ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

# ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ

**Amedekar**
**Müslih SEZER**

**TEZA DOKTORAYÊ**

**Şêwirmendê Tezê**
**Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN**

**Bîngol-2024**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**

**KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

# MELAY-Î CIZİRÎ DİVANI'NIN FİKRÎ KAYNAKLARI

**Hazırlayan**
**Müslih SEZER**

**DOKTORA TEZİ**

**Tez Danışmanı**
**Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN**

**Bingöl-2024**

**NAVEROK**

NAVEROK ... I
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ ... XXV
TEZ ONAY SAYFASI ... XXVI
PÊŞGOTIN ... XXVII
KURTE ... XXX
ÖZET ... XXXI
ABSTRACT ... XXXII
KURTKIRIN ... XXXIII
DESTPÊK ... 1
ÇAVKANIYÊN EDEBIYATA TESEWWIFÊ ... 2
a. Qur'an û Sunnet ... 2
b. 'Ilmê Kelamê ... 3
c. Neoplatonîzm (Nûeflatûnî) ... 4
d. Mîtolojiya Îranê ... 5
e. Mîstîsîzma Hîndê ... 6
f. Dînên Monoteîst (Zerdûştî, Xirîstiyanî) ... 7
BEŞA YEKEM ... 9
1. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI DÎN Û TESEWWIFÊ HILGIRTÎ ... 9
1.1. Dîn ... 9
1.1.1. Mertebeyên Heyînê (Tecelliyên Wucûdê) ... 10
1.1.1.1. Mertebeya Lâ-te'eyyûnê (Mertebeya Bête'eyyûnî, Mertebeya Ehediyetê) ... 11
1.1.1.2. Mertebeya Te'eyyûnê Ewwelî (Mertebeya Wehdetê) ... 12
1.1.1.3. Mertebeya Te'eyyûnê Sânî (Mertebeyê Wahidiyetê) ... 14
1.1.1.4. Âlema Erwâhê/Mertebeya Erwahê ... 15
1.1.1.5. Mertebeya Âlema Misâlê ... 16
1.1.1.6. Mertebeya Şehâdetê / Mertebeya Alema Cismanî ... 17
1.1.1.7. Mertebeya Insânê Kâmil ... 18
1.1.2. Nav û Sifetên Xwûda ... 20
1.1.2.1. Nav û sifetên Xwûda Yên ku Di Qur'an û Hedîsan Da Hatine Beyan Kirin ... 23
1.1.2.1.1. Ellah ... 23
1.1.2.1.1.1. Te'alallah ... 25

1.1.2.1.1.2. Wellah ....................................................................26
1.1.2.1.1.3. Ehsenellah ....................................................................26
1.1.2.1.1.4. Barekellah....................................................................27
1.1.2.1.1.5. Hemdillah ....................................................................27
1.1.2.1.1.6. Lillah ....................................................................27
1.1.2.1.1.7. Billah ....................................................................28
1.1.2.1.2. Îlah....................................................................28
1.1.2.1.3. El-Xefûr, El-Xeffar ....................................................................29
1.1.2.1.4. Es-Semed ....................................................................29
1.1.2.1.5. El-Wehhab ....................................................................30
1.1.2.1.6. El-Wahîb....................................................................31
1.1.2.1.7. Sermedî....................................................................31
1.1.2.1.8. Er-Rebb....................................................................32
1.1.2.1.9. El-Mewla ....................................................................32
1.1.2.1.10. Lemyezel/Layezal ....................................................................33
1.1.2.1.11. El-Heqq....................................................................34
1.1.2.1.12. Es-Subhan ....................................................................35
1.1.2.1.13. El-Xellaq, El-Xaliq....................................................................36
1.1.2.1.14. El-Wahid, El-Ehed ....................................................................36
1.1.2.1.15. El-Wedûd ....................................................................38
1.1.2.1.16. El-Hakîm....................................................................38
1.1.2.1.17. El-Hekîm....................................................................39
1.1.2.1.18. El-Me’bûd, El-Ewwel, El-Axîr, El-Zahîr, El-Batin....................40
1.1.2.1.19. El-Mewcûd, El-Meşhûd....................................................................41
1.1.2.1.20. El-Qeyyûm, Ed-Deyyûm ....................................................................42
1.1.2.1.21. El-Barî ....................................................................43
1.1.2.1.22. Er-Rehman ....................................................................43
1.1.2.1.23. El-Cebbar ....................................................................44
1.1.2.1.24. Es-Subbûh....................................................................45
1.1.2.1.25. Es-Sanî’....................................................................46
1.1.2.1.26. El-Qadîr ....................................................................46
1.1.2.1.27. El-Celal....................................................................47
1.1.2.1.28. El-Celîl....................................................................48
1.1.2.1.29. Eş-Şafî’ ....................................................................49

1.1.2.1.30. Et-Tebîb ....................................................................................................49
1.1.2.1.31. El-Heyy .....................................................................................................49
1.1.2.1.32. Eş-Şahîd ....................................................................................................50
1.1.2.1.33. El-Baqî......................................................................................................51
1.1.2.1.34. El-Bedî' .....................................................................................................51
1.1.2.1.35. El-Fatir .....................................................................................................52
1.1.2.1.36. El-Kerîm ...................................................................................................52
1.1.2.1.37. Ismê E'zem ...............................................................................................53
1.1.2.1.38. En-Nûr ......................................................................................................53
1.1.2.1.39. El-Cemîl, El-Cemal ..................................................................................55
1.1.2.2. Nav û Sifetên Xwûda, yên bi Îzafeya Nav û Sifetên Wî ku di Zimanê Din de Heyî an jî, ji Aliyê 'Alim, 'Arif û Şa'îran ve Hatine Çêkirin ...............56
1.1.2.2.1. Xwûda.........................................................................................................56
1.1.2.2.2. Baxwoy .......................................................................................................57
1.1.2.2.3. Kirdigar .......................................................................................................57
1.1.2.2.4. Dawer ..........................................................................................................57
1.1.2.2.5. Amurzîgar ...................................................................................................58
1.1.2.2.6. Yarê Heqîqî .................................................................................................58
1.1.2.2.7. Meşşateyê Husna Ezel ................................................................................58
1.1.2.2.8. Neqqaşê Ezel ...............................................................................................59
1.1.2.2.9. Mehbûb .......................................................................................................60
1.1.2.2.10. Wehdetê Mutleq .......................................................................................60
1.1.2.2.11. Hostayê 'Işqê .............................................................................................61
1.1.2.2.12. Katib .........................................................................................................61
1.1.2.2.13. Şahê Qudretê ............................................................................................62
1.1.2.2.14. Destê Qudretê ...........................................................................................62
1.1.2.2.15. Hostayê Qudretê .......................................................................................62
1.1.2.2.16. El-Hebîb ...................................................................................................63
1.1.2.2.17. Mulhîmê Xeybê ........................................................................................63
1.1.2.2.18. Sultanê Qidemê, Zatê Qedîm, 'Eslê Qedîm, Nûra Qedîm..........64
1.1.2.2.19. Zatê Muqeddes .........................................................................................65
1.1.3. Melek/Ferîşte ...................................................................................................65
1.1.4. Mishefên Pîroz.................................................................................................68
1.1.5. Sûre, Ayet û Hedîs ...........................................................................................69
1.1.6. Pêxember, Nebî ...............................................................................................73

1.1.6.1. Muhammed (sxl.) ....74
1.1.6.2. Adem....75
1.1.6.3. Îbrahîm....76
1.1.6.4. ‘Îsa (Mesîh) ....77
1.1.6.5. Mûsa (Kelîm) ....78
1.1.6.6. Nûh ....79
1.1.6.7. Suleyman....80
1.1.6.8. Ye’qûb....81
1.1.6.9. Yûsuf....82
1.1.7. Xulefayê Raşidîn (Ebûbekir, ‘Umer, Osman, ‘Elî) ....83
1.1.8. Sehabe, Ehlê Beytê (Ehlê Malbata Pêxember)....85
1.1.9. Qeza û Qeder....85
1.1.10. Axîret û Mevhûmên Derbarê Axiretê ....86
1.1.10.1. Qiyamet....87
1.1.10.2. Berzex ....88
1.1.10.3. Mehşer....88
1.1.10.4. Şefa’et (Mehder)....89
1.1.11. Cennet/Beheşt û Mevhûmên Derbarê Wî....90
1.1.11.1. Hûrî....91
1.1.11.2. Perî, Perîzade....93
1.1.11.3. Wîldan....95
1.1.11.4. Tûba ....96
1.1.11.5. Kewser ....96
1.1.11.6. Selsebîl....97
1.1.11.7. Baxê Îremê, Bihişta Îremê....98
1.1.11.8. Lewhê Mehfûz....99
1.1.11.9. Elest û Qalûbela....101
1.1.11.10. Kuntu Kenzen û Lewlak ....101
1.1.11.11. Buraq....102
1.1.12. Dojeh (Seqer, Nîran, Cehim)....102
1.1.13. Mevhûmên Bawerîyê yên Mayî....104
1.1.13.1. Mî’rac, Şeva Qedrê, Berat, Terfetu’l-‘eyn....104
1.1.13.1.1. Mî’rac ....104
1.1.13.1.2. Leyletu’l-Qedr (Şeva Qedrê) û Şeva Beratê....104

1.1.13.1.3. Terfetu’l-‘Eyn ....... 106
1.1.13.2. Mirin, Ecel û Sekerat ....... 107
1.1.13.3. Rûh ....... 108
1.1.13.4. Şeytan ....... 112
1.1.13.5. Cîn ....... 113
1.1.13.6. Mu’cîze ....... 114
1.1.14. Dîn, Dînên Mayî û Mevhûmên Wan ....... 115
1.1.14.1. Dîn, Îman, Îslam, Musilman ....... 115
1.1.14.1.1. Dîn ....... 115
1.1.14.1.2. Îman ....... 116
1.1.14.1.3. Îslam ....... 117
1.1.14.1.4. Musilman ....... 117
1.1.14.1.5. Hîdayet ....... 118
1.1.14.2. Mescid, Dêr, Kenîşt, Laleş, Çelîpa (Selîb) û Zunnar ....... 118
1.1.14.3. Kufr, Kafir, Înkar, Munkîr, Munafiq, Zulm, Zalim, Zulmet, Muşrik, Mel’ûn, Le’în ....... 121
1.1.14.3.1. Kufr ....... 121
1.1.14.3.2. Kafir ....... 123
1.1.14.3.3. Zulmet ....... 124
1.1.14.3.4. Zulm, Zalim ....... 124
1.1.14.3.5. Înkar, Munkîr ....... 125
1.1.14.3.6. Munafiq, Muşrik ....... 125
1.1.14.3.7. Mel‘ûn, Le’în ....... 126
1.1.14.4. Mewhûm û Terîmên Pûtperestiyê (But/Put, Lat, 'Uzza û Menat, Pûtxane, Senem, Nîgar, Heykel) ....... 126
1.1.14.4.1. Bûtxane/Pûtxane ....... 128
1.1.14.4.2. Senem ....... 129
1.1.14.4.3. Nîgar ....... 129
1.1.14.4.4. Heykel ....... 130
1.1.14.5. Nimêj û Mevhûmên Nimêjê (Qible, Mihrab, Qiyam, Qu'ûd, Seccade, Secde) ....... 131
1.1.14.5.1. Nimêj ....... 131
1.1.14.5.2. Qible ....... 131
1.1.14.5.3. Mihrab ....... 132
1.1.14.5.4. Qiyam û Qu'ûd ....... 133

1.1.14.5.5. Seccade ....................................................................................134
1.1.14.5.6. Secde......................................................................................134
1.1.14.6. Zekat û Mefhûmên Wê (Selem, Nîsab) ........................................135
1.1.14.7. Hecc û Mefhûmên Derbarê Heccê de (Hecca Ekber, Hecca Mebrûrî, Hacî, ‘Umre, Sefa û Merwe, Se’y, ‘Erefat, Tewaf, Îhram) ..........................136
1.1.14.7.1. Sefa û Merwe .......................................................................137
1.1.14.7.2. Tewaf......................................................................................137
1.1.14.7.3. Îhram......................................................................................138
1.1.14.7.4. Qurban ...................................................................................139
1.1.14.8. Ke’be û Mefhûmên Wê (Beyt’ul-heram, Zemzem, Heceru’l-Eswed, ‘Umre) ..................................................................................................140
1.1.14.8.1. Zemzem ..................................................................................141
1.1.14.8.2. Heceru’l-Eswed (Berê Reş) ..................................................142
1.1.14.9. Ferz, Helal, Heram, Guneh, Tewbe ..............................................143
1.1.14.9.1. Ferz.........................................................................................143
1.1.14.9.2. Helal .......................................................................................143
1.1.14.9.3. Heram .....................................................................................144
1.1.14.9.4. Guneh.....................................................................................145
1.1.14.9.5. Tewbe .....................................................................................145
1.1.14.10. Şehadet û Şehîd ........................................................................146
1.2. Tesewwif..............................................................................................147
1.2.1. Şexsiyetên Tesewwifî ......................................................................148
1.2.1.1. Mûrşîd, Şêx, Saqî, Pîrê Mûxan, Pîrê Xerabatê, Welî, Şahê Wilayet, Muxbeçe, Meyfiroş, Salik, Rind, Derwêş, Murîd, Ehlê Meqamatê Terîqê....148
1.2.1.1.1. Mûrşîd.......................................................................................148
1.2.1.1.2. Şêx............................................................................................148
1.2.1.1.3. Saqî, Muxbeçe û Meyfiroş.........................................................149
1.2.1.1.4. Pîrê Mûxan, Pîrê ‘Işqê, Pîrê Xerabatê, Pîrê Terîqê, Pîrê Hikmetbîn ...............................................................................................................151
1.2.1.1.5. Welî û Şahê Wilayetê ................................................................153
1.2.1.1.6. Salik.........................................................................................153
1.2.1.1.7. Derwêş......................................................................................154
1.2.1.1.8. Murîd, Ehlê Meqamatê Terîqê ...................................................154
1.2.1.2. ‘Aşiq ...............................................................................................155
1.2.1.3. ‘Arîf ................................................................................................158
1.2.1.4. Kamil ..............................................................................................160

1.2.1.5. ‘Ebdal ........ 160
1.2.1.6. Mest, Mestane û Mexmûr ........ 160
1.2.1.7. Sekran (Sukran) ........ 163
1.2.1.8. Rind (Rindê Xerabatê) ........ 164
1.2.1.9. Mehbûb ........ 164
1.2.1.10. Zahid, Sûfî, ’Abid, Melamî ........ 169
1.2.1.10.1. Zahid ........ 169
1.2.1.10.2. Sûfî ........ 170
1.2.1.10.3. ‘Abid ........ 171
1.2.1.10.4. Melamet (Melamî/Melametiyye) ........ 171
1.2.1.11. Xafîl ........ 172
1.2.2. Mefhûmên Tesewwifî ........ 172
1.2.2.1. ‘Eşq ........ 172
1.2.2.1.1. ‘Eşq û Tecellî ........ 173
1.2.2.1.2. ‘Eşq Sebeba Afirandinê ye ........ 174
1.2.2.1.3. ‘Eşq, Mum û Perwane ........ 176
1.2.2.1.4. Dînê ‘Eşqê ........ 177
1.2.2.1.5. ‘Eşq û Îradeya Kullî ........ 177
1.2.2.1.6. ‘Eşq, Derd û Bela ........ 178
1.2.2.1.7. ‘Eşq û Mey ........ 178
1.2.2.1.8. ‘Eşq û Elem ........ 179
1.2.2.1.9. Xusûsiyetên ‘Eşqê ........ 181
1.2.2.1.10. ‘Eşqa Beşerî ........ 183
1.2.2.1.11. ‘Eşq û Dil ........ 184
1.2.2.1.12. ‘Eşq û Tewhîd ........ 184
1.2.2.1.13. Zewqa ‘Eşqê ........ 184
1.2.2.1.14. ‘Eşq, Nar/Ateş, Nûr û Lami’ ........ 185
1.2.2.1.15. ‘Eşq û Derya/Qulzem ........ 185
1.2.2.1.16. ‘Eşq û Kelb ........ 186
1.2.2.1.17. ‘Eşq û Rendeş ........ 186
1.2.2.1.18. ‘Eşq û Gewher ........ 186
1.2.2.1.19. ‘Eşq, Ayet û Fatîhe ........ 186
1.2.2.1.20. ‘Eşq û Secdegeh ........ 187
1.2.2.1.21. ‘Eşq û Bor ........ 187

1.2.2.1.22. ‘Eşq û Tuxra ........ 187
1.2.2.1.23. ‘Eşq û Kesayetiyên Wê ........ 188
1.2.2.2. Hubb, Muhebbet û Evîn ........ 189
1.2.2.2.1. Hubb û Muhebbet ........ 189
1.2.2.2.2. Evîn ........ 194
1.2.2.3. Nûr û Lami’ ........ 196
1.2.2.4. Wehdet ........ 200
1.2.2.5. Wîlayet ........ 201
1.2.2.6. Kesret ........ 201
1.2.2.7. Nezer, Besaret, Hîmmet, Înayet ........ 202
1.2.2.7.1. Nezer ........ 202
1.2.2.7.2. Besaret ........ 203
1.2.2.7.3. Hîmmet ........ 204
1.2.2.7.4. Înayet ........ 204
1.2.2.8. Feyz ........ 206
1.2.2.9. Zuhd ........ 207
1.2.2.10. Sulûk (Seyr û Sulûk) û Se’y û Cehd ........ 208
1.2.2.10.1. Sulûk ........ 208
1.2.2.10.2. Se’y û Cehd ........ 209
1.2.2.11. Xelwet ........ 210
1.2.2.12. Keramet ........ 210
1.2.2.13. Seccade û Xirqe/Delq ........ 211
1.2.2.14. Fena û Beqa ........ 212
1.2.2.15. Ezel û Ebed ........ 213
1.2.2.16. Ewwel û Axir ........ 216
1.2.2.17. Zahir û Batin ........ 217
1.2.2.18. Mey, Şerab, Bade, Xemr, Cur’e ........ 219
1.2.3. Ehwalên Tesewwifê ........ 228
1.2.3.1. Tecellî ........ 228
1.2.3.2. Keşf û Şuhûd ........ 231
1.2.3.3. Xeflet ........ 233
1.2.4. Telaqqiyên Tesewwûfê ........ 234
1.2.4.1. Dil ........ 234
1.2.4.1.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Dilê ........ 234

1.2.4.1.2. Dil û Agirê ‘Evînê ....................236
1.2.4.1.3. Dil, Dafik û Teyr ....................238
1.2.4.1.4. Dil û Jeng ....................238
1.2.4.1.5. Çeşmê Dil ....................239
1.2.4.1.6. Dil, Hedefa Tîr, Rîm û Peykanan e ....................239
1.2.4.1.7. Dil û Çiyayê Tûrê ....................240
1.2.4.1.8. Çeşmeyê Dil (Kahniya Dil) ....................240
1.2.4.1.9. Dil, Ke’be û Butxane ....................241
1.2.4.1.10. Dil û Gul ....................241
1.2.4.1.11. Dil û Bulbul ....................242
1.2.4.1.12. Dil, Wuslat û Firqet ....................242
1.2.4.1.13. Dil û Cesed ....................242
1.2.4.1.14. Dil û Mermer ....................242
1.2.4.1.15. Dil û Çiyayê Qafê ....................243
1.2.4.1.16. Dil û Behr ....................243
1.2.4.1.17. Dil Mekanê Fîxanê ye ....................243
1.2.4.1.18. Dil û Neynik ....................243
1.2.4.1.19. Dil, Kafûr û ‘Enber ....................244
1.2.4.1.20. Dil û Fexfûr ....................244
1.2.4.1.21. Dil û Kafir ....................244
1.2.4.1.22. Dil û Rustemê Serhedê ....................245
1.2.4.1.23. Dil û Can ....................245
1.2.4.1.24. Qelb ....................246
1.2.4.1.25. Teşbîhên Mayî ....................247
1.2.4.2. Ayîne (Mîr’at) ....................247
1.2.4.2.1. Ayîneya Dil û Ayîneya Cem ....................249
1.2.4.3. Sîqal (Cîla) ....................250
1.2.4.4. Wucûd ....................251
1.2.4.5. Xeyb ....................252
1.2.4.6. Dunya û Hudûs ....................253
1.2.4.7. Dîwan û Dîwanê Qidemê ....................255
1.2.4.8. Nefs, Nefsê Kullî û Nefsê Emmare ....................256
1.2.5. Faaliyetên Tesewwifê ....................258
1.2.5.1. Zikir ....................258

1.2.5.2. Sema, Reqs û Govend ....258
1.2.5.3. Lerzîn, Cezbe û Ta....265
1.2.6. Mekanên Tesewwifî....267
1.2.6.1. Dergah û Asîtan....267
1.2.6.2. Xaneyê Xemmarî....269
1.2.7. Navên ‘Umûmî yên Ehlên Tesewwûfê ....269
1.2.7.1. Ehlê ‘Eşqê (Pîrê ‘Işqê, Salikê ‘Eşqê, Birîndarê ‘Eşqê, Şehîdê ‘Eşqê) ....269
1.2.7.2. Ehlê Meqamatê Terîqê....271
1.2.7.3. Ehlê Dilan ....271
1.2.7.4. Erbabê Dil û Ehlê Sefa....272
1.2.7.5. Ehlê Hal ....272
1.2.7.6. Ehlê Besaretê....273
1.2.7.7. Ehlê Xerabatê ....273
1.2.8. Ewliya û Mezinên Terîqetê ....274
1.2.8.1. Me’rûfê Kerxî....274
1.2.8.2. Hellacê Mensûr (Ebu‘l-Mugîs el-Huseyn bin Mensur el-Beyzawî)..274
1.2.8.3. Şiblî (Ebû Bekr Dulef bîn Cehder eş-Şiblî) ....276
1.2.8.4. Ferxî/Ferrûxiyê Sîstanî (Ebû Hesen Eliyê kurê Cûlûx) ....277
1.2.8.5. Hatemê Tayî [Ebû Seffane (Ebû Adî) Hatîm bîn Ebdillah bîn Se’d et-Taî el-Kahtanî] ....277
BEŞA DUYEM ....278
2. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI CEMIYETÊ / CIVAKÊ HILGIRTÎ....278
2.1. Şexs....278
2.1.1. Hukûmdar û Rêvebirên Dewletan (Padîşah, Mîr, Melîke, Şah, Beg, Xan û Xaqan)....278
2.1.1.1. Zulqerneyn ....278
2.1.1.2. Xan Şeref....278
2.1.1.3. Belqis ....279
2.1.1.4. Ferfûr (Fexfûr)....279
2.1.1.5. Xan û Xaqan....281
2.1.1.6. Asef....282
2.1.1.7. Mehmûdê Xeznewî û Eyaz (Eyas) ....282
2.1.1.8. Cengîz Xan û Teymûrê Leng ....283
2.1.1.9. Newşîrwan....284

2.1.2. Şa’ir, Alîm û Hunermend/Sen’etkar ....................................................284
2.1.2.1. Manî ..........................................................................................284
2.1.2.2. Eqlîdes.......................................................................................285
2.1.2.3. Se’diyê Şîrazî û Mela Camî ..........................................................285
2.1.2.4. Hafizê Şîrazî...............................................................................286
2.1.2.5. Hemmadê ‘Ereb...........................................................................287
2.1.2.6. Îbn Sîna (Bû ‘Elî sîna) ...................................................................288
2.1.3. Berhemên Şa’ir, Alîm û Hunermendan.................................................289
2.1.3.1. Erjeng (Erjenga Manî) ...................................................................289
2.1.3.2. El-‘Ubabu’l-Zaxir.........................................................................289
2.1.3.3. Şerha Lubabê..............................................................................290
2.1.3.4. Gulşenê Raz û Hikmetil'eyn............................................................290
2.1.4. Kesayetiyên Dîrokî-Efsanewî...............................................................291
2.1.4.1. Samirî........................................................................................291
2.1.4.2. Zuleyxa .....................................................................................292
2.1.4.3. Îskender.....................................................................................292
2.1.4.4. Dara...........................................................................................293
2.1.4.5. Cem (Cemşîd)..............................................................................294
2.1.4.6. Dehhak .....................................................................................295
2.1.4.7. Keyxusrew û Zeng (Nûreddîn Mehmûdê Zengî) ..............................296
2.1.4.8. Xizir û Îlyas................................................................................297
2.1.4.9. Rustemê Zal ...............................................................................298
2.1.4.10. Qeyser ....................................................................................299
2.1.4.11. Efrasiyab .................................................................................299
2.1.4.12. Hekîm Loqman..........................................................................300
2.1.4.13. Şapûr ......................................................................................300
2.1.5. Kesayetiyên Çîrokî (Hîkayewî) ............................................................301
2.1.5.1. Xusrew û Şirîn............................................................................301
2.1.5.2. Leyla û Mecnûn...........................................................................302
2.1.5.3. Ferhad û Şîrîn .............................................................................303
2.1.5.4. Şeyxê Sen’an..............................................................................305
2.1.5.5. Mem û Zîn..................................................................................305
2.1.5.6. Gêw û Peşeng .............................................................................306
2.2. Qewm.................................................................................................306

2.2.1. ‘Ereb....306
2.2.2. ‘Ecem....307
2.2.3. Kirmanc....308
2.2.4. Tirk....308
2.2.5. Mecer....309
2.2.6. Rûm....309
2.2.7. Nûbî û Zengî....310
2.2.8. Teter....310
2.2.9. Hindî....311
2.2.10. Hebeş....311
2.2.11. Fireng....312
2.2.12. Moxul....312
2.2.13. Qereş (Qureyş)....312
2.2.14. Qeçer....313
2.3. Welat û Şar....313
2.3.1. Fireng (Firengîstan)....313
2.3.2. Çîn û Maçîn....313
2.3.3. Bexdad....314
2.3.4. Xeta (Xeten)....314
2.3.5. Teter....315
2.3.6. Seba....315
2.3.7. Bedexşan....316
2.3.8. Heleb....316
2.3.9. Espehan (Esfehan)....316
2.3.10. Kurdistan....316
2.3.11. Şîraz....317
2.3.12. Yeng (Yang)....318
2.3.13. Wan....318
2.3.14. Finik (Findik)....319
2.3.15. Tebrîz û Xurasan....319
2.3.16. Hebeşistan....320
2.3.17. Misir....320
2.3.18. Qezneyn (Xeznîn)....320
2.3.19. Laleş....321

2.3.20. Ermenistan ..... 321
2.3.21. Necef ..... 321
2.3.22. Behreyn ..... 322
2.3.23. Kerbela ..... 322
2.3.24. ‘Erebistan, Mekeh û Medîne ..... 322
2.3.25. Derbend û Semerqend ..... 323
2.3.26. Bohtan û Cizîr ..... 323
2.3.27. Şam û ‘Iraq ..... 324
2.4. Çem, Çiya, Wadî û Behr ..... 324
2.4.1. Çem ..... 324
2.4.1.1. Firat, Dîcle û Nîl ..... 324
2.4.2. Çiya (Koh) ..... 325
2.4.2.1. Tûrê Sîna ..... 325
2.4.2.2. Kohê Qendîlê ..... 326
2.4.2.3. Kohê Qaf ..... 326
2.4.3. Behr (Behra Qulzumê) ..... 326
2.4.4. Wadî (Wadiyê Eymenê) ..... 328
2.5. Jîyana Civakî/Îctîmaî’ ..... 329
2.5.1. ‘Ilm û Mekteb ..... 329
2.5.2. Meslek (Pîşe) û Meşxûliyet ..... 330
2.5.2.1. Seyyad (Nêçîrvan) ..... 330
2.5.2.2. Sehhar û Huqqebaz ..... 330
2.5.2.3. Heddad ..... 331
2.5.2.4. Xulam û Xizmetkar ..... 331
2.5.2.5. Şehsuwar ..... 332
2.5.2.6. Serdar ..... 332
2.5.2.7. Meyfiroş û Xemmar ..... 333
2.5.2.8. Qessar ..... 333
2.5.2.9. Yaqutfiroş ..... 334
2.5.2.10. Cadû ..... 334
2.5.2.11. Muxnî (Muxennî) û Sazende ..... 334
2.5.2.12. Mutrib û Qewwal ..... 335
2.5.2.13. Rimbaz û Faris ..... 336
2.5.2.14. Muftî ..... 337

2.5.2.15. Hekîm (Tebîb) ....................................................................337
2.5.2.16. Cellad û Qatîl....................................................................338
2.5.2.17. Xewwas (Noqîbaz) ..............................................................338
2.5.2.18. Qessab ..........................................................................339
2.5.3. Bezm, Meclis, Dîwan û Unsûrên Wan...........................................339
2.5.3.1. Bezm û Meclis...................................................................339
2.5.3.2. Dîwan............................................................................340
2.5.3.3. Saqî ..............................................................................341
2.5.3.4. Qedeh (Fincan, Cam, Saxer, Xum, Bulbul, Peymane, Kûze, Tas, Kase) ..........................................................................................343
2.5.3.4.1. Qedeh.........................................................................343
2.5.3.4.2. Fincan û Cam ...............................................................344
2.5.3.4.3. Bulbul ........................................................................344
2.5.3.4.4. Saxer ..........................................................................345
2.5.3.4.5. Xum ...........................................................................345
2.5.3.4.6. Peyale ........................................................................345
2.5.3.4.7. Peymane......................................................................346
2.5.3.4.8. Kase û Şehkase.............................................................346
2.5.3.4.9. Kûze û Tas ..................................................................347
2.5.3.5. Şem’ ..............................................................................347
2.5.4. Muzîk û Amûrên Wê ................................................................348
2.5.4.1. Amûrên Muzîkê (Ney/Nay, Erxenûn, Saz, Def, Çeng, Jeh, ‘Ud, Tenbûr, Qanûn, Rebab) ..................................................................348
2.5.4.1.1. Ney û Nay ...................................................................348
2.5.4.1.2. Erxenûn.......................................................................350
2.5.4.1.3. Saz .............................................................................350
2.5.4.1.4. Def û Çeng ..................................................................351
2.5.4.1.5. Jeh/Zeh........................................................................352
2.5.4.1.6. ‘Ûd û Tenbûr................................................................352
2.5.4.1.7. Qanûn û Rebab.............................................................353
2.5.4.2. Meqam û Awazên Muzîkê .....................................................353
2.5.5. ‘Eyş û Noş ............................................................................354
2.5.6. ‘Eyd, Cejn û Şahî.....................................................................354
2.5.6.1. ‘Eyda Qurbanê..................................................................356
2.5.6.2. Newroz...........................................................................356

2.5.7. Telaqqiyên Derbarê Kesayetiyan de ....................................................357
2.5.7.1. Ehlê Şeqa....................................................................................357
2.5.7.2. Ehlê Segsirişt, Xebaîsteb’ û Ker.....................................................357
2.5.7.3. Erbabê Wefayê ...........................................................................358
2.5.7.4. Dost û Hebîb...............................................................................358
2.5.7.5. Tifl, Ciwan ..................................................................................359
2.5.7.6. Şah, Mîr û Geda...........................................................................359
2.5.7.7. Miskîn ( Jar, Xerîb û Feqîr)...........................................................360
2.5.7.8. Naehl û Nadan ............................................................................361
2.5.8. Avahî û Cureyên Wan.....................................................................362
2.5.8.1. Meyxane, Meygede, Xaneyê Xemmar ..........................................362
2.5.8.2. Seray, Qesr, Eywan û Şehneşîn.....................................................363
2.5.9. Qumaş û Cil û Berg ........................................................................363
2.5.9.1. Etles, Dîba û Xare........................................................................363
2.5.9.2. Herîr...........................................................................................364
2.5.9.3. Sundus........................................................................................365
2.5.9.4. Lîbas û Came...............................................................................365
2.5.9.5. Hicab, Sitare û Nîqab...................................................................366
2.5.9.6. Damen ........................................................................................368
2.5.9.7. Serpoş û Qeba..............................................................................368
2.5.9.8. Kemer.........................................................................................369
2.5.9.9. Çar ............................................................................................369
2.5.10. Eşyayên Neqş û Xemilandinê û Kevir û Me’denên Giranbiha .............369
2.5.10.1. Zêr............................................................................................369
2.5.10.2. Le’l............................................................................................371
2.5.10.3. Gewher......................................................................................372
2.5.10.4. Elmas.........................................................................................375
2.5.10.5. Zîv (Sîm), Sifir (Mes) ..................................................................375
2.5.10.6. Feyrûze......................................................................................377
2.5.10.7. Durr, Durdane û Lu’lu’ ...............................................................377
2.5.10.8. Mercan ......................................................................................380
2.5.10.9. Sedef .........................................................................................380
2.5.10.10. ‘Eqîq.........................................................................................381
2.5.10.11. Yaqût........................................................................................382

2.5.11. Bêhnên Xweş/Melzemeyên Kozmetîk....382
2.5.11.1. Kafûr....382
2.5.11.2. Misk, Muşk, Nafe, Zebad/Zubad....383
2.5.11.3. ‘Enber....384
2.5.11.4. Gulav/Gulab/Mawerd....386
2.5.11.5. ‘Ebîr....387
2.5.12. Tiştên Xwarinê....388
2.5.12.1. Şeker, Qend, Neyşeker....388
2.5.12.2. Şehd/Esel (Hingîv)....389
2.5.12.3. Engûr....389
2.5.12.4. Bih....390
2.5.12.5. Sêv....390
2.5.12.6. Genim....391
2.5.13. Tiştên Vexwarinê û Maddeyên Keyfdanê....391
2.5.13.1. Beng (Esrar)....391
2.5.13.2. Qehwe....391
2.5.13.3. Şîr û Şerbet....392
2.5.14. Amûrên Nivîsînê û Unsûrên Wê....392
2.5.14.1. Hunera Xetê û Cureyên Wê (Reyhanî, Dîwanî, Sulis û Muselsel)..392
2.5.14.2. Herf....394
2.5.14.3. Qelem (Kilk, Xame)....396
2.5.14.4. Huqqe....398
2.5.15. Leyîstik û Pêlîstok (Setrenc, Çewgan)....399
2.5.15.1. Setrenc....399
2.5.15.2. Çewgan....400
2.5.16. Amûrên Şerî (Xencer, Gezme, Tîr û Xedeng, Teber/Tevr, Şûr/Şîr, Mizreq, Kevan Peykan, Yengî, Barut, Tox û ‘Al)....401
2.5.17. Eşyayên Din (Kulab, Qefes, Ceres, Ne’l)....404
BEŞA SÊYEM....408
3. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI ÎNSÊN HILGIRTÎ....408
3.1. Însan....408
3.2. Spehîtayî/Rindîtî (Husn û Cemal)....409
3.3. Dost, Yar, Hebîb, Me’şûq....413
3.3.1. Tesewwûr, Teşbîh û Mecazên Derbarê Mehbûbê....416
3.3.1.1. Padişah, Xaqan, Sultan, Mîr, Xundkar, Xusrew, Şah, Qeyser û Beg 416

3.3.1.2. Tabîb/Hekîm....417
3.3.1.3. Melek, Perî, Wîldan, Hûrî, Rûhu’l-Qudus....417
3.3.1.4. Kewkeb (Stêr), Mîhr (Afitab, Xurşîd), Mah, Zuhre....418
3.3.1.5. Gul, Xonce....418
3.3.1.6. Şahbaz, Şahîn, Teyxun....419
3.3.1.7. Şem’....419
3.3.1.8. Leyla, Şîrîn, Belqîs....420
3.3.1.9. But, Lat, Senem, Nîgar....421
3.3.1.10. Yusûf, Mûsa, ‘Îsa (Mesîh)....421
3.3.1.11. Saqî....422
3.3.1.12. Tûtî....422
3.3.1.13. Tac....422
3.3.1.14. Ahû....422
3.4. Unsûrên Spehîtayiyê di Yarê de....422
3.4.1. Rû/ Dêm /Sîma/Wech....422
3.4.2. Zulf, Bisk, Gîsu, Kakûl, Turre....424
3.4.2.1. Teşbîhên Derbarê Zulfê de....425
3.4.2.1.1. ‘Enber, ‘Ebîr (Zer’enber), Mawer (Mawerd/Gulav), Mulkê Xeten....425
3.4.2.1.2. Tewaf....426
3.4.2.1.3. Mar, ‘Eqreb (Duvpişk)....427
3.4.2.1.4. Huma....428
3.4.2.1.5. Kemîn/Dav....428
3.4.2.1.6. Senceq/Lîwa....429
3.4.2.1.7. ‘Aşiq....429
3.4.2.1.8. Toqê Gerdenê, Zunnar....430
3.4.2.1.9. Bedbextî û Bext Girêdan....430
3.4.2.1.10. Şev, Zulmet û Reşatî....431
3.4.2.1.11. Herfa Lam û Dalê....431
3.4.2.1.12. Sihrê Samirî, ‘Eyyarî....431
3.4.2.1.13. Zêr û Herîr....432
3.4.3. Çav (Çe’hv/Dîde/Çeşm/ ‘Eyn)....432
3.4.3.1. Tesewwir û Teşbîhên Derbarê Çavî....433
3.4.3.1.1. Nêrgis, Şehla, Mest û Mexmûr....433
3.4.3.1.2. Sehhar, Cadû, Xemmaz (Fettan, Fitneengîz)....434

3.4.3.1.3. Esed/Şêr, Piling ....................................................................434
3.4.3.1.4. Sad, 'Eyn.........................................................................435
3.4.4. Birh/Ebrû ............................................................................435
3.4.4.1. Teşbîh û Tesewwûrên Derbarê Ebrûyê de ......................................436
3.4.4.1.1. Hîlal/Mahê New ................................................................436
3.4.4.1.2. Keman/Kevan, Qews, Qabê Qewseynê ....................................436
3.4.4.1.3. Mihrab, Qible, Secdegah .......................................................437
3.4.4.1.4. Terazî, Tuxra, Mohr/Xatem ....................................................438
3.4.4.1.5. Qedeh................................................................................439
3.4.4.1.6. Şev, Eswed, Siyah ...............................................................439
3.4.4.1.7. Nûn ...................................................................................440
3.4.4.1.8. Ne'l....................................................................................440
3.4.5. Mujgan (Mijang).......................................................................441
3.4.5.1. Teşbîh û Tesewwirên Derbarê Mijangê de ....................................441
3.4.5.1.1. Cellad, Tîr (Xedeng, Peykan, Gezme), Keyber, Mizraq, Xencer, Şûr, Rim ......441
3.4.5.1.2. Per/Çeng ...........................................................................442
3.4.6. Xemze (Awir) ..........................................................................442
3.4.7. Enî/Cebhet ..............................................................................443
3.4.8. Xal/Nîşan.................................................................................444
3.4.8.1. Teşbîh û Tesewwûrên Derbarê Xalê de ..........................................444
3.4.8.1.1. Nuqteya Wehdetê ya Heqq, Herfên Mishefê ............................444
3.4.8.1.2. Ke'be, Qible .......................................................................445
3.4.8.1.3. Filfil, 'Enber, Hebeş ............................................................445
3.4.8.1.4. Dane...................................................................................445
3.4.8.1.5. Gul, Nesrîn, Misk ................................................................446
3.4.9. Dev û Lêv/Leb ..........................................................................446
3.4.9.1. Teşbîh û Tesewwirên Derbarê Dev û Lêvê de ...............................447
3.4.9.1.1. Şeker/Qend û Nebat, Şerbet.....................................................447
3.4.9.1.2. Le'l, Bade/Mey ....................................................................447
3.4.9.1.3. Xunçe, Huqqe, Mîm ..............................................................448
3.4.9.1.4. Ava Heyatê, 'Îlac .................................................................448
3.4.10. Çene (Zenexdan, Zeqen) ..........................................................449
3.4.11. Gerden ..................................................................................450
3.4.12. Yed/Dest û Enguşt (Tilî) ..........................................................450

3.4.13. Bejin (Qed/Qamet).....451
3.4.13.1. Teşbîh û Tesewwirên Derbarê Bejnê de.....451
3.4.13.1.1. Serw/Selwa (Sipîndar), ‘Er’er (Qaça Hêvrizê), Şimşad (Bîşeng).....451
3.4.13.1.2. Nêrgiz.....452
3.4.13.1.3. Elîf.....452
3.5. Unsûr û Xusûsiyetên Yarê Yên Mayî.....453
3.5.1. Reftar/Meş.....453
3.5.2. Bûse.....453
3.5.3. Zulm, Cewr û Cefa.....454
3.5.3.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Cewr û Cefayê de.....455
3.5.3.1.1. Xencer, Tîr.....455
3.5.3.1.2. Perengê Ateş.....455
3.5.4. Lutûf û Kerem.....455
3.5.4.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Lutûf û Keremê de.....456
3.5.4.1.1. Loqmanî.....456
3.5.4.1.2. Nezer.....456
3.5.4.1.3. Xencerkirin.....456
3.5.4.1.4. Pirskirina Gilehan.....456
3.5.5. Kuyê Yarê.....457
3.5.6. Axa Bin Pêyên Yarê.....457
3.5.6.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Axa Bin Pêyên Yarê de.....458
3.5.6.1.1. Kuhl/Surme/Tûtiya û Dane (Kilê Çavan).....458
3.5.6.1.2. Cela.....459
3.6. ‘Aşiq.....459
3.6.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê ‘Aşiqî de.....459
3.6.1.1. Bulbul, ’Endelîb (Hezar), Qumrî, Tûtak û Goyîn, Kew, Murx, Kelb.....459
3.6.1.2. Ceres (Zengil), Ney û Nay.....461
3.6.1.3. Hilal, Re’d.....461
3.6.1.4. Ayîne.....462
3.6.1.5. Şem’/Şemal û Perwane.....462
3.6.1.6. Şah û Geda/Bende.....463
3.6.1.7. Şehîd, Bîmar.....463
3.7. Unsûrên Wucûda ‘Aşiqî.....463
3.7.1. Sîne.....463

3.7.2. Teşbîhên Derbarê Sîneyê de ....................................................464
3.7.2.1. Putxane ....................................................464
3.7.2.2. Ney û Nay ....................................................464
3.7.2.3. Lewh ....................................................464
3.7.2.4. Kebab ....................................................465
3.7.3. Çav (Çeşm/Dîde) û Eşk (Hêstirên Çavan) ....................................................465
3.7.3.1. Teşbîhên Derbarê Çav û Eşkê de....................................................466
3.7.3.1.1. Ye’qub ....................................................466
3.7.3.1.2. Le‘l (Durr) û Mercan ....................................................466
3.7.3.1.3. Xwîn ....................................................467
3.7.3.1.4. Mewc, Derya, Nîl ....................................................467
3.7.4. Cerg/Ceger....................................................468
3.7.4.1. Teşbîhên Derbarê Cegerê de ....................................................468
3.7.4.1.1. Ateş (Agir) ....................................................468
3.7.4.1.2. Çeng û Jeh....................................................468
3.8. Hal û Rewşên ‘Aşiqî Yên Mayî ....................................................468
3.8.1. Hicran (Hicr/Firaq/Firqet) ....................................................468
3.8.1.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Hicranê de....................................................470
3.8.1.1.1. Agir (Nar) ....................................................470
3.8.1.1.2. Xedeng (Tîr)....................................................470
3.8.1.1.3. Cur’e ....................................................470
3.8.1.1.4. Qiyamet, Rûsiyah ....................................................471
3.8.2. Weslet (Wasil/Wîsal/Wesl) ....................................................471
3.8.2.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Wesletê de....................................................472
3.8.2.1.1. Çira ....................................................472
3.8.2.1.2. Cennet, Heyat....................................................472
3.8.2.1.3. Şîfa, Şerbet....................................................473
3.8.2.1.4. Zekat ....................................................473
3.9. Reqîb (Exyar, ‘Edû/Dijmin)....................................................474
BEŞA ÇAREM ....................................................476
4. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI TEBÎ’ETÊ/SIRUŞTÊ HILGIRTÎ ....................................................476
4.1. Alema Kozmîk/Felek....................................................476
4.1.1. Afirandina ‘Alem û Felekan û Mertebeyên Afirandinê ....................................................478
4.1.1.1. El- Barî (Afirîner)....................................................478

4.1.1.2. ‘Eqlê Ewwel ........................................................................................478
4.1.1.3. Nefsê Kûllî (Rûhê Mutleq/Rûhê ‘Alemê) ........................................479
4.1.1.4. Heyûla ..............................................................................................479
4.1.1.5. Tebî’et ..............................................................................................479
4.1.1.6. Cismê Mutleq ..................................................................................480
4.1.1.7. Felek û ‘Alema Felekan ....................................................................480
4.1.1.8. Çar Unsûr ........................................................................................480
4.1.1.9. Sê ‘Alem ..........................................................................................481
4.1.2. Tesewwûr, Teşbîh û Mecazên Derbarê Felekê de (Dewran, Çerx, Sîpîhr, Gunbedê Dewwar, ‘Erş û Kursî, Sema) ..........................................481
4.1.2.1. Fulk (Keştî), Xurab (Qayik), Etles, Hebab ......................................481
4.1.2.2. Tîr, Nûbar, Qews, Cedwel ................................................................482
4.1.2.3. Mîna, Gunbed, Dolab, Xêvet ............................................................483
4.1.2.4. Nêçîrvan, Dam/Kemîn, Şunqar (Teyrê Baz) ......................................483
4.1.2.5. Qentar (Kerwan) ..............................................................................483
4.1.2.6. ‘Eşq, Gulzar ....................................................................................484
4.1.2.7. Sehhar, Mekkar, Ejdeha Mişar/Erre ................................................484
4.1.3. Stêr (Necm, Kewkeb, Exter) ................................................................485
4.1.3.1. Tesewwûr û Teşbîhên Derbarê Stêran de ........................................487
4.1.3.1.1. Tecellî ..........................................................................................487
4.1.3.1.2. Ehlê ‘Irfanê ..................................................................................487
4.1.3.1.3. ‘Aşiq û Me’şûq ..............................................................................487
4.1.3.1.4. Bişkuw, Kemer ..............................................................................488
4.1.4. Hinek Stêr ..........................................................................................488
4.1.4.1. Şihab ................................................................................................488
4.1.4.2. Suheyl (Stêra Qurixiyê) ....................................................................489
4.1.4.3. Sureyya/Perwîn ................................................................................489
4.1.5. Birc/Buruc ..........................................................................................491
4.1.5.1. Birca Hemelê (Birca Beranê) ............................................................493
4.1.5.2. Birca Xerçengê (Birca Kêvjalê) ........................................................494
4.1.5.3. Birca ‘Eqrebê (Birca Dûvpişkê) ........................................................494
4.1.5.4. Bircê Qewsê (Birca Kevanê) ............................................................495
4.1.5.5. Birca Teraziyê/Birca Mîzanê ............................................................495
4.1.5.6. Birca Esedê (Birca Şêrê) ..................................................................496
4.1.5.7. Birca Sunbuleyê (Birca Ûşiyê) ..........................................................496

4.1.5.8. Burca Cewzayê (Birca Cêwiyê) ....................................................497
4.1.6. Seyyare (Gerestêrk) ....................................................................................497
4.1.6.1. Zuhel/Keywan (Satûrn)................................................................................498
4.1.6.2. Muşterî (Jupîter) ........................................................................................499
4.1.6.3. Merîx (Mars) ...............................................................................................500
4.1.6.4. Roj (Xawer/Şems/Mîhr/Afitab/Xurşîd) .........................................501
4.1.6.4.1. Teşbîh û Tesewwûrên Derbarê Rojê de....................................502
4.1.6.4.1.1. Mehbûb (Wechê/Rûyê Yarê), Hubb ...............................502
4.1.6.4.1.2. Durdane (Mirarî)...........................................................504
4.1.6.4.1.3. Nûr, Nûra Heq ..............................................................504
4.1.6.4.1.4. Sidretu'l-munteha ..........................................................504
4.1.6.4.1.5. Dewlet/Îqbal û Tac.........................................................505
4.1.6.5. Zuhre (Wenûs)...............................................................................................505
4.1.6.6. 'Etarîd (Merkûr) ...........................................................................................506
4.1.6.7. Heyîv/Hîv (Meh, Qemer, Bedr, Hîlal/Mahê New)..........................507
4.1.6.7.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Heyîvê de.....................................508
4.1.6.7.1.1. Yar, Memdûh.................................................................508
4.1.6.7.1.2. Dêm, Rû, Enî, Xebxeb (Gerden) ....................................508
4.1.6.7.1.3. Text ...............................................................................509
4.1.6.7.2. Bedr û Teşbîh û Mecazên Derbarê Wê de ...............................510
4.1.6.7.2.1. Yar.................................................................................510
4.1.6.7.2.2. Rû, Dêm ........................................................................510
4.1.6.7.2.3. Neynika dil ....................................................................511
4.1.6.7.3. Hilal (Mahê New) û Teşbîh û Mecazên Derbarê Wê de ............511
4.1.6.7.3.1. Yar, 'Aşiq, Rû, Birh .......................................................512
4.1.6.7.3.2. Das, Cam (Qedeh), Ne'l, Mihrab, Qews (Kevan) ..............513
4.2. Heywan/Ajal .....................................................................................................514
4.2.1. Teyr (Perende) û Cureyên Wan ........................................................514
4.2.1.1. Tawus...........................................................................................................515
4.2.1.2. Goyîn (Goguk) ..............................................................................................516
4.2.1.3. Tûtak............................................................................................................516
4.2.1.4. Bulbul (Endelîb) ............................................................................................517
4.2.1.4.1. Bulbul û Gul.......................................................................................517
4.2.1.4.2. Bulbul û 'Aşiq ....................................................................................518

4.2.1.5. Zerbav (Zendbaf) .....518
4.2.1.6. Şimqar/Şunqar .....519
4.2.1.7. Kebk (Kew) .....519
4.2.1.8. Tezerû (Tezerwan) û Durrac (Kewê Por/Zirrkew) .....520
4.2.1.9. Kebûter .....521
4.2.1.10. Teyxûn (Teyrê Dewletê) .....521
4.2.1.11. Baz/Şahbaz .....521
4.2.1.12. Şahîn .....522
4.2.1.13. ‘Uqab (Qertel/Elho) .....523
4.2.1.14. Tûtî (Bebxa) .....524
4.2.1.15. Sî û Qaz .....524
4.2.1.16. Qumrî .....524
4.2.1.17. Hudhud .....525
4.2.1.18. Zax/Xurab (Qelereşk) .....526
4.2.2. Heywanên Çar Ling / Ajalên Çar Pê .....527
4.2.2.1. Şêr (Eslan, Esed) .....527
4.2.2.2. Piling .....528
4.2.2.3. Hesp (‘Eşqer, Duldul, Feres, Semend) .....529
4.2.2.4. Merkeb/Xer (Ker) .....529
4.2.2.5. Xezal/Ahû .....530
4.2.2.6. Sincab (Sivor) û Weşek (Werşeq) .....531
4.2.2.7. Seg, Tule .....531
4.2.2.8. Ga .....532
4.2.2.9. Fîl .....532
4.2.3. Heywanên Xuşende, Semek, Mêş .....533
4.2.3.1. Semek (Masî) .....533
4.2.3.2. Meges (Mêş) .....533
4.2.3.3. ‘Eqreb (Dûvpişk) .....533
4.2.3.4. Perwane (Perperok) .....534
4.2.3.5. Mar (Reşmar, Îlan, Erqem, Ef’a) .....535
4.2.4. Heywanên Mîtolojîk .....537
4.2.4.1. Huma .....537
4.2.4.2. ‘Enqa .....538
4.2.4.3. Jiha/Zuha (Ejdeha) .....539

4.2.4.4. Dêw ........................................................................................540
4.3. Nebatat/Riwek ......................................................................................540
4.3.1. Giya û Dar ......................................................................................540
4.3.1.1. Weres ......................................................................................540
4.3.1.2. Kerbeş ......................................................................................541
4.3.1.3. ‘Er’er ......................................................................................541
4.3.1.4. Serw/Selwa ......................................................................................542
4.3.1.5. Şimşad (Bîşeng) ......................................................................................543
4.3.2. Çîçek û Cureyên Wê ......................................................................................543
4.3.2.1. Erxewan ......................................................................................543
4.3.2.2. Xunçe ......................................................................................544
4.3.2.3. Gulnar ......................................................................................546
4.3.2.4. Gul (Werd, Sorgul, Gulazer) ......................................................................................546
4.3.2.4.1. Teşbîh, Mecaz û Tesewwûrên Derbarê Gulê ......................................................................................547
4.3.2.4.1.1. Gul û Yar ......................................................................................547
4.3.2.4.1.2. Gul û Xar ......................................................................................548
4.3.2.4.1.3. Gul û Bulbul ......................................................................................548
4.3.2.4.1.4. Gul û Aşiq ......................................................................................549
4.3.2.5. Filfil (Îsota Reş) ......................................................................................549
4.3.2.6. Lale ......................................................................................550
4.3.2.7. Binefş ......................................................................................551
4.3.2.8. Nêrgiz ......................................................................................552
4.3.2.9. Nesteren (Nester/Nesrîn) ......................................................................................553
4.3.2.10. Reyhan ......................................................................................555
4.3.2.11. Sunbul/Sinbil ......................................................................................556
4.3.2.12. Sosin ......................................................................................557
4.3.2.13. Yasemîn/Semen ......................................................................................557
ENCAM ......................................................................................559
JÊDER ......................................................................................562

## BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Çavkaniyên Hizrî yên Dîwana Melayê Cizîrî* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

15/ 05 / 2024

Müslih SEZER

**TEZ ONAY SAYFASI**

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**

**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

***Müslih SEZER*** tarafından hazırlanan "***Çavkaniyên Hizrî yên Dîwana Melayê Cizîrî***" başlıklı bu çalışma, *30.05.2024* tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *[oybirliği ile]* başarılı bulunarak jürimiz tarafından Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

**TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan** | : Doç. Dr. Yakup AYKAÇ | İmza: ………… |
| **Danışman** | : Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN | İmza: ……….. |
| **Üye** | : Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar Ahmad | İmza: ……….. |
| **Üye** | : Doç. Dr. Zafer AÇAR | İmza: ……….. |
| **Üye** | : Dr. Öğr. Üyesi Şeyhmus ORKİN | İmza: ……….. |

**ONAY**

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun ......./....../2024 tarih ve ...................... sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Enstitü Müdürü

## PÊŞGOTIN

Ev tez, li ser "Çavkaniyên Hizrî yên Dîwana Melayê Cizîrî" radiweste. Armanca vê tezê ew e ku di şexsiyeta dîwana Cizîrî de, bingeh û çavkaniyên dîwanê bêne beyankirin ku pêşketina edebiyata kurdî bête dîtin. Çavkaniyên dîwana Cizîrî, bi beytên dîwanê yên ku wateya wan herî têrdar ve, wek îmaj, mezmûn, sembol û têgehan ve hatine tespîtkirin.

Vê tezê, îlhama xwe ji hinek berhem û tezên Tirkî hilgirtiye. Berhema Agah Sırrı Levend ya bi navê "*Divan Edebiyatı/Kelimeler, Remizler, Mazmunlar ve Mefhumlar*", berhema Rıdvan Canım ya bi navê "*Divan Edebiyatının Kaynakları*" û teza doktorayê ya Abdulhakim Kılınç ya bi navê "*Fuzûlî'nin Türkçe Divanı, Edisyon Kritik ve Konularına Göre Fuzûlî Divanı*" ji wan berheman in. Bi van xebatan, di sînorên metnên edebî de, paşxane û 'ilmê edebiyata klasîk, îmajên şi'ra farisî û 'erebî, têgehên tesewwif û felsefeya Îslamê derdikevine pêş.

Melayê Cizîrî helbestvanekî sereke yê edebiyata kurdî ye û tesîreke berfireh li ser gelek helbestvanan hiştiye û bi helbest û îmajên dîwanê ve jî dikare bi serê xwe temsîliyeta edebiyata klasîk jî bike. Me xwest ku bête zanîn bê kesayetiyekî weha giring di dîwana xwe de çi mijar bi çi awayî/şeklî bi kar anîne.

Di edebiyata kurdî ya klasîk de, yek ji wan berhemên giringtirîn jî dîwana Melayê Cizîrî ye. Li ser dîwana wî, bi dehan şerh, tez, nezîre û texmîs hatine nivîsîn. Dîwana Cizîrî, wek metneke edebî û tesewwifî, ji aliyê hunerên vegotinê ve metneke kanonîk e û herî zêde ji du aliyan ve balkêş û giring e. Yek ji aliyê naverokê ve ye ku bi têgeh û mezmûnên tesewwifî, ji hizr û bîra Cizîrî wateyên xwe girtine û yek jî, ji aliyê zimên ve ye ku nimûneyên zimanekî serkeftî û edebî ji her aliyî ve tê de dikarin bêne dîtin.[1]

Di vê xebatê de, destxeta dîwana Melayê Cizîrî ya Îsmaîl Paşayê Amêdî bûye bingeh. Her çendê destxeta Dîwana Melayê Cizîrî ya herî kevn ya Muhemmed Teyyar Paşayê Amêdî be jî (sala îstînsaxê: 1815), lêbelê bi rêk û pêkiya xwe û pergelsazî û xweşnivîsîn û rastnivîsîna xwe ve ya kurê wî Îsmaîl Paşayê Amêdî ji ya wî serkeftîtir e. Ji ber van egeran me jî, destxeta Îsmaîl Paşa hilbijart. Ev destxet, bi xebata Tahsîn Îbrahîm Doskî re hatiye berawirdkirin. Doskî, bi dehan destxet berawird kirine û

[1] Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (Amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî), Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2019, r. 5.

cudahiyên destxetan nîşan dane. Têgeh, mezmûn û sembolên balkêş di kîjan beyt û çarrêzan de hebin ew wek nimûne hatine nîşandan. Di piyaseya edebîyatê de çi helbestên Melayê Cizîrî hebin hemû hatine berhevkirin û di nêv van helbestan de mijarên dîwanê hatine tespîtkirin. Çavkaniyên hizrî yên dîwana Cizîrî, bi goreyî naveroka xwe ve, di bin banê çar beşan de hatine tesnîfkirin. Di tespîtkirina mijarên dîwanê de hate dîtin ku unsûrên dîwanê bingeha xwe ji dîn û tesewwifê, ji cîvakê, ji însên û ji sirûştê hilgirtine. Ev çavkaniyên sereke jî di nav xwe de wek binbeşan hatine tesnîfkirin û îzahkirin. Mefhûm, têgeh, sembol û îmajên ku di muhayyileya Cizîrî de şekil girtine, me'na û mahiyetê wan, xusûsiyetên wan ên teşbîhî û mecazî hatine beyankirin. Di nêv beyt û çarrêzên Cizîrî de unsûrên çandî, tefekkûrî û îmajên edebî û estetîkî wek çavkaniyên hizrî hatine hilbijartin. Çavkaniyên dîwana Cizîrî ku hest û ramangeriya cîhana Cizîrî jî nîşan didin, hatine kifşkirin. Mezmûn, îmaj, sembol û têgehên dîwana Cizîrî, ewilî bi wateyên xwe yên gelemperî ve hatine îzahkirin û paşê jî di hişmendî û hestewariya Cizîrî de çawa şekil girtine bi nimûneyên beytan hatine beyankirin. Nimûneyên beytan bi goreyî hejmara helbestan hatine dayîn. Di destxetan de helbestên Cizîrî, bi goreyî alfabeyê hatine dîzaynkirin û em jî ji vê tesnîfê re sadiq man û me numarekirina beytan bi goreyî vê tesnîfê çêkir. Reqema yekem, rêza helbestê (qesîde, xezel, murebbe, terkîbê bend û hwd.) û ya duyem jî hejmara beyta helbestê nîşan dide. Wek nimûne; 5/3; 5, rêza helbestê ya dîwanê û 3 jî rêza beyta helbestê îfade dike.

Dîwana Cizîrî, ji aliyê mijaran ve hatiye vekolandin û bi goreyî naveroka xwe ve mezmûn, îmaj, sembol û têgehên dîwanê wek çavkaniyên dîwanê, di bin banê dîn-tesewwif, civak, însan û sirûştê ve hatine senifandin. Di beşa destpêkê de li ser çavkaniyên edebiyata tesewwifê hatiye rawestandin. Bîr û baweriyên tesîr li tesewwifê kirî çi ne û bi çi awayî ji edebiyata tesewwifê re bûne çavkanî, hatine beyankirin. Di beşa yekem de ku beşa herî berfireh e, li ser têgeh û sembolên dînî û tesewwifî hatiye rawestandin û nav û sifetên Xwûda, remz û sembolên dînî û tesewwifî hatine tespîtkirin û îzahkirin. Beşa duyem, bingeha xwe ji civakê hildigire. Kesayetên dîrokî û efsanewî, şa'ir, 'alim, hunermend û berhemên wan ên ku navê wan weke sembolan di dîwanê de derbas bûne hatine beyankirin. Di vê beşê de, dîsa têgeh û mezmûnên weke qewm, welat, bajar, çem, çiya, wadî û behran cih girtine û li ser têgehên xusûsiyetên jiyana civakî (pîşe, meşxûliyet, jiyana rojane û amûrên wê û hwd.) hatiye rawestandin. Bingeha têgeh û mezmûnên beşa sêyem însan e. Însan jî, ji yar/mehbûb,

‘aşiq û reqîbî pêk tê. Ji ber tesîra tesewwifê (wehdetu’l-wucûdê/yekbûna hebûnê) kesayetî û rengê ‘aşiqî û yê reqîbî zêde nayê xuyakirin. Her tişt li derdora mehbûbê dizivire û wateya xwe digire. Bi gelemperî unsûrên spehîtahiyê yên yarê wek remz û sembolan di vê beşê de cih girtine. Beşa çarem, bingeha xwe ji siruştê hilgirtiye. Di vê beşê de li ser têgeh, mezmûn û sembolên ‘alema kozmîk, ‘alema heywan û nebatan hatiye rawestandin.

Çavkaniyên dîwanê yên hizrî, wek naveke gelemperî ji îmaj, mezmûn, sembol û têgehên dînî-tesewwifî, civakî, însanî û sirûştî pêk tên. Hemû çavkaniyên hizrî, ji bo yar, mehbûb û memdûhî dikarin bêne şirovekirin. Çawa perwane li derdora şem’ê dizivire û bi wî watedar dibe, têgeh, mezmûn û sembolên di dîwana Cizîrî de cihgirtî jî, bi girêdana mehbûbê ve têne îzahkirin û Cizîrî wan derbarê vê kontekstê de bi kar tîne.

Ev tez heta bi vî şeklî derkete meydanê, di gelek merheleyan re derbas bû. Ji bo ku tezeke baş derkeve holê, rêberî û alîkariya birêz, Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY, Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD, Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Dr. Öğr. Üyesi Şeyhmus ORKİN gelekî giring bû. Ji ber vê yekê şukran û spasiyên xwe pêşkêşî wan dikim. Dîsa ji hevalên xwe Hacı YILMAZ, Mehmet YILDIRIMÇAKAR û Zafer AÇAR re jî spasdar im ku wan ez bê destek nehiştim. Ji destpêka tezê heta dawiyê, ji bo fikr, teşwîk û pêşniyazên wî, ji şêwirmendê xwe birêz Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN re jî spas dikim û mala hemûyan ava be.

Di pêvajoya tezê de dayika min ya tîmsala şefqet û merhemetê, çû darê beqayê. Piştî wefata wê, hîssiyatek di min de peyda bû ku min ji ber vê xebatê ew îhmal kir ku ez têr neçûme ziyareta wê û sohbeta wê û ew kul û derd wisa bi min re man. ‘Efûya xwe ji dayika dixwazim. Xwûda rehma xwe lê bike.

15/05/ 2024

Müslih SEZER

**KURTE**

Edebiyat, ji aliyê pêşketinê ve neynika gelan e. Remz û îşaretên çand û medeniyeta gelan di nêv cihana edebiyatê de cih digirin. Di edebiyata klasîk de, vê wezîfeyê, herî zêde dîwan bi kar tînin û ji ber vê yekê, yek ji wan keresteyên giring a edebiyata klasîk dîwan in. Nîşanên destkeftiyên maddî û me'newî yên çand û medeniyetekî di wan dîwanan de mewcûd in. Dîwana Melayê Cizîrî jî, yek ji wan dîwanan e ku nîşaneyên asta pêşketina edebiyatê û nimûneyên destkeftinê yên dewlemendiya çand û medeniyeta Kurdan, di nêv dîwana Cizîrî de dikarin bêne dîtin.

Ev xebat ji destpêkê û çar beşan pêk tê. Di destpêkê de li ser çavkaniyên edebiyata tesewwifê hatiye rawestandin, lewra dîwana Melayê Cizîrî ji her aliyî ve dîwaneke tesewwifî ye û bi têgeh, îmaj û mezmûnên tesewwifî ve hatiye dorpêçkirin. Çavkaniyên hizrî (mezmûn, îmaj, sembol û têgeh) yên dîwana Melayê Cizîrî bi goreyî naveroka xwe ve li bin banê çar beşan de hatine tesnîfkirin. Di beşa yekem de, li ser çavkaniyên hizrî yên bingeha xwe ji dîn û tesewwufê hilgirtî, di beşa duyem de, li ser çavkaniyên hizrî yên bingeha xwe ji cemiyetê/civakê hilgirtî, di beşa sêyem de, li ser çavkaniyên hizrî yên bingeha xwe ji însên hilgirtî û di beşa çarem de jî, li ser çavkaniyên hizrî yên bingeha xwe ji siruştê hilgirtî hatiye rawestandin.

Di vê tezê de çavkaniyên hizrî yên dîwana Melayê Cizîrî wek mezmûn, sembol, îmaj û têgehan hatine tespîtkirin, wateyên wan ên gelemperî û şeklê îfadekirina wan, di konteksta helbestên Cizîrî de hatine îfadekirin.

**Peyvên Sereke:** Melayê Cizîrî, Dîwan, Edebiyata Tesewwifê, Çavkaniyên Hizrî yên Dîwana Melayê Cizîrî

**ÖZET**

Edebiyat, gelişmişlik açısından toplumların aynasıdır. Toplumların kültür ve medeniyetine ait remizler ve işaretler, edebiyat dünyası içerisinde yer alır. Klasik edebiyatta bu vazifeyî en iyi şekilde dîvanlar icra ettiği için, divanlar klasik edebiyatın önemli malzemelerinden sayılmıştır. Kültür ve medeniyetteki maddi ve manevi kazanımların işaretleri, divanlarda yer almaktadır. Melay-i Cizirî'nin divanı de o çeşit divanlardandır ki edebiyatın gelişmişliğine ait işaretler ve Kürtlerin kültür ve medeniyetteki kazanımlarına ait örnekler, Cizirî'nin divanında görülebilir.

Bu çalışma, "giriş" ve dört bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında, tasavvuf edebiyatının kaynakları üzerinde durulmuş, çünkü Melay-i Cizirî'in divanı her açıdan tasavvufî bir divandır ve tasavvufî mazmun, imaj ve terimlerle çevrilmiştir. Melay-i Cizîrî divanının fikrî kaynakları (mazmûn, imaj, sembol ve terim) muhtevalarına göre dört başlık altında sınıflandırılmışlardır. Birinci bölümde, kaynağını din ve tasavvuftan alan fikrî kaynaklar; ikinci bölümde, kaynağını cemiyetten alan fikrî kaynaklar; üçüncü bölümde, kaynağını insandan alan ve ondan beslenen fikrî kaynaklar ve dördüncü bölümde de kaynağını tabiattan alan fikrî kaynaklar üzerinde durulmuştur.

Bu tezde, Melay-i Cizirî divanının fikrî kaynakları mazmûn, sembol, imaj ve terim olarak tespit edilmiş, genel manaları ve ifade ediliş şekilleri Cizirî'nin şiirleri bağlamında ifade edilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Melay-i Cizirî, Divan, Tasavvuf Edebiyatı, Melay-i Cizirî Divanı'nın Fikrî Kaynakları

**ABSTRACT**

Literature plays the role of the mirror of societies in process of its development. Symbols and signs belonging to the culture and civilization of societies take place in the world of lîteratûre. Since divans performed this duty in the best way in classical lîteratûre, they were considered as one of the most important materials of classical lîteratûre. The signs of material and spiritual achievements in culture and civilization are included in the divans. Melay-i Cizirî's divan is one of such divans in which signs of the lîteratûre development and examples of the achievements of the Kurdish culture and civilization can be seen.

This study consists of an “introduction” and four chapters. In the introduction, the sources of Sufi lîteratûre are emphasized, because Melay-i Cizirî's divan is a mystical divan in every respect and has been translated with mystical metaphors, images and terms. The intellectual resources of the Melay-i Cizîrî divan (poetic theme, image, symbol and locution) are classified under four headings according to their content. In the first part, the intellectual resources that take their source from religion and mysticism; in the second part, the intellectual resources that their source stems from the society; in the third chapter, the intellectual resources that take their source from and feed on human and in the fourth chapter, the intellectual resources that stem from nature are emphasized.

In this thesis, the intellectual resources of Melay-i Cizirî's divan were determined as mezmûn (poetic theme), sembol (symbol), îmaj (image) and têgeh (locution), and their general meanings and expressions were stated in the context of Cizirî's poems.

**Keywords:** Melay-i Cizirî, Divan, Sufi Literature, Intellectual Sources of Melay-i Cizirî Divan

**KURTKIRIN**

Amd. : amadekar

bnb. : berhema nav bihorî

c. : cîld

DİA : Diyanet İslam Ansiklopedisi

DİBY :Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları

h.b. : heman berhem

hwd. : her weke din

r : rûpel

ra. : radiyallahu anha

sxl. : silavên Xwûda li ser bin

ûym. : û yên mayî

veg. : veguhastin

wer. : werger

## DESTPÊK

Edebiyat, çand û şaristanî ji nişka ve dernakevin. Di geşbûn û berfirehbûnê de merhale hene û bi goreyî wî çêdibin. Edebiyata cîhanê heta îro, di gelek merhaleyan re derbas bûye û îro jî di astekî bilind û berfireh de, li ser rêya xwe dimeşe. Edebiyata kurdî jî geşedanên berfireh bi dest xistine, di çend merhaleyan re derbas bûye û heta roja me hatiye. Çawa her tişt li ser kokekê şîn dibe, geş dibe û berên xwe dide; her wisa edebiyata kurdî jî, li ser hîmekî derketiye, ji çavkaniyên cuda sûd wergirtiye û edebiyateke pêşketî damezirandiye. Dema berhemên edebî têne lêkolînkirin, em dibînin ku di pêşiya wan berheman de tiştên wekhevî hatine beyankirin. Ev wekhevî me ber bi serekahniyan ve dibe. Dîwana Melayê Cizîrî, wek berhemeke klasîk, asteke bilind bi dest xistiye û ev berhem jî dema tê tehlîlkirin û lêkolînkirin, tê dîtin ku ji gelek çavkaniyan sûd wergirtiye û wek berhemeke cûda û orîjînal derketiye nav refên edebiyatê.

Di paşxaneya nivîskar û berheman de bingeh û çavkaniyên giring hene. Ev bingeh û çavkanî du cure ne. Yek, çavkaniyên nivîskî ne ku wek berhemên sereke, yan jî çavkaniyên bingehîn in ku derbarê şa'ir, nivîskar û berheman de xweyî me'lûmat in. Bi goreyî van çavkaniyan wek kronolojîk li ser berhem, nivîskar û serdeman xebat têne kirin. Dîwanên destxet, mecmû'e, keşkûl, antolojîi, jînenîgarî, menaqibname, zargotin, berhemên dîrokî û hwd. ev cure çavkanî ne. Yek jî "ew çavkanî ne ku ji aliyê ilmî, fikrî û hunerî ve îlhamê dide şa'ir û nivîskêr û nivîskar ji wan sûd werdigire" û ew çavkanî weke bi navê "çavkaniyên hizrî" têne beyan kirin.[2] Ev çavkaniyên hizrî, ji unsurên dînî (Qur'an, hedîs, qisseyên pêxemberan), tesewifî, kelam, fiqih, mîtolojî, astronomî, cografya, kesayetên dînî û tarîxî, çanda neteweyî pêk tên. Ji bo ku nivîskar tiştekî orîjînal bibêje an jî biafirîne pêwîst e haya wî ji paşiya wê hebe, ji wan jî îstîfade bike ku berhemeke xurt û dewlemend derkeve meydanê. Ji bo edebiyateke ku baş bête naskirin û analîzkirin, pêwîst e bingeh û çavkaniyên wê bêne tespîtkirin. Dîwana Melayê Cizîrî, ji çavkaniyên pêşiya xwe yên hizrî sûd wergirtiye û ji berhemên paşiya xwe re jî bûye bingeheke giring. Bingeha dîwana Melayê Cizîrî ya sereke mezmûn û têgehên tesewwifê ne û ji her aliyî ve ev dîwan dîwaneke tesewwifî ye. Tesewwifê jî, ji zanistên pêşiya xwe sûd wergirtiye û pêş ve çûye. Çavkaniyên edebiyata tesewwifê bi gelemperî bi vî şeklî hatine tespît kirin:

[2] AbdurrahmanAdak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2014, r. 35.

## ÇAVKANIYÊN EDEBIYATA TESEWWIFÊ

Ji bo ku çavkaniyên Dîwana Melayê Cizîrî baş bêne fehmkirin, pêwîst e çavkaniyên tesewwifê jî bêne beyankirin, lewra dîwana Melayê Cizîrî, ji serî heta binî bi mezmûnên tesewwifê ve hatiye dorpêçkirin. Ji bo felsefeya tesewwifê bi gelemperî ev çavkaniyên sereke hatine dayîn:

### a. Qur'an û Sunnet

Bingeh û çavkaniya tesewwifê ya sereke Qur'an û sunneta pêxember e. Ehlê tesewwifê baweriyên xwe bi ayet û hedîsan ve îzah kirine. Alimên 'ilmê tesewwûfê, ji ayet û hedîsan wateyên cuda derêxistine, bi vî awayî di tesewwifê de hem têgehên cuda hem jî baweriyên cuda derketine. Şaîran, wek çavkaniyeke îlhamê ji ayet û hedîsan îstîfade kirine û di şi'rên xwe de caran wek telmîhî, caran jî bi me'alî cih dane ayet û hedîsan.

Di tesewwifê de ji 'ilmê zahirî zêdetir, 'ilmê batinî di rewacê de ye û gelek mesele ji aliyê batinî ve hatine beyankirin û îzahkirin. Muhyîddînê 'Erebî, Îbn Fariz, Abdulkerîm Cîlî, Hellacê Mensûr, Mewlana Celaleddîn, Cuneydê Bexdadî, Mewlana Şemsê Mexrîbî, Mela Camî û hwd. ayet û hedîsên pêxember, bi gelemperî ji aliyê batinî ve şirove kirine. Îzahkirina ayet û hedîsan de Muhyîddînê 'Erebî namdar e. Îbnê 'Erebî, ayet û hedîs, bi wateyên dûr û kûr şirove kirine. Bi vî awayî hem asoya tesewwifê berfirehbûye hem jî baweriyên nû û têgehên nû peyda bûne. Îbnê 'Erebî, nass, ji du aliyan ve şirove kirine. Yek ji aliyê zahirî ve ku ehlên kelamê jî wisa fikirîne û yek jî, ji aliyê zimanekî batinî ve. Wek mînak, di vê ayetê da, "Ji xeyrî wechê wî, dê her tişt helak bibe. (Sûreya Qessas, 28/88)" peyva "wech"ê, ew zatê îlahî ye ku nakefte fesad û xirabûnê û her daîm baqî ye. Zatê îlahî, li vir muqabilê dîmenên heyinên veguherbar e ku bi navê heyînên xaricî an jî alema şehadetê (alema dîtbar) tê binavkirin. Dîsa bi goreyî Îbnê 'Erebî, peyva "qelem"ê, di wateya "Eqlê Ewwelê" de û "Lewhê Mehfûz" jî di wateya "Nefsa Kullî" de, di Qur'anê de derbas dibe.[3]

Hedîsên pêxember, ji aliyê ehlê tesewwifê ve, bi ayetên Qur'anê hatine şirovekirin. Peyxember, di hedîseke de wiha ferman kiriye: "Xwûda, Adem di sûretê xwe de afirandiye." Ev hedîs ji aliyê Îbnê 'Erebî ve bi vê ayetê hatiye şirovekirin:

[3] Ebu'l-Ala Afîfî, *Tasavvuf, İslam'da Manevî Hayat,* (wer. Ekrem Demirli, Abdullah Kartal), İz Yayıncılık, İstanbul 2018, r.71-72.

"Xwûda, hemû nav hînî Adem kirine (Sûreya Beqere, 31)." "Îbn Erebî dibêje, hînkirina wan navan zikir mumkin kiriye. Nav nebûna, Xwûda tu tişt zikir nedikir û tu tiştê jî Xwûda zikir nedikir. Ji ber vê yekê, Xwûda bi wasitaya navê xwe zikir dike û jê re zikir tê kirin."[4]

Muhyîddînê 'Erebî, di 'ilmê hedîsê de metodolojiyek peyda kiriye. Ew, hinek hedîsên ku di nezera muheddîs û ehlê kelamê de nesehîh in, wek sehîh qebûl dike, lewra ew wê di baweriyê de ye ku "ev ji aliyê keşfê ve sehîh e, lewra dostên Xwûda, di nav weliyan de nebî ne û ji Xwûda agahiyan hildigirin. Hedîsên weke "Yê xwe bizane, Rebbê Xwe dizane", "Xwûda ewilî 'eqil afirand.", "Ez xezîneyekî veşartî bûm…" herçendê sehîh neyêne qebûlkirin jî, ji aliyê Îbn 'Erebî ve bi keşfê sehîh in lêbelê bi rêya neqlê nehatine zeptkirin. Yanî sihheta hedîsê bi goreyî pîvana "keşf"ê ye.[5]

**b. 'Ilmê Kelamê**

Têgeha kelamê, ji aliyê fîlozofên musliman ve di wateya peyv, 'eqil û delîlê de bi berginda "logos"ê hatiye bikaranîn.[6] 'Ilmê kelamê, li ser prensîbên dînê Îslamê yên sereke radiweste. Kelam, ew 'ilm e ku behsa Zatê Xwûda, sifetên wî, mijarên nubuwwetê dike; bi goreyî qanûna îslamî, li ser destpêk û dawîbûnê halê kaînatê radiweste.[7]

Di kevneşopî/nerita entelektuel a Îslamî de, derbarê beyankirin û nîqaşkirina meseleyên baweriyê de cihê 'ilmê kelamê giring e. Gelek meseleyên tesewwifê, bi ilmê kelamê re têkildar in. Wek mîsal, di îzahkirina meseleyan de rola 'eqlî, beyankirina nav û sifetên Xwûda û têkiliya wan bi Zatê wî re, îfadekirina paradoksa tenzîh û teşbîhê, wehdetê wucûd, xuliqandina 'alemê û hwd. hinek ji van meseleyan in.[8] Li dijî ekola Mutezîleyê ya zêde giringî dida 'eqlî; ekola Eş'ariyê, 'eqil sînordar dikir û bi vî awayî vê meseleyê tesîrî entelektûela Îslamî dikir û tesîrên wê hem li ser ehlê kelamê hem jî li ser ehlê tesewwifê peyda dibû.

---

[4] William Chittick, *Îbn Arabî*, (Wer. Kadir Filiz), Nefes Yayınları, İstanbul 2018, r. 79.
[5] Chittick, *Sufi'nin Bilgi Yolu*, (Wer. Ömer Saruhanlıoğlu), Okuyan Us Yayınları, İstanbul 2018, r. 288.
[6] Şamil Öçal, *İslam Düşüncesinde Hikmet, Kelam ve İrfan,* Fecr Yayınları, İstanbul 2020, r. 55.
[7] Yusuf Şevki Yavuz, "*Kelam"*, DİA, c. 25, Ankara 2002, r. 196-203.
[8] Chittick, Sachiko Murata, *İslam'ın Vizyonu*, (Wer. Turan Koç), İnsan Yayınları, İstanbul 2020, r. 414-416.

Gelek meseleyên ‘eqîdeyê/baweriyê yên ehlê kelamê, ji aliyê hinek ehlê tesewwifê ve hatine qebûlkirin. Ew kesê ku bi berhemên weke *Lûma* (Serrac), *Rîsale* (Kuşeyrî) û *Te'errûfê* (Kelabazî) binêre dê bibîne ku ehlê tesewwifê ji ‘ilmê kelamê îstîfade kiriye û nezerî û metodên kelamê bi tesewwifê ve mecz kirine. Nirxandin û hilsengandina hinek meseleyên baweriyê, kûrahiyek daye hizra entelektûel a Îslamî. Wek mînak “tewhîd”, di nezeriyeya ehlê kelamê de wateya wê ew e ku “tunehiya şerîk, hevsengî” ye, lêbelê ev peyv di hişmendiya ehlê tesewwifê de di wateyeke din de tê têgihiştin. Wek nimûne, bi goreyî Cuneydê Bexdadî, “tewhîd, ew zanîn e ku sukûn û hereketên mexlûqan, wek fî’lên Xwûda bête zanîn.” [9]

### c. Neoplatonîzm (Nûeflatûnî)

Felsefeya Yewnanî, bi nivîsên îsewiyên suryanî ketiye nav ‘alema Îslamê. El-Afîfî di wê baweriyê de ye ku mutesewwifên Îslamê nezeriyeya keşf û şuhûdê ji New-Eflatûniyê hilgirtine. Bi goreyî wî, ji xeyrî cudahiyên biçûk; bingeha “merîfet (*gnosis*), nefis, hubût (daketina ‘alemê), ‘eqlê ewwel, nefsa kullî”yê digehije Nûeflatuniyê. Mutesewwifan di gelek nezeriyeyan de ji felsefeya yewnanî sûd wergirtine. Kitêba Plotînus (*Enneadlar*), ya Prokles (*Mebadiu'l-Îlahiyye*) û berhema *Ellah el-Muuqeddesê* (ji telebeyên Stefan Barîsudayli hatine berhevkirin) ewilî tesîrî Xrîstiyaniyê paşê jî tesîrî tesewwifa îslamî kirine. Fikrên sereke yên di van kitêban de ew bûn ku di her însanî de tebî’etekî îlahî û tebî’etekî beşerî heye; rêya yekane ya gehiştina Xwûda û ya naskirina wî, bi riyazetê terbiyekirina nefsê, bi têgihiştina halên me’newî pêk tê. Di gelek mijarên tesewwifî de xuya dibe ku, nezeriyeyên Dêra Rojhilatî, tesîrî tesewwifa Îslamê kiriye. Wek mînak, eksên ramanên feyzên îlahî yên sûfiyan, tecellî, ewwel, axir, zahir û batiniya Xwûda, di nezeriyeyên ehlê tesewwifê de têne dîtin.[10]

Zincîra ‘ilm û hikmetê nehatiye birîn û bi silsîlewî berdewam kiriye. Baweriyên ku ji aliyê pêxemberan ve dihatine beyankirin her çendê hatibine tehrîbkirin jî, dîsa di nav xwe de hinek heqîqetan dihewînin. Vê heqîqetê caran xwe di hişmendiya ‘alim, fîlozof û mutesewwifan de nîşan daye. “*Di derbarê mutefekkirên îslamî de lazim e bête zanîn ku hakimên Îslamê, fîlozofên yewnanî ‘eynen teqlît nekirine. Mutercîmên felsefeya yewnanî, dema metin werdigerandin, ew ji baweriyên*

[9] Ebu'l-Ala Afîfî, b.n.b., r. 72-73.
[10] Ebu'l-Ala Afîfî, h.b., r. 73-76.

*pûç û batil paqij dikirin. Bi vî awayî hakimên (ehlê hikmetê) Musluman, ji ber zarûretê felsefeya Arîsto û Eflatûn dinirxandin û ji nû ve înşa dikirin. Ji ber vê yekê şerhên ku li ser fikrên fîlozofên yewnanî hatî nivîsîn, wek şerhên rexneyî ne. Di 'alema Îslamê de, derbarê meseleyên giring yên felsefeyê de, di mijarên weke mahiyet, hebûn, xuliqandin, kesret û wehdeta hebûnê, xuliqandina 'alemê, zat û sifetên Xwûda, keyfiyeta sudûrê, derketina hebûnan de, berhemên mustaqîl hebûne û hêj jî hene. Têkilî û girêdana van mijaran, bi tehqîq û baweriyên fîlozofên yewnanî ve tune."*[11]

Derbarê sûdwergirtina tesewwif û felsefeya îslamî de nêrînên ji hev cuda hene. Xuya dibe ku xweyî van îdîayan bi delîlên xwe, ev mesele beyan kirine. Ya giring ew e ku herçendê hindik an jî gelek be jî, hemû medeniyetan ji aliyê fikr û ramanan ve tesîr li hev kirine. Bawerî û nêrînên felsefeyê, di tesewwifê de cihên giring hilgirtine. "Mesela *Îskendername,* bi saya yewnaniyan hatiye ketiye nav edebiyata îraniyan. Ev berhem wek romanekê hatibû nivîsîn û yewnaniyan jê re "*Pseudo Callîsthenes/Îskendernameya Sexte*" digotin. Callîstenes, dîrokzanê Îskender bûye. Nîzamî, ji vê berhemê sûd wergirtiye û ev berhem bi farisî nivîsiye."[12] Fîlozof û kîmyager Zu'n-Nûnê Misrî, wek şagirdekî ilmê Hellenîzmê dihate nasîn. Gelek ramanên Zu'n-Nûnê Misrî, dişibine yên Dîonysîus. Fikr û ramanên Dîonysîus, ewilî tesîrî keşîşên Dêra Rojhilatî kiribû û di nava baweriyên Xrîstiyanî de reng girtibûn û bi wî awayî tesîrî zuhda îslamî jî kirîbûn.[13]

### d. Mîtolojiya Îranê

Zanistên herî kevin yên derbarê efsane û mîtolojiya Îranê de, heta BZ ya sedsala XVem diçin. Di *Rig Veda* û *Avesta*yê de zanistên tarîxa îranî û şexsiyetên îranî cih digirin. Kitêba dînê Zerdûşt *Avesta,* BZ di sedsala VIem de hatiye nivîsîn.[14] Dînê Zerdûşt, li ser bawerî û edebiyata gelên îraniyan tesîreke mezin hiştibû. Bingeha gelek efsaneyên dînî yên îraniyan ji baweriyên Zerdûşt sûd wergirtibû.

Gelek meseleyên di *Avesta*yê de hatine beyankirin, piştî salan bûne bingeha destanên qehremanî yên îraniyan. Şerên îraniyan yên li hember tirk, yewnanî û Îskenderê Makedonî, bûye bingeha mîtolojî û destanên neteweyî yên qehremaniyê.

---

[11] Seyyîd Yahya Yesrîbî, *İrfan Felsefesi*, (Wer. Kenan Çamurcu), İnsan Yayınları, İstanbul 2010, r. 22.
[12] Helmut Rîtter, *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi*, Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2011, r. 13.
[13] Reynold A. Nicholson, *İslam Sûfîleri*, (Wer. Kemal Işık ûym.), Büyüyen Ay Yayınları, İstanbul 2014, r. 49.
[14] Nimet Yıldırım, *Fars Mitoloji Sözlüğü*, Kabalcı Yayınları, İstanbul 2008, r. 13-14.

Firdewsî, bi berhevkirina bûyer, bîranîn, efsane û destanan, “*Şehname*” nivîsiye û kitebeke şaheser afirandiye. Di nav *Şehname*yê de bûyer û kesayetên hevpar ên kurd û îraniyan cih digirin. Rustemê Zal, Kawa, Dehhaq çend ji wan kesayetan in.

*Zend-Avesta* (kitêba dînê Zerdûşt), *Hudayname* (di serdema Sasaniyan de şehnameya Pehlewiyan e û dîroka resmî ya Sasanîyan e) û *Şehname* bi gelek bûyerên dîrokî, destan û kesayetên qehremanî ve ji edebiyatê re bûye bingeh. Gelek şa’iran ji wan berheman sûd wergirtine, bi telmîhî û teşbîhê, di berhemên xwe de cih dane wan.[15]

**e. Mîstîsîzma Hîndê**

Ji edebiyat û çavkaniyên sanskrît û aryaniyan, gelek çîrok, destan efsane ketine nav edebiyata rojhilatî. Ji xeyrî tesîra edebiyatê, ji ber baweriyên wekhevî yên weke nîrvana, însanê kamil û wehdetu’l-wucûdê hinek musteşrîk û alimên musluman gotine ku ehlên tesewwifê, telaqqî û baweriyên xwe ji Hîndûîzmê wergirtine. Ji ber hinek raman û baweriyên wekhev, fikrekî weha derketiye meydanê.

Di Brahmanîzmê de, “Brahm”, li ser hemû me’bûdan e, bi wucûda xwe qaîm e, ezelî û ebedî ye. Mebdeyê eşyayan e. Mewcûdat dema fena dibin, dîsa li bal wî ve vedigerin. Dîsa bi goreyî Budîzmê, meqseda ruhî ew e ku bigehije mertebeya dawiyê ku ew jî “nîrvana” ye. Nîrvanaya Budîzmê û fenafillaha tesewwifê, ji aliyê armanca ruhî ve, wek hev in.[16]

Hinek musteşrîk, tesîra Hînduîzmê ya li ser tesewwifê, bi hinek nimûneyan didin, lêbelê ev fikr û gotin zêde nehatine pejirandin. Heta sedsala XIem ku hêj Hindistan ji aliyê muslumanan ve nehatî fetihkirin, baweriyên Buda, tesîrî Rojhilata Îranê kirîbûn. “Di bajarê Belhê de ku navendeke îdarî û şehrekî giring ê dînê Budîzmê bû, gelek manastirên budîst hebûn. Musteşrîk Goldzîher dibêje ku sûfî, zahid Îbrahîm bîn Edhem wek emîrê Belhê tê xuyakirin û bi goreyî menakibnameyan, jiyana wî dubarekirina jiyana Buda ye. Dîsa Nîcholson di wê baweriyê de ye ku rêya sûfîtiyê, ji aliyê terbiyekirina nefsê, muraqebeya zuhdê ve, deyndarê Budîzmê ye.”[17]

Piştî Sultan Mehmûdê Xeznewî Hindistan fetih kir, bajarê Belhê bû şehrekî îslamî. Gelek mezinên tesewwifê, yên wekî Îbrahîm bîn Edhem, Şaqîqê Belhî, Ebû Hamîd Hadraweyh di vî şehrî de jiyana xwe borandine. Ebû Yezîd Bestamî ku yek ji

[15] Yıldırım, h.b., r. 20-24; Rîtter, b.n.b., r. 99-100.
[16] Agah Sırrı Levend, *Divan Edebiyatı*, Dergah Yayınları, İstanbul 2018, r. 40.
[17] Nicholson, b.n.b., r. 52.

mezinên ehlê tesewwifê ye, metoda hindî ya bi navê “muraqabeyê enfas”, ji Ebû Elî Sindî[18] wergirtiye û ji wî telaqqiyên terîqetê hilgirtine.[19] Hem ehlê tesewwifê li ser baweriyên ehlê Hînduîzmê hem jî mîstîkên Hînduîzmê li ser ehlên tesewwifê tesîr kirine.

**f. Dînên Monoteîst (Zerdûştî, Xirîstiyanî)**

Zerdûşt, wek pêxemberekî, di nava kurd û îraniyan de, şerî’eta xwe tesîs kiriye. Dînê Zerdûşt, bi îşareta Qur’anê bi navê Mecûsî hatine binavkirin û ew ji ehlê kitêban hatine dîtin.[20] Dînê Zerdûşt, dînê Sasaniyan ê resmî bûye û bi xebatên mubedan di demeke hindik de, li nav kurd û îraniyan belav bûye. Tesîra Zerdûşt, hem li ser edebiyata cîhanê hem jî li ser hinek telaqqiyên tesewwifê çêbûye. Di serdema Helenîzmê de, nav û namê Zerdûşt li Ewropayê belav bibû û fîlozofên îtalyayî yên di serdema Ronesansê de, ew wek kesayetekî dînî yê mînakgir didîtin û jê re “Magus” digotin. Goethe (1742-1832), di *Faust*ê de wek telmîhî behsa mîtên Zerdûşt dike û fîlozofê Alman Nietzsche jî bi navê “*Weha Ferman Kiriye Zerdûşt*” berhemek nivîsiye. Ji ber ku Zerdûşt pêxember bû û jê re wehiy hatibû, derbarê hebûn, afirandin û ‘alemê de baweriyên wî yên dînê mayî pêwîst e wek hev bin. Sîstema baweriyên Zerdûşt, li ser bîr û baweriyên serdema xwe da, gelek tesîr hiştibûn û Zerdûşt bi wehyê sîstemeke nû ava kiribû. Herçendê *Zend-Avesta*yê esliyeta xwe wenda kiribe jî lê dîsa şopên heqîqetê, tê de têne dîtin. Baweriyên derbarê Ahuramazda û Ehrîmen, bi gelek aliyan ve weke baweriyên Îslamê ne. Ahuramazda, xaliqê ‘alemê ye, xirabî nagehişte wî û ew tune nabe. Mexlûqatên Ahuramazdayê di fî’liyatên xwe de azad in. Bi goreyî kirinên xwe cennet û cehennemê qezenc dikin. Bi êrişên Ehrîmen û şeytanan, di dunyayê de şer û xerabî belav bûye, lê dîsa dê Ahuramazda serkeftî bibe.[21]

---

[18] (Ebû Elî Sîndî/Kûrdî [Z. 770?-840?], li herêma Şahrud ya Îranê jiyaye. Di nav ehlê tesewwifê de bi gotinên xwe yên wecdî ve namdar bûye. Elî Sîndî, murşîdê yekem yê Bayezîdê Bîstamî ye. Behsa nezeriyeya “fena/fenafi’t-tewhîd”ê, cara yekem wî kiriye. Wî ‘ilmê fenayê hînî B. Bîstamî kiriye. Ew, bi nezeriyeyên sekr, melamet, tewhîd, me’rîfet, ‘eşq, mî’rac û îsarê ve derketiye pêş. Herçendê ew di serdema derketine tesewwifê de jiyabe û bi nezeriyeyên balkêş ve jî derketibe pêş, lêbelê di menakibnameyan de û di kitêbên tebeqatê sûfiyeyê de cih nedane vî mutesewwifî. Zanistên derbarê wî de di berhema Ebdurrehman Camî ya bi navê “Nefahatû’l-Ûns”ê de hatine qeydkirin. (Ali Tenik, *Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2015, r. 176-180.)

[19] Ebu’l-Ala Afîfî, b.n.b., r. 76-77.

[20] “Herçi ew kesên ku bawerî anîne, ew kesên ku bûne Cihû (Yehûdî), Sabiîn (stêrperest), fileh (Xirîstiyan), Mecûsî (agirperest) û ew kesên ku bûne pûtperest, bêgûman Xweda, dê roja qiyametê di navbera wan de hukm bike. Lewra Xweda her tiştî dibîne/dizane. (Sûreya Hecc, 22/17)”

[21] Nimet Yıldırım, *İran Mitolojisi*, Pinhan Yayınları, İstanbul 2012, r. 180-181.

Di edebiyata klasîk de mezmûnên weke “mux, muxan, muxbeçe” ji baweriya zerduştî ketine nav edebiyata Îranê û ji wê derê jî belavî nav edebiyatên gelên musulman ên mayî bûne. Kêm dîwanên ehlê tesewwifê hene ku cih nedabine van têgehên Mecûsiyan.

Hinek ‘alim zuhda Îslamê bi ruhbaniya Xrîstiyaniyê ve girêdidin. Ebû’l-Ala El-Afîfî di wê baweriyê de ye ku tesewwif di bin tesîra baweriyên xrîstiyaniyan de maye û Hellacê Mensûr weke hinek keşîşên suryanî behsa hulûlê kiriye. Hulûl, di tesewwifê de xwe nîşan daye. Hellacê Mensûr, meczkirina ruhê îlahî û yê xwe bi vî awayî wesifandiye: *“Weke têkilbûna av û şerabê, ruhê min û ruhê te bûne yek. Tişta ji te bigire ji min jî digire, di her halî de tu, ez î.”*[22]

Di meqama fenafillahê de gotinên bi vî şeklî ji aliyê gelek mutesewwifan ve hatine gotin. Şêx Ebû Seîd Ebu’Xeyr gotiye: “Ez dibînim ku hejdeh hezar ‘alem bi Bayezid ve tejî ye, lêbelê Bayezîd li meydanê tune ye.” Wî xwestiye bibêje ku hebûna Bayezîd, di nav hebûna Heqq de mehf bûye.[23]

El-Afîfî dîsa dibêje, nezeriyeya “qelem/gotin û Heqîqetê Muhemmediyye”yê, nezeriyeya îlahiyata xrîstiyanan e û ji aliyê mezinên dêra Îskenderiyeyê ve hatiye beyankirin û ji aliyê fîlozofên musilman û Hellacê Mensûr, bi rengên motîfên îslamî hatiye boyaxkirin û gehiştiye Muhyîddînê ‘Erebî.[24] Mutesevvif, ji aliyê zuhd û ‘eşqa îlahî ve di bin tesîra keşîş û munzewiyên Xirîstiyanî de mane ku ev mîstîsîzma şerqî ya Xirîstiyanî, bi fikrên Plotinus û mekteba Neoplatonîzmê şekil girtibû.[25]

---

[22] Hallacê Mensûr, *Tavasîn*, veguhestin ji Ebu’l-Ala Afîfî, b.n.b., r. 77.
[23] Feridüddin Attar, *Evliya Tezkireleri*, (Wer. Süleyman Uludağ), Kabalcı Yayınları, İstanbul 2007, r. 171.
[24] Ebu’l-Ala Afîfî, b.n.b., r. 78
[25] Nicholson, b.n.b., r. 47

## BEŞA YEKEM

# 1. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI DÎN Û TESEWWIFÊ HILGIRTÎ

## 1.1. Dîn

Dînên semawî, ji aliyê Xwûda ve ji bo se'adet û xelasbûna herdu dinyayan, ji însanan re hatine şandin. Dîn, di her dewrekî de, di her civakekê de daîma hebûye. Lewra bawerî tiştekî fitrî ye û însan hewcedariyên dînan bûne. Dîn hem ji aliyê maddî hem jî aliyê me'newî ve însên dorpêç dike û daxilî jîyana wî dibe û wek dîsîplînekê xwe di raman û hereketên wî de nîşan dide. Dîn, bi baweriya axiretê, însên ji aliyê me'newiyatê ve pêş ve dibe, li hemberî izdirab û trajediyên dinyayê quweta sebr û tehemmûlê dide wî. Arezû û xwestekên dinyayê demkî ne, ev xusûsiyet jî, valahiyekê di ruhê însên de dihêle û hestên însên tetmîn nake. Dîn, bi baweriya dinyayeke din, zewqên bilind û ulwî û hezzên me'newî dixe dilê însên. Dîrokê daye xwûyakirin ku 'alema însaniyetê bi saya dînan pêşkeftinên me'newî û zîhnî bi dest xistine. Pêxemberan bi telkîn û teblîxkirina wehyê însan kanalîzeyî fikr û ramanên bilind kirine û ji bo bilindbûna însên ya me'newî, jiyanek tesîs kirine.[26] Ji ber van egeran, dîn, di jiyana rojane ya însên de cihekî gelekî giring û bilind hilgirtiye û rengê xwe daye jîyan û berhemên hunermendan jî.

Melayê Cizîrî, şa'irekî mutesewwif e û ji ber vê yekê têgeh û terîmên dînî û tesewifî di helbestên xwe de gelekî bi kar anîne. Esmayê Husna (navên Xwûda yên sereke/navên spehî[27]) di vê derbarê de di rêzên helbestên wî de, îşaretî navên Xwûdê û sifetên wî dikin.

Pêşiyê, ji bo ku nav û sifetên Xwûda baş bêne fehm kirin, pêwîst e derbarê "Hebûn"ê de hinek mesele bêne îzahkirin. Lewra meseleyên dînî û tesewwifî gelemperî bi "Hebûn"ê re têkildar in. Têkiliya Xwûda û 'alemê bi rêbazeke tenzîhî tê îzahkirin. Meseleyên tesewwifê derbarê "Hebûn"ê de têne beyankirin. Bi goreyî tesewwifê "La wucûde Îllallah", yanî ji xeyrî wucûda Xwûda tiştek tune. Piraliya di

---

[26] Günay Tümer, "*Din"*, DİA, c. 9, İstanbul 1994, r. 312-320.

[27] Esmayê Husna, ji Qur'an û hedîsên pêxember hatine hilgirtin. Di Qur'anê de ev terkîb di çar ayetan de derbas dibe: Sureyê Taha, 20/8; Sureyê Heşr, 59/24; Sureyê Îsra, 17/110; Sureyê E'raf, 7/180 (İsmail Karagöz, *Esma-i Hüsna,* Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara 2016, r. 29). Ji Ebû Hureyre hatiye rîwayetkirin, gotiye; pêxemberê Xwûdê (sxl.) got: "Not û neh navên Xwûda (ji sedê yek kêm) hene, kî wan bijimêre/tê bigihêje, ewê here beheştê." (Îmam Buxarî, *Sehîha Buharî*, (Wer. Mela Se'îd Girdarî), Beka Yayıncılık, İstanbul 2015, r. 531.)

‘alemê de tê dîtin, nisbî û îzafî ye, lewra ev xwûyanek/bergehên cûda, ji Heqîqetê ne. Hebûn yek e û ew Hebûna Xwûda ye (La mewcûde îlla Hû). Xuliqandina her tiştî girêdayî “Hebûn”ê ye û nav û sifetên wî jî feyz û tecelliya hebûna wî ne.

Xwûda, bi zatê xwe ve bêsînor û bêwate ye û bi heqqî nayête zanîn. Ew ancax bi wehyê, bi zanistên derbarê xwe ve însanan agahdar dike. Nav û sifetên wî yên ku bi rêya Qur’an û hedîsan hatî beyankirin, derbarê zatê wî de agahiyan didin. Her awayekî wî ancax bi sifetekî tê temsîlkirin. Wek nimûne, navê “Xaliq”, îşaretî muhebbeta wî dike ku wî xwest bête zanîn û ‘alem afirand. Ji bo ku nav û sifetên Xwûda baş bêne fehmkirin, pêwîst e derheqê zanistên derbarê daîreya wucûda wî de hinek agahî bêne dayîn, lewra hem nav û sifetên wî hem jî her mexlûqatek hukmekî Xwûda nîşan didin.

### 1.1.1. Mertebeyên Heyînê (Tecelliyên Wucûdê)

Ji bo “hebûn” baş bête naskirin, ehlê ‘îrfanê bi goreyî tecelliyan mertebe nîşan dane. Ev mertebe keşfî û ‘eqlî ne; bi zemên ve girêdayî û heqîqî nînin. Esasê xuliqandinê, ezelî û ebedî ye, destpêkirin û dawîbûn ji ferdên xuliqî re hene. Şopînerên Îbn ‘Êrebî, di “Hebûn”ê de behsa cûreyên mertebeyên te’eyyûnatan[28] kirine. Bi gelemperî ev mertebeyên ontolojîk di nav pênç hezretên îlahî (el-hazaratu’l-îlahiyetu’l-xams) de wek xulase cih girtine.[29] Ahmet Avnî Konuk, ji Îbn ‘Erebî, Mewlana û Mela Camî îstîfade kiriye û mertebeyên heyînê di heft mertebeyan de beyan kiriye û ew mertebe jî ev in: 1) La-te’eyyûn 2) Te’eyyûnê ewwel 3) Te’eyyûnê sanî 4) Mertebeya erwahê 5) Mertebeya mîsalê 6) Mertebeya şehadetê, 7) Mertebeya însên.[30] Hinek ji muteheqqiqînan bi navê “Hazaratê Hemse”yê navên mertebeyan weha beyan kirine: 1) Ehediyyet 2) Wahidiyyet 3) Erwah 4) Mîsal 5) Şehadet. Hinekan jî ev mertebe bi çar navan tesnîf kirine: 1) Lahût (Ji zatê bê keyfiyet û bê reng pêk tê. Bi “Hû”yê tê îşaret kirin. Ev mertebe, cem’ûl-cem e.) 2) Ceberrût (Ji te’eyyûnê ewwel û şuhûdê mucmelê pêk tê. Bi Xwûda tê tesmiyekirin. Ev mertebe meqama cem’ e.) 3) Melekût (Ev mertebe mecmû’ê ‘alema erwahê û ‘alema mîsalê ye) 4) Nasût (Ev mertebe, mecmû’ê ‘alema şehadetê û hezretê însanê pêk tê).[31]

---

[28] Te’eyyûn: (entification), rewşa heyîna “hebûn”ê (eyn) an jî “tişt”ê îfade dike. Dema hebûn te’eyyûn dibe, bê jimar tişt û mexlûqat derdikevine ‘alema heyînê. Eşya (tişt), ji “Hebûn”ê di dereceyên cuda de zuhûr dibin û ev te’eyyûn jî îzafî ne. (Chittick, *Varolmanın Boyutları*, r. 220.)

[29] Chittick, *Varolmanın Boyutları*, r.220.

[30] Ahmed Avni Konuk, *Fusûsû’l Hikem Tercüme ve Şerhi (Mukaddîme)*, Marmara Üniversitesi İlahiyat Fakültesî Vakfı Yayını, İstanbul 2005, c. 1, r. 10.

[31] Konuk, b.n.b., c. 1, r. 67.

Ji Sedreddînê Konevî bigre heta şopînerên Muhyîddînê Erebî yên mayî, hebûna li bal Xwûda an jî hebûna li huzûra wî, bi tefsîlî/bi berfirehî behsa pênç huzûrên îlahî (hezeretû'l-îlahiyye) kirine. Zatê Xwûda, me'newiyet û ulûhiyet, xeyal, cismanî û însanê kamil ji wan hezretan/mertebeyan in.[32] Ji wî zatê wahid, întîşar û belavbûna mertebeyên hebûnê (meratîbê wucûd) ku bingeha xwe ji Qur'anê digirin, bi têgehên weke zuhûr, feyz û tecelliyê têne îfadekirin.[33]

#### 1.1.1.1. Mertebeya Lâ-te'eyyûnê (Mertebeya Bête'eyyûnî, Mertebeya Ehediyetê)

Ev mertebeya bête'eyyûnî, mutleq û bi tenê Zatî ye. Wucûd/heyîn, ji hemû wesf û îzafeyê sifetan munezzeh e. Heyîna wî ji zatê wî û bi zatê wî ye. Hebûna mewcûdata baqî, ji wî ye û bi wî qaîm e. Wucûda zatî di vê mertebeyê de ji nav, sifet û fî'lan muqeyyed û mute'eyyîn nîne. Ev mertebe, cewhera Heq Te'ala ye û di ser vê re tu mertebe nînin. Ji vê mertebeyê re "mertebeya ehediyet"ê jî tê gotin.[34] Ziman ji te'rîfkirina vê mertebeyê re acîz e. Nîşana wî bênîşanîya wî ye. 'Eqil û qiyas çiqas tefekkûr jî bikin dîsa ji wan îzahatan munezzeh e. Xwûda heyînekî mutleq e û di heqîqetê de yek e. Ehlê keşfê nikarin heqîqeta wî îdraq bikin. Ew dixwazin bi keşf û şuhûdan me'lûmatan ji wî hildin, lêbelê însan di her aliyî de naqis û bê qudret e. Însan çawa jî bike bi temamî nikare wî nas bike û ancax dikare heyranî û heşmetkariya xwe nîşan bide.[35] Ev mertebe ji hemû cureyên zuhûrê, tecelliyan û te'eyyûnan munezzeh e. Pêşiya ku Xwûda bi nav û sifetên xwe ve tecellî nebûyî, di zatê xwe de mexfî bûye. Ji xeyrî zatê wî tiştek nebûye.

Di dîwana Mela de di çarçove û îmkanên şi'rê de bi îşaretkirina van mertebeyan hinek beyanat hene. Ji hev veneqetîna nav û sifetan û wahîdiyeta zatê wî, ji aliyê Mela ve hatine îfadekirin. Hemû nav û sifetên Xwûda di wehdeniyeta wî de mewcûd in, lê belê bi mertebeyan ew ji hev cûda dibin û bi tecellî û te'eyyûnatan derbazî mertebeyên din dibin. Ew di vê mertebeyê de, bêism, bêasar û bêsifet e, lewra zat di mertebeya Ehediyetê de ye. Hêj di navbera wî û tecelliyan de sitre û perde heye û mahiyeta hebûna wî nayête fehm kirin.

Zatê tecella da li zat bêism û asar û sifat

[32] Chittick, *Sufî'nin Bilgi Yolu/İbn-i Arabî'nin Metafiziğinde Hayal*, r. 41.
[33] Chitick, *Aşığın Aynası*, (Wer. Ömer Saruhanlıoğlu), Okuyan Us Yayınları, İstanbul 2018, r. 109-110.
[34] Konuk, b.n.b., c.1, r. 4.
[35] Molla Camî, *Levayîh*, Litera Yayıncılık, İstanbul 2021, r.90.

Sirra hurûfên 'aliyat xef bû di sitr û perde da (9/2)

‘Işq û mehebbet her hebû Heq 'aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet jê we da (9/6)

Ehlên tesewwûfê, ji bo eserê naçine muesserê, lewra Xwûda hebûna mutleq e û înkariya wî ne mimkin e. Sirrên wehdeniyeta wî ji ezel û heta ebedê her tişt dorpêç kiriye. Ew bi zatê xwe heye û ‘ededê wî jî tune. Her tişt ji hebûna wî re delîl û burhan e. Tiştên hatî afirandin hemû ‘elamet û nîşanên qudreta wî ne. Eger ‘eqil mutme’în nebe û bi qiyas, delîl û teşbîhan bixwaze, ev yek jî têrê nake, lewra ‘eqil ji pênaseya wî re kêmar e û acîz e. Her însan mertebeyên hebûnê fehm nake, ancax însanê kamil dikarin tê bigihijin, lewra wan di seyr û sulûkê de ew merhale derbas kirine û bûne şahidê tecelliyên ûlwî.

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed
Wahidek ferd e bi zatê xwe û nînin çu ‘eded (38/1)

Çi heddê 'eql e qiyasê te kirit
Ev e burhan ku tu bêburhan î (114/13)

Mertebeya “La-te’eyyûnê” de her tişt di ‘ilmê wî yê batinî de mewcûd e. ‘Ilmê zahirî hêj nehatiye afirandin. Hêj ‘alema gerdûn û dewran di zahirîyê de nehatî afirandin, an jî hêj ‘erş û kursî di xezîneya qudreta wî de veşartî, lami’a/nûra ‘eşqa husnê Heq hebûye. Hêj nav û sifetên “Lem yezel” jê tenezzûl nebibûn, ‘aşiq û me’şûq (husn û hubb) di zatê wî de, di batiniya ‘ilmê wî de mewcûd bûne.

Hê di ber qalûbelayê belku ev 'alem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû (104/1)

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû di istiwayê lami'a 'işqê hebû (104/2)

Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
'Aşiq û me'şûq yek bûn şem' û hem perwane bû (104/3)

#### 1.1.1.2. Mertebeya Te’eyyûnê Ewwelî (Mertebeya Wehdetê)

Te’eyyûna zatî ya yekem e. Ji mertebeya xeyba heqîqî, te’eyyûna ewilî ye.[36] Ev mertebe, wek “Mertebeya Heqîqeta Muhemmedî” an jî “mertebeya wehdetê” tê binavkirin. Di vê mertebeyê de hejmartin, ‘edet, piratî nînin. Di navbera hebûn û

[36] Abdürrezzak Kaşanî, *Tasavvuf Sözlüğü*, (Wer. Ekrem Demirli), İz Yayınları, İstanbul 2015, r. 91.

nebûnê de wekhevî heye û herdu teref jî weke hev in. Ev mertebe, heqîqetên alemên cismî û rûhanî di nav xwe de dihewîne. Ji vê mertebeyê re gelek nav hatine dayîn. ‘Alema remzan, xezîneya xezîneyan, ‘eqlê ewwel, ‘alema me’nayê, ‘eqlê kûl, Heqîqetê Muhemmediye, Nûra Muhemmedî, Lewhê Mehfûz, îsmê e’zem, Ruhu’l-quds û hwd. hinek ji wan navan in.[37]

Te’eyyûna ewil, heqîqeta Muhemmedî ye. Hedîsa; “Hêj Adem di nevbera av û heriyê de bû, ez pêxember bûm.” Îşaretî vê mertebeyê dike. Tişta ewilîn ya Xwûda afirandî, Nûra Muhemmedî ye. Nubûwweta hemû pêxemberan, welayeta hemû weliyan, ji vê heqîqetê neş’et û zuhûr bûne.[38]

Ev mertebe îşaretê hubba Xwûda dike ku xwestiye ‘alemê biafirîne. Nûra cemalê ezelî, di zatê wî de tecellî bûye û şu’leya ‘eşqê ya di sehergeha ezelê hatî hilkirin, ji xuliqandinê re bûye muharriqê ewwel. Hêj nav û sifet ji hev veneqetiyayî, navê “Ellah”î, hemû nav û sifet di nav xwe de dihewandin. Di vê mertebeyê de wucûda zatê muqeddes, hêj coş nebibû, behra kerema wî hêj pêl nedabû. Ew bi zatê xwe ve hebû û tecelliyên wî hêj te’eyyûn nebibûn.

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Zatek muqeddes bû wucûd coşiş nedabû behrê cûd
Wesfê îzafat û quyûd yek jî tecellayê neda (9/3)

‘Alema xeybê, coşa deryaya kerema Wedûd, bi tecellaya nûra wucûdê rohnî dibe. Qelem tê afirandin û tiştên ku dê bêne xuliqandin, hemû di lewhê mehfûzê ku îşaretî ‘ilmê Xwûda dike, têne nivîsîn. Gencîneya mexfî vedibe û mucevheratên giranbiha ku sifetên wî ne, tecellî dibin. Nûra Muhemmedî tê afirandin û Ruhu’l-qudûs bi ruhê wî, ruh dide jîndaran.

Coşiş ku da deryayê cûd d'ayîneya ismê Wedûd
Carek tecella bû wucûd nûrek ji nûrê jê veda (9/55)

Fûrek ji nûrê wî vekir genca zuhûrê pê vekir
Kenza xwe qufl û mifte kir hêj wê di qufl û mifte da (9/56)

Husnek munezzeh sewwirand nûra hebîb jê afirand
'Alem di kunhê heyyirand Rûhu’l-qudus can nefxe da (9/57)

[37] Konuk, b.n.b., r. 11-13.
[38] Mahmud Erol Kılıç, *Şeyh-i Ekber*, (İbn Arabî Düşüncesine Giriş), Sufî Kitap, İstanbul 2019, r. 295.

Nûrê ji nûra Ehmedî sirra sifatê Sermedî
D'ayîneya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da (9/63)

Ew bû qelem ew bû 'eqil lew pê hedîsê da neqil
Deryayê 'ilmî kir şuxul tefsîlê 'ilmê cumle da (9/64)

Di vê mertebeyê de, ezeliyet û ebediyet; ehediyet û wahidiyet ji hev du cûda dibin. Ev mertebe, destpêka te'eyyûnan e; wucûda mutleq, ehediyeta xwe ber bi wahidiyetê ve diqulubîne. Ev cûdabûn jî îzafî ye û bi goreyî sifetên wî têne îzahkirin. Di heqîqet û Semediyetê de ev nav ji xaricî zatê wî nînin û di zatê wî de yek in û mewsûfê navê Xwûda/Ellahê ne.

Di qidem da ezel û 'eynê ebed herdu yek in
Sermediyyet weh dixwazit ne ezel bit ne ebed (38/2)

Ferq e wahid ji ehed lê di meqamê Semedî
Bi heqîqet ku yek in herdu çi wahid çi ehed (38/3)

#### 1.1.1.3. Mertebeya Te'eyyûnê Sânî (Mertebeyê Wahidiyetê)

Di vê mertebeyê de Xwûda zatê xwe yê mezin û sifetên xwe yên bilind, wek ji hev cihêkiri dizane. Ji vê mertebeyê re, "mertebeya wahidiyetê, hezretê rubûbiyet, hezretê cem', 'alemê melekût, 'alemê esma, tecelliyê sanî, nefesê rehmanî û "heqîqeta însanîyye"yê tê gotin. Her sûretên 'ilmî, di vê mertebeyê de derketine meydanê. Nav û sifetên wucûdê bi goreyî sûretên me'nayê ji hev vediqetin. Heyîna wan û ji hev cihêbûna wan, 'ilmî ye. Wucûda Heq, ji ber sedemên sûretên 'ilmî, bêyî derketina xariciyê, wek piranî zahir dibe. Ev sûretên 'ilmî, dibine sebeb ku zatê îlahî heyînan îcad bike. Di termînolojiya tesewwûfê de ji van sûretên 'ilmî re "a'yanê sabîte" tê gotin. "A'yanê sabîte", ji sûretên 'ilmî pêk tên. Ew sûretên di 'alema şehadetê de derdikevin, ancax sih û 'eksa van "a'yanê sabîte"yan in.[39]

Di vê te'eyyûnê de sûretê tiştan yên 'ilmî têne xuliqandin. Hemû sifet di vê mertebeyê de te'eyyûn dibin sûretê eşyayan di 'ilmî de xuya dibe. "Hemû tiştên ku di 'alema maddî de hatine afirandin û yan dê bêne afirandin, di 'ilmê wî de zahir dibin. Heft sifetên Xwûda (sifetên seb'e) bi navê wî yê "el-Nûrê ve girêdayî îşaretî vê mertebeyê dikin. 'Alema maddî bi hukmê wan navan rêk û pêk dibe û dikeve pergal û

[39] Konuk, b.n.b., c. 1, r. 13-15.

teqwîmê. Ev heft sifet, bi goreyî binavkirina Ehmedê Xanî ev in: jiyan û şiyan, zanîn û vîn, dîtin û bihîstin û axaftin. Ev sifetên Xwûda yên zatî ne û ezelî ne."[40]

Behra wucûdê coşi hat nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te'eyyun her sifat eşya zuhûr 'ilmiyye da (9/46)

Eşya di 'ilmê bûn zuhûr isman ji feyza ismê nûr
Teqwîmi bestin bêqusûr hukmê sifatê seb'e da (9/47)

### 1.1.1.4. Âlema Erwâhê/Mertebeya Erwahê

Ev mertebe bi navên weke "ruhê e'zem, miftahê wucûd, tercûmanê îlahî, 'alema ruhî, 'alema xeybî, 'alema melekûtî û hwd. tê binavkirin. A'yanê sabite, gaveke ber bi zahiriyê ve diçin, lêbelê têkiliya wan hêj bi şekil, reng, zeman û mekanê ve tune.[41]

Wucûd, ji ber sedemên sûretên 'ilmî, tenezzûlî mertebeya erwahan dibe. Di vê mertebeyê de ji her yek sûretên 'ilmî, wek cewherên basît derdikevine meydanê. Ev cewherên basît, di reng û şeklê hev de nînin û bi zeman û mekanê nayêne wesifkirin. Ev mertebe, ji heyînên tiştên saf ên razber/nedîtbar pêk tê. Di vê de, madde û terkîb nînin. Tiştên di vê derê de dikarin bingeha xwe û wekheviyên xwe îdrak bikin. Yanî di vê mertebeyê de her rûhek, xwe, wekhevîyên xwe û Xwûdayê xwe ku bingeha wan e, îdraq dikin. Peyva ku derbarê soza erwahan de tê gotin ku Xwûda ferman kiriye, "Elestû bîrabbîkûm, qalû bela (Ma ez ne Rebbê we me? Gotin belê." (Sûreya E'raf 7/172), di vê mertebeyê de pêk hatiye.[42]

Mela têkiliyekê di navbera sirra hedîsa qudsî ya "kuntu kenzen"ê û hedîsa "lewlak"ê de çêdike. Xwestina zanîna wî û xuliqandina nûra Muhemmedî, sebebên afirandina 'alemê ne.

Ger xeberdar î ji sirra "kuntu kenzen" guh bidêr
Da bi sed nurê beyan ket me'na lewlakê rûh (33/3)

Ji bo ku wesf û kemalatên Xwûda (nav û sifet) baş bêne xwûya kirin, lewh û qelem ji nûra Muhemmedî hatine afirandin. Ji wê eqlê ewwelî, ruhê kullî mewcûdat hatine afirandin. Ji bo tecellaya fî'lî, 'eql û ruh dixwazin di 'alema sûflî da, di cisman

---

[40] Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Komelgeha Ferhengî ya Ehmedê Xanî, Soran, 2018, c. 1, r. 208-209.
[41] Kılıç, b.n.b., r. 313.
[42] Konuk, b.n.b., c. 1, r. 24-25.

de tecellî bibin ku nav û sifetên Xwûda li ser wan aşkera bibi. Her tiştê divê xwe bi ‘eslekî an jî bi şeklekî ve girê bide ku bête xwûya kirin. Ji lefzan re me’na, ji sûretan re heyûlayek û ji rûhan re jî cism û bedenek divê ku mucessem bibin û hem bêne xwûya kirin hem jî bêne zanîn.

Wesf û kemalatên subûh herfên kîtaba 'eql û rûh
Ismek divê lê bin wuzûh lew lewh û kilk û xame da (9/73)

Ew nusxeya 'alîisim lewhek divê jê ra cisim
Da herfî lê bin murtesim herfan şikil nûriyye da (9/74)

Lefzê ku me'nayek divê terkîbê îmlayek divê
Sûret heyûlayek divê rûhan di nefsê cusse da (9/75)

#### 1.1.1.5. Mertebeya Âlema Misâlê

Di vê mertebeyê de tiştên basît û mucerred ên ku di mertebeya pêşiya vê mertebeyê de cih girtibûn, gavekê ber bi zahirbûnê ve tavêjin. Ew cewherên basît û mucerred, dikevine halekî letîf û murekkeb.[43] Ji vê mertebeyê re alema mîsalê hatiye gotin, lewra her ferdê ku di ‘alema erwahê de zahir bûyî, sûretên mumessilê wan ên ‘alema cismanî, di vê ‘alemê de hasil bûne. Ji ‘alema mîsalê re, “alema melekût, alema berzexê”, “murekkebatê letîfe, ‘alema xeyalîb û hwd.” jî tê gotin. ‘Alema mîsalê wasite ye ku feyza ‘alema erwahan, bigehînite ‘alema cisman. Ev alem, di navbera erwah û ecsamê de berzexek e.[44]

Mela ji vê mertebeyê re “alema xeybê û ‘alema mîsalê” gotiye. Hebûnên di vê mertebeyê de ‘erş, kursî û lewha ye.[45] Ew nûra di ‘erşê de tecellî dibe, hemû nav bi wî têne neqişandin. Kursî, Cenneta Xuldê û meqama Sidretu’l Muntehayê di vê mertebeyê de têne afirandin. Feyza û bereketa Xwûda berzexê dadigire û ew di behra cemed girtî de heyat dest pê dike. ‘Eksa her tiştî, weke ‘eksa di neynikê de xwûya dike, di vê mertebeyê de xwe nîşan dide.

Nûra tecella hate 'erş esma hemî lê bûne neqş
Şewqa di wan çû ta bi ferş isman bi zatî secde da (9/69)

Katib qelem dîsa gerand ismek ji isman sewwirand
Kursî ji nûrê afirand Cennatê Xuld û Sidre da (9/70)

---

[43] Kılıç, b.n.b., r. 314.
[44] Konuk, b.n.b., c.1, r. 33.
[45] M. Nesim Doru, *Melayê Cizîrî, Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2012, r. 151.

Serçeşmeya wê dozexê behra cemalê da rexê44
Feyzek ji nûra berzexê dagirt û geh geh fûre da (9/71)

Ew berzexa reng ayîne hingî ku eşya dayîne
Wan tê şemal îsayine jê sûretek 'eksiyye da (9/72)

### 1.1.1.6. Mertebeya Şehâdetê / Mertebeya Alema Cismanî

Ev mertebe, di xaricî de, bi sûretê cisman, zuhûrbûna zat e ku di sûretên vê mertebeyê de, ji xîlafê sûretên ‘alema mîsalê; qabilî tecziye, înqisam, xerq û îltîyamê ne (jihevveqetînê, perçebûnê, qetandinê û bihevvezeliqînê qebûl dikin). Di vê mertebeyê de Zat, bi sûretên cismên ku di xaricî de têne dîtin, tecellî dibe. Tiştên vê mertebeyê bi pênc hestan dikarin bêne îdraqkirin û bi eşkereyî dikare bêne muşahedekirin. Alema şehadetê alema kewn/hebûn û fesad/xirabûnê ye. “Kewn”, derketin û eşkerebûna sûretan e û “fesad” jî, belavbûn û tûnebûna sûretan e. Herwekî av dema dikele, dibe buxûr û sûretê mahiyeta wê diçite fenayê ku keyfiyeta wê ji fena û fesadê pêk tê. Ji wê avê, sûretekî hewayî peyda dibe û ev jî kewn e. Di fesadiya her sûretekî de sûretekî kewnî hasil dibe.[46]

Hemû sûretên ‘alema şehadetê, ji “erez”an pêk tên. Erez, ew tişt e ku di du zemanan de baqî û bi wucûda xwe ve ne mewcûd e. Cewher jî, ziddê erezê ye. Cewher ew tişt e ku bi zatê xwe ve ne qaîm e/ne mewcûd e. Di ‘alemê de tu tişt, cewherek nîne ku bi nefsa xwe qaîm/mewcûd bibe. Mewcûda ku di “eyn”a xwe de, bi “eyn”a xwe qaîm bûyî, ancax wucûda mutleq ya Heqq e ku bi zatê xwe qaîm e.[47]

Di heqîqetê de bingeha e’rez, e’yan û cewheran yek e û hemû jî, ji nûra munezzeh peyda bûne, lêbelê ji bo ku nav û sifet, kemalatên xwe nîşan bidin, her yekî bi sedan şekl û qaliban de têne xuya kirin.

E'raz û 'eyn û cewheran wahid ji eslê mesderan
Te'sîrê bexşê mezheran sed rengî herfan sîxe da (9/49)

Ew latê husn û 'eynê nûr sûret bi sûret tên zuhûr
Ins û perî wîldan û hûr cî cî di wan da cilwe da (9/89)

Her yek ji feyza ismekî tên sûreta tilismekî
Lew me'neya her cismekî pertew ji nûrê lê veda (9/90)

---

[46] Konuk, b.n.b., c.1, r. 36-37.
[47] Konuk, h.b., c.1, r. 37.

Sûretê eşyayan ji hev cuda hatine çêkirin. Di vê de harîkuladeyek heye, lewra maddeya wan wisa bi tertîbî û pergalî hatiye lihevxistin, yek naşibe yekî din. Çar anasirên eslî eger bi mîzanekî neyêne li bal hev û bi hev ve cem' nebin, ji hev ferqkirina wan ne mimkin e.

Çar 'unsur in çar teb'et in vêkra bi mîzan vêk ketin
B'hev ra muxalifsîret in lê d'sûretê şexsiyye da (9/124)

Hetta bi mîzan çar esil b'hev ra nebin cem' û wesil
Cisman ji hev nabin fesil bazû ji bazû şeq neda (9/125)

### 1.1.1.7. Mertebeya Insânê Kâmil

Ev mertebe, di nav xwe de hemû mertebeyên din dihewîne, yanî cami'ê mertebeyên cismanî, nûranî, wehdet û wahidiyetê ye. Ev mertebe, tecelliya dawî ya "wucûdê mutleqê" û lîbasê axirî ye.[48]

Hedîsa qudsî ku weha ye, "Ez gencîneyeke veşartî bûm, min viya bême niyasîn, vêca min mexlûqat afirandin de ku ew min biniyasin." Ev hedîs, hem sebebê hewcedariya mezheran hem jî sebebê afirandina 'alemê beyan dike. Di aliyekî din de jî behsa destpêkirina te'eyyûnan dike. Xezîne deriyê wê çêkiriye, hemû mucevheratên hêja (sifet) nayêne dîtin. Mela Camî, vê hedîsê bi vî şeklî şirove dike: "Xwûda bi kemalatên zatê xwe, bi yekîtiya Qeyyûmbûna xwe, bi nêrîneke ku ne tiştekî li xwe zêde dike ne jî, ji wî tiştek kêm dibe, nezerê xwe kir. Xwûda, bi quweta yekîtiya xwe ku tehekkûmî her tiştî dike, ew nav û sifetên ku wek halên xeybî dihatine zanîn, dît. Tesîra nav û sifetan ji hev cihê nebûne, lêbelê, ji bo ku Xwûda bêqusuriya kemalatê nav û sifetên xwe di mezheran de ji hev cûda nîşan bide, bi nezera heqîqetê tesîrî wan bike, xwest van nîsbet û halan îzhar bike."[49]

Meqseda nefes dayîna nefesa Rehmanî, di vê hedîsa qûdsî de hatiye beyankirin ku dibêje, "Ez gencîneyekî veşartî bûm, min viya bême niyasîn, vêca min mexlûqat afirandin de ew min biniyasin." Goreyî vê hedîsê "hubb, zuhûr û me'rîfet" hene û kemalê me'rîfetê jî bi ayîneya endamê mimkin dibe ku ji qebûlkirina sûretê îlahiyeyê re musaîd bibe. Ji bo vê yekê wucûda letîf ya zatê ulûhiyetê, tenezzûlê mertebeya

---

[48] Konuk, h.b., c.1, r. 67.
[49] Chittick, *Aşığın Aynası*, r. 131.

kesîfeyê bûye ku întîbayên sûretê îlahîyyeyê bikare qebûl bike. Ev mertebeya kesîfe, ‘alema şehadetê ye.[50]

Mela Camî, “însanê kamil” wek tecelliya Xwûda nîşan dide. Lewra însên emaneta Xwûda li ser pişta xwe bar kiriye.[51] “Mertebeyên hebûnê, berpirsiyara emanetan qebûl nekirin, lewra, ancax dikarin mezhera navên Xwûda yên mu’eyyen bikin. Ew mertebe, ji bo mezherbûnê, xweyî qabiliyeta dorpêçkirina navên Xwûda nebûn. Lêbelê însên emanet hilgirt, lewra ew xweyî wî qabiliyetê bû ku hemû mukemmeliyetên navên Xwûda nîşan bide. Bi vî awayî tecelliya Xwûda, di sûretê însên de teheqqûq kir.”[52]

Nav û sifetên Xwûda bi kemaliya xwe ve herî baş di însên de tecellî dibe, lewra însan/Adem, zûbde û xulaseya ‘alemê ye. Ji ber vê yekê jî sedema xilqata ‘alemê, Adem e. Însan ji Adem çêbûne û Adem jî ji nûra Muhammedî çêbûye. Di serkahniya însanê kamil de jî pêxember heye ku di hedîseke qudsî de hatiye beyankirin ku weha dibêje: “Lewlake lewlak lema xeleqte’l-eflak / Ger tu nebûya min felek nediafirandin.” Mewlana di rûba’îyekê de vê xusûsiyetê weha beyan dike.

> Ey nusxeya nameya îlahî ku tu yî
> Wey ayîneya cemalê şahî ku tû yî
> Xaricê te nîne her çi heye di alemê da
> Ji xwe bike teleb her tiştê ku ancax tû yî[53]

Di mertebeya itlaqê ya wucûdê de, sifet; nav ku eserên sifetan in; ef’al eserên esmayan in, tune. Di tenezzûlbûna wucûdê ya mertebeya ulûhiyetê de, xweyî sifet û esmayan e, lêbelê ef’al tune. Wexta tenezûlê mertebeyên kewniyeyê dibe, ef’al zahir dibin. Di mertebeya şehadetê de, dema lîbasên te’eyyûnatên kesîfeyê li xwe dike, sifet, nav û ef’al zahir dibin. Cem’ê mertebeyên wucûda mutleq û etwarên meclaya wî, di ‘alemê de û di xulasaya alemê de ku Adem e, tecellî dibin. Bê ‘alem û bê Adem, dîtina Xwuda mimkin nîne. Ji bo vê yekê di însanê kamil de, zat, sifet, esma û ef’al muctemî’ in, tê de berhev bûne. Bi vî awayî tenezzûlatê kemaliyyeya wucûdê, di însanê kamil de dawî dibe.[54]

---

[50] Konuk, b.n.b., c.1, r. 61.
[51] “Me emanet teklîfî (pêşkêşî) asîmanan û erdê û çiyayan kir, lê wan ji hilgirtina wî xwe paş ve dan û jê veceniqîn. Însan ew hilgirt. Bêgûman însan pir zalim û pir nezan e.” (Sûreya Ehzab, 33/72)
[52] Chittick, *Aşığın Aynası*, r. 134.
[53] Konuk, b.n.b., c.1, r. 62.
[54] Konuk, h.b., c.1, r. 63.

Melayê Cizîrî, giringiya xuliqandina însên ku eşrefê mexlûqat e, beyan dike. Însan mêweya dara ‘alemê ye. Textê ‘alemê bi wî hatiye neqişkirin û ‘alem jî ji bo wî hatiye afirandin. Rûhê însên yê lahûtî, tenezzul bûye hatiye ketiye bedena nasûtî de. Her çendê aliyê însên yê lahûtî, ji aliyê wî yê nasûtî ve hatibe veşartin jî, dîsa ew navenda ‘alemê ye. Di wî de hem xusûsiyetên daketinê (esfele’s-safilînê[55]) û hem jî yên bilindbûnê (alayê illiyîn) hene. *“Emrê xuliqandinê ji Heqîqetên Heqîqetê nuzûl dibe, ‘alema hatiye afirandin û hemû mexlûqatê tîne wucûdê û bi rêya ‘alemên piştî mirinê dîsa vedigerine ser ‘eslê xwe.*[56] *Li aliyekî din însanê kamil, digehije daîreya wucûda xwe. Eger ji ber kêmasiya hinek îstîdad/behredaran, wucûd nekare daîreya xwe temam bike, ew dikeve esfeli’s-safilînê. Yên daîreya xwe temam bikin, ji wan re jî ecrekî bêdawî*[57]*/bênavber heye.”* [58]

Her neh felek lê kaxek in dûr û diraz wek axek in
Tê dar in ew jê şaxek in vê terhê însan mêwe da (9/134)

Însan ber e 'alem dirext sultan ji xelwet hate text
Pê zeyyinîn îqbal û bext dewlet ji bala tale da (9/135)

Sultan ji bala hate xwar lahût di nasûtê veşar
Peyweste bû nuqte’w medar dewra 'urûcê ger we da (9/136)

#### 1.1.2. Nav û Sifetên Xwûda

Ellah (‘erebî) û Xwûda (kurdî) navê afirînerê hemû tiştan e. Ellah,[59] navê afirînerî yê taybet e. Ji bilî vî navê wî yê taybet, navên wî yên din (esmayên husna) û sifetên wî, wesf û xusûsiyetên wî didin nîşan. Çawa ku Sureya Fatîheyê maka Qur’anê ye û wateya Qur’anê di wê de kom bûye, her wisa jî, esmayê husna, li bin banê navê “Ellah” de kom bûne. Nav û sifetên Xwûdê yên din, mewsûfê navê “Ellah” in. Navê Ellah, me’neya nav û sifetên mayî hemû di nav xwe de dihewîne.[60] Îbn Erebî dibêje,

---

[55] “Piştre me ew, li nizmtirînê nizman (li kalîtiyê) vegerandiye.” (Sûreya Tîn, 95/5)
[56] “Ewên ku dema belayek ji wan re were, dibêjin: “Em ji Xweda hatine û em (dîsa) bal wî ve dizivirin.” (Sûreya Beqere, 2/156)
[57] “Lêbelê ji bo wan kesên ku baweriyê bînin û emelê salih (karê qenciyê) bikin, perûyeke ku nayê birrîn heye.” (Sûreya Tîn, 95/6)
[58] Chittick, *Aşığın Aynası*, r. 113-117.
[59] Navê “Ellah” di Qur’anê de 2697 caran derbas dibe. Navê wî yê taybet û yên dinê mahiyeta xwe ji Qur’an û hedîsan hildigrin. Ellah/Xwûda, afirînerê kaînatê ye û hukm û qudreta hemû tiştê di destê wî de ye. Xwûda, mahîyeta heqîqet û zanista derbarê zatê xwe da, ma’lûmat nedaye însanan û dibêje, Di derbarê zatê min de zêde tefekkurê nekin, lêbelê derbarê tiştên ku min afirandî de tefekkûrê bikin. Nav û sifetên wî ji hemû kêmasiyan berî ne û bi wesfên kamil ve muttesif in. Navê wî tahir (pak û paqij), teyyîb (baş, qenc) û mubarek (bi bereket) e. (Karagöz, *b.n.b.*, r. 98.)
[60] Bekir Topaloğlu, “*Allah”,* DİA, c. 2, İstanbul 1989, r. 471-498.

ew kesê ku tewbe dike bi gotina “Ellah” îşaretî navê Xwûda yê “Tewwab”ê dike û kesê nexweş jî bi vê gotinê îşaret û qesta navê “Şafî” dike.[61]

Zanyarên ‘ilmê kelamê bi îttîfaqî tespît kirine ku sifetên Xwûdê di pênc beşan de hatine tesnîfkirin. Ji wan yek tesnîfkaran, ehlê ‘ilmê kelamê yê ewwelîn, Ebû Ebdullah el-Halimî ye. Wî jî navên Xwûda di pênc beşan de, bi goreyî heyîna Xwûda, yekîtiya zatê wî, afirîneriya wî, bê misl û nezîriya wî, hukumdariya wî ya li ser alemê, tesnîf kiriye û wî wateya wan jî beyan kiriye.[62] Dabeşkirin weha hatiye çêkirin: Sifetên Zatî, Sifetên Subûtî, Sifetên Fî’îlî/Tekwînî, Sifetên Selbî/Tenzîhî, Sifetên Muteşabîh.

**Sifetên Zatî**: Ev sifetên hanê, zatiya Xwûda beyan dikin û bi zatê wî ve qaîm in. Wucûd (hebûn), qidem (tunehiya ewweliyata heyîna wî), beqa (tunehiya dawiya heyîna wî), wehdeniyet (yekîtiya wî), muhalefetun lîlhewadîs (neşibiya wî bi yên ku hatine afirandin re), qiyam bînefsîhî (hebûna wî bi wî ye, bi nefsa xwe qaîm e, neafirandina wî).

**Sifetên Subûtî**:[63] Ev sifetên hanê delaletî zatê wî dikin. Bênîhayetî û kemala wî beyan dikin. Ev sifetên wî ezelî û ebedî ne. Xweşî/heyat (zindî ye), zanîn/‘ilm (agahdarê her tiştî ye), bihîstin/semî’ (her tiştî dibihîze), dîtin/beser (her tiştî dibîne), vîn/îrade (daxwestina wî), şîn/qudret (quweta wî têra her tiştî heye), kelam (xeberdarbûna wî), tekwîn (afirînerê her tiştî ew e).

**Sifetên Fî’îlî/Sifetên Tekwînî**: Ev sifetên hanê ‘îş, fî’îl û teserrufatiya Xwûdê û têkiliya wî bi însan û kaînatê re beyan dikin. Xuliqandina kaînatê û îdarekirina wî bi van sifatan tên îfadekirin. Sifetên tekwînî ev in: Tehlîk (afirnadina wî), terzîq (riziqdayîna wî), înşa (ji tunehiyê afirandina wî), îbda (afirandina bêhemta û mukemmel), sûn’ (îcatkirina wî), îfna (tunekirina wî), îmate (can jê standina wî), îhya (vejandina wî), înbat (ji ‘erdê nebat derêxistin), înma (mezinkirin û geşkirin), teswîr (şekildana wî).

---

[61] Abdulkerim Cîlî, *Hakikat-i Muhammediyye*, (Wer. Muhammed Bedirhan), Nefes Yayınları, İstanbul 2019, r. 75.
[62] Topaloğlu, b.n.b., c. 2, r. 471-498.
[63] Ehmedê Xanî, sifetên subûtiyê bi vê şeklê beyan dike:
*Sîfetê di seb’e ji bo Zu’l-Celal*
*Bizan heft in ey ‘arifê purkemal*
*Xweşî Şîn û Zanîn û Vîn û Kelam*
*Bihîstin digel Dîtinê bûn temam*
(Ehmedê Xanî, ‘*Eqideya Îmanê*, (Analiz ve Şerh: Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul 2008, r. 128.)

**Sifetên Selbî/Tenzîhî**: Ev sifetên Xwûda, wî ji kêmasî û şaîbeyên şîrkê tenzîh dikin. Ew bêşerîk e, alim e, qadir e, ezelî û ebedî ye. Pêwîst e Xwûda ji hemû kêmasî û acîziyetan bête tenzîhkirin.

**Sifetên Muteşabîh/Xeberî**: Hinek sifet bi Xwûda ve têne nîspetkirin û ji aliyê zahiriyê ve ne mimkin e ku Xwûda bi wan wesfan mewsûf be. Ancax, însan dikare wan wek wesfên muteşabîh me'na bike. Di heqîqeta xwe de çawabûna wî û mahiyeta wî ji terefê însanan ve bi temamî nayê fahmkirin. Wek nimune; nefs, yed (dest), ricl (pê), wech (rû), 'eyn (çav), zat, yemîn (milê rastî), fewq (li jorbûna wî), 'inde (di cihekî de cihgirtina wî), nuzûl (daketina wî), îstîwaya 'erşê û hwd. encax bi şiroveyeke mecazî dikarin bêne îzahkirin.[64]

Ev sifetên hanê hemû, di bin banê navê "Ellah" de hatine komkirin. Nav û wesfên Xwûda, yanî esmayê husna ji Qur'an û hedîsan hatine tespîtkirin. Melayê Cizîrî jî, ji van nav û sifetan, hinek di helbestên xwe de bi kar anîne û wî jî di çarçoveya nav û wesfên Xwûda de bi hinek terkîban îşaretî Xwûda û sifetên wî kiriye. Wek nimûne: "Şahê qudretê, neqşê qudretê, neqqaşê ezel, husna ezel û hwd."

Di edebiyatên klasîk ên gelên misilman de, derbarê navên Xwûda de, termînolojiyeke hevpar çêbûye. Em dibînin ku Melayê Cizîrî jî, ji vê kevneşopiyê para xwe hildaye û wî jî ev termînolojî bi kar aniye. Nav, sifet û nîşaneyên/îşaratên ku di helbestên Melayê Cizîrî de, ji bo Xwûda hatine bikaranîn, ev in: Ellah (Te'alallah, wellah, ehsenellah, barekellah, hemdillah, lillah, billah, xelîlullah), Xwûda, Îlah, Xeffar, Baxwoy, Semed, Mehbûb, Wehhab, Mewla, Heq, Subhan, Xaliq, Wahib, Furqan, Xellaq, Kirdigar, Wahid, Ehed, Wedûd, Hekîm, Me'bûd, Meşhûd, Qeyyûm, Deyyûm, Dawer, Bari, Amurzîgar, Xeffar, Rehman, Cebbar, Kelîm, Xefûr, Mewla, Kelîm, Quddûs, Heyy, Qadir, Rebb, Celal, Celîl, Subûh, Bakî, Meşşate, Nûr, Bedî', Batin, Ewwel, Axir, Şafî, Fatir, Kerîm, Zahir, Lemyezel/Layezal, Heq-te'ala, Bareke'l-barî, Husna Ezel, Neqqaşê Ezel, Hostayê 'Işqê, Wehdetê Mutleq, Şahê Qudretê, Neqşê Qudretê, Destê Qudretê, Kenza Qudretê, Yarê Heqîqî.

Melayê Cizîrî di helbestên Xwe de derbarê kelam û felsefeyê de, mahiyeta Xwûda, afirandina kesretê, heqîqeta tiştên hatî afirandin de fikr û ramanên xwe, di çarçoveya helbestê de, beyan kirine. Melayê Cizîrî, li ser heyîna Xwûda, tecelliya nav

[64] Karagöz, *b.n.b.*, r. 74-75.

û sifetên wî li ser heyînan û li ser felsefeya wehdetê wucûdê radiweste. Di vê derbarê de nav û sifetên Xwûdê di rêz û beytên xwe de bi kar tîne. Helbesta Mela ya ku bi navê "Ellah sehergaha ezel …" dest pê dike, fikr û hestên Mela yên derbarê tesewwif û felsefeya wî de beyan dike. Di vê helbestê de li ser afirandina candaran tê rawestandin û beyta yekem jî tecellaya Xwûda ya ku li ber perdeyê derketiye û kesret pê xuya bûne, îfade dike.

Navên weke "Ellah, Xwûda, Rebb, Heq", rasterast derbarê zatê wî de hatine bikaranîn. Ji bilî îşaretkirina zatê Xwûdê, nav û sifetên wî bi gelemperî di van hevgirî/konteksan de hatine bikaranîn: Te'eccûbmayîna ji ber qudret, hikmet, afirandin û mezinahiya wî, stirandin/xwe spartin/xwe avêtina ber bext, îkramkirina wî, beddû'a, 'efû xwestin, mezinahî û sipehîtiya wî, tenzîhkirin, alîkariya wî, zikir, sondxwarina bi navê wî, xwestina nêzikbûnê li bal wî ve, alîkarî xwestin, 'ilm, rizaya wî, rehmet xwestina wî, afirandina wî, teqdîrkarê xêr û şeran, îta'eta emrên wî, sirrên wî, nûr û tecelleya wî, lutf, feyz û bereketa wî, îhsan û îkrama wî, cezadayîn û cezakirina wî, wehdeniyeta wî, sirrên, hîkmetên wî, cewabdayîna du'ayan û înayeta wî, heyîna wî, îşaretkirina zat û qudreta wî, lutf û hikmetên wî, tecelliya wî, mukafatkirina wî, 'îta'et û 'îbadetkirin ji wî ra, riziqdayîna wî, dost û yarîbûna aşiqan, me'rîfet, zikir û şukurkirin, mezinahiya sen'eta wî, hemd û senaya wî, tenzîhkirina wî ji kêmasiyan. Nav û sifetên Xwûda yên ku di dîwana Melayê Cizîrî de hatine bikaranîn ev in:

#### 1.1.2.1. Nav û sifetên Xwûda Yên ku Di Qur'an û Hedîsan Da Hatine Beyan Kirin

##### 1.1.2.1.1. Ellah

Navê "Ellah" ji koka "E-l-h"yê tê û ji afirînerê mezin re wek nav hatiye qebûl kirin. Ev nav bi tenê ji wî re hatiye tehsîs kirin[65] û wehdeniyeta wî nîşan dide û cem'a wî tune lewra ji xeyrî Xwûda me'bûdê heqîqî tune.[66] Ellah, heyîna mutleq e, sebebê hemû heyînan e, ji bilî wî tu îlah nînin. Hemû mexlûq/afirîde muhtacî wî ne, lê ew muhtacî kesî nîne. Heyîna wî bi wî ye. Xaliq û hakimê hemû mexlûqan e. Xwûda di

---

[65] "(Ew e), Xwûdayê asîmanan, erdê û her tiştên ku di navbera her duyan de ne. Naxwe, 'îbadetî wî bike û li ser kirina 'îbadetî wî sebrê bikêşe. Ma tu ji wî re hevnavekî din dizanî?" (Sûreya Meryem, 19/65). (Qur'ana Pîroz, Kurdî-Tirkî, Meala wê ya Îcmalî, (Wer. Abdulkerim Bingöl-Muhammed H. Feyzi), Tenvir Neşriyat, İstanbul 2009, r. 309.)

[66] Rağıb el-İsfahanî, Müfredat/Kur'an Kavramları Sözlüğü, "E-l-h", tercüme: Mustafa Yıldız, Çıra Yayınları, İstanbul, 2020, r. 83-84.

Qur'ana Pîroz de wesfên xwe dide û xwe dide naskirin. Tabi'ên dînê Îslamê jî rengên baweriyên xwe ji wan gotinan digrin. "Bibêje, Ellah yek e. Ellah Semed e. Wî tu kes newelidandiye û tu kesî jî ew newelidandiye. Tu kes nîne ku ji wî re hemkûf be jî." (Sûreya Îxlas, 112/1-4). "Ellah, di 'ezemet û kibriyaya xwe de, di qudret û îradeya xwe de û di temamê sifetên xwe de bêmîsal û bênezîr e, lewra sifetên mexlûqan hadîs in, 'erez in, lêbelê sifetên Xwûda qedîm in."[67] "Xwûda ji hemû 'eyb û kêmasiyan munezzeh e, otorîteya wî hêzdar e, îhsan û lutfa wî zêde ye. Hemû heyînên ji xeyrî wî, ji comerdiya wî afirî ne. Îhsan û êdeleta wî, ji bo wî vedibe û kêm dike. Dema wî alem bênimûne afirand û heyî kir, ew bi şikleke spehî û mukemmel pêk anî. Di teserrûfatiya milkê wî de şirîkê wî nîne û di rêvebirîya wî de, bi wî re rêvebirek jî nîne."[68]

Melayê Cizîrî, navê "Ellah", bi taybetî derbareyê te'eccûbmayîn û heyirîna xwe de bi kar tîne. Di afirandina alem û însên de, ji bo aqilmendan îbaretên baş û ecêb hene. Dema Mela wan wateyan teheyyûl dike heyranî û te'eccûbiya xwe bi dubarekirina navê "Ellah" beyan dike. Xwûda xwestiye perdeyan li ser navê xwe rake û xezîneya xwe veke û eşkere bike. Ji ber vê yekê, di sehergeha ezeliyetê da, meşaleya 'işqê şewq daye. Tecelliya wî şu'le daye û nûra cemalê Xwûdayê lemyezel bi vî awayî xwûya bûye. Piştî vê tecellayê êdî bi hikmet û 'ezemeta wî tiştên mayî hatin afirandin û Xwûda, êdî bi afirandinên xwe yê bêhemta, heyîna xwe ya mukemmel nîşanî însanan daye. Mela jî, ji ber vê qudret û xuliqandina kamil ve, medh û senaya Xwûda dike û li ber afirîneriya sipehî, te'eccûbî û heyraniya xwe beyan dike.

> Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
> Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Nevê "Ellah", sifetên Xwûda yên izzet û ikramê ku digel 'evdên xwe dike, nîşan dide. Ji ber heyatbexşkirin û nî'metên wî yên letîf, zerîf û xweşik, şa'ir şikurdar e. Ev sifet, îşaretên zatê wî dikin û mezinatî, sipehîtî û bêmîsaliya sen'eta wî nîşan didin.

> *Ellah* ji nûra sermedî yek qetreyek da Ehmedî
> Şirînî û firrek we dî medhûşi ma hetta ebed (40/10)

> *Ellah* li min heyat e çi şekker û nebat e
> Dê ji nû ve dê cuwan bim ger bêhn bikem gula geş (53/15)

[67] Mela Muhemmed Şoşikî, *Nûra Qelban*, c. 6, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2014, r. 843.
[68] Îbn Arabî, *Fütûhat-ı Mekkiyye*, c. 1, (Wer. Ekrem Demirli), Litera Yayıncılık, İstanbul 2007, r. 92.

*Ellah* çi zerîf î çi letîf î çi şepal î
Qenc î û bi xunc î û bi naz î û delal î
Zanîn me şev û rojê tu bes ku ji xeyal î
Daîm ji xeyala ku li bal e tu li bal î (130/11)

Ji serî heta binî ku nûra wî ‘alem dagirtiye, hemû tişt bi heyîna Xwûda hereket dikin û dizivirin/sema dikin. Yên ku hay ji vê dewwarê/zivirînê re tune, ji wan ‘ecêb dimîne ku dengê dewwarê/zivirînê nabihîsin. Melayê Cizîrî, ji ber nelihevkirina xelwenuşînî û seyyahê/derwêşê, ji ber yek qetreyek nûra Sermedî ku Ehmed heta ebedê bûye medhûş”, “ji ber nalîn û feryada bulbulê, şirînahî û xweşikiya hubba Xwûda, ji ber neşaşkirina feleka dinyayê û çerxê, ji ber reng û awaza sazê ku tiştekî dixwaze, ji ber tecellaya sirra qederê, ji ber gotin û kenên yarê, ji ber rengê xweşikiya wî ku di rengê Yusûf de ye, ji ber cewr û cefaya ku peyapey ‘aşiq dikêşe, ji ber zerîfî, letîfî û şepaliya yarê maye heyirî û ketiye nêv te’eccûbê da.

Te ji feryad û fixanan bi xwe bulbul kerr kir
Ellah Ellah ji çi derdî weh dikalî şeb û roz (47/4)

Ellah Ellah çerx û dolabê binê lê nuqte
Naket qet di dewranê xelet (60/8)

Tu binê sazê bi awazî çi rengî te dixwazin
Ellah Ellah bi Xûdê qet dibihî ev çi xîtab e (94/6)

Navê Ellah, dema bi tena serê xwe hatiye bikaranîn, nîşaneyî Rebbu’l-alemînê kiriye. Ji bilî vê, hinek caran jî navê “Ellah”, bi goreyî rêzimana ‘Erebî bi hinek kelimeyên din re jî hatiye bikaranîn. Bikaranînên bi vî şeklî, ev in:

#### 1.1.2.1.1.1. Te’alallah

“Te’alallah”, yanî şan, zat û wesfên wî bilind in. Mezinahiya zatê wî nayê te’rîfkirin, sifetên wî jî sipehîtiya wî didin nîşan û ew ji bo heyînan hem ruh e hem heyat e. Di delaliya mexlûqan de rengê remz û nîşanên wî ‘eyan in, ji beyankirina husn û cilweya wî re îfade nînin. Ew, di afirandina xetên rûyê yarê de, bi sen’eta xwe ve katibekî bêmîsal e.

Ji mabeyna du ebrûyan dibînim qabê qewseynê
*Te'alallah* binê remzê çi reng avête mabeynê (120/1)

Gewher û gencê Mela husn û cemalê dilber e
Sed *te'alallah* tebarek ev çi husn û cilwe ye (94/28)

Te'alallah çi zat î tu çi wê şîrînsifat î tu

Ne wek qend û nebat î tu yeqîn rûh û heyat î tu (124/1)

Bi şîrînî bi zîbayî çi katib bû we kêşayî
Te'alallah nîşan dane we şîrîn ev mîsal ebrû (106/13)

#### 1.1.2.1.1.2. Wellah

Sonda herî mezin bi navê Xwûda tê xwarin. Ji bilî rizaya Xwûda tu hêvî û daxwazên şa'irî tune. Dîtin û hîskirina şewqa husn û cemalê yarê, armanca wî ye. Sen'eta Rehman a şirîn û xweşik di rûyê dilberan de xwe nîşan dide. "Yên di mewcûdiyetê de têne hebandin, ji xeyrî Xwûda tiştek nîne. Her 'aşiqê ku tişta di rûyê yara xwe de dibîne, ji bilî tezahura wî tiştek dî nîne. Di mewcûdiyetê de tiştek nîne ku 'aşiq nebe.[69] Îbn Erebî di vê mijarê de wiha dibêje: "Hinek ji me, temaşeyî sipehîtiya kemalê dikin, ev sipehîtiya hikmetê ye. Bi vî awayî di her tiştî de "Wî" dibîne. Lewra her tişt saxlem e û fî'lê xwedanê hikmetê ye.[70]

*Wellah* ji herdu 'aleman min husnê canan e xered
Lew min ji husna dilberan her sun'ê Rehman e xered (58/1)

#### 1.1.2.1.1.3. Ehsenellah

"Ehsen" tê wateya herî sipehî û gelek sipehî.[71] "Ehsenellah"; di çêkirin, lihevanîn û xuliqandinê de îşaretî sipehîtî û çêkirina mukemmel a Xwûda dike. Razên ji qudreta îlahî yên ku li rûyê bedewiya yarê û di cemalê wê de peyda dibin, zêde bala aşiqî dikêşe û li ber wan, ew heyran dimîne. Şai'r bi teslimiyeteke mutleq, ji ber qudreta Xwûda heyirî maye, lewra însan, mexlûqeke ehsenu't-teqwîm e û nûr û cemalê Xwêda, herî baş di însên de xwe dide der. Îbn Arabî dibêje, adem û 'alem sifetên Xwûda nîşan didin û bi exlaqê wî exlaqê digrin.[72] Sirrên subhan, surrê subhan[73] (cazîbeya wî ya pak û paqij), di bedewtî û cemalê dildarê de li hev hatine, wechê wê, bi çav û tevahî cemalê xwe ve, qudreta Xwûda ya mezin beyan dikin.

Ne perde ne sitarek li ber wechê hilalê
Ehsenellahu tebarek ji sura wê cemalê (132/5)

---

[69] Chittick, Îbn Arabî Giriş Kitabı, r. 46.
[70] Îbn Arabî, *Aşk Risalesi*, (Wer. Ekrem Demirli), Litera Yayıncılık, İstanbul 2018, r. 115
[71] Abdullah Yeğin ûym., Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Büyük Lügat, Sebat Yayım Dağıtım, İstanbul 2006, r. 33
[72] Chîttick, Îbn Arabî Giriş Kitabı, r.44
[73] Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî/Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (Wer. Emîn Naruzî), c.2, Weşanên Avesta, İstanbul 2013, r. 328

Wer temaşayê şehîdên xwe ke carek tu binê
Ehsenellahu tebarek ji du çehvên di belek (70/2)

Surrê subhan ji husnê dinumêt
Ehsenellah ji sura subhanî (114/12)

#### 1.1.2.1.1.4. Barekellah

Mubarekkirin û bereketkirinê îfade dike. Ew hespê sor (eşqer), bi bereket û mubarekkirina Xwûda, bûye hespeke lezbez/rehwan.[74]

'Eşqerê bedfi'lî çî hî kir 'eceb
Barekellah xweş bezî hespê qule (99/12)

#### 1.1.2.1.1.5. Hemdillah

Şukr û spasdariyê beyan dike. Şa'ir ji ber wechê yarê yê ku mîna heyvekî nû ye, ji Xwûda re hemd û şukrê dike ku wechê yarê nîşanê wî daye.

Bi hemdillah bi feyrûzî li wechê dilberê min dî
Ku mahê new nîşan min dan ji tavê asiman ebrû (108/4)

#### 1.1.2.1.1.6. Lillah

Di wateya "ji bo Xwûdê, di rêya Xwûdê de, bi xatirê Xwûdê" de tê bikaranîn. Dema kesek bixwaze tiştekî bi yekî dinê bidete kirin, bi vî navî şîddeta daxwaza xwe çêtir beyan dike. Di beytên Melayê Cizîrî de ev nav, di wateya ji bo Xwûda, ji bo xatirê Xwûda de, ji bo hemdkirina/tehmîdkirina Xwûda hatiye bikaranîn.

Lillah were saqî bi du caman me ciwan ke
Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê (112/13)

Herçî rengê te bivêtin xwe bibînî lillah
Nezerê wer bide kasê kî çi xweş ayîne ye kas (51/3)

Çi tebî'etbeşer û însan im
Lillahîlhemd çi 'alîşan im (123/2)

---

[74] Nacî Cizîrî, wateya vê beytê bi beyta (Min di dest de Zulfukar û Duldul e) bihorî ve girê dide û weha dibêje: "Melayê Cizîrî dixwaze bibêje ku tebî'etên wî di helbestê de sist û lawaz bû, lê bi saya Îmam 'Elî ew bûye şai'rekî rewan, wek aveke herikbar." (Mela Ebdusselamê Cizîrî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, (Wer. Jan Dost), Weşanên Dara, Diyarbakır 2018, r. 586.)

#### 1.1.2.1.1.7. Billah

Ev sifetê Xwûdê, ji bo sondxwarinê hatiye bikaranîn. Sonda mezin dîsa bi navên wî têne xwarin. Şa'ir sond dixwe û qesem dike ku ger ew nebûya, nefesdayîn dê tunebûya. Mela, di van beytan de li ser navê Xwûdê sond xwariye.

Bê tu billah nebûyîn yek nefesek
Me tu yî rûh mucerred qefes în (80/5)

Nefesek bê te me nayê canim
Billah ne tinê rûh î can î can î (114/15)

Billah ji çi nûr î we tecella li çi Tûr î
Geh geh li seraperdeyê can multemes î tu (105/5)

#### 1.1.2.1.2. Îlah

Îlah, ew heyînê 'alî ye ku layîqî perestîbûnê ye û perestî jê re tê kirin, ji ber mezinahî û 'ezemeta wî heyretbûn çêdibe, bi dil û can penihîn û stirîn jê re çêdibe û bi hestan nayête îdraqkirin.[75] Îlah, di Qur'anê de wehe tê beyankirin: Me'bûd, ewê 'îbadet jê re tê kirin. "Xwedayê we, tenê ew Xweda ye ku ji wî pê ve tu îlah tune ne…" (Sûretê Taha 20/98)

Şa'ir, bi vî navî îşaretî perestiyê dike, bi bangkirina nefsa xwe mesajan dide ku emrên Îlah bêne cih. Lewra yê ku jê re 'îbadet bê kirin, alîkarî jê bê xwestin û lawahî jê bê kirin, her ew e. Lazim e rêya wî ya rast û durust wek heblu'l-metînê/werîsê saxlem bête girtin, lewra ji bilî rêya wî ya siratê musteqîm, rêyên mayî hemû pûç û betal in. Xwûda bi rêya ilhamê, nîşanên xwe bi însanan dide zanîn ku însan bêemriya wî nekin, lewra dojeh, behra agirê îlahî ye. Di hinek beytan de jî navê "Îlah" di berginda navê "Xwûda" de hatiye bikaranîn.

Ehmed mebe cewr û cefa tu terk meke emrê Îlah
Lew 'aqîbet dê bin fena bigrin terîqa şer'îyan (90/11)

Zanim ji 'işqa dojeh î behrek ji narê îlahî
Îro li mahê xergeh î teşbîhê seywan î Mela (12/5)

Burhanê 'eql dur kir qiyas ismê kemalatê di xas
Ewwel îlahî pê binas vê nûrê ew pertew veda (9/7)

Îlahî nêrgiza me'y mest û nazik

---

[75] Yusuf Şevki Yavuz, "Îlah", *DİA*, c. 22, Ankara 2000, r. 64.

Ji destê xwar û bedxwahan biparîz (46/8)

#### 1.1.2.1.3. El-Xefûr, El-Xeffar

El-Xwfûr, tê wateya xefkirin û nixumandinê; islahkirinê û ‘efûkirina kesekî. Ev herdu nav, ji “xafîr”ê hatine dariştin ku ew jî, ji koka “x-f-r”yê darijiye. Ismê fa’ilê wê “Xafîr” e ku tê wateya ewê ‘efû dike û dibexşîne. Navên Xefûr û Xeffar, şeklên “Xafir”ê yên mubelexeyî ne ku tê wateya ewê “zehf ‘efû dike û zehf dibexşîne”.[76]

Xwûda, ‘evdên xwe ‘efû dike û ji ‘ezabê diparêze, lewra ji xeyrî wî ti kes nikare ‘efû bike. “Xefûr”, di wateya nixûmandin û setrbûnê de hatiye bikaranîn. Perwane bi sirra/hikmeta Xefûr, li derdorê canfedayê xwe agirê/nûrê dizivire. Xefûr, sipehîtahiyên yarê nixumandine û şa’ir dixwaze ew perde û sutûr li ser sipehîtahiyê rabin ku carekê wan bibîne û hikmeta xweşewitandina perwaneyê aşîkar bibe.

Şemala ji 'eynê nûr e şewq ku lê sitar tê
Perwane bêdestûr e li çerxê semadar tê
Heyran sirra *Xefû*r e lew canfiday yar tê (132/14)

Canê Melê j'qalû belê bend im welê der kakulê
Belgên gulê rûheykelê ew misk e lê carek hilê
Perde'w sutûr da bêqusûr bêtin zuhûr dêmê bi nûr
Nûra *Xefûr* xalên di hûr cama tehûr le'lên şefeq (67/7)

Însan bi kiryarên xwe ketiye behra gunehan û teşneyê lutfa Xwûda ye. “Xwûda zêde ‘efûkar û zêde bexşende ye (Sûreya Hecc, 22/60), rehmet û şefqeta wî besî xilasbûna însên e.

Xerqê deryayê gunah in teşneyê lutfa Heq în
Rehmeta Amurzîgar û şefqeyê *Xeffarî* bes (52/11)

#### 1.1.2.1.4. Es-Semed

Ev navê Xwûdê, bi tenê di sureyê Îxlasê de derbas dibe û tê van wateyan: “Mercî’ê hemû daxwaz û hewcedariyan ku însan hemû mihtacî wî ne, ewê ji kêmasî û noqsaniyan munezzeh e û hewcedarî tiştekî nîne, şanê wî bilind e, rast, adil û ewlemend.”[77]

Şa’ir navê “Semed”ê di wateyên “bêqusûrî û bênoqsanî, di hemû sifet û fî’lên xwe de kamil, mezinahî û mustexnîbûna wî ji hemû tiştan” de bi kar aniye. Senemên

[76] El-Îsfahanî, b.n.b., r. 714-715; Karagöz, b.n.b., r. 335.
[77] Karagöz, h.b., r. 113; Fikret Karaman ûym., Dînî Kavramlar Sözlüğü, DİBY, Ankara 2006, r. 576.

ku bêqusur hatine afirandin, ji destê katibê Semedî hatine çêkirin û nîşanên wahid û ehediyeta wî dikin.

Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê (122/1)

Neyşekera gerden ji ‘ac dîsa ji reştûzên Semed
Qewsê li bala ferq û tac keybir reşandin bê ‘eded (40/1)

Çi nîşan zulmetê nûr'efşan î
Li cemalê Semedî burhan î
Tu li der heq me çira erzan î
Ku sehergeh bi meşê seyran î (123/6)

Tecellîya nûra cemalê Xwûda herî sipehî di wechê însên de xwe dide der, lewra wî Adem û ‘alem di sûretê xwe de afirandiye. Ji Pêxember hatiye ragihandin ku di hedîsekê de gotiye; “Xwûda, însan di sûretê xwe de afirandiye. Her navê di sûretê Xwûda de, di afirandina însên de derketiye meydanê.”[78] “Însan, ‘alema esxer/biçûk e, ruhê ‘alema ekber e, di nav heyînan de yê herî mukemmel e û xalîfeyê Xwûda ye. Însan, sûretê Heq ê kamil e û bi berfirehî neynika sifetên îlahî ye.”[79] Di wechê însên de ew sipehîtî nebûya, însan mest nedibû, berê xwe nedida wechê beşeran. Hemû sipehîtahî, ji xaliqê mutleq in. Heyînên cuda cuda îzafî ne, herçendê ji hev cuda xwûya bikin jî, çawa ku av û cemed ji yek bingehê derketine, her wisa nav û sifetên ji hev cuda û wahid û ehed jî di meqama Semedî de yek in.

Hûr kir cesed qewsê Semed tîr dan kebed dad û meded
Cerhan ji new xwûn dayî kew ‘işqa me lew meşhûri bû (107/10)

Da şahidê esma bi hemî wechê binasîn
Yek mestê Semed kir bi yekê neqşê senem da (1/4)

Husn û zatê but û latan ji cemalê Semed e
Li misalê senemî weku tecellayê Semed (38/6)

#### 1.1.2.1.5. El-Wehhab

Ev nav ji koka peyva “w-h-b”yê hatiye û şeklê mubalexeya navê “Wahîb” e. Ewê bêberdel zehf nî’metan dide, yê ku di ikram û ihsanê de domdar, yê ku bi lûtf,

[78] İbnü’l-Arabî, *Fusûsu’l-Hikem,* (Wer. û Şerh: Ekrem Demirli), Kabalcı Yayınları, İstanbul 2006, r. 26.
[79] Seyyîd Yahya Yesrîbî, b.n.b., r. 385-386.

ihsan û rehmeta xwe ve hemû ‘evdên xwe rapêçayî.[80] Şa’ir behsa ‘eşqa îlahî dike, şukurdar e ku Xwûda, kerem digel wî kiriye û badeya ronîdar îkramî wî kiriye.

Ew tiliyên nazik reqiq pur da me fincana 'eqîq
Min badeya nûrîn rehîq minnet bi min Wehhabi da (2/9)

### 1.1.2.1.6. El-Wahîb

Ev nav ji koka peyva “w-h-b”yê hatiye. Tê wateya, “ewê bêberdel zehf nî’metan dide, yê ku di ikram û ihsanê de domdar e, yê ku bi lûtf, ihsan û rehmeta xwe ve hemû ‘evdên xwe rapêçayî”.[81]

Xwûda bi navê xwe yê “Wahîb” nuqte, cezim û î’rab yek bi yek li ser herfên “Katibî” daniye; Xwûda, di nî’metbexşiya xwe de bêsînor e, her tişt di destê “Wahib” de ye, ew bixwaze di cih de dihêle, bixwaze li aliyê xwe ve dikêşe. Ew Xwûdayê ku ikram û ihsanê dike bi navê xwe yê “Wahib”, li ser rûyê yarê bi cedwelê, xeteke mîna heyva bedrê kêşaye. “Rûyê yarê wek mushefekê ye, xetên li ser rûyê, ayet û sureyên wî ne. Rengê xet û mîskê jî reş in.”[82] Ew herfên ku ji nûra Wahibî hatî reşandin li ser rûyê yarê, weke xetên reş hatine teheyyûlkirin.

Herfên kişandî katibî nûra di rûh û qalibî
Yek yek bi ismê Wahibî î'rab û cezm û nuqte da (9/15)

Kullab bi destê Wahib e yan rakid e yan cazib e
Yan xafid e yan nasib e yan ref'e û yan cezme da (9/129)

Dîsa li bedrê katibî kêşan ji nû jengarê xet
Nûra reşandî Wahibî wî kir reşî purgarê xet (59/1)

### 1.1.2.1.7. Sermedî

Ev sifetê Xwûda tê wateya “daîmî, ebedî û domdarî”yê.[83] Wateya “Sermedî”yê bi sifetên Xwûda yên weke “el-Ebed, el-Baqî û el-Daîm”ê re ‘eynî ye. Xwûda, ebedî ye û mirin jê re tune.[84] Nûra Ehmedî, ji sifetê Xwûda Sermediyê ye, wî di ayîneya zatê xwe de ji bo ku kemalata wî kişf û ‘eşkere bibin. Xwûda, ji wê nûra Sermedî, qetreyek daye Ehmedî/şa’ir jî, ji ber wê ye ew hetta ebedê heyran û sergeşte maye. Di ‘ilmê

---

[80] Karagöz, b.n.b., r. 265; El-İsfahani, b.n.b., r. 1027.
[81] Karagöz, h.b., r. 265.
[82] Rıdvan Canım, *Divan Edebiyatının Kaynakları,* Akıl Fikir Yayınları, İstanbul 2018, r. 75.
[83] El-İsfahani, b.n.b., r. 467.
[84] Karagöz b.n.b., r. 131.

Xwûda de ezel û ebed di wateya xwe de ji hev cuda ne, lêbelê ji zatê wî re ferqa van nake. Di Sermediyeta Xwûdê de, ezel û ebed herdu yek in, ê ezelî be, ebedî ye jî.

Nûrê ji nûra Ehmedî sirra sifatê sermedî
D'ayîneya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da (9/63)

Ellah ji nûra sermedî yek qetreyek da Ehmedî
Şirînî û firrek we dî medhûşi ma hetta ebed (40/10)

Di qidem da ezel û ‘eynê ebed herdu yek in
Sermediyyet weh dixwazit ne ezel bit ne ebed (38/2)

#### 1.1.2.1.8. Er-Rebb

“Rebb”, wek sifetê Xwûda tê van wateyan: Ewê hemû tişt afirandî, gehiştandî û geşkirî, terbiyekirî, gehandî kemalê, yê rêbertiya wan dike, hewcedariyê wan bi cih tîne, rizqê wan dide, çavdêriya wan dike; yê bi sipehîtî û sen’eta xwe ‘erd û asuman xistî nîzam û întîzamê; yê heyata hemû mexlûqatan te’mîn dike, malik û xwediyê hemû tiştî.[85]

Mela di beytên xwe de, navê “Rebb”ê bi daçeka bangkirinê, bi kar tîne û ji ber afirandina wî ya sen’etkarane, ‘ecêbmayîna xwe beyan dike û derbarê pesindayîna wî de acîziya xwe tîne zimên.

Ya Rebb în guldesteyî ya nergisê re'na sti în
Serwê gulşen ya elîf ya qameta yekta sti în[86] (83/1)

Ya Rebbî çi rû leb bi senaya te guşayim
Subhaneke len uhsiye fi şe'nike hemda[87] (1/9)

#### 1.1.2.1.9. El-Mewla

Mewla, tê wateya dost, alîkar û çavdêrê û bi peyva “welî û walî”yê re hemwate ye. Herdu jî, ji koka “w-l-y”yê tên. Wek sifetê Xwûda, Mewla tê vê wateyê ku ewê alîkarî jê tê hêvîkirin û xwestin, lewra Xwûda malîkê hemû tiştan e û ji hemû ‘evdên xwe re alîkar e.[88]

---

[85] Karagöz,b.n.b., r. 118.
[86] “Xwedêyo çi ‘ecêb e! Ev wêneyê ku ez dibînim gelo qevdek gulên taze yan tayeke nêrgiza nazik, yan di baxçeyên gulan de dareke serwiyê ya bilind, yan wêneyê herfa elîfê ya çikrast, yan bejina dildarê ya zirav e?”
[87] Ey Xwûda, ezê bi çi rûyî dev û lêvên xwe vekim û pesn û medhên te bikim? Bêgûman tu pak û parastî yî û hejmartina pesn û wesfên derbarê rewşa te de zêdeyî qeweta min e.”
[88] Karagöz, b.n.b., r. 310-311

Di beytên Melayê Cizîrî de “Mewla” di wateya Xwûda, dost û hebîbê di pir şefqe de hatiye bikaranîn. Dilê ‘aşiq Ke’beya Mewla ye û dil çiyayê Tûr e ku li wê derê tecellî dibe. Mewla, yar di sûretê periyan de, afirandiye. Ji ber ku hem nûr e hem jî dûr e, wesfên wê nayêne dîtîn.

Piştî her firqetê wuslatek peyda dibe. Ev wuslat, di alema sûfiyan de bi şeklekî me’newî (hîssê qeblel-wukû’) peyda dibe. Şa’ir, ji Mewla re şukurdar e ku şefqet û merhemet li wî kiriye ku dildarê ew vexwendiye dergahê xwe, bi vî awayî wuslat peyda bûye.

Dil Ke‘beya Mewla ye lê narê Kelîm îsaye lê
Bangê “enellah” daye lê hem Ke‘be û hem Tûr e dil (74/7)

Nîne di şerq ew reng zerî însanek e mislê perî
Mewla ji nûre aferî naêt ji wê dîn wesfîyan (90/9)

Bi tûlên asitanê ra vexwendim mîr bi dergahê
Bi vî çavî hebîb dîtim şukur ev şefqe Mewlê da (5/31)

#### 1.1.2.1.10. Lemyezel/Layezal

Bêberahî, bêdûmahî û herhebûyî; ewê tune nabe û ji holê ranabe. Ev sifetê Xwûda, bi navên wî yên weke “el-Ebed, el-Baqî, el-Daîm, el-Ewwel (ewê nehatî afirandin, ezelî û qedîm) û Sermedî” re têkildar e.[89] Ayeta derbarê ezelîbûna Xwûda de, di tesewwûfê de cihekî gelekî giring digire û derbarê heyîna mutleq de beyanatên giring dide: “Dê hemû tişt helak bibin, lêbelê wechê/zatê wî ezelî ye.” (Sûreya Qessas 28/88)

Xwûda di subeha ezeliyeta xwe de, bi nûra xwe şû’le daye û çirisiye. Ronahiya cemalê Xwûda ya bêberahî û bêdomahî geş bûye û tecellî daye, heyîna zatê wî ‘eşkere bûye. Hêj sifetên zatê lemyezel tecellî nebûyîn, ew nedihate zanîn. ‘Eşq û me’şûq, perwane û şem’ di zatê wî de hebûn û yek bûn, ji hev veneqetiyabûn. ‘Işq, ji ronahiya ezelî peyda bûye, ew ‘işq bûye perwane, li derdora çira û şemalê geriyaye û digere.

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê “lem yezel” zatê tecellaya xwe da (9/1)

Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê “lem yezel”
'Aşiq û me'şûq yek bûn şem' û hem perwane bû (104/3)

[89] Karagöz, h.b., ,r. 130

'Işqa ji nûra “layezal” husn û cemalê bêmîsal
Îsandi yelmûm û şemal dîsa xwe lê perwane da (9/5)

Xwûdayê şanê wî pîroz û sipehîtiya wî ji nîşana ezelî, bi destê xwe yê cazîbedar, qedeha şeraba ezelî daye ‘aşiqî. Bi ‘ezm û xîretê, kî berê xwe bide Xwûdayê lemyezel, dê beyreqa fethê bibe nesîbê wî û ew ala dê li her terefê ‘alemê bilind bibe.

Şahidê qudsînîşan husn ji remza ezel
Da me bi destê surê camê meya “lem yezel” (73/1)

Her kenarê pê ve wergîrî 'înayetî himmetê
Rayeta fetha bi nesra “lem yezel” menşuri bî (117/7)

#### 1.1.2.1.11. El-Heqq

Ev navê Xwûdê, tê van wateyan: Ewê di heqîqetê de heyî, heyîna wî mecbûrî, înkariya wî necaîz, di heyîna wî de gûmanî tunehî; di heyîn, îlahîbûn û rebbaniyetê de heqq, ewê eşya heyî kirî, xwediyê rasteqîn yê mulk, ewê ku tune nabe û heqîqetê îzhar dike û adil.[90]

Melayê Cizîrî, di helbestên xwe de, navê “el-Heqq”, bi wateyên afirîner/Xwûda, Xwûdayê ku tiştan bi hikmet diafirîne, ewê di heqîqetê de heyî bi kar aniye. Nûra ‘eşqa Xwûda bi sed şekl û awayan xwe nîşan dide. Hêj ‘erş û kursî ‘eşkere nebûyî, husn û cemalê Heqq hebûye. Wextê nav û sifetên wî di kesretê de tecellî dibin neqşê sen’eta Heq, di rûyê dilberê de xwûya dibin. Ew nûra ku ‘aşiq bengiyê wî ye, nûra Heq e û ji husn û cemalê mutleq e. Çi sipehîtî û cazîbe hebin (dilber, lat, yar û hwd.) tecelliya Heqq di hemûyan de xwe dide der. Heyînên heq û mecazî bi gelemperî bi vî navî tê beyankirin. Heqq yek e û mewcudatên din yan şu’leyê nûra wî ne yan jî ‘eksa neynika heqîqî ne.

‘Işq û mehebbet her hebû Heq 'aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet jê we da (9/6)

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû di istiwayê lami'a 'işqê hebû (104/2)

Te‘alallah nîşan daye bi husnê ev neseq daye
Ji neqşê sen‘etê Heq ev nîşançeşm ev nîşanebrû (108/5)

Lat sûretek Heq e ji esmayên heqqanî
Li bal min muheqqeq e di nêv keşfa subhanî

---

[90] Karagöz, h.b., r. 126

Lahût e her mutleq e di nasûta însanî (132/37)

Heq dizanit ku şevan şubhetê abên di rewan
Me bi dil zarî û kalîn e heta subhegehê (110/7)

'Alem bi 'alem ew neseq bû ayîne esmayê Heq
Nûra tecellaya teteq 'eksê cemalek sade da (9/18)

#### 1.1.2.1.12. Es-Subhan

Ev nav ji koka “s-b-h”yê tê. Sifetê Xwûdê “es-Subbûh” jî di wateya “Subhan”ê de tê bikaranîn. Subbûh, tê wateya ewê zêde tê tesbîhkirinê. Çi candar çi bêcan hemû tişt, bi lîsanê halî û qalî, Xwûda tesbîh dikin.[91] Ji ber vê yekê Xwûda bi vî sifetî ve hatiye wesifandin.[92] Ev nav bi gelemperî wek “subhanellah”ê tê bikaranîn. Tê vê wateyê ku “Xwûda ji hemû qusûr û kêmasiyan berî ye”. Însan dema di te’eccûbmayînê de dimîne vî navî bi kar tîne.

Melayê Cizîrî sifetê “Subhan”ê, di van wateyan de bi kar aniye: Beyankirina te’ecûbmayînê ku ew sani’ekî ehsen e, hemû tişt mukemmel û bêqusûr çêkirine. Mela ji ber kirinên Xwûda ecêbmayîna xwe nîşan dide û weha dibêje: Xaliqê subhan nûra ‘eşqê avêtiye qelbê aşiqî. ‘Aşiq, ji ber wê ‘eşqê tê reqs û cezbeyê. Ew dildara ku weke rojê ronîdar e, tu kes nikare wesfên wê bide, lewra ew ji destê şahê qudretê çêbûye û ji kêmasiyan munezzeh e. Sipehîtiya Xwûda, ji mukemmeliya husn û cemalan dihête zanîn.

Subhan ji remza Xaliqî nûra sipêda sadiq î
Avête qelbê 'aşiqî lerzîn û ta û cezbe da (9/9)

Feryad û efxan sed keser wesfan neşêm lê ev qeder
Zanim ku roj bû hate der subhan ji şahê qudretê (125/1)

Subhan ji te şahê celal ustayê pur qudret li bal
Xasa te dayî ev cemal dêmê ji qudret xett û xal (125/2)

Ji vî teqwîmê însanî nezer dî sirrê subhanî
Fehaze’l-wechu min ecla berahînin we ayat (23/3)

---

[91] “Heft asîman û erd û yên ku li wan hene tesbîhê wî dikin. Tiştek nîne ku bi hemdê tesbîhê wî neke. Lêbelê hûn tesbîhê wan fehm nakin. Muheqqeq ew helîm û xefûr e (Sûretê Îsra, 17/44). (Şoşikî, b.n.b., c. 3, r. 516)
[92] Karagöz b.n.b., r. 136.

#### 1.1.2.1.13. El-Xellaq, El-Xaliq

El-Xaliq, el-Xellaq, tê van wateyan: "Ewê diafirîne, ji tunehîyê heyî dike, afirîner, Xwûda." Wek sifetê Xwûda tê van wateyan "ewê heyînan bênimûne diafirîne, afirîner, ewê heyî dike; ji tiştekî, tiştekî din îcat dike". "Xwûda afirînerê/Xaliqê hemû tiştan e (Sûretê Re'd, 13/16). Navê "el-Xellaq"ê mubalexeya navê el-Xaliq e û tê wateya ewê bi domdarî û bi şekleke mukemmel diafirîne.[93]

Şekl û sûretên eslî di meqameke bilind de hatine tezyîn kirin. Evên em dibînin, di tertîb û teqdîra Xwûda de weke siyên wan in.'Eqlê însên sînordarkirî ye, têra têgehijtina xuliqandin û hikmetên Xwûda nake. Dawîya tefekkûrê; teslîmbûn, heyretî û bêçaretî ye. Sondên mezin bi navê Xwûdê têne xwarin ku Xaliq, yarê heqîqî ye, 'aşiq di rêya wî de canfida ne û ew qenc û letîf e û layiqî her tiştî ye. Mukafat û xelata 'aşiqî ya herî giring jî ew e ku nûr û cemalê Xwûda, dê di cennetê de ji wan re bête nîşandan.

Ew şekl û sûret sewwirîn esl in li bala zeyyinîn
Nisbet bi wan em saye yîn tertîbê Xellaqî we da (9/17)

Yarê heqîqî Xaliq e çîn canfida da vêkevîn
Rast û durust û sadiq e çi reng bi şûna rê kevîn
Qenc û letîf û laiq e d'Baxê Îrem da vêkkevîn (132/15)

Heyret û 'ecz e serencami di babê nezerê
Key bi Xaliq nezerê qasirê mexlûqê resed (38/13)

Mey ku biçit saxerê hêj di destê dilberê
Sondê bi Xaliq xwurî roj e di Burca Hemel (73/2)

#### 1.1.2.1.14. El-Wahid, El-Ehed

Ev herdu nav di ayet û hedîsan de wek navên Xwûda derbas dibin. Wateya "Ehed"ê ya ferhengî "yek, yegane" ye. Wek sifetekî Xwûda tê van wateyan: Ewê hemkûfê wî û yekî weke wî tune ye, bê misil û bêmînak. Ewê ne cism, ne cewher û ne 'araz e, ewê cîhet û mekanê wî tunehî, ewê ji xusûsiyetên cîsmaniyê berî. Ehed ew e ku di zat, sifet û fî'lên xwe de ji cûz û perçeyan pêk nayê. "Wahid" yek e. Wek navê Xwûda, tê wateya ewê hemkûfê wî, nimûneyê wî, şirîkê wî tune ye; ewê nedabeşdar, di qedîmî û ezelîyetê de tekane ye.[94]

[93] Karagöz, h.b., r. 190-191.
[94] Karagöz, h.b., r. 107.

Ehed, wek sifet bi tenê ji bo Xwûda tê bikaranîn, Wahid hem ji bo sifetê Xwûda hem jî ji bo hinek sifetên heyînan tê bikaranîn. Melayê Cizîrî van nav û sifetan di van wateyan de bi kar tîne: Îşaretkirina yekîtiya Xwûda û bêşerîk û bêmîsaliya wî, beyankirina cudahiya di navbera "Wahid û Ehed"ê de.

Xwûda, heyînekî mutleq e û di hemû 'alem û heyînan de îşaret û remzên wî xwûya dikin. Sirrên wehdaniyeta Xwûda ji ezelê heta bi ebedê dorpêç kiriye, ew Wahid e, ji cuz û perçeyan pêk nayê, roja yekîtiya Xwudê hemû kaînat girtiye. Di meqama Semediyetê de cudahiya wahid û ehedê nîne, ev herdu nav di yekîtiya wî de weke hev in û wesfê heyîneke Wahid in. Mela di beytên xwe de vê heqîqetê weha beyan dike:

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed
Wahidek ferd e bi zatê xwe û nînin çu 'eded (38/1)

Ferq e wahid ji ehed lê di meqamê semedî
Bi heqîqet ku yek in herdu çi wahid çi ehed (38/3)

Afitaba ehediyyet di xwe da girtiye kewn
Ne ku 'ewrek heye lê girtiye çehvên me remed (38/5

Di hişmendiya ehlê sulûk û 'arifan de tenê ferqeke lefzî heye. Herçendê nav û sifetên Xwûda cuda cuda tecellî bikin jî, ew mevsûfên navê Xwûda ne û di heqîqetê de ji wahidiyeta wî derketine. "Di heqîqetê de mehbûb zatekî êkan e û ferd e û ew "wacibu'l-wucûd" e, tecelliyê di sifatên "mumkûnu'l-wucûd"ê de diket, li pêş perdeyê de li ser mehbûbên mecazî tecellî dike."[95]

Heyat bi min her wesl e du lat ger bibin latek
Murad bi xwe her esl e têk da bibne sifatek
Ji hev êk nîne fesl e Wahid bimînit zatek (132/35)

Wahidi zatek ferd e tecella d'wan sîfatan
Li eynê dil nezer da li cimley te'yînatan
Tewehhum bûye perde bi ismê but û latan (132/36)

Xwûda, neqşên xwe bi navê xwe yê Semed û Wahid, li ser lewha ehediyetê/yekîtiyê ku tecelliya cemalê wî nîşan dide, reşandiye. Hem 'alem hem jî rûyê yarê wek lewheyeke ji aliyê destxetên katibê ezelî ve hatine neqişandin. Dema ku Xwûda xwestiye xezîneya veşartî eşkere bike, nûra Ehmedî xuliqandiye û mîma di

[95] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r.398-399.

navê Ehmed (Hz. Muhemmed) de, weke roja tenhayiya Xwûdê kifşe bûye. Di destpêka xuliqandinê de ‘eşq û evîn unsûrên muharrîk in û Wahid ji nûra xwe ‘eşq (mey, cam, peymane) jî daye însên ku di navbera wan de muhebbet peyda bibe ku dîsa ber bi heqîqeta xwe ve vegerin.

Ew destxetên katib Semed Wahid li ser lewha Ehed
Neqşek reşandî bê'eded ce'da cemalê şane da (9/52)

Mim metle’ê şemsa ehed ayîne sifet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê "Ecem da (1/3)

Wahid ji nûra wê durrê peymaneyê cama surê
Mey xistî anî ber firê hem cam û hem peymane da (9/67)

#### 1.1.2.1.15. El-Wedûd

Ev nav tê wateya “hezjêkirin, temennî û arezûkirinê.” Ji koka “w-d-d”yê tê û mubalexeya ismê fa’îlî yê “wedd”ê ye. Wek sifetê Xwûda tê wateya ku ew Xwûdayê zêde hez ji ‘evdên xwe yên mu’min dike, ji ber ‘emelê qenc ji wan razî dibe, ihsanê digel wan dike û pesnê wan dide.[96]

Xwûda ji comerdiya xwe ihsan û ikramê li ‘evdên xwe dike. Xuliqandina însên ya ji tunehiyê, ikrameke gelek hêja ye ji bo însên. Dema behra comerdiya Xwûda coş û xurûş bûye, heyîn, di ayîneya navê wî yê Wedûd de tecellî bûne. Heyînên ji xeyrî Xwûda, hemû tecelliyên nûra heqîqetê ne û wî nûr li ser wucûdan wek tecelliyê vedaye.

Coşiş ku da deryayê cûd d'ayîneya ismê Wedûd
Carek tecella bû wucûd nûrek ji nûrê jê veda (9/55)

#### 1.1.2.1.16. El-Hakîm

“El-Hakîm” ji koka “h-k-m”ê tê. El-Hakîm, tê wateya “ewê hukûm dike, biryarê dide, zulmê berteref dike, dadwer, ewê heq û neheqiyê ji hev cuda dike”.[97]

Ev sifetê Xwûda, derbarê hukûmranî û ‘edaleta wî de tê beyankirin. Kesê ku pişta xwe bide “Hakîm” guh nadete gotinên reqîban, lewra ew kesê bi îmaneke muhkem xwe teslîmî Rebbê xwe bike, ji hemû tiştan ewle û emîn dibe. Ewê şah e,

[96] Karagöz, b.n.b., r. 340.
[97] Karagöz, h.b., r. 242-243.

hakim û muxtarê hemû tiştan e, daxwaza wan kesên bêçare tîne cih û wan heyîrî nahêle.

Yar dê hakim bitin qewlê reqiban guh nekit
Şahê mulkê dilberê dê fa'ilek muxtarî bit (19/14)

Guh bide ber gilh û dadan hakimê şehr û bîladan
Dê tu daxwaz û muradan dî kesê bêçare ye (97/44)

#### 1.1.2.1.17. El-Hekîm

El-Hekîm" ji koka "h-k-m"ê tê. "El-Hekîm" di Qur'anê de di 97 ayetan de derbas dibe. El-Hekîm tê van wateyan: "Ewê xweyî hîkmet, alim, hakîm, ewê pêşî li xeletiyan digire, bijişk". "Hekîm", wek sifetê Xwûda, tê van wateyan: Ew Xwûdayê her kar, hukûm, emir û nehiyên xwe, bi hikmetê, rast û îsabetkar çêdike; ewê afirîdeyên xwe mukemmel û saxlem dixuliqîne û wan baş nas dike."[98]

Xwûda, di her kar û hukmê xwe de pirhikmet û şareza ye. Di teqwîma qedîm de hukmê xwe yê pirhikmet neqiş kiriye û ew Xwûdayê ku hukmê wî tejî hikmet in û hekîmê şîfabexş e, ji ezel ve qedehek badeya 'eşqê daye însên, heta hetayî ewê wê binoş in û birînên xwe pê kew bigirin.

Yek jê ji teqwîma qedîm lê bû neseq hukmê Hekîm
Avête wê lewhê reqîm ew 'alema sufliyye da (9/114)

Qedehek bade ji 'işqê di ezel da me Hekîmî
Jê dinoşîn heyûhey hê bi xwe cama me lebaleb (14/7)

Sifetê Xwûda "el-Hekîm" wek şîfabexşê, di însên de jî tecellî dibe. Bi tedbîra hekîm (kîmyagerê şareza[99]), herî û kevir dibin zêr û Xwûda bi ismê xwe yê şafî hikmeta hekîmtiyê daye Hekîmê Loqman ku derdan derman dike.

Her gil û seng dibin zêr bi tedbîrê hekîm
Qabilîyyet ku nebit hikmetê ustadî çi ket (22/5)

Dil nefes dîsa bi ber hat lew hekîm Luqman bi ser hat
Nafi'ê derdê ceger hat tali'ê kewkeb numa ye (96/3)

---

98 Karagöz, h.b., r. 243-244.
99 Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 191.

#### 1.1.2.1.18. El-Me’bûd, El-Ewwel, El-Axîr, El-Zahîr, El-Batin

El-Me’bûd; tê wateya Xwûda, îlah, ewê ‘îbadet jê re tê kirinê. Ev nav, di ayetên derbarê esmayê husnayê de derbas nabe. Di hinek ayetan de (Sureya Alê Îmran, 3/51; Beqere, 2/21; Nîsa, 4/36) tê gotin ku Xwûda, Rebbê ‘alemê ye û ji wî re îbadetê bikin. Ji ber vê wateyê, ev nav hatiye beyankirin.[100]

El-Ewwel, heyîna ewil e, hêj tiştek tunehî ew hebûye. Xwûda qedîm û ezelî ye. “Ew ewwel e, ew axir e (Sûretê Hedîd, 57/3).” Sifetê zatî yê Xwûda “qidem” raciyê vî navî ye. Ewwel, tê wateya qedîmbûn û ezeliyê. El-Axîr, ew e ku herûher dimîne. Her tişt dê helak û tune bibe, lê wechê Xwûda herûhey dê baqî bimîne,[101] axiriya wê tune ye. Ewên hatî xuliqandin ji wan re ewelî û axirî heye, dê rojekê hemû tune bibin, lêbelê ji zatê Xwûda re ewelî û axirî tune. Ew her hebûye û dê her hebe jî. Sifetê zatî yê Xwûda “beqa” raciyê vî navî ye. Axir, tê wateya baqîbûn û ebedîbûnê.[102]

Ez-Zahîr, ji koka “z-h-r”yê tê û wateyên wê ev in: Tiştê nepenî aşîkar bibe, aşîkarbûn, xalibbûn, waqifbûn û naîlbûna tiştekî. Zahir; vekirî, wazih û aşîkar e. Wek sifetê Xwûda “ez-Zahir”, tê van wateyan ku ew Xwûdayê heyîna wî ji hemû tiştî re aşîkar, xalibê her tiştî, ji hemû tiştî mezintir. Xwûda bi fî’ilên xwe zahir e, aşîkar e, tê zanîn û înkariya wî ne mimkin e. Hemû tişt delaletî heyîna wî dikin, lêbelê ‘eqlê însên têra waqifbûna zatê wî nake. El-Batin, ji koka “b-t-n”ê tê. Wateya wî; nepenîbûn û zanîna tiştên hindirî ye. Batin, tişta xef û neaşîkar e. Wek sifetê Xwûda “el-Batin”, ew e ku tiştê ku heqîqet û mahiyeta wî, bi ‘eqlî nayê îdraqkirin. Tiştê ku nayê xeyal û teheyyûlê, ewê bi hestan nayê hîskirin û xefî, ewê sirrên hindirî dizane û waqifê wan e û nêzikî her tiştî ye.[103]

Ev nav û sifetên di xala jor de hatî beyankirin, derbarê naskirina zatê Xwûda de têne bikaranîn û wateya wan bi hev ve girêdayî ye û Melayê Cizîrî jî, ew hemû nav di vê beyta jêr de bi kar anîne.

Huwe’l-ewwel huwe’l-axir huwe’z-zahir huwe’l-batin
Huwe’l-Me‘bûdu we’l-Meşhûdu fî kulli’l-huwiyyat (23/15)

---

[100] Karagöz, b.n.b., r. 62.
[101] “Ji xeyrî zatê wî her tişt tê helak bibe.” (Sûreya Qessas, 28/88)
[102] Karagöz, b.n.b., r. 127.
[103] Karagöz, h.b., r. 128-129.

Di tesewwûfê de mevhûma “wehdetê wucûd”ê ji aliyê Zahirî û Batiniyê ve hatiye nîqaşkirin. Muhyîddîn Erebî dibêje, tu tişt xweyî wucûdekî heqîqî nîne. Alem bi wucûda Heq heyî bûye. ‘Eyn û tiştên di alemê de, bi xusûsiyetên xwe ve hene. Ev tişt masîwa ne û tiştên ji xeyrî Xwûda ne û wucûd ya Heqq e. Tiştên ku em di alemê de dibînin bi serê xwe xweyî heyînekê nînin. Bi saya wucûda Heqq ew heyî dibin. Wucûda ku ji alemê re tê atifkirin mecazî ye, di heqîqetê de tiştek wisa tune. Ew tiştê ku em dibînin alem nîne, wucûda Heqq e ku Zahir û Batin e, ji xwe tu tişt ji xeyrî wî xweyî hebûneke dîtbar nîne. Ewên em dibînin ne ji aliyê Batinî ve ji aliyê Zahirî ve Heqq e. Bi van gotinên xwe re vê ayetê “Ew ewwel e, ew axir e, ew Zahir e, ew Batin e.” (Sûretê Hedîd, 57/3) nîşan dide. Heqq, di alemê de ku cihê mezherê ye, bi navê xwe yê Zahir tê wucûdê. Ji ber wateya navê xwe yê Batinî, Heqq, xwe wek Batin nîşan nade, lewra Batin nayête têgihiştin û nayête zanîn.[104]

Bi goreyî mefhûma wehdetê wucûdê, tecelliya Xwûda, di her mewcûdekî de xwe nîşan dide. Çawa ku hêj tu tiştek nehatî afirandin, ew hem aşiq û hem me’şûq bûye; zahir, mezher, ruh û gewher jî dîsa her ew e.

'Aşiq ew e me’şûq ew e zahir ew e mezher ew e
Rûh her ew e gewher ew e d'her şahidek da şu’le da (9/13)

#### 1.1.2.1.19. El-Mewcûd, El-Meşhûd

Sifetê “el-mewcûd”ê di nav esmayê hûsnayê de tune. Di tesewwifê de biwêjek heye ku dibêjin “la mewcûde îlla hû”, derbarê wehdetu’l-wucûdê de gotineke giring e. Ev Sifet, derbarê zatê Xwûda de tê beyankirin û bi sifetê wî “el-Heyy”ê re têkildar e. Navê “el-Heyy”ê tê wateya zindî, jîndar, bêmirin, ezelî û ebediyê û Xwûda, bi hemû sifetên xwe ve mewcûd e û ew mihtacî tiştekî nîne, fa’ilekî mixtar e û heyînekî mutleq e. Ji ber vê yekê jî mutesewwifan ji bilî heyîna wî, heyîna tiştekî din qebûl nekirine û “la mewcûde îlla hû” gotine. “Wirda herî mûhim ya murîdan, zikr e. Di wextê wirdkêşanê de dema murîd hate mertebeya sulûka mûntehiyê (sulûka zikrê ya dawî), bi mewcûdî pêwîst e “la mewcûde îlla hû”yê mûlaheze bike.”[105]

---

[104] Chittick, *Hayal Alemleri, Îbn Arabî ve Dinlerin Çeşililiği Meselesi,* (Wer. Mehmet Demirkaya), Kaknüs Yayınları, İstanbul 2016, r. 34-35.
[105] Zafer Erginli ûym., *Metinlerle Tasavvuf Terimleri Sözlüğü,* Kalem Yayınevi, İstanbul 2006, r. 1217.

El-Meşhûd; tê wateya yê tê dîtin, yê ku tê muşahadekirinê.[106] “Wel-Meşhûd” payeya “fenaya mutleq” û “wehdetû’l-wucûd”ê ye.[107] Sifetê “el-meşhûd”ê jî di nav esmayê hûsnayê de tune, di lîteratûra tesewwifê de cihê xwe girtiye. Li ber heyîna mutleq ya Xwûda, heyîna tiştên din ne tiştek e û yê tê dîtin herûher ew e. “Huwe’l-mewcûd we’l-meşhûdu”, mezhebê Cizîrî di hebûnê de aşkere dike ku yekîtiya hebûnê ye (wehdetu’l-wucûd).[108]

Melayê Cizîrî jî, bal kêşandiye ser heqîqeta “wehdetu’l-wucûd”ê û şanê Xwûda yê bilind wesifandiye. Yê ku di herdu dinyayan de herûher heyî/mewcûd û tê dîtin/meşhûd Xwûda ye. Çawa ku ewwel û axir, zahir û batin her ew e; yê ku ‘îbadet jê re bê kirin her ew e û yê ku di her tiştî de xuya dike (wehdetu’ş- şuhûd) ew e. Ew li her derê, di her rastiyê de ye, bi tenê her ew tê dîtin.

Mela her wî bibîn her wî eger her wî dinasî tu
Huwe’l-mewcûd we’l-meşhûdu bel la xayre fî’d-dareyn (85/7)

Huwe’l-ewwel huwe’l-axir huwe’z-zahir huwe’l-batin
Huwe’l-Me‘bûdu we’l-*Meşhûdu* fî kulli’l-huwiyyat (23/15)

#### 1.1.2.1.20. El-Qeyyûm, Ed-Deyyûm

El- Qeyyûm, tê wateya “ewê her tiştî diparêze û li bal xwe digire”.[109] Wek sifetê Xwûda, wateya wê ev e: Ewê zewal nabe, her daîm qaîm, ewê ewweliyet û destpêka wî tunehî û bi zatê xwe qaîm e. Ewê afirîdeyên xwe, bi dilê xwe îdare dike û rizqê wan, hewcedariyên wan û muhafezekirina wan girtiye bin mesûliyeta xwe. El-Qeyyûm, ewê bi zatê xwe qaîm, ewê ezelî û ebedî, ewê hebûna her tiştî bi wî ve girêdayî ye.[110]

Ed-Deyyûm, şeklê mubalexeyî yê peyva “dewam”ê ye. “Ed-Daîm”, wek sifetê Xwûdê tê wateya “ewê herheyî, ewê mirin jê re tunehî tune û baqî ye”. Ev sifet bi sifetê “el-Baqî”yê re hemwate ye.[111] “Deyyûmî berdewamkariya pir ya ezelîtî û ebedîtiyê ye û qeyyûmî jî, hildan û parastina pir e ji ber û paşê ve.”[112]

---

[106] Ethem Cebecioğlu, *Meşhûd”, Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Otto Yayınları, Ankara 2020, r. 333.
[107] Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., c. 2, r. 12.
[108] Tehsîn Îbrahîm Doskî ,b.n.b., c. 3, r. 189.
[109] Cebecioğlu, b.n.b., r. 275-276.
[110] Karagöz, b.n.b., r. 105, 125.
[111] Karagöz, h.b., r. 130.
[112] Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., c. 2, r. 296.

Melayê Cizîrî “el-Qeyyûmî û ed-Deyyûm” di wateya ewê herbûyî û herhebûyî de bi kar aniye. Însan bibe laşey, (bigehije mertebeya fenafîllahê) êdî waqifê sirrên Qeyyûmê ezelî û ebedî dibe. Ew Xwûdayê ku herdem heye û dê hertim hebe, li bal wî ezel û ebed yek dem in.

Ji la şey’î ji me‘dûmî me nasî sirrê qeyyûmî
Sucûdî fî turabi’l-mehwî min ‘ele’l-meqamat (23/16)

Ezel ‘eynê ebed yek an e qeyyûmî û deyyûmî
Tenezzul tête tefsîlê bi anat û we ewqat (23/22)

### 1.1.2.1.21. El-Barî

El-Barî, wek sifetê Xwûda, tê wateya “ewê ku dixuliqîne, bênimûne heyînan îcad dike”.[113]

Melayê Cizîrî, navê “el-Barî” di sê cihan de bi kar aniye û ew nav, temsîliyeta navê Xwûdê dike. Melayê Cizîrî, bi vî navî îşaretê bi bereketa Xwûda, hînkirina Hz. Ademî bi esmayan û xwesipartin û parêziya wî dike.

Her seher dihnêrim ez cana bi ahan ra ji dil
Bareke’l-Barî bi is‘adin ‘eleyha yewme ‘îd[114] (39/2)

Barî ji we ‘ellem ku xeberdar kirîn
Îro tu bizan Ademê esma yim ez (49/2)

Dil û can herdu me danê ku îcazet ji me xwest
Qultu estewdi‘uke’l-Bariye Ellahu me‘ek (68/3)[115]

### 1.1.2.1.22. Er-Rehman

Er-Rehman, ji koka “r-h-m”yê darijiye û navekî mubalexeyî ye. Tê wateya “ewê zehf merhametkar e, dewamî merhametê dike û zehf nî’metan dide. Sifetê Xwûda “Rehman” ji sifetê “Rehîm”ê berfirehtir e. Xwûda bi sifetê xwe yê “Rehman” ji hemû mehlûqatên xwe re merhametê dike. “Merhameta wî, hemû tişt dorpêç kiriye (E‘raf, 7/156).[116] Er-Rehman, ji ber firehiya qewareya xwe ku hemû mexlûqan di nav xwe de dihewîne, hemwateyê navê Ellah e. Navên Ellah û Rehman; bi goreyî hemû

[113] Karagöz, b.n.b., r. 193.
[114] Wate: Xwedayê Barî, bereketa xwe bide û wê bextewar bikedi roja cejnê de.
[115] Wate: Ez te disipêrim Xwûdê û te teslîmî wî dikim ku te biparêze.
[116] Karagöz, b.n.b., r. 326-327.

navên Xwûda yên din, xwediyên mertebeyên îhata û kemalê ne. Rehman, heyînan diafirîne; Rahîm jî mertebeyan kifş dike.[117]

Melayê Cizîrî, navê “er-Rehman” bi îsnada navê Xwûda bi kar aniye. Ew, armanca jiyana xwe beyan dike ku di herdu dinyayan de (dinya û axiret) armanca xwestina dîtina cemalan ew e ku tecelliyên Rehman mêze bike, mezinahiya sen’etê Rehman bibîne ku daxwaza dilê wî bi cih bê.

Wellah ji herdu 'aleman min husnê canan e xered
Lew min ji husna dilberan her sun'ê Rehman e xered (58/1)

### 1.1.2.1.23. El-Cebbar

El-Cebbar, wek sifetê Xwûda, di van wateyan de tê bikaranîn: “Ewê mexlûqatên xwe mecbûrî hinek tiştan dike (nexweşî, mirin, ji nû ve vejandin û hwd.), ewê asî û ji serxweçûyan qehr dike, ewê emr û nehyên xwe li ‘evdên xwe dikare bidete kirin, xalib, qehhar, ewê ji derdan re dermanê dide, tiştê şikestî diselihîne, ewê rizqê dide feqîran, ewê karê mexlûqan sererast dike û dixe pergalê.”[118]

Melayê Cizîrî vî sifetê Xwûda, di beyankirina mezinahî û qudreta Xwûda ya sen’etkarane ku di rûyê însên de tecellî bûye bi kar aniye. Neqş û sun'ê Cebbarî di turre û xemriyên yarê de xwe nîşan dide. Xettên Cebbarî yên li rûyê yarê ku weke durran in, tu kesî yên wesa nedîtine, ebrûyên yarê yên weke kemanê bi cedwela Cebbarî hatine kêşan.

Ji neqş û sun'ê Cebbarî muterra turreya tarî
Li nûrê miskê Tatarî li ser wan xemriyan berde (92/14)

Belgên gula reyhanîyê katib numûçek daniyê
Kes dî bi vê şîraniyê durd sifet Cebbarê xet (59/6)

Di dest da yengiyek nûbari min dî ew keman ebrû
Li bala cedwelek Cebbarî tê da hemqeran ebrû (108/1)

Navê el-Cebbar, nîşanî bi tecellî û qudreta Xwûda dike. Nûra Xwûda bi cebrî, tesîrê li ser ‘alemê û li însên dike ku ew nûr nebe, mewcûdat xwûya nake. Mûsa pêxember, ew agir/nûr li çiyayê Tûrê dîtiye û ji hişê xwe çûye. Ji ber ‘eşqa muhr û

[117] Suad el Hakîm, *İbnü’l Arabî Sözlüğü*, (Wer.. Ekrem Demirli), Alfa Yayınları, İstanbul, 2017, r. 411
[118] El-İsfahanî, b.n.b., r. 203-206; Karagöz, h.b., r. 166

neqşê Cebbarî, qefesa teyrê dilê ‘aşiqî jî, ji ber tecelliyan rohnî dibe û nefesên wî jî dibine êgir.

Ji wê nûrê ji wî narî me Mûsayî qebes îsa
Bi rojê rast û çep tarî bi teyrê dil qefes îsa
Bi muhra neqşê Cebbarî ji êgir min nefes îsa (131/21)

**1.1.2.1.24. Es-Subbûh**

Es-Subbûh, navekî Xwûda Te’ala ye. Ji koka “s-b-h”yê tê û derbarê tesbîhkirina Xwûda de tê ‘emilandin. Di nav peyvên ‘erebî de, ji navên Xwûda, bi tenê “subbûh û quddûs” ji wezna “fu’ûl”ê hatine.[119] Subbûh di wateya “ewê ji hemû xirabiyan, kêmasiyan, ‘acizî û ‘eyban dûr” de ye. Peyva “subbûh”ê wek sifetê Xwûdê, di Qur’ana Pîroz û di hedîseke Muslîm de derbas dibe. Bi goreyî Qur’anê her tişt hemd û tesbîhî Xwûda dikin û lêbelê însan tesbîhê wan fahm nakin (Sûreya Îsra 17/44) û ev nav, di hedîsê de jî, di wateya “ewê zehf tê tesbîhkirin” de hatiye bikaranîn.[120]

Es-Subbûh, di helbestên Melayê Cizîrî de, di van wateyan de hatiye bikaranîn: Ji kêmasiyan paqijbûna wî û mukemmel çêkirina wî. Xwûda xwest xezîneya veşartî bête dîtin, ewilî lewh û qelem afirand û paşê jî ji bo têgihiştin û hîskirinê ‘eql û ruh xiste bedena însên. Dema meya ‘eşqê rêhtiye cama ‘eql û ruhê, her der weke rojê rohnî bûye û xezîneyên husn û cemalê yên veşartî hatine xwûyakirin.

Wesf û kemalatên Subûh herfên kîtaba 'eql û rûh
Ismek divê lê bin wuzûh lew lewh û kilk û xame da (9/73)

Ev reng tecella kir Subbûh saqî ji şehkasa futûh
Mey rêhte cama 'eql û rûh roj bû di qewsê qubbe da (9/80)

Afirîde her daîm bi lîsanê halî û qalî, Xwûda diwesifînin. Bi taybetî di semawatê de hinek melek hene ji wan re subbûhî tê gotin û ew her daîm di rukû’ê û di sicûdê de nin û tesbîhî Xwûda dikin. Ji xeyrê mewcûdatan tesbîhkirina însên giring e. Ji bo xilasbûna wî teslîmbûneke qewî pêwîst e. Muhebbet xwe di dilê însên de nîşan dide û ji ber nûra munezzeh ku di dil de peyda dibe, ‘aşiq bi dil û can xwe teslîmî Subbûh dike. Birîn, cezbe, lerzîn û tayên di ‘aşiqî de peyda dibin, ji ber ‘eşqa samîmî ye.

Herkesê muhbet ji rûh e mubtela’y nûra Subbûh e

---

119 El-İsfahanî, h.b., r. 448-450.
120 Karagöz, b.n.b., r. 136.

Wî di dil da sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye (95/25)

#### 1.1.2.1.25. Es-Sanî’

Es-Sanî’, ew sen’etkar e ku çêdike û îcad dike. Es-Sanî’ beyan dike ku Xwûda afirîner e, her tişt sipehî, saxlem û muhkem çêkiriye. Ev nav, bi navên “fa’îl, xaliq û mesewwîr” re hemwate ye.[121]

Xwûda, Sani’ê Qadir e. Qudreta wî digehije ku her tiştî bi sen’etî çêbike. Selama bi navê Sani’ bête dayîn bi xwe re xêr, bereket û kêfxweşiyan jî tîne, lewra ew sipehî ye û tiştên ewî xuliqandî jî sipehî û cazîbedar in.

Selama Sani'ê Qadir Mela da pê mu'etter bî
Muferreh bit me lê xatir peyapey lê mukerrer bî
Ji cama xatirê ‘atir me jê ayînê enwer bî (131/2)

#### 1.1.2.1.26. El-Qadîr

“El-Qadîr”, wek sifetê Xwûda tê wateya “ewê hêzdar, bi quwwet, her çi bivê bi goreyî xwe dike, ewê eşyayan dişeklîne û ‘acizî jê re tune ye”. Ev sifet, ji bo nefiykirina ‘aciziya Xwûda tê bikaranîn, lewra “bi rastî, quwweta Xwûda têra her tiştî dike (Beqere, 2/20).[122]

Ev sifet hem ji bo Xwûda hem jî, ji bo ‘evdan tê bikaranîn. Bi vî sifetî dema însan hate wesifandin, quwweta wî ku dikare tiştekî bike, beyan dike; lêbelê qudret, hêz û quwweta mutleq ya Xwûda ye. Sirra hikmetên Xwûda bêdawî ye, herçendê bi sed cihan belav bibin jî dîsa ‘arifekî şareza tune ku wan bi temamî fahm bike. Ev sifet, rasterast îşaretî navê Xwûda dike ku ew qadirê hemû tiştan e, çi bivê, dikare bike.

Ney bestê tilismê me bi sed xane birit
Qadir heye 'arif bikirit teqrîrê (118/8)

Selama sani'ê Qadir Mela da pê mu'etter bî
Muferreh bit me lê xatir peyapey lê mukerrer bî (131/2)

Di helbestên Melayê Cizîrî de ji “el-Qadîr” zêdetir, peyva “Qudret”ê hatiye bikaranîn ku ev jî îşaretê bi navê “el-Qadir” dike. Di helbestên Melayê Cizîrî de “qudret” di van wateyan de hatiye bikaranîn: “Şiyan, karîbûn û qudreta ezelî ya Xwûda û ew Xwûdayê ku quwweta wî têra her tiştî dike, malik û hakimê her tiştê ye.” Peyva

[121] Karagöz, h.b., r. 214-215.
[122] El-İsfahanî, b.n.b., r. 775-778.

qudretê ya îşaretê bi navê “el-Qadir” dike, wek ravekên “kenza qudretê, qewsê qudret, wesfê qudretê, herfên ji qudret, nura ji qudretê” hatiye bikaranîn.

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû di istiwayê lami'a 'işqê hebû (104/2)

Birhên te qewsê qudret nîşane kir Nîşanî
Lami‘ ji ber dibarin çi yengîyek weh perweş (53/14)

Bê nûr û narê muhbetê bêneqş û wesfê qudretê
Naçîn meqamê wesletê nûrun lena we'l-leylu dac (31/4)

Canê Melê ruha Melê nura ji qudret nuqte lê
Remzek nihîn da min welê nalî ji ber wek nay û def (64/11)

Husn û sura sûretê ser didirit qudretê
Lew di esil dûr ejê te’neyê lemma efel (73/5)

Xwûda, şekl û pergal daye hemû tiştên xuliqandî û muqedderata wan (maharet, taybetî û wezîfe) te’yîn kiriye. Teqdîr; qiymet û hêjaya ku Xwûda daye her tiştî, di wan de tê dîtin. Qudreta îlahî, miqdarê her tiştî kifşe kiriye. Xwûda, ji heyînan re pîvan danîne. Qeder, ango sînor û pîvanên Xwûda kifşe kirî, ji bilî qudreta wî nayêne veguhartin. Bi gelemperî qudreta Xwûda herî mukemmel xwe di însên de dide pêş. Nexşên li ser lewheya rûyê yarê, weke kitêbeke neqişandî hatine tezyînkirin. Ew unsûr, ancax ku ji kahniya sermedî herikîbin dikarin ew qas tesîrdar bibin.

Nûra ji qudret lê du nûn jê ra du nûn in erxewan
Wer ayeta ‘işqê bixwûn xweşnusxeyek mestûr e dil (74/5)

Cebhet û dêmê ji qudret lê nivîsî herf herf
Kakulan ta ta li ser herfan kişandî lam lam (77/7)

Birhên te ji qudret ku numan goşeyê î‘caz
Peyweste kemanan ji guhan goşe gehandin (81/4)

Sayenumayê cebhetê neqş û xetê ji qudretê
Nuqte û herf û cezbe tê bal û perên humayê zulf (63/2)

#### 1.1.2.1.27. El-Celal

El-Celal, ji koka “c-l-l”yê tê û tê wateya “ewê mezin, xweyî astekî bilind, hêzdar û munezzehbûn”. Bi Qur’anê sabît e ku (Sûreya Rehman, 55/27, 78) ji esmayê

husnayê ye. Wek sifetê Xwûda; ‘ezemet, heşmet, qedr û mezinahîya şanê wî beyan dike.[123]

Melayê Cizîrî, navê “el-Celal”, ji bo mezinahî û ‘ezameta wî bi kar aniye. Unsûrên sipehîtahiya Celal, harîkulade ye û ji wesifkirina wan re ‘eqlê însanê kêrdar nîne. Herfên wek neqşan ên li ser rûyê yarê celal û ‘ezemeta Xwûda nîşan didin.

Dêmê bi xal ew nûn û dal ismê Celal bejna şepal
Yekta elif nayê wesif min 'eqlê tiflê mekteb e (100/7)

Subhan ji te şahê celal ustayê pur qudret li bal
Xasa te dayî ev cemal dêmê ji qudret xett û xal (125/2)

Bejna şepal dêmê bi xal î'rab û dal qewsê hilal
Neqşê celal cama zelal xemra helal suhbet bi hal
Ez telbeya aba heyatê bûm teya ku j'badeya
Cama xweyabû 'işweya yar lew peyapey tên sebeq (67/6)

Di rêya silûkê û meqamatê terîqetê de rêyên salikan cure cure ne, hinek bi navê Celal hinek bi navê Cemal, di wî rêyê de dimeşin. Gehiştina mehbûbê bi ‘eşqê çêdibe. Hinek însan ji ber mezinahî û ‘ezemeta navê Celal teslîmî Xwûda dibin û di rêya wî de dimeşin û hinek jî bi navê Cemal, ji ber husn û cemalê Xwûda bengiyê rêya wî dibin. Armanca herdu cure însanan jî, weke hev in.

Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr
Hin celal û hin cemal û sermeyan ev bade bû (104/10)

#### 1.1.2.1.28. El-Celîl

El-Celîl, ji peyva “celal”ê darijiye (ji koka “c-l-l” yê) û sifetekî Xwûda yê zatî ye. El-Celîl wek sifetê Xwûda tê wateya ewê xweyî ‘ezemet û mezinahiyê ye. Ev nav, muttasifê sifetên weke “dewlemend, malîk, alim û qadîr” e. Bi Qur’anê sabît e ku (Sûreya Rehman, 55/27, 78) ji esmayê husnayê ye.[124]

Ehlên meqamatê terîqê û ehlê seyr û sulûkê, dema nezerê didene husn û cemalê Xwûda, dibînin ku ew cemal di neynika wî ya Celîl û ‘ezemet de tê xwûyakirin.

Min nezerek husn û cemalê te kir
Ayineyek dî me ji nûra *Celîl* (72/2)

[123] Karagöz, b.n.b., r. 176.
[124] Karagöz, h.b., r. 176; Sadreddîn Konevî, *Esma-i Hüsna Şerhi*, (Wer. Ekrem Demirli), İz Yayıncılık, İstanbul, 2013, r. 133; El-İsfahanî, h.b., r. 221.

#### 1.1.2.1.29. Eş-Şafî’

Ev nav ji koka “ş-f-y”yê (şîfadayîn, saxkirina nexweşiyan, şîfa xwestin) tê û tê wateya “yê şîfayê dide”. Ev nav di hedîsan de cih digire. Di Qur’anê de bi lêkera “yeşfî”yê[125] îşaretî vî navî tê kirin. Eş-Şafî, ew Xwûda ye ku şîfa û sihhetê dide, nexweşiyên maddî û me’newî baş dike, ferahî û rehetiyê dide.[126]

Ji birhên yarê yên weke qews û kevanan, tîr û xedeng bibarin û dilê aşiqî birîndar bikin jî, şafiyê derdan ew e, dê birînên ‘aşiqî dîsa bikewîne û sax bike; ji bo şifayê, hewceyî nivîştan nîne.

Te ji wan qews û kevanan çi xedeng in te bi weş tê
Ew e hem şafiyê derdan te çi hacet bi niviştê (122/2)

#### 1.1.2.1.30. Et-Tebîb

Et-Tebîb, tê wateya “ewê karên xwe herî baş dike, bi her tiştê baş dizane, mahîr, hukûmdar, şîfadarê derdên maddî û me’newî”. Ev nav di hedîsekê de derbas dibe.[127]

Tebîb, Xwûda ye. Şîfa li bal wî ye, yên din di navberê de wasite ne. Tebîb, murada dilan bi cih tîne û dilan dikewîne. Herçendê ‘eşq derdeke bêderman/bêtebîb xwûya bike jî, wesla hebîbê, îlacê ‘aşiqî ye.

Îro ji murada te dilê min bi birîn e
Ellah çi hebîb î çi tebîb î vekewîne (101/1)

'Işqi derdek bê tebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

#### 1.1.2.1.31. El-Heyy

El-Heyy, ji koka “h-y-y”yê darijiye ku tê wateya “zindî” û “jîndar”. Wek sifetê Xwûda “el-Heyy”, tê wateya “ew Xwûdayê jîndar, ewê herheyî, baqî, ebedî û daîmî”yê.[128]

Melayê Cizîrî, ev nav bi wateya “ew Xwûdayê ku her dem zindî ye” bi kar aniye. Rûhê evîndar û yê dilberê, ji nûra Xwûda derketine. ‘Aşiq û me’şûq, ji dava

---

125 Sureyê Şu’ara, 26/80
126 Karagöz, b.n.b., r. 275.
127 “Tebîb; Xwûda ye, tu şexsekî dost î. Kî tu afirandi, tebîb ew e.” (Ebû Dawûd, Tereccûl. 18, No: 4207, veg. ji Karagöz, b.n.b., r. 276)
128 Karagöz, b.n.b., r. 123.

‘eşqê re dane ne. Davketina wan tiştekî erênî ye, lewra eger ew bikevine tora ‘eşqa îlahî dê baqî bibin. Bi ‘eşqa îlahî însan zindî dibe.

Herdu rûh yek nûr û tav in çerxek û du stêr di nav in
Herdu dane murx û dav in ismê Heyy dav lê veda ye (95/26)

Di derbarê jiyanê de gelek esrar û tilism hene. Amûra muzîkê ney, wek temsîliyeta însên gelek hîkayetan dibêje. Kesê meya ‘eşqê bi navê “Heyy” vexwe, dê deriyê raz û tilisman jê re bête vekirin.

Şimşadi xeramî ku di camê mey da
Cama ji şerabê bi gulabê hey da
Sed hatine qurban û mutriban ney da
Dor hate tilismê mey bi ismê Heyy da (130/2)

**1.1.2.1.32. Eş-Şahîd**

Ev nav ji koka “ş-h-d”yê darijiye û tê wateya şahidbûnê, xeber dayînê, zanîn, danezanîn, îdraqkirin, dîtina bi çav û besîretê, bi fî’l û gotinên xwe delîlbûnê. “Eş-Şehîd” (cem’a wî şûheda) jî şeklê mubalaxawî ya navê “Şahid” e. Wek sifetên Xwûda “eş-Şahîd” û “eş-Şehîd” tên van wateyan: Ewê ji wî tiştek nayê veşartin û xefkirin, ewê muttalî’ê (ewê derbarê her tiştî de zana, xweyîzan û xweyîxeber) her tiştî, ewê dibîne, dizane, xeberdar; ewê tiştekî ji bîr nake û di her tiştî de hazir û nazir, ewê waqifê hemû sirran.[129]

“Eş-Şahîd”, di dîwanê de, di wateya delîlbûn û şahidbûnê de, wek sifetê Xwûda hatiye bikaranîn. Cama destê şahid, jenga dilan dişo û paqij dike. Kesê bê şahid ‘umrê xwe biborîne, ji ‘eşqa îlahî venexwe xilasbûna wî tune. Şahid, ji ‘eyb û kêmasiyan munezzeh e, ew şahidê husnê qidemê ye û şahidê qudsî ye. Şahid bi van xusûsiyetan ve şahid û delîlbûna Xwûda dikin û tecelliya nûra munezzeh nîşan didin.

Cama bi destê şahid jengê ji dil dişotin
Pîrê muxan jî rindan weh weh dikir riwayet (24/8)

Weh ku bê şahid û mehbûb te 'umrê xwe buwar
Karekî rabe bike îro ku êvar e dereng (71/3)

Ew şahidê bêrî ji 'eyb her cilweyek dayî di xeyb
Vê 'alemê ew tête ceyb dîsa ji wê rewneq veda (9/22)

Sed girih min di dil in jê ku çep û rast diket

[129] El-İsfahanî, b.n.b., r. 535-539; Karagöz, b.n.b., r. 232-233.

Şahidê husnê qidem zulf kire kibrê hudûs (28/3)

#### 1.1.2.1.33. El-Baqî

El-Baqî, ji koka "b-q-y"yê tê û wateya wê ew e ku tiştek li ser hal û rewşa xwe ya ewilîn bimîne.[130]. Wek sifetê Xwûda, tê wateya "ewê dawî û mirina wî tune ye, nemir, ewê ebedî dijî û hertim heye".[131]

El-Baqî, di dîwana de, di wateya ebedîbûnê de hatiye bikaranîn. Heyateke baqî û ebedî, di 'eşqê de, bi fenabûnê re derbas dibe. Salik heta fanî nebe û negehije meqama fenafillahê, ew baqî nabe û wuslat jî çênabe. Perwane jî ku temsiliyeta 'aşiqî dike, bi cezbeya lem'eya êgir dişewite, xwe feda dike ku ji nû ve biveje û baqî bibe. Beqa xwestina însanê tecelliya navê Xwûda yê "Baqî" ye.

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

Perwane lew disojî ji lem'eya cezbatê
Feda kirin 'umr û jî di keşfa subbûhatê
Ku da ji nû ve vejî baqî bit di heyatê (132/34)

#### 1.1.2.1.34. El-Bedî'

"Bedî", ji koka "b-d-a"yê tê û tê wateya ewê îcat dike, sen'etkar. Wek sifetê Xwûda, "el-Bedî', tê wateya "ewê bê nimûne û bê mînak ji tunehîyê diafirîne, heyî dike û îcat û înşa dike". Xwûda; 'alem bi hemû unsûrên wê ve, bi awayekî bê misl û bê mînak afirandiye.[132] "Ew ji nû ve afirînerê asîmanan û 'erdê ye." (Sûreya Beqere 2/117, Sûreya En'am 6/101)[133]

Melayê Cizîrî di beytên jêr de "el-Bedî' di wateya xuliqandin û neqişkirina Xwûda ya bêmîsal û bênezîr de bikaraniye. Neqqaşê bedî' her ew e; rewş û şeklên bedî', husna bedî' yên Xwûda ne.

Ehsen ji vî wesfê refî' eşkal û ewda'ên bedî'
Têtin ji nûrê wek reqî' bê 'eyb û neqs û rexne da (9/142)

Te cergê me ji dil kir pare pare
Fe carek ya bedi-'el husni[134] carek (69/10)

---

[130] El-İsfahanî, h.b., r. 150-151.
[131] Karagöz, b.n.b., r. 129.
[132] Karagöz, h.b., r. 194.
[133] Şoşikî, b.n.b., c. 1., r. 154.
[134] Bedi-'el husni: Xwedî spehîtiya bêhempa, xweşikê ku mînaka wî tune ye.

### 1.1.2.1.35. El-Fatir

Ev nav ji koka “f-t-r”yê tê û wek sifetê Xwûda tê wateya “ewê dixuliqîne, îcad dike û ji tunehiyê heyî dike”. Ev nav di Quranê de, bi têkiliya afirandina ‘erd û asîmanan de (En’am 6/14, 79; Îbrahîm 14/10) cih girtiye.[135]

Melayê Cizîrî ev sifetê Xwûda bi wateya “ewê ku ji tunehiyê heyî dike” bi kar aniye. Remzên Fatirî, dema di qelban de tecellî bibin û şû’le bidin, êdî tu quwet nînê wan veşêre. Bivê nevê, êdî ‘aşiq bi zikrê, bi lerzê, bi hal û hereketên xwe, bi girîn û zarînê, agirê dilê xwe nîşan dide. Herwekî Hafizê Şîrazî jî gotî: “Badê sabayê tu gammaz kirî, hêstirê çavê min ez gammaz kirim. Ger ew nebûna, ‘aşiq û me’şûq sirveşartger in.”[136]

Remzek xerîb û Fatirî peyda bibit nêv xatirî
Qewwet te nînin ragirî xef kî di nêv qelbê xwe da (9/38)

### 1.1.2.1.36. El-Kerîm

El-Kerîm ji koka “k-r-m”ê tê û tê wateya comerdî û destvekiriyê. Navê “Kerem”, wek sifetê Xwûda, derbarê “li her cihê û her wextê, xêrkirin û nî’metdayîna wî” de tê bikaranîn.[137] Wek sifetê Xwûda “el-Kerîm”, tê wateya “ewê bêbedel nî’metan dide mexlûqên xwe, ewê tobekaran ‘efû dike, ewê guneh û qusûran vedişêre, ewê îhsana wî zêde û daîmî, bê sebeb û bê bedel nî’metan dide, ewê karên wî layiqî pesindariyê, xweyî fezîlet û xweyî şeref, ewê ji kêmasiyan munezzeh e”.[138]

Melayê Cizîrî, navê “el-Kerîm” derbarê comerdî û ikramdariya Xwûda de bi kar aniye. Xwûda, hewceyiyên ‘evdên xwe dizane û bêbedel dide wan. Xwûda, xweyî îhsan e û nî’metan her daîm dibexşîne ‘evdên xwe.

Go suxte murada xwe ji min telbe ke îro
Min go ji Kerîm telbe û daxwazî çi hacet (21/3)

Xefletê bayê nesîm hat xef ji bal yarê Kerîm hat
Pur bi îhsanek 'ezîm hat qasidê şahê geda ye (96/1)

---

[135] Karagöz, b.n.b., r. 194-195; El-Îsfahanî, b.n.b., r. 752-753.
[136] Hafız-ı Şirazî, *Hafiz Divanı*, (Wer. Mehmet Kanar), Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2011, c.1, r. 472. (Tu ra saba vu mera ab-i dide şud gammaz/Vegerne ‘aşiq û me’şûq razdaranend)
[137] El-Îsfahanî, b.n.b., r. 844-845.
[138] Karagöz,b.n.b., r. 263.

#### 1.1.2.1.37. Ismê E'zem

Ismê E'zem ew nav e ku di nav Esmayê Husnayê de, navê ji hemiyan mezintir in. Hindek zana dibêjin Ismê E'zem ew navê komker in yê me'naya hemî navên dî, di nav xwe de hildigirin.[139] Ismê E'zem, navên herî mezin in. Di Qur'an û hedîsan de behsa wan navan hatiye kirin. Ew navên ku ruhê mu'min ji masîwayê paqij dike û dema mu'min berê xwe dide Xwûda, bi wan du'ayan dike, ew nav Ismê E'zem in. Li ser navên herî mezin îttîfaqî çênebûye. Navên ku wek Ismê E'zem hatine îfadekirin ev in: Ellah, Heyy, Qeyyûm, Rehman, Rehîm, Bedî', Îlah, Wahid, Berr, Mennan, Celal, Îkram, Rebb, Malîk, Ehed, Samed.[140]

Melayê Cizîrî ev raveka Ismê E'zemê di wateya navên Xwûda yên herî mezin de bikaraniye. Ev nav mezinahî û ulûhiyeta Xwûda nîşan didin. Ismê E'zem meyyitan radike, dilan ber xwe ve dikêşe, dax û reşên dilan (derdên maddî û me'newî) baş dike.

Meyyitan ew radikit yekser dilan yexma dikit
Ismê e'zem ma dizanit ya Mesîha ew bi xwe ye (93/9)

Min ku ew nîşan geheştê ev dilê sed daxê reş tê
Zerreyek xweş lê neheştî ismê e'zem pê gehaye (96/4)

Şêxê sofiyan Suhrewerdî, di gotineka xwe de behsa çil navê Xwûda dike. Di nav wan her çil navan de navek heye dibite navê Xwûdê yê mezintirîn. Ew nav, navên din destnîşan dike. Ew nav ji du herfan pêk tê û Melayê Cizîrî ew wek mu'emmeyekî bi kar aniye. Perçemên yarê dema li ser xal û xetên dêmê yarê de têne xwarê û dikevine ser hêya devî, perçemên reş wek elifê û dev jî wek herfa "hê"yê tê teheyyûlkirin.[141]

Ismê e'zem te divê çil ismê zor
Ji du herfan bi mu'emma zanî (114/6)

#### 1.1.2.1.38. En-Nûr

Nûr, şewq û ronahî ye. Du cure nûr hene: Yek dunyewî ye, yek uxrewî ye. Nûra dunyewî jî du qism in. Yek bi besîretê tê dîtin ku nûra 'eqlî û nûra Qur'anê ye. Yek jî bi çavan tê dîtin ku şu'leya roj û stêran e. Rohnîkerê maddî û me'newî Xwûda ye. Xwûda nûra 'erd û asîmanan e (Sûreya Nûr 35).[142] Nûr, tiştê girtî vedike. Ew waridên

---

[139] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 278-279.
[140] Karagöz, b.n.b., r. 99-105.
[141] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 278-279.
[142] El-Îsfahanî, b.n.b., r. 984-986.

ku di dil de derbazî ‘alemê dibin, di hişmendiya sûfiyan de nûr in.[143] Xwûda, nûrekî muqeddes e, ji hemû sifetên kêmasiyan dûr û munezzeh e. Ew nûra qelban e, lewra bi tecelliyên xwe ku tavêje qelban, dibe wesileya ji hev veqetana heqq û batilê.[144]

Di nezeriyeya sûfiyan de eslê heyînê, bingeha mewcûdiyetê nûr e. Alema heyînan weke zerreyên nûrê ne û ji nûra Xwûda tecellî bûne. Nûra sermedî, bêsînor e, çi sûretî bivê diafirine û xwe tê de zahir dike. Ew nûra di heyînan de tecellî bûyî kemala xwe, nav û sifetên xwe di wan de muşahede dike.

Xwûda nûr e di qelban de tecellî dike. Bi tecelliya navê Nûr, ‘eqil, di navbera şahid û xeybê de îrtibatê çêdike; li eserê dinêre diçe mûessîrê û fî’lê dibîne berê xwe dide fa’îlî. Wehdetê mutleq nûr e, di qelban de xwûya dike û me’lûmatên wê zelal û safî dike. Rohnîbûna dilî, ji tecelliya nûra heqîqî ye. Ew nûr wek agirê ‘eşqê di dil de hil dibe, ‘aşiqî dike ateşperest.

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zori di vê mes’elê ehlê dilan şubhe ma (8/12)

Te xweş nûrek zelal î tu di qelbê min hîlal î tu
We qelbî heysu fîhi’l-hubbu misbahun bi mişkat (23/20)

Me ji narî dîye nûra te di dil
Lew di ‘işqa te her ateşperes în (80/9)

Xwûda, nûra qedîm e û wek nûrê tecellî dibe. Ewilî nûra Muhemmedî paşê ji wê nûrê jî yên mayî hatine xuliqandin. Eşya di pêşiya ku wek mucessem bêne xuliqandin, bi feyza ismê Nûrê, di ilmê Xwûda de wek nav hatine zuhûrê. Yanî di Lewhê Mehfûzê de navên wan hatine beyankirin.

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Behra wucûdê coşi hat nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te'eyyun her sifat eşya zuhûr 'ilmiyye da (9/46)

Eşya di 'ilmê bûn zuhûr isman ji feyza ismê nûr
Teqwîmi bestin bêqusûr hukmê sifatê seb'e da (9/47)

Katib qelem dîsa gerand ismek ji isman sewwirand
Kursî ji nûrê afirand Cennatê Xuld û Sidre da (9/70)

---

143 Kaşanî, b.n.b., r. 563.
144 Cebecioğlu, b.n.b., r. 375-376.

Nûr, rohnîkirin e; eger gencineya mexfî nexwestiya û aşikar nebûya, ‘alemên ji xeyrî nûra qedîm dê di tarîtî û nezanînê de bimana. Ew nûra ku ji zatê qedîm tecellî bûyî, dîsa ber bi wî ve dikêşe. Daxwaza cevîna di yek zatî de, îşaretî vê heqîqetê dike. Nûra afirîner, her tişt dorpêç kiriye. Di hemû ‘alem û heyînan de, ji xeyrî nûra zatê munezzeh tiştek xwûya nake.

Coşiş ku da deryayê cûd d'ayîneya ismê Wedûd
Carek tecella bû wucûd nûrek ji nûrê jê veda (9/55)

Husn û cemalê xwast evîn vêkra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan pêkve naz û 'işwe da (9/4)

Te dizanim te dibînim ku tu yî nûrê wucûdê
Ellah Ellah ji çi nûr e te serapa me lebaleb (14/8)

Nûr, di dîwanê de, bi gelemperî wek tecelliya navên Xwûda hatiye bikaranîn. Mu’cîzeya Çiyayê Tûrê û tecellîbûna nav û sifetên Xwûda bi gelemperî wek xwûyakirina nûrekî hatine beyankirin. Îşaretên îlahî, îlhamên ku ketine dilê salik û murşîdî, wek tecellîbûna nûrê hatine îfadekirin. Ravekên weke “nûra Semed, nûra Sermedî, nûra Wahibî, nûra qudret, nûra Xefûr, nûra Celîl, nûra Subûh, nûra qidemê, nûra Heq îşaretî nav û sifetên Xwûda dikin.

Ku dûr im ez ji wê hûrê tenê carek li ser şûrê
Ji Wadê Eymena Tûrê tecella kir di nêv nûrê (124/4)

Ellah ji nûra Sermedî yek qetreyek da Ehmedî
Şirînî û firrek we dî medhûşi ma hetta ebed (40/10)

Ger bibim ber te sucûdê di dema keşf û şuhûdê
Me li dil dê bidirit pertewê nûra qidemê (109/12)

Ger dilber û ger 'aşiq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cî cî di wan da celwe da (9/12)

### 1.1.2.1.39. El-Cemîl, El-Cemal

Peyvên cemîl û cemalê ji koka “c-m-l”yê tên. Wateya cemalê, zehf sipehîbûn e. Sipehîbûn, du cure ye: Yek şexsî ye û sipehîtahiya ruh, beden û fî’lan e; yek jî, bi wasiteya zatê xwe di zatên mayî de tecellîbûn û xwûyabûna sipehîtahiyê ye. “Xwuda, sipehî ye û hez ji sipehîtahiyê dike.” Ev hedîs jî beyan dike ku navên cemîl û cemalê, xwe di mexlûqan de nîşan didin.[145] Cemîl, ewê xweyiyê başîtî û sipehiyê ye. Sipehî;

[145] El-Îsfahanî, b.n.b., r. 226-227.

îhsan û baştî ye. El-Cemîl, wek sifetê Xwûda, tê wateya “ewê di soz, fi’l û karê xwe de baş û sipehî ye, xwediyê baştî û îhsanê ye”.[146]

Sifetên el-Cemîl û el-Cemal ew sifet in ku zatê Xwûda didine naskirin. Xwûda, neqqaşê ezel e û bi ismê xwe yê Cemal sipehîtiya xwe daye hemû heyînan û ew surcemîl û cemalara ye, cazîbedar û xweş neqqaş e.

Neqqaşê ezel ismê cemalê ku nivîsî
Herfên di mucessem ji surê taze reşandin (81/7)

Ger bidîya ew senema surcemîl
Nazilê ‘erdan nedibû Cebraîl (72/1)

Li bedrê katibê husnê nivîsî 'enberê sara
Şîrîn e xalibê husnê bi nîşana cemalara
Nezer kir talibê husnê ku dilber dil berê xara (131/18)

### 1.1.2.2. Nav û Sifetên Xwûda, yên bi Îzafeya Nav û Sifetên Wî ku di Zimanê Din de Heyî an jî, ji Aliyê ‘Alim, ‘Arif û Şa’îran ve Hatine Çêkirin

#### 1.1.2.2.1. Xwûda

Nav û sifetên Xwûda, gelemperî bi ‘erebî ne. Ji bilî peyvên ‘erebî yên kurdî û farisî jî (Baxwoy, Kirdigar, Dawer, Amûrzîgar) hatine bikaranîn. Di edebiyata kurdî de ev nav weke Xweda/Xwedê/Xwûda hatine bikaranîn. Navê “Xwûda” tê wateya “Rebb, xwedî/xweyî/xwedan, Heq, Xaliq[147] û Afirîner[148]”. Ev nav, bi nîşandayîna zatê afirînerê alemê hatiye bikaranîn.

Minnet ji Xûdayî ku bi 'ebdê xwe Mela yî
Iksîrê xemê ‘işqê be dînar û direm da (1/10)

Îsmê te ye mektûbi digel îsmê Xwûdayî
Çend muznib û 'asî bi wî navî xefirîne (101/11)

Me bi sehrayê wîsala xwe bi derîn tu ji Xwûdê ra
Wer ne weqt e ku bibîn xerqeyê behra 'Edemê (109/7)

---

146 Karagöz, b.n.b., r. 132.

147 Melayê Ciziri, *Diwan*, (Ferheng), (Amd. Emin Narozi), Weşanên Avesta, İstanbul 2012, r. 357; Yeğin ûym, “Hüda”, b.n.b., r. 376.

148 Zana Farqînî, “Xweda”, *Ferhenga Kurdî-Tirkî,* Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2004, r. 2046.

#### 1.1.2.2.2. Baxwoy

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniye. “Xwûda, Rebb, refîq, heval û dost” wateyên vî navî ne. Baxwoy; tenê, yekane, mezin û xwedî ye.[149] Ev nav, di edebiyata klasîk de, di wateya “Xwûda” de hatiye bikaranîn. Şa’ir dema şukurxwaziya xwe ji Xwûda re beyan dike an jî, ji wî rica û lava dike, vî navî bi kar tîne.

Bendeyê Baxwoy bivêt dê meylê sîm û zer nekit
Da 'etaya padîşahan bê hed û ejmarî bit (19/17)

Mihnet û cewra hebîbî qehr û azara reqîbî
Xwoşî da min xerîbî lê şukur Baxwoy we daye (95/7)

Ku tûlê asitanî dûr nekî êdî ji dergahî
Ji Baxwoy vê ricû nakîn di babê lutf û rehmê da (5/37)

#### 1.1.2.2.3. Kirdigar

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniye û bi navê Xwûda îzafe kiriye. Ev nav, berginda navên “Xwûda û Sanî”[150] ye. Xwûda Saniyê herî mezin e û bi îradeya wî gul vebûne û baxçe muzeyyen bûne.

Ew bû murada Kirdigar lew kir îrade'w ixtiyar
Vê buxçeyê her lê buhar gul geş di baxê xunçe da (9/44)

#### 1.1.2.2.4. Dawer

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniye. Eslê wî “Dadwer” e. Qazî, hakîm, hukumdarê rast û xwedî insaf.[151] Xwûda, hakim û hukumdarê alemê ye. Di xuliqandina wî de gelek hikmet hene û ancax ku ew bi însanan bide zanîn, însan pê agahdar dibin.

Razê dehrê ji sipîhrê tu nizanî bi cedel
Hikmetê Dawer e tu j’hikmetê Dawer meke behs (27/8)

---

[149] Ebdurrehman Şerefkendî (Hejar), “Baxwoy”, *Ferhenga Kurdî-Farisî,* Weşanên Surûş, Tehran 1388/1967, r. 39.
[150] Şerefkendî, h.b., r. 611.
[151] Yeğin ûym., b.n.b., r. 175; Şerefkendî, h.b., r. 278; Melayê Ciziri, b.n.b., (Ferheng), r. 369.

#### 1.1.2.2.5. Amurzîgar

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniîye. Ev nav ji “amurz”a farisî hatiye. Tê wateya Xwûdayê bexşende û ‘efûkar.[152] Bexşendeya Amurzîgarî bêsînor e. Bi gotina ayeta Qura’ana Pîroz, bêgûman însan di xusranê de ye û teşneyê lutf û rehmet û şefqeta Xwûda ye ku ew nebe xilasbûna însanan tune ye.

Xerqê deryayê gunah in teşneyê lutfa Heq în
Rehmeta Amurzîgar û şefqeyê Xeffarî bes (52/11)

#### 1.1.2.2.6. Yarê Heqîqî

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev raveka navî bi kar aniye. Evîn, iksîra heyînê ye. Xwûda viyaye cemalê wî xuya bibe û alem afirandiye. Muhyîddînê ‘Erebî dibêje, ji bilî Xwûdê tu ‘aşiq û me’şûq nînin, lewra dema aşiq digehêjin mertebeya ku di her tiştî de Xwûda dibînin, vê hestê hîss dikin. Mewlana Celaleddîn jî dibêje, ‘eşq, sifetê Xwûda ye ku ew muhtacê tiştekî nîne; ‘eşqên ji bilî Xwûda hemû mecazî ne.[153]

Yara heqîqî, Xaliqê Rehman e, yên mecazî diçin wenda dibin û li ser soza xwe nasekinin. Yara heqîqî; rast, dirust û sadiq e û qenc û letîf e. Ewê di rêya wî de biçe û canê xwe fedayî wî bike, dê li cennetê (Baxê Îremê) nûr û cemalê wî bibîne.

Yarê heqîqî Xaliq e çîn canfida da vêkevîn
Rast û durust û sadiq e çi reng bi şûna rê kevîn
Qenc û letîf û laiq e d'Baxê Îrem da vêkkevîn (132/15)

#### 1.1.2.2.7. Meşşateyê Husna Ezel

Melayê Cizîrî, ji bilî nassan, lêbelê ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda ev nav bi kar aniye. Meşşate, xemilkarê bûkan e yanî berbûk û nexşkêş e. Melayê Cizîrî, ev peyv wek metaforekê, ji bo destnîşankirina Xwûda bi kar aniye.[154]

---

152 Yeğin ûym., h.b., r. 52; Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 361; Melayê Ciziri*, b.n.b.* (Ferheng*)*, r. 355.
153 Chittick, *Tasavvuf* (Wer. Turan Koç), İz Yayıncılık, İstanbul 2019, r. 150, 153.
154 Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 55; Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b.*,* c. 3, r. 31.

Xemilkerê ezelî/Xwûda ew qas xemilandineke spehî çêkiriye, dil, pêl bi pêl ber wê ve diçe û dibe bengiyê wê sipehîtî û dildariyê. Meşşateyê bi veşartî/sirrî, ji bo cuwaniya ezelî, li ser dêmê yarê xal û nîşan nexş kirine.

Meşşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da
Da 'işqê hilbit pêli pêl qelbê Melê cellabi da (2/1)

Hûn bibên meşşateyê xef danîye
Hem qiran kir xal û nîşanê xelet (61/10)

#### 1.1.2.2.8. Neqqaşê Ezel

Melayê Cizîrî ji bilî nassan, lêbelê ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û ev nav bi kar aniye. Ev ravek, wek sembola navên Xwûdê yên “el-Musawwîr (ewê şekl û taybetiyê dide mexlûqan), el-Muhsîn (ewê hemû tiştên xwe sipehî û saxlem çêdike), el-Bedî’ (ewê heyî û îcat dike ku di beriya wan de nimûneyên wan tune)” hatiye bikaranîn. Xwûda, xaliqê ‘erd û esmanan e ku ew heyî kirine û îcat û înşa kirine.[155]

Nîgarkêş û neqişkarê herî mezin Xwûda ye û ew ezelî û ebedî ye. Dema Xwûda navê xwe yê “Cemal” nivîsand, herfên mucessem li ser reşand û ew neqişand, di rûyê însên de kifşe kir. Herfên mucessem “elîf/ا, nûn/ن, sad/ص, cîm/ج, dal/د, mîm/م” in. Ev herf nîşana birh, çav, zulf, dev û bejnê dikin.[156] Ewan herfan, rûyê dildarê delal kiriye. Biskên ser eniyê renglam, gulangên rengdal, birûyên rengnûn, çavên rengsad, bêvila rengelîf, devê rengmîm[157] li ser rû belav bûne û ismê Cemal bi vî awayî di însên de mucessem bûye. Ismê “Cemal” ‘eşq, ‘eşqê jî cemal/sipehîtayî derêxistiye meydanê û cemal weke sûretê di neynikê de, di wechê însên de xwe dide der.

Neqqaşê ezel ismê cemalê ku nivîsî
Herfên te mucessem ji surê taze reşandin (81/7)

Neqqaşê Ezelî, bi qelema qudretê li ser sefheyê (rûyê yarê) weke elmasan neqş dane çêkirin. Dema ‘aşiq, van tecelliyên husna ezelî dibînin, hukmê yaqût û elmasên gewherfiroşan namîne, lewra neqqaşê sermeşqê qidemî, ji serî hetta binî, bejn û bala însên bi neqşên nûrîn xemilandiye.

Yaqûtî-firoşan di kef elmasi şikestin

---

155 Karagöz, r. 187, 188, 189, 194.
156 Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 512.
157 Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî,* (Wer. Emin Narozî) , Avesta Yayınları, İstanbul 2013, c.2, r. 49-50.

Ev sefheyê elmasê ku neqqaşê qelem da (1/8)

Nûr in ji ser hetta qedem neqqaşê sermeşqê qidem
Pê zeyyinand lewhê 'edem yek yek di wan da çeşne da (9/16)

**1.1.2.2.9. Mehbûb**

Mehbûb, peyveke ‘erebî ye û di kurdî de, di berginda wê de peyvên “dilber, dildar, dilketî, evîndar, me’şûq, hezkirî” têne bikaranîn. Di tesewûfê de “Mehbûb”, Xwûda ye. Ew husnê mutleq e, wî xwestiye cemalê xwe temaşe bike û însan afirandiye. Çawa ku Xwûda sipehî ye û hez ji sipehiyê dike, însan jî meyldarê husn û sipehîtiyê ye. Melayê Cizîrî wek kesayetekî mutesewûf, bikaranîna “Mehbûb”ê îşaretî Xwûda kiriye. Lewra ji bilî wî kes nayê hezkirin. Mutesewif, wexta ‘eşqa îlahî tîne zimên, ji cism û maddeyê dest pê dike, ber bi me’newiyat û rûhaniyatê ve diçe.[158] “Ewên di mevcûdatê de têne hezkirin, ji xeyrî Xwûda kes nîne. Ewê ku her ‘aşiqeq di rûyê me’şûqa xwe de dîtî ji tezahurê wî pêştir tiştek nîne.”[159]

Melayê Cizîrî di helbestên xwe de navê “Mehbûb” di hinek cihan de wek muteşabihî di cihê me’şûqê de, di hinek cihan de jî, rasterast di cihê navê Xwûda de bikaraniye.

Mehbûb û xûb û dilberan bigrî li wan heftê deran
Dê xwe j'şibak û penceran zahir bikin d'her dîde da (9/36)

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

Ji mehbûb dûr kirim çerxê felek wê pur hilavêtim
Nizanim dê li kû dit min di vê dewran û çerxê da (5/9)

Ehsen ji vî nezmê letîf çendî sivik hatî xefîf
Mehbûb bi destê xwe'y şerîf neqdê me muhr û sikke da (9/141)

Lefz û 'îbaret came ye mehbûbê me'na bi xwe ye
Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da (9/40)

**1.1.2.2.10. Wehdetê Mutleq**

Ehed, Wahid, wehdaniyet, di vê derbarê de têne bikaranîn. Wehdet, yekbûn û yekîtiya Xwûda ye û Xwûda ji kêmbûn û zêdebûnê munezzeh e. Ewê bi van sifetan ve muttasif be, “Wahid” e û ji tecezzî û tekessuran munezzeh e. Wahid, wek sifetê Xwûda

---

[158] Abdulbaki Turan, *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi,* Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2010, r. 528.
[159] Chîttick, *İbn Arabî Giriş Kitabı*, r. 46.

tê wateya, “ewê hevaldeng, manend û şerîkê wî tuneyî, di qedîm û ezeliyetê de yegane ye.”[160]

“Wehdetê mutleq/yekîtiya teqez, wek nûrekê dikeve dilan, di wê de tecellî dibe. Pêwîst e ‘arif/sûfî, ji xeyrî Xwûda di dilê xwe de hemû hubban biavêje ku bigihêje mertebeya wehdetu’l-wucûdê.

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zori di vê mes’elê ehlê dilan şubhe ma (8/12)

#### 1.1.2.2.11. Hostayê ‘Işqê

Ev raveka navî bi arastekirina/‘etfa Xwûda hatiye bikaranîn. Çawa Xaliqê alemê Xwûda ye, ewê ‘eşq jî afirandî û diyar kirî her ew e. Hostayê ‘işqê, mehbûb e û bi ‘eşqa xwe, ji serî heta binî, dil bi agirê xwe, weke Mensûrê Hellacî sohtiye.

Hostayê ‘işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot
Remza “enelheq” her tigot bawer bikin Mensûr e dil (74/3)

#### 1.1.2.2.12. Katib

Melayê Cizîrî ji bilî nassan, lêbelê ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda hinek nav, wek îstî’areyî bi kar anîne. Katib, nivîskar û nivîsevan e. Ev peyva fa’îl, hem di wateya rasteqîn de hem jî di ya mecazî de tê bikaranîn.

“Katib”, wek îstî’areyî, Xwûda ye. Katib li ser lewhe û sehîfeyan, bi nivîs û xetên herî xweşik neqş û xemlên xwe çêdike. Alem û rûyê yarê jî, ji ber ku weke lewhayê têne dîtîn, ji aliyê katibê xeybê ve hatine neqişandin. Katibê Xeybê, di sûretê însên de nexş û rengên herî sipehî nivîsîne û ev sipehitayî jî, sani’, musewwir, qudret û kemala wî nîşan didin. Katib, nivîskar û neqqaş e. Neqş û xemilkarî, ji destê qudreta wî dertên. Katib, xettatê herf û xettan e, afirînerê neqşê heyînan e ku bi qelemê wan dixuliqîne, teqdîra wan dinivîse, wan ji xeybê ‘eşkere dike.

Ew destxetên katib Semed Wahid li ser lewha Ehed
Neqşek reşandî bê'eded ce'da cemalê şane da (9/52)

Dîsa li bedrê katibî kêşan ji nû jengarê xet
Nûra reşandî Wahibî wî kir reşî purgarê xet (59/1)

Xeyb û mîsal in her di silk peyweste anî mîmê mulk

[160] Karagöz, b.n.b., r. 107.

Ew katibê elmasê gilk j'wê xameyê ev reşhe da (9/68)

Ku kêşa katibê xeybê xetê reyhan li kafûrê
Çi ayet bû ji "la reyb"ê reşandî zulmet û nûrê
Di yaqûta me dê mey bê ji destê wê sifethûrê (131/9)

**1.1.2.2.13. Şahê Qudretê**

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev raveka navî bi kar aniye. Şah, padîşah û hukûmdar e. Bi îstî’areyî xweyiyê qudret û quwweta mutleq e ku ew jî her Xwûda ye. “Şahê Qudretê”, ew mehbûba weke rojê, ew qas ronîdar çêkiriye ku wesfên wê nikarin bêne gotin.

Feryad û efxan sed keser wesfan neşêm lê ev qeder
Zanim ku roj bû hate der subhan ji şahê qudretê (125/1)

**1.1.2.2.14. Destê Qudretê**

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev raveka navî di helbestên xwe de bi kar aniye. Ev ravek, wek sifetê Xwûda, hêz, quwwet, teserrûf û desthilatdariya Xwûda beyan dike. Destê qudretê, wek mecazî, qesta hêza Xwuda, qudret û sen’eta wî ya mukemmel dike.

Destê qudret ku hilavêti ji bejna te nîqab
Bi cemalê ceberûtî me neman perde’w hîcab (13/1)

Te du nun qelem muqabil bi bedî’ xet nivîsin
Du hilalê destê qudret bi qiranê yek kişandin (86/2)

Kî dest e ji qudret weh kişandi weh reşandî
Qewsê du hilalan li beyadê bireşi (129/5)

**1.1.2.2.15. Hostayê Qudretê**

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev raveka navî bi kar aniye. Ev ravek, wek sifetê Xwûda, qudreta wî ya sen’etkarane û hunerweriyê nîşan dide.

Xwûdayê xweyî qudretekî bêsînor, bi hêz û quwweta xwe, bi sen’etkarane sipehîtiyên rûyê yarê tenzîm kiriye.

Subhan ji te şahê celal ustayê pur qudret li bal
Xasa te dayî ev cemal dêmê ji qudret xett û xal (125/2)

#### 1.1.2.2.16. El-Hebîb

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniye. Ev nav ji koka “h-b-b”yê tê û “hûbb” tê wateya hezkirina zêde.[161] Di xulqiyetê de yê herî zêde bête hezkirin Xwûda ye. Ji terefê Xwûda ve, yê herî zêde hatî hezkirin Hz. Muhemmed e. Di tesewwûfê de, hubba heqîqî ya Xwûda ye û yên din mecazî ne. Mehbûb û hebîb hemwateyê hev in û di helbestên Melayê Cizîrî de di heman me’neyê de hatine bikaranîn.

Hebîb, ‘eşq afirandiye û bi lutf û kerema xwe, ew xistiye dilê ’aşiqî. Ev ‘aşiqbûnxistin bê îradeya ‘aşiqî çêbûye, lewra hêj di qidemê de ev xusûsiyet hatiye nivîsîn. Dema husn û muhebbet ji hev cuda bûne, ew di însên de tecellî bûne. Şu’ledana van sifetan bi însên (‘aşiq û me’şûq) pêk tê.

Husna hebib û lutfê yar avête dil 'işqa xedar
Lew selbî kir jê ixtîyar wê husnê ev îcabi da (2/2)

Tiştê ku ‘aşiqî ji mehbûbê dûr dike wek îstî’areyî reqîb e. ‘Aşiq jî bexîl e, ji xeyrî xwe naxawaze kes hez ji mehbûba wî bike an jî weke wî hez jê bike. Bi bexîliya reqîban, dilê aşiqî rencîde dibe. Xusûsiyetên ‘eşqê gelek in û yek jî bêdermanî û bêtebîbiya wê ye. Dermanê ‘eşqê yê mayînde tune ye. Herçendê ‘eşq, derdeke bêtebîb be jî, dermanê wê dîsa wesla hebîb e. Firqet çêbe jî dîsa hebîb, aşiqî bi wesla xwe şa dike û wî vedixwîne dergaha xwe. Dema ‘aşiqê heqîqî hate peydakirin yên qelb, sextekar û nejidil, ji dergaha mehbûbê têne dûrkirin.

Rûh û rewanê min hebîb dîsa bi telbîsa reqîb
Rencide kir miskîn xerib terka dilê ehbabi da (2/4)

'Işqi derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

Paş firqetê zor muhbetê me ji tel’etê çûm hezretê
Wesla hebîb min bû nesîb mel‘ûn reqîb rencûri bû (107/13)

#### 1.1.2.2.17. Mulhîmê Xeybê

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniye. Peyva Mulhîmê ji koka “l-h-m”ê tê û tê wateya “tiştê ketî

[161] El-İsfahanî, b.n.b., r. 241-242.

dilî, îlham”. Îlham, ji bo fikrên ku Xwûda dixe qelbê însên tê bikaranîn.[162] “Mulhîm” tê wateya “ewê ku dixe dil û tê de disêwirîne, îlhamker”.[163]

Xwûda, mulhîmê xeybê ye, emrê dide Cebraîl ku alîkariya ‘evdên wî bike. Ew, tiştê veşartî û neaşkera, bi rêya îlhamê dide însên. Îlham ew zanîn e ku bi rêya feyzê dikeve dilî, bêyî ku Xwûda delîlekî şer’î ji kitab û sunnetê pê hebit. Ew tiştên ji ‘ilmê heqîqetê têne hesibandin, belkî ew ji îlhama Xwûdê ye ji bo însên ewa Cibrîl bi rêya feyzê avêtiye dilên wan.[164]

Mulhîmê xeybê weh îmla digirit
Meded û feyz ji Rûhilqudus în (80/19)

#### 1.1.2.2.18. Sultanê Qidemê, Zatê Qedîm, ‘Eslê Qedîm, Nûra Qedîm

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev ravekên navî bi kar anîne. Qidem, di rabirdû û dahatûyê de heyîn e. Qedîm/qidem, ne di Qur’anê de ne jî di rîwayetên sehîh de wek wesfên Xwûda, cih nagire. Ehlên kelamê, ev peyv wek wesfê Xwûda bi kar anîne.[165] Wek sifetê Xwûda “el-Qedîm” tê wateya “ewê ewwel û destpêka wî tunehî, ewê nehatî afirandin û ezelî”.[166]

Melayê Cizîrî ev raveka navî, di wateya wesfê Xwûda de bi kar aniye. Xwûda, hem hukumdarê ‘alemê ye, hem jî ewwelî û qidemî ye. Ew Xwûdayê ku muttesifê van sifetan e, çi gotiye pêwîst e bête qebûlkirin û iqrarkirin. Kesê bi baweriyeke saxlem rêya Sultanê Qidemê girtibe, tu îşkence û eziyet nikarin wî ji wê rêyê bidene paş.

Bil ji sultanê qidem min bi te îqrari niye
Ger li kaba me nihen metqeb û munqarê hudûs (28/4)

Di qidemîya Xwûda de hêj tecelliyên wî çênebibûn, navê hudûsê hêj mîrata yekîtiyê de şu’le nedabû, husn û hub, ‘aşiq û me’şûq, husn û cemal di zatê wî de yek bûn. Nûra qedîm/Eslê qedîm/Zatê qedîm, xwest di mir’atê de şu’le bide û tecellî bibe. Husn û cemalê, ji ayîneya zatî şu’le dan û wek sifetên cuda derketine pêş. Paşê husn û cemalê xwestin di yek zatî de bicivin. Nûra qedîm bû ‘eşq û hezkirin, herdu gihan hev û nazî û ‘îşveyên xwe li hevdu kirin.

---

162 El-Îsfahanî, h.b., r. 893-894.
163 Melayê Cizîrî, b.n.b., (Ferheng), r. 400.
164 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 228-229.
165 El-Îsfahanî, b.n.b., r. 778-780.
166 Karagöz, b.n.b., r. 131.

Husn û hub zatê qedîm in lê cuda bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûsê li hukmê tefsîl bû (104/4)

'Aşiq û me'şûq el-heq herdu mir'atê yek in
Bu di ‘eynê cem'ê da eslê qedîm ayîne bû (104/6)

Husn û cemalê xwast evîn vêkra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan pêkve naz û 'işwe da (9/4)

### 1.1.2.2.19. Zatê Muqeddes

Melayê Cizîrî, ji mefhûmên nav û sifetên Xwûda îstîfade kiriye û bi ‘etfa Xwûda, ev nav bi kar aniye. “Muqeddes; tê wateya pîroz, pak û paqijiyê.[167] Ev peyv, îşaretê bi paqijiya me’newî dike û di Qur’anê de wek “Erdê Muqeddes” û “Beytê Muqeddes” derbas dibe.[168]

Xwûda, ezelî û ebedî ye. Ji hemû kêmasiyan munezzeh e. Hêj behra comerdiya wî nehatî wucûdê û tiştek tunehî, Zatê Muqeddes (Zatê ji kêmasiyan temîz û paqij) hebû.

Zatek muqeddes bû wucûd coşiş nedabû behrê cûd
Wesfê îzafat û quyûd yek jî tecellayê neda (9/3)

### 1.1.3. Melek/Ferîşte

Melek ji nûrê hatine xuliqandin. Di helbesta klasîk de bi gelemperî peyva melekê/ferişteyê di wateya mecazî de, wek ewê rû û exlaqê wê baş û zêde temîz de tê bikaranîn. Koka vê peyvê ji îbranî, ji “melakîm”ê[169] tê û tê wateya peyamber û qasidê. Melek heyînên nûranî ne, bi maddiyatê ve girêdayî nînin, lêbelê bi înayeta Xwûda dikarin wek cismî xûya jî bikin. Xwarin, vexwarin û mêr û jinên wan nînin. Ji xeyrî çar melekên mezin (Cebraîl/melekê wehyê; Mîkaîl/bi bûyerên siruştî re wezîfedar e û wan tenzîm dike; Îsrafîl/sûra qiyametrabûnê di destê wî de ye û bi pûfkirina wî re qiyamet radibe; ‘Ezraîl/meleku’l-mewt/melekê mirinê ye, ruhê însan û candaran bi destûra Xwûda distîne) di edebiyata klasîk de hinek melek bi navê “kîramen katibîn, munker û nekîr, zebanî, ridvan, muqarrebîn, subbûhî û quddûsî” cih girtine. Melek, ji

[167] Melayê Cizîrî, b.n.b. (Ferheng), r. 401.
[168] El-Îsfahanî, b.n.b., r. 778.
[169] Hinek aliman gotine peyva melekê ji “melik”ê (hukumdarî) tê. Hinek melek hene hukumdariya hinek stêr û komstêran dikin û ji wan re “melaîke” hatiye gotin. (El-İsfahanî, b.n.b., r. 921-923)

aliyê sipehî, paqijî û safbûnê ve derdikevin pêş. Ji ber munezzehbûna ji kêmasiyan, mehbûb û memdûh wek melekan têne dîtin.[170]

Di dîwanê de navên melekan wek peyvên "ferîşte, melek, melaik, milyaket, Cebraîl, Cibrîl, Cibrîlê Emîn, Rûhu'l-qudus, Subbûhî û Quddûsî, Rûhêqudus" cih girtine.

Peyvên melekê û ferîşteyê, bi gelemperî, bi horî û periyan re têne îfadekirin. Mehbûb, wek horî û melekan e. Cemala mehbûbê ewqas sipehî ye ji horî û melekan jî wêdatir e û melek tecelliya mehbûbê dinêrin û daîm di seyranê de ne. Zikirkirin û semaya melekan wek şexsên ku destên hev girtine û govend dikin, hatiye teswîrkirin. Melek bi felekan re jî semayê digirin. Bi dengê zikrê wan erwah têne mî'racê, di tebeqeyên asîmanan de derbazî cennetê dibin.

Hûr û ferişte kê we dîn nazik û xûb û surşîrîn
Dêmê numûne bir biçîn sûretê Çîn numa xelet (60/4)

Êxsîr kirim zulfa çelek ew horiya nisbet melek
Tîr dan ji reştûzê helek mecrûhê qewsê purweşîn (79/7)

Bi evînê melek û çerx û felek têne sema
Rewşen in têki bi mihrê ji sema ta bi semek (68/7)

Nazikek min seherê dî bi cemalê xwe ne wek
Hûr û wîldan û perî dî ne beşer bû ne melek (70/1)

Xusûsiyetê hinek melekan her daîm ji Xwûda re îbadet kirine, lêbelê hinek melek di hinek şevên taybet de çêtir îbadetê dikin. Şevên Bera'et û Leyletu'l-qedran de, melek, sef girêdidin zikr û semayê dikin û li rexê rast û çepê ve guhdarî mehbûbê dikin.

Du sunbul rast û çep bedrê muselsel turre tuxra ne
Berat û Leyletu'l-qedrê melaîk sef girêdane
Ji balayê bidin çetrê li bedrê taze seywan e (131/17)

Çingeçinga bişkuwan awaz û dengê zerguwan
Sed melaîk guh didirin ber le'lê rast û çep (17/11)

Hinek melek, meddah û senaxwanê pêxember in hinek jî, ji ehlê sulehayê re du'ago ne û bêhed selaman li wan dikin.

Fehma min e qasir weh neşêm wesfê eda kim

---

[170] Canım, b.n.b., r. 161-162.

Meddah ji te ra Xaliq û hindî melekî ne (101/14)

Selamên milyaketan di bêhedd û hisêb in
Şubhetê avên şetan ji Mela l’Mîm û Hê bin
Helakên ji zehmetan derman ji lam û bê bin (132/2)

Melekê wehyê Cebraîl, hem bi navê xwe hem jî wek navê “Rûhu’l-qudûs”ê di helbestan de hatiye bikaranîn. Ew Cibrîlê Emîn e, wî di mî’racê de qasidiya Pêxember kiriye û bi wehiyanîna wî, perdeya di navbera Xwûda û ‘evdan de rabûye û mesajên Xwûda hatine sehkirin û zanîn.

Ger bidîya ew senema surcemîl
Nazilê ‘erdan nedibû Cebraîl (72/1)

Şemsa felek î ya melek î hêj nizanim
Hurî û perî ya bi xwe Rûhu’l-qudus î tu (105/6)

Mî'racê te kir kes dî nekir sedrê rîsalet
Qasid ji Xwedê ra bo te Cibrîlê emîn e (101/5)

Cebraîl; Rûhu’l-qudus e, melekê wehyê ye û ji ber wehiyanînê, melekekî muqeddes e. Ew di navbera ‘erd û asûmanan de qasidiyê dike. Xwûda ji nûra xwe nûra Muhemmedî afirandiye û Rûhu-‘l-qudusê jî, bi izna Xwûda can/ruh êxistiye bedena wî. Rûhu’l-qudus jî wek melekan ji nûrê hatiye afirandin, lewra di rûrohniyê de mehbûb weke wî ye.

Husnek munezzeh sewwirand nûra hebîb jê afirand
'Alem di kunhê heyyirand *Rûhu’l-qudus* can nefxe da (9/57)

Hatif’il xeyb esti în ya tercûmanê *Rûh’ul Quds*
Bulbulê şeyda sti der gulzari ya Mela sti în  (83/10)

Subbûhî û quddûsî (melekên pak û paqij), ew melek in ku di erşê e’zem de, her daîm bi navê Xwûda yên Subbûh û Quddûs, zikr û tesbîhî Xwûda dikin. Bi taybetî di şevên Leyletu’l-qedrê de ku dû’a tên qebûlkirin, wuslat û lîqaya Xwûda dixwazin. Bi zikra “hay û hûyê” ya subbûhî û quddûsiyan, weke helqeya zikrê sofiyan, feryad bilind dibin û lerze çêdibin.

*Subbûhî û quddûsî* û hûrên di beheştê
Peywest e şebê qedrê liqaya te dixwazin (84/6)

Hay û hûya subbûhiyan reqs û semaya qudsiyan
Teşbîhê cewqa sofiyan feryad û zikr û lerze da (9/94)

### 1.1.4. Mishefên Pîroz

Qur’an, ji wan esasên semawî pêk tê ku bi wasiteya Cebraîl wek wehîy, ji Cenabê Pêxember Muhemmed (sxl) re hatiye şandin û di mishefan de hatiye nivîsîn. Ev kitêba pîroz, ji Sûreya Fatîhayê dest pê dike, bi Sûreya Nasê dawî dibe.[171] Kitêba misilmanan a pîroz û muqeddes e. Ji xeyrî navê “Qur’an”ê, navên weke “Mishef, Furqan, Kitêb, Nûr” ji bo Qur’anê, di edebiyata klasîk de hatine bikaranîn.[172]

Di dîwanê de wek kitêbên pîroz, bi tenê navê Qur’anê hatiye beyankirin. Ji xeyrê navê Qur’anê; “tenzîl, furqan, mishef, Qur’ana Mecîd” jî bi îşareta Qur’anê hatine bikaranîn.

Qur’an, kitêbeke pîroz û rûmetdar (mecîd) e. Bawermend li ser Qur’anê sond dixwûn û ev sondxwarineke gelek mezin e lewra bawerî heye ku yê sonda derew bixwe dê Qur’an xenîbê wî bibe. Sonda mezin li ser hêjanên herî pîroz tê xwarin. Qur’an/Furqan, ji bo mu’minan tiştekî pîroz e û şahidiya rastî û durustiyê dike.

Feyza ‘ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j’destê muxbeçeyan dît bi *Mishef* û bi ayat (24/3)

Bi *Qur'anê* bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê muridê wi dibin qatê
Mûrid er bê beser nebwed zi fermaneş bider nebwed
Ke salik bêxeber nebwed zi rah û resmê menzil ha (4/5)

Qur’an ji bo şa’irên klasîk jêdereke giring e. Wê ilham daye gelek şa’iran. Bi hunerên weke teşbîh, telmîh û îqtîbasê şa’iran ji wê gelekî sud wergirtine. Mishef, ji bo spehîtî û rûyê yarê, wek unsûreke şibandinê hatiye bikaranîn. Xet û xal, unsûrên rûyê yarê yên weke herfan hatî sembolîzekirin (çav wek herfa sadê û ‘eynê ye, dev weke herfa mîmê ye, birh weke herfa rê û nûnê ye) wek nivîsa li ser mushefê tê dîtin.

*Mishefa*[173]husn û cemalê sûreta xal û xetan
Ma telewna xeyre herfin la we *Qur’anin Mecîd*[174] (39/11)

---

[171] Muhammed Abid e-Cabirî, Kur’an’a Giriş, Mana Yayınları, İstanbul 2010, r. 19-20; Abdurrahman Adak, Teşeyên Nezmê, Nûbihar, İstanbul 2019, r. 45-46.
[172] Canım, b.n.b., r.157-158.
[173] Xal û xetên di rûyê yarê de wek destxetekî têne qebûlkirin. Her sipehitahiyek weke cuzekî/sureyekê tê dîtin û tevahiya wan sehîfeyan/sureyan, kitêbekê teşkîl dikin.
Xal û xetê şoxqametê me j'vê kitêb û destxetê
Herdem ji new dilfeyz bû ev 'işq û sewda mezheb e (100/5)
[174] Wateya rêzê: “Sond bi Qur’ana Mecîd ku ji xeyrî herfa “la”yê me nexwend.”

Navekî Qur’anê jî “Tenzîl” e û ji koka “n-z-l/nazil”ê tê û tê wateya “ji jor de daketina ber bi jêr ve”.[175] Qur’an, kelamê Xwûda ye û ji dergeh û dîwana mezin daketiye ‘erdê/dinyayê. Qur’an bi tedrîcî nazil bûye. Ji daketina yek carî re “înzal”, ji daketina perçe perçeyî re “tenzîl” tê gotin.[176]

Kaf Ha ye ismê kûr e tuxra ye di Tenzîlê
Bi cismê wê Kohê Tûr e îcmal e di tefsîlê
Cemal ji 'eynê nûr e kewkeb e di qendîlê (132/11)

Navekî Qur’anê jî “Furqan” e û tê wateya ewê heq û batiliyê ji hev cuda dike. Başî û nebaşiyê, rast û çewtiyê ji hev vediqetine. Sûreya Furqanê, bi vî navî hatiye navkirin.[177] Şa’ir bi heft ayetên Furqanê (Sûreya Fatîhayê heft ayet e) sond dixwe ku gotinên wî rast in.

Dibit bêjin me haqanî bi heft ayatê Furqanî
Li mehbûban tu xaqan î were derbê li Qeyser da (92/19)

**1.1.5. Sûre, Ayet û Hedîs**

Ayet, hem di wateya ‘elamet û nîşanê de hem jî wek hevokên Qur’anê hatiye bikaranîn.

Ayet, di edebiyata klasîk de, bi unsûrên yarê yên sipehîtiyê re têkildar e. Sûretê yarê, mishef e, xet û xal û unsûrên rûyî, bi herfan têne sembolîze kirin û li ser rûyî weke nexşan cih girtine. Nûr û cemalê Xwûda di rûyî de xwe çêtir nîşan dide. Çawa ku ayet di Mushefê de bi xetên reyhanî têne nivîsîn, xal û xetên spehîtahiyê jî, bi destê qudretê, li ser rûyê yarê weke mushefê hatine nexişandin.

Ku kêşa katibê xeybê xetê reyhan li kafûrê
Çi ayet bû ji "la reyb"ê reşandî zulmet û nûrê
Di yaqûta me dê mey bê ji destê wê sifethûrê (131/9)

Ev ayetê nûrê ji Mela ra ku nivîsî
Katib ji surrê nuqte bi zêrabê feşandin (81/9)

Nûra ji qudret lê du nûn jê ra du nûn in erxewan
Wer ayeta ‘işqê bixwûn xweşnusxeyek mestûr e dil (74/5)

Elif û du lam û hê dîn me di ayeta cemalê
Ji ceger me kir tesellî û ji sîne dest feşandin (86/4)

---

175 El-Îsfahanî, b.n.b., r. 951-953.
176 Yeğin ûym., b.n.b., r. 980.
177 İskender Pala, “*Furkan”, Ansiklopedik Divan Şiir Sözlüğü,* Kapı Yayınları, İstanbul 2005, r. 159.

Ayet, di hinek beytan de wek hevokên Qur'anê, bi telmîhî hatine bikaranîn. Caran bikaranîna ayetan temsîliyeta hemû Qur'anê jî dike. Sondxwarina li ser ayetekê weke li ser Qur'anê sondxwarin tê qebûlkirin, lewra hemû jî gotinên Xwûda ne û pîroz in.

Feyza 'ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j'destê muxbeçeyan dît bi Mishef û bi ayat (24/3)

Tefsîrê sirra ayeta 'arif divêtin guh detê
Raza rumûzên qudretê ger deyn bikin me'zûr e dil (74/6)

Ayet û hedîs di dîwanê de wek îktîbas û telmîhê cih digirin. Di dîwanê de ayet û hedîsên wek îktîbas û telmîhê cihgirtî ev in:

**Ayet:**

Tu ji nusxeyê tewhîdê mexwûn "ayetê nefyê"[178] (49/11)

Dibit bêjin me haqanî bi heft "ayatê Furqanî"[179] (92/19)

"Sûreya Ummilkîtab" madarê hedret sûri bî[180] (117/8)

'Aşiq ku bi dil "fatiheya 'işqê" xwend[181] (119/6)
*"Leyletu'l-Qedr"*[182] bi min ew se'et û 'îd e di salê (122/3)

*"Ayetulkursî"*[183] *û "En'am"*[184]heykela toxa te bin (117/6)

"Kullu yewmin huwe fî şe'nin"[185] nebî xafil jê (38/8)

---

[178] Di nav beytan de, navê hinek sûre û ayetan wek îşaretkirina wan derbas dibe. "Ayeta nefyê", "La îlahe îllallah" e ku ji xeyrî Xwûda hemû xwedawendan nefy dike.
[179] Furqan navekî Qur'anê ye û ji heft ayetê Furqanî mebest, Sureyê Fatîhayê ye, lewra ew ji heft ayetan pêk tê. "Seb'ul-Mesanî" navekî Qur'anê ye û di beytên Cizîrî de wek "heft ayetê Furqanî" bi wateya xwe ya kurdî ve cih girtiye. Ji ber ku Qur'an bi vê sureyê dest pê dike wek nav "Fatîhe" jê re hatiye gotin. (Şoşikî, b.n.b., c. 1, r. 17.)
[180] Navekî dî yê Sûreya Fatiheyê "Ummul-Kîtab" e, yanî dayika Kitêbê ye. Emr û nehyên Xwûda wek xulaseyekê tê de cih girtine.
[181] Sûreya Fatîheyê destpêka Qur'anê ye. Fatîhe di wateya destpêkirinê de tê bikaranîn. Xwendina Fatîheya 'işqê, destpêkirina evînê ye.
[182] Qur'an di "Leyletu'l-Qedrê/Şeva Qedrê" de nazil bûye. Sûreyê Qedrê bi pênc ayetên xwe ve behsa vê şevê dike. (Bêguman e ku me Qur'an di şeva Qedrê de şandiye xwarê… Ew şev selametî û aramî ye. Heta hilatina spêdeyê dewam dike. [Sûreya Qedr, 97/1, 5])
[183] Ayetulkursî, di dawiya Sureyê Beqereyê (ayeta 255.) de tê û ji bo parastina ji xerabiyan tê xwendin. Ev ayeteke mezin e, navê Xwûda yê mezin tê de heye, ji ber vê yekê efdel e. (Şoşikî, b.n.b., c. 1, r. 311.)
[184] Sureya En'am: Sûreya En'amê li Mekkeyê nazil bûye, ew li ser ulûhiyet, wehiy, pêxembertî û edaletê rawestaye. Tê de behsa nî'metên Xwûda tê kirin. Îmam Fexreddînê Razî gotiye du fezîletên mezin yên vê sûreyê hene: Di yek carî de nazilbûna wê û di merasîma nazilbûna vê sûreyê de hazirbûna heftê hezar melekan. (Şoşikî, b.n.b., c. 2, r. 137-138.)
[185] "Ew, her gav di karekî de ye." (Sûreya Rehman, 55/29)

Bi remza “qabê qewseynê”[186] ji wan birhan xeberdar in (85/3)

Ma telewna xeyre herfin la “we Qur’anin Mecîd”[187] (39/11)

Barî ji “we ‘ellem” ku xeberdar kirîn
Îro tu bizan “Ademê esma” yim ez[188] (49/2)

Nezer dî “’elleme’l-esmau” di batin ‘eynê mir‘at (23/1)

Me be dil ‘urwetê wusqa”[189] ye di dest[190] (3/8)

*Sûreya "Înna Fetehna*"[191] dor û madarê te bî (116/1)

Herfên nûrîn cism e “*Kaf Ha”*[192] ye di ayatê (132/10)

Min di ber “*qalûbela”*[193] batin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser 'ehda “elest”[194] im ta bi roja axirîn (91/1)

Ellah di ber “qalûbela” da yexme ket qelbê Melê (59/12)

Hê di ber “qalûbelayê” belku ev 'alem nebû (104/1)

Lew di esil dûrr e jê te‘neyê “*lemma efel”*[195] (73/5)

“Li yetmeinne qelbî ‘eynulyeqîn”[196] dibexşit
“Eynul‘eyan” divêtin kafî nehin dirayet (24/10)

Dê bibit “*narê Xelîlullah*”[197] dojeh sarî bit (19/1)

Lami‘a sirra “tecella ger li Tûra”[198] dil didet (33/10)

Min can “*yedê beyda*”[199] ye ji 'Îsa çi xeber dim

---

[186] Qabê qewseyn, tê wateya bi qasî navbera herdu birhan. “Cibraîl bi qasî du kevanan yan jî hê kêmtir nêzikî Muhemmedî bû.” (Sûreya Necm, 53/9)
[187] “Qaf, Ez bi Qur’ana Mecîd (rûmetdar) sond dixwim.” (Sûreya Qaf, 50/1)
[188] “Xwûda temamê navan bi Adem de zanîn.” (Sûreya Beqere, 2/31)
[189] “Wî xwe bi qulpa saxlem girtiye ku inqîta’ jê re nîne.” (Sûreya Beqere, 2/256). “Hîç gûman tune ye ku wî xwe bi qulpa/girêka saxlem girtiye.” (Sûreya Loqman 31/22)
[190] Îbareya “Urwetu’l-Wusqa/Dîwarê Xurt (qulpika xurt û hevgirtî)”, di Qur’anê de (Sûreya Beqere û Sureyê Loqman) du caran derbas dibe. Mîna sifetê dînê Îslamê hatiye beyan kirin. (Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 111.)
[191] “Bi rastî me fetheke zahir û ‘eşkere ji te re kiriye.” (Sûreya Fetih, 48/1)
[192] “Kef, He, Ye, ‘Eyn, Sad.” (Sûreya Meryem, 19/1)
[193] “Belê, em şehdeyiyê didin ku Tu Xwûdayê me yî.”(Sûreya Araf, 7/172)
[194] “Ma ez ne Xwûdayê we me?” (Sûreya Araf, 7/172)
[195] “Dema ew çû ava (winda bû) got: Ez ji tiştê here ava, hez nakim.” (Sûreya En’am, 6/76)
[196] “Hûn dê bi çavên xwe dojehê bibînin. (Sûreya Tekasur, 102/7)
[197] “Hey agir, ji bo Îbrahîm bibe hêik û bi selametî!” (Sûreya Enbiya, 21/69)
[198] “Mûsa got: Xwûdayê min, xwe nîşanî min bide; ez te bibînim!” (Sûreya Araf, 7/143)
[199] “Destê xwe (ji berîka xwe) deranî, ji nişka ve ew jî ji bîneran re bû tiştekî spiyê nûranî.” (Sûreya Araf, 7/108). Di Sureyên Taha ayeta 22, Şû’ara ayet 33, Neml ayet 12 û Qesas ayeta 32yê de jî behsa vê mû’cîzeyê hatiye kirin. (Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 152.)

Min “*ateşê Mûsa*”[200] diye gulnar û şerabê (112/5)

Wer ji ber perdê “*yedê beyda*” bi mu'ciz bête der (19/2)

Zanim ne tenê ku “*yedê beyda*”[201] tu didêrî
Wer xweş ke şehîdên xwe ku “’Îsanefes”[202] î tu (105/2)

Min dilberek wek durr heye mehbûb û şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye “Belqîssifet mesken Seba”[203] (11/4)

Er ne “hudhud ji Seba”[204] bêt wekî bayê sebayê (109/5)

Wê dikin se'yê li ser “Merwe'w Sefa”[205] (10/6)

“We'n-necmu iza hewa”[206] bi midrac (29/12)

Ber derê baxê wîsaleş hatifî awazi dad[207]
Hazihî cennatu 'ednin “fedxulûha xalidîn”[208] (91/4)

Bi husna “ehseni’t-teqwîm”[209] di zahir sûretê zat (23/1)

Her nefes dared sela û ne‘reyê “hel min mezîd”[210] (39/8)

Dê qedir bihtir binasî “meq’edê sidqê”[211] ceza ye (95/28)

“Huwe’l-ewwel huwe’l-axir huwe’z-zahir huwe’l-batin”[212] (23/15)

“Lizî hicrin”[213] we zî qelbin şifaun fî işarat (23/18)

We qelbî heysu fîhi’l-hubbu “misbahun bi mişkat”[214] (23/20)

Wacibun lî imtisalu'l-emri “maza te'murîn”[215] (91/2)

---

200 “Hûn (li vir) rawestin, min agirek dît.” (Sûreya Qesas, 28/29).
201 “Destê xwe bike paşila xwe, wê spî û bêqusur derkeve.” (Sûreya Qesas, 28/32)
202 “Gava bi destûra min te mirî zindî dikirin.” (Sûreya Maîde, 5/110)
203 “Bi sond ji bo qewmê Sebe di cihê sekna wan de delîlên mezin hene.” (Sûreya Sebe’, 34/15)
204 “(Dodo/Hudhûd) hat. (Ji Suleyman re) got: Tiştekî ku tu nizanî ez fêr bûm û ji Sebeyê min xeberek rast ji te re anî.” (Sûreya Sebe’, 27/22)
205 “Bêgûman, Sefa û Merwa ji nîşangehên Xwûda ne.” (Sûreya Beqere, 2/158)
206 “Ez, bi stêrê sond dixwim gava ku ji banî dikeve (û winda dibe).” (Sûreya Necm, 53/1)
207 Li ber derê baxê gihaştina te, qasid gazî kir.
208 Wateya misrayê: “Ev bihişta ‘Edn e, bikevinê û herûher tê de bimînin.” Wateya ayetê: “Êdî herin cennetê û herûher li wê bimînin.”(Sûreya Zumer, 39/73)
209 “ Me însan di şekl û awayê herî spehî de afirandiye.” (Sûreya Tîn, 95/4)
210 “Ma hê jî tune ye?” (Sûreya Qaf, 50/30)
211 “Li dîwaneke heq…” (Sûreya Qemer, 54/55).
212 “Xwûda ye, yê pêşîn (ku berî wî tiştek tune ye), yê paşîn (ku di piştî wî re tiştek tune ye), yê zahir (ku di ser wî re tu tişt tune ye û dîtber e), yê Batin (ku nayê dîtin û nedîtber e.) e.” (Sûreya Hedîd, 57/3)
213 “Di van (sondan) de ji bo xwedîhişan sondek (nirxê sondekê) heye.” (Sûreya Fecr, 89/5).
214 “Xwûda, ronahiya asîmanan û erdê ye. Numûneya ronahiya wî wekî kulekekê ye ku çira tê de heye.” (Sûreya Nûr, 24/35)
215 “Ferman ya te ye. Binêre ka tu çi ferman bikî.” (Sûretê Neml, 27/33)

Hemî dar in ji êgir ra kirî rîz[216] (46/11)

**Hedîs:**

Ger xeberdar î ji sirra "*kuntu kenzen*"[217] guh bidêr
Da bi sed nurê beyan ket me'na "*lewlakê"*[218] *rûh* (33/3)

Ya Rebbî çi rû leb bi senaya te guşayim
"Subhaneke len uhsiye fî şe'nike hemda"[219] (1/9)

**1.1.6. Pêxember, Nebî**

Pêxember ew kesên xweyî wesfên bilind in ku ji bo teblîxkirina zanist û emrên Xwûda ku bi rêya wehyê ji Xwûda hildigirin, hatine wezîfedarkirin. Di Qur'an û hedîsan de peyvên "nebî, resûl û mursel" hatine bikaranîn.[220] Pêxember jî, ji însanan re bûne rêber, însan gazî îta'et û 'îbadeta Xwûda kirine.

Di dîwana de, peyva "nebî" bi tenê derbas dibe. Ehlên 'irfanê di wê îdîayê de ne ku ji wan re îlham tê dayîn. Mela ji bo kirina hinek fî'lan îlhama xwe ji me'newîyata ruhê pêxember distîne. Mû'cîzeyeke pêxember jî ew e ku bi îşaretkirina tiliya xwe heyv kiriye du şeq. Birûyên yarê jî weke heyva nû ne. Çawa bi mû'cîzeyê heyv şeq bûye û ji hev veqetaye, yar jî bi badana birûyan, sed ser ji bedenan veqetandine. Ev peyv tenê bi îşareta mucîzeya cenabê pêxember hatiye bikaranîn.

Fetweya pîr û Mela yan tu bi îlhamê *Nebî*
Vê meyê her we dinoşî bi helalî şeb û roz (47/8)

Goşeyên nûnan bi ser badan ji qewsê bêweter
Mislê enguşta *Nebî* sed ser beyandin mahê new (103/2)

Di dîwanê de, navê neh pêxemberan derbas dibe: Adem, Nûh, Îbrahîm, Mûsa, Ye'qûb, Yûsif, Suleyman, 'Îsa û Muhemmed (sxl). Zikirkirina navên pêxemberan, ji bo bihêzkirina mijarê ye. Ji bo pesnê memdûhê, ji bo yarê û ji bo coş û xurûşa 'eşq û

---

[216] "Her çi ew kesên ku ji rêya heq derketine, ew ji dojehê re êzing in." (Sûreya Cinn, 72/15).

[217] "Ez gencîneyeke veşartî bûm, min viya bême niyasîn, vêca min mexlûqat afirandin da ew min biniyasin." (Hedîsa Qudsî). [Ev hedîs, di hedîsên sehîh de cih nagire lewre ev hedîseke mewdû' e. (Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 157).]

[218] "Eger ji ber te nebûya min ev çerx û gerdûn ('alem) nediafirandin." (Hedîsa Qudsî). [Ev hedîs, di hedîsên sehîh de cih nagire lewre ev hedîseke mewdû' e. (Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 157)]

[219] "Ez ê çawa medh û senaya te bikim, lewra medhê te dûrî têgihîştin û pêkanînan e." (Hedîsa Sehîh, Muslîm ji Aîşeyê (ra.) veguhastiye.).

[220] Yusuf Şevki Yavuz, "*Peygamber"*, DİA, Ankara, 2007, c. 34, r. 257-262.

derdan, navên pêxemberan hatine zikir kirin. Bi vî awayî, bi şeklê telmîhê hest û ramanên vebêjerê tesîrdartir dibe.

### 1.1.6.1. Muhammed (sxl.)

Di dîwanê de, pêxemberê herî zêde behsa wî hatî kirin cenabê pêxember e. Çend qesîde û xezel, wek ne'tê ji bo wî hatine nivîsîn. Bi navê Ehmed, Hebîb û nebî"[221] di dîwanê de hatiye zikirkirin. Ne'ta bi navê "Îro ji murada te dilê min bi birîn e (helbesta 101.)" derbarê wî de hatiye honandin. Cenabê pêxember di vê ne'tê de wek hebîb, tebîb hatiye wesifandin.

Navên çend pêxemberan û yên Xulefayê Raşidîn di vê ne'tê de ji ber têkiliya pêxember cih girtine. Felek ji bo wî hatine afirandin, mî'rac bûye nesîbê wî û ji bo xilasbûnê, daxwaza şefa'etê jê tê kirin.

Ger dê tu nebuya nedibû çerxê bidayîr
Sergeşte ji sewqê ne tenê ne felekî ne (101/13)

Carek tu şefa'et ke bi navê xwe ji bo min
Lewra ku Melê xeyrî te îmdadî tunîne (101/15)

Dema Xwûda xwest bête zanîn, ji nûra xwe husnek munezzeh afirand, ji wê nûrê jî alem hate wucûdê yanî heyî çêbûn. Ew nûra ku navê wî bi herfa Mîmê (Muhemmed) dest pê dike, ji nav 'Ereban rabû, ronahiya wî gehişte 'Ecemîstanê jî. Nûra ji roja ehediyetê tecellî bûyî (nûra Muhemmedî), di lîteratûra tesewifê de cihekî giring digire. Bi îşaretî hedîsên mewdû' yên weke "lewlak û nûra Muhemmedî" vê heqîqetê beyan dikin.

Mim metle'ê şemsa ehed ayîne sifet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê "Ecem da (1/3)

Husnek munezzeh sewwirand nûra hebîb jê afirand
'Alem di kunhê heyyirand *Rûhu'l-qudus* can nefxe da (9/57)

Nûrê ji nûra Ehmedî sirra sifatê Sermedî
D'ayîneya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da (9/63)

[221] Di hedîseke şerîf de hatiye rîwayetkirin ku Cubeyrê kurê Mu'tîm (r.a) ji Resulûllah veguhastiye û wî weha gotiye: "Pênç navê min hene: Ez Muhemmed im, Ehmed im, Mahî (paqijger) me ku Xwûda bi min kufir rakiriye û ez Haşîr (berhevkar) im ku însan li ser şopa min berhev dibin û ez Akîb im (ewê dawî). (Muhammed Fuad Abdulbaki Tertibî, *Müttefekun Aleyh Hadisler,* (Wer. Abdullah Feyzi Kocaer), Hüner Yayınları, Konya 2005, r. 623)

Çawa ku cenabê pêxember derbarê Xwûda de di hedîsekê[222] de gotiye ez nikarim wesf û pesnê te bidim lewra taqeta min nagehi, Mela jî bi vê rengê derbarê medhê pêxember de ev kêmasiya xwe beyan kiriye.

Fehma min e qasir weh neşêm wesfê eda kim
Meddah ji te ra Xaliq û hindî melekî ne (101/14)

### 1.1.6.2. Adem

Adem û Hewa, însanên yekem in. Adem, pêxemberê yekem e jî. Adem ji axê hatiye çêkirin. Dema husna muqeddes dibe du qisim, yek wek ‘eql û ruhê ‘ezem dibe misbah û nûra ‘alemê, bêmadde û bêmûdde dibe neqşê Adem û Hewayê.

Yek 'eql û rûhê e'zem e misbah û nûra 'alem e
Hewwa û neqşê Adem e bêmudde bêmadde da (9/83)

Nûra Muhemmedî, ji ronahiya Xwûda tecellî bûye, paşê hemû mexlûq jê hatine çêkirin. Ji ber vê yekê, ji hemû pêxemberan mezintir e. Ew nûra Muhemmedî/mohra pêxembertiyê, ewilî di Adem de şû’le daye û hatiye ketiye eniya Yûsif pêxember. Secdebirina melekan ji Ademî re ji ber wê nûrê bûye. Hezkirina Ye’qûb ya ji Yûsifî, ji ber wê nûrê ye. Herî dawiyê ew nûr hatiye li nik Abdullahê babê pêxember.

Binê berqa tecellayê melek hiştin di Adem da
Ji remza bejn û balayê biruskê rastî 'alem da
Berata zerfeşan dayê bi mehrem mohr û xatem da (131/23)

Mislê te ne Adem weh ne Îbrahîm û ne Nûh
Yûsuf bi te mehbûb û li Yaqûbî şêrin e (101/4)

Peyva “Adem” di wateya însên de wek tewriyeyî tê bikaranîn. Xwûda Ademî hînî navan kir û însan jî yek ji wan navan e. Hînkirina Ademî bi navan wek danezanîna ‘ilm û hikmetê tê şirovekirin. Heke Iblîs waqifê sirra ‘ilmê Ademî bibûya, dê jê re secde bibira.

Barî ji we ‘ellem ku xeberdar kirîn
Îro tu bizan Ademê esma yim ez (49/2)

Ger di Adem bidîya sirrê ‘ilmê Iblîsî
“Hînema ebserehu kebbere hînen we seced” (38/9)

[222] “Ezê çawa medh û senaya te bikim, lewra medhê te dûrî têgihîştin û pêkanînan e.” (Hedîsa Sehîh, Muslîm ji Aîşeyê (ra.) veguhastiye.)

Yar herçendê di sûretê beşerê de jî hatibe xuliqandin lêbelê bi tebî’eta xwe ve, hûrî û perî ye. Ji aliyê din ve weku îşaret bi hinek ayet û hedîsan tê kirin, însan di ziyanê[223] de ye û ji cehennemê re êzing e.[224] Mela, ji ademiyên dewra xwe re, ji însaniyeta wan şikdar e, lewra ferqa wan însanan ji kerê reş û gayê beş tune.

Ey perî horîsiriştê herçend
Bi beşer Ademî û însan î (114/11)

Mebin ev ger bi sûret ademî ne
Hemî dar in ji êgir ra kirî rîz (46/11)

Xaliba ehlê zemanî me Mela ademî yin
Venemayîn ji kerê me’y reş û gayê te yê beş (54/9)

#### 1.1.6.3. Îbrahîm

Îbrahîm pêxember, ceddê cenabê pêxember e. ‘Ereb û Beniîsraîlî ji zurriyeta wî çêbûne.[225] Navê babê wî Taruh (Tarah) û yê dêya wî Ûşa ye. Azer, leqeba babê wî an jî yê mamê wî bûye. Ji welatê Keldaniyan e û di deşta navbera Dîcle û Firatê de, di dewra Nemrûd de jiyaye. Di Qur’ana Pîroz de hinek qisseyên wî hatine beyankirin. Îbrahîm pêxember, bi leqebê Henîf û Xelîlullah tê naskirin. Ji putan re secde nebiriye û her dem li ser rêya rast/henîf bûye. Xelîl, dostê samîmî ye. Ji ber teslîmî û diristbûna wî, Xwûda, Îbrahîm ji xwe re, wek dost hilbijartiye.[226]

Behsa Îbrahîm pêxember, bi muqayesekirina pêxemberê me re hatiye kirin û ew jî yek ji mezinê pêxemberan e (ûli’l-‘ezm), wek pêxember ji wî re bîst suhûf nizil bûne. Qral nemrûd, ji ber ku Îbrahîm putên mabedê şikenandibûn û dijberiya wan dikir, ew avêtiye nav êgir, lê belê bi izna Xwûda ew agir sar bûye[227] û jê re bûye baxçê gulan.

Mislê te ne Adem weh ne *Îbrahîm* û ne Nûh
Yûsuf bite mehbûb û li Yaqûbî şêrin e (101/4)

Ger ji wê hurîbihiştê 'işweyek izhar bit
Dê bibit narê *Xelîlullah* dojeh sarî bit (19/1)

Îbrahîm pêxember; bi xusûsiyetên weke comerdî, qurbankirina kurê xwe Îsmaîl, avêtina nav êgir, bi qelemperî ji aliyê tewhîdê ve û bi şikenandina putan ve

[223] “Bi rastî însan di xusranê de ye.” (Sûreya ’Esr, 103/2)
[224] “Her çi ew kesên ku ji rêya heq derketine, ew ji dojehê re êzing in.” (Sûreya Cinn, 72/15).
[225] Îbrahîm pêxember bi Sara û Hacerê re zewiciye. Îshaq ji Sarayê çêbûye û bavkalê Beniîsraîlîyan e. Îsmaîl, ji Hacerê çêbûye û bavkalê ‘Ereban e. (Canım, b.n.b., r. 197)
[226] “Xwûda, Îbrahîm jî ji xwe re dost girtibû.” (Nîsa 4/125). (Canım, h.b., r. 196-199)
[227] “Me got: Hey agir, ji bo Îbrahîm bibe hênik û bi selametî!” (Sûreya Enbiya 21/69)

derketiye pêş. Peykertraş Azer, di hinek rîwayetan de wek babê wî an jî wek mamê wî tê naskirin û “Azer” leqeba wî kesî ye. Navê peykertraş Azer, di edebiyata klasîk de bi gelemperî bi Îbrahîm pêxember re derbas dibe. Yek peykerçêker e yek peykerşiken e. Azer, tecelliya Xwûda di mehbûbê de nedîtiye, ger bidîtiya lat û menat dê hûr hûr bikira wekî Îbrahîm.

Azerî ger bidîya hûr dikirin Lat û Menat
Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê (121/3)

Di edebiyata klasîk de “senem” bi îstî’areyî temsîliyeta dilberê dike. Xwûdanê/hostayê Latê Azer şîrîndilber e, cihê ku ew lê heye, ew cih weke Ke’beyê pîroz e.

Xundê Latê Azer î tu bê çi şîrîndilber î tu
Her cihê lê bêwerî tu bê xîlaf ew Ke'be ye (97/39)

**1.1.6.4. ‘Îsa (Mesîh)**

‘Îsa, pêxemberê dawî yê Benîîsraîliyan e. Dîroka ji dayikbûna wî wek mîlat hatiye qebûlkirin. Ew li Filistînê, li Nasirayê hatiye dinyayê. Bi pûfkirina Cebraîl, bêbab ji Meryemê re bûye. Incîl wek kitêbeke pîroz jê re nazil bûye û bi xebata 12 hewariyan peyamên wî belav bûne. Împeretorê Romayê, ji ber ku ‘Îsa pêxember daxwaza dewletekê dike, cezayê ‘îdamê dayê. ‘Îsa, di 33 saliya xwe de ji aliyê Xwûda ve hilkêşaye cennetê. Bi goreyî baweriya Mehdîtiyê, ‘Îsa, Mehdî ye yan jî di dewra Mehdî de dîsa dê vegere dinyayê, dê fitneya Deccalî ji dunyayê rake. ‘Îsa pêxember wekî Mesîh, Ruhu’l-quds jî tê nasîn. Di edebiyata klasîk de ew bi mu’cîzeyên xwe ve derketiye pêş. Ji ber tundiyên Yehûdiyan ên li ser Meryemê di dergûşê de xeberdana wî, saxkirina nexweşan û miriyan, bi meshkirin û bi nefesa xwe qenckirina nexweşan, mu’cîzeyên wî yên balkêş in.[228]

‘Îsa pêxember, di helbestên Melayê Cizîrî de bi mu’cîzeyên xwe yên tesîrdar ve derbas dibe. Mehbûb, bi şîfabexşiya xwe ve weke ‘Îsa ye. Ew jî bi remz û razên xwe ve tesîrdar e. ‘Îsa, bi mu’cîze Canbexşî, mesihkirin (Mesîh) û nefesa xwe ve (‘Îsanefes) ku miriyan zindî dike, bi saxkirina birînên nexweşan yên maddî û me’newî ve derketiyê pêş.

Eger de'wayê *‘Îsayî* di 'işqê da bikim ca'iz

[228] Canım, b.n.b., r. 204-207.

Mela daîm tecella ye ji ew terha şelal ebrû (106/12)

Meyyitan ew radikit yekser dilan yexma dikit
Ismê e'zem ma dizanit ya *Mesîha* ew bi xwe ye (93/9)

Mesîha yî li bîmaran kesê geztî du reşmaran
Şehîdên şîr û mûkaran kirî amancê nûbaran (124/9)

Zanim ne tenê ku yedê beyda tu didêrî
Wer xweş ke şehîdên xwe ku *'Îsanefes* î tu (105/2)

#### 1.1.6.5. Mûsa (Kelîm)

Mûsa pêxember kurê Îmran e. Pêxember û xilaskerê Benîîsraîlîyan e. Roja hatî dinyayê bi gotina kahînekî ku dibêje "zaroyek îro dê bête dinyayê û dê dawî li selteneta Fir'ewn bîne", Fir'ewn, wê rojê fermana kuştina zaroyan da. Dayika Mûsa ew danî nav sandoqekê û berda nav çemê Nîlê. Xanima Fir'ewn Asiyeyê ew dît û mezin kir. Mûsa di 40 saliya xwe de eslê xwe hîn bû û ji ber zilma Fir'ewn çû Medyenê. Dema vegeriya Misrê, li Çiyayê Tûrê jê re pêxemberî hat. Mûsa, Fir'ewn gazî dînê heq kir lê belê Fir'ewn êrişî wî kir û Mûsa bi 'eskerên xwe ve bi mu'cîzewî Nîl kire du şeq û di nêv re derbazbû. Fir'ewn û leşkerên xwe ew taqîp kirin û di nîva Nîlê de man û xeniqîn.

Mûsa berê xwe dide Çiyayê Tûrê û agirekî dibîne, li ser darekê dema agir dibîne ditirse û dixwaze vegere. Ji wî agirî dengek tê: "Ya Mûsa, ez Xwûdayê Rebbê 'alemê me." Mûsa diçe secdeyê û dixwaze Xwûda bibîne. Dengek tê: "Tu nikarî min bibînî, lêbelê li çiyê binêre, heke tu bikarî tehemmûlê tecelliya min bikî, tu yê min bibînî." Dema Xwûda tecelliyê çiyê dibe, çiya parçe parçe dibe û Mûsa ji hişê xwe diçe. Asayê wî jî namdar e. Dema asayê xwe diavête 'erdê, asayê wî dibû ejderhayek, marên sihirbazan dadibeland. Di Qur'anê de di gelek ayetan de behsa qisseyên wî tên kirin. Têkiliya wî ya bi Xizir re jî balkêş e.[229]

Dilo er tê meke gazî cewaba "Len teranî" da
Ji ber fikrê di Mûsayî dilê min Tûrê Sîna ye (102/3)

Tûr im bi dil û peyr Mûsa yim ez
Ateşperesê nûrê tecella yim ez (49/1)

Mu'cîzeyên Mûsa pêxember jî gelek in. Ji ber ku li Çiyayê Tûrê Sînayê bi Xwûda re xeber daye wek Musayê Kelîmullah hatiye binavkirin.

---

229 Canım, h.b., r. 214-215.

Dil Ke‘beya Mewla ye lê narê *Kelîm* îsaye lê
Bangê “enellah” daye lê hem Ke‘be û hem Tûr e dil (74/7)

Mûsa pêxember, di dîwanê de ji ber tecelliya Xwûda ya li Tûrê Sînayê ku wî xwestiye Xwûda bibîne, behsa wî hatiye kirin. Ji bo îspata pêxemberiyê, dema destê xwe diêxiste nav palxa xwe û derdixist, destê wî weke nûrekî, spî (yedê beyda/destê spî) dibû û dibiriqîya.

Şa’irî, Kelîm, yedê beyda û Tûrê Sîna wek mezmûn di helbestên xwe de bi kar anîne. Wî jî di heyînan de tecelliya Xwûda (wehdetê wucûd) ditiye û dilê wî Tûrê Sîna ye ji ber ‘eşqa îlahî dişewite. Kesê bawerî aniye û înkariya dîn neke hewceyê dîtina mu’cîzeyan nîne.

Min can *yedê beyda* ye ji 'Îsa çi xeber dim
Min ateşê *Mûsa* diye gulnar û şerabê (112/5)

Mislê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanî xeta hanê xelet (61/2)

Hacet niye cana yedê beyda biderînî
Înkarî di dîn da nebit î‘cazî çi hacet (21/10)

#### 1.1.6.6. Nûh

Nûh pêxember, ji ber tufanê, wekî Ademê duyem tê qebûlkirin. Di Qur’anê de qisseya wî derbas dibe (Sûreya Mu’mînûn, 27). Adem pêxember gelek caran qewmê xwe gazî heqiyê kiriye lê belê wan dijberiya wî kirine û ji rêya rast dûr ketine. Cebraîl ji wî re wehîy aniye ku keştiyekê çêke. Nûh, tabi’ên xwe danîne keştiyê û ji tufanê xilas bûne. Dema tufan xelas bûye keştiya wî li ser Çiyayê Cûdî (di hinek rîwayetan de li ser Çiyayê Agirî) rûniştiye. Nûh, nêzikî hezar salan ‘umir kiriye û ji bo daxwaza ‘umrê dirêj di du’ayan de “Xwûda ‘umrê Nûhî bide te!” tê gotin.[230] Şa’ir di dîwanê de li hemberî ‘umrê Nûh behsa kurtiya zemanê/’umrê xwe dike.

Tali‘ ku dît furset muhlet li nik heram e
Min ‘umrê Nûh nîne were saqî û bi lez xweş (53/7)

Ma te 'umrê Xizr û Nûh û mulkê Zulqerneyn bitin
Gunbeda çerxê melemme' her bi te me'mûri bî (117/17)

[230] Canım, h.b., r. 216-218.

Nûh pêxember yek ji wan pêxemberên mezin e. Şa'ir, dema behsa mezinahiya pêxemberê me dike, wan bi hev re muqayese dike, bi xusûsiyetên wan, mezinahiya wan dipîve.

Mislê te ne Adem weh ne Îbrahîm û ne Nûh
Yûsuf bite mehbûb û li Yaqûbî şêrin e (101/4)

**1.1.6.7. Suleyman**

Suleyman pêxember ji Benîîsraîliyan e û kurê Dawut pêxember e û pêxemberekî hukumdar e. Bi seltenet û hêza xwe ve derketiye pêş. Bi zimanê heywanan zaniye, ji ba û bagerê îstîfade kiriye û di demeke nêzik de çûye mesafeyên dûr. Çawa hukmê însanan kiriye bi mu'cîzewî hukmê cinnan jî kiriye.[231] Di dîwana Melayê Cizîrî de Suleyman pêxember bi text, Belqîsa, hudhud, Asef, xatem û mûriyê ve cih girtiye.

Suleyman pêxember, hakimê ins û cinnan bûye û xwestiye dewleta Sebayê jî bixe bin hakimiyeta xwe. Têkiliya wî ya bi melikeya Sebayê Belqîsayê re giring e. Teyra hudhudê wek qasidekê di navbera wan de çûye û hatiye. Çawa Suleyman hukumdarê dinyayê bûye şa'ir jî di textê dil de xwe wek Suleyman bi hêz û bextiyar dibîne.

Suleymanî me ez dîsa seher hudhud bîşaret da
Cewab anî ji Belqîsa bi hal û sur 'îbaret da
Bi can ez xweş kirim 'Îsa dema wî ew îşaret da (131/11)

Ji neş'a badeya kasê bizat ez xerqê 'irfan im
Ji wê camê ji wê tasê sifetkisra û xaqan im
Ji mihra xemzeelmasê li textê dil Suleyman im (131/10)

Asef, wezîrê Suleyman pêxember e. Ji her aliyî ve alîkariya wî dike, di rêvebirinê de destê Suleyman yê rastê ye. Dema Suleyman gustîla xwe (xatema Suleyman) wende kiriye û ji textê xwe dûr ketiye, Asef ew dîsa aniye ser text. Belqîsa hatiye ser dînê Suleyman û pê re zewiciye. Şa'ir di wuslatbûnê de xwe weke Suleymanî bextiyar dihesibîne.

Minnet ji tali' her ji bext Asef bi text û bext û rext
Belqis ewî anî bi text îro Suleyman î Mela (12/15)

[231] Canım, h.b., r. 219-224.

Mohr û xatem di edebiyata klasîk de sembola lebê yarê ye. Qaşa gustilê bi gelemperî sor e, yaqût û le’l ji rengên xwe ve weke leban sor in. Aşiq hewceyî Suleyman nîne, lewra lebên yarê weke xatema wî şekil girtine û ew sipehîtayî ji yarê re bûye mohr.

Te çi hacet bi Suleymanê husnê
Xatemek le'l e bi gewher anî (114/8)

Di edebiyata klasîk de qisseya Suleyman û mûriyê balkêş e. Suleyman, di seferekê de nêzikî mûriyan bûye û serokê mûriyan xwestiye bikevin malên xwe da ku leşkerên Suleyman wan neperçiqînin. Suleyman vê xeberdana mûriyan dibihîze û di navbera wî serokê mûriyan de diyalog derbaz dibe. Yar di qudret û îhtîşama xwe ve dişibe Suleyman, aşiq jî di destê yarê de ji ze’îfî û belengaziya xwe ve dişibe mûriyê. Aşiq dixwaze yar weke Suleyman wî bibîne û qiymetê bidetê.

Ger çi der dîwanê hedret pur heqîr im şubhê mûr
Çeşmê te çeşmê Suleymanî li halê mûri bî (117/19)

#### 1.1.6.8. Ye’qûb

Ye’qûb Pêxember ji wan pêxemberan e ku di Qur’anê de navê wî derbas dibe. Kurê Îshaq Pêxember e û neviyê Îbrahîm Pêxember e. Leqeba wî “Îsraîl” e, ji ber vê yekê ji zaroyên wî re “Benîîsraîl” hatiye gotin. Duwanzdeh kurên Ye’qûb hebûne û Yûsuf û Bunyamîn ji dayikekê û yên din jî ji dayikekê din bûne. Yûsuf xewnekê dibîne û Ye’qûb ji wê xewnê dizane ku piştî wî dê ew bibe pêxember. Birayên Yûsuf wî diavêjin bîrê û Yûsuf piştî salan li Misrê dibe desthilatdar. Ji hesreta Yûsuf, çavên Ye’qûb Pêxember ji ber girînê kor dibin. Di dema wuslatê de, bi cil û bêhna Yusûf, çavên Ye’qûbî vedibin.

Di edebiyata klasîk de Ye’qûb û Yûsuf bi gelemperî bi hev re têne bikaranîn. Ji ber girîna hesretê çavkurbûna wî û bêhna yarê (bona Yûsûf) ve navê Ye’qûb wek sembol û telmîhê tê bikaranîn. Melayê Cizîrî jî dema ku yarê li nêzikî xwe hîs dike, şukur dike ku ronahiya çavên wî hatiye, herwekî ku bêhna Yusûf bi cilên wî ve ji Misrê hatibû û çavên Ye’qûb li Ken’anê vebibûn.

Şukur bînahiya min hat û *Ye‘qûb* dîde rewşen bûn
Bi boya Yûsufê Misrê li Ken‘anê beser peyda (5/23)

Mela, di bin tesîra yekîtiya hebûnê (wehdetê wucûdê) de di hemû tiştî de nûra Muhemmedî ku ji nûra qedîmî tecellî bibû, dibîne. Ji wê nûrê ye ku Muhemmed (sav),

ewqas şîrîn bûye û felek ji bo wî hatine afirandin. Di muqayesekirina mezinahiya pêxemberan de ji ber wê nûrê ew pêxemberê herî mezin e. Şîrînahiya Yusûf di qelb û çavên Ye'qûbî de jî dîsa ji ber wê nûrê bû ku ew nûr bi sîlsîlewî weke mohra pêxembertiyê derbasî pêxemberan dibû.

Mislê te ne Adem weh ne Îbrahîm û ne Nûh
Yûsuf bite mehbûb û li *Ye'qûbî* şêrin e (101/4)

**1.1.6.9. Yûsuf**

Yûsuf Pêxember pêxemberê Benîîsarîlîyan e, di Tewrat û Qur'anê de derbarê wî de gelek agahî hene. Qisseya wî di Qur'anê de di Sûreya Yûsuf de derbas dibe û Xwûda qisseya wî wek "Ehsenu'l-Qessas/Qisseya herî xweş" nîşan dide. Bavê wî Ye'qûb, zêde jê hez dikir, lewra ew di temenê dereng ê Ye'qûbî de hatibû dinyayê û xweyî xusûsiyeteke bilind ê zîhnî û me'newî bû.[232]

Birayên wî bexîliya wî dikin û rojekê li çiyê wî diavêjin bîrê û kerwaneke ji qebîleya Îsmaîlî tê, Yûsuf ji wan distîne û dibe. Birayên Yûsuf, wî wek koleyê xwe nîşan didin û bi bihayekî erzan wî difiroşin. Kiras/îşlikê wî bi xwîna heywanekî didin û ji bavê xwe re dibêjin gurekî Yûsuf xwariye. Yûsuf, li Misrê tê firohtin û 'Ezîzê Misrê Potîfar wî distîne. Xanima Potîfar Zuleyxa dil berdide Yûsufî û dixwaze murada xwe jê hilde, lêbelê Yûsuf dema jê direve îşlikê wî diqete. Ji ber vê bûyerê dikeve zindanê, ji wê derê xelas dibe û bi şiroveya xewnan dibe desthilatdarê xezîneyê. Di xelayê de birayên Yûsuf jî têne Misrê û hev nas dikin. Yûsuf îşlikê xwe dide birayên xwe da ku bavê wî li çavên xwe bide û sax bibe. Ye'qûb pêxember sax dibe û tê Misrê, dawî bi hesreta wî tê.[233]

Şukur bînahiya min hat û Ye'qûb dîde rewşen bûn
Bi boya *Yûsufê* Misrê li Ken'anê beser peyda (5/23)

Ji vê qisseyê gelek motîf derketine û bi dehan mesnewiyên Yûsuf û Zuleyxayê hatine nivîsîn. Di edebiyata klasîk de spehîtiya Yûsuf, 'eşqa Zuleyxayê, paşve qetîna îşlikê Yûsuf, bi erzanî firohtina wî, şirovekariya wî ya xewnan, wek mezmûn hatine bikaranîn. Yar bi spehîtiya xwe ya bêhempa ve bi Yûsuf re tê teşbîh kirin. Mehbûb dema Yûsufê Sanî be, 'aşiq jî Ye'qûb e. 'Aşiq, weke Ye'qûb di hesreta Yûsuf de izdirabê û sebrê dikêşe heta wuslat peyda bibe.

---

232 Ömer Faruk Harman, "*Yûsuf", DİA*, İstanbul 2013, c. 44, r. 1-5.
233 Canım, b.n.b., r. 233-235.

Ji ber nûra Ehmedî Yûsuf ji Ye'qûb re şîrîn xwûyaye û di dilê wî de weke mehbûbekê cih girtiye, birayên Yûsuf, ew bi bihayekî erzan firohtin û zerer kirin, cezayê bexîliya xwe kêşan û poşman bûn. Yûsuf jî ji hicrana dildariyên xwe (Ye'qûb û Bunyamîn) ve û bi îftîrayên Zuleyxayê ve cer'ekêşê zindanê ye.

Mislê te ne Adem weh ne Îbrahîm û ne Nûh
*Yûsuf* bite mehbûb û li Ye'qûbî şêrin e (101/4)

Bi dînarê denî zinhar da yarê xwe nefroşî
Kesê *Yûsuf* firohtî wî di 'alem da xesaret kir (42/7)

Yûsufê cer'ekeşê hicran im
Nuqteyê daîreyê zindan im(123/2)

Mehbûb, di sipehîtiya xwe de Yûsufê dewr û zemanê ye. Bi gotinên xwe yên lebşekir şîfayê dide nexweşan, lêbelê qet pirsa esîrê 'aşiqê li ber deriyê xwe nake. Mehbûb, di bedewiyê de "Yûsufê Sanî" ye, bi gotinên xwe yên dilaram ve, lêvşekirê 'Îbranî ye, bînahî û dermanê çavê 'aşiqî ye (bînahiya çavên Ye'qûb e).

*Yûsufê* dewr û zeman î go nesîm hat vî nîşanî
Lê ji bo nekhê dehanî nexweşan ew lê mefa ye (95/33)

Purs nekir şahê cehanê Yûsufê dewr û zemanê
Ev çi xak e l'asitanê bel esîrek j'ên me ye (97/21)

Yûsufê sanî tu îro xanim
Ku bi husna xwe nedêrî sanî (114/2)

Yûsufê lebşekerê 'Îbran î
Bes e ger wek te bidêrit sanî (123/6)

### 1.1.7. Xulefayê Raşidîn (Ebûbekir, 'Umer, Osman, 'Elî)

Piştî wefata Pêxember, dewra çar Xulefayê Raşidîn berdewam kiriye û paşê bi Muawiye seltenetî hatiye. Ev çar kesên bijarte di edebiyata klasîk de bi xusûsiyetên xwe yên sereke ve derketine pêş. Di dîwana Mela de di beytekê de navê wan her çar yaran hatine bikaranîn. Ew her çar yar ji ber firaqa Pêxember dinalin. Ebûbekir û Omer qebrên wan li nik rewzayê Pêxember in, yên Osman û 'Elî, jê dûr in û dixwazin bêne li bal Pêxember. Di vê beytê de hem telmîha xalîfeyan hem jî bi tewriyeyî navê Osman û 'Elî hatiye bikaranîn, lewra ev herdu hatine şehîdkirin û di heyata xwe de jî, ji ber

firaqa cenabê Pêxember gelekî dilxemgîn û mehzûn bûne ku her wekî wî firaqê ew kuştî.[234]

Bubekr û ‘Umer herdu ji huba te dinalin
Meqtûl ji fîraqa te çi Osman û ‘Elî ne (101/8)

Xelîfeyê dawiyê îmam ‘Elî (598-661); hem bi eqrebatiyê ve nêzikî Pêxember bûye hem jî di biçûkatiya xwe de li nik cenabê Pêxember perwerde bûye. Ji ber ku berê xwe nedaye pûtan, bi “keremellahû wechehû”yê tê te’zîmkirin. Kunya wî Ebu’l-Hesen (Bavê Hesen), Ebû Tûrab (Bavê Axê) e. Ew bi leqebên Murteza (ewê bijartî), Esedullah (şêrê Xwûda) û Heyderê Kerrar, Şîrê Yezdan, Merdê Xwûda û Şahê Wilayetê tê zanîn. Fedakarê Pêxember e, nesla pêxember bi wî dewam kiriye û mizgîniya cennetê jê re hatiye dayîn.[235]

Îmam ‘Elî bi cesaret û merdaniya xwe ve derdikeve pêş, ew şêr e, Heyderê Kerrar (Şêrê Êrîşker) e û quwwet û qudreta wî, wek sembol hatiye bikaranîn.

Ma qudretê def'ê heye wer şêrê 'Elî bit
Lami' ku bidit sa'iqeya teqdîrê (118/6)

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şêrê *‘Elî*
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê ‘Ereb (14/5)

Ehlê dunyayê seraser dijminê min bin Mela
Piştemîrê min *‘Elî* bit *Heyderê Kerrarî* bes (52/12)

Zulfîqar, şûrê Pêxember bûye û wî ew ji Îmam ‘Elî re hedîye kiriye. Dema behsa Ebû’l-Hesen, şer, quwwet û qudreta wî bê kirin behsa hespê wî Duldulê û şûrê wî “Zulfîqar”ê jî tê kirin. Duldul û Zulfîqar, bi kesayetiya Îmam ‘Elî ve, kompozîsyona cesaret û şerwaniya wî temam dikin. Di beytên jêr de “Zulfîqar û Heyderê Kerrar” bi teşbîhî û mecazî hatine bikaranîn. Tehekkûmiya Xwûda li ser heyînan bi vê teşbîhê hatiye beyankirin.

Rast û çep gav û se‘et her ew li me dadînit
Zulfeqarê qidemê Heyderê Kerrarê hudûs (28/15)

Teb'ê lami'weş ji minnet Bûlhesen
Min di dest da Zulfiqar û Duldul e (99/11)

[234] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.3, r. 381-382.
[235] Canım, b.n.b., r. 239-240.

Îmam ‘Elî, şahê wilayetê/welîtiyê ye. Ew di welîtî û îmametiyê de kesekî sereke ye. Di hedîsekê de Pêxemberê me gotiye “Ez şehrê ‘ilmê me, ‘Elî jî deriyê wê ye.”[236] Di zimanê ehlê tesewwûfê de nêrîn û înayeta meqama welîtiyê giring e. Şêx/welî caran bi nezera xwe, dikare murîdên xwe hînî hinek heqîqetan bike.

Nezera 'eynê 'înayet bi me da şahê wîlayet
Ji 'înayet nezerê ‘eyn tejî 'ilmê hubab e (94/20)

### 1.1.8. Sehabe, Ehlê Beytê (Ehlê Malbata Pêxember)

Ji xeyrî çar xelîfeyan, di helbestên Melayê Cizîrî de wek sehabe û ehlê beytê bi tenê navê Xalidê kurê Welîd û mamê Pêxemberî, Hemze di beytekê de derbas dibin. Şeca’et û qehremaniya yarê (şah), ewên ku wek egîd û qehremanan têne naskirin bilindtir e.

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şêrê ‘Elî
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê ‘Ereb (15/5)

### 1.1.9. Qeza û Qeder

‘Ilmê zatê ezelî yê Xwûda Te’ala, hedîseyên bûyî û yên dê bibin, hemû dorpêç kirine. Wî, bi ‘ilm û îradeya xwe, şert û merc û sedemên bûyer û heyînan bi cih û zemanê ve sînor kiriye. Xwûda ezeliyeta hemû tiştan dizane. Qeder jî ew tiştên di ‘ilmê Xwûda de heyî derketina wan ya li ser ‘alema heyînê ye yanî tecellîbûna wan e. Ew tiştên hatî teqdîrkirin dema bêne vuku’ê/meydanê jê re “qeza” tê gotin.[237]

Melayê Cizîrî; qeza û qeder, bi mevhûmên “teqdîrê muqedder, ‘aqîbet, sirra qederê” aniye zimên. Mevhûma “qeza”yê, bi teşbîha “şahînê qezayê, destê qezayê”, hatiye îfadekirin. Ew kevok/kew dema ji aliyê şahînê ve tê girtin digehije hukmê qezayê. Ew ‘umrê ku hatî teqdîrkirin bi destê qezayê, weke mahê nû tê birîn û jê kêm dibe. Qeza di van beytan de wek îstî’areyî hatiye bikaranîn.

Ew kebkê xeraman ku di kozê bi qebû hat
Şahînê qezayê bi texaful ji xwe ra girt (20/10)

Tu binê mahê new û destê qezayê hey hey
Ne li zer‘ê felekê belkî li ‘umrê me ye das (51/8)

---

[236] Rûdanî, *Büyük Hadis Külliyatı (Cem’ul-fevaid*), İz Yayıncılık, İstanbul 2003, c. 5, r. 120.
[237] Kadı Ebû Şuca’, Ahmed bin Hüseyin *Eş-Şafiî, Delilleriyle Büyük Şafiî Îlmîhalî*, (Wer. Nizameddin Ersöz), Ravza Yayınları, İsatnbul 2005, r. 63.

Muhyîddînê ‘Erebî dibêje; sirra qederê, ew qutubê (tecellîgaha mezherên îlahî) sahîbu’l-weqt e ku bi taybetiyên îlahî tezahur dibin.[238] Sipehîtiya mehbûbê ji remzê sirra qederê ye ku Xwûda ew bi şilklekî mukemmel te’yîn kiriye û afirandiye. Sirra qederê, caran însên di ‘ecêbmayînê de jî dihêle û hikmetên wî veşartî dimînin.

Lew bi husn û nezerê remzê ji sirra qederê bû
Xemriyên seyrê li dêm helqe li dora qemerê bû (122/1)

Ellah Ellah çi tecella te ji sirra *qederî*
Nehêlin çîte tewafê we ziyaret Hecerî (121/2)

Qeza û qeder, teqdîrê Xwûda ne. Xirakirin û veguherandina teqdîra wî mumkin nîne. Tiştên ku bêne serê însên pêwîst e ji Xwûda bê zanîn û disa lazim e însan ji hukmên qeza û qederê re teslîmbûn û rizaya xwe nîşan bide û li ser teqdîrî muqedderê zêde ranewest e, lewra di aqibeta însên de çi heye Xwûda bi însên nedaye zanîn. Tiştê ku hatî teqdîrkirin di derheqê Mela de, şêrê weke îmam ‘Elî jî nikare veguherîne.

Ji ezel ‘aqîbetê karê ku me‘lûm nebit
Camê mey noş û ji teqdîrê muqedder meke behs (27/10)

Ma qudretê def'ê heye wer şêrê 'Elî bit
Lami' ku bidit sa'iqeya teqdîrê (118/6)

Teqdîrê ku hukmî li Melê carî kit
Qet kes heye mumkin bidetê texyîrê (118/14)

#### 1.1.10. Axîret û Mevhûmên Derbarê Axiretê

Axîret, piştî mirinê, dinyaya duyem e û di vê dinyayê de ceza û mukafat dê bêne dayîn. Ji bo heyata piştî mirinê, ravekên weke “axir zeman û roja axirîn” hatine bikaranîn.

Di dinyayê de dema ‘elametên derasayî hatin dîtin, ev bi qiyametrabûnê ve tê şirovekirin. ‘Elameteke qiyametê jî ew e ku roj û stêr dixeyirin û dinya tarî dibe. Tarîtiya şevê û ya qijikê têkilê hev dibin. Dema ruh hatine afirandin, wan soz dane Xwûda ku ew Rebbê wan e û dê li ser ‘ehda xwe bisekinin. Lêbelê li dinyayê hinek bêbext in, li ser soza xwe nasekinin. Hinek jî heta dawiya heyatê li ser soza xwe ya di roja “elest”ê de dayî, dimînin.

Ez dibêm *axir zeman* e dê qiyamet rabitin
Lew şeva tarî kişandî nehişt eswed xurab (16/13)

[238] Suad el-Hakîm, “Kader Sırrı” b.n.b., r. 313.

Min di ber qalûbela batin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser 'ehda elest im ta bi *roja axirîn*
Min divê lê eşkera kim carekê daxa nihîn
Guftem ûra ma du'agowê to em ey hurî'în (91/1)

### 1.1.10.1. Qiyamet

Qiyamet dawîhatina dinyayê ye, destpêka mehşerê û hesabdayînê ye jî. Bi pûfkirina 'Îsrafîlî ya bi sûrê, nîzama dinyayê xirab dibe û bi pûfkirina sûrê ya duyem re jî însan dîsa zindî dibin û li mehşerê kom dibin. Wextê qiyametrabûnê nediyar e, lêbelê elemetên wê hene.

Mela bi peyva "qiyamet"ê behsa qameta yarê jî dike û hunera îştîqaqê û mubalexeyê bi kar tîne. Dêm, dema wekî fesla biharê dibe, bejn û bala wê qiyametan radikin. Bi bejna 'er'erîn ve dema yar bûseyekê dide aşiqî dîsa qiyamet radibe, heşir û neşir dest pê dike. Bi firaqê yarê û bêqametbûna wê, mirina 'aşiqî ye û mirin jî qiyametrabûna însên e.

Leyletulqedr û berat in zulf û cebhet subh û 'îd
Dêm weku fesla biharê lê qiyamet qedd û qam (77/3)

'Er'er xerama me bi qedd û qamet
Yek bûse da me bi sed qiyamet (25/1)

Mela bêqameta yekta qiyamet min bi çehvan dî
Fîraqê rûsiya bin ta ji min canê şîrîn cê da (5/43)

Qamet, qiyamet, qiyam bi hev re îştîqaq in. Qiyametrabûn tarûmarbûna her tiştî ye û her tişt ser û bin dibe. Bi rabûna yarê re zulf dikevin ber bê û belavela dibin û bejnê jî dema qiyam kir ji bo aşiqî êdî rabûna qiyametê ye. Dema yar pora xwe dide ber bê, ew por li ser kompozîsyona yarê digire û ronahiya rûyê wê tarî dike. Ev wek îstî'areyî di roja qiyametê de temsîliyeta xeyirîna roj û stêran dike. Li dinyayê jî dirêjbûna şevan û tarîbûnê wek 'elametên qiyametê tê qebûlkirin.

Te divê zîr û zeber kî me du zulfan bide ber bayê
Te divê qenci qiyamet li me rabit bi xwe rabe (94/26)

Ez dibêm axir zeman e dê qiyamet rabitin
Lew şeva tarî kişandî nehişt eswed xurab (16/13)

### 1.1.10.2. Berzex

Berzex, tê wateya navbera du tiştan/cihan yan deman û navbirê. Cihana miriyan, reşaya navbera deryayan.[239] Berzex, di beytan de bi wateya "qonax"ê hatiye bikaranîn. Ruh dema ji wahidê mutleq tecellî bûye ji qonaxan derbas bûye û ketiye cihê xwe, dîsa ji bedena qefesê derdikeve dîsa ji ew qonaxên ku jê derbasbûyî diçe û digehije eslîyeta xwe ya berê. Di beytên Melayê Cizîrî de ev rêwîtî bi vajîtî hatiye. Yanî di rêwîtiya hatina bedenê de bûye mijar.

Di qonaxa dozexî ya cemedî da, feyza serçeşmeyê coş dibe û heyat/mexlûqat têne wucûdê. Di berzexa/qonaxa bi rengneynikî de, sûretê/tecelliya heqîqetê, her tiştî rohnî dike. Ruh, menzîlan derbas dike û heta tê dikefte laşê xwe. Xelqeyên hebûnê[240] qonaxan derbas dikin û hemû digihijin hev.

Serçeşmeya wê dozexê behra cemalê da rexê
Feyzek ji nûra berzexê dagirt û geh geh fûre da (9/71)

Ew berzexa reng ayîne hingî ku eşya dayîne
Wan tê şemal îsayine jê sûretek 'eksiyye da (9/72)

*Berzex bi berzex* bûne rast nînin di nêv da kêm û kast
Menzil bi menzil her guhast durcê lu'alî huqqe da (9/106)

Danîn di pergaran esil bestin muqabil deh fesil
Vêkra dewair bûn wesil berzex bi berzex xisse da (9/123)

Nûr/ruh, deh qonaxan derbas dike û li cihê xwe yê 'eslî akincî dibe. Ew di qonaxa navan (berzexi'l-esma) de ji hev cûda dibin. Dema nûra 'işqê, ew qelbê ku weke Tûrê Sînayê ye, tecellî bû, ji bo kesê di seyrûsulûkê de, dawî û destpêk dibin yek, yanî ew digihije meqama yekîtiya hebûnê/wehdetê wucûdê.

Ku nûrê 'işqê lami' dit li Tûrê qelbê lami' det
Di seyra *berzexi'l*-esma' nihayat û bidayat (23/4)

### 1.1.10.3. Mehşer

Mehşer, di qiyametê de cihê berhevbûnê ye ku mirî li wê derê careke din zindî dibin. Di mehşerê de, hesaba defteran vedibin û xêr û şer tên hesibandin. Di beytên jêr de, "mehşer û hesab (roja hesab girtinê)" ji bo dirêjahiya zemên hatine bikaranîn. 'Aşiq

[239] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 249; Melayê Cizîrî, b.n.b. (ferheng), r. 358.
[240] Deh fesl/navber (el-meqûlatu'l-'eşer) ev in: cewher, 'erez, çend, çawa, cih, dem, paldan, xwûdanî, serûber, kar, karvedan. (Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 262.)

ji qalûbelê heta roja mehşerê/hesabê li ser soz û peymana xwe ye ku Rebbaniyeta Xwûda qebûl kiribû.

Ew nazika nisbet gulê camek ji Kewser da Melê
Mest im ji ber qalûbelê hetta bi roja mehşerê (113/32)

Min dî sehergaha elest camek ji kewser bû di dest
Jê da Melê lew maye mest hetta hisabê serxweş în (79/21)

### 1.1.10.4. Şefa'et (Mehder)

Mehder û şefa'et, tên wateya bexşîxwazî, xatirdozî û hêviyê.[241] Şefa'et, di mabeynkariya navbera du kesan de ye. Li goreyî baweriyê, Pêxemberê me di roja qiyametê de, bi destûra Xwûda,[242] ji bo bawermendan dê bibe şefa'etkar. Ji vê şefa'etê re "şefa'etê uzma" tê gotin.[243]

Di dîwanê de, bi gelemperî peyva "mehder"ê hatiye bikaranîn. Peyva "şefa'et"ê tenê di ne'tekî de derbas dibe û ev jî daxwaza şa'irî ye ji bo ku Pêxember du'aya 'efûkirinê ji bo wî, ji Xwûda bixwaze.

Carek tu şefa'et ke bi navê xwe ji bo min
Lewra ku Melê xeyrî te îmdadî tunîne (101/15)

'Aşiq, mehderiya xwe di vê dinyayê de dixwaze. Firqet ketiye navbera wî û yara wî. Eger yek bikeve navbera wan, ji bo wuslatê mehderiyê bike dê 'aşiq kêfxweş bibe. 'Aşiq ji her kesê dixwaze ku ew di navbera wî mehbûbê de bibin mehdervan ku di navbera wan de wuslat peyda bibe û mehbûb berê xwe bide 'aşiqî. Kesê bi nukteya remz û razan mehdervaniyê bike, ew xêrxwaz e. Ew kesê ku mehderiyê bike û mehbûb navê 'aşiqî bîne, ew mehderîkirin beredayî naçe û bi vê mehderiyê ew kes sewaba heftê hecan qezenc dike.

Mehdera wê xêrxwazê nukteyek remza mecazê
Wê bi dil seh kir ji sazê muxnî û qanûn û nay e (95/32)

Girtiyem mayim di hebsê kî gelo mehder bikit
Carekê navê me bînit pur sewabek zêde ye (93/2)

Herkesê rabî di behsê carekê mehder biket
Xêrê heftê hec didêrî belku bêhtir ew sewab (16/26)

---

[241] Melayê Cizîrî, b.n.b. (ferheng), r. 396.
[242] "Bêyî izna wî kî heye ku li cem wî şefa'etê bike?" (Sûreya Beqere, 2/255)
[243] Cebecioğlu, "Şefa'at", b.n.b., r. 456

Qelbê ‘aşiqî her dem ji hubba mehbûbê diêşe û dişewite. ‘Aşiq, daxwaza mehderiyê dike ku mehbûb, bi çavê şefqetê lê binêre, wî ji vî agirî xilas bike.

Herdem bi zulmê disojî qelbê ji hubba te'y tejî
Lazim dibêm min dê kujî kes nîne çîtin mehderê (113/26)

Kes nîne lew mehder bikit şefqet li girtiyan bikit
Xemlê ji zêrê zer bikit şefqet lê kit nezerê (113/27)

**1.1.11. Cennet/Beheşt û Mevhûmên Derbarê Wî**

Cennet, di axiretê de mekanê dilaramî û mukafatê ye. Di dîwanê de cennet, bi navê “beheşt, cennet, Cennetê ‘Edn, Cennet’ul-Me’wa, Xuld, Cennatê Xuld û firdewsê” hatiye bikaranîn. Cennet ji bo bawermendan e û dema ew roj hat dê Xwûda ferman bike û bibêje: “Ew cenneta ‘Ednê ye, êdî bi ebedî daxilî wê derê bibin.”

Min li ser bedrê munîr mektûb diye neqşê sewad
Ser bi yek anî du nûnan xettê reyhanî du sad
Hadirî min secde bir lew xerqê xûnê bû fuad
Ber derê baxê wîsaleş hatifî awazi dad
Hazihî cennatu 'ednin fedxulûha xalidîn (91/4)

Di beytên Melayê Cizîrî de cennet hem bi wateya xwe ya rasteqînî ve hem jî bi mecazî/teşbîhî hatiye bikaranîn. Li cihê ku rasterast behsa cennetê tê kirin, qala xusûsiyetên wê derê tê kirin. Xwûda ‘erş û kursî û Cenneta Xuldê û Sidreyê ji nûra xwe afirandine. Perî û horiyan bi xemla xwe cennet nexişandine, horiyên cennetê, melekên subbûhî û quddûsî bi zikrên xwe liqaya mehbûbê dixwazin û melekên din jî tebeq bi tebeq, di cennetê de digerin.

Katib qelem dîsa gerand ismek ji isman sewwirand
Kursî ji nûrê afirand Cennatê Xuld û Sidre da (9/70)

Zalim veşêrî kufrê nema qet di dinê da
Cennet bû muzeyyen xemilîn hor û peri ne (101/7)

Subbûhî û quddûsî û hûrên di beheştê
Peyweste şebê qedrê liqaya te dixwazin (84/6)

Ehsen ji new sebeqan qelem j'qend û nebatê
L'sehîfeya wereqan d’rêjit ava heyatê
Dest bi dest jê tebeqan melek têne cennatê (132/45)

Cennet, bi teşbîhî, ji bo wesifkirina gundê yarê hatiye bikaranîn. Cihê/gundê yarê weke beheştê ye û ew cih weke Ke’beya piroz e. Gundê yarê; Cennetu’l-Xuld

(beheşta herhebûnê), Cennetu'-Firdews û Cennetu'l-Me'wa ye. Mehbûbê gelek nî'met bexşî 'aşiqî kirine, lê ya giring wuslat e, dema wuslat hate cih, 'aşiq êdî xwe di cennetê de dihesibîne.

Wê horîsiriştê li me xweş meywe ye ber kir
Cennat e wesla te û ateşperes î tu (105/11)

Koyê o ya Ke'be ya Beytulmuqeddes ya bihişt
*Xulde ya Firdewsi* ev ya cennet'ul Me'wa sti în (83/9)

Sidre, Sidreyê Munteha; di heft tebeqeya asûmanan de navê meqameke ye. 'Alema kewnî bi vê tebeqeyê hatiye sînorkirin. Sidreyê Munteha, ew meqama dawî ye ku Pêxemberê 'alemê (sxl.) gehiştiyê.[244]

'Aşiqî, dema di dilê xwe de evînek peyda kir, ew ji felek û burcan derbas dibe heta digehije meqama Sidreyê Muntehayê. Di sema û reqsê de, 'aşiq bi hejandin û dirêjahiya zulfa yarê digehije çemê Kewserê û Sidreyê Muntehayê. Zulfa yarê bi dirêjahî û belavbûna xwe ve weke dara Sidrê ye û sîya xwe caran tavêje li ser rûyê/rojê yarê.

'Ilmek numa dil pê nemûc qelbê di 'işqê kit 'urûc
Dê tey bikit çerx û burûc şehper li dara *sidre da* (9/139)

Ser didet abê kewserê zemzemê semayê zulf
Sayenuma ye xawerê *sidreyê muntehayê* zulf (63/1)

#### 1.1.11.1. Hûrî

Hûrî, ew jinên cennetê ne ku bi sipehîtahiya xwe ve derdikevine pêş. Hûrî, ji maddeyên bêhnxweş yên weke sefran, mîsk, 'enber û kafûrê hatine xuliqandin. Lewra pora wan 'enber û mîsk e, birhê wan weke hîlalê ye, rûyê wan weke rojê ronî ye, gotinên wan weke şekirê şîrîn e.[245] Hûrî, di edebiyata klasîk de wek mexlûqatên ji nûrê hatî xuliqandin, têne qebûlkirin.

Sîmînbera neyşekerê ew hûriya nisbet perê
Bejna ji nur dêmîzerê tîr bû ji gulab û mawerê (113/23)

Hûriyên rûhisifet rûhan î
Wek te ser ta bi qedem nûran î (123/6)

[244] Yeğin ûym., "*Sidre*", b.n.b., r. 877.
[245] Canım, b.n.b., r. 148.

Di dîwanê de hûrî wek jinên cennetê hatine teswîrkirin. Husna ji ‘işqê derketî, daye sûretê hûrî û periyan û ew xemlên beheştê ne, di şevên edran de dixwazin cemalê Pêxember bibînin. Hûrî, nazik û mexmûrqeba ne, dêmgul, lebxonçe û şîwekar in, qudsî ne, ji kêmasiyan dûr in, xub, nazik û sûrşirîn in.

Wîldan û hûr in ger perî şirîn û mehbûbên berî
Cumle ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (9/62)

Zalim veşêrî kufrê nema qet di dinê da
Cennet bû muzeyyen xemilîn hor û perî ne (101/7)

Subbûhî û quddûsî û hûrên di beheştê
Peyweste şebê qedrê liqaya te dixwazin (84/6)

Mehbûb, bi sipehîtî, nazdarî û delaliya xwe ve, bi hûriyan re tê teşbîhkirin û ji her aliyî ve ew hûrîsifet/hûrîweş/hûrîmîsal e, hûrî nezer e, hûrîsirişt e û wesla wê ji ‘aşiqî re bihişt e. Ew, hûra bihiştê ye, hûriya serayê ye û weke hûran di meqameke bilind de ye. Herçendê mehbûb wek hûriyan jî be dîsa beşer e û bi libasê cism û can jî be, horîsiriştî û perîruxsariya wê besî ‘aşiqî ye. Ewê, ‘aşiq kiriye êxsîrê xwe, bi pora xwe ew girêdaye. Mehbûb, herçendê hûrî’eyn jî be, di nezera ‘aşiqî de nayête wesifkirin. Ew, ne hûrî ye, ne wîldan û perî ye, ne jî beşer û melek e.

Şemsa felek î ya melek î hêj nizanim
Hurî û perî ya bi xwe Rûhu’l-qudus î tu (105/6)

Me seraperdeyê hûran e meqam
Ji siyeh zulfê butan er veresîn (80/16)

Can û dilê min ew e horiweşê min ew e
Padişahê min ew e em li derê wê geda (8/5)

Hin esmer in hin dêmzerî mehpeyker in surmuşterî
Wîldan û hûr û ew perî min di libsê came da (9/26)

Herçendê yar bi hûriyan re bête teşbîhkirin jî, lê dîsa mehbûb, ji hûriyê spehîtir û delaltir e. Hûrî her çiqas cazîbedar bin jî, ‘aşiq mûyekî yarê bi hûriyekê nade û nezerekê wê mehbûba beşerî, bi hûrên bihiştê nade.

Hor û wildan û perî cumle cema bin îro
Mûyekê pê ji xetê wê but û latê nadim (75/2)

Nezerek wê beşerê lebşekerê hûrîsiriştê
Nadirim ez bi mey û Kewser û hûrên di bihiştê (122/2)

Bejna yarê ji hûrîyan teniktir e, hûrî bêne nik wê dê ji ber şox û şepaliya wê, ji şerm û fediyê dê birevin. Hûrî hemû berhevî ciyekî bin, ji ber husna wê gulbavê ji şerman xûya nabin.

Ew qameta bejna tenik hurî û wildan bêne nik
Filhal dibê rabin ji nik şox û şepala surr ji rav (65/11)

Hûrî ku têk cema bin perî hem di wê gavê
Hemu ji reng çira bin nêzîkî şems û tavê
Ji şerma xuya nabin ji husna wê gulbavê (132/25)

**1.1.11.2. Perî, Perîzade**

Perî, jinên taîfeya cinan in û heyînên semawî ne. Di dîwanê de têkiliya mehbûbê bi periyê re heye. Sipehîtiya yarê bi periyê re wek teşbîhî û îstî’areyî tê qissekirin. Di vê têkiliyê de te’bîrên “perîreng, perîrû û perîzade”yê hatine bikaranîn. Di van teşbîhan de têkiliya tarîtî/zulmet û nûrê derdikeve pêş. Xusûsiyetên melek, hûrî û periyan ji aliyê munezzehbûna ji kêmasî û sipehîtayiyê ve, bi yarê re heye.

Mehbûb, sifethûr e, perîreng e ku di nav lîbasên rengîn de ye û çawa ew nûra munezzeh li Çiyayê Tûrê xwûya bibû û ew der pîroz kirîbû, her wisa ew mehbûba ku ji wê nûrê ye, cihê ew lê xwûya bibe, ji bo ‘aşiqan ew der wisa pîroz dibe. Ji bo nedomdarî/fanîbûna dinyayê pêwîst e kesên ‘aşiq ji ber ‘eşqa wan perîrûyên ku ji nûra munezzeh hatine çêkirin, dev ji dinyayê berdin û ehemmiyetê nedin wê.

Di libsê tarî û nûrê perîrengê sifethûrê
Ji wadê Eymena Tûrê muqeddes kir li min 'erde (92/2)

Beqa nînin li bo tiştî heta kengî bikîn piştî
Di 'işqa wan perîrûyan werin dunyayê da deyn (89/4)

Car caran “perî, perîzade”; rasterast mehbûb e. Di bikaranîna bi vî awayî de xuliqandina wan tê bibîrxistin. Perî û hûriyan sipehitahiya xwe ji nûra Husna Ezelî/Xawer girtine, her çendê nûr di sûretên cûda de jî were meydanê, di heqîqetê de ew ‘eynê nûr in. Dema bi hatina Pêxember zulmet (kufr/tarîtî) radibe, hûrî û perî xwe dixemilînin û cennet muzeyyen dibe.

Wîldan û hûr in ger perî şirîn û mehbûbên berî
Cumle ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (9/62)

Ew latê husn û 'eynê nûr sûret bi sûret tên zuhûr
Ins û perî wîldan û hûr cî cî di wan da cilwe da (9/89)

Zalim veşêrî kufrê nema qet di dinê da
Cennet bû muzeyyen xemilîn hor û peri ne (101/7)

Perî ji taîfeya cinan, mexlûqên nûranî ne û cismê wan nîne. Lê belê şa’ir wan bi cil û bergan de di sûretê mehbûbê de dibîne. Di nav cil û bergan de ew perî bi xwe ye, ew bi xemla xwe ve nîsbetî periya zîba ye û siltana dilan e, wek bê tê dîtin û ji nişka ve wenda dibe û nêrîna mehbûbê ya weke perîzadeyê besî ‘aşiqî ye.

Min dî seher şahê Mecer libsê di ber mexmûri bû
Ew hem durrî surmuşterî ya Reb perî ya hûri bû (107/1)

Me d'vê periya dilberê lê hê li uslûba berê
Lê kifş bibi tu j'pencerê tê û diçi teşbîhê ba (11/5)

Cana ji cemalê te muqeddes qebes im ez
Ger hur û perizade nezerkî te bes im ez (48/1)

‘Aşiq caran xwe ew qas bêbext hîs dike ku bextê wî ji zulfa yarê reştir e, lewra di seherê de perî tên lê ew pê nahese. Mehbûb caran ew qas cazîbedar û sipehî ye, ji perîyan jî wêdetir e. Yar, remzek ji sirra qederê ye, ‘aşiq, mûyekî yarê bi cumleyê periyan nade. Dema ew di cilên sundus de xwûya dibe, ji ber efsûniya wê şah dibin kole, kole jî dibin şah. Perî bendeyên zulfa mehbûbê ya ‘enberîn in û muşteriyê husna wê ne. Hemû periyên rengçira xwe bidin ber tavê, ji şerman, ji ber husna mehbûbê xûya nabin. Yê carekê wê periyê bibîne, hetta ebedê dê zindî bimîne.

Me ji zulfên di siyah reştir bext
Seherê bêt perî bê nehesîn (80/7)

Hurî ku têk cema bin perî hem di wê gavê
Hemu ji reng çira bin nêzîkî şems û tavê
Ji şerma xuya nabin ji husna wê gulbavê (132/25)

Hor û wildan û perî cumle cema bin îro
Mûyekê pê ji xetê wê but û latê nadim (75/2)

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bin xwuya
Bende dê şah û geda bit Xusruwê şîrîn kelam (77/2)

Herkesê carek dîye ew zinde ma hetta ebed
Wê nedidî ew perî dê zindegî lê bit heram (77/4)

### 1.1.11.3. Wîldan

Ev peyv cem'a "welîd"ê ye û tê wateya ew zarokên nûhatî û bêmû.[246] Husn û cemalê Xwûda di dilberan de tecellî dibe û ew dilber di nav cil û bergên xwe de weke mexlûqatên ku ji nûrê hatine xuliqandin (wîldan, hûrî, perî) xûya dikin. Di dîwanê de mehbûb, bi xûy û sifetên xwe ve weke hûrî, perî û wildanan e. Nûr di wan de tecellî dike, nişka ve xwûya dibin û winda dibin û destê 'aşiqî nagehijê ku wesil peyda bibe. Wîldan jî weke hûrî û periyan bi teşbîhî û îstî'areyî hatiye bikaranîn û temsîliyeta menezzehbûna sipehîtiya mehbûbê dike.

Di ter û tazetiyê de, wîldan û mehbûb weke hev in, ew ji tecellîbûna husna Xwûda çêbûne û ew tecellî, bi sûretê lat, perî, ins û wîldanan ve zuhûr dibin. Mehbûb jî di nav lîbasên xwe de weke wildanan e, raqîbên xusûsiyeta wan weke dêwan çav berdidin wan mehbûban, lê 'aşiqê dilbend qebûl nake û dixwaze di rêya yarê de, di yek carê de canê xwe teslîm bike.

Wîldan û hûr in ger perî şirîn û mehbûbên berî
Cumle ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (9/63)

Ew latê husn û 'eynê nûr sûret bi sûret tên zuhûr
Ins û perî wîldan û hûr cî cî di wan da cilwe da (9/89)

Hin esmer in hin dêmzerî mehpeyker in surmuşterî
Wîldan û hûr û ew perî min di libsê came da (9/26)

Teb'îdêwan dest gehiştê hûr û wîldanê behiştê
'Aşiqê dilbendê qiştê can bidit yekcar rewa ye (95/6)

Di van beytên jêrîn de "wîldan" bi wateya xwe ya rasteqîn ve hatiye bikaranîn. Mehbûb, her çendê bi zulfa 'enberîn ve weke wîldanan be jî, bi cemal û sipehîtî û cazîbedariya xwe ve ji wildanan jî wêdetir e û 'aşiq, yara xwe bi hemû wîldanan re venaguhere.

Sef bi sef wildan perî bûn bendê zulfa 'enberîn bûn
Têk li dêmê muşterî bûn reqs û govend û sefa ye (96/13)

Nazikek min seherê dî bi cemalê xwe ne wek
Hûr û wîldan û perî dî ne beşer bû ne melek (70/1)

Hor û wîldan û perî cumle cema bin îro

[246] Melayê Cizîrî, b.n.b. (ferheng), r.424.

Mûyekê pê ji xetê wê but û latê nadim (75/2)

#### 1.1.11.4. Tûba

Dara Tûbayê, dareke beheştî ye, li cihê ku ‘alema şuhûdê xilas dibe, di Sîdretu’l-Muntehayê de cih girtiye. Bi goreyî hedîsan, koka vê darê jor ve ye û çiqên wê jî jêr ve ne. Ew qas mezin e, beheştê sîdar dike. Di edebiyata klasîk de “Tûba” ji bo bejna yarê tê bikaranîn.[247]

Dara Tûbayê dûrbûna yarê sembolîze dike. Bi kêmasiyan (destkurtî û ling topalî), ‘aşiq nikare bigehije wê. Destkurtî û topalî, ji weslê re asteng in. Bejna yarê zirav û dirêj e û weke dara Tûbayê ye, lêbelê ew dar ji derveyê ‘alema şuhûdê ye, ‘aşiq jî nexweş e, destên wî kurt in û lingê wî topal e, nikare xwe bigihîne wê bejna dirêj. Yanî di newesilbûnê de qebehet yê ‘aşiqî ye, lewre kêmasiyên wî hene.

Me dixûnin qed û bejna te ye şeng
Nêrgizên mest û bi naz in neyreng
Lê tu Tûba û ezê xeste me leng
Çi bikim feyde ku êvar e dereng (123/5)

Berê meqsûdê ji Tûbê negirîn melûm e
Me ji destê xwe yê kotah û ji payê xwe yê leng (71/4)

#### 1.1.11.5. Kewser

Kewser, ava beheştê ye. Di tefsîrên Qur’anê de ev av weke çem, gol û hewzê hatiye teswîrkirin. Di hedîseke ku Tîrmîzî rîwayet kirî de, wesfên vê avê weha hatiye kirin: “Ew li cennetê çemek e. Herdu kenarên wî ji zêr in. Cihê ku ew tê de dikişe li ser durr û yaqût in. Bêhna axa wî ji bêhna miskê xweştir e. Ava wî ji hingivîn şirîntir e; ji berfê spîtir e. Ewê ku carekê jê vexwe, ew piştî wê heta hetayê tî nabe.”[248] Kewser, di dîwanê de weke “kewser, hewza kewserê, abê kewserê, cama kewserê” derbas dibe.

Meya ku mehbûb bi destên xwe bide, ji ava kewserê xweştir e, Mela di sehergeha elestê/qalûbelê de qedehek ava kewserê vexwariye ji destê yarê, heta roja hesabê/mehşerê dê serxweş bimîne.

Bi serenguştê ‘eqîqî bide şehkasê rehîq
Abê heywan te çîn nav ji Kewser meke behs (27/3)

Xef da me cama kewserê şêrinqed û lebşekerê

---

[247] Canım, b.n.b., r. 546.
[248] Bi rastî me kewser daye te. (Sûreya Kewserê, 108/1). (Şoşikî, b.n.b., c. 6, r. 832-833.)

Bayê seba da pencerê hatin sema şetrî û lef (64/2)

Min dî sehergaha elest camek ji kewser bû di dest
Jê da Melê lew maye mest hetta hisabê serxweş în (79/21)

Ew nazika nisbet gulê camek ji Kewser da Melê
Mest im ji ber qalûbelê hetta bi roja mehşerê (113/32)

Di edebiyata klasîk de “ava kewserê, lebê yarê” bi hev re têne bikaranîn. Ev herdu têgeh arzûyekê beyan dikin. Leb/lêv, wuslatê temsîl dike û kewser jî bi mecazî beheştê temsîl dike. Têkiliya Kaniya Kewserê bi rûyî re heye. Kaniya Kewserê ji hewza baxçeyê qudretê ye. Yek baxçeyê beheştê dinexişîne, yek yarê. Çav jî yek ji wan nexşan e û nêrînên wan çavan ji ava Kewserê xweştir in.

Hewza ji Kewser çeşme tê ya cih di rewda qudretê
Herdem ji nurê ser da tê xemrî û tayên 'er'erê (113/10)

Nezerek wê beşerê lebşekerê hûrîsiriştê
Nadirim ez bi mey û Kewser û hûrên di bihiştê (122/2)

Bidestxistina pora yarê, îşareta wasilbûnê ye. ‘Aşiq, bi semayê wasilê zulf û Ava Kewserê dibe. Kewser di beheştê de ye, bi serdanê/mirinê ancax di cennetê de wasil peyda dibe. Hewza Kewserê temsîliyeta lêva yarê jî dike. Pora yarê ya ‘enberîn û xelekî tê ser rûyê yarê û digihije Ava Kewserê/lêva yarê.

Ser didet abê kewserê zemzemê semayê zulf
Sayenuma ye xawerê sidreyê muntehayê zulf (63/1)

Zuhra û Mah û Muşterî min dîn li dêmê enwerî
Zulfa muselsel 'enberî ser daye Hewza Kewserê (113/9)

#### 1.1.11.6. Selsebîl

Selsebîl çemekî beheştê ye. Li wê derê, ew av ji mu’minan re dê bête pêşwazîkirin. Selsebîl, ji bo lebê yarê bi teşbîhî hatiye bikaranîn. Lebên yarê sohr in (le’l, badeyê engûr) û tîbûna (selsebîl) ‘aşiqî dişkîne. Dema badeyî, şeraba tirî û ava selsebîlê nas kiriye, bi lêvên yarê re muqayese kirine, ji ber şirîniya wan leban ketiye heyretê û şermende bûye.

Lew ji lebê le‘lê te bû cam xecil
Badeyê engûr kuca selsebîl (72/3)

#### 1.1.11.7. Baxê Îremê, Bihişta Îremê

Qralê qewmê Adê Şeddad, daxwaziya xwedawendiyê kiriye û di navbera Şam û Yemenê de bi teşbîhê beheştê, di nav baxçeyekî de koşkek çêkiriye û navê “Baxê Îremê” lê daniye. Ew xusûsiyetên ku beheşt pê tê teswîrkirin di Baxê Îremê de jî hebûne. Di edebiyata klasîk de yar û spehîtiyên rûyê yarê bi “Baxê Îremê” têne teşbîhkirin.

Mehbûb, lale û guldesteya Baxê Îremê ye. Gulşenê Baxê Îremê, bi kînayewî dêmê yarê ye û neyşeker jî bejn û bala wê ye. Mehbûb, xweyî cemalê gulistanê ye, eger ji wê cemalê yek gul tenê xwûya bibe, ew beheşta ku ehlê dinyayê medhê wê dikin, dê navê wê li dinyayê bête bîrkirin.

Guldesteyên nûrînqedem destan ji enguştan qelem
Ew laleyê Baxê Îrem mawer li zulfan jale da (9/25)

Ya Reb ew guldesteyê Baxê Îrem
Dûr nebit jê her seher badê seba (10/4)

Gulşenê Baxê Îrem neyşekerên muhterem
Cumleyê ehlê herem zemzeme wan subhi dem (50/6)

Ji gulistana cemalê te gulek bête zuhûrê
Ji dinê dê biçitin navê bihişta Îremê  (109/8)

Beheşt û Baxê Îremê têne muqayesekirin. Bi goreyî ‘aşiqî beheşt, Baxê Îremê ye, lê bayê sûbê dibêje ew baxçeyekî Sebayê ye. Baxê Îrema Sebayê, bi hurremî û her daîm bi sûbebûna xwe ve weke beheştê ye. Ne tenê welatê Belqîsayê weke beheştê ye, Botan jî weke Îremê ye, herçendê ‘aşiq bêserwet û saman be jî, di Baxê Îremê Bohtan de, ew weke gulekê bêhempa ye.

Çendekê çemen hurrem bû lê medam wek subhedem bû
Min bihişt Baxê Îrem bû lê seba go min Seba ye (96/12)

Tu mebîn bêser û bêsaman im
Gulê baxê Îremê Bohtan im   (123/2)

“Baxê Îremê” bi rasterast di cihê beheştê de hatiye bikaranîn. Wasilbûna yara heqîqî, di beheştê de pêk tê. Dema ‘aşiq daxilî Baxê Îremê bû, layiqî qencî û letafetên wê derê dibe.

Yarê heqîqî Xaliq e çîn canfida da vêkevîn
Rast û durust û sadiq e çi reng bi şûna rê kevîn

Qenc û letîf û laiq e d'Baxê Îrem da vêkkevîn (132/15)

### 1.1.11.8. Lewhê Mehfûz

Lewhê Mehfûz, tablo, dep û kevala parastî ye. Li ser vê kevalê/depê, tiştên bi qudreta Xwûda dê bêne wucûdê, hatine nivîsîn. Di Qur'ana Mûbîn[249] de tê gotin ku "Qur'ana Pîroz" jî, di Lewhu'l-Mehfûzê de cih girtiye. Tê gotin Xwûda ewilî "lewh û qelem" afirandine. Tiştên ku di vê kaînatê de dê bêne wucûdê, qelemê li ser lewhê nivîsîne. Qelem û lewh sembol in. Qelem, îradeya Xwûda û lewh jî 'ilmê wî ye.[250]

Lewh, di dîwanê de, bi termên nivîsînê yên weke "qelem, kîlk, xame, herf û xeti nexş"ê ve, kompozîsyoneke tenasûbî pêk tînin. Lewh, di dîwanê de weke "lewh, lewhê sîne, lewhê 'edem, lewhê sîmî, lewha ewwelê, lewha ehed" derbas dibe.

Lewh û qelem, ji bo afirandina ewwelîn û destpêkirina xulqiyetê hatine bikaranîn. Ji bo ku wesf û kemalatên Xwûda bêne xwûyakirin, Xwûda "qelem (îrade) û lewh ('ilm)" afirandin. Ji şeraba/'eşqa ezelî nûn û qelem hatine afirandin. Di wê lewheya ewwelîn de teqdîra rizq û nesîbê heyînan hatiye nivîsîn. Bi nivîsîna Lewhê Mehfûzê meqsed ew bû ku neqş û heyînên mecazî pê bêne çêkirin. Hukmê Xwûda di teqwîma qedîm de, di 'alema suflî de, li ser lewhê reqîm xwûya bû. Ew 'ilmê ku li lewhê hatî nivîsîn jê re cismek lazim bû ku xwûya bike. Xwûda, lewheya heyûlayê sûret bi sûret, bi nûra xwe ya zêravî xemiland. Neqqaşê sernivîsa ewwelîn, ji serî heta binî, bi herfên nûranî lewheya nebûnê/'edemê, di çeşne û ahengekê de neqişand.

Wesf û kemalatên subûh herfên kîtaba 'eql û rûh
Ismek divê lê bin wuzûh lew lewh û kilk û xame da (9/73)

Saqî ji xemra ezelê nûra qelem jê afrand
Darêt lewha ewwelê rizq û nesîb qeddirand
Ew bû murad mes'elê neqşê mecaz sewwirand (132/9)

Yek jê ji teqwîma qedîm lê bû neseq hukmê hekîm
Avête wê lewhê reqîm ew 'alema sufliyye da (9/114)

Ew nusxeya 'alîisim lewhek divê jê ra cisim
Da herfî lê bin murtesim herfan şikil nûriyye da (9/74)

Sûret bi sûret lê kişand lewhê heyûla neqqişand
Zîrav ji nûrê lê reşand teqwîm û şekl û xane da (9/121)

---

[249] Bi rastî ew (ya ku tekzîba wê dikin) mezin e û ('eslê wê) di Lewhu'l-Mehfûzê de ye. (Sûreya Burûc, 85/21-22)
[250] Canım, b.n.b., r. 160.

Nûr in ji ser hetta qedem neqqaşê sermeşqê qidem
Pê zeyyinand lewhê 'edem yek yek di wan da çeşne da (9/16)

Qelb, tecellîgaha îlahî ye, ew der pak û paqij e. Çawa ku ‘ilmê Xwûda li ser lewhê hatiye nivîsîn, Xwûda jî bi gelek sifetên xwe ve di qelbî de tecellî dibe. Singê/qelbê însên jî weke Lewhu’l-Mehfûzê ye, ji aliyê îmla û înşayê ve sade ye, pak û paqij e. Di lewhê sîneyê de Xwûda tecellî dibe, lewra qelb, bi herfên nûranî hatiye neqişandin.

Di baxê lefz û me'nayê suxen min serwi azad e
Ji vê îmla û ji înşayê me lewhê dil numa sade
Ji husnê rewneqek dayê ku Şeyx Ehmed me ustad e (131/38)

Herfên reqemê lewhê wucûda me bixwazin
Da qenc bibînî ku çi îmla yim ez (49/4)

Di vê ayîneyê zanî ku hikmet tête te'lîme
Ku herf in taze nûranî di lewhê sîne teqwîme
Ji bala Tûrê însan î nezer da sa'idê sîme (131/25)

Serê însên, weke denê meyê (xum) ye û heft den; dev, du çav, du gûh û du kûnkep in. Di meyxaneya qidemê de Xwûda feyz daye qelemê, li ser rûyê însên ew heft xûm bi ‘eşqê hatine neqişandin. Sûretê însên weke lewhê ye û li ser wî herf (çav/nûn, birh/sad, dev…) hatine nivîsîn. Îradeyê, feyz daye qelemê, ‘işq rêhtiye li ser rûyê însên. Ew destxetên katib Semed nivîsî di lewheya ehediyetê de, ji nûra cemalê wî, bê’eded hatine neqişandin. Ew herfên katib nivîsî, dema talîb ew xwendin û pê agahdar bû, ji dil sed ah û ûf kêşan.

Heft xumê tejî bade di meykedeya qidemê
Ji xuma ku min îrade 'işq rêhte cama Cemê
Lewhê lê nûn û sade lew feyz da qelemê (132/8)

Ew destxetên katib Semed Wahid li ser lewha Ehed
Neqşek reşandî bê'eded ce'da cemalê şane da (9/52)

Katib nivîsîn ew hurûf her talibê pê bû wuqûf
Hatin ji dil sed ah û ûf serxet li lewhê sade da (9/51)

Dêmê mehbûbê, bi nuqteyê mîsk û xetê ‘enber ve, lewhê sîmî ye, ji bo rûyê yarê biriqîn û xal lazim in û ji bo aramî starbûna dilî jî li ser rûyê yarê zêrav pêwîst e bê reşandin.

Kifş e me‘na kî li lewhê sîmi dî

Nuqteyê misk û xetê ‘enber ‘ebes (26/10)

Lewhê ji nû sîqal beden her dem ji nû ve xal bidin
Da dil bi yekdî pal bidin nuqtan bi zêrabê weşîn (79/11)

#### 1.1.11.9. Elest û Qalûbela

Elest û Qalûbela du îbareyên ‘erebî ne. Elestû, tê wateya “Ma ez nînim” û “Qalûbela” jî tê wateya “Belê gotin”. Ev te’bîr ji Sûreya Arafê hatiye derêxistin.[251] Ev peymana ku di navbera Xwûda û însanan de çêbûyî, wek “qalûbela,’ehda elest, sûbha elest, sehergeha elestê” hatiye binavkirin.

Di dîwanê de bi te’bîrên “qalûbelê û elest”ê, bi telmîhî peymana di navbera Xwûda û însanan de tê bibîrxistin. Mela di rêveçûna xwe ya rêya rast de û sekinîna li ser soz û peymana xwe ya bezmê elestê, tîne bîr. Di pêşiya qalûbelayê de ev ‘alem, çerx û dewran û felek tunebûne. Hêj beriya “qalûbelê”, Xwûda qelbê Mela bi xwe ve girêdaye, Xwuda ‘eşq û muhebbeta xwe (camek ji kewserê) xistiye dilê ‘aşiqî û heta roja axirîn ew li ser soza xwe ye û dê wisa mest bimîne.

Hê di ber qalûbelayê belku ev 'alem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû (104/1)

Ellah di ber qalûbela da yexme ket qelbê Melê
Avêhte çerxê cedwelê evrenge ‘enberbarê xet (59/12)

Min di ber *qalûbela* batin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser 'ehda *elest* im ta bi roja axirîn
Min divê lê eşkera kim carekê daxa nihîn
Guftem ûra ma du'agowê to em ey hurî'în
E'redet 'ennî weqalet ma du'au'l-kafirîn (91/1)

Ew nazika nisbet gulê camek ji Kewser da Melê
Mest im ji ber qalûbelê hetta bi roja mehşerê (113/32)

#### 1.1.11.10. Kuntu Kenzen û Lewlak

“Kuntu Kenzen”, tê wateya gencîneya veşartî. Di Hedîsa Qudsî de, Xwûda weha ferman kiriye: “Ez gencîneyeke veşartî bûm, min xwest ez werim naskirin. Min xelq afirandin de ku min nas bikin.”[252]

---

[251] (Hey Muhemmed!) Dema Xwûdayê te ji pişta ademiyan zurriyeta wan girt û ew xwe bi xwe li ser hev kirine şahid (û ji wan re got): Ma ez ne Xwûdayê we me? Hemûyan got: Belê, em şehdeyiyê didin (ku tu Xwûdayê me yî). Eve da ku hûn roja qiyametê nebêjin: Em jê bêhay bûn. (Sûreya Araf, 7/172)
[252] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 157; Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 256.

Lewlak(e), îbareyeke ‘erebî ye, tê wateya “ger tu nebûya”. Ji hedîseke qudsî hatiye girtin. Ji bo giringî û hurmeta Pêxember, Xwûda ferman kiriye: “Ger tu nebûya min ev felek nediafirandin.” Ehlê tesewwifê zêde îtîbarî vê hedîsê dikin, lêbelê ev ne hedîseke sehîh e. Di Quranê de ji bo afirandinê armanceke din tê beyan kirin.[253]

Di vê beyta jêr de behsa sebebê afirandinê tê kirin. Yê ku ji sirra gencîneya veşartî agahdar e, ruh dikare jê re bi sed cûreyî, wateya hedîsa ku ji bo Pêxember hatiye gotin, “ku ew nebûya min ev ‘alem nediafrand”, şirove bike.

Ger xeberdar î ji sirra “kuntu kenzen” guh bidêr
Da bi sed nurê beyan ket me‘na lewlakê rûh (33/3)

### 1.1.11.11. Buraq

Buraq, hespê cennetê ye. Di şeva Mî’racê de, Cebraîl ji Pêxember re ev hesp aniye û ew lê siyar bûye, ji Mescîda Heremê heta Mescîda Eqsayê çûye, ji wê derê jî, bi siwarî çûye esmanan.[254]

Buraq, bi teşbîhî ji bo hespan hatiye bikaranin. Bi goreyî hinek gotinan, di şeva Mî’racê de ne’lên Buraqê li ku derê hişk û ziwa biketa av jê dizî û hêşînahî çêdibû.[255] Şa’ir jî ji bo memdûhî du’ayan dike û dixwaze hespê wî jî weke Buraqê pîroz û bereketdar bibe.

Her derê ne'lê feres şubhet Buraqê vê kevit
Çeşmeyê heywan ji ew 'erdê mubarek fûri bî (117/16)

### 1.1.12. Dojeh (Seqer, Nîran, Cehim)

Dojeh, di axiretê de cihê ‘ezabê ye. Bi goreyî baweriyê, dojeh ji heft tebeqeyan pêk tê û heft deriyên wê hene. Di dîwanê de, bi peyvên wek dojeh, seqer, nîran û cehîmê hatine ‘emilandin. Dojeh; bi peyvên weke “nar, berq, sohtin û dûd”ê re bi goreyî têkildariya wê hatiye bikaranîn. Dojeh, bi taybetî ji bo êşa ‘eşqê, weke teşbîhî, di dîwanê de cih girtiye.

‘Ezaba ‘aşiqî ya derbarê ‘eşqê de kêşayî wek “eşqa dojehê” ye ji behra agirê îlahî, ji ber husn û cemalê wê mehê, ‘aşiq di agirekî weke rengê dojehê de dişewite û ew agir li ber perdeya dilê wî hatiye veşartin, eger berqek ji mehbûba weke rojê

253 Min, cin û însan bes ku ji min re ‘îbadetê/perestiyê bikin, xuluqand. (Sûreya Zariyat, 51/56)
254 Canım, b.n.b., r. 483.
255 Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., c.2, r. 252.

ronîdar, zahir bibe, ew qelbê weke dojehê dişewite, dê hênik bibe, agirê cehennemê, bi izharbûna ‘işweyeke mehbûbê, dê vemire û bibe narê Îbrahîm Pêxember ku ew tê de neşewitîbû.

Zanim ji 'işqa dojeh î behrek ji narê îlahî
Îro li mahê xergeh î teşbîhê seywan î Mela (12/5)

Narê ji rengê dojehê husn û cemalê wê mehê
Me d'perdeya vê xergehê xef kir çi 'umman î Mela (12/9)

Eger berqek ji wê rojê ji ber wê 'iqd û bişkojê
Bidit qelbê wekî dojê li ber doje dibit berde (92/17)

Ger ji wê hurîbihiştê 'işweyek izhar bit
Dê bibit narê Xelîlullah dojeh sarî bit (19/1)

Dilê ‘aşiqî, ji ber sohtina ‘eşqê, bûye seqer, ji ber ahên ‘aşiqî dinya bûye agir û dûd, lewra ji ber evînê di dilê wî de agirek heye, weke dojehê disoje. Eger ew hûriya beheştê xwe nîşanî ‘aşiqî -ku weke agirê dojehê dişewite- bide, dê her tişt bibite wekê beheştê.

Bêhed ji dil nalî ke‘îb da bexçeyan ridwanê xeyb
Van naliyan nînin tu ‘eyb sohtîne em dil bû seqer (43/9)

Li me êş û eleman zêde ji tîra Qeçerê bû
Dil ji me bûye pelek can û cesed têk seqerê bû (122/1)

Ji ber ahên me dinê agir û dûd bit ne 'eceb
Me di dil da heye narek ku disojit seqerê (126/8)

Ger xwe nîşa seqerê dit dikirit hûrîbihişt
Ke'beya tê bit ew meygede û dêr û kenişt (121/1)

Têkiliya reşatiyê, bi agir û sohtinê re heye. Tiştê ku bişewite bi gelemperî ji paş xwe ve reşatiyekê dihêle. Cil û porê yarê yên reş ku ronahiya rûyê wê vedişêre bi ‘eşkereyî şewata dilê ‘aşiqî îlan dikin. Agirê dilê ‘aşiqî yê weke dojehê dişewitîne, ji her aliyî ve, bi arzûyan hatiye dorpêçkirin.

Cilbabû duca sudxike îlhabe fûadî
Yehkîke 'iyanen
Niranû cehimî hucîbet bi’ş-şehewatî
Min kulli cîhatî (127/4)

#### 1.1.13. Mevhûmên Bawerîyê yên Mayî

##### 1.1.13.1. Mî'rac, Şeva Qedrê, Berat, Terfetu'l-'eyn

###### 1.1.13.1.1. Mî'rac

Mî'rac û îsra di yek demê de çêbûne. Îsra, çûyîn û vegerîna Pêxember (sxl.) e ku bi şev ji Mekkê heta Qudsê çûye û hatiye. Mî'rac, ji hilketina wî ya asîmanan û ji gihaştina wî bi Sidretu'l-Muntehayê re tê gotin."[256] Mî'rac, di 27ê meha Recebê de, bi rehbertiya Cebraîl, derketina Pêxemberî ya 'erşê ala ye û li wê derê bi Xwûda re xeber daye û vegeriyaye. Pêxemberê me bi vê rêwîtiyê, di meqamên herî bilind re derbas bûye û heta Sidretu'l-Muntehayê Cebraîl pê re çûye û êdî Cebraîl jî nekariye derkeve meqamên din. Bi mî'racê, delîla bilindahiya mertebeya Pêxember û mezinahiya şanê wî ku ulu'l-'ezm e hatiye îfadekirin.[257]

Xwûda bi mî'racê, kerem digel Pêxember kiriye û ew bilindî 'esmanan kiriye. Pêxember tenê gehiştiye wî meqamê bilind û ev qencî di gel tu kesî nehatiye kirin. Di vê rêwîtiyê de Cebraîl ji Pêxexmber re bûye qasid ku di gelek merhaleyan re derbas bûne.

Mî'racê te kir kes dî nekir sedrê rîsalet
Qasid ji Xwedê ra bo te Cibrîlê emîn e (101/5)

###### 1.1.13.1.2. Leyletu'l-Qedr (Şeva Qedrê) û Şeva Beratê

Tecellîyên di şevên mayî de pêknehatî di vê şevê de pêk tên. Ehlê zahîr, vê şevê di deh rojên dawî yên meha Remezanê de digerin. Goreyî ehlê tesewwûfê, ev şev nayê sînordarkirin û di hemû şevên salê de dikare bê dîtin. Îbnu'l Erebî, dibêje ku wî şeva qedrê, di şeva 15ê meha Şe'banê de dîtîye.[258] Şeva Qedrê, roja 27ê meha Remezanê ye ku Qur'ana Pîroz dest bi nazilbûnê kiriye.[259] Bi goreyî Sûreya Qedrê, ev şev ji hezar mehan çêtir e, lewra ferişte û ruh bi destûra Xwûdê, ji bo selametî û aramiyê, heta hilatina fecrê dadikevin 'erdê. Şeva Beratê jî, yek ji wan şevên pîroz e û roja 15ê meha Şebanê ye ku di wê şevê de ji Pêxember re, pêxembertî hatiye dayîn.

Şeva Qedrê û Şeva Beratê, di dîwanê de bi hev re, ji bo beyankirina bereketa van şevan û nêzikbûna 'îdê (wuslat) hatine bikaranîn. Piştî Şeva Qedrê 'îd tê û mehbûb

---

[256] Ebdulhadî Botî, *Peyxamberê Ummetê Hz. Muhemmed*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 1998, r. 53-54.
[257] Ramazan el-Bûtî, *Fıkhu's-sire*, (Wer. Atik Aydın), Bilge Adam Yayınları, Van, 2006, r. 136-137
[258] Kaşanî, "*Leyletu'l-qedr"*, b.n.b., r. 476.
[259] Bêguman e ku me Qur'an di Şeva Qedrê de şandiye xwarê. (Sûreya Qedr, 97/1).

diyar dibe û wuslat çêdibe. Heyînên beheştê wê şevê (ruh û ferişte) liqaya Pêxember dixwazin û daketina ferişteyan ya ‘erdê wek hunera husnê te’lîlê hatiye beyankirin. Ji bo aramî û vejînê daxwaza ruhî tê kirin, erwahên muqeddes di şeva Qedrê de mehbûbê dixwazin, rohniya wê ye di qendîlan de diçirise û eger ew were êdî ji ber rohniya wê ji mûm û şepalê re hewcedarî namîne. ‘Aşiqê ku bixwaze di vê şevê de ava heyatê binoşe, pêwîst e dest bavêje gerdena pîrî û li ber zulfa wê serê xwe bitewîne.

Subbûhî û quddûsî û hûrên di beheştê
Peyweste şebê Qedrê liqaya te dixwazin (84/6)

Şebê Qedrê li me rewşen ke tu rûh î were xweş
Me ji nû xweş ke li ser çehvên şehîdên xwe bimeş (54/1)

Erwahê mûqeddes şebê Qedran te dixwazin
Nûra te ye misbahê di qendîlê herem da (1/6)

Di *şebê Qedrê* tecellî tu bikî
Me li pê mûm û şepalê çi xered (57/9)

Abê heywan te divê rastî binoşî şebê Qedrê
Desti ber gerdenê pur pêç û xem an zulfê du ta be (94/23)

Mehbûb, ji bo xatirê vê şevê bersîva ‘aşiqê xwe dide û diyar dibe. dema Zuhre û Sureyya di rojhilatê de kifşe dibin, Şeva Qedrê ji mexribê de perdeya xwe diavêje û dest pê dike. Di şeva Qedrê de eger wasilbûn peyda bibe, pîroziya vê şevê zêdetir dibe û êdî naxwaze vê şevê bi Şeva Beratê re veguhere. Piştî Şeva Qedrê ‘îd jî tê û rojên xweş peyda dibin, daxwaza ‘aşiqî ew e ku her rojên mehbûbê weke şevên Qedran û rojên ‘îdê be.

Zuhre û ‘iqd û Sureyyayê di şerqê keşşifîn
Leyletu’l-Qedrê ji mexrib perde dayê rast û çep (17/13)

Ez û yar ger şevekê herdu hem axûş bibin
Leyletu’l-Qedr e me ew şev bi Beratê nadim (75/4)

Hindekî roj û şev in têk 'eyd û Leyletu’l-Qedr
Cam medam pur bade bî lê ne j'meya engûri bî (117/14)

Di dîwanê de, di navbera şevê û pora yarê ya reş de têkiliyek hatiye çêkirin. Por reş e û enî ji weke hîvê dibiriqe. Zulfa yarê ya sunbulîn li ser eniya yarê ya mehcebînî daliqiye û perçemên wê jê re bûne seywan. Ev dîmena zulfê, weke sef girêdana ferişteyan ya ku di şeva Qedrê û Beratê de, hatiye teheyyûlkirin. Zulf hêdî hêdî xwe dide paş û heyv/cebhet derdikeve meydanê û bi zahirbûna eniya mehbûbê

êdî ‘eyd dest pê dike. Bi şefqet û merhemeta mehbûba şox û şepalê, perde radibe wuslat çêdibe û ev wuslat di salê de carekê peyda dibe.

Du sunbul rast û çep bedrê muselsel turre tuxra ne
Berat û Leyletu’l-Qedrê melaîk sef girêdane
Ji balayê bidin çetrê li bedrê taze seywan e (131/17)

Leyletu’l-Qedr û berat in zulf û cebhet subh û ‘îd
Dêm weku fesla biharê lê qiyamet qedd û qam (77/3)

Leyletu’l-Qedr bi min ew se'et û 'îd e di salê
Şefqe kir perde hilanî seherê şox û şepalê (122/3)

Di vê sêxişta jêr de navê Şeva Beratê ji Şeva Qedrê veqetaye û bi ‘îdê re hatiye bikaranîn. Di wan şevên pîroz de bi taybetî ji bo xilasbûnê, ta’et û ‘îbadet zêdetir têne kirin, lewra ferişte bi izna Xwûda ji bona ‘efû û xilasbûnê têne jêr. Ev term, ji bo beyankirina ‘îbadetê û di qelbî de tecelliya sifatên te’eyyûnî hatiye bikaranîn.

Ji neqşê but û latan me sîne butxane ye
Te'eyyuna sifatan tecella qelbê me ye
Di 'îd û şev beratan ji wan ra me secde ye (132/4)

### 1.1.13.1.3. Terfetu’l-‘Eyn

Terfetu’l-‘Eyn, quçandina/qurçkirina çavan e. Çavqurçandin, bi qasî ku palikên çav têne ser û tavilê radibin, yanî bileztirîn dem e, mebest jê demeke pir kurt e.[260] Ev têgeh di dîwanê de ji bo demeke kurt ku tiştên gelek giring û tesîrdar têne kirin, hatiye bikaranîn. Tesîra çavên reş/hebeşî di demeke kurt de ku ehlê dinyayê disoje û di demekê de bi dehan şi’ran dide gotin, wek mubalexewî bi vê termê hatiye beyankirin.

Cohtê Hebeşan bi terfeti’l-'eyn
Anî qederek ji Espehan bac (29/7)

Me berqa şîr û elmasan bi tîrêjê û şîr şehkasan
Seraser ehlê dunyayê disojî terfetu’l-'eynê (120/5)

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şi’ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfeti’l-'eynê (131/37)

[260] Melayê Cizîrî, *Dîwan* (ferheng), r.420; Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 232.

### 1.1.13.2. Mirin, Ecel û Sekerat

Mirin, temambûn û dawîhatina jiyanê ya dinyayê ye. Mirin, di têkiliya ‘aşiq û me’şûq de motîfeke sereke ye. Bi taybetî di wateya xwe ya mecazî de tê bikaranîn. Ji ber firaqê, cefayê, bejna yarê ya serwayî, bi nêrînên yarê yên weke tîrê, aşiq weke miriyekî ye. Di dîwanê de, mirin, bi ravekên weke “ruh dan, can birin, can dan, can feda kirin” hatiye bikaranîn.

Aşiq hem ji firaqê hem jî ji ber awirên yarê bêçare ye. ‘Aşiq her daîm dimirin, hindek ji ber remz û awirên dilberê û hinek jî weke Mela, ji destê firqetê, ruh û canê xwe didin. Ev herdu rewş ji bo kuştina yarê bes in. Mehbûb, bi awirên xwe yên tîrê ve ‘aşiqî birîndar dike û dixwaze ‘aşiqî bikuje. Ji ber sîtem û firaqa yarê dilê ‘aşiqî ker ker bûye. Kesera wuslatê û daxa vê birînê, dê heta mirinê bi ‘aşiqî re bimîne. Mirina di rêya yarê de ji bo ‘aşiqî lezzet û şerefek e. Ew her daîm dixwaze canê xwe di rêya wê de feda bike. Eger ew ji ber tîran bifilite, carek din dê canê xwe qurbanî wê bike.

'Ellilandîn di fîraqê û hem sîne bi ker kir
Ahê hetta mirinê ev ji me ra dax û keser kir (122/5)

Şewq e bi remz û awir in ‘aşiq hero carek mirin
Lewra ku ew her dilgir in feryad ji destê firqetê (115/20)

'Aşiq ew in her dem mirin çend yek remzên dilbir in
Keybir li dil min bihtir in feryad ji destê firqetê (115/19)

Derdê xedar bêm firqet e firqet di can pur zehmet e
'Aşiq mirin her sa'et e ya sehil 'aşiq rûh dite (125/7)

Gula zer sembola firaqê ye û ‘aşiq jî ji ber firaqê weke gulazer, rengezer bûye. Ew dixwaze di rêya mehbûbê de weke gulazer bibe qurban û canê xwe bide.

Wek gula zer bû serwa te mirim
Me bi qurban xwe wek gula zer ke (98/10)

‘Aşiq di rêya yarê de canê xwe bi xwestekî dide. Ew canê xwe ji bo mehbûba xwe xudan dike. Li ber sekeratê jî eger yara wî canê wî jê nestîne, ew di wî êşê de jî bimîne, naxwaze canê xwe teslîm bike.

Canê şêrîn ku ji yar ra bi xûdan ez dikrim
Ne bi yarê xwe di weqtê sekeratê nadim (75/5)

Ecel, mirinê bi xwe re tîne. Tirsa ‘aşiqî ew e ku hêj wuslat peyda nebûyî, ew ejdehaya rûreş lê bike zivistan û canê wî jê bistîne. Mela, ne wekî ‘aşiqên mayî ye.

Lewra herçendê ew sadiq bin jî, canê xwe di rêya yarê de feda nakin; lêbelê Mela, bi can û dil ruhê xwe di rêya yarê de feda kiriye.

Çerx tirsim kit şitabê zû ecel pê det rikabê
Can birit me d'vê 'ezabê ev siyahreng ejdeha ye (96/23)

Çendekî sadiq cema bin er bibêjî can fida bin
Wek Melê lazim tu nabin wî ji dil canê xwe daye (96/24)

### 1.1.13.3. Rûh

Ruh, zindîbûna bedenê pêk tîne û dema ji qefesa bedenê derdikeve beden dimire. Mahiyeta wî nayê zanîn û heyînekî nedîtbar e.[261] Ruh, navenda hest û arzûyan e, lezzeta ‘eşqê hildide. Rûhê ku ji xerabiyê re meyîldar be, jê re “nefs” tê gotin. Rûhê însanan ebedî ye. Lewra ew ji tecelliya Rûhê Kullî ye. Çar cure ruh hene: ruhê cemadî, nebatî, heywanî û însanî. Ji ruhê însanî re “nefsa natiqe” tê gotin.[262]

Mestê şehkasê meya cazîbeyên rûhê didet
Ruh dizani ku ji ber lezzetê ‘işqê me lebaleb (14/3)

Peyva ruhê, di dîwanê de weke raveka rengdêrî bi şeklê “çalakirûh, pakirûh, seffakî ruh, xakê ruh, lewlakê ruh” û bi hinek peyvan re jî ku têkiliya wî pê re heye, wek komepeyv, bi şeklê “ruh û rewan, ruh û can, ruh û qalib, ruh û cism, ‘eql û ruh, ruh û cesed, ruh û mucessem, ruh û mucerred, ruh û cism û can, qelb û ruh, ruh û hestî, ruh û giyanî, ruh û heyat, ruh û nefes, ruh û pertew” hatiye bikaranîn.

Di dîwanê de bi redîfa peyva “ruh”ê xezelek heye.[263] Di vê xezelê de ruh, wek heyînekî ûlvî tecellî bûye, lêbelê ketiye nav xak û gilê (cesed/beden) bûye heyînekî suflî; eger ruh ji wê qefesê xelas bibe, wek heyînekî mucerred dê dîsa pak û paqij bibe. Ruh ji wê bedenê azad bibe dê hîcab û perde jî ji holê rabin. Ew rûhên ku ji qedeha ‘eşqê vexwarî hindirên xwe paqij dikin, yên nevexwarî ruhê xwe napak dikin. Kesê ku ruhê xwe di rêya mihrê/yarê de pare pare neke, di gulzara cemalê sebzepoşan de cihê xwe nagire.

Heyf e qeyda xak û gil bit ‘arifê çalakirûh
Dê mucerred bit ku pertew det ji nû ew pakirûh (33/1)

Qeydê xak û gil nebît da bê hîcab û perde bî

---

[261] “Ji te derheqê rûh de pirs dikin. Bibêje; rûh ji fermana Rebbê min e. Ji we re, ji zanînê tiştekî hindik hatiye dayîn.” (Sûreya Îsra 17/85)
[262] Pala, “rûh”, b.n.b., r. 379.
[263] Xezela 33yem derbarê rûhî de ye û ji 15 beytan pêk tê.

Mislê bedrê carinan têxit xusûfê xakê rûh (33/2)

Dê bi gulzara cemalan sebzepoşan dê çi bit
Ê di mihrê da nebî dil pare pare çakî rûh(33/9)

Bi goreyî yekîniya hebûnê (wehdetu'l-wucûd), Xwûda di her tiştê de tecellî dibe. Peyva ruhê, wek tecelliya nav û sifetên Xwûda di van beytan de hatiye bikaranîn.

'Aşiq ew e me'şûq ew e zahir ew e mezher ew e
Rûh her ew e gewher ew e d'her şahidek da şu'le da (9/13)

Herdu rûh yek nûr û tav in çerxek û du stêr di nav in
Herdu dane murx û dav in ismê Hey dav lê veda ye (95/26)

Lefzê ku me'nayek divê terkîbê îmlayek divê
Sûret heyûlayek divê rûhan di nefsê cusse da (9/75)

Muhabbet, ji sifetên Xwûda hatiye neqişandin. Ew roja ku di neynika dil de xwûya dike di qelb û ruh û zatan de tecellî bûye, muhbeta cazîbedar du qism e; yek tilism e (mahiyeta wî nayê zanîn), yek jî ji ruh û cismê pêk tê, ew kesê muhbeta wî ji ruhî tê, ji nûra munezzeh re dibe mubtela.

Muhbeta mehbûb û latan pur vekir zîwersifatan
Dane qelb û rûh û zatan roj di mir'atê xuya ye (95/20)

Muhbeta sûrî du qism e qufl û miftah û tilism e
Hin ji rûh in hin ji cism e nar û nûr e hin hewa ye (95/21)

Herkesê muhbet ji rûh e mubtela'y nûra subûh e
Wî di dil da sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye (95/25)

Di dîwanê de, di gelek beytan de peyva ruhê, di wateya xwe ya mecazî de hatiye bikaranîn. Ewê ku "ruh û rewan" daye 'aşiqî, me'şûq e, ji agirê 'eşqa mehbûbê, ruhê 'aşiqî weke berfa roj dîtî, dihele. Me'şûqê, bi pençe û kulaban ruh û canê 'aşiqî jê standiye. Ji 'aşiqî re ruh dan/mirin ji firqetê hêsantir e, derdê hîcran û firaqê nebe, tu kes nikare ruh û canî ji hev cûda bike. Pêwîst e du ruh bi cazîbeya 'eşqê bibin yek, eger ruhê du laşan weke hev nebin nagihin hev.

Rûh û rewanê min hebîb dîsa bi telbîsa reqîb
Rencide kir miskîn xerib terka dilê ehbabi da (2/4)

Can dê bidit ew malxerab her sîneyê cotek xurab
Tê da birin pence û kulab wê can di dest û rûh di kef (64/10)

Derdê xedar bêm firqet e firqet ji can pur zehmet e

Yan sehl e 'aşiq rûh dete feryad ji destê firqetê (115/17)

Me navêt ez bi feryad kim li zulma dilberê dad kim
Sehî dê şubhê Ferhad kim bidim rûhî ji kovanê (111/5)

Ne ku peyweste bi yek bin ji surê ‘işqê du rûh
Dê bi eşbahê bibin wasil û peyweste bi yek (68/8)

Ruh, zindîbûnê dide bedenê û bi vê wateya xwe ya rasteqînî ve hatiye bikaranîn: Katib, ji nûra xwe ruh û qalib daye însên, bi her jîndarekî re ruh û cismek heye, 'eql û ruh, herfên kîtaba Lewhê Mehfûzê ne, Nefsa Kullî, ji husna xwe ya munezzeh tecellî bûye, Subbûh, mey rêhtiye ‘eql û ruhî, tê de jî bi sifetên xwe tecellî bûye, çawa ku heyûla sûretekî dixwaze, ruh jî bedenê dixwaze û ruh bi cism û qalibî re bûye yek, lêbelê daxwaza ‘aşiqî ya wuslatê ew e ku ruh ji bedenê derkeve, ji qeyd û bendên xwe azad bibe û weke ewwelîn dîsa bi ruhê kullî re bibe yek.

Wesf û kemalatên subûh herfên kîtaba 'eql û rûh
Ismek divê lê bin wuzûh lew lewh û kilk û xame da (9/73)

Ê dî ku nefsa kullî ye husnek munezzeh 'alî ye
Ew jî bi rûh ra eslî ye wan her di hev da saye da (9/84)

Ew wed’ê herfê bû tilism lew hat te’eyyûn şexsê ism
Ser wa libasê rûh û cism şeklê ehadê sifre da (9/93)

Lefzê ku me'nayek divê terkîbê îmlayek divê
Sûret heyûlayek divê rûhan di nefsê cusse da (9/75)

Qelb û ceger min bûne xwîn lewra ji nû derbûn birîn
Ey can were halim bibîn wer rûh ji qalib bête der (43/3)

Qestê wehdet dikirit rûh bi rûh
We ne ‘aşiq ji wîsalê çi xered (57/7)

Xwûda ‘eql û ruh rêhtine bedena/qefesa însên da ku ruh bête îdraqkirin, lewra Xwûda gencîneyekî veşartî bûye, xwestiye bête naskirin û ji ruhê xwe tecellî kiriye. Di pêşiya ruhî de pêwîst e derrakeyekî rewşen û wala (îdraqekî rohnî û bilind/’eql û hişmendî) hebe ku sûretê husna muqeddes bête fehmkirin ku me’neya “lewlak”ê bête zanîn. Di zahiriyê de herçendê ruh û cesed ji husna ezelî cuda jî bin, di batinî û heqîqetê de yek in.

Ev reng tecella kir Subûh saqî ji şehkasa futûh
Mey rêhte cama 'eql û rûh roj bû di qewsê qubbe da (9/80)

Ger xeberdar î ji sirra “kuntu kenzen” guh bidêr
Da bi sed nurê beyan ket me‘na lewlakê rûh (33/3)

Pur ji can derrake rewşentir û wala divêt
Sûretê husna muqeddes da biket îdrakê rûh (33/4)

'Alim în em vê dizanîn rûh û cism û can în
Qet ji hev batin xuya bîn ger çi zahir ew cuda ye (95/17)

Ruh di cihê navê Pêxember de jî hatiye bikaranîn. Di hedîseke qudsî de tê gotin ku “Husna Cemala Ezelî”, ewilî di “Nûra Muhemmedî” de tecellî bûye û ew nûrekî/rûhekî pîroz e, di şeva Qedrê de ji bo şefa’etê ‘evdên tewbekar, liqaya wî dixwazin.

Şebê Qedrê li me rewşen ke tu rûh î were xweş
Me ji nû xweş ke li ser çehvên şehîdên xwe bimeş (54/1)

Erwahê mûqeddes şebê Qedran te dixwazin
Nûra te ye misbahê di qendîlê herem da (1/6)

Ruh di hinek beytan de, di cihê mehbûbê de hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, mehbûbê wek rûheke mucessem tesewwûr dike. Mehbûb, ruh û heyata ‘aşiqî ye.

Ya Reb ew rûh in mucessem yan mîsalê rûh in ew
Lew bi ser caman dibexşin nazikên şîrînkelam (76/5)

Sebahulxeyri xanê min şehê şîrînzebanê min
Tu yî rûh û rewanê min bibit qurban di canê min
Te'alallah çi zat î tu çi wê şîrînsifat î tu
Ne wek qend û nebat î tu yeqîn rûh û heyat î tu (124/1)

Di hinek beytan de ruh, ji cism û canî azad, di wateya heyînên mucerred de hatiye bikaranîn. Mehbûb wek heyîneke nedîtbar, weke sûretê ruh an jî pertewa zatê qedîm e. Rûhên ulwî di vî şeklî de têne tesewwûrkirin. Mehbûb, wek rûheke mucerred, wek horiyan letîf e, dema weke dara banê ‘aşiq lerizî, ruh jî ji ber ‘eşqa mehbûbê serî dadinin û ji ber zikrê melekan jî, erwah bilind dibine mî’racê.

Bê tu billah nebûyîn yek nefesek
Me tu yî rûh mucerred qefes în (80/5)

Ne tenê rûh î tu rûh û can î
Zîneta husn û sura xûban î (123/6)

(Lew mestû min-el hewa ke banin
La bid'e we qed temidû erwah) (34/6)

Dengê melekan zimêhne zimzim
Erwahi ji 'işqê têne mi'rac (29/13)

Ruh, bi îstî'areyî, di van beytên jêr de di wateya giyanê de hatiye bikaranîn. Mehbûb, ruh û giyanê 'aşiqî ye. Ruh bi destê qudretê, di destê zuluf'enberan de perwerde bûye û wuslata yarê dixwaze, lê heta ruh û bedena wî nesoje wuslat çênabe. Ruh û dil li pey yarê diçin, ji bo xala yarê, 'aşiq ruhê xwe dide.

Dilê bit seydê şahînan yeqîn dê destî jê berdin
Bi naz û 'işweşîrînan şîrîn dê şehd ûşekker din
Di tora 'enberê çînan ji qudret rûhi perwerd in (131/19)

Dûredest im bênesîb im dilberim xanim hebîbim
Pur ji dinyayê xerîb im rûh û rahet min lîqa ye (95/10)

Çûm ziyaret pê û destî lê nehişt ewwel bi qestî
Min bisojit rûh û hestî 'aşiqan sohtin ceza ye (96/17)

Ger ne rûhê me pê dil biretin
Me ji wê qenc û delalê çi xered (57/4)

Dil bi şepalan bide bask û xezalan bide
Sîne bi talan bide rûhê bi xalan bide (50/7)

#### 1.1.13.4. Şeytan

Şeytan; bi temsîliyeta hîle, fesadî, ji Adem re secde nebirinê, ji aliyê Ehrîmenî ve dizîna gustîla Suleyman pêxember ya mulkhukumdariyê[264] û bi sihr çêkirina Ebyed û Ehrimenî ve hatiye bikaranîn. Peyva şeytanê, di dîwanê de weke "Şeytan, Iblîs, Dêwê Mel'ûn, 'Ezazîl, Ehrîmen, Ebyed, Ebyedê Weswas" cih digire. Şeytanî, bêemriya Xwûda kiriye û ji Adem re secde nebiriye, ji ber vê yekê hatiye le'netkirin û qewirandin.

Dêwê mel'ûn û munafiq ê Xudê rûreş kirî
Ma bi bala hilkişîtin 'aqîbet çêbit selab (16/18)

Iblîsî, sirra 'ilmê Adem Pêxember nedîtiye, eger bidîta dê jê re secde bibira û dê şanê wî bilind bikira. Şeytên destûr ji Xwûda xwestiye û dixebite ku bawermendan ji rêya musteqîm dûr bike.[265] Reqîb jî ji ber fesadiyê weke Şeytên e. Ew, le'în û rûreş

[264] "Sond be, me Suleyman imtîhan kiriye. Me cesedek avêt ser textê wî. Pişt re wî dîsa tobe kir û li Xwedayê xwe vegeriya." (Sûreya Sad, 38/34). Di şiroveya vê ayetê de wek îsraîliyatî çîrokeke dirêj tê gotin ku Şeytên gustîla Suleyman ya mulkhukumdariyê revandiye û paşê dû'a kiriye û Xwûda lê boriye.
[265] Îblîsî got: Ez bi îzzeta te sond dixwûm, ez ê hemûyan ji rê derêxim. (Sûreya Sad, 38/82).

e; armanca wî ew e ku fesadiyê di navbera ‘aşiq û me’şûqê de derêxe, ji bo vê yekê Ehrîmen û Ebyed bi hevra dixebitin, weswese û sihrê dikin ku ew di ‘eşq û wasilbûnê de bi ser nekeve.

Ger di Adem bidîya sirrê ‘ilimê Iblîsî
“Hînema ebserehu kebbere hînen we seced” (38/9)

Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê (122/1)

Min go gelo ey dilruba fitna reqîb feyde heye
Go sond bi husna min ku ne lê fi'lê Şeytan e xered (58/6)

*Ehrimen* te‘lîm dabû *Ebyedî* dest tê hebû
Pur bi vê te‘lîm û rayê hatibû çûbû xitab (16/19)

Surperî ‘illet nezanî sihreya *Ebyed* dikit
Pur xelet erzan me dî derheq xwe ew ‘alîcenab (16/20)

Wê diket mexlete her dem bi herîfan bi cedel
Bi du caman ji xwe bin sîretê *Ebyedê weswas* (51/6)

Dax û key min lê hezar in gul di dest şewkên bi xar in
Surperî dêw wê l'kenar in *Ehrimen* xatem reva ye (95/5)

#### 1.1.13.5. Cîn

Cîn, ji cureyekî heyînan in. Melek, rûhanî ne, însan cîsmanî ne û cîn hem rûhanî hem jî cîsmanî ne[266], lêbelê rûhaniyeta wan zêdetir e. Cîn jî weke însanan xweyî îta’t û îsyanê ne.[267] Di dîwanê de ji bo beyankirina hemû mexlûqatan û cinnê şeytanî ev peyv derbas dibe.

Cîgera ‘aşiqî ji ber derbên me’şûqê xwûnî bûye, eger yar were li ser bedena ‘aşiqî dê ew sax bibe û dê îns, cînn û zindewer hemû hesûdiyê bikin. Cinnên firoke (‘Efrît), ‘aşiqî dixe nav pençe û kulabên xwe û weke qertalî bilind dike, nahêle ew mahîtabê bibîne.

Canê min er bê ser hesed mizgîn bi afaqan resed
‘Alem hemî pê bin cesed însan û cinn û canewer (43/4)

Cinnê teyyarek me dî werbû di min winda kirim

---

[266] Di hedîseke de Muslîm rîwayet kiriye ku Pêxember weha gotiye: “Melek ji nûrê, cîn ji narê/agirî û Adem/însan jî, ji axê xulûqiye.” (Mûslîm, Zuhd, 60, veg. ji Fikret Karaman ûym., “Cin”, *Dînî Kavramlar Sözlüğü*, DİBY, Ankara, 2006, r. 103.)
[267] Karaman ûym., b.n.b., r. 103.

Dame ber çenk û kulaban hilfirandim wek ‘uqab (16/16)

### 1.1.13.6. Mu’cîze

Mu’cîze, ew tiştên awarte ne ku bi destûr û emrê Xwûda, ji pêxemberan sadir dibin. Melayê Cizîrî di dîwanê de, bi peyvên “mu'ciz'amûz, mu’ciz, mu’cîzat û î’caz”ê ew bûyerên ku ji pêxemberan sadir bûne û însan jê mane heyirî, beyan kirine.

Melayê Cizîrî bi taybetî li ser tesîrên mehbûbê yên mu’cîzewî rawestaye. Mehbûb, ehlê ‘îcazê ye û ew bi karên xwe yên tesîrdar, dikare weke mu’cîzeyan tesîrê li ‘aşiqên xwe bike. Yar, bi remza mu’cîzeyan muşkîlên ‘aşiqî hel dike û ji bo ku weke ‘Îsa Pêxember mu’cîzeyan nîşan bide, dilan yexma dike ku şehîdên ‘eşqê carek din divejine. Melayê Cizîrî, ji lebê le’lîn yên mehbûbê uslûba mu’cîzegotinê hîn bûye û şi’rên wî weke mu’cîzeyan tesîrdar in.

Semaya cumle dêmdur tê bi î'caz ehlê sur pur tê
Biha testeffu qamatin bi 'îdanu we nayat (23/7)

Zihî şahîn û şehbazê bi naz û xemze û xencan
Çi teyxûn bû di perwazê we şîrîn da me ber pencan
Bi remza sihr û î'cazê birim rêza guhersencan (131/15)

Ji êgir min nefes hil bû ji ruxsarê şeb'efrûzê
Ji bo min hellê muşkil bû bi remza mu'ciz'amûzê
Di nar û nûrê kamil bû ji berqa wê cehansûzê (131/22)

Daxên şehîd û sohtiyan danîne lê wan tilliyan
Ku j'mu'ciza xummariyan rûh bête ser dîsan giyan (125/5)

Yar qest e can yexma kirit da mu'cizê peyda kirit
Remzek ji reng 'Îsa kirit ya sihrê Bû Sîna kirit (125/8)

Şi'ra te sihrrîz e şeker bi mu'cîz
Zanim ji lebê le'lê te ev lefz û eda girt (20/19)

Di dîwanê de wek telmîhî, behsa mu’cîza Mûsa Pêxember ku destê wî weke nûrekî, spî (yedê beyza/destê spî) dibû û vejandina miriyan ya ‘Îsa Pêxember, hatiye kirin.

Wer ji ber perdê yedê beyda bi mu'ciz bête der
Şems û kewkeb dê hilên alem tejî enwarî bit (19/2)

Meyyitan ew radikit yekser dilan yexma dikit
Ismê e'zem ma dizanit ya Mesîha ew bi xwe ye (93/9)

Ez dibêm 'Îsa ye ew ya Bû 'Elî Sîna ye ew
Lew bi remz û 'işweyan pur mu'cizat û şêwe ye (93/10)

### 1.1.14. Dîn, Dînên Mayî û Mevhûmên Wan

### 1.1.14.1. Dîn, Îman, Îslam, Musilman

#### 1.1.14.1.1. Dîn

Dîn, nîzam û întîzama Xwûda ye, ji bo ‘eqilmendan hatiye ku ew di rêya rast de bimeşin û bigihijin rêya rast. Xwûda, rêgez û qaîdeyên dînî, bi wehyê, ji bo hemû însanan, ji peyxemberê yekem Adem û heta yê dawiyê Muhemmed (sxl) daye zanîn. Hinek însan bi wehyê îkna nebûne û ji bo ku dilê wan mutme’în bibe, ji pêxemberan mû’cîze xwestine.

Mûsa Pêxember yek ji wan pêxemberan e ku behsa mu’cîzeyên wî tê kirin. Ew bi mu’cîzeya “yedê beyzayê” bûye mijara edebiyatê. Ev mu’cîze, bi mecazî êdî di navbera ‘aşiq û me’şûqan de derbarê bawerî û mutme’înbûnê de bûye sembol. ‘Aşiq xîtabî yara xwe dike ku yedê beyzayê nederîne û nîşanî wî nede, lewra ew bi hubba xwe ve girêdayî wê ye. Di rêya evînê de înkarî tunebe, hewceyî mu’cîze nîşandanê tuneye.

Hacet niye cana yedê beyda biderînî
Înkarî di dîn da nebit î‘cazî çi hacet (21/10)

Şa’ir, girêdayî dînê ‘eşqê ye, ‘eşqa mehbûbê dînê wî ye. Kî ‘aşiq nebe ji xwe baweriya wî jî tuneye. Di dînê ‘eşqê de secdebirin ferz e, ji memdûhê re çûna secdeyê di hemû dîn û mezheban de caîz e. Ji ber mesajên wî yên şirîn, eger însan ‘eqilmend bibe ne mumkine înkariyê bike.

Yek secde tenê ferz e di dînê 'işqê
Bin ber qedê yarê di mecalê dînê (119/5)

Secde bin ber te rewa ye di hemî mezheb û dînan
Kî dibit muşrik û kafir şîrîn dehenê (109/11)

Têkiliya dîn bi dilî re heye û di gelek beytan de bi hev re têne bikaranîn. Bawerî û înkarî di qelbî de peyda dibin. Mekanê îmanê dil e. ‘Aşiqî, di rêya mehbûbê de dînê xwe feda kiriye û dînê xwe daye ber yexmayê. Mehbûb, bixwaze dil û dînê ‘aşiqî yexma dike. Bi taybetî jî wesfekî dilrûbayê jî ew e ku ew dînbir e, ji ber dilberî, îşwe, sohbeta şirînî û kubariyê, dilê ‘aşiqî yexma dike.

Dil û dîn xaret û yexma nekirî
Serê sewdazede sewda nekirî (123/4)

Dil bi kê dim ez ji wan her yek bi xenca dil dibin
Dilrubayên canfezayên dînbirên ‘aşiqnewaz (45/15)

Da dema suhbet bi coş bi cam bi xwe ji le'lan bi noş bi
Me j'hebîb sed deng suroş bi dînber û pur'işwe ye (97/48)

Bend kir kulab û penceyan dil ma di nêv îşkenceyan
Min ah ji dest wan xenceyan kewkeb û kubarên dînberê (113/20)

### 1.1.14.1.2. Îman

Îman, tesdîqkirin e û baweriya bi Xwûda û hukmên wî ye. Îman, di dîwanê de wek baweriyeke tesewwifî bi mecazî hatiye beyankirin. Rûyê mehbûbê, bi ronahiya xwe ya nûranî ve derdikeve pêş û berê ‘aşiqan li ber rûyê wê ye. Di sûretê însên de unsûrên rûyê wek sembolan têne şirovekirin. Çav temsîliyeta ronahiyê dike û birh, bi şeklê qawîsbûna xwe ve temsiliyeta mihrabê, secdebirinê dike. Yên îman anîne û yên di kufrê de jî, bi heyîna mutleqî di bin siya Xwûda de ne. Mexlûq, nikarin bê Xwûda xwe heyî û tune bikin. Ji ber vê yekê berê hemû însanan jî li ber mihrabê ye û cemalê mehbûbê dixwazin, eger ‘aşiq li ber kufrîzulfê (porareş) neçe secdeyê, dibe ku bi xeletî îmana wî jê biçe.

Te nehin bawer û îman nezerê dî û binê
Çi tecella ye buwî qible melek rû didinê (121/3)

Herdu birhên te ne mihrabi çi îman û çi kufr
Bûd û nabûd ku yek in ew çi sewab e çi ‘îqab (13/12)

Ser nebî ber kufrê zulfê ‘aqîbet
Ez te tirsim lê ji îmanê xelet (61/12)

Îman û kufr, di beytên dîwanê de bi gelemperî bi hev re hatine vegotin. Kufr û reşatî, bi hev re têkildar in. Îman sembola ronahiyê, kufr jî ya tarîtiyê ye. Tarîtî û kufr, herdu jî ronahiyê dinixûmînin. Rûyê yarê ronahî ye, cihê ‘eksa cemalê munezzeh e û zulf reş e, dikeve ser ronahiyê, tarî dike. Mehbûb, caran xeyrîmuslîm e û bi cil û bergên reş ve tê, armanca wê, jê standina îmana ‘aşiqî ye. Ew yar xweyî du çavên talançî yê. Spîleka çavên wê weke kafûrê spî ne û temsiliyeta ronahiyê dikin. Di nav wê spîlekê de reşahiya çavan jî heye, ew jî temsîliyeta tarîtiyê dikin. Spîleka çavan, nûr û îman; reşatiya çavan, zulmet û kufr, kompozîsyoneke balkêş ava dikin û çawa di spîtahiyê de reşatî, di nûrê de tarîtî/zulmetî xwûya dike; caran di îmanê de jî kufr tê xwûyakirin.

Ew kafirên camesiyah hatin bi hev ra sef bi sef
Zanim ku her tên ew medam wan exzê îman e xered (58/2)

Du talançî di meşhûr tê ji me'den 'eynê kafûr tê
Di têkil zulmet û nûr î me kufrê dî di îmanê (111/14)

**1.1.14.1.3. Îslam**

Îslam, teslîmbûn û îta'eta ber bi Xwûdê ve ye. Wek terîmî, ew dînê dawî yê cîhanşumûl e ku ji Pêxember Muhemmed (sxl.) re hatiye. Peyva Îslamê di wateya xwe ya rasteqîn û mecazî de, di dîwanê de hatiye bikaranîn.

Şa'ir, derbarê baweriya tewhîdê de gazindker e. Di qelbê însên de ronahiya Îslamê dernakeve lewra di qelb û canê însên de zunnarên dinyayê (hewa û hewes) hatine girêdan. Zunnar girêdan (li pey çûna hewa û hewesan), 'elemetên fasiqî û kufrê ye. Eger qelbê însên weke camê rewşen û saf be, dê keşf û ilhama wî, remzên kufr û îmanê ji hev cuda bike û dê qelbê wî ji serî heta binî, ji berqa nûra îlhamê rohnî bibe.

Dê bi qelbê me çi det lami'eya Îslamîyê
Ku li canê xwe me xef bestiye zunnarê hudûs (28/17)

Ji reng ayîneya camê te batin rewşen û saf e
Di remza kufr û Îslamê yeqîn fehmê te keşşaf e
Ji berqa nûrê îlhamê durexşan qafi ta qaf e (131/3)

Îslam, wek mecazî, di wateya ronahiyê de hatiye bikaranîn. Rû, di kompozîsyona cemalê yarê de ronahî ye û zulf jî tarîtî ye. Şev û tarîtî dema tên (zulf li ser rû tê berdan) êdî ronahî tê veşartin. Zulf, li kenarê xal û nîşanê xwe berdide û bêhna wê ya 'enberîn, li rexê xal û nîşanê dikeve.

Me kufrê dî û Îslamê ji şerqê zulmet û şam bê
Ji zulfan 'enberîn fam bê kenarê xal û nîşanê (111/15)

**1.1.14.1.4. Musilman**

Di navbera musilmanî, emniyet û alîkarperweriyê de têkiliyek heye. Kesê musilman, arîkarhez e û dema xerabiyekê bibîne dixwaze jê re bibe mani'. Şa'ir, ji ber firaqa mehbûbê weke mumê heliyaye û dadmendiya xwe digihîne musilmanekî ku rewşa halê wî pêşkêşî sultanî bike ku jê re ji aliyê wuslatê ve çereseriyekê bibîne.

Fîraqa dilbera rind e behêtim ez wekî finde
Musilmanik di rê min da xeber bit bal sultanê (111/2)

Peyva “musilman”ê, di vê beytê de, di wateya durustî û heqiyê de hatiye bikaranîn. Eger sofî bi rastî bixwaze di rêya seyrûsulûkê de bigihije mehbûba heqîqî, divê ew teslîmî saqî (mûrşîd, şêx) bibe, lewra saqî, mezherê Xwûdê Te’ala ye.

Were sofî Musilman be bi saqî secdeyê bîne
Ku sûret mezherê zat û sîfatê Heq-te'ala ye (102/2)

#### 1.1.14.1.5. Hîdayet

Bi Qur’an û hedîsan ve dîtina rêya rast e. Hîdayet di destê Xwûdê de ye. Înayeta destê qudretê nebe, însan bi cehd û xebata xwe nikare hîdayetê bi dest bixe. Eger Xwûda, ji ezeliyetê ve cezbeyekê hîdayetê di dilî de peyda nekiribit, îrşadî nikare tiştekî bike. Xwûda ji ezel ve, ewilî zerreyek înayet daye ‘aşiqî û di deftera hîdayetê de xemr û cam (‘eşqa îlahî) bûye qismetê wî.

Dê ji Heq cazîbeyek dil bigirit wer ne Mela
Ji ezel ger tu hîdayet nebit îrşadî çi ket (22/12)

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e ji deftera hîdayet (24/1)

#### 1.1.14.2. Mescid, Dêr, Kenîşt, Laleş, Çelîpa (Selîb) û Zunnar

Mescid, ew nimêgeh û mizgefta piçûk e ku li wê derê secde û nimêj tê kirin. Zahidên ewwelîn jî ji van goşeyên înzîwayê re ku tê de ‘îbadet dikirin, mescîd digotin. Mescîd wek têgeheke tesewwifî tê wateya qelbê ‘abid û weliyan.[268] Dêr, îbadetxaneya Mesihîyan, Kenişte ya Cihuyan, Laleş cihê pîroz ê Êzdîyan e û Ke’be jî weke cihekî giring û pîroz ê Mislimanan e. Di helbestên Melayê Cizîrî de bi gelemperî îbadetgehên weke dêr, kenişt û meygede (bi sembolî, perestgeha rindê xerabatê ye), bi hev re derbas dibin. Armanca ‘aşiqî ew e ku ‘îbadetê bike, ji ber vê yekê mekan zêde giring nîne, nîyet û armanc giring e. Ji xeyrî ‘îbadetê tu armancên wî tune, weke rindekî xerabatê pejmurde ye û destên xwe ji dinyayê şûştiye, di navbera dêr û meygedeyê de diçe û tê. Mehbûba heqîqî, xwe nîşanî cehenemê bide ew der dibe beheşta hûriyan û xwe li perestgehan tecellî bike, ji bo ‘aşiqî hemû perestgeh pîroz dibin.

Ji *mescid* rû be meyxane girt pîrê muxan guyed
Ke salik bêxeber nebwed zi resm û rahê menzil ha (6/7)

Bi heq rindê xerabat im ji *dêrê* vê demê hatim
Çi hêvî hûn diken îro ji vî rindê xerabat (23/17)

[268] Süleyman Uludağ, “Mescit”, *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*, Kabalcı Yayınları, İstanbul 2016, r. 244.

Dibitin Beytêqudus ehlê ziyaret ji Hebeş tê
Ger bikit husn û cemalê xwe tecella di keniştê (122/2)

Ger xwe nîşa seqerê dit dikirit hûrîbihişt
Ke'beya tê bit ew meygede û dêr û kenişt (121/1)

Dînê ‘aşiqî dînê ‘eşqê ye û perestgeha wî jî meygede û xemmarî ye. Hinek ‘abid diçin dêrê, hinek diçin kenişteŷê, lê şa’ir ji xwe re derê xemmariyê bes dibîne, ew naçe dêr û keniştеyan lewra mihraba mehbûbê bi wî re ye. Cihê ku mehbûb lê tecellî bike û mihraba yarê lê hebe, ew der perestgeha wî ye û Laleş jî yek ji van cihan e û dixwaze biçite Laleşê.[269]

Hin ji nik ji dêrê ve tên qesta *keniştê* hin dikin
Ney ji wan im ney ji van im min derê xemmarî bes (52/4)

Dil geşt e min ji dêrê naçim kenişteŷê qet
Mihrab wê bi min ra wer da biçîne Laleş (53/3)

Şa’ir navê perestgehan bi kar tîne lêbelê ‘îbadetkirina wî ne weke sofî û ‘abidan e, ew di ‘îbadet û secdebirinê de berê xwe dide mihrabê û husn û cemalê mehbûbê yê munezzeh xeyal dike. Ji wî re mekan ne giring e, ya giring ew e ku mihraba yarê û husn û cemalê wê lê hebe.

Bi zunnara di dêrê da di hindava çelîpayê
Bi mihrabê me bir secde belê emma xeyal ebrû (106/9)

Dêr/deyr, bi teşbîhî di cihê dunyayê de hatiye bikaranîn. Dunya bi kevnahiya xwe ve deyreke kuhne (kuhnexane) û deyreke xerabe ye; gelek stêr (kesên navdar), hatine û çûne lê dunya hêj li ser xwe ye.

Dav kuhnexanê mislî deyr çendîn kewakib têne seyr
Peykan bi davê şubhê teyr her jê dibarin tarê çerx (35/9)

Çar ummehat in sê benat her bêqerar in bêtebat
Pur 'işq û meyl in îltîfat d'vê taze deyrê kuhne da (9/126)

Tu ji feslê here eslê ku di vê deyrê xerab
Da nebî merkebê cehlê tu li bin barê hudûs (28/21)

[269] Laleş, cihekî pîroz yê Yêzidiyan e. Pêxemberê dînê Yêzidiyê Şeyx Adî bin Musafir li wê derê medfûn e û ew perestgeh û gunbeta ku li ser qebra wî hatî çêkirin, cihê herî pîroz yê Yêzidiyan e. (John S. Guest, *Yezidilerin Tarihi*, Avesta Yayınları, İstanbul 2007, 2. Baskı, s. 68-70).

Çelîpa (selîb), xaça mesîhîyan e, semboleke xrîstîyanan e. Di beytên dîwanê de peyva çelîpa û selîbê derbas dibe. Selîb, wek teşbîhî hatiye bikaranîn; çawa zunnar navgîna keşeyê dipêçe, zulfa yarê jî bi reşatî û dirêjahiya xwe ve derdora dêmê yarê dipêçe. Çelîpa, wek mecazî temsîliyeta ‘aşiqbûn û xwe girêdayî pîrê ‘eşqê dike. ‘Aşiq, li dêrê di hindava xaçê de zunnara xwe girêdide û bi xeyala birhên mehbûbê (tecelliya husn û cemalê munezzeh) di mihrabê de secdeyê dibe, lewra ebrû/birh bi qawisbûna xwe ve temsîliyeta mihrabê dikin. Şa’ir di beyteke xwe de dibêje; “Dil yek e dê ‘işqi yek bit ‘aşiqan yek yari bes/Qible dê yek bit qulûban dilberek dildari bes” û ev gotin temsîliyeta tewhîd û wehdaniyetê dike. Herçendê zunnar girêdan û çelîpa gerandin bibine ‘edet jî, ji wan yek tenê ji bo armancê besî ‘aşiqî ye.

Terh û terzî bo te zunnar û çelîpa yek bi yek
Lê me zunnar û çelîpa yek tenê yek carî bes (52/3)

Bi zunnara di dêrê da di hindava çelîpayê
Bi mihrabê me bir secde belê emma xeyal ebrû (106/9)

Gul çîçek û neqşên xerîb nesrîn û reyhanê hebîb
Lê rast û çep bûyîn selîb cedwelkeşîn zunnarê xet (59/8)

Zunnar, semboleke mesîhî û mecûsiyan e, ji duwanzdeh qulpan pêk tê û keşe li ser newqa xwe girê didin. Zunnar, di tesewwûfê de sembola dûrbûna ji ni’metên dunyayê ye û carinan dûrbûna tewhîd û îmanê jî nîşan dide. Di edebiyata klasîk de, zulfa yarê ya ji navtenga wê jêr ve hatî berdan, bi teşbîhî bi zunnarê tê temsîlkirin.[270]

Girêdana zunnarê ya keşeyan weke sembolekê, sînorên ‘abidî û ‘îbadetên wan nîşan dide. Ew destê xwe ji dinyayê dikêşin û xwe didin karên teqwa û ‘îbadetê. Zunnar li ser cilên reş hem temsîliyeta sadebûnê dike hem jî sadiqbûna wî ya ji mehbûbê re nîşan dide. Zulfa yarê jî bi rengreşiya xwe ve weke zunnarê ye. Çawa zunnar, keşeyan bi armanca wan ve girêdide, zulfa yarê jî zunnara ‘aşiqî ye û ew pê ve hatiye girêdan. Çawa hevsarê kelbê ‘işqê helqeyê zunnarî be, toqa şa’irî jî xelek û çengelên zulfa yarê ye. Herwekî hacî îhramê werdigrin û keşe jî zunnarê girêdidin, xwe teslîmî me’şûqa xwe dikin; şa’ir jî bûye bendê zulfekê yarê, dil daye destê pîrê ‘eşqê .

Toqê gerden helqeya zunnarê zulfa yara min
Dê kilîta kelbê 'işqê helqeyê zunnarî bit (19/6)

Min di benda zulfekê dil da bi destê pîrê ‘işq

[270] Canım, b.n.b., r. 180.

Lew di ‘işqê da ku best îhramî yek zunnarî bes (52/2)

Têkiliya zulfa yarê, bi reşrengî û dirêjahiya wê ve, bi zunnarê re heye. Ew neqşên li ser dêmê yarê ku bi cedwelê hatine kêşan weke zunnarê bi pergalî, nav hev re hatine kêşan. Zunnar jî bi rast û çep tê kêşan û di nav hev re diçin. Pora yarê jî bi vî awayî li ser dêmê wê bi hev re çûne û hatine, weke perawêzên li dor ayetê (nîşana cemalê), bo gehandinê rast û çep dane neqişandin[271] û ev şekil bûne weke şeklê xaçê.

Gul çîçek û neqşên xerîb nesrîn û reyhanê hebîb
Lê rast û çep bûyîn selîb cedwelkeşîn zunnarê xet (59/8)

Madarê dêm û cebhetê haşa li dora ayetê
Lê rast û çep bo wesletê cedwelkeşê zunnarê xet (59/9)

Di edebiyata klasîk de dêr temsiliyeta dinyayê, kenişte jî ya axiretê dike. Girêdana zunnarê, weke semboleke dêrê, dûrbûna ji tewhîd û îmanê hatiye bikaranîn. Girêdana zunnara dinyayê (hewa û hewesên dinyewî) qelbê bawermendî reş dike nahêle li wê derê de şu’leya Îslamê rohnî bide. Dil, kemergirêdana ‘eşqê ye û ‘şa’ir jî bûye zunnarperest; du’aya ‘aşiqî ji bo mey (‘eşq) û me’şûqê ye ku dixwaze, ew seccadeya weke perdeyekê li ser ‘aşiqî, bête rakirin ku rohniya rojê (tecelliya mehbûbê) xwûya bibe.

Dê bi qelbê me çi det lami‘eya Îslamîyê
Ku li canê xwe me xef bestiye zunnarê hudûs (28/17)

Dil kemerbeste di 'işqê û bi xwe zunnarperest în
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e (94/2)

### 1.1.14.3. Kufr, Kafir, Înkar, Munkîr, Munafiq, Zulm, Zalim, Zulmet, Muşrik, Mel’ûn, Le’în

#### 1.1.14.3.1. Kufr

Peyva kafirê tê wateya nixumandin û xefkirinê. Wek terîmeke dînî tê wateya ewê ku Xwûda bi heqqiyê nasnake, dînê îslamiyetê qebûl nake û îmanê pê naîne.[272] Di dîwanê de wek kompozîsyoneke dijberî; îman û kufr, kufr û Îslam, nûr û zulmet bi gelemperî bi hev re hatine bikaranîn. Îman, ronahî; kufr, tarîtî ye.

[271] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 11.
[272] Canım, b.n.b., r. 151.

Kufr, di wateya xwe ya rasteqînî de hatiye bikaranîn. Bi hatina pêxember di dinyayê de kufr rabûye û hatiye veşartin û bi vê xweşiyê ve horî û periyan cennet xemilandine. Piştî rakirina kufrê ji bo îmaneke safî pêwîst e qelb ji ‘elametên kufrê safî bibe. Qelbê însên weke camê rewşen û saf nebe, keşf û ilhamên qelbî, remzên kufr û îmanê ji hev dernaxe û qelb, ji serî heta binî, ji berqa nûra îlhamê rohnî nabe.

Zalim veşêrî kufrê nema qet di dinê da
Cennet bû muzeyyen xemilîn hor û peri ne (101/7)

Ji reng ayîneya camê te batin rewşen û saf e
Di remza kufr û Îslamê yeqîn fehmê te keşşaf e
Ji berqa nûrê îlhamê durexşan qafi ta qaf e (131/3)

Reşatî û spîtiya çavên yarê, wek mecazî, di wateya kufr û îmanê de cih girtine. Mihrab, birhên mehbûbê ne, dema ‘abid/’aşiq berê xwe dide mihrabê li ber wan birhan, reşatiyê (kufr) di nav spîtahiyê (îman) de dibîni. Çavên yarê di talankeriyê de namdar in. Di spîlek û reşatiya wan çavan de zulmet û nûr, kufr û îman têkil hev bûne.

Herdu birhên te ne mihrabi çi îman û çi *kufr*
Bûd û nabûd ku yek in ew çi sewab e çi ‘îqab (13/12)

Du talançî di meşhûr tê ji me'den 'eynê kafûr tê
Di têkil zulmet û *nûr* î me kufrê dî di îmanê (111/14)

Kufr reşahiya zulfa mehbûbê ye. Çawa zulf dikeve li ser rûyê wê yê ronîdar tarî dike, keziyên yarê yên reş, yek bi yek ronahiya (îman) ‘aşiqî jê distînin, dibin. Eger ‘aşiq li ber zulfên mehbûbê yên reş serê xwe nenixumîne/secde nebe, tirs heye ku îmana wî, ji xeletî jê biçe.

Ji mihra wê şefeq se'dê şirîn le'lê şeker we'dê
Dinalim şubhetê re'dê ecêb im lê ji vê ce'dê
Ke dil ra tabi her çîneş bi kufrê mibered dîneş
Zi tabi ce'dê muşkîneş çi xwûn uftadi der dil ha (4/3)

Ser nebî ber kufrê zulfê ‘aqîbet
Ez te tirsim lê ji îmanê xelet  (61/12)

Rûyê mehbûbê, di kompozîsyona cemalê wê de, ronahî ye û zulf jî tarîtî ye. Şev û tarîtî dema tên (zulf li ser rû tê berdan) êdî ronahî tê veşartin. Zulf, bi bêhna xwe ya ‘enberînî, li kenarê xal û nîşanê de xwe berdide jêr.

Me kufrê dî û Îslamê ji şerqê zulmet û şam bê
Ji zulfan 'enberîn fam bê kenarê xal û nîşanê (111/15)

#### 1.1.14.3.2. Kafir

Wesfê kafiriyê, bi gelemperî ji bo yarê û pora yarê tê bikaranîn. Kesên ne misliman jî wek kafir têne dîtin. Rom û freng jî weke ehlê ‘îsewiyan têne qebûlkirin. Peyva “kafir”ê di rêzên jêr de, di wateya xwe ya rasteqîn de hatiye bikaranîn. Di hemû mezheb û dînan de ji mehbûba heqîqî re secde birin (‘îbadet kirin) rewa (caîz e) ye. Gotinên mehbûbê jî cazîbedar in, ên ji wê mesaj hilgirtî, ne mimkin e bibe kafir. Ewên îmanê pê neyînin, poşman jî bibin êdî du’ayên wan jî qebûl nabin.

Secde bin ber te rewa ye di hemî mezheb û dînan
Kî dibit muşrik û kafir şîrîn dehenê(109/11)

Min di ber qalûbela batin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser 'ehda elest im ta bi roja axirîn
Min divê lê eşkera kim carekê daxa nihîn
Guftem ûra ma du'agowê to em ey hurî'în
E'redet 'ennî weqalet ma du'au'l-kafirîn[273] (91/1)

Peyva “kafir”ê, ji ber bêmerhemetbûn û bêînsafiya yarê hatiye bikaranîn. Rom û Frengistan di edebiyata klasîk de temsîliyeta kufrê dikin û yên kafir jî bêînsaf û bêmerhemet in. Mehbûb jî hem cilreş e hem jî frengî ye, xereza wê jê standina îmana ‘aşiqî ye. Mehbûba bêînsaf a Rom û Frengê, bi tîr û xedengên xwe weke derba tifengê cegera ‘aşiqî kun dike, weke wê zalim û bêmerhamet di Frengistanê de tune.

Ew kafirên camesiyah hatin bi hev ra sef bi sef
Zanim ku her tên ew medam wan exzê îman e xered (58/2)

Nekirî terkê tu vê kafiriyê
Dînberê hûrîmîsalê periyê
Nazikê neyşekerê surperiyê (123/5)

Ew şepala şeng û şox e kafira Rom û Fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştim bi dox (36/4)

Cegerê kun dikin û tê dibeyîn mislê tifeng
Mislê wê kafir û zalim qe dibin kes di Fireng (121/4)

Peyva “kafir”ê, wek mecazî, pora reş a yarê e. Wek kînayewî ev peyv, hem behsa zulfa yarê dike ku yar pora xwe berdide, li ser cebhet û xalên wê de têne xwarê û hem jî behsa baweriyê tê kirin ku ewê li ber mehbûba heqîqî secdeyê nebe ew dibe kafir.

---

273 “Pişta xwe de min û got, "ma duayê kafiran çi ye (têne qebûl kirin)?"

Qewî zehmet çî ye tê da kelahî
Selam û sed selam li remzên kufaran (88/7)

Kî bi dil kafir e secde nebitin cebhet û xalê
Ya nedit şehde bi ayatê di wê weqt û mecalê (122/3)

**1.1.14.3.3. Zulmet**

Zulmet tarîtî ye, wek mecazî di wateya nerehetî û eziyetê de jî tê bikaranîn. ‘Aşiq, di destê yarê de bi gelemperî nerehet e û di eziyetê de ye. Mehbûbê ew avêtiye nav tarîtiyê.

Suflewê înam û avêtim zemîna zulmetê
Lê go hişyar im ez ya xewn e min dîtî bi xwab (16/17)

Di medh û senaya memdûhî de ji bo qudretnîşana wî zulmet û nûr bi hev re hatine bikaranîn. ‘Elametên qudreta Xwûda nayêne zanîn, lewra ‘eqlê însên nagehiştê ku Xwuda çawa tarîtî çêkiriye û bi nûra xwe dîsa wê rohnî dike.

Bi nîşanê qudret bênîşan î
Çi nîşan zulmetê nûr'efşan î
Li cemalê Semedî burhan î (123/6)

Zulfa yarê jî bi reşahiya xwe ve tarîtiyê çêdike. Cebhet û dêm unsûrên nûrê û ronahiyê ne. Zulf û xal jî ‘elametên tarîtiyê ne. Mehbûb dema pora xwe berdide, li ser wê ronahiyê dibe sî û tarîtî. Mehbûbê bi tîrên qizil dilê ‘aşiqî birîndar kiriye û ji bo kewgirtina birînê, ‘aşiq ji wê dixwaze ku nîqaba reş (zulf, çara reş) ya li ser rûyê xwe rake ku wê bibîne.

Cebhet û dêm neqqişand misk û zebad lê reşand
Nûr ji zulmetê reşand taze kişande xet bi xet (60/3)

Naêt ji wê dîn wesfetan dêmê şemala zulmetan
Serdar e ta însanetan idraq ji wê girt eslîyan (90/10)

Mecrûhê tîrên qizil în rehmê ke pur sohtîdil în
Vê perdeyê carek hilîn bavê nîqaba zulmetê (125/3)

**1.1.14.3.4. Zulm, Zalim**

Zulm, neheqî, eziyet û îşkence ye. Tenê di beytekê de ku ne’et e, behsa rakirina pêxemberî ya zilm û zaliman tê kirin. Ji bilî wê, zulm û zalim, derbarê mehbûbê de hatine beyankirin. Heta wuslat çênebe, ‘aşiq zulm û azarê dibîne. Mehbûb dema

bêînsaf û bêmerhamet be, dibe zalim û xeddar, zulmê li dildar û ‘aşiqên xwe dike.[274] Di dîwanê de, zulmkirin û zalimiya yarê, ji ber azarî, neheqî, bêşefqet û bêrehmiyê, ji ber nepirskirinê, ji ber firaqê ye. ‘Aşiq, hinek caran bi zulma wê dilşad e, hinek caran naxwaze şîkayetdar be û hinek caran jî zulma wê ve bi êş û birînên xwe, ‘eşkere dike.

Zalim veşêrî kufrê nema qet di dinê da
Cennet bû muzeyyen xemilîn hor û peri ne (101/7)

Ew cefa çû der ji hed zulma te bîr hetta biçîn
Rehmê carek nekî hey zalim ev azarî bes (52/10)

Buhayê ‘işweyek le‘lan me yekser ma melek bexşî
Dil û can wê li ser dayî weh zalim hêj dibêjit deyn (85/6)

Dilber çi bê hed zalim e carek neket pursê li me
Lazim bi halî 'alim e lê pur didêrit xederê (113/18)

Zulma tu key pir pê xweş im sohtîdil û hicrankeş im
Mislê perengê ateş im rûhek mucerred bêkeş în (79/20)

#### 1.1.14.3.5. Înkar, Munkîr

Înkar, qebûlnekirina tiştekî ye. Ji bo îspatkirina rîsaletê, pêxemberan bûyerên awarte nîşan dane. Yek ji wan jî Mûsa Pêxember e. Wek mucîzewî, destê wî spî dibûn. ‘Aşiq, ji bo îspatkirina evîna xwe naxwaze mu’cîzeyan nîşan bide, lewra nîşandana mu’cîzeyan bi înkariya dîn ve tê nîşandan. Bi şubheyê îman qewî dibe. Şa’ir, bi serabê (şuphe) gehiştiye şerabê (‘eşqa îlahî). Ewên înkariyê dikin hetta ebedê, dê dı serabê/şupheyê de bimînin.

Hacet niye cana yedê beyda biderînî
Înkarî di dîn da nebit î‘cazî çi hacet (21/10)

Min rê ji şerabê bi serabê bir û munkir
Hetta bi ebed teşneceger ma di serabê (112/11)

#### 1.1.14.3.6. Munafiq, Muşrik

Di dîn de cezayê munafiq û muşrîkiyê zêde ye, lewra ji bo heyata îctima’îyê kareki xirab e û xapandina însanan e. Xwûda rûyê munafiqan reş kiriye û cezayê wan

---

[274] Xusûsiyetê mesleka mehbûban e; heta ceza û îşkenceyê nedete ‘aşiqî, şerbeta weslê nadetê.
Şerbeta wesla xwe nadet yar henin 'aşiq ceza det
Dilberan ev reng e 'adet mehruwan kemter wefa ye (96/18)

jî dardakirin e. Emr û nehyên îlahî bi ‘eşkereyî hatine vegotin. Kesên emrên îlahî seh bikin êdî pêwîst e ji muşrîkiya xwe derkevin, îmanê bînin.

Dêwê mel‘ûn û munafiq ê Xudê rûreş kirî
Ma bi bala hilkişîtin ‘aqîbet çêbit selab (16/18)

Secde bin ber te rewa ye di hemî mezheb û dînan
Kî dibit muşrik û kafir şîrîn dehenê (109/11)

#### 1.1.14.3.7. Mel‘ûn, Le’în

Kesên, xerabî û gunehên mezin bikin têne qewirandin. Kesê hatî lanetkirin û qewirandin êdî di du dinyayan de jî îflah nabe û aqibeta wî jî giran dibe. Mel’ûnê mezin Îblîs e. Ewî secde ji Adem re nebiriye û hatiye lanetkirin. Di beytên Mela de mel’ûn bi tewriyewî hatiye bikaranîn. Di navbera Xwûda û Adem de le’în û mel’ûn Îblîs e, lewra di şexsê Adem de xwestiye hemû însanan ji rêya Xwûda dûr bike. Di rêya ‘eşqê de jî dildarên mehbûbê gelek in. Reqîbê mel’ûn, dikeve navbera ‘aşiq û me’şûqê de, astengiya wuslata wan dike. ‘Eşq, nexweşiyek e ku tebîbê wê tune, tenê dermanê wê wuslat e, lêbelê reqîbê le’în û rûreş ji vî dermanî re asteng e.

Dêwê mel‘ûn û munafiq ê Xudê rûreş kirî
Ma bi bala hilkişîtin ‘aqîbet çêbit selab (16/18)

Paş firqetê zor muhbetê me ji tel’etê çûm hezretê
Wesla hebîb min bû nesîb mel‘ûn reqîb rencûri bû (107/13)

'Işqi derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

#### 1.1.14.4. Mewhûm û Terîmên Pûtperestiyê (But/Put, Lat, 'Uzza û Menat, Pûtxane, Senem, Nîgar, Heykel)

Put, di edebiyata klasîk de wek îstî’areyî bûye navê yarê. Di dîwarên dêran de bi şeklê mozaîqî ji aliyê ressamên navdar ve teswîr û neqş dihatin çêkirin. Ev neqş û teswîr gelekî spehî û balkêş bûn. Spehîtiya yarê jî wek teşbîhî/îstî’areyî bi van neqşan ve hatiye vegotin. Di pêşiya Îslamiyetê û di serdema ewwilîn de di nav ‘ereban de putperestî berbelav bû. Di Ke’beyê de bi navê Lat, Menat, ‘Uzza Hûbel, putên mezin hebûn û ji wan re rêzdarî dihate girtin.[275]

[275] (Gelî pûtperestan!) De ka ji min re bibêjin, Lat û Uzzayî? Û sisêyê wan ê din Menat (çi qudreta wan heye ku hun ‘îbadetî wan dikin). Sûreya Necm, 53/19-20.

But, Lat û 'Uzza, di dîwanê de, ji ber cazîbedarî û spehiyê ve, wek îstî’areyî bi navê yarê/mehbûbê hatine bikaranîn. Ji aliyê spehîtayiyê ve, ji aliyê bejn û balayê ve, ji aliyê dilgirtî û perestiyê ve, ji aliyê nexşandinê/xemilandinê ve mehbûb/yar, weke putan (Lat, Menat, ‘Uzza) hatiye wesifandin.

Heya bînahiya çehvan but û ‘Uzza û Latê min
Tu yî pêşber sucûda min sehergahan di xelwê da (5/39)

Zulfên but û şîrînleban jehrî ne şubhet ‘eqreban
Lê min ji biska purgirî îro tinê girtin du ta (7/4)

Husn û zatê but û latan ji cemalê Semed e
Li misalê senemî weku tecellayê Semed (38/6)

Hor û wildan û perî cumle cema bin îro
Mûyekê pê ji xetê wê but û latê nadim (75/2)

Ev hûr û perîçehre but û latê cemalê
Der sûretê tehqîqê Mela ‘eynê mecaz in (84/13)

Heyat bi min her wesl e du lat ger bibin latek
Murad bi xwe her esl e têk da bibne sifatek
Ji hev êk nîne fesl e Wahid bimînit zatek (132/35)

Put, wek unsûrekî telmîhî, îşaretê bi Azerê babê Ibrahîm Pêxember dike. Putê ku Azer diheband di çarçoveya yekîniya hebûnê de (wehdetu’l-wucûd) hatiye bikaranîn. Azerî, caran tecellî di wan pûtan de dîtiye, perestî ji wan re kiriye û caran jî tecellî nedîtiye ku bidîta dê pûtên xwe hûr bikiraya.

Xundê latê Azer î tu bê çi şîrîndilber î tu
Her cihê lê bêwerî tu bê xîlaf ew Ke'be ye (97/39)

Azerî ger bidîya hûr dikirin Lat û Menatê
Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê (121/3)

But û Lat, şabaşên li ber lingên memdûhî ne. Di kevneşopiya kurdan de dema kesekî ‘ezîz û qedirbilind bihata, di wê civakê de çi tiştê giranbiha bûya ew tişt li ber lingên wî dihate belavkirin. Bi ‘erebî, nîsarê qidemê, bi kurdî şabaş jê re tê gotin.[276] Memdûh ji nesla Qureyşiyan e û pêwîst e tiştên giranbiha jê re bêne şabaşkirin.

Çendan te but û latê nisarê qedemî ne

---

[276] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 86.

Î'cazê me ke vê ku tu ji neslê Qereş i (129/6)

Ji bo beyankirina tecelliya navên Xwûda, peyva pûtê hatiye bikaranîn. Di ezeliyetê de husn û muhebbet yek bûye. Teclliya wî, di ‘aşiq û me’şûqan de, çawa ku heqîqet di neynikê de xwûya dike, wisa tecellî bûye. Xwûda mezherê ruh û heyatê ye; mehbûb û putên têne hebandin tecelliya sifetên wî ne, bi tecelliya navê mehbûba heqîqî; yar wek îns, perî, wildan û hûriyan xwûya dibin. Xwûda zatekî wahid e, bi sifetên xwe di heyînan de tecellî dibe. But û Lat û te’eddûdên mayî mehbûbên mecazî ne. Sirra wehdeta mehbûbê, li pêş perdeyê, bi nav û sifetên cuda, hatiye veşartin.

Husn û mehebbet zatek in me'şûq û 'aşiq latek in
Lê sûret û mir'atek in her yek di me'nayê xwe da (9/11)

Ne tenê qend û nebatê mezherê rûh û heyatê
Hem but û 'Uzza û Latê lew me dil butxane ye (97/38)

Ew latê husn û 'eynê nûr sûret bi sûret tên zuhûr
Ins û perî wîldan û hûr cî cî di wan da cilwe da (9/89)

Wahidi zatek ferd e tecella d'wan sîfatan
Li eynê dil nezer da li cimley te'yînatan
Tewehhum bûye perde bi ismê but û latan (132/36)

Pût, ji bo bawerî û emîniya pîrê xerabatê bûye mijar, lewra pîr, di rêya sulûkê de çi emrî bi murîdên xwe bike, eger ew bêbesîret nebin dê bînin cih. Di terîqetê de gotinên pîrî, bi mutleqî pêwîst e bêne cih.

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê muridê wi dibin qatê
Mûrid er bê beser nebwed zi fermaneş bider nebwed
Ke salik bêxeber nebwed zi rah û resmê menzil ha (4/5)

#### 1.1.14.4.1. Bûtxane/Pûtxane

Bûtxane, perestgeha pûtan e. Ew cih hem mekanekî maddî ye hem jî me’newî ye. Di edebiyatê de bi gelemperî ji ber ku mekanê baweriyê dil/qelb e û qelb jî di nav singê de veşartiye, mekanê perestinê jî ew der e. Dilê şa’irî, sîne/singê şa’irî, ji ber tecellaya put û mehbûban butxane ye.

Ne tenê qend û nebatê mezherê rûh û heyatê
Hem but û 'Uzza û Latê lew me dil butxane ye (97/38)

Ji me dil Ke'be û butxane kirî
Pêş şem'a xwe perwane kirî (123/4)

Ji neqşê but û latan me sîne butxane ye
Te'eyyuna sifatan tecella qelbê me ye
Di 'îd û şev beratan ji wan ra me secde ye (132/4)

Sîne pûtxane ye îro me ji dêm û qed û qiştê
Bi dilê sade çi kim ez ku tecella negehiştê (122/2)

**1.1.14.4.2. Senem**

Senem, weke peyva pûtê, di edebiyata klasîk de wek îstî'areyî navê yarê/mehbûbê ye. Senem, peyveke 'erebî ye. Pût, di dîwanê de bi gelmeperî di wateya perestiyê de, senem jî bi xeml û neqşkirinê ve, bi tecellaya navê Semedê ve derketiye pêş.

Di baweriya wehdetu'l-wucûdê de, senem jî, şahidê esmayê Semed e û hinek însan bûne bengiyên wê tecellayê. Senem, tecellaya Semed e, wek îstî'areyî, bi neqş, spehîtî û îhtîşamê ve, mehbûb e, senem di hinek beytan de rasterast di cihê mehbûba mecazî de, hatiye bikaranîn.

Da şahidê esma bi hemî wechê binasîn
Yek mestê Semed kir bi yekê neqşê senem da (1/4)

Ger bidîya ew senema surcemîl
Nazilê 'erdan nedibû Cebraîl (72/1)

Senema sur ji Semed şewqê ji Heq daye wucûdê
Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê (122/5)

Da bibînî senema min ne bikîn xwendîye xet
Bike telxîsê cewabê me ji vê muxteserê (126/9)

Senemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman ji burcê mîzan bi xezeb li min kişandin (86/1)

**1.1.14.4.3. Nîgar**

Nîgar, resm û neqşên li ser dîwaran in. Wek mecazî/îstî'areyî di wateya yara spehî de tê bikaranîn.[277] Nîgar, neqş û sûretên destxetî ne. Mehbûba weke nîgarê, muhteşem û xweyî edeb e, bi sed rengan ve hatiye xemilandin û di nav gulan de, guleke hêja ye.

Reng rengi husna sûretan neqş û nîgarên desxetan

[277] Farqînî, "Nîgar", b.n.b., r. 1313.

Bala û bejn û qametan nazikleban pur xende da (9/23)

Neqş û nîgarên dilbera der çîn ji remzên esmeran
Her tên di dest neyşekeran me j'gulşenê ferxarê xet (59/4)

Hêvî û tewqe dikim ez ji xûdana heşemê
Wê nîgar û senem û padişeh û muhteşemê (109/1)

Min go ji nîgaran tu gul î bes bi şukûfê
Zanim ne muhib her kes û xar û xes î tu (105/10)

Senem, bi nexş û nîgarên xwe ve, tecellayê husna mutleq e, bi cemalê wê, husn xemilîne û bi wê naz û nazdariyê dikin û li temaşegehê, husna munezzehî dinêrin. Nîgar, bi wesf û xusûsiyetên xwe ve wek şexseke erênî ye, bi tenê di beytekê de nîgar û dilber wek zalim hatine nîşandan, lewra dilê 'aşiqî didin ber xenceran.

Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca
Teşbîhê nîgaran bi cemalê te dinazin (84/9)

Dil girt û da ber xenceran kuştim nîgar û dilberan
Me j'destê zulma esmeran dad û meded dad û meded (40/7)

#### 1.1.14.4.4. Heykel

Heykel, ew lewhe ye ku navê Xwûdê yên mezin û ayet li ser têne nivîsîn û ji bo parastinê bi şexsan ve tê kirin, hemayîl, nivişt.[278]

Di dîwanê de ji bo du'akirina ji memdûhî re, peyva heykelê hatiye bikaranîn. Şa'ir dixwaze ayet û sûreyên derbarê zafer û mensûriyê de, weke hemayîlekî bi toxê wî ve bên daleqandin ku bibe wesileya bi cihhatina muradên wî.

Ayetulkursî û En'am heykela toxa te bin
Bê nihayet pur murad û bê 'eded mensûri bî (117/6)

Heykel, ji bo beyankirina mezinahiya Xwûda (Katib), di wateya stêrên gerok de hatiye bikaranîn. Mebesta "heft heykel"an heft stêrên gerok e, çawa derdora nivîsên li ser kaxez û lewheyan bi haşiye nivîs têne nivîsandin û neqişandin, Xwûda jî ew sîstema gerestêran bi wî awayî, bi xusûsiyetên pênc kulliyatan/kulliyatê xemse ve çêkiriye û ew neqişandiye. Hemaîl û nivişt bi însanan ve têne daleqandin û gerestêr jî di asûmanan de hatine daleqandin.

Katib di çerxê cedwelê xweş neqşi avêtê welê

[278] Melayê Cizîrî, Dîwan (ferheng), r. 386.

Kir haşiya heft heykelê nêv kulliyatê xemse da[279] (9/122)

### 1.1.14.5. Nimêj û Mevhûmên Nimêjê (Qible, Mihrab, Qiyam, Qu'ûd, Seccade, Secde)

#### 1.1.14.5.1. Nimêj

Nimêj ferzeke dînê Îslamê ye. Peyva nimêjê wek “nemaz” bi tenê di du beytan de derbas dibe. Di bikaranîna peyva nimêj û mevhûmên derbarê nimêjê de, bi gelemperî muxatab mehbûb e. Di secdegeha ‘işqê de, li ber mihraba ebrûyan, nimêj nîyaz û lavahiya aşiqê ye. Ji mehbûbê re, sed reka’et nimêj weke secdebirinê xêr nîne.

‘Eqdê îhramê dema dilber xuya bî ferzî‘eyn
Secdeyek ber wan du birhan nagirit cih sed nemaz (45/16)

Mihrabi du ebrû ku ji bala ve xuyabin
Der secdegehê ‘işqê niyazê me nemaz in (84/11)

#### 1.1.14.5.2. Qible

Di nimêjê de ferz e ku meriv berê xwe bide qibleyê. Qible, bi wateya alî û bergehê (îstîqamet) ve û ji bo ‘îbadetkirinê, mekanê berêxwedanê ve, hatiye bikaranîn. Şêx û mela jî, ji bo rênîşandanê qiblenameyê dil in.

Şebkagul e xalfulful e çînsunbul e dava dil e
Min xefletê dî qibletê wek mah nîşan min hebe (100/2)

Teşbîhê tutakên çiyan xew nakirîn şevtariyan
Lê hêj dixwazîn şukriyan çendî ku rû dîn qibletê (125/5)

Nûrê çirayê dil in çehreguşayê dil in
Şeyx û Melayê dil in qiblenûmayê dil in (50/7)

Di dema ‘eqda îhramê de dilber xwûya be, şems (rûyê yarê yê nûrîn) di burca şerefê de (zulfa yarê xwe da paş) derket û muşterî gehişt îstîwayê di dînê ‘işqê de, secdebirin ferza ‘eyn e.

Şems di nêv burca şeref da sed kewakib çar teref da
Muşterî hatî bi ref da istîwa çû qible ye (97/27)

Herdu qiran ku qible bin her çi dema xwuyabin ew
Wê se‘etê di dînê ‘işq lazim e yek du secde ferz (56/2)

---

[279] Kulliyatê xemse ev in: cins, cûre/new’, cudahî/fesl, peydabûyên taybetî/xasse û peydabûyên giştî/’erezê ‘am. (Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî,* c. 2, r. 486; Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 261-262.

Di navbera birû, rû û qibleyê de têkiliyek heye. Çawa ku qibleya bawermendan yek e û ew jî Beytu'l-Heram e, her wisa qibleya 'aşiqî jî yek e û qibleya ku şa'ir/'aşiq berê xwe didetê, rû û birûyên hîlalî yên mehbûbê ne. Mehbûba ku şewqa xwe ji Semed hilgirtî, ji însanan re ruh, heyat û qible ye.

Dil yek û dê 'işq yek bî 'aşiqî yek yarî bes
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildarî bes (52/1)

'Işq û cemal l'yek zêde bit xal eswed û dêm qible bit
Pêşber du nûnan lê secde bit vêkra biwêrin suhbetê (125/9)

Xal eger bi wechekî bête qiranê ebruwan
Şubhetê Beytê Meqdes Ke'be dibin du qible ferz (56/6)

Qibletî wechuke fî kulli sebahin we mesa'
Bi du ebruyê te cana dixurim ez qesemê (109/13)

Ew e min rûh û heyat û ew e min qibleyê zat
Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê (121/1)

Qible, ji ber secdebirina melekan bûye mijar. Hinek melek hene daîm di rukû' û sucûdê de ne. Xwûda bi tecelliya xwe, ji melekan re bûye qible û erbabê du'agûyan jî, ji bo 'erzkirina halê xwe, berê xwe didin qibleyê.

Te nehin bawer û îman nezerê dî û binê
Çi tecella ye buwî qible melek rû didinê (121/3)

'Erzê kî dê bikirim sûretê hal
Ku tu bî qibleyê erbabê du'a (3/3)

#### 1.1.14.5.3. Mihrab

Mihrab, ew cih e ku îmam li mizgeftê li pêşiya xelkê tê de nimêj dike[280] û di edebiyata klasîk de, bi goreyî ramana tesewwifî, bi şeklê xwe ve bi teşbîhî, wek birûyên mehbûbê tê tesewwûrkirin. Mihrab, di dîwanê de bi kînayewî hatiye bikaranîn û bi wateya xwe ya mecazî ve bi mehbûbê re têkildar e. Mihrab her daîm bi 'aşiqî re ye û li ber wê dimeşe, di batinê de çawa herdu birûyên mehbûbê secdegaha 'aşiqî ye, her wesa, di nav 'ilmê ehlê halê de jî mihrab, ebrû û xalên mehbûbê ne. Dema 'aşiq bi dilekî safî mihrabê bibîne, pêwîst e biçite secdeyê. 'Aşiq, 'arif û sûfî di secde, îbadet û du'ayan de berê xwe didin mihraba birûyên mehbûbê.

[280] Melayê Cizîrî, b.n.b. (ferheng), r. 399.

Herdu birhên te ne mihrabi çi îman û çi kufr
Bûd û nabûd ku yek in ew çi sewab e çi ‘îqab (13/12)

Di batin secdegaha min ji bo wê herdu ebrû ne
Bi 'eynê taqê mihrab in di 'ilmê ehlê hal ebrû (106/11)

Tinê ew secdeya şukrê dibet mihrabê qewseynan
Ku delq û şeml û seccade bi vê avê qesaret kir (42/8)

Cezbeyê dil ji wucûd bir xef ji ber 'eynê hesûd bir
Min bi mihrabê sucûd bir lê hecer nîşane ye (97/12)

Sûfiyê xilwetnişîn bîn di sucûd
Herdu birhên te ne mihrabê du‘a (3/2)

**1.1.14.5.4. Qiyam û Qu'ûd**

Peyva qiyam û qiyametê bi hev re têkildar in û di beytekê de di wateya rabûna qiyametê de hatiye bikaranîn. Zulfa yarê li ser rûyê wê dakeve, belav bibe, qiyamet radibe û ‘alem hemû zîr û zeber (perçe perçe) dibe. An jî dema ba, ji nişka ve, zulfa yarê ji ser rûyê wê yê nûrîn rake, hem bi belavbûna porê û hem jî bi xwûyakirina rûyî, dilê ‘aşiq derbeder dibe. Husn û cemalê munezzeh di rûyê camala mehbûbê de bi endam û zulfan ve (qed û qişt) tecellî dibe. Di vê xwûyakirinê de herçendê wuslat peyda nebe jî, di qiyam û qu’ûdê de, qible dîsa li ber rûyê mehbûbê ye.

Tirsim muxalif ba detê zulfên li dora cebhetê
Raket qiyam wê sa‘etê ‘alem bibit zêr û zeber (43/11)

Ger bikit husn û cemalê xwe tecella di kenîştê
Sîne putxane ye îro me ji dêm û qed û qiştê
Bi dilê sade çi kim ez ku tecella negehiştê
Ew e min qibleyê cebhet di qiyamê di qu'ûdê (122/2)

Qiyam sekinîn û bendemayîn e, şa’ir, ji ber bendemayînê êdî bêsebr e, perdeya sebrê, ji dil dirandiye û dixwaze Me’rûfê Kerxî êdî ji kerxê were halê wî bibîne. An jî şa’ir, di rêya seyr û sulûkê de perdeya navbera alema xeybê û şuhûdê ji dil dirandiye û hatiye mertebeyeke bilind, êdî zanayê wê ’esrê ew e û bila Me’rûf jî were vê heqîqetê bi serê çavê xwe bibîne.

Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand
‘Arifê weqt im û Me‘rûfi bila bêt ji Kerx (37/4)

#### 1.1.14.5.5. Seccade

Seccade, cila nimêjê ye û ji bo paqijiya ‘erdê, nimêj li ser tê kirin. Seccadeya hinek ‘arifan ji hêstêrên çavan şil bûye, dema berê xwe didin qibleyê li ser seccadeyê, birînên dilên wan der dibin û hêstêr ji çavan dibarin. Ji ber zêde hêstêrbarandinê jî, xwûn dikeve çavan. Bi vî awayî, heta ‘aşiq seccadeya xwe bi rengê şeraba sor rengîn neke (hêstêran zêde nebarîne, lawahî û gaziyan neke), wuslat peyda nabe û dest nagehije şehzadeya gerdenzirav û gerdenmirarî. ‘Aşiq li ber mihraba qewseynan, li seccadeyê, secdeya şukrê[281] dibe, bi vê secdebirinê re, bi ava badeya rengîn xirqa û seccadeya xwe paqij dike, xwe ji kirêtiyên me’newî azad dike.

Hetta bi nûra badeyê rengîn nekî siccadeyê
Dûr î ji wê şehzadeyê durdaneya gerden ji 'ac (31/6)

Tinê ew secdeya şukrê dibet mihrabê qewseynan
Ku delq û şeml û seccade bi vê avê qesaret kir (42/8)

Seccade, wek semboleke nimêjê herçendê tişteke maddî jî be, zêdetir îşaretê bi manewîyatê dike û di hemû beytan de jî bi vî awayî hatiye bikaranîn. Lewra di nimêjê de herçendê seccade bête ‘emilandin jî, di navbera ‘aşiq û me’şûqê de wek perdeyekê ye, bi dû’ayên samîmî yên ji dil, ew perde jî xwe dide paş.

Dil kemerbeste di 'işqê û bi xwe zunnarperest în
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e (94/2)

#### 1.1.14.5.6. Secde

Secde di dîwanê de di wateya xwe ya te’zîm, di bilindkirina şanê mehbûbê û ‘îbadetê de hatiye bikaranîn. Di navbera Ke’be, Eswed Hecer û mihrabê de têkiliyek hatiye danîn. Ke’be ji ber pîroziyê ve rûyê yarê ye, Eswed Hecer bi reşatiyê ve xal û nîşana yarê ye û mihrab bi şeklê ve herdu birhên yarê ne. Ke’be, Eswed Hecer û mihrab, wek kînayewî di beytên Melayê Cizîrî de hatine bikaranîn, yanî di van terîman de wateya mecazî li pêş e.

Birûyên mehbûbê mihrab û secdegah in, ‘aşiq û dil, li ber wan diçine secdeyê. ‘Aşiq li ber qedd û qameta mehbûbê diçite secdeyê; ‘aşiq li ber Ke’be û Eswed Hecerê

---

281 Edakirina secdeya şukrê, sunnet e. Piştî bela mûsîbet li însanan radibin an jî qencî û başiyek li wan peyda dibe, ev secde tê eda kirin. (Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 313.

(rû û xal) diçe secdeyê, secde ji bo te’zîmkirinê ye; esma, ji ber nûra tecellayê, diçine secdeyê û secde ji bo şukrê (secdeya şukrê) tê kirin.

Herdu birhên te ji îxlas û yeqîn
Me di wê secde ye adabê du‘a (3/6)

Da ji mihraba du ebruyan secde bit Eswedhecer
Dil bi mîzan mahê new ebrû numayê rast û çep (17/2)

Nûra tecella hate 'erş esma hemî lê bûne neqş
Şewqa di wan çû ta bi ferş isman bi zatî secde da (9/69)

Secdeyan ber eswedê nadim bi sed hecc ekberan
Sond dixûm bi zulfa sîyah ez ‘abidê husna te me (93/20)

Wê mecalê ku cemalê xwe tecella dikirî
Lazim e secde bibîn ber te di vê gav û demê (109/10)

Secde bin ber te rewa ye di hemî mezheb û dînan
Kî dibit muşrik û kafir şîrîn dehenê (109/11)

Secdebirina melekan û nebirina Iblîs ji Adem pêxember re, di dîwanê de weke telmîhî hatiye bikaranîn. Ên nûra Xwûda tê de dîtî secde birine û yê nedîtî (Iblîs) nebiriye.

Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê (122/1)

#### 1.1.14.6. Zekat û Mefhûmên Wê (Selem, Nîsab)

Di dîwanê de peyva zekatê di du beytan de derbas dibe. ‘Aşiq miskîn û feqîr e û yar jî zengîn e; husn û cemalê yarê bi kamiliya xwe ve gehiştiye dereceya nîsabê, êdî pêwîst e yar zekata spehîtiya xwe bide. Ji ber vê yekê ‘aşiq wek zekat ji yarê wuslatê dixwaze, lê belê yar dibêje tu ‘ebdê (kole) min î, zekat, bi koleyan nakeve.

Ji wîsala xwe zekatê bide miskîn û feqîran
Ku cemalê te ye kamil di kemala xwe nîsab e (94/17)

Minnet ku ji bextê xwe û tali' bi nesîb im
Husna te ye îro ji me ra çûye nîsabê (112/6)

Telbe kir weslê j'dilber me bi 'inwanê zekat
Go tu 'ebd î û bi 'ebdê xwe zekatê nadim (75/8)

### 1.1.14.7. Hecc û Mefhûmên Derbarê Heccê de (Hecca Ekber, Hecca Mebrûrî, Hacî, ‘Umre, Sefa û Merwe, Se’y, ‘Erefat, Tewaf, Îhram)

Hecc, yek ji wan pênc şertên Îslamê ye ku di demeke mu’eyyen de, bi usûlî, ji ziyaretkirina Ke’beyê û cihên pîroz yên derdora wê û bicihanîna menasîkên wê pêk tê.[282] Hecc, ‘îbadeteke gelekî bixêr e û gûnehên di pêşiya heccê de têne ‘efûkirin. Kesê biçite wê derê û ferziyetan pêk bîne jê re “hacî” tê gotin.

Herkesê rabî di behsê carekê mehder biket
Xêrê heftê hecc didêrî belku bêhtir ew sewab (16/26)

Hecca ekber, hem hecca ferz e hem jî ew roj e ku roja ‘erefeyê rastî şeva înê bê. Ji bo ‘aşiqî, li ber zulf û xalan secdebirin, ji sed hecc ekberan xweştir e. ‘Aşiq/hacî, bi îhramê qesta eswedan (zulf û xal/wuslat) dike û diçe destên yarê, cohtên hebeşan (çav), tîran li ser ‘aşiqî diweşînin; lê dîsa ew tewafa xwe temam dike û hecca wî, wek hecceke meqbûl (hecca mebrûrî) tê pejirandin.

Secdeyan ber eswedê nadim bi sed hecc ekberan
Sond dixûm bi zulfa sîyah ez ‘abidê husna te me (93/20)

Îhram me best eswed bû qest yar hate mest ez çûme dest
Cohtê hebeş tîr dan bi weş *hecca* me xweş mebrûri bû (107/17)

Hecc û mefhûmên heccê bi gelemperî bi tewriyeyî bi kompozîsyona rûyê yarê ve têkildar in. Rûyê yarê wek tecelliya husna munezzeh pîroz e û weke Ke’beyê ye. Mefhûmên di vê derbarê de hatine bikaranîn di vê wateyê de hatine teheyyûlkirin. Zulfa yarê reş e û li ser rûyê ve tê û wê vedişêre, cila li ser Ke’beyê jî reş e. Xal û nîşanên yarê bi rengreşahiya xwe ve Heceru’l-Eswed e.

Hecc û mefhûmên wê, bi têkiliya yarê ve têne bikaranîn. Dema ji ser rû û gerdena mehbûbê perde radibe, ji haciyan re se‘y (hecc an jî di ‘umreyê de di navbera Sefa û Merweyê de bi usûlî, heft caran çûn û hatin e) û tewaf û ‘umre (hecca piçûk, hecca sunnet) ferz dibe. Hacî di vê rêwîtiyê de dikevin nav cehd û rîtûelan û rûhên xwe paqij dikin. Di vê rêwîtiyê de tewafa pê û destên yarê, ji ‘aşiqî re, ji weqfeya ‘Erefatê xweştir e.

Cebhet û dêm û gerdenê perde dema ji ber biret
Ferz e Mela li haciyan se‘y û tewaf û ‘umre ferz (56/8)

---

[282] Karaman ûym., b.n.b., r. 210.

Ger bidit destî tewafa pê yû destan bigirim
Wê mecalê bi wuqûfa 'Erefatê nadim (75/3)

#### 1.1.14.7.1. Sefa û Merwe

Safa û Merwe, du girên nêzikî Ke'beyê ne. Çûn û hatina di navbera van herdu giran de (se'y), şertekî heccê ye. Safa, rêveçûna rêya yarê wek tevrîyeyî temsîl dike. Dema mehbûb nîqabê ji ser rûyê xwe radike û destûra tewafê dide, 'aşiq, di se'yê de Heceru'l-Eswedê (xalên yarê) ziyaret dike.

Ji ber dêmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Di se'yê beyt û îhramê û min Eswed ziyaret kir (42/5)

Haciyan (zulfa yarê ya xelekî û çengelî), li dor heyîvê (rûyê dildarê), hev girtine, ji Sefa û Merweyê (mebest enî û rêveçûna bi ber yarê ve) têne Beytê (rûyê yarê). Du mîrên serxweş (cezbeya îlahî) û bêînsaf (du çavên yarê yên mest û mêrkuj), nahêlin hacî biçine ziyareta Heceru'l-Eswedê (xal û nîşanên yarê). Hebeşî (zulf), li derdora berê reş dizivirin. Ev menasîk, di 'umrê de û di 'erefeya 'îdê de pêk tên.

Secdeya ber nûn û dalan min tewafa zulf û xalan
Ew bes e j'sahibcemalan da biçîn lê 'umre ye (97/13)

Sunbulên re'na li ber taqê hilal
Wê dikin se'yê li ser Merwe'w Sefa (10/6)

Her li dora Hecer eswed Hebeşan çerx e tewaf
Rast û çep tên 'Erefatê bi sema nû bi û Zeng (71/11)

#### 1.1.14.7.2. Tewaf

Tewaf, ew e ku di serdema heccê de gerana heft caran li derdora Ke'beyê ye. Ev geran nîşaneya muhebbeta Xwûda ye. Tewaf, bi teşbîhî ji bo zivirîna stêran hatiye bikaranîn û wek tevriyeyî, ziyaretkirina mehbûbê ye û ziyaretkirina Heceru'l-Eswed/Berê Reş e.

Min go du şevan şubhê nucûman bi tewaf în
Go 'işwe dizanin bi çi qest û hewes î tu (105/12)

Ji ber dêmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Di se'yê beyt û îhramê û min Eswed ziyaret kir (42/5)

Pêlek ziyaret çin tewaf şubhê wê nînin Qaf bi Qaf
Zemzem ji yaqutê şefaf can dê bibexşim şubhê av (65/14)

Kor e xwe nasipêrit carek bi dest delîlan

Ebleh çi ket tewafê nabînitin Berê Reş (53/10)

Sofiyên hero di tewafa Heceri'l-eswed qest
Ku li silsil bi sema tên hemayan zimzim e çerx (37/2)

Tewaf, di lîteratûra tesewwifê de wek mecazî, ji aliyê stêr, kevana nebî (qews û quzeh) û lû'lûyan ve ziyaretkirina zulf û xalên dilrûbayê ye. 'Aşiq dest û pêyên mehbûbê û zulf û xalên wê tewaf/ziyaret dike.

Kewkeb û qews û quzeh hem lû'lû' bendê heyderî
Tên tewafa zulf û xalên dilrubayê rast û çep (17/8)

Çû tewafa pê û destan şubhetê sekran û mestan
Ehlê hal û xûbperestan wan ji 'umr ev mudde'a ye (96/20)

Ellah Ellah çi tecella te ji sirra qederî
Nehêlin çîte tewafê we ziyaret Hecerî (121/2)

Ma dibit bêheq xîlafê ser detê ma vê nisafê
Er bikî bême tewafê min bi eswed secde ye (97/40)

### 1.1.14.7.3. Îhram

Îhram, ew cilê bêdirûn e ku di hecc û 'umreyê de tê wergirtin û sembola kefen, sadebûn û paqijiyê ye. Wek terîmeke fiqhî, di hecc û 'umreyê de ji nefsa xwe re meni'kirina (qedexekirin) hinek tiştên mubah e[283] û ji bo terbiyeya nefsê tê kirin û sembola teqwatiyê ye. Niyet û telbiye (gotina lebbeykê) du ruknên îhramê ne.[284] Îhram, di dîwanê de, wek îstî'areyî, di wateya girêdana cilê îhramê hatiye bikaranîn. Zulfên yarê, îhram girêdane, ji ber mestiya evînê hatine semayê û di 'eşqê de ji bo nîşana evîndariyê, girêdana îhramê besî 'aşiqî ye.

Min di seher zulfên di mest hatin sema *ihrami* best
Çûn secdeya xalê bi qest lew haciban mihrabi da (2/3)

Min di benda zulfekê dil da bi destê pîrê 'işq
Lew di 'işqê da ku best îhramî yek zunnarî bes (52/2)

Peyva îhramê, bi raveka navî, wek "eqda îhramê (niyetanîna nimêjê) ji ber armanc û niyeta 'aşiqî, bûye mijarê dîwanê. Dema bi dilekî saxlem niyet hate dan, êdî encambûna fi'lê ne muhim e, lewra 'emel bi goreyî niyetan in.[285] 'Aşiq, bê niyeta

[283] Yeğin ûym., b.n.b., r. 420.
[284] Karaman ûym., b.n.b., r. 300.
[285] Ji 'Umerê kurê Xettab (ra.) hatiye vegûhaztin (rîwayet kirin), gotiye: Min bihîst ku pêxemberê Xwûda (sxl.) digot: "Bêgûman, 'emel/kirin, li gor niyetê ne û ji her kesî re tişta ku niyet kirî heye."

îhramê, diçite secdeyê, lê ‘uzrê wî heye lewra ew birîndarê mehbûbê ye û ‘îbadetên wî bi vî şeklî jî meqbûl in. ‘Aşiq hemû deman ji mehbûbê re amade ye ku secdeyê bibe, lewra piştî niyetanînê, ji du birhên dilberê re secdebirin, ji sed nimêjan xêrtir e.

'Eqdê îhramê di 'işqê da ku pîrê 'işqê best
Dê çi xem ger xirqe rehnê xaneyê xemmarî bit (19/7)

Hadirî çûm secde jê ra lê niyet îhram ne vê ra
'Aşiqê ev gezme tê ra her çi ta'et kit rewa ye (96/16)

Hêviyan qet nabirim carek tu dîtî şefqe ke
'Eqdê îhramê bibînim hadirî bim secde ye (93/19)

‘Eqdê îhramê dema dilber xuya bî ferzî‘eyn
Secdeyek ber wan du birhan nagirit cih sed nemaz (45/16)

### 1.1.14.7.4. Qurban

Qurban ew tişta gorîkirinê ye ku bi wê nêzikahiya bi ber Xwûda ve peyda dibe. Ji bo ku însan nêzikî Xwûda bibe, ji bo ‘îbadetê, di demeke kifşkirî de, bi wan cureyên heywanên ku dikarin bêne serjêkirin re, ev îbadet pêk tê.[286]

Qurban, nêzikbûn û teslîmbûn e. Di beytên Mela de qurban, ‘aşiq e û ew her daîm dixwaze canê xwe di rêya hebîbê/mehbûbê xwe de qurban bike. Bi taybetî, qurban di ‘Îda Qurbanê de tê serjêkirin. ‘Aşiq, dixwaze roj derkeve û ‘îd zû were ku qessab wî di rêya yarê de qurban bike ku wuslat peyda bibe.

Îde û hebîbê nezr e lê ya Reb bibînim roj hilê
Yan dê bi qurban bibi Melê sikkîn di dest qessabi da (2/12)

Were carek tu derê lutfê veke
Me bi qurbanê têk xençer ke (98/13)

Ku bi kêra te seher qurban im
Xoş birîndarekî bêderman im (123/2)

‘Aşiq dixwaze mehbûb guh bidete gilehên wî û ew naxwaze ji ber nazên cananê bimire lewra wî xwe ji cananê re kiriye qurban.

Cewra te behîtin û cefaya te perêhtîn
Qurbanê te bim guh bide carek gilehê min (87/3)

(Îmam Buharî, *Sahîh-i Buharî*, (Wer. Abdullah Feyzi Kocaer), Hüner Yayınları, İstanbul 2004, c.1. r. 21); Îmam Buxarî, b.n.b., r. 17.

[286] Ahmet Güç, “*Kurban”, DİA*, Ankara 2002, c.26, r. 433-435.

Her lehze çi hacet ku bi nazan bikujî min
Cana ji xwe qurbanê te me nazî çi hacet (21/8)

Wek gula zer bû serwa te mirim
Me bi qurban xwe wek gula zer ke (98/10)

Tu yî rûh û rewanê min bibit qurban di canê min
Te'alallah çi zat î tu çi wê şîrînsifat î tu (124/1)

Caran mehbûb jî dixwaze ‘aşiqî di rêya xwe de bikete qurbanê xwe. Ev xwestin qurbankirina Îsmaîl Pêxember tîne bîrê, lewra Xwûda, ji Îbrahîm xwestibû ku Îsmaîl di rêya wî de qurban bike.

Van 'işweyan dil herrişand sertîr ji xûnê neqqişand
Lew ez dibêm canê Melê îro te qurban e xered (58/15)

### 1.1.14.8. Ke’be û Mefhûmên Wê (Beyt’ul-heram, Zemzem, Heceru’l-Eswed, ‘Umre)

Ke’be, di dinyayê de, ew ‘îbadetgaha yekem e ku li Mekkehê hatiye înşakirin. Ji bo ku şertên nimêj û heccê bêne cih, Ke’be cihekî taybet e û navenda qible û tewafê ye.[287] Ke’be, deriyê dû’a û daxwazan e.

Di dîwanê de, terîmên weke “Ke’be, Beyt, Beytê Meqdes, Beytu’l-heram, Ke’beya Mewla, Îhram, Hecerê Eswed, Zemzem”ê, di têkiliya ‘aşiq û me’şûqê de hatine bikaranîn. Rûyê yarê Beyt e, dema yar nîqab/poşiyê ji ser rûyê xwe tavêje û destûra tewafê dide, ‘aşiq se’y dike, Hecer Eswedê (pora reş ya yarê û xalên wê) ziyaret dike. Xal û birûyên yarê ji ‘aşiqî re weke Beytu’l-Maqdîs û Ke’beyê, qible ne û ferz e ‘aşiq berê xwe bidete wan.

Bê ya lebşeker î ya ji nebata teber î
Dor beytê ji sefa têne semaya seherî (121/2)

Ji ber dêmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Di se‘yê beyt û îhramê û min Eswed ziyaret kir (42/5)

Ke’be û Eswedhecer perde hilînin ji ber
Lazim e yek secde fer secdeyê şukrê biber (50/7)

Xal eger bi wechekî bête qiranê ebruwan
Şubhetê Beytê Meqdes Ke‘be dibin du qible ferz (56/6)

[287] Kâmil Yaşaroğlu, “*Kâbe”,* DİA, c.24, İstanbul 2001, r. 21-22.

Ke’be, di hişmendiya ‘aşiqî de, ji sînorê xwe derketiye û bi mecazî û pîroziya xwe ve hatiye bikaranîn. Dil, mala Xwûdê ye û weke Ke’beyê pîroz e. Raqîb, leşkerê qehr û xeman e, di meheke pîroz de dil dorpêç kiriye. Di meha Recebê de ku yek ji wan mehên heram e ku di wê mehê de şer nayê kirin; êrişên li ser ‘aşiqî radibin û ew di wê mehê de bextewar dibe. Cihê yar lê rûdine ji ‘aşiq re Ke’be ye û gundê yarê jî weke Ke’beyê pîroz e.

Dil Ke‘beya Mewla ye lê narê Kelîm îsaye lê
Bangê “enellah” daye lê hem Ke‘be û hem Tûr e dil (74/7)

Dilê xemdîdeyê ma şa nekirî
Ji me dil Ke'be û butxane kirî (123/4)

Leşkerê qehr û xeman wê çûn hisara dil bikin
Ke‘be û Beytulheram ew dê bi nûrî bit Receb (14/8)

Xundê Latê Azer î tu bê çi şîrîndilber î tu
Her cihê lê bêwerî tu bê xîlaf ew Ke'be ye (97/39)

Ger xwe nîşa seqerê dit dikirit hûrîbihişt
Ke'beya tê bit ew meygede û dêr û kenişt (121/1)

Koyê o ya Ke'be ya Beytulmuqeddes ya bihişt
Xulde ya Firdewsi ev ya cennet’ul Me'wa sti în (83/9)

#### 1.1.14.8.1. Zemzem

Zemzem, li kêleka Ke’beyê, ava bîrekê ye. Aveke şîfadar tê qebûlkirin.[288] Ava Zemzemê, weke ava Kewserê tê dîtin û bi gelemperî di dîwanê de bi hev re derbas dibin. ‘Eşq, tîbûn e; yek bi avê yek jî bi wuslatê star dibe. “Zemzem” di edebiyata klasîk de di vê derbarê de sembola wuslat û lêva yarê dike. Bi sedan kes weke muşteriyan, mubtelayên ava Zemzemê ne. Zemzem, bi mefhûmên Ke’beyê re bi tewriyewî hatiye bikaranîn. Rûyê yarê Ke’be ye û endamên rûyê jî di vê derbarê de têne me’nakirin û bi taybetî Zemzem, gotin û lebên mehbûbê ne.

Zemzem û xulxul e û 'umre û 'îd e û 'Erefat
Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê (121/2)

Suhbeta çerx û sema tê wek Melê sed mubtela tê
Zemzem û ava heyatê muşterî sed şêx û şox (36/9)

[288] Mustafa Sabri Küçükaşcı, “Zemzem”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 242-246.

Gulşenê Baxê Îrem neyşekerên muhterem
Cumleyê ehlê herem zemzem e wan subhi dem (50/6)

Ser didet abê kewserê zemzemê semayê zulf
Sayenuma ye xawerê sidreyê muntehayê zulf (63/1)

Pêlek ziyaret çin tewaf şubhê wê nînin Qaf bi Qaf
Zemzem ji yaqutê şefaf can dê bibexşim şubhê av (65/14)

**1.1.14.8.2. Heceru'l-Eswed (Berê Reş)**

Heceru'l-Eswed (Berê Reş), kevirek e di dîwarê Ke'beyê de. Ev kevir ji cennetê hatiye û ji bo îşareta destpêkirina tewafê, wek nîşanekê, Îbrahîm Pêxember ew xistiye dîwarê Ke'bê.[289] Destlêdan û selamkirina wî sunnete e. Di edebiyata klasîk de, bi şeklê xwe ve, wek teşbîhî temsîliyeta çavên reş, xal û nîşanên yarê dike. Di kompozîsyona rûyê yarê de, Heceru'l-Eswed (çavên reş, xal û nîşan), mîhrab (birû), tewaf (gerana zulfê li derdora xalê), wek tewriyewî têne bikaranîn.

Cezbeyê dil ji wucûd bir xef ji ber 'eynê hesûd bir
Min bi mihrabê sucûd bir lê hecer nîşane ye (97/12)

Hecer Eswed bidirit destî ziyaret bikirim
Nezrê min bit bigirim xassa terîqa Mekehê (110/8)

Ellah Ellah çi tecella te ji sirra qederî
Nehêlin çîte tewafê we ziyaret Hecerî (121/2)

Biskên siyah xalên di qer reşkagulê zulf çûne ser
Eswed bû daîm secde ber min bestî 'eqda niyyetê (125/1)

'Işq û cemal l'yek zêde bit xal eswed û dêm qible bit
Pêşber du nûnan lê secde bit vêkra biwêrin suhbetê (125/9)

Pora yarê bi bêhna xwe ve gul û sunbul e û bi teşbîha sofiyan hatiye bikaranîn û qesta wan tewafa Heceri'l-Eswedê ye. Yar bêînsaf e wuslatê nade 'aşiqî ku ew Berê Reş tewaf bike. Dema yar pora xwe li ser rûyê xwe tavêje, cemalê wê xwûya dibe, destûra tewafê tê dayîn û 'aşiq Berê Reş tewaf û ziyaret dike.

Sofiyên her di tewafê Heceri'l-eswed e qest
Gul û sunbul bi sema tên hemîyan zimzim e çerx (37/2)

Ma dibit bêheq xîlafê ser detê ma vê nisafê
Er bikî bême tewafê min bi eswed secde ye (97/40)

---

[289] Salim Öğüt, "*Hacerü'l-Esved*", DİA, c. 14, İstanbul 1996, r. 433-435; Canım, b.n.b., r. 142-143.

Ji ber dêmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Di se'yê beyt û îhramê û min Eswed ziyaret kir (42/5)

#### 1.1.14.9. Ferz, Helal, Heram, Guneh, Tewbe

##### 1.1.14.9.1. Ferz

Ferz, ew fî'l û emel e ku bi delîleke qet'î ji aliyê Xwûda û pêxember ve hatiye emirkirin.[290] Di dîwana Melayê Cizîrî de, bi qafiyeya "ferz"ê xezelek heye (Xezel 56) û ev xezel, bi kînayewî, li ber mehbûbê, li ser ferziyeta secdebirinê radiweste. Di dînê 'eşqê de, dema perde û sitare li ber cebhet, dêm û gerdenê rabû û wasilbûn pêk hat, ji 'aşiq û haciyan re li ber mihrabê (birûyên mehbûbê) secde birin; se'y, tewaf û 'umre, di meygedeyê de ji riyayê xwe şuştin, ji salikê 'eşqê re ku ji rêya xwe venegere, tewbe kirin, di de'weya 'eşqê de derew gotin dema çêbû, şehadet anîn ji 'aşiqî re ferz e.

Cebhet û dêm û gerdenê perde dema ji ber biret
Ferz e Mela li haciyan se'y û tewaf û 'umre ferz (56/8)

Yek secde tenê ferz e di dînê 'işqê
Bin ber qedê yarê di mecalê dînê (119/5)

Secdeya şukrê carek me ferz e di wîsalê
Ne perde ne sitarek li ber wechê hilalê
Ehsenellahu tebarek ji sura wê cemalê (132/5)

Neyşekerên şirînzeban mest û bi cama û bade yîn
Ferz tibit ji tewbeyê salikê 'işqê tewbe ferz (56/4)

Er di de'weyê 'aşiqî kifş diket zeban derew
Ketmê şehadetê dibit wê se'etê bi şehde ferz (56/7)

##### 1.1.14.9.2. Helal

Helal, ew tişt e ku di dîn de, kirin, xwarin û vexwarina wê, ji aliyê Xwûda û pêxember ve nehatiye qedexekirin. Însan di wan kirinan de serbest hatine berdan.[291] Di dîwanê de, "helal" ji bo du tiştên heram hatiye bikaranîn. "Xemr û sihr" du tiştên heram in. Şa'ir, wan bi "xemra helal û sihra helal" beyan dike. Xemr, di edebiyata tesewwufê de sembola 'eşqê ye ku 'aşiqî ji hişê wî dibe. "Xemra helal" bi tewriyewî hem tê wateya 'eşqa caîz hem jî tê wateya ew vexwarina tişta helal. Sihra helal, di

---

[290] İbrahim Paçacı, "Farz", *Dinî Kavramlar Sözlüğü,* DİBY, Ankara 2006, r. 172.
[291] Paçacı, "Helal", b.n.b., r. 252.

edebiyatê de tê wateya gotina spehî û rindiyê.[292] Yar hem bi gotinên xwe yên tesîrdar hem jî bi çavên xwe yên sihîrdar, aşiqî dike bengiyê xwe.

Bejna şepal dêmê bi xal î'rab û dal qewsê hilal
Neqşê celal cama zelal xemra helal suhbet bi hal (67/6)

Cama zelal xemra helal yara şepal da min bi hal
'Işqa xedar sohtî sitar nêv me û yar sed sûri bû (107/14)

Zaza bi nayê ra binal saqî werîn xemra helal
Carek ji ser dêmê vemal zulfên li dora cebhetê (125/2)

Dê bi vê endaz û terzê bibit sihrê helal
Ger ne balateb' bit wek pehlewan çalakî rûh (33/13)

Xemze în ya gezme în ya tîri ya sihrê helal
Sahir în ya çeşmê şoxê Turkê bê perwa sti în (83/6)

### 1.1.14.9.3. Heram

Heram, ew fî'l e ku di dîn de bi delîleke qet'î hatiye qedexekirin.[293] Heram, di dîwanê de wek terîmeke fiqhî nehatiye bikaranîn. Peyva "heram"ê derbarê 'eşq, 'aşiq û me'şûqê de wek mecazî, cihê xwe girtiye. 'Aşiq bi gelemperî bêtali' e, şans dema kete destê wî pêwîst e wê firsetê bîne cih, ji firsetê re muhletdayîn heram e, ne caiz e. Cama bi destê mehbûbê neyête dan û 'aşiqî mest neke, ew cam û qedeh, ji 'aşiqî re heram in.

Tali' ku dît furset muhlet li nik heram e
Min 'umrê Nûh nîne were saqî û bi lez xweş (53/7)

Cama ne şekerleb bi me dit 'eynê heram e
Fetwa we numa haşiyeya Şerhê Lubabê (112/15)

Serpoş û qibaba min û 'işq û mey û cam
Cama ku nebes ke bi tenê bes ke xitam
Şahid ne bi mestî bigerînit bi xiram
Ew bade heram e di sed carî heram (130/17)

Kesê 'aşiq, xweyî derd e; ji ber izdiraba evînê û firqeta mehbûbê, xew nakeve çavên wî, xew ji 'aşiqî re dibe heram. Ev rewş, bi biwêja "heram in xewêd şevan" hatiye beyankirin. Kesê mehbûbê carekê bibîne ebedî dimîne zindî û yê wê nebîne jî, heyat jê re dibe heram.

---

[292] Ahmet Mermer ûym., *Eski Türk Edebiyatına Giriş,* Akçağ Yayınları, Ankara 2017, r. 176.
[293] Paçacı, "Haram", b.n.b., r. 232.

Dunya bi min mij bû xemam xew min li çava bû heram
'Umrek bi vî halê temam feryad ji destê firqetê (115/5)

Aşiqên leb û lêvan şabaş e ji Xwedê ra
Selwa û bih û sêvan belçîm ji zîv û zêra
Heram in xewêd şêvan li kesê muhbet vê ra (132/29)

Herkesê carek dîye ew zinde ma hetta ebed
Wê nedidî ew perî dê zindegî lê bit heram (77/4)

#### 1.1.14.9.4. Guneh

Guneh, ew fî’l û hereketên dijberî emr û nehyên îlahî ne.[294] Ev terîm, di dîwanê de, hem bi wateya xwe ya fiqhî ve hem jî bi ya webalî ve hatiye bikaranîn. Şa’ir, xwe di behra gunehan de dihesibîne, eger lutfa Heq nebe, ew ji wê behrê xilas nabe. Ji bo ‘efûkirinê, ew xwe tavêje ber rehmet û şefqeta Xwûda. Ne tenê şa’ir, ehlê xerabatê jî pêwîst e xwe ji heramiyan dûr bigire û rîayetî adabên terîqetê bike.

Xerqê deryayê gunah in teşneyê lutfa Heq în
Rehmeta Amurzîgar û şefqeyê Xeffarî bes (52/11)

Gunah û zuhd û ta’at hilnagirit xerabat
Kesê bi vî derê ret divê biket ri‘ayet (24/5)

Mehbûb, ‘aşiqî bêguneh û mezlûm nahesibîne, gelek caran ‘îtabê li ‘aşiqî dike û ‘aşiq ji ber van te’nan gilîdar e, lewra ew di rêya ‘eşqê de xwe bêsûc, bêguneh û bêxeta dihesibîne û ‘aşiq dixwaze mehbûb carekê jê bipirse ka xeta û gunehên wî çine?

Qet nego qetl e dikim bêguneh û mezlûm e
Reşeqetnî bi nibalin we remetnî bi remîq (66/7)

Xakê payên ku di rêza sek û tûlan xwe dinasîn
Me ne sûc û ne gunah û ne xeta ev çi 'îtab e (94/16)

Xeşmê li feqiran meke zu padişehê min
Pursê bike carek li xeta û gunehê min (87/1)

#### 1.1.14.9.5. Tewbe

Tewbe, ji ber gunehan xwestina ‘efûyê ye. Şa’ir/salikê ‘işqê, tewbe kiriye ku êdî meyê venexwe; lê dema mehbûbên zimanşirîn xwûya dibin, pêwîst e ew ji tewbeya xwe tewbe bike, dîsa meya ‘eşqê vexwe û vegere ser rewşa xwe ya berê.

Neyşekerên şirînzeban mest û bi cama û bade yîn

[294] Mehmet Canbulat, “Günah”, Dinî Kavramlar Sözlüğü, DİB Yayınları, Ankara 2006, r. 204.

Ferz tibit ji tewbeyê salikê ‘işqê tewbe ferz (56/4)

### 1.1.14.10. Şehadet û Şehîd

Şehadet; şehdeyî, di dozekê de şehdebûna li ser bûyerekê ye.[295] Wek terîmeke dînî, di rêya Xwûda de, ji bo dînê Îslamê candayîn e. Ew kesê di vê rêyê de ji bo îlayê kelîmetullahê bête kuştin jê re “şehîd” tê gotin. Peyva şehîdê, mubalexeya navê şahîdê ye. Ew kesê ku di vê rêyê de tê kuştin, hêj li dinyayê dizane ku kesekî cennetî ye, yanî ji xwe re dibe şahid[296] û bi gotina Qur’anê ew zindî ye.[297]

Şa’ir, şahidiya de’weya xwe ya aşiqiyê dike, ew dizane ka di vê rêyê de ew rast û durust e an na.

Er di de‘weyê ‘aşiqî kifş diket zeban derew
Ketmê şehadetê dibit wê se‘etê bi şehde ferz (56/7)

Di dîwanê de şehadet di rêya mehbûbê de pêk tê. Mehbûb bi şûrê xwe yê şerîf dixwaze ‘aşiqî di rêya wê de canê xwe feda bike û bibe şehîdê ‘eşqê. Çawa ku şehîd dixwazin di rêya Xwûda de canê xwe bidin, ‘aşiq jî dixwaze mehbûb li ser soza xwe bisekine û canê wî jê bistîne. Di vê rêyê de şehîdbûn, ceribandina samîmiyetê ye. Mehbûb dixwaze, ‘aşiqê xwe tecrube bike.

Xwûn ji mêlakê bi derba xencerê ma bête der
Bû şehidê 'işqê êdi dê ji ku hişyarî bit (19/10)

We‘de weh dabû şehîd kim wê bi şîrê xwey şerîf
Ma nebî îro peşîman ew ji tedbîra sewab (16/27)

Mehbûb, bi riman, xenceran, reşmaran, şîran û mûkaran li ‘aşiqî dide, wî şehîd dike. Di rêya mehbûbê de bê hisab ‘aşiq şehîd ketine. ‘Aşiq, ji mehbûbê dixwaze ji şehîdên xwe re şefqetê bike û birînên wan bikewîne û wan ji nû ve zindî bike, lewra mehbûb, xweyî mu’cîze ye, weke Mûsa destê xwe spî dike û weke ‘Îsa jî, miriyan sax dike.

Lê şehîdên te bi isbatê bi xencer kuştîyî
Hêj neçû xwûn ji birînan sed û heftad û du şer (54/4)

Şefqê bi dîdarê xwe kit qesta birîndarê xwe kit
Şehîdê reşmarê xwe kit ê ser li fetlan pêşterê (113/28)

[295] Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 382.
[296] Karagöz, “Şehadet, Şehîd”, b.n.b., r. 615-617.
[297] Ewên di rêya Xwûda de hatine kuştin, ji wan re nebêjin “mirî”, belkî ew zindî ne, lêbelê hûn (pê) nizanin. (Sûreya Beqere, 2/154)

Were pêş Melayê xwe şehîd û mubtelayê xwe
Bi şefqet ke lîqayê xwe mera nemrit gedayê xwe
Mesîha yî li bîmaran kesê geztî du reşmaran
Şehîdên şîr û mûkaran kirî amancê nûbaran (124/9)

Were bêperde Mela xwe bi me Nîşanî da seher
Lê ji xwûnê bike perhîz ku şehîdan çi hisab (13/13)

Zanim ne tenê ku yedê beyda tu didêrî
Wer xweş ke şehîdên xwe ku 'Îsanefes î tu (105/2)

### 1.2. Tesewwif

Armanca tesewwifê ew e ku salik û talib bibin însanên kamil û bigehijin ‘alema heqîqî. Tesewwif, di rêya heqîqetê de ji bo wasilbûnê rêwîtiyek e û wendakirina heyînê ye. ‘Evd, bi wendakirina kesayetiya xwe, bi Xwûda re heyî dibe. Ew, ji wesfên muşexxes yên zatê xwe dûr dibe, digihije fenayê û bi Xwûda re baqî dibe.[298] Xusûsiyetê ehlê tesewwifê yê sereke ew e ku giringiyê nade maddiyatê û di ‘alemeke me’newî de, bi jiyaneke sade û mutewazî, heyata xwe berdewam bike. Melayê Cizîrî jî, giringî nedaye dinyayê û jiyaneke mutewazî hilbijartiye. Ew, vê xusûsiyetê weha beyan dike:

Minnet ji Xûdayî ku bi 'ebdê xwe Mela yî
Iksîrê xemê ‘işqê be dînar û direm da (1/10)

Dîwana Melayê Cizîrî, bi terîmên tesewwifê ve dewlemend e. Ew têgeh û terîmên ku wî bi kar anîne nîşan dide ku ew ehlê tesewwifê ye û ji bo ku hest û ramanên xwe beyan bike, şi’r ji xwe re kiriye amûr. Ew terîm û têgehên ji aliyê ehlê tesewwifê ve, ji bo terîqetê, mertebeyên seyr û sulûkê û ‘alema metafîzîkî hatine bikaranîn, yên weke wehdet, tecellî, elest, beka-fena, zahir-batin, ‘eşq, pîrê muxan, welayet, ehlê xerabatê û hwd., di dîwanê de cihê xwe girtine. Melayê Cizîrî, di kevneşopa tesewwifê de, ji ‘alim (Îbn Erebî, Mela Camî) û hunermendên mezin (Hafiz, Se’dî, …) sûd wergirtiye û ev têgeh û terîmên hevpar, di çarçoveya felsefeya tesewwifê de, di sînorên şi’rê de ‘emilandine.

[298] El-Afîfî, b.n.b., r. 42.

### 1.2.1. Şexsiyetên Tesewwifî

#### 1.2.1.1. Mûrşîd, Şêx, Saqî, Pîrê Mûxan, Pîrê Xerabatê, Welî, Şahê Wilayet, Muxbeçe, Meyfiroş, Salik, Rind, Derwêş, Murîd, Ehlê Meqamatê Terîqê

##### 1.2.1.1.1. Mûrşîd

Murşîd, ji bo wasilbûnê, di navbera Xwûda û 'evdan/salikan de rehberek e.[299] Kesê ku bibite murşîd pêwîst e ji her aliyî ve xusûsiyetên bilind pê re hebin. Yek ji wan jî weke weliyan dûrketina ji gunehan e û peyrewiya fermanên Xwûdê ye. Ji bo, bilindbûna me'newiyatê, pêwîst e peyrewên terîqetê ji xwe re weliyekî û murşîdekî peyda bikin. Lewra bê murşîd, salik û talib nagehijin menzila xwe. Di tesewwifê de disturek heye ku tê gotin, kesê murşîdê wî tune, şeytan dibe murşîdê wî, xirabiyan bi wî dide kirin.

Te xered vêkketina yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê bi Bexdadi çi ket (22/9)

Murşîd, dinyaya murîd û meczûban rohnî dike, derd û birînên wan ên me'newî derman dike. Şa'ir jî, xwe di rêya Xwûda de birîndar dihesibîne û dixwaze ku murşîdê xwe bibîne da ku birînên wî jî bêne kewandin.

Rohniya çehvê nebînan murşidê meczûb û dînan
Daruyê derd û birînan min teleb dîna te ye (97/30)

##### 1.2.1.1.2. Şêx

Şêx, bi wateya xwe ya ferhengî ve ew kesê temendirêj e ku di meclisa semayê de wek mubtelayekî 'eşqê, muşteriyê zemzem û ava heyatê ye. Di dîwanê de bi gelemperî di wateya mertebeyeke sofîtiyê de hatiye bikaranîn. Di rêwîtiya heqîqetê de rehberê sofiyan e û wan perwerde dike, edebê hînî wan dike, wan ji qatên/mertebeyên îlahî re amade dike.[300] Şa'irî, bi behskirina şêx û zahidan, têkiliya xwe bi wan re nîşan daye. Şêx, di nîşandana rêyê de weke melayan in û qiblenûmayê dil in. Ew wird û feyza ku 'aşiqî ji şêxê xwe hilgirtî, weke Çemê Nîl, Ferat û Dicleyê boş û bereket e. 'Aşiqî, bi destên xwe, mey îkramî wan kiriye, yanî bi wan re têkiliyeke nêzik peyda kiriye. Ew dilberên ku ji wê meyê venexwarî, yanî yên nêzikî şêx û zahidan nebûyî û

[299] Canım, b.n.b., r. 168.
[300] Suad el Hakîm, "Şeyh", b.n.b., r. 460-461.

ji nêrîn û şahidiya wan sûd wernegirtî, ji ber wê tîbûna me’newî, çavên wan mane mexmûr.

Suhbeta çerx û sema tê wek Melê sed mubtela tê
Zemzem û ava heyatê muşterî sed *şêx* û şox (36/9)

Dest û payan ji berê zêde bikî dê te bikim
Mislê Hemmadê 'Ereb herweki Şêx anî bi ser (44/6)

Nûrê çiraya dil in çehre guşayê dil in
Şeyx û Melayê dil in qiblenûmayê dil in (50/7)

Feyza me şubhê Nîl e em Dicle û Ferat în
Ger şeyx wird dame vêraye min keşakeş (53/13)

Wan dest û zend û sa'idan mey dane şeyx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan ew nêrqiza sîrabi da (2/6)

Melayê Cizîrî, xwe di mertebeya şêxîtiyê de dihesibîne. Muhyîddînê ‘Erebî şêxê mezin e û ustadê hemû ehlê tesewwifê ye. Melayê Cizîrî jî, di dewra xwe de li ser vê rêçê, di ‘eşqê de, xwe wek Şêxê Sanî dihesibîne. Ehlên derdora wî jî payetiya şêxîtiyê dane wî. Di helbesta daneberhevê de Mîr Îmadeddîn, ji xwe re Mela Ehmedê Cizîrî wekî şêx û ustad qebul kiriye.

Di ‘işqê Şeyxê Sanî me bi dil behra me‘anî me
Li zî hicrin we zî qelbin şifaun fî işarat (23/18)

Di baxê lefz û me'nayê suxen min serwi azad e
Ji vê îmla û ji înşayê me lewhê dil numa sade
Ji husnê rewneqek dayê ku Şeyx Ehmed me ustad e (131/38)

#### 1.2.1.1.3. Saqî, Muxbeçe û Meyfiroş

Saqî, di meyxaneyê de ew kesê badefiroş û meygêr e. Di helbesta klasîk de, ew murşîdê kamil e ku şeraba ‘eşqa îlahî pêşkêş dike.[301] Di dîwanê de, peyva saqîyê bi gelemperî di wateya tesewwifî de, digel peyvên weke fincan, cam, bade û xemrê hatiye bikaranîn.

Lillah were saqî bi du caman me ciwan ke
Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê (112/13)

Saqî, mehbûb e, caran zehrê, caran jî meyê dide ‘aşiqî. Ew jenga dilan dişo, di meclisa ‘aşiqan de meya baqî, cama pur gulavê, cama sedefê, xemra al di cama zucac

[301] Canım, b.n.b., r. 112-113.

de; meya gulgûn û saf, qerqefa ateşîn, cama zelal a bêxeş (xwerû), jehra helahil, cama zerîn, xemra helal, şeraba di peyalê de, meya gulgûn di fincanê de, di bulbulê (sewîl, cêr) de, di şehkasê de pêşkêşî ‘aşiqî dike. Mehbûb, caran wê meyê dirêje nava cama ‘eql û ruhê ‘aşiqî.

Ji şeklê ebruyên saqî weh bedrek min muqabil dî
Hilatin sed hilalebrû îşaret min ji ‘eksê da (5/30)

Nêrgizên şengî di mest in çep û rast
Saqiya cam di dest in çep û rast (18/1)

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

Şahidên gulreng saqî belkî nesrîn in beşer
Ê di libsê erxewanî nêrgisên ‘er‘er xiram (76/4)

D'anî zuhûr dêmê bi nûr xalên di hûr cama tehûr
Saqî werîn cama zerîn ew surşîrîn cammeşreb e (100/4)

Ev reng tecella kir Subûh saqî ji şehkasa futûh
Mey rêhte cama 'eql û rûh roj bû di qewsê qubbe da (9/80)

Di heqîqetê de ewê ‘eşq (mey, şerab) xistî dilê ‘aşiqî, Xwûda ye. Saqî wek îstî’areyî di wateya navê Xwûda de jî hatiye bikaranîn. Ji ezel ve, qedeheke ‘eşqê daye ‘aşiqî û ew heta ebedê dê mest û xumar bimîne. Saqî, ji xemra ezeliyê nûra qelemê afirandiye. Bi vî awayî lewheya ewilî çêkiriye û meqseda wî, neqişkirina neqşên mecazî ye. Xwûda, bi sifetên xwe ve, di sûretan de tecellî bûye û saqî jî di vê wateya wehdetu’l-wucûdê de tê dîtin.

Saqî ji ezel yek du qedeh bade bi min da
Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez (48/6)

Saqî ji xemra ezelê nûra qelem jê afrand
Darêt lewha ewwelê rizq û nesîb qeddirand
Ew bû murad mes'elê neqşê mecaz sewwirand (132/9)

Were sofî musliman be bi saqî secdeyê bîne
Ku sûret mezherê zat û sîfatê Heq-te'ala ye (102/2)

Muxbeçe, ew zarok e ku di perestgeha zerduştiyan de wezîfedar e.[302] Di edebiyata klasîk de ji bo xortên meyxaneyê ku li ber mêvanan şerabê digerînin, hatiye

[302] Esat Korkmaz, “Mugbeçe”, *Zerdüştlük Terimleri Sözlüğü*, Anahtar Kitaplar Yayınevi, İstanbul 2004, r.114.

bikaranîn. Feyza ‘ilmê hikmetê di nav qedeha sedefê de ye û muxbeçe wê meyê, pêşkêşî ‘aşiqî dike. Di meyxaneyê de wextê ney tê jendin, muxbeçe radibin reqs û semayê jî dikin. Ji xeyrî badefiroşiyê, semagerî jî pîşeyeke muxbeçeyan e.

Feyza ‘ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j’destê muxbeçeyan dît bi Mishef û bi ayat (24/3)

Guh da awazê neyê weqtê sema tên muxbeçe
Fehmê raz ger dikî çawa dinalin çeng û saz (45/9)

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema
Badexwûran noşi noş mane li dorê cema (8/1)

Meyfiroş, ew kes e ku di meyxaneyê de hem meyê difiroşe û pêşkêşî mêvanan dike hem jî di seherê de, di dîwana badexwûran de sema dike. Meyfiroş husna ezelî ye, ‘eksa wî fincan dorpêç kiriye, ji ber wê ‘eksê, mey tê coş û xurûşê û ji paçikê/kûzeyê tê der. Mey, ‘eşqa îlahî ye, dikeve dilê ‘aşiqî û caran tê cezbeyê, coş û boş dibe ji qalibê xwe derdikeve belavî derdora xwe dibe. Ehlê ‘îrfanê heta ji destê meyfiroşî badeyê nenoşe, ji hişê xwe neçe, nagehije mertebeya wilayetê.

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema
Badexwûran noşi noş mane li dorê cema (8/1)

'Eksa ji husna meyfiroş avête fincanên bi poş
Nageh di caman hate coş fûrî di nêva kûze da (9/102)

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet (24/4)

#### 1.2.1.1.4. Pîrê Mûxan, Pîrê ‘Işqê, Pîrê Xerabatê, Pîrê Terîqê, Pîrê Hikmetbîn

Pîr, hem bi temenê xwe ve hem jî bi tecrubeyên xwe ve hosta û rênasê civakê ye. Peyva pîrê, wek terîmeke tesewwûfî, bi murşîd, welî û şeyxî re hemwate ye. Pîr, rêberê salikê ye. Di edebiyata tesewwifê de, di nav ravekan de/terkîban de hatiye bikaranîn û li wê, wateyên mecazî hatine barkirin.[303] Di dîwanê de, ravekên weke “pîrê mûxan, pîrê ‘işqê, pîrê xerabatê, pîrê terîqê, pîrê hikmetbîn” hatine bikaranîn. Pîrê mûxan û pîrê ‘işqê, ew însanê kamil e ku salikê di nav agirê ‘eşqa îlahî de dişewitîne.

[303] Safi Arpaguş, “Pîr”, DİA, c. 34, İstanbul 2007, r. 272-273.

Pîrê Xerabatê, di qelenderî û melametiyê de şêxê terîqetê ye. Pîrê terîqê û pîrê hikmetbîn, rêberên salikan in. Armanca pîrî, pêşkêşkirina şeraba ‘eşqa îlahî ye.

Ew kesê meqseda wî meyvexwarin be (xwestina ‘eşqa îlahî be), pêwîst e xizmeta pîrê muxanî bike, lewra ew şîşeya meyê pêşkêş dike û bi gotina pîrê muxanan, cama meyê, jengê ji dilan dişo. Armanca ‘aşiqî ew e ku bigehije xerabata muxanî, eger ev daxwaza wî bi cih were, dê ew xirqeyê xwe yê zahidiyê (exlaqê riya û hîleyê) bavêje û meya safî hilgire.

Xidmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd mey
Şîşe û cama zucacê ê divêt dê ret Heleb (15/11)

Pîrê muxan ji şîşeyê da me sebûk li meyê
Şukur Xudê ku qulzumek min ji xwe ra qebale kir (41/6)

Cama bi destê şahid jengê ji dil dişotin
Pîrê muxan jî rindan weh weh dikir riwayet (24/8)

Bi meyê safî bideyn xirqeyê zuhd
Bi xerabatê muxan er biresîn (80/13)

‘Aşiq, bûye bendeyê zulfa yarê û dil daye destê pîrê ‘işqê. ‘Aşiq, ji ber evîndariyê, ketiye halekî pejmurde û hemû perîşaniyên sûretê halan di wî de berhev bûne. Ji ber vê yekê, ew kal nebûyê; ‘eşqê, ciwaniya wî muhafeze kiriye.

Min di benda zulfekê dil da bi destê pîrê ‘işq
Lew di ‘işqê da ku best îhramî yek zunnarî bes (52/2)

Xweş perîşansifet û mecmu’eyê sûretê hal în
Pîrê 'işq în û cuwanteb' û dil 'ehdê şebab e (94/9)

Pîr, hîkmetbîn e, waqifî hemû meşreban e û tu carê mey bi xeletî nerêhtiye di fincanê de. Ji ber vê rast û durustiyê, eger ew ji murîdên xwe re bibêje ji latê re jî secdeyê bînin, murîd, dê emrê wî bînin cih. Ew pîrê terîqetê ye, hem ji aliyê maddî ve hem jî ji aliyê me’newî ve di mertebeyeke bilind de ye û cilên wî weke yên şehzadeyan in.

Pîrê ji hikmetbîn li wifqa meşreban
Kes nedî mey rêhte fincanê xelet (61/24)

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê muridê wi dibin qatê (4/5)

Salikên 'işqê yeka yek hewce nînin ez bibêm

Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû (104/9)

#### 1.2.1.1.5. Welî û Şahê Wilayetê

Mu’mîn, bi îbadetkirinê, dostîniya Xwûda bi dest dixin û bi muhafezekirin û alîkariya wî, derdikevin mertebeya welîtiyê.[304] Welî, ew kes e ku bi ‘îbadetên xwe ve û bi dûrketina ji gunehan, nêzikî Xwûda bûye.[305] Peywên weke welî, wîlayet û şahê wîlayetê, di dîwanê de, di vê derbarê de hatine bikaranîn. Şa’ir, dixwaze hemû kes ji xwe re li welî û murşidekî bigere û peyda bike ku bigehije heqîqetê. Lewra, di nêrîna şahê wilayetê de ‘ilm û ‘irfan heye. Ew bi înayetê binêre, behra dilê te jî ‘ilm dike. Ew kesê bixwaze bibe ‘arif, pêwîst e ji destê meyfiroşî meya ‘eşqê vexwe ku bigehije mertebeya wilayetê.

Te xered vêkketina yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê bi Bexdadi çi ket (22/9)

Nezera 'eynê 'înayet bi me da şahê wîlayet
Ji 'înayet nezerê ‘eyn tejî 'ilmê hubab e (94/20)

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet (24/4)

#### 1.2.1.1.6. Salik

Salik, ew rêwî ye ku bi rêberiya murşidekî, derdikeve rêwîtiyeke me’newî.[306] Ew kesê ku bixwaze ji xwe re weliyekî, murşidekî peyda bike, tu tişt jê re nabe asteng, dê ew bigihije armanca xwe. Salik, heta sûret û me’nayê nezanibe, ji ‘eşqa mecazî derbasî ‘eşqa heqîqî nabe. Rêya ‘eşqê bi derd û bela ye, ji ber vê yekê ‘aşiq sond dixwe ku êdî xwe têkilî ‘eşqê neke; lêbelê dema di destê mehbûban de bade dît, vegerîna ji tewbê jê re dibe ferz. Xusûsiyetên salikên ‘eşqê gelek in, wergirtina cil û bergê şehzadeyî, di vê derbarê de gelek tiştan vedibêje.

Te xered vêkketina yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê bi Bexdadi çi ket (22/9)

Salik wekî hatî ji mecazê bi heqîqet
Sûret neşînasî û bi me‘na te fena girt (20/3)

Neyşekerên şirînzeban mest û bi cama û bade yîn
Ferz tibit ji tewbeyê salikê ‘işqê tewbe ferz (56/4)

---

304 Uludağ, “Velî”, DİA., c. 43, İstanbul 2013, r. 25-28.
305 Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 193.
306 Uludağ, “Sülûk”, DİA, c. 38, İstanbul 2010, r. 127-128.

Salikên 'işqê yeka yek hewce nînin ez bibêm
Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû (104/9)

**1.2.1.1.7. Derwêş**

Derwêş, ew kes e ku xwedî jiyaneke sûfiyane ye û girêdayî terîqetekê û şêxekî ye.[307] Xwûda bext û şans nedaye derwêşan, bextê wan weke birhên yarê reş e û hatiye badan, xwehr e, rast naçe. Li ser vê bêbextiyê jî, çavên yarê weke derbên xedengan dilê 'aşiqî birîndar kiriye. Mehbûb, xweyî ihsan e û rehmdar e, ji 'aşiqan re nayête xezebê; lêbelê 'aşiq dixwaze mehbûb çêtir pirsa halê wî bike.

Ku Heq ew herf û xet kêşan li talayê me derwêşan
Du qewsên goşe lê badan û ser peyweste man ebrû (108/2)

Du nûn di siyehreng in wan ser li me dikêşan
Derbên di wan xedeng in li qelbê me derwêşan
'Aşiq ji dest bi heng in ji dax û zecr û êşan (132/21)

Tu pur ihsan û xweşrehm î li derwêşan bê xeşm î
Ji mehbûban tu pir çeşmê bike pisyar xaqanê (111/8)

**1.2.1.1.8. Murîd, Ehlê Meqamatê Terîqê**

Murîd, ew kes e ku di rêya tesewwifê de ye û xwe li şêxekî û terîqetekî girêdaye. Talibên vê rêyê, piştî ceribandin û serdema amadekariyê, bî'atê şêxê dikin û dibin murîd.[308] Murîd, çawa girêdayê şêxê xwe ye, 'aşiq jî ew qas girêdayê mehbûbê ye. 'Aşiq murîdê mehbûbê ye, ew ji bo wuslatê dixwaze pêyên yarê ramûse, bibe hedefê tîran (çeşman).

Pabûs e murada me ji yara xwe di 'îdan
Mehrûm neki ma ji murada xwe murîdan
Qurbanê te me min bike amancê cerîdan
Emma ji Xudê ra mebe hemrahê pelîdan (130/8)

Di rêya seyr û sulûkê de ji bo wuslatê ehlê meqamatê terîqê rêyên ji hev cuda ceribandine. Hinek ehlê terîqê bi nav û sifetê Xwûda yê cemal ve, hinek jî bi navê celal ve derketine vê rêyê; lêbelê sermayeya hemû ehlê terîqê badeya 'eşqa îlahî ye. Rê (terîqet), gelek jî bin, armanc û hedef yek in.

Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr

---

[307] Tahsin Yazıcı, "Derviş", DİA, İstanbul 1994, c. 9, r. 188-190.
[308] Uludağ, "Mürid", DİA, c. 32, İstanbul 2006, r. 47-49.

Hin celal û hin cemal û sermeyan ev bade bû (104/10)

#### 1.2.1.2. ‘Aşiq

‘Aşiq, di edebiyata klasîk de şa’ir bi xwe ye. Hemû tiştên ku têne beyankirin, têkiliya wan bi ‘aşiqî re heye. ‘Eşqa ku ‘aşiq beyan dike, spehîtahiyeke mucerred e. ‘Aşiq û me’şûq ji hev cuda ketine. ‘Aşiq, dixwaze wuslat peyda bibe û daîma bendewarê lutfa mehbûbê ye.[309]

Di dîwanê de, bi berfirehî peyva ‘aşiq û me’şûqê bi hev re hatine bikaranîn. ‘Işq, muhebbet, mubtela, husn, hubb, cezbe, lat, dilber, yar, wîsal, firqet, dilrûba, mest, sohtin, sadiq, meczûb, saqî, şem’ û perwane bi ‘aşiq û me’şûqê re têkildar in û di dîwanê de, gelemperî bi hev re hatine.

Şa’ir li ser afirandin û tecellîbûna ‘işq û muhebbetê rawestaye. ‘Aşiq û me’şûqê yekem, Xwûda bi xwe ye, ew herdu di zatê Xwûda de yek bûne û Xwûda ‘aşiqê zatê xwe bûye; ji ber vê xusûsiyetê ye ku hinek mehbûb jî dibine ‘aşiqên husna xwe. ‘Işq û muhebbet di zatê Heq de her hebûne. Paşê ew husna ezelî tecellî bûye, di afirîdeyan de xwe nîşan daye û avêtiye qelbê ‘aşiqên beşerî. Mehbûbê, fincana sedefê gehandiye ‘aşiqan û ew li derdora wê durdaneyê sef bi sef digerin. ‘Aşiqê ji ‘işqê mestbûyî, hewceyî meyê nîne, ji xwe ew li ‘eqlê xwe nemaye, spehîtiya mehbûbê ew ji hiş biriye. ‘Aşiq ji destê mehbûbê bêçare ye û di fenayê de mehw bûye; ew bi çavên şehlayî, bûye hedefê tîrên mehbûbê. ‘Aşiq ji bo xemavêtinê, telba siya qedehê dike, lewra yê ji wê meyê vexwe, pur ‘eqil dibe.

Awirên eswed'uyûnan 'eqilan sewda dikin
Gezmeya 'aşiq vi dil keftî ji çehvên şehle bû (104/13)

‘Işq û mehebbet her hebû Heq 'aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet jê we da (9/6)

Subhan ji remza Xaliqî nûra sipêda sadiq î
Avête qelbê 'aşiqî lerzîn û ta û cezbe da (9/9)

Dewrê gehandin her teref mehbûb bi fincana sedef
‘Aşiq gerandin sef bi sef durdaneyê seyywan veda (9/137)

‘Aşiq ji xemê sayeyê wê camê teleb kir
Pur ‘eqlî didêrit me ji qismê hukema girt (20/14)

[309] Canım, b.n.b., r. 40-41.

Xusûsiyetên ‘aşiqan di hinek beytan de hatiye dayîn. Ji bo ku li her derê, husn û hubb xwûya bibe, Xwûda muhebbetname (deftera ‘eşqê) daye ‘aşiqan. ‘Aşiqê ‘arif sadiqê mehbûbê ye, ayîneya nûra Xwûda ye û nûr di wan de tecellî dibe. ‘Işq cewherek e di qelbî de û nayête xefkirin; ji ber muhbet û mihra zeriyan rengê ‘aşiqî kifşe dibe. Halê dilberan ew e ku dilê ‘aşiqî dide ber xenceran, cegerê wî xwînî dike, wî birîndar dike, lewra weke dengê birûskê, ji dilê ‘aşiqî, kalîn tên. Şunqarê felekê jî, her dem pençeyên xwe li dilê ‘aşiqî dide û wî birîndar dike; ‘aşiq, ji bo tesellîbûna dilê xwe, di nêv îşkenceyan de, mehbûba xwe ya weke xonceyan bi bîra xwe tîne, armanca ‘aşiqî ji wîsalê ew e ku herdu ruh (‘aşiq û me’şûq) bigihijin hev. Ji bo ku ‘aşiq û me’şûq bêperde bigihijin hev û bibin yek pêwîst e zatê xwe mehw bike (fenafillah), lewra beden, ji wuslatê re asteng e; heta zatê ‘aşiqê fanî mehw nebe, nagihije mirazê xwe. ‘Aşiq, ji destê firqatê weke miriyan e; firqet ji wî re, ji mirinê zortir e. ‘Aşiq, pîremerd e û bexşîna muradê (wuslat) ji mehbûbê dixwaze. ‘Aşiq mubtelayê zulfê ye, sîneyê wî her dem nar û dûd e; ew dilbendê qiştê yarê ye, di vê rêyê de candayîn, ji xwe re rewa dîtiye.

Derdê xedar bêm firqet e firqet ji can pur zehmet e
Yan sehl e 'aşiq ruh dete feryad ji destê firqetê (115/17)

'Aşiq û me'şûq wasil yek bin bê hîcab
Mehbûb ku bi'zzati 'aşiq bû di 'işqê perde bû (104/14)

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

Bi çi rengi me di dil xef bibitin gewherê ‘işq
‘Aşiqan muhbet û mihra zerîyan kifş e ji reng (71/7)

Hat der ji burc û penceran dil girt û da ber xenceran
Evreng e halê dilberan lew ‘aşiqan xwûn bû ceger (43/2)

Da husn û hubb û mezheran kifş kin li her 'erd û deran
'Aşiq bixûnin defteran dilber mehebbetname da (9/34)

Di dîwanê de, hinek xusûsiyetên mehbûbê weha hatine beyankirin: ‘Aşiqî, fatîheya ‘işqê xwendiye, bi vî awayî dest bi ‘eşqê kiriye. Ew ‘aşiqê nazik û mehbûban e, miskîn e, dilsade ye, xaka rêya yara xwe ye, di dilê wî de sed dax û birîn hene û rengê wî weke xonçeya sor û taze ye, ji yarê re birehm û bişefqet e. ‘Aşiq, ji aliyê yarê ve hatiye mehcûrkirin û ew bi vî awayî dilbirîn bûye. ‘Aşiq ji yarê dixwaze, ew qelbê şikestî bicebirîne û birîna wî bikewîne.

'Aşiq ku bi dil fatiheya 'işqê xwend
Ayati yekayek dikirin amînê (119/6)

'Aşiq ji wê dê sade bit xaka riya yarê xwe bit
Sed dax di dil wek lale bit xûnê bixut rengxunçe bit
Yar jî gel bê perde bit vê ra bi rehm û şefqe bit (125/9)

Bes 'aşiqan mehcûr bikî şubhet Melê rencûr bikî
Qelbê şikestî hûr bikî şûna birînan kûr bikî (125/12)

Bi dilberên mehrû re wefa pir kêm e, wuslatê nadete ‘aşiqî û wî bi sohtina ruh û hestiyan ceza dikin. Çawa meslekê (pîşe) mehbûban xenc û naz e, her wisa sifetê ‘aşiqan jî niyaz e, û mehrû her daîm dixwazin ‘aşiq li ber wan lavahî û niyazê bikin.

Çûm ziyaret pê û destî lê nehişt ewwel bi qestî
Min bisojit rûh û hestî 'aşiqan sohtin ceza ye (96/17)

Şerbeta wesla xwe nadet yar henin 'aşiq ceza det
Dilberan ev reng e 'adet mehruwan kemter wefa ye(96/18)

Pîşeyê mehbûb xenc û naz e sifetê 'aşiq niyaz e
Yar li ber zaza îcaz e şerbeta şîrîn mefa ye (96/19)

‘Aşiq ji derdê evînê, di destê mehbûbê de birîndar e, lêbelê hinek caran bi evînê bextiyar e jî. Birqa mecazî eger li ‘aşiqî bikeve, ew li nik sahibdilan heta ebedê serfiraz dimîne. ‘Aşiq dixwaze dilber qedeheke badeyê bi qelbê wî ve birêje, lewra ew qedeh weke agirê seyyalî/herikbar, kêfekê dide dilê wî.

‘Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz
Dê li nik sahibdilan hetta ebed bit serfiraz (45/1)

Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me birêj
‘Aşiqê suxte bê ateşê seyyalî çi hez (62/2)

‘Aşiq girêdayê tewhîdê ye. Di muhebbetê de jî terefdarê yekîtiyê ye. Di qelban de eger du dilber peyda bibin, ew deriyê şîrkê vedike. Çawa ku dil û qible yek in, dil jî yek e û pêwîst e di dilî de dilberek tenê hebe.

Dil yek û dê ‘işq yek bî ‘aşiqî yek yarî bes
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildarî bes (52/1)

Di ‘eşqê de sadiqbûn xusûsiyeteke giring e. ‘Aşiq û me’şûq jî vê yekê dixwazin, lêbelê ‘aşiqê sadiq kêm in. Eger ‘aşiq kesekî ‘arif be, dibe ‘aşiqekî sadiq.

'Aşiqên sadiq di kêm in yar dibê sed canfidê min
Zanim ew najîte bê min 'aşiq û pur mubtela ye (95/16)

Ger dilber û ger 'aşiq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cî cî di wan da celwe da (9/12)

#### 1.2.1.3. ‘Arîf

‘Arîf, însanê kamil e; Xwûdanas û xweyî me’rîfet e. Bi hîss û tecrubeyên xwe, bûye waqifê heqîqeta eşyayê.[310]

‘Arîf, xusûsiyeteke ‘aşiq û dilberan e, ji wan, ewê ku nûra Heqq tê de tecellî bûye, ew waqifê heqîqetê ye, ehlê besîretê ye û di ‘eşqê de bendeyeke sadiq e. Di rêya seyr û sulûkê de, kesê ji destê meyfiroşî (murşîd) meyê (‘eşqa îlahî) venexwe û ji xwe neçe, ew nagehije mertebeya wilayetê. ‘Arif heta weke perwaneyê reqs neke û di agirê ‘eşqê de neşewite, deriyên razên berî û deriyê xemzeyan li wî venabe.

‘Arifên ehlê besaret ji neseq merdumê çeşm
Surmepoş in di beyadê qebaya xwe ye reş (54/10)
Ger dilber û ger 'aşiq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cî cî di wan da celwe da (9/12)

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet (24/4)

Kirişme û remza berî ‘arif venabin li derî
Hetta di nêva agirî ew xef nebit perwane reqs (55/5)

Pêwîst e ‘arif guh bidete tefsîra sirra ayetan ku bi goreyî wî xeber bide. Eger ew guh nedetê, dil dê sirra rumûzên qudretê îfşa bike û dê wê demê bibe me’zûr. Rûhê ‘aşiqî, ‘arif e, lêbelê bi ax û heriyê ve hatiye qeydkirin. Belkî ji ber vê bendê ye ku ‘arif caran ji ber mewcên behra dilî, ewê tê de sed hezar mewc peyda dibin, bêxeber e. ‘Arif, ji ber cemalê mehbûbê jî ketiye heyretê. Rûyê mehbûbê weke roja rohnîdar e û birûyên wê yên weke mahê nû, caran xwûya dibe caran xef dibe. Ev rewşeke awarte ye û ehlê ‘irfanê yên xweyî besîret jî, ji ber vê yekê ketine heyretê.

Tefsîrê sirra ayetê ‘arif divêtin guh detê
Raza rumûzên qudretê ger deyn bikin me‘zûr e dil (74/6)

Heyf e qeyda xak û gil bit ‘arifê çalakirûh
Dê mucerred bit ku pertew det ji nû ew pakirûh (33/1)

Dil behr e û sed hezari mewc in
‘Arif çi xeber ji behrê mewwac (29/14)

---

[310] Turan Karataş, “Arif”, *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, Perşembe Kitapları, İstanbul 2001, r. 43.

Wê li wechê afitabê gahê kifş û gahê xef
'Arifên sahib besaret heyyirandin mahê new (103/4)

Şa’ir, xwe weke Me’rûfê Kerxî ‘arifê zemên dihesibîne, di sehera sûbê de deriyê meyxaneya ‘işqê vedike, wî cihî ziyaret dike, bi xwîna dil û rondikên çavan xwe paqij dike. ‘Arif, dema bigehije mihrabê û du birhên yarê bibîne, li ber wan mihraban tekbîrê tîne, bi vî awayî niyeta wî bi cih tê û ew, bi mehbûbên selwarewan re dikeve reqsê.

Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand
‘Arifê weqt im û Me‘rûfî bila bêt ji Kerx (37/4)

Derê meyxaneya ‘işqê seher ‘arif zîyaret kir
Bi abê çeşm û xwûnê dil wudû best û teharet kir (42/1)

Mihrabê du birhên te bibînit 'arif
Niyyet çi bi cih bêt dema tekbîrê (118/12)

Weqtê ku nalîn erxewan gulçîçek û terhên ciwan
Vê ra ne bê selwa rewan ‘arif li ferqê can e reqs (55/8)

Cudahiya di navbera ‘arif û ‘alimî de ew e ku ‘arif ehlê ‘irfanê ye, têkiliya wî bi qelbî re heye û ehlê besîretê ye; zanista ‘alimî bi maddiyatê ve girêdayî ye, ew tiştên li ber çavan (hal û ehwal) dizane û ji wan xeber dide. ‘Arif, cewhernas e û qiymeta cewherê ji her kesê çêtir dizane, ew dikare û dizane cewherên rast û yên qelb ji hev derêxe. ‘Aşiq dixwaze dilberê serdarê mehbûban ji qelban agahdar be ku ji halê wan fehm bike û kul û derdên wan bizane, lewra mehbûb ‘arif e, sirrên dilê ‘aşiqî dizane û ew, me’naşînas e, li bin perdeyan jî be ew me’neya heqîqeta eşyayê dizane. ‘Arif herçendê cewhernas û me’nanas jî be, ‘aşiq, derbarê sirrên xwe de ehlê ‘irfanê bêqudret dibîne. Ew bawer nake ku ‘arif sirrên wî, bi qudret û quwweta xwe bizane.

'Arifê cewherşinasî ê bi vî wesf û lîbasî
Dê qedir bihtir binasî meq’edê sidqê ceza ye (95/28)

Dilberê serdarê xûban ez nizam ageh heye
'Arif e b'halê qulûban 'alim b'ehwalê me ye (97/1)

Pur dibêm şefqe li bal e 'arif e'w sahibkemal e
Carinan bîne xeyale pirs bikit çi lê heye (97/6)

'Arifên me'naşunas in ew bi sed sûret lîbas in
Xeyrê mehbûb wan nenasin xef ji wan zanî me ye (97/17)

Ney bestê tilismê me bi sed xane biret
Qadir heye 'arif bikirit teqrîrê (118/8)

#### 1.2.1.4. Kamil

Kamil, di dîwanê de wek wesf û sifetê Xwûda hatiye bikaranîn. Xwûda, kamil e, bê'eyb û bêqusur e. 'Alem, di bin teserrufa wî de ye. Wî heft felek tenzîm kirine, yek bi yek ew anîne reqsê (derdora xwe dizivirin).

Ew kamilê bê 'eyb û neqs ne çerx bi her yek new' û şexs
Wî yek bi yek anîne reqs tê seb'eyê seyyare da (9/109)

#### 1.2.1.5. 'Ebdal

'Ebdal, ew kes e ku ji meşxuliyetên dinyayê xwe rizgar kiriye, xwe daye ta'et û 'îbadetê. 'Ebdal yek ji wan kesan e ku di nav zumreya weliyan de cih digire. 'Ebdal di wateya derwêş û sûfî de jî tê bikaranîn.[311] Peyva 'ebdalê, di dîwanê de di wateya derwêş û sûfiyan de hatiye bikaranîn. 'Ebdal wek teşbîhî hatiye û şa'ir ji ber mehbûbên 'er'erbalîn dikeve cezbeyê û weke 'ebdalan pal dide hevalên xwe û ji xwe ve diçe.

Zimzim û deng û zimihna lalan
Cezbe da me bi hezar ehwalan
Lew dinalim ji neseq 'ebdalan
Ku bi mestî didirin yek palan (123/3)

Wext jî 'îd û sersalan e (newroz). 'Ebdal, 'aşiqê mehbûbê ye, li ber rûyê yarê sekiniye ku yar xet û xalên xwe nîşanî wî bide. Bi vî awayî wuslat peyda dibe (ji qedeha ferfûrî meynoşîn, 'elametê wuslatê ye).

Veke carek xet û xalan li ser wan mesned û palan
Bixwûne lê me 'ebdalan bibînin 'îd û sersalan
Îcazet dî me destûrê perîrengê sifethûrê
Ji nêva zulmet û nûrê binoşîn mey di ferfûrê (124/7)

#### 1.2.1.6. Mest, Mestane û Mexmûr

Mest, ew kes e ku ji hişê xwe çûye. Di edebiyata klasîk de, sembola zewqên beşerî û 'eşqa îlahî ye. 'Aşiq, dema mezherî lutfên mehbûbê bibe û evîn wî dorpêç bike, mest dibe.[312] Xumar, serêşa piştî serxweşî û rewşa paş mestiyê ye. Mexmûr jî, ew kes e ku serxweş e, ji ber meyê nayê ser hişê xwe.[313]

[311] Uludağ, "Abdal", DİA, c. 1, İstanbul 1988, r. 59-61.
[312] Rıdvan Canım, b.n.b., r. 86.
[313] Melayê Cizîrî, b.n.b. (ferheng), r. 399, 427.

Mest, di dîwanê de, bi têkiliya ‘aşiq û me’şûqê de hatiye bikaranîn. Peyva mestê, bi taybetî halê perîşaniya ‘aşiqî jî nîşan dide. Ew peyvên ku bi mestê re hatine bikaranîn jî (xumar, teles, hilak, serxweş, xerab) dîsa di wateyên xwe de, nêzikî wî ne. ‘Aşiq, ji ber pêşkêşkirina qedeha ezelî, ji ber ava/cama kewserê ya di roja qalûbelê de, mest maye û heta ebedê jî dê her wusa bimîne.

Saqî ji ezel yek du qedeh bade bi min da
Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez (48/6)

Hal ji wê remzê giha min mestê wê remzê me hêj
Serxweş im hetta ebed bêcam û neql û bade ye (93/16)

Min dî sehergaha elest camek ji kewser bû di dest
Jê da Melê lew maye mest hetta hisabê serxweş în (79/21)

Ew nazika nisbet gulê camek ji Kewser da Melê
Mest im ji ber qalûbelê hetta bi roja mehşerê (113/32)

Der hati mest subha elest min dest bi dest dî cam di dest
Kakul dibest tayek verest vê ra şikest nîşan e qest
Ew lebşeker wa hate der tayên di ber da sor û zer
Xalên di qer zulf çûne ser le’lan seher lê bû ‘ereq (67/8)

‘Aşiq, ji ber ‘eşqê mest e, ji bo serxweşbûnê hacetî meyê nîne. Ew ji ber evînê, her daîm jixweçûyî ye. Şa’ir di wateyê de behsa mestbûna ezelî jî dike. Piştî însan hatine afirandin, ji aliyê mestbûnê ve bûne du beş. Hinek însan bûne mestên Semed, hinek jî bûne mestên neqşê senemê. Şa’ir, xwe muntesibê nav û sifetê Semedê dihesibîne. Tecellaya Semedê, ‘aşiq dorpêç kiriye û dilê ‘aşiqî bûye Çiyayê Tûrê û şehkaseya ferfûrê. Lewra, ji ber vê yekê, ew mest û sekran bûye.

‘Aşiqê mestê bi ‘işqê niye hacet bi meyê
Waridê warid û ehwali bi ewradî çi ket (22/8)

Da şahidê esma bi hemî wechê binasîn
Yek mestê Semed kir bi yekê neqşê senem da (1/4)

Zanim te kohê Tûr e dil lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil lew mest û sekran î Mela (12/11)

Ji destê şekker'amîzan seraser xerqê mestî me
Semenbû û dilawîzan bi reyhanan ve bestî me
Ji tora fitne'engîzan du ejder mesti gestî me (131/5)

Yar, meyperest e û zulfên wê jî perîşan û mest in. Zulfa yarê, bi haciyan hatiye teşbîhkirin. Çawa ku hacî li derdora Ke’beyê dizivirin (tewaf dikin), zulf jî li

derdora xala yarê kom dibin û wê dorpêç dikin. Dema zulfên wê ji ser rûyê wê tênê xwarê, dibin xelek xelek û li ber xala yarê diçine secdeyê.

Biska siyeh re‘na ye mest yek dî bi heyran lê vewest
Hemyan bi mestî helqe best der bendê ew zulfa reş în (79/6)

Zulfên mu'enber kagulîn biskên siyah rengsunbulîn
Ta ta bi dav dav fittilîn çîn çîn bi mestî sunbulîn (125/3)

Ahê ji destê ejdehan mest û xumarê hejjehan
Dev li dil û ceger nihan jehrê kirî liba yekî (128/2)

Min di seher zulfên di mest hatin sema ihrami best
Çûn secdeya xalê bi qest lew haciban ihramî da (2/3)

Nêrgiz, di edebiyata klasîk de temsîliyeta çavên yarê dike û di vê teşbîh û îstîareyê de çavên yarê yên nêrgizî, mest û xumar û şehla ne. Nêrgiz, teşneyî avê ye û mehbûban jî, mestiya xwe ji wê girtine. Nêrgiz û ‘er’era şengî, wek îstî’areyî di wateya mehbûbê de hatine bikaranîn. Ji xeyrî nêrgizê, sosin û sunbul jî, bi mest, têne semayê.

Ji re‘na nêrgizên te’y mest û xwûnrîz
Zeman bû ‘ehdê cengengîzê Cengîz (46/1)

Nêrgiza nazikqed û şehla ye mest
Dîn kirim ez bulbulan sewda gul e (99/10)

Nêrgiza mest û şîrîn û gul û nesrîn e ji reng
Şekerê lu'lu'ê menşûr biden ahen û seng (121/4)

Lew seher cewlan didet bayê sebayê rast û çep
Sosin û sunbul bi mestî tên semayê rast û çep (17/1)

Cama meyê, ji ber feyza mehbûbê mestane dimeşe. ‘Aşiq, meya şehkaseyê ya di destê mehbûbê de ji xwe re weke dermên dihesibîne, jê vedixwe û mest dibe. ‘Aşiq ji ber noşîna badeyê sekran û mest e, yar bi destê xwe meyê pêşkêşî ‘aşiqî dike û wî mest dike. Wextê mehbûb (selwa sehîqed, durdane, ‘er’er), radibe reqs û semayê, hemû kes mest dibin, kes li ser hişê xwe namîne.

Ma dibit ew dûredest bit dê ji fincana te mest bit
Cam ji şehkasê bi dest bit ebteran ew mey dewa ye (95/30)

Çû tewafa pê û destan şubhetê sekran û mestan
Ehlê hal û xûbperestan wan ji 'umr ev mudde'a ye (96/20)

Mest û hişyarî hemî keckuleh in reqs û sema tên
Ez nizanim çi neseq keyf e nizanim çi şerab e (94/15)

Selwa sehîqed xemmilî lew kemmilî mestane reqs
Wer suhbetê ger qabilî wê bêt werî şahane reqs (55/1)

Sirra di cama badeyê yar tête nêva helqeyê
Medhûş û mestê wê meyê şuşa gulav aşufte da (9/96)

Mehbûb, bi dîtina ‘aşiqî, mest, xumar, mexmûr û meyperest e. Çawa ‘aşiq ji ber mehbûbê mest û serxweş e, mehbûb jî, ji govendê mestane ye. Ew, caran bi meya saxerê mest dibe û her daîm bi mestane dimeşe. Helalbûn û herambûna meyê jî, bi mehbûbê ve girêdayî ye. Eger mehbûb qedehê bi mestane negerîne û pêşkêşî ‘aşiqî neke, ew şerab ji ‘aşiqî re dibe heram.

Sebahulxeyri mesta min letîfa can bi desta min
Xumar û meyperesta min tu yî meqsûd û qesta min (124/2)

Ji hîcabê were der nazik û mestane bimeş tu
Te cehan zêr û zeber kir bi Xûdê ev çi ‘itab e (94/3)

Dêmfener e xal‘enber e bumawer e lebşeker e
Ew meyperest meşha û mest cama di dest ferfûri bû (107/6)

Serpoş û qibaba min û 'işq û mey û cam
Cama ku nebes ke bi tenê bes ke xitam
Şahid ne bi mestî bigerînit bi xiram
Ew bade heram e di sed carî heram (130/17)

### 1.2.1.7. Sekran (Sukran)

Sekr, ji ber tesîra warîdatên[314] bi hêz, jixweçûneke (serxweşî) me’newî ye. ‘Evd eger sifetê cemalê keşif bike, serxweş dibe.[315] Di hengama seyr û sulûkê de, salîk, bi tesîra warîdatan ji xwe diçe. Ew sûfiyê ku dikeve vî halî jê re “sukran” tê gotin. Bi goreyî sûfiyan, sekr, ew hal e ku dema Xwûda tecelliyê Çiyayê Tûrê kir û Hz. Mûsa[316] ji hişê xwe çû û kete ‘erdê.[317]

Dilê ‘aşiqî, weke Kohê Tûrê tijî agir e û dişewite. Ew nar û nûra li Tûrê peyda bûyî, di dilê ‘aşiqî de jî der bûye. Dilê ‘aşiqî şehkaseyeke ferfûrî ye, ‘meya ‘eşqa îlahî li wê derê tijî bûye û ji ber vê yekê jî ‘aşiq mest û sekran bûye. Şa’ir, her daîm mest û

[314] Warîd: Ew hest û ramanên qenc in ku bêyî îradeyê têne qelbî, feyz û tecellî. (Kâşânî, “el-Varîd”, b.n.b., r. 576.
[315] Kâşânî, “es-Sekr”, h.b., r. 303.
[316] “Vêca çi kêliya ku Xwedayê wî di çiya re diyar bû, êdî çiya parçe parçe bû û bi ‘erdê re misêwa bû. Mûsa jî bêhiş ket ser ‘erdê û hay ji xwe nema.” (A’raf 7/143)
[317] Abdullah Kartal, “Sekr”, DİA, İstanbul 2009, c.36, r. 334-335.

sekran e û dixwaze bînahiya çe’vên wê (mehbûb) bê û ew bejn û balaya wê bibîne. Îdîa, kar û xebatên ehlê hal û xûbperestan ew e ku li ber pê û destên mehbûbê, weke sekran û mestan, biçine tewafê.

Zanim te kohê Tûr e dil lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil lew mest û sekran î Mela (12/11)

Ku xalib mest û sekran im sebahulxeyri ya xanim
Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê (124/8)

Çû tewafa pê û destan şubhetê sekran û mestan
Ehlê hal û xûbperestan wan ji 'umr ev mudde'a ye (96/20)

#### 1.2.1.8. Rind (Rindê Xerabatê)

Rind, ew kes in ku girêdayî tu mezheb û meşreban nînin û xwe tenê bi Xwûda ve girêdane. Rind, ehemmiyetê nadete maddiyatê, mutewazî ye; dilbîn e û xwedî zanista ‘irfanê ye.[318]

Rindê xerabatê û pîrê muxanê xweyî ‘ilm û ‘îrfan in û rîwayet dikin ku cama di destê şahidan/mehbûban û rindan de, jenga dilan (gunehî û xerabiyan) paqij dike. Rindê xerabatê, qelender û cihanguhnedir e, girêdayiyê perestgehekê nîne, ji bo perestiyê mekan jê re ne giring e û naxwaze derbarê maddiyatê de, kes ji wî hêvîdar bibe.

Ji jeng û zerqê dil da bişoyin
Cama sedef bîn rendo keramet (25/3)

Cama bi destê şahid jengê ji dil dişotin
Pîrê muxan jî rindan weh weh dikir riwayet (24/8)

Bi heq rindê xerabat im ji dêrê vê demê hatim
Çi hêvî hûn diken îro ji vî rindê xerabat (23/17)

#### 1.2.1.9. Mehbûb

Mehbûb, hebîb, xub dilber, nîgar, şah, dildar, me’şûq, bi rêya îstîareyê ji bo kesê tê hebandin tê bikaranîn. Taybetiyên mehbûbê yên sereke, êş, elem û izdirab dayîna ‘aşiqî ye. Mehbûb, rû nadete ‘aşiqên xwe, bi awirên xwe yên tîrane, dixwaze

[318] Canım, b.n.b., r. 100-101.

canê ‘aşiqên xwe ji wan bistîne. Di edebiyata tesewwufê de, mehbûbê heqîqî Xwûda ye.[319]

Mehbûb, di dîwanê de, bi îstî’areyî li cihê navê Xwûda hatiye bikaranîn. Daxwaza ‘aşiqî her daîm vuslat e, dema bigihije mehbûbê, êdî pêwîst e zatê xwe ji meydanê rake. Xwûda, mehbûbê heqîqî yê bêqusur e, wek tecelliyê, xwe li Çiyayê Tûrê nîşan daye. Mehbûbî, sîstema çerx û felekê bi nîzam û întîzamekê, bi destê xwe yê şerîf çêkiriye û mohra xwe lê daye.

Ji mabeynê bi zat dê çit ku wasil bit bi mehbûbî
Ne tenha dê sefa jê çit eger di mest û meczûb bî
Bi tuxrayek beratê çit bi mohra emrê mensûbî (131/32)

Her dema mehbûb zuhûr bit zêde mezher bêqusûr bit
Dê tecellayek li Tûr bit berqê lami' cezbe ye (97/11)

Ehsen ji vî nezmê letîf çendî sivik hatî xefîf
Mehbûb bi destê xwe'y şerîf neqdê me muhr û sikke da (9/141)

Mehbûb bi îstî’areyî û telmîhî, îşaretê bi navê Xwûda dike. Edakirina zikra Xwûda, qûta qelban e. ‘Aşiq, bi zikirkirina mehbûbî kûl û daxên dilê xwe dikewîne. Di ayetê de hatiye fermankirin ku qelb bi zikra Xwûda mutme’în dibin û şa’irî jî, bi telmîhî, bi peyva mehbûbê, îşaretî vê ayetê kiriye.[320]

Wesfên di mehbûban li daxên kul heyat in
Qût e ji bo qulûban gulav qend û nebat in
Ji nexmeya medha xûban ‘aşiq bi cezbe hatin (132/40)

Mehbûb, hem bi wateya heqîqî hem jî bi ya mecazî de hatiye bikaranîn. Xwûda, aşiqê husn û cemalê xwe bûye, wek tecellîbûnê, ji perdeya xeybê derketiye û xwe aşîkar kiriye. Mehbûb herçendê li pêş perdeyê jî be, çawa ku perde nikarin ronahiya roj, meh û zuhreyê xef bikin, ew jî li pêş perdeyê tecellî dibe û nûra xwe dide der. An jî, mehbûb, xûb û dilber, eger li piş heftê deriyan jî xwe veşêrin, xefkirina wan ne mumkin e, dê ew di her hal û karê de ‘eşqa xwe îzhar bikin.

Husn û cemal û 'işqe ye aram di perdê da neye
Mehbûbi lew hetta heye nabit di perde'w xilwe da (9/35)

'Aşiq û me'şûq wasil yek bin bê hîcab
Mehbûb ku bi'zzati 'aşiq bû di 'işqê perde bû (104/14)

---

[319] Canım, b.n.b., r. 86.
[320] Ew kesên bawerî anîne û dilên wan bi zikirkirina Xwûda têr dibin. Bizanin têrbûna dilan bi zikirkirina Xwûda ye (Sûreya Ra’d, 13/28).

Perdeya mehbûb di nêv qelban ku dê kerker bikit
Qet di perdê xef dibin Xurşîd û Mah û Zuhre ye (93/12)

Însan bi min nasût e gewher di nêv sedefê
J'alema ceberût e şems e hatî şerefê
Tenezzul ji lahût e mehbûb e cam di kefê (132/38)

Mehbûb û xûb û dilberan bigrî li wan heftê deran
Dê xwe j'şibak û penceran zahir bikin d'her dîde da (9/36)

Xwûda mehbûbê heqîqî ye, husn û cemalê wî weke lefz û ‘îbaretan, di mehbûbên mecazî de tecellî bûye. Spehîtiya wîldan, hûrî, perî û mehbûbên beşerî, ji husna nûra Xwûda ne, ji wê husnê zerreyek hilgirtine. Muhbeta mehbûban, sifetên Xwûda neqişandine û ew roja ku di neynika dilî de tecellî bûye, ‘eksa xwe daye qelb, ruhê zatan. Spehîtiya mehbûbê, dayîna Xwûda ye û ew di nav gulên rengîn de guleke zer e. Eger ew cazîbeya tecelliya husna ezelî nebûya ku xistiye dilê mehbûbê, ji bo ‘aşiqî meyla bejn û xal û xetan peyda nedibû; herwekî mehbûbî û şêrîniya Yûsufî li bal Ye’qûbî ve, ji wê sedemê ye.

'Eksê ji Heq dibînîn li dor wechê mehbûban
Li halekê namînîn ji sirra wan metlûban
Geh dinalîn û geh dixwunîn dûr în ji weslê xûban (132/17)

Lefz û 'îbaret came ye mehbûbê me'na bi xwe ye
Lê xemlê husnek zêde ye lewra bi husnê zîbe da (9/40)

Wîldan û hûr in ger perî şirîn û mehbûbên berî
Cumle ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (9/62)

Husn û sur ger tu neyîn cezbe li dil det mehbûb
Me ji zulf û xet û xal û qed û meyyalî çi hez (62/5)

Bi xeml û reng û re'nayê bi mehbûbê bi zîbayê
Bi ew husna Xudê dayê ji gulrengan gula zerd e (92/12)

Muhbeta mehbûb û latan pur vekir zîwersifatan
Dane qelb û rûh û zatan roj di mir'atê xuya ye (95/20)

Mislê te ne Adem weh ne Îbrahîm û ne Nûh
Yûsuf bite mehbûb û li Ye’qûbî şêrin e (101/4)

Mehbûb, yara mecazî ye. Di vê wateyê de xusûsiyetên mehbûbên beşerî jî têne beyankirin. Çi tiştê veşartî û xef hebe ancax mehbûb ji wî xeberdar e û ‘eşq jî, tuxrayeke veşartî ye, bi tenê mehbûb dikare wê bibîne. Sen’eta mehbûbê, di ‘eşqê de

naz û delalî ye û hêvî û lavahiyê ji ‘aşiqî dixwaze. Şa’ir dibêje, qêma xwe li mehbûban neyînin, lewra karê wan, bêsebeb, qesta can e. Tîran ji kemanê (awirên yarê) dikêşîne û bi ser ‘aşiqê birîndar ve berdide.

'Arifên me'naşunas in ew bi sed sûret lîbas in
Xeyrê mehbûb wan nenasin xef ji wan zanî me ye (97/17)

'Işq e tuxraya nihînî her dema mehbûb dibînî
Dê bi dil lazim bixwûnî ev çi ism û nusxe ye (97/15)

Pîşeyê mehbûb xenc û naz e sifetê 'aşiq niyaz e
Yar li ber zaza îcaz e şerbeta şîrîn mefa ye (96/19)

Ey Mela bawer bi mehbûban meke
Karê wan her exzê can e bê xeta (10/9)

Peyweste du ebrû li me mehbûbê kişandin
Sed gezme peyapey li ezê xeste reşandin (81/1)

Putperest çawa put û Latan dihebînin, aşiq jî weke wan ji mehbûba xwe hes dike. Mehbûb, rih û canê ‘aşiqî ye, lêbelê pirsa halê wî yê pejmurde nake û bi bîra xwe jî nayîne. Şa’ir bê mehbûban nikare jiyana xwe bidomîne û daxwaza wî dîsa mehbûbên şox û şeng û esmer in. Yara şa’irî, bi rextê xwe ve, li ser textê padîşah e, taca serê mehbûban e û li ser dilberan xaqan e û ew, wek durrê cazîbedar e. Bi husn û cemalê xwe ve weke Belqîsaya Sebayê ye û bi ebrûyên xwe ve weke mehbûbên Semerqendê ye.

Ellah çi şîrîn î çi nebat î çi heyat î
Mehbûb wekî dîte dibêjim but û lat î
Ya sûretê rûh î tu û ya pertewê zat î
Dîdari me purr dîne li derdê me tu hatî (130/12)

Mela zanim ji meczûban tinê najî tu bêxûban
Dema dil dî bi mehbûban bi şox û şeng û esmer da (92/20)

Tacê ferqê serê mehbûban î
Tu li ser dilberan xaqan î (123/6)

Min dilberek wek durr heye mehbûb û şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye Belqîssifet mesken Seba (11/4)

Ne Şîrîna li Derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Nekêşayin bi vî rengê li neqşê bêzewal ebrû (106/14)

Mehbûb, di dîwanê de, ji bo beyankirina izdiraba ‘aşiqî hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, bêsermiyan û bêhêz e, sermiyanê wî, bi tenê mehbûbên nazik in. Sedema êş û perîşaniya ‘aşiqî mehbûb e. Bi ‘eşqa mehbûbê, cerg û hinavên ‘aşiqî ker ker bûye û birûyên mehbûbê yên weke kevanan, bi xeddarî, tîran diweşînin dilê ‘aşiqî. Izdiraba ‘aşiqî ya mezin ji mehbûbê dûrketin e û çerxa felekê ew ji mehbûbê dûr kiriye. Hêviya ‘aşiqî ji wuslatê heye, lewra mehbûb, xweşrehm û xweyî ihsan e, ji bo wuslatê, yek nêrîna wê, besî ‘aşiqî ye.

'Aşiqê nazik û mehbûban im
Tu mebîn bêser û bêsaman im (123/2)

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

Gezmeyên 'eyn û sadan b’îşaret remz û sirr in
Kişandin goşe badan mehbûb di tîjawir in
Tîrê di wan celladan batin di dil difirrin (132/23)

Tu pur ihsan û xweşrehm î li derwêşan bê xeşm î
Ji mehbûban tu pir çeşmê bike pisyar xaqanê (111/8)

Mehbûb, di meyxaneyê û cama şerabê de, li ber def, tenbûr û çengê reqs dike, qedehên şerabê pêşkêşî ‘aşiqên xwe dike. Ev dîmen îşareta wasilbûna ‘aşiqî ye ku piştî firqetê bi înayeta mehbûbê pê hatiye.

Mehbûb xwe nîşan da sefê carek di cama qerqefê
Hatin bi awazê defê tenbûr û çengê nexme da (9/104)

Dewrê gehandin her teref mehbûb bi fincana sedef
‘Aşiq gerandin sef bi sef durdaneyê seyywan veda (9/137)

Mehbûb, bi reqs û govendkirina xwe ve jî derdikeve pêş. ‘Eşq, hemû heyînan tîne xîretê û bi wê sermestiyê re li derdora xwe digere. Ew yek ji ber ‘eşq û evînê sembola sermestbûnê û zikrê ye. Li cihekî, dema helqeyek hate xwûyakirin, mehbûb jî di nav wê helqeya reqs û semayê de, weke stêran li derdora xwe dizivire.

Mehbûb wek stêran govend û ‘işqbazî
Têkil biçîn semayê hişyar û mest û serxweş (53/4)

Mehbûb bi ‘eynê kewkeb in reqsê ku dê dilber hebin
Sed can giramê min hebin bavême rê erzan e reqs (55/4)

Mehbûb, murşîdê kamil e. Ji bo ‘umrekî berhemdar û hêj nebûyî derengî, pêwîst e însan ji xwe re şahid û mehbûbekî bigire û di rêya wî de bimeşe. Bî’atkirina ji şêx û murşîdekî re, di nav ehlê tesewwifê de rêgezeke giring e.

Weh ku bê şahid û mehbûb te 'umrê xwe buwar
Karekî rabe bike îro ku êvar e dereng (71/3)

Mehbûb, bi îstî’areyî di cihê deshilatdar û memdûhî de jî hatiye bikaranîn. Memdûh xaqanê desthilatdaran e û dijmin û raqîbên wî weke Qeyserê Rûmê bi hêz jî bin, ew dikare wan mexlûb bike.

Dibit bêjin me haqanî bi heft ayatê Furqanî
Li mehbûban tu xaqan î were derbê li Qeyser da (92/19)

Mehbûb, bi îstî’areyî, wek yara qumrî û bulbulan hatiye bikaranîn. Qumrî, bulbul û ‘Endelîb, her seherê mehbûbên xwe dibînin, lê dîsa nalenala wan berdewam dike. Ev ajal, derbarê evînê de, bi deng û awazên xwe ve, sembolên jihevveqetînê ne û ji mehbûbê wuslatê dixwazin.

Qumrî û bulbul dixwînin lê 'eceb ew xweş dimînin
Her seher mehbûb dibînin 'endelîb vê ra veda ye (96/8)

#### 1.2.1.10. Zahid, Sûfî, ’Abid, Melamî

##### 1.2.1.10.1. Zahid

Zahid, ew kes e ku ehemmiyetê nadete malê dinyayê, şohretê, meqam û mewkiyan; ‘îbadetan zêde dike, ji bo axîretê xêr û hesenatan dike û bi tiştên hindik îdareya xwe pêk tîne. Zahid ehlê werayê ne ku dest ji dunyayê vekêşiyane, ji tirsa rîyayê bi ‘îbadet û muhasebeya nefsê re mijûl dibin.[321]

Zahid ew kes in ku bi xwestin û îradeya xwe dinya terk kirine. Ew “Heqq”ê li ser her tiştî re dibînin. Berê xwe didin Xwûda û emrên wî pêk tînin. Zahid, ji xeyrî Xwûda, dev ji her tiştî berdidin.[322]

Zahid, di edebiyata klasîk de, bi gelemperî wek kesayetiyekî menfî/neyînî derdikeve pêş. Ew ji bo rîyayê ‘îbadetê dikin û teb’etê wan gelekî hişk e û evîndarê dîn û sergêj (sewda) in; ancax bi meyê (‘şq û evînê), teb’etê wan nerm dibe. Ji bo ku xweşteb’et bibin û hinekî nerm bibin, mehbûbê bi dest û zendê xwe, mey pêşkêşî

---

[321] Semih Ceyhan, “Zühd”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 530-533.
[322] Îbn Arabî, Fütûhat-ı Mekkiyye, C.6, r. 146-148.

zahidan kiriye û bi vexwarina ji wê meyê, zahid bûne bengiyê mehbûbê. Zahid zû ji rê derdikevin, lewra teb'etê wan baş rûneniştiye. Mehbûba nazik û lêvşeker, bi husna xwe ya dêmdurrî û zimanê xwe yê şêrîn, bi sedan zêdetir zahid ji rê derêxistine. Zahid, mubtelayê zulfa yarê ye û ew bi sed belayên zulfê hatiye kuştin. Şa'ir du'a dike ku weke zahidan kes nekeve nav belayê zulfa yarê, lewra yê ketî nav tora wê, xilasbûna wî tune.

Zahidê hişkiteb' û sewda ye
Bi du caman tebî'etê ter ke (98/12)

Wan dest û zend û sa'idan mey dane şeyx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan ew nêrqiza sîrabi da (2/6)

Ehsen ji husna dêmdurrê şîrînî û guft û goyê
Sed zahid êxistin ji rê wê nazik û lebşekkerê (113/6)

Zor û feqîr û mubtela zahid û sofî û Mela
Kuştine ew bi sed bela kes nekevit belayê zulf (63/10)

#### 1.2.1.10.2. Sûfî

Sûfî, ehlaqeke bilind bi dest xistiye û xweyî 'ehlaqên baş e. Ew tu tiştî îzafeyî xwe nakin û li ber mexlûqatên Xwûdê, xweyiyê mal û milkî nînin.[323] Sûfî ji xeyrî zuhdê bi hal, meqam, sirr, keşf û kerametê re mijûl dibin.[324]

Sûfî, bi zikirkirinê û di wê zikrê de bi derêxistina dengan û îbadetkirinê ve têne bîrê. Hayy û huyya melekên subbûhî û reqs û semaya quddûsiyan bi teşbîhî coşbûna sûfiyan ya zikrê ve hatiye îfadekirin.

Hay û hûya subbûhiyan reqs û semaya qudsiyan
Teşbîhê coşa sofiyan feryad û zikr û lerze da (9/94)

Sûfî, di xelwetê de, di sucûdê de ye û mîhraba du'ayên wî herdu birhên mehbûbê ne û meqseda zivirîna sûfiyan ya weke çerxê jî, tewafkirina Heceru'l-Eswedê ye (xwegehiştina xal û nîşanên yarê). Sûfî, her da'îm di xelweyê de, li benda mehbûbê ye, eger ew pêyên xwe li ser çavên 'aşiqî/sûfî dane û bête xelwetgehê, dê xelweya wan, şerefyab û munewwer bibe.

Sofiyê xilwetnişîn bîn di sucûd
Herdu birhên te ne mihrabê du'a (3/2)

[323] Îbn Arabî, *Fütûhat-ı Mekkiyye*, C.6, r.. 143-144.
[324] Semih Ceyhan, "*Zühd*", DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 530-533.

Pê li ser dîdeyên Melê dayîn
Xelweya sofiyan munewwer ke (98/15)

Sofiyên hero di tewafa Heceri’l-eswed qest
Ku li silsil bi sema tên hemayan zimzim e çerx (37/2)

Sûfî, derbarê îfadekirina ‘eşqê de bûye mijar. Zulf, yek ji unsûrên spehîtiyê yê yarê ye û ‘aşiq dixwaze wê bi dest bixe. Destgehiştina zulfê temsîliyeta wuslatê jî dike. Sûfî jî, yek ji wan mubtelayên mehbûbê ye û ketiye belayê zulfê; weke gelek ‘aşiqan wî jî di vê rêyê de serê xwe daye.

Zor û feqîr û mubtela zahid û sofî û Mela
Kuştine ew bi sed bela kes nekevit belayê zulf (63/10)

Sûfî jî, caran weke zahidekî tê dîtin. Ew jî teb’ethişk e û ji aliyê baweriyê ve îmana wî ne temam e, lewra ew ji bo rîyayê ta’et û ‘îbadetan dike. Pêwist e ji sûretan, ceza û mukafatan derbas bibe û bizane ku sûret mezherê navê Xwûda ne.

Were sofî musliman be bi saqî secdeyê bîne
Ku sûret mezherê zat û sîfatê Heq-te'ala ye (102/2)

### 1.2.1.10.3. ‘Abid

‘Abid, bi şeklekî taybet, bi ‘îbadetên ferz re mijûl dibin. Ji xeyrî ferzan tiştekî nayînine cih. Hinek ji wan vekêşiyane çiya, wadî, devbehr û şikeftan û ji wan re gerok/seyyah tê gotin. Ew bi tenê sewaban dibînin. Qiyamet û tirsên qiyametê, cennet û cehennem ji wan re hatiye nîşandan. Hêstirên wan dirêje li ser secdegeha wan.[325]

Ji ‘aşiqî/’abidî re secdebirina li ber birhên yarê, ji sed hec ekberan hêjatir e. ‘Aşiq, li ser zulfa siyah (xeyba huwiyetê/mehbûbê heq[326]) sond dixwe ku ew ‘abidê husna mehbûbê ye. Temaşekirina husna mehbûbê besî wî ye, ewê din teferrûat in.

Secdeyan ber eswedê nadim bi sed hecc ekberan
Sond dixûm bi zulfa sîyah ez ‘abidê husna te me (93/20)

### 1.2.1.10.4. Melamet (Melamî/Melametiyye)

Melamî ew kesên sahib ‘irfan in ku ji aliyê şekl û şemalan ve însanên sade ne, xwe teslîmî rêya Xwûda kirine, ‘îbadetê bi kirina ferzan îktîfa dibînin û di her tiştî de “Heqq”ê (yekîtiya hebûnê) muşahede dikin.[327] Melamî, efendî û îmamên mensûbên

---

[325] Îbn Arabî, *Fütûhat-ı Mekkiyye*, c.6, r. 144-145.
[326] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 272-273.
[327] Ceyhan, “Zühd”, b.n.b., c. 44, r. 530-533.

rêya Xwûda ne. Efendiyê ‘alemê Hz. Muhemmed (sxl.) jî yek ji wan e. Ew xweyî hikmet in û Xwûda çawa li wan mêze dike, ew jî bi wî şeklî ve li eşyayê mêze dikin. Melamî, sebeban qebûl dikin, lê pişta xwe nadin wan.[328]

Di dîwanê de bi tenê di yek beytê de, îşareta melamiyê bi peyva “melamet”ê hatiye kirin. Melamet, di seyr û sulûkê de mertebeyeke bilind e. Ew kesê negihije meqama melametiyê, te’ma ‘eşqê hîs nake û eger ‘aşiq negehiştibe vê mertebeyê, dibe rezil û ruswayê ‘eşqê.

Ruswayê ‘işqê ne tenha ez bûm
Kê dî zemanan hub bê melamet (25/6)

**1.2.1.11. Xafîl**

Xafîl, ew kes e ku ji heqîqeta eşyayê bêxeber e; paşguhkar û hayjênebûn e.[329] Dustûreke tesewwifê ye ku lazim e sûfî tu carî ji Xwûda bêagah nebe. Ew, her roj di rewşeke cuda de bi karekî ve mijûl e. Piştî her tecelliya wî, feyz û alîkariya wî peyda dibe. Rêya heqîqetê weke Çemê Dîcleyê, per û kûrtên wî zêde ne. Xetereyên wê rêyê gelek in. Ji bo derketina qeraxa selametê, pêwîst e ehlê sulûkê ji wan xetereyan agahdar bin û jê xafil nebin.

“Kullu yewmin huwe fî şe’nin” nebî xafil jê
Her peyapey ji şu’ûnan dikirit feyz û meded (38/8)

Da binasî xeterên rê û nebî xafil jê
Dicle ye lê di purr in per per û pîl û ber û merx (37/5)

**1.2.2. Mefhûmên Tesewwifî**

**1.2.2.1. ‘Eşq**

‘Eşq, evîna zêdahî û bi şîddet e. ‘Eşq ew e ku evîndar xwe bi temamî bidete evîndara xwe, ji wê spehîtir kesekê nebîne û bibe bengîyê wê. Di lîteratûra îslamî de ‘eşq dibe du beş: ‘Eşqa îlahî (‘eşqa heqîqî) û ‘eşqa beşerî (‘eşqa mecazî). ‘Eşqa mecazî siya ‘eşqa heqîqî ye û mecaz pira heqîqetê ye. Şeklê derketina ‘eşqa heqîqî û wesîleya wuslatê ‘eşqa mecazî ye. Muhyîddînê ‘Erebî, ‘îbadet jî weke ‘eşqê hesêb kiriye; ji ber vê ye ku ‘îbadeta bê‘eşq, ne meqbûl e. Meqama ‘eşqê, meqama me’bûdbûnê ye.[330]

328 Îbn Arabî, Fütûhat-ı Mekkiyye, c. 6, r. 141-142.
329 Melayê Cizîrî, b.n.b. (ferheng), r. 424.
330 Uludağ, *“Aşk”* b.n.b., c. 4, r. 11-17; Molla Camî, *Levamî/Aşk ve Şaraba Dair*, (Wer. Tahiru’l Mevlevî), Litera Yayıncılık, İstanbul 2016, r. 68.

#### 1.2.2.1.1. ‘Eşq û Tecellî

‘Eşq, di dîwanê de, ji bo beyankirina afirandinê, bûye mijar. Şa’ir, ‘arif û hikmetbîn e û bi çavê dilê xwe dîtiye ku ‘eşq, ‘eksa cemalê Xwûda ya saf e, tecelliya wî daye ruhê însên û ji wê derê jî belav bûye. Mehbûbên mecazî, xeml û zînetên xwe ji husna mutleqê hilgirtine; cilweya wan mehbûban tevahî cilweya nûra Heqq e û ‘eşqa ezelî bi wan, şêwe û reng daye. Tecelliya nûra Heqq, her daîm ji ebrûyên mehbûban bi ser ‘aşiqî dibare.

Me'nayê 'işqê bêm çi ye lew min bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye zahir di mir'ata me da (9/10)

Çendî ku xeml û rewneq in tezyîn husna mutleq in
Têk cilweyê nûra heq in 'işqa ezel pê şêwe da (9/27)

Eger de'wayê ‘Îsayî di 'işqê da bikim ca'iz
Mela daîm tecella ye ji ew terha şelal ebrû (106/12)

Hêj ‘erş û kursî di xezîneya qudretê de wek xezîneyeke veşartî bûye, di husna Heqq de, lami’a ‘eşqê mewcûd bûye. Bingeha ‘eşqê ji bo heyînan, di bezmê elestê de hatiye avêtin. ‘Eşq, ewilî di nav rûhan de hatiye afirandin. Dema Xwûda xwestiye gencîneya veşartî bête zanîn, nûra ezelî, wek “Nûra Muhemmedî” tecellî bûye û kaînat hatiye wucûdê. Bi goreyî vê nêrînê, di her zerreyê ‘alemê de şopa ‘eşqê û tecelliya ‘eşqê tê dîtin.[331]

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû di istiwayê lami'a 'işqê hebû (104/2)

Xwûda, bi muhebbeta xwe ‘alem afirandiye. Wî, wek nûra ‘eşqê li çiyayê Tûrê şewq vedaye û pertewê ‘işqa wî di mehbûbên mecazî de jî bi sed reng û awayan, xwe nîşan dide. Ew nûra ku li Tûrê tecellî bûyî, di dilê ‘aşiqî de jî peyda bûye. Nûra wê pertewê, di dilê ‘aşiqî de, ji ber ‘eşqa îlahî bûye nar û ‘aşiq bûye ateşperest.

Ku nûrê ‘işqê lami‘ dit li Tûrê qelbê lami‘ det
Di seyra berzexi’l-esma’ nihayat û bidayat (23/4)

Pertewê ‘işqê ji heq sed sifet û sed neseq
Ew diderin yek şefeq lew me rewan tê sebeq (50/2)

‘Eynê ‘işq în û di dil ateşê Tûr
Ji sena berqê cemalê qebes în (80/10)

[331] Uludağ, “Aşk” b.n.b., c. 4, r. 13.

Me ji narî dîye nûra te di dil
Lew di ‘işqa te her ateşperes în (80/9)

Şa’ir, ‘aşiqbûna xwe heta roja ezelê dibe. Xwûda/Heqq, bi navê xwe yê Hekîm, qedeheke badeya ‘işqê kiriye nesîbê wî; ji ber wê meyê heta ebedê, dê ‘aşiq ji ber wê meya baqî, mest û xerab bimîne. Baqîbûna ‘aşiqî di ‘eşqê de fanîbûn e. Ew kesê di rêya ‘eşqê de fanî bibe, bi dostê xwe re baqî dibe.

Ku nesîb dan ji ezel Heq ji me ra 'işqê newişt
Faîde nakin li me ism û ne tilism û ne niwişt (121/1)

Qedehek bade ji ‘işqê di ezel da me Hekîmî
Jê dinoşîn heyûhey hê bi xwe cama me lebaleb (14/7)

Ji ezel Heq bi Melê daye ji 'işqê qedehek
Ta ebed mest û xerab în ji meya wê qedehê (110/15)

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

‘Eşq û muhebbet bi zatê Xwûda ve qaîm in û ev herdu heyîn, di zatê Xwûda de her hebûne. ‘Aşiq û me’şûq jî ew bûye û ew ‘aşiqê zatê xwe bûye, lewra ji bo muhebbetê muhtacî husnekê dî nebûye. Xwûda di sûbeya ezelê de mûma ‘eşqê hilkiriye û nûra cemalê ebedî di zatê xwe de tecellî kiriye û ‘eşq û cemal, ji êkdu zêde bûne. Dema ku husn û cemalê xwestin bi hev re bin, di zatê Xwûda de bûne yek. Paşî nûra qedîm veguherî ‘işq û vînê. Dema wan sifetan ji hev re naz û ‘îşwe kirin, tecellî di mexlûqatên din de peyda bû.

‘Işq û mehebbet her hebû Heq 'aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet jê we da (9/6)
Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

'Işq û cemal l’yek zêde bit xal eswed û dêm qible bit
Pêşber du nûnan lê secde bit vêkra biwêrin suhbetê (125/9)

Husn û cemalê xwast evîn vêkra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan pêkve naz û 'işwe da (9/4)

#### 1.2.2.1.2. ‘Eşq Sebeba Afirandinê ye

‘Eşq, sebeba afirandina ‘alemê ye. Piştî ku husna ezelî xwestiye tecellî bibe, ji bo xwûyakirina nav û sifetên Xwûda, ‘eşq bûye îksîrek û heyîn derketine meydanê.

Tebî'etên cuz'î, ji ya kullî tên. Dema cama meyê gerandiye û belav kiriye, tecelliya husna ezelî di wan de xwûya bûye. 'Eşq, husn û cemal bi hev re kompozîsyonekê temam dikin. Hingî 'eşq, husn û cemal hebin, dê afirandin û tecellî dewam bike; hingî mehbûb hebe, husn, cemal û 'eşq nikarin xwe xef bikin. Ji bo ku husn û bedewiyên rengîn derkevine meydanê, 'eşq, bi nexmeyê hêzê dide ney, def û qanûnê. Ji bo kifşkirina stêran, derketina ehlê 'irfanê (Me'rûfê Kerxî, Şiblî, Se'dî, Ferrûxî), 'eşq bûye sedemeke sereke. Nefsan, bi 'eşqê nefes hildan e û bûne xweyî heyat û qelb jî bi hubbê hatine zimên, xeberdana qalî û halî bûye xusûsiyeta wan. Piştî Xwûda xwest tecellî bibe û xezîneya xwe ya veşartî 'eşkere bike, qelem afirand û bi 'eşqê gote qelemê binivîse. Gelek le'l û durr bi qelema 'eşqê hatine nîzam û întîzamê. Mela jî di nav milkê berr û behrê ku bi 'eşqê hatine wucûdê, weke hakanekî ye, yanî di afirandinê de di asta ehsenu'l-teqwîmê de ye û sultanê kaînatê ye.

'Işqê ji husnê sewwirî xaret kirin hûr û perî
Herçî di kunhê fekkirî ew ma di 'ecz û hîre da (9/59)

'Eynî tebî'et cuz' û kul bişkift di wî baxî du gul
'Işqê gerandî camê mul husnê di wan da pence da (9/105)

Husn û cemal û 'işqe ye aram di perdê da ney e
Mehbûbi lew hetta heye nabit di perde'w xilwe da (9/35)

Bêtin di husnê rengi reng b'nay û def û qanûn û çeng
Ew 'işq e van tînit bi deng lew ra bi husnê nexme da (9/30)

Da kifş bibin kewkeb ji çerx rabin hezar Me'rûf ji Kerx
Şiblî û Sedî'w alê Ferx 'işqê di wan keşfa xwe da (9/33)

Îsa ji erwahan qebes pur şu'le tên nûrînqefes
Nefsan bi 'işqê da nefes qelban bi hubbê lehce da (9/88)

Pur le'l û dur te j'kilkê 'işq anîne nezma silkê 'işq
Der berr û behr û mulkê 'işq me'lûm e xaqan î Mela (12/13)

Di xuliqandinê de, 'eşq, 'eslê 'alemê ye. Xwûda, hubb û husn anîne zuhûrê û 'alem jî bi vî awayî hatiye afirandin. Di xuliqandina 'alemê de 'eşq heye û ji bo berdewamî û pergaliya wê jî, pêwîst e ew têkiliya muhebbetê berdewam bike. Eger di navbera eşyayê de muhebbet, meyl û îltîfat peyda nebe, heyat û pergalî jî berdewam nabe.

Hubb û husn anî zuhûrê 'işq eslê 'alemê
Eslê eşya da bizanî wan çi esl û madde bû (104/7)

Çar ummehat in sê benat her bêqerar in bêtebat
Pur 'işq û meyl in îltîfat d'vê taze deyrê kuhne da (9/126)

**1.2.2.1.3. ‘Eşq, Mum û Perwane**

Di dîroka tesewwifê de kesê yekem car ku ‘eşq, weke izdirap û elemê te’rîf kiriye Hellacê Mensûr e. Di “*Kîtabu’t-Tawasîn*”ê de ‘eşqa îlahî, bi mîsala perwane û mumê beyan kiriye. Ji aliyê perwaneyê ve dîtina mumê “ilme’l-yeqîn”, hîskirina herareta wî “eyne’l-yeqîn”, şewitîn û xwelîbûna di agirê mumê de, “heqqe’l-yeqîn” e.[332] Herçendê şem’ û perwane temsîliyeta ‘eşqê bikin jî, bi temamî ji beyankirina halên wan re noqsan e; lewra ‘eşq agirekî sirf e. ‘Eşqa nûra ezelî, xweyî husn û cemalekî bêmîsl e. Wê nûrê, mûm û şemala bedewiyê hilkiriye û wek ‘aşiq jî perwane afirandiye û li derdora wê nûrê/wî agirî dizivire. Perwane dixwaze bi wê nûrê re dîsa bibe yek û vegere ser ‘esliyeta xwe; lewra her tişt dixwaze vegere ser rewşa xwe ya berê.

Şem‘ û perwane bi zatê xwe ji halê me di dur in
Ateşek sirf e ji ‘işqa te vewestame lebaleb (14/6)

'Işqa ji nûra layezal husn û cemalê bêmîsal
Îsandi yelmûm û şemal dîsa xwe lê perwane da (9/5)

‘Eşq, ne tenê ji bo însanan bûye mijar. Hinek ajal jî bi teşxîsî weke însanan bûne qehremanên ‘eşq û evînê. Perwane (xecxecok), ‘aşiqê êgir/mumê ye, li derdora wî diperpite, dixwaze di wî de fena bibe. Bulbul jî evîndarê gul û gulzarê ye. Ji ber ‘eşqa wê daîm dinale. Di dilê herduyan de jî şu’leya ‘eşqê hil bûye. Rengê êgir û rengê gula sor weke hev in, xweyî cazîbe ne û dilê aşiqan dişewitînin. Şa’ir, ‘eşqa xwe, ya xecxecokê û ya bulbulê muqayese dike û ya xwe ji ya wan bilindtir dibîne, lewra ew ‘aşiqên demdemok in (bulbul, di biharan de, dema gul vedibin dest bi ‘eşqê dike û dinale; perwane jî bi şevê dema çira vêdikeve, nêzikî êgir dibe), lê derd û kulê evîna şa’irî daîmî ye.

Ger çi bulbul cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'işqa bulbul e (99/1)

Perwane û bulbul bi dil in şu‘leyê ‘işqê
Lê ger tu nezer dey bi xwe ew gulşenê raz in (84/4)

[332] Uludağ, “Aşk”, b.n.b., c. 4, r. 12.

Bulbul û perwane ew fesl û dem in
Cinsê 'işqa min tenê derdê kul e (99/9)

### 1.2.2.1.4. Dînê 'Eşqê

Dînê 'eşqê (dînu'l-hub), ji aliyê gelek şa'irên mutesewwif ve hatiye beyankirin. Îbn 'Erebî dibêje; dînê min û qibleya min 'eşq e. Di vê baweriyê de "hubb/'eşq" derdikeve pêş ku hinek mutesewwifan bi yek nezerê temaşeyî heftê du milletan kirine û ferq nexistine navbera wan û gazî her kesî kirine ku bêne dergahê 'eşqê.[333] Di 'eşqê de qaîdeyek heye; dema mehbûb bi işwe û kirişmeyan xwe nîşanî 'aşiqî bide, di dînê 'eşqê de, li ber mihrabê (li ber birûyên yarê), birina secdeyê ji bo hasilbûna muhebbetê ferz e.

Herdu qiran ku qible bin her çi dema xwuyabin ew
Wê se'etê di dînê 'işq lazim e yek du secde ferz (56/2)

Yek secde tenê ferz e di dînê 'işqê
Bin ber qedê yarê di mecalê dînê (119/5)

### 1.2.2.1.5. 'Eşq û Îradeya Kullî

Ji bo ku di dilê 'aşiqî de hestê 'eşqê hilbit, meşşateyê husna ezelî, serê zulfa mehbûbê weke çengelekê kiriye davik. Mehbûbê, bêyî îradeya 'aşiqî, bi lutf û spehîtiya xwe, 'eşqeke xeddar avêtiye dilê wî.

Meşşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da
Da 'işqê hilbit pêli pêl qelbê Melê cellabi da (2/1)

Husna hebib û lutfê yar avête dil 'işqa xedar
Lew selbî kir jê ixtîyar wê husnê ev îcabi da (2/2)

Di 'eşqê de hukmê îradeya kullî derbas dibe. Şa'ir, dilşad û bextiyar e ku Xwûda iksîra xema 'eşqê di cihê dînar û dîrhemê de daye wî. Ji ber vê ye ku 'aşiq, bi hemû derd û kulên xwe yên derbarê 'eşqê de, xwe kêfxweş dihesibîne.

Minnet ji Xûdayî ku bi 'ebdê xwe Mela yî
Iksîrê xemê 'işqê be dînar û direm da (1/10)

Her tişt bi 'eşq û izna Xwûda tê wucûdê. Bi 'eşqa Xwûda, 'aşiq/şa'ir hînî 'ilmê 'ubabê bûye; amûrên muzîkê bi 'eşqa Xwûda gazî 'aşiqî dikin ku husna wî temaşe bike.

---

[333] Uludağ, "Aşk" b.n.b., c. 4, r. 13.

‘Eynê kafûr e bi meşreb me ji husna te ye saf
Lew ji ‘işqa te di dil da me vebû ‘ilmê ‘ubab (13/3)

Lew di çengê me dixwuni ku di ‘işqa te bi saz
Me bi bejna te dixwûnin def û qanûn û rebab (13/5)

**1.2.2.1.6. ‘Eşq, Derd û Bela**

‘Eşq, wek teşbîhî, kînayewî û îstî’areyî hatiye bikaranin. Têkiliya ‘eşqê bi nar û nûrê re heye. Remzên ‘eşqê ji jorê hatine xwarê û Xwûda wekî nûrekê, li Çiyayê Tûrê xwe nîşan daye û wê nûrê ew der şewitandiye. ‘Eşq jî ji ber meylê û wuslatxwestinê ‘aşiqî dorpêç dike û di nava xwe de dişewitîne. ‘Eşq dojeh e, behra agirê îlahî ye, yê bikevê, dişewite. Ew kesê ‘aşiq nebûyî, bêdax û bêderd e û nizane mihneta ‘eşqê çi jan û dax di dil û cegerê de hiştiye. ‘Eşq, deryayek e û ‘aşiq di nav wê de weke keştiyê ye. Kesê li gemiya ‘eşqê suwar bibe, caran bayên muxalîf jî dibine musallatê serê wî û kesê xwe ji wan bayan biparêze dê derkeve qeraxa selametiyê.

Remzeya 'işqê ji bala hate xwar
Qudsiyan avêhte çerxê xulxul e (99/7)

Zanim ji 'işqa dojeh î behrek ji narê îlahî
Îro li mahê xergeh î teşbîhê seywan î Mela (12/5)

Ji derbê dax û bêderdî mepirsin mihneta ‘işqê
Çi zanin bêxeber jana dil û daxa ceger tê da (5/4)

Qulzemê ‘işqê ji bayê xwe muxalif demekê
Te huma hate ‘ecacê me li ser destê xurab (13/7)

**1.2.2.1.7. ‘Eşq û Mey**

Sûfiyên ewwelîn; muhebbet, ji ber serxweşbûnê, teşbîhî şerabê kirine û ji ber sohtinê jî teşbîhî êgir kirine. Mutesewwifan, ji bo teswîrê, hinek wesfên ‘eşqa beşerî, bi mecazî ji bo Xwûda bi kar anîne û caran jî xezelên ku behsa muhebbeta beşerî dikin, bi muhebbeta îlahî şirove kirine. Qesîdeya Xemrî ya Îbnu’l-Fariz,[334] bi teswîra şerabê ku temsîliyeta muhebbeta îlahî dike, dest pê dike. Ev kevneşopî, bi vî awayî heta roja îro hatiye.[335]

---

[334] Beyta qesîdeyê ya yekem: Bi zikrê/navê hebîbê ku hemû muhebbet teweccûhê zatê wî ne, me bê sekne şerab vexwar û bi bêhna wê em ji xwe çûn ku hêj şerab û dayika wê tirî nexwiliqîbû. (Molla Camî, Levamî/Aşk ve Şaraba Dair, r. 57.)
[335] Uludağ, “Muhabbet”, b.n.b., c. 30, r. 386-388.

Bi hinek xusûsiyetan ve ‘eşq û mey dişibine hev. ‘Eşq, di vê derbarê de, bi îstî’areyî weke meyê/camê hatiye dîtin. Bi cama ‘eşqê dil paqij dibe, ji qirêjiyan azad dibe. ‘Eşq, di meyxaneyê de tê vexwarin û ‘arif jî li wê derê, bi ava çeşm û xwîna dilî, xwe paqij dike. Xusûsiyeteke wan a hevpar jî ew e ku herdu jî hiş û ‘eqlê însên ji serê wî dibin û lezzetekê jî didene yê jê vexwariyê. Etwarên ‘eşqê û esrarên mestbûnê gelek in û ji bo beyankirina wan, rîwayet têrê nakin. ‘Aşiqî, bi îradeya xwe, ‘eşq rêhtiye denê meyê (Camê Cem) û ji wê meyê vexwariye. Şa’ir, bi ‘eşqê nexweş e û bi şeraba piyaleya şahê, mest û serxweş bûye, ji ber vê yekê, ruhê wî ji serî heta binî bi lezzeta ‘işqê tejî bûye. Şa’ir, mestbûna ‘eşqê, tercîhî ya meyê dike. Ew kesê ji ‘eşqê mest bibe, êdî ne hewce ye meyê vexwe.

Şem‘a serrê nûr nadirit ger ew neket perhîzê dil
Zewqê cama ‘işqê naket ger neket îmsakê rûh (33/5)

Camê ‘işqê pakê rûhanî tuhûra batin e
Ê şewwişî ew her dima hetta ebed napakî rûh (33/7)

Min go ji qedîm em meyê 'işqa te dinoşin
Go min ku ji 'uşşaqan ne tenê meyperes î tu (105/20)

Derê meyxaneya ‘işqê seher ‘arif zîyaret kir
Bi abê çeşm û xwûnê dil wudû best û teharet kir (42/1)

Etwarê ‘işq û mest î esrarê butperest î
Teqrîrê sed riwayet nakit bi wê kifayet (24/9)

Ji 'işqê lew Mela xest e ji herfa badeya mest e
Ji hoş û 'aqilî rest e li dor goşên di meyxanê (111/24)

Heft xumê tejî bade di meykedeya qidemê
Ji xuma ku min îrade 'işq rêhte cama Cemê
Lewhê lê nûn û sade lew feyz da qelemê (132/8)

Mestê şehkasê meya cazîbeyên rûhê didet
Ruh dizani ku ji ber lezzetê ‘işqê me lebaleb (14/3)

‘Aşiqê mestê bi ‘işqê niye hacet bi meyê
Waridê warid û ehwali bi ewradî çi ket (22/8)

#### 1.2.2.1.8. ‘Eşq û Elem

‘Eşq, derdeke bêderman e; ew derd, tenê bi zulfa yarê û bi dermanê wuslatê tê dermankirin. Ji ber vê yekê, ‘aşiq di navbera jihehveqetîn û wuslatê de diçe û tê. Hem lezzetê hem jî êş û elemê dide ‘aşiqî. Di lezzeta ‘eşqê de elem, di elema ‘eşqê de jî

lezzet peyda dibe. ‘Aşiqbûn, wek belayekî hatiye dîtin. Kesê bikeve ‘eşqê, rehetî jê re tune, lewra ‘eşq û selametî ji hev dûr in û rêya ‘eşqê, rêyeke agirî ye. Ew kesê ku ji yarekî xwe re nefrînê/nifirê bike, bi tenê ji Xwûdê bixwaze ku ew kes bibe mubtelayê ‘eşqê, besî wî ye. ‘Aşiq caran ji derd û elemên ‘eşqê re kêfxweş e û jê kêfê hildide. Di ‘eşqê de hezz û lezzet tune û zêdekirina derd û xeman de jî hezz tune. ‘Eşqa mehbûbê ew qas bi êş û elem e; ji ber ‘eşqa wê, bazin, berg û werek jî dinalin. Xema ‘eşqê, ‘aşiqî disoje, derba ‘eşqê hiş û ‘eqlê wî ji serî dibe. Şerha halê xema ‘eşqê ew qas zêde ye, nayête nivîsîn û wesfên wê di tu hesab û defteran de cih nabin.

Her dilê sohtî bi ulfê yar ne dermanek bi zulfê
Ta ebed ew bendê qulfê 'işq derdek bêdewa ye (95/3)

'Işqi derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

Weh çi ‘işq û çi selamet ji yekê dî dur in
Kullu men yesluku hubben subulu’n-nari selek(70/8)

'Işqê ji Xudê da tu bixwazî jê ra
Ger dê tu li yarek xwe bikî nefrînê (119/4)

Hezz û lezzet me bi ‘umrê xwe di ‘işqa te nedî
Hem bi van derd û xeman zêde tu îsalî çi hez (62/4)

Lew ji ‘işqa wê dinalin bazin û berg û wereq
Cezbeya dil min ji remza wan gehayê rast û çep (17/12)

Şerh û halê xemê 'işqa te ji kû bête nivîsîn
Medhê ewsafê cemalê te kuca têt reqemê (109/9)

Lê ez tinê ser ta qedem yekser disojim dem bi dem
Wesfên di 'işqê ez çi dem nayên hisab û defterê (113/4)

‘Aşiq ji ber muhbeta ‘eşqê, sewdaser e, bûye pêta êgir (pilox) û weke tiştên di nav lehîyê de diçin bêîrade û berbelav bûye. ‘Eşq, sînesoz (hinavsoht) û cangudaz (canpişêv) e; ji destê evînê, ji dil, bi sed rengî, feryad û ah tên, lêbelê ew kesên ku ji ‘eşqê xeber didin, tu carê ji ber vê yekê newestane, lewra di elema ‘eşqê de, lezzetek jî heye.

‘Işqê bi min sewda kirî ‘alem li ser me rakirî
Me’şûq ji min cuda kirî ew nazika kuhlê bi nav (65/9)

Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sehlê û suheylê
Muhbeta ‘işqa di Leylê ez kirim yekser pilox (36/7)

Kî xeberdar kit ji ‘işqê key li ber westan girit
Ger çi reh ew zerreyek sînesoz cangudaz (45/7)

Daim hezar deng tên ji dil feryad û ahên tên ji dil
Sed rengê xem têtin ji dil ‘işqê li min suhtin hinav (65/8)

#### 1.2.2.1.9. Xusûsiyetên ‘Eşqê

‘Eşq, ‘ilmek e; wesfên wê, ew qas gelek in, rîwayetên derbarê wê de, şerh û medihkirina wê, têra îzahkirina wê nakin. Sirrên ‘eşqê jî gelek in, şa’ir tenê dikare wan mu’emmayan hel bike. Xusûsiyetên eşqê, bi taybetî li ser ‘aşiqan têne dîtin. ‘Aşiq, bi xwe van tecrubeyan tîne zimên ku mehbûb haya wê ji ‘aşiqî çêbe û belkî ji bo wuslatê bête rehmê. Di dîwanê de xusûsiyetên ‘eşqê yên menfî/neyînî, weha hatine dayîn: ‘Eşq, xedar e û disoje; ‘eşq, ew qas tesîrdar û cazîbedar e, zerreyekê wê bigehije kê, ew ‘eqlê xwe wenda dike û di dawiyê de jî helak dibe.

Ayetê husnê mufessel ke ji keşşafê cemal
‘Ilmê ‘işqê bike tefsîr û ji defter meke behs (27/7)

‘Ilmê ‘işqê but û latan bi rîwayet nabitin
Qederek hal ku nebit şubhetê her qalî çi hez (62/6)

Wesfên evîn û 'işqehê husn û cemalê wê şehê
Nayêne şerh û medehê ehsen ji neqşê beşerê (113/5)

Zerreyek ‘işqê giha kî û ji ‘eqlê xwe nebir
Kullu men sadefehu dahîyetu’l-‘işqi helek (70/6)

Xusûsiyeteke ‘eşqê jî ew e ku di nav xwe de sirran dihewîne û sirrên wê jî gelek in. Di ‘rêya ‘eşqê de ya giring ne kêfxweşi ye belkî kêşandina derd û elemê ye. Mela Camî, di ruba’îyeke[336] xwe de vê xusûsiyetê wiha beyan dike: “*Sirra xema ‘eşqê derd kêşan e ne şahî û pesnê xwe dan e. Bi neqşan dikare derbazî bêneqşiyê bibe û ev neqşê xerîb jî Neqşebendî ne.”*[337]

Cizîrî jî, weke Mela Camî, behsa sirrên ‘eşqê dike û ew jî di wê baweriyê de ye ku sirrên ‘eşqê bi cehd û xebatê, bi ‘ilmê dest nakeve. Sirrên ‘eşqê, ancax ji aliyê

---

336 “Sirrê xemê ‘eşq derdmendan danend
Ney xweş menşan û xod pesendan danend
Ez neqşê tewan bi sûyê bêneqş şoden
În neqşê xerîb Neqşebendan danend”
337 Molla Cami, Şerh-i Ruba’iyyat, Litera Yayınları, İstanbul 2021, r. 144-145

wan kesên ku weke Mela di rêya ‘eşqê de cewr û cefa kêşayî, dikarin bên bidestxistin û ew sirr bên aşîkarkirin.

Tu j’Melayî her bipirs esrarê ‘işqê ew hel nekit
Vê mu‘emmayê çi zanin sed mela û muste‘îd (39/14)

Rengê ‘aşiqî, ji ber derd û elemên ‘eşqa zerîsifetan, weke zêrê zer bûye. Mehbûb, vê yekê bi husnê tehlîlê dibersivîne. Ew dibêje, ‘eşqa min weke iksîrê ye û tu jî weke me’dena sifirê (mes) bêhempa bûyî; min tu zivirandî zêrê, yanî tu bi ‘eşqa min namdar bûyî. Iksîra ‘eşqê caran jî, ji rastiya xwe dûr dikeve û ‘aşiqî, zîr û zeber dike.

'Işqa te meger zêrîsifet zer kirîne go
Iksîr e evîna me bi 'eynê we mes î tu (105/9)

Ger qelbê heqîqet niye yekcari çira
*'Işqa* te kirîn zêr û zeber iksîrê (118/5)

‘Eşq, wek karekî tîcaretê hatiye dîtin. Îmtîhana dinyayê, weke tîcaretekê ye. Kar û zererên wî, hem li dinayê têne dîtin hem jî li axiretê dê bêne dîtin. ‘Aşiq, her daîm amade ye ku canê xwe di rêya mehbûbê de feda bike. Ew kesê canê xwe di rêya cananê de bide, ew bextewar e û wî tîcareteke biqezenc kiriye. Giringiyên ‘eşqê gelek in û ‘eşq weke iksîrê ye. Çawa ku iksîr tiştên bêxêr (zîv û paxir/sîm û mes) diqelibîne zêrî, ‘eşq jî dilê ‘aşiqî ji wê xwîn û goştê vediguherîne rûhekî tenik û nûranî.[338] Şa’ir, dixwaze di ‘eşqa heqîqî de baqî bibe. Ew tiştên ku ji baqîbûnê dûr in, li ser pişta însên weke barekî hatine barkirin. Daxwaza şa’ir ew e ku her kes wan tiştên bêkêr biavêje.

Di dîdarê hezaran can nîsarê meqdemê yar în
Kesê canan bi can bînit ‘işqê wî tîcaret kir (42/6)

Qelbi e‘yan digirit hubb di wucûd
‘Işqê iksîr e û em sîm û mes în (80/18)

Beqa nînin li bo tiştî heta kengî bikîn piştî
Di 'işqa wan perîrûyan werin dunyayê da deyn (89/4)

Muhebbeta di navbera însanan de (‘aşiq û me’şûq), bi ruhî dest pê dike. Tecelliya husna ezelî, ewilî di rûhan de xwe nîşan daye. Ji ber vê yekê ye ku ruhê însanan bi ‘eşqê, bi hev ve têne girêdan. Ruh, bi cesedî ve bûye yek. Di vê îttîhadê de

[338] Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., r. 45-46.

hevsengiya ruh û bedenê li ber çavan hatiye girtin. Eger bi cazîbeya ‘eşqê du ruh nebin yek, bi hev ve neyêne girêdan, bi spehîtiya bedenê ve nabine yek.

'Işqê ku bidin bi yek du erwah
Peyweste divê bi hev bin eşbah (34/1)

Ne ku peyweste bi yek bin ji surê ‘işqê du rûh
Dê bi eşbahê bibin wasil û peyweste bi yek (68/8)

### 1.2.2.1.10. ‘Eşqa Beşerî

‘Eşq, di dîwanê de, derbarê muhebbeta beşerî (‘eşqa mecazî) de jî bûye mijar. Her wekî tê zanîn ku di edebiyatê de, hinek şexsiyet, bi çîroka evîna xwe ve bûne sembola ‘eşqê. Mehmûd û Eyas, Ferhad û Şirîn, Xusrew û Şirîn, wek nimûne di dîwanê de derbas dibin. Şa’ir, ‘eşqa xwe û ya van kesayetiyan muqayese dike û pile û mertebeya hubba xwe beyan dike.

Şa’ir jî, weke Ferhad, eger serê wî jî di vê rêyê de biçe, dîsa, dest ji mehbûba xwe bernade. Çawa ku bi sedan padîşah û Xusrewan canê xwe di rêya ‘eşqê de dane, şa’ir jî dixwaze di vê rêyê de xwe qurban bike. Ferhad, ‘aşiqekî sadiq e, wî dil daye Şirînê û lezzeta ‘eşqê hîs kiriye. Ferhad, ji bo canana xwe hez ji canê xwe kiriye, lêbelê Perwîz, ji bo canê xwe hez ji canana xwe kiriye, lewra Ferhad ji Perwîz çêtir aşiqekî heqîqî ye. Eger tu derbarê Şirînê de agahiyan bixwazî, ji Perwîz nepirse, ji Ferhad bipirse, lewra ew aşiqekî dildar e û cazîbeya Şirînê û xemên ku ji ber ‘eşqa wê kêşayî, Ferhad ancax dizane.

Dest nehêlim ez ji dînê şibih Ferhad û Şirînê
Wê di ber ‘işqa evînê min di rê çit ev kulox (36/8)

Sed padişah û Xusruwan can dan di ‘işqê û rewan
Şirîn di libsê erxewan min dîn li bejna serwîqed (40/3)

Tinê Ferhad dizanî lezzetê ‘işq
Ku wî can daye Şirînê bi Perwîz (46/5)

Ferhad dizanit tu ji Perwîzî mepirs
Etwarê xemê 'işq û sura Şirînê (119/12)

‘Eşq, di hakimiyeta xwe de weke hukumdarê îraniyan, Xusrewî hatiye dîtin. Textê ‘eşqê yê hebûnê dil e, li wê derê rûdine û dibe hakimê ‘aşiqî.

Xusrewê ‘işqê ku rûnişt li ser textê wucûd
Fetehe’l-qelbe ‘elel-fewri we li’r-rûhi melek (70/7)

Husna ezelî, di neynika dilî de tecellî bûye. ji wê tecelliyê ye ku aşiq dil berdide mehbûbê. Wî husnê şewqa xwe daye dilê Eyasê. Iksîra spehîtiya Eyasê, ‘eşqa Mehmûd e. Ger ew nebûya, bedewiya Eyasê li dinyayê namdar nedibû.

Husni bêayîneyê ‘işqê tecella nadet
‘Işqê Mehmûdî di me‘na nemekê husna Eyas (51/2)

**1.2.2.1.11. ‘Eşq û Dil**

Çavên ‘aşiqî dema bi husna dilberê dikeve, tesîrê li dilî dike û di dilî de sohtin dest pê dike. Ji derba ‘eşqê, singê ‘aşiqî ker ker dibe, dilê wî dibe weke pêta êgir. Dil, mekanê ‘eşq û evînê ye. Di navbera ‘aşiq û me’şûqê de rola wasilbûnê dileyze. Ji bo ku karê xwe bi cih bîne, dil her dem amade ye yanî kemerbesteyê ‘eşqê ye.

‘Işqê di herdu çeşman ewwel di dil eser kir
Lê zerre zerre axir sohtin dikir sirayet (24/6)

Sine geh têt ku bi ker bit ew ji derba ‘eşqê
Me ceger şubhetê barut e û dil maye pereng (71/6)

Dil kemerbeste di 'işqê û bi xwe zunnarperest în
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e (94/2)

**1.2.2.1.12. ‘Eşq û Tewhîd**

Şa’ir, li ser yekîtiya ‘eşqê radiweste. Ev jî îşaretê bi daxwaza tewhîdê dike. Ji bo mu’minekî, mehbûba heqîqî Xwûda ye. Eger ew bawermend, ji Xwûda zêdetir hez ji tiştekî din bike, deriyê şîrkê lê tê vekirin. Çawa ku dilê ‘aşiqî yek e, pêwîst e ‘eşq jî yek be û ji her ‘aşiqekî re jî yarek bes e. Dil jî qibleya ‘aşiqî ye, lazim e di wê derê de jî tenê mehbûbek cih bigire.

Dil yek û dê ‘işq yek bî ‘aşiqî yek yarî bes
Qible dê yek bit qulûban dilberek dildarî bes (52/1)

**1.2.2.1.13. Zewqa ‘Eşqê**

‘Eşq, hem mertebeya ‘aşiqî bilind dike hem jî wî rezîl û ruswa dike. ‘Aşiq hêj negihiştiye mertebeyên bilind û bi êş û elemên ‘eşqê re hemhal e. Eger, ‘aşiq, negihije mertebeya melametê, te’ma ‘eşqê hîs nake. Ji bo wasilbûna menzîlê û rêya seyr û sulûkê, pêwîst e dilberek (yar/murşîd) pêşdariya ‘aşiqî bike, bê murşîd, rêwîtî berhewa dibe. Armanca ‘aşiqî bi qanûnê, şîfa û sefagirtin e. Eger bi vî awayî nebe, ew helaka xwe ya di rêya ‘eşqê de bi necatê (xelasbûnê) nade.

Ruswayê ‘işqê ne tenha ez bûm
Kê dî zemanan hub bê melamet (25/6)

Da di seyrê ‘işqê bêdilber neçêbin
Dil dibit seyra te bê bêdilber ‘ebes (26/3)
Te b'qanûn ku işaret bi sefayê bikirit
Ez helakê xwe di 'işqê bi necatê nadim (75/6)

**1.2.2.1.14. ‘Eşq, Nar/Ateş, Nûr û Lami’**

Ji aliyê şewitandina dilê ‘aşiqî ve ‘eşq, bi êgir re hatiye wekandin. Hingî dilê aşiqî bisoje, ji arzûyên dunyewî dûr dikeve û nêzikî Xwûda dibe. ‘Aşiq bi vî awayî digihije fenafillahê û wuslat pêk tê. Dilê ‘aşiqî di nav agirê ‘işqê de weke cesedekî şewitî ye, bi vê iksîrê dil digihije heqîqetê. Agir, çawa zêrî dihelîne û zîbeq jê difirin, her wusa agirê ‘eşqê jî wucûdê dihelîne, ji qirêjahiyan paqij dike. Dil Ke’beya Mewla ye, herçendê bi agirê evînê dişewite jî, bi nêrîneke safî li wî agirî bête mêzekirin, ew agir dê weke nûrekê xwûya bibe. Eger dil, bi ‘eşqa nûrê, neyête cîlakirin (ji gunehan neyête paqijkirin), cewhera husnê heqîqetê nîşan nade.

Teşbîhê cesed dil me di nêv ateşê ‘işqê
Dê qelbê heqîqet bit û iksîrê hema girt (20/2)

Ateşê ‘işqê şebhê zêr wucûdê hel ket
Heye mumkin nefirit zîbeqê ferrarê hudûs (28/11)

Sed co û sed cobar e tê sed gulşen û gulzar e tê
Çendan ji ‘işqê nar e tê safî nezer dî kûr e dil (74/8)

Cewhera husnê eda tenha dibit meqbûlê teb‘
Ger ne seyqel det bi nûrê ‘işqê wek hekkakî rûh (33/12)

**1.2.2.1.15. ‘Eşq û Derya/Qulzem**

Derya, behr e û sembola zehfahî, kurahî, bêbinî û bêsînorîyê ye. Ji ber van sedeman, ‘eşq bi behrê re hatiye wekandin. ‘Aşiq jî wiha tê teswîrkirin ku di nav vê behra bêbinî de, xerqî avê bûye û tê de wenda bûye. Deryaya ‘eşqê, ji serî heta binî, di nav med û cezîran de ye. Behra ‘eşqê ya ku ‘aşiqî di nav de, bi pêl (mewc) e û serdestî li ser keştiya wî jî kiriye, di nav xwe de dibe û tîne; radike û datîne. ‘Eşqa şa’irî, ji ber pêl û bageran (mewc û ‘ecac) bûye weke behrekê. Mumkine ku bi destê hinduyekî, keştiya ‘eşqê, ser û bin (zîr û zeber) bibe.

Dilber ji le‘lên xwe’y şefaf da min meya gulgûne saf
Deryayê ‘işqê qaf û qaf peyweste cezr û hem meded (40/8)

Feleka etlesî sergeşte di cama me hebab e
Mewc didetin qulzemê 'işqê me li ser dest xurab e (94/1)

'Işqa me ji ber mewc û 'ecacê bûye derya
Wê zêr û zeber kit me bi dest hind û xurabê (112/7)

**1.2.2.1.16. ‘Eşq û Kelb**

Xusûsiyetê kelbê, ji xweyiyê xwe re sadiqbûn e. ‘Aşiq jî, weke kelbê sadiq girêdayî mehbûba xwe ye. Toqa gerdena wî zulfa yara wî ye ku dişibe helqeya zunnarê û qilfa kelbê ‘eşqê jî, helqeya zunnarê ye. Mehbûbê, bi wan toq û helqeyan, hevsarê aşiqî xistiye destê xwe, çawa bivê wesa li pey xwe digerîne.

Toqê gerden helqeya zunnarê zulfa yara min
Dê kilîta kelbê 'işqê helqeyê zunnarî bit (19/6)

**1.2.2.1.17. ‘Eşq û Rendeş**

Rendeş, amûreke necaran e ku textan pê diqeşêrin û şayîk û spî dikin.[339] Rendeş û ‘eşq, herdu jî qirêjahiyan temîz dikin. Yek, girêjahiyên maddî, yek jî yên me’newî jê dibe. Reng û jenga bûyeran, neqşên xwe di dilî de çêkirine; ji bo paqijiya qelbî, pêwîst e ‘aşiq, wî bidete ber rendeşa ‘eşqê.

Reng û jengê hedesê neqşê hudûsê me di dil
Bide ber rendeşê ‘işqê ew e qessarê hudûs (28/18)

**1.2.2.1.18. ‘Eşq û Gewher**

Gewher, kevirê giranbiha ye. Ji bo giringiyê, ‘eşq bi gewherê re hatiye teşbîhkirin. Ji rengê zeriyan kifşe dibe ku gewhera li vir zêr e. ‘Aşiq, ji ber şîddeta evînê nikarin hestên xwe xef bikin û ji ber derdê evînê rengê wan jî zer bûye.

Bi çi rengi me di dil xef bibitin gewherê ‘işq
‘Aşiqan muhbet û mihra zerîyan kifş e ji reng (71/7)

**1.2.2.1.19. ‘Eşq, Ayet û Fatîhe**

Melayê Cizîrî, di navbera unsûrên spehîtiyê yên yarê û Qur’anê de têkiliyek çêkiriye. Mushaf, di edebiyata klasîk de rûyê yarê ye. Neqşên li ser rûyê yarê weke ayetan têne dîtin, lewra her spehitayiyek ji qudreta Xwûda hatiye nivîsîn.[340] Nûn, çavê

[339] Mela Ebdusselamê Cizîrî, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, r. 227.
[340] Rıdvan Canım, b.n.b., r. 88-89.

yarê ye û birûyên li ser jî weke ayetan tê dîtin. Dilê ‘aşiqî jî mestûr e (nivîsandî) û weke erxenûnê ji wan neqşan re dinale û dixwaze wan ayetên nivîsî bixwîne. Sûreya Fatîhayê destpêka Qur’anê ye. “Fatîheya ‘eşqê jî, destpêka evînê ye. Bi hesteke samîmî, dema di dilê ‘aşiqî de evîn peyda bibe, ji bo daxwazên ‘aşiqî, ayetên mayî, yekayek amîn dibêjin.

Nûra ji qudret lê du nûn jê ra dinalin erxenûn
Wer ayeta ‘işqê bixwûn xweşnusxeyek mestûr e dil (74/5)

'Aşiq ku bi dil fatîheya 'işqê xwend
Ayati yekayek dikirin amînê (119/6)

#### 1.2.2.1.20. ‘Eşq û Secdegeh

Di navbera birh û mihrabê de çawa têkilî heye, di navbera secdegeh û ‘eşqê de jî heye. Cihê dilber lê xwûya bibe ew der ji bo ‘aşiqî, mekanê secdeyê ye. Herdu birûyên dilberê yên weke kevana mihrabê, dema ji jor ve li ber çavên ‘aşiqî xûya dibin, di secdegeha ‘eşqê de du’a û lavahiyên wî dibine nimêj.

Mihrabi du ebrû ku ji bala ve xuyabin
Der secdegehê ‘işqê niyazê me nemaz in (84/11)

#### 1.2.2.1.21. ‘Eşq û Bor

‘Eşq, ji ber ku suwariyê xwe zû digehijîne menzîl û mehbûba wî, weke hespekî (bor) hatiye dîtin. Behskirina zulfa dilberê, xwestina wuslata wê ye. Dema ‘aşiq wuslatê dixwaze, hespê evînê, weke bayê nesîmê, wî bizû, ber bi yarê ve dibe.

Me'w nesîm xweş pençe têkra wê diçîn xweş teyr e vêkra
Behsê zulfa yarê vêk ra borê 'işqê pur feza ye (96/6)

#### 1.2.2.1.22. ‘Eşq û Tuxra

Tuxra, gustîl û mohra desthilatdariyê/fermandariyê ye ku mebest jê gulang û biskên kagulê ne.[341] Mehbûbê, wateyeke kûr û xef li ‘eşqê bar kiriye. Ew jî weke tuxraya padîşahiyê girift û têr mesaj e. Ew wateyên li wê hatî barkirin, mehbûb baş dizane û kesê tuxraya evînê bi dil û can bixwîne, dê bizane ka ‘eşq çi nav û nusxeyeke giring û têr wate ye.

'Işq e tuxraya nihînî her dema mehbûb dibînî
Dê bi dil lazim bixwûnî ev çi ism û nusxe ye (97/15)

[341] Melayê Cizîrî, b.n.b., (ferheng), r. 422.

### 1.2.2.1.23. ‘Eşq û Kesayetiyên Wê

‘Eşq, bi kûrahiya xwe ve weke behrekê ye. Di vê behrê de gelek xusûsiyet û kesayetî derketine pêş. Di dîwanê de bi hinek taybetiyên evînê re hinek kesayetiyên taybet jî peyda bûne. Herwekî şa’ir di ‘eşqê de xwe wekî Şêxê Sanî (duyem) dihesibîne ku yê yekem Şêxê Sen’an bûye. Şêxê Sen’an, di ‘eşqê de sombola fedakarî û sadiqbûnê ye.

Di ‘işqê Şeyxê Sanî me bi dil behra me‘anî me
Li zî hicrin we zî qelbin şifaun fî işarat (23/18)

Şa’irî, di dîwanê de, bi têkiliya ‘evînê, derbarê xusûsiyetên evînê de hinek ravek bi kar anîne. Ravekên weke “şehîdê ‘işqê, bulbulê mecrûhê 'işqê, ruswayê ‘işqê, pîrê ‘işq, salikê ‘işqê, hostayê ‘işqê, muftiyê 'işqê, badenoşê 'işqê, rehberê 'işqê, ateşperesê wadê 'işqê, birîndarê ‘işqê”, her yek ji wan xusûsiyeteke ‘eşqê beyan dike û dide zanîn ka ehlê ‘eşqê di deryaya ‘eşqê de vediguhere çi hal û ehwalê. Di van ravekan de jî kifşe dibe ku ‘eşq di vê rêyê de hem ‘aşiqî birîndar dike û aşiq şehîd dibe û mertebeyên bilind bi dest dixe, hem jî di destê ‘eşqê de caran di nav civakê de tê dûrkirin û rezîl û ruswa dibe.

Xwûn ji mêlakê bi derba xencerê ma bête der
Bû şehidê 'işqê êdi dê ji ku hişyarî bit (19/10)

Bulbulê mecrûhê 'işqê taqeta xaran nehin
Dê kulafa rîşê sîne bişkowek bê xarî bit (19/12)

Ruswayê ‘işqê ne tenha ez bûm
Kê dî zemanan hub bê melamet (25/6)

Neyşekerên şirînzeban mest û bi cama û bade yîn
Ferz tibit ji tewbeyê salikê ‘işqê tewbe ferz (56/4)

Xweş perîşansifet û mecmu’eyê sûretê hal în
Pîrê 'işq în û cuwanteb' û dil 'ehdê şebab e (94/9)

Ê birî 'eynê beqayê badenoşê 'işqê bû
Ê bûyî mehwê fenayê 'aşiqê bêçare bû (104/11)

Ateşperesê wadê 'işqîn û 'eceb
Dînarperes û wê dibirin tekfîrê (118/11)

### 1.2.2.2. Hubb, Muhebbet û Evîn

#### 1.2.2.2.1. Hubb û Muhebbet

Peyva muhebbetê, ew nav e ku ji koka peyva hubbê tê. Muhebbet, evîn e; evîna zêdehî jî bi 'eşqê tê binavkirin. Muhebbet, meyla tiştekî ye û di hemwateya îradeyê de jî tê bikaranîn. Lêbelê muhebbet, ji aliyê hêza daxwaziyê ve, ji îradeyê derbaz dibe. Muhebbet, di felsefeya tesewwifê de halekî me'newî û meqameke îlahî ye.[342] Muhyîddînê 'Erebî, derbarê hubb/evînê de, van agahiyan dide: Çar leqebên meqama hubbê hene. Yek muhebbet e. Muhebbet, di qelbî de cihgirtina hubbê ye û xwe paqijkirina ji qirêjahiyên 'arizî ye. Ya duyem wûd e. Navê Xwûda "el-Wedûd" ji vî navî derketiye. Wud, di dunyayê de sabîtbûn e. Xusûsiyeteke arzû, hubb û 'eşqê berdewam bike wûd peyda dibe, yanî li ser muhebbetê sebr û sebat e. Leqeba sêyem 'eşq e. 'Eşq, muhebbeta zêdehî ye. Di Qur'anê de, ji bo şîddeta muhebbetê, bi kînayewî hatiye bikaranîn.[343] Lêbelê, peyva 'eşqê, ji bo Xwûda nayête bikaranîn. Dema hubb, beden û ruhê 'aşiqî dorpêç dike, 'eşq derdikeve meydanê. Leqeba çarem hewa ye û hewa, arzûyên însanan e. Hewa ew îrade ye ku meylî mehbûbê dibe, dema dikeve qelbî de, bi mehbûbê ve tê girêdan.[344]

Li ser şeklê hubbê jî tê rawestandin. Bi goreyî tesîra muhebbetê ya li ser 'aşiqî, muhebbet dibe beş beş. Evîna mecazî ku girêdayî sûretan e, du qism e. Muhebbetek, weke qufl û mifteyê ye. 'Aşiqî digire û bi xwe ve girê dide, îradeya wî jê distîne. Yek jî weke sihrekê ye, 'ecêbiyan tîne serê 'aşiqan, ew qas bengiyê mehbûbê dibin herwekî sihr lê hatî kirin. Ji aliyê tecellîbûne ve jî muhebbet, dibe qisim qisim. Muhebbet di hinekan de ruh e (melek, Cebraîl), di hinekan de cism e (beşer), di hinekan de nar û nûr e (cîn) û di hinekan de jî hewa ye. Hubba baqî ji bo Xwûda ye, pêwîst e 'aşiq bi hubba beşerî (hubba cismanî) ve xwe zêde girênede, lewra tesîra hubba cismanî weke neqşê bêbeqa ye, di demeke kurt de, jê diçe. Ne tenê hubba beşeran bi vî rengî ye, gul û çîçekên çemenan jî di nav muhebbetê de ne. 'Eşqa, gul û bulbulê jî cismanî ye. Bulbul, bûye aşiqê spehîtiya gulê. Heta gul sohratiya xwe wenda neke û neçilmise, bulbul bi mestane nal û newayê dike. Dema gul diçilmise, muhebbeta bulbulê wenda dibe û bi gulên nûgehiştî re dîsa hubb û nalîna wî destpê dike.

---

[342] Uludağ, "*Muhabbet*", DİA, c.30, r. 386-388.

[343] Ewên bawerî anîne zêdetir ji Xwûda hez dikin (Wellezîne amenû eşeddû hubben lîllahî). (Sûreya Beqere 2/165)

[344] Îbn Arabî, Fütûhat-ı Mekkiyye, c. 8, r. 173; Suad el Hakîm, "Hub", b.n.b., r. 233-238.

Muhbeta sûrî du qism e qufl û miftah û tilism e
Hin ji rûh in hin ji cism e nar û nûr e hin hewa ye (95/21)

Hubbê cismanî du roj in ger çi dil pirr pê qusur in
Xef ceger peykan dinojin mislê neqşê bêbeqa ye (95/22)

Têk seher mesti bûn muhbetekê xwestibûn
Zulfekê ew bestibûn ‘eqrebîyan gestibûn (50/1)

Gul heta sohr in bi tê ve bên tebessum pê ve pê ve
Bulbulê serxweş di nêv e nexme û nal û newa ye (95/23)

Herçi cilwa bû ji navê nû gulek dî girt xunavê
Wî ji dil çû muhbeta vê ew bi yarî ra teba ye (95/24)

Hubb û muhebbet, di dîwanê de, di wateya ‘eşqê de hatiye bikaranîn. Ew kesê bûye mubtelayê mehbûbê, di dilê wî de derd û bela û birîn peyda bûne. Lewra muhebbet, weke nêçîrvanekî, ‘aşiqî dixe davê. Eger ‘aşiq, ji ‘eşqa mecazî derbasî ya heqîqî nebe, ew nakeve dava hubba heqîqî. ‘Aşiq meyldarê mehbûbê ye û star nabe û nikare rengê muhebbeta xwe veşêre û eger muhebbeta ‘aşiqî ji ruhî be, ew dibe mubtelayê nûra Subûh. Caran ‘aşiq dibe bengiyê xweşikiyên mehbûba mecazî û ‘umrê xwe di vê rêyê de berhewa dike. Ew kesê muhebbet pê re heyî duçarî derd û belayê dibe û xewêd şevan jî, jê re heram dibin. Di rêya muhebbetê de rezîl û ruswabûn jî heye. Tu kes, bê melametî (lomeya lomedaran û gazind) negihiştiye hubba heqîqî. Herçendê ‘aşiq di nav agirê muhebbetê de dişewite lêbelê ev dibe sedema wuslata wî. Bê nar û nûra muhbetê ‘aşiq nikare biçe meqama wusletê, lewra ew sohtin, di şevên tarî de jê re dibe ronahî û rê nîşanî wî dide.

Bi dama muhbetê bend im xedenga firqetê dil noht
Bi şubhê murxê nîmbismil di hev wertêm di xwûnê da (5/6)

Bi çi rengi me di dil xef bibitin gewherê ‘işq
‘Aşiqan muhbet û mihra zerîyan kifş e ji reng (71/7)

Herkesê muhbet ji rûh e mubtela’y nûra subûh e
Wî di dil da sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye (95/25)

Her dema dilber diyar bit can û dil têk tarûmar bit
Dê çi reng muhbet sitar bit xefkirin bêfeyde ye (97/10)

Aşiqên leb û lêvan şabaş e ji Xwedê ra
Selwa û bih û sêvan belçîm ji zîv û zêra
Heram in xewêd şêvan li kesê muhbet vê ra (132/29)

Bê nûr û narê muhbetê bêneqş û wesfê qudretê
Naçîn meqamê wesletê nûrun lena we'l-leylu dac (31/4)

Muhebbet di wateya meyldariyê de jî hatiye bikaranîn. Rûyê mehbûbê mushef e û xweşikiyên rûyê wê jî weke ayetan li ser hatine nivîsîn û neqişkirin. Eger rû weke ayetê bête tesewirkirin, unsûrên husna wê jî dibin herf. Ew ayet/herfên mîna birh, çav, zulf, bejin, enî meyla ‘aşiqî dikêşînin ser xwe. Çawa ku li derdora ayetan haşiye têne nivîsîn, li derdora ayeta rûyê mehbûbê her wisa unsûrên xweşikiyê hatine neqişandin.

Me‘neya ‘işqê dizanî ayeta husnê bixwûn
Da tu herfên muhbetê yek yek ji hev kî îmtiyaz (45/5)

……… hey’etê remz û rumûzê muhbetê
Haşa li dora ayetê avête der minqarê xet (59/10)

Hubb û muhebbet, di dîwanê de, hem ji bo ‘eşqa heqîqî hem jî ji bo ‘eşqa beşerî hatiye bikaranîn. Di van beytên jêr de, ji ber nîşan û sembolên beşerî, xusûsiyetên ‘eşqa beşerî çêtir xwûya dikin û ji xwe di tesewwifê de, muhebbeta beşerî jî, ji bo gehiştina hubba îlahî, wasitayek e.

Muhebbet, ji bo ‘aşiqî mihnet û bela ye û muhbetê ew di nav pêt û êgir de sohtiye. Çawa ku muhebbeta Leylayê Mecnûn sohtiye, ‘eşqa mehbûbê jî şa’ir kiriye pêta êgir. Tîra muhebbetê li êşiq dikeve û ‘aşiq dibe kuştiyê çavên mehbûbê yên xumar. ‘Aşiq dixwaze, haya mehbûbê ji wî hebe û ew ji badê sebayê hêvîdar e ku xeberekê ji mehbûbê bîne. Ji ber sadiqbûna ‘aşiqî, ji yarê nameya muhebbetê tê. Piştî firqetê wuslat peyda dibe wesla hebîbê dibe nesîbê wî û ‘aşiq digihije muhebbeta yarê.

Muhbetê mihnet di zor in hub dibêm bêşek bela ye
Umr û jî xweş pê diborin sohtin û derd û cefa ye (95/1)

Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sehlê û suheylê
Muhbeta ‘işqa di Leylê ez kirim yekser pilox (36/7)

Lê keşfê esrarê xwe ke mexmûrê xemmarê xwe ke
Heyranê reftarê xwe ke kuştîne tîra muhbetê (125/4)

Çehvenêr im guh li rê me lê seba ruh daye pê me
'Erzihala muhbetê me bendeyek sadiq Mela ye (95/13)

Da bizanit pêt û nar im kuştiyê cohtê xumar im
Muhbetê sohtim buwar im lazim ew zanit we ye (97/8)

Paş firqetê zor muhbetê me ji tel’etê çûm hezretê
Wesla hebîb min bû nesîb mel‘ûn reqîb rencûri bû (107/13)

Di mijara husn û hubbê de telmîhkirina Sultan Mehmûd û Eyazî gelek giring e. Di vê wateyê de, bi tesîra hubbê, meqama şah û gedayan vediguherin. Husn û hubb, weke şah û gedayî ji hev nayêne veqetandin. Eger şem’a (husn) Eyaz nebe, şu’leya Sultan Mehmûd ronahiyê nade. Muhebbet di dilî de dema peyda bû, husn dibe şah, muhebbet (meyla ‘aşiqî) dibe geda; herwekî Sultan Mehmûd meyldarê Eyazî bû, bibû geda, Eyaz jî xweyî husn bû, bibû şah. Lêbelê di rastiya dinyayê de rewşa wan tam ziddê vê bû. Muhebbet ew qas efsûnkar e, şahî dike geda, gedayî jî dike şah. Tesîra hubbê gelek e, ew ji aliyê wucûdê ve însên vediguherîne, ber bi heqîqeta rûhanî ve dibe, yanî ji beşerbûnê, derbasî însaniyetê dike.

Husn û hubb bê yekdu nabin dê biken şah û geda
Nûrê nadet şu‘leya Mehmûdî bê şem‘a Eyaz (45/4)

Ger husn û mehebbet bi seraperdeyê can bin
Geh şah û geda geh bi xwe Mehmûd û Eyaz in (84/12)

Qelbi e‘yan digirit hubb di wucûd
‘Işqê iksîr e û em sîm û mes în (80/18)

Hubb û muhebbet, ‘eşq û husn, di dîwanê de, di gelek cihan de, bi hev re hatine. Muhebbet, derbarê ‘eşqa îlahî de jî hatiye bikaranîn. ‘Eşq û muhebbet, di zatê Xwûda de her daîm hebûne û husn û hubb jî, zatê qedîm in, ji yekdu cuda bûne. Xwûda husn û hubb anîne zuhûrê, ji ber vê yekê ‘eslê ‘alemê ‘eşq e, yanî ‘eşq nebûya mexlûq nedihatine afirandin. Sûretê muhebbetê, di neynikê de, wek heyînek û wateyeke cuda xwûya kiribe jî, husn û muhebbet di zatê Xwûda de yek tişt bûne. Ji bo ku husn û hubb, li her ‘erd û derê xwûya bike, dilberê muhebbetnameyek daye wan. Muhebbeta mehbûban, deriyê sifetên neqişandî vekiriye. Çawa roj di neynikê de xwûya dike û tirêjên xwe belavî her derê dike, muhebbeta îlahî jî şu’leya xwe daye qelb, ruh û zatan, yanî ‘eksa hubba îlahî di beşeran de xwûya dike. Xwûda, di dilê şa’irî de wek nûreke zelal, weke hîlala rohnî, cih girtiye û hubb, di dilê wî de çira û mumek e. Xwûda bi rewşeke tabi’î, muhebbet xistiye dilê însên û hubb bûye kîmyaya qelban. Vê muhebbetê cezbeyek daye însên û ew xistiye rêya seyr û sulûkê. Cehd û xebata bi ‘eşq û hubbê nebe, salik nagihije armanc û menzîla xwe.

‘Işq û mehebbet her hebû Heq 'aşiqê zatê xwe bû
Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet jê we da (9/6)

Husn û hubb zatê qedîm in lê cuda bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûsê li hukmê tefsîl bû (104/4)

Husn û mehebbet zatek in me'şûq û 'aşiq latek in
Lê sûret û mir'atek in her yek di me'nayê xwe da (9/11)

Te xweş nûrek zelal î tu di qelbê min hîlal î tu
We qelbî heysu fîhi'l-hubbu misbahun bi mişkat (23/20)

Cezbe û seyra sulûkê bê mehebbet nabitin
Cehdeya bê'işq û hubb çendî ku kir bê feyde bû (104/8)

Nûr e pur nadir wucûd e gerçi ewwel nar û dûd e
Berqê lami' ma li kû da hubbê qelban kîmya ye (95/27)

‘Aşiq, bi gelemperî ji derdê mehbûbê, bi kul û derd be jî, caran zewqa muhebbetê jî beyan dike. ‘Aşiq, şukurdar e ku Xwûda hubb kiriye nesîbê wî. Bi ‘eşqa mehbûbê, sefaya wî zêde dibe û ew serxweş dikeve. Gilî û gazindên ‘aşiqî ji ber firqetê ye. Ew gehiştiye wuslatê û zulfa yarê ya reş û sunbulîn, xemên wî jê revandine.

Rohniya çavên Mela yî Xaliqê husna te dayî
Hubb tenê da min gedayî husn û hubb yek çeşne ye (97/51)

Ji Hafiz Qutbê Şirazê "Mela" er fehm bikî razê
Bi awaz û ney û sazê bidî ber çerx û perwazê
Tuzed min hubbîhî's-sefwa bihî ehl'ûl-hewa neşwa
Meta ma telqe men tehwa de'i'd-dunya we emhil ha (4/8)

Reşkagulê sunbul çevîn minnet me dîsa xem revîn
Nû bû li dil hubb û evîn feryad ji destê firqetê (115/16)

Hubb û muhbeta mehbûban bi gelemperî tesîreke neyînî li ser ‘aşiqan dihêle. Muhbet, mihnet e û hubb jî bela ye. Herçendê ‘umir, bi muhbetê xweş bibore jî, li pey xwe sohtin û derd û cefayê dihêle. Ji ber husna mehbûbê, di dilê ‘aşiqî de birq vedidin û ji ber nûra hubb û evînê, weke Çiyayê Turê dişewite. Hubba mehbûbê, bi tîr û xedengên Mecerî, her roj ‘aşiqî dikûje. Herçendê hubba mehbûbê di qelbê ‘aşiqî de tejî be jî, mehbûb merhametê nake, bi zulmê aşiqî disoje û kesek jî nîne mehderiyê ji ‘aşiqî re bike û navbera wan çêke ku zêde zulmê lê neke. ‘Aşiq ji destê mehbûbê weke mumê dihele û lal bûye. Ew bi ze'îfbûnê ve weke hilalê ye û bi axîn û nalînê ve jî weke teyra tutakê (goyîn/pepûk) perîşan e. ‘Aşiq, herçendê gilî û gazindan neke jî (bi tenê dixwaze haya mehbûbê pê hebe), derdê dilê xwe beyan dike. ‘Aşiq, ji ber hubba dilberê, bêhal e; şevê heta seherê, weke zengilê radiheje û dinale. Ew kesê ji xwe re rêya hubbê bijartî, herwekî ketî rêyekê agirî.

Muhbetê mihnet di zor in hubb dibêm bêşek bela ye

Umr û jî xweş pê diborin sohtin û derd û cefa ye (95/1)

Dan dil ji ber husna bi nûr berqa tecellaya sudûr
Lew sohtim wek kohê Tûr hubb û evîna enwerê (113/15)

Herdem bi zulmê disojî qelbê ji hubba te'y tejî
Lazim dibêm min dê kujî kes nîne çîtin mehderê (113/26)

Şubhê şem' û şemal im ez ji ber hubba te lal im ez
Ze'îf im wek hilal im ez sifetgoyîn dikalim ez (124/3)

Hubba te ra min radihejîni ku binalim
Şeb ta bi seherê nale ji rengê ceres im ez (48/4)

Weh çi ‘işq û çi selamet ji yekê dî dur in
Kullu men yesluku hubben subulu’n-nari selek (70/8)

**1.2.2.2.2. Evîn**

Evîn, peyveke kurdî ye û di wateya ‘eşq û hubbê de, hem derbarê ‘eşqa heqîqî de hem jî di ya mecazî de hatiye bikaranîn. Evîn derbarê ‘eşqa îlahî û tecelliya navên wî de di dîwanê de cih girtiye.

Wesfên evîn û ‘eşqê, husn û cemalê şahê lemyezel (bi îstî’areyî Xwûda), ne têne şerhkirin ne jî însan dikare bi têrahî medhên wan bide, yanî peyv û quwweta însanan, têra medh û wesfên wan nakin. ‘Eşq jî weke ruhî, ezelî û ebedî ye. ‘Aşiq dibêje, di beriya “qalûbelê” de jî evîn bi wî re hebûye û ew îro jî li ser dayîna wê sozê ye û heta roja dawiyê jî ew sadiqê mehbûba xwe ye. Paşê husn û cemalê xwestine evîn di zatekî de bicivin û nûra qedîm jî ‘eşq û evîn bi naz û îşveyê neqişandiye. Her tişt ji semayê heta masiyê behrê, bi nûra rojê rohnî bûne û melek û çerxên felekê (gerestêrk û galaksî) jî, bi evîna Xwûda, hereket dikin û dizivirin.

Wesfên evîn û 'işqehê husn û cemalê wê şehê
Nayêne şerh û medehê ehsen ji neqşê beşerê (113/5)

Min di ber qalûbela batin vi wê ra bû evîn
Hêj li ser 'ehda elest im ta bi roja axirîn (91/1)

Husn û cemalê xwast evîn vêkra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan pêkve naz û 'işwe da (9/4)

Bi evînê melek û çerx û felek têne sema
Rewşen in têki bi mihrê ji sema ta bi semek (68/7)

Evîn, bi goreyî konteksê, di dîwanê de, bi hinek mecaz û teşbîhan ve hatiye bikaranîn. Ba/bad, bi rola xwe ya herikandinê ve li pêş e. Bayê evînê, dema li ser zulfan dilive, dixwaze bi dalan (xelekên serê zulfê), davê dayne ku dil bikevine davika evînê. Murx, bi daneyê jî dikevine kemînê. Xalên li ser rûyê mehbûbê weke daneyên genim bi çengela zulfê ve hatine daliqandin. Ev yek jî ji bo evîndarê kemînek e, lewra çengala evînê heye, dilê ‘aşiqî digire û ber bi xwe ve dikêşe.

Bayê evînê ku livî hatin li ser zulfan çivî
Herdem hezar dil da kevî xalan di damê dane da (9/45)

Surşêrinê nazeninê kuştim û nakit yeqinê
Wê bi çengala evinê dil ji min bir dil ji min (82/5)

‘Aşiq, di destê evînê de di cewr û cefayê de ye û evîn weke pêtekî êgir wî disoje. Ji ber derbên evînê, dilê ‘aşiqî bûye pêt û pereng û her daîm weke muxnî/stranbêj û çengê, dinale. Husna nûra îlahî, di dilê ‘aşiqî de weke birqekê tecellî dibe û ji ber wê tecelliyê ye ku nûra hubb û evînê weke Çiyayê Tûrê ew sohtiye. Sohtin, dax û birînên evînê, ancax bi şerbeta lêva yarê (wuslatê), kew digire û baş dibe. Evîn weke pêlên behrê ne, diçe û tê (ji nişka ve xwûya dike û wenda dibe), ji ber vê yekê, ‘aşiq dixwaze her daîm wê bibîne. Mehbûb, dema li dîdara ‘aşiqî dinêre, haya wê ji birînên ‘aşiqî çêdibe, lewra remzên evînê nayêne veşartin, ew di her halûkarê de, xwe nîşan didin. ‘Aşiq, jibo dîtina mehbûbê, weke Ferhadê Şirînê di rêya evînê de serê xwe jî dide.

Sohtim ez pêta evînê têk bum gerd û heba
Inne lî ayatu sidqin kane fî haze'n-neba (91/3)

Me ji ber derbê evînê buye dil pêt û pereng
Lew me şeb ta bi seher nale ye wek muxnî û çeng (121/4)

Dan dil ji ber husna bi nûr berqa tecellaya sudûr
Lew sohtim wek kohê Tûr hubb û evîna enwerê (113/15)

Sohtin û derdê evînê 'illetê dax û birînê
Xweş dibit ma ew bi dînê şerbeta lêvan mufa ye (95/2)

'Alim e b'derd û birînê ma dema dîdar û dînê
Xef dibit remza evînê vê bizan bê şubhe ye (97/9)

Dest nehêlim ez ji dînê şibih Ferhad û Şirînê
Wê di ber ‘işq û evînê min di rê çit ev kulox (36/8)

Evîn, herçendê bi xusûsiyetên xwe yên neyînî ve jî hatibe beyankirin, di ‘esliyetê de meqama ‘aşiqî bilind dike, hêjayeke giring dide wî. ‘Aşiq, ji ber te’sîra evînê rengzer bûye, lêbelê mehbûb vê sedemê bi husnê te’lîlê beyan dike ku evîna wê iksîr e, me’denên bêxêr, vediguherîne zêrî.

'Işqa te meger zêrîsifet zer kirîne go
Iksîr e evîna me bi 'eynê we mes î tu (105/9)

Herçendê beyankirina kêf û şahiya evînê li ber derd û xemên evînê hindik be jî, ‘aşiq car caran behsa erênî û lezzeta ‘eşqê jî dike. ‘Aşiq, ji ber evîna şepalê, di şevan de, wekî meşaleyekê ye û ji ber lebên yarê yên şekerbar (gotinên xweş), ‘aşiq jî xweşik û şirîn bûye. ‘Aşiq û me’şûq bi şahiyê, bi hev re nin lêbelê rûyê hev nabînin. Her mehbûbek reng û te’amekê evînê ye. Dema şahî û xweşî dicivin û marên şevê (zulf û kezî) tîrêjên evînê diçirisînin, derd, bela û xem diçin. Zulfa yarê ya reş û bêhnsunbul ku nîşanên wuslatê ne, xemên ‘aşiqî direvînin û hubb û evîn, bi wê dîtinê re, di dilî de, carek din peyda dibin.

Ji evîna te şepalê di şevan şubhê nedîr im
Ji lebê le'lê şekerbarê te wek şekker û şîr im (122/4)

B'şahî bi hev ra hemnişîn reng û ruyê hev me nedîn
Her yek te'amek bû evîn lewra ku pur xwan e xerez (58/4)

Şahî cevîn xem jê revîn marê şevîn îsand evîn
Derd û bela wên çûn hela ‘umrek Mela mehcûri bû (107/15)

Reşkagulê sunbul çevîn minnet me dîsa xem revîn
Nû bû li dil hubb û evîn feryad ji destê firqetê (115/16)

#### 1.2.2.3. Nûr û Lami’

Nûr, şewq û ronahî ye; di qelban de cîla ye û ‘alem bi wê xwûya dibe. Eger batinê şem’ê û batinê qelbê paqij nebe ronahî jê dernakeve. Nûr, sifetekî Xwûda ye. Kesret ji wî peyda bûye. ‘Eşq û evîna di dilê însên de şu’leya wê nûrê ye.

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zori di vê mes’elê ehlê dilan şubhe ma (8/12)

Ew nûr e dabû şewq û tav 'alem xwuyabû hem di nav
Berqên xwe avêtin bilav reng reng e ew nûr berqe da (9/8)

Nûr, bi navê “Zahir”, di mewcûdatê de, tecellîbûna Xwûda ye. Nûra ezelî dema şu’le da, di hemû mewcûdatan de tecellîbûna xwe nîşan da. Nûr, tecellîbûna sifetên Xwûda beyan dike.

Nûr, di dîwanê de, bi gelemperî bi têkiliya cemal û tecelliya Xwûda, bi terkîbên weke “nûr û narê muhbetê, nûra cemalê lemyezel, nûra layezal, nûra qedîm, nûra spêda sadiq, nûra tecellaya teteq, nûra heq, nûra tecella, nûra berzexê, nûra Semed, nûra Sermedî, nûra Wahibî, nûra zelal, nûra qudret, nûra Celîl, nûra Subûh, nûra yeqeq, nûra qidemê, nûrek munezzeh, nûrê teqdîsê” ve hatiye zikirkirin.

Ew latê husn û 'eynê nûr sûret bi sûret tên zuhûr
Ins û perî wîldan û hûr cî cî di wan da cilwe da (9/89)

Nûra tecella hate 'erş esma hemî lê bûne neqş
Şewqa di wan çû ta bi ferş isman bi zatî secde da (9/69)

Ellah ji nûra Sermedî yek qetreyek da Ehmedî
Şirînî û firrek we dî medhûşi ma hetta ebed (40/10)

Katib qelem dîsa gerand ismek ji isman sewwirand
Kursî ji nûrê afirand Cennatê Xuld û Sidre da (9/70)

Dema xezîneya veşartî xwestiye tecellî bibe, ewilî wek nûra hebîb/nûra Muhemmedî tecellî bûye. Ew nûr bi sîlsîlewî heta Pêxemberê me hatiye. Nûr, di beyankirina “kuntu kenzen”ê de di dîwanê de bûye mijar. Xwûda husnekî munezzeh e û nûra hebîbê xwe jê afirandiye û bi ruhê xwe jî can daye wî.

Husnek munezzeh sewwirand nûra hebîb jê afirand
'Alem di kunhê heyyirand Rûhu’l-qudus can nefxe da (9/57)

Nûrê ji nûra Ehmedî sirra sifatê Sermedî
D'ayîneya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da (9/63)

Erwahê mûqeddes şebê Qedran te dixwazin
Nûra te ye misbahê di qendîlê herem da (1/6)

Ger xeberdar î ji sirra “kuntu kenzen” guh bidêr
Da bi sed nurê beyan ket me‘na lewlakê rûh (33/3)

Nûr, çiraya wesletê ye. ‘Eşq, bi teşbîha nûr û şewqê, ‘aşiq jî bi ya perwaneyê tê teswîrkirin. Perwane, ‘aşiqê şewqa nûrê ye, ji bo wesletê li derdora wê dizivire û di dawiyê de xwe tavêje nav wî agirî, dişewite. Ev rewş, di tesewwûfê de, di rêya seyrûsulûkê de mertebeya “fenafillah”ê ye. ‘Aşiqê nûra Xwûda jî wek perwaneyê

dixwaze bigihije mehbûba xwe û nefsa emmareyê ku li ber heqîqetê perde ye, ji holê radike, digihije fenayê.

Gelo dîsa bibînim ez çiraya wesletê hil bit
Bisojim şubhet perwanê li ber wê nûr û şewqê da (5/11)

Şemala ji 'eynê nûr e şewq ku lê sitar tê
Perwane bêdestûr e li çerxê semadar tê
Heyran sirra Xefûr e lew canfiday yar tê (132/14)

Rû, temsîliyeta wehdetê dike. Tecelliya nûra wehdetê herî spehî û berfirehî di rûyê însanan de û ji însanan jî di rûyê mehbûban de xwe nîşan dide. Cazîbe û tesîra nêrîn û spehîtiya rûyê mehbûban ji ber nûra munezzeh e ku di rûyê mehbûban de tecellî bûye. ‘Aşiq, tecelliya husna ezeliyê di ku derê de bibîne berê xwe didetê. Husna munezzeh di rûyan de çawa tecellî bûye, ev beytên jêr beyan dikin.

Dil dixwûnit ji zilf û xalan dêm û balayên ji nûr
Her bi qanûn mujdeya xeybê ji nayê rast û çep (17/9)

Cebhet û dêm neqqişand misk û zebad lê reşand
Nûr ji zulmetê reşand taze kişande xet bi xet (60/3)

Durdaneyên xawermîsal ayîneyên tê da şemal
Nûrek munezzeh ew cemal mey kir di nêva şuşe da (9/77)

Ji mabeyna du ebrûyan peyapey berqê lami‘ tên
Bi ‘eynê ger bibînî safi nûrek sirf e ew mabeyn (85/2)

Du talançî di meşhûr tê ji me'den 'eynê kafûr tê
Di têkil zulmet û nûr î me kufrê dî di îmanê (111/14)

Nûr, ronahiyeke me’newî ye, dilê ‘aşiqî fireh dike. “Pur nûrbûna cihanê û pur nûrbûna şem’a ‘aşiqî û nûra badeya rengîn” di wateyên mecazî de hatine bikaranîn. Nûr, caran di wateya ronahiya maddî de jî hatiye bikaranîn. Ronahiya maddî, ‘alem ronî kiriye û bi vî awayî zulmet belav bûye.

Dil er ji te mesrûr bitin min ji Melê mesrûr bitin
Dê ket cehan pur nûr bitin lê daîma rencûr e dil (74/11)

Hetta bi nûra badeyê rengîn nekî siccadeyê
Dûr î ji wê şehzadeyê durdaneya gerden ji 'ac (31/6)

Yek 'eql û rûhê e'zem e misbah û nûra 'alem e
Hewwa û neqşê Adem e bêmudde bêmadde da (9/83)

'Eqreb û qewsûqezeh vê ra muqabil Muşterî

Roz û şêv nûr û şefeq tîrêj û berq û sipîde ye (93/14)

Nûr, ji ber tecellaya Xwûda ya li Çiyayê Tûrê, bûye mijar. Xwûda, nûra xwe li wê derê nîşanî Mûsa Pêxember daye û çiya zîr û zeber bûye. Bi peyva “nûr û Tûr”ê, wek telmihî, vê meseleyê di beytan de cih girtiye. Nûr, agirê dilê ‘aşiqî ye, çawa li Tûrê tecellî bûye, ew der şewitandiye, dilê ‘aşiqî jî ji ber agirê evînê her daîm dişewite. “Nûr”, di van beytên jêr de, tecelliya sifetên Xwûda ya ku di Wadiya Eymenê de, li Çiyayê Tûrê tecellî bûye sembolîze dike. Şa’ir, dilê xwe ji ber tecelliya ‘eşqê, bi çiyayê Tûrê re muqayese dike.

Dan dil ji ber husna bi nûr berqa tecellaya sudûr
Lew sohtim wek kohê Tûr hubb û evîna enwerê (113/15)

Tûr im bi dil û peyr Mûsa yim ez
Ateşperesê nûrê tecella yim ez (49/1)

Lami'a wê husn û nûrê ger çi tê dil şubhê Tûrê
Batin e nayê zuhûrê lê hicab û perde ye (97/16)

Ku dûr im ez ji wê hûrê tenê carek li ser şûrê
Ji Wadê Eymena Tûrê tecella kir di nêv nûrê (124/4)

Nûr, ronahiya çavên yarê ye. ‘Aşiq, bi çavên yarê temaşeyî ‘alemê dike. Ew bi wan çavan ‘aşiqî mest dike, xwînê dirêje. Tu kesî ji wan çavan selametî nedîtiye.

Bi du çeşman di mest û xwûnrêz
Nûra du çavan kê dî selamet (25/4)

Nûrê çeşmê me ku ‘alem me bi çeşmên te didîn
Li cemalê xwe te wek dîdeyê bê nûri kirin (78/4)

În melek ya şahidê qudsî est ya mahê felek
Hûrî ya Rûh’ul Qudus ya nûrê çeşmê masti în (83/2)

Lami’, tîrêj û pertew e. Lami’ jî weke “nûr”ê, bi gelemperî di wateya xwe ya mecazî de hatiye bikaranîn. Ji bo ku tecellîbûna nûra ezelî, bi dîtbarî baş bête fehmkirin, peyva lami’ê hatiye bikaranîn. Lami’ hem ji bo tecellîbûna nûra munezzeh hem jî ji bo şewq û ronahiya roj û stêran hatiye bikaranîn.

Bi narê firqetê sohtim ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nohtim ji berqa lami‘a tê da (5/1)

Îro mecal wê hat û wext dîsan cuwanbû min dirext
Ew lami‘a dayî ji text ma kane berqen xulleba (7/9)

Ku nûrê ‘işqê lami‘ dit li Tûrê qelbê lami‘ det
Di seyra berzexi’l-esma’ nihayat û bidayat (23/4)

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû di istiwayê lami'a 'işqê hebû (104/2)

### 1.2.2.4. Wehdet

Wehdet, mefhûmek e ku yekîtiya Xwûda beyan dike[345] û di tesewwifê de wek “Wehdetê Wucûd/Yekîtiya Heyînê” cih girtiye. Ev peyv derbarê yekîtiya Xwûda de hatiye bikaranîn. Muhyîddînê ‘Erebî gotiye, heyîn/wucûd, yek e û ew jî heyîna Heqq e. Wucûd, wucûda Heqq e.[346]

Wehdeniyeta Xwûda ew qas bi berfirehî her tişt dorpêç kiriye, weke firehî û kurahiya behrê (qulzemê wehdetê), wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. Sirr û hikmetên wehdeniyeta (yekîtî) Xwûda, ji ezelê heta ebedê her tişt dorpêç kiriye û ew bi zatê xwe ve ferdek bi tenê ye, ji xeyrî wî tu îlah nînin. Wuslatxwestina ‘aşiqî, îspata yekîtiya Xwûda ye. Ji ber yekîtiya heyînê (wehdetu’l-Wucûd), ruh hemû jî dixwazin bi ‘esliyeta xwe re dîsa bibin yek. Lewra ruhê însên, tecelliya Xwûda ye û ji yekîtiya wî afiriye.

Ki men der qilzemî wehdet seraser xurfe-î ‘işqim
Kuca danendî halê ma sebikbaranê sahil ha (6/5)

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed
Wahidek ferd e bi zatê xwe û nînin çu ‘eded (38/1)

Qestê wehdet dikirit rûh bi rûh
We ne ‘aşiq ji wîsalê çi xered (57/7)

Di ‘alemê de, her tişt bi Xwûda heyî dibe, lewra Xwûda heyîyekî mutleq e. ‘Eqlê însên naqis e û têra têgihiştina her tiştî nake. ‘Eqlê însên yê mucerred, bi serê xwe nikare hikmetên felek û stêran têbigihije. Eger bi qudret û hikmeta Rebbê ‘alemê neyê muşahedekirin û di dilê ‘aşiq û ‘arifî de tecellî peyda nebin, bi nûra ‘ilmê wehdetê li wan aşîkar nebe, ew dê derbarê van ‘ilman de her daîm di şekk û şuhbhê de bimînin. Wehdetê mutleq (yekîtiya giştî), nûrek e û wê nûrê weke cilayekê daye qelbê însên û qirêjî û wesweseyên şeytanî paqij kirine. Di qelbê ehlê dilan de, bêhejmar weswese peyda dibin. Di derbarê van zanînan de, ehlê tesewwifê di şubheyan de mane. Wehdetê

[345] Abdullah Eren, *Şeyhülislam Yahya Divanı’nın Tahlili,* Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Erzurum 2004, r. 39-40.
[346] Ekrem Demirli, “*Vahdet-i Vücud*”, DİA, c. 42, İstanbul 2012, r. 431-435.

mutleq, di tesewwifê de mertebeyek e. Pîrên dilpeyrew (ehlê dilan, tesewwifnas), eger wê mertebeyê derbas bibin, digehijin fenafillahê û di zatê Xwûda de tune dibin. Lêbelê, di rêya seyrûsulûkê de gelek sûfî û ‘arif, di şubheyê de dimînin, yanî hinek di wê baweriyê de ne ku gehiştine wê mertebeyê, lê negehiştine. Bi vî awayî ev mesele li bal wan wek şekk û şubhê dimîne.

Remza di necm û hey'etê 'eqlê mucerred naretê
Bênûrê 'ilmê wehdetê ew ma di şekk û şubhe da (9/131)

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zori di vê mes’elê ehlê dilan şubhe ma (8/12)

#### 1.2.2.5. Wîlayet

Wîlayet, di tesewwifê de meqamek e. Ev meqam ji çend pêleyan pêk tê. Pêleya herî bilind pêleya “qutub”ê ye. Îmam ‘Elî, bi goreyî baweriya Şî’ayê îmamê yekem e û di vî meqamî de “şahê wilayetê” ye.[347] Welî jî, weke murşîdan rê nîşanî derwîş û sofiyan (salikê talibê îrşadê) dike, heta ‘arif (sûfî, derwêş) ji destê meyfiroşî (welî, murşîd) meyê nenoşe (‘eşqa îlahî û me’lûmatên heqîqetê), nagehije fenafillahê û meqama wîlayetê bi dest naxe. ‘Arif, bi dilsoziya nezera şahê wîlayetê, dikare hingî deryayekê, ‘ilmê heqîqetê bi dest bixe, herwekî îmam ‘Elî jî, şahê wilayetê ye û ‘ilmê xwe ji perwerdehiya Pêxember û ji nezera wî girtiye. Pêxemberê me gotiye; “Ez şehrê ‘ilmê me û ‘Elî jî deriyê wê ye.[348]

Te xered vêkketina yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê bi Bexdadi çi ket (22/9)

‘Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet (24/4)

Nezera 'eynê 'înayet bi me da şahê wîlayet
Ji 'înayet nezerê ‘eyn tejî 'ilmê hubab e (94/20)

#### 1.2.2.6. Kesret

Kesret, pirî û zahfî ye. Di tesewwifê de ziddê wehdetê ye. Di felsefeya wehdetê wucûdê de, heyîna hemû mexlûqatan, di heyîna Xwûda de tê dîtin. Kesret, hebûna heyînan wek heyînên mustaqîl qebûl dike.[349]

---

347 İskender Pala, “Velayet”, Ansiklopedik Divan Şiir Sözlüğü, Kapı Yayınları, İstanbul 2005, r. 473
348 Rûdanî, b.n.b., c. 5, r. 120.
349 Pala, “Kesret”, b.n.b., r. 267.

Kesret, di dîwanê de ji bo beyankirina wehdetê bûye mijar. Piraniya hejmara navan, zahfiya xwedî navan nîşan nade. Ew navên ku di rêzimana ‘erebî de hatî (Zeyd û ‘Emr), ji bo temsîlê û îspatkirina qaîdeyên rêzimanî ne. Herçendê nav pir bin jî navlêkir yek e. Esmau’l-Husna jî zahf in û ev nav temsiliyeta sifet û xusûsiyetên wî dikin. Lêbelê pirbûna wan navan pirbûna zatê wî nîşan nadin, lewra Xwûda yek e û wahidê mutleq e.

Ji musemma didinê kesret esma tu mebîn
Zeyd û ‘Emrên me hetta çendê du nîne yek yek (68/9)

#### 1.2.2.7. Nezer, Besaret, Hîmmet, Înayet

##### 1.2.2.7.1. Nezer

Nezer, ew e ku murşîd, bi şeklekî me’newî li murîdê xwe dinêre. Bi wê nêrînê, feyz û bereket dibare û întîqalî murîdî dibe.[350]

Nezer; wek îlham, tecellî û ‘înayeta Xwûda, bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, ji tecelliya Xwûda, şu’leyeke muqeddes e û her wextî dixwaze Xwûda bi ‘înayeta xwe nezerê li wî bike. Xwûda, bi înayet û nezera xwe ya saf, di şi’rê de meharetek daye şa’irî û şi’ra wî weke qedehên ava heyatê herikbar e. Dilê şa’irî, neynika hikmetên îlahî ye, li ser lewha dilî, herfên nûranî hatine neqişkirin ku ev kar ji qudreta însaê dûr e, yanî bi destê qudreta mezin hatine çêkirin.

Cana ji cemalê te muqeddes qebes im ez
Ger hur û perizade nezerkî te bes im ez (48/1)

Ji ‘înayet nezera xas e ku her misre‘ û beytek
Qedehên abê heyatê ne di şi‘ra me lebaleb (14/9)

Di vê ayîneyê zanî ku hikmet tête te'lîme
Ku herf in taze nûranî di lewhê sîne teqwîme
Ji bala Tûrê însan î nezer da sa'idê sîme (131/25)

Nezera yarê, ji bo ‘aşiqî gelekî giring e. Hemû mucadeleyên ‘aşiqî, ew in ku yar nezerê li wî bike. ‘Aşiq, nezerekê yarê, bi tu tiştî re venaguhere û ji lutf û nezera mehbûbê, şefqetê temennî dike. Caran nezera yarê, bextê ‘aşiqî venake. Yar, ji xemze û qewsên xwe, berq, birûsk û tîran direşîne cegera ‘aşiqî ya sohtî. Ev jî ji bo ‘aşiqî lutfek e. Ji bo nezerekê, ‘aşiq, ji hemû cefa û mihnetên yarê razî ye.

[350] Ethem Cebecioğlu, “*Nazar”, Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Otto Yayınları, Ankara 2020, r. 360.

Nezerek wê beşerê lebşekerê hûrîsiriştê
Nadirim ez bi mey û Kewser û hûrên di bihiştê (122/2)
Qederek şefqe ji lutfa te temenna dikirîn
Da me mehrûmi nedêrî tu ji lutf û nezerê (126/10)

Di miqdarek nezer min kir ji tali' me nedî carek
Li min dilber xûya bit her nebû carek di salê da (5/20)

Ma li min ke nezerek lutf û ji dil xemze nîyan
Bireşîne cegerê rîşi ji qewsên xwe biweş (54/2)

Te bivê berq û birûskê bireşînî tu nezer da
Te divê roj xuya bit ji şibakê tu xuya be (94/25)

Nezera murşîdî, ji 'înayeta Xwûda ye. Ew kesê bibe hemrahê erbabê dil û ehlê sefayê, dê dilê xwe ji nîfaqê paqij bike. Ew nezera ku ji dilekî saf derkeve, meseleyên gîrîft û muşewweş hel dike û şûpheyan ji ser wan radike, lewra dil, Ke'beya Mewla û Çiyayê Tûrê ye ku tecellî lê çêbûye. Di dilî de, bi sedan co û cûbar dertên (hest û zanistên cûda yên ji zanîna heqîqetê) û bi sedan gulşen û gulzar çêdibin. Dilê 'aşiqî, gulşeneke xweyî raz e; çawa di dilê perwane û bulbulê de şu'leya 'eşqê hildibe, bi nezereke safî lê bête mêzekirin, dê bête xwûyakirin ku agirê evînê di dilê 'aşiqî de jî weke nûrekê ye. Şa'ir, di rêya şahê wîlayetê de ye û bi 'înayeta Xwûda û bi nezera şahê wîlayetê, behra dilê wî, tejî 'ilm û 'irfan bûye.

Dil bişo wer ji vê nîfaqê ku bidit sîne beraqê
Bi sefa hemrehê erbabê dil û ehlê sefa be (94/19)

Dewrê zulfa te muselsel bi nezer hel nabit
Nezerê saf dinê ser diderit nuqteyê şek (68/5)

Dil Ke'beya Mewla ye lê narê Kelîm îsaye lê
Bangê "enellah" daye lê hem Ke'be û hem Tûr e dil (74/7)

Sed co û sed cobar e tê sed gulşen û gulzar e tê
Çendan ji 'işqê nar e tê safî nezer dî nûr e dil (74/8)

Perwane û bulbul bi dilîn şu'leyê 'işqê
Lê ger tu nezer dey bi xwe ew gulşenê raz in (84/4)

#### 1.2.2.7.2. Besaret

Besaret, vekirîbûna çe'van û nêrîna bi dîqqat e û besîret jî feraset û ew quwweta qudsî ye ku însan, heqîqeta eşyayê bi qelbê xwe dizane û hîs dike. Ew kesên ku di dîtina çe'van de, bi qusûr in, Xwûda besîret daye wan. Şa'ir jî şukurdar e ku Xûda,

besaret (hişyariya dilî ) kiriye nesîbê wî. Ew xweyî feraset e û heqîqetê bi qelbê xwe hîs dike.

Bi ebsaran nezer min çû ji çerxê qewsê ebrûyan
Şukurxwaz în ku çehvan karî ber ‘eynê besaret kir (42/4)

### 1.2.2.7.3. Hîmmet

Hîmmet; ew hêza îradeya xurt û bilind e ku di weliyên Xwûda de heye. Welî, an jî ehlê ‘îrfanê, ji bo kamilbûna xwe an jî yekî din, bi hemû hêza rûhanî ya qelbê xwe ve, berê xwe dide Rebbê xwe. Bi goreyî Hakîm et-Tîrmîzî, hîmmet; îrade û niyet e. Bi goreyî Ebû Bekîr eş-Şîblî, hîmmet; cureyeke îradeyê ya bi hêz e. Di tesewwûfê de hîmmet, bi gelemperî, teweccûh û teserrûfa welî û di karên awarte de hêza serkeftinê ye. Ebdulkerîm el-Cîlî gotiye; di vê dunyayê de tişta herî qiymetdar, hîmmet e. Însan ancax bi wê dikare bigihije Xwûda. Hîmmet, mî’raca murîdan e û ew buraq e ku ‘arifan dibe li bal Heq.[351]

Hîmmet, di dîwanê de, ji bo serkeftin û kamilbûna memdûhî bûye mijar. Ehlê seyr û sulûkê û memdûh, xweyî hîmmeteke bilind in. Ew ji hespê xwe yê hîmmetê peya bûne, yanî dest ji hîmmetê berdane, lewra bûne sergeşte û nizanin ka dê heta kengî meş’aleya çerxê di destê xwe de bigerînin. Eger salik, dest ji hîmmetê berde, gelek derî li ser têne girtin. Ew kesê xweyî hîmmet be, berê xwe bidete kîjan kenarê jî, hîmmet li pêşiya wî ye û zuhre û keywan (zuhal) jê re dibin xizmetkar. Çi kesê ku bi ‘ezm û hîmmetê berê xwe bidete Xwûda, dê alaya fethê û serkeftina ezelî, li bal wî bête bilindkirin.

Van rehrewên himmetbilend berdane meydanê semend
Sergeşte yîn hetta bi çend ev rekbê meş‘eldarê çerx (35/17)

Her kinarê pê ve wergêrî 'inanê himmetê
Zuhre bî peykê te û Keywan rikêbdarê te bî (116/2)

Her kenarê pê ve wergîrî 'înayetî himmetê
Rayeta fetha bi nesra lem yezel menşuri bî (117/7)

### 1.2.2.7.4. Înayet

Înayet; alîkarî, lutf û muhafezekirin e. Di çavkaniyên îslamî de bi îzafeya Xwûda wek “înayetullah”ê tê bikaranîn û bi vê peyvê, “alîkariya Xwûda, lutfa wî û

---

[351] Mehmet Demirci, “*Himmet”, DİA,* İstanbul 1998, c. 18, r. 56-57.

muhafezekirina wî” tê qestkirin. Xwûda li ser ‘alemê muessîr e. Di fî’îliyatê de alîkariya ‘evdên xwe dike û wan digehijine serfiraziyê. Di hişmendiya sûfiyan de înayet, lutf û rehmeta Xwûda ye ku dide ‘alemê û ‘evdên xwe.[352]

Xwûda, bê navbeynkar, înayeta ‘evdên xwe dike. Ev înayet, weke meharetekê an jî weke xusûsiyeteke baş, tê fehmkirin. Eger destgirî û înayeta Xwûdayê ezelî nebe, tu kes nagehije (ava heyatê) mirazên xwe û ebediyetê. Ew zerreya înayetê ya ewwil ku Xwûda daye ‘aşiqî, di deftera hîdayetê de, xemr û cam e (evîna îlahî ye). Di vê dunyayê de, du tiştên giring, bi înayeta Xwûda bûne nesîbê şa’irî. Yek ‘eşq e û yek jî şa’irtî ye. Beyt û misrayên şi’ra Mela, ji înayeta xas ya Xwûda ye; lewra ev şi’r, weke qedehên ava heyatê şîfadar û watedar in. Li bal Mela, ehemmiyeta dunyayê û meqamên wê tune, mîrîtî û padîşahî li nik wî weke mûyekî ne. Ew, ‘alemê hemî, bi zerreyeke înayeta Xwûda nade. Ew kesê bi înayetxwestina Xwûda berê xwe bidete Xwûda, dê alaya fethê û serkeftina ezelî, li bal wî bête bilindkirin û dê nûra çadira înayeta Xwûda, weke seywaneyekê, dê wî muhafeze bike.

Destigîrê te nebit Xizrê ‘înayet bi qedem
Nagihê abê heyatê bi du ‘eskerê Ilyas (51/7)

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e ji deftera hîdayet (24/1)

Ji ‘înayet nezera xas e ku her misre‘ û beytek
Qedehên abê heyatê ne di şi‘ra me lebaleb (14/9)

Mîrî û padişahî mûyek li nik Melayî
Nadem bi mulkê ‘alem yek zerreyek ‘inayet (24/11)

Her kenarê pê ve wergîrî 'înayetî himmetê
Rayeta fetha bi nesra lem yezel menşuri bî (117/7)

Xeymeta nûra 'inayet zillê memdûdê te bit
Sûreya Ummilkîtab madarê hedret sûri bî (117/8)

Xwûda, înayeta ‘evdên xwe yên salih kiriye. Şahê wîlayetê û Xizir ji wan kesan in. Şahê wîlayetê, bi nezera înayetê, behra dilê ‘aşiqî bi ‘ilm û ‘îrfanê tejî kiriye. Xizir, bi wê înayetê ‘aşiqan dibe çeşmeya dilî.

Seherê Xizrê ‘înayet ku birîn çeşmeyê dil
Bi cehanê me nezer da ku cehan ‘eynê serab (13/9)

352 Kasım Turhan, “*Înayet”, DİA,* İstanbul 2000, c. 22, r. 265-466.

Nezera 'eynê 'înayet bi me da şahê wîlayet
Ji 'înayet nezerê ‘eyn tejî 'ilmê hubab e (94/20)

### 1.2.2.8. Feyz

Feyz, ji Xwûda, zuhûrbûn û tecellîbûna hemû zanist û heyînan e. Muhyîddînê ‘Erebî gotiye; Xwûda her daîm, lutfan dike û dibexşîne. Her cure başîtî û nî’met, ji bereketa wî coş û xurûş dibe û diherike tê. Ji vê coşbûn û herikînê re “feyîz û feyezan” tê gotin.[353]

Feyz, di dîwanê de derbarê zuhûr û tecellîbûnê de hatiye bikaranîn. Dema behra wucûdê coş bûye û behra cemalî daye rexê, feyza nûra berzexê, yanî nûrek ji zatê mutleq tenezzul bûye; hemû sifetên Xwûda diyar bûne û bi feyza ismê nûr, eşya, di neynika ‘ilmê de hatine xwûyakirin. Eşya bi feyza her ismekî xwûya dibin û têne sûretê û bi pertew û nûrê jî me’neya wan li wan tê dayîn. Paşê, Xwûda, qelem û ‘eqil afirandine. Bi feyza Heqq, qelemê dest bi nivîsînê kiriye. Ew hurûfên di ‘alema suflî de hatî nivîsîn, tecelliyên ‘alema ‘alî ne. Xwûda, di navbera tiştan de rabite û mîzan çêkiriye û nav daye eşyayan û bi vî awayî feyza Heqq, tecellî bûye. Xwûda her daîm di karekî û di afirandinekê de ye. Piştî her tecelliyê, feyz û alîkariya wî li ser ‘alemê dibare.

Behra wucûdê coşi hat nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te'eyyun her sifat eşya zuhûr 'ilmiyye da (9/46)

Serçeşmeya wê dozexê behra cemalê da rexê
Feyzek ji nûra berzexê dagirt û geh geh fûre da (9/71)

Eşya di 'ilmê bûn zuhûr isman ji feyza ismê nûr
Teqwîmi bestin bêqusûr hukmê sifatê seb'e da (9/47)

Ew bû qelem ew bû 'eqil lew pê hedîsê da neqil
Deryayê 'ilmî kir şuxul tefsîlê 'ilmê cumle da (9/64)

Ew bû di cumle rabite mîzan û ism û basite
Feyza Heq ew bû wasite çeşmê wucûdê surme da (9/65)

Feyz, derbarê ‘ilmê felsefeyê de jî hatiye ‘emilandin. Di nav awaza çeng û defê de feyza ‘ilmê felsefeyê heye. Heqîqeta eşyayê, bi felsefeyê nayête zanîn, sirr û nepeniyên heqîqetê, ancax ew bi ‘eşqê (fincan bi can cur’e dan) tê têgihiştin. Dema saqî, meya gulgûn û saf (‘eşqa îlahî), pêşkêşî şa’irî kiriye, yanî bi dilê xwe feyza îlahî

[353] Selçuk Eraydın, “*Feyîz”, DİA*, İstanbul 1995, c. 12, r. 513-514.

vexwariye, di qelbê wî de şuphe nemane û zanistên rasteqîn tê de tejî bûne. Mulhîmê Xeybê (Xwûdayê ku xeybê bi îlhamê dixe qelbê salikî), hukmê xwe îcra dike, bi wasitaya Ruhulqudûsî, feyz û alîkariya xwe li ser ‘alemê dibarîne. Bi wê têjîbûnê, ‘ilmê şa’irî weke Nîl, Dicle û Feratê feyz daye.

Feyza 'ulûmê felsefe hatî di nêv çeng û def e
Min dî di camê da xef e fincan bi can min cur'e da (9/133)

Dêmê ji rengkafûr bikî feyzê li dil da fûr bikî
Pes 'alemê meqhûr bikî weqtê sehergeh ba detê (125/12)

Saqî ku da min ew sulaf feyza meya gulgûn û saf
Zail kirin şubhe'w xîlaf 'ilmek ji bejnê ruq'e da (9/138)

Mulhimê xeybê weh îmla digirit
Meded û feyz ji Rûhilqudus în (80/19)

Feyza me şubhê Nîl e em Dicle û Ferat în
Ger şeyx wird dame vêraye min keşakeş (53/13)

Spehîtiyên rûyê yarê, weke zêrê cilagirtina qelbî, ‘ilmê hikmetê, tesîra roja muhebbetê, şerbeta cam, tas û kaseya ava heyatê, kaseya ferfûrî, feyz û bereketa xwe ji tecelliya nav û sifetên Xwûda hilgirtine.

Qelbê me şibê zêrî ji feyza te cela girt
Ma rûsiyeh û sifirsifet rengê seda girt (20/1)

Feyza ‘ulûmê hikmet cama sedef ku gêra
Me j’destê muxbeçeyan dît bi Mishef û bi ayat (24/3)

Di behsê le‘lî her xamî ji narit teb‘ê elmasî
Welê te’sîrê feyzê mihr û tedbîrê heraret kir (42/9)

Şerbeta wê cam û tasê yar ku bînit ji in'ikasê
Bêt ji me jî feyzek ji kasê abê heywan ew bi xwe ye (97/47)

#### 1.2.2.9. Zuhd

Zuhd, ew e ku ‘evd, ji xeyrî Heq, her tiştî terk bike. Zuhd, li hember dunyayê helwesteke neyînî îfade dike. Giringînedayîna malê dunyayê, meqam, mewkî, şan, şohretê; bi hindikahiyê re îktîfakirin, bi zehfayî ‘îbadetkirin, ji bo axiretê kirina xêran,

hinek ji nîşaneyên zuhdê ne. Sûfiyan, zuhd bi şeklê "terkî dunya, terkî 'uqba, terkî hestî û terkî terkê" xulase kirine.[354]

Zuhd, bi niyeteke xalisane, xusûsiyeteke baş e. Şa'ir, di heyatê de, bi jiyaneke zuhdiyane dijî. Wî, jiyana xwe, çil salan, bi zuhdê derbas kiriye. Yara wî ya dilhişk û xeddar, bi awirekî, jiyana wî ya zuhdiyane ser û bino kir.

Turkê xwûnrêzî xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çil sal e li min zêr û zeber kir ji esas (51/9)

Zuhd, di edebiyata klasîk de bi wateya xwe ya neyînî ve li pêş e. Zahid, gelemperî di nav riyayê (durûtî) de ye; bi dilekî saf û bi niyeteke xalisane ta'et û 'îbadetê nake. Di zuhdê de pêwîst e durûtî/munafiqî tunebe, her tiştê ehlê xerabatê, lazim e ji bo Xwûda be. Usûl û qaîdeyên xerabatê jî hene, kesê serê xwe danite li ser vê rêyê, lazim e bi gotinên pîrê muxanî hereket bike. Kesê xirqeyê zuhdê wergire, an jî bigehije xerebata muxanê, pêwîst e xirqeyê zuhdê bi meya safî re veguherîne û li ser wî ferz e ku bi meya pîrê muxanî ('eşqa îlahî) xwe bişo û paqij bike.

Xirqeyê zuhd reng reng min b'meyê muxane şuşt
Şuşt û şuwek û meykede ewwel karê ferz e ferz (56/3)

Gunah û zuhd û ta'at hilnagirit xerabat
Kesê bi vî derê ret divê biket ri'ayet (24/5)

Bi meyê safî bideyn xirqeyê zuhd
Bi xerabatê muxan er biresîn (80/13)

#### 1.2.2.10. Sulûk (Seyr û Sulûk) û Se'y û Cehd

##### 1.2.2.10.1. Sulûk

Sulûk, an jî seyr û sulûk, ew rêwîtiya me'newî ye ku talib/salik, di bin çavdêriya murşîdekî de dike. Ev têgeh, di tesewwûfê de, di wateyên helwestên ku însên digihijîne Xwûda, 'emel, 'îbadet, fi'l û hereketê de hatiye bikaranîn. Di sedsala diwanzdehem de, piştî ku terîqet derketine meydanê, di wateya "di rêya têgehiştina Xwûda de, ji bo pratîzekirina adab û erkanên tesewwûfî" hatiye bikaranîn.[355] Salik, bi seyr û sulûkê, bi hal û hereketên xwe, ber bi mertebeya nêzikahiya Rebbî ve bilind dibe.[356]

---

[354] Semih Ceyhan, "*Zühd", DİA,* İstanbul 2013, c. 44, r. 530-533.
[355] Uludağ, "Sülûk", b.n.b, c. 38, r. 127-128.
[356] Kâşânî, "es-Sülûk", b.n.b., r. 304.

Rêya seyr û sulûkê, rêya muhebbetê ye. Ev rê, bêmuhebbet nabe. Ew kesê bê’işq û bêhubb, bibe talibê vê rêyê, ew nagehije armanca xwe. ‘Aşiq, di rêya seyr û sulûkê de, mehbûba xwe tefekkur dike û ji bo daxwazên wî bêne cih, rica û lavahiyan dike. Talîb, di seyr û sulûkê de bi gelek çîle, cewr û cefayan re rû bi rû dimîne. Lêbelê ev çîle derbazdar in. Piştî van gengeşiyan, xelat û rojên xweş hene.

Cezbe û seyra sulûkê bê mehebbet nabitin
Cehdeya bê'işq û hubb çendî ku kir bê feyde bû (104/8)

Axa qedema muhterema sîmiberî me
Wek saye peyapey li rêya neyşekerî me
Her keftime rê reh ji girê rehguzerî me
Daîm di sulûka xwe ricûkarê ewî me (130/9)

Bi zehrê xwe’y şerîf xwendim ku xizmetkarê dêrînî
Te pur cewr û cefa dîne di sulûk û se‘y û cehdê da (5/32)

**1.2.2.10.2. Se’y û Cehd**

Se’y, xebat û lêgerîn e û cehd jî têkoşîn e.[357] Se’y û cehd, di wateyên xebatên seyr û sulûkê de hatine bikaranîn. Hingî salik di rêya sulûkê de bixebite û têkoşînê bike, mertebeya wî bilind dibe û libasên pir bixemil (xelatkirina bi hesenatan) jê re têne dayîn. Salik, pêwîst e, berê xwe bide meyxaneya ‘eşqê. Eger bi rehberiya murşîdekî ve xwe bi ‘eşqê ve girênede, an jî dest ji se’y û cehdê berde, wê demê hemû xebatên wî berhewa diçin. Lazim e ‘aşiq canfeda bi, daîm bi se’y û cehdê ve emrên yarê bînite cih û ji wê xafil nebe.

Mefhûm ku bû me'lûm di dil zîwer bidî tê sed 'emil
Bînit libasek purxemil hindî ku se'y û cehde da (9/39)

Se’y û cehdê em bikin meyxaneyê
Ew ku naçit se’y û cehda ber ‘ebes (26/5)

Dest nehêlîn em ji se‘y û cehdeyê
Cehde û se‘ya me narit ser ‘ebes (26/6)

Da canfida şuphet me bit canê ‘ezîz neqdane bit
Daîm bi se'y û cehde bit teb'ê ku yar lê ew we bit (125/9)

[357] Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., r. 458.

### 1.2.2.11. Xelwet

Xelwe (xelwet), tenêtî ye û di cihekî de bi tenê mayîn û ‘uzlet e.[358] Mutesewwûf, ji bo ku xwe ji gunehan biparêze û çêtir xwe bidete ‘îbadetan, cih û warên tenha tercîh dikin. Di serî de, zahîd û sûfi di kuncekî malê de diketine înzîvayê. Piştî sedsala dehem, bi rehberî û çavdêriya şêxekî, di çîlexane û xelwetxaneyê de çîlekêşan jî weke xelwetê hatiye qebûlkirin.[359]

Xelwe, di dîwanê de, tenêmayîna mehbûbê îfade dike û di navbera wî û mehbûbê de perdeya xelweyê heye. Husn, cemal û ‘eşq, li pêş perdeyê ‘aşikar bûne û hingî ev hersê xusûsiyet di mehbûbê de hebin ku ew di zatê Xwûda de ezelî û ebedî ne, mehbûb, perdeya xelweyê/tenêtiyê dide aliyekî, bi awayekî xwe nîşan dide. Ew di ‘alemeka bilind de ye, her daîm xwûya nake û car caran ji xelweyê derdikeve xwe nîşanî ‘aşiq û dildarên xwe dike. ‘Aşiq û sofiyê xelwetnişîn, di seherê de, di xilweyê de, du’a dike û diçe secdeyê. Derwêşên gerok (suyyah/seyyah) û sofî di xilweyê de nin, însan ku sultanê dunyayê ye, ji xelweyê hatiye ser text.

Bête eywanê ji xelwê hurîya qudsêsirişt
Sed hezaran horîqudsî tên lîqayê rast û çep (17/15)

Perdeya xelwê ku hilda yengiyek min dî ti mil da
Gezmeya jehrê li dil da qet nego qetl û xeta ye (96/15)

Husn û cemal û 'işqe ye aram di perdê da neye
Mehbûbi lew hetta heye nabit di perde'w xilwe da (9/35)

Însan ber e 'alem dirext sultan ji xelwet hate text
Pê zeyyinîn îqbal û bext dewlet ji bala tale da (9/135)

Pê li ser dîdeyên Melê dayîn
Xelweya sofiyan munewwer ke (98/15)

Seyyahi me dîn di xelwe iro
Ellah ku çi xelwe û çi seyyah (34/9)

### 1.2.2.12. Keramet

Keramet, ew halê awarte ye ku bi ‘evdên Xwûda yên salih, welî û xweyîteqwayan re zuhûr dibin. Weke mu’cîzeyê, afirîner û xwediyê heqîqî yê

---

[358] Yeğin ûym., “Halvet*”, b.n.b.,* r. 318.
[359] Uludağ, “Halvet”, DİA, c. 15, r. 386-387.

kerametê jî Xwûda ye. Sûfiyan, keramet, wek lutf û ikrameke Xwûda, ji ‘evdên wî yên welî re, qebûl kirine.[360]

Keramet, ji bo însanê kamil îkrama Xwûda ye. Şûştina dilî ji jeng û zerqê, weke nîşandana kerametê hatiye beyankirin. Rindê xerabatê, ‘eşqê (cama sedef) belavî murîdan dike ku ew bi wê, gemar û qirêjiyên dilên xwe bişon û xwe di rêya seyr û sulûkê de pak û paqij bikin.

Ji jeng û zerqê dil da bişoyin
Cama sedef bîn rendo keramet (25/3)

### 1.2.2.13. Seccade û Xirqe/Delq

Piştî teşekkulbûna terîqetan, zahid û sûfiyan, ji bo sembola zuhd û teqwatiyê, xirqe li xwe dikirin. Di serî de xirqe, ji kulavê dihate çêkirin û bi sadebûna xwe ve, ji riyayê dûr bû. Paşê, ew bi neqş û bi pertalên giranbiha hatiye çêkirin û bûye sembola mewkî û meqamê. Bi vî awayî, ew xirqe bûye “xirqeyê zuhdê/riyayê”.[361] Seccade, cila nimêjê ye û l ser wê nimêj tê kirin. Nimêj îbadeteke me’newî ye û seccade jî sembola nimêjkirinê ya maddî ye. Di secdeyê de teqwatî derdikeve pêş û mutesewwûf, çawa destê xwe ji malê dunyayê dişo, her wusa bi hêstirên çavên xwe jî seccadeya xwe jî paqij dike.

Dema şa’ir behsa ‘eşq û wuslatê dike, behsa seccade û xirqeyê jî tê kirin. Xirqe û seccade, bi dunyayê ve têkildar in û temsîliyeta hirsa dunyayê dikin. Ew tiştên ku di navbera ‘aşiq û me’şûqê de, ji bo wuslatê dibine bend, bi hêstirên çavan (tewbekirin û poşmanî) têne paqijkirin. Ew kesê qesda meykedeyê (dergah, ‘îbadetxane) bike, li ser wî ferz e, xwe bi meya evînê bişo (xwe ji qirêjiyên dunyayê dûr bike) û xirqeyê teqwatiyê, ancax bi meya muxaneyî a safî (bi rêberiya şêx û murşidê), tê paqijkirin. Ew kesê pîrê ‘eşqê be, giringiyê nadete meqam û malê dunyayê, lewra ji bo ‘eşqa îlahî, wan xirqeyê xwe di meyxaneyê (xaneyê xemmarî) de rehîn hiştine û ew bi vî awayî, ji bela û qirêjiyên dunyayê, ji serêşî û riyayê xilas bûne.

Dil kemerbeste di 'işqê û bi xwe zunnarperest în
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e (94/2)

Tinê ew secdeya şukrê dibet mihrabê qewseynan
Ku delq û şeml û seccade bi vê avê qesaret kir (42/8)

---

[360] Uludağ, “Keramet”, b.n.b., c. 25, r. 265-268.
[361] Uludağ, “Hırka”, b.n.b., c. 17, r. 373-374.

Xirqeyê zuhd rengzeng min b'meyê muxane şuşt
Şuşt û şuwek û meykede ewwel karê ferz e ferz (56/3)

Bi meyê safî bideyn xirqeyê zuhd
Bi xerabatê muxan er biresîn (80/13)

'Eqda ihramê di 'işqê da ku pîrê 'işqê best
Dê çi xem ger xirqe rehnê xaneyê xemmarî bit (19/7)

#### 1.2.2.14. Fena û Beqa

Fena, di tesewwûfê de merhale û mertebeyek e. Salik di tesewwûfê de, bi rehberiya murşîdekî, bi goreyî qabiliyeta xwe, bi hinek riyazet û mucahedeyan, nefsa xwe terbiye dike. Di dawiya vê terbiye û tezkiyeyê de salik digihije fena û beqayê. 'Evd, bi goreyî fi'l û hereketên xwe fanîbûna xwe dibîne, dixwaze bigehije merhaleyekê ku bibe 'evdekî heqîqî da ku beqayê bi dest bixe. Piştî ku terîqet geş bûn û pêş ve çûn, têgeha fenayê, ji xeyrî têkiliya Xwûda û însên, derbazî merhaleyeke din bûye. Bi vî awayî têgehên weke "fena fi'ş-şeyx, fena fi'l-pîr, fena fi'r-resûl, fenafîllah ê" di lîteratûra tesewwûfê de cihê xwe girtine.[362] Fena, 'alema kesretê û masîwayê sembolîze dike û beqa jî, piştî van terkan, bi wuslata dildarê re mukafatkirin e.

Di gehiştina beqayê de, rola 'eşqê heye. Eger salik, negehije meqama fenayê, ew ji 'eşqa mecazî, derbazî 'eşqa heqîqî nabe, yanî yê ji badeya 'eşqê vexwarî, digehije beqayê; yê venexwarî jî weke 'aşiqekî bêçare, di fenayê de mehw dibe. Ew kesê di 'eşqê de fena bibe, digehije dostê baqî. 'Aşiq, fanî ye, bi fanîbûna xwe re digihije wuslatê û baqî dibe.

Salik wekî hatî ji mecazê bi heqîqet
Sûret neşînasî û bi me'na te fena girt (20/3)

Ê birî 'eynê beqayê badenoşê 'işqê bû
Ê bûyî mehwê fenayê 'aşiqê bêçare bû (104/11)

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

'Aşiq, heta xwe û 'alemê fena nebîne, yanî ji kesretê derbaz nebe, nagehije wehdetê (fenafillah). Şertekî fanîbûnê jî, destşûştina ji malê dunyayê ye. Ji bo rûyê dildarê (husn û cemalê Xwûda), pêwîst e 'aşiq barê dunyayê ji ser pişta xwe bavêje. Piştî gehiştina wê mertebeyê jî 'evdîtî xilas nabe; şa'ir, li ber deriyê wê meqamê, xwe

[362] Mustafa Kara, "Fenâ", DİA, c. 12, İstanbul 1995, r. 333-335.

ji her kesî kêmtir dibîne. Di rêya seyr û sulûkê de kêşana cewr û cefayê jî heye û lazim e salik, emrên Xwûda terk neke. Kî rêya şerî'etê bigire, dê ew bigihije meqama fenayê. 'Aşiq, ji bo baqîbûnê, dil û canê xwe pêşîn dide û fanî dibe û bi vê fanîbûnê re, carek din bi beqayê zindî dibe.

Beqa nînin li bo tiştî heta kengî bikîn piştî
Di 'işqa wan perîrûyan werin dunyayê da deyn (89/4)

Ger çi ji çehvanê Ehmed di 'alem fena
Dûne fena babikum innehu 'ebdun eqel (73/10)

Ehmed mebe cewr û cefa tu terk meke emrê Îlah
Lew 'aqîbet dê bin fena bigrin terîqa şer'îyan (90/11)

Ta weqtê liqayê bi te hey bin di beqayê
Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da (1/7)

**1.2.2.15. Ezel û Ebed**

Ezel, ew zeman e ku destpêka wî nayê fehmkirin. Mutleq ezelî her Xwûda ye; ew, heyîna ewwil e û sebeba xuliqandina yekem a hemû heyînan e. Di 'eqaîda Îslamê de, ji bo Xwûda, destpêk û dawîbûn tune. Ew her hebûye û dê her hebe, lewra ew wacîbû'l-wucûd e.[363] Ebed jî, ew zemanê bêdawî ye û ji bo bêdawîbûna heyînê ku dê her hebe, tê bikaranîn. Peyvên ezel û ebedê, dema ji bo Xwûda têne bikaranîn, 'eynî wateyê îfade dikin. Ev herdu têgeh, bêdawîbûn û berdewamiyê nîşan didin.[364]

Ezeliyet, di dîwanê de, bi gelemperî wek wesfekî Xwûda hatiye bikaranîn. Peyva "ezel"ê, di nav ravekên weke "meşşateyê husna ezel, sehergaha ezel, 'işqa ezel, esrarê ezel, remza ezel, neqqaşê ezel, lami'a fetha ezel, şeraba ezelîn û xemra ezelê" de, bi têkiliya Xwûda hatiye bikaranîn. Ezeliyet, wesfê Xwûda ye, ewwelê wî (lem yezel e) tune. Ewê ezelî be, bi mutleqî, ebedî jî dibe.[365] Şa'ir, di hinek beytan de bi peyva "ezel"ê, bi îstî'areyî û bi telmîhî, îşaretî bûyerên ezelî, yê ku destpêka wan bi ezeliyeta Xwûda ve girêdayî, dike. Xwûda, di sehergeha ezelê de, şu'leya 'eşqê hilkiriye û ji husna xwe ya mutleq, însan bi xeml û neqşan afirandiye û 'eşqa ezelê bi wan şêwe daye. Xwûda, neqqaşê ezel e, bi ismê xwe yê cemal, wek mucessem, însan

---

[363] Ahmet Saim Kılavuz, "Ezel", *DİA*, c. 12, İstanbul 1995, r. 49-50.
[364] Kılavuz, "Ebed", h.b., c. 10, r. 72-73.
[365] Ehlê kelamê, bi goreyî ezelîbûnê, heyîn kirine sê beş: 1. Heyîna hem ezelî hem jî ebedî (ev herdu sifet bi tenê mexsûsî Xwûda ne). 2. Heyînên ne ezelî ne jî ebedî (kaînat). 3. Heyînên ne ezelî, lêbelê ebedî (axîret). (Kılavuz, "Ezel", b.n.b., c. 12, r. 49-50.)

di sûretekî spehî de afirandiye. Xwûda, hekîm e; di ezelê de qedehek badeya ‘eşqê daye şa’irî û ew hêj ji wê meyê dinoşe û hêj mest û xerabê wê meyê ye û heta ebedê jî dê di bin tesîra wê meya ‘eşqê de bimîne; ew meşşateyê husna ezel e, cazîbeyek di navbera ‘aşiq û me’şûqan de çêkiriye.

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Neqqaşê ezel ismê cemalê ku nivîsî
Herfên te mucessem ji surê taze reşandin (81/7)

‘Aşiq er carek ji bala lê bidit berqa mecaz
Dê li nik sahibdilan hetta ebed bit serfiraz (45/1)

Ellah ji nûra Sermedî yek qetreyek da Ehmedî
Şirînî û firrek we dî medhûşi ma hetta ebed (40/10)

Ke'beya tê bit ew meygede û dêr û kenişt
Ku nesîb dan ji ezel Heq ji me ra 'işqê newişt
Faîde nakin li me ism û ne tilism û ne niwişt (121/1)

Ji ezel Heq bi Melê daye ji 'işqê qedehek
Ta ebed mest û xerab în ji meya wê qedehê (110/15)

Meşşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da
Da 'işqê hilbit pêli pêl qelbê Melê cellabi da (2/1)

Ezel, derbarê îradeya kullî de hatiye bikaranîn. Hîdayeta însên, di destê Xwûda de ye. Xwûda, di ezelê de, yekcîhetî (baweriya tewhîdê) kiriye nesîbê Mela û wî, di ezelê de, ji bo çîrûska hîdayetê, cazîbeyek di dilê ‘aşiqî de hilkiriye. Eger di ezelê de ji bo kesekî hîdayet nehatibe nesîbkirin, ji bo islahbûn û hîdayetbûnê, îrşad bi serê xwe tenê, kêrî tiştekî nayê.

Ji ezel yek cîhetî daye Melê
Her me îxlas e ji erbabê du‘a (3/9)

Dê ji Heq cazîbeyek dil bigirit wer ne Mela
Ji ezel ger tu hîdayet nebit îrşadî çi ket (22/12)

Ezel û ebed, hevûdin tezemmûn dikin, yanî yê destpêka wî heyî, dê dawiya wî jî hebe; ewê destpêka wî tunehî pêwîst e dawiya wî jî tune be.[366] Di vê derbarê de ezel û ebed bi hev re hatine. Li bal Xwûda bi goreyî sifetên wî yên Deyyûm û Qeyyûmî,

[366] Kılavuz, “Ebed”, b.n.b., c. 10, r. 72-73.

zeman “yek an” e, yanî ezel û ebed, di qidemiyê de yek in, lewra sermediyyet dixwaze herdu yek bin. Şa’ir dibêje, hewce nîne ku hêj di serî de, serencama encamê bête zanîn, lewra sirrên ezelê, dê di ebedê/dawiyê de bêne xwûyakirin. Qedera însên jî weha ye. Xwûda qedera însên bi wî nedaye zanîn. Tiştê ku Xwûda bi însên nedaye zanîn, pêwîst e însan li pey wî nekeve û meya ‘eşqê binoşe û li ser teqdîr û muqedderatê raneweste.

Ezel ‘eynê ebed yek an e qeyyûmî û deyyûmî
Tenezzul tête tefsîlê bi anat û we ewqat (23/22)

Di qidem da ezel û ‘eynê ebed herdu yek in
Sermediyyet weh dixwazit ne ezel bit ne ebed (38/2)

Esrarê ezel dê di ebed bête zuhûrê
Encamê serencamê ji axazî çi hacet (21/11)

Ji ezel ‘aqîbetê karê ku me‘lûm nebit
Camê mey noş û ji teqdîrê muqedder meke behs (27/10)

Ezel û ebed, ji bo ku zeman, di hişmendiya însên de bête tesewwûrkirin, hatiye bikaranîn. Sirrên wehdeniyeta Xwûda ji ezelê û heta ebedê, her tişt dorpêç kirine. Ji bo memdûhî daxwazîkirina serkeftinê, bi ezeliyetê, weke mubalexeyî, bi “lami’a fetha ezelê” hatiye beyankirin. Tesîra dîtina mehbûbê jî balkêş e. Ew ‘aşiqê ku carekê wê bibîne, hetta ebedê zindî dimîne. ‘Aşiq, caran bê cam û badeyê jî hetta ebedê serxweş dimîne, lewra ‘aşiq bûye hedefa remza mehbûbê. Yar dilê ‘aşiqî disoje. Eger ew wê birînê derman neke, dê heta ebedê dilgirtî bimîne, lewra ‘eşq, derdekî bêderman e. ‘Aşiq, bi şerabê (‘eşqê), ji şubheyan (serab) azad dibe; lêbelê munkîr, hetta ebedê di şepheyê de wek cîgersotî dimîne.

Sirrê wehdet ji ezel girtiye hetta bi ebed
Wahidek ferd e bi zatê xwe û nînin çu ‘eded (38/1)

Lami'a fetha ezel berqê ji ber tacê te dit
Kewkeba se'da ebed necmek ji seyyarê te bî (116/6)

Herkesê carek dîye ew zinde ma hetta ebed
Wê nedidî ew perî dê zindegî lê bit heram (77/4)

Hal ji wê remzê giha min mestê wê remzê me hêj
Serxweş im hetta ebed bêcam û neql û bade ye (93/16)

Her dilê sohtî bi ulfê yar ne dermanek bi zulfê
Ta ebed ew bendê qulfê 'işq derdek bêdewa ye (95/3)

Min rê ji şerabê bi serabê bir û munkir
Hetta bi ebed teşneceger ma di serabê (112/11)

### 1.2.2.16. Ewwel û Axir

Ewwel û axir, sifetên Xwûda ne. Ewwel, tê wateya ewê destpêka heyîna wî tune ye; axir jî tê wateya ewê dawiya heyîna wî tune ye. Di kelam, felsefe û lîteratûra tesewwûfê de, di cihê ewwel û axirê de, hemwateyên wan yên weke termên "qedîm-baqî, ezelî-ebedî" û te'bîrên weke "lem yezel-la yezel" jî têne bikaranîn. Ewwel û axiriya Xwûda, wî ji zemên munezzeh dike, lewra zeman, têgeh û mewhûmekî zîhnî ye.[367] Xwûda, afirînerê yekem ê her tiştî û îlletî ye, lewra ewwel e û zindebûnê dide her tiştî û her tiştî jî tune dike, lewra axir e. Ew, bi zatê xwe ve ewwel e; bi sifetên xwe ve axir e.[368]

Li bal Xwûda, zeman tune, ew tayyê zamên û tayyê mekên e, yanî ji zemên munezzeh e. Peyvên ewwel û axirê, îşaretî vê yekê dikin. 'Ilm, herf û neqşên 'alemê, her yek ji yek jêderekê derketiye û dê dîsa vegerin li ser 'esliyeta xwe. Herçendê di zêhna înasên de ewwel û axir ji hev cuda bin jî, li bal Xwûda ew yek in. Yekitiya wan bi goreyî wehdetu'l-wucûdê ye û Xwûda hem ewwel e hem jî axir e.

Nuqteyê 'ilm û sewadê herf û neqşê 'alemê
Her yek di wê yek bimînit ewwel û axir yek e (104/16)

Huwe'l-ewwel huwe'l-axir huwe'z-zahir huwe'l-batin
Huwe'l-Me'bûdu we'l-Meşhûdu fî kulli'l-huwiyyat (23/15)

Ewwel û axir, ji bo nediyariya zemên hatiye beyankirin. Bi taybetî ev herdu peyv bi wateyên xwe ve, bi ewwelî û axiriya Xwûda ve têkildar in. 'Eşq, di eweliyatê de weke nar û dûyê bûye, paşê weke nûreke nadir xwûya kiriye. Xwûda di ewweliyetê de, bi înayeta xwe, zerreyek ji cama'eşqê, kiriye qismetê 'aşiqî. "Lewhu'l-mehfûz" jî, bi nivîsîna xwe ve, bi ewweliyatê ve têkildar e. Lewha ewwelê, derbarê "Lewhu'l-mehfûz"ê de hatiye bikaranîn. Qelemê, li ser "Lewhu'l-mehfûz"ê, derbarê şa'irî de, di ewweliyatê de çi nivîsiye nayête zanîn; lêbelê di dawiyê/axirê de navê wî, bi bednamiyê derketiye. Axir, derbarê qiyametê (roja axirîn) de, hatiye bikaranîn. Lewra zemanê wî jî nediyar e.

---

[367] Bekir Topaloğlu, "Evvel", *DİA*, c. 11, İstanbul 1995, r. 545.
[368] Topaloğlu, "Ahir", b.n.b., c. 1, r. 542.

Saqî ji xemra ezelê nûra qelem jê afrand
Darêt lewha ewwelê rizq û nesîb qeddirand
Ew bû murad mes'elê neqşê mecaz sewwirand (132/9)

Me ra j'ewwel çi pir xamê kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'dî û Camî ji şuhret pê hesîn ‘amê
Bi deng û bang û awazê dibêjit nexmeya sazê
Nihan key manend an razê kez û sazendê mehfil ha (4/7)

Nûr e pur nadir wucûd e gerçi ewwel nar û dûd e
Berqê lami' ma li kû da hubbê qelban kîmya ye (95/27)

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e ji deftera hîdayet (24/1)

### 1.2.2.17. Zahir û Batin

Zahir û batin, ji Esmayê Husnayê ne. Zahir, tiştê aşîkar e û batin jî yê xefî ye. Xwûda bi nî’metên xwe ve zahir, bi rehmeta xwe ve batin e; bi birina tengasiyan li ser însên zahîr, bi înayeta xwe ve batin e; bi lutûfkirina heysiyet û şerefê ve zahir, bi nîşandana rêya rast ve batin e.[369] Xwûda, batin e, delîlên heyîna wî gelek in, lêbelê ji hîssiyatan xef in, bi çavan nayête têgihiştin, mahiyeta wî nayête zanîn, bi kemiyet û keyfiyetê nayête wesifdan, nakeve sînorên tesewwira zêhnê; ji ‘evdên xwe yên mu’min re zahir e, lêbelê ji tefekkûr û nezera munkirê re xef e.[370]

Di tesewwifê de şekil û vexwûyan giring nînin. Ya giring, batina tiştan e û ew jî bi dilê ‘aşiqî re têkildar e. Di ‘îbadetê de, sembolên zahirî ne giring in; yên giring nîşanên batinî ne. Di dîn de, ‘emel, bi goreyî niyetan in. Dema niyet saf û xalis be, şekil ne giring in. ‘Aşiqî, di batina xwe de secdegehek çêkiriye û ew jî herdu birhên yarê ne. Şa’ir, di zahiriyê de perîşan xwûya dike, lêbelê di batina xwe de, weke tuxrayê li hev hatiye û giringî û tesîrdariyê di nav xwe de dihewîne, yanî di heqîqetê de dilê ‘aşiqî tejî tecelliyat in. Di zahirîyê de ‘aşiq û me’şûq ji hev cuda bin jî, di heqîqetê de ew yek in. Însan, bi zahirî ve, bi şeklekî spehî (ehseni’t-teqwîm) hatiye xuliqandin û bi batinî ve jî tecelliya heqîqî ye.

Di batin secdegaha min ji bo wê herdu ebrû ne
Bi 'eynê taqê mihrab in di 'ilmê ehlê hal ebrû (106/11)

---

[369] Topaloğlu, “Zahir”, b.n.b., c. 44, r. 85.
[370] Topaloğlu, “Batin”, b.n.b., c. 5, r. 187.

Zahir tu perîşan î halê me bibîn
Mecmû'ê dizanim xwe û tuxra yim ez (49/5)

'Alim în em vê dizanîn rûh û cism û can în
Qet ji hev batin xuya bîn ger çi zahir ew cuda ye (95/17)

Bi husna ehseni't-teqwîm di zahir sûretê zat
Nezer dî 'elleme'l-esmau' di batin 'eynê mir'at (23/1)

Ji remza dilberê, dilê/batina 'aşiqî tejî kul û derd e. Xwûda lami'a husn û nûrê û agirê evînê, weke birûskeke batinî, di dilê 'aşiqî de hilkiriye û wê derê disoje. Ev agirê sohtger ('eşq), Xwûda di ezeliyê de kiriye nesîbê 'aşiqî û herçendê ev 'eşq di zahiriyê de weke 'ezabekî xwûya bike jî, di batina xwe de zewqekî di nav xwe de dihewîne û weke kêfekî beheştê tê hîskirin.

Ji remza dilberê dîsa li min batin vejîn derd e
Di libsê tariyê min dî xuya bû ew siyah çerde (92/1)

Lami'a wê husn û nûrê ger çi tê dil şubhê Tûrê
Batin e nayê zuhûrê lê hicab û perde ye (97/16)

Birûska batinî da dil di pêtê sîne wê wer bû
Kû dê bêtin depîta dil di nav wê nar û pêtê da (5/7)

Ku nesîb dan ji ezel Heq ji me ra 'işqê newişt
Faîde nakin li me ism û ne tilism û ne niwişt
Zahirî da me 'ezabek û ku batin ve bihişt
Sohtinê daye hinavan û ceger têk birişt (121/1)

Bi goreyî felsefeya wehdetu'l-wucûdê, zahir jî û batin jî Xwûda ye. Afirandina kesretê ji 'eşqê çêbûye û ew 'eşqa di mîr'atê de zahir dibe, 'eksa cemalekî safî ye, yanî tecelliya Xwûda ye. Xwûda, remzekî xefî, cazîbeya şehzadeyî ('eşq) avêtiye dilê 'aşiqî. Herçendê di mecazê de, sûret ji hev cuda bin jî, di heqîqetê/batinê de, sebeba heyîna mexlûqan, her Xwûda ye û tecelliya Cemalê Xwûda, di her şahidekî de şu'le dide.

Huwe'l-ewwel huwe'l-axir huwe'z-zahir huwe'l-batin
Huwe'l-Me'bûdu we'l-Meşhûdu fî kulli'l-huwiyyat (23/15)

Me'nayê 'işqê bêm çi ye lew min bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye zahir di mir'ata me da (9/10)

Remzek nihîn avête dil mihrê ji batin mêhte dil
Şehzadeyê sur rêhte dil şehkaseya ferfûr e dil (74/2)

'Aşiq ew e me'şûq ew e zahir ew e mezher ew e
Rûh her ew e gewher ew e d'her şahidek da şu'le da (9/13)

Batin qelbê însên e. Pêşrew/murşîd dixwaze wê mekanê bi 'eşqa heqîqî tejî bike. Di wê mekanê de tecelliyat peyda dibin; lewra ew mekan (dilê 'aşiqî), ji rengê neynikê, rewşen û saftir e.

Min dîn li dor bedra temam herfên di mektûb dal û lam
Wê dilberê batin revam yexma kirim sîmînberê (113/22)

Ji reng ayîneya camê te batin rewşen û saf e
Di remza kufr û Îslamê yeqîn fehmê te keşşaf e
Ji berqa nûrê îlhamê durexşan qafi ta qaf e (131/3)

### 1.2.2.18. Mey, Şerab, Bade, Xemr, Cur'e

Zimanê sembolîk, di edebiyata tesewwifê de cihekî fireh wergirtiye. Ev sembol wek têgehên tesewwifî, di nav xwe de wateyên mecazî beyan dikin. Zimanê sembolîk û mecazî bi çend sedeman çêbûye. Çawa Muhyîddînê Erebî jî gotî "lefz têra wateyê nake", lewra ew tecelliyên di dilê ehlê îrfanê de peyda dibin, hinek caran bi tu lefzê ve nikarin bête beyankirin. Ev jî bivê nevê bi sembol û mecazan tê îfadekirin. Hinek caran jî ehlê 'îrfanê naxwaze heqîqetê rasterast beyan bike û bi mecazê, heqîqetê vedişêre/dinixumîne. Şebûsterî vê heqîqetê weha beyan dike:

Erûz û qafiye me'na napîvin
Di hundir her zerfî me'na naguncin (beyt 52)

Me'anî tu caran nakevin herfan
Behra Qulzum bi cîh nabe di zerfan (beyt 53)

Ji korîtî çêbû gumana teşbîh
Ji yek çavî çêbû îdraqa tenzîh (beyt 104)[371]

Di cihgirtina sembol û zimanê mecazî de bingeha dînî jî giring e. Ev xusûsiyet bi navê tê'vîlê, di lîteratûra hedîsê de derketiye pêş. Bilxesse di tesewwif û şî'ayê de te'vîl hatiye tetbîqkirin. Di hedîsekê de ku îmamê şeşem Ce'ferê Sadiq rîwayet kiriye ku Pêxember (sxl.) weha ferman kiriye: "*Kitêba Xwûda çar tiştan di nav xwe de dihewîne: Wateya metnê (îbare), îma (îşaret), wateya nepenî ya derbarê 'alema seresehekî/ji derveyê hîssî (letaîf) û heqîqetên me'newî (heqaîq). Wateya metnî, ji bo gel e (a'wam), îşaret ji bo zumreya hawasê ye, wateyên nepenî/veşartî ji bo dostên*

371 Şêx Mehmûdê Şebûsterî, *Gulşena Raz,* (Werg. M.Muhammed Garsî Farqînî), Nûbihar Yayınları, İstanbul 2005, r. 13, 18.

*Xwûda ne (ewliya) û heqîqetên me'newî jî, ji bo pêxember û enbîyan in.*" Îbn Ebbas (ra.) derbarê hedîseke Pêxember (sxl.) de ku rojekê li Çiyayê Erefatê, di weqfeyê de, bi îma û îşareta vê ayetê (Xwûda, ew Xwûda ye ku heft asîman û ji 'erdê jî ew qas afirandine. Sûreya Telaq, 65/12 ) kiriye û weha gotiye: "Ey kurê Adem! Eger min çawa ji Pêxember bihîstibû, ev ayet wisa ji were şirove bikira, dê we ez bidama ber keviran."[372]

Mezmûnên weke "mey, ateşperest, zunnar, pîrê mûxan û hwd." ji aliyê ehlê zahîrî ve wek peyvên kufrê hatine qebûlkirin. Lêbelê edebiyat, şî'îr, fesahet, belaxet, ji bo beyankirina ehlê 'îrfanê wek amûran in. Arifan jî, ji bo ku peyamên xwe yên 'îrfanî îzah bikin ji teşbîh û mecazên edebiyatê îstîfade kirine. Têgeha "mey, şerap û yên mayî, di lîteratûra tesewwifê de temsîliyeta "eşqa îlahî û me'rîfetullahê" dikin. Ev kevneşop di nav mutesewwifên ewwilîn de dest pê kiriye û hatiye. Hafizê Şîrazî di beyteke xwe de hem wek ehlê sulûkê hem jî weke edebiyatnasekî, sembol û teşbîhên vê kevneşopê bi vî şeklî beyan kirine:

Sûfî ez pertewê mey razê nîhanî danîst
Gewherê herkes ezîn le'l tevanîdanîst

(Sûfî bi pertewa meyê raza veşartî zanî
Bi vê le'lê dikare bizanî cewhera/derûna her kesî)

Mey, peyveke farisî ye û di wateya şerabê de tê bikaranîn. Ew temsîliyeta 'eşqa hêzdar û kêfdana wê dike.[373] Mey, ew şerab e ku ji tiriyê tê çêkirin. Mey, bade, mûdam, xemr, bîntu'l-îneb, duxterê rez, cam, saxer, qedeh, peyale û hwd., wek îstîare û mecaza mursel, di cihê şerabê de tên bikaranîn. Şerab, bi reng û kêfdanê ve wek îstîare û teşbîhî hatiye bikaranîn.[374] 'Eşq û muhebbet, bi xusûsiyetên xwe ve dişibine şerabê. Mesela meqamê 'eslî yê şerabê kûp/den e û di binê denî de bêyî quwweteke xaricî dikele, coş dibe û ser de diçe. Sirra muhebbetê jî, di singê 'aşiqan de veşartî ye. Dema xelebe û îstîlaya muhebbetê zêde dibe, bêyî quwweteke xaricî derdikeve meydanê. Dîsa şeraba zahirî çawa di demar/rehên vexwêr de belavî wucûdê dibe, her wisa şeraba muhebbetê jî di hîs û quwweta xweyiyê xwe de tesîrdar dibe."[375]

---

[372] Seyyîd Hüseyîn Nasr, *İslam/İdealler ve Gerçekler*, (Wer. Ahmet Özel), İz Yayıncılık, İstanbul 1996, r. 73.
[373] Cebecioğlu, "mey", b.n.b., r. 335.
[374] Abdulbaki Turan, *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi,* Nûbihar Yayınları, İstanbul 2010, r. 698.
[375] Molla Camî, *Aşk ve Şaraba Dair/Levamî*, r. 46-47.

Mey, şerab, bade û xemr, ‘eşqa îlahî sembolîze dikin û ew bi metaforên şênber ve hatine beyankirin. Xwûda nûreke munezzeh e û ji cemalê wî, ‘eşq peyda bûye û çawa mey dikeve nava şuşeyê, wisa ketiye dilê ‘aşiqî jî, yanî Xwûda mey rêhtiye cama 'eql û ruhê ‘aşiqî. Wahid, ji bo nîşana yekîtiya xwe ‘eşq xistiye qedeha cam a cazîbedar ku ‘aşiq bi ber wehdeniyeta wî ve bên. Meya di wê camê de, bêdeng û bêsewt tê vexwarin û caran jî piştî vexwarinê hinek dengên nediyar têne qelbê wî û hîssên ‘aşiqî şulû dikin. Ev şulûbûn (alûde), ji ‘eşqa beşerî û wesweseyên şeytanî çêdibin. Şeyx û zahidan ji wê meyê vexwarine. Şeyx û zahid, rêwiyên/salikên seyr û sulûkê ne. Di vê rêyê de mey, di şehkasa cazîbedar û fincana sedef de, ji wan re hatiye dayîn. Şeraba ji wan re hatî dayîn, şerabeke saf e.

Durdaneyên xawermîsal ayîneyên tê da şemal
Nûrek munezzeh ew cemal mey kir di nêva şuşe da (9/77)

Wahid ji nûra wê durê peymaneyê cama surê
Mey xistî anî ber firê hem cam û hem peymane da (9/67)

Mey ku di camê bête noş bêdeng û sewt her tête goş
Jê tête dil herdem suroş lew ev şerab alûde da (9/79)

Wan dest û zend û sa'idan mey dane şeyx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan ew nêrqiza sîrabi da (2/6)

Mey hate fincana sedef kes dê vexut îro bi xef
Saqî bi çeng û nay û def ferfûrîya mehtabi da (2/11)

Derketina heyînê, bi tecellî û zuhûrê ye. Tecellî wek coşbûna deryayê hatiye beyankirin. Ji behra ‘edemê reşheyek (dilop) peyda bûye û ew dilopa meyê hatiye ketiye nêva tasa ‘alemê. Tecellî û zuhûr, bi mertebeyî peyda bûne. Ji şehkaseya surrê (kenza mexfî), mey hatiye fincana sedefê, yanî di dilê ‘aşiqî de şu’le daye. Xwûda, katibê xeybê ye û ji nûra xwe xetên zîba li ser rûyê yarê reşandine û neqş kirine. Piştî vê neqişandina husn û cemalê yarê, meya ‘eşqê jî di dilê ‘aşiqî yê weke yaqûtan de hatiye rêhtin.

Îro ji şehkasa surrê mey hate ficana sedef
Minnet ku iro dêmdûrrê da min meya husna xwe xef (64/1)

Ew reşhe da wê qulzumê mey hate tasa 'alemê
Cama cehanbîn da Cemê b'Eskenderî ayîne da (9/101)

Ku kêşa katibê xeybê xetê reyhan li kafûrê
Çi ayet bû ji "la reyb"ê reşandî zulmet û nûrê

Di yaqûta me dê mey bê ji destê wê sifethûrê (131/9)

Kesê vexwarina meyê bike meqsed, divê ji pîrê muxanî re xizmetê bike, yanî di bin fermandariya murşîdekî de rêwîtiyeke me’newî bike. Pîrê muxan, qedeha meyê pêşkêşî ‘aşiqî kiriye û ew jî ji wê behrê vedixwe. Di wê rêwîtiyê de pêwîst e cazîbedariyek hebe. Ev cazîbe jî bi dengê ney û sazê, bi yar û meyê çêdibe. Mehbûb, serpoş, qedeh û meya ‘aşiqî ye, her daîm cama ‘eşqa wî tejî dike. Eger mehbûb, cama ‘eşqê bêmest û bêcazîbe bigerîne, ew badeya ‘eşqê, li ‘aşiqî dibe heram. Eger hebîb, di sohbetên xwe de behsa mey û çengê neke, dê ‘aşiq feryad û fixan bike. Di rêya muhebbetê de cewr û cefa; dax û key heye. Di vê hengamê de evîn weke bêmehel tê dîtin. Lewra mekanê (mehel) ‘eşqê dil e û ew jî ji ber evînê şewitiye; ji ber vê yekê te’mê nade ‘aşiqî.

Xidmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd mey
Şîşe û cama zucacê ê divêt dê ret Heleb (14/11)

Pîrê muxan ji şîşeyê da me sebûk li meyê
Şukur Xudê ku qulzumek min ji xwe ra qebale kir (41/6)

Mûxnî û sazende yîn lê bi mecala mey în
Xef ji sura perde yîn bêje me tu mujdeyîn (50/3)

Serpoş û qibaba min û 'işq û mey û cam
Cama ku nebes ke bi tenê bes ke xitam
Şahid ne bi mestî bigerînit bi xiram
Ew bade heram e di sed carî heram (130/17)

Suhbet bi mey û çeng û hebîbê me nevêtin
Firyad û fixana me bes in sazî çi hacet (21/6)

Mey (‘eşqa heqîqî), dermanê her tiştî ye. Eger însan ‘aqibeta tiştan meraq bike, lêbelê ew kar ji wî re me’lûm nebin, ji cama meyê binoşe û xwe teslîmî Rebbê xwe bike, dê dilaram bibe; lewra dê bizane ku teqdîra muqedder her di destê Xwûda de ye. Ew kesê bi fincana ‘eşqa îlahî mestbûyî, ew ji Xwûda dûredest nabe, lewra ew mey, ji ebteran re dewa ye.

Ji ezel ‘aqîbetê karê ku me‘lûm nebit
Camê mey noş û ji teqdîrê muqedder meke behs (27/10)

Ma dibit ew dûredest bit dê ji fincana te mest bit
Cam ji şehkasê bi dest bit ebteran ew mey dewa ye (95/30)

Mey û şerab, di wateya ‘eşqê de, bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. ‘Eşq û mey, herdu jî serxweşiyekê didin ‘aşiqî; lê serxweşbûna ‘aşiqî ne ji meyê ye. Remzên dilberê yên xefî ew ebter û serxweş kiriye. Yanî jihişçûna (serxweşî) wî, ne ji meya tirî (engûr) ye, ji ‘işweya yarê ye. Mey (‘eşq), ji aliyê Xwûda ve, ji ‘aşiqî re hatiye bexşandin. ‘Aşiq, di ‘eşqê de bêîrade ye. Teqdîra Xwûda ew kiriye mubtelayê evînê. Eger ne wisa bûya, Şêxê Sen’an, meya ‘eşqê venedixwar û nediçû nêv Ermenîstanê.

Min go ji qedîm em meyê 'işqa te dinoşin
Go min ku ji 'uşşaqan ne tenê meyperes î tu (105/20)

Me muşerref ke du çeşmên me bîsata qedemê ke
Pur li nik min heye mey mêze ke min sîne kebab e (94/11)

Da binoşim mey ji lêvê mawera reyhan û sêvê
Lûlûwên şekker di nêvê abê heywan çeşme ye (97/24)

Serxweş im bêcam û mey remza nihîn ebter kirim
Nagehan tîr dane dil lew kuşt di hadir suxte ye (93/17)

Da min suroş wer mey binoş weqtê xuroş ez çûm ji hoş
Ji ‘işweya yarê bû xweya ew ne ji meya engûri bû (107/8)

Mey nenoşî Şeyxê Sen‘anê xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet (61/1)

Pîrê hîkmetbîn, hemû meşreban dizane û bi xeletî, mey nerêhtiye fincana (qelb) ‘aşiqî. Mehbûbên weke nêrgizên nazik û re’na, weke gulên taze û geş, bi qedehên rengîn, meyê pêşkêşî ‘aşiqî dikin. Eger ew mey, ji ‘aşiqî re, ji destê mehbûbên neyşekerên şîrînqed bête pêşkêşkirin, dê dilê wî yê reş, cîla bigire û ronî bibe. Dema ji destê dilberê mey biçite saxerê, dilê ‘aşiqî, weke roja Burca Hemelê ronî dibe û dema bi fincana surê, dilber meyê dide ‘aşiqî, dilê wî mexmûr dike.

Pîrê ji hikmetbîn li wifqa meşreban
Kes nedî mey rêhte fincanê xelet (61/24)

Du qedeh mey bi Nîşanî diderin reng bi reng
Nêrgiza nazik e re‘na û gula taze ye geş (54/8)

Neyşekkera şîrînqed me j’dest te mey divêtin
Da sîne pê cela dîn rewşen bikin dilê reş (53/8)
Mey ku biçit saxerê hêj di destê dilberê
Sondê bi Xaliq xwurî roj e di Burca Hemel (73/2)

Îro ji remza dêmdurê minnet ku min mesrûr e dil

Dilber bi fincana surê mey da me û mexmûr e dil (74/1)

Murşîd, mîr û begên seyr û sulûkê ne. Dema mîr li murîdên xwe dinêre wan dixe bin tesîra xwe. Çavê murşîdî bi nezerê ve weke nêrîna şêran tesîrdar e. Murşîd, ji ‘eşqa îlahî vedixwe, paşê jî bi wê cohtê meyxwûran (çav), ‘eşqê (mey) dirêje şeraba saxerê (dilê murîd). Çavên murşîdî ji mey vexwarine û weke mîran bêînsaf in.

Textê du mîr û begleran meydan e coqa gogeran
Eslan û cotê meyxuran mey di şeraba saxerê (113/12)

Bê muruwwet ku du mîran ji surrê mey di serî
Ellah Ellah çi tecella te ji sirra qederî (121/2)

Mey, di wateya heqîqî de jî hatiye bikaranîn. Raveka “nezerek wê beşerê”, îşaretê bi mehbûba beşerî dike. Ew mehbûb, hûrîsirişt e, di xusûsiyetên hûriyan de ye. ‘Aşiq, yek nezera mehbûba xwe, bi mey, ava kewserê û hûriyan venaguhere. Ew kesê bi ‘eşqê mest bibe, hewceya wî bi meyê tune, lewra ‘eşq jî weke meyê, hişê ‘aşiqî ji serê wî dibe.

Nezerek wê beşerê lebşekerê hûrîsiriştê
Nadirim ez bi mey û Kewser û hûrên di bihiştê (122/2)

‘Aşiqê mestê bi ‘işqê niye hacet bi meyê
Waridê warid û ehwali bi ewradî çi ket (22/8)

Mey û şerab, di wateya ‘eşqê de, bi gelek xusûsiyetan ve hatiye bikaranîn. Di bikaranîna van têgehan de, wateyên mecazî û teşbîhî li pêş in. Meya baqî, heyata dil e; kesê ji meya baqî, meya xas û meya lem yezelê vexwe, baqî dibe.

Kefa ku kûz û tas tê nazik û sipî zend in
Cama ku meya xas tê binêrin talib çend in
Vexwun ji destê rastê bi medhan mehbûb xwendin (132/39)

Şahidê qudsînîşan husn ji remza ezel
Da me bi destê surê camê meya lem yezel (73/1)

Newaya mutrib û çengê fixan avête xerçengê
Were saqi heta kengê neşoyîn dil ji vê jengê
Heyata dil meya baqî binoşin da bi muştaqî
Ela ya eyyuhes-saqî edir ke'sen we nawil ha (4/1)

Tiştê ku rûhên ‘aşiq û me’şûqê ber bi hev ve dikêşe, meya cazîbedar e. Hingî mey, kevin be tesîrdartir dibe û “meya du sale”, gelek tişt anîne serê ‘aşiqî.

Mestê şehkasê meya cazîbeyên rûhê didet

Ruh dizani ku ji ber lezzetê ‘işqê me lebaleb (14/3)

Ah ji dest wê perîyê dil li Melê hewale kir
Her çi li min kirî Mela camê meya du sale kir (41/1)

Rengê meyê jî, bi gelek teşbîhan ve hatiye bikaranîn. Meyê, rengê xwe ji gulasor hildaye û saf e. Mey, caran rengê xwe ji lêvên dilberê yên le’lî û şeffaf hildigire û gulgûn û saf e. Qesta ‘aşiqî ji meya sor, lebê yarê ye, yanî gotinên wê yên şirîn in.

Rûhaniyên qudsîmîsal têne lîbasê xett û xal
Saqî meya gulgûn û al tînit di fincana me da (9/78)

Saqî ku da min ew sulaf feyza meya gulgûn û saf
Zail kirin şubhe'w xîlaf 'ilmek ji bejnê ruq'e da (9/138)

Dilber ji le‘lên xwe’y şefaf da min meya gulgûne saf
Deryayê ‘işqê qaf û qaf peyweste cezr û hem meded (40/8)

Bê meyê lebê le‘l Mela min ji meya alî çi hez
Suhbeta tê nebitin yar bi her halî çi hez (62/1)

Bade, di edebiyata klasîk de hem di wateya şerabê de hem jî di wateya qedehê de hatiye bikaranîn. Bade, di tesewwifê de sembola ‘eşq, zewq û ‘eşqa Xwûda ye.[376] Bade, di nav beytên şa’iran de, temsiliyeta lêv û dêmên yarê û hêstirên çavên ‘aşiqî dike. Bade, rengsor e (badeya nûrîn rehîq) û fincan/qedeha wê jî sor e (fincana ‘eqîq). Ew ji aliyê Wehhabî ve wek îkramekê, ji ‘aşiqî re hatiye dayîn.

Ew tiliyên nazik reqiq pur da me fincana 'eqîq
Min badeya nûrîn rehîq minnet bi min Wehhabi da (2/9)

Ehlê tesewwifê, ‘eşqê weke wasitaya wuslata Heqqî qebûl dikin û badeyê jî wek sembol ji bo cezbeya dilî bikar tînin. Di navbera bade û ‘eşqê de xusûsiyetên hevpar hene. Çawa ‘eşq di dilê her mexlûqekî de ji hev cuda tecellî dibe, bade jî bi goreyî qabê xwe (zerf) şekil digire. Di kûpên şerabê de, şerap tê de bê sebeb dikele coş dibe û ‘eşq jî di dilê ehlê îrfanî de coş dibe, cezbeyekê dide wî însanî. Herdû jî tesîreke mezin li ser însên dikin û wucûdê dixin bin bandora xwe. Bi van wekheviyan, bade wek sembol ji bo temsîlkirina ‘eşqa îlahî hatiye bikaranîn.

Afirandina însên û tekamula wî, yanî dayîna hest û hişmendiya wî bi sembola badedayînê hatiye beyankirin. Têgehên “bade, mest, xumar, saqî, me’şûq …” bi dayîna

376 Cebecioğlu, “Bade”, b.n.b., r. 63.

‘eşqê ve girêdayî ne. Vexwarina badeyê, bi ezeliyeta Xwûda ve tê girêdan. Piştî ku Xwûda xwestiye xezîneya veşartî bête zanîn, nav û sifetên wî te’eyyûn bûne husn û hubê xwe nîşan dane. Saqî ku temsîliyeta Xwûda dike, hêj di ezeliyetê de bade daye ‘aşiqî û heta ebedê jî ‘aşiq dê mest û xumar bimîne.

Bade me noşî ji dest çûm ji xwe û mam mest
Qetre bi behrê giha behri bi ‘eynî xwe ma (8/9)
Saqî ji ezel yek du qedeh bade bi min da
Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez (48/6)

Saqî 'eceb ev bade rêt 'aşiq ji me'şûq ev divêt
Fincan bi fincan da û mêt kama dilê bêçare da (9/99)

Badeya le’lê, bi rengê xwe ve dişibe lêvê. Di tesewwifê de lêv, temsîliyeta “fenafîllah”ê, feyzên batinî û lezzetên rûhanî dike. Ji aliyekî din ve jî bade hişê însên ji serê wî dibe û însan ji xwe diçe.[377] Ji ber van sedeman, di navbera lêvên sor û badeya le’lî de, ji aliyê rengî ve têkiliyek hatiye çêkirin. Şerbeta lam û bêyan (leb/lêv) û badeya le’lî, sembola ‘eşqa heqîqî dikin û herdu jî ji bo însên di dinyaya din de dibine wesileya baqîbûna însên.

Şerbeta lam û bêyan ez bi heyatê nadim
Badeya le'lê bi ava zulûmatê nadim (75/1)

Xemr, navenda ‘eqlî dinixûmîne, ji ber vê yekê, hemû şerabên ku serxweşî jê çêdibe weke “xemr” hatine binavkirin. Şeraba ji tirî û xurmeyê hatî çêkirin jî wek xemrê hatiye binavkirin.[378] Xemr, di lîteratûra tesewwifê de di wateya ‘eşqa îlahî de hatiye bikaranîn. Xemr, temsîliyeta safîbûnê dike. Dil muştaqê xemrê ye, lewra Xwûda ew di deftera hîdayetê de nivîsiye û kiriye qismetê ‘aşiqî.

Dîsa ji nû bêhal e dil saqî werîn cama zucac
Muştaqê xemra al e dil lê xwoşi anîbit mizac (31/1)

Şem'a wîsalê her geş e şewqa şemalê ateş e
Xemra peyalê bêxeş e saqî 'eceb ev bade da (9/98)

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e ji deftera hîdayet (24/1)

Xemr, di wateya ‘eşqê de hatiye bikaranîn û jê re sînorek jî hatiye dayîn, lewra ‘aşiq li pey her xemrê nîne ew dixwaze xemra helal bi dest bixe. Ehlê dilan, dixwazin

[377] Ali Nihat Tarlan, *Fuzûlî Divanı Şerhi*, Akçağ Yayınları, Ankara 2011, r. 113; Levend, b.n.b., r. 48.
[378] El-İsfahanî, “h-m-r”,b.n.b., r. 339-340.

bi helaliyê, bi rê û rêbazeke rast û durust, di rêya Xwûda de bimeşin ku bigehijine heqîqetê.

Cama zelal xemra helal yara şepal da min bi hal
'Işqa xedar sohtî sitar nêv me û yar sed sûri bû (107/14)

Zaza bi nayê ra binal saqî werîn xemra helal
Carek ji ser dêmê vemal zulfên li dora cebhetê (125/2)

Xemr, murada dil û sebeba hebûnê ye. Eger ew ji dilî re nehatibiya dayîn, dê dil bê miraz bimaya. Afirandina 'alemê bi 'eşqê/xemrê ve girêdayî ye. Eger Xwûda nexwesta bête zanîn, yanî xemra ezelî ji nûra xwe neafirandibûya mexlûq jî nedihatine wucûdê.

Ger nebexşî dil muradê ji heyata xemr û badê
Dê bikim gilleh û dadê dad me dîsa ber te ye (97/45)

Saqî ji xemra ezelê nûra qelem jê afrand
Darêt lewha ewwelê rizq û nesîb qeddirand
Ew bû murad mes'elê neqşê mecaz sewwirand (132/9)

Cur'e, qurt/fir û vexwarin e. Di hengama sulûkê de, ji hal û sifetên ku salik dikevitê re jî cur'e tê gotin. Cur'e, hem meqama seyrê (seyr û sulûkê) ya salikê ye hem jî sirr û meqamên salikê yên veşartî ne.[379] Di rêya seyr û sulûkê de meşeqqet gelek in û bi sebr û tehemmûlê salik bi ser dikeve. Hebûn û hatina dinyayê ji esliyeta xwe veqetîne û weke cur'eya hicrê ye. Salik dixwaze bi seyr û sulûkê mertebeyên qurbiyetê/nêzikahiyê derbas bibe nêzikî Rebbê xwe bibe. Di seyr û sulûkê de, hemû sirr û meqam ji salikî re aşîkar nabin, lewra herçendê feyza ilmê felsefeyê hebe jî, ew ancax ji ehlê 'îrfanê re tê dayîn. Eger salik ji mucahedeyên derûnî û zahirî xilas bibe, dikare di meqamên qurbiyetê re derbas bibe.

Kesê mihnet dî firqet, vexwarî cur'eya hicrê
Giryê wan tê bi halê min di vê hicran û zecrê da (5/5)

Feyza 'ulûmê felsefe hatî di nêv çeng û def e
Min dî di camê da xef e fincan bi can min cur'e da (9/133)

---

[379] Cebecioğlu, "Cur'adan", r. 105; Selami Şimşek, "Cür'a"*Tasavvuf Edebiyatı Terimleri Sözlüğü,* Litera Yayıncılık, r. 77.

### 1.2.3. Ehwalên Tesewwifê

#### 1.2.3.1. Tecellî

Tecellî, di mertebeyên cuda de, zuhûrbûna heyîna Heqq e û bi wasiteya keşfê îdraqkirina salikî ya vê zuhûrê ye. Di tesewwifê de, zanînên ledûnnî û nûrên ku di dilê salikî de zuhûr dibin, wek tecellî têne qebûlkirin. Îbnu'l-Erebî, xuliqandinê, bi fî'la tecelliyê îzah dike û dibêje; 'alem, mertebeya tecellî û zuhûra Heqq e. Însan, tecellîgahê herî mukemmel û yê dawî ye ku hemû mertebeyên tecelliyê di xwe de dihewîne.[380]

Di dîwanê de ji bo zuhûrbûnê, peyvên weke tecellî, keşf, şuhûd û te'eyyûnê hatine bikaranîn. Tecellî, di dîwanê de, bi rêya telmîhê, weke zuhûrbûna Heqq ya li Çiyayê Tûrê hatiye beyankirin. Xwûda, li Çiyayê Tûrê, biperde tecellî dibe. Ew, di Wadiya Eymena Tûrê de, wek nûrekê tecellî dibe. Tecellîbûn, wek enwar û birqê, xwe nîşanî Mûsa Pêxember daye. Ew nûra ku di Tûrê de xwe nîşan dayî, xwe di dilê 'aşiqî de jî nîşan dide û wê derê dikelîne û disojîne. 'Aşiq, ji ber tecellîbûnê dilê xwe Tûr dihesibîne û ew peyrewê Mûsa ye. Piştî ku nûra munezzeh di dilê 'aşiqî de tecellî bûye, ew bûye ateşperest, yanî bûye bengiyê wê nûrê.

Ji Wadyê Eymena dilber nizam enguştek îzhar bit
Ku xweş enwar û berq in ew tecellabûn di Tûrê da (5/27)

Pertew ji 'eynê nûrekê tên tên tecella Tûrekî
Ew ser didit yek fûrekî lew çendi leb leb qetre da (9/21)

Dan dil ji ber husna bi nûr berqa tecellaya sudûr
Lew sohtim wek kohê Tûr hubb û evîna enwerê (113/15)

Tûr im bi dil û peyr Mûsa yim ez
Ateşperesê nûrê tecella yim ez (49/1)

Xuliqandin, bi tecelliyê dest pê kiriye. Dema deryaya comerdiyê coş bûye, heyîn, di neynika navê Wedûd de tecellî bûye. Di subeha ezelê de Xwûda muma 'eşqê hilkiriye û nûra cemalê xwe ya ebedî, di zatê xwe de tecellî kiriye. Ev tecellîbûn, bê nav û eser û sifetên Xwûda çêbûye. Paşê 'alem bûye neynika navên Heq û wek nûrekê di heyînan de xwûya bûye. Ew husna ku di neynika cemalê munezzeh de zuhûr bûye, wek ayetên husnê di heyînan de xwûya bû. Tecellîbûn, qedeme qedeme çêbûye û dema

[380] Semih Ceyhan, "Tecellî", DİA, c. 40, İstanbul 2011, r. 241-243.

tecellî di ‘erşê de xwûya dibe, nav bi wê têne neqişandin. Paşê tecellî wek nûrekê, li ser ferşê (dunyayê) xwûya dibe û “esma hemî” jê re diçine secdeyê. Xwûda bi navê xwe yê Subûh, tecellî kiriye û mey (‘eşq) rêhtiye cama ‘eql û ruhê ‘aşiqî û ew der nûranî kiriye.

Coşiş ku da deryayê cûd d'ayîneya ismê Wedûd
Carek tecella bû wucûd nûrek ji nûrê jê veda (9/55)

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Zatê tecella da li zat bêism û asar û sifat
Sirra hurûfên 'aliyat xef bû di sitr û perde da (9/2)

'Alem bi 'alem ew neseq bû ayîne esmayê Heq
Nûra tecellaya teteq 'eksê cemalek sade da (9/18)

Ew sûretê mir'atê husn jê bû zuhûr ayatê husn
Lê bû tecella zatê husn vê husnê ew serçeşme da (9/60)

Nûra tecella hate 'erş esma hemî lê bûne neqş
Şewqa di wan çû ta bi ferş isman bi zatî secde da (9/69)

Ev reng tecella kir Subûh saqî ji şehkasa futûh
Mey rêhte cama 'eql û rûh roj bû di qewsê qubbe da (9/80)

Tecellîgaha herî mukemmel, di însên de xwe nîşan daye. Spehîtiya mehbûban, ji cemalê Semed e ku ew cemal di rûyê wan de tecellî bûye. Ji ber vê yekê, meqseda ‘aşiqî ji cemalê xuban, tecelliya cemalê Xwûda ye. Eger, ew tecelliya pîroz û munezzeh nebe, hewcedariya ‘aşiqî bi cemalê yarê tune. ‘Aşiq wek qefesekê ye, mehbûb, di dilê wî de tecellî bûye û ew bûye ruh û canê ‘aşiqî. Eger di dilê ‘aşiqî de neynika ‘eşqê (‘eksa cemalê munezzeh) tunebe, husn, di wê derê de tecellî nabe. Eger ew husn nebûya, Mehmûd nedibû bengiyê spehîtiya Eyasê. Şêxê Sen’an jî weke Mûsa tecelliya Xwûda di mehbûbê de dît û berê xwe de Ermenîstanê. Di vê muhebbetê de tu xeletî tune, lewra husna munezzeh, ‘aşiqî ber bi xwe ve dikêşe. Şa’ir, de’weya dîtina nûrê ca’îz nabîne, lewra wek wehdetê mutleq, Xwûda di her tiştî de xwûya dike, herwekî di nêrînên mehbûban de jî tesîra tecellîbûna wî heye. Ji ber tecelliyê, çavên mehbûbê weke qabêqewseynê rengdar bûye û birûyên wê jî weke hîlalê ronî bûne. Ji ber wê tecellîbûnê, dema mehbûb xwûya bibe, pêwîst e ‘aşiq li ber wê biçe secdeyê. Îblîs, tecelliya Xwûda di Adem de nedîtiye, eger wî, ew nûr bidîta dê ji Adem re secde bibira. Ew nûra Xwûda ye ku weke tecellaya cemalî, di sûretê beşeran de xwûya dike.

Ew nûra ku di Adem de çirisiye û ferişteyan li ber wê secde birine; hatiye û ketiye bejn û balaya mehbûban. Di ‘alemê de ji bo bidestxistina wê nûrê, gelek xirecir derketine. Suleyman Pêxember, di gustîla xwe de hêza wê nûrê dîtiye û cîhan hemû xistiye bin fermandariya xwe.

Husn û zatê but û latan ji cemalê Semed e
Li misalê senemî weku tecellayê Semed (38/6)

Ne cemalê te tecellî bikirit
Me ji xûban bi cemalê çi xered (57/8)

Yexma ji me can kir ku tecellayê li dil da
Min ruhê ji qalib tu yî tenha qefes im ez (48/3)

Husni bêayîneyê ‘işqê tecella nadet
‘Işqê Mehmûdî di me‘na nemekê husna Eyas (51/2)

Mislê Mûsa wî tecellaya te dî
Ê tu dî kanî xeta hanê xelet (61/2)

Wê mecalê ku cemalê xwe tecella dikirî
Lazim e secde bibîn ber te di vê gav û demê (109/10)

Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ger 'Ezazîlî bidîta nedibir xeyrê sucûdê
Xerqi bûm ez di xema 'işqê di weqtê seherê bû
Lew tecellayê cemalê li mîsalê beşerê bû (122/1)

Binê berqa tecellayê melek hiştin di Adem da
Ji remza bejn û balayê biruskê rastî 'alem da
Berata zerfeşan dayê bi mehrem mohr û xatem da (131/23)

Di dînê ‘eşqê de ya giring ji Xwûda re ‘îbadetkirin e. Eger ‘abid tecellaya Xwûda di dilê xwe de hîs bike, besî wî ye. Dema tecella zuhûr bibe, Beytêqudus, kenişt, putxane di hişmendiya ‘abidî de dibin yek. Ji xwe armanca ‘abid/’aşiq ew e ku li ber qibleyê biçe qiyam û sucûdê. Daxwaza ‘aşiqî ew e ku di qibleya ehlê dilan de cemalê Xwûda keşf bibe û di nav tac û per û qewsên wî yên hîlalî de tecellî bibe. Xwûda, Wahid e û zatekî ferd e û bi sifetên xwe tecellî dibe. Hemû te’eyyûnatên wî pêwîst e bi çavên dilî bêne temaşekirin, lewra tewehhûm di navbera wî û heyînan de bûye perde. Te’eyyûna sifetên Xwûda di qelbê ‘aşiqî de tecellî dibe; ji ber wan neqşan ku di sûretê mehbûban de peydabûne, qelbê ‘aşiqî bûye weke butxaneyê û di wê derê de her daîm ‘îbadet têne kirin.

Dibitin Beytêqudus ehlê ziyaret ji Hebeş tê
Ger bikit husn û cemalê xwe tecella di keniştê
Sîne putxane ye îro me ji dêm û qed û qiştê
Bi dilê sade çi kim ez ku tecella negehiştê
Ew e min qibleyê cebhet di qiyamê di qu'ûdê (122/2)

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê
Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê (122/3)

Wahidi zatek ferd e tecella d'wan sîfatan
Li eynê dil nezer da li cimley te'yînatan
Tewehhum bûye perde bi ismê but û latan (132/36)

‘Aşiq, di wîsalê de ye, li ber tecellîbûna husna munezzeh, dixwaze biçite secdeyê lê şermende ye. Lê tecella û şuhûd digehijin hewara wî û wî, ji wî halî xelas dikin. Dema Cemal xwe nîşan bide, secdebirin ferz dibe. Dema nûr tecellî dibe, ‘aşiq dikeve cezbeyê û ji xwe ve diçe. Êdî ew halên wê seyr û sulûkê nayêne gotin, bi tenê hîskirin heye.

Ji neqşê but û latan me sîne butxane ye
Te'eyyuna sifatan tecella qelbê me ye
Di 'îd û şev beratan ji wan ra me secde ye (132/4)

Negiham secde bibim pur xecilîm ez ji wîsalê
Hadirî berqê li dil da ji tecella û şuhûdê (122/3)

#### 1.2.3.2. Keşf û Şuhûd

Keşf, ew terîma tesewwifê ye ku dema hiş û hest, derbarê mijarên îlahiyatê de, di ‘ecziyetê de dimînin, dibe rêya bidestxistina zanînê. Keşf, zanîna xeybê ye; tiştên li pêş perdeyê û dûrî ji têgihiştina ‘eqlî, ancax bi keşfê têne zanîn. Keşf, caran di wateya temaşekirina tecelliyên Xwûda de jî tê bikaranîn. Di tesewwifê de, terîmên weke feraset, înkîşaf, muşahede, yeqîn, îlham di nêzikî wateya vê peyvê de hatine bikaranîn.[381] Şuhûd jî, muşahede, dîtin û îdraqkirin e û bi wasiteya nûrê, dîtina Heqq e.[382]

Keşf û şuhûd, bi tecelliyê re têkildar in. Ew nûra ku ji Nûra Ehmedî tecellî bûye, sirra sifetên Sermedî ne. Bi vî awayî sirrên kemalatê Xwûda, di neynika zatê wî de kifş bûne. Heyînê, bi muhebbetê dest pê kiriye, eger ew nebûya keşfê esrarê sifetên

[381] Uludağ, “Keşf”, b.n.b., c. 25, r. 315-317.
[382] Kâşânî, “eş-Şuhûd”, b.n.b., r. 316.

Xwûda xwûya nedikirin. Sûretê esmayên Xwûda, bi husn û xubê, aşîkar bûne û derketine meydanê. Tecelliya Xwûda ew qas spehî ye, nayête te'rîfkirin û ji dûrî îdraqkirina 'eqlî ye. Şa'ir, ji ber rengînbûna keşf û şuhûdê, di heyretê de maye. 'Aşiq, di hengama keşf û şuhûdê de biçite secdeyê, dê pertewê nûra qidemê bibîne.

Nûrê ji nûra Ehmedî sirra sifatê Sermedî
D'ayîneya zatê xwe dî keşfa kemalatê xwe da (9/63)

Keşfê esrarê sifatan bêmehebbet nabitin
Sûretê esma tivêtin da bikî jê fehmê raz (45/2)

Rûh î û ne cism î ji cemalê bi çi ism î
Rengi reng dibî keşf û şuhûdê çi kes î tu (105/3)

Ger bibim ber te sucûdê di dema keşf û şuhûdê
Me li dil dê bidirit pertewê nûra qidemê (109/12)

Mehbûbên beşerî, xweyî cilweyên nûra Heqq in û 'eşqa ezel bi wan şêwe daye. Ji bo ku husn û hubb, li her deran kifş bibin; Xwûda (dilber) muhebbetname daye 'aşiqan. 'Eşqa ezelî, ji bo xwûyakirina nav û sifetên xwe, xwestiye xwe di dilê zatên gewre (Şiblî, Se'dî, Ferxî) de jî kifş bike. Sûretê mehbûbên mecazî (Lat), tecelliya esmayên Heqq in û ew ji keşfa Sûbhanî peyda bûne.

Çendî ku xeml û rewneq in tezyîn husna mutleq in
Têk cilweyê nûra heq in 'işqa ezel pê şêwe da (9/27)

Da husn û hubb û mezheran kifş kin li her 'erd û deran
'Aşiq bixûnin defteran dilber mehebbetname da (9/34)

Da kifş bibin kewkeb ji çerx rabin hezar Me'rûf ji Kerx
Şiblî û Sedî'w alê Ferx 'işqê di wan keşfa xwe da (9/33)

Lat sûretek heq e ji esmayên heqqanî
Li bal min muheqqeq e di nêv keşfa subhanî
Lahût e her mutleq e di nasûta însanî (132/37)

Keşf, bi navê Subbûhî te'eyyûn dibin. Ev te'eyyûn, bi birqê, bi nûrê û bi işraqê peyda dibin. Şa'ir dixwaze, dilê memdûhî jî, bi birqa Subbûhî ronîdar bibe. Eger remzek ji sirra Subhanî di dilê wî de kifş bibe, dê ew jî qelban û memleketan fetih bike. Keşfa Subbûhî, di lem'eya findê de, ji perwaneyê ('aşiq) re kifş dibe. Perwane ji bo heyateke baqî, di wî agirî de disoje û 'umrê xwe feda dike. Di agirê rojê de jî tecelleya mehbûbê heye, ji aliyê 'aşiqî ve ev sirr kifş dibe û ew dibe rojperest. Lazim e 'aşiq/'abid, tecelliyên Xaliq bi qelbê xwe hîs bike. 'Aşiq, ji Xwûda dixwaze, bibe

aşînayê keşfê esrara wî û bi tesîra tecellayên wî mexmûr bibe. Qibleya ehlê dilan (mehbûb), dema husn û cemalê xwe kifşe bike, perdeya di navbera ‘aşiq û me’şûqê de radibe û ‘aşiq li ber mehbûbê diçe secdeyê.

Berqê subbûhî ku îşraqê li sed canan didit
Ew ku keşfa dil bikit remzek ji esrarê te bî (116/7)

Perwane lew disojî ji lem'eya cezbatê
Feda kirin 'umr û jî di keşfa subbûhatê
Ku da ji nû ve vejî baqî bit di heyatê (132/34)

Dibên xawerperest î tu nizanin min di keşfê da
Numayin min di şerqê nazika gerdenşemal ebrû (106/6)

Lê keşfê esrarê xwe ke mexmûrê xemmarê xwe ke
Heyranê reftarê xwe ke kuştîne tîra muhbetê (125/4)

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê
Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê
Kî bi dil kafir e secde nebitin cebhet û xalê
Ya nedit şehde bi ayatê di wê weqt û mecalê (122/3)

Di tesewwifê de ‘eşkerekirina sirran wek tiştekî neyînî tê dîtin. Hellacê Mensûr, Nesîmî û Suhrewerdî el-Maktûl ji wan kesan in ku sirrên xwe îfşa kirine û hatine kuştin. Ew kesên ku sirrên xwe keşf bikin, di qanûn û şerî’eta ‘eşqê de kuştina wan helal e.

Hell lehu’l-qetlu bi şer’ul-hewa
Men keşfu’s-sirre we ba sirrê bah (32/9)

#### 1.2.3.3. Xeflet

Xeflet, fehmnekirina giringiya tiştên ji bo heyata dinya û axiretê ye. Xeflet, nezanîna menfe’etên maddî û me’newî ye û di wateya bêdîqqatî, îhmalkarî û îdraqnekirinê de hatiye bikaranaîn. Bi goreyî zahid û sûfiyan, musîbet û qesweta herî mezin xeflet e û xewa herî kûr jî xewa xefletê ye.[383]

Di dîwanê de, xeflet di wateya “ji nişka ve”yê hatiye bikaranîn. Xeflet, bi wateyên erênî ve derketiye pêş. ‘Aşiq, dema dikeve xefletê, mehbûb bi nêrînên xwe yên weke tîran, li qelbê wî dide û wî birîndar dike. Ev birîndarkirineke me’newî ye û derbarê ‘eşqa heqîqî de rewşeke erênî ye. Bi goreyî ehlê tesewwifê, pêwîst e ehlê

[383] Uludağ, “Gaflet”, b.n.b., c. 13, r. 283-284.

‘îrfanê carekê jî ji heqîqetê xafil nebe. Xeflet, însên bi ber delaletê ve dibe, delalet jî bi ber kufrê ve dibe. Xeflet, di demekê de, weke birqa lami’ê ji nişka ve peyda dibe. Ji ber vê yekê, xeflet, bi raveka “xedenga xefletê” wek teşbîhî hatiye bikaranîn. Yek demê însan xafil bimîne, tîrên firqetê yên weke birqên dijwar, li dilê ‘aşiqî dide û wê derê ker ker dike.

Xeflet bi sir da min nezer mîran bi qetlê kir xeder
Tîr dane dil şahê Mecer bê mirwet amanc kir ceger (125/1)

Bi narê firqetê sohtim ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nohtim ji berqa lami‘a tê da (5/1)

Xedenga firqetê re‘d e dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer cebel bit ew bi ker bit wê gavê da (5/3)

#### 1.2.4. Telaqqiyên Tesewwûfê

##### 1.2.4.1. Dil

###### 1.2.4.1.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Dilê

Di dîwanê de, bi redîfa dilî, xezelek heye. Ev xezel weke puxteya terma dilî ye ku di dîwanê de behsa wî hatiye kirin. Xwûda, remzeke veşartî (‘eşq) rêhtiye dilê ‘aşiqî û ew der payebilind kiriye û bûye cihekî giring. Di vê xezelê de dil, ji ber remzên dilbera dêmdûrr, mesrûr e û ji ber pêşkêşkirina qedeha meya ‘eşqê mexmûr e.

Remzek nihîn avête dil mihrê ji batin mêhte dil
Şehzadeyê sur rêhte dil şehkaseya ferfûr e dil (74/2)

Îro ji remza dêmdurê minnet ku min mesrûr e dil
Dilber bi fincana surê mey da me û mexmûr e dil (74/1)

Tecellîyên îlahî di dilî de peyda dibin. Dil, xweşnusxeyeke mestûr e, ji aliyê Xwûda ve bi tecelliyan hatiye neqişandin. Dema Hostayê ‘eşqê, ‘eşq rêhtiye dilê ‘aşiqî û ew der sohtiye, remz û sirr tê de peyda bûne. Ehlê ‘irfanê nekarîne wan sirran xef bikin û ew sirr eşkera kirine, lewra ‘aşiq ji bo beyankirina mesajên îlahî xwe me’mûr dibîne. Yek ji wan yê ku sirra xwe faş kiriye Hellacê Mensûr e û wî raza rumûzên qudretê îfşa kirine. Lêbelê ew me’zûr e, lewra ew dilê ku ji ber wan tecelliyan ew qas bişewite û nekare xwe bigire û sirran îfşa bike, pêwîst e me’zûr bê dîtin.

Nûra ji qudret lê du nûn jê ra du nûn in erxewan
Wer ayeta ‘işqê bixwûn xweşnusxeyek mestûr e dil (74/5)

Dil lê bidet nûranî weqtê sewaş û heyheyê
Fehm er bikî wehya meyê jê din xeber me'mûr e dil (74/4)

Hostayê 'işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot
Remza "enelheq" her tigot bawer bikin Mensûr e dil (74/3)

Tefsîrê sirra ayeta 'arif divêtin guh detê
Raza rumûzên qudretê ger deyn bikin me'zûr e dil (74/6)

Dil, Ke'beya Xwûda ye, çawa di Ke'beyê de bi cil û bergên îhramê, însan hemû weke hev dibin, her wisa di neynika dilî de jî, lazim e hemû însan, ji aliyê xuliqandinê ve weke hev bêne dîtin. Ew agir û nûra (tecellaya Xwûda) ku Mûsa di çiyayê Tûrê de dîtî, di dilê 'aşiqî de jî peyda bûye. Dil, herçendê wek pêtekî êgir jî bête zanîn, lê ku bi dilekî safî nezer lê bête kirin, dê bête dîtin ku ew nûrek e. Dil, ji ber mezherbûna tecelliyên îlahî, rewşen bûye. 'Aşiq, bi wê nûrê temaşeyî dinyayê dike û tecelliyên îlahî di hemû heyînan de dibîne, lêbelê dil, ji ber 'eşqa îlahî û ji ber giraniya tecelliyên îlahî, rencûr (jar û nexweş) e, yanî di nexweşiyeke me'newî de ye.

Dil Ke'beya Mewla ye lê narê Kelîm îsaye lê
Bangê "enellah" daye lê hem Ke'be û hem Tûr e dil (74/7)

Sed co û sed cobar e tê sed gulşen û gulzar e tê
Çendan ji 'işqê nar e tê safî nezer dî kûr e dil (74/8)

Me ji narî dîye nûra te di dil
Lew di 'işqa te her ateşperes în (80/9)

Dil er ji te mesrûr bitin min ji Melê mesrûr bitin
Dê ket cehan pur nûr bitin lê daîma rencûr e dil (74/11)

Xezela bi redîfa "dil ji min bir dil ji min", di têkiliya me'şûq û dilî de hatiye nivîsîn. Mehbûb, bi hemû xişr û xemlan ve, xwe nîşanî 'aşiqî daye û ew kiriye meftûnê xwe. Mehbûbê, bi wesfên xwe yên weke şox û şengî, zuhrerengî, heybetpilingî, miskixalî, qewsên hîlalî, dêmnedîrî, gîsû herîrî, tîrawirî, sûrşirînî, nazenînî, şirînkelamî, mahîrûyî, miskibûyî, surpilingî, şêrixoyî, mahîtabî, afitabî, şebniqabî, serwênazî, serfirazî û bi zulf û xalên reşîn dilê 'aşiqî jê standiye û biriye.

Şox û şengê zuhre-rengê dil ji mm bir dil ji min
Awurên heybetpilingê dil ji min bir dil ji min (82/1)

Mahirûyê miski bûyê surpilingê şêr xwûyê
Wê bi zulfan şubhê goyê dil ji min bir dil ji min (82/8)

Mahitabê afitabê dêm di rojê şebniqabê

Xweş bi çengal û kulabê dil ji min bir dil ji min (82/10)

### 1.2.4.1.2. Dil û Agirê ‘Evînê

Mehbûbî (Xwûda), bi husn û lutfa xwe, bi birûskeke batinî, ‘eşqekî xedar avêtiye dilê ‘aşiqî û canê wî yexma kiriye û ew bêîrade hiştiye û ji kêfa badeya ku saqî pêşkêşî wî kirî, ew bûye şeydayekî dilbirîn. Piştî ku tesîra ‘eşqê di dilî de xwûya bûye, tesîra wê di çavan de jî peyda bûye. Di şerî’eta ‘eşqê de qanûneke dilberan heye ku ‘aşiqan didin ber xenceran û dil û cîgerên wan xwînî dikin. Agirê ‘eşqê di dilî de bûye weke agirê cehennemê û bêhed nalîn û xemgînî ji ber vê yekê tên. Ji ber ‘eşqê, dilê ‘aşiqî, bûye nar û pêt û agirê evînê wê derê disoje. ‘Eşq, dema kete qelbî, ew jî weke êgir hingî diçe gûr dibe, cewr û cefayên wê sar nabe. Agirê ‘eşqê di dilê ‘aşiqî de ew qas gurr e, dinya ji ber wê bibe agir û dûman jî pêwîst e kes heyirî nemîne, lewra ew agirê di dilê wî de, dikare dojehê jî bişewitîne.

Birûska batinî da dil di pêtê sîne wê wer bû
Kû dê bêtin depîta dil di nav wê nar û pêtê da (5/7)

Hat der ji burc û penceran dil girt û da ber xenceran
Evreng e halê dilberan lew ‘aşiqan xwûn bû ceger (43/2)

Bêhed ji dil nalî ke‘îb da bexçeyan ridwanê xeyb
Van naliyan nînin tu ‘eyb sohtîne em dil bû seqer (43/9)

Husna hebib û lutfê yar avête dil 'işqa xedar
Lew selbî kir jê ixtîyar wê husnê ev îcabi da (2/2)

Min her bi nar û pêt e dil berqek ji pêtan tête dil
Gava disot hinav û dil ew qameta bejna zirav (65/10)

Sar nabit dil bi seyd cewr û cefayan zerreyek
'lşqê tebî'et nar e hingî dê her biçit dijwarî bit (19/18)

Ji ber ahên me dinê agir û dûd bit ne 'eceb
Me di dil da heye narek ku disojit seqerê (126/8)

Husna munezzeh (Sanî’), mehbûb bi xeml û cazibeyan neqişandine û dilê ‘aşiqan yexme û talan dikin. Me‘şûq, weke nêçîrvanekê ye û bi zulfa xwe ‘aşiqî digire, wî dike bendeyê xwe. Ew kesê ku bibe meftûnê ‘eşqê, îradeya wî ji destê wî diçe. ‘Aşiq, weke zulfa yarê bêqerar maye, lêbelê dilê wî tejî muhbeta yarê ye. ‘Eşq, çi qeder mihnetkêş e û çawa cegerê disoje, encax yê ketî vî derdî dizane. Ji ber xedengên firqetê

jî, dilê wî pare pare ye. ‘Eşqa mecazî di dilî de peyda dibe û paşê vedigere ‘eşqa heqîqî. Di vê astê de, agir çawa demirî dihelîne, ‘eşq jî dilê ‘aşiqî wesa disoje û dihelîne.

Husna munezzeh bênîşan wê lê nivîsî zerkeşan
Xal û xetên 'enberfeşan herkes bi wan dil yexme da (9/28)

Ji ulfê şubhetê zulfê medam lew bêqerar im ez
Ku canê min ‘ezîz îro wekî dil çû di ulfê da (5/8)

Ji derbê dax û bêderdî mepirsin mihneta ‘işqê
Çi zanin bêxeber jana dil û daxa ceger tê da (5/4)

Bi dama muhbetê bend im xedenga firqetê dil nuht
Bi şubhê murxê nîmbismil di hev wertêm di xwûnê da (5/6)

Dil ji ber narê mecazî bi’l-heqîqet bû pereng
Naru qelbî fî hewa ba mislu narin fi’l-hedîd (39/7)

‘Aşiq, li pey mihr û camê ye, lewra heta ew ji wan venexwe, dilê wî nesoje, bedena wî ji ber herikîna xwûna dilî, weke le’lê Bedexşanê sor nebe, nabite ehlê kemalê. Dil, hem ji ber ‘eşqê bêhal e hem jî dermanê wî ‘eşq e û ew muştaqê xemrê ye. Heta saqî di qedeha zuzac de xemrê pêşkêşî wî neke, ew baş nabe. Ew qedeha saqî û neyşekera şirînqed pêşkêş bike, agir be jî, dê dilê ‘aşiqî derman bike û reşahiyên dilê wî rewşen bike. Dilê ‘aşiqî encax bi vê meyê zinde dibe û ji sedan menzîlan derbas dibe. Xemra helal (‘eşqa heqîqî), “agir û sîqala dil e”, wê disojîne û di sersal û newrozan de wî zindî dike.

Dîsa ji nû bêhal e dil saqî werîn cama zucac
Muştaqê xemra al e dil lê xwoşi anîbit mizac (31/1)

Saqî ku dê mehweş bitin kakul ji şêva reş bitin
Qerqef bila ateş bitin em dê bi wê dil kîn 'îlac (31/2)

Neyşekkera şîrînqed me j’dest te mey divêtin
Da sîne pê cela dîn rewşen bikin dilê reş (53/8)

Da em bi wê dil hey bikîn pê sîne dax û key bikîn
Sed menzilan pê tey bikîn ew dê di seyrê dit rewac (31/3)

Ev nar û sîqala dil e daîm li wê qala dil e
Newroz û sersala dil e weqtê hilêtin ew sîrac (31/5)

#### 1.2.4.1.3. Dil, Dafik û Teyr

Dil, weke teyrekî di qefesa bedenê de hatiye hepiskirin û ji ber vê hepiskirinê ye ew her daîm dixwaze ji wê zincîrê azad bibe bigehije wuslatê. Dil nêçîr e, mehbûb dixwaze dilê ‘aşiqî bi dest bixe û wî bike hêsîrê xwe. Reşkagul, xalfulful û reşsunbulên mehbûbê, ji dilê ‘aşiqî re dafika nêçîrê ne. Di tebî’eta heywanan de qanûnek heye, kîjan hêzdar be dixwaze yê din bi dest bixe. Yanî kî şahê mulkê dilberê be, fa’ilê muxtariyetê jî her ew e. Ew kesê tebî’eta wî ya weke teyrê baz (şahîn) be, ji aliyê teyxûnê (şahbaz) ve tê nêçîrkirin. Huma, çiqas bifire û bilind biçe jî dîsa dê bikefte ber pençeyên şimqariyê şahê balindeyan. Dil, herçendê caran bi zorê bête destxistin jî, hinek caran jî bi xemla mehbûban bi nazik û nezaketê, bi îknayê tê bidestxistin. Di vê derbarê de dil, weke teyrekî siloke ye. Bi te’mekî tenê nayête nêçîrkirin, pêwîst e teyrê dilî bi xapandinên xemildar bête nêçîrkirin. Dil weke kevokê ye û bi saf û nazikiya xwe zû dikeve davê. Dilê pak û paqij jî wesa ye û zû tê xapandin. Lazim e dil di vê xapandinê de neyête lomekirin, lewra ev di destê wî de nîne, şahîbaz bi xwe jî ewqas bihêz e dîsa dikeve dava me’şûqê.

Ji wê nûrê ji wî narî me Mûsayî qebes îsa
Bi rojê rast û çep tarî bi teyrê dil qefes îsa
Bi muhra neqşê Cebbarî ji êgir min nefes îsa (131/21)

Yar dê hakim bitin qewlê reqiban guh nekit
Şahê mulkê dilberê dê fa'ilek muxtarî bit (19/14)

Her dilê bazîsifet dê seydê teyxûnek we bit
Firr û perwazê humayî penceyê şimqarî bit (19/13)

Ew dilê min wek kebûter nabitin kes lewme ket
Lew di vê dewrê me ra keftî weh dîn sed şahbaz (45/10)

#### 1.2.4.1.4. Dil û Jeng

Dil mekanê ‘eşqê ye. Lazim e ‘aşiq wê derê ji qirêjahiyan, ji nîfaqan, ji jengan (tiştên ku însên ji Xwûdê dûr dikin) paqij bike. ‘Aşiq, ji rindê xerabatê dixwaze ku qedeha sedefê (‘eşqa heqîqî) bidete wî ku dilê xwe ji jeng û qirêjîyan paqij bike. ‘Eşq, weke meyeke baqî ye; kî ji wê camê, ji destê şahidê vexwe dilê wî heyatê dibîne û ew baqî dibe.

Dil bişo wer ji vê nîfaqê ku bidit sîne beraqê
Bi sefa hemrehê erbabê dil û ehlê sefa be (94/19)

Cama bi destê şahid jengê ji dil dişotin
Pîrê muxan jî rindan weh weh dikir riwayet (24/8)

#### 1.2.4.1.5. Çeşmê Dil

Çeşmê dil, çavkaniya bidestxistina zanînê ye ku xusûsiyeteke ehlê ‘irfanê ye. Çavên dilê ‘aşiqî, bi bêhna rûyê yê weke gulê û bi bêhna perçem û kakulê mehbûbê, rohnî û zelal dibe. Me’lûmatên derbarê ‘eşqê de encax bi vî awayî têne zanîn. Şa’ir, bi çavê dilî dîtiye ku ‘eşq, ‘eksa cemalekî safî ye, di neynika dilî de şu’le daye û tecellî bûye. Heyîn, ji nûra munezzehê şu’le daye û zêde bûye. Tiştê ehlê ‘irfanê bibêje, ji wehm û rîwayetê dûr e. Ew zanînên derbarê tewhîdê de ku şa’ir dide, rast in û dilê wî şehdeya rastiya vê yekê dike. Herçendê ‘aşiq/şa’ir, xweyî çeşmê dil be jî, lê dîsa di gelek mijaran de dilê wî ji aliyê fehmkirinê ve kêmber e.

Mawera belgên gulê bû bihn û boya kakulê bû
Darûyê qelbê Melê bû lew bi çehvên dil cela ye (95/34)

Me'nayê 'işqê bêm çi ye lew min bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye zahir di mir'ata me da (9/10)

Dê sirrê tewlîdê bibêm ne j'wehm û teqlîdê bibêm
Me'na ji tewhîdê bibêm dil vê edayê şehde da (9/91)

Min dil ji fehmê qasir e j'wê sûretê çar bakire
Pê kir temam ew daîre neqşek ji wê terwende da (9/113)

#### 1.2.4.1.6. Dil, Hedefa Tîr, Rîm û Peykanan e

Dil, ne ku bi zulma dilberê disoje, ew bi xet û xalên wê birîndar dibe û disoje. Çavên yarê yên weke fêrisan (qehreman) dadiberizine dil. ‘Aşiq, bi qewsên çavên reş birîndar bûne. Ji wan birînan, xwîna sor û ergûwanî, weke cowan jê diherike. Ew qewsên weke peykan, tevr (teber) û kaşuwan (gog) tesîrdar, dilê aşiqî, bi peykanan birîndar kirine û bêhisab kûl û kovan tê de peyda bûne û ji ber wan ax û oxa wî ye. Mehbûban, dilê aşiqî bi şîşan dax kirine û dilê wî weke ney û nayê herdem dinale. Ew çavên weke cohtê esedan pençeyên xwe li ser singê ‘aşiqî danîne, dil û hestiyên wî diherişînin. Şa’ir nadan e, lewra ew qas îşkence li wî têne kirin, lêbelê dîsa ew dil berdide naehlan.

Xwûn ji dil co co rewan tên wek ‘eqîq û erxewan tên
Lê ji ber destê selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox (36/3)

Min xwûn ji dil bi co têtin ew bazîyê bê tor û sil

Dakefte nêv tora qizil qumrî nehiştin ref bi ref (64/6)

Dilberê îro seher avête cergê min du dox
Yek li sîne yek li dil da lew ji min tên ax û ox (36/1)

Peywest e du fêris ji me ra daberizin dil
Zulfan ji çep û rastê li oxilme cema girt (20/17)

Ya Reb çi wê mihnetkeş î ser ta qedem têk ateş î
Mecrûhê qewsê tozreş î lew dil bi peykan î Mela (12/4)

Bêmirwetê dil herişand teşbîhê şîşê lê kişand
Ker kir ceger xwoê lê reşand ateş li ser danî Mela (12/8)

Cohtê esedan pence li ser sîne nihandin
Kullabi gihandin dil û hestî herişandin (81/3)

Ev sîneya wek nay û ney pur lê kişandin dax û key
Her dil bi naehlan nedey ya Reb çi nadan î Mela (12/6)

**1.2.4.1.7. Dil û Çiyayê Tûrê**

Lami'a husna Xwûda, weke nûreke batinî, weke tecellaya li Tûrê, dikeve dilê 'aşiqî. Ji ber tecellaya nar û nûrê, dilê 'aşiqî weke Çiyayê Tûrê şewitiye û dil, şehkaseya fexfûrî ye, şa'ir jê vexwariye û mest û sekran bûye.

Lami'a wê husn û nûrê ger çi tê dil şubhê Tûrê
Batin e nayê zuhûrê lê hicab û perde ye (97/16)

'Eynê 'işq în û di dil ateşê Tûr
Ji sena berqê cemalê qebes în (80/10)

Zanim te Kohê Tûr e dil lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil lew mest û sekran î Mela (12/11)

**1.2.4.1.8. Çeşmeyê Dil (Kahniya Dil)**

Xizir û Îlyas, li ava heyatê geriyane û peyda kirine. Lêbelê zindîmayîna wan jî heta axiretê ye û dîsa dê mirin wan jî bigire. Di heqîqetê de tê dîtin ku hemû tişt, ji xeyrî wechê Xwûda dê fena bibin. Heqîqetên jiyana mecazî weke serabê ne, wext tê wenda dibin. 'Aşiq bi alîkariya Xizir, diçe kahniya dilî û dibîne ku cîhan weke serabekê (xeyalî û derew) ye.

Seherê Xizrê 'înayet ku birîn çeşmeyê dil
Bi cehanê me nezer da ku cehan 'eynê serab (13/9)

#### 1.2.4.1.9. Dil, Ke’be û Butxane

Mehbûbê dilê ‘aşiqî kiriye Ke’be û butxane. Heyat û ruh, di dilê mehbûbê de tecellî dibin û hezkirin û hebandina hemû mehbûban (but, ‘Uzza, Lat) jî dîsa di dilê ‘aşiqê de xwe nîşan didin. Ji ber vê yekê navenda baweriyê dil e û dil butxane ye. Dil, cihê tecellî û ‘eşqê ye û zikrên Xwûda tê de tê kirin. Di mehên receb, şe’ban û remezanê de, zêdetir ‘îbadet têne kirin. ‘Îbadet û zikir çiqasî zêde bibin, Ke’be (dil) rohnîtir dibe.

Ji me dil Ke'be û butxane kirî
Pêş şem'a xwe perwane kirî (123/4)

Ne tenê qend û nebatê mezherê rûh û heyatê
Hem but û 'Uzza û Latê lew me dil butxane ye (97/38)

Xalên (nîşan) yarê bi rengê xwe ve Ke’be ye û zulfên wê jî leşker in. Yar dema zulfên xwe bi ser rûyê xwe ve berdide, zulf derdorên xalê dorpêç dikin, herwekî Ke’be ji aliyê leşkeran/haciyan ve hatiye dorpêçkirin. Meha recebê yek ji wan meha aşitiyê ye û ‘aşiq dixwaze tê de şer çênebe û dorpêçkirin rabe, rûyê mehbûbê her daîm bête dîtin.

Leşkerê qehr û xeman wê çûn hisara dil bikin
Ke‘be û Beytulheram ew dê bi nûrî bit Receb (14/8)

#### 1.2.4.1.10. Dil û Gul

Gul, bi bulbulê re kompozîsyona ‘aşiq û me’şûqê temsîl dike. Çawa her sefayekê, cefayekê wê heye, her wisa mehbûb jî, bi husnên xwe ve xweyî mihnet û ‘îtab (xar) in. Xarên sorgulan û werdên bi xar gelek birîn di dil û cîgerê ‘aşiqî de vekirine. ‘Aşiq, bi wan xaran kêfxweş e, lewra derd jî derman jî ji mehbûbê tên. Eger sed peykan jî di dilê wî de hebin, dema mehbûba weke stêra perwînê rohnîdar, bêperde xwe nîşanî ‘aşiqî bide, dê birînên wî kewa xwe bigirin û baş bibin.

Min di dil kovan hezar in dax û keyber bêhisab
Mihneta werdên bi xar in wên di dil da sed nişab (16/1)

Sed nişab in min di dil îro ji xarên sorgulan
Yek bi yek peykan çevîbûn çûne cergê da kulab (16/2)

Ger dused peykan di nêva dil buwan dê xweş buyan
Her dema kewkeb bidîna necm û perwîn bêhîcab (16/4)

#### 1.2.4.1.11. Dil û Bulbul

Gul, me'şûqa bulbulî ye. Axîn, nalîn û dilxwîniya bulbulî ji ber firaqa gulê ye. Durketina ji mehbûbê, dilê 'aşiqî jî weke ya bulbulî xwînî kiriye. Dilxwînkirina bulbulî bi daxkirina laleyê re hatiye wekandin, lewra lale bi şekl û rengê xwe ve weke birîneke daxkirî û xwînbûyî tê teheyyûlkirin.

Dûr kirîn ji sunbulan çîçek û bişko û gulan
Dil me ji rengê bulbulan şubhet daxê lale kir (41/5)

#### 1.2.4.1.12. Dil, Wuslat û Firqet

'Aşiq, herî zêde ji firqetê re gilîdar e, lewra armanca wî bidestxistina wuslatê ye. Dilê 'aşiqî, ji ber firqeta mehbûbê şewitiye û birîndar e. Herçendê mehbûb bi gotinên xwe yên weke şerbeta şirîn, dilê 'aşiqî xweş bike jî, di wan gotinan de jehra helahîl (jehra kujer) peyda dibe û bi firqetê, dilê 'aşiqî dişewitîne û dike kebab. Dermanê derdê firqetê wuslat e û dil bi dîdar û xerqbûna nûra mehbûbê rohnî dibe û naxwaze êdî ji mehbûbê dûr bikeve.

Vê firqetê dil pur şewitand cerhên qedîm dîsa kewand
Şîşên di sor ta ta tewand feryad ji destê firqetê (115/8)

Şerbeta jehra helahil bû di nav şîrînleban
Lew bi narê firqetê axir li min dil kir kebab (16/22)

Ron bû bi dîdara te dil bû xerqê enwarê te dil
Naret ji ferwara te dil feryad ji destê firqetê (115/14)

#### 1.2.4.1.13. Dil û Cesed

Dil, di nav agirê 'eşqê de weke cesedekî ye, bi sohtinê, dê bigihije heqîqetê.

Teşbîhê cesed dil me di nêv ateşê 'işqê
Dê qelbê heqîqet bit û iksîrê hema girt (20/2)

#### 1.2.4.1.14. Dil û Mermer

Dilê mehbûbê, bi hêstirên çavan jî nerm nabe û bi merhametê ve weke mermerê hişk e.

Dilê yarê me nebû nerm bi sed ab û girîn
Ji dilê dilberê ma û berê mermer meke behs (27/11)

#### 1.2.4.1.15. Dil û Çiyayê Qafê

Herçendê qelb/dil, bi wateya xwe ve, bi veguherînê ve têkildar be û mişara dinyayê (‘ecel) li ser serê wî biheje jî, di behra qidemê de, ji ber derd û kulan, ew nehilweşiyaye û weke çiyayê Qafê li ser pêyan e.

Dil di deryayê qidem Qaf e bi sabit qedemî
Gerçi daîm li serê ferq e me minşarê hudûs (28/5)

#### 1.2.4.1.16. Dil û Behr

Dil, behrek e û di nav xwe de bi sed hezaran pêlan dihewîne. Ew her daîm bi coş û hereket e. Dil, bi zikr û ‘îbadetê ve jî girêdayî ye, lewra tecellî tê de peyda dibin û ji ber ‘eşqa mehbûbê, dilê ‘aşiqî yê weke behrê tejî durr û cewher dibin.

Dil behr e û sed hezari mewc in
‘Arif çi xeber ji behrê mewwac (29/14)

Derya û qaf û qulzemîn dil cewhera cama mubîn
Îro Mela yek jê emîn ew bû demê hatîn bi nav (65/17)

#### 1.2.4.1.17. Dil Mekanê Fîxanê ye

Dil, bi ‘eşqê re têkildar e û rengê ‘eşqê aşîkar dike. ‘Eşqê dilê ‘aşiqî sohtiye û ji ber vê yekê, di dilê wî de bi sed rengan xem hene û dengê hezar feryad û ahan jê tê. Ew kesê muhbeta wî ji ruhî tê, dibe mubtelayê nûra Subûhî û di dilê wî de bi sedan birîn, cezbe, lerizîn û ta peyda dibin.

Daim hezar deng tên ji dil feryad û ahên tên ji dil
Sed rengê xem têtin ji dil ‘işqê li min suhtin hinav (65/8)

Daîm ji xeyala te me sed nale di dil da
Lewra ji mîsala te çu sorgul me nedîne (101/3)

Herkesê muhbet ji rûh e mubtela’y nûra subûh e
Wî di dil da sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye (95/25)

#### 1.2.4.1.18. Dil û Neynik

Dil, bi şeffafbûnê ve şubhetê neynikê ye. Sir, sifet û navên Xwûda di wê derê de tecellî dibin. Dema neynika dil hatiye cîlakirin, tecelliyan tê de xwûya kirine û ji ber şu’ledayîna wê, şerab paqij bûye û rengê wê jî safî bûye. Nexmeya çengê mizginiyê dide ‘aşiqî û perdeyên jengê li ser dilê wî radibin û ew der paqij dibe.

Yar jî gel bê perde bit vê ra bi rehm û şefqe bit

Wek xunçe 'aşiq dil vebit dil şubhetê ayîne bit (125/9)

Ayineyê dil "Mela" cela da
Min tel'etihi fe qed sefe’r-rah (34/12)

Ku işaret bi beşaret bibirit nexmeyê çeng
Ji rûwê ayineyê dil bibirit perdeyê zeng (71/1)

**1.2.4.1.19. Dil, Kafûr û ‘Enber**

Dilê ‘aşiqî şewitiye û bûye pêta êgir û weke bixûrê, dûman bi ser dikeve. Di sohbetên ehlê ‘irfanê û ehlê kemalatê de ji bo ku sohbeteke kamil pêk were û ji her aliyî ve xweş derbas bibe, kafûr û ‘enber têne şewitandin û pêtên wê dişewitin û ji bixûra wan bêhneke xweş dertê. Dilê ‘aşiqî jî, ji ber ‘eşqê bûye pêteke êgir û ‘aşiq dixwaze, di cihê wan pêtan de, dilê wî bixin mecmerê û bêhn bikin, yanî guhdariya dilê wî bikin ka ji destê evînê çi lê bûye û çi hatiye serê wî.

Min go ji me dil şubhê bixûr xweş te bi ker kir
Ker kir bi du le'lên xwe şeker go 'edes î tu (105/16)

Suhbet ku kamil bo bi rê carek bi cayê ‘enberê
Qelbê me bavê mecmerê xweş‘enber û kafûr e dil (74/9)

**1.2.4.1.20. Dil û Fexfûr**

Dil her daîm wuslatê dixwaze. Şox û şepala gotinşirîn û exlaqnazik, ji dil ‘aşiq vexwestiye û vexwendiye dîwana xwe. ‘Aşiq, dema vê mizgîniyê dibihîze, xwe weke fexfûrên padîşahên çîniyan bextiyar û payebilind dihesibîne.

Şox û şepala leb şeker ew nazika wê qenc û rend
Wê dil ji dil dil da û vexwend îro yeqîn ferfûr e dil (74/10)

**1.2.4.1.21. Dil û Kafir**

Husna munezzeh, ji aliyê qibleya ehlê dilan ve (birûyên yarê qible ye), cemalê xwe kifşe bike, yan jî, ji ber tac û perên wî ve birûyên hilalî tecellî bibin, dil li ber wan diçe secdeyê. Tecelliyên Xwûda û eserên wî gelek in. Eger, însan di wan eseran de tecelliyan nebîne û bi wan nehese, ew însan dilhişk, dilgirtî û dilkafir e.

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê
Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê
Kî bi dil kafir e secde nebitin cebhet û xalê
Ya nedit şehde bi ayatê di wê weqt û mecalê (122/3)

#### 1.2.4.1.22. Dil û Rustemê Serhedê

‘Aşiq, çi qeder bi hêz û quwwet be jî, di destê mehbûbê de bêquwwet û bêîrade dibe. Dilê ‘aşiqî, bi qahîmiyê ve weke hezar dilan û weke Rustemê Zalê Serhedî ye. Lêbelê di destê ‘eşqê de, ev xusûsiyetên xwe wenda kirine bêxwedî û bêquwwet maye.

Ger çi bi deh sedan e dil Rustemê Serhedan e dil
Zayi’ û bê xûda ne dil tê bidirin bi xuwayekî (128/11)

#### 1.2.4.1.23. Dil û Can

Dil û canê ‘aşiqî, di rêya me’şûqê de qurban in. Ji bo ku bigihije heyateke baqî, wî dil û canê xwe pêşîn (selem) daye. Ev beyt bi telmîhî îşaretî wê ayetê dike ku dibêje: “Bi rastî, Xwûda ji mûminan, nefsên wan û malên wan, bi dayîna cennetê, ji wan kirriye (Tewbe, 9/111).”[384] Mizgîniya baqîbûnê, ‘Îsa Pêxember (peyambir) dema îşaretî ‘aşiqî dike, hestiyên wî yên riziyayî sax dibin û dîsa dil û canê xwe di rêya mehbûbê de tune dike, digihije mertebeya fenafillahê.

‘Er’er û serwa ciwan yasemîn û erxewan
Rûh ew in û her rewan dê dil û can dîn bi wan (50/6)

Ta weqtê liqayê bi te hey bin di beqayê
Min neqdê dil û can di fenayê bi selem da (1/7)

Dema 'Îsa îşaret kir li min 'ezmên remîm hey bûn
Dil û canê me xaret kir tenê me'dûm û laşey bûn
Eda lew xweş 'îbaret kir me hemser muxnî û ney bûn (131/12)

‘Aşiq, her daîm bi dil û canê xwe yê xwûnî ve, wuslata mehbûbê dixwaze û ji bo zulfên wê dil û canê xwe daye. Ji bo ‘işweyeke lêvên (gotinên) le’l yên mehbûbê, ‘aşiqî hemû malê xwe daye, lêbelê mehbûb hêj dibêje wî, tu deyndarê min î.

Carekî goh da Nîşanî ne Mela yî were ba vî
Me ji xwûnê dil û can û dehen û kame lebaleb (14/10)

Min go dil û canê xwe ji zulfa te reha kim
Xweş go çi nezanî û Mela ger bires î tu (105/23)

Buhayê ‘işweyek le‘lan me yekser ma melek bexşî
Dil û can wê li ser dayî weh zalim hêj dibêjit deyn (85/6)

[384] Şoşikî, b.n.b., c. 2, r. 703.

Mehbûb, qesta dil û canê ‘aşiqî dike û wê derê yexma û talan dike. ‘Aşiq jî, hêvîdarê vê qestkirina mehbûbê ye. Eger mehbûb dil û canê wî hilde, dê wuslat peyda bibe.

Geh dil û geh can diben Turkên te tên
Nagirit yexma û talanê xelet (61/22)

Ger ne qesta dil û canê me diket
Me ji wê şox û şepalê çi xered (57/3)

Dil û can herdu me danê ku îcazet ji me xwest
Qultu estewdi‘uke’l-Bariye Ellahu me‘ek (68/3)

Mehbûb, rohniya çavên ‘aşiqî ye, lewra ew bêyî wê tune ye. Ji ber ‘eşqa mehbûbê, dil û canê wî şewitiye û talan bûye. Eger ‘aşiq, bejn û bala wê bibîne dê wuslat peyda bibe û daxwazên wî dê bêne cih.

Ji wê sohtî dil û canim sebahulxeyri ya xanim
Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê (124/4)

**1.2.4.1.24. Qelb**

Di dîwanê de ji xeyrî peyva dilî, di heman wateyê de peyva “qelb”î jî, bi gelemperî di rêzên ‘erebî de hatiye bikaranîn. Qelb, bi remz, feyz û tecelliyên Xwûda ku tê de peydabûne, ji ber ku mekan û meqama ‘eşq û muhebbetê ye, ji ber mekanê îdraq û têgihiştinê û ji ber navendbûna baweriyê bûye mijar.

Sed Nîl weh tên û diderin qelbê me
Pê nahesihîn qulzum û derya yim ez (49/7)

Te xweş nûrek zelal î tu di qelbê min hîlal î tu
We qelbî heysu fîhi’l-hubbu misbahun bi mişkat (23/20)

Dilber mecalê name dî nasî ku nîşana me dî
Nûn muxalif tê nedî hel qelbuha nehwî’s-seba (7/7)

Li yetmeinne qelbî ‘eynulyeqîn dibexşit
‘Eynul‘eyan divêtin kafî nehin dirayet (24/10)

Qelb, bi hinek teheyyûlan wek mecazî û teşbîhî hatiye bikaranîn. Qelb, ji ber helwestên mehbûbê şikestî ye, şubhê neyê dinale. Ji xeyrî van xusûsiyetên beşerî, dema ‘eşq ber bi heqîqetê ve dizivire, tê îdraqkirin ku qelbî ji ber feyz û tecelliyên mehbûbê, şubhê zêrî cîla girtiye û dibiriqe û ew şuhbê Tûrê Sînayê û dojehê tev de bûye agir û dişewite. Qelbî, lîbasê cism û canî wergirtiye û tê de meqam girtiye. Ew

kesê qelbê wî hişyar be û haya wî ji tecelliyan hebe, di îşaretên Xwûda de, ji bo wan şîfa heye.

Bê hed li qelbê şubhê ney cewra te danîn dax û key
Lew bê mehel xweş nîne mey emma bi şîranî Mela (12/14)

Qelbê me şibê zêrî ji feyza te cela girt
Ma rûsiyeh û sifirsifet rengê seda girt (20/1)

Eger berqek ji wê rojê ji ber wê 'iqd û bişkojê
Bidit qelbê wekî dojê li ber doje dibit berde (92/17)

Te'eyyuna sifatan tecella qelbê me ye
Di 'îd û şev beratan ji wan ra me secde ye (132/4)

**1.2.4.1.25. Teşbîhên Mayî**

Dil, bi reng û rohniyê ve bi stêrê (kewkeb) re, bi nalîna ji ber derb û firaqa evînê ve, bi çeng û jehê re, bi heşmet û qiymetê ve, bi qesrê (siraceyê dil) re, bi nazikî û hessasiyetê ve, bi şîşeyê re, ji ber tecelliyên payebilind, bi texte sultan û padîşahan re hatiye teşbîhkirin.

Lew yek neseq min tên sebeq nûra yeqeq da dil şefeq
Şirînlebê dil kewkebê lê bende bêdustûri bû (107/11)

Ma ji ber derb û fîraqa te sukûnek me heye
Cerg û dil herdu bi nalî ne wekî çeng û jihê (110/6)

Serdefterê wesfên te ye dîbaceyê dil
Yek qetre ji lutfa te ye siraceyê dil
Zikrê te dikit durr û ziya lehceyê dil
Teyrê nefesa hay û huya lehceyê dil (130/3)

Amancê xedengên te ye min şîşeyê dil
Daîm ew e her min xem û endîşeyê dil
Ateş direşînit qebesê pîşeyê dil
Hingî li xeyalê biderim tîşeyê dil (130/4)

Ji neş'a badeya kasê bizat ez xerqê 'irfan im
Ji wê camê ji wê tasê sifetkisra û xaqan im
Ji mihra xemzeelmasê li textê dil Suleyman im (131/10)

**1.2.4.2. Ayîne (Mîr'at)**

Peyvên ayîne (farisî) û mîr'atê ('erebî), di tesewwûfê de, weke îmajan hatine bikaranîn. Hinek fikrên nazarî yên ku têgihiştina wan zor in, bi teşbîh û temsîlên ayîneyê (mîr'at) hatine îfadekirin. Di tesewwûfê de ew heyînên ku Xwûda di wan de

zuhûr û tecellî dibe (mezahîr, mecalî), wek neynikê hatine dîtin. Îbn ‘Erebî, neynik, wek sembolekê, ji bo beyankirin û îzahkirina wehdetê wucûdê, xuliqandinê, wehdet û kesretê bikaraniye.[385]

Îzahkirina pêvajoya heyînê wek mecazî bi gelemperî bi ayîneyê/neynikê tê beyankirin. Çawa sûret di ayîneyê de ‘eksa xwe dide, heyîna Xwûda jî di alema şehadetê de wisa ‘eks dide û tecellî dibe. Heqq, bi ayîneyê bête sembolîzekirin, ‘eksên jê derdikevin jî wek nav û sifetên wî têne hesêbkirin. Ayîne sembolîzekirina tezahûra wehdetê ye ku di heyînê de bi şeklê kesretê tecellî dibe.

Em têk hewiyyat în yeqîn ism în ji mesder muşteq în
Mewhûm û laşey' mutleq în 'eks în di nêv ayîne da (9/20)

Bi goreyî nezeriyeya “Heqîqeta Muhemmedî”yê, Hz. Muhemmed (sxl.), neynika Heqq ya herî mukemmel e û ji bo tecelliyên sifetên şemsa ehediyetê, ew bûye ayîne û nav û sifetên Xwûda, wek nûrekê di zatê wî de tecellî bûne. ‘Eksa “Heqîqeta Muhemmedî” di rûyê mehbûban de wek roja ronîdar, tecellî bûye. Ji ber vê yekê, şev û roj, meqseda dîtina ‘aşiqan ji rûyê mehbûban, ew ‘eksa Muhemmedî ye.

Mim metle’ê şemsa ehed ayîne sifet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê "Ecem da (1/3)

Awirên cotê belek berqeke j'semawatê
Xurşîd e çerxa felek hatiye nêv mîratê
Însan e b’sûretmelek yan hurî ye d’cennatê (132/24)

'Eksê ji ruhê te şeb û rozan weh dixwazin
Hindî ku hene cumletê mîr’at û ayîne (101/12)

‘Alem, bi navên Heqq re bûye ayîne û wek nûrekê ‘eks daye. Însan jî, ‘eksa navên Xwûda ye ku di neynikê de xwûya dike. Çawa ‘eksa mûmê, weke muma ji mesderê rohnîdar e, nûra cemalê munezzeh jî bi ‘eksa xwe her tişt rohnî kiriye, yanî ji tunehiyê, heyî kiriye. Mîr’ata zatê Heq yek bûye û di ezeliyetê de, di zatê Xwûda de, ‘aşiq û me’şûq jî yek bûne. ‘Eslê van herduyan yek ayîne bûye û ji wê ayîneyê tecellî bûne; paşê di sûretê mehbûban de ji hev cuda hatine xwuyakirin.

'Alem bi 'alem ew neseq bû ayîne esmayê Heq
Nûra tecellaya teteq 'eksê cemalek sade da (9/18)

Durdaneyên xawermîsal ayîneyên tê da şemal

385 Uludağ, “Ayna”, b.n.b., c.4, r. 259-262.

Nûrek munezzeh ew cemal mey kir di nêva şuşe da (9/77)

Ayîneyê zatê yek in lew dilber û latê yek in
Vêkra di mir'atê yek in hemta di naz û 'işwe da (9/85)

'Aşiq û me'şûq el-heq herdu mir'atê yek in
Bu di ‘eynê cem'ê da eslê qedîm ayîne bû (104/6)

Ayîneya Îskender, di tesewwûfê de wek terîmekê, tê wateya dilê însanê kamil ku ji xeyrî Xwûda ji her tiştî xalî bûye û bi tenê ‘eksa heqîqetan tê de peyda dibe. Ayîneya Îskender jî yek ji wan mezahîran e ku sifetên Xwûda tê de zuhûr bûne.

Yek girtîye zulfê û yeki xalê numayî
Ayîne bi Eskenderî û camê bi Cem da (1/5)

Ew reşhe da wê qulzumê mey hate tasa 'alemê
Cama cehanbîn da Cemê b'Eskenderî ayîne da (9/101)

Durdaneya dêmgewher e ayîneya Eskender e
Bêmirwetan dil kir ker e mecrûhê xalan î Mela (12/7)

**1.2.4.2.1. Ayîneya Dil û Ayîneya Cem**

Camê Cem, di tesewwûfê de, di wateya çavê dil, neynika dil, nefsa zana (însanê kamil) hatiye bikaranîn. Hafizê Şîrazî, têgeha “Camê Cem”ê, di wateya camê cîhanbîn, qedeha ayîneya kirdar, ayîneya Îskender de emilandiye.[386]

Dilê mehbûba mecazî, weke ayîneya camê ye û nûra Heq, di husn û cemalê wan de tecellî bûye. Di ayîneya dil de, hikmet têne te’lîmkirin û ev hîkmet, ji ‘alemeke payebilind tên. Ew di badeya qedehê de ku weke le’lê sor e, ji Cama Cem ya cîhanbîn re neynik e. Xusûsiyeta hevpar ya herduyan ew e ku herdu jî sirran ‘aşikar dikin.

Ger dilber û ger 'aşiq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cî cî di wan da celwe da (9/12)

Şefeq da sîmiendamê ji bala pertewek nûrê
Bigir ayîneya camê ji destê mest û mexmûrê
Tu carek guhde peyxamê ji nay û 'ûd û tenbûrê (131/26)

Di vê ayîneyê zanî ku hikmet tête te'lîme
Ku herf in taze nûranî di lewhê sîne teqwîme
Ji bala Tûrê însan î nezer da sa'idê sîme (131/25)

Ayîneyê camê cehanbînê Cem

---

[386] Nurettin Albayrak, “Cem”, *DİA*, c.7, İstanbul 1993, r. 279-280.

Badeyê le'lî ne di cama zucac (30/2)

Neynik, dema tê cîlakirin, tişt tê de têne dîtin. Dil, neynik e û tecelliyên îlahî jî weke cîlayê ne. Dema nexmeyên çengê (me’rîfet û hîkmet[387]) di dil de peyda dibin, perdeya jengê (qirêjiyên me’newî), ji ser rûyê ayîneya dilî radibin. Bi tecelliyên îlahî, dilê ‘aşiqî, cîla digire û dibiriqe. Ji ber wê biriqînê rengê qedehê jî safî dibe. Dilê ‘aşiqî çawa ji heqîqetan re weke xunçeyê vekirî be, pêwîst e ji zuhûrbûna tecelliyan re jî weke neynikê saf û berraq be.

Ku işaret bi beşaret bibirit nexmeyê çeng
Ji rûwê ayineyê dil bibirit perdeyê zeng (71/1)

Ayineyê dil "Mela" cela de
Min tel'etihi fe qed sefe’r-rah (34/12)

Yar jî gel bê perde bit vê ra bi rehm û şefqe bit
Wek xunçe 'aşiq dil vebit dil şubhetê ayîne bit (125/9)

Terîma ayîneyê wek mecazî û teşbîhî di van ravekan de bi şeklê “berzexa reng ayîne, ayîneya xeybê û ayineyê Rûhu’l-qudus” bi têkiliya tecelliya nav û sifetên Xwûda ve hatine bikaranîn.

Ew berzexa reng ayîne hingî ku eşya dayîne
Wan tê şemal îsayine jê sûretek 'eksiyye da (9/72)

Kesê bê perde mehrem bit ne dê bê perde wek ney bê
Rebab û çengê hemdem bit 'badet mestê bêmey bê
Di dest da camê wek Cem bit ji reng ayîneya xeybê (131/24)

Lazim bi xwe ayineyê Rûhu’l-qudus î tu
Lew kes nedîn hurî bi vê ayînê (119/8)

**1.2.4.3. Sîqal (Cîla)**

Sîqal, zahirbûna zatê muqeddes e ku di zatê xwe de, ji bo zatê xwe tecellî dibe.[388] ‘Alem, ew neynik e ku Xwûda tê de tecellî bûye û cîlaya ‘alemê jî însan e.[389] Însan jî ‘alemek e û cîlaya wî jî ‘eşq e. Eger ‘eşq nekeve dilê însên ew der bêtesîr û rij dimîne.

---

387 Abdurrahim Alkış, *Melayê Cizîrî’nin Dîvanında Tasavvûfî Mazmunlar*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2014, r. 173.
388 Kâşânî, “el- Cela”, b.n.b., r. 186.
389 Cebecioğlu, “Cila”, b.n.b., r. 103.

‘Eşq, di dîwanê de wek cîlaya dilî hatiye dîtin. Ew, dilî saf û temîz dike ku tecellî û hîkmet tê de xwûya bibin. Cewhera husnê, bi serê xwe tenê ne meqbûl e, pêwîst e bi nûra ‘eşqê jî bête cîlakirin ku tesîrdartir bibe.

Ev nar û sîqala dil e daîm li wê qala dil e
Newroz û sersala dil e weqtê hilêtin ew sîrac (31/5)

Cewhera husnê eda tenha dibit meqbûlê teb‘
Ger ne seyqel det bi nûrê ‘işqê wek hekkakî rûh (33/12)

**1.2.4.4. Wucûd**

Wucûd, heyîn e û hemû heyîn jî bi zatê Xwûda ve girêdayî ne. Ruh û nefesa heyînan her ew e û heyîn, bi şewqa Heq ve hatiye wucûdê. Hêj behra cûd û keremê coş nebûyî, Zatê Muqeddes hebûye. Dema behra wucûdê coş dibe û ser de diçe, nûrek ji wî Zatê Muqeddes tenezzûl dibe (tê xwarê), sifetên Xwûda te’eyyûn dibin (xwûya dibin) û di ‘ilmê wî de eşya zuhûr dibin. Heyîn pêl bi pêl zêde dibe û ew nav di ‘ilmê Xwûda de dibine coht, yanî heyîn bi coht (nêr û mê) têne afirandin. Cûd û kerema ku Xwûda ji heyînan re kiriye, di neynika navê Wedûd de hatiye wucûdê. Xwûda di navbera heyînan de têkiliyek daniye, nîzam û întîzam çêkiriye û navek li her heyînekê kiriye. Ew nûr, di navbera Xwûda û heyînan de bûye wasite. Xwûda surme kêşaye çavê wucûdê û zatê Xwûda nayête dîtin, lêbelê feyzên wî xwûya dikin.

Ma yek nefesek min dibitin bê tu wucûdek
Dê bê te çi goyem hem rûh î hem nefes î tu (105/8)

Zatek muqeddes bû wucûd coşiş nedabû behrê cûd
Wesfê îzafat û quyûd yek jî tecellayê neda (9/3)

Behra wucûdê coşi hat nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te'eyyun her sifat eşya zuhûr 'ilmiyye da (9/46)

Esma muqabil bûne zewc lê cumle jê bûn fewci fewc
Behra wucûdê hate mewc mewcan di behrê lucce da (9/54)

Coşiş ku da deryayê cûd d'ayîneya ismê Wedûd
Carek tecella bû wucûd nûrek ji nûrê jê veda (9/55)

Ew bû di cumle rabite mîzan û ism û basite
Feyza Heq ew bû wasite çeşmê wucûdê surme da (9/65)

Nûra Zatê Muqeddes, di mehbûban de jî tecellî bûye û ‘aşiq her daîm di wê nûrê de tecelliyên Zatê Muqeddes dibînin. Dema Xusrewê ‘eşqê li ser textê wucûdê

rûdine, ruh dibe hakimê her tiştî û hemû deriyên qelbî têne vekirin. Çawa agir, zêrî dihelîne, ew nûra agirê ‘eşqê jî, wucûda ‘aşiqî dişewitîne û dihelîne, lê ev helandin wucûdê ber bi baqîbûn û wuslatê ve dibe. Di ‘esliyetê de, muqeddesiya wucûdê girêdayî hubbê ye. ‘Eşq, wek iksîrekê ye û li çi bikeve wî hêja û payebilind dike. Wucûda însên weke zîv û sifirê, bê qiymet e, lêbelê dema iksîra evînê di dilî de zuhûr dibe, wucûd dibe tişteke hêja.

Te dizanim te dibînim ku tu yî nûrê wucûdê
Ellah Ellah ji çi nûr e te serapa me lebaleb (14/8)

Xusrewê ‘işqê ku rûnişt li ser textê wucûd
Fetehe’l-qelbe ‘elel-fewri we li’r-rûhi melek (70/7)

Ateşê ‘işqê şebhê zêr wucûdê hel ket
Heye mumkin nefirit zîbeqê ferrarê hudûs (28/11)

Qelbi e‘yan digirit hubb di wucûd
‘Işqê iksîr e û em sîm û mes în (80/18)

### 1.2.4.5. Xeyb

Xeyb, ew tişta xef û bê setr e ku bi rêya ‘eql û hestan nayête fehmkirin.[390] Bi goreyî Muhyîddînê ‘Erebî, hemû tiştên ku “Heqq”î ji însên xef dikin, xeyb in.[391]

Xwûda, xeybê wek îlhamê dixe dilan û hukmê xwe bi vî awayî îcra dike. Dilê ‘aşiqî, baxçeyê ridwanê xeybê ye, ew tecelliyên tê de zuhûr dibin û ji aliyê her kesî ve nayêne hîskirin, lewra ew tecellî, ji ‘alemeke xeybî ve têne şandin. Hudhudê ridwanê xeybê jî, ji mehbûbê sed xeberên şirîn tîne da ku dilê ‘aşiqî yê mirî, dîsa vejîne. Ew şahidên (mehbûbên beşerî) ku ji ‘eyb û kêmasiyan dûr in, nûra tecelliyê, bi qelema xeybê, ji ‘alema xeybê hatiye di rûyê wan de peyda bûye. Katibê xeybê, ji kafûrê, xeteke zîba li ser rûyê mehbûbê neqişandiye.

Mulhimê xeybê weh îmla digirit
Meded û feyz ji Rûhilqudus în (80/19)

Bêhed ji dil nalî ke‘îb da bexçeyan ridwanê xeyb
Van naliyan nînin tu ‘eyb sohtîne em dil bû seqer (43/9)

Hudhudê ridwanê xeybê sed xeber şîrîn ji ceybê
Da dilê min murde hey bê guh li rê min wek seba ye (95/12)

[390] İlyas Çelebi, “Gayb”, *DİA,* İstanbul 1996, c.13, r. 404-409
[391] Şimşek, “xeyb”, b.n.b., r. 125.

Nûnên te hilalî bi qiran yek ji sura heq
Bê ‘eybi li dêmê qelemê xeybê kişandin (81/6)

Ku kêşa katibê xeybê xetê reyhan li kafûrê
Çi ayet bû ji "la reyb"ê reşandî zulmet û nûrê
Di yaqûta me dê mey bê ji destê wê sifethûrê (131/9)

Xwûda, xeybê bi hinek ‘evdên xwe dide zanîn. Xeyb, caran bi dengekî xweyî nediyar ve (hatif), an jî, ji aliyê Cebraîl ve tê beyankirin. Di destê ‘aşiqî de ayîneya xeybê heye, di wê de weke cama Cemê, ji xeybê hayîdar dibe. Ney (me’rîfet û hikmet), ji ‘alema xeybê mizginiyan dide ‘aşiqî ku were, zulf û xal, bejn û balayê mehbûbê bibîne.

Hatif’il xeyb esti în ya tercûmanê Rûh’ul Quds
Bulbulê şeyda sti der gulzari ya Mela sti în (83/10)

Kesê bê perde mehrem bit ne dê bê perde wek ney bê
Rebab û çengê hemdem bit 'îbadet mestê bêmey bê
Di dest da camê wek Cem bit ji reng ayîneya xeybê (131/24)

Dil dixwûnit ji zilf û xalan dêm û balayên ji nûr
Her bi qanûn mujdeya xeybê ji nayê rast û çep (17/9)

### 1.2.4.6. Dunya û Hudûs

Dunya, cihê xemê, çîlekêşanê û firqetê ye. Dilê ‘aşiqî, ji destê mehbûbê bûye agir, dunya hemû ji wî re bûye xem, kul û derd. Ji ber hubba dilbera gerdenzirav, raqîbên ‘aşiqî zêde bûne û dunya hemû bûne dijminên wî. Ne ku derdê ‘aşiqî bes bi raqîban re mucadelekirin e, ew li aliyekî, ‘aşiq ji destê firqetê jî bi kul û derd e. Ji ber firqetê, ‘umrê ‘aşiqî ber bi hewayê ve çûye. Dunya jê re bûye mij û duman, li ber çavê wî êdî xwûya nake û xewên şevan jî li wî bûne heram. ‘Aşiq, di dunyayê de rehetiyê nabîne û di vê derbarê de hêviyên wî şikestî ne. Dunya baqî nîne û eger ‘eşq nebe jiyana dunyayê beyhûde diçe. Ew kesê bibe ‘aşiqê perîrûyan û barê dunyayê li ser pişta xwe dayne, ew baqî dibe û digihije mirazê xwe.

‘Aşiq dibûm lew ez bi nar dunya digirtî çar kinar
Xem lê dibûne sed hezar l’zulfan bit sêsed silav (65/3)

Zaxan li bax rav girtinin me’şûq ji rengê sosin in
Dunya li min bû dujmin in seb xatirê gerden zirav (65/5)

Dunya bi min mij bû xemam xew min li çava bû heram
'Umrek bi vî halê temam feryad ji destê firqetê (115/5)

Beqa nînin li bo tiştî heta kengî bikîn piştî
Di 'işqa wan perîrûyan werin dunyayê da deyn (89/4)

Hudûs, çi araz û çi cewher be, ew tişt e ku ji tunehiyê hatiye heyînê.[392] Hudûs, bêjeyeke ‘erebî ye, bi wateya “tiştên nû peydayî” ye. Di dîwanê de bi mecazî, di wateya cîhanê de hatiye xebitandin.[393] Di dîwanê de, bi redîfa “hudûs”ê qesîdeyek heye. Di vê qesîdeyê de, nêrînên şa’irî yên derbarê dunyayê de derdikevine pêş. Hudûs, bi serê xwe tenê tiştekî bêqiymet e; ‘eşqê, hêja û giranahiyek daye wê.

Peyva hudûsê, bi şeklê mecazî û teşbîhî hatiye bikaranîn. Hudûs, dêreke xirabe ye. Ew kesê bi çavekî ‘eslî li wê nenêre, ew li bin barê dunyayê de dibe merkebê cehaletê. Di gulzarên hudûsê de, gul û xar bi hevra nin, ew kesê bêdîqqet be, ji heqîqetê bêagah be, êstiriyên hudûsê (êş û elem), wî diêşînin. Sultanê husna ezelî (Xwûda), bi xemla dunyayê, derd û elem xistiye dilê ‘aşiqî, lêbelê hestûyên wî qet qet jî bikin, ew rêya sultanê qidemê bernade, lewra dilê wî di behra qidemê de qedemsabît e, li ser soza xwe ya bezma elestê ye. Ev alem ji bo armancekê çêbûye, lazim e bi nezerekî safî lê bête temaşekirin. Ew însanê ku vegere ser ‘esliyeta xwe, dê bibîne û bizane ku berdarê dinyayê (mêwe) çî ye.

Da ji bil xunçelebek nazik û durdane bijêrî
Bi tebessum bi te ra bit ji gulzarê hudûs (28/2)

Sed girih min di dil in jê ku çep û rast diket
Şahidê husnê qidem zulf kire kibrê hudûs (28/3)

Bil ji sultanê qidem min bi te îqrari niye
Ger li kaba me nihen metqeb û munqarê hudûs (28/4)

Dil di deryayê qidem Qaf e bi sabit qedemî
Gerçi daîm li serê ferq e me minşarê hudûs (28/5)

Tu hudûsê weh mebîn qenci nezer dê carek
Li esasê qidemê daniye dîwarê hudûs (28/9)

Here eslê xwe û tertîb û qiyasê jî bike
Ger nizanî çi ye yekcarî berê jarê hudûs (28/10)

---

392 El-İsfahanî, “H-d-s”, b.n.b., r. 268-269.
393 Celalettin Yöyler, *Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2006, r. 239.

Dunya, weke Heyderê Kerrarî (Îmam ‘Elî) ye, di destê wê de Zulfîqar heye û her daîm li ser serê însanan dihejîne. Heyata dinyayê jî weke gîrdabekê ye û însan di nav de dizivire, nikare jê derkeve. Ev gîrdab, hubba dunyayê ye (zunnarê hudûs), kesê xwe bi hubba dunyayê ve girêbide, şewqa Îslamê jî di dilê wî de nabiriqe. Hubba dunyayê, jengê dide qelbê însên, ev qirêjahî jî bi rendeşa ‘eşqê tê paqijkirin, lewra ‘eşq qessara (sefarker, paqijker) qirêjahiyên dinyayê ye. ‘Aşiqî, di rêya cananê de, ruhê xwe daniye destê xwe, ji çûnê re amade ye, lewra temenê heyatê kurt e, dê roj zû biçe ava, lazim e însan qêma xwe li dinyayê neyîne û li emaneta xwe xweyî derkeve, li bin siha dara dinyayê nemîne û emaneta xwe zaîl neke. Sipehîtî û nîgarên dinyayê, tecelliyên husna ezelî ne û ‘aşiq bi vî çavî lê mêze bike besî wî ye. Eger bi çavekî rehmanî li dinyayê neyête mêzekirin, dê elemên dinyayê însên dorpêç bikin, lewra di her lehzeyê de, xencera xeddarê dinyayê, li dilê însên dikeve û wî diêşîne.

Rast û çep gav û se‘et her ew li me dadînit
Zulfeqarê qidemê Heyderê Kerrarê hudûs (28/15)

Dê bi qelbê me çi det lami‘eya Îslamîyê
Ku li canê xwe me xef bestiye zunnarê hudûs (28/17)

Reng û jengê hedesê neqşê hudûsê me di dil
Bide ber rendeşê ‘işqê ew e qessarê hudûs (28/18)

Wê ji xeflet biretin saya zewalê ey dil
Rûn tenê da tu emanet li siha darê hudûs (28/20)

Da nîgarê xwe bi sed rengî bibînî îro
Were carek bike seyrê tu di etwarê hudûs (28/22)

Tu bi halê me dizanî çî ye her lehze Mela
Me di dil têt û diret xencerê xeddarê hudûs (28/23)

#### 1.2.4.7. Dîwan û Dîwanê Qidemê

Dîwan, cihê civîn û civatê ye û di wateya berhema nivîskî de jî hatiye bikaranîn. Di dîwana Mela de, ji bo civîn û berhevbûna ewweliyetê (qidem, ezel) hatiye bikaranîn. Destpêkirina xuliqandinê ewilî bi qelemê dest pê kiriye. Ew tiştên ku dê bêne wucûdê, ji aliyê qelemê ve di dîwana qidemê de hatine nivîsîn. Di dîwana ku hinek ‘ilmê Xwûda tê de hatine nivîsîn û mehfûz in, ewilî navê Muhemmed (sxl.) hatiye nivîsîn. Ew navên ku di dîwanê de hatine nivîsîn, navên hêja ne. Şa’ir, di dîwana hezretî de xwe weke mûriyekî piçûk û bêqiymet dibîne. Şa’irî, ji dîwana se’adetê seh

kiriye ku navên kesê hêja û payebilind di dîwanê de hatine nivîsîn û dixwaze mehbûb, navê wî jî, di dîwana xwe de, digel navên ‘evdê hêja, bikêşe qelemê.

Ismê te ye mektûbi di dîwanê qidem da
Herfek qelemê ilmê bi teqwimê reqem da (1/1)

Ger çi der dîwanê hedret pur heqîr im şubhê mûr
Çeşmê te çeşmê Suleymanî li halê mûri bî (117/19)

Me ji dîwanê se'adet seh kirî şubhê Mela
Tu bi navê me gedayî bikişînî qelemê (109/16)

### 1.2.4.8. Nefs, Nefsê Kullî û Nefsê Emmare

Nefs; zat, heqîqet û heyîna tiştekî ye. Bi goreyî hinekan nefs, ruh e, bi goreyî hinekan mirovatî ye, bi goreyî hinekan cesed (beden) e û bi goreyî hinekan xwîn e. Bi goreyî sûfiyên muheqqîq, nefs bingeha xirabîyê ye (wesf û fî’lên xirab). Bi goreyî hinekan jî nefs, cewhera heyînê ye (‘ayn) ku ketiye qalib û bedenê.[394]

Nefs, di dîwanê de, bi qelemperî, derbarê heqîqet û heyînê de hatiye bikaranîn. Xulûqandina heyînê, bi teşbîha behra cemalê, bi coşbûna behrê, bi ‘eksa neynikê tê îfadekirin. Heyîn, ewilî di sehergeha ezelê de, di ‘ilmê Xwûda de, bi teorîkî dest pê dike. Ji bo ku wesf û kemalatên Subûh bêne xwûyakirin, lewh û qelem têne afirandin û li ser lewhê jî, bi şekl û herfên nûranî cisim hatine neqişkirin. Heyûlayê (maddeya bingehîn) ji bo xwe pê ve bigire hewcedariya sûretan kiriye û rûhan jî, xwestine di laş û bedenî de bibine nefs û cusse bidin.

Serçeşmeya wê dozexê behra cemalê da rexê
Feyzek ji nûra berzexê dagirt û geh geh fûre da (9/71)

Ew berzexa reng ayîne hingî ku eşya dayîne
Wan tê şemal îsayine jê sûretek 'eksiyye da (9/72)

Wesf û kemalatên subûh herfên kîtaba 'eql û rûh
Ismek divê lê bin wuzûh lew lewh û kilk û xame da (9/73)

Ew nusxeya 'alîisim lewhek divê jê ra cisim
Da herfî lê bin murtesim herfan şikil nûriyye da (9/74)

Lefzê ku me'nayek divê terkîbê îmlayek divê
Sûret heyûlayek divê rûhan di nefsê cusse da (9/75)

---

[394] Erginli ûym., “Nefs”, b.n.b., r. 744-768.

Hebûn yek e û ayîneya zatî jî yek e. Bi goreyî wehdetê wucûdê, di neynika zatî de dilber û lat jî yek in. Fer û 'esil dema cemi' dibin, meyla wîsalê dikin û ji wan nûrek peyda dibe û bi vî awayî şem'a nefsan rohnî dibe, yanî di navbera rûhan de muhebbet peyda dibe û nefs bi vî şeklî nefesê hildidin û têne wucûdê.

Ayîneyê zatê yek in lew dilber û latê yek in
Vêkra di mir'atê yek in hemta di naz û 'işwe da (9/85)

Vêkra ku bûn wesl û cem' barîn ji mabeynê lemi'
Îsa ji erwahan şemi' şem'a nufûsan şu'le da (9/87)

Îsa ji erwahan qebes pur şu'le tên nûrînqefes
Nefsan bi 'işqê da nefes qelban bi hubbê lehce da (9/88)

Nefsa kullî, ew cewhera tarî ye ku valahiyê tejî dike û paşê nûra navê Heqq tê de tecellî bûye û bi vî awayî xusûsiyeta tarîtiyê jê çûye. Nefsa Kullî, bi zatê xwe di navbera heba û 'eqlî de ye. Heba sirf zulmet e (tarîtî), 'eqil jî sirf nûr e (ronahî). Nefs, di navbera van herduyan de weke perdekê ye.[395] Xwûda emrê tecelliyê daye û husna muqeddes bûye du qisim. Yek ruh û 'eqlê 'ezem e ku çira û nûra 'alemê ye, yek jî nefsa kullî ye ku 'eslê wê jî, ji ruhî ye.

Tey kir di nêv tuxrayê ism teksîr ji herfan kir tilism
Husna muqeddes bû du qism hukmê tecellayê we da (9/82)

Yek 'eql û rûhê e'zem e misbah û nûra 'alem e
Hewwa û neqşê Adem e bêmudde bêmadde da (9/83)

Ê dî ku nefsa kullî ye husnek munezzeh 'alî ye
Ew jî bi rûh ra eslî ye wan her di hev da saye da (9/84)

Nefsê emmare bi's-sû (nefsa xerabiyê emir dike[396]), ew nefs e ku însên dibe helakê, alîkariya şeytên dike, dibe beremrê hewa û hewesan û bi hinek xerabiyan ve tê îthamkirin.[397] Di dîwanê de, bi goreyî nêrîna sûfiyên muheqqîq, nefs, derbarê hewa û hewesê de hatiye 'emilandin. Ew kesê ku bixwaze di rêya seyr û sulûkê de bigehije

---

[395] Erginli ûym., "*Heba*", b.n.b., r. 364-366.
[396] Heft mertebeyên nefsê hene û jê re "etwarê seb'e" tê gotin. Di mertebeya herî jêr de nefsa emmare heye û ev nefs, xirabî û neqenciyê emrê însanê dike. Mertebeyên nefsê yên mayî ev in: nefsa lewwame (nefsa rexnegir/nefsa lomekar), nefsa mulhîmme (nefsa ku naîlê keşf û îlhamê bûyî), nefsa mutme'înne (nefsa ku ji xirabiyan paqij bûyî û tetmîn bûyî), nefsa raziye (nefsa razî bûyî û gehiştî mertebeya heqqel-yeqînê), nefsa merziyyeyê (nefsa ku xwestekên beşerî terk kirî û Xwûda jê razî bûyî), nefsa safiyye (nefsa ku ji xirabiyan saf û paqij bûyî). (Molla Camî, Levamî, [dipnot], r. 41; Cebecioğlu, *"nefs"*, b.n.b., r. 363-366).
[397] Erginli ûym., "*Nefs"*, b.n.b., r. 747.

meqameke bilind an jî bigehije wê ‘eşqa weke gewheran hêja, pêwîst e emrên nefsa emmareyê pêk neyîne û ji hewa û hewesên nefsê emmareyê xwe dûr bigire.

Bixwaze gewhera işqê bi terka emrê nefsanî
Eger cuz'ek ji me maye yeqîn neqşê Heyûla ye (102/4)

#### 1.2.5. Faaliyetên Tesewwifê

##### 1.2.5.1. Zikir

Zikir, di lîteratûra dînî de, ji bo xilasbûna ji xeflet û bîrkirinê û ji bo bîranîna Xwûda ye. Ji aliyê zakîran ve zikir dibe sê cure: Zikra ehlê zahîrî, rîayetkirina edebên şerî’etê û edakirina ‘îbadetan. Zikra ehlê tesewwifê, xwestin û telebkirina wesla Xwûda ye. Zikra ‘arifan, ji nefs û tesewwûrên wê fanîbûn e û nezerkirina ‘alema nûranî ye. Bi goreyî sûfiyan zikir, bidestxistina hişyarbûna qelbî ye ku bi xusûsiyetên zat, sifet, nav û bi bereketa îhsanên Xwûda pêk tê.[398]

Her tişt bi lîsanê halê xwe, zikra Xwûda dike. Dengê zikra melekên Subbûhî, Quddûsî û sûfiyan, her terefî dilerizîne. Dilê ‘aşiqî jî, her daîm zikra Xwûda dike. Wesifkirina Xwûda, dîbaceya serdeftera dilî ye. Bi hay û hûya zikra Xwûda, dil rohnî dibe û ew mekan weke durr û mircanan qiymetdar dibe. Ew iksîra ku her tiştî bi ber zikrê ve dibe, ‘eşq e. Coşbûna badeyê jî, ji ‘eşqê ye.

Hay û hûya subbûhiyan reqs û semaya qudsiyan
Teşbîhê coşa sofiyan feryad û zikr û lerze da (9/94)

Serdefterê wesfên te ye dîbaceyê dil
Yek qetre ji lutfa te ye siraceyê dil
Zikrê te dikit durr û ziya muhçeyê dil
Teyrê nefesa hay û huya lehceyê dil (130/3)

Guh da zikr û hal û coşa badeyê
Wê bi bulbul ra dixûnit bulbul e (99/2)

##### 1.2.5.2. Sema, Reqs û Govend

Sema, bihîstina tiştên zahirî û batinî ya sûfî ye. Di edebiyatê de, di wateya naxme, muzîk û reqsê de tê bikaranîn. Bi goreyî sûfiyan armanca semayê, bihîstin û têgehiştina me’nayê ye. Dema me’na digehije qelbî, wî dide hereketkirin û wecd hasil dibe. Ew kesê tabi’ê nefsa xwe bibe, dengî dibihîze lê nagehije me’nayê. Ji aliyê batinî

[398] Reşat Öngören, “Zikir”, *DİA,* c. 44, İstanbul 2013, r. 409-412.

ve her tişt di hereket û semayê de ye.[399] Ji zerreyê bigire hetta Sureyyayê her tişt hereket dike û ev hereketkirin jî wek reqs û semayê tê dîtin. Heqîqeta ‘îbadetkirina ji batinî ve, bi ayetekî Qur’anê jî hatiye beyankirin.[400]

‘Aşiq, bi reqs û semayê dixwaze bigehije beqayê. Ew, bi fenabûnê (serdayîn), dixwaze baqî (ava kewserê) bibe. Mehbûba şêrînqed û lêvşeker qedeha ava kewserê bi xef dide ‘aşiqî û dema bayê sebayê jî dide pencereyê û xwûya dibe, neqş û xemlên yarê yên weke bisk, xemr, şetrî û lefê, têne reqs û semayê. Di vê hengamê de, ji bo pêşkêşkirina qedehê, tiliyên yarê yên weke ‘eqîqên nazik jî radibin semayê.

Ser didet abê kewserê zemzemê semayê zulf
Sayenuma ye xawerê sidreyê muntehayê zulf (63/1)

Xef da me cama kewserê şêrinqed û lebşekerê
Bayê seba da pencerê hatin sema şetrî û lef (64/2)

Nazika min di semayê bi ser enguştê ‘eqîq
Da me îro di semayê qedehek taze rehîq (66/1)

‘Eşqê, heyîn daye destpêkirin û bi nûra ‘eşqê, hemû ‘alem ji semayê heta semekê rohnî bûye û ji ber evînê, melek û çerxa felekê hemû semayê dikin. Şeraba ‘eşqê ew qas te’mdar û tesîrdar e, mest, hişyar û muşewweşan dixe bin bandora xwe û wan dixe nav reqs û semayê.

Bi evînê melek û çerx û felek têne sema
Rewşen in têki bi mihrê ji sema ta bi semek (68/7)

Mest û hişyarî hemî keckuleh in reqs û sema tên
Ez nizanim çi neseq keyf e nizanim çi şerab e (94/15)

Sema, bi texenniyê, bi dengê muzîkê dest pê dike. Şa’ir di hengama semayê de, bi ber awaza def û çengê dixwaze xezelên xwe bîne meqamê. Bi dengê aletên muzîkê yên weke çeng, ney û nayê, ‘aşiq ji hişê xwe diçe, dikeve reqs û semayê. Ney, sembola însên e û ji ber firqetê daîm dinale. Remz û razên ji ney û nayê têne bihîstin, bi ‘eqlî nayêne fehmkirin; ew encax bi nêrîneke qelbî, bi rehberiya murşîdekî têne fehmkirin. Wextê muxbeçe têne semayê, ney, çeng û saz (me’rîfet û hikmet) sirrên nalînên xwe ‘eşkere dikin û gelek mesele jî têne helkirin.

---

399 Semih Ceyhan, “Sema”, *DİA*, c.36, İstanbul 2009, r. 455-457.

400 Tu çiyayan dibînî, tu wan sabît hesab dikî, hal ev e ku ew her wekî kişîna ewran dikişin. (Sûreya Neml, 27/88) (Şoşikî, b.n.b., c. 4, r. 536.)

Were bê perde Mela vê xezelê bine meqam
Her dema bête sema def bi def û çeng bi çeng (71/15)

Remz û razê ney û nayê ku sema'î ne hemî
Ji mehala te bi 'eqlê xwe bizanî ji qiyas (51/5)

Guh da awazê neyê weqtê sema tên muxbeçe
Fehmê raz ger dikî çawa dinalin çeng û saz (45/9)

Wer guh da çeng û nayê şirîn ku bên semayê
Camê binuşe vêran çi sade û çi zerkeş (53/6)

Reqs û sema bi gelemperî di wextê seher û subê de dest pê dike. Ev jî îşaretê bi soz û peymanên roja qidemê/elestê dike, lewra 'aşiq li ser soza xwe ye û di semaya seherê de destê xwe ji yara xwe ya şêrînqed pêştir nade kesekî din. Mehbûb jî di reqsê de ye û di semayê de, bi tenê destê 'aşiqî digire. Destgirtin û daxilbûna seraya mehbûbê, îşaretî wuslatbûnê dikin. Dema 'aşiq, mehbûba xwe di semayê de dibîne, êdî xwe bêperde nîşanî wî dide û wuslat hasil dibe.

Di semaya seherê desti bi kes dî îro
Xeyrê şêrîn qed mewzûn herekatê nadim (75/10)

Hate destê me di reqsê û digo bil j'MeIê
Dest bi kes dî di semaya ku Mela tê nadim (75/11)

Ez çûme serayê ku şirînqed li semayê
Go ev ne Melayê me ye bê perde bila bê (112/18)

Di ezeliyetê de 'aşiq û me'şûq yek bûne. Sema û reqs, nîşanê bi îşareta wuslatê dikin û 'aşiq û me'şûq ji hev re îltîfatê dikin û dixwazin weke berî dîsa bigihijin hevûdu û bibin yek zat. Melekên Subbûhî û Quddûsî jî zikra Xwûda dikin û ji ber wê cezbeyê, Quddûsî ji hişê xwe diçin û weke zikr û coşbûna sûfiyan dikevine reqs û semayê. Dengê reqs û semayê alem dorpêç kiriye, lewra her heyîn di batinî de, di reqs û semayê de ye.

Me'şûq û 'aşiq herdu lat meczûbê yek dê bin sifat
Hîna ku bû yek îltîfat be'dek sifatan hisse da (9/92)

Hay û hûya subbûhiyan reqs û semaya qudsiyan
Teşbîhê coşa sofiyan feryad û zikr û lerze da (9/94)

Heyheya reqs û semaya te çi xweş bestiye çerx
Ku di bircê sema têt û li ser destê çû berx (37/1)

Zulf, sembola kesretê û xal jî ya Ke’beyê ye. Çawa di heccê de qesta hacî û sûfiyan tewafa Hecer Eswedê ye, ya zulfê jî li dor xalê civîbûn e. Xemrî û zulfa yarê ya weke gul, sosin û sumbul û reyhanê bêhnxweş, tên ser rûyê yarê û li derdora xala yarê reqs û semayê dikin. Meşa mehbûba bejinşimşad û serwê, xeraman û cazîbeya ronahiya rûyê yarê yê weke roj, zuhre û mahê, zulfa yarê ya weke duvpişkan ser xelek, diêxine semayê û dengê zivirîn û reqsa wan belav dibe. Xwestina zulfê, bi berhatina xalê ve îşaretî ‘îbadetkirina heyînan dike, lewra her tişt ji aliyê batinê ve ji ber mezinahiya Xwûda, ji xwe diçin û mest dibin, yanî reqs û semayê dikin. Şah (murşîd), qedehê (‘eşq) pêşkêşî ‘aşiqî dike û dilê wî rohnî dike û zuluf jî dest bi semayê dikin.

Her li dora Hecer eswed Hebeşan çerx e tewaf
Rast û çep tên 'Erefatê bi sema nû bi û Zeng (71/11)

Şimşadi bi meş sosin û sunbul bi sema tên
Ey serwê xeraman ku tu carek bimeşî (129/2)

Buxçeya sorgul di geş tê çîçek û reyhan di reş tê
Dilberê seyran û geşt tê sunbulan ta ta sema ye (96/9)

Sunbul bi *sema* tên û gulan perde dirandin
Bişkiftine alal û hişîn bûne terazin (84/7)

Sofiyên hero di tewafa Heceri’l-eswed qest
Ku li silsil bi sema tên hemayan zimzim e çerx (37/2)

Min di seher zulfên di mest hatin sema ihrami best
Çûn secdeya xalê bi qest lew haciban ihramî da (2/3)

Min dî ji xeflet cam di kef Şahê Necef dil kir hedef
Roj hate şeref stêr bûne xef her çar teref nûra yeqeq
Zulmet nema suhbet we ma nûra şemalan çû sema
Lê ew dema zulf bûn cema hatin semayê yek neseq (67/1)

Zuhre û Xurşîd û mah dîn di qewsê hemqiran
Surre dibit li 'eqreban çerx û sema û heyhey e (93/13)

Di sohbeta meclisa semayê de bi sedan mubtelayên ‘eşqê hene û ew muşteriyên zemzem û ava heyatê ne. Ew dixwazin bi semayê, bigehijin wuslatê û heyateke ebedî bi dest bixin. ‘Aşiq jî dixwaze daxilî govendê bibe, lewra mehbûba weke stêran rohnîdar jî di reqsê de ye. Dilber, bi hezar rengên cuda xemilîne û di reqs û semayê (zikr û ‘îbadetê de) de jî kemilîne. Mehbûbên dêmdurr û surperî, neyşeker, surşirîn û weke heyîva bedrî di reqs û semayê de nin û muxbeçeyên meyfiroş (murşîd û talibên

‘eşqa îlahî) di her seherê de sema dikin û ew kesên ku te’ma ‘eşqa îlahî hildayî û jê vexwarî, li derdora wan muxbeçeyan dicivin. Ew mehbûbên weke sorgulan dema têne gulzarê, lale û reyhan li derdora wê semayê dikin. Murşîd, destê talibên ‘eşqê (sûfî, salik) digirin û wan dixin nav refa reqs û semayê.

Suhbeta çerx û sema tê wek Melê sed mubtela tê
Zemzem û ava heyatê muşterî sed şêx û şox (36/9)

Mehbûb wek stêran govend û ‘işqbazî
Têkil biçîn semayê hişyar û mest û serxweş (53/4)

Şahid hezar reng xemmilîn reqs û sema pê kemmilîn
Îro Mela em sed dil în saqî werîn cama zucac (31/11)

Di çerxê wek nucûm hatin sema qiran dêmdur
Hîva bedri bû ew surperî min dî di reqsê da (5/26)

Ger çi tên reqs û semayê her seher sed neyşeker
Min ji bezma surşirînan ew şirîn reftarî bes (52/5)

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema
Badexwûran noşi noş mane li dorê cema (8/1)

Yarê ku dî em geda dest bi destê me da
Em bi semayê birîn reqs û sema jî we ma (8/6)

Reqs, di tesewwûfê de halekî wecdê ye. Bi dengê Qur’anê, dengê şî’îr, qesîde an jî naxmeyên muzîkê, sûfî dikevine halê wecdê. Dema ev deng di organên însên de belav bibin, semaya bi hereket yanî reqs derdikeve meydanê.[401] Reqs û sema, di heman wateyê de hatine bikaranîn û di gelek beytan de jî, ji bo kirpandinê, bi hev re hatine bikaranîn. Di dîwanê de, helbesta 55em, bi redîfa “reqs”ê ye û reqs di wateya tesewwifê de, wek sembolekê, di çarçoveya helbestê de hatiye beyankirin.

Mehbûbên bejna wan weke selwiya rast û dirêj (selwa sehîqed), xwe dixemilînin, dikevine reqsê û reqs bi wan dikemile, ji xwe nîşana wan mehbûbên weke nêrgiz û neyşekeran, reqs e. Dermanê dilê ‘aşiqî wuslat e û ev jî bi reqs û govendê peyda dibe. Reqsa ku mehbûbên weke stêran rû rohnî tê de hebin, ji bo ku daxil bibe, ‘aşiq razî ye ku canê xwe bide.

Selwa sehîqed xemmilî lew kemmilî mestane reqs
Wer suhbetê ger qabilî wê bêt werî şahane reqs (55/1)

[401] Ceyhan, “Sema”, *b.n.b.*, c.36, r. 455-457.

‘Ala û tayên di qurmizîn eslan di ber daberrizîn
Nêrgiz di baxan tewwizîn neyşekeran nîşane reqs (55/7)

Le’lê şekerxendê birîn destêt sipîzendê birîn
Dîsa bi govendê birîn derdê Melê derman e reqs (55/9)

Mehbûb bi ‘eynê kewkeb in reqsê ku dê dilber hebin
Sed can giramê min hebin bavême rê erzan e reqs (55/4)

Rûyê yarê weke gulistanê ye. Wexta yar dimeşe unsûrên wê yên husn û cemalê kifş dibin û bejna wê ya weke selwiyan jî hişê ‘aşiqî ji serî dibin û ‘aşiq mirina xwe dide ber çavê xwe û dixwaze bikeve reqsê ku wuslat peyda bibe. Dema ‘aşiq dikeve reqsê, mehbûb awiran dide û ew awir weke berqtîrêjan di dilê ‘aşiqî de cezbeya ‘eşqê peyda dikin û dilê ‘aşiqî direvîne.

Weqtê ku nalîn erxewan gulçîçek û terhên ciwan
Vê ra ne bê selwa rewan ‘arif li ferqê can e reqs (55/8)

Wan di reqsê da ku dîm awir peyapey dane min
Berq û tîrê şeran li dil da cezbeya ‘işqê revam (77/6)

Di hengama reqsê de şeraba ‘eşqê tê vexwarin, lêbelê huşçûna ‘aşiqî ne ji meyê ye, ew ji ber reqsa mehbûbên weke durrdaneyan e. Sohbeta ehlê dilan, bi dengê sazan coş dibe, razên deryayê pêl didin û wateya wan sirran digihije dilî û hûbba beşerî tê de peyda dibe.

Mestane mestan noşenoş qerqef di caman hate coş
Ma dê bimînit kes bi hoş weqtê ku bên durdane reqs (55/2)

Suhbet bi sazan hate saz bi mewwicî deryayê raz
Da dil ji nû bayê mecaz wê keştiyê sukkane reqs (55/3)

Reqs, deriyê sirran li ‘aşiqî (ehlê ‘îrfanê) vedike. Hetta ‘arif, weke perwaneyê ku li derdora êgir reqs dike û di êgir de disoje, fena nebe, ew nikare deriyê sirrên ‘îrfanê veke. Reqsa ‘aşiqî jî, weke ya perwaneyê dijwar derbas dibe. Di hengameya reqsê de, tîrên (şewk) mehbûbê li dilê wî dikevin, wî birîndar dikin, lê ‘aşiq ji ber wan kêfxweş e û reqskirinê weke seyranekê tesewwir dike.

Kirişme û remza berî ‘arif venabin li derî
Hetta di nêva agirî ew xef nebit perwane reqs (55/5)

Perwaneyê şem‘a geş în zulfê di nazik raweşîn
Şewkên di dil ra pê xweş în me pê hebîb seyran e reqs (55/6)

Di hinek beytên dîwanê de, peyvên reqs û govendê bi hev re hatine bikaranîn. Cezbeya ehlê ‘irfanê bi gelemperî bi peyva semayê hatiye beyankirin. Melayê Cizîrî, xwestiye bi peyvên kurdî jî vê haletê îfade bike û ji ber vê yekê, peyvên reqs û govendê jî bi kar anine. Sema, reqs û govend hemwate ne, lê bikaranîna bi hev re, teferrûatên wan derdixe meydanê. ‘Aşiq, an jî ehlê ‘îrfanê, ji ber tecelliyên husna ezelî, dikevine sema, reqs û govendê. Reqs û govend û sema, bi hinek sembolên ‘eşqa mecazî ve hatibine beyankirin jî, ji xwe ew jî ji bo gehiştina ‘eşqa îlahî, wezîfeya pêlikekê dibînin.

Di qidemê de, ‘aşiq û me’şûq yek zat bûne û bi tecelliya sifetan ji hev cuda bûne. Ji bo ku di navbera heyînan de nêzikahiyek çêbibe, Xwûda, ji sewîla şerabê, ‘eşqê berdide dilan ku di navbera heyînan de muhebbet peyda dibe. Ruh, bi vî karî kêfxweş dibin û weke helqeyê dicivin û dest bi reqs û govendê dikin. Ew husna ezelî ku di rûyê mehbûbê de tecellî bûye, gelekî cazîbedar e, heyînên beheştê yên weke wildan û perî bûne bengî û bendeyên wê tecelliyê. Ew bûne muşteriyên dêm û zulfa mehbûbê û wê cezbeyê ew xistine nav reqs û govendê.

Saqî ji dengê bulbul e avête çerxê xulxule
Rûhan li dorê silsile govend û reqs û helqe da (9/103)

Sef bi sef wildan perî bûn bendê zulfa 'enberîn bûn
Têk li dêmê muşterî bûn reqs û govend û sefa ye (96/13)

Usûla sereke ya sema, reqs û govendê zivirîna li derdora xwe ye, lewra her tişt di hereketê de ye û dizivire. Di sîstema rojê de hemû rojgar (seb'eyê seyyare/heft gerestêrk) li derdora xwe dizivirin û ji aliyê batinî ve ‘îbadetê dikin. Ger û zivirîna wan, wek reqsê tê tesewwirkirin. Xwûda, di nav çerxa wê sîstemê de bi hikmeta xwe cazîbeyek peyda kiriye. Eger ew cazîbeya hîkmetamîz nebûya, ew gerestêrk, bi mestane nedizivirîn û reqs nedikirin. Armanca reqs û govendkirina bimestane ya wan gerestêrkan a li derdora rojê (find), wuslatxwestina mehbûba şekerxende (kenşêrîn) û gewherxende ye.

Ew kamilê bê 'eyb û neqs ne çerx bi her yek new' û şexs
Wî yek bi yek anîne reqs tê seb'eyê seyyare da (9/109)

Ew yek bi yek xalî nehin bê hikmetek 'alî nehin
Ger van surek halî nehin reqsek çira mestane da (9/118)

Mestane govendê dikin reqsê li dor findê dikin
Qesta şekerxendê dikin le'lan ji gewher xende da (9/119)

Hemû tişt ji çar unsûran hatine xuliqandin. Ew çar ummehat/çar makên sereke (hewa/ba, ax, av û agir) ne û ji wan makan jî sê benat/sê keç (nebat/hêşînahî, bêcan/me’den û heywan) peyda bûne. Ev mak û tiştên ji wan derketî, di halê xwe de weke sergeşteyan, reqseke şehbazî dikin.

Hin suflewî bazî dikin hin meylê evrazî dikin
Xweş reqs û şehbazî dikin sergeşte ne d'halê xwe da (9/127)

### 1.2.5.3. Lerzîn, Cezbe û Ta

Cezbe, ew wecd e ku di sohbet, zikir û meclisa semayê de, di dilê ehlê ‘îrfanê de, ji ber warîdatan peyda dibe.[402] Lerzîn, cezbe û ta, ji ber tecelliyên Xwûda çêdibe. ‘Eşqa nûra layezal, dema husn û cemalê xwe yê bêmîsal hil kir û ‘alem hate wucûdê û pê rohnî bû, remzên Xwûda weke fecra sadiqî, di dilê ‘aşiqî de derhatin. Ji ber tecelliyên îlahî, ‘aşiq dilerize, dikeve tayê û cezbeyê. Ew kesê ji dil de bibe mubtelayê nûra Subûh, di dilê wî de bi sedan birîn, lerizîn, cezbe û ta peyda dibin.

'Işqa ji nûra layezal husn û cemalê bêmîsal
Îsandi yelmûm û şemal dîsa xwe lê perwane da (9/5)

Subhan ji remza Xaliqî nûra sipêda sadiq î
Avête qelbê 'aşiqî lerzîn û ta û cezbe da (9/9)

Herkesê muhbet ji rûh e mubtela’y nûra subûh e
Wî di dil da sed curûh e cezbe û lerzîn û ta ye (95/25)

Cezbe dil da dihejînit ji me nûr bi şan
Nale ji rengê ceres în û ceres în (80/6)

‘Aşiq bi nêzikahiya mehbûbê, dikeve cezbeyê. Dema ‘aşiq bizane ku dê wuslat peyda bibe, ji ber wê heyecanê dilê ‘aşiq dilerize û cezbe peyda dibe. Di derbarê bihîstina her tiştê yarê de, heyecanek li ‘aşiqî peyda dibe. Behskirina wesfên mehbûban, ji bo kul û derdên ‘aşiqî derman e. Medh û senaya mehbûbê, ji qelban re weke qûtê ye. ‘Aşiq bi vê dizane û dema dengê medha xûban dibihîze dikeve cezbeyê û ji hişê xwe diçe.

Kesê ku yek divêtin sohtiyê bi ulfetê
Şevan ku wî xew têtin ji tîra mehebbetê
‘Aşiq li pey wê têtin ji cezb û ji firqetê (132/30)

Wesfên di mehbûban li daxên kul heyat in

[402] Hasan Kamil Yılmaz, “*Cezbe”*, DİA, İstanbul 1993, c. 7, r. 504.

Qût e ji bo qulûban gulav qend û nebat in
Ji nexmeya medha xûban ‘aşiq bi cezbe hatin (132/40)

Cezbe û seyr û sulûk, bi ‘eşq û muhebbetê çêdibin. Eger ‘eşq û muhebbet nebe, feydeya cezbê ji salikê re çênabe. Ji ber vê yekê, mehbûbê, bi destê xwe yê cazîbedar, cama ‘eşqê pêşkêşî ‘aşiqî kiriye. Bi wê meyê re, cezbeyek ketiye dil û canê ‘aşiqî û dil û can ji hev cuda kirine û ‘aşiq heyirî û şaş maye. ‘Aşiq, ji ber unsûrên husn û cemalê mehbûbê, ketiye cezbeyê û bêhal e. Eger ew husn û cazîbeya ku mehbûbê di dilê ‘aşiqî de hilkirî, nebûya, te’m û meyla zulf, xet, xal û bejna yarê çênedibû.

Wan di reqsê da ku dîm awir peyapey dane min
Berq û tîrê şeran li dil da cezbeya ‘işqê revam (77/6)

Cezbe û seyra sulûkê bê mehebbet nabitin
Cehdeya bê'işq û hubb çendî ku kir bê feyde bû (104/8)

Cezbeyê dil ji wucûd bir xef ji ber 'eynê hesûd bir
Min bi mihrabê sucûd bir lê hecer nîşane ye (97/12)

Ew hemî vêkra me dîn têkil di çerxê carekê
Her ji wan bêhal im ez ehwal û 'işq û cezbe ye (93/15)

Yek di zatê surşîrînan bû cemal û husn û sur
Yek di qelbê ehlê dil nar û celal û cezbe bû (104/5)

Husn û sur ger tu neyîn cezbe li dil det mehbûb
Me ji zulf û xet û xal û qed û meyyalî çi hez (62/5)

Di çêkirin, nîzam û întîzama ‘alemê de mukemmeliyek heye û mehbûbî mohra xwe li wê înşayê daye. Alem darek e û însan jî bi wê darê ve meywe û sultanê ‘alemê ye û herdu jî bi xuliqandineke bêmîsal hatine wucûdê. Şa’ir, ji ber wan eşkal û wesfên husna munezzeh ku ji ‘eyb û kêmasiyan dûr in, bûye mubtela û cezbeyek ketiye dilê wî.

Însan ber e 'alem dirext sultan ji xelwet hate text
Pê zeyyinîn îqbal û bext dewlet ji bala tale da (9/135)

Ehsen ji vê nezmê Mela eşkal û ewsafên cela
Lew dil bi wan bû mubtela cezbe'w celal e d'sîne da (9/143)

### 1.2.6. Mekanên Tesewwifî

#### 1.2.6.1. Dergah û Asîtan

Dergah û asîtan, mekanên faaliyetên îrşadê yên pîrên terîqetê an jî cihên îkameta şahan in. Di dîwanê de ji bo cih û mekanê mehbûbê bi îstî'areyî hatiye bikaranîn. Şemsa dewletê, asîtana mehbûbê ziyaret dike ku dîdarê wî yê şerîf pir nûr bibe. Şa'ir jî dixwaze ji asîtana dewletê dûr nebe ku fermanên mehbûbê yên mukerrem bîne cih. Kesê ku daxwaz û arzuyeke wî hebe, berê xwe dide asîtan û dergaha mehbûbê, lewra ew kesên ku xatirê wan tê qebûlkirin jî, dîsa ricakarê wê derê û dergehê ne.

Lew ziyaret asitanê te bit şemsa dewletê
Ta sehergahan ji dîdara şerîf purnûri bî (117/4)

Ji asitanê dewletê xaib nebî carek Melê
Da ji fermana mukerrem dem bi dem me'mûri bî (117/23)

Biçîn werdan ji gulzaran ku exyaran di dest xar in
Ji mexsûsanê dergahî du'a min ew di hecrê da (5/33)

Her kesê qestek di dil dê qestê dergahê te kit
Ê di xatir ercû kit dê her recukarê te bî (116/17)

Çûna dergahê nîşana wuslatê ye. Mehbûb, 'aşiqî bi tûlên asîtanê re vedixwîne dergahê. 'Aşiq, bi vê mu'emeleyê kêfxweş e, lewra Mewla, şefqet li wî kiriye û wî bi çavên xwe mehbûb dîtiye û wuslat peyda bûye. 'Aşiq, bi asîtanê muşerref dibe û di wî baxçeyê weke gulistanê de dilberan jî (şahid) dibîne. Li ber deriyê dergahê û li ber asîtanê tûleyên mehbûbê her daîm hene. 'Aşiq jî, ji bo ku her daîm mehbûbê bibîne, dixwaze weke tûleyê li ber derîzanê bimîne. Ew di vê derbarê de bexîliya tûleyan dike. 'Aşiq, ji Xwûda lavahiyan dike ku lutf û rehmetê li wî bike û wî jî ji ber derîzanê dergehê (ji ser rêya heq/siratê musteqîm) dûr neke. 'Aşiq, ji bo ku mehbûbê bibîne, li ber deriyê dergahê, razî ye ku bibe kulmek ax jî.

Bi tûlên asitanê ra vexwendim mîr bi dergahê
Bi vî çavî hebîb dîtim şukur ev şefqe Mewlê da (5/31)

Bûm şerîf ez b'asitanê şahidên wê gulsitanê
Saqiya cam cam didanê kewkeban seywan veda ye (96/11)

Bênîşanên me nîşan kî Mah û Xurşîdê qiran kî
Bende kelbê asitan kî dûr nekî xweş tûle ye (97/42)

Di rê da xakê dergah im belê ewwel ji vê xakê
Bila bê paye û cah im me pê çû ferqê eflakê
Şikarek der rehrê şah im ji wê bend im di fitrakê (131/29)

‘Aşiq, di destê mehbûba şahê cîhanê û Yûsûfê dewr û zemanê de hêsîr e, lê haya mehbûbê jê tune. ‘Aşiq, li ser rêya asîtanê bûye ax ku dema mehbûb bê, bi damenê (pêşmal) wê bigire ku yar wî muhatab bigire û bibêje ev hêsîr û belengaz kî ye. ‘Aşiq, li ber deriyê mehbûbê (li asîtanê), weke tûleyê nêçîrê ye. Lêbelê mehbûb pirsa wî nake û wî nayîne bîra xwe. ‘Aşiq, mu’emeleyên neyênî jî weke îltîfatekê qebûl dike û wan mu’emeleyan, derbarê muhatabgirtinê û bibîranînê de dihesibîne.

Purs nekir şahê cehanê Yûsufê dewr û zemanê
Ev çi xak e l'asitanê bel esîrek j'ên me ye (97/21)

Bûme xak ez lew ji rê ve da dema yar bê ji wê ve
Damenê bigrim ji pê ve çendekê min cehde ye (97/22)

Da ziyaret kim nîşanê ber Zuhel bêtin qiranê
Tûle yim ser l'asitanê çehvenêra mûçe ye (97/41)

Li kelbê asitanê xwe nepursî qet hebîb carek
Gelo naête bîrê em di vê nêçîr û ravê da (5/17)

Min divê ser l'asitanê her wekî tûlan nihim
Belkî carek keyl bipursit ev çi mehrûm tûle ye (93/26)

Axa derîzana (asîtan) mehbûbê, ji ‘aşiqî re derman e. ‘Aşiq, ji bayê sûbê dixwaze ku biçe asîtanê, yarê bibûse û lavahiyan ji yarê re bike ku ew lê bête rehmê. Halpirskirina ‘aşiqî û axa asîtana yarê, dermanên birîna ‘aşiqî ne û birîna wî bi wan dikewe. ‘Aşiq, bûsezenê asîtana mehbûbê ye, li ber derîzana wê, ji bo ramûsana asîtanê qûr bûye û weke mayîna di secdeyê de, maye.

Dilberê da tu bibusî bi dused zarî û lutf
Asitan û der û dîwar û şibakên qelehê (110/3)

Belku dilber ji ruyê 'adilî û merhemetê
Rehmekê kit li feqîran weh bipirsi gilehê (110/5)

Ji axa asîtanê meskenê xwe
Li daxa ta bibînim xweş sebatîz (46/4)

Bûsezenan her kî ber an asitan
Meskeni min cebhetihî la burah (32/8)

### 1.2.6.2. Xaneyê Xemmarî

Xaneyê xemmarî, bi îstî’areyî di cihê meyxaneyê de hatiye bikaranîn. Meyxane jî di tesewwûfê de sembola dergah û tekyayê ye. Di van mekanan da, ‘evd, bi ‘eşq û şewqê du’a û îstîxfarê dikin.[403] Kesê di rêya heq de niyeta wî xalis be û baweriya wî bi destnimêja wî hebe, eger xirqeyê xwe di xaneyê xemmariyê de wek rehîne jî hiştibe ne xem e, dê ew wî xirqeyê dîsa bi dest bixe.

'Eqda ihramê di 'işqê da ku pîrê 'işqê best
Dê çi xem ger xirqe rehnê xaneyê xemmarî bit (19/7)

### 1.2.7. Navên ‘Umûmî yên Ehlên Tesewwûfê

### 1.2.7.1. Ehlê ‘Eşqê (Pîrê ‘Işqê, Salikê ‘Eşqê, Birîndarê ‘Eşqê, Şehîdê ‘Eşqê)

Mijara dîwana Cizîrî ya sereke ‘eşq e. Muntesibên ‘eşqê jî gelek in û xusûsiyetên wan jî, ji hev cuda ne. Ehlên ‘eşqê, bi goreyî taybetmendiyên xwe yên xusûsî, bi ‘eşqê re têkildar bûne. Ehlê ‘Eşqê; bi navên weke pîrê ‘işqê, şehidê 'işqê, mecrûhê ‘eşqê, birîndarê ‘eşqê, salikê ‘eşqê, Xusrewê ‘eşqê, badenoşê ‘eşqê derketine pêş.

Murîdê di niyeta xwe de samîmî be, xwe û îradeya xwe teslîmî şêxê xwe bike û daxilî sohbetên wî bibe, şêx, bi ‘ilmên ji Xwûda hilgirtî, cehd û xîreta bi cihanîna emir û nehyên Xwûda, murîdî ji aliyê me’newî ve perwerde dike û bi wê îrtîbatê, murîd, mertebeyên seyrûsulûkê derbas dibe. Wergirtina xirqeyî (lûbsê xirqe), di navbera şêx û mûrşîdî de têkiliyê datîne. Murîd, eger ji bo tercîhkirinê, di navbera şêx û nefsa xwe de bimîne, dê ew hakemîya şêxê xwe qebûl bike.[404]

Salikê ‘eşqê, îradeya xwe teslîmî murşîdê xwe dike. Ew tewbeyên xwarî jî, piştî têkilîdanîna di navbera wî û murşîdê wî de bêhukum dibin û salik bi tewbeyeke nasûh, tewbe dike. Xusûsiyetên salikên ‘eşqê gelek in û ew xirqeya ku pîrê terîqê dixe ber murîdî, weke xirqeyê şehzadeyan payebilind e û dê bi wê xirqeyî mertebeyan xweş derbas bibe û bigehije meqamên bilind. Salikê ‘eşqê, weke Xusrew, sultanê ‘eşqê ye. Dema li ser textî rûnişt (bi destxistina meqamên bilind), deriyên ‘ilm û ‘irfanê jê re

---

[403] Cebecioğlu, “Meyhane”, b.n.b., r. 336.
[404] Erginli ûym., “Hırka”, b.n.b., r. 370.

vedibin û ruhê wî dibe hakimê her tiştî. Salikê ‘eşqê bi derbaskirina meqaman dema bû pîrê terîqê, ji murîdbûnê xilas dibe. Pîrê ‘eşqê, bi samîmiyetê mertebeyan derbas bibe, êdî hewce bi rêberiya murşîdî nake. Lewra xirqe di navbera murîd û şêxî/murşîdî de nîşana têkilîdanînekê ye. Sermayeya ehlê terîqê, badeya ‘işqê ye. Ewê ji wê badeyê vexwarî, mehw dibe, tune dibe (fanafîllah) û digehije beqayê.

Neyşekerên şirînzeban mest û bi cama û bade yîn
Ferz tibit ji tewbeyê salikê ‘işqê tewbe ferz (56/4)

Salikên 'işqê yeka yek hewce nînin ez bibêm
Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû (104/9)

Xusrewê ‘işqê ku rûnişt li ser textê wucûd
Fetehe’l-qelbe ‘elel-fewri we li’r-rûhi melek (70/7)

'Eqda ihramê di 'işqê da ku pîrê 'işqê best
Dê çi xem ger xirqe rehnê xaneyê xemmarî bit (19/7)

Ê birî 'eynê beqayê badenoşê 'işqê bû
Ê bûyî mehwê fenayê 'aşiqê bêçare bû (104/11)

Birîndarê ‘eşqê, ji ber firqetê di nexweşiyeke dijwar de ye. Ew qas ji mehbûbê dûr ketiye, nagehije siha wê jî. Bulbul jî, wek ‘aşiqekî, mecrûhê ‘eşqê ye. Dixwaze êstiriyên li derdora gulê (reqîb, ‘emelên ku însên ji Xwûda dûr dikin) jê bikevin û wuslat peyda bibe, lewra êdî, ji ber êşa birînê, tehemmûla wî ji reqîban re nemaye. Dermanê kul û rîşên dilê bulbulê, guleke bêxar a nûbişkiftî ye. Êstirîyên gulê dema peyda bûn, ji ‘aşiqî re rehetî û aramî êdî tune.

Birîndarê 'işqê me dûr im ji siha bihan
D’zanin meddahê kê me d'hezar û yek û sihan
Senaxwanê Melê me li hemû ‘erd û cihan (132/49)

Bulbulê mecrûhê 'işqê taqeta xaran nehin
Dê kulafa rîşê sîne bişkowek bê xarî bit (19/12)

Ehlê ‘eşqê her daîm birîndar e, lewra êrişên mehbûbê domdar in. Tîrên ji qewseynan dibarin, li egera ‘aşiqî dikevin û wî tarûmar dikin. Xwûn ji dev û mêlakan bête der, ew şehîd dibe û êdî hişyarbûna wî ne mumkin e, ew digihije fenafillahê û sewaba şehîdiyê bi dest dixe.

Wer ji qewseynan bi mîzan bête der cotek xedeng
Dê ceger bit pare pare sîne tar û marî bit (19/9)

Xwûn ji mêlakê bi derba xencerê ma bête der

Bû şehidê 'işqê êdi dê ji ku hişyarî bit (19/10)

### 1.2.7.2. Ehlê Meqamatê Terîqê

Ehlê meqamatê terîqê, ew talîb e ku dixwaze bikeve rêya sulûkê. Sulûk di nefsê de dest pê dike û destpêka wê jî tewbekirin e. Hişyariya qelbê ehlê meqamatê terîqê wî digihijîne wuslatê (fenafîllah) û ev jî meqama dawî ye û salîk bi vê meqamê baqî dibe.[405] Ew kesên dixwazin bi meqamatên terîqê bigehijin heqiyê, ketine rêya seyr û sulûkê û hinekan rêya sifetên celalê, hinekan jî rêya sifetên cemalê hilbijartine û herçendê rêyên wan ji hev cuda bin jî, sermayeya wan badeyê 'eşqê ye.

Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr
Hin celal û hin cemal û sermeyan ev bade bû (104/10)

### 1.2.7.3. Ehlê Dilan

Ehlê dil, 'aşiqê heqîqî ye. Ew qiymetê nade mal û milkê dunyayê, di dilê wî de her daîm hubba Xwûda heye û dixwaze bigihije wuslatê. Di navbera ehlê dilan û husnê mutleqê de perde heye, lê dîsa wan bi xeybê bawerî anîne û berê xwe dane qibleyê.

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê
Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê (122/3)

Bi teqdîr û hikmeta Xwûda, husn û hubb ('aşiq û me'şûq) ji hev cuda dibin û bi navê hudûsê peyda dibin. Sifetê husnê, di zatê dilberan de, dibe husn, cemal û hubb û di dilê ehlê 'eşqê (ehlê dil) de jî, bi sifetê celalê, dibe nar û cezbe.

Husn û hubb zatê qedîm in lê cuda bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûsê li hukmê tefsîl bû (104/4)

Yek di zatê surşîrînan bû cemal û husn û sur
Yek di qelbê ehlê dil nar û celal û cezbe bû (104/5)

'Aşiq daxilî meclisê dibe û mehbûba mehcebîn qedeheke nûranî pêşkêşî wî dike. Piştî vê qedehê, di dilê ehlê dilan de, nûra Wehdetê mutleq tecellî dibe û wê derê veduguherîne weke ayîneyekê û sirrên hikmetê lê peyda dibin, lêbelê hinek ehlê dilan ji aliyê tecellîbûnê ve di şubhê de dimînin, yanî ewên şubhedar, hêj negehiştine meqama heqqelyeqînê. Di rêya sulûkê de pêwîst e 'aşiq fena bibe. Me'şûq di 'eşqa xwe de wî tune dike ku di zatê wî de heyîneke nû derkeve (mecmer dişewite bêhna

[405] Uludağ, "Sülûk", b.n.b., c. 38, r. 127-128.

xweş jê tê) û baqî bibe. Dema ehlê dilan, bigehijin meqamên bilind, sirran aşîkar dikin û derbarê me’rîfet û hikmetê de agahiyan didin.

Daxilê meclis bûyî îşev Nîşanî lew ku xef
Camê reyhanî li ehlê dil neşandin mahê new (103/7)

Wehdetê mutleq Mela nûr e di qelban cela
Zori di vê mes’elê ehlê dilan şubhe ma (8/12)

Wê beglerê pur kuştine enguşt bi xûnê riştine
Ma ehlê dil qet hiştine sohtîne mislê mecmerê (113/3)

Ew cezme dayî merkezan êy dil ji ber şewqê lezan
Hikmet bi qanûnê bizan ehlê dil ev jê gufte da (9/130)

#### 1.2.7.4. Erbabê Dil û Ehlê Sefa

Erbabê dil û ehlê sefa, xweyî hinek xusûsiyetan in. Pêwist e dilê xwe ji nîfaqê bişon, paqij bikin ku sîneya wan saf û berraq bibe ku tecellî di wê derê de peyda bibin û me’rîfet û hikmet xwe tê de nîşan bidin. Dema ev taybetmendî hatine bidestxistin, êdî ew zat dibe ‘arif û dikare bi ehlê dilan û ehlê sefayê re hemrahiyê bike û bikeve aramî û sefayê.

Dil bişo wer ji vê nîfaqê ku bidit sîne beraqê
Bi sefa hemrehê erbabê dil û ehlê sefa be (94/19)

#### 1.2.7.5. Ehlê Hal

Ehlê hal, ehlê heqîqetê ye û tiştê ku bizane û baweriyê pê bîne, di heyata xwe de tetbîq dike. Ew sirrên fenafillahê dizanin û dibine mezherên tecelliyên îlahî.[406] Ehlê hal û xubperest, ji aliyê dildayîn û bengîtiyê ve weke hev in. Herdu jî serxweş û mest in û li derdora tiştê ku hez jê dikin, diçin û tên. Di ‘umrekî de, meşxûliyet û îdîaya wan, bi destxistina wî tiştî ye ku hubba wî di dilê wan de heye.

Çû tewafa pê û destan şubhetê sekran û mestan
Ehlê hal û xûbperestan wan ji 'umr ev mudde'a ye (96/20)

Ehlê hal, bi dîtineke maddî dibîne, lêbelê di nezera ehlê ‘îrfanê de nêrîneke batinî heye. Herdu birûyên mehbûbê, di dilê ehlê ‘îrfanê de tişteke batînî ye, lêbelê di nêrîna ehlê halî de ew ebrû weke taqê mihrabê têne xwûyakirin (yek ji aliyê maddî ve û yek jî, ji aliyê me’newî dinêre).

---

[406] Cebecioğlu, “Ehl-i hal”, b.n.b., r. 143.

Di batin secdegaha min ji bo wê herdu ebrû ne
Bi 'eynê taqê mihrab in di 'ilmê ehlê hal ebrû (106/11)

**1.2.7.6. Ehlê Besaretê**

Besaret; îdraq, feraset û dîtina bi qelbî ye. Bi nûra qudsiyetê perdeyên li ber qelbî têne rakirin û heqîqeta eşyayê û mahiyeta wê ya batinî, ji aliyê ‘arifî ve tê dîtin.[407] ‘Arifên ehlê besaretê, di nav qeba û ‘ebayên xwe yên reş û spî de xwe veşartine, her kes wan nas nake, lêbelê nêrînên wan tûj in û bi çavên qelbî, mahiyeta eşyayê û sirrê bûyeran dizanin.

‘Arifên ehlê besaret ji neseq merdumê çeşm
Surmepoş in di beyadê qebaya xwe ye reş (54/10)

**1.2.7.7. Ehlê Xerabatê**

Xerabat, meyxane ye û bi îstî’areyî di cihê dergah û tekyayê de hatiye bikaranîn. Ehlên Xerabatê jî ew sûfî ne ku ji maddiyatên dunyayê dest kêşane û nefsa xwe jî kuştine. Wan, ji bo avakirin û înşakirina axireta xwe, hem dunyaya xwe hem jî nefsa xwe xirab kirine.[408]

Pîrê xerabatê, murşîd e û ji bo perwerdehiya murîdên xwe dixebite. Murîd îradeya xwe teslîmî pîrê xerabatê dike û emrên wî bêtereddût tîne cih. ‘Aşiq jî rindê xerabatê ye, ji aliyê maddî û dunyewî ve, naxwaze kesek tiştekî ji wî hêvî bike. Gunehkirin û zahidîtî ne karê ehlê xerabatê ye, ew kesê di deriyê xerabatê de bikeve hundir, pêwîst e ji usûl û qa’îdeyên ehlê xerabatê re rî’ayetê bike. Xerabatê muxan, şeraba ‘eşqê belav dike û dide murîdan. Pêwist e murîd xwe bigehînin wê şerabê, xirqeyê xwe yê riyakarî û hîleyê bavêjin û meya safî (‘eşqa heqîqî) ji wî pîrî bistînin. Şa’ir xwe ji ehlê xerabatê cuda dike û dibêje, ji ber qedeha ‘eşqê ya ezeliyetê, hêj ew mest û xerab e û dê heta ebedê jî her wisa bimîne.

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatê
Bibêjit secde bin latê muridê wi dibin qatê (4/5)

Bi heq rindê xerabat im ji dêrê vê demê hatim
Çi hêvî hûn diken îro ji vî rindê xerabat (23/17)

Gunah û zuhd û ta’at hilnagirit xerabat
Kesê bi vî derê ret divê biket ri‘ayet (24/5)

---

407 Cebecioğlu, “Basiret”, h.b., r. 69.
408 Cebecioğlu, “Harabat”, h.b., r. 196.

Bi meyê safî bideyn xirqeyê zuhd
Bi xerabatê muxan er biresîn (80/13)

Ji ezel Heq bi Melê daye ji 'işqê qedehek
Ta ebed mest û xerab în ji meya wê qedehê (110/15)

#### 1.2.8. Ewliya û Mezinên Terîqetê

##### 1.2.8.1. Me'rûfê Kerxî

Me'rûfê Kerxî (wefat, 816), ehlê tesewwifê ye. Ew dostê bayê wuslatê ye, di terîqetê de nimûneyê sereke, di rêya heqîqetê de rêber, aşînayê sirrên şêxîtiyê û qutub û efendiyê 'aşiqên wextê xwe bûye. Keramet û riyazatên wî gelek in û di futûwwet û teqwayê de kesekî namdar bûye.[409]

Me'rûfê Kerxî, di dîwanê de ji bo beyankirina husn û tecelliyên îlahî hatiye zikirkirin. Kerxî, di nav ehlê tesewwûfê de weke stêrekê hatiye dîtin. Çawa di asîmanan de stêr 'ezemet û mezinahiya Xwûda nîşan didin, her wisa di dunyayê de jî qutubên weke Kerxî, bi me'rîfet û hikmetê, mezinahiya Xwûda beyan dikin. Şa'ir, di nav ehlê tesewwûfê de xwe bi Me'rûfê Kerxî re muqayese dike. Ew jî, xwe 'arifê zemên dihesibîne û dixwaze pîrekî terîqetê yê weke Me'rûfê Kerxî bê û wî bibîne û mezinahiya wî tesdîq bike.

Da kifş bibin kewkeb ji çerx rabin hezar Me'rûf ji Kerx
Şiblî û Sedî'w alê Ferx 'işqê di wan keşfa xwe da (9/33)

Kerixîn em di qiyamê me ji dil perde dirand
'Arifê weqt im û Me'rûfi bila bêt ji Kerx (37/4)

##### 1.2.8.2. Hellacê Mensûr (Ebu'l-Mugîs el-Huseyn bin Mensur el-Beyzawî)

Hellacê Mensûr (mirin, 921), di rêya Xwûda de, bûye şehîdê Heqqiyê. Ew, di nav alavên firaqê de, mest, bêqerar û di halekî perîşan de bûye. Di derbarê heqîqet, sirr, me'rîfetê de berhemên wî hene û ew berhem, ji aliyê me'nayê ve gotinên zor in.[410] Hellacê Mensur, di edebiyatê de ji ber gotinên xwe yên şatahatî derketiye pêş. Ew, bi şetahata "enelheq"ê hatiye tawanbarkirin û hatiye kuştin. Herçendê Hellac wek mulhîdekî hatibe dîtin û kuştin jî, lê piştî kuştina wî ew weke şehîdekî mezlûm hatiye dîtin. Herwekî di sala 1266ê de, filozof û mutesewwif Nasiruddînê Tûsî şehadeta wî

---

[409] Feridüddîn Attar, Evliya Tezkireleri, (Wer. Süleyman Uludağ), Kabalcı Yayınları, İstanbul 2007, r. 305
[410] Feridüddîn Attar, h.b., r. 527.

teqdîs dike qebra wî ji nû ve dide çêkirin.[411] Hellacê Mensûr, di edebiyatê de bûye sembola wan kesên qehreman ku di rêya ‘eşq û baweriyê de, mirina xwe didin pêşiya xwe û xwe feda dikin. ‘Aşiq, di rêya ‘eşqê de Hellac e û ji bo mehbûba xwe razî ye ku bête darvekirin. Dema zulfa yarê dibe sêdar, ‘aşiq jî dibe Mensûr û bi zulfa yarê ya weke sêdarê ve tê darvekirin.[412]

Hallac ji ber sedemên siyasî hatiye kuştin. Wî du peyv gotine ku Îslamê ew gelemperî bexşandiye lê tu carî ji bîr nekiriye ku gotiye “Enel’l-Heqq” (Ez Heqq im). Bi goreyî Hallacî, însan di ‘eslê xwe de îlahî ye, lewra Xwûda Adem di sûretê xwe de afirandiye. Xwûda, sûretê ‘eşqa ezelî di zatê xwe de daye der ku weke dîtina di neynikê de xwe muşahede bike. Hallac, derbarê hulûlê de şatahatan beyan dike û şatahatên wî ji aliyê hinek ehlê tesewwifê û kelamê ve têne redkirin. Piştî salan, Mela jî di nav de, gelek ehlên tesewwifê piştgirî dane Hellacî û ji ber hinek sebeban ew parastine. Hellac li hember Heqq guneh nekiriye, lêbelê li hemberî şerî’etê suncekî mezin kiriye û bi heqdarî hatiye cezakirin. Hallac, ew sirra Rebbê xwe ku ji bo kesên bijarte hatibû veqetandin, îfşa kir û ji sirrê re îhanet kir. Hellac, di bin tesîra serxweşiya wecdê de xeber da, di esliyetê de xwe bi sifeteke îlahî nîşan da, lê belê zenn kir ku bi zatê îlahî re bûye yek. Ji ber ku wehdeta îlahî hemû heyîn dorpêç kirine, Hellac jî xwest ku beyan bike, di esasê xwe de di navbera Xwûda û afirîdeyan de ferq û cudahî tune. Ew kesê bi temamî ji nefsa xwe ya zahirî azad bibe, bi nefsa xwe ya heqîqî ve heyî dibe ku ew jî Xwûda ye.[413]

Melayê Cizîrî, ji ber gotina şatahatên Hellacê Mensûr, di çend beytên xwe de, ew bi bîr aniye. Bi goreyî Melayê Cizîrî, Hellacê Mensur ew şatahat di meqama fenayê de gotiye û ji ber vê yekê me’zûr e. Cizîrî, dibêje ku ew jî gehiştiye wê meqamê, lêbelê li ber deriyê wê meqamê, ew xwe weke ‘evdekî heqîr dibîne.

Ger çi ji çeşmê enna ‘alem Mela kir fena
Dûne fena babikum innehu ‘ebdun eqel (73/10)

Hellacê Mensûr, ji ber heraret û îştiyaqa wuslata îlahî, sirrên xwe aşîkar kirine. Şa’ir, coşbûn û şewitîna dilê xwe, bi Hellacê Mensur re muqayese dike. Hostayê ‘eşqê (Xwûda), agirê evînê berdaye dilê ‘aşiqan û serî heta binî ew ji ber ‘eşqa îlahî şewitîne.

---

411 M. Louis Massignon, İslam’ın *Mistik Şehidi Hallâc-ı Mansûr’un Çilesi*, (Wer. İsmet Birkan), Ardıç Yayınları, 1. Kitap, Ankara 2006, r. 85.
412 Canım, b.n.b., r. 276-277.
413 Nicholson, b.n.b., r. 129-130 .

Dilê şa’ir jî, ji ber wê şewitînê fena dibe û digihije mertebeya fenafillahê û ew jî weke Hellacê Mensur dibêje “enelheq”. Mehbûbê, bi lebên xwe yên weke le’lî, şa’ir ji husn û xubê xeberdar kiriye. ‘Aşiq, ewilî di wêraneya hewayê de zerreyek bûye û weke rojê, bi tirêjên tecelliyê ew xwûya bûye û meşhûr bûye. Çawa Mensur hatiye darvekirin û bi sêdarê ve çûye û hatiye, mehbûbê jî ‘aşiqê xwe bi çengelên zulfa xwe ve girêdaye û weke Mensûrî dibe û tîne.

Hostayê ‘işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot
Remza “enelheq” her tigot bawer bikin Mensûr e dil (74/3)

Dil Ke‘beya Mewla ye lê narê Kelîm îsaye lê
Bangê “enellah” daye lê hem Ke‘be û hem Tûr e dil (74/7)

Zerreyek bû bi hewaya te di wîrane nekî
Mislê rojê bi şu’a’a xwe te meşhûri kirin (78/7)

Ji "enel heq" bi lebên le'lî xeberdar kirin
Bi gulaba serê zulfa xwe te Mensûri kirin (78/8)

#### 1.2.8.3. Şiblî (Ebû Bekr Dulef bîn Cehder eş-Şiblî)

Şiblî (wefat, 334/946), mutesewwifekî namdar bûye. ‘Eslê wî ji Xorasanê ye û demekê walîtiya Denbawendê kiriye. Di hengameya walîtiyê de, di bin tesîra Xeyr en-Nessac de dimîne û dest ji walîtiyê berdide û xwe dide tesewwûfê. En-Nessac, wî dişîne bal Cuneydê Bexdadî, ew perwerdehiya tesewwûfê ji Bexdadî hildigire. Şiblî, bi şatahatên xwe ve namdar e û ew jî hevalê Hellacê Mensûr e. Di derbarê Hellacî de weha gotiye: “Ez û Hellac, em yek tişt bûn; dîwanetiya min ez xilas kirim, lêbelê, ‘eqlê Hellac ew têk bir.”[414] Herçendê, mîzacê Hellac û Şiblî ji hev cuda jî bin, lê belê dostanî û samîmiyeta di navbera wan de gelekî xurt û kûr bûye. Piştî kuştina Hellac, bi tenê Şiblî şahidê arzûyên derasayî yên Hellac bûye û muhebbet û heyraniya xwe di hinek wecîzeyên xwe de beyan kirine.[415]

Şiblî, wek mutesewwifekî mezin, ji bo tesîra beyankirina ‘eşqa îlahî hatiye bibîranîn. ‘Eşqa îlahî, xwe di wan zatên mezin ên ehlê tesewwûfê de kişf kiriye.

Da kifş bibin kewkeb ji çerx rabin hezar Me'rûf ji Kerx
Şiblî û Se’dî'w alê Ferx 'işqê di wan keşfa xwe da (9/33)

---

[414] Dilaver Gürer, “*Şiblî*”, DİA, İstanbul 2010, c. 39, r. 125-126
[415] Massignon, b.n.b., r. 133.

### 1.2.8.4. Ferxî/Ferrûxiyê Sîstanî (Ebû Hesen Eliyê kurê Cûlûx)

Ferxî (wefat, 429/1037-1038), şa'irekî îranî yê serdema Sultan Mehmûdê Xeznewî ye. 'Eslê wî ji Sicistanê ye û di qesîdenivîsînê de namdar bûye û dîwaneke (ji 9564 beytan pêk tê) wî heye. Wî, li ser gelek rayedarên dewletê qesîde nivîsîne. Mersiyeya wî ya li ser mirina Sultan Mehmûdê Xeznewî, di vê qadê de şaheserek e.[416]

Ferrûxiyê Sîstanî, di dîwanê de ji bo 'eşqê hatiye beyankirin. Ferrûxî, sûfiyekî namdar û salikê 'eşqa îlahî bûye. Navê wî, ji bo beyankirina tecelliya 'eşqa îlahî hatiye zikirkirin. Melayê Cizîrî, di beytekê de jî, xwe bi Ferrûxî re muqayese dike û dibêje, ez pîrê şa'iran im, şalfiroşê şi'rê ez im û Ferxî li nik min weke çêjikekî ye, yanî hêj 'ecemî ye li ber hostatiya min.

Da kifş bibin kewkeb ji çerx rabin hezar Me'rûf ji Kerx
Şiblî û Sedî'w alê Ferx 'işqê di wan keşfa xwe da (9/33)

Pîrê şe'ar e te di şi'rê Melê şalifiroş
Lew nîşan min mede Ferxî ku li nik min bûye ferx (37/6)

### 1.2.8.5. Hatemê Tayî [Ebû Seffane (Ebû Adî) Hatîm bîn Ebdillah bîn Se'd et-Taî el-Kahtanî]

Hatemê Tayî (wefat, 578?), ew kes e ku di dewra cahiliyê de, bi camêrî û comerdiya xwe ve namdar bûye. Wî dîwanek nivîsiye û di dîwana xwe de medhê comerdiyê kiriye û sedema comerdiya xwe jî wek rizaya îlahî nîşan daye. [417]

Şa'ir, di qesîdeyekê de, du'ayan ji memdûhî (mîrê Cizîrê) re dike û dixwaze ew jî weke Hatemê Tayî, di ihsan, ikram, bexşandin û comerdiyê de, binavûdeng bibe û navê wî jî di cîhanê de belav bibe.

Paşê Newşîrwan dibêm dê hakimê 'adil tu yî
Mislê Hatem da bi danê der cihan meşhûri bî (117/9)

---

[416] Tahsin Yazıcı, "*Ferruhî-î Sîstanî*", *DİA,* İstanbul 1995, c. 12, r. 410-411; Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., c. 1, r. 337.
[417] Süleyman Tülücü, "Hatim et-Taî", *DİA*, İstanbul 1997, c. 16, r. 472-473.

## BEŞA DUYEM

## 2. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI CEMIYETÊ / CIVAKÊ HILGIRTÎ

### 2.1. Şexs

### 2.1.1. Hukûmdar û Rêvebirên Dewletan (Padîşah, Mîr, Melîke, Şah, Beg, Xan û Xaqan)

#### 2.1.1.1. Zulqerneyn

Zulqerneyn, wekî împeretorê Makedonê, Îskender tê zanîn. Hinek dîrokzan Zulqerneyn û Îskender wek kesayetên cuda qebûl dikin. Zulqerneny, bi fetihkirina dinyayê û bi çêkirina sûran ku pêşiya Ye’cûc û Me’cûcan girtiye, namdar bûye. Ew bi fetha dunyayê, bûye serbaz û hukumdarekî cîhangîr.[418]

Zulqerneyn, ji bo medihkirina memdûhê hatiye bikaranîn. Şa’ir dixwaze, mulkê memdûhê jî weke yê Zulqerneynî fireh û bêpayan bibe.

Ma te 'umrê Xizr û Nûh û mulkê Zulqerneyn bitin
Gunbeda çerxê melemme' her bi te me'mûri bî (117/17)

#### 2.1.1.2. Xan Şeref

Xan Şeref, yek ji mîrekî Cizîra Botan e û navê wî Şerefeddîn e. Mîr Şeref, kesekî cengawer bûye û Çiyayê Şengalê desteser kiriye û çend ‘eşîrên Kurdan li wê derê bi cih kirine.[419]

Navê Xan Şeref di dîwanê ji ber tîravêjiya wî û burca wî derbas dibe. çawa Cengîz Xan û Teymûrê Leng, di talankirinê de namdar bûne, her wisa jî Xan Şeref, di şerkirin û tîravêtinê de namdar bûye. Melayê Cizîrî, dixwaze keleha Şerefxan (Burca Belek) her daîm ma’mûr/ava bimîne û di wê derê de şahî û kêfxweşî cih bigire.

Sef sef me dîn Hindî û Hebeş Cengîz hat Teymûrê Leng
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan Şeref (64/8)

Daîma menzilgeha sûra te bi burca Şeref[420]

---

[418] Canım, b.n.b., r. 347-348.
[419] Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 412.
[420] Burca Belek, Burca Şeref: Ev birc cihê cihnişîna mîrên Botan e. Mîr Şerefê kurê Mîr Bedrê ‘Ezîzanî, ev burc ava kirîye. Wî ji sala (k. 904/z. 1498)ê heta (k. 915/z. 1509)ê li Cizîrê hukum kirîye. (Melayê Cizîrî, Dîwan, (Amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî), (jêrenot), Weşanên Nubiharê, Stenbol 2012, r. 360.)

Tali'ê ferxende û bextê se'îd yarê te bî (116/3)

### 2.1.1.3. Belqis

Belqis, melîkeya dewleta Sebeyê ye û di Qur'ana Pîroz de hikayeta wê tê qissekirin ku dînê tewhîdê pejirandiye.[421] Di edebiyata klasîk de navê Belqîsê, bi navê Hz. Suleyman Pêxember, Asef û bi navê Hudhudê re tê bikaranîn.Belqisê, dewleteke dewlemend û ma'mûr ava kiriye.

Şa'ir, yara xwe bi Belqisê re diwekîne. Husn û cemalê yarê weke ya Belqisa melîkeya Sebayê ye. Mehbûb di şeklê Belqisê de, wek nar û nûreke pîroz tê wucûdê û bi wî şeklî tecellî dibe. Dema yar weke Belqisê be, 'aşiq jî weke Suleyman Pêxember serbilind e. Hudhudê zimanşirîn, peyamberê 'aşiqî ye, xeberê tîne ji 'aşiqî re ku Belqis dê bê û wuslat peyda bibe. Belqis, weke 'Îsa pêxember e, dema wuslat peyda dibe, 'aşiq weke miriyê di destê Mesîh de, dîsa zindî dibe.

Min dilberek wek durr heye mehbûb û şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye Belqîssifet mesken Seba (11/4)

Ji nar û nûrê teqdîsê tecella kir li min dîsê
Li ser textê xwe Belqîsê hilanîn bêhîcab perde (92/3)

Minnet ji tali' her ji bext Asef bi text û bext û rext
Belqis ewî anî bi text îro Suleyman î Mela (12/15)

Sed hezar bar şakir im ez ku ji Belqîsa perî
Hudhudê şirînzeban îro xeberdarê me ye (93/23)

Suleymanî me ez dîsa seher hudhud bîşaret da
Cewab anî ji Belqîsa bi hal û sur 'îbaret da
Bi can ez xweş kirim 'Îsa dema wî ew îşaret da (131/11)

### 2.1.1.4. Ferfûr (Fexfûr)

Fexfûr, 'unwanê hukumdarê Çînê ye. Li Çînê tasikên porselen ên giranbiha dihatin çêkirin û ji wan re jî fexfûr (kaseya fexfûr) dihate gotin. Tê gotin ku kurê Yafesê kurê Nuh Pêxember, li Asyayê hukumdarî kiriye û navê wî jî Fexfûr bûye. Ev hukumdar (Fexfûr), di dewra Îskender de bûye. Di edebiyata klasîk de, dema memdûh tê medihkirin, ji bo muqayeseyê navê Fexfûrî tê zikirkirin.[422]

---

[421] Canım, b.n.b., r. 250-251.
[422] Canım, b.n.b., r. 268-269.

Melayê Cizîrî, qesîdeyek li ser Xan Şerefê Mîrê Cizîrê wek medhiye nivîsiye û tê de memdûhê û Fexfûrê muqayese dike û dixwaze selteneta Mîrê Cizîrê jî weke ya Îskender û Fexfûrî payîdar bibe. Mehbûb, bi gelek xusûsiyetan ve weke fexfûran e. Ew jî, li ser textê hakimiyetê ye, nazik û nazenîn e, gerdenzirav e û di nav lîbasên qedîfê yên giranbiha de ye. Ew mehbûba weke sultanê Çînê (Fexfûr), sîmbeden, heybetdar û dilbir e û dema xwûya dibe, ji ber 'eşqa wê hiş û dilê 'aşiqî difirin diçin.

Ya Cizîrê şubhê Dara textê heft iqlîmi bit
Da hukm û seltenet Eskender û Fexfûri bî (117/10)

Nazikletîf gerdenxefîf libsê şerîf kemxe'w qedîf
Min dî bi wext ew nîk bext îro li text fexfûri bû (107/3)

Fexfûrsur e sîmadur e heybetpur e pur dilgir e
Ew hate meş min çûne heş dil lew ji 'işqê fûri bû (107/4)

Tasika porselen ku li Çînê dihate çêkirin, bi goreyî şahan dihate neqişkirin û şah û padîşahan tê de şerab vedixwarin. Mehbûb, meyperest e û cama di destê wê de jî fexfûrî ye û weke şewqa heyîvê dibiriqe. Şa'ir, dilê xwe diwekîne şahkaseya ferfûrî (fexfûrî). Dilê şa'irî jî weke kaseya ferfûrî, ji ber tecelliyan, ji ber remz û sirran, ji ber cazîbeya yarê mest û sekran e. 'Aşiq, ji mehbûbê dixwaze ku bi wesla xwe wî weke vexwarina badeya fexfûrî mexmûr bike û bi kaseya fexfûrî, feyzên dilê wî zêde bike.

Dêmfener e xal'enber e bumawer e lebşeker e
Ew meyperest meşha û mest cama di dest ferfûri bû (107/6)

Mey hate fincana sedef kes dê vexut îro bi xef
Saqî bi çeng û nay û def ferfûrîya mehtabi da (2/11)

Remzek nihîn avête dil mihrê ji batin mêhte dil
Şehzadeyê sur rêhte dil şehkaseya ferfûr e dil (74/2)

B'wesla xwe da fexfûr bikî j'wê badeyê mexmûr bikî
Nêv kaseya ferfûr bikî dalan ji xalan dûr bikî (125/12)

Îcazet dî me destûrê perîrengê sifethûrê
Ji nêva zulmet û nûrê binoşîn mey di ferfûrê (124/7)

#### 2.1.1.5. Xan û Xaqan

Ji hukumdarê tirkan re “xan” tê gotin. Xan, rêvebirê serbixwe ye. Ji serokê mîrîtiyên kurdan û di dewra Safewiyan de, ji rêvebirên taşrayê re jî “xan” dihate gotin. ‘Ereban, ji bo hukumdarên tirk, moxol û çîniyan ‘unwana “xaqan”ê bi kar anîne.[423]

Xaqan, bi tîravêtinê ve û bi bejn û bala xwe ve, heybetdar in. Cih û warê xaqanan weke gulşen û gulzarê ye. Şa’ir, di gelek xalan da, xwe weke xan û xaqanan dibîne. Ew di iqlîma gotinê de û di mulkê ‘eşqê de xaqan e, lewra wî derbarê ‘eşqê de gotinên weke le’l û mircanan giranbiha, anîne nezmê.

Feryad ji dest ferqê di dûr în ji sultanan
Tîr e ji lewnê berqê heybeta wan xaqanan
Roj e hatiye şerqê dinalîn ji kovanan (132/18)

Çîmena sultaniyê yek laleyek baxê te bit
Gulşena xaqaniyê xarek ji gulzarê te bî (116/11)

Lew di iqlîmê suxen xaqan im
Sibehê 'îd e'w ez pê zanim (123/2)

Di iqlîmê suxen xaqan rewanbexş û şekerrêz î
Ji neyşekker li ewraqan bi can ra 'enber'amêz î
Ji sîminsa'id û saqan bi sehharî guherrêz î (131/36)

Pur le'l û dur te j'kilkê 'işq anîne nezma silkê 'işq
Der berr û behr û mulkê 'işq me'lûm e xaqan î Mela (12/13)

Mehbûb jî, hem xan e hem jî xaqan e. Di destê wê de cam û tasa badeya ‘eşqê heye û xwe weke kîsra û xaqanan dibîne. Latê husnê û şahê mehbûban ew e, taca serê mehbûban ew e û li ser dilberan weke xaqanan e. Ew, dilê ‘aşiqê xwe dike hedefa tîr û mizraqan û ji celladê xwe re jî dibêje, bi ser wan tîran re jî dilê wî hêj xencer bike.

Ji neş'a badeya kasê bizat ez xerqê 'irfan im
Ji wê camê ji wê tasê sifetkisra û xaqan im
Ji mihra xemzeelmasê li textê dil Suleyman im (131/10)

Latê husnê we şehê xûban î
Bi xwe hem xan î we hem xaqan î (114/1)

Tacê ferqê serê mehbûban î
Tu li ser dilberan xaqan î (123/6)

Kirim amancê mizraqan di dil dan tîr çûn faqan

[423] Aydın Taneri, “Han”, *DİA*, c. 15, İstanbul 1997, r. 517-518.

Bi celladê xwe ew xaqan dibêjit hêj tu xencer da (92/5)

**2.1.1.6. Asef**

Asef, navê wezîr û katibê sirrên Suleyman Pêxember e. Agahiyên derbarê wî de, di sûreyê Nemlê (ayet 38-40) de derbas dibe. Têkiliya Asefî, bi cinan re heye û dema li hemberî Sebeyîyan şer dikin, cin textê Belqîsê ku gelek ji wan dûr bûye, di demeke hingê niqitandina çavan, anîne bal wî. Asef, xwedî ‘ilmekî derasayî û waqifê ‘ilmê xefî bûye. Cin, gustîla Suleyman Pêxember didizin û li şûna wî, li ser text rûdinin. Asef, ji ber ‘ilmê xwe ji vê meseleyê agahdar dibe û dek û dolabên wan ser û bin dike. Asef, di edebiyatê de, wek wezîrekî îdeal, xweyî fikrên bilind û îsabetdar bûye mijar.[424]

Navê Asef, di dîwanê de, di beytekê tenê de, digel navê Suleyman, Belqis, bext û textê wek tenasûbî û telmîhî hatiye bikaranîn. Bext û tali’ê Asefî hebûye û Belqisê bi saya cinan tîne û Suleyman Pêxember teltîf û dilaram dike. Di hengama wuslatê de, şa’ir jî mehbûba xwe wek Belqisê dibîne û xwe jî weke Suleyman Pêxember bextewar dihesibîne.

Minnet ji tali' her ji bext Asef bi text û bext û rext
Belqis ewî anî bi text îro Suleyman î Mela (12/15)

**2.1.1.7. Mehmûdê Xeznewî û Eyaz (Eyas)**

Mehmûdê Xeznewî (998-1030), hukumdarê Xeznewiyan e. Ew, bi qabiliyeta rêvebiriyê, siyaset û bi fethên mu’ezzem, wek kesayetekî giring derketiye pêş. Di edebiyatê de wek tîmsalê ‘edalet û merhametê hatiye dîtin.[425]

Eyaz, koleyê sultan Mehmûdê Xeznewî ye. Ew, hem ji aliyê fîzîkî ve hem jî, ji aliyê ruhî ve xweyî husn û cemalê bûye. Ew gelek zîrek û ewledêr bûye. Di edebiyata klasîk de, şa’ir, mehbûbên xwe diwekînin sultan Mehmûd û xwe jî diwekînin Eyazî.[426]

Di dîwanê de navê Mehmûd û Eyaz bi hev re hatine. Sultan Mehmûd şah e û Eyaz jî geda/kole ye. Jihevcudanebûna husn û hubbê, bi taşbîha Mehmûd (şah) û Eyazî (geda) hatiye beyankirin. Şu’leya nûrê xwe di şem’ê de nîşan dide, çawa ku husna Eyazî nebe, hubba Mehmûdî jî xwûya nabe. Husn û hubb, şu’le û şem’, şah û geda,

---

[424] Canım, Divan, b.n.b., r. 241-243.
[425] Erdoğan Merçil, “Mahmûd-ı Gaznevî”, *DİA,* c. 27, Ankara 2003, r. 362-365.
[426] Canım, b.n.b., r. 245.

Mehmûd û Eyaz, her yek yê din heyî dike û ji hev cuda nabin. Husn/spehîtî, bê neynika ‘eşqê tecellî nabe, her wekî iksîra spehîtiya Eyazî nebûya, ‘eşqa Mehmûd jî peyda nedibû. Şah û geda, têgehên îzafî ne. Ev têgeh bi husn û muhebbetê watedar dibin. Di seraperdeya rûhî de husn û muhebbet cih girtibin, bi xusûsiyetên xwe ve, caran şah (Mehmûd) dibe geda û geda (Eyaz) jî caran dibe şah.

Husn û hubb bê yekdu nabin dê biken şah û geda
Nûrê nadet şu‘leya Mehmûdî bê şem‘a Eyaz (45/4)

Husni bêayîneyê ‘işqê tecella nadet
‘Işqê Mehmûdî di me‘na nemekê husna Eyas (51/2)

Ger husn û mehebbet bi seraperdeyê can bin
Geh şah û geda geh bi xwe Mehmûd û Eyaz in (84/12)

#### 2.1.1.8. Cengîz Xan û Teymûrê Leng

Cengîz Xan (1155-1227), avakarê împeretoriya Moxol û hukumdarê wê yê yekem e. Cengîz Xan, bi zilm û talankeriyê ve namdar bûye. Hêzên radestî wî nebûya û eman jê nexwestiya, hemû zarok, jin û ajal dikuştin û şehr talan û ser û bin dikir. Hemdemê wî Îbnu’l-Esîr gotiye: “Ji dewra Adem Pêxember û heta vê dewrê, însaniyetê felaketeke weke îşxal û îstîlaya moxolan nedîtiye.”[427]

Teymûr Leng (1336-1405), avakar û hukumdarê împeretoriya Tîmûr e. Tîmûr, şervanekî bi îhtîras û xwînrij e. Di gelek cepheyan de şer kiriye, ji navenda Asyayê heta Enqereyê hatiye û bi sultanê Osmanî, Bayezîdê 1em re şer kiriye û Osmanî têk biriye. Koka wî jî digehe Cengîzxan û ew jî di şer û talanê de di rêya wan de meşiyaye.[428]

Melayê Cizîrî, di du beytan de, ji bo beyankirina heşmetî û êrişên yarê ji bo teşbîhê cih daye navê Cengîz Xan û Teymêrê Leng. Çavên yarê mest in û bi nêrînê, dilê ‘aşiqî xwînî dike û xwînê dirêje. Bi xwînrêhtinê ve yar û Cengîz Xan weke hev bêînsaf in. Herdu jî şerker û talanker in. Yek dewletan digire û talan dike, yek jî dilan digire û talan dike.

Ji re‘na nêrgizên te’y mest û xwûnrîz
Zeman bû ‘ehdê cengengîzê Cengîz (46/1)

---

427 Mustafa Kafalı, “*Cengiz Han*”, DİA, c. 7, İstanbul 1993, r. 367-369.
428 Canım, b.n.b., r. 338-339.

Cengîz û Teymûr, bi îstî’areyî temsiliyeta çav û birhên yarê ne. Meqsed ji Hindî û Hebeşan jî, zulfa wê ya reş e ku li derdora çêv têne berdan. Çav û birhên yarê (Cengîz û Teymûr) dixwazin, êrişî dilê ‘aşiqî bikin û xwînê birêjin.

Sef sef me dîn Hindî û Hebeş Cengîz hat Teymûrê Leng
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan Şeref (64/8)

### 2.1.1.9. Newşîrwan

Newşîrwan, ji sulaleya Sasaniyan e, di navbera salên 531 û 579ê de bûye hukumdarê Sasaniyan. Bi ‘edaletperweriya xwe namdar bûye. Sembola ‘edaleta wî ew bû ku bi taqê Eywana Kîsrayê ve zengilek daliqandibû û zincîrek jî pê ve girêdabû. Kesê ku hewcedariya wî hebûya bi wê zincîrê li zengilê dixist û Newşîrewan bi halê xwe xeberdar dikir.[429]

Melayê Cizîrî di medhiyeya mîrê Cizîrê, Xan Şeref de cih dide navê Newşîrvan û dibêje Xan Şeref, di ‘edaletperweriyê de, piştî Newşîrvan kesê duyem e, yanî ew Newşîrwanê Duyem e.

Paşê Newşîrwan dibêm dê hakimê 'adil tu yî
Mislê Hatem da bi danê der cihan meşhûri bî (117/9)

### 2.1.2. Şa’ir, Alîm û Hunermend/Sen’etkar

### 2.1.2.1. Manî

Manî, pêxemberê dînê Manîheîzmê ye, lê belê di edebiyatê de, bi mahareta hûnera resmê namdar bûye. Manî, baweriyên dînê Zerduştî û Mesîhiyan mecz kiriye û wek dînekî cuda derêxistiye meydanê. Kitêba Manîheîzmê bi resman hatibû neqişandin û resimçêkirina Manî wek mu’cîzeyekê dihate dîtin. Di edebiyata klasîk de pora yarê û ‘aşiq bi Manî re tê teşbîhkirin.[430]

Di beytên dîwanê de, Manî bi munasebeta neqş û resmê cih girtiye. Meqseda çêkirina neqşên ku Manî li Çînê çêkirî (sûretê Çîn), çêkirina rûyê yarê ye. Herçendê, resmên wî weke neqşan jî bêne dîtin, lê di heqîqetê de ew resm û nîgarên sûretê mehbûbê ne.

Şeraba nabê rummanî şefeq da 'iqdê perwînê
Muselsel maye reyhanî xetê nazik li nesrînê

---

[429] Canım, h.b., r. 322-323.
[430] Canım, h.b., r. 313.

Xerez şeklê te bû Manî ji sûret xaniya Çînê (131/7)

Di daneberheva şi’ra Mela û Mîrî de, Mîr bersîva Melayî dide û dibêje; wî di neynika dil de sûretê Şirînê dîtiye û Manî resmê wê xelet çêkiriye, lewra ji ustadên xwe bihîstiye ku xusûsiyetên mehbûbê yên wî bihîstî, di resmên Şirînê yên Manî çêkirî de tune. Resmên Manî û sûretê yarê têne muqayesekirin. Mehbûb, bi nazikî û surşirîniyê ve weke hûrî û melekan e, ji ber vê yekê tabloyên Manî yên herî spehî li ber husn û cemalê wê, şaş û xelet xwûya dikin.

Mîsala sûretê Çînê xelet Manî xeta kêşa
Ku min dîbû di ayînê ji ber zulfa duta kêşa
Me dîbû şeklê Şîrînê tu ustadan we nakêşa (131/8)

Hûr û ferişte kê we dîn nazik û xûb û surşîrîn
Dêmê numûne bir biçîn sûretê Çîn numa xelet (60/4)

**2.1.2.2. Eqlîdes**

Eqlîdes (B.Z. sedsala 3yem), ji Yewnanîstana Berê ye û avakarê geometriyê (endazyarî) ye. Eqlîdes, zanista geometriyê berhev kiriye, tesnîf kiriye û wek sîstemekê çêkiriye û di nav kitêba “Element”an de beyan kiriye.[431]

Husna munezzeh, li ser sûretê lewheya yarê, xett, nuqte, şekil çêkirine, bi alîkariya yekî nebe nayêne tesewwûrkirin. Di çêkirina ‘alemê û heyînên mayî de jî hendeseyek heye û her kesek bi wê hendeseyê û pergalê nahese, lêbelê Eqlîdes, ji serî heta binî, ew hendese teswîr kiriye.

Hingî ku xett û nuqte ne ewda' û eşkal tê hene
Her yek bi miqdarê xwe ne esla tesewwur rê neda (9/115)

Miqdar û şeklê hendesî kêmzêde yek pê nahesî
Teswîr dikir Eqlîdesî hetta bi sethê sufle da (9/116)

**2.1.2.3. Se’diyê Şîrazî û Mela Camî**

Se’diyê şîrazî (Ebû Muhammed Se’dî Şerefeddîn Muslih b. Ebdullah b. Muşerrîf Şîrazî/1182-1292), yek ji mezinên helbestvanê edebiyata farisî ye. Di xezelnivîsînê de serkeftî bûye û di dîwana wî de xezelên ‘aşiqane gelek in. Tesîra Se’dî ne tenê li ser helbestvanên faris çêbûye. Tesîra wî li ser edebiyatnasên klasîk ên gelên din jî çêbûye û şêwaza wî hatiye teqlîtkirin. Berhemên wî gelek in û yên herî namdar

[431] Hüseyin Gazî Topdemir, “Öklid”, *DİA*, c. 34, İstanbul 2007, r. 24-25.

Bostan û Gulistan in.[432] Ev berhem, di medreseyên Kurdistanê de wek kitêbên dersê hatine xwendin. Di dîwana Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî û ya Siyehpoş de behsa Şêx Se'dî tê kirin.[433]

Mela Camî (Ebdurrehman Camî/1414-1492), alim û şa'irekî Neqşebendî yê îranî ye. Tehsîla xwe li Semerqend û Heratê, li ser 'alimên 'ilmê kelamê û li ser esasên fiqha Şafi'î qedandiye. Bi 'erebî û farisî ji çilan zêdetir berhem nivîsîne. Mijarên berhemên wî, tesewwif, edebiyat, 'ilmên edebî û dînî ne. Berhemên wî yên herî giring ev in: *Dîwan* (3 cîld), *Heft Ewreng* (ji heft mesnewiyan pêk tê), *Şerhu'l-Fusûsu'l-Hîkem*, *Baharîstan* (nazîreya Gulistanê ye), *Rîsaleyê Musîqî*, *Şerh-i*, *Mîmiyye-i Hamriyye-i Fâriziyye* (şerha qesîdeya Hemriyyeyê ya Îbnü'l-Fâriz).[434] Mela Camî, hem ji aliyê edebiyatê ve hem jî ji aliyê tesewwifê ve tesîr li gelek şa'iran kiriye û ji ber Terîqeta Neqşebendiyê li ser alim û şa'irên kurd jî gelek tesîrdar bûye.

Se'diyê Şîrazî û Mela Camî, ji aliyê muqayesekirinê ve bûne mijar û şa'ir ji aliyê 'eşqê ve xwe bi wan re muqayese dike. Ev herdu kesayet, di 'eşqa îlahî de namdar bûne. Herdu jî mutesewwif in, hem di 'ilmê tesewwifê hem jî edebiyatê de namdariyeke heqdar bi dest xistine. Melayê Cizîrî, namdarbûnê wek bednamiyê dibîne, naxwaze navê wî derbarê 'eşqê de belav bibe, lêbelê agirê 'eşqê di dil de nasekine û xweyê xwe îfşa dike. Mela jî, bi wê îfşakirinê, di 'eşqê de weke Se'dî û Camî xweyî şuhret bûye.

Me ra j'ewwel çi pir xamê kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'dî û Camî ji şuhret pê hesîn 'amê
Bi deng û bang û awazê dibêjit nexmeya sazê
Nihan key manend an razê kez û sazendê mehfil ha (4/7)

#### 2.1.2.4. Hafizê Şîrazî

Hafizê Şîrazî (Haci Şemseddîn Muhammed/1317?-1390), yek ji wan helbestvanên lîrîk yê farisan e. Qesîde, rûba'î û qit'e jî nivîsîne, lê di xezelnivîsînê de şuhretek bi dest xistiye. Hafiz, ji xusûsiyetên xezelên xezelnûsên pêşiya xwe jî îstîfade kiriye, ji ber vê yekê xezelên wî di edebiyata farisan de di asteke bilind de cih girtine. Bi zimanekî mecazî[435], behsa meclisa 'eşq û şerabê kiriye û bi aheng, herikbarî, bi

[432] Mustafa Çiçekler, "Sa'dî-î Şirazî", *DİA,* c. 35, İstanbul 2008, r. 405-407.
[433] Şêx Se'diyê Şîrazî, Gulîstan, (Wer. M. Înal-M. Yamalak), Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2013, r. 14.
[434] Ömer Okumuş, "Camî", *DİA*, c. 7, İstanbul 1993, r. 94-99.
[435] Hafiz, şa'îrekî qelender e, lê belê Mehmed Wehbî Efendî, helbestên Hafiz, bi goreyî tesewwifê şerh kirine. (Yazıcı, "Hâfiz-ı Şîrazî", *DİA*, c. 15, r. 103-106.)

zimanekî sade, bi gotinên wecîzane di helbestê de namdar bûye. Di xezelên wî de mezmûnên ‘ilmî, ehlaqî û felsefî hene, ji aliyê sen’etên edebî ve jî dewlemend in û me’na û şêwaz di nav wan huneran de nefetisîne.[436]

Hafiz, di xezelên xwe de mezmûnên şerab û meyxaneyê wekî Heyyamî gelek bi kar anîne. Şarîhan mezmûna şerabê, bi sembolên weke ‘eşq, feyz, neş’e û wehdetê; mezmûna meyxaneyê jî bi sembolên ‘alem, xankah û dilî ve şirove kirine.[437] Hafiz, bi şêwaza xwe ve li ser gelek şa’iran tesîr hiştiye û bi dehan şerh li ser dîwana wî hatine nivîsîn û bi ber dehan zimanan ve jî hatiye wergerandin.

Melayê Cizîrî, di bin tesîra Hafiz de maye û li ser xezelekê Hafiz terbîyek nivîsiye. Cizîrî, helbesta xwe bi ya Hafiz re muqayese dike û dixwaze êdî di cihê Hafiz de helbestên wî bêne xwendin, lewra helbestên wî, weke mirarî û mircanan giranbuha ne û di nezmê de, di asteke bilind de ne.

Ger lu’lu’ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şi‘rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet (21/12)

Mela, di helbestê de, Hafiz wek qutbekî Şîrazê dibîne û dibêje, helbestên wî ji aliyê sirrên ‘irfan û hikmetê ve dewlemend in. Ew kesê sirrên helbestên Hafiz fehm bike û dunyayê terk bike, dê ew bibe ehlê dilan, dê bigehije ber çerxa perwazê (sema) û dê bi mehbûbê re wuslat peyda bibe û ji ‘eşqa mehbûbê, weke mestekî, dê bikeve sefayê.

Ji Hafiz Qutbê Şirazê "Mela" er fehm bikî razê
Bi awaz û ney û sazê bidî ber çerx û perwazê
Tuzed min hubbîhî’s-sefwa bihî ehl’ûl-hewa neşwa
Meta ma telqe men tehwa de’i’d-dunya we emhil ha (4/8)

#### 2.1.2.5. Hemmadê ‘Ereb

Di derbarê Hemmadê ‘Ereb de agahî nînin. Tehsîn Îbrahîm Doskî wek îhtîmalekê, îşaretê bi Hemmadê kurê Meysereyê Kûfî (wefat, koçî 155) dike, lê dibêje derbarê vî şexsî de, di berhemên dîrokî de, serpêhatiyên balkêş nehatine beyankirin.[438]

Navê Hemmadê ‘Ereb, di hicwiyyekê de derbas dibe. Di vê helbestê de behsa dizekî helbestan tê kirin û Mela, gefan li wî kesî dixwe ku ew destdirêjiya helbestan

[436] Yazıcı, b.n.b., c. 15, r. 103-106.
[437] Hafız-ı Şirazî, Hafız Divanı (Amd. A. Gölpınarlı), r. XV.
[438] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 264-265.

berdewam bike û sucê xwe îtîraf neke, weke tiştê ku şêx anî serê Hemmadî, dê ew jî bîne serê wî dizê helbestan.

Dest û payan ji berê zêde bikî dê te bikim
Mislê Hemmadê 'Ereb herweki Şêx anî biser (44/6)

### 2.1.2.6. Îbn Sîna (Bû 'Elî sîna)

Îbn Sîna (Ebû Elî el-Huseyn b. Ebdîllah b. Elî b. Sîna/980-1037), fîlozofê mekteba Meşşaî ya îslamî û pêşengekî temsîlkarê tibba qerna navendê ye.[439] Li Ewropayê, derbarê tibbê de tesîra wî hetta sedsala 17em berdewam kiriye. Di edebiyatê de wek sembola kesê ku dixwaze axê veguherîne zêrî, hatiye zikirkirin. Veguherîna axê ber bi zêrî ve, di tesewwifê de veguherîna însên a ber bi însanê kamil ve tê şirovekirin.[440]

Di dîwanê de, Îbn Sîna ji bo beyankirina halên harîkulade/derasayî, bi teşbîhî bûye mijar. Mehbûb, bi remz û îşweyên xwe mu'cîzatan nîşan dide û ev xusûsiyeta mehbûbê weke ya 'Îsa Pêxember û ya Ebû Elî Sîna ye. Yekî mirî vejandine û yekî jî bi 'ilmê kîmyayê ax veguherandiye zêrî. Yar, bi qesta nîşandana mu'cîzeyê, qesta canê 'aşiqî dike û dilê wî talan dike. Ew jî weke Îsa Pêxember dixwaze miriyan zînde bike (bigehijîne mertebeya fenafillahê) û weke Îbn Sîna jî karê harîkuladeyî nîşan bide û axê veguherîne zêrî ('aşiqî bibe însanê kamil).

Ez dibêm 'Îsa ye ew ya Bû 'Elî Sîna ye ew
Lew bi remz û 'işweyan pur mu'cizat û şêwe ye (93/10)

Yar qest e can yexma kirit da mu'cizê peyda kirit
Remzek ji reng 'Îsa kirit ya sihrê Bû Sîna kirit (125/8)

Di dîwanê de navên berhemên Îbn Sîna *eş-Şîfa* û *el-Qanûn*, bi tewriyeyî hatine bikaranîn. Eş-Şîfa, derbarê mantiq û dîsîplînên felsefeya nazarî de hatiye nivîsîn. Îbn Sîna di vê berhemê de li ser fikrên Thales û Pîsagor jî rawestaye, 'ilmên weke mantiq, fîzîk, matematîk û metafîzîkê bi goreyî tertîba Arîsto tê de cih girtine.[441]

*El-Qanûn fi't-Tib*, berhemeke ansîklopedîk û sîstematîk a tibbî ye. Îbn Sîna, ev berhem di deh salan de qedandiye. Wî, lîteratûra tibbî ya belave ya Helenîstîk, Bîzans

---

[439] Ömer Mahir Alper, "Îbn Sînâ", *DİA*, c. 20, İstanbul 1999, r. 319-322.
[440] Canım, b.n.b., r. 292-293.
[441] İlhan Kutluer, "eş-Şifa", *DİA*, c. 39, İstanbul 2010, r. 131-134.

û Suryanî berhev kiriye, bi goreyî sîstemekê nêrînên xwe jî li ser zêde kirine û bi vî awayî berhema herî mezin ya tibba îslamî aniye vucûdê.[442]

*El-Qanûn fi't-Tib*, ji bo nexweşan agahiyên şîfayê di nav xwe de dihewîne. Çawa di vê berhemê de reçeteyên şîfayê hene, le'lên dilberê jî bi gotinên xwe, nexweşên dilî (nexweşên 'eşqê) xweş û sax dike. Eger yar, ji bo tedawîkirina 'aşiqê xwe îşaretê bi Qanûn û Şîfayê neke, 'aşiq, helaka xwe ya di rêya 'eşqê de, bi xilasbûnê nade. Ew dixwaze bi derdê 'eşqê re rû bi rû bimîne.

Dê ji wan le'lan şîfayê dil bi qanûn telbe kit
Da işaret xweş bikin dê her kesê bîmarî bit (19/11)

Ne b'qanûn ku işaret bi şîfayê bikirit
Ez helakê xwe di 'işqê bi necatê nadim (75/6)

### 2.1.3. Berhemên Şa'ir, Alîm û Hunermendan

#### 2.1.3.1. Erjeng (Erjenga Manî)

*Erjeng*, navê kitêba Manî pêxember e û bi navê *Erjeng*ê Manî tê naskirin. Ev kitêb, bi resmên bedew hatiye neqişkirin û vê kitêbê namdariyek daye Manî.[443] 'Aşiq, ji mehbûbê dixwaze ew bi zîvav û zêravê, her roj rûyê xwe bi spehîtiyeke cuda ve bixemilîne û nîşanî wî bide, ji ber ku wêneyên Manî yên herî namdar ku di berhema *Erjeng*ê de cih girtine, nebine asteng û perde ku ew temaşeyî wan bike û rûyê wê yê mîna rojê ronîdar nebîne.

Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşikê bavê
Ku da Erjeng ji wê navê li ber rojê nebit perde (92/16)

#### 2.1.3.2. El-'Ubabu'l-Zaxir

*'Ubabê*, navê kitêbeke ferhengê ya 'Îmam Hesenê Sexanî (wefat, koçî 650) ye. Ev ferhenga bi 'erebî nehatiye temamkirin û piştî bîst cildan ew hê gihaye herfa "mîm"ê.[444]

Peyva *'Ubabê*, bi tewriyeyî hatiye bikaranîn. Ev peyv tê wateya deryayê û navê ferhengekê ye jî. Husn û meşreba (siruşt, xuy) mehbûbê weke kafûrê spî û saf e; ew

[442] Esin Kâhya, "el-Qanûn fi't-Tıb", *DİA*, c. 24, İstanbul 2001, r. 331-332.
[443] Yıldırım, "Mani", Fars Mitoloji Sözlüğü, r. 500-501.
[444] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 282-283; Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., c. 1, r. 146.

kesê bibe ‘aşiqê wê husnê, dê di dilê wî de deriyê deryaya ‘ilmê vebe û weke kitêba *‘Ubabê* tejî ‘ilim bibe.

‘Eynê kafûr e bi meşreb me ji husna te ye saf
Lew ji ‘işqa te di dil da me vebû ‘ilmê ‘Ubab (13/3)

**2.1.3.3. Şerha Lubabê**

Bi navê *Lubab*ê du berhem hene û di dewra xwe de, bi mijarên xwe ve namdar bûne û gelek şerh li ser wan hatine nivîsîn. Yek li ser fiqha Şafi’î ye û Ebû Hesenê Mehamillî nivîsiye; yek jî li ser nehwê ye û Esfer Ayînî nivîsiye.[445]

Şerha *Lubab*ê, bi teşbîhî û tewriyewî, ji bo xet û xalên yarê bûye mijar. Çawa di kitêbên şerhê de li derdora metna ‘eslî de haşiye û perawêzên şerhê têne nivîsîn, li derdora rûyê husn û cemalê yarê de jî xal, xet û neqş (bisk û perçem) hatine xêzkirin. Ew xet û xal, derbarê husn û cemalê yarê de agahiyan didene ‘aşiqî. Dema ‘aşiq wan haşiyeyan dibîne û dixwîne, singê wî weke şerha *Lubab*ê tejî ‘ilm û hikmet dibe.

Xet û xalên te bi mû mû ji me ra mes'elegoy în
Me ji wan haşiyeyan sîne tejî şerhê Lubab e (94/22)

Berhemên şerhên li ser *Lubab*ê hatî çêkirin di nav medreseyên kurdan de jî namdar bûne. *Lubab*, ji aliyê fetwayan ve berhemeke giring e. Şa’ir ji wan fetwayan îstîfade dike û dibêje; eger qedeha ji destê mehbûba lêvşirîn nebe, vexwarina wê meyê heram dibe û ev fetwa jî, di haşiyeya şerha *Lubab*ê de mewcûd e.

Cama ne şekerleb bi me dit 'eynê heram e
Fetwa we numa haşiyeya şerhê Lubabê (112/15)

**2.1.3.4. Gulşenê Raz û Hikmetil'eyn**

*Gulşenê Raz*, berhemeke tesewwifî ya şa’ir û mutesewwifê îranî, Şêx Mehmûdê Şebûsterî (wefat, 720/1320) ye. Ev mesnewî, wek cewaba pirsên yek ji sûfiyên Xorasanê, Emîr Huseynî Sadatê Herewî hatiye nivîsîn. Li ser vê berhemê gelek şerh hatine nivîsîn.[446] *Hikmetil'eyn*, navê kitêba fakîhê Şafî’î Necmeddînê Qezwînî (wefat, 675/1277) ye. Ev kitêb di ‘ilmê hey’etê de hatiye nivîsîn û zêde asê û zehmet e.[447]

[445] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 295-296.
[446] Adnan Karaismailoğlu, “Şebüsteri”*, DİA*, c. 38, İstanbul 2010, r. 400-401.
[447] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 372.

Navê van berheman bi tewriyewî hatiye bikaranîn. Ev herdu berhem ji aliyê tesewwif û fiqha Şafi'î ve giring in û bi hikmet û 'irfanê, Melayê Cizîrî îşaretî van berheman kiriye. Kesê bibe mudawîmê meclisa xwendina van berheman, dê sirr jê re bêne 'aşîkarkirin.

Bi şêran ra ku rimbaz im di remza qabê qewseynê
Bi 'eynê Gulşenê Raz im di babê Hikmeti'l-'eynê
Mulazim hedretê lazim hicab rakit ji mabeynê (131/31)

Binê nûnên li ser sadan ku katib goşe lê badan
Seraser qaf ta qaf e rumûza Hikmeti'l-'eyn (89/3)

Şu'leya 'eşqê di dilê aşiqên weke perwane û bulbulê de hil bûye. Eger, bi çavekî nezerî lê bête temaşekirin, dê bête zanîn ku ew şu'le, bi sirrên xwe ve weke baxçeyê gulan e. Di *Gulşenê Razê* de sirrên 'aşiq û me'şûqan cih digirin.

Perwane û bulbul bi dilîn şu'leyê 'işqê
Lê ger tu nezer dey bi xwe ew gulşenê raz in (84/4)

### 2.1.4. Kesayetiyên Dîrokî-Efsanewî

#### 2.1.4.1. Samirî

Xwûda, di Qur'ana Pîroz de, di Sûreya Tahayê de behsa Samirî dike. Samirî, ew kes e ku dema Hz. Mûsa derdikeve Çiyayê Tûrê, ji zêrî golikekî çêdike û Benîîsraîliyan ji rê derdixe û dibe sebeb ku Benîîsraîlî, golikî bihebînin.[448]

Samîrî di dîwanê de ji bo sêhr û tesîrdariya wî hatiye zikirkirin. Zulfa yarê bi Samirî re hatiye wekandin. Ji bo ku 'aşiq bête îknakirin û bibite bendeyê mehbûbê, zulfa wê ya reş bes in, hewcedariya sihra Samirî nîne. Di navbera sêhra Samirî û tesîrdariya yarê de têkiliyek heye. Çawa ku 'aşiq dixwaze, mehbûb weke Mesîhî miriyan zinde bike, wisa jî dixwaze mehbûb weke Samirî, îşwe û nazên sêhirbar bike û 'eqlê 'aşiqî ji serê wî rake.

Xwe çi sihrê Samirî nînin ku zulfan reş biken
Çeşmê benda dilrubayan kakula 'eyyarî bes (52/7)

Bi Mesîhasifetî 'işwe divên
Samirî sihrisifet şêwe divên (123/1)

[448] Mahmut Salihoğlu, "Samirî", *DİA*, c. 36, İstanbul 2009, r. 78-79.

### 2.1.4.2. Zuleyxa

Zuleyxa, kesayetiyeke jin ya qisseya Yûsuf Pêxember e. Ew xanima ‘ezîzê Misrê ye û ‘aşiqî Yûsuf Pêxember dibe. Navê Zuleyxayê wek mezmûnekê, bi teşbîhî û telmîhî hatiye bikaranîn. Zuleyxa, bi ‘eşq, xewn, bedewî, hîlebazî û bi zindanîkirina Yûsuf Pêxemberî, di edebiyatê de derketiye pêş.[449]

Di dîwanê de, tenê di beytekê de navê Zuleyxayê derbas dibe. Mehbûb, bi husn û cemalê xwe ve weke Zuleyxayê spehî ye û her kes vê heqîqetê dizane û ew hewceyî medhan nîne.

'Alemek şehdetiya husn û cemalê te didit
Tu Zuleyxayê zeman î û çi hacet medehê (110/12)

### 2.1.4.3. Îskender

Îskender (BZ 356-), bi çend navan ve tê naskirin. Ew gelemperî bi navên Îskenderê Mezin, Îskenderê Makedonî û Îskenderê Zulqerneny namdar bûye. Nîzamiyê Gencewî, jiyan û têkoşîna wî di berhema xwe *Îskendername*yê de pêşkêş dike. Bi goreyî vê berhemê, Îskender pêxember e û şehrê Îskenderiyeyê ava kiriye û ayîneya Îskender daye çêkirin.[450]

Îskender, di dîwanê de bi taybetî ji ber ayîneya Îskender bûye mijar. Ayîneya Îskender, li Îskenderiyê li ser kuleyekê, ji bo qontrolkirina çûn û hatina keştiyan hatiye çêkirin. Ayîneya Îskender, wek ayîneya alemnûma an jî ayîneya gîtînûma (neynika dunyayê nîşan dide) tê zanîn. Gelek efsane li ser vê ayîneyê hatine gotin ku dema leşker û artêşên dijminan ber bi Îskenderiyê dihatin, di wê ayîneyê de dihatin dîtin.[451]

Mehbûbê ayîne daye Îskngerî û dunya hemû tê de xwûya kiriye. ev neynik, ji Îskender re wek tiştekî sembolîk hatiye dayîn û wek mu’cîzewî bûye mizgînkarê cîhangiriya wî ku Îskender ji Ewropayê heta Çînê dunya feteh kiriye bûye hukumdarekî cîhangîr.

Yek girtîye zulfê û yeki xalê numayî
Ayîne bi Eskenderî û camê bi Cem da (1/5)

Ew reşhe da wê qulzumê mey hate tasa 'alemê

---

449 Zehra Öztürk, “Züleyha”, *DİA,* c. 44, İstanbul 2013, r. 552-553.
450 Yıldırım, “İskender”, *Fars Mitoloji Sözlüğü*, r. 427-435.
451 Yıldırım, “Âyîne-i İskender”, h.b., r. 114-116.

Cama cehanbîn da Cemê b'Eskenderî ayîne da (9/101)

Di navbera yarê û ayîneya Îskender de têkiliyek heye. Neynika Îskender li pêşiya yarê ye û husn û cemalê wê tê de xwûya dike û pêlên behrê ji ber spehîtiya wê dikevine coş û xurûşê. Yar, weke durr û gewherê giranbaha û geş e û weke neynika Îskender zelal û saf e, lêbelê yara bêînsaf dilê ‘aşiqî ker ker û birîndar kiriye û ‘aşiq birîndarê xal û nîşanên wê ye.

Mîr'atê Sikenderî li pêş e
Behrun we lehe'l-'ukûsu emwac (29/9)

Durdaneya dêmgewher e ayîneya Eskender e
Bêmirwetan dil kir ker e mecrûhê xalan î Mela (12/7)

Wek efsanewî tê gotin ku Îskender, piştî fetha Hindistanê, ji bo ava heyatê bi Xocê Xizir re çûye welatê tarîtiyê. Xizir, ava heyatê dîtiye û jê vexwariye, lê Îskender ji wê avê venexwariye.[452] Mela di beytekê de vê rewşê beyan dike ku Xizir tenê gehiştiye mirazê xwe yanî gehiştiye ava heyatê.

Abê heywan te divêtin tu bibî hemrehê Xizr
Camê Cem bîn û ji Dara û Sikender meke behs (27/9)

Navê Îskender wek teşbîhî, ji bo memdûhî hatiye beyankirin. Şa’ir dixwaze hukm û selteneta memdûhî (Şerefxanê Cizîrî) weke ya Îskender serkeftî û serfirazî bibe û mîr weke wî bibe hukumdarê cîhanê.

Ya Cizîrê şubhê Dara textê heft iqlîmi bit
Da hukm û seltenet Eskender û Fexfûri bî (117/10)

#### 2.1.4.4. Dara

Dara, qralê Ahamenîşan e û kurê Erdeşîrê Dirazdest e. Bi Îskenderê Makedonî re şer kiriye û têk çûye. Ji aliyê xizmetkarên xwe ve bi sûîkastekê hatiye kuştin.[453] Qral Dara, bi şerwanî û cîhangiriyê ve namdar bûye. Şa’îr bi beqayê ve ye, dixwaze bibe hevalê Xizir û ji ava heyatê nûş bike, ji ber vê yekê naxwaze behsa şer û hukumdariya Dara û Îskenderî bike. Hukumdarî, tac û text tiştên fanî ne, lê ew li pey şopa tiştên baqî ye.

Abê heywan te divêtin tu bibî hemrehê Xizr
Camê Cem bîn û ji Dara û Sikender meke behs (27/9)

[452] Yıldırım, “İskender”, h.b., r. 434.
[453] Yıldırım, “Dârâ”, h.b., r. 233.

Navê Dara, wek teşbîhî, ji bo memdûhî hatiye beyankirin. Qedeha ku Cem, ji Dara re wek mîras hiştibû, heft îqlîman (heft dewlet) tê de xwûya dikirin. Şa'ir jî dixwaze ew wêneyên di camê de dihatine dîtin bibe heqîqet û Cizîra Botan weke paytexta qral Dara hukmê li heft îqlîman bike û hukm û selteneta Şerefxan weke ya Îskender û Fexfûrê Çînî serkeftî bibe.

Ya Cizîrê şubhê Dara textê heft iqlîmi bit
Da hukm û seltenet Eskender û Fexfûri bî (117/10)

**2.1.4.5. Cem (Cemşîd)**

Cem, hukumdarê Pîşdadiyan yê çarem û yê herî mezin e. Ew bi navên Cem, Cemşîd, Cemşasp, Cemşîdûn tê zanîn. Ji aliyê Dehhaq ve hatiye kuştin. Wek avakarê gelek tiştan tê qebûlkirin. Cara yekem şerab wî çêkiriye, amûrên şerî yên weke zirx, sîlah û şûr wî dane çêkirin û cara yekem wî ermûşa rengîn û qumaşên pembû emilandine. Cara yekem wî şerab û qedeha şerabê îcad kirine û şeraba Cem ji nexweşiyan re bûye şîfa. Ji ber îlaçbûna şerabê, di edebiyata tesewwifê de, terkîba "Camê Cem"ê wek sembol hatiye bi kar anîn.[454]

Hukumdar Cem, di edebiyatê de bi gelemperî bi cam/qedehê ve bûye mijar. Qedeha Cem, sihîrdar bûye û sirr aşîkar dikirin. Cemşîd, di wê qedehê de bûyerên ku di dunyayê de diqewimîn, temaşe dikirin. Ev qedeh, piştî Cem, ji Keyxusrew, paşê jî ji Dara re wek mîras maye. Di wê qedehê de rewşa kaînatê, sirrên heft felekan dihatine dîtin. Camê Cem, di edebiyata tesewwifê de wek îksîrekê tê qebûlkirin. Ew, di wateya dil, ruh, can û ayîneya dil de tê bikaranîn. Camê Cem, di termînolojiya tesewwifê de, dilê 'arif û murîdî yê saf, paqij û şeffaf temsîl dike. [455]

Qedeha Cem, wek xelat ji aliyê mehbûbê ve jê re hatiye dayîn û ew şeraba di wê qedehê de ji bo nexweş û birîndarên 'eşqê şîfa ye û ava heyatê ya Xizir dîtî, 'aşiqî ber bi baqîbûnê ve dibe. Di navbera qedeha Cem û lêvên le'l de têkiliyek heye. Ji aliyê reng û ji aliyê heyatbexşînê ve weke hev in. Ew ayîneya Camê Cem ya ku dunya tê de dihate dîtin, badeya di nav de weke leba yarê sohr e û heyatbexşîn e.

Yek girtîye zulfê û yeki xalê numayî
Ayîne bi Eskenderî û camê bi Cem da (1/5)

Abê heywan te divêtin tu bibî hemrehê Xizr

---

[454] Yıldırım, "Cemşîd", h.b., r. 204-211.
[455] Yıldırım, "Cam-ı Cem", h.b., r. 190-194.

Camê Cem bîn û ji Dara û Sikender meke behs (27/9)

Ayîneyê camê cehanbînê Cem
Badeyê le'lî ne di cama zucac (30/2)

Camê Cem ji bo memdûhî jî bûye mijar. Lewra Cem, bi goreyî *Şehname*yê 600 salan di dunyayê de di nav huzûr û refahê de hukumdariya xwe berdewam kiriye. Sebebê vê yekê jî qedeha wî ya cîhanbîn e. Şa’îr dixwaze mîrê Cizîrê, weke Cem qedeha wî ya zêrîn ji badeyê vala nemîne û ji badeyê her daîm mexmûr û dilşad bimîne. Dîsa ji bo mîr tê xwestin ku ew qedeha di destê wî de bibe weke ayîneya camê Cem ku sirr û xeyb ji aliyê wî ve bêne zanîn, yanî deriyê razan ji wî re bête vekirin.

Mislê Cem cama zerîn xalî nebî te j'badeyê
Da ji xemra bade şadimanî daîma mexmûri bî (117/11)

Kesê bê perde mehrem bit ne dê bê perde wek ney bê
Rebab û çengê hemdem bit 'îbadet mestê bêmey bê
Di dest da camê wek Cem bit ji reng ayîneya xeybê (131/24)

Cem, ji aliyê hukumdariyê ve qralekî namdar, di şer û cesaretê de jî weke pehlêwanekî bûye. Lêbelê ew çiqas mezin û namdar jî bin, ancax ji memdûhî re dikarin xulamiyê bikin.

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şêrê ‘Elî
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê ‘Ereb (14/5)

Çi hedd seydê hezar can in di fitrak û bendê da
Ku sed Cemşîd û Keyxusrew xulam in ser di vê rê da (5/19)

### 2.1.4.6. Dehhak

Di *Avesta*yê de behsa Dehhak tê kirin. Ew hukumdarê Pîşdadiyan yê pêncem e. Ew bi navên weke “Ejhapeyker, Ejhaçeşm, Ejhadûş, Dehhakê Mardûş” hatiye binavkirin. Bi goreyî rîwayetên klasîk yên îranî, Dehhaq, dêw û ejderhayekî bihêz e. Bi xapandina Îblîsî (Ehrîmen), bavê xwe Mîrdasî dikuje. Bi hîleyê navmilên Dehhakî radimûse û du reşmar di nav milên wî de derdikevin. Dîsa Ehrîmen wek hekîmekî sextekar, ji wan maran, wek ‘îlac, mejiyê însanan nîşan dide. Bi serîrakirina Kawayî, Dehhak tê kuştin, gel rizgar dibe. Ferîdûn di cihê wî de dibe hukumdarê Îraniyan. Dehhak, di çavkaniyên pehlewî de wek avakarê pênc xerabiyan (tamahkarî, qirêjahî, sêhr, derew û laûbalîtî/bêhurmetî) tê qebûlkirin.[456] Di dîwanê de wek telmîhî mar û

[456] Yıldırım, “Dahhak”, h.b., r. 227-230; Gölpınarlı, b.n.b., c. 1-2, r. 154-155.

Dehhaq bi hev re hatine beyankirin. Reşemarên Dehhakî, wek tewriyewî temsiliyeta keziyên yarê dikin. Herdu jî (kezî û reşemar) hem ji aliyê reng ve dişibine hev hem jî nerehetiyê didin însanan.

Herdu îlanên te di min toqê gerden kin medam
Da me her bêtin tebessum wek gula Dehhakî rûh (33/11)

### 2.1.4.7. Keyxusrew û Zeng (Nûreddîn Mehmûdê Zengî)

Keyxusrew, kurê Siyaveş e ku ji xanedana Keyaniyan e û yek ji hukumdarê Sasaniyan yê namdar e. Ew bi xirakirina putxaneyê û bi avakirina ateşgedeya Azergoşesb namdar bûye. Piştî kuştina Gersîvez û Efrasiyabî (dêya Keyxusrew Ferngîs qîza Efrasiyab e), bi fermî dibe hukumdarê Îranê. Ew bi ‘edalet, merhamet û xêrkirinê ve hatiye naskirin. Ji aliyê îraniyan ve wek pêxember hatiye qebûlkirin. Di dawiya umrê xwe de xwe vekêşaye înzîwayê û di gera çol û çiyayan de bi hevalên xwe re wenda bûne û êdî nehatine dîtîn.[457]

Keyxusrew, di dîwanê de ji bo memdûhî bi teşbîhî hatiye bikaranîn. Keyxusrew, hukumdarekî gelek namdar bûye, lêbelê ew çiqas mezin û namdar jî be, ancax ji memdûhî re dikare xulamiyê bike.

Çi hedd seydê hezar can in di fitrak û bendê da
Ku sed Cemşîd û Keyxusrew xulam in ser di vê rê da (5/19)

Nûreddîn Mehmûdê Zengî (1146-1174), yek ji hakimên xanedana Zengiyan û kurê Îmadûddîn Zengî (wefat, zayînî 1146) ye. Li Şam û Helebê hukumdarî kiriye. Wî digel xaçperestan, bi ermenî û rûman re jî şer kiriye. Piştî hilweşîna Dewleta Fatimiyan, li Misrê ji serbaz û naîbê xwe Selaheddînê Eyyûbî dixwaze ku xutbeyê êdî li ser navê xelîfeyên Ebbasiyan bixwîne. Xelîfeyê Ebbasiyan, Mustazî Bîemrîllah, bi ‘elametên seltenetiyê, temlîknameyekê jê re dişîne û Kurdistan, Suriye, Misir, Trablusgarp, başûrê Sudanê, Yemen û Hîcaz dikevin bin hakîmiyeta Nûreddîn Mehmûd. Ew, bi ‘edalet û dîndariya xwe, bi leqeba “el- Melîkû’l- adil” hatiye bi nav kirin.[458]

Navê Nûreddîn Mehmûdê Zengî jî weke navê Keyxusrew, bi teşbîhî hatiye bikaranîn. Şa’ir, halê xwe û yên van herdu kesayetan ji aliyê serfiraziyê ve muqayese dike. Li ser serê şa’irî taca îqbalê heye û di firînê de jî weke teyrê humayê (teyrê

[457] Yıldırım, “Keyhusrev”, h.b., r. 464-468.
[458] Bahattin Kök, “Nûreddin Zengî”, *DİA*, c. 33, İstanbul 2007, r. 259-262.

dewletê) ye. Ji ber van eger û destkeftiyan, ew xwe weke Keyxusrew û Mehmûdê Zengî, serfiraz, serbilind û bextiyar hîs dike.

Di perwazê humadeng în me ser da tacê îqbalê
Şehê Keyxusro û Zeng în serefraz în di vî halê
Li ber pê ‘er’era rengîn me qamet bû şubê dalê (131/28)

**2.1.4.8. Xizir û Îlyas**

Xizir, di dewra Mûsa Pêxember de jiyaye û jê re ‘ilmê ledûnê û hikmet hatiye dayîn. Wî jî weke Îlyas ava heyatê vexwariye û bûye nemir. Di Qur’anê de navê Xizir derbas nabe, lê belê gelek mufessîr dibêjin ew şexsê ku di Sûreya Kehfê de di gel Mûsa Pêxember qisseya wan hatî beyankirin, Xizir e. Di edebiyata tesewwifê de, Xizir murşîdî û Mûsa Pêxember jî murîdî sembolîze dike. Xizir di behran de, Îlyas jî di bejahiyan de, alîkariya wan kesên ku ketine xetereyê dikin.[459]

Xizir, di dîwanê de bi ava heyatê, bi dirêjahiya ‘umrî û bi alîkariyê bûye mijar. Di dunyayê de gelek kesên namdar hatine û çûne. Kesên li pey beqayê bin, pêwîst e bi goreyî wê, ji xwe re şopîneran (murşîd, rehber) bijêrin. Ew kesê bixwaze ava heyatê bi dest bixe û ew bibe nesîbê wî, pêwîst e ji Xizir re bibe hemrah û bi şev û roj, bi xîret û xebatê mucadele bike.

Abê heywan te divêtin tu bibî hemrehê Xizr
Camê Cem bîn û ji Dara û Sikender meke behs (27/9)

Ê bi Xizrî ra divêt ava heyatê bit nesîb
Dê bi se‘y û cehdeyê yeksan li bal bin roz û şeb (15/10)

Xizir, ji bo xwestin û beyankirina dirêjiya ‘umrî jî bi teşbîhî hatiye bikaranîn. Wî ava heyatê vexwariye û heta roja qiyametê dê zindî bîmîne. Şa’ir ji bo ‘umirdirêjiya memdûhî Xizir û Nûh Pêxemberî wek mînak dide û dixwaze temenê memdûhî jî weke yê wan dirêj bibe.

Ma te 'umrê Xizr û Nûh û mulkê Zulqerneyn bitin
Gunbeda çerxê melemme' her bi te me'mûri bî (117/17)

Xizir, murşîd û pîrê sûfiyan e û rehberiya wan dike, rê nîşanî wan dide. Di baweriya sûfiyan de Xizir, sembola navê Xwûda yê “batin”î ye. Ew alîkariya însanan dike. Xizir înayeta Xwûda ye, ehlê dilan dibe serçeşmeya dilî, ji wan re nîşan dide ku dunya bi hemû heyînên xwe ve weke serabê ye da ku xwe bi tiştên fanî ve girênedin.

---

459 Yıldırım, “Hızır”, Fars Mitoloji Sözlüğü, r. 375-381.

Bidestxistina ava heyatê, bi înayeta Xwûda ye. Eger di ezelê de ev nehatibe nesîbkirin û înayet destê Xizirî negire, bi wî re çiqas ‘esker û alîkar jî hebin ne mumkin e ku bigihije ava heyatê (beqa).

Seherê Xizrê ‘înayet ku birîn çeşmeyê dil
Bi cehanê me nezer da ku cehan ‘eynê serab (13/9)

Destigîrê te nebit Xizrê ‘înayet bi qedem
Nagihê abê heyatê bi du ‘eskerê Ilyas (51/7)

#### 2.1.4.9. Rustemê Zal

Rustem, kurê Zalî ye bi cesaret û ‘eqilbûna xwe ve bûye qehremanê Îraniyan yê herî namdar. Rustem şehsed salan ‘umir kiriye, di zemanê hukumdarên weke Keykubad, Keykavûs û Keyxusrew de jiyaye û van hukumdaran ji bo hakimiyeteke xurt pişta xwe dane Rustem. Bi cesaret û merdaniyê ve kesî nekariye vî pehlêwanî têk bibe. Bi hîle, dek û dolaban, ji aliyê birayê wî yê heram ve, bi hespê wî Rahşê ve ew xistine bîrekê û paşê karîne wî bikûjin. Di çanda Îraniyan de, navê Rustem bi têgehên weke qehremanî, cesaret û bêtirsiyê hatiye beyankirin.[460]

Di cîhanê de hinek kesayetî bi qehremaniyê derketine pêş. Yek ji wan jî Rustemê kurê Zal e. Mehbûb bi êrişên xwe yên li hember ‘aşiqî, weke pehlewanê navdar Rustemê kurê Zal, cesûr, ‘egîd û bêeman e.

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şêrê ‘Elî
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê ‘Ereb (14/5)

Hinek tişt ji derveyî quwweta însên in. Înayeta Xwûda nebe û di nesîbê wî de tune be nikare bigihije wî tiştî. Eger di teqdîrê de nehatibe nivîsîn ku Ferhad û Şîrîn bigihijin hev, bazûyên milan yên wekê Ferhadî û quwwet û egîdiya Rustemî bi kêrî tiştekî nayên. Sînorê quweta pehlîwanan jî heye, herwekî ji ber êrişên tîrên mehbûbê, ji ber cazîbeya spehîtiya mehbûbê, pehlêwanên weke Rustem jî bêtaqet dimînin û bi sedan qehremanên weke Rustem û Efresiyab, hatine kerkerkirin û hatine kuştin.

Bi Şîrînê negehit desti eger Rustem bit
Dê bi bazûyê milan şubhetê Ferhadî çi ket (22/2)

Keybir reşandin bêhisab misrî ku dan sîqal û tab
Sed Rustem û Efrasiyab kuştin li wan ker kir cesed (40/2)

[460] Yıldırım, “Rüstem”, h.b., r. 592-596.

### 2.1.4.10. Qeyser

Qeyser, leqeba împeretorên Bîzansê û yên Romaya Berê ye. Qeyserê Romê, ew împeretorê Bîzansê ye ku bûye hakimê Anatoliyayê.[461] Qeyserê Romê, wek îstî'areyî ji bo nêrînên yarê yên li ser 'aşiqî bûye mijar. Qeyserê Romê, kezî û bisk in, li serhedê frengan, dor û rexên dêmê, top û zincîr jî davên kezî û biskan e. Zulfa yarê, bi reşahiyê ve (kufr/tarîtî) dema dibe freng, serê zulfê jî dibine davik ku 'aşiqî pê bigirin û hêsîr bikin.

Qeyserê Romê li ser heddê Fereng
Top û zincîr vebestin çep û rast (18/5)

Qeyserê Romê ji bo muqayesekirinê bûye mijar. Şa'ir, xweşî û aramiyê bi xefî, di hêmbêzkirina yarê de dibîne, naxwaze behsa tiştên fanî yên weke Qeyserê Romê û mal û milk û selteneta wî bike ku 'umrê xwe zayî bike. Xaqanê Tirkan û Qeyserê Rûmê bi telmîhî û îstî'areyî hatine bikaranîn. Şa'ir, dixwaze xaqanê mehbûban dest dayne ser welatê Qeyserê Romê. Yan jî unsûrên husnê yên rûyê dilberê, serdestiyê li zulfan bike û di nav zulfên (freng/kafir) wê de bêne xwuyakirin.

Dê nihanî bi der axûş dê bidî canê şîrîn
Şaxê 'umrî bixwe ber jê û ji Qeyser meke behs (27/6)

Dibit bêjin me haqanî bi heft ayatê Furqanî
Li mehbûban tu xaqan î were derbê li Qeyser da (92/19)

Qeyser, ji bo beyankirina mezinahiya mehbûbê hatiye bikaranîn. Mehbûb, bi text û sifetên xwe ve Qeyser e û caran ji wî jî mezintir û dewlemendtir e. 'Aşiq dixwaze mehbûba wî bimeşe biçe ber deriyê qesrê, li hemberî şah û qeyseran raweste û pesnê xwe bide ku ew ji wan xemiltir e.

Textebend û sifetên qeyseriyê
Dînberê hûrîmîsalê periyê
Nazikê neyşekerê surperiyê (123/1)

Bimeş û ku kewkeb bi ser derê qesrê
Bi xwe kokê li şah û qeyser ke (98/8)

### 2.1.4.11. Efrasiyab

Efrasiyab, hukumdarê Turkîstanê yê namdar e û kurê Pêşeng e. Bi şerên padîşahên îraniyan ve namdar bûye, ji re wesfê nemiriyê hatiye dayîn, lêbelê

---

461 Pala, "Kayser", b.n.b., r. 263.

Ahuramazda wesfê nemiriyê ji wî standiye. Di şerê îran û tirkan de, ji aliyê Keykawûs û Keyxusrew ve tê kuştin. Efrasiyab di *Şehname*yê de, wek kesekî xirab û terefdarê Ehrîmen û dijminê îraniyan tê behskirin. Efrasiyab, di edebiyatê de, ji xeyrî van neyîniyan, wek nîvpehlîvanekî tê qissekirin.[462] Herçendê kesên weke Efrasiyab û Rustem pehlîvan jî bin, ji ber cazîbeya mehbûbê têk diçin û dimirin.

Keybir reşandin bêhisab misrî ku dan sîqal û tab
Sed Rustem û Efrasiyab kuştin li wan ker kir cesed (40/2)

#### 2.1.4.12. Hekîm Loqman

Hekîm Loqman, ji bo kewgirtina birîna ‘aşiqî bûye mijar. Ji ber ‘eşqa mehbûbê, dilê ‘aşiqî bi şîşan hatiye daxkirin. Şa’ir, ji mehbûbê dixwaze lutf û keremê jê re bike û bi sifetê xwe yê “Hekîm Loqmani”yê birîna wî derman bike, lewra ew sewdaliyê wê ye. Derd jî derman jî, ji mehbûbê tên. Ew di sihhetbexşiyê de Hekîmê Loqman e, dil bi wê nefesê hildide. Ew dermanê derdê cegeran e, ew ji bo ‘aşiqan stêra bext û tali’ê ye.

Îro tu bes bike Loqmaniyê xan im
Lutfek bi Melê ra bike sewda yim ez (49/13)

Dil nefes dîsa bi ber hat lew Hekîm Loqman bi ser hat
Nafi'ê derdê ceger hat tali'ê kewkeb numa ye (96/3)

#### 2.1.4.13. Şapûr

Bi navê Şapûr, sê hukumdarên îraniyan hene. Şapûrê kurê Erdeşîr, nexşkêşê namdar Manî û Xusrewê Perwîz.[463] Navê Şapûr, ji bo pesendkirin û mezinkirina memduhî bi teşbîhî hatiye bikaranîn. Şa’ir dixwaze, şirînpuser (zarokên şirîn) di dîwanê de daîma amade bin û yên weke Xusrew û Şahpurî jî xulam û girêdayî şehzadeyê wî bin.

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê Şapûrê te bit da Xusrew û Şapûri bî (117/13)

---

[462] Yıldırım, “Efrasiyab”, Fars Mitoloji Sözlüğü, r. 268-271.
[463] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 310-311.

### 2.1.5. Kesayetiyên Çîrokî (Hîkayewî)

### 2.1.5.1. Xusrew û Şirîn

Hîkayeya Xusrew û Şîrînê, cara yekem di *Şehname*yê de, di behsa Xusrewê Duyem de, ji aliyê Firdewsî ve (wefat, zayînî 1021) hatiye nivîsin. Vê hîkayeyê şeklê xwe yê 'eslî bi vehandina Senaî (wefat, zayînî 1150) û Nîzamiyê Gencewî (wefat, zayînî 1214?)[464] ve hilgirtiye. Nîzamî, ev hîkaye wek mesnewiyekê nivîsandiye û piştî wî jî di edebiyata gelên musilmanan de bi dehan mesnewî li ser şopa Nîzamî hatine nivîsîn. Xusrew, kurê hukumdarê îranî Hurmuz e û Şîrîn jî prenseseke ermenî ye. Xusrew, şevekê, di xewna xwe de dibîne ku bapîrê wî Nûşîrewan mizgîniyê didê ku dê Xwûda çar tiştan bike nesîbê wî: Di spehîtiyê de yareke bêmîsal (Şirîn), bi navê Şebdîz hespekî harîkulade, bi navê Barbed musîkîşînasek û textekî muhteşem. Xusrewê Perwîz, wan bi dest dixe û di dawiyê de kurê wî yê ji Meryemê çêbûyî, Şîrûy dixwaze bi Şirînê re bizewice û babê xwe Xusrewî dide kuştin.[465]

Xusrew, bi munasebeta ku hukumdarekî xweyî heşmet û 'ezamet e, di dîwanê de wek teşbîhî ji bo yar, memdûh û 'eşqê cih girtiye. Peyva "xusrew"ê, di wateya sultan û prensan de jî hatiye bikaranîn. Navê Xusrew û Şirînê, bi tewriyewî hatine bikaranîn. Xusrew, hem di wateya hukumdarî de hem jî wek kesayetekî hîkayeyê hatiye bikaranîn. Şirîn jî hem di wateya yara Xusrew ya hîkayeyê de hem jî di wateya şirîn û spehiyê de hatiye bikaranîn.

Meger Şirîn bi vê şîraniyê bû
Ela şems-ul melahet qed tuşarek (69/2)

Mehbûb, Xusrewê xûban e û ew 'aşiqên dîwane ku tên û dikevine tor û davika zulfa yarê, musteheq in ku Xusrewê xûban wan ceza bike. Ew, bi bejnziraviyê, neyşekerî, zîvîten û porzêriyê ve Xusrew e. Ew mehbûba weke periyan, dema di nav hevrîşimê zêrkirî de (sundus) xwuya dibe, ji ber husn û cemalê wê şah dibin bende û geda û dildariyên wê jî weke Xusrew payebilind dibin. 'Aşiq li ber me'şûqan tenê naveguherîn, bi sedan padîşah û xusrewan (sultan) jî, ji bo 'eşqa wê canê xwe feda kirine.

Dîwane herê tên û di vê silsil û bendê
Ku musteheqê Xusrewê xûban bi ceza girt (20/16)

---

464 Mehmet Kanar, "Nizamî-i Gencevî", *DİA*, c. 33, İstanbul 2007, r. 183-185.
465 Yıldırım, "Husrev ve Şirin", Fars Mitoloji Sözlüğü, r. 393-397; Canım, b.n.b., r. 355-356.

'Er'era qamet'elîf neyşekera şox û şepal
Nazik û sîmîten û Xusrew û zerrînkulehê (110/2)

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bin xwuya
Bende dê şah û geda bit Xusruwê şîrîn kelam (77/2)

Sed padişah û Xusruwan can dan di ‘işqê û rewan
Şirîn di libsê erxewan min dîn li bejna serwîqed (40/3)

Navê Xusrew û Şirînê bi tewriyewî hatiye bikaranîn.‘Aşiq hem sultan e hem jî weke Xusrew di meqameke payebilind de ye. Me’şûq hem li bal ‘aşiqî şîrîn e hem jî weke Şirîna Xusrewî xweyî husn û cemal e. Xusrew û Şirîn, sultanên ‘aşiq û me’şûqan in. Dema xusrewê (sultan) ‘işqê li ser textê wucûdê (dil) rûnişt, deriyên sirran lê vedibin û ruh dibe hakimê her tiştî. Mehbûb, xusrewa (sultan) padîşahan e; xub, dilberî, naz û şîweya mehbûban li wê tên.

Xusrewê ‘işqê ku rûnişt li ser textê wucûd
Fetehe’l-qelbe ‘elel-fewri we li’r-rûhi melek (70/7)

Xûbî û dilberî û naz û telettuf bi te şên
Xusrewa padişehan î we xûdana cebehê (110/14)

Di kevneşopê de mêr mehrê didin jinan, lêbelê di toreya hubbê de kesê xweyî husn bibe, ji wî re mehr tê dayîn. Xusrewê dildarê Şirînê, sultanê Derbendê ye, pêwîst e, dilberên zîvbeden mehr û baca xwe bidene wî.

Xusrewê Şîrînê li Derbendê husn
Sîmîberan lazim e lê mehr û bac (30/7)

Memdûh, bi qedr û qiymetê ve weke Xusrew e û ji wî jî qedirbilindtir e. Xusrew li cem memdûhî ancax weke tayê tor û dafikê (bendê şapûrê) ye, yanî ji bo bidestxistina arzûyan weke tiştekî berdest û di emrê wî de amade ye.

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê Şapûrê te bit da Xusrew û Şapûri bî (117/13)

### 2.1.5.2. Leyla û Mecnûn

Leyla û Mecnûn, wek du kesayetan sembola ‘aşiq û me’şûqên negehiştine hev in. Ev herdu kesayet, ‘aşiq û me’şûqên îdeal in. Navê Mecnûn, Qeys bîn Mulewweh e, ji ber ‘eşqa Leylayê, her tişt terk kiriye û bi çol û çiyan ketiye. Malbata Leylayê destûrê nade ku wuslata wî bi Leylayê re çêbibe û Mecnûn dîn û har dibe, vediguhere mecnûnekî. Di edebiyata tesewwifê de, Leyla ‘eşqa îlahî, Mecnûn jî ruhê bêqerar yê

însên sembolîze dike. Ji bo ku Mecnûn bigehije meqama herî bilind (wuslata Heqqiyê) pêwîst e ew ji qefesa wucûdê derkeve.[466]

Di dîwanê de Leyla ji bo teşbîhê (îstîare) bûye mijar. ‘Aşiq xwe wek Mecnûn, yara xwe jî weke Leylayê dibîne. Çawa ku Mecnun ji ber ‘eşqa Leylayê dîn bû kete çolan û perîşan bû, her wisa şa’ir jî weke ax û ava bêqerar ya di nav lehiyê de, ji ber ‘eşqa mehbûba xwe şewitiye û bûye pêtên êgir. Hiş û ‘eqlê şa’irî, ji ber husna mehbûbê ji serî çûye û mest bûye û ew jî weke Mecnûnî xwe di çolê de reben dibîne. Dilê wî jî di serê çengela (kullabe) keziyên dilberê de, ewa wekî şehmaran maye. Quweta ‘eşqa Leylayê, Mecnûn perîşan kiriye, eger ew hêz û quweta ‘eşqê nebûya Mecnûn nedikete wî halî.

Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sehlê û suheylê
Muhbeta ‘işqa di Leylê ez kirim yekser pilox (36/7)

Mestê bi dêm ez bûm mudam çûne ji dest min ‘eql û fam
Mecnûn ez im sehra meqam dil kefte zarê ef'îyan (90/5)

Setweta Leylê yeqîn Mecnûn teband
Wer ne Qeys naket beyabanê xelet (61/4)

Leyla wek îstî’areyî di wateya mehbûbê de hatiye bikaranîn. Şa’ir dema behsa yara xwe dike, wê wek Leylayê dibîne û diwesifîne. Herdu birhên Leylayê weke du roj û du hîlalan li ser dêmê wê (mehbûb) cih girtine.

Pêro yeqîn ku xal in di ‘iqda Sureyyayê
Du roj û du hilal in lê dêmê wê Leylayê
Bêwesf û bêmîsal in di remza şekerxayê (132/27)

### 2.1.5.3. Ferhad û Şîrîn

Ev hîkaye, bi gelek versiyonan ve hatiye nivîsîn. Di hinek versiyonan de ‘aşiq wek Ferhad, di hinekan de jî wek Xusrew derdikeve pêş. Di versiyonên gelêrî de lehengê sereke Ferhad e. “Ferhad, ‘aşiqê Şirînê û raqîbê Xusrewê Perwîz e. Bi fedakarî û samîmiyetê ve, Xusrew di bin siya Ferhadî de dimîne.”[467] Ferhad kurê xaqanê Çînê ye. Ferhad di neynika Îskenderê Rûmî de Şirînê dibîne û ‘aşiqê wê dibe. Ferhad ji bo Şirînê ji çiyê avê derdixe. Xusrewê Perwîz jî hez ji Şirînê dike û Ferhadî digire û hepîs dike. Xusrew, ji Ferhadî re xeberê dişîne ku ew bi Şirînê re zewiciye. Ferhad vê xeberê

[466] Yıldırım, “Leyla ve Mecnun”, h.b., r. 487-489.
[467] Yıldırım, “Ferhad”, h.b., r. 305-307.

seh dike û xwe dikuje. Şapur cesedê Ferhadî tîne serayê û Şirîn wî dibîne û ew jî ruhê xwe teslîm dike. Ev hîkaye jî, veguherîna ‘eşqa mecazî ya ber bi ‘eşqa îlahiyê ve sembolîze dike.[468]

Ferhad, bi teşbîhî ji bo beyankirina hêz û quwetê bûye mijar. Di hîkayeya Ferhad û Şîrînê de tê qissekirin ku ava Çiyayê Bîsutûnê, du sed ustayan ku ew sê sal bû nedikarîn derêxin, Ferhadî bi pazuyên xwe yên bi quwwet, di yek rojê de derdixe.[469] Lêbelê di ’eşqê de dîsa înayet nebe, bi quwweta pazûyan û bi pehlewaniyê destgehiştin/wuslat peyda nabe.

Bi Şîrînê negehit desti eger Rustem bit
Dê bi bazûyê milan şubhetê Ferhadî çi ket (22/2)

Şa’ir, di rêya ‘eşqê de xwe weke Ferhadî dihesibîne. Ew qas ji mehbûba xwe hez dike, yek mûyekî wê bi du sed Zîn û Şîrînan nade. Ji ber vê yekê, ji yarê dixwaze ku ew ‘aşiqî, Ferhadê (dildar) xwe hesêb bike. ‘Aşiqî di rêya mehbûbê de canê xwe daye pêşiya xwe, dixwaze weke Ferhad û Şirînê yara xwe bibîne. Serê wî jî di vê rêyê de biçe, ew det ji dîtina yara xwe bernade. ‘Aşiq, herçendê di rêya mehbûbê de cefayê bikêşîne jî, ew bi halê xwe memnûn e, naxwaze feryad û fixanê bike û giliya mehbûba xwe bike. Ew dixwaze wekî Ferhad, bi samîmane ji ber kul û kovanan bêdeng ruhê xwe teslîm bike. Ferhad, lezzeta ‘eşqê hîs kiriye û canê xwe di vê rêye de daye. Di ‘aşiqîbûna Şirînê de, Ferhad ji Xusrewî samîmîtir e, wî bi can û dil, ji Şîrînê hez kiriye. Ferhad çêtir dizane bi halên xem û derdên ‘eşqê û cazîbeya Şirînê.

Mûyekî ez ji te nadim bi dused Zîn û Şîrînan
Çi dibit ger tu hesêb kî me bi Ferhad û Memê (109/14)

Dest nehêlim ez ji dînê şibih Ferhad û Şirînê
Wê di ber ‘işqa evînê min di rê çit ev kulox (36/8)

Me navêt ez bi feryad kim li zulma dilberê dad kim
Sehî dê şubhê Ferhad kim bidim rûhî ji kovanê (111/5)

Tinê Ferhad dizanî lezzetê ‘işq
Ku wî can daye Şîrînê bi Perwîz (46/5)

Ferhad dizanit tu ji Perwîzî mepirs
Etwarê xemê 'işq û sura Şîrînê (119/12)

[468] Canım, b.n.b., r. 355-357.
[469] Canım, h.b., r. 355.

Ferhad di neynika Îskenderê Rûmî de Şirînê dibîne û 'aşiqî wê dibe. Ji bo beyankirina vê rewşê, navê Şirînê wek telmîhî hatiye bikaranîn. Şîrîn, di çavê Ferhadî de ew qas spehî ye, nîgarkêşê herî namdar Manî jî nekariye resmê wê çêke û xeta kiriye.

Mîsala sûretê Çînê xelet Manî xeta kêşa
Ku min dîbû di ayînê ji ber zulfa duta kêşa
Me dîbû şeklê Şîrînê tu ustadan we nakêşa (131/8)

#### 2.1.5.4. Şeyxê Sen'an

Şeyxê Sen'an, Şêx Ebdurrezaqê Yemenî ye. Ferîduddîn 'Ettar, di *Mantiqu't-Teyrê* de û Feqiyê Teyran jî di şi'rekê xwe de hîkayeya Şeyxê Sen'anî bi berfirehî qisse dike. Şeyxê Sen'an, di edebiyata klasîk de sembola wî şexsî ye ku ji bo 'eşqê çîle û izdirabê dikêşe û xwe fedayî mehbûba xwe dike.[470]

Navê Şeyxê Sen'an, di dîwanê de wek telmîhî hatiye bikaranîn. Şa'ir, di 'eşqê de, xwe di mertebeyeke bilind de dibîne, lewra dilê wî behra me'aniyê ye û ji bo ehlê dilan di îşaretên wê de şîfa hene. Di 'eşqê de şêxê yekem Şêxê Sen'aniyan e û ew jî di mertebeya şêxîtiyê de di rêza duyem (sanî) de ye. Ew serpêhatiyên di serê Şeyxê Sen'aniyan de qewimî, ew daxwazên heram ên şêx ji bo yarê pêk anî (meyvexwarin, şivanîya berazan, şewitandina Qur'anê)[471] û bi xewndîtinê çûna li Ermenîstanê, hemû bi teqdîra îlahî bûne.

Di 'işqê Şeyxê Sanî me bi dil behra me'anî me
Li zî hicrin we zî qelbin şifaun fî işarat (23/18)

Mey nenoşî Şeyxê Sen'anê xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet (61/1)

#### 2.1.5.5. Mem û Zîn

Çîroka Mem û Zînê, bi navê "Memê Alan" wek destaneke mîtolojîk, ji beriya miladiyê ve heta niha di nav kurdan de hatiye qissekirin. Ehmedê Xanî, ji destana Memê Alan îlhama xwe giritye û wek mesnewiyê nivîsandiye. "Başî, rastî, bêgunehî,

---

[470] Canım, h.b., r. 335-338.
[471] Feridüddin Attar, *Mantıku't-tayr,* r.70-83; Feqiyê Teyran, *Ey Avê Av û Şêxê Sen'anî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 1999; M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî),* Nûbihar Yayınları, İstanbul 2000, r.267-357.

jarî û bindestî di şexsê Memê û Zînê de, xirabî, şalûzî, fesadî û durûtî jî di şexsê Bekir de kiriye qalikekî muşexxes û li ber çavan raxistiye."[472]

Di dîwanê de, tenê di beytekê de navên Mem û Zînê wek telmîhî û teşbîhî hatiye bikaranîn. Mehbûba şa'irî, li bal wî ew qas hêja û payebilind e ku mûyekî yara xwe bi du sed Zîn û Şirînan nade ku ev herdu me'şûq jî di asteke bilin de ne. Şa'ir ji mehbûba xwe dixwaze ew wî weke Ferhad û Memî, wek dildarekî ji xwe re qebûl bike, lewra ew jî weke wan 'aşiqan dildar û hezkiriyekî samîmî ye.

Mûyekî ez ji te nadim bi dused Zîn û Şîrînan
Çi dibit ger tu hesêb kî me bi Ferhad û Memê (109/14)

**2.1.5.6. Gêw û Peşeng**

Gêw, yek ji wan qehremanên îranî e. Ew kurê Gûderz e û zavayê Rustem e. Wezîfeya wî ya herî giring ew bûye ku Keyxusrewî ji destê tirkan xilas kiriye û aniye Îranê. Keyxusrew hêza xwe ji wî girtiye. Ew jî digel Keyxusrew wenda dibe û êdî nayête dîtin.[473] Bi navê Peşeng, çend qehremanên îranî hene ku di hîkayetên îranî de hatine qissekirin.[474] Gêw û Peşeng, ji ber qehremanî, şer û cengê bûne mijar. Di şerê rûm, ecem, freng û hebeşan de (ji zulf, qews, nîşan, mijang û birûyên yarê temsîlî ye) dema şer gûr dibe, ji şerê pehlêwanên weke Gêw û Peşengî dijwartir dibe.

Lê ne wek waqi'eya Gêw û Peşeng
Hilbitin qenc ji nêv ateşê ceng (123/5)

**2.2. Qewm**

**2.2.1. 'Ereb**

Peyva "'Ereb"ê, di dîwanê de, bi gelemperî wek muşebbehûnbîh hatiye 'emilandin. Lewra qewm û taîfeyên 'ereban bi rengê xwe ve reş in û pora yarê, xal, xet, birh û mijang jî reş in û bi îstî'areyî hatine bikaranîn. Di behsa destpêka pêxembertî (tecelliya nûra ehediyetê û nûra Muhemmedî) û mu'cîzeyên pêxember de, bi zikirkirina şervan û qehremanên dewra Îslamê de (Xalidê kurê Welîd, Hemze û Îmam Elî), bi teşbîh û îstîareyê di beyankirina rengên taîfeyên 'ereban (zulf, birû û mijangên

[472] Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn,* (Wer. Mehmet Emîn Bozarslan), Hasat Yayınları, İstanbul 1990, r. 10.
[473] Yıldırım, "Gîv", Fars Mitoloji Sözlüğü, r. 335.
[474] Yıldırım, "Peşeng", h.b., r. 565.

yarê) de, di behsa Hemmadê ‘Ereb de û di medhê memduhî de û ji bo beyankirina fethan peyva “‘ereb”ê hatiye bikaranîn.

Mim metle’ê şemsa ehed ayîne sifet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê "Ecem da (1/3)

Tox û ala ku xuyabûn ji 'Ecem
'Ereban tîp şikestin çep û rast (18/3)

Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê ‘Ereb
Tox û ‘ala di Ferengî ne kemandarê Hebeş (54/5)

Zorbe weh tînin ‘Ereb têk cevandin qeseb
Qenc bi çehvan werin ceng û cîdala Cemel (73/6)

**2.2.2. ‘Ecem**

Peyva “Ecem”ê, di dîwanê de, bi gelemperî wek muşebbehûnbîh hatiye ‘emilandin. Lewra qewmê ‘ecem, bi rengê xwe ve spî ye û bi îstî’areyî di cihê rûyê yarê de hatiye ‘emilandin. Di behsa tecelliya nûra ehediyetê û nûra Muhemmedî de bi îstî’areyî behsa şerê rûm, hindî, moxol, ‘ereb û ‘eceman (liwa, tox û al, bi îstî’areyî, zulf, tuncik û temborîkên yarê; pençê pilingê awirên yarê; cohtê moxolan, çav û qewsên hîlalî yên yarê ne) de, wek îronî, di behsa helbestdizînê de ji bo pêşketina edebiyata ‘eceman, ji bo medhê memdûhî ku derbendê ‘eceman bikevine bin emiriya wî û bi îstî’areyî, ji bo fetihkirina welatan[475] peyva “‘Ecem”ê hatiye bikaranîn.

Eşkal û xetên daîreyê nûqteyê 'ilm in
Ev neqş û misal in di xeyalatê 'Ecem da (1/2)

Durrê nasufte dihoni me nedi mislê tu qet
Ne di semtê 'Ecemê da ne der iqlimê Teter (44/2)

Rûm û ‘Ecem ji her teref ceng û sewaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber liwayê zulf (63/7)

Rom û 'Ecemê girtiye oxilme bi sef sef
Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)

[475] Mela Ebdurrehîmê Westanî, navên qewman yên di vê beytê de “Te Fireng û 'Erebistan û Mecer têk standin/Celewê xweş vegerîn hatiye newba 'Ecemê (109/15)” di wateyekî tesewwifê de bi kar tîne û dibêje; mexsed bi Frengan nefsa emmare ye, bi ‘Erebistanê nefsa lewwame, bi Mecerê nefsa mulheme û bi ‘Ecemê nefsa mehcûbe ye. Tehsîn Îbrahîm Doskî, vê beytê bi fetihkirina Osmaniyan ve girê dide ku Osmaniyan welatê Freng, Mecer û ‘Ereban bi dest xistin û di dorê de bidestxistina welatê ‘Eceman heye. (Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r, 95-96.)

### 2.2.3. Kirmanc

Mîr û Kirmanc du çînên kurdan in. Di desthilatdariyê de beg, axa û mîran xwe ji kirmancan nedihesibandin. Di dîwanê de peyva “Kirmanc”ê hem îşaretî vê yekê dike hem jî di wateya kurdên ku ne desthilatdar in dike. Peyva “Kirmanc”ê di behsa şerê kirmanc û ‘ereban de bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. Gulang, bisk, kagul û kezî ji ber rengê xwe ‘ereb in. Kirmanc, bi reng û dilsadeyiyê ve spî ne wek îstî’areyî enî û dêma yarê ne. Li ser dêm û eniyê; kagul, bisk têne meydanê, hêrişê didene nexş, nîgar û nîşanan.

Mir û Kirmanc li holan qederek westane
Lê di nîvê herdu sef û tipê 'Ereb hatine ceng (71/13)

### 2.2.4. Tirk

Tirk, di edebiyata klasîk de wek mezmûnekê, neteweyekî leşker û şerker in. “Peyva ‘Tirk’ê bi mezmûnên weke xwîn, talan û yexmayê” ve tê bikaranîn.”[476] Tirk, wek îstî’areyî mehbûba xwînrêj e û ew bi xemzeyeke xwe, zuhdê salane yê ‘aşiqî ser û bin dike. Di behskirina şerê tirk, moxul û hindiyan (zulf, xal, kezî) de, ew bi goreyî xusûsiyetên xwe, bi îstî’areyî, hatine bikaranîn. Tirk, çavên yarê yên tîravêj û talanker in. Turk zulfa yarê ne, dema bi kevanên xwe yên bêtêl, bi dêmê re têne ceng û herbê, tîran di dêmê de wer dikin.

Turkê xwûnrêzî xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çil sal e li min zêr û zeber kir ji esas (51/9)

Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne 'eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)

Da bêne ceng û herb û şer zulfa ji qewsê bê weter
Têk da xûrrîn Turk û Teter deng tête nêva mestîyan (90/4)

Tirk, di dîwanê de di wateya mehbûbên dilrevîn de hatiye bikaranîn. Tirk, talan û yexmayê bi xeletî nakin, lewra di xuliqandina wan de xwînrêhtin heye. Ew, dilan jî canan jî dibin û bi dilrevînê ve namdar in. Tirk, wek teşbîhî ji bo çavê yarê hatine bikaranîn. Çavên yarê û mehbûba şox ya tirk, ji aliyê sêhr, xemze, tîravêtin û bêperwayiyê ve weke hev in. ‘Aşiq, ji ber nêrînên derbên çavên yarê yên mîna

---

[476] Ayhan Tek, *Melayê Cizîrî (Jiyan û Tesîra Edebî, Şerha Xezelên Bijartî),* Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2019, r. 68.

mehbûbên şox yên tirk, çawa goy ji ber lêdana çewgan û kaşoyan direve, wisa direve, lewra çavên wê mehbûbê dilrevîn in.

Geh dil û geh can diben Turkên te tên
Nagirit yexma û talanê xelet (61/22)

Xemze în ya gezme în ya tîri ya sihrê helal
Sahir în ya çeşmê şoxê Turkê bê perwa sti în (83/6)

Li ber çewgan û kaşoyan ji derba Turk û Hinduyan
Dibazim her wekî goyan dema ew têne meydanê (111/11)

Di behsa nî'metdayînê (çemê Firat û Nîlê), şerwanî û şehsuwariyê de jî tirk bûne mijar.

Lê meşreb û Turkan Firat û Nîl kir
Teşneleb çû terfê 'ummanê xelet (61/23)

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şêrê 'Elî
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê 'Ereb (14/5)

**2.2.5. Mecer**

Mecer, bi şahê xwe ve, bi fetihkirinê ve û bi tîr û xedengên xwe ve bi îstî'areyî hatiye bikaranîn. Mehbûb wek şahê Mecerê ye, dema sûbê xwûya dike, weke hûrî û periyan e. Tîran tavêje dilê 'aşiqî û bêînsaf e. Hubba mehbûbê, her roj 'aşiqî dikuje; ew ji ber tîr û xedengan, weke miriyekî di nav xwînê de maye.

Xeflet bi sir da min nezer mîran bi qetlê kir xeder
Tîr dane dil şahê Mecer bê mirwet amanc kir ceger (125/1)

Min dî seher şahê Mecer libsê di ber mexmûri bû
Ew hem durrî surmuşterî ya Reb perî ya hûri bû (107/1)

Hubba te ma xweş hiştime her roj ji nû ez kuştime
Yekser ji xûnê riştime tîr û xedengên Mecerê (113/16)

**2.2.6. Rûm**

Rûm, ji ber şer û fetihkirinê wek îstî'areyî hatiye bikaranîn. Di dîrokê de şerê rûm, fireng û 'eceman gelekî çêbûye. Şerkirina wan wek îstî'areyî bi sembola zulf, dêm, birh û kagûlên yarê hatine îfadekirin. Rûyê yarê spî ye û bi îstî'areyî padîşahê Rûmê ye û zulf, xett û xalên reş 'ereb û hindî ne, dixwazin wê derê bixin bin hakimiyeta xwe. Rûm û fireng, zulm û kufrê temsîl dikin. Pora yarê, rûyê wê

dinixumîne û reş e; ji ber vê yekê wek kufrê hatiye dîtin. Ew bi bêînsafiyê ve jî weke kafirên Rûmê ye.

Tu binê Rûm û ‘Ecem kuştine Zengî di kemîn
Hane her têt peyapey ji teref ru zu û xweş (54/6)

Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne 'eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)

Rom û 'Ecemê girtiye oxilme bi sef sef
Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)

Rûm û ‘Ecem ji her teref ceng û sewaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber liwayê zulf (63/7)

Ew şepala şeng û şox e kafira Rom û Fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştim bi dox (36/4)

### 2.2.7. Nûbî û Zengî

Nûbî û Zengî, ew millet in ku ji rengên xwe ve reş in. Nûbî û Zengî, bi munasebeta şer û tewafa Beytê wek îstî’areyî hatine bikaranîn. Zengî, kagul û xalên yarê yên reş, nûbî biska reş ya ser eniyê temsîl dike. Xal di rûyan de hindik in. Ev rewş, bi husnê te’lîlî, bi kuştin û kêmasiya wan ve hatiye girêdan. Rûm û ‘ecem (enî, dêm, rû) di sefekî de; Hindî, zengî û hebeş (zulf, xal, birh) jî di sefekî de li hemberî hev şer dikin.

Bên sewaşê Hebeş û Nûbî û Zeng
Tu dizanî çi neheng in çi neheng (123/5)

Her li dora Hecer eswed Hebeşan çerx e tewaf
Rast û çep tên 'Erefatê bi sema Nûbi û Zeng (71/11)

Rûm û ‘Ecem ji her teref ceng û sewaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber liwayê zulf (63/7)

### 2.2.8. Teter

Teter, bi têkiliya şer û talanê bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. Hejandina zulfê li ber bê û qewsên yarê yên tîravêj û talanker weke turk û teteran in.

Da bêne ceng û herb û şer zulfa ji qewsê bê weter
Têk da xûrrîn Turk û Teter deng tête nêva mestîyan (90/4)

### 2.2.9. Hindî

Hindî, ji bo rengên xwe bi teşbîhî (muşebbehûnbîh) hatine bikaranîn. Di beyankirina şerê gelan de hindî, bi îstî'areyî ji ber rengê xwe, temsîliyeta por û xalên yarê dike.

Ber vi şerqê û seher westayîn
Hîndûyên rojperest in çep û rast (18/4)

Li ber çewgan û kaşoyan ji derba Turk û Hinduyan
Dibazarim wekî goyan dema ew têne meydanê (111/11)

Sef sef me dîn Hindî û Hebeş Cengîz hat Teymûrê Leng
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan Şeref (64/8)

Hindî bi zikirkirina teyrê tawusê, bûne mijar. Hind, cihê tawusan e, ew kesê bixwaze spehîtiya wê bibîne an jî bi dest bixe, pêwîst e zilm û zordariya hindîyan jî bide ber çavên xwe.

Cewrê Hindî bikêşînit her kesê Tawus bivêt
Gewher û durra yetîm bêterkê ser nabin teleb (15/12)

### 2.2.10. Hebeş

Hebeş, ji bo rengên xwe bi teşbîhî (muşebbehûnbîh) hatine bikaranîn. Hebeş, di meydana şer de, bi îstî'areyî, temsîliyeta por, çav û birhên yarê dikin. Hebeş, kemandar (çav) in. Sef bi sef sekinîne di destê wan de tîr û kevan hene (birh û mijang) û berdidin dilê dijminan (dilê 'aşiqan). Xala yarê, wek îstî'areyî, Heceru'l-Eswed e, zulf (haciyên hebeşî) li derdora wê diçin û tên, wê tewaf dikin.

Zengiyan quşen vebestin pêşiberê coqa Hebeş
Daberistin yek bi yek çûn ber liwayê rast û çep (17/10)

Cohtê Hebeşan bi terfetil'eyn
Anî qederek ji Espehan bac (29/7)

Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê 'Ereb
Tox û 'ala di Ferengî ne kemandarê Hebeş (54/5)

Her li dora Hecer Eswed Hebeşan çerx e tewaf
Rast û çep tên 'Erefatê bi sema Nûbî û Zeng (71/11)

Îhram me best eswed bû qest yar hate mest ez çûme dest
Cohtê Hebeş tîr dan bi weş hecca me xweş mebrûri bû (107/17)

Rom û 'Ecemê girtiye oxilme bi sef sef

Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)

### 2.2.11. Fireng

Fireng, di wateya gelên ewropî de hatiye bikaranîn û ji bo şer û temsiliyeta kufrê bûye mijar. Di şerkirina gelan de wek îstî'areyî bi sembola zulf, dêm, birh û kagûlên yarê hatiye bikaranîn. Di dîwanê de fireng kafir e, temsîliyeta zulfa yarê ya reş dike û rûyê yarê yê spî dinixumîne. Fireng zalim in û qesta canê 'aşiqî dikin.

Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê 'Ereb
Tox û 'ala di Firengî ne kemandarê Hebeş (54/5)

Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne 'eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)

Ew şepala şeng û şox e kafira Rom û Fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştim bi dox (36/4)
Cegerê kun dikin û tê dibeyîn mislê tifeng
Mislê wê kafir û zalim qe dibin kes di Fireng (121/4)

### 2.2.12. Moxul

Moxul, di edebiyata klasîk de bi şer û talanê têne naskirin. Ew ji ber şer û tîravêtinê ve bûne mijar. Peyva "Moxil"ê bi îstî'areyî bi sembola pora yarê û çavên yarê ve hatiye bikaranîn. Ravekên weke "tîrik Moxil" û "cohtê Moxilan" îşaretê bi çav, birh û mijangên yarê dikin.

Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne 'eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)

Min li dil tîrik Moxil dî têk ji ber xûnê qizil dî
Lê dibêm derba ku dil dî hêj ji çehvên şehle ye (97/50)

Rom û 'Ecemê girtiye oxilme bi sef sef
Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)

### 2.2.13. Qereş (Qureyş)

Qureyş, qebîleya Hz. Muhemmed (sxl.) Pêxember e. Di dîwanê de ji bo medh û mezinahiya memdûhî hatiye bikaranîn. Dilber, li ber pêyên memdûhî hatine şabaşkirin, lewra ew ji qebîleya qureyşan e û ji mezinahiya wê re ew qas şabaş hêj hindik in.

Çendan te but û latê nisarê qedemî ne
Î'cazê me ke vê ku tu ji neslê Qereş i (129/6)

### 2.2.14. Qeçer

Qeçer, xanedanên tirkmenan e û li Îranê hukum kirine. Di sala 1796ê de, Axa Muhammed Xan ev dewlet ava kiriye.[477] Ev ‘eşîrekî noxolî ye û Teymûr Leng ew anîne Îranê û bûne şerwanên Sefewiyan.[478]

Qeçer, bi şer û tîrên xwe ve namdar bûne. “Tîrên Qeçerê” wek îstî’areyî temsiliyeta çav û awirên yarê dikin. Êş û elemên ‘aşiqî yên mezin ji derba wan tîrên Qeçerî ne û dilê wî tejî xedengên (sertîr) Qeçerî ne.

Li me êş û eleman zêde ji tîra Qeçerê bû
Dil ji me bûye pelek can û cesed têk seqerê bû (122/1)

Ku di zindan û hebisxaneyê wê bend û esîr im
Ji xedengên Qeçerî sîne tejî gezme û tîr im (122/4)

### 2.3. Welat û Şar

### 2.3.1. Fireng (Firengîstan)

Welatê Firengan, ji ber şer, êriş û medhê memdûhî bûye mijar. Memdûhî gelek cih fetih kirine û welatê firengan jî di nav de ye. Fireng, di wateya Ewropayê de wek diyarê kufrê, bi peyv û ravekên weke “Freng û heddê Firengê”, bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. Mehbûb, bi şervanî û tîravêtina xwe ve Qeyserê Romê ye. Çavên yarê bi xemze û awirên xwe ve li ser xeta Frengê (li ser xaza por û eniyê de) sekinîne êrişî ‘aşiqî dikin.

Te Fireng û 'Erebistan û Mecer têk standin
Celewê xweş vegerîn hatiye newba 'Ecemê (109/15)

Qeyserê Romê li ser heddê Fireng
Top û zincîr vebestin çep û rast (18/5)

### 2.3.2. Çîn û Maçîn

Çîn û Maçîn, gelemperî bi têkiliya zulfa yarê hatine bikaranîn. Çîn, xelek û porxelekîya zulfa yarê îfade dike. Çînên (zencîr û xelek) zulfa yarê, sed welatên weke Çîn û Maçînê di nav xwe de girtine. Bêhna mîsk û ‘enberê, ji Çînê tê û li wê derê di zikê xezalekî de tê peyda kirin. Yar ji bo pora xwe ya ‘enberîn, wek xerac ji çîniyan

---

[477] Faruk Sümer, “Kaçarlar”, *DİA*, c. 24, İstanbul 2001, r. 51-53.
[478] Şerefkendî (Hejar), b.n.b., r. 627.

mîsk û ‘enberê distîne. Ji ber wê ye pora wê her daîm bêhn’enberîn e. Çîn, bi têkiliya sûretê Çînê (resm û nexşên Manî), di dîwanê de cih girtiye.

Sed Çîn di xwe da girtine zulfa te bi çîn
Şi'ra ye me dil û heq çûye heta Maçînê (119/12)

Mihra te pur ebter kirîn xalan ji bin biskan derîn
Zulfa muselsel 'enberîn çîn çîn ji Çînê tête bac (31/8)

Hûr û ferişte kê we dîn nazik û xûb û surşîrîn
Dêmê numûne bir biçîn sûretê Çîn numa xelet (60/4)

Mîsala sûretê Çînê xelet Manî xeta kêşa
Ku min dîbû di ayînê ji ber zulfa duta kêşa
Me dîbû şeklê Şîrînê tu ustadan we nakêşa (131/8)

### 2.3.3. Bexdad

Bexdad, bi kesayetiyên dînî ve şehrekî pîroz e. Bi têkiliya welî û murşîdan ve bûye mijar. Herçendê li Bexdadê kesayetên mezin hebin û ew der cihekî pîroz be jî, kesê ketibe rêya sulûkê û dest bi îrşadê kiribe, êdî ne mumkin e ku ew li Bexdadê bimîne.

Te xered vêkketina yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê bi Bexdadi çi ket (22/9)

### 2.3.4. Xeta (Xeten)

Xeta herêmeke Çînê ye û bi miskê ve namdar e. Por, xal, xet û kagula yarê, bi bêhnê ve bi têkiliya miska Xetayê ve hatinê bikaranîn. Bêhna pora yarê ji bêhna miska Xetayê xweştir e. Qiymeta Xetayê li cem yarê nîne. Bêhna pora yarê ji bêhna miska Xetayê xweştir û hêjatir e. Ji ber vê yekê, ‘aşiq, mulkê Xeta û textê (padîşahê) Xetayê fedayî yek zulfê yarê dike.

Enwera rengfirişte beşera hûrîsirişt
Ya ji miskê Xetenê xal û xet û kagul û qişt (121/1)

Sosin û sunbul û gul çerx e li dora semenê
Xemriya helqe û çîn dane ji miskê Xetenê (121/3)

Silsila behsê ji xûna dil birin zulfa biçîn
Dê Xeta bit nafe misk er nafeyê Tatarî bit (19/5)

Zulfan tu bes çîn çîn bike biskên muqabil dîn bike
Pêşkêşî yek zulfa te bin mulkê Xeten textê Xeta (7/2)

Bêhna miskê ji zikê ahûyê derdikeve û ew ahû (xezal) jî li Xetayê dijîn. Yar jî bi hinek xusûsiyetên xwe ve (çav, silikîn, bedewî) wek ahûyê ye. ‘Aşiq, ji bo wuslatê, dav û kemîn li ber ahûsifetê vedaye, dema yar pê dihese, ji ber ku nekeve kemînê, berê xwe vediguherîne, bi ber Xetayê ve diçe.

Canên xwe me kir dane û dama ku vedayî
Ahûsifet ew pê hissîya rahê Xeta girt (20/6)

### 2.3.5. Teter

Misk, nafe û durrên Teterê namdar in. Teter, bi têkiliya durrên nasufte, bi bêhna misk û nafeyê hatiye bikaranîn. Helbestên Mela weke durran in, ew di iqlîma Teterê de jî peyda nabin. Xal, turre û zulfa yarê ji miska Teterê bêhnxweştir e û dema bêhna pora wê bê, behsa bêhnên mayî wek xeta tê dîtin.

Durrê nasufte dihoni me nedi mislê tu qet
Ne di semtê 'Ecemê da ne der iqlimê Teter (44/2)

Silsila behsê ji xûna dil birin zulfa biçîn
Dê xeta bit nafe misk er nafeyê Tatarî bit (19/5)

Ji neqş û sun'ê Cebbarî muterra turreya tarî
Li nûrê miskê Tatarî li ser wan xemriyan berde (92/14)

Hûrîweş e şirînmeş e kagulreş e xalhebeş e
Xalên di qer miskê Teter nazikbeşer kafûri bû (107/2)

### 2.3.6. Seba

Seba, bi munasebeta Belqîs, hudhud Suleyman Pêxember û xweşikahiya wî ve di dîwanê de cih girtiye. Dilber Belqîssifet û li Sebayê meskûn e. Seba, weke bihişta Baxê Îremê hurrem û aram e.

Dê me hudhud ji Seba bêt û nizanîn çi ye hal
Ku li halê me xerîban ne sual û ne cewab (13/11)

Min dilberek wek durr heye mehbûb û şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye Belqîssifet mesken Seba (11/4)

Çendekê çemen hurrem bû lê medam wek subhedem bû
Min bihişt Baxê Îrem bû lê seba go min Seba ye (96/12)

### 2.3.7. Bedexşan

Bedexşan, deverek e li Efxanistanê, bi ser Feyzabadê ve ye. Ew bi yaqûtên gelekî hêja û kevirên le'l ve meşhûr e.[479] Bedexşan, di dîwanê de, ji bo rengê kevirên le'l û yaqûtan bûye mijar.

Her sîneyê tabi temam napuxte xam bê mihr û cam
Xerqîn di xûna dil medam le'la Bedexşan î Mela (12/12)

Durexşan hat û rexşan hat sena berqa tecellayê
Bi cama reng bi lexşan hat bi fîrûzê cela dayê
Li min le'la Bedexşan hat ji destê mahsîmayê (131/4)

### 2.3.8. Heleb

Heleb, ji ber murşîdî (pîrê muxan) bûye mijar. Ew kesê meqseda wî mey be û bixwaze meyê di şîşe û qedeha zuzac de vexwe, pêwîst e biçite Helebê, ji pîrê muxanê re xizmetê bike, lewra Heleb, bi şêx û murşîdan ve cihekî namdar e.

Xidmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd mey
Şîşe û cama zucacê ê divêt dê ret Heleb (15/11)

### 2.3.9. Espehan (Esfehan)

Espehan, bajêrekî Îranê ye, îro jê re "Esfehan" tê gotin.[480] Ev bajar, bi bac û xeracdayînê ve bûye mijar. Bac û xerac, wek îstî'areyî, bi têkiliya yarê ve hatiye bikaranîn. Esfehan, di serdema Cizîrî de paytexta Sefewiyan bûye. Çavên yarê (cohtê hebeşan) li ser 'aşiqî ew qas tesîrdar e, ji cihê herî zor jî bacê distîne, yanî kesên payebilind û dijwar jî dixe bin hîmayeta xwe.

Cohtê Hebeşan bi terfetil'eyn
Anî qederek ji Espehan bac (29/7)

Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac (31/9)

### 2.3.10. Kurdistan

Kurdistan, ji wî ciyê re tê gotin ku kurd tê de jiyane û dijîn. Ewliya Çelebî, di sedsala 17em de li seranserê welatê Kurdistanê geriyaye û sînorên wê weha tespît kirine: "Sînorê wê yê bakur diyarê Erzirûmê ye û ji wir bi ser Wanê, Hekariyê, Cizîrê,

---

[479] Melayê Cizîrî, Dîwan, (ferheng), r.320.
[480] Melayê Cizîrî, h.b., (ferheng), r.319.

Îmadiyyeyê, Mûsilê, Şarezorê, Erdelanê, Dereneyê û Deretengê re heta Besrayê diçe."[481] Kurdistana îro, ji qismek navend û başûrê Zaxrosan, ji sê beşan du beşê rojhilata Toros û Pontusê, ji nîva başûrê çiyayên Amanosê pêk tê.[482]

Kurdistan, wek sembolekê, ji bo medhê memdûhî ku dixwaze cihên herî xweş û cazîbedar bikevin bin hîmayeta wî, bi îstî'areyî bi têkiliya yarê ve ku yar "şehê Kurdistanê" ye û ji 'aşiqên xwe jî bacê distîne û di beytên fexriyeyê de ji bo kesayetî û mezinahiya hunera şa'irî hatiye bikaranîn.

Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî (116/9)

Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac (31/9)

Bi tebilxaneyê şahî were text
Ku tu îro şehê Kurdistan î (114/4)

Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im (123/2)

### 2.3.11. Şîraz

Şîraz, ew bajarê dîrokî ye ku li başûrê Îranê, li ser rêya dîrokî ya bazirganiyê cih girtiye.[483] Bajarê Şîrazê, bi îstî'areyî bi têkiliya dilberê; bi kevanên namdar ve ku birh û çavên yarê ne; bi têkiliya hunermendê namdar Hafizê Şîrazî ku şa'ir di zeviya şi'rê de wî ji xwe re rakîb dibîne û bi têkiliya namdariya bajarê bi xwe ku tê de hunermend û mutesewwifên mezin derketine, bûye mijar.

Mislê wî qewsê hilalî ku du nûn in reyhan
Kî nişan dane di Şîraz kî anîne ji Yeng (71/10)

Dema ew tên bi bazî tên digel qewsên şîrazî tên
Çi mûkar in û tazî tên bi de'wa dêne lêkdanê (111/12)

Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şi'rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet (21/12)

Tulu'a ma ji bo gitî şefeq da
Ji Şîrazê şu'a'ê daye Tebrîz (46/6)

---

481 Mihemed Emîn Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê,* (Wer. Ziya Avcı), Weşanên Avestayê, İstanbul 2012, r. 27.
482 Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, Doz Yayınları, İstanbul 2004, r. 43.
483 Osman Gazi Özgüdenli, *DİA,* "Şîraz", c. 39, İstanbul 2010, r. 182-184.

### 2.3.12. Yeng (Yang)

Bi navê Yang-Cou û Yang-Çuanê li Çînê du bajarên mezin hene. Li başûrê rojhilata Asyayê, bi navê “yang”ê darek heye, bi rengê beqema sor an jî bi rengê esmersorê ye û zêde saxlem e. Ev dar, di avakirina xaniyan de tê ‘emilandin.[484] Dibe ku ew tîrên (yengî) ku Melayê Cizîrî behs dike ji wê darê hatibin çêkirin.

Yeng,[485] bi tîran ve weke bajarê Şîrazê namdar bûye. Yengî (tîrên Yengê), bi îstî’areyî, bi têkiliya yarê ve û bi çêkirina tîr û kevanan ve ku tîr; awir, mijang û çavên yarê ne û kevan jî birh û çavên yarê ne, di dîwanê de bûye mijar.

Mi j'bihriyan pur naliyan şevtariyan ceng bû miyan
Wer kuştiyan ji yengiyan b'wan tilliyan xweş ke giyan
Kir şefqe mîr anîme bîr pur dan me tîr ku mîr esîr
Negha feqîr zulfa herîr avêhte şîr da pê bi heq (67/3)

'Alim e b'daxê firadan gezmeyên wan nûn û sadan
Çûne dil hetta bi radan yengiyê reşgoşe ye (97/2)

Di dest da yengiyek nûbari min dî ew kemanebrû
Li bala cedwelek Cebbarî têda hemqeran ebrû (108/1)

Têne qetla me û tên me du hezar tîr û xedeng
Direşînin me di destan du siyeh qewsê ji Yeng (121/4)

Yengî te di şengî bi derengî we kişandin
Sed tîr û xedengî bi çi rengî te reşandin
Serpence bi îşkence te wek xunçe livandin
Hestî we bi mestî li me vê ra herişandin (130/7)

### 2.3.13. Wan

Wan, li başûrê Kurdistanê, bajarekî kevnare ye, ji aliyê qralîçeya asûrî Şah Meryemê ve (Semîramîs) hatiye avakirin. Di dewra Keyaniyan de, desthilatdarekî bi navê “Wan”, bajar fireh kiriye û ji nû ve ava kiriye û piştî wî Wan ketiye destê Îskenderê Mezin.[486] Di dewra Îslamê de gelek sehabî ji bo bidestxistina Wanê hatine û li vir şehîd ketine. Ji ber coxrafyayeke stratejîk, Wan gelek giring bûye û di dîrok û edebiyatê de jî behsa wê hatiye kirin.

---

[484] Meydan Larousse, “Yang”, c. 20, Sabah Gazetesi Yayınları (dîroka weşanê tune)
[485] Hejar dibêje, peyva “Yeng”ê tu qamusekî de rastê me nehat û dibe ev peyv “Yezd” jî be û ev bajarekî mezin e û li rojhilatê Esfehanê ye. (Şerefkendî (Hejar), b.n.b., r. 211.)
[486] Mehmet Emin Bozarslan, *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler,* Deng Yayınları, İstanbul 2001, r. 229.

Di dîwanê de Wan, bi îstî'areyî, bi têkiliya dilberê ve bûye mijar. Wan, di dewra Osmaniyan de, wek senceqekê girêdayî Osmaniyan bûye û bac daye paytextê. Ev xusûsiyet (bacdayîn), wek îstî'areyî bi dildayîn û fedakirina 'aşiqî ve hatiye beyankirin.

Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac (31/9)

### 2.3.14. Finik (Findik)

Finik, nahiyeya qezaya Dihê ya wilayeta Sêrtê ye.[487] Di dewra Melayê Cizîrî de wek gundekî bûye. Finik, di dîwanê de ji bo şa'irê diz bûye mijar. Kesekî şi'rên Melayî, wek şi'rên xwe nîşan dida û Melayê Cizîrî jî li ser wî kesî hicwiyeyek nivisiye. Finik mekanê xezelan e, şa'irên ku xezel dinivîsandin dizanin ku ew muteşa'ir ne musennifê wan şî'îran e.

Tu d'zani di Finik da ku mekanê xezelan e
Çi buha têne meta'ê te eya bê ser û ber (44/5)

### 2.3.15. Tebrîz û Xurasan

Tebrîz, bajarek e li Îranê û navenda wilayeta Azerbeycana Rojhilat e. Di sala 1502yê de Şah Îsmaîl Tebrîz kiriye paytexta Sefewiyan.[488] Xurasan jî eyaletek e li bakurê rojhilatê Îranê ye. Di 'ilm, edebiyat û tesewwifê de derketiye pêş û kesayetên namdar jê derketine.[489] Tebrîz û Xurasan, di wateya welat û şehran de, ji bo medhê memdûhî hatine bikaranîn ku şa'ir dixwaze ev şehrên giring jî bikevin bin hîmayeta wî.

Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî (116/9)

Tebrîz, ji ber kesayetên mutesewwif (Şemsê Tebrîzî) û ji bo fexriyeyê ku ronahiya helatina şaîrî, heta Tebrîzê çûye, bûye mijar.

Teb û tabê hezar îşkence da dil
Ji Şîrazê negahî mestê Tebrîz (46/7)

Tulu'a ma ji bo gitî şefeq da
Ji Şîrazê şu'a'ê daye Tebrîz (46/6)

---

487 Seyid Eliyê Findikî, *Dîwan,* Weşanê Nûbiharê, İstanbul 1999, r. 5.
488 Ali Sinan Bilgili, "Tebriz", *DİA*, c. 40, İstanbul 2011, r. 219-222.
489 Osman Çetin, "Horasan", *DİA*, c. 18, İstanbul 1998, r. 234-241.

### 2.3.16. Hebeşistan

Hebeş(istan), welatek e ku li rojhilata Afrîkayê cih digire. Ew, yek ji jîngehên herî kevn a dunyayê ye.[490] Hebeş, di dîwanê de, bi îstî'areyî hatiye bikaranîn. Xala yarê "Hecerê Eswed/Kevirê Reş" û "Beytu'l-Qudus" e, zulf bi rengê xwe ve hebeş in û ji Hebeşistanê têne ziyaretiya wê.

Ew e hem şafiyê derdan te çi hacet bi niviştê
Dibitin Beytêqudus ehlê ziyaret ji Hebeş tê (122/2)

### 2.3.17. Misir

Li Misira Berê zanist gelek pêş ve çûbû. Di serdema hakimiyeta Firawûn, Pers, Yewnan û Romayê de gelek alim û seyyahên bêyanî li Misrê cih dibin û ji medeniyeta wê îstîfade dikin. Misir, di dirokê de, bi têkoşîna Mûsa Pêxember, bi firawûn re û bi qisseya Yusûf pêxember ve derketiyê pêş.[491]

Misir, bi şûrên xwe yên elmasî ve ku bi îstî'areyî temsiliyeta awirên çavên yarê dikin; ji bo medhê memdûhî û bi telmîhî di behsa Yusûf Pêxember de bûye mijar.

Xencer û tîr û teber barîn şibê berq û burûsk
Misriyan lami' ji elmasan didayê rast û çep (17/5)

Ji lebê le'lê şekerbar te nekir pursî Melê
Misriyan gezme reşandin ku kişandin elmas (51/10)

Şukur bînahiya min hat û Ye'qûb dîde rewşen bûn
Bi boya Yûsufê Misrê li Ken'anê beser peyda24 (5/23)

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şi'ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê (131/37)

### 2.3.18. Qezneyn (Xeznîn)

Qezneyn, bajarekî dîrokî yê Efxanistanê ye. Di çavkaniyên îslamî de wek "Xezne, Xeznîn" hatiye qeydkirin. Di berhema *Hudûdu'l-'alem*ê de wek "Xeznîn" derbas dibe. Di dewra Sultan Mehmûdê Xeznewî de, ji aliyê kulturî û şaristaniyê ve bi pêş ketiye û wek navendeke bazirganiyê namdar bûye.[492] Qezneyn, ji bo medhê memdûhî ku şi'ra wî di gelek navendên giring de belav bûye, hatiye bikaranîn.

---

[490] Davut Dursun, "Etiyopya", *DİA,* c. 11, İstanbul 1995, r. 488-491.
[491] Hilal Görgün, "Mısır", *DİA,* c. 29, Ankara 2004, r. 555-557.
[492] Enver Konukçu, "Gazne", *DİA*, c. 13, İstanbul 1996, r. 479-480.

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şi’ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê (131/37)

### 2.3.19. Laleş

Laleş, mekanê êzdiyan yê pîroz e û li Kurdistana Başur cih digire. Laleş, wek wadiyekê li bakurrojavayê Musilê ye. Meqbera Şêx Adî, li vê derê ye û ev der cihê haciyên êzdiyan e.[493] Laleş, di dîwanê de bi têkiliya mehbûbê wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. Hemû cihê ku perestî lê tê kirin mihrab in û mihraba ‘aşiqî jî bi wê re ye. Laleş jî yek ji wan mihraban e.

Dil geşt e min ji dêrê naçim kenişteyê qet
Mihrab wê bi min ra wer da biçîne Laleş (53/3)

### 2.3.20. Ermenistan

Ermenistan, wek welatekî, di edebiyata klasîk de derbarê lehengên destan û hîkayeyan de bûye nijar. Şêxê Sen’an di xewna xwe de qîza padîşahê ermeniyan dibîne, ‘aşiqî wê dibe û bi pey wê dikeve. Ew ji bo ku heqîqetek derkeve meydanê çûye nav Ermenîstanê. Ew ne bi îradeya xwe, belkî bi teqdîra Îlahî çûye.

Mey nenoşî Şeyxê Sen‘anê xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet (61/1)

### 2.3.21. Necef

Necef bi şahê xwe ve bûye mijar. Şahê Necefê, bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. Mehbûb, weke şahê Necefê ye, yanî di meqameke bilind de ye.

Min dî bi xef şahê Necef sohbet bi kef fincan di kef
Nûn ku jê berdan xedeng wê pur ji teng şîrînleb e (100/3)

Min dî ji xeflet cam di kef Şahê Necef dil kir hedef
Roj hate şeref stêr bûne xef her çar teref nûra yeqeq
Zulmet nema suhbet we ma nûra şemalan çû sema
Lê ew dema zulf bûn cema hatin semayê yek neseq (67/1)

---

[493] Îbrahîm S. Işık, *Kürtler*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2013, r. 304.

### 2.3.22. Behreyn

Behreyn, welatekî xweyî behr e û ji ber şi’ra memdûhî bûye mijar. Şi’rên Mela weke durran in. Durr jî ji behrê (Behreyn) derdikevin. Şa’ir xewwas e û di behrê de durran derdixe.

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şi’ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê (131/37)

Mela billah di vî dewrî bi vî rengî bi vî tewrî
Nîşan da wek Nîşanî kes me durr anîn ji Behreyn (89/6)

### 2.3.23. Kerbela

Kerbela, çolek e, li Iraqê ye. Îmamê Huseyîn li wê derê şehîd ketiye û ev der di edebiyata klasîk de wek cihê derd, kerb û belayê derketiye pêş. Kerbela, bi îstî’areyî hatiye bikaranîn û temsîliyeta mîhnetên rêya ‘eşqê dike. Kesê bikeve rêya seyr û sulûkê, pêwîst e di gelek wadiyan re derbas bibe. Wadiya vê dunyayê jî weke Kerbelayê ye.

Çûme ser pişta kumeydî min jê pur ew jan û key dî
Behr û ber me l'ber xwe tey dî deşt û çol û Kerbela ye (96/5)

### 2.3.24. ‘Erebistan, Mekeh û Medîne

‘Erebistan, ji ber fetha memdûhî bûye mijar. Memdûhî gelek dever û welat fetih kirine û xistine bin hîmayeta xwe û ‘Erebistan jî yek ji wan welatan e.

Te Fireng û 'Erebistan û Mecer têk standin
Celewê xweş vegerîn hatiye newba 'Ecemê (109/15)

Şehrê Mekehê, cihekî pîroz e û Beytu’l-Heram li wê derê ye. Ev şehr, ji ber Heceru’l-Eswedê, wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. Heceru’l-Eswed, xala yarê ye û ‘aşiq dixwaze biçite Mekehê (huzura mehbûbê) ku Heceru’l-Eswedê bibîne û wê ramûse.

Hecer Eswed bidirit destî ziyaret bikirim
Nezrê min bit bigirim xassa terîqa Mekehê (110/8)

Medîne, di ne’tekê de derbas dibe û ji ber ku cihê wefata Pêxember e, bûye mijar. Pêxember li Medîneyê, di rewzeya paqij de medfûn e û her dildarekî wî dixwaze wê sedefê bibîne. Dîtina wî jî ancax bi çûyîna Medîneyê û bi me’newî hasil dibe.

Xeyrî te nehin der sedefê behrê wicûdê
Lew lazim e em qesdê bikin rahê Medîne (101/6)

### 2.3.25. Derbend û Semerqend

Derbend, li Daxistanê, li qeraxa bakurrojavayê Behra Xezarê, şehrekî dîrokî ye. Ji aliyê Sasaniyan ve wek şehrekî keleh hatiye avakirin.[494] Derbend û Semerqend, di wateya şehr û memleketî de wek memleketên dilberan hatine beyankirin. Derbend cihê Şirînê ye û ev der wek "Derbendê husn" hatiye îfadekirin. Mehbûbên van şehran ji aliyê neqşê birhan ve bêqusur in.

Xusrewê Şîrînê li Derbendê husn
Sîmîberan lazim e lê mehr û bac (30/7)

Ne Şîrîna li Derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Nekêşayin bi vî rengê li neqşê bêzewal ebrû (106/14)

Şehrê Debendê ji bo medhê memdûhî, di du beytan de jî bi tewriyewî hatiye bikaranîn. Şa'ir dixwaze şirînpuserên Derbendê di dîwanê de xizmetkarê memdûhî bin û Derbenda 'Ecemê jî xelata teşrîfa wî be.

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê Şapûrê te bit da Xusrew û Şapûri bî (117/13)

Xass û teşrîfê te bin derya û derbendê 'Ecem
Da xelatên her seher sed zerkeş û mexmûri bî (117/18)

### 2.3.26. Bohtan û Cizîr

Bohtan û Cizîr, di dîwanê de, wek du cihên giring, di wateya herêm û şehran de cih girtine. Bohtan, bi îstî'areyî, ji bo fexriyeyê ku şa'ir xwe gula Baxê Îremê Bohtanê dihesibîne û Cizîr jî, ji bo medhê memdûhî hatine bikaranîn. Şa'ir dixwaze Cizîr bibe text û paytexta memdûhî.

Çendî ku digerrihim dikêşim sebr û hîrê
Şubhetê çeng û jeh im hilak im j'derba tîrê
Senaxwanê Feqqeh im îroke di Cizîrê (132/50)

Tu mebîn bêser û bêsaman im
Gulê baxê Îremê Bohtan im (123/2)

Ya Cizîrê şubhê Dara textê heft iqlîmi bit
Da hukm û seltenet Eskender û Fexfûri bî (117/10)

[494] Aliyev Salih Muhammedoğlu, "Derbend", *DİA*, c. 9, İstanbul 1994, r. 164-166.

### 2.3.27. Şam û ‘Iraq

Şam û ‘Iraq, di wateyên welatan de hatine bikaranîn. Şam û ‘Iraq welatê mehbûbê ne. Ji bo wuslatê ferz e ku ‘aşiq biçe Şam û ‘Iraqê ku mehbûbê bibîne, dax û keserên dilê xwe pê bikewîne.

Sefera Şam û 'Iraqê li me xweş lazim û fer kir
Bi me da jehr û reqîban di devî şehd û şeker kir (122/5)

## 2.4. Çem, Çiya, Wadî û Behr

### 2.4.1. Çem

#### 2.4.1.1. Firat, Dîcle û Nîl

Dîcle, bi pêl, ber û çalan ve bi teşbîhî hatiye bikaranîn. Weke Çemê Dîcleyê, di rêwîtiya jiyan û seyr û sulûkê de jî pêl, kevir û çal gelek in. Lazimê ehlê sulûkê hay ji wan hebe.

Da binasî xeterên rê û nebî xafil jê
Dicle ye lê di purr in per per û pîl û ber û kerx (37/5)

Nîl, Firat û Dîcle, bi gelemperî bi hev re hatine beyankirin û bi coş û bereketa xwe ve, wek teşbîhî bûne mijar. Şa’ir feyza ‘ilm û hikmeta xwe, bi van çeman re muqayese dike ku ew di wê derbarê de dewlemend e. Dilê şa’irî, ji aliyê bereketa feyzê ve weke behrên mezin e û weke sed Nîl û Firatê, feyz diherikin dilê wî.

Feyza me şubhê Nîl e em Dicle û Ferat în
Ger şeyx wird dame vêraye min keşakeş (53/13)

Sed Nîl weh tên û diderin qelbê me
Pê nahesihîn qulzum û derya yim ez (49/7)

Dîcle û Nîl, ji ber boşbûnê jî bûne mijar. Hêstirên çavên ‘aşiqî, bi coşbûnê ve, bi Nîlê re hatiye wekandin. Ji ber peydanebûna wuslatê, sebr û sukûna şa’irî ketiye Dîcleyê û çûye, yanî êdî ew bêsebr û nerehet e; ji ber vê yekê jî çawa ava Nîlê boş e û her diherike, ew jî bi du çeşman weke Nîlê hêstiran dibarîne. Ew xwîna weke pêlan di dilê ‘aşiqî de peyda bûye, wek hêstiran di çavên wî de bûne derya. Hêstirên çavên ‘aşiqî ew qas zêde ne, ew av e ku bûye serekahniya Nîlê.

Sebr û sukûn çûn me ji nêv Dicle da
Lew ji du çeşman me dizêt abê Nîl (72/7)

Xwûn ku ji dil bi mewc bêt eşkê rewan me têne xet

Nîl ji dîdeyan dizêt keftime navê şubhê qet (60/1)

Firat û Nîl, ji bo fetihkirina tirkan wek mecazî, bûye mijar. Mehbûbê, ji ber çavbirçîtiya wan ev herdu çem dabûne wan (Mezopotamya û Sîna ketiye bin hîmayeta wan), lê dîsa çavên wan têr nebûye û wek xeletiyekê berê xwe dane ‘ummanên mezin.

Lê meşreb û Turkan Firat û Nîl kir
Teşneleb çû terfê ‘ummanê xelet (61/23)

### 2.4.2. Çiya (Koh)

#### 2.4.2.1. Tûrê Sîna

Çiyayê Tûrê, li çola Sînayê, nêzikî Behra Sor e. Wek têgeheke tesewwifî, sembola nefsê dike. Xwûda li vî çiyayî, ji aliyê nefsê ve xitabî Mûsa Pêxember kiriye. Perçebûn û şewitîna çiyê ya ji ber tecelliyê, temsîliyeta nefsê ya fenafillahê dike û Çiyayê Tûrê temsîliyeta însên ya aliyê maddî dike.[495]

Tûrê Sîna, bi peyv û ravekên weke “Tûr, Kohê Tûr, Tûrê Muqeddes, ateşê Tûr, Tûrê qelb, Wadê Eymena Tûrê, nûra ateşê Tûrê”, bi telmîhî, teşbîhî, îstî’areyî, ji bo Mûsa Pêxember û cihê tecelliya nûra Xwûda bûye mijar.

Çiyayê Tûrê, bi îstî’areyî ku temsîliyeta ‘aşiq û dilê ‘aşiqî dike; bi telmîhî ji bo mu’cîzeya Mûsa Pêxember û tecelliya nûra Îlahî û bi teşbîhî ku bi têkiliya tecelliyên îlahî ku di çiya û dilî de peyda dibin, hatiye bikaranîn.

Zanim te kohê Tûr e dil lew her bi nar û nûr e dil
Şehkaseya ferfûr e dil lew mest û sekran î Mela (12/11)

‘Eynê ‘işq în û di dil ateşê Tûr
Ji sena berqê cemalê qebes în (80/10)

Billah ji çi nûr î we tecella li çi Tûr î
Geh geh li seraperdeyê can multemes î tu (105/5)

Ku nûrê ‘işqê lami‘ dit li Tûrê qelbê lami‘ det
Di seyra berzexi’l-esma’ nihayat û bidayat (23/4)

Di libsê tarî û nûrê perîrengê sifethûrê
Ji wadê Eymena Tûrê muqeddes kir li min 'erde (92/2)

Bi qudret nuqteya nûrê ku kiswet bû li nîşanê
Ji nûra ateşê Tûrê çi şewqek daye perwanê
Ji sehba badeferfûrê me ateş hate fincanê (131/20)

[495] Canım, b.n.b., r. 612-613.

Ji Wadyê Eymena dilber nizam enguştek îzhar bit
Ku xweş enwar û berq in ew tecellabûn di Tûrê da (5/27)

### 2.4.2.2. Kohê Qendîlê

Çiyayê Qendîlê, li sînorên Îran û ‘Iraqa îro, çiyayekî mezin û bilind e (3500 m).[496] Ev çiya ji bo hêza ‘aşiqî ya di ‘eşqê de bi teşbîhî hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, di ‘eşqê de weke Çiyayê Qendîlê di asteke bilind de ye.

Tu barê firqetê zanî nikarim ez tehemmul kim
Bi narê kohê Qendîl im bila fîl im di ‘işqê da (5/38)

### 2.4.2.3. Kohê Qaf

Çiyayê Qafê, çiyayekî efsanewî ye. Tê bawerkirin ku vî rêzeçiyayî derdora dunyayê dorpêç kiriye. Sûreya Qafê ku bi herfa “qaf”ê dest pê dike, ji aliyê mufessîran ve, wek temsîliyeta Çiyayê Qafê hatiye şirovekirin. Çiyayê Qafê, di tesewwifê de temsîliyeta wucûda murşîdê kamil dike.[497]

Qaf, di dîwanê de, bi wateya çiyê de, ji bo teşbîha dilî ku weke Qafê sabitqedem e û ji bo xeyirîna rojê ku Çiyayê Qafê rûyê rojê dinixûmîne, wek mecazî ji aliyê berfirehî û dûrbînê ve ku ew dunyaya ji aliyê Çiyayên Qafê ve hatine dorpêç kirin û ji bo tecelliyên şêwe û remzên mehbûbê ku Kohê Qafê jî ber wê ker ker dibin, hatiye bikaranîn.

Dil di deryayê qidem Qaf e bi sabit qedemî
Gerçi daîm li serê ferq e me minşarê hudûs (28/5)

Pêlek ziyaret çin tewaf şubhê wê nînin Qaf bi Qaf
Zemzem ji yaqutê şefaf can dê bibexşim şubhê av (65/14)

Binê nûnên li ser sadan ku katib goşe lê badan
Seraser qaf ta qaf e rumûza hikmeti’l-'eyn (89/3)

Şêwe û remzên di wê teşbîhê berqê lami' in
Kohê Qaf bit ker dikit sata xuya bit perde ye (93/11)

### 2.4.3. Behr (Behra Qulzumê)

Eqlê însên ji îdraqkirina xuliqandin û sirrên Xwûda re acîz e. Ehlê îrfanê nebe nayête îzahkirin. Ji bo vê yekê jî, hem ji bo beyanatên belîx û fesîh hem jî ji bo

---

[496] Işık, b.n.b., r. 242.
[497] Pala, “Kaf”, b.n.b., r. 248.

têgihiştinê, teşbîh û sembol derdikevine meydanê. Tecellîbûn û te'sîratên Xwûda bi teşbîh û sembolan bi tenzîhkirina wî, tê îfadekirin. ʻIlm û hukmê Xwûda bi deryayê û tecelliya nav û sifetên wî jî bi pêlên deryayê têne teşbîhkirin û sembolîzekirin. Ancax bi vî awayî heqîqeta eşyayê tê îdraqkirin. Wucûd/mewcûdiyeta heqîqetê, ew behra bêqerax e, coş bûye û tecelliyên wê hatine xwûyakirin. Ew pêlên li ser deryayê têne xwûyakirin jî ʻalem e.

Behra di 'alem lê zebed mewc û hebab in hin cemed
Peyweste têtin cezr û med seywan li sehrayê veda (9/111)

Behr, di dîwanê de, bi gelemperî ji aliyê tesewwifê ve bûye mijar. Zatê muqeddes, bi kerem û comerdiya xwe behra keremê coş kiriye û behra heyînê bi fermana Xwûda ya "kun feyekûn"ê dest pê kiriye. ʻAlema heyînê weke behrekê hatiye beyankirin û destpêka heyînê û xuliqandinê weke qetreyek badenoşiya ji behrê hatiye îfadekirin. Husna Xwûda li behra wucûdê daye û nûra Muhemmedî wek sedefekê hatiye wucûdê. Dema behr coş bûye, ji zatê qedîm nûrek tenezzul bûye û heyîn di ʻilmê Xwûda de peyda bûye. Paşê, heyînê di behra wucûdê de, pêl û pêl dest pê kiriye. ʻAlema semayê, sîstema roj û stêran jî paşê hatine wucûdê.

Zatek muqeddes bû wucûd coşiş nedabû behrê cûd
Wesfê îzafat û quyûd yek jî tecellayê neda (9/3)

Feyyadê 'ilmê "min ledun" pey pey ji behra "kan û kun"
Geh geh bi ustadê suxun wî gewherê nasufte da (9/132)

Dil behr e û sed hezari mewc in
ʻArif çi xeber ji behrê mewwac (29/14)

Behra wucûdê coşi hat nûrek tenezzul bû ji zat
Hatin te'eyyun her sifat eşya zuhûr 'ilmiyye da (9/46)

Her neh bi vê çerx û lezê çerx in li dora merkezê
Behra di 'alem lê kezê tê ev hebab sergeşte da (9/110)

Ji xeyrî Behra Qulzumê (Behra Sor), navên behrên taybet di dîwanê de derbas nabin. Ev behr, bi mecazî ku durr û mucewher jê têne deranîn, ji bo comerdiya memdûhî wek behra sor ya mîran hatiye beyankirin.

Ji behra Qulzuma mîran bi xewwasî guherçîn im
Di behsa şerh û tefsîran tu deryayan we nabînim
Ji mîr û begler û çîran xulamê Mîr ʻUmadîn im (131/39)

Behr, bi wate û destnîşankirina têgeh û mefhûmên weke ‘alema heyînê, ‘alema neyînê (behra 'edemê), xuliqandinê, îhsan û comerdiyê, ‘alema tecelliyê (behra cemalê), zehfahiya derdan, ‘ilm, kûrahiya dil, dirêjahiya firqetê, xwestin û arzûyên bêsînorî hatiye bikaranîn.

Behr, di van beytên jêr de, wek têgeh û sembolan, di nav ravekên weke behrê cûd, behra wucûdê, behra cemalê, behra 'alemê, behra kan û kunê, behra narê îlahî, behra me‘anî, behrê ferqê û behru’l-‘emîqê hatiye bikaranîn.

Zanim ji 'işqa dojeh î behrek ji narê îlahî
Îro li mahê xergeh î teşbîhê seywan î Mela (12/5)

Di ‘işqê Şeyxê Sanî me bi dil behra me‘anî me
Li zî hicrin we zî qelbin şifaun fî işarat (23/18)

Me bi sehrayê wîsala xwe bi derîn tu ji Xudê ra
Wer ne weqt e ku bibîn xerqeyê behra 'edemê (109/7)

Mela billah di vî dewrî ti vî rengî bi vî nûrê
Nîşan da wek Nîşanî kes deranîn durr ji behrê da (120/6)

Behr, digel parzemînê, bi şeklê “berr û behr û mulk”ê û “derya, qaf û qulzem”ê, ji bo îfadekirina hemû dunyayê hatiye bikaranîn.

Billah çi teb'etadem î yekser dibêm yek 'alem î
Deryayê Qaf û Qulzem î yan çerxê gerdan î Mela (12/3)

Pur le'l û dur te j'kilkê 'işq anîne nezma silkê 'işq
Der berr û behr û mulkê 'işq me'lûm e xaqan î Mela (12/13)

**2.4.4. Wadî (Wadiyê Eymenê)**

Wadiya (newal) Eymenê, nêzikî Çiyayê Tûrê ye. Di dîwanê de di çend beytan de Eymen û Tûr bi hev re hatine. Mu’cîzeya Mûsa Pêxember ya bi axaftina Xwûda re û tecelliya Îlahî di vê wadî û çiyayî de pêk hatiye. Ji ber vê yekê ev derdor wek cihên pîroz tête qebûlkirin. Newala Eymena Tûrê ji bo Mûsa Pêxember bi telmîhî di dîwanê de cih girtiye.

Ji Wadyê Eymena dilber nizam enguştek îzhar bit
Ku xweş enwar û berq in ew tecellabûn di Tûrê da (5/27)

Di libsê tarî û nûrê perîrengê sifethûrê
Ji wadê Eymena Tûrê muqeddes kir li min 'erde (92/2)

Bi bulbul ra şeb û rozê li ser wê terh û bişkojê

Enîmahê şefeqrozê te sohtim şubhetê rojê
Ku dûr im ez ji wê hûrê tenê carek li ser şûrê
Ji Wadê Eymena Tûrê tecella kir di nêv nûrê (124/4)

### 2.5. Jîyana Civakî/Îctîmaî'

#### 2.5.1. 'Ilm û Mekteb

'Ilm, di dîwanê de, bi wateyên tesewwifî ve hatiye bikaranîn. 'Ilm, li bal Xwûda ye û wî hînî însanan kiriye. Xwûda 'ilm, hikmet û me'rîfet xistiye dilê însên ku Xaliqê xwe nas bike. 'Eqlê mucerred têra têgihiştina 'ilmê eşyayê nake. Bi nûra 'ilmê wehdetê û 'ilmê ledûnê ('ilmê xeybê), însan bi heqîqeta eşya û heqîqeta heyînê digihije.

Remza di necm û hey'etê 'eqlê mucerred naretê
Bênûrê 'ilmê wehdetê ew ma di şekk û şubhe da (9/131)

Feyyadê 'ilmê "min ledun" pey pey ji behra "kan û kun"
Geh geh bi ustadê suxun wî gewherê nasufte da (9/132)

'Ilm, 'eşq e; rûyê mehbûbê ayeta husnê ye, pêwîst e 'aşiq bi wê re mijûl bibe û di wî cemalî de 'ilmê 'işqê şirove bike. 'Aşiq dema bi tesîra tecelliya husn û cemalê munezzeh ji wê meya gulgûn (gulreng) û safî ('eşqa îlahî) ji destê saqî vedixwe, an jî bi tesîra nezera şahê wilayetê, dil derbazî 'eşqê dibe, deriyê 'alema xeybê, deriyê 'ilmê 'ubabê, jê re tê vekirin. 'Ilmê hikmetê dema di dilî de peyda dibe, şubhe û îxtîlafên ku di hişmendiya 'aşiqî de hene, belav dibin. Derbarê 'ilmê eşqê de gelek rîwayet hene, eger 'ilmê halî nebe, qiymeta rîwayetên qîl û qalê jî tune.

Ayetê husnê mufessel ke ji keşşafê cemal
'Ilmê 'işqê bike tefsîr û ji defter meke behs (27/7)

Nezera 'eynê 'înayet bi me da şahê wîlayet
Ji 'înayet nezerê 'eyn tejî 'ilmê hubab e (94/20)

'Ilmek numa dil pê nemûc qelbê di 'işqê kit 'urûc
Dê tey bikit çerx û burûc şehper li dara sidre da (9/139)

'Eynê kafûr e bi meşreb me ji husna te ye saf
Lew ji 'işqa te di dil da me vebû 'ilmê 'ubab (13/3)

Saqî ku da min ew sulaf feyza meya gulgûn û saf
Zail kirin şubhe'w xîlaf 'ilmek ji bejnê ruq'e da (9/138)

'Ilmê 'işqê but û latan bi rîwayet nabitin
Qederek hal ku nebit şubhetê her qalî çi hez (62/6)

‘Ilm, derbarê sihrê de jî hatiye bikaranîn. Çavên yarê sihirdar in û dema li ‘aşiqê xwe dinêre wî dixe bin tesîra xwe. Yar, di ‘ilmê sihrbendiyê de zana ye û ‘aşiq jî ji wê haletê zêde bizar û bêmecal e, lewra dermanê wî tune.

Kuştime ez bi jehrê bî zêde bi ‘ilmê sihri bî
Lew dimrim bi behrê bî çare bikin dewayekî (128/3)

Mekteb, di nav raveka "‘eqlê tiflê mektebê" de hatiye bikaranîn û ji aliyê têgihiştina husn û cemalê yarê de ku sipehîtiya wê tecelliya ismê Celal e, noqsaniya ‘eqlê însên beyan dike.

Dêmê bi xal ew nûn û dal ismê Celal bejna şepal
Yekta elif nayê wesif min 'eqlê tiflê mekteb e (100/7)

**2.5.2. Meslek (Pîşe) û Meşxûliyet**

**2.5.2.1. Seyyad (Nêçîrvan)**

Seyyad, di têkiliya yarê de hatiye bikaranîn. Seyyad, yar e, an jî çavên wê ne; dilê ‘aşiqî jî teyrek e. Yar dixwaze teyrê (dil), nêçîr bike û bike buryan.

Hebîbê ‘ezmê suhbet kir di caman lew şerab anî
Dilê min bir du seyyadan ji buryan ra berê wê da (5/29)

Seyyad, bi munasebeta xwestinên di çarçoveya mumkinatê de bûye mijar. Ji bo ku teleb bêne cih, pêwîst e xwestin di daîreya mumkinatê de bin. Tuleyê seyyadê çiqas xweyî merîfet be jî, seyd û nêçîr nebe, nikare tiştekî bi dest bixe.

Mumkinek dê hebitin da ku teleb hasil ket
Seyd û nêçîr ku nebit tûleyê seyyadî çi ket (22/4)

**2.5.2.2. Sehhar û Huqqebaz**

Çerxa felekê, sehhar û huqqebaz e, lewra bi sed awayan dek û dolaban digerîne û însanan dixapîne. Çavên yarê yên cadû jî sehhar in, bi remzên birhên xwe, dilê ‘aşiqî dide ber çovgoyan (kaşu).

Sed baziyan ev huqqebaz dînit bi hîle karisaz
Geh geh ku naze û geh nîyaz sehharî pur mekkarê çerx (35/5)

Sehharê cohtê caduwan îro ji remza ebruwan
Dil girt û da ber kaşuwan ker kir li miskînan kebed (40/6)

Memdûh, bi gotinên xwe yên rewanbexş, şekerrêz û guherrêz ve ew qas tesîrê li derdora xwe dike, dibe weke sehharekî. Gotin û nezmên şa’irî yên şekerbar jî gelekî tesîrdar in û wî ew ‘eş’ar weke sehharekî ji Behreynê, ku gelek dûr e, aniye.

Di iqlîmê suxen xaqan rewanbexş û şekerrêz î
Ji neyşekker li ewraqan bi can ra 'enber'amêz î
Ji sîminsa'id û saqan bi sehharî guherrêz î (131/36)

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şi’ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê (131/37)

**2.5.2.3. Heddad**

Heddad, bi têkiliya biker û kirinê ve delîla hebûna bikerekî dike. Kar, bikerê xwe nîşan dide. Herwekî ku heddad (hesinger) nebe kûreyê hesinger û mehsûlatên wê jî dernakevine meydanê.

Fa‘ilek lazim e da fi‘l û eser peyda bit
Ger tu heddad nebî kûreyê heddadî çi ket (22/3)

**2.5.2.4. Xulam û Xizmetkar**

Memdûh, caran bi lutf û teşrîfa xwe gazî xizmetkarê (‘aşiq) xwe dike û wî vedixwîne huzura xwe. Lewra wî di rêya seyr û sulûkê de cefa kêşaye, sebir kiriye û wuslata mehbûbê (fenafillah) heq kiriye. Herkes di vê dunyayê de û di vê dewrê de xulam û xizmetkarê memdûhî ye. Di rêya rêveberî yê de padîşahên weke Cimşîd û Keyxusrew jî ancax ji memdûhî re dikarin xulamiyê bikin, desthilatdarî û rêvebirî ne heddê wan e. Gotin û helbestên ‘aşiqî jî, îlhama xwe ji behra memdûhî hildigirin, ji ber vê yekê ew xwe wek xulamê wî dibîne.

Bi zehrê xwe’y şerîf xwendim ku xizmetkarê dêrînî
Te pur cewr û cefa dîne di sulûk û se‘y û cehdê da (5/32)

Çi hedd seydê hezar can in di fitrak û bendê da
Ku sed Cimşîd û Keyxusrew xulam in ser di vê rê da (5/19)

Ji behra qulzuma mîran bi xewwasî guherçîn im
Di behsa şerh û tefsîran tu deryayan we nabînim
Ji mîr û begler û çîran xulamê Mîr ‘Umadîn im (131/39)

Mehbûb, qebûl bike jî qebûl neke jî, ‘aşiq xwe wekî xulam û xizmetkarê wê dihesibîne. Lewra ji bo wuslatê, mehbûb, ji ‘aşiqî çi bixwaze, ew ji bo bikaranînê amade ye.

Xwoş xeramê ez xulamê nazikê şêrin kelamê
Tûtîya eywan xeramê dil ji min bir dil ji min (82/7)

Bejna te bi şengî te çi rengi û xeram î
Qedneyşeker î 'işweper î mah î temam î
Carek te bihişta bigehişta me xulamî
Ta qenci Melayî bidiya bê bi selamî (130/15)

**2.5.2.5. Şehsuwar**

Şehsuwar, şahê suwar û nêçîrvanan e. Di şehsuwariyê de tirk, di rîmbaziyê de jî ‘ereb namdar in. Yar, şehsuwara ‘aşiqî ye, ew nebe kes nikare dilê wî bi kemendê, nêçîr û hêsîr bike. ‘Aşiq dixwaze şehsuwar, di şuna ajalên nêçîrê (reqîb), wî nêçîr bike û bi tayê xurc û zînê xwe ve girêbide.

Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şêrê ‘Elî
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê ‘Ereb (14/5)

Dizanim şehsuwarê min xezalek wê di fitrakê
Bi cayê seydê ez bûma di wê fitrak û bendê da (5/18)

Şehsuwar îro kemend avêhtine qelbê Melê
Bend naket xeyrê fitraka te sed fitrakî rûh (33/15)

**2.5.2.6. Serdar**

Serdar, pêşengê leşkeriyê ye. Di dîwanê de ji bo pêşengên hinek tişt û kesan, weke “serdarê xalan, serdarê xuban” hatiye bikaranîn. Xalên yarê serdarê filfilan e, lewra ji filfilan reştir e.

Tayê di nazik sunbul in serdarê xalan fulful in
Qumrî di burcan xulxul in zaxan li baxê girti rav (65/4)

Naêt ji wê dîn wesfetan dêmê şemala zulmetan
Serdar e ta însanetan idraq ji wê girt eslîyan (90/10)

Mehbûb, bi wesfê xwe ve serdara însanan e, lewra xusûsiyetên însaniyetê hemû di xwe de dihewîne. Dilber, serdara hemu mehbûban e, pêwîst e halê ‘aşiqî bipirse, lewra ‘arifê qelban û zanayê ehwalan her ew e.

Dilbera serdarê xûban ez nizam ageh heye
Hebs û zindanê esîr û girtiyê dermande ye (93/1)

Dilberê serdarê xûban ez nizam ageh heye
'Arif e b'halê qulûban 'alim b'ehwalê me ye (97/1)

### 2.5.2.7. Meyfiroş û Xemmar

Meyfiroş û xemmar, di wateyên murşîdê kamil, pîrê kamil û mehbûbê de bi îstî'areyî hatine bikaranîn. Şagirtên meyxaneyê meyfiroş in, 'eksa husna meyfiroşî, qedeh jî dorpêç kiriye û mey di wê de coş û xurûş dibe. Rêya gehiştin û bidestxistina welayetê jî, ji destê meyfiroşî, bi vexwarina meyê hasil dibe.

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema
Badexwûran noşi noş mane li dorê cema (8/1)

'Eksa ji husna meyfiroş avête fincanên bi poş
Nageh di caman hate coş fûrî di nêva kûze da (9/102)

'Arif heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Xaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet (24/4)

Xemmar çavên yarê ne. Bi nêrînan, dildar û 'aşiqên xwe mest û mexmûr dikin. Cihê 'aşiqî, li ber deriyê xemmarî ye û ji bo perestiyê, sekinîna li ber vî deriyî ji xwe re bes dibîne. Salikê 'eşqê û pîrê 'eşqê, eger xweyî niyeteke saf û durust bin, ne xem e ku xirqeyê (hubba mal û meqamê) xwe di xaniyê xemmarî de rehîne hiştibin.

Lê keşfê esrarê xwe ke mexmûrê xemmarê xwe ke
Heyranê reftarê xwe ke kuştîne tîra muhbetê (125/4)

Hin ji nik ji dêrê ve tên qesta keniştê hin dikin
Ney ji wan im ney ji van im min derê xemmarî bes (52/4)

'Eqda ihramê di 'işqê da ku pîrê 'işqê best
Dê çi xem ger xirqe rehnê xaneyê xemmarî bit (19/7)

### 2.5.2.8. Qessar

Qessar, cilan paqij û spî dike.[498] Jiyan û bûyerên dinyayê dilê însên qirêj dikin, jenga gemariyê tavêjine ser. Rendeş û paqijkerê dilî, 'eşq e. Qessarê ku qirêjahiyên dunyayê ji dilî paqij dike, rendeşa 'eşqê ye.

Reng û jengê hedesê neqşê hudûsê me di dil
Bide ber rendeşê 'işqê ew e qessarê hudûs (28/18)

[498] Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 227.

### 2.5.2.9. Yaqutfiroş

Kevirên giranbaha û neqişkirî, li ber neqşên dêmê yarê ku ji husna munezzeh hatine neqişandin, bêqiymet dibin. Dema yaqûtfiroş jî vê husnê dibînin, elmasên di destên wan de, ji ber heşmetkariya husna dilberê, dikevin û dişkên.

Yaqûtî-firoşan di kef elmasi şikestin
Ev sefheyê elmasê ku neqqaşê qelem da (1/8)

### 2.5.2.10. Cadû

Çavê dilberê, weke cadûyan sihrdar û fettan in. Dilbera cadû, bi remzên birhên xwe, dilê ‘aşiqî dide ber kaşuwan û wî ker ker dike. Cadû, her daîm fitneyan dike û bi çavên xwe yên fitnebaz, di dilê ‘aşiqî de şeran dertîne.

Sehharê cohtê caduwan îro ji remza ebruwan
Dil girt û da ber kaşuwan ker kir li miskînan kebed (40/6)

Sewaşek rêhte dîsa ‘alema dil
Bi cadûyê du çeşmê fitneengîz (46/10)

### 2.5.2.11. Muxnî (Muxennî) û Sazende

Muxnî û sazende, dengbêj û stranbêj in. Muxnî sazbend e û di dengê amûrên muzîkê de jî nukteyên remzan û wateyên mecazî hene. Muxnî, bi dilî ji wan agahdar dibe ku çi dibêjin.

Mehdera wê xêrxwazê nukteyek remza mecazê
Wê bi dil seh kir ji sazê muxnî û qanûn û nay e (95/32)

Zulfa yarê, muxnî û sazende ye; hejîna wan a li dor dêmê, ji ‘aşiqî re weke deng û awazan e. Dema bi hejîna bayê sebayê, pora yarê bi ser rûyê wê ve tê xwarê, husn û cemalê wê tê perdekirin û li bin wê perdeyê sirr peyda dibin û ew sirr jî ku bi me’rîfetê bêne temaşekirin, mizgînî jê têne fehmkirin.

Mûxnî û sazende yîn lê bi mecala mey în
Xef ji sura perde yîn bêje me tu mujdeyîn (50/3)

Muxnî, bi têkiliya ‘aşiqî, di wateya mecazî û wekandinê de hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, caran bi kêfxweşî, bi muxniyê re distre û dengê wî jî xweş dibe. ‘Aşiq, caran jî weke muxniyê ji kul û derdan dinale. Çawa muxnî, stran û awazên huzunbaz dibêje, aşiq jî, ji şevê heta subê, ji ber derbên evînê wisa dinale. Muxannî hemrazê ‘aşiqî ye, lewra ew aletên ku muxnî dijene, bêperde peyam û mesajan didin wî.

Dema 'Îsa îşaret kir li min 'ezmên remîm hey bûn
Dil û canê me xaret kir tenê me'dûm û laşey bûn
Eda lew xweş 'îbaret kir me hemser muxnî û ney bûn (131/12)

Me ji ber derbê evînê buye dil pêt û pereng
Lew me şeb ta bi seher nale ye wek muxnî û çeng (121/4)

Ney û muxnî me hemraz in di remza ayîneya camê
Tenê mehrem ney û saz in didin bê perde peyxamê
Dinalin bişko û baz in hezar reng têne îlhamê (131/13)

### 2.5.2.12. Mutrib û Qewwal

Mutrib, sazbend û stranbêj e; qewwal jî, qewlbêj û çîrokbêj e.[499] Amûrên muzîkê, me'rîfet û hikmetê temsîl dikin[500] û jendarê wan jî dibe sembola murşîdê kamil û pîrê kamil.

Ji bo ku hunermendê deng û vegotinê hunera xwe îcra bike, guhdar jê re lazim in. Eger guhdar tunebin, qiymet û wateya wan gotinan jî namîne. Herwekî, eger mehbûb guh nedete axîn, nalîn û fîxanên ‘aşiqî, evîn jî watedar nabe.

Bedewê pak çi ket feshetê meydan ku nebit
Mustemi‘ guh nedirit mutrib û qewwalî çi hez (62/7)

Deng û awaza mutribî ew qas bilind e, gehiştiye birca kêvjalê (xerçeng) û birca cewzayê. ‘Aşiq, ji mutribî dixwaze, bi amûrên muzikê yên weke def û şebabê (bilûr), di meqama segahê de bistire, lewra ew bi wî dengî ciwan dibe û ‘aşiq dema tecelliyên nûra zelal li ser rûyê yarê dibîne, mest dibe û dixwaze dîsa mutrib li ber wan neqşên rengmîsal, li amûra muzîkê bide û bistire.

Newaya mutrib û çengê fixan avête xerçengê
Were saqi heta kengê neşoyîn dil ji vê jengê
Heyata dil meya baqî binoşin da bi muştaqî
Ela ya eyyuhes-saqî edir ke'sen we nawil ha (4/1)

Lillah were saqî bi du caman me ciwan ke
Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê (112/13)

Newaya mutrib û nayê fîxan avête cewzayê
Feyaheyya bi kasatin we ya heyya bi tasat (23/11)

Lê seyyirî bayê şimal pêçane ser nûra zelal

[499] Melayê Cizîrî, b.n.b., (ferheng), r. 401, 407.
[500] Alkış, b.n.b., r. 173.

Kes dibîn ev rengmîsal mutrib were weqt û mecal (125/2)

### 2.5.2.13. Rimbaz û Faris

Rimbaz, di tîravêtinê de hosta ye. Fêris (faris) jî di sûwarbûn û ajotinê de hosta û xweyî meharet e. Di dîwanê de rimbaz û faris wek îstî'areyî bi temsiliyeta çav û birhên yarê hatine bikaranîn. Awirên yarê, weke tîr û rîman in û awirên çavan (rimbaz) û mijang (faris) li hev dikevin êrişî 'aşiqî dikin. Rîmbazên 'ereb (birhên reş), di şerkirinê de wek pehlewanên namdar Rustem, Cemşîd, Xalid û Hemze ne. 'Aşiq, ji ber wan pehlîwanên rimbaz bêçare ye, lewra dema ew ji bo êrişê kom dibin, bi sedan rîman tavêjin dilê wî û wî birîndar dikin. Faris û rimbazên 'ereb, ne tenê digel 'aşiqî şer dikin, ew caran li hemberî freng û hebeşan (pora yarê) jî şer dikin, lewra freng û hebeş êrişî wan dikin (zulf li ser wan de didahele) û bi ser wan de tên.

Fêris û rimbaz gihan yek bi tîr
Ehmedu fi'l-beyni qetîlu'r-rimah (32/7)

Kî dizanit min ji rimbazan dema oxilme tên
Têne dil sed rim rewan û sîne dibe sed cerîd (39/9)

Ji dest şêrîn û nazekê rimbazi teyrendazekê
Kuştime gerdengazekê min ş'kestiye ejnû û gav (65/16)

Gezmên di şîrînnazikê derbên di wê rimbazikê
Çûyîne nêv dil gazikê min dad ji zulma dilberê (113/17)

Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê 'Ereb
Tox û 'ala di Ferengî ne kemandarê Hebeş (54/5)

Şa'ir, rimbazê şêran e (mîr, desthilatdar), bi remza birhan (qabê qewseyn), dixwaze biçite dîwan û huzura wan. Memdûh jî, şa'irî taltîf dike ku ew şa'ir (meddah) şehlewend e û ew jî rimbazê ber emrê wî ye.

Bi şêran ra ku rimbaz im di remza qabê qewseynê
Bi 'eynê Gulşenê Raz im di babê Hikmetil'eynê
Mulazim hedretê lazim hicab rakit ji mabeynê (131/31)

Giranbend im di bendê da di qeyda şahê şehbazan
Du serpence di zendê da gehiştin yek şubê bazan
Di destê şehlewendê da bi şahînî û rimbazan (131/30)

#### 2.5.2.14. Muftî

Şa’ir, muftiyê zemanê xwe ye, lewra wî ji destê saqî (murşîdê kamil), şerabeke zelal û saf vexwariye. Ew, muftiyê ‘eşqê ye jî. Mesele û pirsgirikên ‘eşqê, bi sunnet û kitabê çareser dike.

Heywan li kû dimînit em muftiyê zeman in
Bêtin ji destê saqî cama zelale bêxeş (53/5)

'Aşiqê mes'elexwah im were em muftiyê 'işq în
Destekê sunnet e tê da di yekê nessê kitab e (94/18)

Ney û nay, ji ber qewlê qedîmbûnê, muftiyê meclisa semayê ne û deng û awazên wan, ji aliyê hikmet û me’rîfetê ve ter û tejî ye.

Muftî me ney û nay e û ney qewlê qedîm e
Bawer te nehin guh bide ber çeng û rebabê (112/16)

#### 2.5.2.15. Hekîm (Tebîb)

Hekîmê ezelî û ebedî her Xwûda ye. Dermanê ku ew bide, heta ebedê domdar e. Hekîmî, di ezelê de qedehek badeya ‘eşqê, wek derman daye şa’irî, ew ê heta ebedê jî vexwe û jê kêm jî nabe.

Qedehek bade ji ‘işqê di ezel da me Hekîmî
Jê dinoşîn heyûhey hê bi xwe cama me lebaleb (14/7)

Tebîb, teşhîsa nexweşiyan dike û wan nexweşiyan tedawî dike. Tebîb, bi têkîliya yarê ve bi îstî’areyî hatiye bikaranîn. ‘Eşq, derdekî bê tebîb e. Nexweşî, ji raqîbî çêdibe û dermanê wê jî wuslata yarê ye. Ji ber firqetê, dilê ‘aşiqî birîndar e, dixwaze hebîb, weke tebîbekî were birîna dilê wî bikewîne. Mehbûb, Hekîmê Luqman e, dema tê li ser ‘aşiqî, ruh û nefes tê bedenê, lewra ew dermanê derdê cegerê ye û ew ji bo ‘aşiqî stêrka bextewariyê ye.

'Işqi derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

Îro ji murada te dilê min bi birîn e
Ellah çi hebîb î çi tebîb î vekewîne (101/1)

Dil nefes dîsa bi ber hat lew hekîm Luqman bi ser hat
Nafi'ê derdê ceger hat tali'ê kewkeb numa ye (96/3)

Hekîm, xweyî qabiliyet û xweyî hikmet e. Ew, çawa ji riwekan dermên çêdike, her wisa dikare herî û keviran jî vegerîne zêrî.

Her gil û seng dibin zêr bi tedbîrê hekîm
Qabilîyyet ku nebit hikmetê ustadî çi ket (22/5)

### 2.5.2.16. Cellad û Qatîl

Cellad û qatil, bi têkiliya çav, birh û awirên yarê, bi îstî'areyî hatine bikaranîn. Çavên yarê cellad in, lewra mehbûb tĩjawir e û tîrên wan celladan di dilê 'aşiqî de dadiçikin. Herçendê cellad (çavên yarê), bi şîr û xencerên xwe ve êrişî 'aşiqî bikin jî, ew zererê nadin wî, lewra yar bi naz û nazenîn perwerde bûye.

Gezmeyên 'eyn û sadan b'îşaret remz û sirr in
Kişandin goşe badan mehbûb di tĩjawir in
Tîrê di wan celladan batin di dil difirrin (132/23)

Dema celladi bên bazî bi şîr û xencerên tazî
Li dergeh da nekî gazî delal û naz û perwer da (92/21)

Qatil, çavên yarê ne. Ew çavên qatil yên reş û kemandar, tîran bi coht tavêjine dilê 'aşiqî. Çavên mehbûba çavreş (eswed'uyun), şer dane destpêkirin, qetil kirine û xwîn rêhtine. Ji ber talana wan çavan, 'alem peritiye û perîşan bûye.

Daxên me pur di kul in xeber jê nayê gotin
Yengiyan derb li dil in hinav ji ber disotin
Kemandar reşqatil in gezme li dil bi cot in (132/22)

Fêris û rimbaz gihan yek bi tîr
Ehmedu fi'l-beyni qetîlu'r-rimah (32/7)

Bedra ji qudret lê du nûn ew qatila eswed'uyûn
Pur rakirin wê qetl û xwûn 'alem perîht yexmakerê (113/25)

Yar, bi destê xwe yê mubarek zehrê dide 'aşiqê xwe, yanî ew 'eşqa ku vedixwe jê re weke qetlê û yar jî weke qatilekê xwûya dike, lêbelê dema vedixwe ew zehra di destê yarê de, ji 'aşiqî re dibe aveke şirîn weke şerbeta hingîvê.

Ger ji destê te'y mubarek zehrîyê qatil vexwum ez
Vê li min şehd û êsel bit şekeramîz û xoşab (13/8)

### 2.5.2.17. Xewwas (Noqîbaz)

Xewwas, ji bo medha şa'irî bûye mijar. Şa'ir, bi gotinên xwe yên weke durran ve xewwas e. Wî ew durr (şi'r) ji Behreynê bi sêhrdariyê anîne û pêşkêşî Mîrî kirine. Şa'ir, di Behra Sor ya mîran de weke xewwasekî, gewher çandine û bûye guherçîn.

Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şi'ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê

Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê (131/37)

Ji behra qulzuma mîran bi xewwasî guherçîn im
Di behsa şerh û tefsîran tu deryayan we nabînim
Ji mîr û begler û çîran xulamê Mîr ‘Umadîn im (131/39)

**2.5.2.18. Qessab**

‘Eyd, di edebiyatê de temsîliyeta wuslatê dike. Qurban, sikkîn (kêr) û qessab, bi munasebeta serjêkirina qurbanê bûne mijar. Qessab serjêkir e. Di roja ‘eyda qurbanê de qurban têne serjêkirin. Çawa ku Îbrahîm Pêxember kurê xwe Ismaîl Pêxember ji Xwûdê re kiribû qurban, her wisa mehbûbê jî ‘aşiqê xwe kiriye nezir ku di roja ‘eyda qurbanê de bête qurbankirin. Di roja ‘eyda qurbanê de piştî tav derkeve qurban têne serjêkirin û ‘aşiq/qurban jî dixwaze ew mehbûba weke rojcebîn derkeve, wê bibîne û paşê qessabî bi kêra destê xwe ve were wî qurban bike.

Îde û hebîbê nezr e lê ya Reb bibînim roj hilê
Yan dê bi qurban bibi Melê sikkîn di dest qessabi da (2/12)

**2.5.3. Bezm, Meclis, Dîwan û Unsûrên Wan**

**2.5.3.1. Bezm û Meclis**

Bezm (meclis), cihê kêf û şahiyê ye. Di bezmê de mey tê vexwarin, li ber musîkiyê reqs û sema tê kirin. Saqî, mutrib û reqqas unsûrên vê meclisê ne. Mudawîmên bezmê, ehlê dilan in.[501]

Meclis, meyxaneya mehbûbperestan e, bi şem’a wê meclisê kesayetî û giringiya ‘aşiqan derdikeve meydanê. Mudawîmên bezmê, mehbûbên zerî, genimreng, siyehçerde (reng esmer) ne. Mehbûbên neyşeker û surşirîn, her seherê bi rêveçûnên xwe yên şirîn ve, ji bo reqs û semayê têne bezmê. Di bezmê de, gelek ‘aşiq jî cih digirin. Mehbûb bi nêrînên xwe êrişî wan dike û wan şehîd dike. Di vê meclisê de bi sedan ‘aşiq weke perwaneyê canê xwe didin û ji wan şehîdên ‘eşqê, weke dengê çeng û amûrên muzîkê yên huzunbaz, bi sed awayan awaz û nalîn derdikevin. ‘Aşiq di vê meclisê de bendewar in ku mehbûb bi destê xwe xemra di nûrînqedehê de pêşkêşî wan bike. Sed canê ‘aşiqî jî hebin, ji bo yek îşweya yarê, ‘aşiq amade ye ku di wê meclisê de, wan hemiyan jî di wê rêyê de feda bike. Şa’ir jî yek ji wan ji ehlê dilan e, bi xef

[501] Canım, b.n.b., r. 51.

daxilî wê meclisê dibe û ew mehbûba weke meha nû rohnîdar, şerabeke reyhanî pêşkêşî wî dike.

Were meyxaneyê şahidperesan
Şem‘ê meclis di nebîtin çi kes în (80/8)

Zeriyên şubhet durdane ku bin şahidê bezmê
Ji genimreng û siyehçerde û esmer meke behs (27/4)

Ger çi tên reqs û semayê her seher sed neyşeker
Min ji bezma surşirînan ew şirîn reftarî bes (52/5)

Seherê cumle şehîdan te bezm avêhtin
Ê jimarî ne yekayek me hemî şeş sed û şeş (54/3)

Ger şubhetê perwane di bezmê te çi sed ger
Sed nale hezar reng wekî çeng û zehê min351 (87/7)

Daxilê meclis bûyî îşev Nîşanî lew ku xef
Camê reyhanî li ehlê dil neşandin mahê new (103/7)

### 2.5.3.2. Dîwan

Dîwan cihê civîn û civata ruhan e. Dîwana qidemê, dîwana yekem e û Xwûda tê de ruh berhev kirine û te’lîmat daye wan. Di wê dîwanê de qelemê ewilî navê Hz. Muhemmed (sxl.) nivîsandiye. Ew dîwan, dîwana se’adetê ye. Qeza û qeder û teqdîrat di wê dîwanê de hatine nivîsîn. Şa’ir ji mehbûbê dixwaze ku di wê dîwanê de navê wî jî weke gedayekî di dîwana xwe de binivîse û wî taltîf bike.

Ismê te ye mektûbi di dîwanê qidem da
Herfek qelemê ilmê bi teqwimê reqem da (1/1)

Me ji dîwanê se'adet seh kirî şubhê Mela
Tu bi navê me gedayî bikişînî qelemê (109/16)

Dîwan, cihê şah û mulûkan e. Qerardayîn û muhasebeya kar û ‘emelên dewletê di wê dîwanê de tê dîtin. Di wê dîwanê de, herkes xizmetkarê memdûhî ye. Şa’ir jî di wê dîwana hezretî de xwe weke mûriyekî biçûk û heqîr dibîne, lêbelê ji memdûhî hêvîdar e ku çawa Suleyman Pêxember mûrî dîtine û pirsa halê wan kiriye, ew jî wî bibîne û pirsa hal û rewşa wî bike.

Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê Şapûrê te bit da Xusrew û Şapûri bî (117/13)

Ger çi der dîwanê hedret pur heqîr im şubhê mûr

Çeşmê te çeşmê Suleymanî li halê mûri bî (117/19)

#### 2.5.3.3. Saqî

Saqî, di sohbet û meclisan de qedehê pêşkêşî ‘aşiqan dike. Mutrib û saqî du mudawîmên meclis û dîwanê ne. Saqî, di dîwanê de wek mehbûb û murşîdê kamil bûye mijar. Saqî, wek îstî’areyî temsiliyeta afirînerî jî dike ku di dîwana ezelî de ‘eşq rêhtiye dil û hişê ‘aşiqî.

Saqî, hêj di ezelê de, mey pêşkêşî ‘aşiqî kiriye û dê ‘aşiq heta ebedê jî mest û xumar bimîne. Saqî, ji xemra ezelê, nûra qelemê afirandiye û bi wê nûrê, qelemê dest bi nivîsînê kiriye ku neqşên mecazî bêne wucûdê.

Saqî ji ezel yek du qedeh bade bi min da
Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez (48/6)

Saqî ji xemra ezelê nûra qelem jê afrand
Darêt lewha ewwelê rizq û nesîb qeddirand
Ew bû murad mes'elê neqşê mecaz sewwirand (132/9)

Saqî, mehbûb e, dêmmehweş e, kagulên wê weke şeva reş e; cilên wê erguwanî û gulreng in, ew weke nesrîn, nêrgis û ‘er’erê ye; jehriya gelek tesîrdar di ta’ma gulavê de pêşkêşî ‘aşiqî dike. Herçendê meya ku saqî pêşkêşî ‘aşiqî dike di fincana sedef de weke mehtabê biriqdar jî be û digel awaza çeng, nay û defê re jî bête pêşkêşkirin, ew ji ‘aşiqî re weke jehreke kujer e (zehra helahîl). Saqî, bi wê meyê ‘aşiqî dikuje ku ew ber bi fanîbûnê ve biçe û bigihije mertebeya fenafillahê. Saqî dibe wesîle ku ‘aşiq dilê xwe ji jengan paqij bike ku dilê wî her daîm zindî bimîne.

Ji şeklê ebruyên saqî weh bedrek min muqabil dî
Hilatin sed hilalebrû îşaret min ji ‘eksê da (5/30)

Şahidên gulreng saqî belkî nesrîn in beşer
Ê di libsê erxewanî nêrgisên ‘er‘er xiram (76/4)

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

Mey hate fincana sedef kes dê vexut îro bi xef
Saqî bi çeng û nay û def ferfûrîya mehtabi da (2/11)

Di destê saqî de sewîl û bulbul heye, ji ber dengê wê, ruhan li derdora wê helqeya reqs û govendê girtine. Saqî, bi qedeha di destên xwe de, dixwaze ji wê meyê pêşkêşî her kesî bike. Meya di destê saqî de gulgûn û saf e û feyzê dibexşîne. Kesê jê

vexwe, şubhe û xilafên hişê wî wenda dibin û jê diçin û di heman demê de ew ciwan jî dibe. Saqî ji bo ku şehkaseyê rohnî bike (hiş û ‘eqlê bidete însên), mey û badeyeke ‘ecêb rêhtiye cama ‘eql û ruhê însên. Bi wê badeyê hişmendiya însên çêbûye, her der rohnî bûye, yanî însên bi ‘eqlê xwe zanîn bi dest xistiye. Ev meyrêhtin, ji xwe daxwaza aşiqî bû ji me’şûqê û bi wî awayî murad û kama dilê bêçareyê ‘aşiqî bi cih tê.

Saqî ji dengê bulbul e avête çerxê xulxule
Rûhan li dorê silsile govend û reqs û helqe da (9/103)

Lillah were saqî bi du caman me ciwan ke
Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê (112/13)

Dîsa ji nû bêhal e dil saqî werîn cama zucac
Muştaqê xemra al e dil lê xwoşi anîbit mizac (31/1)

Saqî, di cama zuzac de, meyeke zelal û saf dide ‘aşiqan. ‘Aşiq, ji saqî dixwaze ku ew bi lez wê şerabê hem pêşkêşî wî û hem jî pêşkêşî surşirînê bike, lewra meşreba yarê meyvexwarin e. Bi vexwarina badeya saqî, dil herçendê birîndar bibe jî, ew ji ber şewqa dîtina saqî safî û paqij dibe.

Şahid hezar reng xemmilîn reqs û sema pê kemmilîn
Îro Mela em sed dil în saqî werîn cama zucac (31/11)

D'anî zuhûr dêmê bi nûr xalên di hûr cama tehûr
Saqî werîn cama zerîn ew surşîrîn cammeşreb e (100/4)

Ji neş'a badeya saqî dilê mecrûhê şeyda ye
Ji şewqa dîtina saqî demîr û dil mucella ye (102/1)

Şa’ir ji sofiyan dixwaze ku dilê xwe safî bikin, teslîmî saqî (murşîd) bibin ku di rêya sulûkê de bikarin bimeşin, lewra saqî mezherê zat û sifetên Xwûda ye û ji ‘eksa saqî, şeraba di piyaleyê de nûranî dibe.

Were sofî musliman be bi saqî secdeyê bîne
Ku sûret mezherê zat û sîfatê Heq-te'ala ye (102/2)

Du reşmaran vi min ber bû me dil maye d'xeyalê da
Ku sunbul hat û ker ker bû di ber goşên hilalê da
Ji 'eksa saqî enwer bû şeraba me d'peyalê da (131/6)

Haya ‘aşiqî ji helalî û heramiyê heye. Ew ji saqî dixwaze ku xemra helal pêşkêşî wî bike.

Zaza bi nayê ra binal saqî werîn xemra helal
Carek ji ser dêmê vemal zulfên li dora cebhetê (125/2)

#### 2.5.3.4. Qedeh (Fincan, Cam, Saxer, Xum, Bulbul, Peymane, Kûze, Tas, Kase)

Qedeh, fincan, cam, saxer, tas, kase û peymane îstîkanên mey û şerabê ne û hemwateyên hev in. Xum, bulbul û kûze jî den û kûpên mezin in û tê de tiştên xwarin û vexwarinê têne muhafezekirin. Ev qedeh û kûp, ji cam, ax, zêr û zîvî têne çêkirin.

Qedeh, bi reng û te'ma şeraba tê de bi lebên yarê re; bi şekl û rengê xwe ve bi xonce û laleyê re tê wekandin. Di tesewwifê de, şeraba di qedeh û kûpan de, di wateya şewk, cezbe û wecdê de tê bikaranîn.[502]

##### 2.5.3.4.1. Qedeh

Qedeh, di dîwanê de, di wateya îskana bade û meyê de, bi mecazî hatiye bikaranîn. Ew qedehên reng bi reng û nûrîn, bi destê saqî, şehzade û mehbûbên neyşeker û dêmdurran û nêrgizên mest û dest spî ve ji 'aşiqî re têne pêşkêşkirin.

Saqî ji ezel yek du qedeh bade bi min da
Hetta bi ebed mest û xumar û teles im ez (48/6)

Da me şehzade bi destê xwe mûbarek qedehek
Ne xubarek ji xumarî û ne tundî û ne xeş (54/7)

Me ji destê yedê beyda qedehek noşî û bes
Şe'şe'anîyyê ke necmin bi senayê we berîq (66/2)

Nûrînqedeha xemr û heyata ser wan
Ger bidet dest bi dest muşterehê min (87/8)

Qedeh, di wateya 'eşq, şewk, cezbe û wecdê de hatiye bikaranîn. Wek mecazî di qedehê de du'a[503], 'eşqa saf/'eşqa îlahî û ava heyatê heye. Qedeh, ji bo hinek beyanatên razber (bexşandina 'eşq û muhebbetê ji însên re), wek metaforeke dîtbar/mucessem hatiye bikaranîn.

Ji du'ayê qedehek der dest e
Her seher mestê meyê nabê du'a (3/4)

Me ji serçeşmeyê heywan qedehek safi vexwar
Nagihê lezzet û zewqa me bi sed cildê kîtab (13/4)

[502] Canım, h.b., r. 76-77.
[503] Di rîwayetan de tê gotin ku Hz. Muhemmed (sxl.), di şeva Mî'racê de li 'esmanan, qedeheke kesk dîtiye û du'ayek jê re hatiye hînkirin. Di edebiyata klasîk de, derbarê "du'aya qedehê" de metafor û bibîrxistinên dewlemend hatine bikaranîn. (Canım, b.n.b., r. 77.)

Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me birêj
‘Aşiqê suxte bê ateşê seyyalî çi hez (62/2)

Nazika min di semayê bi ser enguştê ‘eqîq
Da me îro di semayê qedehek taze rehîq (66/1)

Ji ‘înayet nezera xas e ku her misre‘ û beytek
Qedehên abê heyatê ne di şi‘ra me lebaleb (13/9)

#### 2.5.3.4.2. Fincan û Cam

Fincan û cam, îskanên şerab û meyê ne. Cama badeya engûrê, weke lebên le’l ên yarê sor in û dema suhbet geş dibe, cam jî, ber bi lêbên le’l ve dirêj dibin. ‘Aşiq dixwaze her daîm cama wî tejî bade bibe, lê ne ji meya engûrî. Ew li pey ‘eşqê ye û dixwaze di cama wî de her dem meya ‘eşqê hebe.

Name tey kir rozenê ‘îyd e vekir fesla meyê
Lê bi zimzim tên bi awazê ney û fincan û cam (76/3)

Da dema suhbet bi coş bi cam bi xwe ji le'lan bi noş bi
Me j'hebîb sed deng suroş bi dînber û pur'işwe ye (97/48)

Hindekî roj û şev in têk 'eyd û Leyletu’l-Qedr
Cam medam pur bade bî lê ne j'meya engûri bî (117/14)

Di fincan û cama ‘aşiqî de meya ‘eşqê heye. Ew ‘eşqeke bi goreyî şahan payebilind e û cama wê jî weke ya şahan e.

Ma dibit ew dûredest bit dê ji fincana te mest bit
Cam ji şehkasê bi dest bit ebteran ew mey dewa ye (95/30)

#### 2.5.3.4.3. Bulbul

Bulbul, cêr û sewîl e û kûpa meyê ya mezin e. Mey, ji wê dirêje qedehan û ji meyxwûran re tê pêşkêşkirin. Vê amûrê, navê xwe ji dengê valakirina av û meyê ku ji bilbilîka wê dertê, girtiye. Ji ber ku di nava xwe de meya mexmûriyê dihewîne, dengê wê jî gelekî tesîrdar e û ruh dengê xulxula wê dibihîzin û li derdora bulbulê reqs û govendê dikin.

Saqî ji dengê *bulbul* e avête çerxê xulxule
Rûhan li dorê silsile govend û reqs û helqe da (9/103)

Guh da zikr û hal û coşa badeyê
Wê bi bulbul ra dixûnit bulbul e (99/2)

#### 2.5.3.4.4. Saxer

Saxer, qedeha mey û şerabê ye û bi gelemperî bi wan re tê bikaranîn. Mexseda beyankirina saxerê mey û şeraba di nava wê de ye.

Çavên yarê meyxur in û dilê ‘aşiqî jî saxer e; dema çav ji xwe diçin û mexmûr dibin, meya ‘eşqê berdidin saxera dilê ‘aşiqî. Çavên dilberê (du begler), meyperest in, di wextê sehergehê de saxer di destê wê de ye, dest bi dest digerîne. Wextê mey ji destê dilberê dirêje saxerê, çawa roj biçe Birca Berxê (Burca Hemelê) ku wext dema biharê ye, her der spehîtir û geştir dibe. ‘Aşiq, ji dilberê dixwaze ku saxera wê her daîm tejî bibe ku şefqet û rûkeniya wê berdewam bike.

Textê du mîr û begleran meydan e coqa gogeran
Eslan û cotê meyxuran mey di şeraba saxerê (113/12)

Saxer bi dest serxweş û mest weqtê sehergeh dest bi dest
Xeflet du begler meyperest kuştim bi derba xencerê (113/13)

Mey ku biçit saxerê hêj di destê dilberê
Sondê bi Xaliq xwurî roj e di Burca Hemel (73/2)

Çeşmek li ehwalê me bî derheq Melê bêperde bî
Saxer medam bêperde bî pur şefqet û bême'de bî (125/6)

#### 2.5.3.4.5. Xum

Xum, den û kûpa mezin e. Xum, bi mecazî hatiye bikaranîn û di meygedeya ezeliyetê de bi badeyê hatiye tejîkirin, yanî di dîwana qidemê de ‘eşq ketiye hişmendiya însên. Serê însên weke xumê ye, li ser lewheya serî de heft kun hene (dîtina bi du çavan, bêhnkirina bi du kunên pozê, bihîstina bi du guhan û xeberdana bi devî) û têkiliya hemûyan bi ser û mejiyê însên re têkildar in. Li ser wê lewhê çav û birih (nûn û sad) jî hatine neqişandin.

Heft xumê tejî bade di meykedeya qidemê
Ji xuma ku min îrade 'işq rêhte cama Cemê
Lewhê lê nûn û sade lew feyz da qelemê (132/8)

#### 2.5.3.4.6. Peyale

Peyale, qedeh û şûşeya şerabê ye. Peyale xweyiyê gelek sirran e. Şa’ir bi wan sirran dizane û dixwaze ku memdûh jî bi wan sirran bizane ku bigihije meqameke payebilind. Xemra di peyaleyê de bêxeş û bêhîle ye. Peyale di destê Xizir de jî heye û ew di wê peyaleya rengîn û biriqîn de sed peyaleyan nîşanî ‘aşiqî dide.

Şem'a wîsalê her geş e şewqa şemalê ateş e
Xemra peyalê bêxeş e saqî 'eceb ev bade da (9/98)

Xizir di remz û mu‘cizî mest û meyê di dengizî
Hat û peyaleyek di dest eşkere sed peyale kir (41/7)

Di mensûba wîsalê da bila sahibmeqam bit ew
Di ber qewsê hilalê da ji wê rojê bi cam bit ew
Di esrarê peyalê da divê miskînxîtam bit ew (131/33)

Mehbûba şekerleb, bi nûra cazîbedar ‘aşiqî rohnî kiriye û di peyaleyê de ‘eşq pêşkêşî wî kiriye. Peyale, dil û hişmendiya însên e. ‘Şeraba ‘eşqê di wan de tê pêşkêşkirin. Husn û cemalê Xwûda di wan peyaleyan de tê dîtin; eger meqseda ‘aşiqî ew husn û cemal nebin, hewcedariya peyaleyê namîne.

Meşiha mest û şekerleb bi me da mey ji peyalê
Negiham secde bibim pur xecilîm ez ji wîsalê (122/3)

Me ji bil husn û cemalê çi xerez
Bê cemalê ji peyalê çi xerez (57/1)

**2.5.3.4.7. Peymane**

Peymane, qedeha şerabê ye. Ji bo dayîna hestên ‘eşq û cazîbeyê bûye mijar. Peymaneya ‘aşiqî ji aliyê Wahid ve hatiye dayîn û ew peymane ji durrê hatiye çêkirin û nûrîn e. Mehbûbê, meya ‘eşqê xistiye peymaneyê û pêşkêşî ‘aşiqî kiriye.

Wahid ji nûra wê durê peymaneyê cama surê
Mey xistî anî ber firê hem cam û hem peymane da (9/67)

**2.5.3.4.8. Kase û Şehkase**

Şehkase, qedeha şah û mîran e. Di şehkaseyê de şeraba saf û paqij heye. ‘Aşiq ji ber badeya wê kaseyê, xerqî behra ‘ilm û ‘irfanê bûye. Di şerbeta tasê de sûretê yarê xwûya dibe û ji ber vê yekê ew şerbeta di wê kaseyê de weke ava heyatê ye û feyzan dide ‘aşiqî. Di kaseya şerabê de hemû tecellî xwûya dibin; kî bivê çi bibîne û bixwaze xwe çawa bibîne ew kase bi wî awayî wî nîşan dide.

Bi serenguştê ‘eqîqî bide şehkasê rehîq
Abê heywan te çîn nav ji Kewser meke behs (27/3)

Ji neş'a badeya kasê bizat ez xerqê 'irfan im
Ji wê camê ji wê tasê sifetkisra û xaqan im
Ji mihra xemzeelmasê li textê dil Suleyman im (131/10)

Şerbeta wê cam û tasê yar ku bînit ji in'ikasê
Bêt ji me jî feyzek ji kasê abê heywan ew bi xwe ye (97/47)

Herçî rengê te bivêtin xwe bibînî lillah
Nezerê wer bide kasê kî çi xweş ayîne ye kas (51/3)

**2.5.3.4.9. Kûze û Tas**

Kûze, cêr û sewîla av û şerabê ye û ji axê tê çêkirin. Tas jî, qedeha av û meyê ye. Kûze û tas, bi gelemperî di wateyên mecazî de bi mey û şerabê re hatine bikaranîn. Kûz û tas di nav kefa destê mehbûbê yê nazik û spîzende de ye. ‘Aşiqan vedixwîne ku werin ji wê meya ‘eşqê pêşkêşî wan bike. Meya di wê kaseyê de ava heyatê ye, lewra tê de feyz, bereket û tecellî hene. Dema ‘aşiq wê tasê digire destê xwe, xwe weke kîsra û xaqanan bextiyar dihesibîne. Di wan kûze û tasan de gelek bereket hene, lê ‘aşiq, feyz û bereketa di şeraba kûze û tasan de têra xwe nabîne û qedehên mezintir ji mehbûbê dixwaze.

Kefa ku kûz û tas tê nazik û spî zend in
Cama ku meya xas tê binêrin talib çend in
Vexwun ji destê rastê bi medhan mehbûb xwendin (132/39)

Ji neş'a badeya kasê bizat ez xerqê 'irfan im
Ji wê camê ji wê tasê sifetkisra û xaqan im
Ji mihra xemzeelmasê li textê dil Suleyman im (131/10)

Tu şerabê bi xerabê bi nehengan da demê
Dê kifayet bi çi rengî me biken kûze û tas (51/4)

Tas, wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. ‘Alem tas e û Xwûda dilopên heyînê li ser behr û berrê reşandiye û ji wê meya reşheyê jî rêhtiye nav tasa ‘alemê.

Ew reşhe da wê qulzumê mey hate tasa 'alemê
Cama cehanbîn da Cemê b'Eskenderî ayîne da (9/101)

**2.5.3.5. Şem’**

Meclisa rind û ‘aşiqan bi şem’ê rohnî dibe. Di wê meclisê de mehbûbên mehcebîn, rûrewneq û rûpertew hebin, êdî ne hewceyê mûm û fîndê ye ku meclisê rohnî bikin, lewra şewqa wan têra rohnîkirina meclis û dîwanê heye.

Were meyxaneyê şahidperesan
Şem‘ê meclis di nebîtin çi kes în (80/8)

### 2.5.4. Muzîk û Amûrên Wê

#### 2.5.4.1. Amûrên Muzîkê (Ney/Nay, Erxenûn, Saz, Def, Çeng, Jeh, ‘Ud, Tenbûr, Qanûn, Rebab)

##### 2.5.4.1.1. Ney û Nay

Di dîwanê de amûra muzîkê ya herî zêde derbasbûyî ney e. Ney û nay, di dîwanê de, gelemperî bi sema, muxnî û mutribî re wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. Di tesewwifê de ney sembola me’rîfet û hikmetê ye.[504] Ney, bi wateya murşîdê kamil, peyamên ji yarê û qedeha yar pêşkêş dike be jî tê bikaranîn. Qamûşa ku dibe ney, ji mêrgeh û sazistana xwe tê dûrxistin. Piştî gelek merhaleyan nava wê vala dibe, rengê wê zer dibe û li ser rûyê wê bi şîşa daxkirî kun têne vekirin. Sazbend, dema puf diketê bi dengekî dilsoş û feryatnak deng jê dertê. Feryada wê ya dilsoz, bi xwestin û bêrîkirina wê ya neyistanê ve tê şirovekirin. Dengê neyê, feryad û fîxana aşiqî ye.[505] Ney, însanê kamil e; ew ji yekîtiya neyistanê hatiye birîn, ji hebûna xwe derbas bûye û bi hebûna heqîqî re heyî bûye. Her dengê ji wê dertê îradeya Xwûda beyan dike.[506]

Ney, wek sembolekê, gelek sirran di dengê xwe de dihewîne (firqet, eziyet, mehcûriyet û hwd.). Ney, qewlê qedîm e; lewra ji ‘aşiqî re muftîtiyê dike. Di semayê de mizginiyan dide û pêwîst e ehlê ‘irfanê guh bide remz û sirrên wê û guh nedete qîl û qalên dinê. Ew kesê bixwaze sirrên neyê fehm bike, dema muxbeçe radibine semayê pêwîst e guhdariyê çeng û neyê bike. Kesê ji wan sirran fehm bike dê meqama wî heta çerx û perwazê bilind bibe.

Muftî me ney û nay e û ney qewlê qedîm e
Bawer te nehin guh bide ber çeng û rebabê (112/16)

Dê beşaret bi beşaret ji neyê bêne sema‘
Tu jî nayê û sema‘ê bike bawer meke behs (27/5)

Guh da awazê neyê weqtê sema tên muxbeçe
Fehmê raz ger dikî çawa dinalin çeng û saz (45/9)

Ji Hafiz Qutbê Şirazê "Mela" er fehm bikî razê
Bi awaz û ney û sazê bidî ber çerx û perwazê (4/8)

---

504 Alkış, b.n.b., r. 173.
505 Cebecioğlu, “Ney”, b.n.b., r. 370-371.
506 Gölpınarlı, b.n.b., c. 1-2, r. 17.

Însanê ku ‘umrê xwe bê‘eşq û bêmehbûb biborîne û bê çeng û saz û nay û defê mabe îmkan tune dê ew poşîman bibe.

Îro li 'umrê xwo'y telef bê şahid û cama sedef
Bê çeng û saz û nay û def zanim peşîman î Mela (12/10)

Ney, di dîwanê de wek îstî’areyî cih girtiye Di navbera ney û însên de wekheviyek heye. Herdu jî, ji welatê xwe (beheşt û neyistan) hatine sirgunkirin û li xurbetiyê eza, cefa û îşkence dîtine. Dil û singê wan hatiye daxkirin û şewitandin. ‘Aşiq, bê yar û mey, xwe weke ney û sazê nalende dihesibîne.

Ev sîneya wek nay û ney pur lê kişandin dax û key
Her dil bi naehlan nedey ya Reb çi nadan î Mela (12/6)

Bê hed li qelbê şubhê ney cewra te danîn dax û key
Lew bê mehel xweş nîne mey emma bi şîranî Mela (12/14)

Peyweste tu her bang mekî şubhetê ney
Bê yar û mey û saz weku nay im ez (49/9)

Ney û muxnî me hemraz in di remza ayîneya camê
Tenê mehrem ney û saz in didin bê perde peyxamê
Dinalin bişko û baz in hezar reng têne îlhamê (131/13)

Sed şîş li dil da ne ji mihrê me Mela
Lew her bi fixan mislê ney û nay im ez (49/12)

Ji cefaya te nema qet li me reng
Tu dizanî çi dibêjit ney û çeng (123/5)

Mehbûbên zuhresîma, guhdariya ney, qanûn û rebabê dikin. Meclîs bê muzîk nabe; kesê bivê were meclîs û dîwanê pêwîst e def û neya xwe jî bi xwe re bîne.

Zuhreyê ceng û sewaş ev dî ji çeng avête çeng
Xweş li pê qanûnê ney wê gohde tu qanûn û rebab (16/12)

Ta çendi bi xef bade binoşî we nefes da
Encam bi def û ney were mîrê 'eses î tu (105/19)

Mesajên mehbûbê di dengê çeng, def, qanûn û rebabê de veşartiye. Ew bi dengê wan amûran, ‘aşiq û dildarên xwe, vedixwîne bal xwe; lewra deng û awaz, bi dengê neyê tesîrdartir dibe. Remz û razên neyê semaî ne, ji ber vê yekê ‘eqlê însên nagehiştê ku hemûyan fehm bike.

Fehmê raz er bikiri wer bibihî mujdeyê saz
Çengê bêperde dibêjit ne ney û nayê bi deng (71/2)

Dema 'Îsa îşaret kir li min 'ezmên remîm hey bûn
Dil û canê me xaret kir tenê me'dûm û laşey bûn
Eda lew xweş 'îbaret kir me hemser muxnî û ney bûn (131/12)

Remz û razê ney û nayê ku sema‘î ne hemî
Ji mehala te bi ‘eqlê xwe bizanî ji qiyas (51/5)

‘Aşiq, di medh û senakirina mehbûbê de, lavahiyên xwe weke deng û awaza çeng û neyê dibîne. Kesê bixwaze bêperde wek mehrem biçe hizûra yarê, pêwîst e weke neyê bêperde be.

Ism û navê te'y şirîn xweş kir li min qelbê mirî
Lew di medhê te'w senayê bûyîme çeng û ney e (93/24)

Kesê bê perde mehrem bit ne dê bê perde wek ney bê
Rebab û çengê hemdem bit 'îbadet mestê bêmey bê
Di dest da camê wek Cem bit ji reng ayîneya xeybê (131/24)

**2.5.4.1.2. Erxenûn**

Erxenûn, amûreke muzîkê ya dengmehzûn e û ji yewnaniyan hatiye. Ji bo muzîkên dînî yên li dêrên xirîstiyanan hatiye bikaranîn û ji bo îlahiyên xemnak û mehzûn ev enstrûman dihate îcrakirin.[507] Humbaneke wê heye û bi lûleya puvdanê deng jê dertê. Heft ta û diwazdeh lûleyên dengî pê ve hene. Dema ba di wan lûleyan re derdikeve her yek dengekî cuda derdixe. Bi şeklê xwe ve dişibe orgê.[508] Ev amûra muzîkê, ji aliyê deng û nalînê ve, wek îstî’arewî temsiliyeta dilê ‘aşiqî dike. Ev amûr, hem di wateya xwe ya rasteqîn de bi îşareta kêfxweşiyê ve û hem jî di wateya mecazî de ji bo nalîn û feryada ‘aşiqî ya ji ber bedewiya birhên yarê hatiye bikaranîn.

Ma di baxê 'eyş û nûşê her bi saz û erxenûn
Kamiran û kamibexş û dilxweş û mesrûri bî (117/12)

Nûra ji qudret lê du nûn jê ra dinalin erxenûn
Wer ayeta ‘işqê bixwûn xweşnusxeyek mestûr e dil (74/5)

**2.5.4.1.3. Saz**

Saz, navê gelemperî yê amûrên muzikê ye. Di meclis û sohbetan de behra razan bi dengê wê pêl dide. Di nava sirrên sazê de, ji ‘aşiqî re mizgînî û mehderî jî hene. Saz

[507] Tek, b.n.b., r. 99-100.
[508] Muhemmed Emîn Doskî, *Şîrovekirina Dîwana Melayê Cizîrî*, c. 4, r. 742-743.

û ney peyamên xwe bê perde û ‘aşîkar beyan dikin, lewra ew mehremên dîwana mehbûbê ne û sirr û mesajên xwe rasterast ji wê digirin.

Suhbet bi sazan hate saz bi mewwicî deryayê raz
Da dil ji nû bayê mecaz wê keştiyê sukkane reqs (55/3)

Fehmê raz er bikiri wer bibihî mujdeyê saz
Çengê bêperde dibêjit ne ney û nayê bi deng (71/2)

Mehdera wê xêrxwazê nukteyek remza mecazê
Wê bi dil seh kir ji sazê muxnî û qanûn û nay e (95/32)

Ney û muxnî me hemraz in di remza ayîneya camê
Tenê mehrem ney û saz in didin bê perde peyxamê
Dinalin bişko û baz in hezar reng têne îlhamê (131/13)

**2.5.4.1.4. Def û Çeng**

Navên def û çengê, bi meclisa meyê re wek îstî’areyî derbas dibin. Şa’ir, dixwaze di meclisa mehbûbê de, dema sema bi awaza def û çengê dest pê bike, xezelên xwe bîne meqamê û bixwîne. Bi deng û awaza çeng û defê re, saqî meyê dixe fincana sedefî û fexfûrî ya ku weke heyvê dibiriqe û pêşkêşî ‘aşiqî dike. Def, çeng û qanûn, bi awazên xwe, spehîtiyên mehbûbê nîşan didin. Di nav dengê wan amûran de feyza ‘ilmê felsefeyê jî heye. Kesê ‘umrê xwe bêmehbûb û bê‘eşq derbas bike çawa ku dê poşiman bibe, her wisa kesê ji deng û sirrên def û çengê jî bimîne, dê wisa poşiman bibe.

Were bê perde Mela vê xezelê bine meqam
Her dema bête sema def bi def û çeng bi çeng (71/15

Mey hate fincana sedef kes dê vexut îro bi xef
Saqî bi çeng û nay û def ferfûrîya mehtabi da (2/11)

Bêtin di husnê rengi reng b’nay û def û qanûn û çeng
Ew 'işq e van tînit bi deng lew ra bi husnê nexme da (9/30)

Feyza 'ulûmê felsefe hatî di nêv çeng û def e
Min dî di camê da xef e fincan bi can min cur'e da (9/133)

Îro li 'umrê xwo'y telef bê şahid û cama sedef
Bê çeng û saz û nay û def zanim peşîman î Mela (12/10)

Mehbûb, bi naxmeyên çengê ‘aşiqî vedixwîne bal xwe û def, qanûn û rebab jî bi dengê xwe gazî ‘aşiqî dikin ku bejn û bala mehbûbê mêze bike. Mehbûb, dema

remzên veşartî pêşkêşî ‘aşiqî dike, ji ber tesîra wan remzan, ‘aşiq weke nay û defê dinale.

Lew di çengê me dixwuni ku di ‘işqa te bi saz
Me bi bejna te dixwûnin def û qanûn û rebab (13/5)

Canê Melê ruha Melê nûra ji qudret nuqte lê
Remzek nihîn da min welê nalî ji ber wek nay û def (64/11)

Di dengê çengê de raz veşartî ne. Eger ‘aşiq bixwaze ji wan sirran agahdar bibe, lazim e di semayê de guh bide muxbeçeyan.

Guh da awazê neyê weqtê sema tên muxbeçe
Fehmê raz ger dikî çawa dinalin çeng û saz (45/9)

Wer guh da çeng û nayê şirîn ku bên semayê
Camê binuşe vêran çi sade û çi zerkeş (53/6)

**2.5.4.1.5. Jeh/Zeh**

Jeh, hem amûreke muzikê hem jî têla çengê ye. Jeh, wek teşbîhî, ji bo beyankirina nalîn û feryada ‘aşiqî ya di rêya ‘eşqê de bûye mijar. Di meclisa mehbûbê de bi sedan ‘aşiq weke perwaneyê can û dilê xwe didin. Ji wan, weke deng û awaza çeng û jehê, bi sedan nale û feryad bilind dibin. Çawa çeng û jeh bi awaza huzunbaz û nalîn dinalin, her wisa ‘aşiq jî, ji ber derbên tîrên mehbûbê nalîn û efxan e.

Ger şubhetê perwane di bezmê te çi sed ger
Sed nale hezar reng wekî çeng û zehê min (87/7)

Çendî ku digerrihim dikêşim sebr û hîrê
Şubhetê çeng û jeh im hilak im j'derba tîrê
Senaxwanê Feqqeh im îroke di Cizîrê (132/50)

**2.5.4.1.6. ‘Ûd û Tenbûr**

‘Ûd, hem ji bo beyankirina nalîna ‘aşiqî wek teşbîhî, hem jî wek îstî’areyî ji bo remzan bûye mijar. Dilê ‘aşiqî, ji ber ‘eşqê bûye pêta êgir, ji ber vê yekê ew jî weke muxnî û ‘ûdê, ji şevê heta subê dinale.

Dil ji me bûye pelek can û cesed têk seqerê bû
Lew me şeb ta bi seher nalî ye wek muxnî û 'ûdê (122/1)

Di dengê ‘ûd û tenbûrê de peyamên veşartî hene, pêwîst e ‘arif û ‘aşiq guh bidinê ku jê fehm bikin. Mehbûb jî bi awazên def û tenbûrê daxilî meclisê dibe û xwe nîşanî ‘aşiqên xwe dike.

Şefeq da sîmiendamê ji bala pertewek nûrê
Bigir ayîneya camê ji destê mest û mexmûrê
Tu carek guhde peyxamê ji nay û 'ûd û tenbûrê (131/26)

Mehbûb xwe nîşan da sefê carek di cama qerqefê
Hatin bi awazê defê tenbûr û çengê nexme da (9/104)

### 2.5.4.1.7. Qanûn û Rebab

Qanûn, di dîwanê de wek tewriyewî hatiye bikaranîn. Ev peyv, hem di wateya usûl û rêgezê de hem jî di wateya amûra muzîkê de hatiye bikaranîn. Qanûn, weke amûrên muzîkê yên dinê, ji bo xwûyakirina dilberan, tê jendin. Dema dilberên bi lîbas û zîweran xemilandî, dengê van amûran dibihîzin, têne meclisê, reqs û semayê dikin û rengînî û spehîtiya wan xwûya dibe. Qanûn û rebab bi deng û awazên xwe ve gelek peyam û hîkayetan dibêjin û dilberên zuhresîma û 'aşiq jî guhdarî van amûran dikin.

Bêtin di husnê rengi reng b'nay û def û qanûn û çeng
Ew 'işq e van tînit bi deng lew ra bi husnê nexme da (9/30)

Zuhreyê ceng û sewaş ev dî ji çeng avête çeng
Xweş li pê qanûnê ney wê gohde tu qanûn û rebab (16/12)

Guh da nayê ji lebê le'lî bi qanûn e hîkayet
Dê çi şehde bide vê ra bidirit şehde rebab e (94/7)

### 2.5.4.2. Meqam û Awazên Muzîkê

Sêgah û şebab, du awa û cûreyên stranê ne.[509] Ev perdeya muzîkê, li pêşiya perdeya "sî (bûsedang)"yê ku li ser xaza sêyem ya portreyê cih digire, bi danîna komekî bemolê tê çêkirin.[510] Mutribê dengbêj hem di jendina amûrên muzîkê de hem jî di strandinê de jêhatî ye. 'Aşiq bi goreyî dilê xwe ji mutribî dixwaze ku bi lêdana defê û pufkirina bilûrê re straneke li ser awaza sêgahê bibêje. Dengê amûrên muzîkê û awazên mutribî dema bi hev dikevin agirê 'eşqa dilê 'aşiqî gurtir dibe.

Lillah were saqî bi du caman me ciwan ke
Mutrib bi defê ra bide sêgah û şebabê (112/13)

---

509 Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 653.
510 İsmail Hakkı Özkan, "Segâh", *DİA*, c. 36, İstanbul 2009, r. 304-306.

### 2.5.5. ‘Eyş û Noş

‘Eyş û noş, bi gelemperî di bax û baxçeyên erxewanî de, bi sazan tê kirin. Ew kesê di van baxan de cih bigire, kamiran û dilşad û dilxweş dibe. Dilxweşî û mesrûriya însên di vê dunyayê de ne domdar e. Tu kesî di vê dunyayê de doza xwe bi ser nexistiye. Di xaniyê dunyayê de, ji tu kesî re rehetî, aramî û emînî tune, lewra kî di vê dewranê de dest bavêje gulan, êstiriyên wan xwînê ji destê wan tînin û êş û elemê berdidine ruhê wan. Dema însan bi can û dil xwe dide dinyayê bi muhebbetî wê himbêz dike, zengila mirinê lê dide û amadekariya axiretê tîne bîra wî û lezzet, kêf û şahiyên dinyayê ber bi elemê ve vediguherîne. Rojên wuslatê weke demeke çav niqandin û vekirinê, xweş û bi lez derbaz dibin û diçin. Ew şerab û zewqên ku ‘aşiqî pê kêfxweş û dilgerm dibû, bi veguherîna dewranê re weke xewnekê û serabekê tê xwûyakirin.

Ma di baxê 'eyş û noşê her bi sazê erxewan
Kamiran û kamibexş û dilxweş û mesrûri bî (117/12)

Di vê taqê di vê xanê me 'eyş û êminî kanê
Kesê dest dit ji dewranê nihalek ve gulistanê
Der axuşeş çi miared ke ez dil caneş bispared
Ceres feryadê midared ke ber bendîd mehmil ha (4/4)

Ah eyyamên wîsalê weku xweş borîn û çû
Ew şeraba ‘eyş û noşê ma li pêşberê min serab (16/21)

### 2.5.6. ‘Eyd, Cejn û Şahî

‘Eyd, ew roj in ku dibine wesileya wuslat, kêfxweşî û aramiyê. Şa’ir dixwaze her wext weke ‘eydan xweş bibe. Bi dîtina rûyê yarê û pîrozkirina ‘eydê re têkiliyek heye. Herdu jî kêfxweşi û aramiyê didin ‘aşiqan. Wuslat û dîtina yarê jî, ji ‘aşiqî re roja ‘eydê ye. Bi dîtina yarê hemû kes ‘eydê pîroz dikin. Daxwaza ‘aşiqî ji dil ew e ku roja ‘eydê wuslat peyda bibe û ew jî dilaram û kêfxweş bibe. Di roja ‘eydê de deriyên lutf û îkraman vedibin. Ev kevneşop hem ji aliyê şah û mîran ve hem jî ji aliyê kesayetên giring ve tê îcrakirin. Padîşah û mîr, di vê rojê de deriyên xezîne û serayên xwe ji gel re vedikin û lutf û îkramê ji wan re dikin. Di wê rojê de ‘aşiq dilgerm û şadmend e, lewra mîrê wî (mehbûb) deriyê lutfê jê re vekiriye û çi bixwaze dê bidetê.

Hindekî roj û şev in têk 'eyd û Leyletu’l-Qedr
Cam medam pur bade bî lê ne j'meya engûri bî (117/14)

Îd e û herkes ji dîdara te lê pîroz e ‘îd
Ez tinê mehrûmê dîdar im bi sed menzil beî‘d (39/1)

Her seher dihnêrim ez cana bi ahan ra ji dil
Bareke'l-Barî bi is'adin 'eleyha yewme 'îd (39/2)

'Îd e û mîrê me îro dergehê lutfê vekir
Go Mela hingî bixwazî dê bidem bes tu bixwaz (45/17)

'Eyd, bî wxûyakirin û dîtina hîlalê dest pê dike. Zulfên yarê weke şevên tarî ne, dema xwe ji ser rûyê yarê didin paş, xet, xal û unsûrên wê yên spehîtahiyê xwûya dibin, ji 'aşiqî re dibe şahiya 'eydê. 'Aşiq, ji ber neqş û nuqûşên rûyê yarê ku sifetên Xwûda tê de tecellî bûne, di 'eydan de jê re secdeyê dibe. Di navbera 'eyd û yarê de tiştekî hevpar heye, ew jî hîlal e. Birûyên yarê yên mîna hîlalê dema xwûya bikin ji 'aşiqî re dîsa cejn û şahî ye û ji xas û 'amê re jî, ji bo kêf û sefayê, weke bangekê ye. Di roja 'eydê de, ji ber ronahiya birûyên yarê yên hîlalî, cebhet û eniya yarê weke ronahiya subeya 'eydê ye. Welhasil, armanca xwestina dîtina hîlala 'eydan, bi wekheviya birûyên yarê ve girêdayî ye, eger ew wekhevî nebin 'aşiq li benda hatina heyva hîlalî nîne.

Veke carek xet û xalan li ser wan mesned û palan
Bixwûne lê me 'ebdalan bibînin 'îd û sersalan
Îcazet dî me destûrê perîrengê sifethûrê
Ji nêva zulmet û nûrê binoşîn mey di ferfûrê (124/7)

Ji neqşê but û latan me sîne butxane ye
Te'eyyuna sifatan tecella qelbê me ye
Di 'îd û şev beratan ji wan ra me secde ye (132/4)

Leyletu'l-Qedr û berat in zulf û cebhet subh û 'îd
Şefqe kir perde hilanî seherê şox û şepalê (122/3)

'Îd e û da 'alemê bangê sefayê xas û 'am
Mahê new ebrû numandin çû ji ber 'ewrê xemam (76/1)

Zemzem û xulxul e û 'umre û 'îd e û 'Erefat
Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê (121/2)

Leyletu'l-Qedr û berat in zulf û cebhet subh û 'îd
Dêm weku fesla biharê lê qiyamet qedd û qam (77/3)

Leyletu'l-Qedr bi min ew se'et û 'îd e di salê
Şefqe kir perde hilanî seherê şox û şepalê (122/3)

Ger ne teşbîhê du burhên te bitin
Me di 'îdan bi hîlalê çi xerez (57/2)

### 2.5.6.1. ‘Eyda Qurbanê

Bikaranîna peyva qurbanê, wek telmîhî bûyera Îbrahîm û kurê wî Îsmaîl Pêxemberî tîne bîrê. Di roja ‘eyda qurbanê de, qurban têne serjêkirin. ‘Aşiq jî, qurbanê mehbûbê ye. Birîndarekî bêderman e û dixwaze di suheha ‘eydê de ji aliyê mehbûbê ve bête serjêkirin ku wuslat peyda bibe, birîna wî kew bigire û bigihije yara xwe.

Lew di iqlîmê suxen xaqan im
Sibehê 'îd e'w ez pê zanim
Ku bi kêra te seher qurban im
Xoş birîndarekî bêderman im (123/2)

Qurban, di edebiyata klasîk de temsîliyeta aşiqî dike ku wî xwe feda û qurbanî yara xwe kiriye. Mehbûbê, ‘aşiq ji xwe re kiriye nezir ku di roja ‘eydê de, qurbanî xwe bike. ‘Eyd, ji bo ‘aşiqî wuslat e û ew bêsebr e ku subeya ‘eydê bê û yara xwe bîbîne û bi destê wê, di destê wê de canê xwe qurban bike.

Îde û hebîbê nezr e lê ya Reb bibînim roj hilê
Yan dê bi qurban bibi Melê sikkîn di dest qessabi da (2/12)

Di kompozîsyona spehîtiya rûyê yarê de xalên wê Beytu’lheram e û zuluf (hacî) li derdora wê diçin û tên, wê tewaf dikin. Ev dîmen, ‘eyda qurbanê tîne bîrê û 'umre, 'eyd û 'erefat, bi tenasûbî bi hev re têne bikaranîn.

Zemzem û xulxul e û 'umre û 'îd e û 'Erefat
Senema sur ji Semed neyşekera leb ji nebat
Ehesenellahu tebarek ji sura wê senemê (121/2)

### 2.5.6.2. Newroz

Newroz, sersal û destpêka biharê ye. Bi goreyî teqwîma îranî meha ferwerdînê (21ê meha Adarê) destpêka biharê ye û roja yekem ya newrozê ye jî. Dema roj dikeve Birca Hemelê, hukmê biharê dikeve ser tebî’etê û jiyan û tebî’t dixemilin.[511] Ji ber vê yekê ev roj weke cejnekê tê pîrozkirin. Agirberdan wek kevneşopeke pîroz di newrozê de tê îcrakirin. Newroz, bi nar, sîqal û sersalê re wek tenasûbî hatiye bikaranîn. Agir bi biharê re bedena tebî’etê ji qirêjahî û jengên zivistanê paqij dike. Agir û nûra ‘eşqê, wek teşbîhî û îstî’areyî bi agirê newrozê re hatiye sembolîzekirin. çawa bi agirê newrozê tebî’et xwe nû dike û paqij dibe, agirê evînê jî, dilê ‘aşiqî ji jeng û sîqalan

[511] Yıldırım, “Nevruz”, Fars Mitolojisi Sözlüğü, r. 547-550.

paqij dike. dema agir û nûra ‘eşqê dikeve dilê ‘aşiqî, ronahiyek di dilê wî de hiltê û ji ‘aşiqî re dibe sersal û newroz.

Ev nar û sîqala dil e daîm li wê qala dil e
Newroz û sersala dil e weqtê hilêtin ew sîrac (31/5)

Kompozîsyona rûyê yarê wek îstî’areyî demsala biharê ye. Di demsala zivistanê de, şev dirêj in û roj jî ketine bin siya şevan. Bi biharê re rohnahî zêde dibe û çawa tebî’et berfê ji ser rûyê xwe tavêje û kulîlk lê hişîn dibin, herwisa zulfa reş jî dema ji ser rûyê yarê xwe dide paş, ronahî û sipehîtayiyên wê derdikevine meydanê. Dîtina rûyê yarê ji ‘aşiqî re sersal û newrozek e. Çawa kulîlk û nexşên biharê xwûya dibin dilaramiyek dikeve tebî’etê û dilê însên, herwisa xet, xal û unsûrên yarê yên spehîtahiyê dema xwûya dibin, ji ‘aşiqî re dibe şahiya cejna newrozê.

Veke carek xet û xalan li ser wan mesned û palan
Bixwûne lê me 'ebdalan bibînin 'îd û sersalan
Îcazet dî me destûrê perîrengê sifethûrê
Ji nêva zulmet û nûrê binoşîn mey di ferfûrê (124/7)

### 2.5.7. Telaqqiyên Derbarê Kesayetiyan de

#### 2.5.7.1. Ehlê Şeqa

Di dîwanê de tîp û kesayetên rengîn cih girtine. Ehlê şeqa jî yek ji wan kesê ciwakê ye û ji bo beyankirina medhê memdûhî hatiye bikaranîn. Kesên şaqî, di destê memdûhî de bi zar in û emanê nadete wan. Şa’ir dixwaze ew kesê ku ji can û dil teslîmî dadmendiya dewleta memdûhî nebe, di destê desthilatdar de weke eşqiyayan di qehr û azarê de be.

Ê ne dewletxwahê hedret bit ji nêva can û dil
Şubhetê ehlê şeqa ber qehr û azarê te bî (116/18)

#### 2.5.7.2. Ehlê Segsirişt, Xebaîsteb’ û Ker

Mebesta heyînê muhebbet e, lewra şa’ir pir ehemmiyetê dide hub, muhebbet û mehbûbê. Di hişmendiya şa’irî de ew kesê ji cananê hez neke û nefretê jê bike, ew exlaqpîs, xuyseg û tebî’etker e.

Xebaîsteb‘ e û ji ehlê segsirişt e
Yeqîn ew ker ji canan lew dikit bîz (46/12)

#### 2.5.7.3. Erbabê Wefayê

Di ‘eşqê de usûl û qaîde hene. Yek ji wan jî wefadarî ye. ‘Aşiqî, di rêya ‘eşqê de gelek eza û cefa dîtiye û dilê wî gelekî şewitiye. ‘Aşiq ji mehbûbê dixwaze ku serkêşî û xezebê lê neke û di ‘eşqê de wefadariyê nîşanî ‘aşiqê xwe bike.

Serkeşî şêweyê erbabê wefa nîne rihê min
Te ji dil sohtî Mela bes bi Mela ra bi cefa ne (94/29)

#### 2.5.7.4. Dost û Hebîb

Dost û hebîb ew kes in ku ji dil meyla hev dikin û dibine muhibbên hev. Şa’ir peyva dostê, bi gelemeperî ji bo mehbûbê bi kar tîne. Pêwîst e kesên dostê hev bin ji hev neêşin û ji hev ‘aciz nebin; lêbelê di ‘eşqê de ev yek ne mumkin e. Mehbûb dosta ‘aşiqî ye, lêbelê singê ‘aşiqî dike hedefa tîran. Aşiq ji ber dosta xwe weke çengê dinale û weke şem’ê dihele; lê nizane ka haya dosta wî jê heye an na. ‘Aşiq bi xwîna cegerê, ji dosta xwe re arzuhalan dinivîse ku ew wan bixwîne, lutf û mehametê jê re bike. Şa’ir, ji dil girêdayî û wefadarê mehbûba xwe ye. Di dilê wî de, ji xeyrî hubba mehbûbê, hubba yeka din tune ye. Heta canê wî di bedena wî de ye, ew ji mehbûba xwe dest bernade. Herçendê bi fesadî û telbîsa reqîbî, hebîbê dilê ‘aşiqî şikandibe jî, ew ji hebîba xwe gazind û gilîdar nîne.

Tîran li me dit dost me dibê sîne hedef kir
Nazan li me kit yarê me zarî û niyaz in (84/10)

Şubhetê çengê dinalim hêj ji dest daxa qedîm
Her wekî meş'el disojim dost nizam ageh heye (93/25)

Ma bi zehrê şekerîn dosti bixûnit carekê
'Erzihala ku nivîsî me bi xûna cegerê (126/11)

Di rêya dostê Mela yek cihet û sadedil în
Me heta can heye dîsa ji teleb dest nehilîn (121/5)
Rûh û rewanê min hebîb dîsa bi telbîsa reqîb
Rencide kir miskîn xerib terka dilê ehbabi da (2/4)

Dostê heqîqî Xwûda ye. ‘Aşiq heta di ‘eşqê de fena nebe, bi dostê heqîqî re baqî nabe. Însan mexlûqekî fanî ye, wuslata wî bi fenafillahê çêdibe û ew bi fanîbûnê û gehiştina meqama fenafillahê, jiyaneke ebedî bi dest dixe.

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

### 2.5.7.5. Tifl, Ciwan

Tifl, zarokê ku hêj ‘eqlê wî tam negehiştî ye. Tifl, ji bo teşbîhê hatiye beyankirin. Spehîtiya yarê ji ber tecelliya navê Celal hatiye wucûdê û harîkulade ye. Însan çiqas mezin û gehiştî bibe jî dîsa derbarê têgihiştina mezinahiya Xwûda de ‘eqlê wî weke yê zarokekî mektebî ye, yanî ji têgihiştinê re neqis û kêm e.

Dêmê bi xal ew nûn û dal ismê Celal bejna şepal
Yekta elif nayê wesif min 'eqlê tiflê mekteb e (100/7)

Ciwan, bi gelemperî wek sifetê yarê hatiye bikaranîn. Ciwan ji bo tazebûn û spehîtiya wê bûye mijar. Yar bi bejn û bala xwe ve weke selwa ciwan ya nûçêbûyî ye. Yar weke serwa ciwan, terhên (şax û çiq) ciwan, ji aliyê bedewî û rindiyê ve wek îstî’areyî hatiye wesifdan.

Xwûn ji dil co co rewan tên wek ‘eqîq û erxewan tên
Lê ji ber destê selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox (36/3)

Dil bide wan bişkowan lu’lu’ û ‘eqd û gowan
‘Er’er û serwa ciwan da tu bi wan bî ciwan (50/5)

‘Er’er û serwa ciwan yasemîn û erxewan
Rûh ew in û her rewan dê dil û can dîn bi wan (50/6)

Mawer ke terh û bişkuwan cîran û berg û lu’luwan
Lew ‘er‘er û selwa ciwan şetrî bi mestî lê xweşîn (79/13)

Weqtê ku nalîn erxewan gulçîçek û terhên ciwan
Vê ra ne bê selwa rewan ‘arif li ferqê can e reqs (55/8)

### 2.5.7.6. Şah, Mîr û Geda

Şah, ew e ku di wesfên wî de izzet, îkram, me’rîfet û hukumdarî heye. Bi gelemperî şah, mehbûb e û wan wesfan di şexsê xwe de dihewîne. Hukmê ‘aşiqên xwe dike û çawa bivê ‘aşiqên wê wisa hereket dikin. ‘Aşiq, di dîwanê de, bi îstî’areyî wek geda hatiye beyankirin. ‘Aşiq di bin emr û meftûnê mehbûbê de ye. Şah qesta kuştina ‘aşiqî jî bike, ew geda ye, î’tîrazê nake, lewra ew xweyî edeb e û hududê xwe dizane.

Yarê ku dî em geda dest bi destê me da
Em bi semayê birîn reqs û sema jî we ma (8/6)

Şah bi qesda kuştina min rim hejand min go sebeb
Dame çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da go edeb (14/1)

Şah û geda jî weke husn û hubbê bê yekûdu nabin, ew bi hev ve girêdayî ne û bi hev re heyî dibin. Çawa ku şu’leya Sultan Mehmûdê Xeznewî bê şem’a Eyaz nabe, her wisa, şah û geda jî bi hev re, xusûsiyetên wan derdikevine meydanê. Ji ber spehîtiya mehbûbê, şah dibine geda, geda jî dibine şah û xusrew. Şah dibine geda, lewra ji ber wê husnê, dihelin û dikevine bin emrê mehbûbê û geda jî dibine şah, lewra ew bi wê husn û cemalê mehbûbê xwe bextiyar û dilaram dihesibînin. Mekanê husn û muhebbetê sergoşeya dilî ye. ‘Aşiq bi wê hesta ku ketî dilê wî, caran xwe geda, caran jî xwe weke şahan serbilind û hukumdar dihesibîne. Mehbûb, şaha ‘aşiqan (geda) e, dema ‘aşiq wê dibînin ruhê wan yê mirî ji nû ve zinde dibe û geş dibe. Di çavên ‘aşiqî de yara wî, ji hemû şah û qeyseran mezintir û î’tîbartir e; lewra dildar û evîndarên wê hemû ji dil û samîmî ne. Herçendê ‘aşiq weke geda û feqîran bin jî, lê ew bi ruh û canê xwe fadaîyê mehbûbê ne.

Husn û hubb bê yekdu nabin dê biken şah û geda
Nûrê nadet şu‘leya Mehmûdî bê şem‘a Eyaz (45/4)

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bin xwuya
Bende dê şah û geda bit Xusruwê şîrîn kelam (77/2)

Ger husn û mehebbet bi seraperdeyê can bin
Geh şah û geda geh bi xwe Mehmûd û Eyaz in (84/12)

Şev bû di nêv çeşmên me da hetta beşîr mizgîn dida
Dê bê seher şah û geda feryad ji destê firqetê (115/12)

Perdeyê hebabê bi hîcabê te vedayîn
Serwî di çemen da’w di benda hewe da yîn
Herçende tu mîr î me feqîr û me geda yîn
Zanî ji giyanê xwe bi canê xwe feda yîn (130/6)

### 2.5.7.7. Miskîn ( Jar, Xerîb û Feqîr)

Miskîn, belengaz, destteng û jar e.[512] Miskîn, di dîwanê de, wek îstî’areyî ji bo ‘aşiqî hatiye beyankirin. ‘Aşiq, dema ji mehbûbê dûr bikeve û ji aliyê wê ve bête rencîdekirin; ew xwe wek xerîb û miskînan dihesibîne. ‘Aşiq, di destê yarê de, ji ber êrişên wê û ji ber firqetê xwe miskîn û jar dibîne.

Rûh û rewanê min hebîb dîsa bi telbîsa reqîb
Rencide kir miskîn xerib terka dilê ehbabi da (2/4)

---

[512] Melayê Cizîrî, b.n.b., (ferheng), r. 400.

Xefletê ew keşşifî şîr dest bi dest hatin ceger
Go xebînet ya Melê miskîn Mela ker kir kezeb (15/13)

Mislê goyîn direwan nale ji dil tên miskîn
Em nizanîn tu çira her weh dinalî şeb û roz (47/3)

Bûyên çolex dikeftin metbexa mîran
Qewî zulm e li me mîskîn û jaran (88/1)

Miskîn û feqîr, wek mecazî ji bo ‘aşiqî hatine bikaranîn; lewra yar di husn û cemalê de ew qas dewlemend e ku gehiştiye kemala nîsabê. ‘Aşiqî jî, ji ber ku di firqetê de ye û ji husn û cemalê wê sûd wernegirtiye, ji mehbûbê dixwaze zekata xwe bidete wî ‘aşiqê miskîn û feqîr. Eger mehbûb, nezerê li ‘aşiqê xwe neke, wî ji zindana firqetê azad neke û neke wasilê husna xwe, dê ‘aşiq xwe weke miskîn û xerîban bihesibîne. ‘Aşiq, ji mehbûbê dixwaze ku ew dilê xwe yê weke kevirê hişk ji bo ‘aşiqî nerm bike û ‘aşiqê miskîn nekûje.

Ji wîsala xwe zekatê bide miskîn û feqîran
Ku cemalê te ye kamil di kemala xwe nîsab e (94/17)

Carek tu nezer da li me miskîn û xerîban
Berde tu ji hebsê û ji zindanê derîne (101/2)

Çi xeber dim ji dilê te'y wekî seng
Bikujî 'aşiqê miskîn bi tifeng (123/5)

#### 2.5.7.8. Naehl û Nadan

Naehl, ew kes e ku qiymeta ‘eşq û ‘aşiqî nizan e, an jî xwe weke qiymetnezan nîşan dide. Dil, wek gewherekî, emanetê Xwûda ye û pêwîst e bi kesên naehl re neyê dayîn. Dilê ‘aşiqî ji ber derbên evînê hatiye dax û keykirin û weke neyê fîxan û efxan dike; lê dîsa dest ji dilberdana wan naehlan bernade. ‘Aşiq van rastiyan dibîne ku mehbûb qedr û qiymeta wî nizane û wî bi wuslata xwe şa nake, lê dîsa dest ji hubba mehbûba xwe bernade, lewra ew di vê derbarê de nadan e.

Dil emanet da bi naehlan nedî
Lê bi naehlan me da gewher ‘ebes (26/2)

Ev sîneya wek nay û ney pur lê kişandin dax û key
Her dil bi naehlan nedey ya Reb çi nadan î Mela (12/6)

Ji derbê 'işqê nadan im sebahulxeyri ya xanim
Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê (124/5)

### 2.5.8. Avahî û Cureyên Wan

#### 2.5.8.1. Meyxane, Meygede, Xaneyê Xemmar

Meyxane, meygede û xaneyê xemmar, wek mekanan derbarê ‘eşqê de û di wateyên tesewwifî de ji bo tekya û dergehê hatine bikaranîn. Murşîd û rêvebirê meyxane û meygedeyê pîrê mûxan û pîrê ‘eşqê ye. Saqî û muxbeçe jî wek alîkar û berdestan şerabê (‘eşq, hikmet û me’rîfet) belav dikin.

Ew kesê xîret bike û berê xwe bidete meyxaneyê ew di vê dunyaya derewîn de karekî mayînde dike û dê di dinyaya din de mukafat û xelata wî jê re bête dayîn. Meyxaneya ‘işqê cihê tewbekirin û me’rîfetê ye; ew der, cihê şahidperest û mehbûbperestan e. Ehlê ‘irfanê li wê derê, bi hêstirên çavan xwîna dilê xwe û xwe paqij dikin û destnimêj digirin. Kesê bixwaze ji gunehan dûr bikeve, pêwîst e cehda wê derê bike û xwe ji qirêjahiyên dunyayê paqij bike. Ehlê ‘eşqê, meyxane ji xwe re kirine menzil, lewra ‘aşiq û ‘arifan, di qedeh û meyên wê derê de rû û cazîbeya yarê dîtine.

Se’y û cehdê em bikin meyxaneyê
Ew ku naçit se’y û cehda ber ‘ebes (26/5)

Were meyxaneyê şahidperesan
Şem‘ê meclis di nebîtin çi kes în (80/8)

Derê meyxaneya ‘işqê seher ‘arif zîyaret kir
Bi abê çeşm û xwûnê dil wudû best û teharet kir (42/1)

'Eqda ihramê di 'işqê da ku pîrê 'işqê best
Dê çi xem ger xirqe rehnê xaneyê xemmarî bit (19/7)

Dêm di camê me dî sur di medamê me dî
Lew me ji meyxaneyê girtiye ber der mezel (73/3)

Meygede, bi mehbûbê û bi tecelliyên wê yên li wê mekanê watedar dibe. Eger mehbûb nîşane û tecelliyên xwe li cih û mekanekî de nîşan bide, ew der ji bo aşiqî dibe weke cihekî pîroz; lewra di vê derbarê de ferqa Ke’be, meygede, dêr û keniştê namîne.

Ger xwe nîşa seqerê dit dikirit hûrîbihişt
Ke'beya tê bit ew meygede û dêr û kenişt (121/1)

#### 2.5.8.2. Seray, Qesr, Eywan û Şehneşîn

Qesr, eywan, seray û şehneşîn ji bo heşmetiya mehbûbê hatine bikaranîn. Ev mekanên navborî cihên şah û mîran in. Pêwist e ‘aşiq wan deran bi dest bixe ku mehbûbê bibîne. Mehbûb ji ‘aşiqî re şah û mîr e. Ji ber nûr û tecelliya mehbûbê, ev der weke fecrê sadiq rohnî ne û dibiriqin.

Şehneşînê nazikan zayi‘ mekin
Da bibînî dil bi vê xanê xelet (61/7)

Gunbeda nûrîn xuya bû spêdeya sadiq numa bû
Yek bi yek şewqê vedabû qesr û eywan û sera ye (96/7)

Bimeş û ku kewkeb bi ser derê qesrê
Bi xwe kokê li şah û qeyser ke (98/8)

Yar weke tûtiya şirînkelam e, meqama wê bilind e, di eywana şahan de nîştecih e. Eywan, cihê dîtina şahan e, ew li pêş perdê di xelwetê de ye. Her dem nayête xwûyakirin. Dema derkeve eywan û dîwanê, bi sed hezaran hûrî ji bo ku husn û cemalê wê mêze bikin tênê pêşberî wê û wê di eywanê de diqudsînin. Seraya yarê mehrem e û cihê huru’l-eynan e. ‘Aşiq, destûrê ji yarê dixwaze ku deriyê serayê lê bête vekirin û yarê bibîne. ‘Aşiq ji bo dîtina mehbûbê salikê qesr û serayan e, lewra mehbûba weke şah û padîşahan li wê derê dimîne. Ew di seraya xwe de, xwe bêperde nîşanî ‘aşiqê xwe dike.

Xwoş xeramê ez xulamê nazikê şêrin kelamê
Tûtîya eywan meqamê dil ji min bir dil ji min (82/7)

Bête eywanê ji xelwê hurîya qudsêsirişt
Sed hezaran horîqudsî tên lîqayê rast û çep (17/15)

Şem'a me jê pur nûr bikî zehrê xwe me'mûr bikî
Şeha me bê destûr bikî mehrûm serayê hûr bikî (125/12)

Ez çûme serayê ku şirînqed li semayê
Go ev ne Melayê me ye bê perde bila bê (112/18)

### 2.5.9. Qumaş û Cil û Berg

#### 2.5.9.1. Etles, Dîba û Xare

Etles, dîba û xare, hem ji bo qumaşê giranbiha hem jî ji bo cilên ji wî çêkirî re tê bikaranîn. Rûyê vî qumaşî ji hevrîşimê û nava wî (betanê wê) jî ji pembû an jî ji

hiriyê tê ristin. Ev qumaş û cil, sembola dewlemendiyê ye. Şexsên kesayetbilind û meqambilind û zengîn wî cilî ber dikin.

Etles, dîba û xare, ji bo xeml û ziyneta mehbûbê bûye mijar. Cil û bergên yarê, ji etles û dîbayê ne. 'Aşiq dixwaze, çi cil û bergê giranbiha û neqişkar hene, mehbûb wan wergire û xeml û zîneta xwe bi wan çêke. Ew dixwaze cilên yarê bi zêravê û hevrîşimê hatibe neqişandin.

Çîn çîn kirin zulfên siya kesketlesa dîbaqeba
Êdî nîşan nabin xuya têkil kirin lazim seba (11/1)

Sed hezar etles û hem xare divên
Her li bo zînet û xemla te divên (123/1)

Xemriyan şifite tuxra nekirî
'Er'erê xare û dîba nekirî (123/4)

Zulfa siyeh 'enber bike xemlê ji zêrê zer bike
Zerbav û dîban ber bike misk û gulavê lê reşîn (79/12)

### 2.5.9.2. Herîr

Herîr, hevrîşim e. Ev cure qumaş bi biriqîn û nermiyê ve namdar e. Herîr wek îstî'areyî ji bo zulfa yarê hatiye bikaranîn. Zulf, bisk, kezî û gîsoyên yarê weke herîrê nerm û birqdar in û şetrî, bisk û tayên zulfa yarê weke herîrê zirav in.

Zahir dibêjim pendigîr da dil nedî zulfa herîr
Şubhê Melê d'mînin esîr guhdêr e qewlê mu'teber (43/12)

Dêm nedirê bû 'ebîrê xemrî û gîs û herirê
Sîne kir amancê tirê dil ji min bir dil ji min (82/4)

Xemrî di reş in miska herîr û bûn li dor bedra munîr
Her ca ku hakim lê du mîr merd în li textê kişwerê (113/11)

Bisk û gîsu ji herîr in qesîr in turre û zulf
Ne ji kafûr e beden xalê ji miskê Teterê (126/14)

Xemirî û qişt û zulf û bisk ên ji herîr û bû ji misk
Min bes in ew ji mal û risk dil bide dilrubayekî (128/9)

Qewsê te hilalî bi delalî keşiha
Bejna te ji şengî bi derengî meşiha
Marê ji herîrî di 'ebîrê xuşiha
Mawer bû ji wan zulfê di zengî weşiha (130/1)

### 2.5.9.3. Sundus

Sundus, hevrîşimê tenik û zêrkirî ye.[513] Sundus, ji bo bejn û bala mehbûbê û neqş û xemla wê hatiye beyankirin. Mehbûb di nav cil û bergên sundusî de xwe nîşanî ‘aşiqî dike. Sundus, bi rengê xwe spî û tenik e. Dema yar bi cilên sundusî ve ji tariyê dertê, her der rohnî dibe.

Îro mi dî weqtê seher ew dilbera sundus di ber
Dîsa di lebsê sor û zer nûrek munezzeh bû beşer (125/1)

Min dî di newbê yar tewî sundus ew bêm lê derew
Meh bû di qewsê bûyî ew şêvan lew nayê me xew (67/5)

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bin xwuya
Bende dê şah û geda bit Xusruwê şîrîn kelam (77/2)

### 2.5.9.4. Lîbas û Came

Lîbas û came, wek cil û bergan, ji bo bejna yarê û pîrê ‘eşqê, ji bo meqama wan hatiye zikirkirin. Lîbas, wek stargehekê, bi mecazî û îstî’areyî, ji bo cismê beşerî hatiye bikaranîn. Çawa xusûsiyetên ‘aşiq, murîd û pîrê terîqetê bilind in, cil û bergên wan jî goreyî meqam û hêjayiya wan bijare ne. Cilê pîrê terîqê, weke yê şah û şehzadeyan giranbiha ye.

Salikên 'işqê yeka yek hewce nînin ez bibêm
Cameya pîrê terîqê ser ji nik şehzade bû (104/9)

Lîbas û xeml, digel rûyê yarê dereceya husna wê nîşan didin. Lîbasên wê yên purxemil agirê evînê gurtir dike û meyla ‘aşiqî jî zêdetir dike. Cemalê yarê tecelliya husn û nûra nunezzeh e. Yar, weke horiyên cennetê qudsî ye û di nav lîbasên neqişkirî û xemilandî û rengfîruze de xwûya dike.

Da ruyê husna dilberan b'xeml û lîbas û zîweran
Bête şuhûda beseran bînahî ye d'her dîde da (9/29)

Mefhûm ku bû me'lûm di dil zîwer bidî tê sed 'emil
Bînit libasek purxemil hindî ku se'y û cehde da (9/39)

Husna munezzeh bêmisal ser da libasê xett û xal
Sergeşte heyran mayî lal Ehmed ku dî nûra Semed (40/9)

Şahidê cilwenuma qudsiyê feyrûzelibas
Her ji rengê te nîşan dit tu Nîşanê xwe binas (51/1)

---

513 Melayê Cizîrî, h.b., (ferheng), r. 415.

Rûhaniyên qudsîmîsal têne lîbasê xett û xal
Saqî meya gulgûn û al tînit di fincana me da (9/78)

Xwûda ji ruhê xwe, weke gewherên giranbiha însan afirandiye û beden jî weke qefesekê jê re kiriye stargeh. Wucûda însên ji ruhê wî re kiriye lîbasekî beşerî.

Weh çi balagewher in hatî libasê cism û can
Min ji wan horîsiriştan ev perîruxsarî bes (52/6)

Ew çi ‘alî cewher in hatî libasê cism û can
‘Işweyên wan şibhê iksîrê di qelban in meqam (76/6)

Ya ji ser ta bi qedem têki ji 'eyban e berî
Bête ber 'eynê şuhûdê di lîbasê beşerî (121/2)

**2.5.9.5. Hicab, Sitare û Nîqab**

Hicab û sitare; perde û poşî ne. Ev cil û bergên nixumandinê, wek îstî’areyî ji bo perdeya xeybê hatine bikaranîn. Di navbera Xwûda û mexlûqatan de perdeya xeybê heye. Piştî Xwûda xwest ji xezîneya veşartî bête dîtin, li alemê tecellî kiriye û nîqab, perde û hîcab êdî di navbera wî û heyînan de hatiye rakirin. Çawa ku Qafê roj dorpêç kiriye, nîqabê (perdeya xeybê) jî ew xezîneya munezzeh veşartibû. Cebraîl bi destê xwe nîqabê, yanî perdeya xeybê radike û her der rohnî dibe û ‘alema şuhûdê tê meydanê.

Destê qudret ku hilavêti ji bejna te nîqab
Bi cemalê ceberûtî me neman perde’w hîcab (13/1)

Destê Cibrîlî hilavêtî ji bejna te nîqab
Bi yeqîn Qaf e li rojê were der rohnî te nîqab e (94/4)

Caran ji ber bextê xirab perde û nîqab dikevin navbera tecelliyan û însan wan nabîne. Maddeya ku însan jê hatiye çêkirin wek bextê xirab tê dîtin. Lewra ruh di qalibê xwe de girtiye û hêsîr kiriye. Çawa heyîv dikeve navbera rojê û ew nayête dîtin, ax jî weke perde û hîcabekê ketiye navbera tecelliyan û ruhî. Mehbûb, bi sedaqatê xwûya dibe. Eger ‘aşiq bi hubbeke sadiqane wê bihebîne, dê ew bêperde û bêhicab xwe nîşanî wî bide.

Zuhre û ‘iqd û Sureyya keşşifîbûn ew di şerq
Sayeya bextê me dayê ma li ser perde’w nîqab (16/5)

Qeydê xak û gil nebît da bê hîcab û perde bî
Mislê bedrê carinan têxit xusûfê xakê rûh (33/2)

Ê yekî sadiq hebînî bê hîcab ger ew bibînî
Ma li hişyarî dimînî serxweşê bê bade ye (97/14)

‘Alem, di pêşiya tecelliyan de, di tarîtîyê de bûye. Dema li pêş perdeyê, tecelliyan weke birqê vedane, ji ber husn û cemalê qudreta ezelî, ‘alem nûrîn bûye. Nûra munezzeh, li pêş perdeyê ye, ew weke tecelliya Çiyayê Tûrê, di batina ‘aşiqî de tê zuhûrê.

Berqê ku veda ji ber niqabê
(Wel-lamiû min senahû qed lah) (34/10)

Lami'a wê husn û nûrê ger çi tê dil şubhê Tûrê
Batin e nayê zuhûrê lê hicab û perde ye (97/16)

Nîqab, bi îstî’areyî zulfa yarê ye û rûyê cemalê wê dinixumîne. Dêm û rûyê yarê weke rojê ronîdar e û nîqaba wê (zulf) jî weke şevê reş e. ‘Aşiq ji mehbûbê dixwaze ew nîqabê ji ser rûyê xwe rake ku husn û cemalê wê bibîne, lewra ew mudawîmê dîwana hezretê ye. Bayê sebayê zulfên yarê dihilavêje û li ser rûyê wê, hîcab û perdeyê radike. Dema nîqaba zulfan li ser dêmên mehbubê radibe, ‘aşiq vê rewşê ji xwe re wek destûrdana tewafê dihesibîne. ‘Aşiq di wê ronahîyê de xalên yarê (heceru’l-eswed) ziyaret dike. Dema perde û sitare ji ber wechê hîlalê radibe, sirra cemalê kifşe dibe û ji ber wuslatê, ji ‘aşiqî re jî secdeya şukrê ferz dibe.

Kifş bû di qewsê da hilal vê ra mi dî bedra kemal
Lê bûn nîqab çewkan û dal wan yek bi mestî daye pal (125/2)

Xergeh bi min hicab e sitar dikit cemalê
'Ewrê reş xwe nîqab e li ber wechê hilalê
Perwane lew di 'ezab e mehcûb e ji şemalê (132/13)

Ji ber benda nîqaba wê li ber fetla 'îsaba wê
Cemala mahitaba wê me bedrek dî di seywanê (111/19)

Hîcab û perde avêtin seba reyhan hilavêtin
Ji burcan tîri pur rêhtin gihan min rast û çep cerde (92/4)

Ji ber dêmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Di se‘yê beyt û îhramê û min Eswed ziyaret kir (42/5)

Secdeya şukrê carek me ferz e di wîsalê
Ne perde ne sitarek li ber wechê hilalê
Ehsenellahu tebarek ji sura wê cemalê (132/5)

### 2.5.9.6. Damen

Ji bo ku daxwaz bêne cih, bi damenê şah, mîr û mezinan tê girtin. Damengirtin, nîşana lavahî û ricayê ye. ‘Aşiq dixwaze li ser rê û asîtana yarê bisekine û dema ew bê, bi damena wê bigire û çi qeder cehd û quweta wî heye, lawahî û ricayê jê bike ku bizane ew dildarê wê ye û haya wê pê hebe.

Bûme xak ez lew ji rê ve da dema yar bê ji wê ve
Damenê bigrim ji pê ve çendekê min cehde ye (97/22)

### 2.5.9.7. Serpoş û Qeba

Serpoş, ew cil in ku têne wergirtin. Qeba jî (xiftan û ‘eba), weke cubbeyê pêşiya wê vekiriye û li ser cilan tê wergirtin. Ev cil û berg ji bo yarê, ji bo ‘arifên ji ehlê besaretê weke mecazî hatine bikaranîn. Serpoş (poşî) û surmepoşa wan spî ye û qebayên wan jî reş in. Cil û bergên ehlê ‘irfanê ne giring in, ew ehlê besaretê ne û giringiyê didene me’newiyatê.

‘Arifên ehlê besaret ji neseq merdumê çeşm
Surmepoş in di beyadê qebaya xwe ye reş (54/10)

Mehbûb, nûranî û pîroz e û ew serpoşa ‘aşiqî ye. ‘Aşiq, bi wergirtina wê star dibe. Ew ji qatekî bilind, yanî ji asîmanan daketiye dinyayê. Ji ber vê yekê qebayê yarê jî, ji rengê asîmanî (rengşîn) ye.

Serpoş û qibaba min û 'işq û mey û cam
Cama ku nebes ke bi tenê bes ke xitam
Şahid ne bi mestî bigerînit bi xiram
Ew bade heram e di sed carî heram (130/19)

Ku lê têt ew qebayê asîmanî
Letîfa şeng û nazik wek belazîz (46/9)

Serpoş û qeba, caran wek îstî’areyî temsiliyeta rîya û durûyiyê dikin. ‘Sûfî, bi kirinên xwe serpoş û qebaya riyayê werdigire ser xwe. Dema ‘ehlê ‘îrfanê pê dihese ku libasê riyayê wergirtiye, dixwaze wan perde û qebaya riyayê, li ser beden û ruhê xwe bidirîne û bavêje ku heqîqet wek şeffafî û safî derkeve meydanê.

Serpoş û qebaba me ye tesbîh û musella
Wer da biderînin li xwe vê perde qibayê (112/12)

#### 2.5.9.8. Kemer

Kemer, ew navbend e ku ji gewherên giranbiha tê neqişandin û yar li ser navtenga xwe girêdide. Kemer, weke text û tacê, ‘elametê bextewarî û si’ûdê ye.

Exterê îqbal û mehê burcê bext
Mihr û sipihr û kemer û text û tac (30/5)

Kemer, weke biwêjekê, wek “kemerbeste” hatiye bikaranîn. Kemerbeste, wek biwêjekê, tê wateya hurmet, rêzdarî û teslîmbûnê. Dilê ‘aşiqî li hember mehbûbê kemerbeste ye, di emrê wê de amade ye. Di navbera kemer û zunnarê de jî têkiliyek heye û herdu jî li ser cil û bergan têne girêdan.

Dil kemerbeste di 'işqê û bi xwe zunnarperest în
Mey û me'şûq e du'ayê me û seccade qibab e (94/2)

#### 2.5.9.9. Çar

Çar, wek cil û bergê tê wergirtin û bedenê hemû, ji serî heta binî dinixûmîne. Çar, wek îstî’areyî, qirêjahî û jengên dilî ne; eger însan xwe ji wan qirêjahiyên weke çara reş ku qelbî dorpêç kirine, xilas bike, dê di dilî de tecelliyên nûranî peyda bibin.

Yar jî, di nav çarê de xwe nixûmandiye. Eger ‘aşiq ji ser rûyê yarê bikaribe çarê bidete paş dê yar bi hemû xemilînên xwe ve xwûya bike. Daxwazeke ‘aşiqî jî ew e ku yar li ser rûyê xwe kefî û çarşevan bidete paş ku ji ber ronahiya rûyê wê, şewqa roj û heyîvê wenda bibe û ya yarê her derê rohnî bike.

Çarê hilîn yarê bibîn ne perdeya tarê bibîn
Sed carî ew karê bibîn gul wê di nêva buxçe da (9/43)

Perdeya xêlî û çarê tu ji ser dêmê hilîn
Da ji şewqa te bixef bit şefeqa mihr û mehê (110/10)

Çar, wek teşbîhî bi xunçeyê re hatiye bikaranîn. Di navbera çarê û xunçeyê de têkiliyek heye. Herdu jî dema vedibin, husn û cemalê wan tê xwûyakirin.

Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî
Bişkifti sifet-xunçe ji çara ereşî (129/1)

### 2.5.10. Eşyayên Neqş û Xemilandinê û Kevir û Me’denên Giranbiha

#### 2.5.10.1. Zêr

Zêr, me’denekî qiymetdar û hêja ye. Ji ber qiymêt û rengê xwe yê zer ku cazîbedar e, wek pere û ji bo tiştên neqşan tê bikaranîn. Qelîteya zêrî bi mehek û çakûcî

û ya ‘aşiqî jî firqetê kifşe dibe. Zêr, di dîwanê de ji bo tecrûbekirinê bûye mijar. Qelîteya aşîqî ji aliyê mehbûbê ve tê tecrûbekirin. Tecrûbeya wî bi hicrê tê kirin. Eger zêr û ‘aşiq herdu jî xalis û saaf bin, ji bo tecrûbeyan hewce nîne.

Ta çendê bi hecra xwe tu min tecrîbe înî
Zêrê ji xwe xalis mihekk û gazî çi hacet (21/9)

Ji aliyê şewitandin û sohtinê ve di navbera zêr û ‘eşqê de têkiliyek heye. Ji bo ku wek me’denekî safî derkeve meydanê zêr di êgir de tê helandin. Agirê ‘eşqê jî wucûda ‘aşiqî dişewitîne, wî tecrube dike, qelîteya wî derdixe meydanê.

Ateşê ‘işqê şebhê zêr wucûdê hel ket
Heye mumkin nefirit zîbeqê ferrarê hudûs (28/11)

Di nav gel de baweriyek heye ku bi iksîrê ji ax û kevirî zêr tê çêkirin. Eger hekîm (kîmyager), jêhatî, xwedî tedbîr û xweyî qabiliyet be, dikare vî karî pêk bîne.

Her gil û seng dibin zêr bi tedbîrê hekîm
Qabilîyyet ku nebit hikmetê ustadî çi ket (22/5)

Zêr, me’denê neqişandinê ye. Jin, ji bo neqişandinê gelekî zêde zêrî bi kar tînin û bi wê cazibedariyekê bi dest dixin. Lêbelê ji bo celbkirina qelban zêr bi serê xwe tenê bes nîne, lazim e di bejn û bala yarê de jî cazîbeyek hebe kû zêr jî li ser wî bedenî kêra tiştekî were. Çawa mehderî û şefqet bi hev re xweş bin, xeml jî xweş e lê ku bi zêrên zer bête kirin.

Zêr û zîwer dikirin celbê qulûban haşa
Husn û sur zati nebit qametê meyyadî çi ket (22/7)

Kes nîne lew mehder bikit şefqet li girtiyan bikit
Xemlê ji zêrê zer bikit şefqet lê kit nezerê (113/27)

Katibê neqşên qudretê, li ser rûyê yarê gencîneyek ava kiriye. Xet û xalên tabiî û yên ku yarê bi xwe jî çêkirî û xwe xemilandî weke zêrê spehî û cazîbedar in. Ji bo xemilandinê jî neqşa herî sipehî û cazîbedar zêr e. Yar jî bi nexşên zêrî, xeml û zîneta xwe çêdike. Neqşên qudretê ew qas li yarê tên, ji ber spehîtayîyên rûyê yarê sîm û zêr şerm û fedî dikin. Zêrên heqîqî yên cazîbedar neqşên qudretê yên li ser rûyê yarê ne û wek me’denekî zêr, li ber wan neqşan tiştekî mecazî ye.

Zêde bi husn in di qenc şox û şepal in di xenc
Lê me ewan zêr û genc dame ewan sed şikenc (50/3)

Pur xecilîn sîm û zer xeyrê li terhên di terr

Belg û wereq tac û ser zulfê li ser bûne gerr (50/5)

Katib ji neqşê qudretê zêr reşand ser xetê
Erzen û dêm û cebhetê lê neqişand û kir nuqet (60/2)

Zulfa siyeh ‘enber bike xemlê ji zêrê zer bike
Zerbav û dîban ber bike misk û gulavê lê reşîn (79/12)

Serwinazê serfirazê şubhê zêr remza mecazê
Dame ber çakûç û gazê dil ji min bir dil ji min (82/11)

Zêr, nîşaneya dewlemendîyê ye û îşaretê bi zengîniya dinyayê dike. Ew kesê ku giringiyê bidete me’newiyatê, dewlemendiya wî heyîna muhebbetê ye. Ji bo ‘aşiqî dewlemendî heyîna yara wî ye. Sîm û zêr, temsîliyeta hubba mal û meqama dinyayê dikin. Ew kesê ku hez ji Xwûda bike pêwîst e giringiyê nedete mal û meqamên dunyayê ku mukafata xwe jî sultanê heqîqî, di dinyaya din de bistîne.

Tu heyî min di dinê lew di dinê begler û mîr im
Zêr û mal er çi nedêrim te didêrim ne feqîr im (122/4)

Bendeyê Baxwoy bivêt dê meylê sîm û zer nekit
Da 'etaya padîşahan bê hed û ejmarî bit (19/17)

**2.5.10.2. Le’l**

Le’l, me’denekî rengsor e û li welatê Bedexşanê derdikeve. Bi gelemperî ji bo lêvên yarê, xeberdana wê, mohra hukumdariyê, bade û nezmê wek teşbîhî û îstî’areyî hatiye bikaranîn. Le’l, îşaretê bi devê yarê û gotinên wê dikin. Le’lên yarê (gotin) ji bo nexweşan şîfa û derman e. Leble’lên yarê, can dide dildar û birîndarên mehbûbê. Di dîwanê de ravek û teşbîhên weke “le’la Bedexşan, le’lê şekerxende, lebê le’lê şekerîn, le’lê şekerbar” derbarê le’lê de hatine bikaranîn.

Le’l, bi gelemperî bi şekirî re tê bikaranîn û xeberdanên yarê yên xweş û nazik weke te’ma şekirî ne, ‘aşiqî mest dikin û kêfeke xweş didin. ‘Aşiqê bêmar, eger ji wan lebên le’lî yên yarê şîfayê bixwaze, ew gotin û îşaretên ji wan le’lan dertê, dê ji ‘aşiqî re bibe şîfa û derman; lewra ew lebên le’lî ji bo ‘aşiqî ava heyatê ye.

Mestane govendê dikin reqsê li dor fîndê dikin
Qesta şekerxendê dikin le'lan ji gewher xende da (9/119)

Her sîneyê tabi temam napuxte xam bê mihr û cam
Xerqîn di xûna dil medam le'la Bedexşan î Mela (12/12)

Ew herdu le'l û herdu weşm geh geh bi naz û geh bi xeşm

Ew bejn û bala hate çeşm me d'seyrê rûhanî Mela (12/16)

Dê ji wan le'lan şîfayê dil bi qanûn telbe kit
Da işaret xweş bikin dê her kesê bîmarî bit (19/11)

Can bide wan dilgiran gewher û le'l û duran
Bexşe bişîrîn suran dil bi xwe bir awûran (50/3)

Min go ji me dil şubhê bixûr xweş te bi ker kir
Ker kir bi du le'lên xwe şeker go 'edes î tu (105/16)

Me ji le'lê lebê yarê vexwar avê heyat
Axyar bila têki biçin Darînê (119/7)

Le'l, wek îstî'areyî nezm û helbestên Melayî yên hêja û edebî ne. Mela ew helbestên weke le'lê qiymetdar, bi qelema 'eşqê, di behsa 'eşqê de beyan kirine. Hêja û qiymeta helbestên wî bi beyankirina 'eşqê ve girêdayî ne. Şa'irî ev nezmên ku weke le'lê giranbiha ji lefz û edaya yarê girtine.

Pur le'l û dur te j'kilkê 'işq anîne nezma silkê 'işq
Der berr û behr û mulkê 'işq me'lûm e xaqan î Mela (12/13)

Şi'ra te sihrrîz e şeker bi mu'cîz
Zanim ji lebê le'lê te ev lefz û eda girt (20/19)

Badeya di cama zuzac de, bi rengê xwe ve weke le'lê sor e. Di sohrbûna qedehê de hem tesîra şerabê hem jî ya lêvên sor (le'l) heye.

Ayîneyê camê cehanbînê Cem
Badeyê le'lî ne di cama zucac (30/2)

Çare bikin 'îlacekî qend û şeker mizacekî
Şuşe ji le'l û 'acekî neyşekkerek li tayekî (128/4)

Mehbûb bi hukumdariyê ve weke Suleyman Pêxember e û lêvên wê yên weke le'lê jî wek mohrê tên qebûlkirin.

Te çi hacet bi Suleymanê husnê
Xatemek le'l e bi gewher anî (114/8)

### 2.5.10.3. Gewher

Gewher, navê gelemperî yê me'denên giranbiha ye. Tiştên bi van hatî çêkirin û neqişandin, bihatir û hêjatir dibin.

Gewher ji bo maddeya xuliqandina însên jî hatiye bikaranîn. Ew madde ji aliyê Xwûda ve ji bo însên wek gewherekê hatiye hilbijartin. Xwûda gewhera însên pak û

paqij çêkiriye û ruhê wî jî daniye nav wî qalibî, eger însan xwe rast û durust û paqij neke sûncê gewherê nîne. Bedenê însên di alema nasûtî de hatiye çêkirin û ruhê wî jî weke sedefekê ji alema lahûtî hatiye ketiye nav wî bedenî. Yanî ruhê wî ji nefxeya Îlahî ye.

'Aşiq ew e me'şûq ew e zahir ew e mezher ew e
Rûh her ew e gewher ew e d'her şahidek da şu'le da (9/13)

Feyyadê 'ilmê "min ledun" pey pey ji behra "kan û kun"
Geh geh bi ustadê suxun wî gewherê nasufte da (9/132)

Kan bi gewher çi biket gewher eger pak nebit
Tu besîret te nebit sîretê ecdadî çi ket (22/6)

Însan bi min nasût e gewher di nêv sedefê
J'alema ceberût e şems e hatî şerefê
Tenezzul ji lahût e mehbûb e cam di kefê (132/38)

Dil, weke gewheran hêja ye, ew kesê ku qiymeta gewherê nizane pêwîst e jê re neyête dayîn. Her hêjayek bedelekê dixwaze. Çawa teyrê tawûs bi bedewiya xwe ve hêja ye û însan dixwazin wê bibînin, her wisa ew kesê bixwaze gewher û durran bi dest bixe, lazim e can û serê xwe dayne meydanê û di rêya wî tiştî de fedakar bibe.

Dil emanet da bi naehlan nedî
Lê bi naehlan me da gewher 'ebes (26/2)

Cewrê Hindî bikêşînit her kesê Tawus bivêt
Gewher û durra yetîm bêterkê ser nabin teleb (15/12)

Gewherên hêja di devê yarê de ne. Hem didanên wê hem jî gotinên wê yên hêja û tesîrdar, ji gewherên mayî qiymettir in. Me'rîfet jî, bi hêjayîyê ve weke gewherê ye û di her kesekî de nîne.

Şîrê elmasî kişînit tu ji lami' da xeber
Vekirit huqqeyê yaqûtî ji gewher meke behs (27/13)

Guftûgo çendê ger Mela me'rîfetê peyda ke
Gewhera me'rîfetê kes nagehitê kes bi xîred (38/14)

Unsûrên spehîtayiyê yên yarê, weke gewherên hêja û giranbiha têne dîtin, lewra eger însan kan û me'denek be rûyê wê jî tev de cureyên gewheran in. Gewher û gencê 'aşiqî husn û cemalê dilberê ye. Dêmê wê weke durran û lêvên wê jî weke gewheran e. Mebest ji lêvê, gotin in û lêv, hem îşaretê bi didanên yarê yên weke morî û mircanan hem jî îşaretê bi gotinên wê yên şekerbarî dikin. Rûyê yarê ji ber husn û

cemalê ve weke gewheran bi şewq û tav e. Le’lê yarê yên gewherîn, ji aliyê spehîtahiyê ve ji wê re bûne weke mohra hukumdariyê.

Gewher û gencê Mela husn û cemalê dilber e
Sed te'alallah tebarek ev çi husn û cilwe ye (93/28)

Can bide wan dilgiran gewher û le’l û durran
Bexşe bişîrîn suran dil bi xwe bir awûran (50/3)

Nazik û xûb û zerê rengmelek in surrperî
Dêmdurr û leb gewherê lê bibe can muşterî (50/5)

Tîr dan ji qewsê malzirav ew gewhera pur şewq û tav
Sohtin li min sîne û nav lew tên ji cergê ateşîn (79/8)

Te çi hacet bi Suleymanê husnê
Xatemek le'l e bi gewher anî (114/8)

Hêja û payebilindiya însên jî, bi ‘eşqê çêdibe. ‘Eşq di ruhê însên de weke gewherekê ye. Li cihekî gewher hebin, gewherçîn jî li pey wan dikevin û wan derdixin, an jî caran gewher ji ber hinek sedeman, bi awayekî xwe aşîkar dike û derdikeve meydanê. Gewher, ji ber meyla xwestina nîşandana spehîtahiyên xwe, nikare xwe veşêre.

Bi çi rengi me di dil xef bibitin gewherê ‘işq
‘Aşiqan muhbet û mihra zerîyan kifş e ji reng (71/7)

Bixwaze gewhera işqê bi terka emrê nefsanî
Eger cuz'ek ji me maye yeqîn neqşê Heyûla ye (102/4)

Me’den û gewher ji bo gotinên hêja hatiye bikaranîn. Ew peyvên derbarê medhê mehbûbê de bêne rêhtin dibine weke gewheran. Gotinên meddahî nehêja ne, belkî ji ber wesfê mehbûbê, wan gotinan giymet girtine û hêja bûne. Peyv û nutq ku derbarê memdûhî de jî bêne gotin ew weke gewheran hêja dibin. Nefesa meddahî weke misk û enberê ye û di wê nefesê de jî gotinên neyşekerî û nebatî, weke gewheran ji devên meddahî, ji bo memdûhê têne rêhtin.

Bulbulên wê gulşenê ji ezel ew her dibêjin
Heta ebed j'me'denê gewheran da birêjin
Herfek ji wesfan tenê ‘alem têk naperêjin (132/42)

Nefesa te ji enber e zebad û misk dirêjin
Çi şaxê neyşekker e nebat û qend dirêjin
Nutqa te xwe gewher e sed bar gewher dirêjin (132/46)

#### 2.5.10.4. Elmas

Elmas, ji bo husn û cemalê mehbûbê wek muqayeseyî hatiye bikaranîn. Ji ber tecelliyên rûyê yarê, yaqûtfiroş elmasên di destên xwe de tavêjin, lewra ew li ber wê husnê êdî bêqiymet in. Qelema katibê xeybê jî ji elmasê ye û hûsn û cemalê yarê bi wê qelemê neqişandiye. Rûyê yarê ew qas rohnî û birqdar e, şewqa elmasê di bin siha wê de maye.

Yaqûtî-firoşan di kef elmasi şikestin
Ev sefheyê elmasê ku neqqaşê qelem da (1/8)

Xeyb û mîsal in her di silk peyweste anî mîmê mulk
Ew katibê elmasê gilk j'wê xameyê ev reşhe da (9/68)

Neqşê elmasî li elmasî binê girtiye herf
Xetê yaqûtî li yaqûti şikênandiye çerx (37/3)

Elmas, ji ber şewq û biriqînê ve bûye mijar. Yar, bi şûr, xencer, tîr û tevran êrişî ‘aşiqî dike. Di vî şerî de amûrên yarê (nêrîn, birh, çav, awir û hwd.) yên şerî weke elmasê dibiriqin. Xusûsiyeteke elmasê jî ew e ku toza wê bikeve ser tiştekî, wî tiştî perçe perçe dike. Çavên yarê û xemzeyên wê weke elmasan tesîrdar in û dilê ‘aşiqî perçe perçe dikin.

Xencer û tîr û teber barîn şibê berq û burûsk
Misriyan lami‘ ji elmasan didayê rast û çep (17/5)

Bibêjin xemze elmasê bi zimzim bîne şehkasê
Ku hel kit me'neyên asê fe ya heyya lena hat (23/9)

Şîrê elmasî kişînit tu ji lami‘ da xeber
Vekirit huqqeyê yaqûtî ji gewher meke behs (27/13)

Me berqa şîr û elmasan bi tîrêjê û şîr şehkasan
Seraser ehlê dunyayê disojî terfetu’l-'eynê (120/5)

#### 2.5.10.5. Zîv (Sîm), Sifir (Mes)

Me’dena sifrê, rengê xwe zû winda dike û rengekî qirêj ser de digire. Dema sifir bête cîlakirin, spî dibe û dibiriqe. Qelbê însên jî ji ber teqsîratan qirêj dibe, hetta di hedîsekê de tê gotin ku li ser qelb, bi kirina gunehan nuqteyeke reş peyda dibe. Ew reşahîya di dilî de peyda dibe, zêde bibe, rûyî jî bi xwe re reş dike. Wek baweriyeke gel tê gotin ku sîm û mes, bi iksîrê ve vediguherin zêrî. Wucûda însên jî weke van

me’denan suflî ye û encax bi iksîra ‘eşqê saf û paqij dibe. Feyz û bereketên Îlahî dema bikevine qelbî, ew qelbê rûreş û rengsifir, tê cîlakirin û paqij dibe.

Qelbê me şibê zêrî ji feyza te cela girt
Ma rûsiyeh û sifirsifet rengê seda girt (20/1)

Qelbi e‘yan digirit hubb di wucûd
‘Işqê iksîr e û em sîm û mes în (80/18)

Zîv jî weke zêrî di neqş û xemilandinê de tê bikaranîn. Zîv, temsiliyeta mal û hubba dinyayê dike. Ew kesê bibe aşiqê mehbûbê, qiymetê nade dinya û malê dinyayê û zêr û zîvan di rêya wê de şabaş dike. Ew bendeyê ku ji Xwûda hez bike û di rêya wî de biçe, pêwîst e meyla sîm û zerî neke, lewra ew, însên bi dunyayê ve girêdidin.

Aşiqên leb û lêvan şabaş e ji Xwedê ra
Selwa û bih û sêvan belçîm ji zîv û zêra
Heram in xewêd şêvan li kesê muhbet vê ra (132/29)

Bendeyê Baxwoy bivêt dê meylê sîm û zer nekit
Da 'etaya padîşahan bê hed û ejmarî bit (19/17)

Sîm û rûyê yarê ji aliyê biriqandinê ve têne berawirdkirin. Dema sîm rûyê yarê dibîne, hem şerm û fedî dike hem jî ji ber rohniya rûyê wê ‘eqil ji serî diçe. Ava sîmê ya li ser tiştên xemlê jî, ji şerman dernakeve derve.

Sîma ku numa nema li hiş sîm
Sîmab ji xecalet ma ji îxrac (29/8)

Pur xecilîn sîm û zer xeyrê li terhên di terr
Belg û wereq tac û ser zulfê li ser bûne gerr (50/5)

Sîm û ava sîmê, ji bo neqişandinê û biriqandinê têne bikaranîn. ‘Aşiq, ji yarê dixwaze ku neqşên rindiya xwe bi ava sîmê nîşan bide. Sîm, rengê bedena saqî û rengê rûyê yarê ye û ew weke sîmê dibiriqin. Ev reng, îşaretê bi saf û paqijiya wan dike.

Saqiyê sîm saqî ra jehrê helahil ku bidet
Canê me şukr û minnet tîz rewan qelb e ferz229 (56/5)

Bi sîmavê bi zêravê tu rojê neqşikê bavê
Ku da Erjeng ji wê navê li ber rojê nebit perde (92/16)

Me ji ayetê kubra ku bi tuxra we keşandî
Î'rab bi zêrabî keşandî û reşandî
Sîma ji sîma bi xwe spêde reşandî
Îlan ve weşandî bi 'ebîrî veweşandî (130/12)

### 2.5.10.6. Feyrûze

Feyrûze, kevirekî giranbiha yê rengesmanî ye. Cil û bergên mehbûbê weke rengê vê me'denê esmanî ne. Mehbûb, ji 'alemeke qudsî hatiye û ji ber vê yekê jî feyrûzelibas li ber in. Di navbera rûyê yarê û esmanan de têkiliyek heye. Li ser herduyan jî heyv tê xwûyakirin. Mahê nû, birûyên yarê ne û 'aşiq wan li ser wechê dilberê dibîne.

Şahidê cilwenuma qudsiyê feyrûzelibas
Her ji rengê te nîşan dit tu Nîşanê xwe binas (51/1)

Bi hemdillah bi feyrûzî li wechê dilberê min dî
Ku mahê new nîşan min dan ji taqê asiman ebrû (108/4)

### 2.5.10.7. Durr, Durdane û Lu'lu'

Durr, ew kevirê giranbaha yê spî û birqdar e ku ji behrê tê derxistin. Durr, wek unsûrekî teşbîhê, ji bo yarê, ruhî, hêstirên 'aşiqî û şi'rê hatiye bikaranîn. Durr, wek ravekên "durrê yetîm, durrê nasufte, hewza durr, dêmdurr, durra hikmetê, lu'lu'ê mensûrî", di helbestan de cih girtiye.

Yar; bi nazik, delalî, biriqîn û cazîbeya xwe ve weke heba durrê ye û wek durrdaneyê tê wesifandin. Yar, ji nurek munezzeh e û ji ber vê yekê weke durrên giranbiha û hêja ye.

Durdaneyên xawermîsal ayîneyên tê da şemal
Nûrek munezzeh ew cemal mey kir di nêva şuşe da (9/77)

Bêj ew şîrîna surperî durdaneya ez muşterî
Kan 'ehd û peymana berî bê fayde çûn şubhê heba (11/7)

Durdaneya dêmgewher e ayîneya Eskender e
Bêmirwetan dil kir ker e mecrûhê xalan î Mela (12/7)

Durdaneya gerdenbilur reyhan li ser werdên di cur
Hey hey bi mestî têne dur xala li nik ferqê bi tac (31/7)

Kewkebê subh esti ya xurşîdi ya durrê yetîm
Ya tenê sîmên ber est ya gewherê wala sti în (83/3)

Durr, ji bo hêstirên 'aşiqî wek teşbîhî hatiye bikaranîn. Her yek dilopeke hêstirên çavên 'aşiqî yên ji bo yarê rêhtî, weke durran giranbiha ne. Pêwist e 'aşiq wan hêstirên durrî ji bo mehbûbên mecazî nebarîne, lewra ew bêfeyde ye û berhewa diçe.

Me hadir secdeya şukrê li wî ‘erdê muqeddes kir
Bi mujganên xwe durr sifet in enî malî li ‘erdê da (5/35)

Min ev mîsal lew bo te best zoran bi zulfan dil vebest
Her çi te dî sûretperest durrê yetîm bêfeyde da (9/41)

Qedeha ku yar pêşkêşî ‘aşiqî dike, wek rengê durrê ye û birq jê dibarin.

Da me bi destî surrê cama ji rengê durrê
Cezbe giha can û dil pur şewişandin hema (8/8)

Durr, wek îstî’areyî di wateya ruhî de hatiye bikaranîn. Xwûda ji ruhê xwe puf kiriye ruhê însên û ew xistiye qefesa bedenê. Çiraya ruhî bi vî awayî hil bûye û geş bûye.

Avête durdana xwe dur îsand ji misbaha xwe sur
Dolabê necmê nehs û kur mihra sitêra Se'de da (9/107)

Bi reng û nirxê xwe ve dilber weke durrê ye û ew durreke bijare û giranbaha ye. Unsûrên spehîtayiyên wê jî durr in û ew dêmdurr e. Li ser guliyên yarê yên sor, nîşanên wê, weke xunava dilopa durrê xwûya dike. Nîşanên rûyê wê li derdora hewza sûretê wê weke durran cih girtine. Yar, xweyî gelek hêjayan e ku weke durran in. Hetta ‘aşiq di rêya wê de canê xwe feda neke, ew nagehije wan durrên bijare û giranbiha û wuslata wî bi cih nayê. ‘Aşiq vê yekê dizane û wî jî ser daniye rêya yarê.

Neyşeker û dêmdurrê da me bi destê surrê
Cam û qedeh şibeh av lew me rewan tên xezel (73/9)

Yarê me pur nîşan û sur sîma ji dur dêm kewkeb e
Ew lebşeker nazikbeşer cebhetseher kagulşeb e (100/1)

Sebzeyan şebnem gulav lê sor'eqîqan durr xûnav lê
Dilberê seyran û rav lê 'er'eran sîtabe daye (96/10)

Dev û didanên yarê bi huqqeya durdaneyê re hatiye wekandin. Didanên yarê, bi rengê xwe ve weke heba durrê spî û birqdar in.

Lew ku pur şefqe didêrit kerem û lutf û kemal
Ah ji dest remz û surên wê durr û gewherxeberê (126/12)

Neyşekkera ji rengê durr nêrgiza bi remz û sûrr
Ser kemmilîn du mar di hûrr pê dikûjit Melayekî (128/5)

Mîmi ya yaqûti ya serçeşmeyê abê heyat
Huqqeya durdaneyê ya le'lê şekkerxa sti în (83/7)

Nêrgiza mest û şîrîn û gul û nesrîn e ji reng
Şekerê lu'lu'ê mensûr biden ahen û seng (121/4)

Şa'ir, helbestên xwe bi durrê re diwekine. Ew bi wan durran di milkê 'eşq û şi'rê de bûye xaqan. Kes nikare weke helbestên wî binivîse. Di teqlîdê de ancax helbestên xav û negihayî (durrê nasufte) derdikevine meydanê. Durrên nasufte, ji devê hostayê hunerbazî, bi rewanbexşiya Xaliq, bi iksîra 'eşqê ji lêvên le'lî derdikevin û hêja û qiymetdar dibin. Durr, ji Behreynê dertên û helbestên weke durran jî li nik şa'irî peyda dibin. Şa'ir, weke xewwasekî dixebite û ji behra 'ilmê mijarên kûr û hêjayî derdixe. Gotinên bi hikmet jî, weke durran in û bi rengê gotinê nayêne beyankirin. Ew bi usûleke veşartî û sembolîk têne îfadekirin.

Pur le'l û dur te j'kilkê 'işq anîne nezma silkê 'işq
Der berr û behr û mulkê 'işq me'lûm e xaqan î Mela (12/13)

Durrê nasufte dibêjim ji lebê le'lê di Melê
Ger rewanbexş nebit nezmê kerê lalî çi hez (62/8)

Mela billah di vî dewrî bi vî rengî bi vî tewrî
Nîşan da wek Nîşanî kes me durr anîn ji Behreyn (89/6)

Di xetma sewt û herfê da ji musîqî xeber nayê
Di kelam û nehw û serfê da beyan nabî bi inşayê
Durra hikmet di nutfê da bi hey'et guhtinê nayê (131/35)

Helbestên Mela, di nezmê de, lu'lu'ên mensûrî ne û weke moriyên mirarî belavî nava gel bûne. Kî bixwaze helbestên belîx yên weke durran bibîne û bixwîne, êdî ne hewce ye berê xwe bidin helbestên Hafizê Şîrazî, bila yên Cizîrî bixwîne û ew besî wan e.

Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şi'rê Melê bîn te bi Şîrazî çi hacet (21/12)

Lu'luyên mensûrî yên derbarê medh û senayên memdûhî de hatine beyankirin, ji qelbê şa'irî dertên. Di navbera behra pur lu'lu û dilê şa'irî de têkiliyek hatiye çêkirin. Ji aliyê kûrahî û bereketê ve herdu jî dişibine hev. Gotinên yarê yên şirîn jî, weke lu'luan hêja û giranbiha ne.

Her di medhê te'w senayê sîne û qelbê Melê
Bê tefawut qulzuma pur lu'luwê mensûri bî (117/22)

Bi remz û guft û surran nebatê ew dirêjin
'Işweyên le'l û durran lu'lû şeker bihêjin

Xedengên di awirran aşiqan dibirêjin (132/28)

### 2.5.10.8. Mercan

Mercan, bi rengê xwe yê sor ve bûye mijar û bi îstî'areyî hêstirên yarê sembolîze dike. Çav dema zêde bigirîn, hêstêr êdî bi rengekî sor derdikevin. 'Aşiq jî, ji ber firqetê zêde giriyaye û hêstirên wî weke morîyên sor ên ji mercanê hatî çêkirin, bi rengê xwînê dibarin. Hêstirên weke xwînê 'elameta korbûnê ne. Dermanê wan çavan, dîtina yarê ye; dema 'aşiq wê bibîne dîderewşen dibe, ronahî li çavên wî peyda dibe.

Suftiyên pur le'l û mercanan bi mujganan heta
Dîde rewşenbûn bi dîna dêmdurra sîmînxebeb (15/9)

### 2.5.10.9. Sedef

Sedef, qalikê îstîrîdyeyê yê hişk û şeffaf e. Mercan di nav wê de çêdibe. Ji ber saxlembûn û şeffafbûna wê, qedeh û qotiyên mucewheran ji wê têne çêkirin. Sedef, bi fincanê û bi camê re wek ravekekê hatiye bikaranîn. Di daketina 'eşq û hubbê ya dilî de, wek teşbîheke muşexxes, bi rêhtina meyê ya fincana sedefê hatiye bikaranîn. Hubb û evîn sebeba hebûnê û afirandinê ne, ji ber vê yekê qiymetdar e û cihê lê tê muhafezekirin (qelb) jî, weke sedefa giranbiha û hêja ye.

Mey hate fincana sedef kes dê vexut îro bi xef
Saqî bi çeng û nay û def ferfûrîya mehtabi da (2/11)

Îro li 'umrê xwo'y telef bê şahid û cama sedef
Bê çeng û saz û nay û def zanim peşîman î Mela (12/10)

Ji jeng û zerqê dil da bişoyin
Cama sedef bîn rendo keramet (25/3)

Îro ji şehkasa surrê mey hate ficana sedef
Minnet ku iro dêmdûrrê da min meya husna xwe xef (64/1)

Sedef, wek îstî'areyî 'alem e û Hz. Muhemmed jî durra di nav de ye. Ew di nav wê sedefê de durrekî yekta ye. Însan jî bi eslê xwe ve heyînekî nasûtî ye, ruhê wî ji 'alema lahûtî ye, ji ber vê yekê ew di vê 'alemê de weke gewhera di nav sedefê de ye. Tiştên giranbiha û qiymetdar di nav muhafezeyên hêja de têne parastin. Şa'ir, ew qas têkiliyê dide dostaniyê, selama xwe jî di nav qotiya sedefê virê dike.

Xeyrî te nehin der sedefê behrê wicûdê
Lew lazim e em qesdê bikin rahê Medîne (101/6)

Însan bi min nasût e gewher di nêv sedefê
J'alema ceberût e şems e hatî şerefê
Tenezzul ji lahût e mehbûb e cam di kefê (132/38)

Selama min heqîrê sedefek divê tê kin
Îroke li Cezîrê heqq e ku li Melê kin
Helakên ji derba tîrê derman heye lê kin (132/1)

**2.5.10.10. ‘Eqîq**

‘Eqîq, kevirekî rengsor û qiymetdar e û ji ber reng û hêjayê ve bûye mijar. Fincan û qedehên badeyê bi wê maddeyê têne çêkirin. Rengê ‘eqîq û badeyê sor in û bi vî awayî ew hev bi bîr tînin. Di vê hengamê de ‘aşiq dixwaze yar bi tiliyên xwe yên bi hineyê sorkirî (serenguştê ‘eqîqî) ku wek ‘eqîqê xwuya dikin, di şehkaseyê de şerabê pêşkêşî wî bike.

Nazika min di semayê bi ser enguştê ‘eqîq
Da me îro di semayê qedehek taze rehîq (66/1)

Meşha seher yarê şefîq da min bi enguştên ‘eqîq
Ji badeya nûrînrehîq mexmûrê xemra pê xiş în (79/15)

Xwûna ji dilê ‘aşiqî diherike wek teşbîhî bi rengê ‘eqîqê re hatiye beyankirin. Mehbûb, bi herdu tîrên xwe li cegera ‘aşiqî dide û xwîn ji cegerê diherike. Ew sorbûna tiliyên wê, ji ber wê xwînê ye.

Xwûn ji dil co co rewan tên wek ‘eqîq û erxewan tên
Lê ji ber destê selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox (36/3)

Tîr û rim herdu li dil dan li ceger çîpan kir
Ew ji xwûna min e riştî tilîyên sohr û ‘eqîq (66/8)

‘Eqîq, wek tiştên giranbiha yên weke xişr, gewher û mirariyan di durcan de têne parastin û pêwîst e qotiya parastinê jî weke wan amûrên ji xemla hêja be. ‘Eqîq, bi rengê xwe ve wek îstî’areyî temsiliyeta lêvên yarê dike. Durca xişr û xemlan jî ji ‘eqîqê hatiye çêkirin. Durca ‘eqîqê, dev û lêvên yarê ne û di nav de mercan û mirarî hene (didan).

Ji guher xunçe guşayê digirit durcê 'eqiq
Bi şeker xende zenî ger bigirît şekkerê teng (71/14)

### 2.5.10.11. Yaqût

Yaqût, kevirekî sor û giranbaha ye. Ji ber reng û nirxê xwe bûye mijar. Yaqûtîfiroş, gelemperî navê bazirganê eşyayê neqş û xemlan e. Yaqût, ji bo xemla yarê hatiye bikaranîn. Dev û lêvên yarê bi didanên wê ve huqqeya yaqûtî ye. Xetên sor yên li ser rûyê wê bi rengê xwe ve ji yaqûtê sortir in û hêjaya yaqûtê li ber wan daketiye. Lêvên yarê weke du xetan hatine kêşandin li ser rûyê wê û weke yaqûtê şeffaf in û ji wê jî sortir in. Di navbera xwînê û rengê yaqûtê de jî têkiliyek heye. Yarê, bi peykanan ‘aşiq birîndar kiriye û dest û tiliyên xwe li xwîna wî daye. Lewra ew tiliyên wê weke yaqûtê sor xwûya dikin. Meya ku di qedehê de ji ‘aşiqî re bête pêşkêşkirin, ji yaqûtê hatiye çêkirin û hem rengê qedehê, hem jî şeraba tê de û lêvên yarê sor in û ew hemû wek kompozîsyonekê di şi’rê de tenasûbê bi kar tînin.

Yaqûtî-firoşan di kef elmasi şikestin
Ev sefheyê elmasê ku neqqaşê qelem da (1/8)

Şîrê elmasî kişînit tu ji lami‘ da xeber
Vekirit huqqeyê yaqûtî ji gewher meke behs (27/13)

Neqşê elmasî li elmasî binê girtiye herf
Xetê yaqûtî li yaqûti şikênandiye çerx (37/3)

Şûncihê peykan û neslê j'tillîyên yaqût û feslê
Er nekî derman bi weslê j'derb û tîr û gezme ye (97/36)

Ku kêşa katibê xeybê xetê reyhan li kafûrê
Çi ayet bû ji "la reyb"ê reşandî zulmet û nûrê
Di yaqûta me dê mey bê ji destê wê sifethûrê (131/9)

### 2.5.11. Bêhnên Xweş/Melzemeyên Kozmetîk

### 2.5.11.1. Kafûr

Kafûr dareke ji malbata darçînan e, kulîlkên wê spî ne.[514] Ev dar ji ber reng, şeffafî û bêhnê ve bûye mijar. Şa’ir, safbûn û paqijbûna xwe diwekîne kafûrê. Rû û bedena wî jî weke kafûrê spî ye. Katibê xeybê li ser rûyê yarê yê weke kafûrê spî, xeteke zîba kêşa ye. Kafûr ji xeyrî rengê xwe bi bêhna xwe ve jî hatiye bikaranîn. Dil dema ji ber ‘eşqê bişewite bêhna kafûrê jê tê.

‘Eynê kafûr e bi meşreb me ji husna te ye saf
Lew ji ‘işqa te di dil da me vebû ‘ilmê ‘ubab (13/3)

[514] Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., (dipnot), r. 114.

Hûrîweş e şirînmeş e kagulreş e xalhebeş e
Xalên di qer miskê Teter nazikbeşer kafûri bû (107/2)

Ku kêşa katibê xeybê xetê reyhan li kafûrê
Çi ayet bû ji "la reyb"ê reşandî zulmet û nûrê
Di yaqûta me dê mey bê ji destê wê sifethûrê (131/9)

Suhbet ku kamil bo bi rê carek bi cayê ‘enberê
Qelbê me bavê mecmerê xweş‘enber û kafûr e dil (74/9)

Di navbera kafûr û spîleka çavî de têkiliyek heye. Di çavî de spîlek û reşahî hene û bi têkiliya zulmet û nûrê û kufr û îmanê tê bikaranîn. Spîleka çavî weke kafûrê saf û spî ye.

Du talançî di meşhûr tê ji me'den 'eynê kafûr tê
Di têkil zulmet û nûr î me kufrê dî di îmanê (111/14)

#### 2.5.11.2. Misk, Muşk, Nafe, Zebad/Zubad

Misk (nafe), di navika xezalê de çêdibe, dikeve erdê û bi vî awayî tê bidestxistin. Ev madde bi bêhn û rengê xwe ve bûye mijar. Cihê ku mîsk lê tê bidestxistin, welatên weke Teter û Xeten hatine beyankirin. Di navbera por, xal û birûyên yarê û mîskê de têkiliyek tê lidarxistin. Bêhna yarê weke miskê ye û bi hemû unsûrên xwe yên spehîtayiyê ve ew xweyî bêhna herî xweş e.

Ji aliyê bêhnxweşiyê ve, pora yarê weke miskê ye û wê miskê bi ser gulrûyê xwe berdide. Li ber bêhna pora yarê bêhna misk û nafeya teterî ne tiştek e. Aşiq ji yarê dixwaze ku bêhna miskê li ser cilên xwe bireşîne.

Silsila behsê ji xûna dil birin zulfa biçîn
Dê xeta bit nafe misk er nafeyê Tatarî bit (19/5)

Qiştên di xwe çîn çîn bide ber misk û zebadê
Tayên di 'îsabê bireşînin bi gulabê (112/3)

Gulên her miskê ezfer lê 'ebîr û 'enbera ter lê
Semaya sosinan her lê bi zulfan mat û mawer da (92/7)

Xemrî di reş in miska herîr û bûn li dor bedra munîr
Her ca ku hakim lê du mîr merd în li textê kişwerê (113/11)

Sunbulên ter ya binefş ya sosin û gulçîçek in
Zulfi ya muşkê Xuten ya sûretê tuxra sti în (83/5)

Dilê ‘aşiqî ji ber derbên xencerên yarê, birîndar e û xwîna sohr jê tê. Di vê hengamê de bêhna nefesa wî weke misk û mawerdê ye, lewra ew ji ber davên sunbulên yarê birîndar bûye.

Bi derbên xenceran kuştîn bi xûna sohr lê miştîn
Di çîna sunbulên qiştîn me dil pur misk û mawerd e (92/6)

Misk, wek dilopeke ava reş e û bi reng û bêhna xwe ve wek îstî’areyî di cihê xala yarê de tê bikaranîn.

'Eqreb nehin ew sunbul in bu'enber û dava dilîn
Nîşan ji misk û filfilîn wan sineyê min kir hedef (64/4)

Miskê reşandî ez dibêm wan nuqteyan hin bûne kêm
Lê xettê reyhani li dêm katib ji nû i'rabi da (2/7)

Bêhna yarê jî weke ya misk û zubadê ye. Dema ew dimeşe, bêhna miskê jê diweşe. Hemû çîçek bêhnên xwe pêşkêşî yarê dikin da ku yar li rûyê xwe yê weke heyvê bide. Destê qudretê cebhet û dêma yarê neqişandiye û misk û zebad li ser reşandiye ku bêhneke xweş bide. Dema yar xwe bixemilîne, ‘aşiq ji wê dixwaze ku bêhna miskê li ser cilên xwe reşîne. Di hişmendiya ‘aşiqî de gul bêhna xwe ji yarê hildigirin, lewra yar li ser gulan bêhna xwe direşîne. Axa pêyên yarê, destên wê yên spî bêhnmisk in. Bi wê bêhnê, yar destê xwe bide birîna ‘aşiqî û mesh bike, dê ew sax bibe.

Nefesa te ji enber e zebad û misk dirêjin
Çi şaxê neyşekker e nebat û qend dirêjin
Nutqa te xwe gewher e sed bar gewher dirêjin (132/46)

Xetê yaqutî du nûn mektûb ji mîskê ezferend
Ya hilal’ul 'îdi ya ebrûyê bêhemta sti în (83/8)

Zulfa siyeh ‘enber bike xemlê ji zêrê zer bike
Zerbav û dîban ber bike misk û gulavê lê reşîn (79/12)

Li ber rojê nebit xêlî dibêjim qameta 'êlî
Qedîf û serkeşê têlî zubad û misk û 'enber da (92/15)

#### 2.5.11.3. ‘Enber

‘Enber, di edebiyatê de ji bo bêhnên xweş wek muşebbehun bîh (yê tê şibandin) tê bikaranîn. Caran jî bi rengê nêzikî reş ji bo şeb û zulfa me’şûqê wek kînayewî tê

‘emilandin.[515] Nefesa me’şûqê, xal, por, birh, axa lingê yarê bi ‘enberê re tê şibandin. Bêhna yarê her daîm weke misk û ‘enberê ye û xal û xetên wê jî ‘enberfeşan in.

Yarê, li ser gerdena xwe ‘enber werkiriye. Bêhna yarê û cil û bergên yarê weke ‘enberê xweşbêhn in. Nefesa yarê jî ku îşareta nêzikahî û wuslatê dike, weke ‘enberê xweş e.

Hin gulê bû‘enber in hin di şirîn esmer in
Hin guherê dane yin mislî Suheylê sema (8/2)

Bayê şemal belavkirî me’şûq ji ber windakirî
Gerden bi ‘enber werkirî ‘aşiq dibê lê purr belav (65/2)

Nefesa te ji ‘enber e zebad û misk dirêjin
Çi şaxê neyşekker e nebat û qend dirêjin
Nutqa te xwe gewher e sed bar gewher dirêjin (132/46)

Zulfa û keziyên yarê weke ‘enberê reş in û ew zulf ‘alemê wêran dikin. Dema behsa zulfa yarê tê kirin bêhna ‘enberê tê bîr û êdî ne hewce ye ku behsa ‘enberê bête kirin.

‘Alemê wêran diken zulfên ji rengê ‘enberê
Çerx û perwazê didin carek li bayê rast û çep (17/4)

Namê ‘enberşikenê bêt ji ‘enber meke behs
Bil ji wê silsileyê zulfê mu‘enber meke behs (27/1)

Du zulfê 'enber'efşan in du le'lê şekkerestan in
Du çeşmê sihrê fettan in dilê min wan xedeng danê (111/16)

Xalên yarê wek noqte û bi rengê xwe ve dişibine ‘enberê. Rûyê yarê weke lewheyeke sîmî ye û li ser wê jî misk û xetên ‘enberîn hene. Ev rewş, xusûsiyetên spehîtahiya yarê nîşan dide.

Kifş e me‘na kî li lewhê sîmi dî
Nuqteyê misk û xetê ‘enber ‘ebes (26/10)

Husna munezzeh bênîşan wê lê nivîsî zerkeşan
Xal û xetên 'enberfeşan herkes bi wan dil yexme da (9/28)

Dil, ji ‘eşqa me’şûqê bişewite, ji wê sohtinê, ji dil bêhna ‘enberê tê.
Suhbet ku kamil bo bi rê carek bi cayê ‘enberê
Qelbê me bavê mecmerê xweş‘enber û kafûr e dil (74/9)

---

515 Muhemmed Şerifi, “enber”, *Ferhengê Edebiyata Farisî,* c. 2, Întîşaratê Mu’în, Tehran 1387, r. 1041.

Birûyên yarê weke ‘enberê reş in û bêhna wan jî xweş tê.

Kuştim bi qewsê ‘enber e şoxê ji dil mil dan ber e
Êxiste dil sed pencere ev renge em mihnetkeş în (79/18)

Axa li ber lingên qencan weke ênberê ye.

Di meydana şîrînxencan biçerxin mislê şetrencan
Turaba ber piyê qencan zubad û 'enberîn gerd e (92/18)

**2.5.11.4. Gulav/Gulab/Mawerd**

Gul, hem bi rengê xwe hem jî bi bêhna xwe ve bûye mijar. Ew bi spehîtî û rengê xwe ve temsîliyeta mehbûbê dike. Tiştê têkiliya yarê pê re heye li bal aşiqî meqbûl e. Cam û qedeha ku yar pêşkêşî ‘aşiqî dike bi bêhna xwe ve weke gulavê ye, lewra şeraba tê de weke gulavê bêhnxweş e. Her çendê di nêv de zehra helahîl hebe jî, ‘aşiq wê weke tiştekî meqbûl pêşwazî dike. Musebbîbê birînên/cerhên ‘aşiqî yar e û ew birîn dîsa bi dîtin û destên wê têne kewandin û dermankirin. Birîna bi destê wê bête dermankirin, ew birîn weke gulê bêhneke xweş li derdora xwe belav dike. Unsûrên yarê yên spehitahiyê weke gulavê bêhnxweş in. Zulfên wê yên reş têne ‘enberkirin û cil û bergên wê jî bi bêhna gulê têne avkirin. Aşiq ji yarê dixwaze ew li ser cil û bergên xwe yên weke qewsûquzehê rengîn, ji serî heta piyan gulavê lê bike.

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

Zulfa siyeh ‘enber bike xemlê ji zêrê zer bike
Zerbav û dîban ber bike misk û gulavê lê reşîn (79/12)

Qiştên di xwe çîn çîn bide ber misk û zebadê
Tayên di 'îsabê bireşînin bi gulabê (112/3)

Pur bi wan cerhan xweş im lew ku wê derman dikir
Şerbet û ava heyatê şekker û qend û gulab (16/3)

Şerbeta zehrê helahîl ku hebibê me b’det
Bi gulab û şeker û qend û nebatê nadim (75/7)

Kesk û sorên ji rengê qewsûquzeh
Ji serapa gulav û mawer ke (98/3)

Dêmên yarê weke gulên sor in û xunava/xwûha li ser wan dêman weke ava gulê bêhn dide. Dêmên yarê gulên sor in û di seherê de xunav/şebnem lê digirin. Xunav (xwêdana dilberê) jî bêhna xwe ji dêmgulên sor hildide. Xunavên li ser rûyê yarê ter û

tazetiya wê nîşan didin. Di sehera subê de (xortanî gencînahî) xunavgirtina gulê tazebûn û ciwaniya mehbûbê îşaret dike. Gulab, wek teşbîhî bêhna yarê ye û xunav jî wek îstî'areyî temsîliyeta xwêdana li ser dêmên wê dîke ku ew jî 'elemetên xweşikî û ciwanîyê ne.

Li gulên te'y ter û nazik ku seher girtî xunav
Di ebarîq û qinînan ji hesed sohtî gulab (13/2)

Werdan gulav girtin xunav lê min bi nav sohtin hinav
Cerg û hinav zulfên belav lê bûne dav bend kir bi nav (67/2)

Çîçekên qewsûqezehreng hezar rengi sema ye
Sunbulan girt xunav e li gulan taze gulab e (94/14)

Li gulan misk û 'enberê bireşîn
Ji gulabê cinesriyan ter ke (98/2)

Sîmînbera neyşekerê ew horiya nisbet perê
Bejna ji nûr dêmîzerê tîr bû ji gulab û mawerê (113/23)

"Ma", bi 'erebî av e û "werd" jî gul e. Mawerd tê wateya ava gulê (gulab). Mawerd, wek îstî'areyî hem ji bo bêhna pora yarê hem jî ji bo bêhna xwêdana wê tê bikaranîn. Unsûrên spehîtahiyên yarê weke qewsûquzehê rengîn in û ji wan hemû unsûran (zulf, birû, dêm, dest û tilî) bêhna mawerdê tê.

Biskên ji herîrê şeke bavê xem û tabê
Zulfên ji 'ebîrê tu ji nû mawerê lê ke (112/2)

Xalên mudewwer filfilîn mawer ji biskan lê werîn
Zulfên perîşan têne mest bihna biha wan e xerez (58/8)

Mawer ke terh û bişkuwan cîran û berg û lu'luwan
Lew 'er'er û selwa ciwan şetrî bi mestî lê xweşîn (79/13)

### 2.5.11.5. 'Ebîr

'Ebîr, bêhna xweş ya têkel e.[516] Her unsûreke yarê ya spehîtahiyê bêhneke xweş ya cuda dide û ew bêhn jî di nav xwe de bi tevahî bêhneke çeşnî jî didin û ji wê bêhna tevlîhev re jî 'ebîr tê gotin. Dêm û zulfa yarê bi bêhna 'ebîrê ve namdar in. Bêhna 'ebîrê ji bo mehbûb û memdûhî nî'metên giranbiha ne. Şa'ir dixwaze selamên ku ji

[516] Melayê Cizîrî, Dîwan, (ferheng), r. 374.

memdûhî re virêkirî bibe ‘ebîrefşan û di her seherê de ji sultên re bêhnên xweş pêşkêş bike.

Dêm nedirê bû ‘ebîrê xemrî û gîs û herirê
Sîne kir amancê tirê dil ji min bir dil ji min (82/4)

Gulên her miskê ezfer lê 'ebîr û 'enbera ter lê
Semaya sosinan her lê bi zulfan mat û mawer da (92/7)

Biskên ji herîrê şeke bavê xem û tabê
Zulfên ji 'ebîrê tu ji nû mawerê lê ke (112/2)

Selama min senaxwanî sehergeh gewher'efşan bit
Bi xizmet 'erdê sultanî 'ebîr û 'enber'efşan bit
Bi sûret emrê Subhanî ser elqabê zer'efşan bit (131/1)

**2.5.12. Tiştên Xwarinê**

**2.5.12.1. Şeker, Qend, Neyşeker**

Şeker û qend, bi gelemperî ji bo lêva yarê û ji bo wesfên gotina wê tên bikaranîn. Gotinên yarê weke şekirên şirîn û xweş in. Şeker, bi gelemperî wek teşbîhî ji bo tiştên xweş tê bikaranîn. Şi’ra şa’irî ji weke şekirê xweş û şirîn e. Gotinên yarê ji şekirî jî şirîntir in. Dema ew bipeyive, ji ber şirînahiya gotinên wê, êdî hukmê qend û şekirî namîne. Zehra helahîla ji destê mehbûbê, ji şeker û qendî şirîntir e.

Mestane govendê dikin reqsê li dor findê dikin
Qesta şekerxendê dikin le'lan ji gewher xende da (9/119)

Şi'ra te sihrrîz e şeker bi mu'cîz
Zanim ji lebê le'lê te ev lefz û eda girt (20/19)

Veke lêvê û ji nêvê biwerîn qend û nebat
Ji lebê le‘lêşekerbêj û ji şekker meke behs (27/2)

Şerbeta zehrê helahîl ku hebibê me b’det
Bi gulab û şeker û qend û nebatê nadim (75/7)

Yarê me pur nîşan û sur sîma ji dur dêm kewkeb e
Ew lebşeker nazikbeşer cebhetseher kagulşeb e (100/1)

Neyşeker (qamişa şekerîn), bi gelemperî bi ziravî û dirêjahiyê ve, ji bo bejna yarê ya lihevhatî, wek îstî’areyî û teşbîhî tê bikaranîn.

Neyşekera gerden ji ‘ac dîsa ji reştûzên Semed
Qewsê li bala ferq û tac keybir reşandin bê ‘eded (40/1)

Neyşekerên şirînzeban mest û bi cama û bade yîn
Ferz tibit ji tewbeyê salikê ‘işqê tewbe ferz (56/4)

Qend, ew şekir e ku ji nebata qamişê çêdibe. Qend, wek îstî’areyî, temsîliyeta gotinên yarê yên xweş û şekkirîn dike.

Veke lêvê û ji nêvê biwerîn qend û nebat
Ji lebê le‘lêşekerbêj û ji şekker meke behs (27/2)

Nefesa te ji enber e zebad û misk dirêjin
Çi şaxê neyşekker e nebat û qend dirêjin
Nutqa te xwe gewher e sed bar gewher dirêjin (132/46)

**2.5.12.2. Şehd/Esel (Hingîv)**

Şehd/esel, ji ber te’m, şîfa û panzehîrê bûye mijar. Tiştê zehîr be jî, eger bi destê yarê ji ‘aşiqî re bête pêşkêşkirin, ew jê re dibe panzehîr û şîfa.

Ger ji destê te’y mubarek zehrîyê qatil vexwum ez
Vê limin şehd û êsel bit şekeramîz û xoşab (13/8)

**2.5.12.3. Engûr**

Engûr, ûşiyê tirî ye. Şeraba sor, ji wî tê çêkirin. Di navbera badeya/cama engûrî û lêvên yarê de têkiliyek heye û herdu jî bi rengê xwe ve sor in, lêbelê soratiya badeya engûrî li ber lêvên yarê di kêmasiyekî de ye û ji vê yekê şerm û fedî dike. Di navbera badeya engûrî, lebêle’l û Sesebîlê de hem tenasûbek hatiye çêkirin hem jî bi xusûsiyetên hevpar ve hatine danberhevkirin. Di navbera lêvên yarê yên heyatbexş û çemê beheştê Sesebîlê de jî têkiliyek heye. Yê ji wan vexwe, êdî têhnî nabe. Ewê ferqa di navbera badeya engûrî û Selsebîlê de bizane, gelo mumkin e ku wan weke hev bihesibîne?

Lew ji lebê le‘lê te bû cam xecil
Badeyê engûr kuca selsebîl (72/3)

Meya engûrî, wek îstî’areyî, temsîliyeta ‘eşq û ‘işweyên yarê dike. Tiştê ku ‘aşiqî ji hişê wî dibe, coş û xuroş dike ancax ‘işweyên mehbûbê ne. Tesîr û hişbirina meya engûrî, li ber ‘işweya yarê ne tiştek e.

Da min suroş wer mey binoş weqtê xuroş ez çûm ji hoş
Ji ‘işweya yarê bû xweya ew ne ji meya engûri bû (107/8)

Hindekî roj û şev in têk 'eyd û Leyletu’l-Qedr
Cam medam pur bade bî lê ne j'meya engûri bî (117/14)

#### 2.5.12.4. Bih

Bih, bi rengê xwe yê zer ve bûye mijar. Rûyê zerbûyî bi teşbîha bihê tê bikaranîn. Hem rûyê ‘aşiqî hem jî yê me’şûqî bi teşbîha bihê hatiye wesifandin. Zulfa yarê ji bo ku nîşanên yarê yên weke reng û bêhna filfilê bêhh bike, têne ziyareta wan. Mûyên li ser dêm û rûyê yarê jî weke bihê zerik in û bêhna wan jî zulfê ber bi xwe ve dikêşe.

Xalên mudewwer filfilîn mawer ji biskan lê werîn
Zulfên perîşan têne mest bihna biha wan e xerez (58/8)
Aşiqên leb û lêvan şabaş e ji Xwedê ra
Selwa û bih û sêvan belçîm ji zîv û zêra
Heram in xewêd şêvan li kesê muhbet vê ra (132/29)

Ji derdê ‘eşqê û firqetê rengê ‘aşiqî zer dibe û ev jî nîşana nexweşiya derdê ‘eşqê ye. ‘Aşiq ji ber ku ji yara xwe dûr ketiye rûyê wî weke bihê zer bûye. Weke bihê rengezerbûyîn wek ‘elametê nexweşiya ‘eşq û firqetê hatiye beyankirin.

Dûr im ji gulê b'xunav lew zerê şubhet bih im
Sosina ‘ereq ji gulav d'firqetê dibijihim
Ji mihrdaran tevav tu hetav î ez sih im (132/48)

Birîndarê 'işqê me dûr im ji siha bihan
D’zanin meddahê kê me d'hezar û yek û sihan
Senaxwanê Melê me li hemû ‘erd û cihan (132/49)

#### 2.5.12.5. Sêv

Sêv, wek îstî’areyî temsîliyeta rûyê sor ê yarê dike. Bikaranîna sêvê bi nesîmê re îşaretê bi tezewwûqa tecelliyan dike. ‘Aşiq, di heps û zindana firaqê de maye. Bi tecelliyan, deriyên meqamên bilind jê re vedibin û ‘aşiq ber bi meqama ruhî ve bilind dibe.[517]

Nesîmê sunbul û sêvan seher da hebs û zindanê
Vebû qufla me bêmifte ziringînê li quflê da (5/24)

Şekker di nêv lêvan e wê reyhan li dor sêvan e wê
Meş'el di nêv şêvan e wê tîsî ji rengê fenerê (113/7)

Sêv, dareke beheştî ye û wek telmîhî îşaretê bi dûrketina Adem Pêxemberî ya ji beheştê dike. Tê rîwayetkirin ku Adem Pêxember ji wê darê sêv xwariye û ji beheştê hatiye dûrxistin, lewra ew ji xwarina wê sêvê hatibû meni’kirin.

[517] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 135-136.

Me j’bexçeya yarê çînî bêpurs yek sêvek tenê
Fe bima ceneytu ceneytî elqet ‘eleyye cînayeta (7/6)

**2.5.12.6. Genim**

Genim, ji ber rengê xwe bûye mijar. Ev rengê dilberê ye. Şa’ir, dilberên genimreng û durdaneyan muqayese dike û tercîha xwe bi ser ya durdaneyê ve dibe. Ev wateya zahirî ya vê beytê ye. Wateya wê ya batinî jî ev e ku esliyeta me’nayê îfade dike: “Eger li huzûr û meclisa zikrê, me’nayên ciwan û taze di dilê zakir de tecellî bibin, hewce nîne ku zakir li peyvên ter û nazik bigere da ku gotinên xwe pê bixemilîne.”[518]

Zeriyên şubhet durdane ku bin şahidê bezmê
Ji genimreng û siyehçerde û esmer meke behs (27/4)

**2.5.13. Tiştên Vexwarinê û Maddeyên Keyfdanê**

**2.5.13.1. Beng (Esrar)**

Beng, maddeyek e û bi kêşana bêhna wê serxweşî pê çêdibe. Ev têgeh di helbestê de wek têgeheke kevneşopî ya edebiyata klasîk hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, ne ji meyê ne jî ji bengê serxweş bûye. Ew xwe ne xumar ne jî hişyar dihesibîne. Ew di bin êrişên çavên yarê de ye û hişçûyîna ji serê wî ji ber wan çavên kemandar e. Herçendê beng jî weke meyê dikare wek îstî’areyî bête şirovekirin, lêbelê di dawîya vê bendê de misraya “*Mislê wî kafir û zalim qe diyîn kes di Fireng*”ê berê me dide mehbûba beşerî. ‘Aşiq, ne ji ber bade û bengê belkî ew ji ber cewr û cefayên yarê mest û serxweş e.

Lew ne hişyar û xumar in me nexwarî mey û beng
Du kemandarê Hebeş hatine filhal bi ceng (121/4)

Mestê cewra te me bê bade û beng
Bê te cana li me 'alem bûye teng (123/5)

**2.5.13.2. Qehwe**

Ehlê tesewwifê ji her aliyekî ve teslîmî Rebbê xwe dibe. Ew dizane ku derd jî ji wî tên derman jî. Sûfî bende ye û her daîm li benda fermana Rebbê xwe ye.[519] Eger

---

[518] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 2, r. 56-57.
[519] Er bi kuştin wer bi hiştin emr û fermana te bit
Ehmedu ‘ebdun reqîqun waqifun beyne’l-‘ebîd (39/15)
(Emr û fermana hiştin û kuştinê ya [Rebb] e, Ehmed, ‘evdekî te ye di nav ‘evdan de, li ber [emr û fermana] te amada ye.)

di nav qehweya telh de zehîra kujer jî bête pêşkêşkirin, ew ji bo ‘aşiqî bi te’ma xwe weke şerbetê û bi bêhna xwe ve jî weke ava gulê ye, lewra ji destê mehbûbê yê pîroz û mubarek hatiye pêşkêşkirin.

Qehweya telxi digel zehrê helahil biderî
Me ji destê te mubarek şekeramîz e kulab (13/6)

**2.5.13.3. Şîr û Şerbet**

Çi dermanên hebin ku yar pê birîna ‘aşiqî derman bike, wek şerbetê tên dîtin. Şerbeta ku zehra helahîl (zehîra kujer) tê de heyî, ji aşiqî re ji aliyê hebîbê ve bête pêşkêşkirin, ew ji ‘aşiqî re wek şekir û ava gulê ye. Şerbeta meqbûl jî ew e ku bi hîngîvê bête çêkirin. Di dîwanê de şerbet û şîr wek îstî’areyî lêva yarê, ‘eşq û mey in. Dermanê sohtina evînê şerbeta lêvan e.

Pur bi wan cerhan xweş im lew ku wê derman dikir
Şerbet û ava heyatê şekker û qend û gulab (16/3)

Şerbeta zehrê helahîl ku hebibê me b’det
Bi gulab û şeker û qend û nebatê nadim (75/7)

Sohtin û derdê evînê 'illetê dax û birînê
Xweş dibit ma ew bi dînê şerbeta lêvan mufa ye (95/2)

Ji evîna te şepalê di şevan şubhê nedîr im
Ji lebê le'lê şekerbarê te wek şekker û şîr im (122/4)

**2.5.14. Amûrên Nivîsînê û Unsûrên Wê**

**2.5.14.1. Hunera Xetê û Cureyên Wê (Reyhanî, Dîwanî, Sulis û Muselsel)**

Bi sirra vê hedîsê ku “Xwûda spehî ye û hez ji spehîyê dike”, wî ‘alem û mexlûqat jî spehî û zerîf xuliqandine. Di edebiyata tesewwifê de sûretê yarê weke mishefê/kitêbekê tê qebûlkirin û xettat û katibê vê nusxeyê jî Rebbê ‘alemê ye. Xwûda ew rûyê weke bedrê neqişandiye û bi sen’etî afirandiye. Neqş û xetên li ser wê bedrê ji aliyê Wahibî ve bi pergalî hatine kêşan. Rûyê yarê bi cewherên xwe ve weke hewzeke le’l û durran e.

Dîsa li bedrê katibî kêşan ji nû jengarê xet
Nûra reşandî Wahibî wî kir reşî purgarê xet (59/1)

Herfên ji qudret nuqte pur madarê hewza le‘l û dur
Ev reng kî dîne weh ser qudretnumûn zengarê xet(59/2)

Rûyê yarê bi tezyîn û unsûrên neqşa xwe ve weke gulşenekê/baxçeyekî rengîn e. Çîçek, gulnar, reyhan, sunbul, gul, nesrîn, wek îstî'areyî temsîliyeta unsûrên rûyê yarê dikin. Lêv, dêm, çav, birû, zulf û şetriyên yarê, li ser rûyê kitêbê, bi destê Katibê Ezelî, bi sen'eteke bêhempa hatine neqişandin.

Ew çîçekên şetrîsifet ef'a mislê qelbê me mêht
Selwa ji balayê we rêht ev perdeya gulnarê xet (59/3)

Neqş û nîgarên dilbera der çîn ji remzên esmeran
Her tên di dest neyşekeran me j'gulşenê ferxarê xet (59/4)

Reyhan û sunbul tê hene sed çîçek û gul tê hene
Zerbavê bulbul tê hene ew bexçeya gulzarê xet (59/7)

Gul çîçek û neqşên xerîb nesrîn û reyhanê hebîb
Lê rast û çep bûyîn tebîb cedwelkeşîn zunnarê xet (59/8)

Neqşên li ser mishefa rûyê yarê hatine çêkirin weke nivîsandina ayetan hatiye dîtin. Çawa xettatan mushefên Qur'anê bi xettên herî xweşik dinivîsandin, Katibê Ezelî jî li ser rûyê yarê yê spî, ayetên zerîf nivîsîne. Rûyê yarê spî ye û li ser wê bi xetên reş ayet hatine nivîsîn, lewra zulf û birûyên yarê, bi rengên xwe ve reş in û ev xet jî li derdora dêm û cebhetê/eniyê wek xetên balkêş hatine kêşandin. Li derdora kitêban haşiye û perawîz têne nivîsîn. Birh û zulf/kezî jî weke wan perawîzan wek teşbîhî hatine beyankirin.

Madarê dêm û cebhetê haşa li dora ayetê
Lê rast û çep bo wesletê cedwelkeşê zunnarê xet(59/9)

Hêj kitêbên matbû zêde nebûbûn (ji matba'ayê nehatî çapkirin), xettatî û tezhîbî pîşeyekî giring bû. Qur'anên destxetî, dîwan û berhemên giring dihatine neqişkirin. Dema katib ew destxet biqedanda, ji aliyê neqişkeran ve bi ava zêrî dihate xemilandin. Bi vî awayî kitêbê hem bi xeta nivîsînê hem jî bi vê neqişkirinê hêjayek hildigirt. Mûyên yarê yên zirav û zerik ku nîşana ciwaniya wê ne, wek zêrkêşiya li ser kitêbekê hatiye îfadekirin.[520]

Îro berata Ehmedî tuxranîşan zerkeş me dî
Xettê humayûn kes nedî şîrîn û me'nadarê xet (59/13)

Ev ayetê nûrê ji Mela ra ku nivîsî
Katib ji surrê nuqte bi zêrabê feşandin (81/9)

[520] Tek, b.n.b., r. 144.

Hunera xeta îslamî, bingeha xwe ji Qur’ana Pîroz digire û ev huner jî weke sen’eteke pîroz tê dîtin. Di serî de Qur’an bi nivîsa kufî dihate nivîsîn. Ev huner bi pêş ketiye û heta îro hatiye. Îbn Nedîm (mîladî, sedsala 10em) behsa awayên nivîsînê dike. Îbn Muklah jî navê şeş şeklên bingehîn dide û rêgezên wan jî beyan dike. Culûs, neqş, reyhan, muheqqîq, tewkîy û rîka ji wan şeklên bingehîn in.[521] Reyhanî, dîwanî, sulis û muselsel navê çar rengên nivîsînê ne ku xettatan pê xet dinivîsîn. Ew, îşaretê bi cudabûna tecelliya Neqqaşê Ezelî ya li ser cemalê mehbûbên mecazî dike.[522] “Neqqaşê Ezel, bi navê xwe yê Cemal, li ser herfên mucessem spehîtahiyeke nû neqişandiye (81/7).” Neqqaşê Ezelî, nîşanên husn û cemalê xwe, bi şeklên xetê yên weke reyhanî, dîwanî, sulis û muselselê li ser rûyê yarê neqişandiye.

Miskê reşandî ez dibêm wan nuqteyan hin bûne kêm
Lê xettê reyhani li dêm katib ji nû i'rabi da (2/7)

Reyhanî û dîwanî û hem sulis û muselsel
Yek yek we hezaran ji husnê neqqişandin (81/8)

Tecellîbûna zatê îlahî bi wehdetê wucûdê ve tê îfadekirin. Îbn ‘Erebî dibêje ‘alem “hem ew e hem ew nîne”. Xwûda du çav dane însên (zu’l-eyneyn). Bi çavekî dinêre ku muqayesekirina Xwûda nayête kirin û ew ji ‘aleman munezzeh e. Bi çavekî din jî dinêre ku Xwûda Rehman e, wucûda wî nufûzî hemû eşyayan kiriye.[523] Bi vî awayî sûretên mecazî, bingeha xwe ji cemalê mehbûbê heqîqî hilgirtine. Nûra cemalê ezelî dema li ser rûyê mehbûbê tecellî bûye, ew der weke heyva bedrê rohnî kiriye. Li ser rûyê mehbûbê yê nazik, weke xetên reyhanî xetên nazik hatine kêşandin. Ew ressam û wêneçêkerên ku sûretên mecazî çêdikin, armanca wan nîşandana husn û cemalê Neqqaşê Ezelî ye û Manî jî yek ji wan wêneçêkeran e.

Şeraba nabê rummanî şefeq da 'iqdê perwînê
Muselsel maye reyhanî xetê nazik li nesrînê
Xerez şeklê te bû Manî ji sûret xaniya Çînê (131/7)

#### 2.5.14.2. Herf

Li ser herfên ‘erebî edebiyateke sembolîk hatiye avakirin. Bi goreyî şeklê herfan sembolîzmek peyda bûye. Hinek alim vê sembolîzmê bi destpêka xuliqandinê

---

[521] Seyyid Hüseyin Nasr, *İslam Sanatı ve Maneviyatı, çev. Ahmet Demirhan*, İnsan Yayınları, İstanbul 1992, r.37-38.
[522] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r.235.
[523] Chittick, Aşığın Aynası, r.76.

ve girêdidin. ‘Alimê Sûfî yê îranî Kemaleddîn Huseyîn Kaşîfî (sedsala 15em) di tefsîra xwe de beyan dike ku tiştê yekem ku Xwûda afirandî “nûr” e û ev peyv jî bi herfa “nûn”ê dest pê dike. Xwûda ewilî “qelem”, paşê qaba qelemê/hûqqe yanî “nûn” afirandiye. Bi vî awayî Sûreya Qelemê, bi “nûn û qelem”ê dest pê dike. Bi goreyî hedîsekê, qelem ziman e û nûn jî devî sembolîze dike.[524] Ev herdu bi hevre “kelam”ê tîne bîr ku di beriya bîdayetê de (destpêk) “kelam” hebû. Bi goreyî Îbn ‘Erebî, mewcûdat peyvên Xwûda ne. Peyv jî ji herfan pêk tên. Bi goreyî kozmolojiya Ekberî, bîst û heşt herfên alfabeya ‘erebî, teqabûlî bîst û heşt dereceyên hebûnê dikin.[525]

Di edebiyata klasîk de, hinek herf wek teşbîh û mecazî bi hinek unsûrên rûyî ve hatine sembolîzekirin. Herfa “elîf”ê, ji bo bejna yarê, herfa “nûn”ê ji bo birhê, herfa “sad”ê ji bo çavê muşebbehûnbîh e. Destê Qudretê li ser cebhet û dêmê yarê weke herfan, ûnsûrên spehîtahiya wê neqiş kirine. Kakulên wê yên weke herfa “lamê /ل” goşebadayî, li ser wan herfan daliqîne. Di tebî’etê de hîlalek tenê heye, lêbelê destê qudretê bi xetên bedî’, du hîlal/birû nêzikî hev li ser cebheta yarê çêkirine. Katibê Ezelî, li ser sadan/çavan du nûnên goşebadayî çêkirine û ev neqiş hemû rumûz û nîşanên veşartî ne û weke meseleyên kitêba Necmeddînê Qezwînî *Hikmeti’l-‘eyn*ê, têgihiştina wan zor û dijwar e.

Cebhet û dêmê ji qudret lê nivîsî herf herf
Kakulan ta ta li ser herfan kişandî lam lam (77/7)

Te du nun qelem muqabil bi bedî’ xet nivîsin
Du hilalê destê qudret bi qiranê yek kişandin (86/2)

Binê nûnên li ser sadan ku katib goşe lê badan
Seraser qaf ta qaf e rumûza hikmeti’l-'eyn (89/3)

Herfa “elîf”ê tîkaniya xwe ve hukumdarê (Dîvîne Magesty) û Xwûda sembolîze dike ku Xwûda bingeha hebûna her tiştî ye. Navê Xwûda yê mezin ku “Ellah” e, dîsa bi wê herfê destpê dike.[526] Herfa elîfê, du lam û hêyek bêne bal hev ayeta cemalê yanî navê “Ellah”î pêk tê. Di zaravê sofiyan de, herfên navê “Ellah”î bi vî şeklî tê şirovekirin. *“Herfa elîfa ewilî sembola ehediyetê ye û kesret ji wê derdikevin. Lama yekem sembola navê Celalê ye ku bilindtirîn tecelliya zatî ye. Lama duyem,*

---

[524] Seyyid Hüseyin Nasr, *İslam Sanatı ve Maneviyatı,* r.34-35
[525] Îbn Arabî, *Harflerin İlmî,* (Wer. Mahmut Kanık), Asa Kitabevi, İstanbul 2000, r. 15.
[526] Seyyid Hüseyin Nasr, *İslam Sanatı ve Maneviyatı,* r. 40.

*sembola Cemalê mutleq e ku di mezheran de diête dîtin. Herfa hêyê bi xwariya xwe ve îşaret e ji bo nifşê mirovî.”*[527]

Elif û du lam û hê dîn me di ayeta cemalê
Ji ceger me kir tesellî û ji sîne dest feşandin (86/4)

Herfa “mîm”ê wek îstîa’reyî sembola devî ye. Serê herfa mîmê girover e û devê yarê jî girover e û ev giroverî caran weke nuqteyê jî tê dîtin. Di nav ehlê tesewwifê de wateya wê ya batinî û mecazî li pêş e. “Mîm, murşîdê kamil e, lewra fenafîllah û bekabîllah bi saya serê wî mumkin dibe.”[528]

Mîmi ya yaqûti ya serçeşmeyê abê heyat
Huqqeya durdaneyê ya le'lê şekkerxa sti în (83/7)

Herfa “elîf”ê ji bo bejna yarê muşebbehûnbîh e. Dêm, xal, nûn/çav û dal/perçema xwar kompozîsyona spehîtahiya yarê pêk tînin û gotin têra wesf û sifetên wê husn û cemalê nakin, lewra ew bi navê Celal li ser rûyî hatine neqişandin.

Dêmê bi xal ew nûn û dal ismê Celal bejna şepal
Yekta elif nayê wesif min 'eqlê tiflê mekteb e (100/7)

**2.5.14.3. Qelem (Kilk, Xame)**

Bi nivîsîna “Qelem”ê, ew tiştên di ‘ilmê Xwûda de sabît in (a’yanê sabîte) di ‘alema îmkanê de îzhar bûne. Qelem, ew ruh e ku ji ‘ilmê tefsîlî yê îlahî re û zahirbûna şeklên kelîmeyan re bûye wasite. Bi navê ‘eqlê ewwel, ruhê mezin, nefesa Rehman, Heqîqeta Muhemmediyye tê binavkirin. Ew qelemu’l-e‘la (qelema mezin) ye, lewra bûye wasita ku ‘ilm û me’rîfetan bigehîne mexlûqatan. Pêxember bi hedîseke qudsî îşaretî qelemê kiriye ku Xwûda emrê qelemê kiriye: “*Di derbarê mexlûqatên min de, ‘ilmê min binivîse.*”, an jî di rîwayetekê de hatiye beyankirin ku ferman kiriye; “*Ewên ku dê heyî bibin, wan binivîse*.”[529] Mehmûdê Şebûsterî, destpêkirina nivîsîna ‘ilmê Xwûda, weha îfade dike:

Qafa qudreta wî nefes da qelemê
Hezar neqş xwûya bû li lewhê ‘edemê[530]

Di dîwanê de, qelem, wek “Heqîqeta Muhemmedî” hatiye beyankirin. Beyanatên Melayê Cizîrî jî îşaretê bi heqîqeta vê hedîsê dikin ku Pêxember weha

---

[527] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 198-199.
[528] Şimşek, “Mim”, b.n.b., r. 239.
[529] Kaşanî, “el-Kalem”, b.n.b., r. 456-457; Şebusteri, b.n.b., r. 14-16.
[530] Şêx Mehmûdê Şebûsterî, Gulşena Raz, r. 9.

gotiye: "*Lewlake lema xeleqtu'l-eflak/Ger tu nebûya min felek/'alem nediafirandin*." Vê hedîsê di nav ehlê tesewwifê de cihekî giring hilgirtiye û wek destpêkirina xuliqandinê tê qebûlkirin. Ji 'erzê heta 'erşê, ji zerreyê heta kûreyê, ji felekan heta melekan hemû cureyên hebûnê ji nûra Muhemmedî û ji bo nûra Muhemmedî hatine xuliqandin. Ev bawerî cara yekem ji aliyê sûfî Sehl b. Ebdullah et-Tûsterî (koçî, sedsala 3yem) ve hatiye bayankirin. Wî ev beyanat di tefsîra Sûreya Nûrê, ayeta 35em de îfade kiriye. Piştî Tûsterî, Hellacê Mensûr, Îmam Gazalî behsa vê meseleyê kirine. Muhyîddînê Erebî, têgeha Nûra Muhemmediyyê, bi awayekî berfirehî îzah kiriye.[531] Nûra Muhemmedî, di lîteratûra edebiyatê de bilxesse di kitêbên siyerê de cih girtiye. Di mewlûda Bateyî de jî Nûra Muhemmedî, ji babî derbasbûna ber bi kurî ve, bi şeklekî edebî hatiye vehandin.[532]

Di beytên Melayê Cizîrî de jî "qelem" wek 'eqlê ewwelê, wek tişta ewwilê hatî afirandin, wek zahirbûna 'ilmê hatiye beyankirin. Bi îşaretkirina qelemê, merhale merhale afirandina 'alemê û ya mexlûqatan hatiye îfadekirin. Husna li ser rûyî hatî neqişandin, ji husna Heqq e û bi qelema xeybê, bêqusûr hatiye neqişkirin.

Ismê te ye mektûbi di dîwanê qidem da
Herfek qelemê ilmê bi teqwimê reqem da (1/1)

Ew bû qelem ew bû 'eqil lew pê hedîsê da neqil
Deryayê 'ilmî kir şuxul tefsîlê 'ilmê cumle da (9/64)

Nûnên te hilalî bi qiran yek ji sura heq
Bê 'eybi li dêmê qelemê xeybê kişandin (81/6)

Di bingeha afirnadina qelemê de jî xwestina 'eşkerekirina xezîneya veşartî heye. Xwûda ji 'eşqa ezelî qelem afirandiye û feyz daye wê ku tiştên mecazî bixemilîne. Qelem ji nûra ezelî û mexlûqatên mayî jî ji tecelliya nûra qelemê hatine wucûdê. Ji bo ku wesf û kemalatên navê Subûhî û herfên kitêba 'eql û rûhî zahir bibin, lewh, kilk û xame hatine afirandin.

Heft xumê tejî bade di meykedeya qidemê

---

[531] Abdulkerim Cîlî, b.n.b., (dipnot), r. 40-41.

[532] Întîqala (derbazbûna nûrê ji babî ber bi kurî ve ) Nûra Muhemmedî, di mewlûda Bateyî de cihekî berfireh girtiye. Ev du beytên jêr ji beşên Mewlûdê hatine girtin:
Girtî yek qebze ji nûra xwe Xweda
Gote wê: " Kûnî hebîbî Ehmeda"
…
Çûn ji Adem nûra Ehmed bû cuda
Hate pişta Şîsê burhanu'l-huda (Mela Huseyînê Bateyî, *Mewlûda Nebî*, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara 2015, r. 26, 38)

Ji xuma ku min îrade 'işq rêhte cama Cemê
Lewhê lê nûn û sade lew feyz da qelemê (132/8)

Saqî ji xemra ezelê nûra qelem jê afrand
Darêt lewha ewwelê rizq û nesîb qeddirand
Ew bû murad mes'elê neqşê mecaz sewwirand (132/9)

Wesf û kemalatên subûh herfên kîtaba 'eql û rûh
Ismek divê lê bin wuzûh lew lewh û kilk û xame da (9/73)

### 2.5.14.4. Huqqe

Huqqe, ’elbika lû’lûan e an jî ew şûşe/qutî ye ku murekkeb, misk û lewente tê de têne muhafezekirin.[533] Huqqe, derbarê tecelliyê de, ji bo cihkirina ruhî hatiye beyankirin. Ruh di nevbera ‘alema ruhî û ya meşhûd de derbas dibe, tê dikeve cihê xwe yê ‘eslî ku ew jî bedena wî ya mucessem e. Destpêkirina xuliqandinê, bi hereketkirina cewher û durran tê beyankirin. Îbn ‘Erebî destpêkirina hebûnê û tecellîbûnê weha beyan dike: “Xwûda ‘erş afirand û bi navê Rehmanî, îstîwayê li ser ‘erşê bû (Sûreya Taha, 20/5). Paşê kursî ava kir, bi çavê xwe yê Celalî (e’yni’l-Celalî) li cewherê nêrî û wê cewherê heya/fedî kir û heliya û cuzên wê ji hev veresiyan û weke avê herikî.” Ayeta ku dibêje hêj ‘erd û asûman tunehî, “Erşê wî li ser avê bû (Sûreya Hud, 11/7).” bi vê wateyê tê şirovekirin.[534]

Berzex bi berzex bûne rast nînin di nêv da kêm û kast
Menzil bi menzil her hetta kudurr çû di huqqe da (9/106)

Huqqe, qutiya yaqût û mucewheran e û bi îstî’areyî ji bo devê yarê tê sembolîzekirin û yaqûtên di nêv de jî didanên yarê ne. Ji aliyê zahirî ve huqqe dev, didan jî yaqût bin, ji aliyê batinî û mecazî ve huqqe gotinên ehlê ‘îrfanê ne û yaqût jî wateya beyanatên wan ên hikmetamîz û kûrwate ne. Dema yarê devê xwe vekir û didanên wê hatine dîtin, spehîtahiya yaqûtan êdî namîne û ne hewceye êdî behsa wê jî bête kirin, an jî dema murşîdê kamil/ehlê îrfanê devê xwe vekir û xeber da, êdî hukmê gotinên kesên mayî yên edebî û fesîh namîne. Huqqeya yaqûtî, huqqeya durdane wek îstî’areyî devê yarê ye, bi sorbûna xwe ve weke yaqût û le’l e û di nav wê huqqeyê de jî didanên wê weke durr û mircanan in. Ji aliyê tesewwifê ve jî, ew cewher, gotinên murşîdê kamil in.

---

[533] Melayê Cizîrî, Dîwan, (ferheng), r. 387

[534] Îbn Arabî, *Marifet ve Hikmet*, (Wer. Mahmut Kanık), İz Yayınları, İstanbul 2020, r. 30.

Şîrê elmasî kişînit tu ji lami‘ da xeber
Vekirit huqqeyê yaqûtî ji gewher meke behs (27/13)

Mîmi ya yaqûti ya serçeşmeyê abê heyat
Huqqeya durdaneyê ya le'lê şekkerxa sti în (83/7)

### 2.5.15. Leyîstik û Pêlîstok (Setrenc, Çewgan)

#### 2.5.15.1. Setrenc

Setrenç (kişik), ew leyîstika zîhnî ye ku li ser zemînekê/texteyekî, bi kevirên/berikên bi navê şah, qela/rex, wezîr, feres, fîl, pîyon/peykê tê leyîstin. Ev leyîstik bi matbûna şahî diqede. Matbûna şahî weke têkçûnê tê qebûlkirin. Setrenç, wek îstî’areyî heyatê sembolîze dike. Însan jî li ser vê zemîna dinyayê leyîstikvanekî setrencê ye. Zeman û çerxa hîlekar jî ew leyîstikvan in ku dixwazin her daîm însên têk bibin. Ew kesên ku xwe nehs û qurnaz dihesibînin, eger bêhişane weke feresê/hespê çap û rast hereket bikin û şahê xwe têxine talûkeyê, têkçûna wan jî dibe mecbûrî. Berikên/darikên leyîstikê yên mayî (şah, wezîr, feres, fîl ...) bi goreyî rast, çep û çapraz leyîstina xwe ve bi goreyî hukmê xwe yê di leyîstikê de wek tewrîyewî têne bikaranîn. Di setrencê de berikên bi hêz şah, qele, fîl û hesp in û berikên herî bêhêz jî piyon in.[535] ‘Aşiq/leyîstikvan dixwaze bi piyonan raqîbên xwe têk bibe û sedeqeta xwe ji yarê re nîşan bide û ji bo wuslatê astengiyan ji meydanê rake.[536] Eger yar alîkariya reqîban neke têkçûna wî mimkin nîne, lêbelê dema yar/şah bi reqîban re îttîfaqê çêbike, dê ew jî têk biçe.

Min go li ruxan îm ne ku kecrew weku ferz în
Şeh go me bikin matê bi bazî feres î tu (105/17)

Ger çi li ber derb û cefan fîl bûm
Bê mefer ez mati kirim şah û fîl (72/12)

Dê bi peykê bikirin matî reqîbî dîsa
Bi rux û fîl û feres ez kêş û matê nadim (75/9)

Ger çi yekser li rexên fîlsifet
Rast û çep baz li seyrê feres în (80/12)

---

[535] Di Memû Zînê de jî, bi goreyî statû û hêza xwe, Tacdîn û Çeko weke fîl û ruxê hatine sembolîzekirin.
Fîl û rux û kerkedan ku hatin
Dîn Mîr û mu’ellimê xwe mat in
(Perwîz Cîhanî, *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2013, r. 623
[536] Tek, b.n.b., r. 122-123.

#### 2.5.15.2. Çewgan

Çewgan, navê leyîstikekê ye ku li ser hespan bi cûv û goyê tê leyîstin. Ev nav ji peyvên cûv û goyê tê. Çewgan, peyveke kurdî-farisî ye û tê wateya cûv û kaşoyê. Ji bo hêza fermanê, wek kînayewî tê bikaranîn.[537] Di edebiyata klasîk de, wek îstî'areyî ji bo zulfa yarê jî tê 'emilandin.[538]

Ji aliyê Melayê Cizîrî ve, bi leyîstik û amûrên wê, beyankirina destpêka jiyan û hebûnê balkêş e. Dibe ku bi vê termînoljiyê îşaretî ayêta Qur'anê jî kiribe ku dibêje: "Jiyana dinyayê her lîstik û kêfxweşiyek e (E'nkebût 64, En'am 32)."

Çewgan, wek kînayewî di wateya cûvê de hatiye bikaranîn. Afirandina hebûnê û tenezzûla nav û sifetan, wek muharrîqê ewwelîn, bi çewganê, bi goyê û bi fulkê/keştiyê hatiye îfadekirin. Muhyîddînê 'Erebî, destpêka xuliqandinê bi nûr û nefesa Rehmanî dide destpêkirin. Xwûda nefesê dide avê, ji ber za'zaa û hejandina wî av pêl dide. Nefes li ser avê tecellî dibe. Pêlên avê bi hemdê Heqq, digihijine qeraxa 'erşê û di wê hengamê de cewher (es-saq) diheje û direcife û hebûn bi vî awayî dest pê dike û hereket dike.[539]

Mertebeyên hebûnê, ber bi alema cismanî ve diçin. Di mertebya cismanî de bayê lamekanê, çawa cûv li goyê bikeve û goy hereket bike û li hewayê bizivire, herwisa bi cûvê lamekanî li keştiya felekê dikeve û keştî diheje, dilerize û dest bi hereketê dike. 'Alema di sukûn û di sekneyê de, diherike û zeman ji bo 'alemê dest pê dike.

Çewganê bayê lamekan fulka felek qaîm sekan
Teşbîhê goy da ber şekan her bê sukûn û sekne da (9/108)

Di edebiyatê de, çewgan, wek îstî'areyî birh û pora yarê û goy jî can û serê 'aşiqî temsîl dike. Di tesewwifê de çewgan, wek îstî'areyî temsîliyeta qeder û îradeya ezelî ya Xwûda dike.[540] Bi goreyî nêrîna Cebriyyeyî, însan li ber bayê qederê wekî belg û goyekî ye û bêîrade ye û diçe û tê. 'Aşiq li ber hukmê mehbûbê û îradeya mutleq, weke goyekî ye (bê ser û pa û bêîrade). Firqet û cefaya mehbûbê jî weke çewganê dilê 'aşiqî hûr hûr dikin. Ev dîmen teslîmiyet û sedeqeta 'aşiqî jî nîşan dide. Ew li ber

---

537 Mihemed Emîn Doskî, b.n.b., c. 4, r. 1671.
538 D. Mehmet Doğan, "çevgân", *Büyük Türkçe Sözlük*, Yeni Şafak Kültür Yayınları (İz Yayınları), İstanbul 1996, r. 222.
539 Îbn Arabî, Marifet ve Hikmet, r. 30.
540 Canım, b.n.b., r. 56-57.

hukmê memdûhî û li ber hukmê mutleq bêîrade ye. Lewra ji xeyrî wî tiştek nîne/la mewcûde îlla hû.

Şibhê goy bê ser û pa bûm li ber derb û şekan
Lew bi çewgan cefaya xwe ji dil hûri kirin (78/2)

Li ber çewgan û kaşoyan ji derba Turk û Hinduyan
Dibazim her wekî goyan dema ew têne meydanê (111/11)

Ey ne wek goy bê ser û pa bêt di benda xizmetê
Ma di çewgana te her perkende û meqhûri bî (117/20)

Mahirûyê miski bûyê surpilingê şêr xwûyê
Wê bi zulfan şubhê goyê dil ji min bir dil ji min (82/8)

Ê goyê meydanê te bit wek min di zindanê te bit
Serbendê çewkanê te bit mecrûhê peykanê te bit (125/10)

Kaşo, wek teşbîhî di wateya cefayên yarê û derbarê hestên firqetê de hatiye bikaranîn. Hedefa mehbûbê her daîm dilê ‘aşiqî ye, lewra tesîra yarê ewilî di dilî de peyda dibe. Dilê ‘aşiqî, ji ber çavên yarê (cohtê cadû) yên sehhar, weke derbên kaşuwan parçe parçe bûye.

Sehharê cohtê caduwan îro ji remza ebruwan
Dil girt û da ber kaşuwan ker kir li miskînan kebed (40/4)

### 2.5.16. Amûrên Şerî (Xencer, Gezme, Tîr û Xedeng, Teber/Tevr, Şûr/Şîr, Mizreq, Kevan Peykan, Yengî, Barut, Tox û ‘Al)

Xencer, sîlaheke kevnare ya mirovahîyê ye. Hem ji bo êrişê hem jî ji bo parastinê di qerneya navîn de hatiye bikaranîn. Ji ber serxariyê, birûyên yarê dişibine xencerê.[541] Xencer, tîr, teber, mizraq wek amûrên şerî, bi gelemperî bi têkiliya yarê ve hatine bikaranîn. Nêrînên yarê, xemze, çav, birû û mijangên wê, ji ‘aşiqî re weke sîlahan, kujer in. Çav û nêrînên yarê bi wesfê qesta kuştin û birîndarkirina ‘aşiqî, bi teşbîha xencer, tîr û teberê têne bikaranîn. Xencera yarê li dil û mêlakê/cegerê ‘aşiqî dikeve, wî birîndar dike û caran jî wî dikuje. ‘Aşiq, xencerkirina dil û cegeran wek xusûsiyet û halekî wan yê tabi’î dibîne.

Xencer û tîr û teber barîn şibê berq û burûsk
Misriyan lami‘ ji elmasan didayê rast û çep (17/5)

Xwûn ji mêlakê bi derba xencerê ma bête der

[541] Canım, b.nb., r. 74.

Bû şehidê 'işqê êdi dê ji ku hişyarî bit (19/10)

Hat der ji burc û penceran dil girt û da ber xenceran
Evreng e halê dilberan lew ‘aşiqan xwûn bû ceger (43/2)

Kirim amancê mizraqan di dil dan tîr çûn faqan
Bi celladê xwe ew xaqan dibêjit hêj tu xencer da (92/5)

Saxer bi dest serxweş û mest weqtê sehergeh dest bi dest
Xeflet du begler meyperest kuştim bi derba xencerê (113/13)

Kul û derdên dinyayê jî weke derbên xencerê hatine dîtin. Dinya fanî ye û ‘ecelê wekî celladekî xencer di destê xwe de girtiye, hêviya derba kuştinê ye. Mayîna li ser dinyayê firqet û sirgûna ‘aşiqî dirêj dike û di vê hengamê de xencera hudûsê/dinyayê ya xeddar derban li dilê wî dide û wî diêşîne.

Tu bi halê me dizanî çî ye her lehze Mela
Me di dil têt û diret xencerê xeddarê hudûs (28/23)

Tîr, rim, gezme, xedeng û peykan, bi têkiliya êrişên yarê yên bi ser ‘aşiqî ve dibarin, têne bikaranîn. Di edebiyata klasîk de xemze, nêrîn û mijangên yarê bi teşbîha tîr, gezme û xedengê hatiye bikaranîn. Ji dara xedengê tîrên dijwar têne çêkirin, ji ber vê yekê ev peyv ji tîrê re jî hatiye bikaranîn. Ji serê tîrê yê tûj an jî demirkirî re “sertîr û xedeng” jî hatiye bikaranîn.[542] Bi taybetî nêrîn û mijangên yarê li ser ‘aşiqî tesîreke mezin dihêle. Ew bi nêrîn û mijangên xwe ve tîr û xedengan tavêje ‘aşiqî û wan di dilê wî de dadiçikîne. ‘Aşiq ji ber wan tîr û birînan kêfxweş e û dixwaze yar wan êrişan herdaîm berdewam bike.

Ger dused peykan di nêva dil buwan dê xweş buyan
Her dema kewkeb bidîna necm û perwîn bêhîcab (16/4)

Tîr bi kevanê ve tê ‘emilandin. Bi şeklê xwe birû û mijangên yarê bi teşbîha tîr û kevanê tê bikaranîn. Tîravêj, gelemperî tîran bi ser hev re diavêje. Mijangên yarê jî wek sefgirtî, ji aliyê kevanê birûyan ve amadeyî tîravêtinê ne. Weke zulfa yarê birû û mijangên wê jî reş in û ev reşatî weke “qewsê şevî, yengiyê reşgoşe” tê bikaranîn.

Gezmeyek qewsê şevin aşiq bi nêva dil kevit
Dê ji can destan bişot xasma kevan nûbarî bit (19/8)

Ne tenê gezme dibarin me ji qewsê du hilal
Me ji mujganê sîyeh têne ceger tîr û xedeng (71/9)

---

[542] Canım, b.nb., r. 72-73.

Kuştim bi derba keyberan gezme û xedeng û awiran
Remz û işarat û suran dan dil ji nêva pencerê (113/14)

Tên sîneyan peykan nehîn amancê wan tîran em în
Dama belayên der kemîn her goşe doramarê çerx (35/2)

Nihîn dil d'direşînin tîrên di siyah goşan
Du mîr b'xezeb d'kşînin li qetla me bêhoşan
Ji qaf û waw û sîn in xedengên eswedpoşan (132/20)

Yengî, di wateya tîrê de wek îstî'areyî di sembola awir û mijangên yarê de tê bikaranîn. Darên welatê Yengê ji riman re dijwar in û rimên ji darên vî welatî têne çêkirin, bi saxlemiya xwe ve namdar bûne.

Perdeya xelwê ku hilda yengiyek min dî ti mil da
Gezmeya jehrê li dil da qet nego qetl û xeta ye (96/15)

'Alim e b'daxê firadan gezmeyên wan nûn û sadan
Çûne dil hetta bi radan yengiyê reşgoşe ye (97/2)

Di dest da yengiyek nûbari min dî ew kemanebrû
Li bala cedwelek Cebbarî têda hemqeran ebrû (108/1)

Kevan, wek amûreke şêrî ya tîravêtinê, bi xwehriya xwe ve wek îstî'areyî temsîliyeta birûyên yarê dikin. Birû, kevan e û mijang û awirên ji çav derdikevin jî tîr û xedeng in. Kevan herçiqas nûbarî be ew qas xweş tîran diavêje. Ev jî îşaretê bi mehbûba ciwan dike.

Gezmeyek qewsê şevin aşiq bi nêva dil kevit
Dê ji can destan bişot xasma kevan nûbarî bit (19/8)

Ê diye ew bi xwe carek di 'ecêb im ku bi hiş tê
Te ji wan qews û kevanan çi xedeng in te bi weş tê (122/2)

Şûr/Şîr, wek amûrekî şerî, di helbestên Melayê Cizîrî de, temsîliyeta birû, xemze û mijangên yarê dike, lewra tesîra yarê ya li ser 'aşiqî, bi van unsûrên spehîtahiyê çêdibe. Çavên yarê weke kujeran bête qebûlkirin, xemze û birûyên wê jî dibine weke şûrî.

Ew gezmeyên wek şûr û tîr recm û bela jê têne jêr
Hindî ku dilber têne seyr her wê ev e kirdarê çerx (35/10)

Kişandin lê wekî caran xedengên qewsê nûbaran
Ji rengê şîr û mûkaran reşandin sîne wek baran (124/6)

Barût, bi têkiliya qelbî re hatiye bikaranîn. Dema agir bigehite barûtê, ew diteqe û zererê dide derdora xwe. Dilê ‘aşiqî jî ji ber derbên yarê, ji ber sojîn û germahiya dilî weke barûtê nêzikî teqînê ye. Herareta agirê evînê, dilê ‘aşiqî zêde germ kiriye û tehlûke heye ku ew weke barûtê biteqe.

Sine geh têt ku bi ker bit ew ji derba ‘işqê
Me ceger şubhetê barut e û dil maye pereng (71/6)

Tox û ‘al, senceq û beyreq in. Tox/toq, di serdema împaratoriyan de, di eskeriye û rêvebiriyê de li gor payeyê dihate bikaranîn. Moxolan kuriya gakûviyan, bi alayên xwe yên leşkerî ve dikirin û tirkan jî ev ‘edet ji wan hilgirtiye. Tirkan di cihê kuriya gakoviyan de ya hespan bi kar anîne. Paşê weke şeklê stêrekê li ser milên şexşiyetên leşkerî ku rutbe û nîşana wî beyan bike hate bikaranîn.[543] Tox û al, wek îstî’areyî sembola perçema reş ya yarê (‘ereb) û rûyê yarê yê spî dike (‘ecem). Tox û al, di kompozîsyona unsûrên yarê yên rûyî de, wek îstî’areyî cih girtiye. Perçemên yarê caran dikevine ser zulf û xalê, caran jî ser rûyî.

Tox û ala ku xuyabûn ji 'Ecem
'Ereban tîp şikestin çep û rast (18/3)

Zalimê kuştim şepalê nazikê qencê delalê
Bûn hicaba zulf û xalê êdek û ‘ala û tox (36/5)

Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê ‘Ereb
Tox û ‘ala di Ferengî ne kemandarê Hebeş (54/5)

Bejn û balaya yarê, bi dirêjahî, ziravî û rastiya xwe ve dişibe tox û alayan. Tox û al, hem di nav leşkeran de xweş tê xwûyakirin û bijartin hem jî di pêşiya leşkeran de tê girtin. Di hişmendiya ‘aşiqî de yar li pêşiya hemû kesan e û ji her aliyî ve tê bijartin û dîtin.

Bejn û bala tox û ‘ala min kirin vêk ra mitala
Çiçek û terhên wala dil ji min bir dil ji min (82/12)

### 2.5.17. Eşyayên Din (Kulab, Qefes, Ceres, Ne’l)

Kulab, hesinê serxwar û çengel e. Ew kulabên di sing û cegerê ‘aşiqî de dadiçikin, hem sertûj in hem jî serxwar in û dema dadiçike êdî zû jê dernakeve. Xarên

[543] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 351-353.

sorgulan, serneynûka ‘uqab/qertelê, neynûka pençeya ‘uqab/qirikê wek kulabî hatine tesewwir kirin.

Sed nişab in min di dil îro ji xarên sorgulan
Yek bi yek peykan çevîbûn çûne cergê da kulab (16/2)

Cinnê teyyarek me dî werbû di min winda kirim
Dame ber çenk û kulaban hilfirandim wek ‘uqab (16/16)

Can dê bidit ew malxerab her sîneyê cotek xurab
Tê da birin pence û kulab wê can di dest û ruh di kef (64/10)

Tesîra nêrîn û awirên yarê yên li ser ‘aşiqî, weke tesîra neynûka ajalên wehşî hatiye beyankirin. Ew ajal dema nêçîra xwe bi dest dixin, wan dixine nav pençeyên xwe û neynûkên tiliyên xwe di canê wê re dikin, êdî azadbûn û xilasbûna wê tune ye. Ew ‘aşiqê ji aliyê yarê ve hatî nêçîrkirin û bendkirin, di destê yarê de weke nêçîra di destê wan ajalan de ye. Çavên yarê, wek kemanên reş in û mijangên wê jî kulab in; çavpiling û esed/şêr in û nêrîn û mijang jî kulab in; çavên yarê yên reş weke du cohtê xuraban in û neynûkên wan weke kulaban in.

Ne tenê ji qişt û zulfa me di sîne sed kulab in
Li ceger siyeh kemanan du hezar tîr reşandin (86/5)

Ji ceger Mela pilingan bi kulabê pensi bi ker kir
Esedan ji pence vêran dil û sîne herişandin (86/6)

Min dî bi xwab ew mahitab da dil kulab cohtê xurab
Dil şewwişand xweş herrişand têk hûri bû (107/9)

Qefes, qalibê ruhî ye. Însan ji du qisman pêk tê. Can û qefes. Can, ruh e û aliyê însên yê ulwî nîşan dide û qefes jî bedena wî ya cesed e ku aliyê wî yê suflî sembolîze dike. Ruh, ji aliyê qefes/bedenê ve hatiye qeyd û bendkirin. Can di bedenê de hêsîr e û bendkirî ye.

Qefes, wek termeke tesewwifî bi sembola bedenê tê îfadekirin. Ruhê însên weke teyrekî ye û di qefesa bedenê de hêsîr ketiye. Her daîm dixwaze ber bi ‘esliyeta xwe ve biçe. Dema ‘ecel tê ruh qefesa xwe dişkîne û azad dibe. Dîsa di hedîsekê de hatiye beyankirin ku pêxember weha ferman kiriye: “Hêj hûn nemirine, bimirin.” Ehlê îrfanê hêj li heyatê sirra mirinê bi dest dixin û ruhê xwe li heyatê jî azad dikin.[544] Ruh,

[544] Cebecioğlu, “kafes”, b.n.b., r. 262.

heyînekî ulwî ye û bingeha xwe ji Rûhê Ezelî hilgirtiye. Ruhê însên qalibê xwe ji tecelliya Heq hilgirtiye û bi tenê ew ji qefesê pêk tê.

Yexma ji me can kir ku tecellayê li dil da
Min ruhê ji qalib tu yî tenha qefes im ez (48/3)

Bê tu billah nebûyîn yek nefesek
Me tu yî rûh mucerred qefes în (80/5)

Mehbûs ez im zindan qefes şahê ji min girtî hewes
Zaxa ji dêmê reng weres mexlûq ji miskê cismîyan (90/7)

Ceres, zengil e û di tesewwifê de, di wateya xîtabên Îlahî yên di qelbî de tecellî dibin, tê bikaranîn. Bi vî awayî, caran wehiy ji Cenabê Pêxember re hatiye û ev cure wehiy ya herî dijwar bûye.[545] Ehlê îrfanê jî îdîa dikin ku bi vî şeklî, ‘irfan û hikmet di qelbê wan de tecellî bûye.

Ceres, di dîwanê de wek teşbîhî ji bo axîn û nalînên ‘aşiqî bûye mijar. ‘Aşiq ji ber hubba mehbûbê ketiye cezbeyê, diheje û dinale. Ev rewşa ‘aşiqî weke dengderxistina ceresê ye. Tecelliyên mehbûbê di dilê ‘aşiqî de peyda dibin, ruhê wî talan dike, bedena wî dixe nav cezbe û nalînê.

Hubba te ra min radihejîni ku binalim
Şeb ta bi seherê nale ji rengê ceres im ez (48/4)

Cezbe dil da dihejînit ji me nûr bi şan
Nale ji rengê ceres în û ceres în (80/6)

Dîsa ceres, di demên berê de, di nav karwanan de weke îşareta xilasbûna ji rawestbûnê dihate bikaranîn. Di edebiyatê de wek mecazî îşareta jêderketina dinyayê dike. Dinya, rawestgehek e û bi ‘Ezraîl, zengila çûnê tê lêdan û di ‘alemeke din de meş dewam dike. Ceresa herî dawî jî sûra Îsrafîl e ku dawîbûna heyata dinyayê îlan dike. ‘Aşiq, di ‘eşqê de xwe rêber û ceresê rêwingên jiyanê dibîne ku rêwing ji rêya rast xafil nebin û ji rêya rast dernekevin ku ew rê jî rêya ‘eşqê ye.[546]

Cana ceresê rehberê 'işqa te ez im qet
Ageh bi fixan û herekatê ceres î tu (105/7)

Ne’l/nal, ji bo dilnizmî/mutewazîbûnê hatiye bikaranîn. ‘Aşiq xwe weke ebrûyên yarê yên weke mehê new nabîne, ew xwe ancax weke nala hespê yarê, weke

[545] Cebecioğlu, “ceres”, h.b., r. 99.
[546] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 70.

tiştekî bêqîmet dihesibîne. Yar ew qas hêja ye, lê ‘aşiq li hemberî yarê weke nala hespê bêqiymet e.

Min go mehê new çaşinîyê ebrûyê yar î
Go min hed e ez şubhetê ne'lê feres im ez (48/5)

Nala hespê, dîsa ji bo medhê memdûhî bûye mijar. Şa’ir dixwaze û temennî dike ku cihê nalê hespê memdûhî lê ketî, weke şûnpêyên Buraqê pîroz bibe û ew cih weke ‘erdekî mubarek, ava heyatê jê derkeve û jê biherike.

Her derê ne'lê feres şubhet Buraqê vê kevit
Çeşmeyê heywan ji ew 'erdê mubarek fûri bî (117/16)

# BEŞA SÊYEM

## 3. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI ÎNSÊN HILGIRTÎ

### 3.1. Însan

Di navenda tesewwifê de însan heye. ‘Alem, di şexsê Heqîqeta Muhemmedî de ji bo însên hatiye xuliqandin. Wesfê însanê kamil û eşrefê mexlûqatî, di şexsiyeta însên de xwe daye der. Xwûda, însan bi ruhê xwe afirandiye û bi danezanîna ‘ilmê[547] jî ew weke heyînekî meqambilind û pîroz di ‘alemê de bi cih kiriye. İnsan ruhê ‘alemê ye, lewra Xwûda ‘ilmên îlahî/danezanîna navan, hînî wî kiriye û ew kiriye qibleya melekan. Di hedîsekê de Pêxember gotiye, “Xwûda, însan di sûretê xwe de afirandiye.” Û “Xwûda însan afirandiye û di wî de tecellî bûye.” Îbrahîm Heqqî Erzerûmî, sultanbûna însên ya li ‘alemê bi vî şeklî beyan dike: “Însan di alemê de weke sultanekî ye. Xiftanê wî temsîliyeta çar unsûran/anasirê erba’ayê dike; sancaxa di destê wî de, sancaxa şerî’etê ye; textê wî çadira muhabetullahê ye; taca di serê wî de, taca me’rîfetê ye. Bi van xusûsiyetan ve di ‘alemê de jê re cihekî taybet û şerefek hatiye dayîn.”[548]

Însan mezherî navên Xwûda ye û “Ellah” jî ew nav e ku her tişt dorpêç kiriye. “Çawa navê “Ellah”î, her tişt dorpêç kiriye (el-îsmu’l-camî’), însanê kamil jî, navên Îlahî yên di hemû mertebeyên kaînatê de, di xwe de dihewîne (el-kewnu’l-camî’).[549] Mela Camî, xusûsiyeta însên ya sereke, wek xuliqandina dudestbûna wî nîşan dide. Ji xeyrî însên her tişt, tenê yan bi cemalê îlahî yan jî bi celalê îlahî bûye mezherê sifatan. Lêbelê însan bi du destan hatiye afirandin. Ew du dest sifetên cemal û celalê Xwûda ne û ev sifet di însên de tecellî bûne.[550] Însan, li hemberî makrokozmosê (‘alema mezin) mîkrokozmos (‘alema biçûk) e, lewra di ‘alemê de çi hebe, hemû di wî de mewcûd e. Di heqîqetê de însan ‘alema mezin, ‘alem jî însanê biçûk e, lewra xelîfe ji teb’ayên xwe bilindtir e.[551]

Efdelbûna însên bi ayet[552] û hedîsan hatiye beyankirin. Di dîwanê de jî însan wek mexlûqekî mukerrem û bijarte hatiye îfadekirin. Di xuliqandinê de ‘alem wek

---

[547] “Wî, Adem hînî hemû navan kir.” (Sûreya Beqere, 2/31)
[548] Ali Tenik, *Tasavvufî Bilgi*, Litera Yayınları, İstanbul 2017, r. 162-163
[549] Chîttîck, Sufi’nin Bilgi Yolu, r. 66
[550] Chîttîck, Aşığın Aynası, r. 129
[551] Chîttîck, h.b., r. 133
[552] Muheqqeq me Benîadem mukerrem kirine û me ew li reşahî û behrê hildane û me ji tiştê xweş û pak rizqê wan daye û me ew bi tefdîlekê li ser gelek mexlûqên xwe tefdîl kirine. (Sûreya Îsra, 17/70)

darekê ye û însan jî wek mêweya wê darê hatiye hesibandin. Li ser text û selteneta ‘alemê însan wek sultanekî hatiye şandin. Îqbal, bext û dewlet bi însên ve hatine neqişandin û ‘alem bi afirandina însên re watedar bûye. Eger, însan di ser ‘alemê de nehata afirandin, ‘alem, hem weke dareke bêber dima hem jî watedar nedibû. Ev xusûsiyet jî nîşan dide ku ew xelîfeyê Xwûda ye û ‘alem ji bo wî hatiye afirandin.

Her neh felek lê kaxek in dûr û diraz wek axek in
Tê dar in ew jê şaxek in vê terhê însan mêwe da (9/134)

Însan ber e 'alem dirext sultan ji xelwet hate text
Pê zeyyinîn îqbal û bext dewlet ji bala tale da (9/135)

Xuliqandina bêhempa ya însên e. Ev jî îşaretê bi sirra Subhanî dike. Ayetên li ser lewheya rûyê însên hatî neqişkirin ew qas spehî ye ku ev jî burhan û delîlên herî aşîkar in. Xuliqandina cismanî, herî spehî di rûyê însên de û di însên de jî herî zêde di rûyê mehbûban de tecellî dibe. Ew kesê ji husna subhanî û ezelî re delîlan bixwaze, ew neqşên li ser sûretî besî wî ne. Bi taybetî, ebrûyên yarê, digel unsûrên mayî, di xuliqandina însên ya herî spehî de (ehsenê teqwîm) unsûrekî balkêş e.

Ji vî teqwîmê însanî nezer dî sirrê subhanî
Fehaze’l-wechu min ecla berahînin we ayat[553] (23/3)

Me cewher 'unsurek xamis numa îro di tali' da
Di vê teqwîmê însanî li tali' bûne fal ebrû (106/8)

Însan, cewherekî alî ye. Herçendê ew ji axê hatibe çêkirin û cesedê wî ji ‘alema nasûtiyê bête hesibandin jî, ew ji nûra ezelî afiriye û Xwûda bi ruhê xwe puf kiriye û can daye însên[554] û di esliyetê de ew di ‘alema lahûtiyê de hatiye xwarê. Însan ji aliyê lahûtiyê ve weke sedefekî ye û di nav de cewherekî alî heye.[555]

Însan bi min nasût e gewher di nêv sedefê
J'alema ceberût e şems e hatî şerefê
Tenezzul ji lahût e mehbûb e cam di kefê (132/38)

### 3.2. Spehîtayî/Rindîtî (Husn û Cemal)

Husn, bi zatê qedîm ve qaîm e. Hêj xezîneya veşartî nehatî aşkerekirin, husn bi zatê Xwûda re hebûye. Xwûda, husna mutleq e û wî kaînat li ser sûretê xwe afirandiye. Ew spehî ye û kaînat jî ji ber vê yekê spehî ye. Wî kaînat di dereceya herî spehî û

---

553 “Bêguman ev rû, burhan û delîlên herî diyar in (delîlên afirandina bêhempa ne).”
554 “Dema ez şeklekî bidimê û ji ruhê xwe pif bikimê, hûnê jê re herin secdeyê.” (Sûreya Hicr, 15/29)
555 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.3, r. 400.

saxlem de çêkiriye. Ebû Hemîd Xazalî gotiye; di ‘alema îmkanê de ji vê ‘alemê mukemmeltir ‘alem nîne. Xwûda, di ‘alemê de spehîtahiya xwe dîtiye û hez ji spehîtahiya xwe kiriye.[556] Muhyîddînê Erebî, spehîtahiya kaînatê; wek hêvî, berfirehî, lutf, rehmet, şefqet, comerdî û îhsanê îfade dike.[557] Hemû spehîtahiyên mecazî, tecelliya wê husna ezelî ne. Husn û hubb bi zatê qedîm ve girêdayî ne, dema husna ezelî xwestiye, gencîneya veşartî bête dîtin, bi nav û sifetan ve te’eyyûnî mertebeyan bûye û husn û hubb wek sifetan aşîkar bûne.

'Erş û kursî hêj di mexfî bûn di kenza qudretê
Husnê Heq bû di istiwayê lami'a 'işqê hebû (104/2)

Rohniya çavên Mela yî Xaliqê husna te dayî
Hubb tenê da min gedayî husn û hubb yek çeşne ye (97/51)

Ew sûretê mir'atê husn jê bû zuhûr ayatê husn
Lê bû tecella zatê husn vê husnê ew serçeşme da (9/60)

‘Eşq û muhebbet sebebên afirandinê ne. Xwûda bi vîna danezanîna xwe mexlûq afirandine û mewcûdat bi vî awayî hatiye wucûdê. Ji wê husna munezzeh, nûra Muhemmedî hatiye afirandin û Benîadem jî, ji wê nûrê hatine çêkirin, yanî ruhê însên, ji wî ruhê muqeddes tecellî bûye. “Însanê kamil/heqîqeta Muhemmedî, armanca xuliqandinê ye. Ev nûr, ew mezher e ku navê “Ellah”î (navê “Ellah”î hemû navan di nav xwe de dihewîne) di wî de zuhûr dibe.”[558]

Husnek munezzeh sewwirand nûra hebîb jê afirand
'Alem di kunhê heyyirand Rûhu’l-qudus can nefxe da (9/57)

Ê dî ku nefsa kullî ye husnek munezzeh 'alî ye
Ew jî bi rûh ra eslî ye wan her di hev da saye da (9/84)

‘Alem, ‘eks û sûreta spehîtahiya Xwûda ye. Ew kesê derbarê spehîtahiya hebûnê û ya ‘alemê de bikeve tefekkûrê, qelb û hîssiyatên wî dibine wesîle ku ew ber bi husna mutleq ve biçe. Tecelliyê nûra spehîtahiya Îlahî, caran di sûretê însên de xwûya dibe. Di esliyetê de ev jî spehîtahiya Îlahî bi xwe ye.[559] Melayê Cizîrî jî di dîwanê bi xusûsiyetên mehbûbên mecazî îşaretê bi husn û cemalê ezelî dike. Husnên

556 Îbn Arabî, Aşk Risalesi, Litera Yayıncılık, r. 115.
557 Îbn Arabî, Futûhatu’l-Mekkiyye, c. 2, r. 542, veguhastin Halid Cemil Muhammed, Sevgi ve Güzelliğin Şairi, Hîvda Yayınları, İstanbul 2008, r. 157.
558 Chîttîck, Aşığın Aynası, r. 134.
559 Halid Cemil Muhammed, Sevgi ve Güzelliğin Şairi, Hîvda Yayınları, İstanbul 2008, r. 159-160.

reng reng, neqş û nîgarên li ser sûretan, wek tecelliya husna Xawerî di yarên mecazî de xwûya bûye.

Yari pir husnek li bal bû dilberek xayet cemal bû
Ew ji hal ageh bi hal bû şubhê wê şefqe û 'eta ye (95/31)

Reng rengi husna sûretan neqş û nîgarên desxetan
Bala û bejn û qametan nazikleban pur xende da (9/23)

Wîldan û hûr in ger perî şirîn û mehbûbên berî
Cumle ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (9/62)

Husna ezelî, husneke muqeddes e û di tecellîbûnê de wek du qisman kifşe dibe. Yek ‘eql û ruhê e’zem û yek jî nefsa kullî ye. Xwûda, ruhê ‘ezem û ruhê ewwel e. Sê wechên me’newî yên ruhê ‘ezem hene. Ya yekem, feyza hebûnê ewilî wî qebûl kiriye. Ya duyem, nivîsandina ‘ilmê ya derbarê mexlûqatan de ye ku jê re “qelemu’l-‘ela” tê gotin û ya sêyem jî, mezher û barkêşê hukmê tecelliya ewwel e.[560] Nefsa kullî jî, ruhê ‘alemê ye. Di tesewwifê de ‘alem wek heyîneke candar tê dîtin. Heqîqeta Muhemmedî û însanê kamil jî bi vê têgehê tê îfadekirin.[561]

Tey kir di nêv tuxrayê ism teksîr ji herfan kir tilism
Husna muqeddes bû du qism hukmê tecellayê we da (9/82)

Yek 'eql û rûhê e'zem e misbah û nûra 'alem e
Hewwa û neqşê Adem e bêmudde bêmadde da (9/83)

Ê dî ku nefsa kullî ye husnek munezzeh 'alî ye
Ew jî bi rûh ra eslî ye wan her di hev da saye da (9/84)

Husn, di dîwanê de bi têkiliya Xwûda ve hatiye bikaranîn, lewra ew spehî ye û hez ji spehîyê dike. Tecelliya nûra husnê ya Zatê Ezelî, bi teşbîha roj û pertewa wî ve hatiye beyankirin. Serçeşmeya husnê, Xwûda ye. Mexlûqat hemû pertewa/’eksa rojê ne. Çi tiştê ji wî tecellîbûyî hemû jî, ji ‘eksa wî ne û bi mutleqî spehî ne. Wî, her tişt bi şeklekî mukemmel afirandiye û her tişt jî ‘eks û sûretê ayîneya Heqq in. Çawa her tişt ber bi ‘esliyeta xwe ve vedigere, her tiştê ku ji husna ezelî tecellîbûyî, dîsa dixwazin ber bi heqîqeta xwe ve vegerin. Meyla ji mehbûbên mecazî û behskirina spehîtahiya wan, ji ber feyza husna ezelî ye. Hubb û meyla wan, ‘aşiqî ber bi Afirîner ve dibe wî nêzikî Xaliq dike.

Serçeşmeya husnê ew e Xurşîd û 'alem pertew e

[560] Kaşanî, “er-Rûhu’l-a’zam”, b.n.b., r. 274-275.
[561] Cebecioğlu, “nefs-i küllî”, b.n.b., r. 365; Kaşanî, “el-Küll”, b.n.b., r. 464-465.

Geh bedr e geh mahê new e wer Muşterî yan Zuhre da (9/61)

'Eksa ji husna meyfiroş avête fincanên bi poş
Nageh di caman hate coş fûrî di nêva kûze da (9/102)

Wellah ji herdu 'aleman min husnê canan e xerez
Lew min ji husna dilberan her sun'ê Rehman e xerez (58/1)

Taybetiyên husn û muhebbetê gelek in. Ketina heyretbûn û dehşetbûnê, bêdengmayîn û lalbûn ji wan hinek in. Ji wan taybetiyan yek jî “heyam” e. Heyam, jixweçûn e. ‘Aşiq ji ber tesîra dereceya husnê dikeve heyretê û hişê wî ji serî diçe.

Husna serçeşmeyê ya ezelî nayête îfadekirin. Ne qudreta însên ne jî peyvên însên têra vî karî dikin. Beyankirin û teşbîhkirina ‘eks û sûretan jî ne hêsan e. Ji bo wan husnan çi teşbîh bêne kirin dîsa jî kêm dimînin. Xwûda behsa afirandina mukemmel ya însên kiriye ku gotiye: “Bi rastî me, însan di sipehîtirînê qed û qameta mutedîl de xuliqandiye (Sûreya Tîn, 4).” Ew husna ji ‘eşqê peydabûyî, di mehbûbên mecazî yên weke hûrî û periyan de tecellî bûye. ‘Eks û sûretên husna heqîqî ew qas cazîbedar be, serçeşmeya husnê ji xwe nayête te’rîfkirin.

Husna te nizanim bi çi teşbîhi bikim
Fî ehseni’t-teqwîm lew hatiye tefsîrê (118/3)

'Işqê ji husnê sewwirî xaret kirin hûr û perî
Herçî di kunhê fekkirî ew ma di 'ecz û hîre da (9/59)

Cemal, ew sifetê ezelî ye ku Xwûda wek muşahedeyê ‘ilmîyye, di zatê xwe de cara yekem muşahede kiriye. Wî xwest wek muşahedeyê ‘eyniyye di mexlûqatan de sifetê xwe bibîne. Ji bo ku cemalê xwe di ayîneyê de bibîne, ’alem afirand. Bi goreyî Abdurrezaq Kaşanî, el-Cemal, wesfên rehmet û lutfa Xwûda ye. Cemal, tecellîbûna wechê Xwûda ya ji bo zatê wî ye.[562]

Cemal, wek sifeteke Xwûda di însên de tecellî bûye. Cemalê Xwûda saf e. Ew cemalê saf, di neynika ruhê însên de ‘eks dide û tecellî dibe. Sifeta cemalî, di zatê mehbûbên surşirînan de wek husn û cemalekî cezîbedar tecellî dibe û di qelbê ehlê dilan de jî wek nar û celalê cezbe dide. Piştî ku husn û hubb te’eyyûn bû, di jin û mêran de bi vî awayî ‘eksa wî peyda bûye.

Me'nayê 'işqê bêm çi ye lew min bi çeşmê dil diye
'Eksa cemalek safî ye zahir di mir'ata me da (9/10)

[562] Cebecioğlu, “Cemal”, b.n.b., r.97.

Yek di zatê surşîrînan bû cemal û husn û sur
Yek di qelbê ehlê dil nar û celal û cezbe bû (104/5)

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Daxwaza ‘aşiqî, bidestxistina husn û cemalê dilberê ye. Ji xeyrî wê husn û wî cemalî, ‘aşiq xweyî tiştekî din nîne. ‘Aşiq wê sipehîtahiyê ji xwe re weke gewherên xezîneyê yên giranbiha dibîne. Şa’ir di vê derbarê de minnet û şukurdariya xwe ji Xwûda re beyan dike ku ji xeyrî ‘eşqa husn û cemalê yarê tiştekî din nekiriye nesîbê wî.

Gewher û gencê Mela husn û cemalê dilber e
Sed te'alallah tebarek ev çi husn û cilwe ye (93/28)

Minnet ji Xûdayî ku bi 'ebdê xwe Mela yî
Iksîrê xemê ‘işqê be dînar û direm da (1/10)

### 3.3. Dost, Yar, Hebîb, Me’şûq

Di dîwanê de ji bo yarê wek teşbîh û mecazan, bi çendan peyv û terkîb hatine bikaranîn. Ev peyv û terkîbên hatine beyankirin, gelemperî bi têkiliya afirîner hatine ‘emilandin. Cihê ku behsa mehbûbên mecazî dike û îşaretan ber bi wan ve dide, pêwîst e derbarê nêrîneke tesewwifî de dîsa îzahat bêne kirin, lewra di hişmendiya mutesewwifî de, dihemû tiştên afirandî de wech û îşaretên Xwûda wek tecelliyê cih girtine. Îbn Fariz derbarê tecelliya husna mutleq de weha dibêje: *“Hemû spehî û rûspehî, husn, cemal û zerafetên xwe ji Zatê Mutleq deyn hilgirtine. Di heqîqetê de ew me’şûqa raprast, bi çend awayên şeklan de zahir dibe. Însan, wan şeklan ji xeyrî wî tefehhum dike; lêbelê di wan hemûyan de tecellî dibe.”* Dîsa di vê derbarê de Zûnnûnê Misrî ‘eynî beyanatan îfade dike: *“Kî bi Xwûda re bibe dost, ew bi hemû cazîbe û çehreyên sipehî re ûnsiyetê/dostaniyê peyda dike. Di van de ji bo ehlê me’rîfetê sirr hene û ji xeyrî ehlê wî, bi kesekî din re ev sirr aşîkar nabin.”* [563]

Melayê Cizîrî derbarê tecelliya li ser sûretên mecazî de heman tiştan dibêje û dixwaze li eşyayê ne bi nezerekî zahirî, bi nezerekî batinî bête mêzekirin.

Ev hûr û perîçehre but û latê cemalê
Der sûretê tehqîqê Mela ‘eynê mecaz in (84/13)

---

[563] Yesrîbî, b.n.b., r. 374-375.

Tîrên ‘eşq û evînê hêj di qidemê de di singê ‘aşiqî de hatine daçikandin. Bi wan tîran re di dilî de cezbeyek peyda bûye. Dost, naz û delaliyan ji ‘aşiqê xwe re dike û ji ber wan e ku ‘aşiq her daîm dizare, dinale û diniyaze. Ji ber naz û cazîbeyan, ‘aşiq weke çengê dinale û weke findê dihele û disoje. Ew dixwaze ji ber derd û kulên evînê dost hal û rewşa wî bibîne ku daxa dilê wî derman bike û bikewîne.

Tîran li me dit dost me dibê sîne hedef kir
Nazan li me kit yarê me zarî û niyaz in (84/10)

Şubhetê çengê dinalim hêj ji dest daxa qedîm
Her wekî meş'el disojim dost nizam ageh heye (93/15)

Di rêya dostê de, safdilbûn, îqrar, berdewamî, sedeqet jî giring in. ‘Aşiq, li ser soz û ‘ehda xwe ya berê ye. Hingê canê wî sax e, wî ‘ehd û peyman daye û sond xwariye ku li ser rêya yara xwe bimeşe. Meşandina li ser rêya yarê û sadiqbûn bi xwe re baqîbûnê jî tîne. Kar û meşxuliyetên ‘aşiqî ji bo wuslatê ye. Eger ‘aşiq di rêya seyr û sulûkê de bimeşe û bigehije mertebeya fenayê, dê ew di zatê Xwûda de fena bibe û baqî bibe. Bi meqama fenayê ‘aşiq û me’şûq dibine yek û wuslat peyda dibe. Îbn Fariz jî di vê derbarê de weha dibêje: “*Heta tu di min de fanî nebî, tu wuslata min naxwazî; heta sûretê min li ser te tecellî nebe, tu fanî nabî*.”[564] Armanca muhebbetê di însên de wuslat e û ruh digehije ruhî, cism digihije cismê.[565]

Di rêya dostê Mela yek cihet û sadedil în
Me heta can heye dîsa ji teleb dest nehilîn (121/5)

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost
'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

Yar, ji aliyê xuliqandinê ve bêhempa û bêqusûr e, lewra Xwûda ew ji nûra ezelî afirandiye. Ew yara ji husna ezelî hatî afirandin nayête wesifandin û peyv jî têra wesf û sifetên wê nakin. Ew nûra di rûyê yarê de wek şemaleke hilbûyî di nav tarîbûnê de weke çirayekê ye. Serdarîbûna însên û xuliqandina herî spehî di esliyetê de ji wî rûyî tê fehmkirin.

Nîne di şerq ew reng zerî însanek e mislê perî
Mewla ji nûre aferî naêt ji wê dîn wesfîyan (90/9)

Naêt ji wê dîn wesfetan dêmê şemala zulmetan

---

[564] Kaşanî, “el-Fanî”, b.n.b., r. 31.
[565] İbn Arabî, Fütûhat-ı Mekkiyye, c. 8, r. 166.

Serdar e ta însanetan idraq ji wê girt eslîyan (90/10)

Di hişmendiya ‘aşiqî de yar xweyî hinek taybetiyan e. Pêwist e yar ji aşiqê xwe re bê perde be, xwe nîşanî wî bide û jê re bi rehm û şefqet bit. ‘Aşiq, ji destê dax û birînên ‘eşqa xeddar û firqetê bêzar e. Eger yar şefqet û merhemetê nîşanî wî bide dê kul û derdên wî belav bibin û dax û birînên wî jî sax bibin. Di heqîqetê de yar şefqet, merhemet û înayet daye ‘aşiqê xwe. Ji bo hîdayetbûna wî xemr û cam (‘eşq) kiriye qismet û nesîbê wî. Vexwarina ji wê xemr û camê ji bo wuslat û xilasbûnê besî ‘aşiqî ye.

Daîm bi se'y û cehde bit teb'ê ku yar lê ew we bit
Yar jî gel bê perde bit vê ra bi rehm û şefqe bit (125/9)

Di deh salan mulazim mam û yarê rû neda carek
We ger ne yar eger rû det bes e carek di salê da (5/21)

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e ji deftera hîdayet (24/1)

Yar, di hinek beytan de wek mehbûbekê mecazî bi xusûsiyetên beşerî ve derdikeve pêş. Rûyê wê roj û heyva rohnîdar e, devê wê weke huqqeya yaqûtî ye, nazikbeşer û porreş e. Birhên wê weke du mehên nû li ser rûyê wê cih girtine. Dilê yarê weke kevir/berê û mermerê hişk e. Ew bêrehm û bêşefqet e, lewra ji ber ahûgirînên ‘aşiqî dilê wê nerm nabe û şefqetê nîşanî ‘aşiqê xwe nake.

Li rûyê yarê du mehê new me qiran dîn di mest
Tu ji sitêr û Qemer û tali‘ê kewkeb meke behs (27/15)

Yarê me pur nîşan û sur sîma ji dur dêm kewkeb e
Ew lebşeker nazikbeşer cebhetseher kagulşeb e (100/1)

Dilê yarê me nebû nerm bi sed ab û girîn
Ji dilê dilberê ma û berê mermer meke behs (27/11)

Hebîb, bi husn û hubba ezelî re têkildar e. Muhebbet hestekî fitrî ye. “Di eşqê de çar leqeb hene û ya yekem muhebbet e. Muhebbet ew e ku hubb, di qelbî de cih bigire û ji qirêjiyên arizî paqij bibe. Xweyîyê muhebbetê, li hemberî mehbûba xwe, bê armanc û bê îrade ye.”[566] Husn û hubb di zatê qedîm de her hebûne û bi te’eyyûna sifetan di dilê ‘aşiqî de jî cih girtiye. ‘Aşiq, di muhebbetê de bê ixtiyar e, lewra ev hest wek mutleqî di ezeliyetê de ketiye dilê însên. Eger hubba Xwûda nexwestiya li

[566] İbn Arabî, h.b., c. 8, r. 172.

qencîneya xwe temaşe bike, mewcûdat nedihate wucûdê. Husna hebîb, bûye sedem ku ‘işq bikeve dilê ‘aşiqî û unsiyet peyda bibe.

Husna hebib û lutfê yar avête dil 'işqa xedar
Lew selbî kir jê ixtîyar wê husnê ev îcabi da (2/2)

'Işqi derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

Hebîb, di dîwanê de, ji bo Pêxember Hz. Muhemmed (sxl.) jî hatiye bikaranîn. Hebîbullah (mehbûba Xwûda), navekî Pêxember e. Ev nav ji bo te’zîm û hurmetê tê bikaranîn.[567] Xwûda, xweyî husnekî munezzeh e û nûra Heqîqeta Muhemmedî ji wê husnê afirandiye.

Husnek munezzeh sewwirand nûra hebîb jê afirand
'Alem di kunhê heyyirand Rûhu’l-qudus can nefxe da (9/57)

Hebîb, mehbûbên mecazî ne. Xusûsiyetên beşerî ji bo wan hatine beyankirin. Herçendê ev sembol pêwîst e ji aliyê tesewwifê ve bêne îzahkirin jî, lê dîsa ji aliyê zahirî ve ew teqebûlî heyîneke cismanî dikin. Lewra, ehlê ‘irfanê ji mecaziyê derbasî heqîqetê dibe.

Gul çîçek û neqşên xerîb nesrîn û reyhanê hebîb
Lê rast û çep bûyîn tebîb cedwelkeşîn zunnarê xet (59/8)

Me’şûqê heqîqî Xwûda ye. ‘Aşiq û me’şûq, di zatê wî de yek in. Dema gencîneya veşartî hate ‘eşkerekirin, ew herdu lat wek sifetên cuda ji hev veqetiyane.

Husn û mehebbet zatek in me'şûq û 'aşiq latek in
Lê sûret û mir'atek in her yek di me'nayê xwe da (9/11)

Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
'Aşiq û me'şûq yek bûn şem' û hem perwane bû (104/3)

### 3.3.1. Tesewwûr, Teşbîh û Mecazên Derbarê Mehbûbê

#### 3.3.1.1. Padişah, Xaqan, Sultan, Mîr, Xundkar, Xusrew, Şah, Qeyser û Beg

Teşbîha mehbûbê bi desthilatdaran re, bi hêz û hukumdariya wê ya li ser ‘aşiqan tê beyankirin. Çawa qral û padîşah, li ser teb’ayên xwe hukmê dikin, mehbûb jî, ji her aliyî ve hukmê ‘aşiqên xwe dike û wan dixe bin hîmayeta xwe. Mehbûb

[567] Cebecioğlu, “Habîbullah”, b.n.b., r. 183.

padîşah e, ‘aşiq li ber deriyê wê gedayek e. Mehbûb di ciwaniyê de weke xaqanê Çînê ye û ew bi ciwanî û hukumdariya xwe ji hemû qeyserên ciwaniyê hêjatir e, lewra ew taca serê qeyseran e.

Mehbûb, wek padîşah û desthilatdarekê tê tesewwurkirin. Ew, di dîwanê de, bi wesfên “padişah, xaqan, sultan, mîr, xundkar, xusrew, şah, qeyser û began” hatiye wesifandin. Mehbûb, şaha cîhanê ye û fa’ileke muxtar e. Lazim e ew her daîm li halê esîr û suxteyên xwe bipirse û ev halpirsîn hêza hukumdarî û ‘edaleta wê nîşan dide.

Dibit bêjin me xaqanî bi heft ayatê Furqanî
Li mehbûban tu xaqan î were derbê li Qeyser da (92/19)

Can û dilê min ew e horiweşê min ew e
Padişahê min ew e em li derê wê geda (8/5)

Yar dê hakim bitin qewlê reqiban guh nekit
Şahê mulkê dilberê dê fa'ilek muxtarî bit (19/14)

Lazim e bi sultan û mîran purskirin l'halê esîran
Ew kirî amancê tîran suxteyên dermande ye (97/4)

#### 3.3.1.2. Tabîb/Hekîm

Derdê dil, derdekî bêderman e û ‘aşiq jî nexweşekî bêmecal e. Ji xeyrî mehbûbê kes ji derdê wî re nikare bibe derman. Çawa ku mehbûbê ji ezeliyê ve ew derd di qedeha ‘eşqê de daye ‘aşiqî, reçeteya xilasbûna wî jî dîsa di destê wê de ye û dermanê wî jî ew dizane. Derdê ‘aşiqî yê herî mezin firqet e û dermanê wî jî wuslet. Wuslet murada wî ye û jê dixwaze ku ew yara tebîb birîna wî bikewîne û destê wuslatê dirêjî wî bike.

Qedehek bade ji ‘işqê di ezel da me Hekîmî
Jê dinoşîn heyûhey hê bi xwe cama me lebaleb (14/7)

Îro ji murada te dilê min bi birîn e
Ellah çi hebîb î çi tebîb î vekewîne (101/1)

#### 3.3.1.3. Melek, Perî, Wîldan, Hûrî, Rûhu’l-Qudus

Husn û cemalê mehbûban, zerreyek ji husna Îlahî ne. Sedema teşbîha yarê bi melek, horî, wîldan, perî û Ruhu’l-qudusê re, nikarîbûna dîtin û gehiştina yarê û ji aliyê xuliqandinê ve sipehîtahî û bêqusuriya wan e. Di tesewwira ‘aşiqî de, mehbûb ji aliyê husn û cemalê ve ji melek, hurî û periyan jî spehîtir û bêqusurtir e.

Şemsa felek î ya melek î hêj nizanim
Hurî û perî ya bi xwe Rûhu'l-qudus î tu (105/6)

Nazikek min seherê dî bi cemalê xwe ne wek
Hûr û wîldan û perî dî ne beşer bû ne melek (70/1)

#### 3.3.1.4. Kewkeb (Stêr), Mîhr (Afitab, Xurşîd), Mah, Zuhre

Mehbûb, bi ronakî û rewşeniyê ve weke stêran e. Çawa di reqs û gera asîmanan de gerestêrk û rojgar dizivirin û stêrkên geş di nav wan de xwûya dikin, her wisa di reqs û semayê de jî, mehbûb, ji yên din têne bijartin û kifşe dibin.

Mehbûb bi 'eynê kewkeb in reqsê ku dê dilber hebin
Sed can giramê min hebin bavême rê erzan e reqs (55/4)

Ji ber sipehîtahî, mezinahî û ronahiya roj, heyv û stêran, mehbûb bi wan re tê wekandin. Çawa ev unsûr ew qas ronak in tu perde nikare şewqa wan binixumîne, her wisa sipehîtahiya yarê jî 'aşîkar e û li her derê tê xwûyakirin. Mehbûb li vir Xwûda ye. Şêwe û remzên wî weke vedana birqê ye. Tecelliya Xwûda dema bêperde li Çiyayê Tûrê daye, çiya ker ker bûye. Tecelliya Îlahî, di dilan de jî tecellî dibe û wê derê jî ker ker dike. Nûr û tecelliya mehbûbê xwe di her tiştî de dide der û bendkirina wê ne mumkin e.

Perdeya mehbûb di nêv qelban ku dê kerker bikit
Qet di perdê xef dibin Xurşîd û Mah û Zuhre ye (93/12)

Tava rojê geş û zelal e û heyv jî şewq û rohniya xwe ji rojê hildigire. Ew îşareta tecelliya Îlahî ye ku li ser sûretan vedaye. Nûranî û rohnîbûna yarê ji ber wê tecelliyê ye. Ji ber wan tecelliyan rûyê mehbûbê ew qas rewşen e, 'aşiq di wê cemalê de stêrên ronak yên weke Zuhre û Muşterîyê dibîne.

Mahitabê afitabê dêm di rojê şebniqabê
Xweş bi çengal û kulabê dil ji min bir dil ji min (82/10)

Zuhra û Mah û Muşterî min dîn li dêmê enwerî
Zulfa muselsel 'enberî ser daye Hewza Kewserê (113/9)

#### 3.3.1.5. Gul, Xonce

Gul, bi reng û bêhna xwe ve bi yarê re têkildar e. Yar jî weke gulên rengîn, bi xeml û rana ye û weke guleke zer, nazik, xonçe ye. Ew pir bixeml û pir biîşwe ne. Yarê bi wan xusûsiyetên xwe ve li ser 'aşiqî tesireke mezin hiştiye û ev kiriye bengiyê xwe.

Bi xeml û reng û re'nayê bi mehbûbê bi zîbayê

Bi ew husna Xudê dayê ji gulrengan gula zerd e (92/12)

Ew nazika nisbet gulê camek ji Kewser da Melê
Mest im ji ber qalûbelê hetta bi roja mehşerê (113/32)

Ew yara weke xonçeya gulê ji ‘aşiqî re her daîm wesileya teselliyê ye. Di nêv îşkenceyên çerxa felekê de, bibîranîna wê tesellî û hêviya xilasbûna derd û îşkenceyan dide ‘aşiqî.

Bîra xwe tînin xonçeyan ‘aşiq di nêv îşkenceyan
Tavête dil pur pençeyan herdem ji nû şunqarê çerx (35/3)

Feryada ‘aşiqî, weke feryad û nalîna bulbulê tê tesewwûrkirin. Gul, bulbul, feryad û nalîn bi hev re têne bikaranîn û rewşa muhebbetê derdikeve meydanê. Bulbul, aşiqê gulê ye û her dem bi nalîn û zarî ye. ‘Aşiq jî weke bulbulê li hemberî yara xwe feryad dike wuslata wê dixwaze.

Bulbulê heyran hezar nale ye wan zare zar
Xonçeleb û gul’izar nazikê zêrîn hezar
Hin geş û hin xonçe ne pêşî yek in xonce ne
Pur sur û pur ‘işwe ne ‘aşiqê husna xwe ne (50/2)

#### 3.3.1.6. Şahbaz, Şahîn, Teyxun

Mehbûb, bi heybet, nazdarî û meşê ve, weke şahbaz û şahînê ye. Mehbûb jî, weke van teyran, nêçîra xwe (‘aşiq) dixe kemîna ‘eşqê, bi naz û xemzeyên xwe yên weke pençeyan, wî digire nav tora xwe û dilê wî hêsîr dike. Şahbaz, şahê teyran e û li ser destan tê girtin. Şahbaz, dema nêçîra xwe digire, wê radikêşe bilindahiyê. ‘Aşiq jî bi girtina destê şahbazan ve, bi vê munasebetê, xwe di mertebeyeke bilind de dibîne.

Ji aliyê mehbûbê ve nêçîrkirina ‘aşiqî û bilindkirina wî, bi goreyî tesewwifê, temsîliyeta seyr û sulûkê dike. Derbasbûna merhaleyan, biha û mertebeya ‘aşiqî bilindtir dike. Sûfiyê bikeve rêya seyr û sulûkê, bi rêberiya murşîdê xwe ji merheleyan derbas dibe, mertebeya wî bilind dibe û ber bi wehdetê ve diçe.

Zihî şahîn û şehbazê bi naz û xemze û xencan
Çi teyxûn bû di perwazê we şîrîn da me ber pencan
Bi remza sihr û î'cazê birim rêza guhersencan (131/15)

#### 3.3.1.7. Şem’

Perwane û şem’, bi hinek xusûsiyetên xwe ve dişibine ‘aşiq û me’şûqê. Mehbûb û şem’, bi ronahî, sipehîtahî û sohtiniyê ve dişibine hev. Şem’, perwaneyê,

mehbûb jî ‘aşiqê xwe di agirê evîna xwe de disoje. Çawa cazîbeya agirê şem’ê perwaneyê ber bi xwe dikêşe, her wisa husn û cemalê yarê jî, aşiqî ber bi xwe ve dikêşe û di agirê evîna xwe de dişewitîne. Cezbeya di navbera ‘aşiq û me’şûq û şem’ û perwaneyê de, bi zatê ezelî ve girêdayî ye. Hêj sifetên zatê lemyezel ‘aşîkar nebûyî, ev xusûsiyet di zatê wî de dîsa hebûne. Bi te’eyyûnan ji hev cuda bûne û dixwazin di zatê qedîm de dîsa bi hev re bicivin. Daxwaza vegerîna ber bi ‘eslê xwe ve bi vê munasebetê tê îzahkirin.

Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
'Aşiq û me'şûq yek bûn şem' û hem perwane bû (104/3)

Têkilîdanîna di navbera şem’ û yarê de, bi meclisê re têkildar e. Yar, bi rûyê xwe yê mehtabî û afîtabî meclisê rohnî dike û dilê ‘aşiqan bi cezbeya ‘eşqê disoje. Di meclisa bêmehbûb de qiymeta ‘aşiqî jî tune. Eger mehbûb nebe, ‘aşiq jî tune, lewra mehbûb cewher, ‘aşiq jî e’rez e.

Were meyxaneyê şahidperesan
Şem‘ê meclis di nebîtin çi kes în (80/8)

### 3.3.1.8. Leyla, Şîrîn, Belqîs

Belqîs, hukumdar û melîkeya Sebayê ye. Bi hêz, quwwet û tesîra xwe ve bi teşbîha yarê wek tevriyewî hatiye bikaranîn. Belqîs, hem bi hukmê xwe ve hem jî bi husn û cemalê xwe ve bala Sûleyman Pêxember kêşabû. Yara hem xweyî husn û cemal hem jî li ser ‘aşiqî hukumdar, bi teşbîha Belqîsê tê bikaranîn.

Min dilberek wek durr heye mehbûb û şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye Belqîssifet mesken Seba (11/4)

Şirîn, mehbûba mecazî ya Ferhadî ye. Şa’ir, mehbûba xwe û Şirînê pêrgî hev dike. Di neqişandina ebrûyan de kesek weke mehbûbê tune, ebrûyên wê jî bêzewal in. Şirîna Derbendê û mehbûbên Semerqendê, yarên mecazî ne û dê husna wan zewal bibe.

Ne Şîrîna li Derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Nekêşayin bi vî rengê li neqşê bêzewal ebrû (106/14)

Leyla, wek kînayewî, temsîliyeta mehbûbê dike. ‘Aşiq, weke Qeysî ye û me’şûq jî weke Leylayê ye. Qeys, ji ber ‘eşqa Leylayê disoje û dikeve çol û çiya û bi serê xwe tenê dimîne. Sohtina ji ber agirê evînê, bi teşbîha Leyla û Mecnûnê tê

sembolîzekirin. Ji ber ‘eşqa Leylayê Qeys ketibe çi rewşê, ‘aşiq jî, ji ber hubba mehbûba xwe ketiye wî halî. Sohtina ji ber agirê evînê, herdu jî bûne weke pêtên êgir.

Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sehlê û suheylê
Muhbeta ‘işqa di Leylê ez kirim yekser pilox (36/7)

#### 3.3.1.9. But, Lat, Senem, Nîgar

Mehbûb ji aliyê rindîtî û sipehîtahiyê ve weke nîgar û seneman e. Çawa senem û nîgar li cem xweyê xwe şirîn in, mehbûb jî li bal ‘aşiqî, weke qend û nebatê şêrîn e. Ew ji bo wî iksîra heyatê ye.

Hêvî û tewqe dikim ez ji xûdana heşemê
Wê nîgar û senem û padişeh û muhteşemê (109/1)

Ellah çi şîrîn î çi nebat î çi heyat î
Mehbûb wekî dîte dibêjim but û lat î
Ya sûretê rûh î tu û ya pertewê zat î
Dîdari me purr dîne li derdê me tu hatî (130/12)

#### 3.3.1.10. Yusûf, Mûsa, ‘Îsa (Mesîh)

Teşbîha yarê bi Yusûf Pêxember re, ji ber spehîtahiya wî ye. Yusûf Pêxember tîmsalê spehîtahiyê ye. Mehbûb, ji aliyê rindî û spehîtahiyê ve Yusûfê dewr û zemanê xwe ye. Her kes heyranê wî ye.

Purs nekir şahê cehanê Yûsufê dewr û zemanê
Ev çi xak e l'asitanê bel esîrek j'ên me ye (97/21)

Mehbûbê, tesîreke mû’cîzewî li ser ‘aşiqên xwe hiştiye. Ji ber vê yekê jî, ew bi vê xusûsiyeta xwe ve weke Mûsa û ‘Îsa Pêxember hatiye tesewwirkirin. Xwûda bi ruhê xwe puf kiriye însên û can daye qefes û bedena wî. Jixwe li vir, xusûsiyetên mehbûba heqîqî li pêş in. Mûsa Pêxember, destê xwe dixiste bêrika xwe, destên wî bi mu’cîzeyê sipî dibûn. ‘Îsa Pêxember jî, bi mu’cîzewî puf dikire miriyan û ew sax dikirin. ‘Aşiq jî, dema yarê dibîne, carek din zinde dibe û can tê bedena wî, lewra ew ji bîmaran re weke Mesîhayî ye.

Zanim ne tenê ku yedê beyda tu didêrî
Wer xweş ke şehîdên xwe ku 'Îsanefes î tu (105/2)

### 3.3.1.11. Saqî

Hestê ‘eşqê, bi mutleqî ji aliyê Xwûda ve ji însên re hatiye dayîn. ‘Eşq û şerab, ji aliyê hişbirinê ve bi hev re têkildar in. Saqî jî, belavkarê şerabê ye. Saqî wek îstî’areyî, temsîliyeta Heqqî dike.

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

### 3.3.1.12. Tûtî

Teşbîha yarê bi tûtiyê, ji ber xeberdana wê ya şirîn, nazik û kubar e. Di dîwana padîşahan de qissebêj, dengbêj û qisseşirîn hene û dîwanê rengîn dikin. Yar jî di seraya padîşahan de ye û xweyî zimanekî pir şirîn e.

Xwoş xeramê ez xulamê nazikê şêrin kelamê
Tûtîya eywan meqamê dil ji min bir dil ji min (82/7)

### 3.3.1.13. Tac

Mehbûb, ji aliyê li ser destgirtinê ve bi tacê re têkildar e. Tac, li ser serê padîşah û melîkeyan heye û îşaretî bijarî û hukumraniyê dike. Yar jî di nav dilberan de weke xaqanekî ye. Ew weke tacekê ye û li ser seran tê girtin. Ew keseke bijarte ye.

Ne tenê rûh î tu rûh û can î
Zîneta husn û sura xûban î
Tacê ferqê serê mehbûban î
Tu li ser dilberan xaqan î (123/6)

### 3.3.1.14. Ahû

Ahû (xezal), ji ber sipehî, zerafet û bidestxistinê zor ve wek îstî’areyî temsîliyeta yarê dike. Ahû siloke ye û heman nayête nêçîrkirin. ‘Aşiqî, di rêya yarê de canê xwe kiriye dane ku mehbûbê ber xwe ve bîne, lê dema yar pê dihese jê dûr dikeve.

Canên xwe me kir dane û dama ku vedayî
Ahûsifet ew pê hissîya rahê Xeta girt (20/6)

## 3.4. Unsûrên Spehîtayiyê di Yarê de

### 3.4.1. Rû/ Dêm /Sîma/Wech

Dêma mehbûbê, hem ji bo sipehîtahiyê hem jî ji bo unsûrên sipehîtahiyê yên li ser rûyî, di edebiyatê de hatiye bikaranîn. Husn û cemalê zatê ezelî, herî sipehî di rûyê însên de û baxusûs jî di rûyê jinan de xwe daye nîşan. Unsûrên sipehîtahiyê yên li ser

rûyê yarê dibe sedema cazîbeya navbera ‘aşiq û me’şûqê. Tecelliya li ser rûyê mehbûbê ji aliyê wehdetu’l-wucûdê ve tê îzahkirin. Herwekî Şebûsterî gotiye: “*Alem, seranser şewqa nûra Xwûda ye*.”[568] Hedîsên ku derbarê tecelliya li ser însên beyanatan didin, yên weke “Xwûda Adem li ser sûretê xwe afirand”, “Xwûda, însan afirandiye û di wî de tecellî bûye”[569], îşaretê bi xuliqandin û tecelliya munezzeh dikin ku ew jî herî sipehî di rûyê mehbûbê de xwe nîşan dide. Dîsa di ayetê de hatiye beyankirin ku: “Hûn berê rûyê xwe bidin kîjan aliyî wechê Xwûda li wê derê ye (Sûreya Beqere, 2/115).” Di derdora van beyanatên Îlahî de ehlê tesewwifê jî di wechên mehbûbê de tecelliyên Xwûda dîtine û ew sipehîtahî wek ‘eksa nûra Heq hesibandine.

'Eksê ji Heq dibînîn li dor wechê mehbûban
Li halekê namînîn ji sirra wan metlûban
Geh dinalîn û geh dixwunîn dûr în ji weslê xûban (132/17)

Hem bedr û hem Zuhra ye dêm ji ‘alema kibra ye dêm
Xweş destxetek tuxra ye dêm herfan ji miskê reş weşîn (79/10)

Dêma yarê, wek teşbîhî û îstî’areyî, ji aliyê xusûsiyetên hevpar ve, bi roj/afîtab, meh, kewkeb, zuhre, fesla biharê û durrê re hatiye bikaranîn. Ravekên weke “wechê afîtab, şubhê mah, dêm kewkeb, dêm zuhre”yê, spîbûn, rohnîbûn û nûraniya rûyê yarê îfade dikin. Roj, hem birqdar e hem jî sohtinak e. Ji ber van xusûsiyetan rûyê yarê wek teşbîhî bi têkiliya rojê ve tê bikaranîn. Di kompozîsyona rûyê yarê de porên wê şeva tarî, rûyê wê jî di nav vê tarîtiyê de mehtabê sembolîze dike. Di tesewwifê de, rû, wehdetê, por jî kesretê sembolîze dike. Birqa li ser rûyê yarê tecellîbûyî, di dilê ‘aşiqî de jî birq dide û wê derê rohnî dike. Ev têkilî jî dibe sedema hubb û muhebbetê.

Wê li wechê afitabê gahê kifş û gahê xef
'Arifên sahib besaret heyyirandin mahê new (103/4)

Hat padişahê pursipah qametelîf dêm şubhê mah
Dad û meded sed ah û ah zulf û ‘eqarib çune ser (43/6)

Weh ku çi şîrînleb in xebxeb û dêm kewkeb in
Kakûl û gîsûşeb in zulm û cefameşreb in (50/4)

Şox û şepala surrperî ebrûsîyeh lebşekkerî
Dêm zuhre ye ez muşterî her telbekar im weqt û gav (65/12)

---

[568] Şebûsterî, b.n.b., r. 29.
[569] Tenik, Tasavvufî Bilgi, r. 161-162.

Fesla biharê û durr, di îfadekirina sipehîtahiya rûyê yarê de wek sembolan, neqş û zînetên yarê yên bêhempa nîşan didin. Çawa di demsala/fesla biharê de tebî'et vedije û bi neqşan gul û çîçek vedibin; her wisa rûyê yarê jî weke fesla biharê her daîm li ser rûyê xwe sipehîtahiyên weke durr û çîçekan muhafeze dike. Dêm û lebên sor, xal û xetên (muyên zer) ku bêhna misk û 'enberê ji wan tê, bi teşbîha fesla biharê hatine beyankirin.

Leyletu'l-Qedr û berat in zulf û cebhet subh û 'îd
Dêm weku fesla biharê lê qiyamet qedd û qam (77/3)

Fexfûrsur e sîmadurr e heybetpur e pur dilgir e
Ew hate meş min çûne heş dil lew ji 'işqê fûri bû (107/4)

Wechê yarê bi gelemperî bi teşbîha meh û hîlalê tê sembolîzekirin. Eniya wê (mehcebîn), birhên wê (hîlal, mahê new) bi şeklên mehê ve têne beyankirin. Têkiliyên di navbera meh û unsûrên yarê yên sipehîtahiyê de, hem ji aliyê zahirî ve hem jî ji aliyê batinî ve hatine çêkirin.

Bi mîzan qewsê mahê new li wechê dilberê min dî
Ji çeşmê goşeyê ebrû bi dûrî cam îşaret kir (42/3)

Bi hemdillah bi feyrûzî li wechê dilberê min dî
Ku mahê new nîşan min dan ji tavê asiman ebrû (108/4)

### 3.4.2. Zulf, Bisk, Gîsu, Kakûl, Turre

Zulf/por, wek mecazeke tesewwifî, di wateyên kesretê de, di 'alemê de tecellîbûna îlahî, bi sifetê zatê Ehed, huwwiyeta xeybî ku gehiştin û îdraqkirina wî nemumkin e, bi tecelliya sifetên Celal û Cemalê Xwûda ve tê bikaranîn.[570] Zulf, ji aliyê bêhn û şeklê xwe ve di nav xeyal, teşbîh û tesewwiran de bûye mijar. Ji ber dirêjahî, xelekbûna wê (çîn çîn), bêhna wê ya misk û 'enberîn, rengê wê yê reş, pejmurde û muşewweşbûna wê, di nav mecaz, teşbîh û tesewwirên zengîn de hatiye bikaranîn.[571]

Zulfa yarê reş e, ji herdu aliyên rûyên wê ve tên xwarê, herwekî tarîtî bikeve ser ronahiyê. Serê zulfên yarê weke herfa dalê dibe xelek û diheje. Li ber bayê seherê diheje û ev hejandina rast û çepî, weke mestîbûn û daxwaza semakirina porê tê xeyalkirin.

---

570 Kaplan Üstüner, *Tasavvuf ve Klasik Şiirimiz*, Akçağ Yayınları, r. 278; Cebecioğlu, "Zülf", h.b., r. 551-552

571 Cemal Kurnaz, *Hayalî Bey Divanı'nın Tahlili*, Kurgan-Edebiyat Yayınları, Ankara 2012, r. 141.

Secdeyan ber eswedê nadim bi sed hecc ekberan
Sond dixûm bi zulfa sîyah ez ‘abidê husna te me (93/20)

Lew seher cewlan didet bayê sebayê rast û çep
Sosin û sunbul bi mestî tên semayê rast û çep (17/1)

Dil ji biska silsilîn bû fir dida xala siyah
Şehperê zulfa şepal û dalê dayê rast û çep (17/3)

Rûyê yarê wehdet û Ke’beyê, zulfa wê jî kesretê sembolîze dike. Dema zulf biheje û bikeve ser wê dêma nûra zelal, ‘aşiq dixwaze bayek ji şimalê ve bê, wê zulfê belav bike û ji ser wê nûrê, tarîtiyê bidete paş. ‘Aşiq, di vê hengamê de maye di kesretê de û dixwaze deriyê wehdetê lê bête vekirin.

Zulf çûne ser nûra zelal carek were bayê şîmal
Biskan ji ser dêmê vemal zulfan ji ser cotê esed (40/5)

Di dîwanê de, bi redîfa “zulf”ê xezelek (xezela 63yem) heye. Ji xeyrî wê xezelê jî, wek ûnsûreke sipehîtahiyê ya yarê, di gelek wateyên sembolîk de zulf hatiye bikaranîn. Di navbera dirêjahiya pora yarê, eziyetên ku ‘aşiq ji destê zulfê kêşayî û cewr û cefayên zulfê yên bêsînor de têkiliyek heye. ‘Aşiq di wê baweriyê de ye ku mesele û hîkayetên zulfê bi qisekirinê xilas nabin. Welûdbûn, bêsînorbûn û watekurahiya zulfa yarê ji aliyê şa’ir ve jî hatiye beyankirin. Eger behsa yek mûyekî zulfa yarê jî bête kirin, qala wê heta sûbê jî xilas nabe.

Şem'i dê can dit ji şewqê bête ber subhê nefes
Narit axir ger bi mûyek behsê zulfa yarî bit (19/4)

#### 3.4.2.1. Teşbîhên Derbarê Zulfê de

##### 3.4.2.1.1. ‘Enber, ‘Ebîr (Zer’enber), Mawer (Mawerd/Gulav), Mulkê Xeten

Bêhna zulfa yarê, wek teşbîhî, bi ‘enber, ‘ebîr, mawerd û miska Xetenê re tê îfadekirin. Têkiliya ‘enber û zulfê, hem ji aliyê rengî ve ye hem jî ji aliyê bêhnê ve ye, lewra pora yarê di edebiyatê de bi rengê reş ve derketiye pêş. ‘Enber jî hem bi rengê xwe yê reş ve hem jî bi bêhna xwe ya xweş ve ji bo zulfa yarê bûye sembolek. Zulfa yarê ji bo ‘aşiqî gîrdabek e. ‘Aşiq dema bikeve bend û tora wê, xilasbûna wî tune. ‘Enber jî maddeyeke zeliqok e û ji vî aliyî ve jî di navbera zulf û ‘enberê de têkiliyek heye.

‘Aşiq dixwaze, zulfa yarê weke hemû tiştên bêhnxweş bêhn jê bê. Eger bêhnên xweş li ser porê bêne werdan, ji wê armoniyê bêhna herî xweş dê derkeve meydanê. Mawerd û ‘ebîr jî, ji wan bêhnên xweş in. Bêhna zulfa yarê ji hemû bêhnan xweştir û hêjatir e.

‘Alemê wêran diken zulfên ji rengê ‘enberê
Çerx û perwazê didin carek li bayê rast û çep (17/4)

Biskên ji herîrê şeke bavê xem û tabê
Zulfên ji 'ebîrê tu ji nû mawerê lê ke (112/2)

Herçendê miska Xetayê ji welatê Xetenê derdikeve jî (misk, ji xwûna navika xezala Xetenê derdikeve), lê dîsa ew li hemberî bêhna wê zulfê ne tiştek e. Hem bi bêhna xwe ve hem jî bi nirxê xwe ve yek tayê/mûyê zulfa dilberê, ji mulkê Xetenê û textê padîşah û paytexta Xetayê hêjatir e. Peyva “Çîn”ê hem ji bo xeleka porê hem jî ji bo welatê Çînê, wek tewriyeyî tê bikaranîn.

Zulfan tu bes çîn çîn bike biskên muqabil dîn bike
Pêşkêşî yek zulfa te bin mulkê Xeten textê Xeta (7/2)

**3.4.2.1.2. Tewaf**

Di edebiyatê de, bi gelemperî dema zulf bikeve ser xalan, ev rewş weke tewafa Beytê tê teheyyûlkirin. Li vê derê tiştekî balkêş heye, kewkeb, qewsê quzeh û lû’lû (rîş, zerzerk, pilpilikên bi benda heyderiyan ku yar bi dersokê ve dikin bi ser eniya xwe ve berdiden xwarê[572]) têne tewafa zulf û xalê. Rûyê yarê ji bo ‘aşiqî weke Ke’beyê ye. Dema pora wê bikeve ser rûyê wê, ‘aşiq, zulfa yarê weke perdeya Ke’beyê teheyyûl dike. Dildayîn û bengîbûna zulfê bi vî awayî tê şirovekirin. Mela ‘Ebdirrehîmê Westanî, dibêje ku kewkeb, qewsê quzeh û lû’lû, wek kînayewî ji bo heqaîqên me’arifên qelbî hatine bikaranîn.[573]

Kewkeb û qews û quzeh hem lû’lû’ bendê heyderî
Tên tewafa zulf û xalên dilrubayê rast û çep (17/8)

Hecc, salê carekê çêdibe. Di wê tewafê de yar xwe bêperde nîşanî ‘aşiqî dide. ‘Aşiq li wê hêviyê ye ku sala heccê were û qet nebe salê carekê jî be, ew zulf û xala yara xwe ziyaret bike û wê tewaf bike. Hecc, ji bo ‘aşiqî, fesla gehiştin û wuslatê ye.

Çûbû 'umrim d'vê xiyalê ma şevek 'îdan di salê

---

[572] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.1, r. 342-343.
[573] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c.1, r. 343.

Bêm ziyaret zulf û xalê roj û şev min ev du'a ye (96/22)

### 3.4.2.1.3. Mar, 'Eqreb (Duvpişk)

Mar, ji bo zulfa yarê wek muşebbehûnbih tê bikaranîn. Ji ber rengê xwe yê reş, bi dirêjahî, bi şeklê fetlokî û xingelokî û bi zehr û kujeriya xwe ve ji bo pora yarê bûye mijar.[574] Bisk û keziyên yarê, bi şeklê xwe ve weke mara reş in. Dema xunav û jale li ser rûyê yarê çêbûn, ew weke misk û gulavê bi ser bisk û keziyên yarê yên reşemarên hûrr/harr ve jî dirije û tê xwarê. Dema yar dimeşe, keziyên wê weke marên xûşende, bêhna herîr û 'ebîrê li derdora xwe belav dikin.

Çîçek û gul sehergehan nesterînên di xergehan
Têkî ji misk û mawerê mar e xunav jale kir (41/3)

Neyşekkera ji rengê durr nêrgiza bi remz û sûrr
Ser kemmilîn du mar di hûrr pê dikûjit Melayekî (128/5)

Qewsê te hilalî bi delalî keşiha
Bejna te ji şengî bi derengî meşiha
Marê ji herîrî di 'ebîrê xuşiha
Mawer bû ji wan zulfê di zengî weşiha (130/1)

Mar, bi jehra xwe ve namdar e. Çawa nêçîra xwe digeze zehîra xwe berdide bedena wî û wî bêhereket dihêle, 'aşiq jî, ji destê evîn û dilberê weke nêçîra zehîrkirî ye. 'Aşiq, ji aliyê kezî û biskên yarê ve hatiye girêdan û bêhereketkirin. Bisk û keziyên yarê bi dirêjahiya xwe ve jî balkêş in. Keziyên yarê, bejna yarê ya selwî dorpêç kirine û bi ser bedena wê, heta xwarê hatine û di bejna wê de wenda bûne.

Xef bûn di nêv tora qizil îlanmîsalê ser li mil
Kuştîn û zehr avêhte dil hêj kuştiyên remza berê (113/30)

Fetlên siyah marên şevîn reyhan bi dor serwan çevîn
Axir bi selwê da revîn xef bû di tayê çenberê (113/29)

Mar, wek kînayewî, ji bo keziyên yarê hatiye bikaranîn. Keziyên wê, weke reşmarên di navmilê Dehhakî de hatine teheyyûlkirin.[575] Dehhaq, di edebiyata farisî de sîmgeya xirabiyê ye; hêzên xirab, di şeklê Dehhak de mucesem bûne. Dehhak, bi xapandina Îblîsî (Ehrîmen), bavê xwe Mîrdasî dikuje. Bi hîlekariyê, navbera herdu milên wî radimûse û di wê derê de, du mar derdikevin û dewamî wî diêşînin.[576] Bi vî

[574] Harun Tolasa, *Ahmet Paşa'nın Şiir Dünyası,* Atatürk Üniversitesi Yayınları, Ankara 1973, r. 495.
[575] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.2, r. 160-161.
[576] Yıldırım, "Dahhak", *Fars Mitoloji Sözlüğü*, r. 227-230; Gölpınarlı, b.n.b., c. 1-2, r. 154-155.

awayî, di edebiyata klasîk de kezî, mar û ramûsan wek tenasûbî bi hev re dema bêne bikaranîn ev bûyera mîtolojîk wek telmîhî derdikeve meydanê.

Herdu îlanên te di min toqê gerden kin medam
Da me her bêtin tebessum wek gula Dehhakî rûh (33/11)

Duvpişk, bi duvê xwe yê xwehr, bi zehr û kujeriya xwe ve, bi têkiliya zulfê, wek teşbîhî tê bikaranîn.[577] Serê bisk û kakulên yarê xelek xelek in. Hem ji aliyê şeklî ve hem jî ji aliyê tesîrê ve di navbera zulf û duvpişkê de têkilî hatiye danîn.

Hat padişahê pursipah qametelîf dêm şubhê mah
Dad û meded sed ah û ah zulf û ‘eqarib çune ser (43/6)

Zulfên but û şîrînleban jehrî ne şubhet ‘eqreban
Lê min ji biska purgirî îro tinê girtin du ta (7/4)

#### 3.4.2.1.4. Huma

Huma, di edebiyatê de sembola mezinahî û bilindahîyê ye. Siya humayê, tê wateya dewlet, talih, bext û bereketê.[578] Zulfên dilberê, bi çeng û perên humayê hatine teşbîhkirin. Di navbera huma û zulfê de wechê şebehê heye. Herdu jî temsîliyeta bereket û si’ûdiyê dikin. Wek efsanewî tê îfadekirin ku huma teyrê dewletê ye. Siya vê teyrê bikeve ser milê kê, dê deriyê îqbalê lê vebe û dê ew bibe xweyî si’ûd û dewletê. Dema ba li zulfa yarê dide û dihejîne, biska wê weke perê humayê, deriyê îqbalê li ber ‘aşiqî vedike û ew dikeve cezbeyê û radibe semayê.[579]

Sayenumayê cebhetê neqş û xetê ji qudretê
Nuqte û herf û cezbe tê bal û perên humayê zulf (63/2)

Bal û perên sifethuma saye li cebhetê numa
Xemrî û zulf çûne sema yek bi yek ew li payê zulf (63/3)

#### 3.4.2.1.5. Kemîn/Dav

Çengel, wek îstî’areyî ji bo xeleka serê zulfa yarê hatiye bikaranîn. Xeleka serê zulfê wek amûrekî davê ‘aşiqî hêsîr dike û ji xwe re dike nêçîr. Zulf ew qas kemîneke dijwar e ku ancax ew dikare dilê ‘aşiqî nêçîr bike. Zulf, wek ûnsûreke ‘eşqê ji aliyê

---

577 Abdullah Eren, *Şeyhülislam Yahya Divanı’nın Tahlili*, Erzurum Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Bilim Dalı, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Erzurum 2004, r. 459.
578 Abdulhakim Kılınç, *Fuzûlî’nin Türkçe Divanı, Edisyon Kritik ve Konularına Göre Fuzûlî Divanı*, İstanbul Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Bilim Dalı, Yayınlanmamış Doktora Tezi, İstanbul 2017, r. 299.
579 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.3, r. 52.

meşşateyê (berbûk/xemilkar) husna ezelî ve hatiye afirandin. Serê zulfa ku li ber cênîkan dialiqe, weke serê çengelê ye. ‘Aşiq bi wê çengelê ve hatiye nêçîrkirin û ev jî wek teşbîhî, girêdayîbûn û êxsîrbûna ‘aşiqî nîşan dide. Ew dilê ku bûye meftûnê ‘eşqê, yanî ketiye benda dava zulfê, ji bo xelasbûnê tiştek ji destê wî nayê. Ew bi kemenda evînê ve hatiye girêdan.

Meşşateyê husna ezel çengalê zulfan tabi da
Da 'işqê hilbit pêli pêl qelbê Melê cellabi da (2/1)

Dil bendê dava zulfekê keftî kemenda ulfekî
Hel fî yedî’l-meftûni şey ew keyfe esne‘ ya feta[580] (7/3)

Belga gulê, wek îstî’areyî rûyê yarê ye û li ser wê belgê jî xala yarê heye û ew xal û nîşan weke ‘enberê ye. Xal, hem bi reşahiyê ve hem jî bi bêhna xwe ve weke ‘enberê tê teheyyûlkirin. Dil weke teyrekî, bi êma xalê tê û dikeve tor û benda zulfê û bi wan xelekan ve tê girêdan û ji aliyê nêçîrvanê ve tê girtin û hêsîrkirin. Xalên yarê dane; zulfên wê kemîn û dilê ‘aşiqî jî teyr e ku dikeve wê davê.

Îro li ser belgê gulê zulfan ji ‘enber dav veda
Her ro xeyalek tê Melê bayê şemalê kir belav (65/1)

Şahibaz er çendî perwazê bi bala te bêt û ret
Dê di nêv tora te bêt û seydê şunqarê te bî (116/13)

#### 3.4.2.1.6. Senceq/Lîwa

Zulf, ji ber hejandina li ber bi bê, wek lîwaya artêşa ‘eskerî tê teheyyûlkirin. Lîwa li jor tê girtin û zulfa yarê jî li ser serê wê ye û li jor e. Yar, bi unsûrên xwe yên spehîtahiyê ve weke artêşa ‘eşq û evînê ye. ‘Aşiq jî, hêsîr û bendeyê ‘eşqê ye, ji aliyê yarê ve hatiye hêsîrkirin.[581]

Rûm û ‘Ecem ji her teref ceng û sewaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber liwayê zulf (63/7)

#### 3.4.2.1.7. ‘Aşiq

Xusûsiyeteke zulfê jî perîşan û tarûmarbûna wê ye. Bayê sabayê dema tê, wê diêşîne û belav dike. Zulf, wek belavbûyî û muşewweş tê teswîrkirin û bi vî awayî di navbera dil û zulfê de têkiliyek heye ku dilê ‘aşiqî jî bi tesîra zulfa yarê berbelav e.

---

[580] Wate: “Ez dikarim çi bikim? Ew kesê bûyî meftûnê ‘eşqê ji destê wî tiştek nayê.”
[581] Melike Erdem Günyüz, *Ahmedî Divanı’nın Tahlili,* İstanbul Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Eski Türk Edebiyatı Anabilim Dalı, Basılmamış Doktora Tezi, İstanbul 2001, r. 484-485.

Zulfa perîşan, di tesewwifê de wek mecazî, tecelliyên zatê Ehediyetê yên gûnagûn/reng reng/cure cureyî jî sembolîze dike. Tecelliyên zatê Ehediyetê di ‘alemê de reng bi reng belav bûne.[582]

Îro ji derba xencerê lazim bi êşan î Mela
Teşbîhê zulfa dilberê zanim perîşan î Mela (12/1)

### 3.4.2.1.8. Toqê Gerdenê, Zunnar

Zunnar, çara pişta keşîşan e. Bi dirêjahî û rengê xwe yê reş ve, bi temsîliyeta kufrê ve, di navbera zulf û zunnarê de têkiliyek tê çêkirin. Zunnar, li ser navtenga keşîşî wek toqekê tê girêdan. Zulfa yarê ya dirêj û xelek jî ji ‘aşiqî re weke toqa gerdenê ye. Toqa ‘eşq û evînê ji aliyê mehbûbê ve ketiye stûyê ‘aşiqî û ew çawa bixwaze, ‘aşiqî wisa hereket dike. Îradeya ‘aşiqî ji destê wî hatiye standin; jixwe di ‘eşqê de îrade tune ye.

Toqê gerden helqeya zunnarê zulfa yara min
Dê kilîta kelbê 'işqê helqeyê zunnarî bit (19/6)

### 3.4.2.1.9. Bedbextî û Bext Girêdan

Rûyê yarê, bi rewneqî û ronahiya xwe ve bextiyariya ‘aşiqî ye. Zulfa yarê dema bikeve ser wê ronahiyê bextê ‘aşiqî jî tê girtin. Dûrketina ji ber deriyê mehbûbê ji ‘aşiqî re sebeba nalîn û efxanê ye û ev jî dibe sedema bextreşiya wî. Eger di seherê de yar bê û ‘aşiq bi hatina wê nehese, xwe bêbext dihesibîne û ew bextreşî jî weke reşahiya zulfa yarê pir zêde ye.

Me ji zulfên di siyah reştir bext
Seherê bêt perî bê nehesîn (80/7)

Di biskên yarê yên du ta de, gelek girê û xelekên xwar hene. ‘Aşiq jî bedbextî û bêsi’ûdiya xwe weke zulfa yarê xweyî girê û nerast/xwar dibîne. Ew ji ber firqeta yarê xwe bedbext dihesibîne û her daîm dilê wî xemgîn e. Di vir de wek îstî’areyî behsa sihr û efsûniyê jî tê kirin. Sêhrdar, dema li ser yekî sêhrê çêdike, bextê wî dide girêdan û girêyan li tayan û mûyan dide.[583] Li vir jî bextê ‘aşiqî bi girêyên zulfa yarê hatiye girêdan. Eger yar rehmê lê bike û wan fetl û girêyan veke dê bextê wî yê reş jî vebe û wuslat peyda bibe.

---

[582] Şimşek, “Zülf-i perişan”, b.n.b., r. 399.
[583] “Ji şerê sêhrbazên ku di girêbendan de puf dikin.” (Sûreya Feleq, 4). Sêrbaz, bi çêkirin û pifkirina di girêbendan de zerarê diden mirovan. (Şoşikî, b.n.b., c. 6, r. 844-845.)

Me ji biskên te girihdarê ji bextê me girî ne
Me ji zulfên bi xem û tab di dil da xem û tab e (94/24)

#### 3.4.2.1.10. Şev, Zulmet û Reşatî

Zulf, bi goreyî rengê xwe, bi "kakûl û gîsûşeb, biska siyeh, zulfa reş û hwd." ve hatiye wesifkirin. Zulf, bi rûyê yarê yê rohnîdar ve, bi têkiliya nûr û zulmetê ve û bi tezadî ve tê bikaranîn. Rûyê wê, 'alemê weke rojê rohnî dike û zulfa wê jî 'alemê di tarîtiyê de dihêle. Di tesewwifê de zulfa yarê weke çarekî reş e ku bi ser rûyê yarê ve tê xwarê û husn û cemalê wê vedişêre. Bayê seherê zulfê dihejîne, tehrîk dike. Yanî 'alema kesretê bi tecelliyên Heq re hereket dikin. Pêwîst e salik, ji 'alema kesretê derbas bibe bigehije 'alema wehdetê. Lewra muhebbeta kesretê heweseke demdemok e. Di vê derbarê de zulf, weke hewa û kesretê hatiye tesewwirkirin.[584]

Weh ku çi şîrînleb in xebxeb û dêm kewkeb in
Kakûl û gîsûşeb in zulm û cefameşreb in (50/4)

Biska siyeh re'na ye mest yek dî bi heyran lê vewest
Hemyan bi mestî helqe best der bendê ew zulfa reş în (79/6)

Saqî ku dê mehweş bitin kakul ji şêva reş bitin
Qerqef bila ateş bitin em dê bi wê dil kîn 'îlac (31/2)

#### 3.4.2.1.11. Herfa Lam û Dalê

Zulfa yarê weke zincîrê dirêj û xelekkirî ye û dil û 'eqlê 'aşiqî bi xwe ve girêdaye. 'Aşiq bi zulfa yarê ve tê daliqandin û canê xwe teslîm dike. Çînçînbûna zulfê, weke zincîrekê û xelekbûna wê jî weke çengelekî dikeve dilê 'aşiqî, wî qeyd û bend dike. Serê zulfa yarê weke herfên "lam û dal"ê çengel û xelek e. 'Aşiq tê û dikeve wê bendê û bi wan çengelan ve tê girêdan.

Dil ji biska silsilîn bû fir dida xala siyah
Şehperê zulfa şepal û dalê dayê rast û çep (17/3)

Cebhet û dêmê ji qudret lê nivîsî herf herf
Kakulan ta ta li ser herfan kişandî lam lam (77/7)

#### 3.4.2.1.12. Sihrê Samirî, 'Eyyarî

Di edebiyata klasîk de yar sêhrdar e. Bi sipehîtahî û cazîbeya xwe ve 'aşiqên xwe teshîr dike.[585] Bi girê û bendan sêhr tê çêkirin. Di sêhrbaziyê de ji amûrên ku têne

[584] Üstüner, b.n.b., r. 280.
[585] Canım, b.n.b., r. 110.

bikaranîn yek ji wan jî tayê/mûyê zulfê ye. Samîrî, di serdema Mûsa Pêxember de jiyaye û bi sêhrê ve li ser însanan gelek tesîrdar bûye. Benîîsraîlî, ji rê derxistine. Samirî zêrker bûye û zêrên îsraîliyan helandine û ji wan re, ji zêrî peykerekî golikekî çêkiriye.[586] Dema Mûsa ji Çiyayê Tûrê vegeriyaye ew tawanbar kiriye û darizandiye. Samîrî, ji Mûsa Pêxember re weha gotiye: "*Ew melekê ku hat cem te, min li cihê pêyên wî, kulmek ax hilda xiste nêv maya heykelî. Borînkirina vî heykelî ji ber wê ye*."[587]

Di teshîrkirinê de yar û Samirî weke hev in û herdu jî di karên xwe de serkeftî ne. Ev cihê yar lê bit û zulfên xwe yên reş nîşanî 'aşiqî bide û kakûlên wê yên 'eyyarî û sêhrdar rabine reqs û semayê, ji bo dilgirtin û teshîrkirina 'aşiqî bes e, êdî ne hewce ye ku weke Samîrî sêhrbazî bêne çêkirin.

Hewce sihrê Samirî nînin ku zulfan reş biken
Çeşmê benda dilrubayan kakula 'eyyarî bes (52/7)

#### 3.4.2.1.13. Zêr û Herîr

Ji aliyê nermbûnê ve di navbera zulf, bisk, gîsû û herîrê de têkilî hatiye danîn. Kezî û biskên yarê ew qas nerm û hilû ne, weke herîrê/ermûşê ne. Çi xweşikahiyên neqş û xemilandinê hebin hemû di zulfa dilberê de têne xwûyakirin. Zulf û perçemên wê, ji ava zêrî hatine xemilandin. Hem ji aliyê biriqandinê ve hem jî bi nexşên ku li ser eniya wê hatine çêkirin, weke xeml û neqşên zêrîn têne dîtin.

Bisk û gîsu ji herîr in qesîr in turre û zulf
Ne ji kafûr e beden xalê ji miskê Teterê (126/14)

### 3.4.3. Çav (Çe'hv/Dîde/Çeşm/ 'Eyn)

Çav, bi peyvên "çehv, dîde, çeşm û 'eyn"ê di dîwanê de bi gelemperî bi birh û mijangê re hatiye bikaranîn. Çav, ew unsûrê herî sipehî yê yarê ye ku mehbûb, bi çavan 'aşiqan cezb dike, dilê wan ji wan distîne, birîndar dike û dixe bin tesîra xwe. Ji ber vê yekê, wek sehhar û cadû tê wesifandin. Yar, bi çavan tesîrî aşiqî dike û eza û cefayan bi wasitaya wan dide aşiqî. Birh, di destê çavan de kevan, xemze û mijang tîr û xedeng in. Yar bi wî awayî tîran li sing û dilê aşiqî diweşîne. Çav, mexmûr û şehla ye û bi şeklê xwe ve jî bi teşbîha nêrgis û herfa sadê ve tê sembolîzekirin. Çavên yarê reş in û surmekirî ne. Çav di tesewwifê de, wek "beser", sifetê Xwûda ye. Xwûda bi wê sifetê,

---

[586] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 357-358.
[587] Gölpınarlı, b.n.b., c. 1-2, r. 275.

kêmasiyên salikî dinixûmine û salikî jî bi vê yekê xeberdar dike.[588] Di sembolîzma tesewwifê de çav, ji bo salikî sîlaha herî tesîrdar e ku wî ber bi masîwayê ve dikêşe. Xwûda, ‘eksa cemalê xwe xistiye çavê mehbûban û wezîfe daye çavan ku ji bo îmtîhanê, ‘aşiqan ber bi kesretê ve bibin.[589] Eger yar ji masiwayê û ji mehbûbên beşerî derbas bibe, dê bigihije wehdetê.

Dê du sîyeh surmeyê çehvên xwe kit
Xakê rehê yarê saba her sebah (32/5)

Nûrê çeşmê me ku ‘alem me bi çeşmên te didîn
Li cemalê xwe te wek dîdeyê bê nûri kirin (78/4)

Ji re‘na nêrgizên şehla mecalê hemqeran bînim
Hezar remz û îşarat in ji wan qewsên çevan ebrû (108/6)

#### 3.4.3.1. Tesewwir û Teşbîhên Derbarê Çavî

##### 3.4.3.1.1. Nêrgis, Şehla, Mest û Mexmûr

Çavên mexmûrî, mest û şehla, temsiliyeta bêrehmî û bêşefqetiya yarê dike. Ew çavên şehla û mexmûr, dema li ‘aşiqê xwe dinêre wî jî nexweş dike û dixe bin tesîra xwe. ‘Aşiq, birîndarê çavên şehla û mexmûr e, lêbelê ew ketiye firqetê û di narê firqetê de şewitiye. Çawa bulbul ji ‘eşq û evîna gulê dîn û har bûye, ‘aşiq jî ji destê wan çavên şehla û mest, ji xwe çûye û dîn bûye.

Bihtir bi rehm û şefqe bî b'şîrê te da perwa nebî
Mexmûrê çavên şehle bî sotîne narê firqetê (125/6)

Nêrgiza nazikqed û şehla ye mest
Dîn kirim ez bulbulan sewda gul e (99/10)

Di navbera nêrgis û çavî de, ji aliyê şekl û mestiyê ve têkiliyek hatiye dayîn. Nêrgis wek nebateke xewanînê tê bikaranîn. Mestbûn û şehlabûn xusûsiyetên nêrgis û çavî yên hevpar in. Ji mestbûnê re, çavên yarê yên şehla û nêrgisî besî ‘aşiqî ne.

Kes nedye sehergeh ku çi nazikweres î tu
Me j'belgê gul û nêrgizên sermesti bes î tu (105/1)

Ji re‘na nêrgizên şehla mecalê hemqeran bînim
Hezar remz û îşarat in ji wan qewsên çevan ebrû (108/6)

---

[588] Canım, b.n.b., r. 65-67; Nejat Sefercioğlu, *Nev’î Divanı’nın Tahlili*, Akçağ Yayınları, Ankara 2001, r. 167.
[589] Tarlan, b.n.b., r. 54-55.

#### 3.4.3.1.2. Sehhar, Cadû, Xemmaz (Fettan, Fitneengîz)

Çavên yarê bi sêhrbaziyê ve serkeftî ne û ‘aşiq teshîr kirine. Di heman demê de fettan in jî dilê ‘aşiqî dide ber tîr û xedengan û wê derê tar û mar dike. Çav, bi remza ebrûyan, mujganên weke tîran û kaşuwan, li singê ‘aşiqî dide û dil û cegerên wî pare pare dike.

Du zulfê 'enber'efşan in du le'lê şekkerestan in
Du çeşmê sihrê fettan in dilê min wan xedeng danê (111/16)

Sehharê cohtê caduwan îro ji remza ebruwan
Dil girt û da ber kaşuwan ker kir li miskînan kebed (40/6)

Çav, mekanê fitne û xemmaziyê ye. Hêstirên çavên aşiqî, rewşa wî beyan dikin. Ji bo aşîkarkirina sirrên ‘aşiqî hewceyê xemmaziyê nîne. Ji bo navderketin û beyankirina sirrên ‘aşiqî “eşk” bes in, ji bo belavkirina van, hewceyê çavên xemmazî nîne. Çav, sebebên fitne û alozîyê ne. Çav, bi tîr (mijang) û kevanên (ebrû) xwe ve, amade ye ku fitneyê derxe û di dilê ‘aşiqî de bibe sebeba şer û tarûmariyê. Sedema tarûmarbûna dilê ‘aşiqî, çavên yarê yên cadû û fitneengîz in.

Razên me çi hacet weku xemmazî bizanin
Eşkên me bes in dîdeyê xemmazî çi hacet (21/7)

Sewaşek rêhte dîsa ‘alema dil
Bi cadûyê du çeşmê fitneengîz (46/10)

#### 3.4.3.1.3. Esed/Şêr, Piling

Çav, weke şêr û pilingekî nêçîrvan, wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. Şêr û piling, di nêçîrê de nêçîrvanên hêzdar û serkeftî ne. Mehbûb jî di nêçîra ‘eşqê de weke wan hêzdar e. Ew jî ‘aşiqên xwe dixe dava xwe û bi dest dixe. Di nêçîra şêr û pilingan de pençe û neynokên/kullabên wan di bidestxistina nêçîrê de giring in. Ew, bi wan pençeyan nêçîra xwe ji hev dikin. ‘Aşiq jî ber çavên yarê yên weke cohtê esed û pilingan di halekî wisa de ye.

Cohtê esedan pence li ser sîne nihandin
Kullabi gihandin dil û hestî herişandin (81/3)

Ji ceger Mela pilingan bi kulabê pensi bi ker kir
Esedan ji pence vêran dil û sîne herişandin (86/6)

#### 3.4.3.1.4. Sad, ‘Eyn

Herfa sadê û ‘eynê, ji ber şeklên xwe temsîliyeta çavî dikin. Giroveriya serê herfan û badana goşeyên wan dişibine çavan. Herfên ‘eyn û sadê wek sembola çavan di edebiyata klasîk de bi berfirehî hatine bikaranîn. Di beyta jêr de peyva “eyn”ê tewriyewî hatiye bikaranîn. Hem di wateya çavî de hem jî bi herfa “eyn”ê ve hatiye ‘emilandin. Gezme, sertîr in û îşaretî mijangên yarê dikin. Dema dilber goşeyên çavên xwe weke kêşana kevanê li aşiqî badide, tîjawirên weke gezme û sertîran, ji wan celladan tên û di dilê ‘aşiqî de diçikin.

Gezmeyên 'eyn û sadan b’îşaret remz û sirr in
Kişandin goşe badan mehbûb di tîjawir in
Tîrê di wan celladan batin di dil difirrin (132/23)

### 3.4.4. Birh/Ebrû

Ebrû, wek unsûreke sipehîtahiyê, bi mecaz û metaforên dewlemend ve, di dîwanê de weke peyv û ravekên “ebrûhilal, qews, qewseyn, qabê qewseyn, qewsê ebrû, qewsê hilalê, qewsên çevan, qewsê şevîn, qewsên Şîrazî, qewsê eswed, qewsê nûbaran, qewsê duhilalan” hatiye bikaranîn. Birû, bi reng, şekl û cohtbûna xwe ve wek îmajeke balkêş e. Bi taybetî dema çav wek qatîl û kujerekî tê tesewwirkirin, birû dibe kevan û tîrên mijangan û xedengan bi ser qelb û dilê ‘aşiqî re direşîne û diweşîne. Rû, dema bi teşbîha Ke’beyê/qibleyê bête tesewwirkirin, birû, dibe mihrab û rû dema mishef be, birû jî dibe besmele.[590]

Birh, bi teşbîha mihrabê ve sembola qurbiyetê/nêzîkahiyê ye. Secde li ber mihrabê tê kirin û cihê ku ‘evd/’abid herî nêzîkî Xwûda dibe dema secdê ye. Mihrab û secde îşareta nêzîkahiya Heqq in. Bêyî tefekkûra Heqq, berêxwedana mihrabê tê zemm/rexnekirin û ‘aşiq û ‘arifê ku bi tefekkûra Heqq teweccuhî ebrûyên yarê bibin ku birh sembola nêzîkahiyê ye, ew karên wan têne medihkirin[591]

Senemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman ji burcê mîzan bi xezeb li min kişandin (86/1)

Qibletî wechuke fî kulli sebahin we mesa'
Bi du ebruyê te cana dixurim ez qesemê (109/13)

Wê sipîde ji burcê qews ebrû numandin mahê new

---

[590] Sefercioğlu, b.n.b., r. 161.
[591] Üstüner, b.n.b., r. 274.

Xweş ji qewsê ebruyan wê kişandin mahê new (103/1)

### 3.4.4.1. Teşbîh û Tesewwûrên Derbarê Ebrûyê de

#### 3.4.4.1.1. Hîlal/Mahê New

Têkiliya di navbera birh û hîlalê de hem zahirî ye hem jî batinî ye. Şeklê wê yê qewsî weke mihrabê hatiye teheyyulkirin. Armoniya rûyê yarê, digel çav û birhan, nîşanên tecelliya nûra Heq in. Birhên yarê bi destê qudretê ve weke mahê new hatiye kêşandin. Hîlal, dîtina hindik ya yarê jî tîne bîr, lewra li ser rûyê yarê yê afîtabî, wenda dibe. Dema zulfa yarê weke şev û ‘ewran bête teheyyûlkirin, birhên yarê jî weke hilalê tê dîtin. Mahê new, bi şev (zulf kete ser rûyî) derdikeve û bi derketina seherê jî dîsa wenda dibe. Geh derketin û geh wendabûna wê, ‘arifên xweyî besîretan dixe heyretê. Ev xusûsiyet, weke sirrekê tê dîtin.

Wê sipîde ji burcê qews ebrû numandin mahê new
Xweş ji qewsê ebruyan wê kişandin mahê new (103/1)

Wê li wechê afitabê gahê kifş û gahê xef
'Arifên sahib besaret heyyirandin mahê new (103/4)

Heyv, bi veguherîna şeklê xwe ve zemên temsîl dike û zemên nîşan dide. Destpêk û dawîbûna mehê bi şeklên wê têne zanîn. Hatina ‘eydê jî bi vî awayî tê zanîn. Herwekî tê zanîn ku ‘aşiq bi hestên ku ji rûyê yarê hilgirtî, ji xwe re weke şahiya ‘eydê teheyyûl dike. Dîtina birhên yarê û teheyyûlkirina wek hîlalê, îşaretê bi wuslatê û hatina ‘eydê dike. Herkes ji bo ku bizane meha Remezanê xilas bûye û destpêka ‘eydê ye, li hîlalê dinêre; lê armanca nêrîna ‘aşiqî ew e ku di wî şeklê heyvê de birhên yarê teheyyûl bike û bibîne. Dema ‘eyd tê, ‘ewr/zulf/kesret belav dibin û birhên yarê weke meha nû xwûya dibe. Birhên yarê, di tesewwira ‘aşiqî de, ji hîlala ‘eydê fezîlettir e, lewra ‘eyd salê du caran tê, lê her dîtina ebrûyên yarê ji wî re ‘eyd e.

Ger ne teşbîhê du burhên te bitin
Me di ‘îdan bi hîlalê çi xerez (57/2)

‘Îd e û da ‘alemê bangê sefayê xas û ‘am
Mahê new ebrû numandin çû ji ber ‘ewrê xemam (76/1)

#### 3.4.4.1.2. Keman/Kevan, Qews, Qabê Qewseynê

Qews, kevan û birûyên kevankî ne. Birh, mijang û çav bi hev ve girêdayî ne. Çav serokê wan e û dema bixwaze êriş bike, wek amûran birh û mijangan bi kar tîne.

Dema çav weke qatîl û kujeran bête teheyyûlkirin, amûrên wê yên şerî, birh û mijang in. Di vê êrişê de birh, weke qews, kevan û xencerê tê dîtin. Birhên weke qewsên ji qudretê, Nîşanî/Mela ji xwe re kirine hedef û tîrên yengî yên perweş û xedengan, bi ser wî ve dibarînin. Dema mehbûb li ‘aşiqî tê xezebê, ji kemanên birûyên xwe tîrawiran diweşîne.

Birhên te qewsê qudret nîşane kir Nîşanî
Lami‘ ji ber dibarin çi yengîyek weh perweş (53/14)

Ê diye ew bi xwe carek di 'ecêb im ku bi hiş tê
Te ji wan qews û kevanan çi xedeng in te bi weş tê (122/2)

Senemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman ji burcê mîzan bi xezeb li min kişandin (86/1)

Raveka qabê qewseynê (hindê nêzikiya du kevanan), ji ayeteke Qur’anê[592] hatiye wergirtin û di îşareta meqama qurbê, nêzikahiya wehdetê ji kesretê îfade dike. Di edebiyata tesewwifê de “qabê qewseyn”, daîreya wucûb û îmkanê, wehdet û kesretê beyan dike.[593] Qabê qewseynê wek remz û nîşanekê, delaletî nêzîkahiya wîsala mehbûbê dike.

Ji mabeyna du ebrûyan dibînim qabê qewseyn
Te'alallah binê remzê çi reng avête mabeyn (89/1)

#### 3.4.4.1.3. Mihrab, Qible, Secdegah

Di edebiyata tesewwifê de rû weke Ke’beyê tê tesewwirkirin û pîroz e. Ke’be, meqam û qibleya ‘îbadetê ye. Berê qible û secdegehan ber bi wî ve ye. Di edebiyata tesewwifê de jî mehbûb her Xwûda ye. Çawa zahid û sofî berê xwe didine mihraba mizgeftê; ‘arif jî berê xwe dide mihraba ebrûyên yara xwe. Lewra di nezera ehlê ‘irfanê de Heq, di rûyê însên/mehbûban de tecellî bûye. Ebrûyên yarê, di hişmendiya ehlê tesewwifê de weke mihrab, secdegeh û qibleyê hatine dîtin û di ‘alema me’newiyatê de ehlê ‘irfanê bi vê teheyyûlê çûne secdeyê. Di vê teheyyûlê de jî dîsa tesîra wehdetê wucûdê heye. Bi goreyê ayetê ku wechê Xwûda li her derê ye, ji bo ‘aşiq û ‘arifên

592 “Bi qasî nêzîkahiya du kevanan bû, yan jî hîn nêzîktir bû.” (Sûreya Necm, 53/9). Cebraîl, di sûretê Benîademiyan de dihate cem Pêxemberê Xwûda. Pêxemberê Xwûda (sxl.) jê xwest ku ew xwe di sûretê tê de xuliqî, nîşanî wî bide. Li şikefta Hîrayê, li rexê rojhilat derketiye û xwe nîşanî Pêxember daye. Ev ayet behsa wê nêzîkahiyê dike. (Şoşikî, b.n.b., c.6, r.289-291.)
593 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 330-331; Kaşanî, “Kab-ı kavseyn”, b.n.b., r. 449.

Rebbanî, secdebirin li ber birhên yarê û li ber mihrabê weke hev e, bes tenê bila di pêşiya xwe de tecelliyên Xwûda bibîne.

Sofiyê xilwetnişîn bîn di sucûd
Herdu birhên te ne mihrabê du‘a (3/2)

Di batin secdegaha min ji bo wê herdu ebrû ne
Bi 'eynê taqê mihrab in di 'ilmê ehlê hal ebrû (106/11)

Da ji mihraba du ebruyan secde bit Eswedhecer
Dil bi mîzan mahê new ebrû numayê rast û çep (17/2)

'Işq û cemal l’yek zêde bit xal eswed û dêm qible bit
Pêşber du nûnan lê secde bit vêkra biwêrin suhbetê (125/9)

#### 3.4.4.1.4. Terazî, Tuxra, Mohr/Xatem

Burca mîzanê wek kînayewî, ji bo eniya yarê tê bikaranîn. Di vê burcê de herdu kevanên birhên yarê jî wekî kevên/ezmanên mîzanê/terazuyê têne tesewwirkirin.[594] Birhên yarê weke kevên şihînê/teraziyê, li hemberî hev disekinin. Ezmanên teraziyê, ciwaniya yarê dide kêşan.[595] Hêja û ciwaniya yarê bêqusur e, lewra kevên teraziyê jî weke hev in. Yar di ciwanî û sipehîtahiyê de bê qusur hatiye afirandin. Ev wekheviya wan kevên teraziyê, îşaretê bi çêkirina destê qudretê dike.

Senemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman ji burcê mîzan bi xezeb li min kişandin (86/1)

Heyîv bû ew zulmatê dixum sondê bi ayatê
Ku nûrê da semawatê esed hat rastê mîzanê (111/20)

Guhersenc in di husnê da du ebrû mislê mîzanê
Du şehla bûn di qewsê da giranser bûn di kêşanê
Hilalan goşe çûn pê da du sunbul rast û çep danê (131/16)

Tuxraya padîşahan, bi şekl û bi rengê hibra reş ve, wek îstî’areyî, bi sembola ebrûyên yarê hatiye bikaranîn. Li ser hukm û fermanên sultan û padîşahan tuxra/mohr dihate kêşandin û bi vî awayî xwediyê fermanê ‘eşkere dibû. Yar jî, sultana mulkê husnê ye. Ew jî di mulkê husnê de hukumdar e û bi hukm û fermanên xwe tesîrê li ‘aşiqên xwe dike, wan dixe bin hîmayeta xwe. ‘Aşiq, li ser sûretê yarê ayetên husnê

[594] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 3, r. 196-197.
[595] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 4, r. 13-14.

dixwîne û birhên wê jî wek mohrekê lê didene zanîn ku ev ayetên husnê, tecelliya kaniya cemalê ezelî ye.

Tenê ma her terazû ne di babê husnê dikêşanî
Hilalê xatemê husn î li ew dêmê bi xal ebrû (106/7)

Çi beratê husn e ya Reb bi nişanê padişahî
Bi teref du turre tuxra û bi mawerê reşandin (86/3)

#### 3.4.4.1.5. Qedeh

Di navbera qedeh/fincana meyê û birûyên yarê de ji aliyê şekl û îmajan ve têkiliyek tê dayîn. Palderê ‘eşqê ji bo ‘aşiqên heqîqî celal, cemal û kemal e. ‘Aşiq, dixwaze her daîm bi van unsûran re hemhal bibe û di destê wî de fincana meyê hebe. Rûyê dilberê, wekî taqeheyvê spî û zelal e, birûyên wê wekî heyva yekşevî zirav in. Birûyên wê di qodik û ayîneya meya safî û zelal de ji ‘aşiqî re aşkere dibe.[596]

Di nav avê de daxwaza dîtina hîlalê, yek ji wan rêyan bû ku rojên mehê (destpêk û dawîbûn) bizanin. Firaxek bi avê dihate tejîkirin û berê xwe didane ‘esmanê ku heyvê di nav wê avê de bibînin.[597] Rûyê yarê ji bo tecelliyên Celal û Cemalê ezelî wekî qedehekê ye. ‘Aşiq dixwaze di wê qedeha spî û zelal de ‘eksa cemalê safî bibîne. Li ser wê zelalbûnê birûyên yarê jî weke hîlalê xwûya dikin. Di nav aveke/qedeheke zelal de çawa heyv bi ‘eksa xwe nîşan dide, herwisa rûyê yarê jî aveke saf û zelal e û birûyên wê jî di nav de, ‘eksa hîlal û mehtabê ne.

Me lew fincan li ser dest e ku mehtaba hilalebrû
Numayin min di mir'atê meya safa zelal ebrû (106/1)

Werîn cama hilalî da ji ‘eksê mahê new bînî
Ku xanê mihr û terkê çerxê û xwanê roze xaret kir (42/2)

Bi mîzan qewsê mahê new li wechê dilberê min dî
Ji çeşmê goşeyê ebrû bi dûrî cam îşaret kir (42/3)

#### 3.4.4.1.6. Şev, Eswed, Siyah

Têkiliya şev, eswed/siyahê bi ebrûyên yarê re, ji aliyê rengî ve ye, lewra birûyên yarê reş in. Reşahî, bi munasebeta zilm û eziyetê jî tê bikaranîn. Mehbûb, bi gezmeyên qewsê şevîn dilê ‘aşiqî birîndar dike. Munasebeteke din a di navbera wan de ew e ku Heceru’l-Eswed jî reş e û di diwarê Ke’bê de ye, yanî ber bi qibleyê ve ye.

---

[596] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 4, r. 6-8.
[597] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 2, r. 245.

‘Armanca ‘aşiq û ‘abidî ew e ku berê xwe bidin wê mabedê. Ke’be, eswed, mihrab, qible wek tenasûbî û tevriyewî bi vê têkiliyê ve têne bikaranîn.

Gezmeyek qewsê şevin aşiq bi nêva dil kevit
Dê ji can destan bişot xasma kevan nûbarî bit (19/8)

Îhram me best eswed bû qest yar hate mest ez çûme dest
Cohtê hebeş tîr dan bi weş hecca me xweş mebrûri bû (107/17)

Tîr dane qewsê eswed e şehzadeya şîrînqed e
Kuştîne wek min dused e wê padişah û beglerê (113/2)

**3.4.4.1.7. Nûn**

Birh, bi şeklê xwe ve dişibe herfa nûnê. Goşeyên wan birhên weke hilalê bi zêrî hatine neqişandin. Mehbûbê dema weke heyva nû, goşeyên herdu birhên xwe dihejîne, ev wek îşareta havêtina tîran tê tesewwirkirin.

Mil dizanim dane ber qewsê hilalî goşezer
Lew ji bala goşeyên nûnan livandin mahê new (103/5)

**3.4.4.1.8. Ne’l**

Ebrûyên yarê bi şeklê xwe ve dişibe ne’lê û wek teşbîhî di dîwanê de cih girtiye. ‘Aşiq, bi meha nû re dipeyive û di navbera wê û ebrûyên yara xwe de wekhevîyekê teheyyûl dike. Heyva nû, xwe bi mutewaziyê girêdide û xwe di ‘eyarê ebrûyên yarê de nabîne. Di heqîqetê de ‘aşiq dixwaze bibêje ku tu tiştek weke unsûrên yarê yên spehîtahiyê nîne. Tu tişt di ‘eyarê wê de tune ye. Li ber spehîtahiya yarê, heyva nû jî weke nala hespê ye.

Min go mehê new çaşinîyê ebrûyê yar î
Go min hed e ez şubhetê ne'lê feres im ez (48/5)

Di dîwanê de bi redîfa “ebrû”yê xezelek heye (xezela 106em). Di vê helbestê de, xusûsiyetên ebrûyê bi berfirehî wek îmaj, mezmûn û sembolan hatine beyankirin. Rûyê yarê weke heyvê (mehtab) û birhên wê jî weke hîlalê (hîlalebrû) ne. Rû, a’yîneya tecelliyên sifatên Xwûda ye û ji ber vê yekê şeklên qudretê yên weke mah û hîlalê li ser rûyî têne dîtin. Ebrûyên yarê, bi îşareta xuliqandina saf û zelal, tuxraya sultanî, meh, hîlal, nîşana qabê qewseynê, xatema husna ezelî, mihrab û secdebirinê, reng û neqşê bêzewal, di vê xezelê de hatine bikaranîn.

Me lew fincan li ser dest e ku mehtaba hilalebrû
Numayin min di mir'atê meya safa zelal ebrû (106/1)

Te şîrînî te zîbayî te reftarî te balayî
Bînin nûnên di tuxrayî li bala herdu xal ebrû (106/2)

Ne Şîrîna li Derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Nekêşayin bi vî rengê li neqşê bêzewal ebrû (106/14)

Nişana qabûqewseynê ku qews avête ebsaran
Di teqwîma tecellayê li ser lê bûn hilal ebrû (106/15)

### 3.4.5. Mujgan (Mijang)

Mijang, di edebiyata tesewwifê de wek têgeheke mecazî, di wateya îhmalkirina 'emelên salikî û adabên terîqetê de tê bikaranîn.[598] Mijang, yek ji wan unsûrên spehîtahiyên yarê ye û wek amûrên êrişê yên yarê cih girtiye. Çav, birh û mijang bi hev re têkildar in û wek tenasubî têne bikaranîn. Çav, weke tîravêjî bête teheyyûlkirin; birh dibine kevan û mijang jî dibine tîr û xedeng. Hejmara zêde ya mijangan û rastrêzbûna wan a weke yekîneyên leşkerî, weke artêşekê tê dîtin.

Hedefbûna tîr û peykanan, îşareta qurbiyetê ne. Eger her daîm mehbûb, bi wan mujgananên weke tîr û peykanan êrişî 'aşiqî bike û wî birîndar bike, 'aşiq jî wek bîmarekî yarê dê xwe bextiyar bihesibîne ku haya yarê jê heye û nêzikî wî ye. 'Aşiq, ji yarê dixwaze ku mehbûb dilê wî yexma û talan bike û her roj bibe qurbanê yarê û bîmar û birîndarê yarê bibe, bes tenê bila yar ji wî dûr nekeve.

Ê goyê meydanê te bit wek min di zindanê te bit
Serbendê çewkanê te bit mecrûhê peykanê te bit
Yexma û talanê te bit her roj qurbanê te bit
Bîmarê mujganê te bit daîm di fermanê te bit (125/10)

Kuştim bi derba keyberan gezme û xedeng û awiran
Remz û işarat û suran dan dil ji nêva pencerê
Ew gezmeyên wek şûr û tîr recm û bela jê têne jêr
Hindî ku dilber têne seyr her wê ev e kirdarê çerx (35/10)

#### 3.4.5.1. Teşbîh û Tesewwirên Derbarê Mijangê de

##### 3.4.5.1.1. Cellad, Tîr (Xedeng, Peykan, Gezme), Keyber, Mizraq, Xencer, Şûr, Rim

Mijangên yarê herî zêde bi teşbîha tîr û xedengê têtê bakaranîn. Çav wek tîrawir û tîravêj; birh wek kevanekê bête teheyyulkirin; mijang jî dibine tîr, xedeng, gezme,

[598] Tarlan, b.n.b., r. 312.

peykan, mizraq, rim û peykan. Hem bi şeklê xwe ve hem jî wek amûrekî şerî yê birîndarkirin û kuştinê, mijang, wek xencer û şûrî jî hatiye teheyyûlkirin.

Ne tenê gezme dibarin me ji qewsê du hilal
Me ji mujganê sîyeh têne ceger tir û xedeng (71/9)

Ez im amancê wan tîran ji peykanan û sertîran
Bûyim polad li ber şîran seraser mam têk gerde (92/9)

Xencer û tîr û teber barîn şibê berq û burûsk
Misriyan lami‘ ji elmasan didayê rast û çep (17/5)

Kirim amancê mizraqan di dil dan tîr çûn faqan
Bi celladê xwe ew xaqan dibêjit hêj tu xencer da (92/5)

### 3.4.5.1.2. Per/Çeng

Şeklê mijîlangan/mijangan bi tevahî dişibe per û çengên ajalên firinde.[599] Awirên dilberê weke tîran e. Mijîlangên wê weke perran e, lewra tîravêjên berê, perê teyran li paşiya tîrê ve dikirin ku ew rast biçite hedef û armanca xwe.[600] Mijangên yarê weke tîr û xedengan, lib lib û ta ta hatine rêzkirin û bi çevandina çavên yarê, amade ne ku bi ser dilê ‘aşiqî bêne reşandin û weşandinê.

Ê muşterî dêmê zerî nebir serî ney can berî
Bavêt serî gava berî lazim herî wî ev perî
Telbê di rê nîşanberê tîrawirrê mujgînperrê
'Işq û surrê behr û berrê avêhte rê ser ma qeleq (67/4)

### 3.4.6. Xemze (Awir)

Xemze; çavkirin, çavşikandin, awir, îşaret û nîşanên çav û birûyan e.[601] Di tesewwifê de wek têgehekê tê wateya tesîra Heqq, cezbe û feyza batinî û tecelliya masîwayê.[602] Xemze, nêrîna yarê ya birîndarnak û hîddetkar îfade dike. Yar, awirên xwe wek sîlaheke tesîrdar, li ser ‘aşiqê xwe bi kar tîne û wî birîndar dike. Awirên yarê weke elmasa tîj û kûjer in.

Bibêjin xemze elmasê bi zimzim bîne şehkasê
Ku hel kit me'neyên asê fe ya heyya lena hat (23/9)

---

599 Hinek şîrovekaran peyva “mujgînperê” bi wate û teşbîha “perî”yê ve bi kar anîne. Ev peyv wek tevriyewî, hem di wateya “periyê” de hem jî di wateya “perr/çengê” de dikare bête bikaranîn. Muhemmed Emin Doskî di wateya “perî”yê de bikaraniye. (Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 666-667.)
600 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 89.
601 Melayê Cizîrî, b.n.b., (ferheng), r. 426.
602 Üstüner, b.n.b., r. 284.

Xemze, îşaret û nîşanên mehbûbê jî beyan dikin. Hinek awirên wê bi peyv û teşbîhan nayêne îfadekirin. Wateya wan ji dilê ‘aşiq û ‘arifan têne wergirtin.

Ji remzên xemzeçalakê bi dil dê bête idrakê
Me’an lem yes’e'hel-lefzu min deyq’il 'îbarat[603] (23/12)

Mehbûbên mecazî, caran dibine sebeb ku ‘aşiq bi masîwayê ve bêne girêdan. Çav û awirên mexmûr û sahir ên şox û dilberên bêeman û bêmerhemet vê tesîrê li ser ‘aşiqan dikin. Di sembolîzma tesewwifê de xemze, tecelliya masîwayê ya herî tesîrdar û mezin e ku salikî sewkî masiwayê dike. Xemze, cehd û xîret dike ku salikî ji rêya Heqq vegerîne. Xemze caran ew qas tesîrdar e, çawa zuhd û teqwaya Şêxê Sen’an û Bersîsê ‘Abid berhewa kirî, herwisa zuhdê çilsaliya ‘aşiqî jî bi yek xemzeyê ser û bin dike, li ber hewayê berdide.

Turkê xwûnrêzî xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çil sal e li min zêr û zeber kir ji esas (51/9)

Xemze în ya gezme în ya tîri ya sihrê helal
Sahir în ya çeşmê şoxê Turkê bê perwa sti în (83/6)

### 3.4.7. Enî/Cebhet

Rûyê yarê weke Ke’beyê tê dîtin. Enî jî, ji wê parçeyek e. Zulfa wê weke perdeya Ke’bê ye, dema ji ser cebhet û dêmê perde rabe, se’y, tewaf û ‘umre li haciyan dibe ferz.

Cebhet û dêm û gerdenê perde dema ji ber biret
Ferz e Mela li haciyan se‘y û tewaf û ‘umre ferz (56/8)

Qibleya ehlê dilan ger bikitin keşfê cemalê
Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê
Kî bi dil kafir e secde nebitin cebhet û xalê
Ya nedit şehde bi ayatê di wê weqt û mecalê (122/3)

Eniya yarê, ji ber geşbûnê (rewneqî, rewşenî) wek şefeq, stêr û heyîvê (enîmah) tê teheyyûlkirin. Di dîwanê de bi gelemperî eniya yarê, wek parçeyeke rûyî, bi rûyî re hatiye bikaranîn. Rûyê yarê weke stêr, Zuhre û Perwînê ronak e, cihê rûyê yarê lê bête dîtin êdî hukmê ronahiya roj û heyîvê namîne. Cebhetê yarê û zulfa wê, bi têkiliya zulmet û nûrê wek îstî’areyî hatiye bikaranîn. Dema zulf li ser dêm û cebhetê xwe dide

[603] “ Ji ber watetengiya îbareyan, kelîme, ji îfadekirina daxwazên me re kêmar û ‘aciz in.”

paş, zulmet belav dibe û li ser wê nûrê unsûrên rûyî yên mayî jî wek xetên nûkêşandî xwûya dikin.

Yarê me pur nîşan û sur sîma ji dur dêm kewkeb e
Ew lebşeker nazikbeşer cebhetseher kagulşeb e (100/1)

Ji şefeq Zuhre xuyabit tu binî Perwînan
Cebhetê ew binumêt tu ji Meh û Xawer meke behs (27/14)

Cebhet û dêm neqqişand misk û zebad lê reşand
Nûr ji zulmetê reşand taze kişande xet bi xet (60/3)

**3.4.8. Xal/Nîşan**

Xal, nîşan û şanikên li ser rûyî ne. Rengê wê reş e (xal'enber, xala siyah, xaleswed, xalfilfil, xalhebeş), bêhna wê weke bêhna misk û 'enberê ye. Di tesewwifê de wek mecazî tê wateya Zatê Îlahî, huwiyeta wî ya xeybî, 'alema xeybê, reşahiya gunehan û di meqama îstîxnayê de, di behra wuslatê de xerqbûna murşîdê.[604] Xalên yarê, digel unsûrên spehîtahiyê yên rengreş, yên weke çav, birh û porê ve ahengekê pêk tînin. Xal li ser rûyê yarê wek unsûreke cezbeyê, dilê 'aşiqî dixe davê û ber bi xwe ve dikêşe. 'Aşiq, weke teyrekî teme'kar wê xalê weke daneyekî dibîne û dikeve tora yarê.

**3.4.8.1. Teşbîh û Tesewwûrên Derbarê Xalê de**

**3.4.8.1.1. Nuqteya Wehdetê ya Heqq, Herfên Mishefê**

Rûyê yarê mushefa husn û cemalê ye. Xal û xet, tecelliya sûretên wî cemalî ne. Meşşateyê husna ezelê bi mîzaneke harîkulade xalên yarê li ser rûyî neqişandine. Ayetên li ser mushefê têne nivîsîn bi murekkebê bi xetên herî xweş dihatine nivîsîn. Ji aliyê rengê xal û nivîsên mushefê û ji aliyê batinî ve jî wek watedariyê di navbera wan de têkilî hene. Herdû jî îşaretê bi husn û cemalê ezelî û bi wehdeniyeta Xwûda dikin. Ayetên li ser sûretê mehbûbê ku xal yek ji wan ayetan e, bête xwendin ji xeyrî tewhîdê pêştir tiştekî beyan nakin.

Mishefa husn û cemalê sûreta xal û xetan
Ma telewna xeyre herfin la we Qur'anin Mecîd (39/11)

Hûn bibên meşşateyê xef danîye
Hemqiran kir xal û nîşanê xelet (61/10)

---

[604] Cebecioğlu, "Hal, Hal-i Siyah", b.n.b., r. 189; Üstüner, b.n.b., r. 273-274.

#### 3.4.8.1.2. Ke’be, Qible

Ebrûyên yarê bi şeklê xwe ve wek mihrabê tên teheyyûlkirin. Ev mihrab qible ye û ev jî Beytu’l-Heram e. Xal, nêzikî ebrûyan bibe qible dibine dudu û ev jî qibleya yekem ya musilmanan Beytu’l-Meqdîsa Qudsê ye. Di vê wechê de ji ‘aşiqî re du caran li ber wan mekanên pîroz secdebirin dibe ferz. Dema rûyê mehbûbê wek Ke’be/qibleyê bête sembolîzekirin; xalên wê dibine Heceru’l-Eswed. ‘Aşiq, hem li ber wan mihraban diçe secdeyê hem jî Berê Reş tewaf dike, herwekî çûyî ‘umreyê.

Xal eger bi wechekî bête qiranê ebruwan
Şubhetê Beytê Meqdes Ke‘be dibin du qible ferz (56/6)

'Işq û cemal l’yek zêde bit xal eswed û dêm qible bit
Pêşber du nûnan lê secde bit vêkra biwêrin suhbetê (125/9)

Secdeya ber nûn û dalan min tewafa zulf û xalan
Ew bes e j'sahibcemalan da biçîn lê 'umre ye (97/13)

#### 3.4.8.1.3. Filfil, ‘Enber, Hebeş

Rûyê mehbûbê wek sofreyekê bête teheyyûlkirin, xalên wê jî, bi şekl û rengê xwe ve weke libên filfilê têne dîtin. ‘Enber jî, hem ji aliyê rengî ve hem jî, ji aliyê bêhnê ve temsîliyeta xalê dike. Rûyê yarê spî ye û zulf, birh û xalên wê, li ser wê dêma spî, ji ber reşatiyê wek hebeşiyan tê teheyyûlkirin.

Dîsa ji dest wan sorgulan per can ji xal û fulfulan
Perde ji tayê sunbulan bend bû ji dava bendîyan (90/2)

Dêmfener e xal‘enber e bûmawer e lebşeker e
Ew meyperest meşha û mest cama di dest ferfûri bû (107/6)

Hûrîweş e şirînmeş e kagulreş e xalhebeş e
Xalên di qer miskê Teter nazikbeşer kafûri bû (107/2)

#### 3.4.8.1.4. Dane

Husn û hubb, ji yek zatî derketine. Bayê evînê di navbera wan de muhebbetek peyda kiriye. Me’şûq kiriye nêçîrvan û ‘aşiq jî bûye nêçîr. Me’şûq, bi zulfan, davê li ber ‘aşiqên xwe vedide ku wan bixe tora evîna xwe. Xalên yarê jî weke daneyên li ber davê (zulf û xal) têne teheyyûlkirin. ‘Aşiq dema temahkariyê bike, di nav zulfên muşewweş de bixwaze wan daneyên ku li derdora dafikan reşandî bi dest bixe, dikeve wê dafikê û tê hêsîrkirin û bendkirin. Zulfa yarê bi çengela serê xwe ve weke herfa dalê ye. Zulf dema bikeve ser xalê wek dîmeneke davvegirtinê li ber çavan ‘eyan dibe.

Bayê evînê ku livî hatin li ser zulfan çivî
Herdem hezar dil da kevî xalan di damê dane da (9/45)

Daneyên ‘enber li nesrînan reşandî xali xam
Sosinên nazik li ser xalan çevandin dami dam (77/1)

#### 3.4.8.1.5. Gul, Nesrîn, Misk

Xala yarê, bi bêhna xwe ve weke bêhna gul, nesrîn û miskê ye. Dêmên yarê weke gula sor in û xal jî di nav vê gulê de cih digire û weke bêhna wê bêhn dide derdora xwe. Miska Teterê ya reş, giranbaha ye û ew jî layiqî yarê ye. Xala yarê jî, hem bi rengî ve hem jî bi bêhnê ve weke miska Teterê ye.

Bi xalên werd û nesrînan ji qudret xet kişandî lê
Bi terha nêrgiza ‘êlî sehergahan nesîm lê da (5/36)

Bisk û gîsu ji herîr in qesîr in turre û zulf
Ne ji kafûr e beden xalê ji miskê Teterê (126/14)

#### 3.4.9. Dev û Lêv/Leb

Dev û lêv, bi gelemper bi hev re hatine bikaranîn. Wek unsûreke yarê ji xwe bi hev ve girêdayî ne. Lêvên yarê bi gelemperî bi şekl û rengê xwe ve bûne mijar. Xusûsiyetên wê yên sereke reng û şirînahiya wê ye. Leb, wek mecazî, di lîteratûra tesewwifê de tê wateyên tûnebûn, wehdet, fenafillah, neş’e û feyzên me’newî û kelama Heqqiyê.[605] Herdu lebên yarê dema bikevine ser hev, bi biçukahî û nazikiya xwe ve wek nuqteyekê tê xwûya kirin ku ew jî nuqteya ‘ilmê ye. Nuqte, di ‘ilmê tesewwifê de destpêk û dawîbûna herfan e. Hemû herf ji nuqteyan pêk tên. Sûretê hemû heyînan di ‘ilmê Xwûda de te’eyyûn dibin. Ev te’eyyûn dibe sebeb ku hebûn xwûya bibe û derkeve meydanê. Hebûna heqîqî ya Xwûda ye. Nuqte, ew “te’eyyûna zatî” ye û ‘alem jî nuqteyek ji ‘ilmê wî ye.[606] Herfa elifê sembola Zatê Ezelî ye. Di alfabeya ‘erebî de herfa duyem jî “bê” ye û ev jî te’eyyûna sanî ye ku wek qelem û Heqîqeta Muhemmedî tê îzahkirin. Di vê mertebeyê de nav û sifet ji hev veqetiyane û te’eyyûnê/tenezzûlê mertebeyan bûne.[607]

Lebê le'lên te du bê herdu bi yek nuqteyê 'ilm in
Li xetê herfê elîf cezbe şubê helqeyê bab e (94/21)

---

605 Üstüner, b.n.b., r. 267.
606 Cebecioğlu, “Nokta”, b.n.b., r. 375.
607 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 292-295.

### 3.4.9.1. Teşbîh û Tesewwirên Derbarê Dev û Lêvê de

#### 3.4.9.1.1. Şeker/Qend û Nebat, Şerbet

Dev û lêv, bi ‘ilm û vegotinê ve têkildar in. Gotinên yarê ji ‘aşiqî re her daîm xweş tên. Bi vê têkiliyê di navbera şeker, qend û şerbetê de wek mecazî teşbîhek hatiye tesewwirkirin. Xeberdan û sozdayîna yarê weke şikenandina şekirî hatiye tesewwûrkirin. Gotinên wê ji qend û nebatê jî şirîntir in. Dev û lêv di qurbiyetê de temsîliyeta wuslatê jî dikin. ‘Illet, dax û birînên ji ber evînê ku di dilî de çêbûne, ew lêv (wuslat) nebin, tiştek din ji wî re nabe derman.

Veke lêvê û ji nêvê biwerîn qend û nebat
Ji lebê le‘lêşekerbêj û ji şekker meke behs (27/2)

Sohtin û derdê evînê 'illetê dax û birînê
Xweş dibit ma ew bi dînê şerbeta lêvan mufa ye (95/2)

Bi lebê le‘lê şekerxende şikêna şekerek
Ene bi’l-we‘di le wasiq fe leha’l-we‘du wesîq[608] (66/4)

#### 3.4.9.1.2. Le’l, Bade/Mey

Lebên yarê bi rengê xwe ve weke kevirên le’l in û bi hêjaya xwe ve jî weke gewheran giranbiha ne. Di nav gewheran de ya herî giranbiha lêvên wê ne. Di navbera qedeha şerabê û lêvê de jî, ji aliyê rengî ve têkildariyek heye. Herdu jî sor in, lêbelê di soratiyê de ji lêvan sortir tiştek nîne. Dema ferqa di navbera badeya tirî û ava selsebîlê de -ava beheştê ye-, bête zanîn, dê qedeha şerabê ji lêvên yarê şerm û fedî bikin. Dê qedeha şerabê bizane ku lebên yarê di soratiyê de di asta herî bilind de ye.

Mexlûq ji miskê reng cesed dindan û lêv le'l û bered
Peyda nîye ew reng çu qed ne mexrib û ne şerqîyan (90/8)

Nazik û xûb û zerê rengmelek in surrperî
Dêmdurr û leb gewherê lê bibe can muşterî (50/5)

Lew ji lebê le‘lê te bû cam xecil
Badeyê engûr kuca selsebîl (72/3)

Bade/mey, wek îstî’areyî bi teşbîha lêvên yarê ve têne bikaranîn. Dev jî weke dilopeke meyê tê teheyyûlkirin. Qedeha lebaleb bi meyê tejîkirî weke devê yarê tê dîtin. Lebên yarê, ji şerabê spehîtir û tesîrdartir e. Lêvên/devê qedehê jî

608 “Ez ji wê sozê bawer dikim, lewra ew sozên xwe bi cih tîne.”

teşneyê/têhniyê lebên yarê ne û dixwazin yar wê qedehê bibe ser lêvên xwe. 'Aşiq, mexmûrê vê meyê ye û dixwaze meyê ji wan lêvên le'lîn vexwe û meyperestiya wan jî, ji wê tê. Li nik 'aşiqî şerbeta lêvan ji heyatê û badeya lebên le'lî jî ji ava heyatê çêtir û hêjatir e.

Da binoşim mey ji lêvê mawera reyhan û sêvê
Lû'lûwên şekker di nêvê abê heywan çeşme ye (97/24)

Şerbeta lam û bêyan ez bi heyatê nadim
Badeya le'lê bi ava zulûmatê nadim (75/1)

### 3.4.9.1.3. Xunçe, Huqqe, Mîm

Lebê xunçe, di wateyên feyzên me'newî û kelama Heqqiyê de hatiye bikaranîn. Behskirina 'işraqî û ilhamî vê yekê beyan dike. Devê yarê, bi biçûkahî û giroveriya xwe ve dişibe xunçeya gulê. Dêmê yarê dema weke gulê bête teheyyûlkirin, devê wê jî di nav wê gulê de xunçe ye. Meyla însên ya gulzarê ji ber van teşbîhan e.

Min bi îşraqê sualek ji lebê xunçe guşa kir
Go bi îlhamê dizanî di suala te cewab e (94/5)

Horî û şehzadeyek dêmgul û lebxunçeyek
Bo rêyên Heq şîweyek naz neman xunçeyek (50/4)

Lebên yarê di edebiyata klasîk de bi teşbîha le'l, yaqût û xonceyê tê îfadekirin. Devê yarê jî bi biçûkahiyê ve weke nuqte, xunçe, zerre û herfa mîmê tê tesewwûrkirin.[609] Devê yarê, ji aliyê rengî ve weke yaqût û le'lê, bi canbexşînê ve weke ava heyatê, bi şeklî ve weke herfa mîmê ye. Devê yarê, weke qûtiya durr û gewheran e. Gotin û sozên yarê yên weke durr û cewheran, zimanê wê yê şekerîn û didanên wê yên mircanî, di nav wê 'elbikê/huqqeyê de têne parastin.

Mîmi ya yaqûti ya serçeşmeyê abê heyat
Huqqeya durdaneyê ya le'lê şekkerxa sti în (83/7)

### 3.4.9.1.4. Ava Heyatê, 'Îlac

Lêv, ji 'aşiqî re weke kaniya ava heyatê ye. Ava heyatê li welatê zulûmatê heye û ew jî bi tenê bûye nesîbê Xizir. Ew lêvên weke ava heyatê ji dax û birînên 'aşiqî re derman in. Dilê 'aşiqî ji aliyê yarê ve hatiye birîndarkirin. Di 'eşqê de derd û derman jî ji mehbûbê tên. Ew dermanên ku ji aliyê hekîmên mayî ve ji 'aşiqî re weke 'îlacê

[609] Canım, b.n.b., r. 87.

têne tewsiyekirin, ancax birîna wî zêde dikin. Mîzaca dilê birîndar, cewabê nade wan dermanan. Dermanê dilî, lebên le'lî yên yarê ne, eger ji wan binoşe dê birîna wî kew bigire.

Çeşmeya ava hayatê şerbeta qend û nebatê
Min li daxan ew mufa tê can ji bo şukrane ye (97/25)

Dil ji 'îlacê ku biderket mîzac
Dê ji lebê noşî 'eta bit 'îlac (30/1)

### 3.4.10. Çene (Zenexdan, Zeqen)

Zenexdan û zeqen, wek mecazên tesewwifî, tên wateya mekanê lezzeta rûhanî û mulahezeya ji muşahedeyê hasilbûyî. Ev terîm, derbarê lutfa mehbûbê û di muşahedeya Heqq de û di dijwariya têgihiştina sirran de jî tê bikaranîn.[610]

Ava heyatê li welatê zulûmatê ye. Eger ji wê tarîtiyê xilas bibin, ava heyatê tê bidestxistin. 'Aşiq ji zulûmatê (bengîtiya zulfa yarê) xilas dibe, lê bendên pêşiya wî xilas nabin û ew dikeve "çaha" zeqenê û ber bi helakbûnê ve diçe. Ji bo rizgarbûnê, dîsa daxwaza lebên le'lî dike. Zenexdan ji bo têgihiştina serekahniya ava heyatê (dev û lebên yarê) pêleyek e. 'Aşiq ji bo ku ji ber tîr û awirên yarê birîndar nebe, dixwaze di zenexdana yarê de (kurta çeneyê) xwe veşêre û bigihije lêvan. Eger zulfa yarê bikeve ser rûyê wê yê bedrî û ew di nav wê zenexdanê de xwe veşêre an jî di nav mûyên wê yên xubarî de xwe veşêre û xwe nedete ber çavên yarê, dê bikare bigihije ava heyatê. Dilê ku kete dava zulfê, bi ketina çala zeqenê rizgar dibe. Dil dema bendê zulfan be, xeyala çala zeqenê dike. Di navbera çala çenê û fikr û ramanên kûr de têkilî tê çêkirin. Di rêya seyr û sulûkê de ev jî derbaskirina merhaleyekê ye. Hêngê diçe perdeya li ser sirran radibe û salik zanist û agahiyên kûr bi dest dixe. Çala çenê jî, weke zulfê, masîwayê temsîl dike û masîwa jî, ji bo salikê tor û dav in.

Çendekî taqet didêrim bim xubar bedrê veşêrim
Ger ji çehvan ez biwêrim min zenexdan telbe ye (97/23)

Ez ji zulfa te verestim me teleb kir lebê le'l
Lê ti çaha zeqenê bê ser û pa çûme helek (70/14)

[610] Üstüner, b.n.b., r. 276-277.

### 3.4.11. Gerden

Gerdena yarê, wek unsûreke spehîtahiyê, temsîliyeta nêzikahiya yarê dike. Balkêşiya wê, ji reng û ziraviya wê tê. Rengê gerdenê weke hestiyê fîlê (‘ac) spî ye. Di dîwanê de, gerdena yarê, weke ravekên “gerdenbilur, gerdenzirav, gerdengaz, gerdenxefîf”ê hatiye bikaranîn. Spîbûn, dirêjahî û ziraviya gerdenê cazîbe û spehîtahiyekê dide yarê. Peyva “gerdengaz”ê di nav çand û kultura rojane de jî cih girtiye. Gaz, alava pîvanê ye û wek kînayewî ji bo dirêjbûna gerdenê hatiye bikaranîn.[611]

Hetta bi nûra badeyê rengîn nekî siccadeyê
Dûr î ji wê şehzadeyê durdaneya gerden ji 'ac (31/6)

Ji dest şêrîn û nazekê rimbazi teyrendazekê
Kuştime gerdengazekê min ş’kestiye ejnû û gav (65/16)

### 3.4.12. Yed/Dest û Enguşt (Tilî)

Dest, nezaket, zerafet û spehîtahiya yarê nîşan dide. Destê yarê, wek “yedê beyza/destê sipî”yê hatiye teheyyûlkirin. Ev teşbîh hem ji aliyê rengî ve hem jî ji bo xwestina bilindkirina şanê wê hatiye bikaranîn. Ji keramet û hal û rewşên harîkulade re yedê beyza hatiye gotin. Ev ravek ji bo mu’cîzeyeke Mûsa Pêxember hatiye bikaranîn.[612] Yedê Beyza, di tesewwifê de wek sembola tecelliya quwwet û qudreta Îlahî tê îfadekirin.[613]

Ji husna wê tecellayê yedê beyda û balayê
Çi wesfan bêm xeber nayê welê dil cezbeyê dayê (124/5)

Vexwarina ji qedeha ‘eşqê, perderakirina ji ser sirran û rewşenbûna ‘alemê, dermankirina birînan bi yedê beyzayê pêk tê. Ev îfadeyên ku derbarê yedê beyzayê de hatine beyankirin, tecelliya destê qudretê û îradeya kullî nîşan didin.

Me ji destê yedê beyda qedehek noşî û bes
Şe‘şe‘anîyyê ke necmin bi senayê we berîq[614] (66/2)

Wer ji ber perdê yedê beyda bi mu'ciz bête der
Şems û kewkeb dê hilên alem tejî enwarî bit (19/2)

Rastî yedê beyda kirit miskê di cerhan dakirit

---

[611] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 4, r. 1736.
[612] Cebecioğlu, “Yed-i Beyza”, b.n.b., r. 535.
[613] Canım, b.n.b., r. 178.
[614] “Ew, bi şewq û biriqandina xwe ve dişibihe stêrkan.”

Da xweş bikit ihya kirit şefqê ke ya Reb da kirit (125/8)

Tiliyên yarê, ji bo beyankirina nazikî û nezaketa wê û bi qesta can û rûhstandina ‘aşiqî bûne mijar. Tiliyên yarê zirav û dirêj in. Bi şeklê xwe ve dişibe qelemê. Serê tiliyên wê sohr in. Sohratiya tiliyan, ji rengê ‘eqîqê ye. Ew tiliyên sohr ên weke ‘eqîqê, rengê xwe ji xwîna ‘aşiqî hilgirtine. Tîr û rimên yarê di dil û cegerên ‘aşiqî de bûne sebeba xwînrêhtinê. Di wê xwînrêhtinê de, tesîra tiliyên yarê hene.

Guldesteyên nûrînqedem destan ji enguştan qelem
Ew laleyê Baxê Îrem mawer li zulfan jale da (9/25)

Tîr û rim herdu li dil dan li ceger çîpan kir
Ew ji xwûna min e riştî tilîyên sohr û ‘eqîq (66/8)

### 3.4.13. Bejin (Qed/Qamet)

Qamet, wek mecazeke tesewwifî, tê wateyên weke “berxwedana ‘ulwiyetê, bi tenê ji Xwûda re ‘îbadetkirin (ji xeyrî wî tu kes layiqê ‘îbadetkirinê nîne), bêşikî dana hubba Îlahî û wehdetê”.[615]

Bejin, bi dirêjahî, rastbûn û ziraviyê ve bûye mijar. ‘Aşiq, di hesreta dîtina yarê de ye ku ew bimeşe bejn û balaya şirîn û delaliya wê bibîne. Di dîwanê de, têkiliya “qed û qamet”ê, bi qiyametrabûnê re hatiye beyankirin. Derketin û dîtina yarê, çûn û firaqa yarê, di nav ‘aşiqan de dibe sebeba qengeşî, feryad û fixanê. Ev jî weke rabûna qiyametê tê tesewwûrkirin.

Xwezîya min bidîya ew qed û balayê şirîn
Her dema ku ew bi meş tê bi delalê şeb û roz (47/5)

Mela bêqameta yekta qiyamet min bi çehvan dî
Fîraqê rûsiya bin ta ji min canê şîrîn cê da (5/43)

#### 3.4.13.1. Teşbîh û Tesewwirên Derbarê Bejnê de

##### 3.4.13.1.1. Serw/Selwa (Sipîndar), ‘Er’er (Qaça Hêvrizê), Şimşad (Bîşeng)

Bejna yarê, bi dirêjî, ziravî û rastbûnê ve bi dara serwiyê re tê wekandin. Peyva serwiyê (dara kajê/sipîndar), di beytan de, weke ravekên “bejna serwîqed, serwê gulşen, serwê xeraman, serwa ciwan” cih girtiye û wek îstî’areyî bi temsîliyeta bejna yarê hatiye bikaranîn.

Ew çîçekên şetrîsifet ef‘a mislê qelbê me mêht

[615] Üstüner, b.n.b., r. 272; Cebecioğlu, “Kamet”, b.n.b., r. 267.

Selwa ji balayê we rêht ev perdeya gulnarê xet (59/3)

Sed padişah û Xusruwan can dan di ‘işqê û rewan
Şirîn di libsê erxewan min dîn li bejna serwîqed (40/3)

Têkiliya di navbera dara ‘er’erê (qaça hêvriz) û bejna yarê de, ji aliyê dirêjahî û rastbûnê ve hatiye çêkirin. ‘Er’er, bi bejna yarê re wek teşbîhî hatiye bikaranîn.

Min dîn li bejna ‘er‘erîn tayên zubadu ‘enberîn
Bayê sebayê rast û çep bayê seba nûra Semed (40/4)

Şimşad, dara bîşengê ye û bi ziravî û bilindiyê ve navdar e. Şimşadxeramî, ew wesf e ku îşaretê bi hejandina nazikî ya yarê dike. Ji aliyê tesewwifê ve wek mecazî, bejna şimşad û serwiyê, îşaretî cemalê Zatî û canan jî îşaretî wucûda mutleq dike.[616]

Şimşadîxeram û serwîxennac
Canan dibirit bi 'işwe tarac (29/1)

Şimşadi bi meş sosin û sunbul bi sema tên
Ey serwê xeraman ku tu carek bimeşî (129/2)

### 3.4.13.1.2. Nêrgiz

Nêrgiz hem ji bo çavên yarê yên reş û mest hem jî ji bo bejna wê ya nazik û zirav wek îstî’areyî hatiye bikaranîn, lewra tayê nêrgizê, nazik û zirav e.

Nêrgiza nazikqed û şehla ye mest
Dîn kirim ez bulbulan sewda gul e (99/10)

Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî
Bişkifti sifet-xunçe ji çara ereşî (129/1)

### 3.4.13.1.3. Elîf

Elîf, bi şeklê xwe ve bi bejna yarê re têkildar e. Elîf, hem îstî’areyî hem jî wek teşbîhî ji bo bejna yarê ya zirav hatiye bikaranîn. Ziraviya bejna yarê weke herfa elîfê hatiye teheyyûlkirin. Herfa elîfê, di tesewwifê de, îşaretê bi zatê ehediyetê dike. Lewra ew di ezeliyetê de hebûna yekem e.[617] Ji aliyê muheqqîqan ve gelek wate li ser herfa “elîf”ê hatine bar kirin. Meqama elîfê, meqama “cem”ê ye. Navê wî Ellah e. Sifetê wî qayyumiyet e û bi çendan navên wî yên fi’lî jî hene. Yekûna ‘alema herfan û hemû mertebe a’îdî wî ne. Ew hem navenda daîreyê ye hem jî çembera wê ye.[618]

[616] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 115-116.
[617] Cebecioğlu, “Elif”, b.n.b., r. 145.
[618] İbn Arabî, Harflerin İlmi, r. 129-130.

Ya Rebb în guldesteyî ya nergisê re'na sti în
Serwê gulşen ya elîf ya qameta yekta sti în (83/1)

Hat padişahê pursipah qametelîf dêm şubhê mah
Dad û meded sed ah û ah zulf û ‘eqarib çune ser (43/6)

**3.5. Unsûr û Xusûsiyetên Yarê Yên Mayî**

**3.5.1. Reftar/Meş**

Rêveçûna yarê bi bejn û balaya wê re têkildar e. Ew dema dimeşe, bi xeramî (nazikî, kubarî û nazenînî) dimeşe. Di navbera meşa wê û halê wê yê ruhî de jî têkiliyek heye. Yar ehlê naz û nazdariyê ye, ew di meqama nazê de ye. Pêwîst e goreyî wê haletê bimeşe. Dar û belçimên li ber bayê subê yê hênik û aheste çawa bi mestane dihejin, yar jî bi wî şeklî ve dimeşe. Ew, bi gelemperî di seherê de di nav gulistanê de û di bezma surşirînan de dimeşe.

Ger çi tên reqs û semayê her seher sed neyşeker
Min ji bezma surşirînan ew şirîn reftarî bes (52/5)

Sorgulek min dî di gulzarê bi meş
Lale û reyhan li ser têne sema (10/5)

Rêveçûna yarê, bi şekl û endamê ve û bi hejîna li ber bayê ve bi dara ‘er’erê, bi nêrgizê ve, bi dara şimşadê ve û bi serwiyê ve têkildar e. Ev têkilî, ji aliyê dirêjahî û ziraviyê ve hatiye teheyyûlkirin. Dema yar di gulistanê de dimeşe, lale, reyhan, sosin û sunbul li derdora wê semayê digirin. Xunçe, ji bo ku wê temaşe bikin, serê xwe di nav çara/belgên xwe yên bişkivî de derdixin û li meşa yarê û husn û cemalê wê mêze dikin. Bi meşa yarê ya şengî û nazî re, bêhna misk û zubadê jê dadiwerive.

Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî
Bişkifti sifet-xunçe ji çara ereşî (129/1)

Şimşadi bi meş sosin û sunbul bi sema tên
Ey serwê xeraman ku tu carek bimeşî (129/2)

Şeng û bi naz û meşşiha misk û zubadê weşşiha
Ru me dibin payan hêj zêr e li min peyale kir (41/2)

**3.5.2. Bûse**

Di navbera wuslat û bûseyê de têkiliyek heye. Bûse, wesîleya wuslatê ye. Hêviya ‘aşiqî ji bûseyê, dîtina husn û cemalê yarê ye. Bûse, ji ‘aşiqî re ihsana yarê ye û bi wê, ‘aşiq kêfxweş û şadûman dibe.

Ji aliyê mutesewwifan ve ihsanên ku digel însên hatine kirin weke bûsedanê hatine dîtin. Mela Ebdurrehîmê Westanî, “bûse”yê wek kînayewî, bi berhevî û di amadeyiya sûretî û me’newî ya gotinê de şirove dike. Bûse, destûrdana axaftinê ye, lewra axaftin jî bi devî çêdibe. Dîsa “bûse”, bi dayîna nî’metên cennetê jî tê şirovekirin û piştî van nî’met û ihsanan ku însan bi serê şeytên ji rê derketiye, ji aliyê Xwûda ve, bi avêtina ji cennetê hatiye cezakirin.[619]

Yek bûse bexşî ewwel bi ihsan
Axir li min kir curm û xeramet (25/2)

### 3.5.3. Zulm, Cewr û Cefa

Taybetiyên me’şûqan ew e ku êş û elemê didene ‘aşiqan. Ew rû nadete ‘aşiqan û her daîm bi tîrên awirên xwe wan birîndar dike û qesta kuştina wan dike. Ji ber ah û zariyan, ji ber girîna ‘aşiqan jî, dilê mehbûbê nerim nabe û nayête merhemetê. ‘Aşiq, çi qeder bi derd û kederan re rû bi rû bimîne û bigirî, ew qas di nezera me’şûqê de wek şexsekî meqbûl tê dîtin.[620] Çilekêşîna di rêya yarê de, ji bo terbiyeya nefsê û îmtîhana dinyayê ye. Çîlekêşîn, qurbiyetê bi xwe re tîne. Salik eger sebrê bikêşe û merhaleyên îmtîhanê derbas bike, digihije meqamên bilind û meqama herî bilind jî fenafillah e. Ji însanan ên herî nêzikî Xwûda û yê Xwûda zêde hez jê dike, pêxember in û îmtîhana herî dijwar jî, ya wan e.

Weh ku çi şîrînleb in xebxeb û dêm kewkeb in
Kakûl û gîsûşeb in zulm û cefameşreb in (50/4)

Dilber çi bê hed zalim e carek neket pursê li me
Lazim bi halî 'alim e lê pur didêrit xederê (113/18)

‘Aşiq dizane ku bi wan cefayan dê bigihije aramanca xwe, ji ber vê yekê ew cewr û cefa kêfxweşiyekê didin ‘aşiqî. Dil jî bi cewr û cefayê re aşîna dibe, hînî wan dibe. Zulma ji destê yarê bê jî, ew ji bo ‘aşiqî ‘edalet e û ew pê kêfxweş e.

Mihnetkeş im roz û şebî der firqeta şîrînlebê
Zulma ji ber destê te bî ew ‘edl e em pur lê xweş in (79/19)

---

[619] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 34-37.
[620] Rıdvan Canım, b.n.b., r. 260.

#### 3.5.3.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Cewr û Cefayê de

##### 3.5.3.1.1. Xencer, Tîr

Ji ber tesîra wê ya kuştinê, cefaya yarê weke derba xencer û tîran hatiye dîtin. ‘Aşiq, di destê yarê de bê îrade ye. Nîgar û dilberên esmer, dilê ‘aşiqî talan dikin û didin ber xenceran. Tîrên cefa û zulmê ew qas di dilî de cih girtine, ji ber êşa wan, ‘aşiq nikare wê cefayê îfade jî bike. Me’şûq ji ‘aşiqî re bêtehemmûl û bêmerhemet e. Ne tenê ji feryad û girînê, ji beyankirina halê xwe re jî taqeta wî nemaye.

Dil girt û da ber xenceran kuştim nîgar û dilberan
Me j’destê zulma esmeran dad û meded dad û meded (40/7)

Cana ji cefaya te û zulmê çi xeber dîn
Ku tîr ji cewra te bi dil da me bi gazin (84/3)

##### 3.5.3.1.2. Perengê Ateş

Cefayên yarê weke pêtên agirê dilê ‘aşiqî disojin. Bi sohtinê, beden û can ji hev veqetiyane. Lê dîsa gazind û giliyên wî tune, ew bi wan daxan kêfxweş e. Hubb, bi serê xwe belayê serê ‘aşiqî ye. ‘Eşq, ji xwe di nav derd û cefayan de sohtin e.

Zulma tu key pir pê xweş im sohtîdil û hicrankeş im
Mislê perengê ateş im rûhek mucerred bêkeş în (79/20)

Muhbetê mihnet di zor in hubb dibêm bêşek bela ye
Umr û jî xweş pê diborin sohtin û derd û cefa ye (95/1)

#### 3.5.4. Lutûf û Kerem

Mehbûb, caran digel ‘aşiqên xwe lutf û keremê dike. Lutfa herî mezin ew e ku mehbûba heqîqî, ‘aşiq heyî kiriye û bi husna xwe, ‘eşq avêtiye dilê wî.

Husna hebib û lutfê yar avête dil 'işqa xedar
Lew selbî kir jê ixtîyar wê husnê ev îcabi da (2/2)

Vekirina deriyê lutfê ji ‘aşiqî re weke rojên ‘eydan kêf û şahî ye. Mehbûb, di wê rojê de deriyê xezîneya lutf û keremê vedike û li ‘aşiqan, bêsînor îkram têne kirin.

‘Îd e û mîrê me îro dergehê lutfê vekir
Go Mela hingî bixwazî dê bidem bes tu bixwaz (45/17)

#### 3.5.4.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Lutûf û Keremê de

##### 3.5.4.1.1. Loqmanî

Hekîmê Loqman ji hemû kûl û derdan re dibe derman. Lê hekîma ‘aşiqî, mehbûb e. Eger ew lutf bike, weke hekîmekî were li ser birîna wî, dê ew sax bibe. ’Aşiq, sewdazedeyê mehbûbê ye û dixwaze ew birîna wî bikewîne.

Îro tu bes bike Loqmanîyê xan im
Lutfek bi Melê ra bike sewda yim ez (49/13)

##### 3.5.4.1.2. Nezer

Nezera yarê ji bo ‘aşiqî lutf e. Eger yar bi çavê rehmê li ‘aşiqê xwe binêre êş û elemên wî hemû sax dibin. Lêbelê ji bo ku yar nezerê li wî bike, ew razî ye ku yar bi ser dil û cegerê wî yê birîndar ve tîran ji qewsên xwe biweşîne û bireşîne. ‘Aşiq, ji hemû mîhnet û cefayan re razî ye, bi tenê yar nezera xwe bidetê û wî bênezer nehêle, lewra nezera yarê ji hebs û zindanên maddî û me’newî, azadbûna ‘aşiqî ye.

Ma li min ke nezerek lutf û ji dil xemze nîyan
Bireşîne cegerê rîşi ji qewsên xwe biweş (54/2)

Carek tu nezer da li me miskîn û xerîban
Berde tu ji hebsê û ji zindanê derîne (101/2)

##### 3.5.4.1.3. Xencerkirin

‘Aşiq her cure têkiliya yarê ji xwe re weke lutf û keremekê dihesibîne. ‘Aşiq, di rêya ‘eşqê de ji bo yarê xwe qurban kiriye, lê dixwaze yar jê re lutfekê bike, wî bi destê xwe yê mubarek ser jê bike û bike qurban.

Were carek tu derê lutfê veke
Me bi qurbanê têk xençer ke (98/13)

##### 3.5.4.1.4. Pirskirina Gilehan

‘Aşiq, ji ber bêxemiya yarê gilîdar e. Ew dixwaze yar her daîm bi wî re têkildar be. Pirsa hal û rewşa ‘aşiqî,’edalet û merhemeta wê nîşan dide. Yar daxwazên ‘aşiqî neyîne cih jî, hema bi tenê halê wî bipirse û gilehên wî guhdar bike, ev yek besî ‘aşiqî ye.

Belku dilber ji ruyê 'adilî û merhemetê
Rehmekê kit li feqîran weh bipirsi gilehê (110/5)

### 3.5.5. Kuyê Yarê

Kuy (tax), ew mekan e ku ‘aşiq bi dewamî dixwaze bigehije wê derê, lêbelê gehijtin pêk nayê. Gehijtina kuyê peydabûna wuslatê ye. Çavên ‘aşiqî her dem li rê û deriyê kuyê yarê ye ku destûr jê re bê dayîn û bikeve wê derê. ‘Aşiq û raqîb (segê kuyê) mudawîmên li ber deriyê gund in û bi hêviya dîtina yarê heta seherê hemnefesê hev in.

Her şevem ne‘rezenan ta bi seher
Bi segê kuyê te ra hemnefes în (80/4)

Daxilbûna kuyê, wasilbûna yarê ye û wek têgeheke tesewwifî temsîliyeta wehdetê dike. Cihê yarê, ‘erd û mekanên pîroz in. Kuyê yarê, weke mekanên pîroz ku tecellî lê peydabûyî yên weke “Ke’be, Beytu’l-Meqdîs, beheşt, cennetu’l-Firdews, cennetu’l-Me’wa”yê hatiye beyankirin.

Kuyê o ya Ke'be ya Beyt’ul-meqdîs ya bihişt
Xulde ya Firdewsi ev ya cennet’ul Me'wa sti în (83/9)

### 3.5.6. Axa Bin Pêyên Yarê

Axa bin pêyên yarê, ji axên din cudatir e. Lewra têkiliya wê bi yarê re heye û bêhna yarê jê tê. Ew ax weke dermanên çavan hatiye tesewwirkirin. Axa bin pêyên wê, weke dermanên tûtiya, surme/kuhlê, çavên ‘aşiqî sax dike û rohniya wan zêdetir dike. ‘Aşiq, ji bayê subê (nesîm) dixwaze axa rêya yarê bîne li çavên wî bike ku dil û çavên wî rohnî bibin. Ji ber firqetê ‘aşiqî gelek hêstir barandine û çavên wî êdî baş nabînin, eger axa pêyên wê li ser çavên wî bikeve dê dîsa ronahiya çavên wî lê vegerin. Herwekî Ye’qûb Pêxember jî bi kirasê Yusûfî dîsa rohniya çavên xwe bi dest xistibû. Bi têkiliya rohnîbûna çavan û axê, wek telmîhî, îşareta qisseya Ye’qûb û Yusûf Pêxemberî jî tê kirin.

Me temenna ji nesîm xakê rehê kir
Pê bikîn dîde û dil nûranî (114/14)

Mela Ebdurrehîmê Westanî dibêje, “sipêde”, wek kînayewî, destpêka ronahiya wucûda Heqq e. Însan ji tarîtiyê (tûnebûn) derbasî ronahiyê (hebûn) bûye. Bayê sûbê, axa rêya yarê weke kilê çavan bi ser însên ve werandiye û ew heyî kiriye.[621]

---

[621] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 143.

#### 3.5.6.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Axa Bin Pêyên Yarê de

##### 3.5.6.1.1. Kuhl/Surme/Tûtiya û Dane (Kilê Çavan)

Surme, wek boyaxeke reş, kil û dermanê çavan e.[622] Li derdora çavan û li ser mijangan tê lêdan. Çavên yarê jî reş in, lêbelê reşahiya xwe ji wê axa binê pêyên yarê girtine. ‘Aşiqî ew ax weke kilê, di ser çavên xwe re kêşaye.

Bayê sûbê, axa rêya yarê li ser du çavên xwe yên reş weke surmeyê dikêşîne. Ev surme, hem çavan rohnî dike hem jî quwwetê dide. Ew bayê ku ji aliyê yarê ve hatî, ji bo ‘aşiqî mizgîniyê tîne. Ew surmeya ku ji yarê hatî, dê çavên ‘aşiqî vekin. Çavvekirin wuslat e, eger wuslat peyda nebe çavê ‘aşiqî tiştekî nabîne. Bêhna toz û xubarên li ser çîmena ku yar lê geriyayî weke miskê bêhn dide û ji aliyê bayê sebayê ve li derdorê tê bilindkirin. ‘Aşiq, dibîne ku bayê sebayê axa rêya yarê wek surmeyê li çavên xwe dide, ji bê dixwaze ku ji wê tozê bîne û ew jî kilê çavan (kuhlê beser) li ser çavên xwe bikêşîne.

Dê du sîyeh surmeyê çehvên xwe kit
Xakê rehê yarê saba her sebah (32/5)

Toz û xubarên seherê ber çemen
Qed neşere’t-tîbe we bi’l-miski fah623 (32/6)

Tozekî bibin bi xwe ra ta bikirin kuhlê beser
Ji terîqa qedema dilberê wê rehguzerê (126/5)

Tûtiya, bi hêrandina kevirekî tê bidest xistin. Ji çavêşanê re derman e û li ser çavan tê werandin.[624] ‘Aşiq, ji Hudhûdê dixwaze ku ew jî weke nesîmî (bayê sûbê) ji axa rêya ku yar li ser geriyayî bîne ku ew li ser çavên xwe yên nexweş (nesax) wek dermanê tûtiya bikêşîne.

Da di çeşman min werîna xaki her wek tûtiya
Ya hebîbê lê nîhanî baniya wê ew turab (16/25)

Tûtiya, dermanê çavan e. Ji bo saxkirina werem û bihêzkirina çavî tê bikaranîn. Dane jî, dendika tovê giyan e, hûr dikin û ji bo saxbûnê dixin çavê kul.[625] Axa rêya yarê, çavên kor vedike, yên nesax jî baş dike û rohniya wan zêde dike.

---

[622] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 357.
[623] Bi bêhnên xweş yên meke miskê, belavê derdora xwe dike.
[624] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 333.
[625] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 919.

Bê guman xaka rîya wê tûtiya û dane ye
Ger te çehvên kor veînin xweş dibin pê dîde ye (93/7)

**3.5.6.1.2. Cela**

Cela (cîla) wek îstî’areyî di cihê surmeyê/kilê de hatiye bikaranîn. Xusûsiyeta cîlayê biriqandin e. Kil jî hem nexweşiyên çavan sax dikin hem jî rohniya wê zêde dikin ku çav baştir bibîne. Kilkirina çavan, xemamên li ser çavan radike û çav çêtir saf û zelal dibînin. Kêşana axa pêyên yarê li ser çavan, temsîliyeta wuslata wê dike ku dîtina wê nêzîk e.

Xaka rêya dilber Mela bikşîn di çehvan wek cela
Dîdarê qismet bû hela feryad ji destê firqetê (115/24)

**3.6. ‘Aşiq**

Di rêya cananê de fedakirina canê giring e. Lewra ew kesê xwe di vê rêyê de feda neke, dîdara yarê nabîne û nagehije meqama wuslatê. Di bazara ‘eşqê de xebata baş û mayînde ew e ku ‘aşiq, her tiştê xwe heta canê xwe jî, ji bo cananê feda bike. Sermayeya ‘aşiqî bi tenê evîn û evîndara wî ye. Ji ber vê yekê pêwîst e ew xwe jî feda bike. Kesê ji bo canê xwe hez cananê bike an jî, ji bo hubba dunyayê yara xwe îhmal bike û bifiroşe ew îmtîhanê wenda dike û dikeve xusranê.

Di dîdarê hezaran can nîsarê meqdemê yar în
Kesê canan bi can bînit ‘işqê wî tîcaret kir (42/6)

Bi dînarê denî zinhar da yarê xwe nefroşî
Kesê Yûsuf firohtî wî di ‘alem da xesaret kir (42/7)

**3.6.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê ‘Aşiqî de**

**3.6.1.1. Bulbul, ’Endelîb (Hezar), Qumrî, Tûtak û Goyîn, Kew, Murx, Kelb**

Gul û bulbul temsiliyeta ‘eşqê dikin. ‘Aşiq, ji aliyê nalîn û feryadê ve weke bulbul û qumriyê, yar jî bi spehîtahî, naz û delaliyê ve weke gulê tê tesewwûrkirin. Xwendina (nalîn) bulbul, qumrî û ‘endelîbê ji ber hîcran û firqetê ye. Derd û kulên ‘aşiqî ku ji ber wan feryad û fixanê dike, dîsa ji ber firqetê ye.

Qumrî, ew teyr e ku di stûyê wê de helqeyek ji purtê heye û weke gerdenê ye. Ev helqeya gerdenî weke toqa evînê tê teheyyûlkirin ku ketiye stûyê qumriyê. Qumrî

herdaîm bi coht digerin. Ev xusûsiyetê wan, temsîliyeta bengîbûn û girêdana ‘aşiqî ya bi mehbûbê ve dike.

Qumrî û bulbul dixwînin lê 'eceb ew xweş dimînin
Her seher mehbûb dibînin 'endelîb vê ra veda ye (96/8)

Tûtak û goyîn, du cureyên teyrê kundî (bom) ne. Ji aliyê nalînê ve, bi ‘aşiqî re têkildar in. Ew li ser kavl û xirabeyan dixwînin. Kund, wek teyrekî bêîfleh û bêyom tê zanîn.[626] ‘Aşiq jî, di firqetê de ye, şans û taliha wî destûr nedaye ku bigehije wuslatê û ji ber vê yekê, weke tûtak û goyînan dinale û dikale.

Sehergeh ‘endelîb mest in ji bêhna werd û bişkojan
Şubhê tûtak û goyînan dinalîn em di ferqê da (5/16)

‘Eşq, wek kemînekê û şahîn weke qeza û qederê hatiye tesewwirkirin. Mehbûb, şahîn e û ‘aşiqê xwe nêçîr dike. Kewên ku bi nazdarî dimeşin û bi qebqeba xwe têne kozê, ji aliyê şahînê ve têne girtin. Hêsîrkirina dilê ‘aşiqî jî, bi vî şeklî hatiye teşbîhkirin.

Ew kebkê xeraman ku di kozê bi qebû hat
Şahînê qezayê bi texaful ji xwe ra girt (20/10)

Murxê nîmbesmel, ji bo beyankirina halê ‘aşiqî yê dijwar bûye mijar. Nîmbesmelebûn, îşaretê bi teslîmnekirina ruhê teyrê dike. Di serjêkirinê de besmele tê xwendin, besmele û serjêkirin bi hev re diqedin. Serjêkerî, hêj besmeleya xwe temam nekiriye, stûyê teyrê nêvî hatiye birîn û ew li ber sekeratê ye û di nêv xwîna xwe de diperpite. Li ber sekeratbûnê, haletê însên yê herî zor e ku can ji bedenê tê veqetandin. Herwekî di hedîsekê de hatiye gotin ku ruhkêşandina ji bedenê herwekî kêşana hiriyê ji nav dirîkan e. Însan di wê demê de di ‘ezab û êşeke gelekî zor û dijwar de ye. ‘Aşiqî jî, dema di nav hîcran û firaqê de be halê wî weke wê teyra nîv besmelekirî ye, weke miriyên li ber sekeratê ye.

Bi dama muhbetê bend im xedenga firqetê dil noht
Bi şubhê murxê nîmbismil di hev wertêm di xwûnê da (5/6)

Du kes mudawîmên ber deriyê yarê ne: ‘aşiq û kelb. Kelb hem ji bo parastina xanî û malan hem jî ji bo nêçîrê tê xweyîkirin. ‘Aşiq ji bo wuslatê her daîm li ber deriyê yarê ye. Ne li ber derî pirsa halê wî tê kirin ne jî di nêçîrê de tê bîra yarê.

Li kelbê asitanê xwe nepursî qet hebîb carek

[626] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.1, r. 128-129.

Gelo naête bîrê em di vê nêçîr û ravê da (5/17)

### 3.6.1.2. Ceres (Zengil), Ney û Nay

Ceres, ji ber dengê xwe wek unsûreke teşbîhê hatiye bikaranîn. ‘Aşiq, ji ber hubba evînê, ji şevê heta subê weke zengilê dinale û xew nakeve çavên wî. Ew tecelliyên ku di dilê wî de peyda dibin, nahêlin ew rehet razê û ji ber derdê evînê her dinale.

Hubba te ra min radihejîni ku binalim
Şeb ta bi seherê nale ji rengê ceres im ez (48/4)

Têkiliya ‘aşiqî û ney û nayê ji ber feryad û fîxanê ye. Dengê ney û nayê huzunbaz û xemgînnak e. Ney û nay, ji bo ‘aşiqê nalîn, muşebbehunbîh e. Axîn û feryada ‘aşiqî, bi teşbîha ney û nayê tê kirin. Mehbûbê, di dilê ‘aşiqî de dax û birîn hiştine û ew jî ji ber wan birînan, weke ney û nayê ax û fîxan dike.

Sed şîş li dil da ne ji mihrê me Mela
Lew her bi fixan mislê ney û nay im ez (49/12)

### 3.6.1.3. Hilal, Re’d

Têkiliya di nevbera hilal û ‘aşiqî de, ji aliyê şeklê ve ye. Heyv, her roj kêm dibe û weke şeklê hilalê zirav û xwar dibe. ‘Aşiq jî, ji ber evîna dijwar ya mehbûbê, weke hilalê zirav û piştxwar bûye.

Şubhê şem' û şemal im ez ji ber hubba te lal im ez
Ze'îf im wek hilal im ez sifetgoyîn dikalim ez (124/3)

Têkiliya birûsk û ‘aşiqî, ji aliyê dengî ve ye. Birûsk û tecellî herdu jî, ji bilindahiyê tên. Tecelliyên rumûzan li ser ‘aşiqî, weke tesîra birûskê ye. Dengê jê tê û li ku vede, wê derê disoje. Re’d/birûsk, bi dengekî gurr vedide. Ji nişka ve diqêre û wenda dibe. Tesîreke dijwar li ser wê heye ku ew qas dengekî bilind jê dertê. ‘Aşiq jî, ji ber şewq û ronahiya yarê weke birûskê dinale. ‘Aşiq, ji ber tesîra remz û razên tecelliyan dikale.

Ji mihra wê şefeq se'dê şirîn le'lê şeker we'dê
Dinalim şubhetê re'dê ecêb im lê ji vê ce'dê (4/3)

‘Aşiqan bêgav lew kalîn ji dil tên şubhê re‘d
Wan ji balayê dibarin wek burûsk û remz û raz (45/6)

### 3.6.1.4. Ayîne

Ji bo beyankirina fikra tecelliyê, ayîne wek sembolekê hatiye bikaranîn. ‘Alem, weke ayîneyeke bê cîla hatiye afirandin. Di mertebeyên zuhûrê de nav û sifetên Xwûda weke cîlayekê di ayîneyê de tecelî bûne û ayîne gehiştiye şeklekî mukemmel.[627] Husn û hubb (‘aşiq û me’şûq), ji ayîneya qedîm in. Dema nav û sifetên Xwûda ji hev cuda dibin, hubb weke nar, celal û cezbeyê, husn jî weke cemal, husn û surê di zatê wî de tecellî bûne. ‘Esl û binyata ‘aşiq û me’şûqê bi ayîneyê ve tê teşbîhkirin. Di ‘alema hadis de ew ji hev cuda bûne, husn bûye me’şûq; hubb, bûye ‘aşiq.[628] Ev herdu, wek ayîneyan hatine tesewwirkirin û nûra Heq di wan de cîlwe daye û tecellî bûye.

'Aşiq û me'şûq el-heq herdu mir'atê yek in
Bu di ‘eynê cem'ê da eslê qedîm ayîne bû (104/6)

Ger dilber û ger 'aşiq in 'arif di vê da sadiq in
Ayîneyê nûra Heq in cî cî di wan da celwe da (9/12)

### 3.6.1.5. Şem’/Şemal û Perwane

Perwane, mûm û şem’, gelemperî bi hev re têne bikaranîn. Rûyê yarê şem’ e, lewra ronahiya xwe ji tecelliya nûra ezelî hilgirtiye. ‘Aşiq jî ew perwane ye ku li derdora wê şem’ê dizivire û dixwaze di wî de tune bibe û bigehije wuslatê. Daxwaza wuslatê û di şem’ê de tunebûna perwaneyê, daxwaza vegera li ser esliyeta wê ye, lewra hêj hukmê ezelî nehatî zanîn perwane û şem’ (husn û hubb) di zatê Lemyezel de hebûne û yek bûne.

Nehtibûn hukmê sifatan ew ji zatê lem yezel
'Aşiq û me'şûq yek bûn şem' û hem perwane bû (104/3)

Ji aliyê wuslatxwestin û fenaxwestinê ve, ‘aşiq bi perwaneyê ve tê wekandin. Ji aliyê sohtinê ve ‘aşiq weke şemalê ye. Herdu jî dişewitin. Yek bi destê agirê evînê, yek jî bi destê agirê heqîqî disoje. Herdu jî, dihelin û fena dibin.

Min go di şevan şubhê şemalan weh disojîn
Got perwanesifet ca here bê sewt û his î tu (105/21)

[627] M. Nesim Doru, Melayê Cizîrî, Felsefî ve Tasavvufî Görüşleri, r. 55.
[628] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c.4, r. 49-51.

#### 3.6.1.6. Şah û Geda/Bende

Sînorên şahbûn û gedabûna ‘aşiqî, bi yarê tên kifşekirin. Şahbûn û gedabûna ‘aşiqî, li hemberî yarê hestek e. Dema ew yara weke periyan, di nav cil û bergên keskermûşî de xwûya dibe, ‘aşiq, ji ber wê husn û cemalê dihele û dibe weke gedayekî. Caran jî, dibîne ku yara wî ew qas spehî û bêqusur e, xwe weke şahekî payebilind û bextiyar dihesibîne û di vê hestê de xwe weke şahekî teheyyûl dike. Eger yar nebe, hêjaya mîrtî û padişahiyê hingî mûyekî li nik ‘aşiqî nîne.[629]

Ew perî weqtê di sundus da ji qundus bin xwuya
Bende dê şah û geda bit Xusruwê şîrîn kelam (77/2)

#### 3.6.1.7. Şehîd, Bîmar

‘Aşiq, nexweşê yarê ye. Ew, di destê yarê de weke nexweş û şehîdekî tê tesewwirkirin. ‘Aşiq, her daîm di bin êrîşên yarê de ye û yar bi hemû aletên xwe yên şerî ve êrişê dibe ser ‘aşiqî. Cohtên reşmarên keziyên yarê, ‘aşiq geztine û awirên wê yên weke şîr û xenceran jî, di dilê wî de daçikî ne. Ew kesê bi vî şeklî birîndar bibe, mumkin e ku bimire û bibe şehîdê ‘eşqê.

Ew kesê di rêya Xwûda de bimire, şehîd tê qebûlkirin. Di tesewwifê de jî, ‘aşiq ew e ku bûye mubtelayê husn û cemalê Îlahî. Ji ber vê yekê, çi ‘aşiqê heqîqî be çi jî yê mecazî be, herdu jî di rêya Xwûda de ne. Ew di vê rêyê de bimirin dibine şehîd.[630]

Mesîha yî li bîmaran kesê geztî du reşmaran
Şehîdên şîr û mûkaran kirî amancê nûbaran (124/10)

### 3.7. Unsûrên Wucûda ‘Aşiqî

#### 3.7.1. Sîne

Di têkiliya ‘aşiq û me’şûqê de mekanê herî giring sîne (sing) ye. Dil û ceger di nav singê de sîperên êrişan in. Êş, elem û izdirabên ku ‘aşiq dikêşe, cewr û cefayên yarê, li ser singê ‘aşiqî xwe nîşan didin. Hedefa êrişa yarê singê ‘aşiqî ye û li ser singê ‘aşiqî bi sedan kul, keder û birîn hene. Xemze, qewsên hîlalî, bijangên xedengî, cewr

[629] Mîrî û padişahî mûyek li nik Melayî
Nadem bi mulkê ‘alem yek zerreyek ‘inayet (24/11)

[630] Di hedîsekî de pêxember (sxl.) weha gotiye: “Şehîd pênc qism in: … û yek jî ewê ku di rêya Xwûdê de şehîd dibe.” (Îmam Newewî, *Riyadus-Salihîn/Baxê Qencan*, (Wer. Mela Salihê Dihî), Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2017, r. 652)

û cefayên yarê, derdê firqetê bûne sebeba birîndarkirina singê ‘aşiqî. Pêtên agirê evînê, li singê ‘aşiqî werbûne, wê derê disojin û talan dikin.

Birûska batinî da dil di pêtê sîne wê wer bû
Kû dê bêtin depîta dil di nav wê nar û pêtê da (5/7)

Wer ji qewseynan bi mîzan bête der cotek xedeng
Dê ceger bit pare pare sîne tar û marî bit (19/9)

### 3.7.2. Teşbîhên Derbarê Sîneyê de

#### 3.7.2.1. Putxane

Putxane ji ber tecelliyên Îlahî, bi sîneyê re têkildar e. Bawerî û îmananîn, bi qelbî tê kirin. Qelb jî di nav singê de ye û nezergeha Îlahî ye. Husn û cemalê Heqq, li her derê tecellî bûye û secdebirin û ‘îbadetkirin jî, li ber wê husnê tê kirin. Di îbadetxaneyan de meqseda secdebirinê, ji ber teheyyûla wê husn û cemalî ye. Herwisa, husn û cemalê ezelî, di sîneya ‘aşiqî de jî tecellî dibe. Dil ku di sîneyê de ye, ji Xwûda re serî ditewîne. Nexşên mehbûbê û te’eyyûnatên nav û sifetan, di qelbî de tecellî dibin.

Ger bikit husn û cemalê xwe tecella di keniştê
Sîne putxane ye îro me ji dêm û qed û qiştê
Bi dilê sade çi kim ez ku tecella negehiştê
Ew e min qibleyê cebhet di qiyamê di qu'ûdê (122/2)

Ji neqşê but û latan me sîne butxane ye
Te'eyyuna sifatan tecella qelbê me ye
Di 'îd û şev beratan ji wan ra me secde ye (132/4)

#### 3.7.2.2. Ney û Nay

Ji aliyê daxkirinê ve, di navbera sîne û nayê de têkiliyek hatiye dayîn. Herdu jî birîndar in û ji esliyeta xwe dûr ketine. Sîne û ney, ji firqetê gilîdar in û ji destê firqetê dinalin.[631] Ji bo ku ney bibe amûreke muzîkê, bi şîşên daxkirî li ser wî kun têne vekirin. Singê ‘aşiqî jî hedefê tîrên awirên yarê ne û li wê derê dax û birîn peyda dibin.

Ev sîneya wek nay û ney pur lê kişandin dax û key
Her dil bi naehlan nedey ya Reb çi nadan î Mela (12/6)

#### 3.7.2.3. Lewh

Lewh, bi têkiliya dil û ayîneyê ve bûye mijar. Sîne, qalik û qefesa dilî ye. Mexsed ji sîneyê dil e. Dil jî, ayîneya zatî ezelî ye. Tecelliyên subhanî li ser lewheya

[631] Gölpınarlı, b.n.b., c.1-2, r. 14.

dilî de tecellî dibin. Ji bo daxwaza Mûsa Pêxember, Xwûda weke nûrekî li çiyayê Tûrê tecelliya xwe dabû. Tûra însên jî dil e û Heqq, li wê derê tecellî dibe.[632] Di tesewwifê de sîne (dil/qelb), tecellîgaha Heqq e. Nav û sifetên mehbûbî di sîneyê de hatine neqişkirin. Çawa ku her tişt (qeza û qeder) di Lewhê Mehfûzê de hatiye nivîsîn, herwisa, lewhê sîneyê jî têkiliyên di navbera ‘aşiq û me’şûqê de beyan dike. Mexseda ji depê/lewhê singê, dil e. ‘Eşq, wek qeder ji bo dilî hatiye nivîsîn. Hingî can di qefesê de ye ‘eşq jê dernakeve. Teqdîra ezelî çawa hatibe nivîsîn, dê wisa jî biqewime. Tiştek li dijî teqdîra ezelî nabe.[633]

Di vê ayîneyê zanî ku hikmet tête te'lîme
Ku herf in taze nûranî di lewhê sîne teqwîme
Ji bala Tûrê însan î nezer da sa'idê sîme (131/25)

Kes dî li lewhê sîne qet neqşek vehatî bê xelet
Her dem ji nû yek taze xet tavête ber pergarê çerx (35/15)

#### 3.7.2.4. Kebab

Ji ber sohtinê, dil bi kebabê re tê teşbîhkirin. Sîneya ‘aşiqî, ji ber sohtina evînê bûye weke kebabê (goştê birajtî). ‘Aşiq, herî zêde ji ber firqetê bêzar e. Narê firqetê di sîneya ‘aşiqî de dibe pêtên êgir û sîneya ‘aşiqî disoje, weke kebabê sohr dike.

Me muşerref ke du çeşmên me bîsata qedemê ke
Pur li nik min heye mey mêze ke min sîne kebab e (94/11)

Şerbeta jehra helahil bû di nav şîrînleban
Lew bi narê firqetê axir li min dil kir kebab (16/22)

### 3.7.3. Çav (Çeşm/Dîde) û Eşk (Hêstirên Çavan)

Çav, wek unsûrekî, halê ‘aşiqî beyan dike, derd û izdirabên wî nîşan dide. Xusûsiyeta çavî, barandina hêstiran e. Dema ji çavan hêstir zêde bibarin, şuna hêstiran xwîn dibare, lewra ji ber girîna zêde, rengê çavî sor bûye.[634] Çavên ‘aşiqî ji ber firqetê her daîm giryan in. Feryad, fîxan û hêstirên çavên ‘aşiqî di ‘eşqê de hal û rewşa wî beyan dikin. ‘Aşiq dixwaze hubba wî wek sirrekê bimîne û nekeve devê xemmazan. Lêbelê ew hêstirên di çavan de dibarin hemû hestan aşikar dikin.

Razên me çi hacet weku xemmazî bizanin

632 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 369.
633 Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 272.
634 Eren, b.n.b., r. 315.

Eşkên me bes in dîdeyê xemmazî çi hacet (21/7)

Axa binê pêyên yarê, ji bo çavan weke dermanê herî baş tê tesewwûrkirin. ‘Aşiq, axa rêya yarê ji çavên xwe re dike “tûtiya û dane”. Ew ax, çavên xemnak û nexweş sax dike; çavên kor vedike û rohniya wan zêdetir dike. ‘Aşik her daîm li ber asîtaneya yarê ye. Serê xwe datîne ser şîpandera wê ku ew pêyên xwe yên nazik û mubarek dayne ser çavên wî. Birînên ‘aşiqî bi vî awayî sax dibin.

Bê guman xaka rîya wê tûtiya û dane ye
Ger te çehvên kor veînin xweş dibin pê dîde ye (93/7)

Bîne pêyêt nazik mubarek deyne ser çehvên me carek
Min curûh xweş bin me carek rohn bibin min dîde ye (97/31)

**3.7.3.1. Teşbîhên Derbarê Çav û Eşkê de**

**3.7.3.1.1. Ye’qub**

Di lîteratûra tesewwifê de, Ye’qûb aşiqî û Yusûf jî me’şûqê temsîl dike. Ji ber firaqa Yusûf, çavên Ye’qûb kor dibin. Dema li welatê Misrê xeber û mizgîniya Yusûf tê, kirasê Yusûf didin ber çavên Ye’qûbî, çavên wî sax dibin. Ji ber vê yekê Yusûf bênahiya/ronahiya çavên Ye’qûb e. ‘Aşiq jî, ji ber firaqê nexweş e û çavên wî, ji ber ah û zar û girînê kor bûne. Dermanê çavên wî jî yar e. Axa bin pêyên yarê weke surmeyê li ser çavên ‘aşiqî bête kêşandin, dê çavên wî jî weke yên Ye’qûb sax bibin û rohnî bibin.

Şukur bînahiya min hat û Ye‘qûb dîde rewşen bûn
Bi bûya Yûsufê Misrê li Ken‘anê beser peyda (5/23)

**3.7.3.1.2. Le‘l (Durr) û Mercan**

Le’l û mercan, wek kînayewî, temsîliyeta rondik/hêstirên sor ên wekî xwînê dikin. Le’l û mercan cewherên sor in. Dema ‘aşiq zêde bigirî êdî li şûna wan rondikên saf û zelal, hêstirên sor dibarin. Ev jî îaşretî hêza zêdegirînê beyan dike.

Barandina rondikên çavan, dema ku ji nav mijangan têne xwarê weke mohrikên mercanî ku bi tayî ve hatine rêzkirin, tê tesewwirkirin. ‘Aşiq bi mijangê xwe le’l û mercanan qul dike û bi tayê mijangê xwe ve rêz dike. Rijandina rondikên çavan, ji bo ‘aşiqî dibe wesîle ku halê xwe ji yarê re beyan bike û dixwaze yar bi wan rondikan merhametê li wî bike. ‘Aşiq, bi barandina rondikan, wuslatê bi dest dixe, yar rehm û şefqeta xwe pê tîne û xwe nîşanî wî dide. Yar ronahiya çavan e, dema çavên ‘aşiqî wê

dibîne, çavên wî rewşen dibin. ‘Aşiq, ji bo ku wuslat peyda bûye, diçe secdeya şukrê. Cih û wextê ku ‘aşiq herî zêde nêzîkî me’şûqê dibe, dema secdeyê ye. ‘Aşiq di secdeyê de jî, wan hêstirên durrsifet dibarîne û eniya xwe datîne secdeyê. Rondikbarandin û bi eniyê ve ‘erdmaliştin, îşareta tewbexwestinê û gunehbexşînê dikin.

Suftiyên pur le‘l û mercanan bi mujganan heta
Dîde rewşenbûn bi dîna dêmdurra sîmînxebeb (15/9)

Me hadir secdeya şukrê li wî ‘erdê muqeddes kir
Bi mujganên xwe durr sifet in enî malî li ‘erdê da (5/35)

#### 3.7.3.1.3. Xwîn

Destnimêjgirtina bi xwînê, bi menqibeya Hellacê Mensûr re ketiye nav lîteratûra tesewwifê. Dema ku dest û lingên wî jê dikin, Hellac bi xwîna xwe milên xwe sor dike. Sedema wê wek destnimêjgirtinê nîşan dide û dibêje: “Ez bi wê xwînê destnimêj digirim. Di meqama ‘eşqê de, du reka’et nimêj, ancax bi destnimêjgirtina xwînê sehîh dibe.”[635]

‘Arif, li seherê diçe meyxaneya ‘eşqê, qirêjiya dilê xwe bi rondikên çavan û xwîna dilê xwe dişo. Dema dil ji qirêjiyên me’newî paqij bibe, deriyên hikmet û me’rîfetê li wî têne vekirin. Ev derîvekirin jî, ancax di meyxaneya ‘eşqê de, bi destnimêjgirtina bi xwînê peyda dibe.

Derê meyxaneya ‘işqê seher ‘arif zîyaret kir
Bi abê çeşm û xwûnê dil wudû best û teharet kir (42/1)

#### 3.7.3.1.4. Mewc, Derya, Nîl

Rondikên çavan, bi şekl û zêdehiyê ve bi pêlên deryayê re têne wekandin û wek mubalaxawî di gelek teheyyûlan de tê bikaranîn. Bingeha hêstirên çavan dil e. Ji ber kul û izdirabên evînê, xwîna dilî bi mewcî di çavan de weke hêstiran dibare. Ew qas zêde dibare, dibe wek çemî. Ev çem jî bi boşbûnê ve weke Çemê Nîlê tê teheyyûlkirin. Çavkaniya Çemê Nîlê, çav û hêstirên ‘aşiqî ne.

Xwûn ku ji dil bi mewc bêt eşkê rewan me têne xet
Nîl ji dîdeyan dizêt keftime navê şubhê qet (60/1)

[635] Feridüddin Attar, *Evliya Tezkireleri,* r. 535.

### 3.7.4. Cerg/Ceger

Cegerên ‘aşiqî bi munasebeta kul û derdên wî bûye mijar. ‘Aşiq cegerxwîn e û di cegerên wî de dewamî xwîn diherike. Xwînîbûna cegerê bi ‘eşqa ezelî ve girêdayî ye. Roja ku mehbûbê meya ‘eşqê pêşkêşî ‘aşiqî kiriye, bi tîra evînê, cerg û hinavên wî ker ker bûne. Derba firqetê, xarên sorgulan, xemze û çavên yarê sebeba birîndarkirin û xwînîkirina cegera ‘aşiqî ne.

Mehbûb bi cama pur gulav ker kir li min cerg û hinav
Zehra helahil bû di nav lew saqî ew cellabi da (2/5)

Hebîbê bêxeta kuştim bi derba firqetê axir
Ji wê rojê dizanî min ku yar ew tîr li cergê da (5/10)

Sed nişab in min di dil îro ji xarên sorgulan
Yek bi yek peykan çevîbûn çûne cergê da kulab (16/2)

#### 3.7.4.1. Teşbîhên Derbarê Cegerê de

##### 3.7.4.1.1. Ateş (Agir)

Cegera ‘aşiqî ji aliyê agirê evînê ve hatiye sohtin û agir, di wê derê de bûye pêt. Bi vê teheyyûlê, ax û oxên ji cegera ‘aşiqî tên, weke bayê ji êgir hatî tê îzahkirin.

Tîr dan ji qewsê malzirav ew gewhera pur şewq û tav
Sohtin li min sîne û nav lew tên ji cergê ateşîn (79/8)

##### 3.7.4.1.2. Çeng û Jeh

Ji ber nalîn û fîxanê, di navbera cerg, çeng û jihê de têkiliyek hatiye dayîn. Cerg û hinavê ‘aşiqî ji derbên tîrên yarê û firqetê birîndar bûne. Çawa deng ji çeng û jehê tê, her wisa ‘aşiq jî, wek wan dinale û dizare.

Ma ji ber derb û fîraqa te sukûnek me heye
Cerg û dil herdu bi nalî ne wekî çeng û jihê (110/6)

### 3.8. Hal û Rewşên ‘Aşiqî Yên Mayî

### 3.8.1. Hicran (Hicr/Firaq/Firqet)

Derdê herî giran ji ‘aşiqî re firqet e. Firqetê agirek berdaye can û dilê ‘aşiqî û ji serî heta pêyan ew şewitandiye. Bêbereketî, bêsi’ûdî, jarî û ze’îfbûna wî, feryad û fîxana wî ya weke tûtak û pepûkan hemû ji ber firqetê çêbûne. Hemû kar û xebatên ‘aşiqî, ji bo gehiştina wuslatê ye. Ancax wuslatê dikare xedengên ku firqetê di dilê wî de daçikandine, jê derêxîne û birîna dilê wî bikewîne. Firqeta rûsiyah, canê ‘aşiqî yê

şirîn jê sitandiye, xewa şevan lê heram kiriye û dunya jê re kiriye mij û xemam. Mirin, ji firqetê hêsantir e. Ji xwe mirin, ji bo ehlê ‘irfanê sebeba wuslatê ye, lê di destê firqetê de ew bêzar e, lewra firqet derdekî xedar e.

Bi narê firqetê sohtim ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nohtim ji berqa lami‘a tê da (5/1)

Derdê xedar bêm firqet e firqet ji can pur zehmet e
Yan sehl e 'aşiq ruh dete feryad ji destê firqetê (115/17)

Dunya bi min mij bû xemam xew min li çava bû heram
'Umrek bi vî halê temam feryad ji destê firqetê (115/5)

Sebeba dûrketina ji mehbûbê, çerxa felekê ye. Ew di destê felekê de weke belçima li ber bê ye. Bayê felekê ew gelekî hilavêtiye û di vê dewran û çerxê de ‘aqibeta xwe jî nizane. ‘Aşiq, ji bo sakînbûn û arambûnê daxwaza wuslatê dike.

Ji mehbûb dûr kirim çerxê felek wê pur hilavêtim
Nizanim dê li kû dit min di vê dewran û çerxê da (5/9)

‘Aşiq, sebeba firqetê nizane. Ew xwe bêxeta dihesibîne. Lê tîne bîra xwe ku firqet wek cebrî bûye nesîbê wî. Di ezeliyetê de, hebîbê bi tîra firqetê derbek li ‘aşiqî daye û ew kiriye giriftarê firqetê.

Hebîbê bêxeta kuştim bi derba firqetê axir
Ji wê rojê dizanî min ku yar ew tîr li cergê da (5/10)

Ehlê ‘eşqê baş dizane bi êş û sohtina firqetê. Yê nizane ka ji destê firqetê çi tê kêşandin bila ji ‘aşiqan pirs bike, lewra kesê bi serê wî ve ev bûyer nehatî, nizane ka ev çi derdekî bêderman e. Kesê ku neketibe firaq û hicranê, şewitîna can û dilî nizane. Hicran nebe, tiştek nikare ruh û canî ji hev cuda bike. Ev yek jî îşaretî can û qefesê dike ku Xwûda ji ruhê xwe puf kiriye însên û ketiye qefesa bedenê. Ew ruh dixwaze ji wê qefesê azad bibe, dîsa bigehije esliyeta xwe, yanî bigehije neyistana xwe.

Narê fîraq û sohtinê êşa xedengan nohtinê
Pirs kin ji 'uşşaqan tenê feryad ji destê firqetê (115/18)

Heçî firqet nedî hicran nebê min dax û key lê ne
Ji bil derbê di hicran û fîraqê rûh û can tê da (5/2)

#### 3.8.1.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Hicranê de

##### 3.8.1.1.1. Agir (Nar)

Sohtinî, xusûsiyeta agir û evînê ye. Yek ji aliyê maddî ve yek jî ji aliyê me'newî ve dişewitîne. Êş û izdiraba şewata me'newî, ji ya maddî dijwartir e, lewra sohtina me'newî dewamî ye û dermanê wê jî, ji xeyrî wuslatê ne tiştek e. Firqeta ku 'aşiqî ketiye nêv, weke êgir, can û bedena wî wisa disoje, heta dil û cegerên wî dike weke kebabê. Agirê ketiye dilî, derdê herî giran û zehmet e. Ew agirê hîcranê li wê derê disoje heta ruh û canê 'aşiqî jê distîne.

Şerbeta jehra helahil bû di nav şîrînleban
Lew bi narê firqetê axir li min dil kir kebab (16/22)

Vê firqetê dil pur şewitand cerhên qedîm dîsa kewand
Şîşên di sor ta ta tewand feryad ji destê firqetê (115/8)

##### 3.8.1.1.2. Xedeng (Tîr)

Di navbera xedeng û cudahiyê de, ji aliyê tesîr û tehrîbkirinê de wekheviyek heye. Çawa tîr li dil û cegeran bikeve, xwîn ji bedenê tê û weke derba kuştinê tesîrê lê dike, herwisa firqet jî li ser 'aşiqî tesîreke wisa tehrîbkar û dijwar dihêle. Ew xedengên yarê yên kujer ku di dilê 'aşiqî de çikiyane, eger ew tîr li Çiyayê Cebelê jî bikevin dê wî jî ker ker bikin. Di vê teşbîhê de wek telmîhî nûr û tecelliya Xwûda ya Çiyayê Tûrê tîne bîrê. Tecelliya Îlahî, ew çiya zîr û zeber kiribû. Di dilê 'aşiqî de jî 'eşqa îlahî, nûra Îlahî heye, kerkerbûna wê derê ji ber vê yekê ye.

Xedenga firqetê re'd e dilê ew xefletê lê dit
Dibêjim wer Cebel bit ew bi ker bit wê gavê da (5/3)

##### 3.8.1.1.3. Cur'e

Di tesewwifê de 'eşq, bi şerab û meyê re hatiye sembolîzekirin. Bi vexwarina vê cur'eyê re mihnetkêşan û ketina firqetê dest pê dike. Daxwaza vexwarina şeraba 'eşqê ji aliyê ehlê irfanê/ehlê 'eşqê ve hatiye kirin. Mela Camî wiha du'a dike: "*Ya Reb, qedehek ji şeraba muhebbetê, ji qedeha dewlet û se'adetê neşweyekî ihsanî me bike.*"[636] Melayê Cizîrî jî, sedemê firqeta xwe bi vexwarine meya ezelî ve girêdide. Firqet û hîcrana xwe wek teqdîra Îlahî dihesibîne.

[636] Ya Reb zi meyê muhbetem camê bixeş
We zi saxer dewletem serencamê bixeş (Molla Camî, Levamî/Aşk ve Şaraba Daîr, r. 22.

Kesê mihnet dî firqet vexwarî cur'eya hicrê
Giryê wan tê bi halê min di vê hicran û zecrê da (5/5)

#### 3.8.1.1.4. Qiyamet, Rûsiyah

Menzeraya qiyametrabûnê di Qur'an û hedîsan de hatiye beyankirin ku rewşeke pir dehşet û xof e.[637] Qiyametrabûn, îşaretî "poşmanî, tirs, xem, kovan û derdan"[638] dike. Dem û se'eta ku 'aşiq ketiye firqetê, ew dem ji wî re bûye weke demeke qiyametrabûnê. Dûrkeftina ji mehbûbê weke xirabûna dinyayê ne xweş û zehmet e.

Zori Mela firqetê ebter kirîn
Inne mine's-sa'eti yewme'r-rehîl[639] (72/15)

Firaq, di sûretê kesekî rûreş de hatiye teşbîhkirin. Firaq ew qas rûreş e, lewra 'aşiqî ji mehbûba wî dûr kiriye û ew ebter kiriye. Sebeba nexweşî û ji başiyê dûrkirinê firaq e. 'Aşiq ji ber firaqê ketiye halekî wisa dijwar, herwekî qiyamet li ser serê wî rabûye.

Mela bêqameta yekta qiyamet min bi çehvan dî
Fîraqê rûsiya bin ta ji min canê şîrîn cê da (5/43)

### 3.8.2. Weslet (Wasil/Wîsal/Wesl)

Jiyana 'aşiqî di navbera helezonga firqet û wuslatê de derbas dibe. 'Aşiq ji neyistana xwe dûr ketiye, dixwaze dîsa bigehije wê rawestgehê û bibe wasilê yara xwe. Cehd û xebatên wî ji bo vê gehiştinê ne. Di rêya 'eşqê de, daxwaza gehiştina meqama fenayê giring e. Bi gehiştina vê meqamê, wuslat peyda dibe, yanî "fenafîllah", meqama wuslatê ye. Di 'eşqê de wasilbûn û baqîbûn, bi fenabûnê ve girêdayî ne. Eger salik/'aşiq, di rêya seyr û sulûkê de, xwe tune bike, ji ezîtiya xwe derbas bibe bigehije meqam û mertebeya "fenafîllah"ê, ew hem wasilê mehbûbê dibe hem jî di zatê Xwûda de baqî dibe. Sohtina 'eşqê, 'aşiqî fena dike û ber bi wuslatê ve dibe. Dereceya sohtina wî, nêzîkbûna wuslata wî nîşan dide. Xelata gehiştina meqama fenafîllahê, dîtina husn û cemalê Xwûda ye. Daxwaz û lavaya 'aşiqî ji Xwûda ew e ku wî wasilê xwe bike, ji sohtina firaqê, feryad û fîxanê xilas bike.

Lew di 'işqê da fena bû da bibit baqî bi dost

---

[637] "Gava ku roj were pêçan. Gava ku stêr reş bibin û bikevin. Gava ku çiya bêne hejandin û ajotin." (Sûreya Tekwîr, 81/1-3)
[638] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 768.
[639] "Roja firqetê, ji min re weke qiyametrabûnê ye."

'Aşiqê fanî nebû wasil hetta baqî nebû (104/15)

Ya Reb bi dîdara xwe kî min wasilê yara xwe kî
Bes sohtîyê nara xwe kî feryad ji destê firqetê (115/21)

Wuslatxwestin, daxwaza yekîtiya ruhan e. Di "mertebeya late'eyyûnê" de zatê qedîm yek e û husn û hub di zatê wî de her hebûne.[640] Paşê ew ji hev cuda bûne û dixwazin di wî zatê qedîm de dîsa bibin yek.

Qestê wehdet dikirit rûh bi rûh
We ne 'aşiq ji wîsalê çi xerez (57/7)

**3.8.2.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Wesletê de**

**3.8.2.1.1. Çira**

Firqet, bi zulmetê (tarîtî) û weslet jî bi ronahiyê (çira) tê sembolîzekirin. Çira/find, hem dawîlêanîna zulmetê ye hem jî îşaretê bi tecelliya nûra Heq dike. "*Xwûda, nûra 'erd û asîmana ye.*" (Sûreya Nûr 24/53). Ew nûr, di mehbûban de jî tecellî bûye. Hilbûna çirayê îşaretê bi wuslatê dike û dîtina yarê dil û çavên 'aşiqî rohnî dike. Şem'/çira û perwane, wuslata 'aşiq û me'şûqê temsîl dikin. Dema perwane çirayê bibîne, tê 'eşqê, ji bo ku bi nûrê re wasil bibe, dixwaze di şewq û nûra çirayê de xwe tune bike. Xwetunekirin û sohtina wî, daxwaza gehiştina fenafillahê û baqîbûnê ye.

Gelo dîsa bibînim ez çiraya wesletê hil bit
Bisojim şubhet perwanê li ber wê nûr û şewqê da (5/11)

**3.8.2.1.2. Cennet, Heyat**

Di navbera wuslat û beheştê de, ji aliyê zewq û hestxweşiyê ve têkiliyek hatiye dayîn. Wuslat weke xweşiya beheştê hatiye teheyyûlkirin. Beheşt, bi nî'met û zewkên xwe ve çiqas xweş be, wuslata mehbûbê jî, ji bo 'aşiqî ew qas xweş e û ji beheştê jî xweştir e. Lewra dibêje eger ji gulistana cemalê mehbûbê yek gul tenê jî xwûya bike, dê beheşta Îremê bimîne di bin siya wê de û dê navê beheştê bê jibîrkirin. Di nezera ehlê 'îrfanê de, meqseda daxwaza cennetê jî, xwestina dîtîna husn û cemalê zatê ezelî ye.

Wê horîsiriştê li me xweş meywe ye ber kir
Cennat e di wesla te û ateşperes î tu (105/11)

[640] Husn û hubb zatê qedîm in lê cuda bûn ew ji yek
Lê niha ismê hudûsê li hukmê tefsîl bû (104/4)

Ji gulistana cemalê te gulek bête zuhûrê
Ji dinê dê biçitin navê bihişta Îremê (109/8)

Firaqa ji mehbûbê, ji bo ‘aşiqî mirin e û dermanê vî derdê bêderman jî wuslat e. Wuslat û gehiştina yarê, ji bo can û dilê ‘aşiqî, heyat e. Ew can û dilê di firqet û dûrkeftinê de helak bûyî, ancax bi wîsalê (gehiştina meqama wehdetê) zînde dibe.

Wesla te li can û dil heyat e
(Men zaqe merareten-newey tah)[641] (34/3)

**3.8.2.1.3. Şîfa, Şerbet**

Wuslat, ji bo kûl û derd û elemên ‘aşiqî şîfa û şerbet e. ‘Aşiqê şerbeta wuslatê vexwe, ji hemû elemên wî re şîfa û derman peyda dibe. Wuslat, bi xwe re gelek xweşî û nî’metan jî tîne. Derman û daruyê nexweşiya evînê her wuslat e. Ji xeyrê wuslatê tu derman, birîn û daxên ‘eşq û evînê sax nakin û nakewînin. Mehbûb, bi firaqê ‘aşiqên xwe îmtîhan dikin, samîmiyet û sedeqeta wan diceribînin û paşê jî bi wuslata xwe, wan xelat dikin.

Daruwê derdê me tu yî canê min
Hel bi siwe’l-wesli şifau’l-‘elîl[642] (72/6)

Şerbeta wesla xwe nadet yar henin 'aşiq ceza det
Dilberan ev reng e 'adet mehruwan kemter wefa ye (96/18)

**3.8.2.1.4. Zekat**

Têkiliya di navbera zekatxwestin û wîsalxwestinê de muhtacbûn û daxwazî ye. Zekat, ji feqîr û xweyî muhtacan re tê dayîn. Li ser rûyê dinyayê sermayeyê ‘aşiqî jî, bi tenê hebûna mehbûbê ye. Lewra şa’ir dibêje, Xwûda, ji xeyrî xemê ‘eşqê tiştek nekiriye nesîbê min.[643] Firqetê, sermayeya ‘aşiqî jê standiye û ew feqîr hiştiye û bûye muhtacê zekata wuslata wê. Eger mehbûb wuslata zekata xwe bide ‘aşiqî, dê ew hewcedariyên xwe (gehiştina fenayê û baqîbûn) pêk bîne.

Telbe kir weslê j'dilber me bi 'inwanê zekat
Go tu 'ebd î û bi 'ebdê xwe zekatê nadim (75/8)

---

[641] “Dawiya kesê ji elema firaqa te vexwarî, helakbûn e.”
[642] “Ma ji xeyrî wuslatê, dermanê nexweşiya evînê heye?”
[643] Minnet ji Xûdayî ku bi 'ebdê xwe Mela yî
Iksîrê xemê ‘işqê be dînar û direm de (1/10)

### 3.9. Reqîb (Exyar, ‘Edû/Dijmin)

Reqîb, di navbera ‘aşiq û me’şûqê de kesayetekî fesad û çavnebar e. Ew, dikeve navbera evîndar û yaran, ‘ewanî û fesadiyê dike û her daîm ji hevdîtin û civîna wan re dibe asteng.[644] Reqîb, ji her aliyî ve kesekî neyînî ye û ji bo yarê bi ‘aşiqî re ketiye reqabetê. Ji ber mehbûbê, dunya ‘alem ji ‘aşiqî re bûne dijmin. ‘Aşiq vê yekê ji xwe re nake xem û derd, lewra ew dizane ku eger dilber jê re yar bit, ‘alem hemû jî dijminên wî bin ne giring e. Dostbûn û hevalbûna dilberê besî wî ye.

Zaxan li bax rav girtinin me’şûq ji rengê sosin in
Dunya li min bû dujmin in seb xatirê gerden zirav (65/5)

Leşkerê alem meger yekser te dijmin bin Mela
Xem bi mûyek nakişînî ger te dilber yarî bit (19/19)

Mehbûb dema eleqeyê nîşanî ‘aşiqî bide, hêrs û çavnebariya reqîbî zêde dibe. Ji ‘aşiqî re nîşandana ‘eleqeyê ji reqîbî re dibe cezayek. Dema ava heyatê ji ‘aşiqî re tê dayîn, ew dikeve nêv dilxweşî û kêfxweşiyê û girîn û zarîn jî dibe nesîbê reqîbî. Mela Ebdurrehîmê Westanî, ava heyatê bi zanîn û me’rîfetê, bi zindîkirinê, bi qebûlkirinê û dijmin jî bi şeytan û wesweseyên nefsê ve sembolîze dike.[645] Razîbûna mehbûbê bi ‘aşiqî re, sebeba harbûna şeytan û nefsê ye.

Avê heyatê bi me da şerbetek
Zinde kirîn ma ji 'edû ra neşac (30/3)

Destê me seher girt û birîn seyrê hebîbê
Filhali reqîbî ji hesed lerze û ta girt (20/9)

‘Aşiq, di ‘eşqê de gelekî bexîl û hesûd e. Ew naxwaze ji xeyrî xwe, mehbûb bi kesekî re eleqeyê nîşan bide. Ew dixwaze gulên gulzaran ji xwe re biçîne û xar û êstirî jî bibin para exyaran/reqîban. ‘Aşiq, ji yarê dixwaze ku mey û şeraba ‘eşqê nedete exyaran û rê nede û nehêle ew bêne nêv gulzarê jî, lewra reqîb û exyar, xwînxwar û xwînmijên gulê ne û ew murdar in, ne layiqî mehbûbê ne.

Biçîn werdan ji gulzaran ku exyaran di dest xar in
Ji mexsûsanê dergahî du‘a min ew di hecrê da (5/33)

Camê bi exyaran nedî xemrê bi xûnxwaran nedî
Werdan bi murdaran nedî wan rê di gulzaran nedî (125/11)

[644] Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 57.
[645] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 127.

Kar û xebatên reqîbî, astengkirina hevgehiştina dilber û dildarî ye. Fesadî, tevlihevkirin û xeberguhêzî xusûsiyetên pîşeya wî ne. Sedema rencîdekirin û dilşikênandina ‘aşiqî ji aliyê yarê ve, reqîbê fesad e. Ew dibe sebeb ku mehbûb berê xwe ji ‘aşiqî veguhere û ‘eleqeya xwe ji wî bibire. Reqîb bûye sebeb ku ji ‘aşiqî re jehrî û ji reqîban re jî şehd û şeker hatiye pêşkêşkirin. ‘Aşiq ji vê yekê aciz dibe û weke pêt û perengan di hêrsa agirê dilê xwe de dişewite û xwe ji wîsalê dûr digire.

Rûh û rewanê min hebîb dîsa bi telbîsa reqîb
Rencide kir miskîn xerib terka dilê ehbabi da (2/4)

Bi me da jehr û reqîban di devî şehd û şeker kir
Em bûyîn pêt û pereng lew ji wîsalê me hezer kir (122/5)

Reqîb, bi fitne û fesadiya xwe ve wek şeytanê le’în, rûsiyah tê wesifdan. Ew kesekî rûreş û bêyom e. Ji firqetê bigire heta hemû tiştên neyînî, sebeba bûyîna van fî’lan, hemû reqîbê le’înê şeytan û rûreş e.

Min go gelo ey dilruba fitna reqîb feyde heye
Go sond bi husna min ku ne lê fi'lê Şeytan e xerez (58/6)

'Işqi derdek bêtebîb e lê mufa wesla hebîb e
Kuştime dewra reqîb e pur le'înê rûsiya ye (95/4)

# BEŞA ÇAREM

## 4. ÇAVKANIYÊN HIZRÎ YÊN BINGEHA XWE JI TEBÎ'ETÊ/ SIRUŞTÊ HILGIRTÎ

### 4.1. Alema Kozmîk/Felek

Felek, wek têgeheke astronomiyê cihê vegera stêran e. Astronoman, sîstema kadizê, ji bo îzahkirina hereketên rojgaran/gerestêrkan, weke heft helqeyên di nav hev de tesewwir kirine û her rojgarek li ser helqeyekê siwar kirine û bi izna Xwûda li ser wê sîstemê dizivirin.[646]

Felek, di berginda asîman û qubbeya asîmanî de cih girtiye. Di edebiyatê de ji bo felekê, peyvên weke "çerx, sema, dewran, sipihr, gerdûn, gunbedê dewwar, kursî û semayê" hatine bikaranîn. Felek û çerx, wek mecazî û tewriyewî tên wateyên "dehr, dunya, dewran, 'alem, talîh, bext û qederê". Alimên 'ilmê felekê, di bin bandora nezeriyeyên Batlamyus de mane û bi goreyî wî 'alem wesifandine û îzah kirine. Bi goreyî Batlamyus, felek ew e ku ji neh qubbeyên navhevî pêk tê û dunya bi wan hatiye dorpêçkirin. Dunya di merkezê de ye û li ser dunyayê jî tebeqeyên asîmanî hene. Di her tebeqeyekê de stêrek heye û di rêgehên xwe de dizivirin. Bi goreyî nêzîkahiya dunyayê, di nêv heft felekan de ev heft rojgar (seb'eyê seyyare) hene. Di feleka yekem de Heyv, di ya duyem de Utarîd (Merkûr), di ya sêyem de Zuhre (Wenûs), di ya çarem de Roj, di ya pêncem de Merîx (Mars), di ya şeşem de Muşterî (Bercîs, Jupîter) û di ya heftem de Zuhel (Keywan) heye. Di feleka heştem de stêrên sabit hene û jê re "Feleka Burûc" an jî 'erş û kursî tê gotin. Li derveyî hemûyan ku hemû dorpêç kirine, feleka nehem heye û jê re "Felekû'l-Eflak" tê gotin. Ev felek ji hemûyan mezintir û quwwettir e, lewra jê re "feleka 'ezem/çerxê 'ezem" jî tê gotin. Ev felek ji hemû cisman xalî ye û weke qumaşekî bê neqş û desen e. Lewra jê re "feleka etles/çerxa etles" jî tê gotin. Ji vê felekê re gelek nav hatine dayîn. Hinek astronoman ev felek bi navê "Erşê a'la, 'Erşê 'ezem, 'Erşê îlahî û 'Erşê Kursî" bi nav kirine. Her heşt felek, ji rojavayê ber bi rojhilatê ve dizivirin. Lêbelê feleka nehem (Felekû'l-eflak), dijî wan, ji rojhilatê, ber bi rojavayê ve dizivire. Ji ber vê yekê stêran jî bi xwe re digerîne û dûrahîya stêran bi hev re û bi burcan re vediguhere. Tê bawerkirin ku tesîra burcan li ser bext û talîha însanan heye. Bi goreyî vê baweriyê felek bi vê veguherînê re dibine sebeba xirabî û

[646] İlhan Kutluer, "Felek", *DİA,* c. 12, İstanbul 1995, r. 303-306.

bêyomîyê. Ev jî wek qedera însên hatiye hesibandin. Ji ber vê yekê însan dewamî ji felekê gilîdar bûne, ew xaîn û bêbext hesibandine. Bi vê munasebetê, felek di wateya “qeder”ê de hatiye bikaranîn. Însanan, felek kirine sedema bêtalîhî û izdirabên xwe û jê gilîdar bûne.[647]

Di dîwanê de sedema dûrketins aşiqî ji yarê, wek çerxa felekê hatiye dayîn. Felek, dibe sebeb ku burc û stêr ji hev dûr dikevin. Dûrketin û zêde hilavêtina ‘aşiqî jî, ji ber vê yekê ye. Ew ji felekê gilîdar e ku ew ji yarê dûr kiriye û nizane ka felek dê wî ber bi kîjan ‘aqibetê ve bibe jî. Ew, di destê felekê de weke belçima li ber bê ye.

Ji mehbûb dûr kirim çerxê felek wê pur hilavêtim
Nizanim dê li kû dit min di vê dewran û çerxê da (5/9)

Ka’înat, bi eşq û evînê hatiye wucûdê. Di ‘alema melekûtê de melek, di ‘alema felekan de hemû çerx û felek ji muhebbeta Xwûda dizivirin. Semakirina ‘aşiqan û zivirîna çerx û felekê ji ber muhebbeta Xaliqê Ezelî ye. Wek muharriqê ewwel, ji roja Xwûda ‘alem afirandî heta vê gavê, her tişt bi ‘eşq û şewkê dizivire û sema dike.

Bi evînê melek û çerx û felek têne sema
Rewşen in têki bi mihrê ji sema ta bi semek (68/7)

Çerx e felek û melek diyar in
Şemsun we kewakibun we ebrac (29/11)

‘Aşiq, ji destê felekê zar û giryan e. Bi gelemperî felek, bi rûyê xwe yê xeddar nîşanê bi ‘aşiqî dide. Ji ber derb, derd û azarên felekê, feryad û fîxana ‘aşiqî gehiştiye ber perê asîmanan. Herçendê, însan xwe di vê gerdûnê de sergeşte û serberedayî bibîne û bikeve xefletê jî, zengila mirinê, însên ji ber xefletê hişyar dike, lewra di menzîla dunyayê de emînî tune. Ewê tu avêtî, dê dîsa te hilde bibe. Şûrê felekê/şûrê ‘ecelê li ser serê însên dizivire û hişyariyan didê. Qentarê çerxê, bi feryadî gazî însên dike ku tedbîra xwe bibîne û nekeve xefletê. ‘Aşiqî ji destê vê çerx û felekê gelek afat û bela dîtine. Ew bi tecrûbeyî dibêje, ew kesê ji dil bibe yarê çerxê û dil berdê, ew ebleh e û ehmeq e, lewra tiştek weke xwe namîne û her tişt vediguhere û bi dawî dibe.

Agir di ab û gil dikit qelban ji qelban hil dikit
Metqeb di can û dil dikit daîm avistin karê çerx (35/12)

Pur min ji vê çerxê Mela kêşane afat û bela

[647] Kurnaz, “Felek”, *DİA,* c. 12, r. 306-307; Canım, b.n.b., r. 436.

Ebleh dibînim wî hela herçî ji dil bit yarê çerx (35/19)

Feleka nehem (çerxa tis’e), hem îşaretî mertebeyên te’eyyûnê dike hem jî îşaretê bi tebeqeya melekûtê dike. Melekên Subbûhî û Quddûsî, di vê felekê de te’eyyûn bûne û şeklê wan weke birqa agirî ye. Ew di vê derê de her daîm ji Xwûda re tesbîh û tehmîdan dikin. Şev û roj karê wan ‘îbadet, tesbîh û secdebirin e.

Westane şahid sef sef in batin di 'eynê xef xef in
Teşbîhê berqa xatif in lami' di çerxê tis'e da (9/95)

### 4.1.1. Afirandina ‘Alem û Felekan û Mertebeyên Afirandinê

‘Alem, di du merhaleyên bingehîn de hatiye wucûdê. Xwûda xwestiye xezîneya wî ya veşartî bête zanîn û ‘alem ji tunehiyê afirandiye. Paşê sudûrê dest pê kiriye. Heta ku ‘alem şeklê xwe yê îro hilgire, bi tedrîcî afirandinê berdewam kiriye. Bi goreyî Rîsaleyên Îxwanê Safayê, afirandina ‘alemê, di çend merheleyan de pêk hatiye û paşê şeklê xwe yê îro hilgirtiye. Afirînerê ‘alemê (el-Barî), ‘alem bi goreyî merhaleyan afirandiye:[648]

#### 4.1.1.1. El- Barî (Afirîner)

Xwuda, xwestiye bête zanîn û mexlûqat afirandiye. Ew xwestina wî rehmet e. Rewşa yekem ya zuhûrê ev rehmet e ku mekanekî me’newî çêbûye ku mexlûqat tê de bêne wucûdê. Ew, heyîna ezelî û ebedî ye. Bêmisl û bêşerîk e. Jê re tu şekl, fî’l û wesfên însanî (antropomorfîk) nikarên bêne nîsbetkirin.

Ellah sehergaha ezel yelmûmê 'işqê şu'le da
Nûra cemalê lem yezel zatê tecellaya xwe da (9/1)

Husn û cemalê xwast evîn vêkra di yek zatî cevîn
Nûra qedîm bû 'işq û vîn wan pêkve naz û 'işwe da (9/4)

#### 4.1.1.2. ‘Eqlê Ewwel

‘Eql, ew hebûna yekem e ku ji Barî sadir bûye. Xwûda tenezzul nekiriye ku bi hebûnên maddî re mijûl bibe, ji ber vê yekê sûretên hemû heyînên paşê çêbûyî, di vî ‘eqlî de afirandiye û wezîfeya destpêkirin û tenzîmkirina sudûrê daye ‘eqlî. Ji ‘eqlî, ruhê ‘alemê û maddeya yekem sudûr bûye.

Katib qelem dîsa gerand ismek ji isman sewwirand

[648] Mian Muhammed Şerîf (Ed.), *İslam Düşüncesi Tarihi*, (Wer. Mustafa Armağan ûym), c. 1, İnsan Yayınları, İstanbul 2014, r. 383-385; Titus Burckhardt, *Muhyiddin İbn Arabî’nin Mistik Astrolojisi*, (Wer. Mehmed Temelli), Verka Yayınları, Ankara 2018, r. 21-23.

Kursî ji nûrê afirand Cennatê Xuld û Sidre da (9/70)

Serçeşmeya wê dozexê behra cemalê da rexê44
Feyzek ji nûra berzexê dagirt û geh geh fûre da (9/71)

Avête durdana xwe dur îsand ji misbaha xwe sur
Dolabê necmê nehs û kur mihra sitêra Se'de da (9/107)

Çewganê bayê lamekan fulka felek qaîm sekan
Teşbîhê goy da ber şekan her bê sukûn û sekne da (9/108)

#### 4.1.1.3. Nefsê Kûllî (Rûhê Mutleq/Rûhê ‘Alemê)

Ev ruh, cewherekî basît e ku ji ‘eqlî sadir bûye. Ev ruh, di rojê de zuhûr dibe ku roj jî, heyatê dide ‘alema binheyvê.

Roj bû di nêva neynikê katib ji herfê 'eynikê
Nêv goşeya qewseynikê tuxra bi ismek taze da (9/81)

Tey kir di nêv tuxrayê ism teksîr ji herfan kir tilism
Husna muqeddes bû du qism hukmê tecellayê we da (9/82)

Yek 'eql û rûhê e'zem e misbah û nûra 'alem e
Hewwa û neqşê Adem e bêmudde bêmadde da (9)/83

#### 4.1.1.4. Heyûla

Heyûla di meddeya yekem de ew cewher e ku hecm û bûutên wî tune. Ew, cewherekî basît e û zat û puxteyekî me’newî ye. Maddeya yekem pasîf e û fî’l û enerjiya wî tune û bi serê xwe nikare sudûr bibe. ‘Eqil di ruhê ‘alemê de sudûra wî dibe. Rûhê ‘alemê meyl dide, bi cehd û hewlê, maddeyê dixe sûretên cuda.

Nûra tecella hate 'erş esma hemî lê bûne neqş
Şewqa di wan çû ta bi ferş isman bi zatî secde da (9/69)

Katib qelem dîsa gerand ismek ji isman sewwirand
Kursî ji nûrê afirand Cennatê Xuld û Sidre da (9/70)

Lefzê ku me'nayek divê terkîbê îmlayek divê
Sûret heyûlayek divê rûhan di nefsê cusse da (9/75)

#### 4.1.1.5. Tebî’et

Enerjiya ku di nav ‘alema binheyvê de belavbûyî, tesîrê li hemû cisman dike. Ev enerjî sebeba hereket, zindîbûn û veguherînê ye. Ev pergel û tenzîma di vê sudûrê de, bi hikmeta Xwûda, bi îrade û înayeta Îlahî dişixule.

Kullab bi destê Wahib e yan rakid e yan cazib e
Yan xafid e yan nasib e yan ref'e û yan cezme da (9/129)

Remza di necm û hey'etê 'eqlê mucerred naretê
Bênûrê 'ilmê wehdetê ew ma di şekk û şubhe da (9/131)

#### 4.1.1.6. Cismê Mutleq

Dema ruhê ‘alemê bi alîkariya ‘eqlî bi sê cihêtan ve meyla maddeyê kiriye, maddeyê dest bi hereketê kiriye û maddeya yekem bi sê ebyad/bû’ut (dirêjahî, firehî û kûrahî) bi dest xistine û bi vî awayî cismê mutleq û maddeya duyem peyda bûye. Cismê mutleq ew cewher e ku dinyaya me ji wê hatiye afirandin.

#### 4.1.1.7. Felek û ‘Alema Felekan

Di vê merheleyê de yanzdeh felekên me’newî sadir bûne. Ev felek ev in: Feleka Muhîtê, Feleka Stêrên Sabîte (kewâkibê sâbîte) û Feleka Stêrên Seyyare (kewâkibû’s-seyyâre ku ji seyyareyên Satûrn (Zuhel), Jupîter (Muşterî), Mars (Merîx), Roj, Wenûs (Zuhre), Merkûr (Utarîd) û heyvê pêk tên. Ev hemû cismên asîmanî, ji unsûra pêncem ya esîrê (ether) hatine afirandin ku ji ber vê yekê me’rûzî bûyîn û xirabûnê namînin.

Ew kamilê bê 'eyb û neqs ne çerx bi her yek new' û şexs
Wî yek bi yek anîne reqs tê seb'eyê seyyare da (9/109)

Her neh bi vê çerx û lezê çerx in li dora merkezê
Behra di 'alem lê kezê tê ev hebab sergeşte da (9/110)

Dolab û çerxê neh felek pêş destî kursî bûn helek
Sergeşte hatin ew gelek d'wê nuqteya mewhûme da (9/140)

#### 4.1.1.8. Çar Unsûr

Heyînên binheyvê (rêgeha heyvê) bi sudûra çar unsûran (agir, hewa, av û ax) pêk hatine. Di ‘alema binheyvê de bûyîn û xirabûn (kevn û fesad) dest pê dike. Ev çar unsûr di nav xwe de veduguherin. Av vediguhere hewa û êgir; agir vediguhere hewa, av û axê.

Çar 'unsur in çar teb'et in vêkra bi mîzan vêk ketin
B'hev ra muxalifsîret in lê d’sûretê şexsiyye da (9/124)

#### 4.1.1.9. Sê ‘Alem

Merhaleya sudûrê ya dawiyê, ji ‘alema me’den, nebat/riwek û heywanan sadir dibe. Ev ‘alem jî, di nav xwe de bi veguherîna çar unsûran û bi mîzan û pîvaneke têkilhevî ya çar unsûran, derketiye meydanê.

Hetta bi mîzan çar esil b'hev ra nebin cem' û wesil
Cisman ji hev nabin fesil bazû ji bazû şeq neda (9/125)

Ber bi sed pencereyan daye şu‘a‘ê qidemê
Gunbedê ‘işqê ji ser kursiyê dîwarê hudûs (28/8)

### 4.1.2. Tesewwûr, Teşbîh û Mecazên Derbarê Felekê de (Dewran, Çerx, Sîpîhr, Gunbedê Dewwar, ‘Erş û Kursî, Sema)

#### 4.1.2.1. Fulk (Keştî), Xurab (Qayik), Etles, Hebab

Asîman, ji aliyê reng, rast û firehiyê ve, bi behrê re tê wekandin. ‘Alem dema weke behrê bête tesewwûrkirin, stêr û rojgar jî weke keştiyan têne xeyalkirin. Felek, di nêv ‘alemê de, weke keştiyekê li ser behrê ye. Ew, li ser wê behrê hatine afirandin û paşê jî, bi tesîra bayê lamekanî (Xwûdayê bêcih û bê mekan/muharikê ewwel), felekan weke goyekî, dest bi zivirînê kirine. Dunya jî weke keştiyekê ye û di asîmanan de li ser rêgeha xwe dizivire û însan jî rêwiyên wê keştiyê ne.

Fulk û felek ji yek kokê tên. Felek, ew cih e ku stêr tê de diherikin û diçin. Stêr jî weke keştiyê/fulkê soberiyê dikin. Yek li ser behrê û yek jî di asîmanan de soberiyê dike. Ji ber vê yekê herdu jî bi “felek”ê hatine binavkirin.[649]

Çewganê bayê lamekan fulka felek qaîm sekan
Teşbîhê goy da ber şekan her bê sukûn û sekne da (9/108)

Felek, ji bo beyankirina mezinahiya ‘alemê, bi ‘alemê re hatiye muqayesekirin. ‘Erşê ‘ala, bêsînor e. Felek jî di nêv wê de weke berbiqên avê ne, yanî bi goreyî mezinahî û firehiya ‘alemê, tiştekî gelek hindik e. Têkiliya afirandinê û zindebûnê bi avê re heye. Xwûda dibêje ku her tişt ji avê zinde bûye.[650] Ji ber vê yekê jî, dibe ku her tiştî afirandî, di nav avê de hatiye teheyyûlkirin. Neh çerxên felekê di rêgehên xwe de, ji ber tesîra ‘eşqa îlahî sergeşte bûne û dizivirin. Gera stêr û rojgeran, bi teşbîha gera hebabê/berbiqê ya li ser avê hatiye teheyyûlkirin. Gera stêran bi goreyî sunnetullahê

[649] El-İsfahanî, “Felek”, b.n.b., r. 758.
[650] “Ma ew kesên ku kafir bûne, nizanin ku asîman û ‘erd herdu bi hev ve bûn, me ew ji hev veqetandin û me her tiştê zindî ji avê afirandiye?” (Sûreya Enbiya, 21/30)

çêbûye, lê belê li vir sebeba gera stêran wek husnê te’lîlî bi ‘eşqa îlahî ve hatiye girêdan.

Feleka Etlesi sergeşte di cama me hebab e
Mewc didet qulzemê 'işqê me li ser dest xurab e (94/1)

Neh çerxê sipihrê ji hewaya te û mihrê
Sergeşte ne ew têk vi me ra mislê hebabê (112/8)

Etles, navê feleka nehem e. Feleka Etlesê, li bin Feleka Kursiyê ye û jê re Feleka Bêstêr, Feleka Burcan jî tê gotin. Ji qumaşê bê neqş û nîgar re jî etles tê gotin. Ji ber ku ev felek bê stêr e (stêr û rojgar neqşên asîmanan in), bi etlesê re hatiye teşbîhkirin.

Ji meqsûdan tu yî bes min bibin ber çerxê Etles min
Ji xeyrê te nevêt kes min bi reştûzên muqewwes min (124/2)

#### 4.1.2.2. Tîr, Nûbar, Qews, Cedwel

Ji ber baweriya tesîra felekê ya li ser qeza û qederê, felek, weke nêçîrvanekî tîravêj tê teheyyûlkirin. Felek dişibe kevanê û ji wan kevanên xwe tîrên felekê tavêje însanan û bandorê li ser qeza û qedera wan dike. Hedef û sîpera tîr û nûbarên felekê, dilê ‘aşiqî ye û ew tîr û nûbar hedefên xwe digirin û ‘aşiqî dixin bin bandora xwe.

Ehmed im sine siper pêşberî tîra felekê
De'wedarê te me îro tu ji dehlê were der (44/7)

Ahê ji derdê dil neket herçî nedî azarê çerx
Derbê li nîva dil didet lami‘sifet nûbarê çerx (35/1)

Çerx di wateya qederê de jî tê bikaranîn. Bi tecelliya navê en-Nûr, sîberek ji ‘Eqlê Ewwel zuhûr dibe û jê re “Nefsê Kullî” an jî “Lewhê Mehfûz” tê gotin. Hemû tiştên ku dê biqewimin ji aliyê Eqlê Ewwelî ve di Nefsê Kullî de têne nivîsîn.[651] “Çerxê cedwelê”, îşaretê bi vê yekê dike ku unsûrên spehîtahiyê yên li ser rûyê yarê bêqusûr hatine xêzkirin. Ji aliyê rastbûn, xêzkirin û çêkirina bêqusûr ve di navbera çerxê (destê qudretê) û cedwelê de têkiliyek hatiye çêkirin.

Ellah di ber qalûbela da yexme ket qelbê Melê
Avêhte çerxê cedwelê ev reng e ‘enberbarê xet (59/12)

[651] Titus Burckhardt, b.n.b., r.21.

#### 4.1.2.3. Mîna, Gunbed, Dolab, Xêvet

Asîman, bi şekl û dewr û gera xwe ve "gunbedê dewwar" e. 'Esman, bi giroverbûn û gerdûniyê ve weke gunbed û dolabekê hatiye teheyyûlkirin. Neh felekên li 'esmanan ku weke dolab û gunbedê dewwar girover in, di rêgehên xwe de dizivirin.

Şemsî bi şemsî cam bi cam hetta dikin dewrê temam
Ateş dirêjit her medam ev gunbedê dewwarê çerx (35/11)

Dolab û çerxê neh felek pêş destî kursî bûn helek
Sergeşte hatin ew gelek d'wê nuqteya mewhûme da (9/140)

Gunbeda 'esmanê bi rengê xwe ve hişîn e (mîna). Ava li ser dunyayê hatî afirandin jî, rengê xwe ji rengê 'esmanê hildigire. Hişînahiya 'esmanê, ji aliyê destê qudretê ve hatiye te'yînkirin.

Hê di ber qalûbelayê belku ev 'alem nebû
Çerx û dewran dewrê gerdûn gunbedê mîna nebû (104/1)

#### 4.1.2.4. Nêçîrvan, Dam/Kemîn, Şunqar (Teyrê Baz)

Felek, weke nêçîrvanekî hatiye teheyyûlkirin. Nêçîrvanê felekê, li ber 'aşiqî kemîn vedaye û singê wî ji xwe re kiriye sîper û hedef. Ji her aliyê çeperên çerxê ve, bela û musîbet, weke tîran bi ser 'aşiqî de dibarin.

Tên sîneyan peykan nehîn amancê wan tîran em în
Dama belayên der kemîn her goşe doramarê çerx (35/2)

Di navbera çerxê û teyrê bazî de ji aliyê nêçîrvaniyê ve têkiliyek heye. Herduyan jî, li ber nêçîrên xwe, dav vedane û dixwazin wan bixin nav dava xwe. Qeza û qederê, weke şunqarê, 'aşiqî xistiye nav pençeyên xwe, îşkenceyan lê dike.

Bîra xwe tînin xonçeyan 'aşiq di nêv îşkenceyan
Tavête dil pur pençeyan herdem ji nû şunqarê çerx (35/3)

#### 4.1.2.5. Qentar (Kerwan)

Her tiştê afirandî, hereket dikin. Însan û felek jî weke karwanan bi dûv hev girtine û ber bi menzîlekê ve diçin. Însan di 'alemê de rêwî ye û di nav kerwanê însanan de ber bi menzîla axîretê ve dimeşe. Çerx û gerdûn jî li ser rêgehên xwe di rêwîtiyekê de ne û ew jî ber bi menzîlekê ve diherikin û diçin.

Gavek ji dengê zengilan êmin çi rûnîn menzilan
Hey hey bibînin mehmilan feryad e her qentarê çerx (35/18)

#### 4.1.2.6. ‘Eşq, Gulzar

Stêr û felekên li asîmanan, mezherî tecelliya Xwûda ne. Li ser rêgeha xwe zivirina wan ji ber ‘eşqa Îlahî ye. Ew jî, ji ber wê muhebbetê sema dikin û weke perwaneyê li derdora wê şu’aya qidemî dizivirin. Ew felekên ku weke gunbedê li asîmanan hatine daliqandin, ji ber ‘eşqa Îlahî digerin û sema dikin. Ger û dewra felekan wek tesîreke ‘aşiqane, hatiye teheyyûlkirin.

Ber bi sed pencereyan daye şu‘a‘ê qidemê
Gunbedê ‘işqê ji ser kursiyê dîwarê hudûs (28/8)

Ji ber gul û bilbilê, çerx/dunya weke gulistanekê hatiye qebûlkirin. Çerxa felekê, weke gulzarekê ye û tê de hemû unsûrên spehîtahiyê û yên ‘eşq û muhebbetê hene. Cihê ku ew qas spehîtahî lê hebin, êdî ew der weke gulzarekê ye.

Ji kovana letîfa gul‘izar têtin ji bulbul ah û zar
Şûna gulan restîne xar nêva cihê gulzarê çerx (35/4)

#### 4.1.2.7. Sehhar, Mekkar, Ejdeha Mişar/Erre

Felaketên ku bi serê ‘aşiqî ve hatine, ji aliyê felekê ve hatine. Felekê bi hîle û huqqebaziyê ‘aşiq xapandiye û xistiye halekî dijwar. Felek hîlebaz e û sed baziyan bi ‘aşiqî re dileyize û nahêle ew bigihije wuslatê. Felekê rengên xwe yên cuda hemû nîşanî ‘aşiqî dane. Bilxesse rengên wê yên neyînî yên weke sehhar, mekkar û hîlebazî para wî ketine.

Sed baziyan ev huqqebaz dînit bi hîle karisaz
Geh geh ku naze û geh nîyaz sehharî pur mekkarê çerx (35/5)

Felek, rûreş e û bêbext e, lewra ‘aşiq ditirse ku hêj ew negihayî mirazê xwe, felek weke ejdehayekî bê û wî bixwe. Negehiştina mirazan û wasilnebûna yarê, ‘aşiqî xistiye nav ‘ezabeke dijwar. Di vê hengamê de candayîna wî (‘ecelhatina wî) weke ji destê ejdehayê ve bête standin, hatiye teheyyûlkirin. ‘Ecel, weke ejdehayê ye, dema hat ji destê wî xilasbûn tune.

Çerx tirsim kit şitabê zû ecel pê det rikabê
Can birit me d'vê 'ezabê ev siyahreng ejdeha ye (96/23)

Felek xayîn e û nahêle tu kes dêza xwe bi ser bixe. Ew mişarekî didanjehrî ye û ‘umrê însên her dibire û zehîra xwe dixe can û bedena wî. Kêmbûn û xelasbûna ‘umrê însên, weke birrîna tiştekî bi mişara çerxê hatiye beyankirin.

Ev erreya jehrî didan min jê di dil da bin sinan
Ma l'behrê ferqê dijminan bêt û biret minşarê çerx (35/7)

#### 4.1.3. Stêr (Necm, Kewkeb, Exter)

Stêr, cismên girover û birqdar in. Ew, bi xusûsiyetên reng, şekil û birqdariyê ve bûne mijar. Di serdema navîn de heft gerestêrk (seb'eyê seyyare) jî wek stêran dihatine qebûlkirin. Ji wan heft gerestêrkan re "seb'eyê seyyarê" û ji yên mayî re jî "stêrên sabit" dihate gotin.[652]

Sûret bi sûret lê kişand lewhê heyûla neqqişand
Zîrav ji nûrê lê reşand teqwîm û şekl û xane da (9/121)

Katib di çerxê cedwelê xweş neqşi avêtê welê
Kir haşiya heft heykelê nêv kulliyatê xemse da (9/122)

Stêrnasiyê, di gelek kulturan de bi wateyên dînî û mîtolojîk ve cihekî giring hilgirtiye. Asîman wek herêmeke îlahî hatiye hesibandin û bûyerên li wê derê diqewimin jî weke fa'aliyetên xwedawendan hatine dîtin. Di Yewnana Berê de, her gerestêrkek bi navê xwedawendekî ve dihate beyankirin. Di Misira Berê de cismên asîmanî wekî xwedawend dihatine qebûlkirin. Di Qur'anê de tê beyankirin ku di pêşiya Mûsa Pêxember, 'Erebên Hîmyerî roj dihebandin.[653] Di dewra cahiliyê de, di nav 'ereban de astronomî di rewacê de bûye. Di rêwitiya şevê de di rênaskirin, te'yînkirina demsalan û texmînkirina rewşa hewayê de, ji stêrên sabît, îstîfade hatiye kirin. Bi vî awayî 'ilmekî gelêrî çêbûye û bi navê "ilmê enwaî" namdar bûye. Ji aliyê gel ve hatiye bawerkirin ku rewş û hereketên stêran, li ser bûyerên dunyayê û li ser qedera însanan tesîrdar e. Navên stêran di nav Hînt, Sumer, Babîl, Misir û Asûriyan de belav bûye. Di nêzikî sala 150yê ya Miladî de, Batlamyus (Ptolemaios), derbarê navên stêran û zanistên 'ilmê enwayî de kitêbekê dinivîse û bi navê *el-Mecîstî* ber bi 'erebî ve tê wergerandin. Berê, stêr, sabît (el-kewakîbû's-sabîte, es-sewabît) dihatine qebûlkirin û astronomên berê roj û heyv jî wek gerestêrk qebûl dikirin. Di sedsala 16em de piştî teoriya Copernîcus ya navendîbûna rojê, roj bû navenda kaînatê û heyv jî wek peyka dunyayê hate qebûlkirin. Ji dewra berê heta vê demê heft gerestêrkên ku hatine zanîn ev in: 1. Heyv (qemer, sipihr, neyyîrê esxer, peykê felekê), 2. Merkûr (Utarîd, debîrê felekê, debîrê asîman, mûnşîyê çerxê, el-katîb, tîr), 3. Wenûs (Zuhre, se'dê esxer,

[652] İhvanı- Safa Risaleleri, Ayrıntı Yayınları, (Wer. Ali Durusoy ûym), İstanbul 2017, r. 83.
[653] Min ew û nijada wê dîtin ku dev ji Xweda berdabûn û ji rojê re secde dibirin. (Sûreya Neml, 27/24)

kewkebê seherê, kewkebê ‘îşayê, nahîde), 4. Roj (Şems, Afîtab, Xûrşîd, Mîhr, Hûr, Neyyîrê e’zem), 5. Mars (Merîx, Mirrîx, Nehsê esxer, Celladê felekê, behram, el-ehmer), 6. Jûpîter (Muşterî, Hurmûz, Se’dê ekber, Se’dê uzma, Bercîs), 7. Satûrn (Zuhel, Keywan, Pasbanê felekê, el-muqatîl). Piştî îcadkirina teleskopê, di sedsala 18em de, Uranûs û Neptûn jî li ser gerestêrkan zêde bûne.[654]

Mestane govendê dikin reqsê li dor findê dikin
Qesta şekerxendê dikin le'lan ji gewher xende da (9/119)

Tê bayê çerx û lewleban tedwîr û seyra kewkeban
Şe'şa'niya roz û şeban dolabê her jê tê seda (9/120)

Bi goreyî ‘ilmê nucûmê tê bawerkirin ku jihevdûrbûn û nêzîkbûna stêran, di burcan de hevgehiştina wan, tesîrê li ser bext û si’ûdiya însanan dihêle. Stêr, bi teşbîh û tesewwûran ve, wek kevneşopekê, di nav edebiyatê de cihekî giring wergirtiye.

Zuhre û ‘iqd û Sureyya keşşifîbûn ew di şerq
Sayeya bextê me dayê ma li ser perde’w nîqab (16/5)

Dil nefes dîsa bi ber hat lew hekîm Luqman bi ser hat
Nafi'ê derdê ceger hat tali'ê kewkeb numa ye (96/3)

Vêk ketin Şems û Zuhel îro di burca ‘Eqrebê
Seyf çû destê Merîxê mulkê dil lew kir xerab (16/7)

Bi goreyî ‘ilmê nucûmê, hinek stêr bioxir (se’d), (Jûpîter/Muşterî û Venûs/Zuhre) û hinek jî bêyom (nehs), (Zuxel/Satûrn û Merîx/Mars) in. Stêr dema di burcên xwe de cih bigirin, ji wî cihî re “şeref” tê gotin. Ev peyv, hem di wateya rasteqîn hem jî ya mecazî de bi kînayewî tê bikaranîn û îşaretî medh û bilindkirina şan û şerefa memdûhî jî dike.

Kewkeba se'da şeref tali' te nêv burca te bit
Da tinê j'çerxa bela şubhetê mehê menzûri bî (117/2)

Lami'a fetha ezel berqê ji ber tacê te dit
Kewkeba se'da ebed necmek ji seyyarê te bî (116/6)

Daîma menzilgeha sûra te bi burca Şeref
Tali'ê ferxende û bextê se'îd yarê te bî (116/3)

[654] Yavuz Unat, “Yıldız”, *DİA*, c. 43, İstanbul 2013, r. 534-538.

#### 4.1.3.1. Tesewwûr û Teşbîhên Derbarê Stêran de

##### 4.1.3.1.1. Tecellî

Şewq û ronahiya stêran, weke nûra Xwûda tê teheyyûlkirin. Stêra bext û talihê bi zuhûrbûna tecelliyan re hatiye teşbîhkirin. Heqq, li pêş perdeya xeybê ye û ancax bi nûr û tecelliyan xwe nîşan dide. Stêra se'adet û bextewariyê (nûr û tecellî) eger ji pişt perdeya xeybê xwe nîşan bide, dê dunya û 'alem hemû geş û rohnî bibin.

Extera te j'perdeya xeybê eger bêtin zuhûr
Dê bibit nisfi'n-nehare wer şeba deycûri bî (117/5)

##### 4.1.3.1.2. Ehlê 'Irfanê

Ji aliyê meqambilindî û bijariyê ve, di navbera 'arif û stêran de têkiliyek hatiye çêkirin. Rehrewên rêya rast weke stêran, ronak û bijare hatine tesewwûrkirin. 'Arifên himmetbilind, ji ber ku rêya Xwûda girtine û tê de dimeşin, ew weke stêran meqambilind û bijare ne.

Van rehrewên himmetbilend berdane meydanê semend
Sergeşte yîn hetta bi çend ev rekbê meş'eldarê çerx (35/17)

##### 4.1.3.1.3. 'Aşiq û Me'şûq

Têkiliya 'aşiq/me'şûq û stêran ji aliyê yekbûnê ve ye. Hemû hebûn, tecelliya nûra qedîm in û ji yek nûrê sadir bûne. Çawa roj yek e, lêbelê hetavên wê bêhejmar in, her wisa bi goreyî wehdetê wucûdê 'alem jî yek e. Di nav wê çerx û gerdûnê de stêr zêde bin jî, lê dîsa ji yekê sadir bûne.

Herdu rûh yek nûr û tav in çerxek û du stêr di nav in
Herdu dane murx û dav in ismê Hey dav lê veda ye (95/26)

Xusûsiyeteke stêran jî dewr û gera wan e. Stêr jî di heqîqetê de ji ber 'eşqa îlahî dizivirin. 'Aşiq jî, ji ber hubba mehbûbê weke stêran dizivirin û bi 'eşq û şewkê sema dikin.

Min go du şevan şubhê nucûman bi tewaf în
Go 'işwe dizanin bi çi qest û hewes î tu (105/12)

Ji aliyê spehîbûn, ronakbûn û bilindkirinê ve, di navbera stêr û mehbûban de têkiliyek hatiye çêkirin. Li asîmanan cisim gelek in, lêbelê yên herî ronak stêr in. Di nav hebûnan de jî, ya herî hêja û spehî mehbûb e. Herdu jî (stêr û mehbûb), di nav zêdehiyê de, di heman demê de kifşe dibin û têne dîtin.

Mehbûb wek stêran govend û ‘işqbazî
Têkil biçîn semayê hişyar û mest û serxweş (53/4)

Di çerxê wek nucûm hatin sema qiran dêmdur
Hîva bedri bû ew surperî min dî di reqsê da (5/26)

Mehbûb bi ‘eynê kewkeb in reqsê ku dê dilber hebin
Sed can giramê min hebin bavême rê erzan e reqs (55/4)

Têkiliya di navbera me’şûq û stêran de, herî zêde ji aliyê rengî ve hatiye çêkirin. Dêm û rûyê yarê ronak û birqdar e, yanî spî û geş e. Ji ber vê yekê, dêmê yarê, bi rengê xwe ve bi stêran re hatiye teşbîhkirin.

Yarê me pur nîşan û sur sîma ji dur dêm kewkeb e
Ew lebşeker nazikbeşer cebhetseher kagulşeb e (100/1)

Lew yek neseq min tên sebeq nûra yeqeq da dil şefeq
Şirînlebê dêmkewkebê lê bende bêdustûri bû (107/11)

**4.1.3.1.4. Bişkuw, Kemer**

Bişkuwên cilên yarê, bi rengê xwe yê spî ve dişibine stêran. Ew bişkuw û qulpikên li ser sîng û gerdenê, ji aliyê spîbûn û geşbûnê ve weke stêran hatine teheyyûlkirin.

Bişkuwên benda girêbanê ji rengê kewkeban
Berq û tîrojan ji Xurşîdî vedayê rast û çep (17/7)

Gerestêrkên Jûpîter û Wenûsê (Muşterî û Zuhre), bi goreyî ‘ilmê nucûmê wek stêrên se’d û bextewariyê têne qebûlkirin.[655] Extera îqbalê, ji memdûhî re, li ser pişta wî weke kemerekê hatiye teheyyûlkirin.

Exterê îqbal û mehê burcê bext
Mihr û sipihr û kemer û text û tac (30/5)

**4.1.4. Hinek Stêr**

**4.1.4.1. Şihab**

Stêrên Şihabê, geş in, dixeyirin û wenda dibin. Wek gurrî û alavekî ji asîmanan ber bi jêr ve dikevin.[656] Ev stêr ji ber bêtalîhbûna ‘aşiqî bûye mijar. Dema ‘aşiq dibîne ku rûyê felekê jê re nekeniyaye û rûyê bextewarî û se’adetê nîşanî wî nebûne, feleka

[655] Îhvan-ı Safa Risaleleri, c. 1, r. 90.
[656] Sefercioğlu, b.n.b., r. 365.

wî şaş û vajîgûn dibe. ‘Aşiq, xwe di rewşeke wisa de teheyyûl dike herwekî sîstema stêran xera bûye û ew stêrên Şihaban yên geş û mezin li ser serê wî de tên.

Munqelib min dîn menazil vajî ew seyrê dikin
Yek bi yek xwûn jê dibarin ateş û lem‘ û şihab (16/11)

**4.1.4.2. Suheyl (Stêra Qurixiyê)**

Stêra Suheylê, di nîvkûreya (nîvgilor) Başûr de cih digire û xwûya dibe. Stêrkeke geş, spî û mezin e. Li Yemenê xweş tê dîtin, ji ber vê yekê jî, jê re “Suheylê Yemanî” tê gotin. Wek efsanewî tê bawerkirin ku kevirê ‘eqîqê rengê xwe ji vê stêrê hilgirtiye.[657]

Ji aliyê rengî ve têkiliyek di navbera stêra Suheylê û yarê de hatiye çêkirin. Rûyê yarê yê spî û geş, mîna dendikê cewherê ye û wê jî rengê xwe ji Suheylê girtiye. Dendikên cewherê, ji ber rengê xwe ve û ‘aşiq jî ji aliyê tenêmayînê ve bi Suheylê re hatiye teşbîhkirin.

Hin gulê bû‘enber in hin di şirîn esmer in
Hin guherê dane yin mislî Suheylê sema (8/2)

Lew heriftim ez ji meylê şubhetê sehlê û Suheylê
Muhbeta ‘işqa di Leylê ez kirim yekser pilox (36/7)

**4.1.4.3. Sureyya/Perwîn**

Perwîn, ew komstêr e ku ‘ereb jê re “Iqdê Sureyya, Benatu’n-Ne’ş” dibêjin. Perwîn di burca Sewr an jî Hemelê de cih digire. Ev komstêr ji heft stêran pêk tê. Wek efsanewî tê bawerkirin ku ev heft stêr ji heft qîzan pêk hatiye. Ew heft qîz mirine û di asîmanan de dîsa hatine bal hev. Ev komstêr, di qutuba bakûr de cih digire. Di edebiyata farisî de, bi navê “Heft Evreng, Heftperê Sureyya” tê naskirin.[658]

Komstêra Sureyyayê, bi geşatî û spîbûna xwe ve bûye mijar. Herdu stêrên ixbalê ku Zuhre û Muşterî ne, ji nav tariya şevê derdikevin, ji ‘aşiqî re mizgîniya hatina sûbeka geş didin. Ev herdu stêr bi xwe re ji bo ‘aşiqî, talihê tînin. Ronahiya sûbê, li perwînê bide, dibe şefeq û ronahî. Di wê ronahiyê de bejn û balaya dilberê li ber çavan aşkere dibe.[659]

Ji qundus Zuhre peyda bit ji sundis Muşterî bêt der

---

[657] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 77; Canım, b.n.b., r. 447.
[658] Canım, b.n.b., r. 445.
[659] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 125-126.

Sipêde det Sureyyayê şefeq det qameta pê da (5/13)

Ji şefeq Zuhre xuyabit tu binî Perwînan
Cebhetê ew binumêt tu ji meh û Xawer meke behs (27/14)

Perwîn, komeke stêran e, wekî ristikê yan jî ûşiyê tirî tê dîtin. Perwîn ji bo bext û talihê ‘aşiqî bûye mijar. Nêzîkbûna Perwînê caran se’adetê tîne, caran jî bextê reş tîne û ji se’adetê re dibe asteng. ‘Iqd, wek teşbîhî, ristik û gerdeniya xemla jinan e. Stêra Perwînê, wek îstî’areyî temsîliyeta dêmdûrran dike.[660] Nêzîkbûna Zuhre û Sureyyayê, ji bo ‘aşiqî, bi xwe re talihê tîne. Mehbûba weke perwînê geş û spî, ew qas nêzikî ‘aşiqî dibe, ‘eksa wê dikeve ser qedeha ‘aşiqî. Herçendê, li rojhilat, derketina Sureyyayê û Zuhreyê, nîşana xweşî se’adetê bin jî, ‘aşiqî xwe bêşans û bêbext dihesibîne. Sîbera bextê wî yê reş, perdeya xwe ya reş û tarî li ser Zuhre û Sureyyayê ve berdide û xweşî û se’adet ji wî dûr dikevin.

Qirana Zuhreyê min dî di ber ‘iqda Sureyyayê
Ji perwînan dibêjim ‘eks e hêj keftî di camê da (5/28)

Zuhre û ‘iqdê Sureyya keşşifîbûn ew di şerq
Sayeya bextê me dayê ma li ser perde’w nîqab (16/5)

Ji aliyê geşbûn, biçûkatî û giroveriyê ve di navbera xal û nîşanên yarê û Perwînê de têkiliyek hatiye çêkirin. Xal û nîşanên li ser dêmê mehbûbê, weke gerdeniya ‘Iqda Sureyyayê ne. Herdu jî weke xeml û neqşekê derdikevine pêş.

Pêro yeqîn ku xal in di ‘iqda Sureyyayê
Du roj û du hilal in lê dêmê wê leylayê
Bêwesf û bêmîsal in di remza şekerxayê (132/27)

Perwîn, wek îstî’areyî di şûna dilberê de hatiye bikaranîn. Herdu jî bi rûyê xwe ve geş in û ronahiyê didin derdora xwe. Eniya mehbûbê, mehcebîn e, yanî eniya wê weke heyvê ye. Dema meh (enî) û Perwîn (dêmê yarê yê spî û zelal) rastî hev bên, her der rohnî û geş dibe.

Qemer hat rastê perwînan ji bo xemla te şem’ înan
Me nêrgiz dîn di nesrînan di nêv baxê gulistanê (111/21)

[660] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 1, r. 139-140.

#### 4.1.5. Birc/Buruc

Birc,[661] li asîman menzîla stêran e. Roj, di rêgeha xwe de, di salekê de di nav diwanzdeh komstêran re derbas dibe û bi goreyî vê gerê şeklan hildigire. Ev felek pêşiya Feleka Etlesê ye û di vê menzilê de stêrên sabît hene. Ev stêrên sabît bi goreyî şeklên xwe dabeşî diwanzdeh bircan bûne. Xwedawend Mardukê Asûrî, rêgeha rojê dabeşî diwanzdeh burcan kiriye. Di vê gerê de tê bawerkirin ku roj bandorekê li ser dinyayê dihêle. Ilmê burcê di beriya zayînê de di mezopotamyayê de di nav Sumer û Akadiyan de derketiye. Di kevneşopa Mezopotamyayê de cismên asîmanî weke xwedawendan dihatine qebûlkirin. Însan di bin kîjan burcê de hatibe dinyayê, di bin tesîr û hakimiyeta wî xwedawendî de dima. Wek mînak, eger di bin burca kêvjalê de hatibe dinyayê, ew di bin hakimiyeta xwedawendên herî hêrsdar de ye û wek însaneke xeternak dihate qebûlkirin.[662]

'Alema heyînan, dabeşî du qisman dibe. Yek hebûnên ulwî, yek jî hebûnên suflî ne. Hebûnên ulwî, ji neh felekan pêk tên. Hebûnên suflî jî, ji çar unsûran (ax, av, agir û hewa) pêk tên. Ji neh felekan heft felek, gerok in (Seb'eyê Seyyare) û dizivirin. Feleka heştem jî, Feleka Bircan e û stêrên vê felekê sabît in. Feleka nehem jî, bi navê Feleku'l-Etlesê tê binavkirin. Di vê felekê de, ji her stêreke vê komstêrê, bi xeyalî ber bi stêrên din ve xet bêne kêşandin, weke şeklê cism û heywanan şekil derdikevine meydanê. Bi goreyî van şeklan birc hatine binavkirin. Di Feleka Bircan de ev diwanzdeh birc cih digirin: Birca Beranê (Hemel), Birca Gayê (Sewr), Birca Cêwiyê (Cewza), Birca Kêvjalê (Seretân), Birca Şêrê (Esed), Birca Simbileyê/Ûşiyê, Birca Terazûyê/Mêzînê (Mîzan), Birca Dûvpişkê ('Eqreb), Birca Kevanê (Qews), Birca Karikê (Cedî), Birca Satilê (Delv), Birca Masiyê (Hût).[663]

Muhyîddînê 'Erebî, derbarê bircan de me'lûmatên cuda dide. Bi goreyî wî tiştê ewilî hatiye afirandin cismê kullî ye. Di nav cismê kullî de, tiştê ji aliyê wî ve cara yekem hatiye afirandin 'Erş e û 'Erş, tê wateya textî. 'Erş, ew cism e ku 'alema maddî hemû dorpêç kiriye. Di bin 'erşê de "kursî" heye. Kursî ew felek e ku 'erd û asîman bi dirêjî û firehiyê ve dorpêç kiriye. Tecelliya hemû sifetan û emrên îlahî li vî cihî têne meydanê. Ew kelamên îlahî yên ku weke quwweteke di 'erşê de cih girtî, di feleka

661 Mela Ebdurrehîmê Westanî dibêje; birc, wek kînayewî ji bo 'eşqa heyûlayê, meqam û mertebeyan hatiye bikaranîn. (Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 53-54.)
662 Kürşat Demirci, "Burç", *DİA*, c. 6, İstanbul 1992, r. 421-422.
663 Îhvan-ı Safa Risaleleri, c. 1, r. 84-85; Şebûsterî, b.n.b., r. 71.

‘Erşê de wek fî’lê tecellî dibin. Di bin Feleka Kursiyê de jî Feleka Etlesê heye. Di hişmendiya Îbn ‘Erebî de, di Feleka Etlesê de 12 melek hene. Melekê yekem di şeklê teraziyê de ye û mifteya veguherînê û ya felekê (wext û zeman) di destê wî de ye. Melekê duyem di şeklê dûpişkê de ye û Xwûda ew bi afirandina êgir re wezîfedar kiriye. Ji vê jî tê zanîn ku Îbn ‘Erebî, di cihê birc û stêran de melek teswîr kirine.[664] Xwûda ji bo afirandina ‘alema, diwanzdeh walî wezîfedar kirine. Cihên wan, ew birca di feleka herî dûr de ye. Ew feleka dûr (Feleka Etlesê) dabeşî diwanzdeh qisman kiriye, ji bo her cihê waliyekî bircek tê de bi cih kiriye. Ev birc, weke bircên sûrên şehran in. Xwûda ew walî li wê derê bi cih kirine û her waliyek di birca xwe de, di textekî de rûniştiye. Heq bi wan hatiye perdekirin û perdeya navbera Lewhê hatiye rakirin. Wan waliyan (melek), di Lewhê de tiştên di ‘alema afirandinê de ku dê bêne xuliqandin, xwendine û wan tetbîq dikin.[665] Îbn ‘Erebî, bi vî awayî rengekî îslamî daye bircan, ew di daîreya baweriyê de îzah kirine û bi kar anîne. Di vê beyta jêr de xwûya dike ku Cizîrî jî, di me’lûmatên derbarê birc û felekiyatê de di bin tesîra Îbn ‘Erebî de maye.

Dolab û çerxê neh felek pêş destî kursî bûn helek
Sergeşte hatin ew gelek d'wê nuqteya mewhûme da (9/140)

Her gerestêrkek, di bircekê de geştir xwûya dike. Di vê bircê de tê bawerkirin ku quwwet zêde dibe. Ji ber vê yekê ji wê bircê re “Birca Şerefê” hatiye gotin.[666] Birc, di dîwanê de wek tevriyewî hem ji bo bircên stêran hem jî ji bo bircên kelhan hatiye bikaranîn. Di medhê mehbûb û memdûhî de ji bo bilindkirina şanê wan ji bircan hatiye îstîfadekirin. Cizîrî, di rêwitiyên me’newî de qala bircan dike û di seyr û silûkê de behsa çûn û derbasbûna wan dike.

Mesref di nav van meş'elan qet'a mesafa merhelan
Sirra burûc û menzilan resma sulûkê cadde da (9/117)
'Ilmek numa dil pê nemûc qelbê di 'işqê kit 'urûc
Dê tey bikit çerx û burûc şehper li dara sidre da (9/139)

---

[664] Titus Burckhardt, b.n.b., r. 22-23.
[665] Îbn Arabî, Fütûhat-ı Mekkiyye, c. 2, r. 393-394.
[666] Şebûsterî, b.n.b., r. 71-72.

#### 4.1.5.1. Birca Hemelê (Birca Beranê)

Roj dema bigihije Birca Beranê (21ê Adarê-20ê Nîsanê), destpêka demsala biharê ye. Bi goreyî salnameya kevin, ji rojên yekem û şeşem ên biharê re newroz dihate gotin. Roj di vê bircê de di "birca şerefê" de ye, lewra roj geştir û ciwantir e.[667]

Di navbera hatina biharê û kêfxweşiyan de têkiliyek hatiye dayîn. Dema, dilber (şahidê qudsînîşan), bi destê xwe qedeha meya ezelî pêşkêşî 'aşiqî bike, 'aşiq ew qas şad û bextewar dibe, herwekî zivistan xilas bibe, demsala biharê were. Ketina Birca Beranê çawa ji rojê re "şeref" e, pêşkêşkirina cama yarê jî, ji bo 'aşiqî şerefek e.

Mey ku biçit saxerê hêj di destê dilberê
Sondê bi Xaliq xwurî roj e di Burca Hemel (73/2)

Şeref, di feleka bircan de, menzila gerestêrkan ya herî tesîrdar e. Hubût jî dijî wî ye. Şerefa Rojê di Birca Beranê de ye. Şerefa Muşteriyê jî di Birca Kêvjalê de ye.[668] Roj, di Birca Beranê de digehije birca şerefê. Dema roj digehije dereceya nozdehê ji Burca Beranê, digehije derceya herî geş. Di vê hengamê de, bi sedan stêr û kewkeb, li her çar rexên wê xwûya dibin. Roj, di Birca Beranê de, di dereceya nozdehê de û Muşterî jî di Birca Kêvjalê de, di dereceya panzdehê de dibine hemqiranê hev û bi rengekî geştirî xwûya dikin. Ji vê hemqiranê re "îctîma'ul-nûrîn/kombûna herî geş" tê gotin.[669]

Şems di nêv burca şeref da sed kewakib çar teref da
Muşterî hatî bi ref da istîwa çû qible ye (97/27)

Birca şerefê, ji bo medh, sena û bilindkirina şana memdûhî jî bûye mijar. Birca şerefê, wek tewriyewî hem ji bo bircên asîmanî hem jî ji bo birca Kelha Cizîrê (Birca Şerefxanê Mîrê Cizîrî) hatiye bikaranîn. Birca şerefê bi xwe re se'adet, talih û bextewariyê tîne. Şa'ir dixwaze, ev xweşî û bextewarî her daîm ji memdûhî (Mîr Şerefê Cizîrî) re jî bibine bext û yar.

Daîma menzilgeha sûra te bi burca Şeref
Tali'ê ferxende û bextê se'îd yarê te bî (116/3)

---

667 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 139.
668 İhvan-ı Safa Risaleleri, c. 1., r. 87-89.
669 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 346-347.

#### 4.1.5.2. Birca Xerçengê (Birca Kêvjalê)

Birca Kêvjalê di rêza çarem de ye û xaniyê heyvê ye. Di destpêka vê bircê de şev dirêj dibin û roj jî kurt dibin (21ê Hezîranê-21ê Tîrmehê). Ev birc, ji ber dûrahiyê bûye mijar. Ji ber derdê firqetê newaya mutrib û çengê ku ‘aşiq jî bi wan re feryad û fîxan dike, gehiştiye ber perê Birca Xerçengê. ‘Aşiq dixwaze, Birca Xerçengê jî, ji ber dengê wan binale ku ji derdê firqetê re çareyek bête dîtin.

Newaya mutrib û çengê fixan avête xerçengê
Were saqi heta kengê neşoyîn dil ji vê jengê (4/1)

Ku ji çenga me binalit Xerçeng
Bi fixan bêt ji ber sed ferseng (123/5)

#### 4.1.5.3. Birca ‘Eqrebê (Birca Dûvpişkê)

Di Birca Dûvpişkê de (23yê Çiriya Pêşîn-21ê Çiriya Paşîn) rojên tavî kêm dibin û roj kurt dibin. Rojên ‘ewrî zêde dibin û heyv dikeve ber perdeya ‘ewran. Xwûyanekirina yarê, bi rewşa Birca ‘Eqrebê hatiye îzahkirin. Di navbera Birca Dûvpişkê û heyvê de têkiliyekî neyînî hatiye tesewwirkirin. Dema heyv dikeve Birca ‘Eqrebê, tiştên neyînî diqewimin. Rûyê yarê heyîv e û zulfa wê jî ‘eqreb e. Zulf dema bikevine ser rûyî, firqet çêdibe û yar li ber çavan wenda dibe. ‘Aşiq dixwaze ew yara weke heyva bedrê, ji ber perdeya zulfê derkeve ku şevên wî rohnî bibin (wuslat peyda bibe).

Bû mawer û şîrînlebê wê xûb û nûr di xebxebê
Bedra di Burca 'Eqrebê kengî ji ber perdê derê (113/24)

Stêrnas, bi goreyî tebî’etên bircan, derbarî xweşî û nexweşiya pêşerojê de agahiyan didin. Bi goreyî vêkketin û hemqirana Zuhelê û stêrên mayî tebî’etê bircan derdikevin meydanê. Ew stêra ku di bircan de hemqiranê Zuhelê dibe eger xweyî tebî’eteke agirîn be, ew sal bi nexweşiyê ve (şer, kuştin, xirabî, xela) tê şirovekirin. Eger ew stêr xwedan tebî’eteke axî be, dê salekê bihêz, berfireh û hişkî be; eger tebî’eteke hewayî/bayî be, dê salekê xweşî û mu’tedil be û eger avî be, dê sal bi çandinê ve bi bereket be.[670]

[670] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 318-319.

Tebî’eta rojê, germ û zuwahî (agir) ye. Eger ew herdu gerestêrk (roj û zuhel), di Birca ‘Eqrebê (Birca ‘Eqrebê nîşana bêtali’î û nehsê ye) de bibin hemqiranê hev, ev jî dibe nîşana bêtali’î, ‘ezab, şer û xirabiyê.

Vêk ketin Şems û Zuhel îro di Burca ‘Eqrebê
Seyf çû destê Merîxê mulkê dil lew kir xerab (16/7)

Lew tenezzul kir Merîxê newbe çû dora Zuhel
Çû teref Mihra Sipîhrê nezzilî ‘erdan ‘ezab (16/8)

### 4.1.5.4. Bircê Qewsê (Birca Kevanê)

Birca Qewsê (22yê Çiriya Paşîn-20ê Çileya Pêşîn), xweyî tebî’eteke agirî ye. Birca Qewsê, wek îstî’arewî ji bo eniya yarê hatiye bikaranîn û bi ebrûyên yarê û mahê nû re bikaranîna wê jî tenasûbek peyda kiriye. Di vê bircê de dîsa xezeb li ser ‘aşiqî dibare, lewra yar ji kevanên xwe, tîran bi ser ‘aşiqî ve dikêşîne. Hemqirana/nêzîkbûna Zuhre, Roj û Mehê jî, dibe sebebê êrişa dûvpişkan.

Wê sipîde ji Burcê Qews ebrû numandin mahê new
Xweş ji qewsê ebruyan wê kişandin mahê new (103/1)

Zuhre û Xurşîd û Mah dîn di qewsê hemqiran
Sirrê dibit li 'eqreban çerx û sema û heyhey e (93/13)

### 4.1.5.5. Birca Teraziyê/Birca Mîzanê

Roj, di navbera 23yê Îlonê û 22yê Çiriya Pêşîn de dadikeve Birca Teraziyê. Birc, di dîwanê de, bi gelemperî, wek îstî’areyî ji bo birhên yarê hatiye bikaranîn. Stêrên tebî’eta wan nehs ku ji însanan re nexweşiyê tînin, di bircan de rastî hev tên. Di Birca Teraziyê de jî, mehbûb, bi hişm û xezebê, ji kemanên birhên xwe, awirên tîran bi ser ‘aşiqî re diweşîne.

Senemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman ji Burcê Mîzan bi xezeb li min kişandin (86/1)

Hemqirana Birca Esedê û Birca Mîzanê, bi xwe re ji bo ‘aşiqî xweşî û mizgîniyan tîne. Di nav tariyê de (zulmat/zulf), du nûr peyda dibin ku yek roj e, yek jî heyîv e. Mîzan û esed, wek îstî’areyî hatine bikaranîn. Esed/şêr, çavên yarê ne û mîzan/terazî jî, eniya wê ye. Ronahiya herduyan asîmanan geştir dikin.

Heyîv bû ew zulmatê dixum sondê bi ayatê
Ku nûrê da semawatê esed hat rastê mîzanê (111/20)

#### 4.1.5.6. Birca Esedê (Birca Şêrê)

Roj, di navbera 23yê Tîrmehê û 22yê Tebaxê de di nav vê bircê de dimîne. Hewa zêde germ dibe û roj, di vê bircê de herî tesîrdar e. Bi goreyî muneccîman, kesên di vê bircê de hatine dinyayê, xweyî qudret in, xalibê nefsa xwe ne, ji bo şan û şerefê azwer/têkoşer in. Ji aliyê me'newî û exlaqî ve tekamuliyê bi dest bixin, dibine xweyî tebî'eteke xwînşirîn.[671] Ji ber van xusûsiyetan, memdûh, bi xusûsiyetên vê bircê têne medihkirin û wesifandin. Cîzîrî jî îşaretê bi vê baweriyê dike û dibêje ku kesê di vê bircê de hatibe dinyayê dê nam û şohretekê bi dest bixe û dê bi tiliyan bête nîşandan.

Qewsê du hilalan ku li ser Burcê Esed bit
Bû şuhre di 'amê 'emel enguşti numa girt (20/18)

Burca Esedê, ji bo tesîra yarê ya li ser 'aşiqî hatiye bikaranîn. Birca Esedê, wek îstî'areyî enî û çavên dilberê ye. Kevanên reş ên qudretê jî birhên wê ne. Yar li ser wê bircê bi tîrên awiran êrişî 'aşiqî dike û wî di nav xwînê de dihêle.

Perwane yîm sotî kebed dilber ji ber Burca Esed
Tîr dan ji reştûzê Semed lew têk ji xwûnê neqqişîn (79/17)

#### 4.1.5.7. Birca Sunbuleyê (Birca Ûşiyê)

Birca Sunbuleyê (23yê Tebaxê-22yê Îlonê), şeşemîn birca salê ye û navê xwe ji guliyê dexlê/genimî hilgirtiye û li aliyê bakûr xwûya dike. Birca Sunbuleyê, wek îstî'areyî ji bo perçema dilberê hatiye bikaranîn. Dema perçema dilberê bi ser eniya wê tê xwarê bi şeklê xwe ve weke sunbulê ye.[672] Birca Sunbuleyê, di dîwanê de, bi zulf, sîne û dilî re wek tenasubî hatiye bikaranîn.

Her me ji Burcê Sunbule pence di sîne û dil e
Dûr û diraz û muşkil e qisse û macerayê zulf (63/5)

Birca Sunbulê, wek kînayewî hem di wateya bircê de hem jî di wateya enî û guliyên yarê de hatiye bikaranîn. Birca Sunbuleyê, dawiya demsala havînê û destpêka payîzê ye. Di navbera payîz û halê 'aşiqî yê pejmûrde de têkiliyek heye.

Tê 'endelîb û bulbulîn Roj hate Burca Sunbulîn
Xeflet me dî lew xeccilîn rehmê ke pur sohtîdil în (125/3)

Sunbulan seywan li dêmê taze kir

---

[671] Canım, b.n.b., r. 435.
[672] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 53-54.

Afitab îro di burca sunbul e (99/4)

#### 4.1.5.8. Burca Cewzayê (Birca Cêwiyê)

Birca Cewzayê (21ê Gulanê-20ê Hezîranê), ji bo beyankirina dûrahiyê hatiye bikaranîn. Ev birc, di ‘esmanê heştem de di navbera Birca Gayî û Kêvjalê de cih digire. Di vê bircê de roj, di meha gulanê de ye.[673] Ji ber firqetê ‘aşiq jî digel mutribî, fîxan û zariyê dike. Ji xwe di ‘eşqê de derdê herî giran firqet e û fîxana wê jî şedîd e. Fîxan û zariya ‘aşiqî ew qas bi şîddet e, heta ber perê feleka heştem ya Birca Cewzayê diçe.

Newaya mutrib û nayê fîxan avête Cewzayê
Feyaheyya bi kasatin we ya heyya bi tasat (23/11)

#### 4.1.6. Seyyare (Gerestêrk)

Bi goreyî zanista felekiyata berê, di asîmanan de heft seyyare hene û ji wan re seb’eyê seyyare/kewakibê seb’eyê seyyare tê gotin. Ji xeyrî dinyayê, hemû wek stêr dihatine qebûlkirin. Stêr jî dikirine du beş. Stêrên gerok û stêrên sabit. Sabitbûna wan stêran ew e ku mesafeya di navbera wan de daîma weke xwe ye û naguhere. Gerestêrk, nêzîkî hev dibin û ji hev dûr dikevin.[674] Tê bawerkirin ku li ser tebî’et û qedera însên, tesîra van seyyareyan heye. Ev seyyare, xweyî hinek xusûsiyetan in. Zuwahî, şilahî, germahî, sermahî hinek ji tebî’etên wan in. Ew jî weke însên, xweyî xûyê baş û xirab û xweyî mîzac in. Her seyyareyek xweyî wezîfeyekê ye û bi wê wezîfeyê re hatine peywirdarkirin. Roj, siltanê asîmanan e, Heyv, wezîrê Rojê ye; Utarîd katib; Zuhre mutrib; Merîx, serbaz; Muşterî hakim/qazî; Zuhel xezînedar e.[675] Ji van gerestêrkan, du heb (Roj û Heyv) ronîger (neyyîreyn) in; du heb (Muşterî û Zuhre) bi oxir (se’deyn) in; du heb (Merîx û Zuhel) bêyom (nehsen) in û yek jî (Utarîd) ahengdar (mumtezîc) e.[676] Zanayên ‘ilmê hey’etê yên berê di wê baweriyê de bûn ku her kewkebek ji maddeyeke cuda çêbûye. Wek mînak, Ûtarîd ji sifrê, Zuhre ji zîvê û Roj ji zêrî hatiye çêkirin. Di zanista berê de, dinya, wek navenda felekê dihate hesibandin. Lêbelê di ‘ilmê nû de roj bûye navenda zivirîna felekan û rêza gerestêrkan bi vî şeklî ye: ‘Ûtarîd, Zuhre, ‘Erd, Merîx, Muşterî, Zuhel, Ûranus, Neptûn, Plûton. Cizîrî, di zanista ‘ilmê stêrnasiyê de li ser şopa zanayên berê ye. Yanî di sîstema wî de ‘erd (dunya) bûye

---

673 Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 4, r. 124.
674 Erzurumlu Îbrahîm Hakkı, *Marifetname*, Müjde Yayınları, İstanbul 1986, r. 103.
675 Canım, b.n.b., r. 446.
676 İhvan-ı Safa Risaleleri, c. 1., r. 90.

merkeza felekan.[677] Di van beytên jêr de jî behsa neh felekan û seb’eyê seyyareyê ku bi destê qudretê dizivirin û oxiriya wan hatiye kirin.

Seb'eyê seyyare û neh çerxê sergerdan bi vê
Gerdiş û dewrê 'eceb der xizmet û karê te bî (116/4)

Lami'a fetha ezel berqê ji ber tacê te dit
Kewkeba se'da ebed necmek ji seyyarê te bî (116/6)

Ew kamilê bê 'eyb û neqs neh çerx bi her yek new' û şexs
Wî yek bi yek anîne reqs tê seb'eyê seyyare da (9/109)

#### 4.1.6.1. Zuhel/Keywan (Satûrn)

Zuhel, bi navê Keywanê jî tê zanîn û bi goreyî feleknasiya kevin di feleka heftem de, li dawiya gerestêrkan cih digire. Li derdora Zuhelê xelekek heye ku ji tozê pêk hatiye, weke kemerekê tê dîtin. Di edebiyata farisî de jê re “xadimê pîr, xadimê sipîhr” jî tê gotin.[678] Ji ber ku di dawiya gerestêrkan de cih girtiye, jê re pasban jî hatiye gotin. Di sîstema baweriya astrolojiyê ya kevin de, wek “nehsê ekber” (bêoxirê herî mezin) tê hesibandin. Ehmeqî, cahilî, tirsonekî, direwî, keşmekeşî, xem, tiralî, serhişkî xusûsiyetên vê gerestêrkê ne. Zuhre û Ûtarîd dostên wê, Şems û Qemer dijminên wê ne. Rengê wê reş e û ji zirîçê hatiye çêkirin. Zuhel, hakima îqlima heftan e. Weke însanekî ku di destê wî de das an jî xencerek heye tê teswîrkirin.[679]

Zuhel di asîmanê heftem de ye û ji hemû seyyareyan bilindtir e. Ev xusûsiyeta wê dibe nîşana meqama bilindahî û mezinahiyê. Li ber vê mezinahiyê, ‘aşiq xwe li ber asîtana yarê, di cihê herî nizim de teheyyûl dike. Zuhel, ji bo medhê memdûhî bûye mijar û ‘şa’ir dixwaze ewê di asîmanan de di meqama herî bilind de ku Zuhre ye, ji memdûhî re bibe xizmetkar (rikêbdar) û se’adet û serfirazî bibine hevalên wî.

Her kinarê pê ve wergêrî 'inanê himmetê
Zuhre bî peykê te û Keywan rikêbdarê te bî (116/2)

Rengê Zuhelê reş e û bi têkiliya nîşanê hatiye bikaranîn. Zuhel, hem bi rengê xwe ve îstîare ye ji bo pora yarê ku caran bi ser eniya wê ve dikeve ser rûyê wê û nîşanan dinixumîne, hem jî reqîbê ‘aşiq e ku dibe asteng nahêle wuslat peyda bibe.

[677] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 250-251 .
[678] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 3, r. 1227.
[679] Canım, b.n.b., r. 452-453.

Qirana (nêzîkbûn) Zuhelê bi xwe re bêtali'îyê tîne, nahêle 'aşiq xwe bigihîne nîşanên yarê ku bi wuslata wê şa bibe.

> Da ziyaret kim nîşanê ber Zuhel bêtin qiranê
> Tûle yim ser l'asitanê çehvenêra mûçe ye (97/41)

Zuhel, nîşanê bêtali'îyê ye. Bi rengê xwe yê reş ve wek kujerê ronahiyê tê teheyyûlkirin û caran ji aliyê rojhilat, weke ku di destê wî yê rastî de serê însanekî heye tê teswîrkirin. Zuhel, di dîwanê de ji bo bêtali'îyê bûye mijar. Zuhel, di feleka heftan de ye û şeş bircan dûrketina wê û ji aliyê rojava ve wendabûna wê wek nîşana çûn û rakirina bêoxiriyê tê teheyyûlkirin.

> Bi derbê Kewkeba subhê li meşriq Zuhre tali' bit
> Zuhel dûr bit li şeş burcan û wenda bit di xerbê da (5/12)

Di feleknasiya kevin de Şems û Qemer dijminên Zuhelê û Zuhre û Ûtarîd jî dostên wê ne. Lewra Roj û Heyv ronîger in û Zuhel jî reş e û temsiliyeta zulmetê dike. Li ser rêgeha gerestêrkan dûrbûn û nêzîkbûna wan û daketina bircan, bi gelek teheyyûlan ve hatiye beyankirin. Şerê Zuhel û Rojê jî, weke şerê nûr û zulmetê hatiye teheyyûlkirin. Derketina Zuhel û Merîxê nehs in û sebeba avabûna Rojê ne û derketina zulmet û tarîbûnê ne. Şa'ir, talihê xwe weke wan reş dibîne.

> Vêk ketin Şems û Zuhel îro di burca 'Eqrebê
> Seyf çû destê Merîxê mulkê dil lew kir xerab (16/7)

> Lew tenezzul kir Merîxê newbe çû dora Zuhel
> Çû teref Mehra Sipîhrê nezzilî 'erdan 'ezab (16/8)

#### 4.1.6.2. Muşterî (Jupîter)

Ev gerestêrk, di feleka şeşem de cih digire û gerestêrka herî mezin e. Tê bawerkirin ku ev gerestêrk sembola dîn, 'ilm, hilm, heya, tewazû, 'eql, kerem û fesahatê ye. Ji ber vê yekê, yên di bin bandora vê gerestêrkê de hatine dinyayê, xweyîterbîye, fedîkar/şermende, xûynerm, zerîf, dilnizm, comerd, xweyîşans, cesûr, natik/axivger û belîx in. Muşterî, qazî û katiba felekê ye. Merîx û Qemer dostên wê, Zuhre û Ûtarîd jî dijminên wê ne. Muşterî, ji gerestêrkên mayî geştir e. Ji ber vê yekê, di edebiyatê de wezîr, alim, hakim û memdûh bi Muşteriyê re hatine wekandin.[680] Muşterî, sembola se'adet û bereketê ye.

---

[680] Canım, b.n.b., r. 439.

Muşterî, sembola bext û talihê ye. Dîtina wê nîşana wuslatê ye. Muşterî bi van xusûsiyetan ve hem bi wateyên zanista felekiyatê ve hem jî bi îstî'areyî ji bo unsûrên spehitahiyê yên li ser rûyê yarê hatiye bikaranîn. Derhilata Muşteriyê sebeba ronahiyê ye, ew jî îşaretê bi oxiriyê û wuslata yarê dike, an jî rewşa dijî vê yekê dibe sebeba bêtalihiyê. Yanî xeyirîn û derneketina Muşteriyê dibe sebeba firqetê.

Ji qundus Zuhre peyda bit ji sundis Muşterî bêt der
Sipêde det Sureyyayê şefeq det qameta pê da (5/13)

Lew ji şeş burcan 'Utarid j'Afitabê dûr bû
Lê Zuhel bû Muşterî avête çerxê înqilab (16/9)

Muşterî, ji ber nêzîkahiya rojê geş e û bi çavan tê dîtin. Ji ber geşbûn û birqdarbûna xwe ve wek îstîarewî temsîliyeta rûyê yarê û spehîtahiya wê dike. Spehîtiya yarê weke Muşteriyê gehiştiye mertebeya kemalê. 'Aşiq li ber wê spehitahî û nûrê sewda û dîn bûye. Çawa gerestêrk dikevine birca şerefê û geşbûna wan a herî xurt xwe nîşan dide, herwisa rûyê yarê yê weke Muşteriyê geş û nûranî jî, ji 'aşiqan re bûye qiblegah.

'Eqreb û qewsûqezeh vê ra muqabil Muşterî
Roz û şêv nûr û şefeq tîrêj û berq û sipîde ye (93/14)

Lew weku sewda û dîn im her dema dêmê dibînim
Dîn dibim heyran dimînim Muşterî ya Zuhre ye (97/26)

Şems di nêv burca şeref da sed kewakib çar teref da
Muşterî hatî bi ref da istîwa çû qible ye (97/27)

#### 4.1.6.3. Merîx (Mars)

Merîx, bi goreyî feleka heyîvê di rêza pêncem de cih digire. Rengê sor li ser wê hakim e û ji ber vê yekê jê re "nehsê esxer/bêoxirê biçuk" hatiye gotin. Kêfxweşî, xîretdarî, hîddet, sefahet, quwwet, îxanet, hêrsbûn, bêşermî, 'înatkarî û hwd., hinek ji xusûsiyetên vê gerestêrkê ne.[681] Merîx, serbazê Rojê ye. Keldaniyan ev gerestêrk wek xwedawendekî didîtin û bi navê "Mares"ê bi nav dikirin. Di metnên îranî de wek "Behram" derbas dibe û wek melekê xêrê dihate hesibandin. Di *Avesta*yê de wek xwedawendê zaferê tê dîtin. Ew gerestêrk, wek xortekî tilîsor ku di destekî wî de

[681] Erzurumlu Îbrahîm Hakkı, b.n.b., r. 133-136.

xençer û şûr, di yê dinê de serekî birî heye tê teheyyûlkirin û resimkirin. Di edebiyatê de bi xençer, şûr, rengê sor, roj û xwînê ve tê bikaranîn.[682]

Dê wi çerxê pêncemîn bêt tenezzul kit Merîx
Mislê Şemsê ger bikişînit bêtin ew xezeb (15/3)

Vêk ketin Şems û Zuhel îro di burca ‘Eqrebê
Seyf çû destê Merîxê mulkê dil lew kir xerab (16/7)

Keywan, bêoxirê mezin û Merîx jî bêoxirê biçuk e. Ew, ‘elametê herb û şerî ye. Mensûbên vê gerestêrkê, ji aliyê quwwet, hîddet û cesaretê ve namdar in. Ji ber rengsoriya wê, bi şer û xwînê ve tê nîspetkirin. Ji aliyê bêtalihiyê ve ku tesîr dike, di dîwanê de bûye mijar. Derhatin û dîtina Merîxê, dibe sebeba bêtalihiyê, şer û nazilbûna ‘ezabê.

Lew tenezzul kir Merîxê newbe çû dora Zuhel
Çû teref Mehra Sipîhrê nezzilî ‘erdan ‘ezab (16/8)

Fîraqê şev bi axir çû sipêde kifşibû dîsa
Merîxa nehsi avabû xuyabû roj di şerqê da (5/25)

#### 4.1.6.4. Roj (Xawer/Şems/Mîhr/Afitab/Xurşîd)

Roj, di feleka asîmanan de, di rêza çarem de cih digire û ew stêra herî mezin û herî geş e. Stêra herî zêde hetavê belav dike ew e. Quwwet, şîddet, qehhar, hêrsbûn, ‘ecibandin, hestiyarî, nezaket, îffet û şermkirin hinek sifetên vê gerestêrkê ne.[683] Roj, bi reng, geşî, birqdarî, germahî, bilindahî, ronîgerî, hetav û şewqa xwe ve di edebiyatê de bûye mijar. Roj, siltan û hukumdarê asîmanan e. Gerestêrkên mayî wek sîstema rêvebiriyê kesayetên di bin emrê wê de ne. Herwekî heyv, wezîr e û Ûtarîd jî katibê wî ye. Roj, di edebiyatê de, bi gelemperî ji ber geşahî, birqdarî û spehîtahiyê ve, sembola rûyê yarê û yê memdûhî ye û rûyê wan bi rojê re tê teşbîhkirin.[684]

Roj, wek gerestêrkekê, di zanista felekiyatê de li ser bext û talihê însanan, wek hêzeke tesîrdar tê qebûlkirin. Bi stêr û gerestêrkan re kombûn û dûrketina rojê, wek sebeba oxiriyê û bêtalihiyê tê teheyyûlkirin. Cizîrî jî, di dîwanê de îşaretî vê baweriyê kiriye.

Fîraqê şev bi axir çû sipêde kifşibû dîsa
Merîxa nehsi avabû xuyabû roj di şerqê da (5/25)

[682] Canım, b.n.b., r. 441-442.
[683] Erzurumlu Îbrahîm Hakkı, b.n.b., r. 137-141.
[684] Canım, b.n.b., r. 447-449.

Vêk ketin Şems û Zuhel îro di burca ‘Eqrebê
Seyf çû destê Merîxê mulkê dil lew kir xerab (16/7)

Şems di nêv burca şeref da sed kewakib çar teref da
Muşterî hatî bi ref da istîwa çû qible ye (97/27)

**4.1.6.4.1. Teşbîh û Tesewwûrên Derbarê Rojê de**

**4.1.6.4.1.1. Mehbûb (Wechê/Rûyê Yarê), Hubb**

Rûyê yarê, ji ber spehîtahî û geşbûnê ve, bi rojê re tê wekandin. Roj, bi şekl û rengê xwe ve bi rûyê yarê re têkildar e. Hem roj hem jî yar di ronahî û spehitahiyê de hemkûfê hev in. Derketin û dîtina yekê, wezîfeya ya dinê pêk tîne. Di hişmendiya ‘aşiqî de, roj yar e û yar jî roj e, lewra ji her aliyî ve cudahiya wan tune.

Te bivê berq û birûskê bireşînî tu nezer de
Te divê roj xuya bit ji şibakê tu xuya be (94/25)

Sotim bi berqa lami‘ e ew necm û bedra tali‘ e
Şemsa semayê rabi‘ e lew pur ji şewqê şewwişîn (79/2)

Fener niye nûra Heq e husn û cemalê mutleq e
Berq e sipêde şefeq e Zuhra û Şemsa xawerê (113/8)

Di teheyyûla ‘aşiqî de, bi gelemperî rûyê yarê ji rojê rohnîtir û geştir e. Yar dema rûyê xwe nîşan bide, roj di asîmanan de wenda dibe. Di wextê seherê de dema yar xwûya bibe, roj ji şewqa wê şerim dike û xwe dide aliyekî. Dema cebhetê yarê xwûya bike hukmê rojê êdî namîne û behsa wî jî nayête kirin.

Perdeya xêlî û çarê tu ji ser dêmê hilîn
Da ji şewqa te bixef bit şefeqa mihr û mehê (110/10)

Ji şefeq Zuhre xuyabit tu binî Perwînan
Cebhetê ew binumêt tu ji Meh û Xawer meke behs (27/14)

Perdeya goşeqeseb bê tu ji ser dêmê hilîn
Lew di şerqê meh û xurşîdi ji şewqê bettilîn (121/5)

Rûyê yarê gelekî ronahî û ciwan tê teheyyûlkirin. Bi mubalexeyî tê îfadekirin ku herwekî roj û heyvê şewq û ronahiya xwe ji rûyê yarê girtî. Roj ji rûyê yarê yê geş şerim dike û diçe zewalê. Xeyirîna rojê wek husnê te’lîlî, bi şermkirina rojê ku ji şewqa rûyê yarê fedî dike, hatiye beyankirin. Di heqîqetê de, sedema teswîrkirina rojê, ji bo

temsîlkirina rûyê yarê ye, ger ev sebeb nebe, di hişmendiya ‘aşiqî de ronahiya rojê weke şeveke zulmet e.

Şems û qemeran şû’le ji ruyê te vedabû
Yelmûm ji te bû mûm û şemal jê ayisîne (101/9)

Ne ku şermende ji rûyê te buwa
Afitabê bi zewalê çi xerez (57/6)

Afitabê ku ne teswîr ji husna te bitin
Nûruha fî nezerî zulmetu dacin we helek (70/12)

Girtina roj û heyîvê (xusûf û kusûf) wek husnê te’lîlî hatiye teheyyûlkirin. Xusûf, xeyirîna heyvê û ya rojê ye.[685] Kusûfu’ş-şems (girtina rojê) û kusûfu’l-qemer (girtina heyvê), di ‘eynî birc û ‘eynî dereceyê de, di wextekî de roj û heyv bêne li bal hev, derdikeve meydanê. Ev bûyera tabi’î bi tenê di dawiya mehê de pêk tê. Dema heyîv bikeve pêşiya derawa/pozîsyona derece û birca rojê, êdî şewq û tirêjên rojê nagehijine çavên me û roj wek xeyirî xwûya dike.[686] Sebeba girtina roj û heyîvê, bi hesûdiya wan ve hatiye girêdan, lewra dema yar dimeşe, spehitahî, ronahî û geşbûna rûyê wê tê dîtin, roj û heyv ji ber hesûdiyê (çavnebariyê), êdî naxwazin rohniya xwe belav bikin.

Nazika min ku bi mestî di çemen hate xeramê
Ji hesed çûne xusûfê meh û mihra di felek (70/4)

Roj, di du wextan de herî rohnî û geş e. Yek di Birca Hemelê de, yek di Birca Şerefê de. Ew, wextê dûhayê jî herî ciwan e. Bi navê Dûhayê sûreyek di Qur’anê de heye û li ser navê vî wextî, sond tê xwarin. Dûha, ronahiya rojê ya di çaxê ciwaniya wê de ye. Roj derdikeve, bilind dibe, geş dibe û ber bi zewalê ve diherike û dixeyire.[687] Ciwantî û geşbûna rûyê yarê, bi wan wextên rojê re hatiye teşbîhkirin.

Pur 'umir min çû bi sextî lê şukurxwaz im ji bextî
Zuhreyek bû ew li textî belku bêm Şemsu’d-dûha ye (96/14)

Însan bi min nasût e gewher di nêv sedefê
J'alema ceberût e şems e hatî şerefê
Tenezzul ji lahût e mehbûb e cam di kefê (132/38)

685 Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 693.
686 İhvan-ı Safa Risaleleri, c. 1., r. 88.
687 Şoşikî, b.n.b., c. 6, r. 780.

Mihr, wek tewriyewî hem di wateya hubbê/’eşqê de hem jî di wateya rojê de hatiye bikaranîn. Di sêxiştên jêr de, “mihr”, hem îşaretê bi hubba memdûhî dike hem jî îşaretê bi şehînşahiya wî ya weke rojê dike. Roj, şewq û tirêjên xwe li her terefî belav dike. Ji ber vê yekê qewareya hakimiyeta wê gelek berfireh e. Di teheyyûla şa’irî de, hakimiyeta memdûhî jî weke ya rojê berfireh e.

Xet û xal in di camê da nişan pê ismê Ellah e
Di behsa zulf û damê da Mela ya qenci kûtah e
Di xetma wê xitamê da xerez mihra şehînşah e (131/34)

#### 4.1.6.4.1.2. Durdane (Mirarî)

Yar bi durran re û durr jî bi rojê re hatiye wekandin. Durr jî weke rojê spehî û geş in. Ji ber van xusûsiyetan di navbera durr û rojê de têkiliyek hatiye teheyyûlkirin.

Durdaneyên xawermîsal ayîneyên tê da şemal
Nûrek munezzeh ew cemal mey kir di nêva şuşe da (9/77)

#### 4.1.6.4.1.3. Nûr, Nûra Heq

Di tesewwifê de roj temsîliyeta Heq dike. Roj, temsîliyeta wehdetê, zatê Ehediyetê û nûra tecelliya Xwûda dike. Roj, heyatê dide tebî’etê, ew bes yek e, lêbelê ronahî û şewqa wê li her derê ye. Xusûsiyetên wehdetu’l-wucûdê, bi xusûsiyetên rojê re têne îzahkirin. Hebûn, bi tecelliya zatê ezelî peyda bûye. Şemsa Ehedî û husna Xawerî, di ‘alemê de tecellî bûne û hebûn bi wî awayî hatiye wucûdê.

Wîldan û hûr in ger perî şirîn û mehbûbên berî
Cumle ji husna Xawerî nûrê di wan yek zerre da (9/62)

Mim metle’ê şemsa ehed ayîne sifet kir
Lami' ji 'Ereb berqê li fexxarê "Ecem da (1/3)

#### 4.1.6.4.1.4. Sidretu’l-munteha

Ji aliyê mezinahî û berfirehiyê ve, di navbera Sidretu’l-muntehayê û rojê de têkiliyek hatiye çêkirin. Sidretu’l-munteha, ew meqama dawî ye ku mexlûqat bi ‘emel û ‘ilmê digehijinê û di wateya dara beheştê de jî tê bikaranîn.[688] Çiqên vê darê berjêr in û koka wê ber bi jor ve ye û çiqên wê darê gelek dirêj in. Roj jî bi tirêjên xwe ve ji milyon mesafeyan derbaz dibe û digihije dinyayê. Tiştê bejna wî dirêj sîbera wî jî dirêj e. Ji ber vê yekê di navbera dara sidretu’l-muntehayê û rojê de wekheviyek heye.

688 Kaşanî, “Sidretu’l-münteha”,b.n.b., r. 293; Cebecioğlu, “Sidretu’l-münteha”, b.n.b., r. 438.

Ser didet abê kewserê zemzemeyê semayê zulf
Sayenuma ye xawerê sidreyê muntehayê zulf (63/1)

#### 4.1.6.4.1.5. Dewlet/Îqbal û Tac

Dewlet, bi rojê re tê teşbîhkirin. Ew kesê şemsa dewletê li ser wî hilbe, dibe malikê dewletê û se'adetê bi dest dixe. Eger şemsa dewletê derîzanga/asîtanê memdûhî ziyaret bike, rûyê wî yê şerîf, dê sehergehê rohnîtir bike.

Lew ziyaret asitanê te bit şemsa dewletê
Ta sehergahan ji dîdara şerîf purnûri bî (117/4)

Ji aliyê şekl, reng û rewnaqiyê ve, roj weke tacekê hatiye tesewwûrkirin. Tac, nîşana hukumdarî, bextewarî û dilxweşiyê ye. Taca dewletê li ser serê şah û hukumdaran û li ser serê kesên xweyî dewlet û xweyî îqbal tê danîn. Teheyyûla tacê di serê mehbûbê de, îşaretê bextewariya wê ye.

Exterê îqbal û mehê burcê bext
Mihr û sipihr û kemer û text û tac (30/5)

#### 4.1.6.5. Zuhre (Wenûs)

Zuhre, di feleka asîmanan de, di rêza sêyem de cih digire. Stêreke geş û ciwan e. Stêrnas vê stêrê wek keçekê ku di destê wê de çeng (gîtar) heye û semayê dike, tesewwûr û resm dikin. Zuhre, stêra tali' û se'adetê ye û nîşana belavbûna kêf û xweşiyê ye.[689] Ev gerestêrk dema mexribê derdikeve, dibêjinê "stêra şevê", dema di seherê de derdikeve, jê re "stêra sûbê" tê gotin. Ev stêr, qasida hatina şevê û sipêdê ye.[690]

Zuhre, wek sazbenda felekê tê teheyyûlkirin. Ji ber spehîtahî û rewnaqiya xwe temsîliyeta jinan dike. "Nermahî, rûxweşî, zerafet, kêfxweşî, sazbendî, xuliqandina xweş xusûsiyetên vê gerestêrkê ne."[691] Ji Jupîter û Zuhreyê re "se'deyn/bioxir" tê gotin û Zuhre "se'dê biçûk" e.[692]

Zuhreyê ceng û sewaş ev dî ji çeng avête çeng
Xweş li pê qanûnê ney wê gohde tu qanûn û rebab (16/12)

[689] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 323.
[690] Mehmet Emin Doski, b.n.b., c. 3, r.1227.
[691] Erzurumlu Îbrahîm Hakkı, b.n.b., r. 150.
[692] İhvan-ı Safa Risaleleri, c. 1., r. 90.

Derketina Zuhreyê, wek çirayê wusletê hatiye teheyyûlkirin. Ji aliyê rojhilat ve derketina Zuhelê nîşana wuslat û vekirina deriyê talih û se'adetê ye. Jixwe, talih, se'adet, kêf û şahî taybetiyên vê gerestêrkê ne. Di nav zulmeta bêtalihiya 'aşiqî de derketina Zuhreyê wek sebeba ronahiyê hatiye beyankirin.

Bi derbê Kewkeba subhê li meşriq Zuhre tali' bit
Zuhel dûr bit li şeş burcan û wenda bit di xerbê da (5/12)

Ji qundus Zuhre peyda bit ji sundis Muşterî bêt der
Sipêde det Sureyyayê şefeq det qameta pê da (5/13)

Zuhre, gerestêrkeke spehî û geş e. Ji ber vê yekê temsiliyeta yarê dike. Yar di dîwanê de bi xusûsiyetên "dêmzuhre, zuhrereng, zuhresîma"yê hatiye wesifandin. Zerafet û letafeta rûyê yarê bi teşbîha Zuhreyê hatiye beyankirin.

Şox û şepala surrperî ebrûsîyeh lebşekkerî
Dêm zuhre ye ez muşterî her telbekar im weqt û gav (65/12)

Şox û şengê zuhrerengê dil ji min bir dil ji min
Awurên heybetpilingê dil ji min bir dil ji min (82/1)

Hem bedr û hem Zuhra ye dêm ji 'alema kibra ye dêm
Xweş destxetek tuxra ye dêm herfan ji miskê reş weşîn (79/10)

Şoxa ku ez di bendê dil girtîye kemendê
Letîf e zuhresîma ebrûhilal û mehweş (53/12)

Zuhre, bi têkiliya stêra Perwîn û qedehê jî bûye mijar. Ji aliyê geşî û nûrê ve Zuhre û yar dişibine hev û ev geşahî û nûr 'eksa xwe didine qedeha 'aşiqî jî. Ger ronahiya Zuhreyê wek tecelliya nûra Heq bête tesewwûrkirin, qedeh jî wek sembolê dibe dilê aşiqî. 'Eksa nûrê ku di qedehê de peyda bûye, keşf û ilham in ku di dilê 'aşiq û ehlê 'irfanê de xwe didine der.

Qirana Zuhreyê min dî di ber 'iqda Sureyyayê
Ji perwînan dibêjim 'eks e hêj keftî di camê da (5/28)

#### 4.1.6.6. 'Etarîd (Merkûr)

'Etarîd, di feleka duyem de cih digire. Ev gerestêrka bext û talihê ye.[693] Heyv dosta wê û Roj û Zuhre jî dijminên wê ne. Durketina 'Etarîdê ji Rojê dibe sebeba vajîbûna bext û talihê û di dîwanê de jî bi vê têkiliyê hatiye bikaranîn.

Lew ji şeş burcan 'Etarid j'Afitabê dûr bû

---

[693] Îhvan-ı Safa Risaleleri, b.n.b., c.1., r. 90.

Lê ji dil bû Muşterî avête çerxê înqilab (16/9)

#### 4.1.6.7. Heyîv/Hîv (Meh, Qemer, Bedr, Hîlal/Mahê New)

Heyîv, di dîwanê de ji ber reng, geşahî, ronahî û bilindahiyê ve bi hinek teşbîh û tesewwûran re bûye mijar. Heyîv, wek peyvên “mah, qemer, bedr, hîlal û mehtab”ê hatiye bikaranîn. Heyîv, ew gerestêrk e ku piştî rojê li ser însanan û li ser kaînatê herî zêde tesîr dike. Roj, zatê Heq temsîl dike û heyîv jî wek neynikekê ji rojê şewqê hildide û bi vê ‘eksê temsîliyeta tecelliya sifetên Heq dike. Roj siltanê asîmanan e û heyîv jî wezîrê wî ye. Heyîv, bi goreyî veguherîna şeklê xwe ve jî hatiye bikaranîn. Bedr, şeklê wê yê tam e û temsiliyeta yarê û rûyê wê yê bêqusûr dike.[694] Hîlal, bi qewsîbûna xwe ve temsiliyeta birhên wê dike. Hîlal, sembola ze’îfbûn û lawazbûna ‘aşiqî û nîşana hatina ‘eydan e jî. Melayê Cizîrî, di xezeleke xwe de, raveka “mahê new”ê wek redîf, bi kar aniye û di vê xezelê de gelek teşbîh û mecaz derketine pêş. Di navbera heyîv û yarê de têkiliyek hatiye çêkirin. Yar bi xwe, rû, dêm û eniya wê bi heyîvê re tê teşbîhkirin. Girtina heyvê, wek teşbîhî bi zulf û rûyê yarê hatiye beyankirin. Zulfa wê dema dikeve ser rûyê wê yê ronak, rû tê nixûmandin û zulmet hakim dibe. Yar, bi geşbûnê ve, ji stêrên mayî geştir e û dema derdikeve, hukmê yên mayî namîne.

Perdeya goşeqeseb bê tu ji ser dêmê hilîn
Lew di şerqê meh û xurşîdi ji şewqê bettilîn (121/5)

Ji şefeq Zuhre xuyabit tu binî Perwînan
Cebhetê ew binumêt tu ji meh û Xawer meke behs (27/14)

Perdeya xêlî û çarê tu ji ser dêmê hilîn
Da ji şewqa te bixef bit şefeqa mihr û mehê (110/10)

Ger ne teşbîhê du burhên te bitin
Me di ‘îdan bi hîlalê çi xerez (57/2)

Dema dunya bikeve navbera roj û heyîvê, temamê heyîvê (xusûfê kûllî) an jî qismekî wê (xusûfê cuz’î) ji rojê şewqê hilnade û xemam xwûya dike. Ji vê rewşa heyîvê re “xusûf/girtina heyîvê” tê gotin.[695] Di dîwanê de xeyirîn û girtina heyîvê, wek husnê te’lîlê bi sebebên din ve hatiye girêdan. Mîhr û meh, ji ber ronahiya yarê ji hesedan diçine xusûf û kusûfê. Nenûranîbûna ruhî jî weke xeyirîna heyîvê hatiye beyankirin.

---

[694] Canım, b.n.b., r. 45-47.
[695] Erzurumlu İbrahîm Hakkı, b.n.b., r. 161.

Nazika min ku bi mestî di çemen hate xeramê
Ji hesed çûne xusûfê meh û mihra di felek (70/4)

Qeydê xak û gil nebît da bê hîcab û perde bî
Mislê bedrê carinan têxit xusûfê xakê rûh (33/2)

Rûyê yarê ew qas geş û ronahî ye, wek çavkaniya şewq û tirêjên roj û heyîvê hatiye teheyyûlkirin. Şu'leya ji roj û heyîvê derdikeve, bingeha xwe ji rûyê yarê digire, yanî 'eksa geşatî û ronahiya rûyê yarê ye daye li ser roj û heyîvê.

Şems û qemeran şû'le ji ruyê te vedabû
Yelmûm ji te bû mûm û şemal jê ayisîne (101/9)

**4.1.6.7.1. Teşbîh û Mecazên Derbarê Heyîvê de**

**4.1.6.7.1.1. Yar, Memdûh**

Yar û memdûh bi heyîvê re têne wekandin. Yar, ji aliyê geşatî û ronahiya rûyê û spehîtahiyê ve tê daneberhevkirin. Şa'ir, rûyê yarê ji heyîvê geştir û spehîtir dibîne. 'Erd û semawat, nûr û ronahiya xwe ji geşatiya yarê hildigirin. Yar di vê hengamê de di şeklê heyîvê yê "bedr"ê de ye.

Heyîv bû ew zulmatê dixum sondê bi ayatê
Ku nûrê da semawatê esed hat rastê mîzanê (111/20)

Di çerxê wek nucûm hatin sema qiran dêmdur
Hîva bedri bû ew surperî min dî di reqsê da (5/26)

Xelqo li min ken şîretê ew dilbera zerrînkemer
Min dî di halê xefletê hate der ji burcê wek qemer (43/1)

Şimşad û xeramek ku me dîbû seherê
Camek ji şerabê bi me da wê qemerê (130/3)

Heyîv, di feleka yekem de cih digire. Ew ji stêrkên pîroz tê hesibandin û stêra se'adetê ye. Şa'ir, hêvî dike ku bextê memdûhî weke yê heyîvê bibe û çawa ew di nav stêran de mezin û geş xwûya dike, memdûhî jî di nav desthilatdaran de weke wê geş û bextewar xwûya bike.

Kewkeba se'da şeref tali' te nêv burca te bit
Da tinê j'çerxa bela şubhetê mehê menzûri bî (117/2)

**4.1.6.7.1.2. Dêm, Rû, Enî, Xebxeb (Gerden)**

Ji aliyê renk, şeklê giroverî, geşahî û spehîtahiyê ve di navbera heyîv û rojê de têkiliyek hatiye çêkirin. Dêma yarê ya nûrîn û enwerî dişibe mahê.

Zuhra û Mah û Muşterî min dîn li dêmê enwerî
Zulfa muselsel 'enberî ser daye Hewza Kewserê (113/9)

Dêmê bedr û enîyê zulf li ser bûne helek
Erqeman helqe û gerdan e li dora qemerê (126/6)

Rûyê yarê bi peyvên weke “mahîtab, mehtab, mehpeyker”ê hatiye wesifandin. Di vê teşbîhê de nûr û ronahiya rûyê yarê li pêş e. Tesîra rûyê yarê, ji aliyê sohtinê ve bi rûyê wê yê nûranî û rewneqî re têkildar e.

Min dî bi xwab ew mahitab da dil kulab cohtê xurab
Dil şewwişand xweş herrişand têk hûri bû (107/9)

Hin esmer in hin dêmzerî mehpeyker in surmuşterî
Wîldan û hûr û ew perî min di libsê came da (9/26)

Heyîv, di nav tariya şevê de diçirise. Rûyê yarê yê spî û geş jî, di nav porê wê de rûşen dibe. Ji ber van xusûsiyetan, di navbera heyîv û rûyî de têkiliyek hatiye çêkirin. Di asîmanan de derdora heyîvê tarî xwûya dike. Ew tariya ku heyîv dorpêçkirî, bi teşbîha zulfa yarê ya eniya wê dorpêçkirî, hatiye beyankirin. Enîya (cebhet) yarê jî, bi teşbîha heyîvê tê bikaranîn. Ew xelekên pora wê yên weke ‘eqreban (dûvpişk) dema têne ser eniyê, di nav wê geşatî û spîtahiyê de, eniya wê weke qemerê tê teheyyûlkirin.

Remz û surên şîrînleban tîroj û berq û kewkeban
Rêza muselsel 'eqreban ger dan li dora qemerê (113/21)

Xebxeba yarê bi rengê xwe yê spî ve dişibe heyîvê. Çawa mah geş xwûya dike gerdena yarê jî weke wê geş û spî ye.

Şebkagul e xalfulful e çînsunbul e dava dil e
Min xefletê dî qibletê wek mah ditîsa xebxebe (100/2)

**4.1.6.7.1.3. Text**

Ji aliyê bilindahiyê ve di navbera heyîv û textê de têkiliyek hatiye çêkirin. Roj siltanê asîmanan e û heyîv jî textê wî ye. Asîman dema weke koşk û serayekê bête teheyyûlkirin, roj dibe sultan û heyîv dibe textê padîşahî. Şa’ir dixwaze ku stêra îqbalê li ser serê memdûhî ve vede û heyîv jî jê re bibe text û weke padîşahan, serfiraz û serbilind di wî textî de rûne û bibe hakimê cîhanê.

Exterê îqbal û mehê burcê bext
Mihr û sipihr û kemer û text û tac (30/5)

#### 4.1.6.7.2. Bedr û Teşbîh û Mecazên Derbarê Wê de

Bedr/mehtab, heyîva tam e. Hîlal di nava du heftêyan de şewqê ji rojê hildigire û bi şeklê xwe ve tam xwûya dike. Bedr, bi reng, ronahî, geşbûn û giroveriya xwe ve wek teşbîhî hatiye bikaranîn. Di dîwanê de, weke ravekên "bedra munîr, bedra kemal, bedra temam"ê, cih girtiye.

##### 4.1.6.7.2.1. Yar

Yar, bi reng û geşbûnê ve weke bedrê ye. Çawa di şevê de bedr di nav stêran de geştir û ronahîtir xwûya dike, her wisa yar jî, di nav koma reqsê de kifşe dibe û tê naskirin.

Di çerxê wek nucûm hatin sema qiran dêmdur
Hîva bedri bû ew surperî min dî di reqsê da (5/26)

Bedr, bi temamiyê ve îşareta tali'ê dike. Di nav gerestêrkan de heyîv wek gerestêrkeke se'deyn tê naskirin. Yar bi bêqusûrî û bêkêmasiyê ve weke bedra tali'ê ye.

Sotim bi berqa lami' e ew necm û bedra tali' e
Şemsa semayê rabi' e lew pur ji şewqê şewwişîn (79/2)

##### 4.1.6.7.2.2. Rû, Dêm

Rû û dêmên yarê bi şekl û rengê xwe ve dişibine bedrê. Rûyê yarê jî bi şeklê xwe ve girover e û rengê wê jî geş û sor û zer e. Katibê nusxeya rûyê yarê, bêqusur xet kêşane, yanî ew tam û mukemmel çêkiriye.

Min li ser bedrê munîr mektûb diye neqşê sewad
Ser bi yek anî du nûnan xettê reyhanî du sad (91/4)

Hem bedr û hem Zuhra ye dêm ji 'alema kibra ye dêm
Xweş destxetek tuxra ye dêm herfan ji miskê reş weşîn (79/10)

Kifş bû di qewsê da hilal vê ra mi dî bedra kemal
Lê bûn nîqab çewkan û dal wan yek bi mestî daye pal (125/2)

Rû û dêmên yarê bi têkiliya zulfê ku temsiliyeta şevê û zulmetê dike, hatiye bikaranîn. Zulfa wê weke seywaneyekê xwûya dike û di bin wê seywaneyê de rûyê yarê bi reng û geşbûnê ve weke bedrê ye.

Ji ber benda nîqaba wê li ber fetla 'îsaba wê
Cemala mahitaba wê me bedrek dî di seywanê (111/19)

Dêmê bedr û enîyê zulf li ser bûne helek
Erqeman helqe û gerdan e li dewra qemerê (126/6)

#### 4.1.6.7.2.3. Neynika dil

Di navbera neynika dilî û bedrê de têkiliyek hatiye çêkirin. Dilê aşiqî neynik e û mekanê tecelliyan e. Hubb û muhebbeta îlahî her daîm di dilê wî de tecellî dibe. Çawa bedr, bi geşatiyê ve di asîmanan de xweş xwûya dike, her wisa jî, îşaret û tesîrên muhebbetê di neynika dilî de xwûya dikin.

Gerçi her daîm ji mihra neynika dil bedr e min
Wek hilalê subhê têm ez carinan bim nabedîd (39/12)

#### 4.1.6.7.3. Hilal (Mahê New) û Teşbîh û Mecazên Derbarê Wê de

Têkiliya heyîvê û yarê herî berfireh bi şeklê hîlalê re hatiye çêkirin. Bi şeklê wê yê qewsî û bi geşahiyê ve di navbera yar û hîlalê de tesewwur hatine beyankirin. Hîlal, bi xusûsiyetên weke ziravî, rengê xwe yê sor û zer ve, ji bo wekandinê bûye mijar. Di dîwanê de bi redîfa “mahê new”ê xezelek (xezela 103yem) hatiye nivîsîn. Di vê xezelê de “mahê new”, wek îstî’areyî û teşbîhî ji bo birûyên yarê hatiye bikaranîn. Birûyên yarê bi şeklên xwe yên qewsî û ziravî ve dişibe “mahê new”ê. Xwûyakirin û nexwûyakirina yarê jî dîsa bi teşbîha bedr û hîlalê hatiye beyankirin. Lewra bedr vedigere hîlalê û paşê jî wenda dibe.

Wê sipîde ji burcê qews ebrû numandin mahê new
Xweş ji qewsê ebruyan wê kişandin mahê new (103/1)

Mil dizanim dane ber qewsê hilalî goşezer
Lew ji bala goşeyên nûnan livandin mahê new (103/5)

Wê li wechê afitabê gahê kifş û gahê xef
'Arifên sahib besaret heyyirandin mahê new (103/4)

Di navbera dewr û gera qemer/hîlalê û zemên de têkiliyek heye. Hîlal, îşaretê bi dewra camê/qedehê dike. Ev ger jî, îşaretê bi zemên dike û dewra heyîvê ya hîlalî jî îşaretê bi umrê yarê dike ku ew di umrê xwe yê herî ciwan de ye, yanî çardeh salî ye.

Xweş bi dewrê camê îşaret kir hilalê saqîyan
Mahitab in zuhresîma çarde salî temam (76/2)

Bi goreyî roj û heyîvê zeman tê hesabkirin û kifşkirin. Hereketên roj û heyîvê, di kifşkirina meha Remezanê û te’eyûnkirina ‘eydan de wek pîvan tê bikaranîn. Dîtina mahê newê û belavbûna xemama ‘ewran nîşana ‘eydê ye û nîşana wuslatê ye. Di

‘esliyetê de xerez û armanca aşiqî ji hîlalê herdu birhên yarê ne, yanî dîtina wê û wasilbûna wê ye. Hîlal, hem birhên yarê tîne bîra aşiqî hem jî bi hatina ‘eydan îşaretî wasilbûna yarê dike.

‘Îd e û da ‘alemê bangê sefayê xas û ‘am
Mahê new ebrû numandin çû ji ber ‘ewrê xemam (76/1)

Ger ne teşbîhê du burhên te bitin
Me di ‘îdan bi hîlalê çi xerez (57/2)

**4.1.6.7.3.1. Yar, ‘Aşiq, Rû, Birh**

Yar ji aliyê spehitahiyê ve dişibe hîlalê. Spehîtahiya yarê tecelliya nûra Heq e û ew nûr jî di dilê aşiqî de weke nûrekê ye. Ew nûr jî weke hîlalê zelal û geş e.

Te xweş nûrek zelal î tu di qelbê min hîlal î tu
We qelbî heysu fîhi’l-hubbu misbahun bi mişkat (23/20)

Goşeyên nûnan bi ser badan ji qewsê bêweter
Mislê enguşta Nebî sed ser beyandin mahê new (103/2)

Mahê new, ji aliyê şeklê xwe yê zirav ve îşaretê bi bejn û navteng û birûyên yarê yên zirav dike. Ji ber van xusûsiyetên wekhev, yar weke hîlalê hatiye tesewwûrkirin.

Daxilê meclis bûyî îşev Nîşanî lew ku xef
Camê rûhanî li ehlê dil neşandin mahê new (103/7)

Ji aliyê ziravbûn û ze’îfbûnê ve di navbera ‘aşiq û hîlalê de tesewwûrek hatiye çêkirin. Di seherê de hukmê rojê (mehbûb) dijwar e û hîlal êdî xweş xwûya nake. ‘Aşiq, ji ber nûra mehbûbê êdî xwûya nake. Ji ber wê nûrê, xwûyanekirina aşiqî ji aliyê wehdetê wucûdê ve jî dikare bête şirovekirin.

Gerçi her daîm ji mihra neynika dil bedr e min
Wek hilalê subhê têm ez carinan bim nabedîd (39/12)

Di navbera ziravbûna hîlalê û ze’îfbûna aşiqî de têkiliyek hatiye çêkirin. Hîlal, her diçe zirav û ze’îf dibe û wenda dibe. ‘Aşiq jî di destê yarê de weke wê hîlalê ze’îf ketiye û bêçare ye.

Şubhê şem' û şemal im ez ji ber hubba te lal im ez
Ze'îf im wek hilal im ez sifetgoyîn dikalim ez (124/3)

Rûyê yarê, ji aliyê spehîtahî û spîbûn, geşbûn û zelalîyê ve dişibe hîlalê. Di nav zulmeta şevê de rûyê wê ji bo aşiqî weke hîlalê ye. Ew hîlala geş û ronahî, bê perde û bê sitare, zelal û saf xwûya dike.

Secdeya şukrê carek me ferz e di wîsalê
Ne perde ne sitarek li ber wechê hilalê
Ehsenellahu tebarek ji sura wê cemalê (132/5)

Hîlal, herî zêde bi birhên yarê re têkildar e. Ev têkildarî ji aliyê şeklê qewsî ve hatiye çêkirin. Rûyê yarê dema weke rojê hate tesewwûrkirin, di nav wê ronahî û geşatiyê de birhên yarê dibine hîlal. Ew herdu birhên weke meha newê yên li ser rûyê yarê ji aliyê şekl û spehîtahiyê ve ji hemû stêr û gerestêrkan hêjatir û spehîtir e. Ewê wan birhan bibîne, êdî ne hewce ye behsa stêrên mayî bike, lewra birhên yarê bi destê qudretê hatine çêkirin û reng û şeklê xwe jî, ji qewsêquzehê hilgiritine.

Li rûyê yarê du mehê new me qiran dîn di mest
Tu ji sitêr û Qemer û tali‘ê kewkeb meke behs (27/15)

Nişana qabûqewseynê ku qews avête ebsaran
Di teqwîma tecellayê li ser lê bûn hilal ebrû (106/15)

Te du nun qelem muqabil bi bedî’ xet nivîsin
Du hilalê destê qudret bi qiranê yek kişandin (86/2)

**4.1.6.7.3.2. Das, Cam (Qedeh), Ne’l, Mihrab, Qews (Kevan)**

Zeman û dewra zemanê bi hereketên roj û heyîvê têne kifşkirin. Ew bi destê qeza û qederê hatiye te’eyyûnkirin û dewr û gera wê, îşaretê bi ‘umrê însanê jî dike. Hîlal, bi şeklê xwe ve dişibe dasê û das jî amûreke birrînê ye. Çawa das tiştan dibire, herwisa ew hîlala weke dasê jî, bi dewra xwe, ‘umrê însên jê dibe û wî ber bi xilasbûnê ve dibe.

Tu binê mahê new û destê qezayê hey hey
Ne li zer‘ê felekê belkî li ‘umrê me ye das (51/8)

Di navbera hîlal û qedehê de, ji aliyê şeklî ve têkiliyek hatiye çêkirin. Herdu jî birqdar û şeffaf in. Geşahiya heyîvê/hîlalê di nav qedehê de ‘eks dide û xwûya dike.

Werîn cama hilalî da ji ‘eksê mahê new bînî
Ku xanê mihr û terkê çerxê û xwanê roze xaret kir (42/2)

Di navbera hîlal û nalê hespan de têkiliyek hatiye çêkirin. Herçendê ji aliyê şeklî ve, herdu bişibine hev jî, yek sembola bilindahî û hêjayiyê ye yek jî sembola

bêqiymetbûn û ketina ber lingan e. ‘Aşiq, hîlalê dişibîne birhên yarê, lêbelê ji ber spehitahiya yarê, hîlal xwe weke nalê hespê dibîne. Ev jî dide nîşan ku di hişmendiya aşiqî de, yar ji hîlalê hêjatir û spehîtir e.

Min go mehê new çaşinîyê ebrûyê yar î
Go min hed e ez şubhetê ne'lê feres im ez (48/5)

Qews, amûreke şerî ye û tîr bi wê têne avêtin. Mijang û nêrînên yarê dema dibine tîr, birhên wê jî dibine qews û tîr û xedengan bi ser ‘aşiqî ve diweşînin.

Ne tenê gezme dibarin me ji qewsê du hilal
Me ji mujganê sîyeh têne ceger tir û xedeng (71/9)

Da sîne cohtê tîrxweş qewsê hilalê tozreş
Yek tîrê pur kuştin li meş xwûnê weh cerhan daye kef (64/5)

Senemê ji qewsê ebrû du hilalê new numandin
Du keman ji burcê mîzan bi xezeb li min kişandin (86/1)

Birhên yarê bi şeklê xwe yên qewsî ve dişibin mihrabê. Mihrab, berqible ye û di nimêjê de ‘abid/’aşiq berê xwe didine wê derê. Herdu birhên yarê yên weke mihrabê li ser rûyê wê hatine neqişandin ku ‘aşiq ji bo secdeyê berê xwe bide wê derê. Di edebiyata klasîk de, xalên yarê li ber birhên wê, weke ‘abidekî li ber mihrabê secdebirî, tê teheyyûlkirin.

Da ji mihraba du ebruyan secde bit Eswedhecer
Dil bi mîzan mahê new ebrû numayê rast û çep (17/2)

### 4.2. Heywan/Ajal

#### 4.2.1. Teyr (Perende) û Cureyên Wan

Însan unsûrekî tebî’etê ye û bi unsûrên mayî yên tebî’etê re jî têkildar e. Ajalan, ‘alema xeyalî yên şa’irên klasîk bi xusûsiyetên xwe ve neqişandine û temam kirine. Ajal, bi xusûsiyetên xwe yên taybet ve bala însanan kêşane ser xwe û bi teşbîhî, mecazî û bi tesewwûrên cuda hatine bikaranîn. Dilê ‘aşiqî bi teyrê re hatiye teşbîhkirin û têkiliya aşiq û me’şûqê weke dava di navbera ajal û nêçîrvanan de hatiye teheyyûlkirin. Perendeyan, di dîwanê de bi navê teyr û murxê cih girtine û bi dil, ‘aşiq û me’şûqê re hatine bikaranîn. Teyr û tuyûr, ji aliyê spehîtahî, reng, firîn, nalîn, ketina davê û nêçîrkirinê ve, wek teşbîhî di dîwanê de bûne mijar.

Di navbera dil û teyrê de ji aliyê nêçîrkirinê ve têkiliyek hatiye çêkirin. Hubb û muhebbet di navbera ‘aşiq û me’şûqê de weke daneyekê ye. Dil bi wê daneyê dikeve bend û tora wê nêçîrvanê. Dilê ‘aşiqî weke teyrekî ye û bi hêsanî nakeve dava yar û ‘işweşirînên weke şehzadeyan.

Teyrê dil bê tem'ekê nayête dest şehzadeyan
Quşçi şahin di destê û dê pê azarî bit (19/16)

Bi qanûn guh da mizgînê bizanî da sira sazan
Ji hikmet tête tedwînê bi 'eynê me'neya razan
Bi dama 'işweşîrînê didit teyrê me perwazan (131/27)

Herdu rûh yek nûr û tav in çerxek û du stêr di nav in
Herdu dane murx û dav in ismê Hey dav lê veda ye (95/26)

Peykanên ji mêjangên yarê dibarin, weke firîn û perwaza teyrê hatine teheyyûlkirin. Ev peykanavêtina weke teyrê, şîddet û dijwariya êrişên yarê nîşan dide.

Ne ku wek teyrê ji mêjên te bibarin li peykan
Ji birînên di dilê şubhetê xirbalî çi hez (62/3)

Teyrên ku têne nêçîrkirin, dema bikevine dest, têne serjêkirin. Di hengama serjêkirinê de, hêj bi temamî can û rihê xwe teslîm nekirî, di nav xwîna xwe de diperpite. ‘Aşiq jî, ji destê yarê û firqetê, rewşa xwe dişibîne wan teyrên ku di wê hengamê de, di nav wê xwînê de diperpite.

Bi dama muhbetê bend im xedenga firqetê dil noht
Bi şubhê murxê nîmbismil di hev wertêm di xwûnê da (5/6)

Teyrên di dîwanê de bi xusûsiyetên xwe yên taybet ve cih girtine ev in:

#### 4.2.1.1. Tawus

Tawus bi per, çeng û dûvê xwe yê rengareng ve namdar e. Welatê wî Hindistan e û di serdema Îskenderê Mezin de çûye heta Ewropayê. Di spehîtahiya wî de sen’eta Îlahî xwe nîşan dide û însên ji xwe re heyran dihêle. Ew sembola reng, spehîtahî, îhtîşam, ‘ucb û qurebûnê ye.[696] Tawus, teyrekî cennetî ye û bi goreyî baweriyeke gelêrî, tawus û mar dergevanên beheştê bûne û bi alîkariya şeytên, daxilî beheştê bûne û Adem û Hewwa ji rê derxistine û ji beheştê hatine avêtin. Tawûs hatiye cezakirin. Bi lingên wî ve pûrt nehatiye û bi dijî rengîniya per û dûvên wî, lingên wî mane tazî û

[696] Ömür Ceylan, Kuşlar Divanı/Osmanlı Şiir Kuşları, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 227-228

rût. Bi dûv û perên xwe yên rengareng û neqişkirî ve tîmsalê spehîtahiyê ye, lê dema lingên xwe yên bêpûrt û çiplax dibîne ax û zarînê dike.[697]

Tawus, di dîwanê de ji ber rengînî û spehîtahiya xwe ve bûye mijar. Hindistan, welatekî dûr e. Kesê bivê ku biçe wê derê teyrê tawusî bibîne an jî bi dest bixe, divê tehemmûlî zehmetiyên wê rê û rêwîtiyê bike û ji ber cewr û ezayên hindiyan dest ji wê daxwazê bernede. Ger ne wisa be ew wê spehitahiyê bi dest naxe û nagehije mirazê xwe, lewra bidestxistina spehîtahî û hêjayan bedelan dixwazin.

Cewrê Hindî bikêşînit her kesê tawus bivêt
Gewher û durra yetîm bêterkê ser nabin teleb (15/12)

#### 4.2.1.2. Goyîn (Goguk)

Goyîn, navê teyrekî ye, ji şevê heta sûbê bi dengekî xemgîn himhimê dike û dinale.[698] Goyîn cureyekî kundî (bûm) ye. Di naverojê de, nabîne û bi şev jî heta sûbê dixwîne. Hez ji tenêtiyê dike û ji ber vê yekê, di wîraneyan de cih digire. Suleyman Pêxember ji bûmê pirs kiriye ku çima di wîraneyan de cih digire. Bûmê gotiye, “wîrane mîrasên Xwûda ne û ez di nav mîrasên wî de sakîn û aram dibim.” Jê pirsiye ku dema dixwîne çi dibêje. Weha bersîv daye: “Ey xafîl! Tedarîkê bikin, xwe amadeyî seferê bikin.”[699]

Ji aliyê dengê goyînî yê nalînane û ji aliyê derdê ‘aşiqî ku ji ber evînê ah û zarînê dike, têkiliyek hatiye çêkirin. Herdu jî derdnak in û ji ber derd û xeman dinalin. Ew kesên ku bi xem, derd û belayan her daîm dinalin, bi goyînî re têne teşbîhkirin.

Mislê goyîn direwan nale ji dil tên miskîn
Em nizanîn tu çira her weh dinalî şeb û roz (47/3)
Êk ji wan perwane bû soht û fixanek jê nehat
Êk ji wan teşbîhê goyînê bi ah û nale bû (104/12)
Ji kovana te Şîrînê dinalim şubhê goyînê
Dirêjim hêstirên xwînê wekî tavên di baranê (111/6)

#### 4.2.1.3. Tûtak

Tûtak û goyîn du cureyên teyrê kundî ne û bi ‘erebî jê re “bûm” tê gotin. Ev teyr li nav kavil û xirabeyan dixwînin û dinalin. Ji ber wê nalînê tê bawerkirin ku ew teyr bûye perendeyekî kor û bêîfleh.[700] Şa’ir, ji ber firaqê, weke tûtakî heta subê dinale

---

697 Gölpınarlı, b.n.b., r. 48-49.
698 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b. n. b., c. 2, r. 319-320.
699 Ceylan, b.n.b., r. 51-53.
700 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b. n. b., c. 1, r. 128-129.

û xew nakeve çavên wî. Şa’ir, ji aliyê kêşana zehmetiya tenêtiyê, nalîn û xewneketina çavan ve, xwe diwekîne tûtakî.

Sehergeh ‘endelîb mest in ji bêhna werd û bişkojan
Şubhê tûtak û goyînan dinalîn em di ferqê da (5/16)

Teşbîhê tûtakên çiyan xew nakirîn şevtariyan
Lê hêj dixwazîn şukriyan çendî ku rû dîn qibletê (125/5)

Firaqê têk hirqet e be'îd e ji xeyalê
Tûtak e bi zehmet e bulbul ji ber cemalê
Goyîn xwe qet nakete ku dûr e ji wîsalê (132/31)

**4.2.1.4. Bulbul (Endelîb)**

Di nav teyran de yê herî zêde bi xusûsiyetên xwe ve bi ‘aşiq re têkildar bulbul e. Di edebiyata klasîk de motîfa gul û bulbulê temsîliyeta ‘aşiq û me’şûqê dike. Bulbul, ew aşiqê gulê ye ku dinale, feryad û fîxan dike û hêstiran ji çavan dibarîne. Gul, nazdar e, bêwefa ye û zulmê li ‘aşiqê xwe dike û berê xwe nade wî.[701] Bulbul, ji aliyê dengê xwe yê xweş û nalînê ve bi ‘aşiqî re têkildar e.[702]

Da li ser çehvên bimalim bulbulê werdên bi xal im
Carekê rehmê ke zalim şefqe ku heqqê we ye (97/33)

Baxê binefş û sorgulan sosin li dora sunbulan
Awaz û dengê bulbulan dagirtibû her çar derav (65/6)

Hatif’il xeyb esti în ya tercûmanê Rûh’ul Quds
Bulbulê şeyda sti der gulzari ya Mela sti în (83/10)

**4.2.1.4.1. Bulbul û Gul**

Bulbul, ji ber spehîtahiya gulê mest û serxweş e. Gul, wuslata xwe nade bubulê û ew jî, ji ber vê yekê her daîm bi nexme û newayên xwe, dinale û dizare. Bulbul ji ber bêhna gul û xonçeyan mest dibe û dinale, ‘aşiq jî, ji derdê firqetê mest dibe û dinale.

Gul heta sohr in bi tê ve bên tebessum pê ve pê ve
Bulbulê serxweş di nêv e nexme û nal û newa ye (95/23)

Sehergeh ‘endelîb mest in ji bêhna werd û bişkojan
Şubhê tûtak û goyînan dinalîn em di ferqê da (5/16)

[701] Kurnaz, Hayalî Bey Dîvanı’nın Tahlili, r. 315-317.
[702] Canım, b.n.b., r. 484-485.

Gul, bi reng û bêhna xwe ve herçendê spehî û cazîbedar be jî, hêjayî û rewneqiya xwe ji bulbulî hildigire. Eger bulbul nebûya û qiymet nedabûya gulê, gul ew qas hêja û namdar nedibû.

Ger çi bulbul cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'işqa bulbul e (99/1)

**4.2.1.4.2. Bulbul û 'Aşiq**

Bi munasebeta maceraya 'eşqê ya di navbera gul û bulbulê de, ew bûne sembola 'aşiq û me'şûqê. Ji aliyê birîndarî û nalînê ve 'aşiq dişibe bulbulê. Dilê herduyan jî mecrûh e, tejî dax û birîn in. Feryad û fîxana 'aşiqî ji ya bulbulê zêdetir e. Derdê 'aşiqî ew qas mezin e, bi şev û roj ji ber wî kul û derdî dizare û dikale.

Bulbulê mecrûhê 'işqê taqeta xaran nehin
Dê kulafa rîşê sîne bişkowek bê xarî bit (19/12)

Xunçeleba ji renggulê dêmê bi ser numa Melê
Şubhetê bulbulan seher lew me fixan û nale kir (41/8)

Te ji feryad û fixanan bi xwe bulbul kerr kir
Ellah Ellah ji çi derdî weh dikalî şeb û roz (47/4)

Bi bulbul ra bi efxan im sebahulxeyri ya xanim
Were bînahiya çehvan bibînim bejn û balayê (124/3)

'Eşqa 'aşiqî ji ya bulbulê bilindtir e, lewra 'eşqa bulbulê bi fesl û deman ve girêdayî ye. Di demsala biharê de, gul derdikevin, dibişkivin û 'eşqa bulbulê dest pê dike. Piştî gul diçilmisin û rengê payîzê li wan dide, 'eşqa bulbulê bi dawî dibe. Li dijî vê yekê 'eşqa 'aşiqî her daîm berdewam e û derdê bi wî re çêbûye jî her dewam e.

Bulbul û perwane ew fesl û dem in
Cinsê 'işqa min tenê derdê kul e (99/9)

Bulbul û aşiq, ji aliyê wehdet û kesretê ve jî hatine muqayesekirin. Aşiq, terefdarê wehdetê ye û yek gul besî wî ye, lê bulbul, çi qeder gul hebin di gulistanê de 'aşiqê hemûyan e û dixwaze hemûyan jî bi dest bixe.

Bulbulan sed gul di çav in çav li sed gul dî dikin
Min ji baxê gul'izaran yek gul û gulnarî bes (52/8)

**4.2.1.5. Zerbav (Zendbaf)**

Di Farisî de bi dehan navên bulbulê an jî cureyê bulbulê hene. Bûburd, bûburdek, hezar, hezarava, hezaravaz, hezardastan, şebhan, murxê şebhîz, zendbaf,

zendhan û hwd., ji wan navan in.[703] Di dîwanê de navê zerbavê, bi bulbulê re hatiye zikirkirin. Gulistan, wek kînayewî ji bo rûyê yarê hatiye bikaranîn. Reyhan, sunbul, çîçek û gul, wek kînayewî zulf, dêm, sîma û rengê yarê ne. Zerbav û bulbul jî, wek kînayewî, ji bo çekê zêr û zîvên xemlên yarê hatine bikaranîn.[704]

Reyhan û sunbul tê hene sed çîçek û gul tê hene
Zerbav û bulbul tê hene ew bexçeya gulzarê xet (59/7)

#### 4.2.1.6. Şimqar/Şunqar

Şunqar, bazê çavreş e[705] û teyrekî dirinde yê herî namdar e. Di farisî de jê re “baz, başe” tê gotin. Di edebiyata klasîk de, bi navê “şahbaz, bazê sefîd, bazê dînarî” namdar e. Cureyên şunqarî ji aliyê nêçîrê ve serkeftî ne. Şunqar, sembola îhtîşam, qudret û muzefferiyetê ye.[706] Şunqar, di dîwanê de ji aliyê muzefferiyeta nêçîrê ve bûye mijar. Hubb û muhebbet weke şunqarî bi hêz û quwet e. ‘Aşiq û me’şûq weke teyrê hûmayê bilind bifirin jî, dîsa ji ber pençeyên şunqarî xilas nabin û dê bikevine tora wî. Dil weke hûmayê bête teheyyûlkirin, mehbûb jî dibe şunqar û dilê ‘aşiqî ji aliyê şunqarî ve tê nêçîrkirin.

Her dilê bazîsifet dê seydê teyxûnek we bit
Firr û perwazê humayî penceyê şimqarî bit (19/13)

Şahibaz er çendî perwazê bi bala te bêt û ret
Dê di nêv tora te bêt û seydê şunqarê te bî (116/13)

Çerxa felekê jî dişibe şunqarî. Ew jî ‘aşiqî dixe bin pençeyên xwe, azarê lê dike û derba firaqê lê dixe. Di her goşeyekî felekê de daveke belayê li ber ‘aşiqî hatiye vedan. ‘Aşiq her çiqas di bin wan îşkenceyan de yarên weke xonçegulan bînin bîra xwe û li teselliyê bigerin jî, dîsa felek şemaqekê/pençeyekê li wan dide û wan dixe nav tor û dava xwe. Ev jî dide nîşan ku ji ber teqdîra qudretê tiştek xilas nabe.

Bîra xwe tînin xonçeyan ‘aşiq di nêv îşkenceyan
Tavête dil pur pençeyan herdem ji nû şunqarê çerx (35/3)

#### 4.2.1.7. Kebk (Kew)

Kew, di edebiyata klasîk de wek “kebk”ê derbas dibe. Di edebiyata farisî de jê re “ateşxar, ateşxare, hacel, û zerîç” tê gotin. Ji cinsê kewa mezin û ya xweşwîn re

[703] Ceylan, b.n.b., r. 61.
[704] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 597-598.
[705] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 234-235.
[706] Ceylan, b.n.b., r. 84-86.

“kebkê derî/kewderî” tê gotin. Goştê wê bi te’m e û nêçîrkirina wê jî zor e. Kew, bi deng, meş û nêçîrkirinê ve namdar e[707] û di dîwanê de jî, ji van aliyan ve bûye mijar. Xuliqandina însên an jî hatina ‘aşiqî ya dinyayê, bi hatina kewa xeraman (kewa bi meşa delal, binaz û kubar) ya tê kozê re hatiye wekandin. Teqdîra îlahî (qeza û qeder) jî weke şahînî hatiye teheyyûlkirin. Însan ji destê qederê, aşiq jî ji destê me’şûqê xilas nabe, lewra teqdîra ezelî weha ferman kiriye.

Mela ‘Ebdurrehîmê Westanî, kewê bi nefsê re û Tehsîn Îbrahîm Doskî jî kewê bi Adem Pêxember û Hewayê re sembolîze dike. Nefs û Adem, herdu jî xafil bûne û ketine tor û kozê şeytên.[708]

Ew kebkê xeraman ku di kozê bi qebû hat
Şahînê qezayê bi texaful ji xwe ra girt (20/10)

#### 4.2.1.8. Tezerû (Tezerwan) û Durrac (Kewê Por/Zirrkew)

Tezerû, teyreke kûvî ya namdar e û jê re mirîşka kovî tê gotin.[709] Di farisî de jê re “tezerv” tê gotin. Di edebiyata farisî de bi navê horûsê sahrayî/mirîşka kovî, tedû, tûreng û turnuqê, cureyên tezerûyê jî hene. Tezerû, şevan li ser daran radizên û bi şeklê xwe ve gelek spehî ne, lê belê dengê wan nexweş e. Bi tawûsê re seltenet û baqîbûnê temsîl dike.[710] Di edebiyatê de ji ber nêçîrkirinê û ji ber rêveçûna wê ya delal û kubar bûye mijar. Teyreke siloke û bêdeng e. Tezerv û yar, bi meşa kubar û nazdar ve dişibine hev.

Durrac, balindeyek e ku bi rengê xwe mîna kewan e, lê ji wê piçûktir e. Yar, ji aliyê spehîtahiyê ve, dişibe durracê.[711] “Tezerû û durrac, wek kînayewî temsîliyeta salik û ‘aşiqê heqîqetê jî dikin. ‘Aşiq ji ber tecelliyatên mehbûbê mest bûye û ji xwe çûye, maye bêdeng.”[712] Ji aliyê bêdengiyê ve, di navbera tezerrû, durrac û ‘aşiqî de têkiliyek hatiye çêkirin.

Min dî seherê di xwabê mestî
Bê deng tezerû we lalê durrac (29/2)

[707] Ceylan, b.n.b., r. 160-161.
[708] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 388-390.
[709] Tehsîn Îbrahîm Doskî, h.b., c. 2, r. 116-117.
[710] Ceylan, b.n.b., r. 220-221.
[711] Mela Ebdusselamê Cizîrî, b.n.b., r. 230.
[712] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 116-117.

#### 4.2.1.9. Kebûter

Kebûter, bi goreyî balindeyên din sakîn e. Bi xwendin û spehîtahiyê ve namdar e. Di dinyayê de cara yekem ji aliyê însanan ve kebûter hatiye kedîkirin. Tê gotin ku Nûh Pêxember ji bo cihê tespîtkirina jiyanê ew şandiye bejahiya dinyayê. Di wextê hicretê da, li şikefta Hîrayê, Pêxember ji dijminan muhafeze kiriye. Goştxwarina wê helal e, lê ji ber ku di camiyan de meskûn in û ji ber wan egerên me gotî, kuştina wan baş nayête dîtin. Bi hêsanî ji teyrên dirinde re nabine nêçîr, lê ji şahbazan re dibine nêçîr.[713]

Dilê 'aşiqî, di 'eşqê de dişibe kebûterê. Dema 'eşq wek şahînî bête teheyyûl kirin, dilê 'aşiqî jî dibe kebûter. Kebûter ji şahînî re dibe nêçîr û dikeve nav pençeyên wî. Di nêçîrbûna 'eşqê de, 'aşiq naxwaze kes lomeyê lê bike, lewra bi sedan 'aşiqên weke şahbazan ketine tor û benda evînê.

Ew dilê min wek kebûter nabitin kes lewme ket
Lew di vê dewrê me ra keftî weh dîn sed şahbaz (45/10)

#### 4.2.1.10. Teyxûn (Teyrê Dewletê)

Teyxûn ji tuxanê hatiye û balindeyekî goştxwer e. Cureyekî şahînan e. Di nav gel de, ji vî teyrî re "teyrê dewletê" tê gotin. Bi teyxûnî, teyrê îqbalê tê bidestxistin.[714] Teyxûn wek îstî'areyî, temsiliyeta 'aşiqî dike ku di dest û tora dilberê de hatiye hêsîrkirin/nêçîrkirin.

Teyxûn di destê te zehî dewlet û îqbal
Herçî tu bûyî dam di tora xwe huma girt (20/5)

Zihî şahîn û şehbazê bi naz û xemze û xencan
Çi teyxûn bû di perwazê we şîrîn da me ber pencan
Bi remza sihr û î'cazê birim rêza guhersencan (131/15)

#### 4.2.1.11. Baz/Şahbaz

Şahîn, baz û şahbaz, wek perendeyên dirinde, di edebiyatê de di dewsa hev de hatine bikaranîn. Baz, wek kînayewî pora yarê ye û dilê aşiqî bi xwe ve girêdide û nêçîr dike. Şahbaz, teyrekî rengspî yê nêçîrvan e û dikare bête kedîkirin. Şah û mîr, ji

[713] Ceylan, b.n.b., r. 98-104.
[714] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 244-245.

bo nêçîrê şahbazan kedî dikin û xweyî dikin. Dema nêçîr bibe ‘aşiq, çav û xemzeyên yarê jî wek şahbazan têne teheyyûlkirin.[715]

Xişl û xemlên li ser eniya yarê bi baz, ‘uqab û qumriyan re hatine wekandin. Ew xişl, li ser enîya yarê weke wan perendeyan dihejin, dimeşin û reqs dikin.

Netrik û berg û şetrîyan reqs e ji rengê xemrîyan
Baz û ‘uqab û qumrîyan seyr e seher tebayê zulf (63/4)

Ji ber evînê hiş li serê ‘aşiqî nemaye. Hişjiserçûyîna ‘aşiqî, weke firîna bazê hatiye beyankirin.

Ferre ‘eqlî min lehîbî mislî bazin ew ‘uqab
Zabe rûhî misle ma enhelle fî narin celîd (39/5)

Baz/şahbaz, di dîwanê de bi gelemperî bi têkiliya nêçîrê hatiye bikaranîn. Dilê ‘aşiqî weke bazî ye, bilind bifire jî, dîsa ji perendeyên dijwar re (me’şûq) dibe nêçîr û dikeve tora wan.

Şahibaz er çendî perwazê bi bala te bêt û ret
Dê di nêv tora te bêt û seydê şunqarê te bî (116/13)

Baz û şahîn, ji bo nêçîrvanan, ji bo girtina nêçîrê alîkar in. Mîr û şah, ji bo nêçîrê, wan xweyî dikin û bi xwe re dibine nêçîrê. Memdûh, şahê şahbazan e. Çawa baz girêdayî û bendê nêçîrvanên xwe ne, herwisa şa’ir jî, girêdayî şahê xwe ye.

Giranbend im di bendê da di qeyda şahê şehbazan
Du serpence di zendê da gehiştin yek şubê bazan
Di destê şehlewendê da bi şahînî û rimbazan (131/30)

#### 4.2.1.12. Şahîn

Navê şahîn û şunqarê (qertel), caran di şûna hev de têne bikaranîn. Hem bi şekl hem jî bi xusûsiyetên nêçîrê ve ev herdu perende dişibine hev. Şahîn, teyrekî goştxwer û dirinde ye. Ser û çavên wî mezin e û singê wî fireh e. Ji jor ve nêçîra xwe dibîne, nizûl dibe û di yek carê de nêçîra xwe digire. Neyarê kebûter û kosiyan e. Ji bo nêçîrê tê bikaranîn. Ev teyr, hêlîna xwe di nav zinar û rizdeyan de çêdike, cesûr û bêmerhemet e. Kebûter, kew, tezerv û çûkên piçûk ji aliyê şahînî ve têne nêçîrkirin.[716]

Şahîn ji bo nêçîrê tê bikaranîn û di dîwanê de jî, bi vê têkiliyê bûye mijar. Şahîn, ji bo nêçîrê dane/tomk e. Teyrê dil jî, çawa Ebdurrehîmê Westanî gotî, wek kînayewî

[715] Canım, b.n.b., r. 480.
[716] Ceylan, b.n.b., r. 223-224.

ji bo hêzên rûhanî û nefsanî hatiye bikaranîn. Şehzade bi daneyekê/tomkekî nikarin teyrên biha bixine destê xwe.[717] Pêwîst e ew quşçî ku şahîn li ser destê wî ye, wî neêşîne û azariyan nedetê. Bi dilxweşiyê pê re mu’ameleyê bike. Eger dilbera şehzade bixwaze dilê ‘aşiqî bi xwe ve bikêşe, divê dîsa bi wî tomkî/daneyê teme’ bide.

Teyrê dil bê tem'ekê nayête dest şehzadeyan
Quşçiyê şahin di destî û dê pê azarî bit (19/16)

Dilê ‘aşiqî dema weke perendeyeke nêçîrê bête teheyyûlkirin, nêçîrvan/mehbûb jî dibe şahîn. Şahîn li vê derê wek kînayewî temsiliyeta yarê (nêrîn û xemze û zulfên yarê) dike. Çawa teyr dikevine nêv pençeyên şahînan, herwisa jî, dilê ‘aşiqî dikeve çîn û helqeyên zulfa yarê.

Dilê bit seydê şahînan yeqîn dê destî jê berdin
Bi naz û 'işweşîrînan şîrîn dê şehd û şekker din
Di tora 'enberê çînan ji qudret rûhi perwerd in (131/19)

Şahîn, wek teşbîhî bi qeza û qederê re hatiye bikaranîn. ‘Aşiq dema weke kewê bête teheyyûlkirin, hukmê qezayê jî dibe şahîn, lewra hêj di qidemê de ji aliyê destê qudretê ve bengîtiya ‘aşiqî ji bo muhebbetê/mehbûbê hatiye nivîsîn.

Ew kebkê xeraman ku di kozê bi qebû hat
Şahînê qezayê bi texaful ji xwe ra girt (20/10)

#### 4.2.1.13. ‘Uqab (Qertel/Elho)

‘Uqab, di kurdî de bi navê eylo/elho tê binavkirin. Ev teyr, balindeyekî goştxwer û nêçîrvan e. Bi navê “elhoyê zêrîn, elhoyê deştî, dobrak, elhoyê pençkurt, elhoyê deryayî” cinsên wî hene.[718] Ev teyr, di dîwanê de, bi xusûsiyetên xwe yê nêçîrê û firînê ve bûye mijar. Elho jî dema nêçîra xwe bi dest dixe bilind dibe û nêçîra xwe ji jor ve berdide û dikuje.

Cinnê teyyarek me dî werbû di min winda kirim
Dame ber çenk û kulaban hilfirandim wek ‘uqab (16/16)

Netrik, berg û şetrî, wek çek û nexşên zulfa jinikan têne bikaranîn. Ev nexşe bi zulf û biskan ve têne girêdan û li ser eniyê têne berdan. Di vê dêmenê de çavên yarê jî weke baz, ‘uqab û qumriyan têne teheyyûlkirin ku çav di seherê de, temaşeyî reqsa zulf û nexşên li derdora eniya yarê dikin.

[717] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 372-373.
[718] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 196-197.

Netrik û berg û şetrîyan reqs e ji rengê xemrîyan
Baz û ‘uqab û qumrîyan seyr e seher tebayê zulf (63/4)

#### 4.2.1.14. Tûtî (Bebxa)

Tûtî, bi spehîtahî û mehareta xeberdanê ve namdar e û di dîwanê de jî, di van derbaran de hatiye bikaranîn. Di nêv teyran de herî zêde ev teyr ji kedikirinê re musaît e. Dengê însanan teqlîd dike û xeber dide. Xwarina xwe weke însanan bi destê xwe dibe devê xwe. Ji şekir û şirînahiyê gelekî hez dike. Tê bawerkirin ku yê zimanê tûtiyê bixwe, dê xweş û zarşirîn bipeyive û yê ziravê wê bixwe dê lal bibe. Tûtî, ji aliyê şeklê xwe yê cazîbedar û bi mehareta xeberdanê ve, di edebiyatê de wek îstî’areyî bi sembola yarê hatiye bikaranîn.[719] Yar, bi meşa xwe ya nazdar û kubar ve dişibe tûtiyê. Zimanê ‘aşiqî jî di medh û senaya mehbûbê de şirîn û xweş e. Ji aliyê zimanê şirîn ve ‘aşiq û tûtî dişibine hev. Aşiq, tûtiya zimanşirîn e.

Xwoş xeramê ez xulamê nazikê şêrin kelamê
Tûtîya eywan xeramê dil ji min bir dil ji min (82/7)

Axa qedema muhterema payê perî me
Wek tûtî peyapey li zebanê şekkerî me
Her lehze dibî bêt ku diçim rehgûzerî me
Êdî çi bibêjim ku kerîm bin kerîm e (130/11)

#### 4.2.1.15. Sî û Qaz

Sî (werdek) û qaz, wek îstî’areyî temsîliyeta yarê dikin. Ji aliyê avjenî û ref bi ref geranê ve namdar in. Meşa kubar û nazdar ya mehbûbên mestane, dişibe meşa sî û qazan û mehbûb jî weke wan bi hev re ref bi ref dimeşin.

Nêrgizên qametzumerred sergiran hatî xiram
Çar etrafan bi ref ref lê bi meş tên sî û qaz (45/14)

Cobar rewan in çemenan terh cuwan in
Mestane bi ref ref li kenaran sî û qaz in (84/8)

#### 4.2.1.16. Qumrî

Qumrî, ji familyaya kebûterê ye û ji aliyê nêçîrvanan ve tê nêçîrkirin. Qumrî, di edebiyatê de sembola ‘eşq û muhebbetê ye.[720] Di farisî de ji bo qumrî û teyrên weke qumriyê navên weke “qeresî, masûçe, nazû, şifnîn, verşan” têne bikaranîn. Bi şeklê

[719] Ceylan, b.n.b., r. 194-195.
[720] Canım, b.n.b., r. 513.

xwe ve û bi sedeqeta ji hevalê xwe re namdar in. Qumrî coht dijîn û tê bawerkirin ku eger yek ji wan bimire, êdî ya dinê bi yên mayî re hevaltiyê nake û heta bimire feryad û fîxanê dike.[721]

Teyrê baz, wek îstî'areyî mehbûbê û qumrî jî 'aşiqî temsîl dike. Çavên 'aşiqî, bi teşbîha teyrêbaz û dilê wî yê birîndar jî bi teşbîha qumriyê hatiye sembolîzekirin. Çavên yarê yên bazî, dilê wî yê weke qumriyê nazik birîndar kiriye û xistiye nav tora xwe.

Min xwûn ji dil bi co têtin ew bazîyê bê tor û sil
Dakefte nêv tora qizil qumrî nehiştin ref bi ref (64/6)

Qumrî, bi firaqa hevalê xwe dinale. Di navbera vê xusûsiyetê û firaqa 'aşiqî de têkiliyek hatiye çêkirin. Nalîna ji ber firaqê xusûsiyeta wan ya hevpar e.

Qumrî û bulbul dixwînin lê 'eceb ew xweş dimînin
Her seher mehbûb dibînin 'endelîb vê ra veda ye (96/8)

#### 4.2.1.17. Hudhud

Hudhud, navê teyrikê Suleyman Pêxember e. Jê re "dadokê dunikil" jî tê gotin. Suleyman Pêxember ew ji xwe re weke qasidekî bikar dianî.[722] Hudhud, wek qasid û xizmetkarê Suleyman Pêxember namdar bûye. Hudhudî, ji dûr ve, ava li binê 'erdê didît. Wî, Suleyman Pêxember, derbarê Belqîsê ya melikeya Sebeyê de agahdar kiriye.[723]

Di edebiyata klasîk de, hudhud û bayê sebayê, di navbera 'aşiq û me'şûqê de qasid in. Di dîwanê de jî, hem telmîhî hem jî îstî'areyî bi têkiliya qasidiya Suleyman Pêxember û Belqîsê hatiye bikaranîn. Hudhud xeber û mizginiyan ji yarê tîne digihîne 'aşiqî. 'Aşiq, bi qasidiya hudhudî, ji yarê agahdar dibe.

Er ne hudhud ji Seb'a bêt wekî bayê sebayê
Dê li kê 'erz bikim vê xem û derd û elemê (109/5)

Suleymanî me ez dîsa seher hudhud bîşaret da
Cewab anî ji Belqîsa bi hal û sur 'îbaret da
Bi can ez xweş kirim 'Îsa dema wî ew îşaret da (131/11)

---

[721] Ceylan, b.n.b., r. 171-172.
[722] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 3, r. 1283.
[723] Canım, b.n.b., r. 492-493.

Hudhud, weke “şîrînkelam, xweşteb’et, şîrînzeban, hudhudê ridwanê” hatiye wesifdan, lewra çi xebera ji yarê were, ew ji bo ‘aşiqî mizgîniyek e û weke şekirê şirîn e. Bi xeberên hudhudî dilê mirî yê ‘aşiqî vedije.

Hudhudek xweşteb‘ min îro divê her wek nesîm
Da bi bal dilber hinara û bianiya dîsa cewab (16/23)

Sed hezar bar şakir im ez ku ji Belqîsa perî
Hudhudê şirînzeban îro xeberdarê me ye (93/23)

Hudhudê ridwanê xeybê sed xeber şîrîn ji ceybê
Da dilê min murde hey bê guh li rê min wek seba ye (95/12)

#### 4.2.1.18. Zax/Xurab (Qelereşk)

Zax cureyeke qelereşkê ye. Pêtiriya leşê wê reş e, lêbelê patik û derdorên guhî û berzika wê spî ye. Zax, ji ber rengê xwe bûye mijar û ew di dîwanê de wek îstî’areyî ji bo çavên yarê hatiye bikaranîn. Rengê reş û spî, li ser leşê zaxê heye û çav jî, reş û sipî ye.[724] Çavên yarê yên reş weke leşkerên sefgirtî, êrişan dibine ser dilê ‘aşiqî û wî birîndar dikin.

Ref ref nehiştin zax zax danîne dil min dax dax
Dê kî biminit sax sax westane leşker sef bi sef (64/7)

Mehbûs ez im zindan qefes şahê ji min girtî hewes
Zaxa ji dêmê reng weres mexlûq ji miskê cismîyan (90/7)

Can dê bidit ew malxerab her sîneyê cotek xurab
Tê da birin pence û kulab wê can di dest û ruh di kef (64/10)

Pora yarê ya reş ya li ser eniyê û li ser rûyî, dema tê berdan, serê zulfan dibe xelek. Eniya yarê heyv e û birca çavan e û rûyê yarê jî bax e. Herwekî tê zanîn li ser bircan li dijminan êriş dihate kirin û tîr dihatine avêtin. Ew pora bi ser eniyê ve hatî xwarê, wek îstî’areyî leşkerên li ser bircan in û ji bo êriş û nêçîrkirinê dav vedane. Ji aliyê rengî ve di navbera kezî û xurabê de jî têkiliyek hatiye teheyyûlkirin. Zulfa/pirça yarê ya alandî û badayî (kezî) bi rengê xwe ve dişibe xurabê. Xurab, wek îstîa’reyî, keziyên yarê yên reş in.

Tayê di nazik sunbul in serdarê xalan fulful in
Qumrî di burcan xulxul in zaxan li baxê girti rav (65/4)

Fetl û taban da xuraban ebleq û cohtê şebaban

---

[724] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 63.

Dame ber pence w kulaban dil ji min bir dil ji min (82/6)

Xurab, wek wateyeke neyînî ji bo tarîbûna şevê hatiye bikaranîn. Şeva ‘aşiqî ji ber rewşa nexweşiyê ew qas tarî ye, herwekî reşatî ji xurabê re nemayî û hemû hatiye ketiye nav şevê.

Mela Ebdurrehîmê Westanî, dibêje; xubar, wek kînayewî tariya nefsê ye û ew geşatiya ruhî, di nêv xwe de dipêçe.[725]

Ez dibêm axir zeman e dê qiyamet rabitin
Lew şeva tarî kişandî nehişt eswed xurab (16/13)

### 4.2.2. Heywanên Çar Ling / Ajalên Çar Pê

#### 4.2.2.1. Şêr (Eslan, Esed)

Şêr, li çiya û dehlan dijî, bi pençeyên xwe yên tesîrdar û bihêz ve heywanekî dirinde ye. Ew sembola quwwet û şeca’etê ye. Di edebiyatê de çav û xemzeyên yarê, roj û reqîb, bi teşbîha şêrî ve hatine beyankirin.[726] Şêr (esed), di dîwanê de, bi têkiliya bircê, wek îstî’areyî, di sembola çavên yarê, reqîbên ‘aşiqî û Îmam ‘Elî de hatiye bikaranîn.

Şêr, ji aliyê hêz û quwwetê ve bûye mijar. ‘Aşiq, reqîbên xwe weke şêran bi hêz û quwwet dibîne. Ew kesên ku dixwazin ‘aşiqî dest ji de’we û doza xwe berde, herçendê weke şêran bi hêz bin jî, dîsa nikarin bigihijine armanca xwe.

Ger çi di nêv helqeyê şêran im ez
Leyse ‘eleyna li ‘idane sebîl (72/14)

Şêr, ji ber hêz û quwwetê bûye mijar. Şa’ir, di meqama qurbê de (qabê qewseynê) ji aliyê bidestxistina remzan de, xwe weke şêran serkeftî dihesibîne. Şêr çawa di nêçîrê de serkeftî ne, şa’ir jî, di rim avêtinê de, xwe serkeftî û xweyî meharet dihesibîne.

Bi şêran ra ku rimbaz im di remza qabê qewseynê
Bi 'eynê Gulşenê Raz im di babê Hikmetil'eynê
Mulazim hedretê lazim hicab rakit ji mabeynê (131/31)

Şêr, bi têkiliya êriş û nêçîrê ve bûye mijar. Ji ber vê yekê di navbera çav û xemzeyên yarê û şêrî de têkiliyek hatiye beyankirin. Çawa şêr bi pençeyên xwe li ser

---

[725] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 324.
[726] Canım, b.n.b., r. 477-478.

nêçîra xwe tesîrdar e her wisa çavên yarê jî li ser ‘aşiqî û dilê ‘aşiqî tesîrdar e, ew nêçîr kiriye û birîndar kiriye.

Textê du mîr û begleran meydan e coqa gogeran
Eslan û cotê meyxuran mey di şeraba saxerê (113/12)

‘Ala û tayên di qurmizîn eslan di ber daberrizîn
Nêrgiz di baxan tewwizîn neyşekeran nîşane reqs (55/7)

Cohtê esedan pence li ser sîne nihandin
Kullabi gihandin dil û hestî herişandin (81/3)

Şêr, bi têkiliya Îmam ‘Elî hatiye bikaranîn. Ew, ji aliyê cesaret, şeca’et û pehlewaniyê ve, di edebiyata klasîk de weke “Esedullah, Şêrê Yezdan, Şêrê Xwûda” hatiye wesifdan.[727]

Ma qudretê def'ê heye wer şêrê 'Elî bit
Lami' ku bidit sa'iqeya teqdîrê (118/6)

Di burca hemelê de roj dibe hakimê felekan û her tişt dikeve bin hîmayeta wî. Rûyê yarê dema weke rojê bête teheyyûlkirin, çavên yarê jî, di vê burcê de ji aliyê tesîrê ve dibine esed/şêr.

Qewsê du hilalan ku li ser burcê esed bit
Bû şuhre di ‘amê 'emel enguşti numa girt (20/18)

Perwane yîm sotî kebed dilber ji ber burca esed
Tîr dan ji reştûzê Semed lew têk ji xwûnê neqqişîn (79/17)

#### 4.2.2.2. Piling

Piling, bi xusûsiyetên xwe ve dişibe şêrî û di dîwanê de bi hev re, di heman wateyê de hatine bikaranîn. Ev herdu heywan jî bi nêçîrkirina bi pençeyên xwe ve namdar in. Piling, wek îstî’areyî çavên yarê yên tesîrdar in. Çavên yarê yên weke pilingî cazîbedar û biheybet, cegera ‘aşiqî weke kullabeyên kêlbetanê ker ker dike.

Ji ceger Mela pilingan bi kulabê pensi bi ker kir
Esedan ji pence vêran dil û sîne herişandin (86/6)

Mahirûyê miski bûyê surpilingê şêr xwûyê
Wê bi zulfan şubhê goyê dil ji min bir dil ji min (82/8)

[727] Canım, h.b., r. 478.

#### 4.2.2.3. Hesp (‘Eşqer, Duldul, Feres, Semend)

Eşqer, hespê bi rengê sor ê bi zerî ve ye. Ev hesp ne ‘eslî ye û ji bo bezê jî zîrek û jêhatî nîne.[728] Duldul jî, hêstira Pêxember bûye ku hukumdarê Misrê Mukawkis jê re kiribû xelat. Pêxember di şeran de li wê hêstirê suwar dibû. Paşê ev hêstir, ji Îmam ‘Elî re kiriye xelat. Duldul, di edebiyata klasîk de ji bo xweşrevînê bûye mijar.[729]

Di dîwanê de, belîxnivîsîn û rewanbêjiya helbestê, bi hespajotinê re tê teşbîhkirin. Mela dibêje ku wî rewanbêjiya xwe ji feyz û bereketa Îmamê ‘Elî girtiye. Hespê eşqer, di destê Îmamê ‘Elî de weke Duldulê dibûye rewan û bezek.

'Eşqerê bedfi'lê çi hî kir 'eceb
Barekellah xweş bezî hespê qule (99/12)

Teb'ê lami'weş ji minnet Bûlhesen
Min di dest da Zulfiqar û Duldul e (99/11)

Hesp, ji aliyê nalkirin û rehwanrevînê ve bûye mijar. Stêrên ku di asûmanan de dizivirin li ser rêgeha xwe weke hespên li meydana pêşbaziyê direvin, hatine teşbîhkirin. Stêr, wek îstîa’reyî rêwiyên rêya salikê yên hîmmetbilind in.

Van rehrewên himmetbilend berdane meydanê semend
Sergeşte yîn hetta bi çend ev rekbê meş‘eldarê çerx (35/17)

Têkoşîna aşiq, me’şûq û reqîban, bi temsîla leyîstika setrencê hatiye îfadekirin. Hesp, di setrencê de berikek e û rast û çep tê leyîstin. Leyîstina rast û çep a berika hespê weke xwar û nedurustî hatiye beyankirin. ‘Aşiq, di rêya evînê de weke leyîstina berika qel’eyê, rast û durust e; weke leyîstina berika hespê, ne xwar û vîç e.

Ger çi yekser li rexên fîlsifet
Rast û çep baz li seyrê feres în (80/12)
Min go li ruxan îm ne ku kecrew weku ferz în
Şeh go me bikin matê bi bazî feres î tu (105/17)

#### 4.2.2.4. Merkeb/Xer (Ker)

Ker, ji famîlyaya hespan e û ji bo sûwarbûn û barkirinê tê bikaranîn. Ker, ji aliyê teb’etê xwe yê ehmeq, cahil, qedirnezanînê ve di dîwanê de bûye mijar. Mirovên cahil û ji aliyê me’newiyatê ve kor, xusûsiyetên wan weke yên kerê ne, ew başî û nebaşiyê ji hev cuda nakin, hetta tercîha xwe li ser xirabiyê dibin.

---

728 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 372.
729 Canım, b.n.b., r. 486.

Camid çi ket bi husnê koran nezer lê xwar e
Xerteb‘etên di ebleh çi nêrgiz û çi kerbeş (53/9)

Bêzî diket ji qencan bi remz û naz û xencan
Qedrê gulan çi zanit kerbeş divêt kerê reş (53/11)

Ji aliyê heqîqetnasînê ve, însan, ji rê derketine û bûne weke ker û gayî. Ji xeyrî xwarinê û xebatên dunyewî ve, haya wan ji tiştekî nemaye. Ew herçendê ademî bin jî, lê bi tebî’etê xwe ve weke ker û gayan in. Di nav vê dêra kevin de (dunya), ew kesê ji teferrû’atê û mecazê derbasî ‘esl û heqîqetê nebe, dê di bin barê dunyayê de weke kereke ehmeq û nezan bimîne.

Xaliba ehlê zemanî me Mela ademî yin
Venemayîn ji kerê me’y reş û gayê te yê beş (54/9)

Tu ji feslê here eslê ku di vê deyrê xerab
Da nebî merkebê cehlê tu li bin barê hudûs (28/21)

**4.2.2.5. Xezal/Ahû**

Xezal, bi çavên xwe yên mezin û sipehî, bi bêhna xweş û silokeyê ve, di dîwanê de cih girtiye. Ev ajal, ji ber silokeyê û xweşrevînê ve bi hêsanî nayête nêçîrkirin û nakeve dest. Ji ber van xusûsiyetan xezal/ahû wek îstî’areyî temsîliyeta yarê dike. ‘Aşiq û rakîb dixwazin yara xwe weke xezalê binêçîrin, lê ew bi xwe ji aliyê yarê ve têne nêçîrkirin û girtin.

Dil bi şepalan bide bask û xezalan bide
Sîne bi talan bide rûhê bi xalan bide (50/7)

Ahuwa min ne ku rencek te bi xatir bigehit
Bi Xwudê key te ku ew seg bi xwedî hat mesek (68/6)

Mehbûba weke şehsuwarên nêçîrvan, xezalek nêçîr kiriye û avêtiye fitraka hespê xwe. Dema ‘aşiq vê yekê dibîne, ji bo ku wasilê mehbûbê bibe, dixwaze ku di cihê wê xezalê de di fitraka hespê (benkeya pişt zînê de) wê de ew bûya û ji aliyê mehbûbê ve hatiba nêçîrkirin.

Dizanim şehsuwarê min xezalek wê di fitrakê
Bi cayê seydê ez bûma di wê fitrak û bendê da (5/18)

Welatên Çîn, Xeta, Xuten û Teterê, ji aliyê ahûyan ve namdar in. Yar, bi hêsanî nayête bidestxistin. Her çiqas ‘aşiq can û dilê xwe di rêya yara weke xezalan de bike dane jî, ew yar pir siloke ye û dema pê bihese berê xwe vediguhêze û diçe.

Canên xwe me kir dane û dama ku vedayî
Ahûsifet ew pê hissîya rahê Xeta girt (20/6)

#### 4.2.2.6. Sincab (Sivor) û Weşek (Werşeq)

Sincab û weşek du ajalên xweyî kurkên giranbiha ne. Ev herdu heywan ji nifşê kêtik û bi lingan e û ji ber post û kevlên xwe bûne mijar. Ji kevlên wan canewaran kurk, xeml û nexşên cil û bergan têne çêkirin. Sincab û weşek, wek kînayewî ji bo cilên giranbiha hatine bikaranîn.[730]

Dilbera min seherê hat bi tox û bi yedek
Sed yedek bûn di berê têki bi sincab û weşek (68/1)

#### 4.2.2.7. Seg, Tule

Seg, ji aliyê xusûsiyeta xwe ya girêdayîbûn û sedeqetê ve namdar e. Seg, wek îstîa’rewî ji bo reqîbî hatiye bikaranîn. Ehlê teb’etnexweş, şerker bi teşbîha seyan hatine bikaranîn. Seg û tuleyên li ber asîtana yarê, wek kînayewî cih girtine. ‘Aşiq, rakîb û tule li ber deriyê yarê sekinîne, sedeqeta xwe jê re nîşan didin. Herçendê seg ji aliyê însanan ve wek heywanekî hakîr bête dîtin jî, ‘aşiq wî heywanî meqbûl dibîne û dibe hevalê seyên ber asîtana yarê. Di çavê yarê de, ji aliyê sedeqetê ve di navbera seg, rakîb û ‘aşiqî de ferq tune.

Her şevem ne‘rezenan ta bi seher
Bi segê kuyê te ra hemnefes în (80/4)

Bi tûlên asitanê ra vexwendim mîr bi dergahê
Bi vî çavî hebîb dîtim şukur ev şefqe Mewlê da (5/31)

Min divê ser l'asitanê her wekî tûlan nihim
Belkî carek keyl bipursit ev çi mehrûm tûle ye (93/26)

Seg, ji aliyê şer û keşmekeşê ve jî bûye mijar. Ew kesê hez ji dilberan bike, ew xweyî tebî’etekî xweş e û yê ji dilberan bireve û nefretê ji wan bike, ew xebaîs, pîsteb’et e. Hubb û muhebbet xusûsiyetên însanî ne. Şerkirin û nefret jî yên seyan e.

Xebaîsteb‘ e û ji ehlê segsirişt e
Yeqîn ew ker ji canan lew dikit bîz (46/12)

Tule, segê nêçîrê ye. Nêçîrvan, tuleyan perwerde dikin û ji bo nêçîrê bi kar tînin. Herçendê nêçîrvan û tule zîrek û jêhatî bin jî, eger nêçîrek tunebe, di

[730] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 673-674.

biserneketina vê nêçîrê de suncê tuleyê tune. Pêwist e tiştê însan bixwaze û teleb bike, di nav sînorên mumkînatê de be.

Mumkinek dê hebitin da ku teleb hasil ket
Seyd û nêçîr ku nebit tûleyê seyyadî çi ket (22/4)

#### 4.2.2.8. Ga

Ga, ji aliyê nezanîn û têgehiştinê ve di dîwanê de bûye mijar. Gayê beş, ew ga ye ku eniya wî spî ye. Ga, tenê hizra xwarinê dike û sembola zêdexwarinê ye. Armanca ker û gayî herdem têrkirina zik û binzikan e.[731] Mirovên zemanî jî, bi van xusûsiyetan ve, bi van heywanatan ve hatine teşbîhkirin.

Nimûnedayîna heywanan ji aliyê nezanîn û têgehiştinê ve, îşaretê bi van ayetan dikin: "*Yan tu dibê qey (dihesibînî) piraniya wan bi rastî guhdariya gotinan dikin yan aqil dikin (aqilê xwe dixebitînin)? Na ew wek dewaran in, heta wan bêtir rê winda kiriye*." (Sûreya Furqanê, 25/44); "*Sond be, me gelek ji cin û însan ji bo dozexê afirandine. Dilên wan heye; pê (rastiyê) nagihin û çavên wan hene; pê (rastiyê) nabînin û guhên wan hene pê (heqiyê) nabihîzin. Ha ew wekî terş û heywanan in, belkî hê jî gumrah û reşaştir in. Ew in, yên her ji xwe bêagah*." (Sûreya A'rafê, 7/179).

Xaliba ehlê zemanî me Mela ademî yin
Venemayîn ji kerê me'y reş û gayê te yê beş (54/9)

#### 4.2.2.9. Fîl

Fîl, wek heywanekî hem bi quwwet e hem jî mezin e. Li Hindistanê ji bo barhilgirtinê tê bikaranîn. Fîl, di dîwanê de, ji ber hêz û quwwetê û ji ber ku navê berika setrencê ye, hatiye bikaranîn. 'Aşiq û rakîb, di 'eşqê de weke fîlê bi hêz û quwwet in. 'Aşiqî, hêz û quwweta xwe têra tehemmulkirina narê firqetê nabîne. 'Aşiq her çendê ji ber derb û cefayan xwe weke fîlê hêzdar bihesibîne jî, dîsa ji aliyê mehbûba weke şahan û reqîbên weke fîlan ve hatiye hêsîrkirin û matkirin.

Tu barê firqetê zanî nikarim ez tehemmul kim
Bi narê kohê Qendîl im bila fîl im di 'işqê da (5/38)

Ger çi li ber derb û cefan fîl bûm
Bê mefer ez mati kirim şah û fîl (72/12)

Bende kirim ger çi şebeh fîli bûm
Sîmîbera sa'id û bazû ji 'ac (30/4)

[731] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 562-563.

Ger çi yekser li rexên fîlsifet
Rast û çep baz li seyrê feres în (80/12)

### 4.2.3. Heywanên Xuşende, Semek, Mêş

#### 4.2.3.1. Semek (Masî)

Masî, ji bo nimûnedayîna mexlûqatên ku zikr û semayê dikin, bûye mijar. Li herî jor çerx û felek û melek, li herî jêr jî masî hene û di navbera van herduyan de çi tişt hene hemû bi evînê (ji ber cezbeya îlahî) semayê dikin. Ji semayê bigire heta masiyê binê behrê dîsa bi nûra ‘eşqa îlahî her tişt rewşen dibin.

Bi evînê melek û çerx û felek têne sema
Rewşen in têki bi mihrê ji sema ta bi semek (68/7)

#### 4.2.3.2. Meges (Mêş)

Ji aliyê devjêneberdanê ve, di navbera ‘aşiq û megesê de têkiliyek hatiye çêkirin. Meges, ji şirînahiyê hes dike û daîma li ser wê vedide. Yar weke qend û nebatê şirîn e û ‘aşiq jî weke teb’ê megesê her daîm li derdora wê ye. Di navbera nebat û megesê de çi têkilî hebe, her wisa di navbera ‘aşiq û me’şûqê de jî heye. ‘Aşiq, cewr û cefayê ji yarê bibîne û yar bi tîxan wî ji deriyê xwe dûr bike jî, dîsa ‘aşiq ji ber deriyê wê dûr nabe.

Sed cewr û cefa di bi me naçin ji derê te
Yekser tu nebat î û li teb'ê meges im ez (48/8)

Min go me bi tîxan wenda kin ji derê te
Go em ji nebat în we li teb'ê meges î tu (105/13)

#### 4.2.3.3. ‘Eqreb (Dûvpişk)

‘Eqreb, ji ber dûvê wê yê xwar, jehrî û ji ber rengê wê yê reş, bi têkiliya por, bisk û nîşanên yarê hatiye bikaranîn. Nîşanên li ser rûyê yarê bi rengê xwe ve û biskên wê yên badayî û xwar jî bi şeklê xwe ve wek dûvpişkê hatiye teheyyûlkirin. Rû û dêmê yarê weke mahê geş û weke baxê gul’izarê rengareng e û zulf, perçem û biskên yarê yên dişibine dûvpişkan dikevine nava heyv û gul’izarê.

'Eqreb nehin ew sunbul in bu'enber û dava dilîn
Nîşan ji misk û filfilîn wan sineyê min kir hedef (64/4)

'Eqreb û qewsûqezeh vê ra muqabil Muşterî
Roz û şêv nûr û şefeq tîrêj û berq û sipîde ye (93/14)

Zulfên but û şîrînleban jehrî ne şubhet ‘eqreban
Lê min ji biska purgirî îro tinê girtin du ta (7/4)

Hat padişahê pursipah qametelîf dêm şubhê mah
Dad û meded sed ah û ah zulf û ‘eqarib çune ser (43/6)

Îro ‘eqarib hate xwar çû nêv baxê gul‘izar
Ew baxçeya her lê bihar her bulbulan lê qal û şer (43/8)

#### 4.2.3.4. Perwane (Perperok)

Perwane, ji familyaya perperokan e û di şevan de li derdorê şewq û êgir dizivire û xwe tavêje nav êgir. Di edebiyata klasîk de perwane, bengiyê mûmê (şem’) ye û sembola ‘aşiqî ye û şem’ û perwane bi gelemperî bi hev re têne bikaranîn. Perwane, ew ‘aşiq e ku bêdeng e, ew qas sadiq e, ji yara xwe re canê xwe jî feda dike. Gehiştina fenafillahê ya salikî weke xwetunekirina perwaneyê tê îzahkirin.[732]

‘Eşq û agir ji aliyê sohtinê ve dişibine hev. Yek maddî û yek jî me’newî dişewitîne. ‘Eşq, aşiqî; agir jî perwaneyê dişewitîne. ‘Eşq, nûra husn û cemalê layezal e û ‘aşiq jî bengiyê wê husnê ye û li derdora wê dizivire û dixwaze weke perwaneyê di nav wê nûrê de bisoje.

'Işqa ji nûra layezal husn û cemalê bêmîsal
Îsandi yelmûm û şemal dîsa xwe lê perwane da (9/5)

Gelo dîsa bibînim ez çiraya wesletê hil bit
Bisojim şubhet perwanê li ber wê nûr û şewqê da (5/11)

Ji me dil Ke'be û butxane kirî
Pêş şem'a xwe perwane kirî558 (123/4)

‘Aşiq xwe û perwaneyê berawird dike û xwe ji wî bilindtir dibîne. Halê şem’ û perwaneyê têra têgehiştina halê ‘aşiqî nake. ‘Eşqa perwaneyê bi fesla biharê re girêdayî ye, lê ya ‘aşiqî herdem e û ji ber vê yekê daîm dinale. ‘Aşiq û perwane bûne hedefên birqa evînê. Perwane ze’îf e û nikare xwe ber wê birqê bigire, lê ‘aşiq li ser pêyan e.

Şem‘ û perwane bi zatê xwe ji halê me di dur in
Ateşek sirf e ji ‘işqa te vewestame lebaleb (14/6)

Bulbul û perwane ew fesl û dem in

[732] Canım, b.n.b., r. 500-501.

Cinsê 'işqa min tenê derdê kul e (99/9)

Perwane lew dimmirit xweş nîne ev bijînê
Zeîf e xwe nagirit tîj e berqa evînê
Di perdê nasebirrit perde kemala dînê (132/33)

Di ‘eşqê de wekhevîyeke ‘aşiq û perwaneyê jî ew e ku herdu jî disojin, lê bêdeng in; axîn û nalînê nakin. Ev bêdengiya wan ji aliyê yarê ve weke bêhîssiya wan tê şirovekirin. Sohtina wan ya bêdeng û bêferyad (an jî bideng û biferyad), sedeqet û samîmiyeta wan nîşan dide.

Min go di şevan şubhê şemalan weh disojîn
Got perwanesifet ca here bê sewt û his î tu (105/21)

Ser ta bi qedem ez bisojim şubhê Mela yî
Perwanesifet sohtim û bê sewt û his im ez (48/10)

Ji aliyê sedeqet û samîmiyetê ve goyîn û perwane (ev herdu ajal, ehlê seyr û sulûkê sembolîze dikin) hatine berawirdkirin. Perwane di agirê mûmê de disoje lê deng jê nayê, lêbelê goyîn daîm axîn û nalînan dike. ‘Aşiqê sadiq, pêwîst e gilî û gazindan neke.

Êk ji wan perwane bû soht û fixanek jê nehat
Êk ji wan teşbîhê goyînê bi ah û nale bû (104/12)

Di navbera salik û perwaneyê de têkiliyek hatiye çêkirin. Heta perwane neşewite nagihije şem’ê û heta salik jî di meqama fenayê de tune nebe ew jî nagehije heqîqetê. Heta ehlê ‘irfanê weke perwaneyê nesoje, deriyê sirran jê re venabe.

Kirişme û remza berî ‘arif venabin li derî
Hetta di nêva agirî ew xef nebit perwane reqs (55/5)

Perwane lew disojî ji lem'eya cezbatê
Feda kirin 'umr û jî di keşfa subbûhatê
Ku da ji nû ve vejî baqî bit di heyatê (132/34)

**4.2.3.5. Mar (Reşmar, Îlan, Erqem, Ef’a)**

Keziyên yarê bi şekl û rengê xwe ve, bi teşbîha maran têne beyankirin. Mar, bi dirêjahî, reşatî, gezkirin û zehîrkirinê ve di dîwanê de bûye mijar. Bejna yarê weke dara selwiyê zirav û dirêj tê teheyyûlkirin. Keziyên yarê yên dirêj jî, li ser pişta wê, weke mar/reşmaran têne teheyyûlkirin ku xwe li wê darê fetilandine/alandine û herwekî ji wê darê de têne xwarê. Bi meşa yarê, hem bejna wê hem jî keziyên wê bi

ahengî dihejin, ev hejandin weke mestiya maran û weke hatina seyra ‘aşiqî hatiye îfadekirin.

Dilê min wan xedeng lê da di burca roz û şeb tê da
Li selwa mar livîn pê da bi mestî têne seyranê (111/17)

Fetlên siyah marên şevîn reyhan bi dor serwan çevîn
Axir bi selwê da revîn xef bû di tayê çenberê (113/29)

Qewsê te hilalî bi delalî keşiha
Bejna te ji şengî bi derengî meşiha
Marê ji herîrî di 'ebîrê xuşiha
Mawer bû ji wan zulfê di zengî weşiha (130/1)

Wek efsanevî tê gotin ku li derdora her xezîneyekê marek heye û wê xezîneyê diparêze. Ef’î jî marê zêrî ye. Devê yarê jî durc e ku durc jî qotiya durr û gewheran e. Kezî û biskên yarê bi ser rûyê wê ve dadihelin û ev dimen weke marên ku qutiya gewheran/xezîneyê diparêze hatiye teheyyûlkirin.

Ef'a li serwa silsilîn reşmar ji durcan kemmilîn
Di berda binêr baxê gulîn daîm xeyala hebsîyan (90/6)

Di navbera şetrî û ef’ayê de têkiliyek hatiye çêkirin. Şetrî, mohrik û mircan in ku jin ji bo xemilandinê bi kar tînin. Dema yar wan şetriyan bi ser eniya xwe ve berdide, herwekî marên ji darê hatî xwarê, hatine teheyyûlkirin. Gulnar û ef’î wek telmîhî, efsaneya Dehhaq jî tîne bîrê, lewra di nav milên Dehhaq de weke du gulan birîn çêbibûn û du mar di nav wê birînê de şîn bibûn û xwîn dimêhtin. Yar jî bi hemû xeml û spehîtahiyên xwe ve weke wan maran xwîna ‘aşiqî dimêje û wî birîndar dike.

Ew çîçekên şetrîsifet ef‘a mislê qelbê me mêht
Selwa ji balayê we rêht ev perdeya gulnarê xet (59/3)

Ji aliyê rengî ve di navbera mar û şevê de têkiliyek hatiye çêkirin. Keziyên yarê weke tarîtiya şevê reş in. Keziyên yarê yên weke şeva tarî reş, di dilê ‘aşiqî de ronahiya evînê hil dike û xem û kulên wî belav dike. Marên şevîn, caran jî, qesta canê ‘aşiqî dikin û dixwazin ruhê wî jê bistînin.

Şahê cevîn xem jê revîn marê şevîn îsand evîn
Derd û bela wên çûn hela ‘umrek Mela mehcûri bû (107/15)

Lazim bi qetla min divî hêj dev û di dil marê şevî
Peykan di cergê min çevî bend kir bi şewka 'enberê (113/19)

Şa’ir, rengê çermê xwe ji aliyê reşatiyê ve dişibîne kevlê reş yê marî. Herçendê ji aliyê rengî ve çerm û kevilên wan dişibine hev jî, meqseda şa’irî teşbîhkirina bext û talîhê ye. Bextê şa’irî weke kevlên marên siyeh, reş e.

Me hesko bo qelem sîtil dewê de
Sîyah in em weku kevlên di maran (88/3)

Reşmar, ji aliyê gezkirin û zehîrkirinê ve jî bûye mijar. Çawa mar însên digeze, her wisa keziyên yarê yên weke reşmarî jî, xwe li dilê ‘aşiqî alandine û ew geztiye. Ji wî nexweşê ku reşmaran ew geztiye, derman, dîsa yara weke Mesîhî ye. ‘Aşiq ji yarê dixwaze ew bête ser birîndarên xwe û ‘aşiqî ji keziyên xwe re qurban bike.

Mesîha yî li bîmaran kesê geztî du reşmaran
Şehîdên şîr û mûkaran kirî amancê nûbaran (124/9)

Şefqê bi dîdarê xwe kit qesta birîndarê xwe kit
Şehîdê reşmarê xwe kit ê ser li fetlan pêşterê (113/28)

Xef bûn di nêv tora qizil îlanmîsalê ser li mil
Kuştîn û zehr avêhte dil hêj kuştiyên remza berê (113/30)

Erqem, marê belek e ku li ser kevlên wê reşatî û spîtî hene.[733] Erqem, wek kînayewî ji bo bisk û keziyên yarê hatiye bikaranîn. Biskên yarê yên weke marên reş û belek, li ser eniya wê aliyane.

Zinhar kesê desti bibit erqemê serwê
Bê‘işweyê le‘lan te bi teslîmê jiha girt (20/11)

Dêmê bedr û enîyê zulf li ser bûne helek
Erqeman helqe û gerdan e li dewra qemerê (126/6)

#### 4.2.4. Heywanên Mîtolojîk

##### 4.2.4.1. Huma

Huma, teyrê dewletê ye. tê bawerkirin ku kî wî bi dest bixe dibe xundkar.[734] Ev teyr, sembola talih û se’adetê ye û weke ‘enqa û sîmurxê jî tê binavkirin. Huma sembola mezinahî û bilindahiyê ye. Sîbera humayî, tê wateya dewlet, talih, bext û bereketê. [735] Huma bilind difire û venade li ser ‘erdê. Ji ber vê yekê, nayête nêçîrkirin û nakeve destan. Yar jî, ji ber ku ‘aşiq nikare xwe bigihînê, weke teyra humayê hatiye

[733] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 390.
[734] Melayê Cizîrî, Dîwan (ferheng), r. 387.
[735] Canım, b.n.b., r. 493.

tesewwirkirin. Kesê ji aliyê humayê ve bête nêçîrkirin, xweyî cewherekê nebe û qiymeta wî tune be jî, di destê wê humayê de hêjayekê hildigire û bi qiymet dibe, lewra teyra dewletê bûye nesîbê wî. Hemû dildarên mehbûbê ji bo ku yara weke humayî bi dest bixin tor û dav li ber wê vedane. Ew kesên tor li ber humayê vedane ew bi xwe ji wê humayê re dibine nêçîr.

Teyxûn di destê te zehî dewlet û îqbal
Herçî tu bûyî dam di tora xwe huma girt (20/5)

Bi umîda te humayî ji Melê tor veda
Wer temaşayê cehan bûye hemî tor û şebek (70/15)

Wek efsanewî tê gotin ku siya teyrê humayê bikeve ser serê kê dê deriyê se'adetê lê vebe. Bi vê têkiliyê, pora yarê bi per û çengê humayê hatiye teşbîhkirin. Eger siya pora yarê jî bidete ser rû û dêma dilberê ku li ser wê dêmê nexş û xetên qudretê hene, dê deriyê wan gencineyan ji 'aşiqî re vebe. Zulfa yarê ya li ser eniya wê, ji bo 'aşiqî weke perên teyrê humayê ne û jê re dibe wesileya weslet û se'adetê.

Sayenumayê cebhetê neqş û xetê ji qudretê
Nuqte û herf û cezbe tê bal û perên humayê zulf (63/2)

Ahê me tên ji daxekê suhtime şebçeraxekê
Sayenuma ye zaxekî bal û perên humayekî (128/7)

Di navbera memdûhî û teyrê dewletê (huma) de jî têkiliyek hatiye çêkirin. Memdûh jî weke humayê hîmmet bilind e. Li ser serê wî jî taca îqbalê heye û li 'erda di bin hîmayeta wî de xweyî se'adetê ye û welatê ew rêveberiya wê dike jî cihê bextewariyê ye.

Di perwazê humadeng în me ser da tacê îqbalê
Şehê Keyxusro û Zeng în serefraz în di vî halê
Li ber pê 'er'era rengîn me qamet bû şubê dalê (131/28)

#### 4.2.4.2. 'Enqa

Tête bawerkirin ku 'enqa, li Çiyayê Qafê dijî, perên wî yên rengareng hene û rûyê wî jî dişibe rûyê însên. Bejna wî dirêj e, tu carê venadete li 'erdê û daîma li bilindahiyê difire.[736] 'Enqa, dûrî û negîhiştina dildarê temsîl dike. Navê wî heye lê eslê wî nîne.[737]

[736] Canım, b.n.b., r. 474-475.
[737] Melayê Cizîrî, Dîwan (ferheng), r. 375.

‘Enqa, di dîwanê de wek îstî’arewî, yarê sembolîze dike. Yar û ‘enqa ji ber dûrbûnê û bidestnexistinê û wasilnebûnê dişibine hev. ‘Enqa, nayête nêçîrkirin; kesê de’weya girtina ‘enqayî bike, cehd û xebata wî badêhewa diçe. Eger ew bi xwe neyê, bidestxistina wî ne mumkin e. Ji xwe yar ji dil hez ji ‘aşiqê xwe bike, dê were û ne hewce ye ji jor ve weke ‘enqayî lê bête gerîn.

‘Enqa ne şikara kes e dava bo biçîn ve
Dava ku li ‘enqa ku vedê badêhewa girt(20/7)

Mehbûb bi dil bit me bi evrazî çi hacet
‘Enqa bi xwe bêtin firr û perwazî çi hacet (21/1)

**4.2.4.3. Jiha/Zuha (Ejdeha)**

Jiha, marê mezin e. Tê bawerkirin ku mar bi ‘ecelê xwe namire, îlla ji aliyê însanan ve dê bêne kuştin. Marê ku ji aliyê însanan ve neyête kuştin û ‘umrê wî bibe hezar sal ew êdî dibe ejderha. Peyva ejderhayê ji “Ajî Dehhaq”ê tê ku Dehhaq padîşahê ‘ereban e û di dewra Cemşîd de Îran zebt kiriye[738]

Jiha, di dîwanê de wek îstî’areyî keziyên yarê ne. Ji ber stûrbûn û tesîra wî ya mezin, li ser ‘aşiqî, weke ejderhayî hatiye teheyyûlkirin. Kesê ne bi destûra yarê destên xwe dirêjî keziyên wê bike, herwekî destê xwe dirêjê ejderhayî kirî, îhtîmal heye ku wan destan bigeze û wî jehrî bike. Keziyên yarê, bi şeklê xwe ve, weke ejderhayê sehmnak û heybetdar tê dîtin.

Zinhar kesê desti bibit erqemê serwê
Bê‘işweyê le‘lan te bi teslîmê jiha girt (20/11)

Surmadar în ji surrê mestê ji qudret kemmilîn
Me ji xeflet du jiha dîn û ji sehmê xeccilîn (121/5)

Ahê ji destê ejdehan mest û xumarê hejjehan
Dev li dil û ceger nihan jehrê kirî liba yekî (128/2)

Çerxa felekê (qeder, ecel), weke ejdehayekî reş hatiye teheyyûlkirin. Felek jî, bi kînayewî mirin û ecel e. Bi şev û roj du’ayên ‘aşiqî ew in ku ew zulf û xalên yarê ziyaret bike. Lê ditirse ku hêj ew daxwaz bi cih nehatî, feleka reş a weke ejdehayekî bê û ruhê wî jê bistîne.

Çerx tirsim kit şitabê zû ecel pê det rikabê

---

738 Gölpınarlı, b.n.b., c. 1-2, r. 154-155.

Can birit me d'vê 'ezabê ev siyahreng ejdeha ye (96/23)

#### 4.2.4.4. Dêw

Dêw, heywanekî çîrokî û efsanewî ye. Li ser şeklê mirovan e, lê gelek bi sehm û kirêt e.[739] Dêw, ji bo hebûnên kirêt û xirab tê bikaranîn. Mel'ûnê xirab şeytan e û ew weke dêwekî hatiye teşbîhkirin. Dêw, wek kînayewî temsiliyeta nefsa emmareyî dike. Ev nefs, însên ber bi nizmiyê ve dibe.[740] Nefsê emmare, ew e ku meyla arzûyên cismanî dike, emrê kirina lezzetên hîssî û şehewî dike. Nefs di vê mertebeyê de, bingeha xirabiyê ye û menba'ê exlaqê xirab e.[741]

Dêwê mel'ûn û munafiq ê Xudê rûreş kirî
Ma bi bala hilkişîtin 'aqîbet çêbit selab (16/18)

Dêw, wek kînayewî ji aliyê xirabî û fesadiyê ve temsiliyeta reqîbî dike. Ew reqîbên tebî'etê wan weke dêwan xirab, li derdora mehbûban digerin, fesadiyê dikin û nahêlin 'aşiqê heqîqî xwe bigehîne yarê û wuslat peyda bibe. Dêw, hem di wateya reqîbî de hem jî di wateya nefsê emmareyê de dikare were şirovekirin.

Dax û key min lê hezar in gul di dest şewkên bi xar in
Surperî dêw wê l'kenar in Ehrimen xatem reva ye (95/5)

Teb'îdêwan dest gehiştê hûr û wîldanê behiştê
'Aşiqê dilbendê qiştê can bidit yekcar rewa ye (95/6)

### 4.3. Nebatat/Riwek

#### 4.3.1. Giya û Dar

#### 4.3.1.1. Weres

Weres, peyveke 'erebî ye. Ev giya li Yemenê şîn dibe û di rengkirina cilan de dihate bikaranîn. Ev giya ji ber rengê xwe bûye mijar û rengê wê weke ze'feranê zer e. Weres, wek kînayewî ji bo rengê rûyê 'aşiqî hatiye bikaranîn.[742] Rengê 'aşiqan ji ber firqetê û eza û cefaya mehbûbê zer dibe. 'Aşiq, ji ber rengê xwe yê zer weke weresê nazik bûye. Eger yar bixwaze li gul û nesrînan binêre, dîtîna 'aşiqî ya bi rengê zer ve

---

739 Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 198.
740 Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 1, r. 327.
741 Seyyîd Şerîf Cürcanî, Ta'rîfat/Tasavvuf Istılahları, terc. Abdülaziz Mecdî Tolun, Litera Yayıncılık, İstanbul 2020
742 Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 855.

besî wê ye. Şa’ir, ji ber derdê ‘eşqê hem rengê rûyê xwe hem jî rûyê yara xwe yê zer û nazik dişibîne weresê.

Were canim ku çi nazik weres în
Ji gul û nesterenan em te bes în (80/1)

Mehbûs ez im zindan qefes şahê ji min girtî hewes
Zaxa ji dêmê reng weres mexlûq ji miskê cismîyan (90/7)

Kes nedye sehergeh ku çi nazikweres î tu
Me j'belgê gul û nêrgizên sermesti bes î tu (105/1)

#### 4.3.1.2. Kerbeş

Kerbeş, giyayekî belgpehn û bi sitrî ye. Di demsala biharê de şîn dibe û ji aliyê heywanên stûr yên weke keran ve tê xwarin.[743] Ker gelek hez ji vî giyayî dike û ji ber vê yekê weke giyayê kerê hatiye binavkirin. Kesên ferqa di navbera tiştên xweş û tiştên nexweş de nezane, ew wekî kerê ye, lewra li cem kerê ferqa nêrgiz û giyayê kerbeşê tune. Ew herduyan jî, ji bo ziktêrkirina xwe bi kar tîne.

Camid çi ket bi husnê koran nezer lê xwar e
Xerteb‘etên di ebleh çi nêrgiz û çi kerbeş (53/9)

#### 4.3.1.3. ‘Er’er

‘Er’er, dareke çiyayî ye, bilindahiya wê digehije nêzikî bîst mêtroyan û ji nifşê kajê ye. Di edebiyatê de wek kînayewî ji bo bejna bilind tê bikaranîn.[744] Er’er, bi belgên xwe yên rengîn, bi hejîna li ber bê û bi dirêjahiyê ve, bi yarê re têkildar e. Nexş, xemrî û xişrên yarê dişibine belgên ‘er’erê û bejna wê jî dişibe dirêjahiya wê darê. Li ber bejna yarê ya weke dara ‘er’erê rast û dirêj, bejna ‘aşiqî weke herfa dalê tewiyaye û bûye du ta.

'Er'eran ta di şepal in wereqan cezbe ye vê ra
Nêrgizan ser di giran in li binefşan xem û tab e (94/13)

'Er'era rengîn ji tayê sor û zer
Qumriyan sed rengê şîrîn xulxul e (99/6)

'Er'era qamet'elîf neyşekera şox û şepal
Nazik û sîmîten û Xusrew û zerrînkulehê (110/2)

Di perwazê humadeng în me ser da tacê îqbalê

[743] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 550-551.
[744] Muhemmed Emîn Doskî, h.b., c. 1, r. 220.

Şehê Keyxusro û Zeng în serefraz în di vî halê
Li ber pê ‘er’era rengîn me qamet bû şubê dalê (131/28)

#### 4.3.1.4. Serw/Selwa

Serwî, peyveke farisî ye û bi ‘erebî jê re “şeceretu’l-hayye” tê gotin. Di edebiyata klasîk de wek îstî’areyî ji bo bejna dirêj hatiye bikaranîn.[745] Dara serwiyê, bi dirêjahî, ciwanî û bi hejîna li ber bê ve bi bejna yarê re têkildar e. Bi vê têkildariyê, di dîwanê de weke rawekên “serwîxennac, selwa ciwan, selwa sehîqed, selwa rewan, selwa xeraman, serwîqed”ê hatiye bikaranîn. Li ber bê hejîna serwiyê, bi selwa rewanê; û bi serwîxennacê jî meşa yarê ya cilwedar hatiye îşaretkirin.

Şimşadîxeram û serwîxennac
Canan dibirit bi 'işwe tarac (29/1)

Xwûn ji dil co co rewan tên wek ‘eqîq û erxewan tên
Lê ji ber destê selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox (36/3)

Selwa sehîqed xemmilî lew kemmilî mestane reqs
Wer suhbetê ger qabilî wê bêt werî şahane reqs (55/1)

Weqtê ku nalîn erxewan gulçîçek û terhên ciwan
Vê ra ne bê selwa rewan ‘arif li ferqê can e reqs (55/8)

Şimşadi bi meş sosin û sunbul bi sema tên
Ey serwê xeraman ku tu carek bimeşî (129/2)

Dara selwiyê bi teşbîha bejna yarê hatiye bikaranîn û di tebî’etê de xwealandina maran ya bi daran ve jî giring e. Ji ber rast û dirêjahiya dara selwiyê mar, bi hêsanî dikarin xwe li wê darê bialînin. Dema por û keziyên yarê yên dirêj û reş bi teşbîha marî û ‘eqrebê bêne teheyyûlkirin, bejna yarê ya zirav û dirêj jî dibe dara serwiyê ku kezî xwe lê badidin.

Pur şewwişandin dil e zulfa siyah ser da mil e
Tora muxabiş silsil e selwayê ‘eqarib lê meşîn (79/3)

Fetlên siyah marên şevîn reyhan bi dor serwan çevîn
Axir bi selwê da revîn xef bû di tayê çenberê (113/29)

---

[745] Rıdvan Canım, b.n.b., r. 538-541.

#### 4.3.1.5. Şimşad (Bîşeng)

Şimşad, peyveke farisî ye. Ev dar her dem kesk e, belgên wê biçûk û stûr in. Di edebiyatê de wek îstî’arewî ji bo bejna yarê tê bikaranîn.[746] Ev dar bi navê “bîşeng”ê jî tê zanîn û bi ziravî û bilindiyê ve navdar e.[747] Rêveçûn û meşa yarê ya kubar û nazdar, bi hejîna dara şimşadê ya li ber bê ve hatiye teşbîhkirin.

Şimşadîxeram û serwîxennac
Canan dibirit bi 'işwe tarac (29/1)

Du ‘enber bûn li şimşadî vibestî
Lew bestin lew hewa bû ‘enber’amîz (46/3)

Şimşadî xeramek ku me dîbû seherê
Camek ji şerabê bi me da wê qemerê
Tîrek ku ji qewsên di wê da cegerê
Qurbanê xwe kir canê şîrîn ruxfenerê (130/3)

### 4.3.2. Çîçek û Cureyên Wê

Çîçek nexşên tebî’etê ne. Ew bi şekil, reng û bêhnên xwe ve wek mecazî û teşbîhî hatine bikaranîn. Çawa dema demsala biharê tê û tebî’et bi wan dixemile û tezeyyûn dibe, unsûrên yarê yên li ser rûyê wê jî weke çîçekên gulistana yarê hatine beyankirin. Çîçek, xeml û nexşa gulistanê ne û unsûrên yarê jî li ser baxçeyê rûyê wê bi teşbîha wan çîçekan hatine îfadekirin. Di dîwanê de tê dîtin ku her tiştê şînber, ber bi wateyeke razber ve diçe û wateyên maddî ber bi wateyên me’newî ve diherikin. Çîçek jî bi vî awayî bi wateyên xwe yên mecazî ve derdikevine pêş.

Reyhan û sunbul tê hene sed çîçek û gul tê hene
Zerbavê bulbul tê hene ew bexçeya gulzarê xet (59/7)

#### 4.3.2.1. Erxewan

Erxewan, guleke bi rengê sor û binefşî ye. Li destpêka biharê şîn dibe û bi rengê xwe ve namdar e. Rengê wê yê sor û binefşî wek teşbîhî, ji bo rengê hinarokên rûyê yarê û rengê xwînê hatiye bikaranîn.[748]

[746] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 327.
[747] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 115-116.
[748] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 400.

Ji aliyê rengê sor ve, xwîna ‘aşiqî dişibe rengê çîçeka erxewanê. Xwîna ‘aşiqî ya ji aliyê destê selwa rewan ve hatî rêhtin, bi rengê xwe ve weke rengê ‘eqîq û erxewana sohr e.

Xwûn ji dil co co rewan tên wek ‘eqîq û erxewan tên
Lê ji ber destê selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox (36/3)

Rengê erxewanê sor, pembe û binefşî ye. Ev rengîniya erxewanê, ji bo xeml û nexşên dilberê bûye sembol. Ew dilbera bejna wê weke dara serwiyê zirav û dirêj e, cil û bergên li ser wê jî weke rengê erxewanê şirîn û delal in.

Sed padişah û Xusruwan can dan di ‘işqê û rewan
Şirîn di libsê erxewan min dîn li bejna serwîqed (40/3)

‘Er’er û serwa ciwan yasemîn û erxewan
Rûh ew in û her rewan dê dil û can dîn bi wan (50/6)

Bergên erxewanê, bi rengên xwe yên cuda ve bûne mijar. Şa’ir, şi’rên xwe bi yên şa’irên dinê re muqayese dike. Herçendê li ser bergê erxewanê yên reng bi reng yanî cure cure şi’r hatibine nivîsîn jî, lê dîsa weke şi’rên Melê rewan û dilrewan nînin.

Şi‘rê Melê ku wek rewan daye di can me dil rewan
Pur me li bergê erxewan dîne xezel leng û şetet (60/5)

#### 4.3.2.2. Xunçe

Xunçe, çîçeka bijkojî ya nevekirî ye û mebesta bikaranîna wê, devê yarê yê piçûk e.[749] Her biharê, li nav baxçeyan weke nexşa biharê xunçe dibişkivin, vedibin û dibine gulên rengîn. Mehbûb jî, di serî de weke xunçeyê, newcîwan û piçûk e, paşê mezin dibe, dibe weke guleke nazenîn.

Ew bû murada Kirdigar lew kir îrade'w ixtiyar
Vê buxçeyê her lê buhar gul geş di baxê xunçe da (9/44)

Xunçe, wek kînayewî ji bo yarê jî hatiye bikaranîn. Yar jî weke xunçeya gul’izarê terr û taze ye û ji aliyê bedewbûn û ciwaniyê ve weke xunçeyê ye. ‘Aşiq dixwaze yara wî ji aliyê remz û ‘işweyên xwe ve, her daîm weke xunçeyê vegirtî û cazîbedar be.

Ji xunçên xunçeya wê gul’izarê
Me her xunçe di dil da maye xarek (69/3)

[749] Melayê Cizîrî, Dîwan, (ferheng), r. 427.

Daîm bi remz û 'işwe bî şubhet gula ser xunçe bî
Wê buxçeyê xar tê ne bî ageh ji 'uşşaqên xwe bî (125/6)

Çavên yarê yên weke nêrgizê mest, dema ji xewê hişyar dibin weke vebûn û bişkivîna nêrgizê hatine teheyyûlkirin. Nêrgiza mest, wek îstî’areyî çavên yarê ne. Li ser rûyê wê yê weke qedîfeya nerm, xunçeya nêrgizê bişkiviye û serê xwe di nav wê qedîfeyê de derxistiye. Çîmen, wek îstî’areyî dema bibe dêmê dilberê, unsûrên bedewîbûnê yên li ser dêmê wê, weke xunçeyên terr û nazik têne teheyyûlkirin.

Bişkifti ji xunçe nêrgiza mest
Bû ferqi ji ser qedîfe dîbac (29/3)

Çûme temaşa çemen taze gul û nesteren
Xunçe û bişko biken çîçek nesrînsemen (50/1)

Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî
Bişkifti sifet-xunçe ji çara ereşî (129/1)

Di navbera dilê ‘aşiqî û bişkiftina xunçeyê de têkiliyek hatiye teheyyûlkirin. Çawa xunçe dibişkive, vedibe û ‘aşîkar dibe, mehbûb jî dixwaze dilê ‘aşiqî li ber yara wî her daîm vekirî be û hez ji yara xwe bike. Dilê ‘aşiqî ji aliyê muhebbetê ve weke xunçeyê nazik û nazenîn e, lê haya mehbûbê ji vê hessasiyetê nîne û dilê ‘aşiqî, bi pençeyên xwe digire û diêşîne.

Yar jî gel bê perde bit vê ra bi rehm û şefqe bit
Wek xunçe 'aşiq dil vebit dil şubhetê ayîne bit (125/9)

Yengî te di şengî bi derengî we kişandin
Sed tîr û xedengî bi çi rengî te reşandin
Serpence bi îşkence te wek xunçe livandin
Hestî we bi mestî li me vê ra herişandin (130/8)

Xunçe, bi rengê xwe yê sor ve wek îstî’arewî temsîliyeta lêvên yarê dike. Devê yarê weke qutiya mucewheran e (durca ‘eqîq) û dema weke xunçeyê vedibe, gewherên yarê (lebên le’lî û didanên mircanî) aşîkar dibin.

Ji guher xunçe guşayê digirit durcê 'eqiq
Bi şeker xende zenî ger bigirît şekkerê teng (71/14)

Min bi îşraqê sualek ji lebê xunçe guşa kir
Go bi îlhamê dizanî di suala te cewab e (94/5)

Xunçeleba ji renggulê dêmê bi ser numa Melê
Şubhetê bulbulan seher lew me fixan û nale kir (41/8)

#### 4.3.2.3. Gulnar

Gulnar, gul û kulîlka hinarê ye. Dunya wek gul'izarê bête teheyyûlkirin, mehbûbên di nav wî baxçeyî de jî, ji aliyê bedewbûn û cazîbeyê ve, dibine gul û gulnar. 'Aşiqê heqîqî, ji xwe re yek yarê digire û ew yar jî weke gul û gulnarê bedew û bijare ye. Gulnar, wek kînayewî hem îşaretê bi çîçeka hinarê dike ku ehlê zana ferqa wê û ya xaran dizanin, hem jî îşaretê bi yara bedew dike.

Bulbulan sed gul di çav in çav li sed gul dî dikin
Min ji baxê gul'izaran yek gul û gulnarî bes (52/8)

Camê bi exyaran nedî xemrê bi xûnxwaran nedî
Werdan bi murdaran nedî wan rê di gulzaran nedî
Reyhan û gulnaran nedî bo wan dijeyn xaran nedî
Tu remz û esraran nedî koran tu enwaran nedî (125/11)

Cil û bergên yarê yên sor, an jî pora wê ya henekirî bi rengên xwe ve dişibine gulnarê. Perdeya gulnarê wek îstî'arewî ew tişt e ku bejn û rûyê yarê dixemilîne û dinixûmîne. Zulfa yarê ya ji rengê xwe ve weke gulnarê sor û henekirî, dema li ser dêmê wê bête berdan, dêm ji ber 'aşiqî ve tê veşartin.

Ew çîçekên şetrîsifet ef'a mislê qelbê me mêht
Selwa ji balayê we rêht ev perdeya gulnarê xet (59/3)

Di navbera gulnar û şerabê de, ji aliyê rengê sor ve têkiliyek hatiye çêkirin. Herdu jî, bi rengî ve dişibine hev. Agirê Mûsa yê ku li Çiyayê Tûrê dîtî, weke kulîlka hinarê ye ku di nav şeraba 'eşqê de tê dîtin.[750] Ew kesê 'aşiqê heqîqî be, agirê ku Mûsa Pêxember dîtî, dê ew jî di 'eşqa heqîqî de wî agirî/nûrê bibîne.

Min can yedê beyda ye ji 'Îsa çi xeber dim
Min ateşê Mûsa diye gulnarê şerabê (112/5)

#### 4.3.2.4. Gul (Werd, Sorgul, Gulazer)

Di edebiyata klasîk de çîçeka ku herî zêde behsa wê hatiye kirin gul e. Ew ji aliyê bedewî, reng û bêhna xweş ve ji teheyyûlên cuda re bûye mijar. Di tesewwûfê de gula nebişkivî (xunçegul) wehdetê û gula bijkivî jî kesretê sembolîze dike. Gul, wek mezmûnekê, yarê, rûyê yarê û dêmên yarê temsîl dike. Navê gulê bi gelemperî bi

[750] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 4, r. 152-154.

bulbulê re derbas dibe, lewra gul me’şûqê, bulbul jî ‘aşiqî sembolîze dike. Êstiriyên gulê jî, raqîbên ‘aşiqî ne.[751]

Gul heta sohr in bi tê ve bên tebessum pê ve pê ve
Bulbulê serxweş di nêv e nexme û nal û newa ye (95/25)

Ew nazika nisbet gulê camek ji Kewser da Melê
Mest im ji ber qalûbelê hetta bi roja mehşerê (113/32)

**4.3.2.4.1. Teşbîh, Mecaz û Tesewwûrên Derbarê Gulê**

**4.3.2.4.1.1. Gul û Yar**

Yar, ji her aliyî ve weke gula bedew e û qedeha ‘eşqê pêşkêşî ‘aşiqî dike. Dêm û rûyê wê yên sor jî, bi rengên xwe ve weke gulên sor in. Zulfên wê weke perdeya şevê dikevine ser dêmê, eger ew perde li ser wî dêmê gûlîn rabe û ‘aşiq wê bedewiyê bibîne dê ji hinek derdên wî re bibe şîfa.

Nêrgiza mest ji bala çemenan sunbul û gul tê
Qedehek taze bi destê xwe meşê da me lebaleb (14/4)

Arîd est în ya şu’a'ê şemsi ya bedrê munîr
Lale ya nesrîn û gul ya badeyê hemra sti în (83/4)

Nebat û şekkera lêvê nesîmê wê gul û sêvê
Hilînit perdeya şêvê şifaya hindekî derd e (92/13)

Belgên gulê, wek kînayewî ji bo rûyê dilberê yê bedew, ciwan û nazik, hatiye bikaranîn.

Îro li ser belgê gulê zulfan ji ‘enber dav veda
Her ro xeyalek tê Melê bayê şemalê kir belav (65/1)

Yar, bi xeml, reng, bedewbûn û nazikiyê ve weke guleke sor û zer e. Di nêv wan cilên sor û zer de, ew nimuneyê husna Heq e, ji qusûr û kêmasiyan dûr e û ji aliyê bedewbûnê ve bêmîsal e.

Bi xeml û reng û re'nayê bi mehbûbê bi zîbayê
Bi ew husna Xudê dayê ji gulrengan gula zerd e (92/12)

Daîm ji xeyala te me sed nale di dil da
Lewra ji mîsala te çu sorgul me nedîne (101/3)

[751] Canım, b.n.b., r. 528-529.

#### 4.3.2.4.1.2. Gul û Xar

Gul, sembola lutfê û xar (êstirî) jî ya qehr û azarê ye. Ew mekanê ku yar lê nebe, her tişt weke xaran tê dîtin û ev jî, ji bo ‘aşiqî cezadan û ‘ezabek e. Di hişmendiya ‘aşiqî de, raqîbên wî, ji bo wî weke xaran in; dema ‘aşiq bixwaze destên xwe ji bo wuslatê dirêjî yara xwe bike, ew êstiriyên derdora gulê (raqîb û axyar) eza û cefayê didene ‘aşiqî û dilê wî xwînî dikin.

Ji kovana letîfa gul‘izar têtin ji bulbul ah û zar
Şûna gulan restîne xar nêva cihê gulzarê çerx (35/4)

Dax û key min lê hezar in gul di dest şewkên bi xar in
Surperî dêw wê l'kenar in Ehrimen xatem reva ye (95/5)

Gul, bê êstiran nabe. Cewr û cefayên yarê jî weke êstiriyên sorgulan hatine teheyyûlkirin. Ew êstirîyên ji aliyê yarê ve muselletî serê ‘aşiqî bûne, weke sertîr û kulabeyan di ceger û dilê ‘aşiqî de hatine çikandin.

Sed nişab in min di dil îro ji xarên sorgulan
Yek bi yek peykan çevîbûn çûne cergê da kulab (16/2)

#### 4.3.2.4.1.3. Gul û Bulbul

Gul û bulbul, wek îstîa’rewî temsiliyeta ‘aşiq û me’şûqê dikin. Mestbûna bulbulan û nalîn û axîna ‘aşiqan ji ber firqeta gulê/mehbûbê ye. Dînbûn û şeydabûna bulbulan/‘aşiqan jî, ji ber ‘eşqa gulan/mehbûban e.

Sehergeh ‘endelîb mest in ji bêhna werd û bişkojan
Şubhê tûtak û goyînan dinalîn em di ferqê da (5/16)

Nêrgiza nazikqed û şehla ye mest
Dîn kirim ez bulbulan sewda gul e (99/10)

Têkiliya gul û bulbulê wek telmîhî îşaretê bi mertebeyên tecelliyê dike. ‘Aşiq û me’şûq, ji wehdeniyeta mutleq hatine afirandin. Cewhera hebûnê Xwûda ye û xwestiye xezîneya wî ya veşartî bête zanîn û ‘aşiq û me’şûq (gul û bulbul) ji zatê wî tecellî bûne. Ji ber vê yekê gul, sembola Heqiyê dike û afirandina ‘aşiqî/bulbulê jî îşaretê bi ronahiya/danezanîna Heqiyê dike. Mela ‘Ebdurrehîmê Westanî dibêje; gul, mehbûba xweyî husn û cemal e ku wek kînayewî temsiliyeta zatê Heq dike; bulbul jî

‘aşiq e û wek kînayewî, temsîliyeta Pêxemberê me dike ku ew bûye wasite û qasid ku wehdeniyeta Xwûdê li cîhanê bête zanîn.[752]

Ger çi bulbul cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq ji 'işqa bulbul e (99/1)

#### 4.3.2.4.1.4. Gul û Aşiq

Hêja û bedewiya gulê di nav çîçekan de çi be, qiymet û hêjaya ‘aşiqî jî wek bendeyekî ji memdûhî/mehbûbê re weke wê ye. Welatê Botan di dunyayê de weke Beheşta Îremê ye û ‘aşiq jî, di nav wê beheştê de xwe weke gulekî bêhemta û bextiyar dihesibîne.

'Aşiqê nazik û mehbûban im
Tu mebîn bêser û bêsaman im
Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im (123/2)

Gulezer, îşaretê bi derd û kulên ‘eşqê dike. Ji ber derdê ‘eşqê û firaqê rûyê ‘aşiqî zer bûye. ‘Aşiq dixwaze weke gulezerê qurbanî mehbûba xwe bibe, an jî mehbûb, wî jî weke gulîzerên mayî, vexwîne nav baxçeyê xwe.

Wek gula zer bû serwa te mirim
Me bi qurban xwe wek gula zer ke (98/10)

Wek gulek zer di buxçeya te me ez
Tu me têkil xwe wek gula zer ke (98/11)

#### 4.3.2.5. Filfil (Îsota Reş)

Filfil, toveke reş û tûj e, ji aliyê reng û şeklê xwe ve wek îstî’arewî, temsiliyeta xal û nîşanên yarê dike.[753] Di edebiyata klasîk de xalên li ser rû û gerdena yarê, bi reşahî û giroveriyê ve bi teşbîha filfilê hatine bikaranîn.[754] Li ser biskên yarê ava gulê hatiye reşandin û dema dikeve ser rûyê wê, ew bêhn dikeve ser xal û nîşanên wê jî. Ketina zulfan li ser rûyî wek husnê te’lîlî, bi mebesta bêhnkirina xalan ve hatiye girêdan. Xalên yarê ji bêhnê ve weke miskê, ji şeklê ve weke filfilê ne.

Xalên mudewwer filfilîn mawer ji biskan lê werîn
Zulfên perîşan têne mest bihna biha wan e xerez (58/8)

'Eqreb nehin ew sunbul in bu'enber û dava dilîn

---

[752] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 3, r. 363-365.
[753] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 4, r. 1727-1728.
[754] Canım, b.n.b., r. 526-527.

Nîşan ji misk û filfilîn wan sineyê min kir hedef (64/4)

Xalên yarê bi şekl û rengê filfilê ve weke daneyên davê hatine teheyyûlkirin. Dema ‘aşiq dixwaze dest bavêje wan daneyan ku bi wuslatê muşerref bibe, ‘aşiq, ji aliyê ta û çengelên serê zulfê ve tê girtin û dikeve tor û benda mehbûbê.

Dîsa ji dest wan sorgulan per can ji xal û filfilan
Perde ji tayê sunbulan bend bû ji dava bendiyan (90/2)

**4.3.2.6. Lale**

Lale, nexş û xemla gulşen/gulzar û çîmen/mêrgan e û bi reng û şeklê xwe ve bi gelek teheyyûlan re bûye mijar. Lale bi şeklê xwe ve dişibe qedehê û bi rengê xwe yê sor ve jî bi şerab, xwîn, birîn û dêmê re hatiye wekandin.[755] Gulşen, wek îstî’arewî temsiliyeta dêmê yarê dike û bi gelek rengan unsûrên spehîtahiyê li ser wê dêmê vebûne. Lale jî wek unsûreke bedewbûnê, soratiya rûyê yarê ye. Yar, bi bedewiya xwe ve, laleya Baxê Îremê ye.

Bi werdan zeyyinîn gulşen çemen da lale bişkiftin
Binefş û çîçekan vêk ra şefeq da yek di rewdê da (5/15)

Arîd est în ya şu’a'ê şemsi ya bedrê munîr
Lale ya nesrîn û gul ya badeyê hemra sti în (83/4)

Guldesteyên nûrînqedem destan ji enguştan qelem
Ew laleyê Baxê Îrem mawer li zulfan jale da (9/25)

Di nav laleyê de soratiyeke/lekeyeke tarî (sortarî) heye û dax, birîn û sohtina ‘aşiqî temsîl dike. Dilê ‘aşiqî, di muhebbetê de weke rengê bulbulan e û birînên wî, ji ber firqetê weke rengê laleyê daxkirî ne. Di navbera dilê ‘aşiqî û laleyê de têkiliyek heye. Birînên herduyan jî, di hindurê wan de ye. Dilê herduyan jî xwînî ye û birîndar in.

Dûr kirîn ji sunbulan çîçek û bişko û gulan
Dil me ji rengê bulbulan şubhet daxê lale kir (41/5)

'Aşiq ji wê dê sade bit xaka rêya yarê xwe bit
Sed dax di dil wek lale bit xûnê bixut rengxunçe bit (125/9)

Lale ji bo beyankirina ‘eşkerebûna ‘eşqê bûye mijar. Bi goreyî sunnetullahê her tişt di rêya xwe de diherike. Çawa meyla ‘aşiqî li ser me’şûqê heye, her wisa dema

---

[755] Canım, h.b., r. 532-535.

bihar tê, ew laleyên ji gulan narîntir û tazetir, di bin axê de şîn dibin û serê xwe radikin. Lale, bi vê serîrakirinê, dixwazin hatina biharê pîroz bikin û muhebbeta xwe ji biharê re nîşan bidin.

Ew laleyên ji gul tazeter fesla biharê bête ser
Cih cih bi hev ra têne der xweş xweş di 'erdê xare da (9/37)

### 4.3.2.7. Binefş

Binefş, mizgîniya biharê ye, bi rengê xwe yê mor û bi bêhna xwe ya xweş ve li çiyayan, li deştan şîn dibe. Di edebiyata klasîk de, ji aliyê bêhn, reng û stûyê xwar ve bûye mijar. Xal û nîşanên yarê bi binefşê re têne wekandin. Bêhn û şeklê binefşê dişibe miskê û ew gelemperî, wek xemleke tebî'etê, bi gul, lale, nêrgiz, sunbul û reyhanê re tê bikaranîn.[756]

Di baxê min medam dil tê cinesrî'w sosin û gul tê
Binefş û terh û sunbul tê çevîn ser şubhê rêhanê (111/22)

Rû û dêmê yarê weke rojê rohnîdar e, dema zulfa yarê ya weke şeva reş, ji aliyê wê rojê ve hate nixûmandin, li ser gulşena rûyê yarê weke çîçekên din binefş jî, şefeq tavêje, yanî ji wê re jî, roj dest pê dike û serê xwe ji xewa şevê radike.

Bi werdan zeyyinîn gulşen çemen da lale bişkiftin
Binefş û çîçekan vêk ra şefeq da yek di rewdê da (5/15)

Binefş, ji ber reng (sortarî û reştarî) û bêhna xwe ve wek îstî'arewî temsîliyeta zulfa yarê dike. Zulfa dilberê, bi şeklê xwe yê kurs û bi rengê xwe ve weke baxê binefşan hatiye teheyyûlkirin. Dilê 'aşiqî her daîm di nav gul û çîçekan de ye û ew dil ji aliyê zulfa yarê ya weke binefş, sunbul û reyhanê ve hatiye dorpêçkirin. Ew zulfa ku weke rengê nesrîn û binefşan hatî xemilandin, bi şûşeyên ku ji diranên fîlan hatine çêkirin -ku ava gulê di wan de heye- tê 'enberkirin.

Ew sunbulên bu'enberî reyhan binefş û 'er'erî
Lew tên bi dêmê da bi lez wan seyr li nîşan e xerez (58/7)

Baxê binefş û sorgulan sosin li dora sunbulan
Awaz û dengê bulbulan dagirtibû her çar derav (65/6)

'Er'eran ta di şepal in wereqan cezbe ye vê ra
Nêrgizan ser di giran in li binefşan xem û tab e (94/13)

Nesrîn û binefşe tewwizandin

[756] Canım, b.n.b., r. 519-520.

Mawer direşande şûşeyê 'ac (29/6)

#### 4.3.2.8. Nêrgiz

Nêrgiz, peyveke latînî ye û ji “narcîssus”ê tê. Di ‘erebî de jê re “axber, zerrînqedeh” tê gotin. Çîçekeke rengspî û rengzer e. Belgên wê spî û nava wê jî zer e û ji ber vî rengî, dişibe çavan. Di edebiyata klasîk de, çavên mexmûr, mestane û şehla, bi teşbîha nêrgizê têne wesifandin.[757]

Nêrgiz, di dîwanê de, ji aliyê bedewî û nazikiyê ve bûye mijar. Yar, weke nêrgiza re’na nazik û nazenîn e. Yar di nav cil û bergên xwe yên rengîn de weke nêrgizan nazik û nazende xwûya dike. Ferqa navbera xweşî û nexweşiyê bi nimûneyên nêrgiz û kerbeşê hatiye beyankirin.

Ya Rebb în guldesteyî ya nergisê re'na sti în
Serwê gulşen ya elîf ya qameta yekta sti în (83/1)

Şahidên gulreng saqî belkî nesrîn in beşer
Ê di libsê erxewanî nêrgisên ‘er‘er xiram (76/4)

Nêrgiza nazik û ter neyşekera mest û xumar
Dêmdur û le'lîleb û muhteşem û mu'teberê (126/2)

Bejna yarê, weke nêrgizeke yekta û nazik e û ji bejna wê re wekhevî nîne. Yar, weke tayê nêrgizê nazik û zirav e. Di seherê de bi nazikî û kubarî li ber çavên dildarên xwe dimeşe. Ew ji her aliyî ve bêhemta ye, ji ber vê yekê ‘aşiq dixwaze ew ji destê xwar û bedxwahan bête parastin.

Nisbet perîya zîba ye ew wek nêrgiza yekta ye ew
Ya men reyî xillî fehel yuşbî bi şeyin qameta (7/5)

Îlahî nêrgiza me’y mest û nazik
Ji destê xwar û bedxwahan biparîz (46/8)

Nêrgiza mest û xeraman di sehergeh ku meşî
Bişkifti sifet-xunçe ji çara ereşî (129/1)

Kulîlka nêrgizê, bi goreyî tayê baskê xwe ve mezin û giran e. Ji ber vê yekê kulîlka nêrgizê serxwahr e. Serxwahrbûna wê wek husnê te’lîlî, bi mest û cezbebûnê ve hatiye girêdan. Bejna yarê, weke tayê nêrgizê zirav û serê wê jî weke kulîlka nêrgizê, nazik û giran e.

[757] Canım, b.n.b., r. 536-537.

'Er'eran ta di şepal in wereqan cezbe ye vê ra
Nêrgizan ser di giran in li binefşan xem û tab e (94/13)

Li ser nêrgiza şehla (mebest jê çavên reşikhêşîn in[758]) û mestane, efsane têne gotin. Nêrgiz, bi bedewî û qeşengiya xwe ve xortekî kubar û mexrûr bûye û rû nedaye qîzên ciwan. Qîzan, li bal Xwûda giliya wî kirine û Xwûda ew ceza kiriye. Li ber qeraxê avekê ‘eksa xwe di avê de dîtiye û bûye heyranê xwe û xwe şaş kiriye û ketiye avê û di avê de xeniqiye. Bedena wî wek çîçeka nêrgizê di dinyayê de şîn bûye. Ji wê rojê ve, bi heyranî û mestane, li bedewan dinêre.[759] Çavên yarê yên şehla mêrkûj in û ‘aşiq jî bûye gorî û qurbanê wan çavên şehla. Şehlabûna çavên dilberan, wek husnê tehlîlî, bi rewşa nêrgizan ve hatiye girêdan.

Dilê xemdîdeyê ma şa nekirî
Kuştiyê xencerê birra nekirî
Guhriyê nergisê şehla nekirî
Li me bê perde tecella nekirî (123/4)

Wan dest û zend û sa'idan mey dane şeyx û zahidan
Mestî bi çeşmê şahidan ew nêrgiza sîrabi da (2/6)

Ji re‘na nêrgizên te’y mest û xwûnrîz
Zeman bû ‘ehdê cengengîzê Cengîz (46/1)

Nêrgiza ‘êlî (nêrgiza bejinbilind), wek îstî’arewî, zulfa yarê ya dirêj e. Ew di sehergahan de, li ber bayê nesîmê diheje û xemlekê dide gulistanê.

Bi xalên werd û nesrînan ji qudret xet kişandî lê
Bi terha nêrgiza ‘êlî sehergahan nesîm lê da (5/36)

Nêrgiza nazikqed û şehla ye mest
Dîn kirim ez bulbulan sewda gul e (99/10)

### 4.3.2.9. Nesteren (Nester/Nesrîn)

Nesteren, guleke bi dara êstirî ye û gulên wê sor û spî ne û bêhna wê xweş e.[760] Nesrîn, ji ber rengê spî û bêhna xwe ya xweşik ve, wek îstî’arewî ji bo yarê û rûyê yarê hatiye bikaranîn. Dinya bax û çîmen e û dilberên tê de jî weke gul û çîçekan in û nesrîn jî, yek ji wan çîçekan e. Nesrîn, di dîwanê de wek kînayewî hem kulîlka baxan e hem

[758] Mela Ehmedê Zivingî, b.n.b., c.2, r. 417.
[759] Canım, b.n.b., r. 536-537.
[760] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 2, r. 855.

jî dilber e. Wezîfeyeke nesrînê heye ku bêhna xwe ya weke misk û gulavê, weke xunava li ser giyayan, berdide ser pora yarê.

Çûme temaşa çemen taze gul û nesteren
Xunçe û bişko biken çîçek nesrînsemen (50/1)

Çîçek û gul sehergehan nesterînên di xergehan
Têkî ji misk û mawerê mar e xunav jale kir (41/3)

Qemer hat rastê perwînan ji bo xemla te şem’ înan
Me nêrgiz dîn di nesrînan di nêv baxê gulistanê (111/21)

Nexşên li ser rû û li ser enîya yarê ve hatine çêkirin an jî xişrê li ser eniya yarê daleqayî, weke gul û çîçekan hatine teheyyûlkirin. Nesrîn jî yek ji wan nexş û xişran e. Ew nexş û xeml, weke zunnarê, bi çep û rast, di nav hev re çûne û hatine.

Gul çîçek û neqşên xerîb nesrîn û reyhanê hebîb
Lê rast û çep bûyîn tebîb cedwelkeşîn zunnarê xet (59/8)

Di navbera rengê nesrînê û rengê rûyê sakî de têkiliyek heye û herdu jî spî ne. Dêmên sakiyan weke gula nesrînê spî û zelal in. Sakî, bi rûyên xwe yên weke nesrînê spî, bi cil û bergên weke kulîlkên rengîn, bi nazikî û nazdariyê ve têne xwûyakirin.

Şahidên gulreng saqî belkî nesrîn in beşer
Ê di libsê erxewanî nêrgisên ‘er‘er xiram (76/4)

Daneyên ‘enber li nesrînan reşandî xali xam
Sosinên nazik li ser xalan çevandin dami dam (77/1)

Xetên li ser rûyê yarê yên weke nesrînê spî hatî kêşandin, ji destê qudretê derketine. Muzerikên li ser dêmê yarê, bi reng û bêhnên xwe ve, weke nesrînan hatine teheyyûlkirin.

Şeraba nabê rummanî şefeq da 'iqdê perwînê
Muselsel maye reyhanî xetê nazik li nesrînê
Xerez şeklê te bû Manî ji sûret xaniya Çînê (131/7)

Nesrîn, wek kulîlkeke xemildar, ji bo pesnê memdûhî bûye mijar. Şa’ir dixwaze û temennî dike ku cihê memdûhî pêyên xwe li ser danî, şînahî jê derkeve û di nav wê şînahiyê de nesrîn jî hebin ku ew der weke baxçeyekî, ji memdûhî re rengîn bibe.

Şubhetê Rûhi’l-qudus 'erdê tu pê lê dayinî
Sebze û reyhan û nesrîn û gul û menqûri bî (117/15)

#### 4.3.2.10. Reyhan

Reyhan, ew rêwek e ku kulîlkên wê spî û pembehî ne û bênxweş in. Rengê belçimên wê sortarî ye. Di hekîmtiya berê de dihate bawerkirin ku bi bêhna vê kulîlkê xewa însên dihat û qelb pê biquwwet dibû. Di edebiyata klasîk de ji aliyê bêhna xwe ya xweş û tesîrdar û bi şeklê xwe ve bûye mijar. Reyhan wek îstî’arewî (muşebbehunbîh) ji bo zulfa yarê, muzerkên wê, kakûl û perçemên wê hatiye bikaranîn.[761]

Reyhan, ji bo wekandina yarê bûye mijar. Mebest ji reyhanê, yara ciwan û nazik e. Yar bi nezaket û meşkubariyê ve dişibe reyhanê. Dema reyhan li ber bê diheje, hem bêhna xweş li derdorê belav dibe hem jî bi hejîna mestane ve dîmeneke xweşik çêdibe. Ev dîmenên xweşik yek di reyhanê de yek jî di yarê de heye. Şa’ir dixwaze ku memdûh pêyên xwe dayne ku derê, weke xeml û nexşekî tebî’etê, li wê derê kûlîlk vebin û yek ji wan kulîlkan jî reyhan be.

Bi qedê xwe nêrgiza Buhtan î
Nazikek şeng şubê reyhan î
Çi xetşikeste şîrîn reyhan î
Ku tu bi nesix kirî dîwanî (123/6)

Meşî mestane reyhanî dilê min dî di amancê
Reşandî şîbeyek tîran li qewsê her du mal ebrû457 (106/4)

Şubhetê Rûhi’l-qudus 'erdê tu pê lê dayinî
Sebze û reyhan û nesrîn û gul û menqûri bî (117/15)

Reyhan, di dîwanê de, bi gelemperî ji bo por, bisk û keziyên yarê, wek îstî’arewî hatiye bikaranîn. Dema rûyê yarê weke gulistanekê tê teheyyûlkirin, zulfa wê ya weke reyhanê bedew û bêhnxweş, li derdora gul û çîçekên dinê derdikevine meydanê. Dema ew yara weke sorgulê di nav gulzarê de bimeşe, pora wê ya weke lale û reyhanan bi hejîna xwe ve herwekî reqs û semayê dikin. Zulfa reyhanî ya mest û sergiran, li ser gula cûrî de diweşin û xwe li xal û nîşanên yarê difetilînin. “*Reyhan wek îstî’arewî ji bo zulfên reş û bênxweş, werdên cûrî jî, ji bo rûyê sorşekirî hatiye bikaranîn.”*[762]

Sorgulek min dî di gulzarê bi meş
Lale û reyhan li ser têne sema (10/5)

---

[761] Canım, b.n.b., r. 525.
[762] Tehsîn Îbrahîm Doskî, b.n.b., c. 2, r. 135-136.

Wer ji 'eksa xemrîyan qews û qezeh dit asuman
Dê gul û reyhan bibarin têk û tê gulzarî bit (19/3)

Durdaneya gerdenbilur reyhan li ser werdên di cur
Hey hey bi mestî têne dur xala li nik ferqê bi tac (31/7)

Ew sunbulên bu'enberî reyhan binefş û 'er'erî
Lew tên bi dêmê da bi lez wan seyr li nîşan e xerez (58/7)

Zulfa yarê li ser rûyê wê bi rengê xwe ve weke perdeyeke ji reyhanan e. Dema bayê sebayê ji ser wî rûyî wan reyhanan dide paş, di burcê cebheta yarê de ji çavên wê tîr bi ser dilê ‘aşiqî ve rast û çep dibarin.

Hîcab û perde avêtin seba reyhan hilavêtin
Ji burcan tîri pur rêhtin gihan min rast û çep cerde (92/4)

Şekker di nêv lêvan e wê reyhan li dor sêvan e wê
Meş'el di nêv şêvan e wê tîsî ji rengê fenerê (113/7)

Reyhan caran keziyên yarê ne û dema bejna yarê weke dareke serwiyê rast û dirêj hate teheyyûlkirin, ew keziyên wê yên bi ser wê bejnê ve hatî xwarê, weke marên li derdora serwiyê xwe alandî tê dîtin.

Fetlên siyah marên şevîn reyhan bi dor serwan çevîn
Axir bi selwê da revîn xef bû di tayê çenberê (113/29)

**4.3.2.11. Sunbul/Sinbil**

Sunbul, kulîlkeke binefşî û spî ye. Bêhneke xweş jê tê û wek kînayewî ji bo biskên dilberê tê bikaranîn.[763] Sunbul, hem ji aliyê rengê xwe hem jî, ji aliyê bêhn û nazikiya xwe ve bi zulfa dilberê re têkildar e. Bayê sebayê, di seherê de li zulfa yarê dide û dihejîne û tîne semayê. Bi wê hejînê re bêhna sunbulê jê belav dibe. Di gulzara rûyê yarê de gelek kûlîlk hene û yek jî sunbula zulfa yarê ye. Ew tayên biskên dilberê yên weke sunbulan nazik, bi rengê xwe ve binefşî ne û dîtina wan îşareta wuslatê ye û ji bo ‘aşiqî xemrevîn in.

Lew seher cewlan didet bayê sebayê rast û çep
Sosin û sunbul bi mestî tên semayê rast û çep (17/1)

Reyhan û sunbul tê hene sed çîçek û gul tê hene
Zerbavê bulbul tê hene ew bexçeya gulzarê xet (59/7)

---

[763] Muhemmed Emîn Doskî, b.n.b., c. 1, r. 104-105.

Tayê di nazik sunbul in serdarê xalan fulful in
Qumrî di burcan xulxul in zaxan li baxê girti rav (65/4)

Reşkagulê sunbul çevîn minnet me dîsa xem revîn
Nû bû li dil hubb û evîn feryad ji destê firqetê (115/16)

Şebkagul e xalfulful e çînsunbul e dava dil e
Min xefletê dî qibletê wek mah nîşan min hebe (100/2)

#### 4.3.2.12. Sosin

Sosin, guleke nazik û bêhnxweş e; bi rengê xwe ve çend cureyên/nifşên wê hene. Ev kulîlk, bi navên weke sosina çapanî, sosina xenatî, sosina çînî û sosina çolî tê binavkirin. Sosin, ji aliyê reng û bêhnê ve, wek îstî'arewî ji bo bisk û pirça dilberê hatiye bikaranîn.[764] Xusûsiyetên sunbul û sosinê dişibine hev û bi gelemperî digel hev hatine zikirkirin û herdu jî gelemperî ji bo zulfa yarê hatine bikaranîn.

Herkes seherê talibê tiştek bi çemen hat
Hin sosin û hin sunbul û hin zulfê du ta girt (20/8)

Zulf û sunbul muşkîbuy û bisk û sosin sirşirîn
Serwîbala sebzepoş û gulnîşan û xunçebaz (45/13)

Zaxan li bax rav girtinin me'şûq ji rengê sosin in
Dunya li min bû dujmin in seb xatirê gerden zirav (65/5)

Sunbulên ter li gulan bal bi mestî diderin
Sosinên taze û nesrînwereqan bûne helek (70/3)

Sosinên nazik û terwende divên
Kewkebên şewq û şefeqzuhre divên (123/1)

#### 4.3.2.13. Yasemîn/Semen

Yasemîn, guleke bênxweş e û her cureyeke wê bi rengekî ye ku zer, şîn û spî ne.[765] Ji yasemînê re "gula sêberg, gula Wanê, gula Misrê, gula pêxember" jî tê gotin. Di edebiyata klasîk de, ji aliyê rengê spî, belg û bêhna xwe ve bûye mijar.[766] Yasemîn wek îstîarewî temsiliyeta yarê, dêma yarê û pora wê dike ku yar weke kûlîlka yasemînê spî û nazik e.

Dilo wer seyrê balayan di gulzaran semensayan
Biha tehtezzu banatin lena min meysî qamat (23/6)

---

[764] Muhemmed Emîn Doskî, h.b., c. 1, r. 207-208.
[765] Muhemmed Emîn Doskî, h.b., c. 4, r. 1762.
[766] Canım, b.n.b., r. 547-548.

Me bi dil nêrgizên xasse divên
Semen û yasemînên taze divên (123/1)

‘Er’er û serwa ciwan yasemîn û erxewan
Rûh ew in û her rewan dê dil û can dîn bi wan (50/6)

Di navbera yasemîn û zulfa yarê de ji aliyê bêhna xweş ve têkiliyek hatiye çêkirin. Zulfa yarê “semenbû” ye, yanî bêhna wê weke bêhna yasemînê xweş û dilaram e.

Ji destê şekker'amîzan seraser xerqê mestî me
Semenbû û dilawîzan bi reyhanan ve bestî me
Ji tora fitne'engîzan du ejder mesti gestî me (131/5)

Semen, gula asmînê ya spî ye û wek îstî’arewî ji bo dêmê dilberê yê spî hatiye bikaranîn. Bisk, perçem û zulfên dilberê, li derdora dêmê yarê (semen) çerx vedane û dizivirin.

Sosin û sunbul û gul çerx e li dora semenê
Xemriya helqe û çîn dane ji miskê Xetenê (121/3)

**ENCAM**

Ev xebat li ser çavkaniyên hizrî yên dîwana Melayê Cizîrî rawestiye û huner, bîr, hest û xeyalên cîhana Melayê Cizîrî bi vî awayî derxistiye pêş. Di hebûnê de unsûra sereke însan e (însanê kamil) û her tişt ji bo wî hatiye xuliqandin û ew jî, ji bo ta'et û 'îbadetê hatiye afirandin. Însan, bi goreyî xuliqandina xwe, bi bîr û baweriyan re, bi însanan re, bi cîvakê re û bi siruştê re têkildar e. Ev xusûsiyetên hanê, cîhana şa'irî ya hizrî û hestewariyê pêk tînin û şekl û rengekî didene hest û ramanên wî. Şa'ir, di hişmendî û hestên xwe de wateyan li van xusûsiyetan bar dike û di dinyaya xwe de, careke din wan watedar dike. Îja di şexsiyeta Cizîrî de têkiliya civakê bi dîn û tesewwifê re, bi civak, însan û siruştê re derdikeve pêş çavan.

Çavkaniyên dîwanê yên ku bingeha xwe ji dîn û tesewwifê hildigirin, di dîwanê de qewareyeke berfireh ji xwe re veqetandiye. Telaqqî û tesewwirên Cizîrî yên dînî û tesewwifî di vê beşê de derdikevine pêş. Melayê Cizîrî, ji her tiştê wêdatir kesayetekî mutesewwif e û li ser ekola Muhyeddînê 'Erebî hest û ramanên xwe yên tesewwifî, di çarçoveya metneke edebî de pêşkêş kirine. Nav û sifetên Xwûda, kesayetên dînî yên pêşeng, mevhûmên derbarê axiretê, şexsiyetên tesewwifê, mefhûm û ehwalên tesewwifê û mutesewwifên pêşeng, wek mezmûn, têgeh û sembolan di vê beşê de hatine beyankirin û îzahkirin. Ev çavkaniyên hizrî jî nîşan didin ku Melayê Cizîrî hem şa'ir hem jî wek kesayetekî mutesewwif, di edebiyatê de pêşeng e û bi helbestên xwe yên watekûr, îşaretî mesele û têgehên tesewwifê kiriye. Bîr û baweriyên tesewwifê yên ku Muhyîddînê 'Erebî bingeha wan daniye (wehdetu'l-wucûd), mesele û mijarên tesewwifê yên ku di berhema *Gulşena Razê* û berhemên Mela Camî û Hafizê Şîrazî de hatine pêşkêşkirin, ji aliyê Cizîrî ve jî hatine beyankirin. Di van têgeh û mezmûnan de tê xwûyakirin ka asoya bîr û bawerî û hestewariya Cizîrî, çi qeder kûr û berfireh e.

Hunermendê heqîqî di navenda civakê de cih digire û di nav civakê de rolekî mezin dileyîze. Li Kurdistanê îro jî li ber çavan e ku mela û feqiyên medreseyê û ehlê terîqet û tesewwifê bi civakê re têkildar in û di navenda şîn û şahiyên civakê de her daîm cihê xwe digirin. Çavkaniyên ku bingeha xwe ji civakê hilgirtî vê yekê piştrast dikin. Hukumdar û rêvebirên dewletan yên dîrokî û namdar; şa'ir, 'alim û sen'etkarên mezin; kesayetên efsanewî û sembolîk, navên 'eşîr, qewm û welatan, pîşe û meşxûliyetên civakê, xeml û nexşên jiyana rojane û yên 'eyd û şahiyan, tiştên vexwarinê û maddeyên kêfdanê, leyîstik û pêlîstokên civakê, amûrên şer û nêçîrvaniyê

û hwd. di paşxaneya helbestên Cizîrî de cihekî berfireh digirin û wek, îmaj, sembol û mezmûnan şi'ra Cizîrî bedî'tir û dewlemendtir dikin.

Însan, cewherê kaînatê ye. Di navenda xuliqandinê de însên cih girtiye. Însan, di 'alemê de wek kesayetekî 'aşiq hatiye pêşkêşkirin. Wî, hêj di qalûbelayê de cur'eya 'eşqê vexwariyê û heta hetayê jî dê wisa mexmûr jî bimîne. Însan aşiq e û divê her daîm li ser rêça mehbûbê xwe bimeşe û daxwazên wî pêk bîne. Masîwa, di vê têkiliyê de watedar dibe, ger ne wisa be, însan dikeve xefletê û ev jî dibe sebeba xusranê. Di heqîqeta hebûnê de sê cure heyîn mewcûd in. Yek mehbûb, yek 'aşiq û yek jî reqîb e. Di tesewwifê de mehbûb zatê Zulcelal e û însan jî 'aşiq e. Her tiştên ku dikevine navbera van herduyan de jî reqîb in. Hemû unsûrên spehîtahiyê di yarê de kom bûne û bi gelemperî jî di rûyê wê de bi cih bûne û ev jî tecelliya nav û sifetên Xwûda ne. Zulf, çav, birh, mijang, bejna serwî, xemze, nîşan, enî û hwd. bi têkiliya 'aşiq û me'şûqê di nav helbestên Cizîrî de wek îmaj, sembol û mezmûnan xwe dane der.

Siruşt û unsûrên derbarê wê da, bi gelemperî di têkiliya 'aşiq û me'şûqê de hatine bikaranîn. Termînolojiya kozmolojiyê, heywan û nebatên ku siruştê dixemilînin, dîsa wek unsûrên di bin emrê însên de, di dîwanê de cih girtine. Siruşt bi unsûrên xwe ve ji bo munasebeta 'aşiq, meşûq û reqîbî wek amûrên têkiliyê û nexş û tezyînê hatine bikaranîn. Siruşt, bi unsûrên xwe ve bi xuliqandin û unsûrên yarê yên spehîtahiyê re têkildar in. 'Eksa stêr, gerestêrkan; nexş û rengê gul û çîçekan bi unsûrên li ser rûyê yarê re munasebetdar in. 'Eşq û evîn nêçîrek e û ajalên ku di jiyana însên de cih girtî û balkêş, bi munasebeta vê nêçîrê bûne mijar. Ji bo îzahkirina sen'eta Îlahî, ji bo hubb û evînê, unsûrên tebî'etê wek amûran hatine bikaranîn.

Bi goreyî van çavkaniyên hizrî (îmaj, mezmûn, sembol û têgeh) tê dîtin ku Cizîrî xweyî uslûbeke dewlemend û rengîn e. Xeyalên dinyaya wî, sînorên hest û ramangeriya wî kûr û berfireh e. Cizîrî, paşxaneya hest û hişmendiya xwe di sînorên sen'et û edebiyatê de rijandiye nav helbestên xwe û ew îmaj, sembol û têgehên di nav rêzên wî de darijtî, hem dewlemendiya dîwana Cizîrî hem jî ya edebiyata kurdî nîşan dide. Herçendê mezmûn wek îmajên hevpar di edebiyatê de cih girtibin jî, lêbelê di hest û hişmendiya şa'irî de bi teşbîh û mecazan, bi rengekî cuda ve derdikevin pêş. Zanîn û têgihiştina çavkaniyên dîwana Cizîrî, têgehiştina 'ilmê edebiyata klasîk e û beyankirina paşxane û çavkaniyên edebiyata klasîk e.

Dîwana Melayê Cizîrî, hem bi şekil hem jî bi naveroka xwe ve ku bi ji sedan îmaj, sembol, mezmûn û têgehan pêk tê, çavkaniyeke sereke ya edebiyata kurdî ya klasîk e û dikare ji edebiyata nûjen re jî, ji aliyê îlham û sûdwergirtinê ve bibe çavkaniyeke sereke.

## JÊDER


ADAK, Abdurrahman, Teşeyên Nezmê, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2019.

ALKIŞ, Abdurrahim, Melayê Cizîrî'nin Dîvanında Tasavvûfî Mazmunlar, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2014.

AFÎFÎ, Ebu'l-ala, Tasavvuf, İslam'da Manevi Devrim, (Wer. H. İbrahim Kaçar-Murat Sülün), Risale Yayınları, İstanbul, 2004.

ATTAR, Feridüddîn, Evliya Tezkireleri, (Wer. Süleyman Uludağ), Kabalcı Yayınları, İstanbul 2007.

____________________ ,Mantıku't-Tayr, (Wer, Murat Toprak), Kırkambar Kitaplığı Yayınları, İstanbul 2001

BOTÎ, Abdulhadî, Peyxamberê Ummetê Hz. Muhemmed, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 1998.

BOZARSLAN, Mehmet Emin, Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler, Deng Yayınları, İstanbul 2001.

BUHARÎ, Sahîh-i Buharî, (Wer. Abdullah Feyzi Kocaer), Hüner Yayınları, İstanbul 2004.

BURCKHARDT, Titus, Muhyiddin İbn Arabî'nin Mistik Astrolojisi,(Wer. Mehmed Temelli), Verka Yayınları, Ankara 2018.

CANIM, Rıdvan, Divan Edebiyatının Kaynakları, Akıl Fikir Yayınları, İstanbul 2018.

CEYLAN, Ömür, Kuşlar Divanı/Osmanlı Şiir Kuşları, Kapı Yayınları, İstanbul 2007.

CEBECİOĞLU, Ethem, Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü, Otto Yayınları, Ankara 2020.

CÎHANÎ, Perwîz, Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2013.

CIZÎRÎ, Mela Ebdusselamê, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, (Wer. Jan Dost), Weşanên Dara, Diyarbakır 2018.

CHİTTİCK, William, Îbn Arabî Giriş Kitabı, (Wer. Kadir Filiz), Nefes Yayınları, İstanbul 2018.

____________________ ,Tasavvuf, (Wer. Turan Koç), İz Yayıncılık, İstanbul 2019.

____________________, Hayal Alemleri, İbn Arabî ve Dinlerin Çeşililiği Meselesi, (Wer. Mehmet Demirkaya), Kaknüs Yayınları, İstanbul 2016.

____________________, Varolmanın Boyutları, (Wer. Turan Ko)ç, İnsan Yayınları, İstanbul 2020.

____________________, Aşığın Aynası, (Wer. Ömer Saruhanlıoğlu), Okuyan Us Yayınları, İstanbul 2018.

____________________, MURATA, Sachiko, İslam'ın Vizyonu, (Wer. Turan Koç), İnsan Yayınları, İstanbul 2020.

CÎLÎ, Abdulkerim, Hakikat-i Muhammediyye, (Wer. Muhammed Bedirhan), Nefes Yayınları, İstanbul 2019.

CÜRCANÎ, Seyyîd Şerîf, Ta'rîfat/Tasavvuf Istılahları, (Wer. Abdülaziz Mecdî Tolun), Litera Yayıncılık, İstanbul 2020.

DEVELİOĞLU, Ferit, Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Büyük Lügat, Aydın Kitabevi, Ankara2003.

DOSKÎ, Tehsîn Îbrahîm, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Weşanên Komelgeha Ferhengî ya Ehmedê Xanî, Soran, 2018.

DOĞAN, D. Mehmet, Büyük Türkçe Sözlük, Yeni Şafak Kültür Yayınları (İz Yayınları), İstanbul 1996.

EL-ÎSFAHANÎ, Rağıb, Müfredat/Kur'an Kavramları Sözlüğü, (Wer. Abdulbaki Güneş, Mehmet Yolcu), Çıra Yayınları, İstanbul 2012.

EREN, Abdullah, Şeyhülislam Yahya Divanı'nın Tahlili, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Erzurum 2004.

ERGİNLİ, Zafer (Ed.), Metinlerle Tasavvuf Terimleri Sözlüğü, Kalem Yayınevi, İstanbul 2006.

EL-CABİRÎ, Muhammed Abid, Kur'an'a Giriş, Mana Yayınları, İstanbul 2010.

EL-BÛTÎ, Ramazan, Fıkhu's-sire, (Wer. Atik Aydın), Bilge Adam Yayınları, Van 2006.

ERZURUMLU ÎBRAHÎM HAKKI, Marifetname, Müjde Yayınları, İstanbul 1986.

FEQIYÊ TEYRAN, Ey Avê Av û Şêxê Sen'anî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 1999.

FINDIKÎ, Seyid Eliyê, Dîwan, Weşanê Nûbiharê, , İstanbul 1999.

FARQÎNÎ, Zana, Ferhenga Kurdî-Tirkî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2004.

GÖLPINARLI, Abdulbaki, Mesnevi Tercemesi ve Şerhi, İnkılap Kitabevi, İstanbul 2020.

GUEST, John S., Yezidilerin Tarihi, (Wer. İbrahim Bingöl), Avesta Yayınları, İstanbul 2007.

GÜNYÜZ, Melike Erdem, Ahmedî Divanı'nın Tahlili, İstanbul Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Eski Türk Edebiyatı Anabilim Dalı, Basılmamış Doktora Tezi, İstanbul 2001.

HAFIZ-I ŞÎRAZÎ, Hafız Divanı, (Wer. Abdulbaki Gölpınarlı), Türkiye İş Bankası Yayınları, İstanbul 2017.

____________________, Hafız Divanı, (Wer. Mehmet Kanar), Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2011.

IŞIK, İbrahîm S., Kürtler, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2013.

ÎHVANI- SAFA RİSALELERİ, Ayrıntı Yayınları, (Wer. Ali Durusoy ûym), İstanbul 2017.

ÎBN ARABÎ, Aşk Risalesi, (Wer. Ekrem Demirli), Litera Yayıncılık, İstanbul 2018.

ÎBN ARABÎ, Harflerin İlmi, (Wer. Mahmut Kanık), Asa Kitabevi, Bursa 2000.

___________________, Fusûsu’l-Hikem, (Wer. û şerh: Ekrem Demirli), Kabalcı Yayınları, İstanbul, 2006.

___________________, Fütûhat-ı Mekkiyye, (Wer. Ekrem Demirli), Litera Yayıncılık, İstanbul, 2007.

ÎZADY, Mehrdad R., Kürtler, Doz Yayınları, İstanbul 2004.

ÎMAM BUXARÎ, Sehîha Buharî, (Wer., Mela Se’îd Girdarî), Beka Yayıncılık, İstanbul 2015.

ÎMAM NEWEWÎ, Riyadus-Salihîn/Baxê Qencan, (Werg. Mela Salihê Dihî), Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2017.

KADI EBÛ ŞUCA’, Ahmed bin Hüseyin Eş-Şafiî, Delilleriyle Büyük Şafiî Îlmîhalî, (Wer. Nizameddin Ersöz), Ravza Yayınları, İstanbul 2005.

KARATAŞ, Turan, Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü, Perşembe Kitapları, İstanbul 2001.

KARAGÖZ, İsmail, Esma-i Hüsna, DİBY, Ankara 2016.

KARAMAN Fikret ûym., Dînî Kavramlar Sözlüğü, DİBY, Ankara 2006.

KÂŞÂNÎ, Abdürrezzak, Tasavvuf Sözlüğü, İz Yayıncılık, İstanbul 2015.

KILINÇ, Abdulhakim, Fuzûlî’nin Türkçe Divanı, Edisyon Kritik ve Konularına Göre

Fuzûlî Divanı, İstanbul Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Eski Türk Edebiyatı Bilim Dalı, Yayınlanmamış Doktora Tezi, İstanbul 2017.

KILIÇ, Mahmud Erol, Şeyh-i Ekber, (İbn Arabî Düşüncesine Giriş), Sufî Kitap, İstanbul 2019.

KONEVÎ, Sadreddîn-î, Esma-i Hüsna Şerhi, (Wer. Ekrem Demirli), İz Yayıncılık, 4. Baskı, İstanbul, 2013.

KONUK, Ahmed Avni, , Fusûsû’l Hikem Tercüme ve Şerhi, Marmara Ünv. İlahiyat Fakültesî Vakfı Yayını, İstanbul 2005.

KORKMAZ, Esat, Zerdüştlük Terimleri Sözlüğü, Anahtar Kitaplar Yayınevi, İstanbul 2004.

KURNAZ, Cemal, Hayalî Bey Divanı'nın Tahlili, Kurgan-Edebiyat Yayınları, Ankara 2012.

LEVEND, Agah Sırrı, Divan Edebiyatı, Kelimeler ve Remizler, Mazmunlar ve Mefhumlar, Dergah Yayınları, İstanbul 2018.

MASSİGNON, M. Louis, İslam'ın Mistik Şehidi Hallâc-ı Mansûr'un Çilesi, (Wer. İsmet Birkan), Ardıç Yayınları, Ankara 2006.

MİHEMED EMÎN ZEKÎ BEG, Dîroka Kurd û Kurdistanê, (Werg. Ziya Avcı), Weşanên Avestayê, Çapa Duyem, İstanbul 2012.

MEYDAN LAOURAUSSE, Sabah Gazetesi Yayınları.

MELAYÊ CİZÎRÎ, Dîwan, (Amd. Emîn Narozî), Avesta, Stembol 2012.

____________________, Dîwan, (Amd. Tahsîn Îbrahîm Doskî), Nûbihar Yayınları, İstanbul 2019.

MOLLA CAMÎ, Levamî/Aşk ve Şaraba Dair, wer. Tahiru'l Mevlevî, Litera Yayıncılık, İstanbul 2016.

____________________, Şerh-i Rubaiyyat, wer. Tahiru'l Mevlevî, Litera Yayıncılık, İstanbul 2021.

____________________, Levayih, (Wer. Şemseddîn Sivasî), Litera Yayıncılık, İstanbul 2021.

NASR, Seyyid Hüseyîn, İslam/İdealler ve Gerçekler, (Wer. Ahmet Özel), İz Yayıncılık, İstanbul 1996.

____________________, İslam Sanatı ve Maneviyatı, (Wer. Ahmet Demirhan), İnsan Yayınları, İstanbul 1992.

NİCHOLSON, Reynold A., İslam Sûfîleri, Kültür Bakanlığı Yayınları, (Wer. Mehmet Dağ ûym.), Ankara 1978.

____________________, Reynold A., İslam Sûfîleri, (Wer. Kemal Işık ûym.), Büyüyen Ay Yayınları, İstanbul 2014.

ÖÇAL, Şamil, İslam Düşüncesinde Hikmet, Kelam ve İrfan, Fecr Yayınları, İstanbul 2020.

PALA, İskender, Ansiklopedik Divan Şiir Sözlüğü, Kapı Yayınları, İstanbul 2005.

QUR'ANA PÎROZ, Kurdî-Tirkî, Meala wê ya Îcmalî, (Wer. Abdulkerim Bingöl-Muhammed H. Feyzi), Tenvir Neşriyat, İstanbul 2009.

RÎTTER, Helmut, Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi, Ayrıntı Yayınları, İstanbul 2011.

RÛDANÎ, Büyük Hadis Külliyatı/Cem'ul-fewaîd, İz Yayıncılık, İstanbul 2003.

SADÎNÎ, M. Xalid, Feqiyê Teyran (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî), Nûbihar Yayınları, İstanbul 2000.

SEFERCİOĞLU, Nejat, Nev'î Divanı'nın Tahlili, Akçağ Yayınları, Ankara 2001.

SUAD EL-HAKÎM, Îbnü'l Arabî Sözlüğü, (Wer. Ekrem Demirli), Alfa Yayınları, İstanbul, 2017.

ŞEBÛSTERÎ, Şêx Mehmûdê, Gulşena Raz, (Werg. M.Muhammed Garsî Farqînî), Nûbihar Yayınları, İstanbul 2005.

ŞEREFKENDÎ, Ebdurrehman (Hejar), Ferhenga Kurdî-Farisî, Weşanên Surûş, Tehran 1388/1967.

______________________, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Neşrê Panîz, Tehran 1393.

ŞERÎF, Mian Muhammed (Ed.), İslam Düşüncesi Tarihi, İnsan Yayınları, İstanbul 2014.

ŞERİFÎ, Muhemmed, Ferhengê Edebiyata Farisî, Întîşaratê Mu'în, Tehran 1387.

ŞÎRAZÎ, Şêx Se'diyê, Gulîstan, (wer. M. Înal-M. Yamalak), Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2013.

ŞOŞİKÎ, Mela Muhemmedê, Nûra Qelban, Weşanê Nûbiharê, Stenbol 2014.

TARLAN, Ali Nihat, Fuzûlî Divanı Şerhi, Akçağ Yayınları, Ankara 2011.

TENİK, Ali, Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2015.

___________, Tasavvufî Bilgi, Litera Yayınları, İstanbul 2017.

TEK, Ayhan, Melayê Cizîrî (Jiyan û Tesîra Edebî, Şerha Xezelên Bijartî), Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2019.

TERTİBÎ, Muhammed Fuad Abdulbaki, Müttefekun Aleyh Hadisler, (Wer. Abdullah Feyzi Kocaer), Hüner Yayınları, Konya 2005.

TOLASA, Harun, Ahmet Paşa'nın Şiir Dünyası, Atatürk Üniversitesi Yayınları, Ankara 1973.

TURAN, Abdulbaki, Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2010.

ÜSTÜNER, Kaplan, Tasavvuf ve Klasik Şiirimiz, Akçağ Yayınları, Ankara 2014.

ULUDAĞ, Süleyman, Tasavvuf Terimleri Sözlüğü, Kabalcı Yayınları, İstanbul 2016.

XANÎ, Ehmedê, Mem û Zîn, (Wer. Mehmet Emîn Bozarslan), Hasat Yayınları, İstanbul 1990.

_________________, 'Eqideya Îmanê, (Analiz ve Şerh: Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul 2008.

YEĞİN, Abdullah ûym., Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Büyük Lügat, Sebat Yayım Dağıtım, İstanbul 2006.

YESRÎBÎ, Seyyîd Yahya, İrfan Felsefesi, (Wer. Kenan Çamurcu), İnsan Yayınları, İstanbul 2010.

YILDIRIM, Nimet, Fars Mitoloji Sözlüğü, Kabalcı Yayınları, İstanbul 2008.

________________, İran Mitolojisi, Pinhan Yayınları, İstanbul 2012.

YÖYLER, Celalettin, Şîroveya Dîwana Melayê Cizîrî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2006.

ZİVİNGÎ Mela Ehmedê (2013). Gerdeniya Gewherî/Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, (Wer. Emîn Naruzî), Weşanên Avesta, İstanbul 2013.

**XALÊN/MADDEYÊN ANSÎKLOPEDÎK**


ALPER, Ömer Mahir, “Îbn Sînâ”, DİA, c. 20, İstanbul 1999, r. 319-322.

ALBAYRAK, Nurettin, “Cem”, DİA, c.7, İstanbul 1993, r. 279-280.

ARPAGUŞ, Safi, “Pîr”, DİA, c. 34, İstanbul 2007, r. 272-273.

BİLGİLİ, Ali Sinan, “Tebriz”, DİA, c. 40, İstanbul 2011, r. 219-222.

CEYHAN, Semih, “Sema”, DİA, c.36, İstanbul 2009, r. 455-457.

________________ “Tecellî”, DİA, c. 40, İstanbul 2011, r. 241-243.

_________________“Zühd”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 530-533.

ÇETİN, Osman, “Horasan”, DİA, c. 18, İstanbul 1998, r. 234-241.

ÇELEBİ, İlyas, “Gayb”, DİA, c.13, İstanbul 1996, r. 404-409.

ÇİÇEKLER, Mustafa, “Sa’dî-î Şirazî”, DİA, c. 35, İstanbul 2008, r. 405-407.

DEMİRCİ, Kürşat, “Burç”, DİA, c. 6, İstanbul 1992, r. 421-422.

DURSUN, Davut, “Etiyopya”, DİA, c. 11, İstanbul 1995, r. 488-491.

DEMİRCİ, Mehmet, “Himmet”, DİA, c. 18, İstanbul 1998, r. 56-57.

DEMİRLİ, Ekrem, “Vahdet-i Vücud”, DİA, c. 42, İstanbul 2012, r. 431-435.

ERAYDIN, Selçuk, “Feyîz”, DİA, İstanbul 1995, c. 12, r. 513-514.

GÖRGÜN, Hilal, “Mısır”, DİA, c. 29, Ankara 2004, r. 555-557.

GÜRER, Dilaver, “Şiblî”, DİA, c. 39, İstanbul 2010, r. 125-126.

GÜÇ, Ahmet, “Kurban”, DİA, c.26, Ankara 2002, r. 433-435.

HARMAN, Ömer Faruk, “Yûsuf”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 1-5.

KÂHYA, Esin, “el-Qanûn fi’t-Tıb”, DİA, c. 24, İstanbul 2001, r. 331-332.

KARTAL, Abdullah “Sekr”, DİA, c.36, İstanbul 2009, r. 334-335.

KARAİSMAİLOĞLU, Adnan “Şebüsteri”, DİA, c. 38, İstanbul 2010, r. 400-401.

KÖK, Bahattin, “Nûreddin Zengî”, DİA, c. 33, İstanbul 2007, r. 259-262.

KANAR, Mehmet, “Nizamî-i Gencevî”, DİA, c. 33, İstanbul 2007, r. 183-185.

KARA, Mustafa “Fenâ”, DİA, c. 12, İstanbul 1995, r. 333-335.

KAFALI, Mustafa, “Cengiz Han”, DİA, c. 7, İstanbul 1993, r. 367-369.

KILAVUZ, Ahmet Saim, “Ezel”, DİA, c. 12, İstanbul 1995, r. 49-50.

_____________________ “Ebed”, DİA, c. 10, İstanbul 1994, r. 72-73.

KONUKÇU, Enver, “Gazne”, DİA, c. 13, İstanbul 1996, , r. 479-480.

KUTLUER, İlhan, “eş-Şifa”, DİA, c. 39, İstanbul 2010, r. 131-134.

________________“Felek”, DİA, c. 12, İstanbul 1995, r. 303-306.

KURNAZ, Cemal, “Felek”, DİA, c. 12, İstanbul 1995, r. 306-307.

KÜÇÜKAŞCI, Mustafa Sabri, “Zemzem”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 242-246.

MERÇİL, Erdoğan, “Mahmûd-ı Gaznevî”, DİA, c. 27, Ankara 2003, r. 362-365.

MUHAMMEDOĞLU, Aliyev Salih, “Derbend”, DİA, c. 9, İstanbul r 1994, r. 164-166.

OKUMUŞ, Ömer, “Camî”, DİA, c. 7, İstanbul 1993, r. 94-99.

ÖNGÖREN, Reşat, “Zikir”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, s. 409-412.

ÖĞÜT, Salim, “Hacerü’l-esved”, DİA, c. 14, İstanbul 1996, r. 433-435.

ÖZGÜDENLİ, Osman Gazi, “Şîraz”, DİA, c. 39, İstanbul 2010, r. 182-184.

ÖZKAN, İsmail Hakkı, “Segâh”, DİA, c. 36, İstanbul 2009, r. 304-306.

ÖZTÜRK, Zehra, “Züleyha”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 552-553.

SALİHOĞLU, Mahmut, “Samirî”, DİA, c. 36, İstanbul 2009, r. 78-79.

SÜMER Faruk, “Kaçarlar”, DİA, c. 24, İstanbul 2001, r. 51-53.

TANERİ, Aydın, “Han”, DİA, c. 15, İstanbul 1997, r. 517-518.

TOPDEMİR, Hüseyin Gazî, “Öklid”, DİA, c. 34, İstanbul 2007, r. 24-25.

TOPALOĞLU, Bekir, “Allah”, DİA, c. 2, İstanbul 1989, r. 471-498.

TOPALOĞLU, Bekir, “Zahir”, DİA, c. 44, İstanbul 2013, r. 85.

TOPALOĞLU, “Batin”, DİA, c. 5, İstanbul 1992, r. 187.

______________“Ahir”, DİA, c. 1, İstanbul 1988, r. 542.

______________“Evvel”, DİA, c. 11, İstanbul 1995, r.545.

TURHAN, Kasım, “Înayet”, DİA, c. 22, İstanbul 2000, r. 265-466.

TÜLÜCÜ, Süleyman, “Hatim et-Taî”, DİA, c. 16, İstanbul 1997, r. 472-473.

TÜMER, Günay, “Din”, DİA, c. 9, İstanbul 1994, r. 312-320.

UNAT, Yavuz, “Yıldız”, DİA, c. 43, İstanbul 2013, r. 534-538.

ULUDAĞ, Süleyman, “Ayna”, DİA, c.4, İstanbul 1991, r. 259-262.

____________________“Aşk” DİA., c. 4, İstanbul 1991, r. 11-17.

____________________ “Halvet”, DİA, c. 15, İstanbul 1997, r. 386-387.

____________________ “Hırka”, DİA, c. 17, İstanbul 1998, r. 373-374.

____________________ “Gaflet”, DİA, c. 13, İstanbul 1996, r. 283-284.

____________________ “Keramet”, DİA, c. 25, Ankara 2002, r. 265-268.

____________________ “Keşf”, DİA, c. 25, Ankara 2002, r. 315-317.

____________________ “Muhabbet”, DİA, c.30, İstanbul 2005, r. 386-388.

____________________ “Mürid”, DİA., c. 32, İstanbul 2006, r. 47-49.

____________________ “Velî”, DİA., c. 43, İstanbul 2013, r. 25-28.

____________________ “Sülûk”, DİA, c. 38, İstanbul 2010, r. 127-128.

YAVUZ, Yusuf Şevki, “Kelam”, DİA, c. 25, Ankara 2002, r. 196-203.

____________________ “Îlah”, DİA, c. 22, İstanbul 2000, r. 64.

____________________ “Peygamber”, DİA, c. 34, İstanbul, 2007, r. 257-262.

YAZICI Tahsin, “Ferruhî-î Sîstanî”, DİA, c. 12, İstanbul 1995, r. 410-411.

_______________ “Hâfız-ı Şîrazî”, DİA, c. 15, İstanbul 1997, r. 103-106.

________________“Derviş”, DİA, c. 9, İstanbul 1994, r. 188-190.

YAŞAROĞLU, Kâmil “Kâbe”, DİA, İstanbul 2001, c.24, r. 21-22.

YILMAZ, Hasan Kamil, “Cezbe”, DİA, İstanbul 1993, c. 7, r. 504.